Bingehê Dîrokî û Siberojê yê Şoreşa Jinê

Encamên Lêkolîn û Analîza Sosyolojîk

li ser Jin û Civaka Rojava / Bakur û Rojhilatê Sûriyê

Weşanên Akademiya Jineolojiyê:

Sipasiya ji bo endamên Navendên Lêkolînê ya Jineolojîyê û hemû kesên ku keda wan tê de derbas bû

Em vê pirtûkê di kesayeta Şehîd Malda Kosar de diyarî hemû şehîdên Şoreşa Rojava dikin.

Amadekar: Şervîn Nûdem
Sererastkirin: Luqman Guldivê

Weşanxane: Şîler
Qamişlo, 2021

Naveroka Pirtûkê

Pêşgotin

I. LÊKOLÎN Û ANALÎZA SOSYOLOJÎK ÇIMA PÊWÎST BÛ?

II. REBAZÊN LÊKOLÎNÊ Û XEBATÊ

III. DANE, ÇAVDÊRÎ Û ENCAMÊN DERBARÊ MIJARÊN LÊKOLÎNÊ DE

1. Şoreşa Neolîtîk wek Bingehê Dîrokî û Çandî yê Şoreşa Jinê ya Hemdem

1.1. Dîroka 12 Hezar Salan û 14 Hezar Girên li Bakurê Sûriyê

1.2. Dîrok di Roja Îro de Veşartî Ye

1.3. Pêkhateyên Bakurê Sûriyê û Bingehê Neteweya Demokratîk:

a) Li dijî Yekîtiya Gelan Êrîşên Mêhtingeran

b) Pêkhateyên Bakurê Sûriyê:

- Gelê Kurd Li Rojavayê Kurdistanê
- Gelên Aşûrî-Suryanî-Keldanî û Ermenî Li Bêt-Nehrên
- Gelê Ereb li Bakurê Sûriyê
- Gelê Tirkmen
- Gelê Çeçen
- Gelê Çerkes
- Qewmên Mitirb û Mehelmî

c) Bawerî û Olên Mezopotamyayê:

- Êzdayetî
- Cihûtî
- Xirîstiyanî
- Îslamiyet
- Elewîtî û Şîa

d) Wekî Encama Beşê

2. Çavkanî û Cûreyên Pirsgirêkên Jin û Civakê

2.1. Pirsgirêkên Civakê yên Zayendperestî, Malbat û Jin

a) Ferasetên Ol, Malbat û Namûsê

b) Zayendperestiya Dewleta Sûriyê

2.2. Mêhtingerî û Nijadperestî: Parçekirina Jin-Jiyan-Civakê:

a) Şovenîzma Dewletê û Pirsgirêkên Siyasî, Aborî û Koçberî yên Civaka Kurd

b) Tepisandina Vîn, Çand û Ramanê

2.3. Pirsgirêkên Jinê û Siyasetê

2.4. Pirsgirêkên Civakê yên Perwerdeyê

2.5. Pirsgirêkên Ekolojîk û Tenduristiyê yên Civakê

2.6. Pirsgirêkên Hişmendiyê

2.7. Wekî Encama Beşê

3. Bandora Şoreşa Kurdistanê û Şoreşa Rojava li ser Jiyana Jinan û Civakê

3.1. Salên Destpêkê yên Tevgera Azadiyê li Rojava: '*Şînbûna civaka Rojava li ser koka xwe*'

3.2. Pêşengên Tevgera Azadiya Jinê li Rojava

3.3. Bandora Tevlîbûna Jinên Pêşeng li ser Civaka Rojava

a) Herêma Efrînê
b) Herêma Kobanê
c) Herêma Cizîrê
d) Dayikên Şoreşger Keçên Xwe yên Şoreşger Oxir Dikin

3.4. Çawa Bijîn? - Serpêhatiyên birêxistinbûna jinê li Rojavaya salên 1990'î

a) Tevlîbûna Hevjînan: *Çûkên ku ji Qefesê Derdikevin û Difirin*
b) Jinên Cebhewî
c) Têkiliyên Abdullah Ocalan bi Gel û Jinan re
d) Têkiliyên Civakî wekî Bingehê Tevgera Azadiya Jinê û Hevaltiya Gelan

3.5. Roja Reş - Bandora Komploya Navdewletî li ser Jin û Civaka Rojava

a) Berxwedana li dijî Qirkirina Siyasî û Civakî
b) Raperîna 12'ê Adara 2004'an
c) Pêngava Avakirina Yekîtiya Star
d) Wekî Encama Beşê

3.6. Jin Weke Hêza Pêşeng a Şoreşa Rojava

a) Meşên Îniyê û Serhildanên Gel
b) Avakirina Komîn û Meclîsan
c) Mala Jinê
d) Şoreşa Ziman
e) Hêza Xweparastinê ya Jinê
f) Şehîda Yekemîn a Şoreşa Rojava
g) Şoreşa 19'ê Tîrmeha 2012'an
h) Avakirina Hêzên Asayîşê û Asayîşa Jinê
i) Wekî Encama Beşê

3.7. Avakirina Xweseriya Demokratîk û Şerê li dijî DAIŞ'ê

a) Pêvajoya Şerê Serêkaniyê

b) Avakirina Tabûrên Jinan

c) Damezrandina Yekîneyên Parastina Jinê YPJ

d) Pêngavên Rizgarkirina Herêma Cizîrê

e) Damezrandina Rêveberiya Xweser ya Sê Kantonên Rojava

f) Bipêşxistina Maf û Qanûnên Jinê

g) Di Berxwedana Kobanê de Dîroka Jinê ji nû ve Hatiye Nivîsandin

h) Hêza Xweparastinê Bûye Nasnameya Nû ya Jinên Rojava

i) Wekî Encama Beşê

3.8. Di Avakirin û Parastina Neteweya Demokratîk de Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê

a) Bi Rengê Jinê Avakirina Neteweya Demokratîk

b) Rizgarkirina Jinê û Herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji Faşîzma DAIŞ'ê

c) Şerê Dagirkeriya Tirkiyê

d) Avakirina Ruh û Saziyên Hevbeş ên Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê

e) Parastin û Avakirina Siberojeke Azad

3.9. Bandora Şoreşê li ser Rewşa Jin û Civakê

a) Polîtîka

b) Jiyana Hevjîn, Malbat û Civakê

c) Rewş û Siberoja Jinên Ciwan

d) Etîk û Estetîk

e) Tenduristî û Ekolojî

f) Aborî

g) Demografya

h) Perwerde û Zanist

i) Nirxandinên li ser *'Asta Şoreşa Jinê Gihandiye'*

- Azadî çi ye?
- Şoreş û Lêgerînên Azadiyê Didomin

IV. DAXWAZ, XEYAL Û NIHÊRÎNÊN JINAN JI BO SIBEROJÊ

V. GOTINA DAWÎ

VI. ÇAVKANÎ

"Dîroka koledariya jinê hîna nehatiye nivîsandin.

Dîroka azadiya jinê hîna li bendê ye bê nivîsandin."

Abdullah Ocalan

Pêşgotin

Berê gelek lêkolîner, arkeolog û nivîskarên ji welatên dervê hatine erdnîgariya Rojava û Bakurê Sûriyê. Ew girên dîrokî kolandin, li şûnwar û kevneşopiyên gelên herêmê meyzandin û li gorî hişmendiya xwe ew şirovekirine. Bi vî awayî gelek pirtûk û gotarên lêkolîneran - piraniya wan jî mêrên Ewropî – bi nêrîneke oryantalîst hatine weşandin. Di nivîs û wêneyên van weşanan de gelên resen wekî objeyên balkêş hatine nîşan dan. Lê belê dengê wan, nêrîn û şiroveyên wan hatine paşguhkirin. Çîrokên li ser jinên xwecih qet nebûn an jî li gorî xeyalên zilamên Ewropî dihatin vegotin. Bi kurtasî rastiya jinan û gelên vê herêmê bûye mijara gelek ferazî û têzên zanista pozîtîvîst. Van çavkaniyan ji derxistina holê ya heqîqetê zêdetir, xizmeta rewakirina ferasetên mêhtinger û zayendperest kiriye. Beramberî vê, berhemên nivîskî yên ku ji aliyê civak û civaknasên xwecihî ve hatine nivîsandin, pirr kêm in. Rastiya jin û gelên Mezopotamyaya Jorîn bi pirranî bi rêya çanda devkî û manewî di hafîza dîrokî ya civakê de hatiye parastin û ragihandin. Lê belê nêzikatiyên pozîtîvîst yên zanistên şaristaniyê van çavkaniyên zanînê an wekî 'ne zanistî' piçûk xistine, an jî li gorî daxwaz û berjewendiyên desthilatdaran şirovekirine. Bi taybetî heqîqeta şoreşa neolîtîk ya ku bi pêşengiya jinê pergaleke adilane ya jiyan û aboriya civakê li herêmên derdora çemên Firat û Dîcleyê ava kiribû, di pirraniya çavkaniyên dîrokî û zanista desthilatdar de tê înkarkirin. Ji hebûna jinên ku berhem û zanînên bingehîn ji bo bipêşketina mirovahiyê afirandine, heta îro guman tê kirin.

Rast zanîna dîrokê, naskirina çand, civak û dîroka xwe, qabiliyeta mirov a avakirina siberojê jî dide diyarkirin. Bi taybetî, ji bo jin û gelên wekî jin û gelê Kurd yên ku nasname, çand, ziman û hebûna wan hatine înkarkirin, xwegihandina çavkanî û daneyên resen a dîroka xwe, xwedî wateyeke girîng e. Çîrok û serpêhatiyên jinên ku li ser axa Rojavayê Kurdistanê dijîn, hemû beşeke heqîqeta çand û jiyanê, êş û kêfxweşî, zordestî û berxwedanên dîrokî û yên hemdem vedibêjin. Heta niha li gotin û nêrînên van jinan têra xwe û bi baldarî nehatiye guhdarîkirin. Pirtûkên ku bi rastî heqîqeta dîroka jin, civak û şoreşa jinê vedibêjin, gelekî kêm in.

Di pêvajoya Şoreşa Rojava de bi taybetî, ji dema berxwedana Kobanê ve, careke din nivîskar, derhêner û lêkolîneran berê xwe daye vê herêmê. Xebatên wan ji bo danasandina têkoşîna jinê û pergala xweseriya demokratîk di rayê giştî ya cîhanê de bi risteke girîng rabûne. Lê belê careke din di gelek berheman de nêrîn û şiroveyên oryantalîst û zayendperest derketin holê. Wekî Akademiya Jineolojî em girîng dibînin ku leheng û çalakvanên vê şoreşê jî, dîroka xwe binivîsin, serpêhatî û şiroveyên xwe vebêjin.

Ji ber van sedeman bi ya Akademiya Jineolojiyê pêwîst bû ku bi şêwaz û rêbazên zanista jin û civakê çavkaniyek were amadekirin ku bergehên heqîqeta jin û Şoreşa Rojava radixe ber çavan û şirove dike. Bê guman em nikarin bibêjin ku me karibû di çarçoveya vê xebat û pirtûkê de bigihêjine heqîqeta gişt ya dîrok û şoreşa jinê. Gelek alî kêm mane; gelek nirxandin û şiroveyên divê werin berfireh û kûrkirin. Mabesta me ew bû ku em bi xetên stûr û hinek hûrgiliyên jiyanê hewl bidin dîmenekî giştî xêz bikin. Bi taybetî jî me xwest guhê xwe bibin dengê jinên ku li cihekî di nav rastiya vê şoreşê de dijîn. Bi vê armancê me ji destpêkê heta bi dawiya sala 2017'an bi sedan hevpeyvîn û nîqaşên bi jinên li kantonên Cizîr, Efrîn, Kobanê û Minbicê meşandin. Her wiha di salên 2018 û 2019'an de jî çend hevpeyvîn hatine kirin. Nêrîn û serpêhatiyên jinan, çavkaniyeke bi rûmet û watedar e ji bo fêhmkirina dîroka jin û şoreşa Rojava. Lê dîsa ji ber sedemên cuda me nikaribû xwe bigihînin gelek ferd û pêşengên vê şoreşê ku bi parvekirina serpêhatî û nêrînên xwe yên hêja wê karîbûna naveroka pirtûkê dewlemendtir bikin. Lewma em vê pirtûkê wekî pêşnûmayê ji bo xebatên nû û berfirehtir dibînin. Yek ji encamên pêvajoya xebata lêkolînê ew bû ku bi ya me avakirina navendên lêkolînê yên Jineolojiyê yên herêmî li Bakur û

Rojhilatê Sûriyê pêwîst bû da ku li her herêmê jin karibin heqîqeta xwe ya dîrokî û civakî lêbikolin û pê zanibin. Lewma ji 2'ê Îlona 2017'an ve li pey hev Navendên Lêkolînê yên Jineolojiyê li Efrîn, Dêrik, Minbic, Hesekê, Kobanê, Tebqa, Şehba û Helebê hatin vekirin.

Wekî çîrokên jiyanê yên jinan ku di vê pirtûkê de tên ziman, çîroka berhevkirin û nirxandina encamên vê lêkolînê û di dawiyê de nivîsandina vê pirtûkê jî di nav aloziyên qada şoreşê de bihuriye. Li gorî plansaziya xwe, me xwestibû piştî pêşkeşkirin û nirxandina encamên destpêkê ya lêkolînê di Yekemîn Konferansa Jineolojiyê ya Bakurê Suriyê de ya ku di 12 û 13'ê Çileyê 2018'an de hatiye lidarxistin, nivîsandina pirtûkê di sala 2018'an de bi dawî bikin.

Lê belê di rastiya Şerê Cîhanê ya Seyemîn de gelek caran hesabê malê û sûkê hev nagirin. Bi bandora êrîş û şerê dagirkeriyê yê dewleta Tirk li dijî herêmên Efrînê û Rojhilatê Firatê pêvajoya nivîsandina pirtûkê çend caran hatiye rawestandin û dirêj kir. Lê belê di heman demê de me hewl daye da ku em van pêvajoyan jî ji bo hîn rastir fêhmkirin û şirovekirina rewşa jin û civakê di nav pêvajoya şoreşê de binirxînin. Em vê pirtûkê wekî destpêkekê dibînin.

Hewldanên me ji bo têgihîştin, şirovekirin û nivîsandina heqîqeta şoreşa jinê li Rojava, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi jiyan, xebat û têkoşîna me ji bo pêkanîn û parastina şoreşa jinê wê hê jî bidomin.

Akademiya Jineolojiyê

Gulana 2021'an

I. LÊKOLÎN Û ANALÎZA SOSYOLOJÎK ÇIMA PÊWÎST BÛ?

Şoreşa Rojava ku wek Şoreşa Jinê jî hatiye nasîn di asta cîhanê de deng veda. Li hemberî tevahiya êrîşên zayendperest û faşîst yên pergala kapîtalîst a gerdûnî, Şoreşa Rojava di nava jinan, gelên bindest, mirovên azadîxwaz û sosyalîst de hêviyên nû û hevgirtinên înternasyonal ava kirin. Hêvî û lêgerinên nû yên mirovahiyê li ser bingehê sosyalîzma demokratîk çavkaniyên xwe ji paradigmaya

rêber û pêşengê Konfederalîzma Demokratîk birêz Abdullah Ocalan digirin. Fikrên wî yên nûjen derbare avakirina civakeke demokratîk û ekolojîk li ser bingehê azadiya jinê de û perspektîfên wî ji bo pêkanîna Konfederalîzma Demokratîk li ser xeta parastina rewa, bûne îlham û bingehê vê pêngava şoreşgerî.

Şoreşa Rojava ku dikeve sala xwe ya heştan, di warê bîrdozî, siyasî, leşkerî û civakî de guhertinên mezin ava kirine û xwe îspat kiriye. Armanceke bingehîn a Jineolojiyê jî ew e ku em karibin li ser erdnîgariya şoreşa yekemîna jinê ya serdema neolîtîk, şoreşa jinê ya duyemîn bi ser bixin. Ji ber vê, em dixwazin hewl bidin ku çavkanî û zanînên bifêde ji bo ji nû ve zindîkirina civaka exlaqî, polîtîk û azad li ser bingehên xwe yên dîrokî derbixin holê. Hingê em ê bikarin serdema sedsala 21'ê bikin serdema moderniteya demokratîk û azadiya jinê.

Tevî ku bi vê perspektîf û armancê bi salan gelek têkoşîn û xebat hatine meşandin û bi hezaran mirovî jiyana xwe ji bo pêkanîn û parastina vê şoreşê feda kiriye, hê jî di jiyanî-kirina ruh, feraset û sazîbûna pergala neteweya demokratîk de zehmetiyên mezin tên kişandin. Pirsgirêkên civakî weke zayendperestiya civakê, tevî bûyerên firotin û kuştina jinan, pirsgirêkên perwerde û tenduristiyê, pirsgirêkên aborî û hilberînê, pirsgirêkên zêhniyetê û yên exlaqî, an jî yên penaberîyê û ewlekariyê hene, û li benda çareseriyê ne. Em dixwazin hewl bidin çavkaniyên van pirsgirêkan fêhmbikin. Ji ber ku bi dahûrandinên civaknasî li ser sedemên pirsgirêk û astengiyan, em dikarin derfetên nû ava bikin da ku lêgerînên me yên azadiyê û çareseriyê bi encam bibin. Di heman demê de armanca vê xebata lêkolînê ev bû ku em meraq, nîqaş û zanebûna jinên Rojava li ser dîrok û sosyolojiya civaka xwe zêdetir bi pêş bixin.

Jineolojî ji rastiya jinê bi rê dikeve û li ser vî bingehî hewl dide ku heqîqeta civakê fêhmbike. Ji bo me lêkolîn û analîzên sosyolojîk û dîrokî yên li ser jin û civaka Rojava pêwîst bû, ji bo ku em bikarin di pêvajoya şoreşê de guhertin û veguhertina civakê li ser bingehê demokrasî, ekolojî û azadiya jinê bi avahiyekê serketî bi pêş bixin. Di dîrokê de gelek şoreş û têkoşînên azadiyê hatine meşandin ku bi fedakarî û lehengiyên mezin serketinên leşkerî û siyasî bi dest xistine. Lê mixabin ew şoreş di dawiyê de şikestin. Ji ber ku di dema avakirina pergala nû de wan nekarî ji hêviyên azadiya jinê û civakê re bibin bersiv. Lewma ji bo me pêwîst e ku em bikarin dînamîkên şoreşgerî yên bîrdozî, siyasî, çandî û leşkerî yên bipêşxistî bi pêngaveke sosyolojîk xurttir bikin. Her wiha em bawer dikin ku bi her gavê ber bi derxistina holê û xwegihandina heqîqet û bîreweriya civakê ve, çavkaniyên xwebûnê, vîn û hewldanên çareseriyê yên jinan li herêmên Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriye zêditir wê bi pêş bikevin û vegerin çanda jiyana azad.

Li gorî vê armancê, pirsên lêkolînê di çar mijarên esasî de hatine diyarkirin:

1. **Bingehê dîrokî ya şoreşa jinê ya duyemîn li ser axa Kevana Zêrîn çi ye?**
2. **Çavkanî û cûreyên pirsgirêkên civakê û jinan li Rojavayê Kurdistanê çi ne?**
3. **Bandora Şoreşa Kurdistanê û Şoreşa Rojava li ser jiyana jinan û civakê çawa ye?**
4. **Nêrîn, daxwaz û xeyalên siberojê çi ne? Jinên Rojava jiyaneke çawa, civakeke çawa dixwazin?**

Êrîşên qirkirinê û dagirkerî yên dewleta Tirk ku di 20'ê Çileyê 2018'an de li dijî herêma Efrînê dest pê kirin û ji 9'ê Cotmeha 2019'an ve li dijî Serêkaniyê, Girê Spî û herêmên Bakur û Rojhilatê

Sûriyê hemûyan dewam dikin, serê pêşî erişên hovane li dijî çand û şoreşa jinê ya vê erdnîgariyê ne. Ev jî carekê din girîngiya vê lêkolînê, nivîsandin û parastina bermahiyên jinê radixe ber çavan.

II. RÊBAZÊN LÊKOLÎNÊ Û XEBATÊ

Di destpêka sala 2017'an de me wek Akademiya Jîneolojiyê pêşnûmayek li ser armanc, pirs, mijar û rêbazên lêkolînê amade kir. Li gorî armancên lêkolînê, rêbazên lêkolînê yên çawanî û çendanî [hejmarî] di nava hev de û bi afirînerî hatin bi kar anîn. Li ser esasê pêşnûmayê komên lêkolînê ji endamên Akademiya Jîneolojiyê, Navendên Lêkolînê yên Jineolojiyê li kantonên Cizîrê û Efrînê û

Komîtaya Jineolojiyê ya Kobanê hatin avakirin. Nêzîkî 12 mehan xebata lêkolînê li meydanê hatiye meşandin.

Di qonaxa yekem de çavkanî, nivîs, pirtûk û lêkolînên heyî bi pirsên lêkolînê ve elaqedar li ser erdnîgari, dîroka jinê û rewşa civakî ya Rojavayê Kurdistanê û Bakurê Sûriyê hatin komkirin û nirxandin. Dîsa bi rêya hevdîtinên bi endamên saziyên xweseriya demokratîk û Kongra Star re pêşniyaz û çavdêriyên derheqê rewş û pirsgirêkên civakî de hatin girtin.

Di qonaxa duyem de li her sê kantonên Rojava, li herêmên Bakurê Sûriyê û eniya pêngava rizgarkirina Reqayê li gorî mijarên cuda û taybet, derbarê pirsên lêkolînê de muxatebên hevpeyvînan hatine diyarkirin. Bi gişti qederê 380 hevdîtin, nîqaş û hevpeyvînan bi jin û komên jinan re hatin çêkirin. Li navçeyên Dêrik, Girkêlegê, Rimêlan, Til Koçer, Çilaxa, Tirbespiyê, Qamişlo, Amûdê, Dirbêsiyê, Hesekê, Til Temir, Serêkaniyê, Eyn Îsa, Minbic, Girê Spî, Kobanê û Efrînê endamên komên lêkolînê hevpeyvînên di nava gund, taxên bajêr û saziyan de pêk anîne.

Ji bo dîmeneke giştî derkeve holê, me hewl da ku em bi rêbazên dewlemend xwe bigîhinin jinên ji tevahiya pêkhate û beşên civaka Rojava û Bakurê Sûriyê. Li ser vî esasî me hevpeyvînên ferdî û komî çêkirin

- bi jinên Kurd, Keldanî, Aşûrî, Sûryanî, Ereb, Çeçen, Tirkmen, Mihelmî û Mitirb re; bi jinên Misilman, Êzdî, Elewî û Mesîhî re;
- bi jinên ciwan, dayik û pîran re; bi jinên zewicî, jinebî û nezewicî re; bi wan jinan re ku hevjînê xwe berdane an jî hatine berdan; bi jinên kedkar, rewşenbîr, hunermend û xwendekar re;
- bi dayikên zanyar û dîroknasên herêmî re; bi pîrik û bijîşkên xwezayî re; bi hevjîn, dayik û xwuşkên şehîdên Kurd, Ereb û Aşûrî re;
- bi wan jinan re ku 30 sal û zêdetir e di nava tekoşîna azadiyê de cih girtine, bi wan dayikan re ku tevlî civînên Rêber Abdullah Ocalan bûn û yên ku li zindanên Sûriyê û Tirkiyê êşkence li wan hatiye kirin; bi jinên welatparêz û cebhewiyên 'kevin' re, bi xebatkarên nû û bi kesên 'serbixwe' re; bi jinên şervan re, bi jinên penaber û yên ku ji esareta DAIŞ'ê xilas bûyî re.

Bi jinên xwedî ewqas rastî û tecrûbeyên cuda re hevpeyvîn hatin çêkirin. Her çîrok, ders û rastiya jiyanê ku van jinan bi me re parve kir, bû kevirek di mozaîka rengîn a heqîqeta jin û civaka Rojava de. Me hewl da ku em van keviran bi pêhesîn û watedayînekê rast deynin cem hev. Ji vê re hişyarî û berpirsyarî divê, da ku em dîmeneke çêkirî yekrengî an jî yeke li gorî dilê xwe xêz nekin. Ji ber ku armanca me xuyayîkirina heqîqetê ye.

Li gorî van rêbazan me li jinên pêşeng, parêzvan û kedkarên şoreşê guhdarî kir. Me bala xwe da şiroveyên nûnerên Kongra Star; gotinên endamên Mala Jinê, Asayîşa Jinê, Parastina Jinê, Dada Jinê, saziyên bawerî, civakî û tenduristiyê, Rêxistina SARA, Saziya Malbatên Şehîdan û kooperatîfên jinan; nêrînên endam û hevserokên jin yên komîn, meclîs û desteyên Xweserîya Demokratîk; dîtinên nûnerên jin yên Tev-Dem, MSD û PYD'ê heta nirxandinên fermandar û şervanên YPJ'ê.

Dîsa di **nîqaşên bi komên perwerdeyê** de wek di dewra jinên Ereb li Akademiya Ş. Farûq, li dewreyên Kongra Star û perwerdeyên Jineolojiyê, li akademiyên civakî û leşkerî de dahûrînên kolektîf li ser dîrok û ramanên jinê, derheqê pirsgirêkên civakî û bandora şoreşê li ser jin û civakê de bi pêş ketin.

Her wiha **endamên komên lêkolînê tevlî civînên** meclîs û komînên jinan bûn. Dîsa beşdarbûna li civîn û konferansên Kongra Star li ser mijarên lêkolînê yên wek 'pêkanînên qanûnên jinê', avakirina pergalên tenduristiyê, Dada Jinê û akademiyên xweser, çêbûye. Di van kombûnan de dane û analîzên girîng yên derheqê rewşa jin û civaka Rojava de derketin holê.

Em çûn serdana şûnwarên dîroka kevnar û şaristaniyên wek Girê Mozan (Orkêş); Girê Çaxirbazar (Çaxil); Til Bêder (Nabada); Hemokar; Til Xelef; Keşto û Xuêra li Cîzirê; Girê Cindirêsê, Kevirê Bûkê, Şikefta Qîzika, Xirabê Şemsê, Girê Endarê û Zinarê Zînê li Efrînê; Girê Mişтenûr, bajarokên Şêran û Tilêjb li Kobanê; Kelha Necîm û Şikefta Keçikan li Minbicê û Kelha Caber li Tebqayê. Li ser esasên çavderiyên li cihê cih bi xwe û raporên kolanên arkeolojîk yên dema bihûrî, me hewl da, daneyên darîçav li ser heqîqeta şoreşa neolîtîk û çanda jinê kom bikin û ji nû ve şirove bikin.

Dîsa ji bo bidestxistina daneyên çendanî li ser rewşa jinê pirsnameyên ji bo Dada Jinê, Mala Jinê û Asayîşa Jin û elaqedarî lîsteya pirsan encamên serjimarî li kantonên Cizîrê, Kobanê û Efrînê hatin amadekirin û radestê saziyên peyvendîdar hatin kirin. Pirsnameyên taybet ji bo Desteyên xweseriya demokratîk wek desteyên şûnwar, jin, tenduristî û perwerdeyê hatin amadekirin. Ji bo analîzkirina rewşa jinên Rojava yên koçber li Ewropayê, endamên Komîteya Jineolojiyê ya Ewrupayê hevpeyvîn bi jinên koçber re li sê welatên Ewropayê çêkirin. Tevî van xebatan arşîvek bi çavkaniyên deng û dîmen yên jinên Rojava hatiye avakirin.

Di qonaxa seyem de endamên Navendên Lêkolînê yên Jineolojiyê dosyayên hevpeyvînan bi deng vegerandin nivîsê. Di heman demê de encamên lêkolînê hatin nirxandin û şirovekirin. Di 12-13'ê Çileyê 2018'an de encamên destpêkê yên lêkolînê bi raporekê ji Konferansa 1'emîn a Jineolojiyê ya Bakurê Sûriyê re hatin pêşkeşkirin. Di encama nîqaş û pêşniyazên li konferansê de, xebata lêkolînê hatiye domandin. Piştre, xebatên nivîsandina pirtûkê û amadekariya materyalan ji bo çapkirin û belavkirina encamên lêkolînê hatin destpêkirin.

Serpêhatiyên ku di hêla rêbazên me de derketin holê:

- Cih û derdora hevdîtinan girîng in. Hevpeyvînên ku bi şêweyekî xwezayî di nava malan de bi pêş ketin, hîn zêdetir nêzîkî heqîqeta civakê ne. Dîsa qeydên deng an jî girtina wêneyan ji bo hinek jinan dibûn sedema nerehetî û xwe li me girtinê. Çiqas em karibin di jiyana jinan a rojane de bi rengekî xwezayî parve bikin, ewqas jî bawerî û parvekirina jinan bi pêş dikeve û heqîqeta jiyanê xuya dibe.
- Dîsa çavdêriyên ji hundirê civakê û 'ji derve' hevdu temam dikin. Gelek agahî û zanînên ji rêûresmê yên herêmî li cem jinan parastî ne. Lê pirr caran haya jinan bi xwe ji vê dewlemendî û wateya vê zanînê û çandê nîne, ji ber ku ji bo wan wek fêrbûnek û rastiyeke xwezayî xuya dike. Tenê gava ku em bikarin çandên xwecihî yên herêmên cuda li ber hev bigirin taybetîbûn û girîngiya rêûresmên çandî yên herêmî zelal dibin.
- Ji bo dîmeneke gişтî ya sosyolojiya jin û civakê li Bakurê Sûriyê derkeve holê, rêbaz û hewldanên ji bo xwe gihandina tevahiya beşên civakê girîng hatiye dîtin. Li xetên gund, tax û bajaran ku di qada civakî de pergala komîn, meclîs û hevserokan baş hatiye rûniştandin, xwe gihandina tevahiya beş û pêkhateyên civakê hêsan e. Li van cihan, hevjiyan û hevkariya saziyan û civakê xuya dibe. Rêveberî an jî endamên Kongra Star di van herêman de pişтgirî û hêzeke mezin dan meşandina xebata lêkolînê. Ji ber ku ew bi

xwe jî weke civaknas xebata xwe dimeşînin. Lê bi taybetî pêwîst e ku rewşa jinên nerêxistinkirî baştir were fêhmkirin: Çima têkiliyên wan bi saziyên civakî û komînan re qut an jî lawaz in? Pirsgirêkên wan yên jiyanê û daxwazên wan çi ne?

- Di xwegihandina daneyên statîstîkî yên saziyan de carinan zehmetî hatin kişandin. Tevî ku gelek çavkaniyên me yên zanîn û zanebûnê hene jî, nirxandin û ji wan sûdwergirtin sînordar dimîne. Ev jî destnîşan dike ku ji bo sazîbûneke domdar û avakirina hafize rabihurî û siberojê pêwîst e ku em bi baldarî nêzîkî birêkûpêkkirin û parastina xebatên arşîvê bibin.
- Her wiha gelek jin û sazî bi ked, fikir û baweriya xwe di pêkanîn û pêşveçûna lêkolîna sosyolojîk de cihê xwe girtine, rê nîşanî me dan û alîkarî kirin. Ew bi naskirin û beşdarbûna li vê xebatê lêhûrbûnên nû li ser dîrok, civak û jiyana xwe tecrûbe kirine û pirsên nû ji xwe pirsîne. Encameke rêbazên hevpeyvîn û nîqaşan jî ew bû ku jinan di jiyana xwe de rojevên nû ava kirine û dest bi lêkolînên li ser çand û civaka xwe kirine. Di vî warî de em dikarin bibêjin ku bi vê xebata lêkolînê ve li gelek cihan jin bi rê ketin da ku heqîqet û wateya jiyana xwe baştir fêhmbikin. Ew ketin nav hewldanên nû da ku li nirxên çanda dayika xwedawend û dayikên xwe xwedî derkevin û ji nû ve wan zindî bikin.

III. DANE, ÇAVDÊRÎ Û ENCAMÊN DERBARÊ MIJARÊN LÊKOLÎNÊ DE

1. Şoreşa Neolîtîk wek Bingehê Dîrokî û Çandî yê Şoreşa Jinê ya Hemdem

Kevana Zêrîn ango Mezopotamya wekî dergûşa mirovahiyê jî tê nasîn. Erdnîgariya Kurdistanê û Bakurê Sûriyê jî beşek ji vê axê ye. Yek ji armancên lêkolîna me jî ew bû ku em daneyên serdema şoreşa neolîtîk eşkere bikin. Me xwest fêhmbikin gelo bandor û wateya van rayên dîrokî yên çanda jinê, civaka komînal û nirxên civakî di roja îro de çi ne? Elaqedarî vê em ketin pey pirsên wekî: Destpêka civakîbûn, hilberîn, avakirina gundan û bajarbûnê li ser vê erdnîgariyê çawa û kengê çêbûn? Civakeke çawa, çand û manewiyata jiyanê bi çi rengî li vir bûye? Di van serdemên dîrokî de rist û rewşa jinan çawa bû? Çavkaniyên jiyanê, şêwazên hilberînê û aboriyê çi bûn?

Li ser erdnîgariya Bakurê Sûriyê şopên cih û demarên dîroka mirovahiyê, çanda jinê û serdema neolîtîk ji Dêrikê heta Efrînê, ji Waşokanî û Kobanê heta Minbicê, Reqayê û Baxozê xuya ne. Çend ji daneyên herî kevnar ên mirovahiyê di ***Şikefta Duderî*** ya li Çiyayê Lêlûnê ya herêma Efrînê hatine dîtin. Ev şikeft bi du deriyên xwe 50 metre fireh, 15 metre dirêj û 10 metre bilind e. Şûnwar û hestiyê Neanderthaleran li vir hatin dîtin. Daneyên van dişibin yên ku li *Şikefta Şanedar* li Başûrê Kurdistanê derketin holê. Amûrên kevir û hestiyê nêzî 70 mirovan destnîşan dikin ku berî 200 hezar salan di serdemên Paleolitik û Mezolitikê de komên mirovan li şikeftên Çiyayên Kurmênc jiyane. Di lêkolînên sala 1993'an de di vê şikeftê de skeletê zarokeke Neandartaler a du salî hat dîtin. Li ser şeklê dirêjkirina zarokê wek cenîn bi milê xwe yê badayî û vekirina destê wî bala mirov dikişîne. Wekî din li şikeftê daneyên têkîldarî serdemên Kebarî (18 – 12 hezar sal BZ'yê) û Natufiyan (12 - 9 hezar sal BZ'yê) hatin vedîtin. Di van serdemên beriya dîtina çandiniyê de mirov wekî neçîrvan û berhevkaran çanda jiyana komînal bi pêş dixistin û gav bi gav dêman dibûn.

1.1. Dîroka 12 Hezar Salan û 14 Hezar Girên li Bakurê Sûriyê

Zêdetirî 14 hezar gir [bi Erebî 'til'] li ser axa Rojava ava bûne.[1] Tebeqeyên van çand û şaristaniyên cuda, dîroka 12 hezar salan dihewînin. Gelek caran gund û bajar ji ber bandora karesatên xwezayî yên wekî lehî, erdhej, hişkesalî, xela, bahoz û hwd. dihatin terikandin an jî ji ber sedema êrîş û şeran dihatin hilweşandin. Şêniyên wan koçber bûne. Lê pirr caran piştî dehan, sedan an jî hezaran salan li ser nişstecihên kevin nifşekî nû jiyan, gund û bajarên nû ava kirine. Gir bi vî rengî tebeqe bi tebeqe bilind bûne. Di roja îro de li ser pirraniya giran gor û goristan hene. Ev gor û goristan jî bi piranî di sedsala 19 an 20'an de hatine çêkirin. Mirov dikare wan wekî nîşanên parastina demarên kevnar ên vê axê şirove bike.

Bi hezaran gund, perestgeh û bajarên kevnar li ser axa dewlemend ya Kevana Zêrîn di navbera rêze Çiyayên Herêma Botanê, Mêrdînê heta Çiyayên Amanos û Nûrheqê, Çiyayên Kizwana û Çiyayên Kurmênc de, di deştên navber û kêlekên rûbarên Dîcle, Xabûr, Firat û Awrînê de hatin avakirin. Mirov dikare bibêje erdnîgarî, dîrok, çand û zimanên herêmên Rojavayê Kurdistanê li binxetê îro wekî neynikên herêm û çandên herêmên Bakurê Kurdistanê li serxetê ne: Efrîn û Dîlok/ Mereş, Kobanê û Riha, Serêkaniyê û Ceylanpinar, Dirbêsiyê û Qoser, Amûdê û Mêrdîn, Qamişlo û Nisêbîn, Dêrik û Cizîrê, Botan û Koçerat weke berdewama hevdu ne. Lewma xeta sînor ji sala 1923'an ve wan herêman bi tundî ji hevdu veqetandin, mirov dikare wekî qelaştina bedena mirovekî vê yekê binirxîne.

Pêvajoya pêşîn a serdema neolîtîk di navbera salên 11.500 û 10.000 BZ (beriya zayînê[2])'yê de li Mezoptomya Jorîn bi pêş ket. Malên piçûk û gulover ji kerpîç dihatin avakirin; çandina zad,

[1] Bjoern H. Menze and Jason A. Ur: *Mapping patterns of long-term settlement in Northern Mesopotamia at a large scale*, 2012 [Lêkolîn û şiroveyên li ser wêneyên satelîtê yên NASA]

neçîrvanî û kevneşopiya veşartina mirovên mirî li bin malan ji taybetmendiyên vê serdemê bûn. Yekîtî û hevsengî di navbera jiyan û mirinê, ruh û bedenê, cîhan û gerdûnê, xweza û mirovbûnê de hebûn. Avakirina embarên mezin li navenda gundan destnîşan dike ku ked, hilberîn û debara komînal û hevbeş, dihatin birêxistinkirin. Mînakên vê çandê li ***Til Mureybet, Ebu Hureyra, Til Halula, Girê Sor û Girê Keçikan*** hatinê vedîtin. Di dawiya sedsala 20'an de rejîma Sûriyê ev deverên şên ên herî kevnar hemû li bin golên bendavên Tişrîn û Tebqayê de veşartin. Heman çanda civaka xwezayî li derdora ***Girên Endarê*** û ***Cindirêsê*** li Efrînê; li ***Çemê Xallan*** nêzîkî Amedê/Erxenî, li ***Newala Çorî*** û ***Xirabreşk*** nêzîkî bajarê Rihayê, li Anatolya Navîn, li herêmên Derya Spî yên Sûriyê û Filistînê çêbûye. Li wan deveran ava çeman û baranê têra çandiniyê dikir û pêwîst nedikir ku cotkar zeviyên xwe av bidin.

Daneyên ku li *Xirabreşk* derketin holê, nîşan didin ku li van cihên dergûşa mirovahiyê di heman demê de çandeke xurt a manewî ya hevbeş hebû. Avahiyên ji kevirên mezin li Girê Miradan ê li Xirabreşkê ku ji qederê 10.500 BZ'yê mane, bi pisporî, bi hêzeke mezin, kolektîf û hevbeş hatine avakirin. Pergala gulover a rêzkirina keviran mirov dikare an wekî pergala gerdûnê an jî wekî malzarokê şirove bike. Misoger e ku ev cihê merasîm û baweriyê xwedî wateyeke girîng bû di jiyana mirovên Kevana Zêrîn de. Li ser bingehê pîrozdîtina gerdûnê, xwezayê û dayikê, pergala jiyanê hatiye avakirin. Girê Miradan ê li Xirabreşkê bûye cihê navendî yê bawerî û merasîman. Wisa tê hizirkirin ku qewm û şêniyên tevahiya gundên herêma Firatê li wir gihandina hev ji bo merasîmên salê ji bo miriyên xwe li dar bixin.

Di destpêka salên 10.200 – 8000 BZ'yê de mirovan li gundê Mureybet jiyana xwe bi komkirina zad û nêçirvanî domandiye. Paşê tov dihatin çandin û demek şûnde sewal jî dihatin kedîkirin. Di serdema 8000 BZ'yê de ***Til Mureybet*** bi 500 şêniyên xwe bûye bajarê yekemîn û herî mezin ê cîhanê.[3] Di çanda jiyana bajêr de – ku wek çanda dayiksalarî jî hatiye pênasekirin – parvekirina xebatan, avahiyên civakî, aborî, fikrî û çandî di asta jor de hatibûn bipêşxistin.[4]

Girê Sor jî bûye yek ji navendên destpêkê yên çanda neolîtîk li herêma Kobanê li ser çemê Firatê. Ev cih bi navên xwe yên Hîtîtî *Mazuwari,* Aramî *Til Barsip* û Erebî *Til Ahmar* jî hatiye nasîn. Çîrok û navên cûrbicûr ku li Girê Sor hatine kirin, him qala dîroka pirrçandî ya gelan dikin, him jî qala dîroka dagirkeriya desthilatdaran dikin. Di salên 9200 heta 8700 BZ'yê de li Girê Sor rêzên xaniyên gulover û çarqorzî ji ax û keviran hatibûn avakirin. Li gorî mezinbûn, teşeyên dîwaran, neqişên hundirê xanîyan û hestiyên serê mirovan ku li bingehên xaniyan hatin dîtin, tê texmînkirin ku li Girê Sor pergala jîyanê ya civaka komînal hatibû bicihkirin.[5] Li gorî şiroveya arkeologa Fransî Danielle Stordeur, şêniyên Girê Sor tevlî merasîmên navendî yên olî li Xirabreşkê dibûn. Wateya vê ew e ku mirov her sal 200 km ji Girê Sor dimeşiyan heta xwe digihandin cihê pîrozbahiyê. Lê li derdora 7.500 BZ'yê cihên Girê Sor û Xirabreşk hatin terikandin û li bin axê hatin veşartin. Piştî vê, serdemeke nû dest pê kir: Derdora 5 hezar BZ'yê jiyan li ser axa Girê Sor carekê din şîn dibû. Lê îcar şopên nîştecihbûn û goristanan ku di şikeftan de hatine vedîtin xwe dispêrin çanda El Ubeyd. Bi bipêşketina amûr û rêbazên çandîniyê, bi cotkarî û kedîkirina sewalan û jiyana dêmanî, êdî şoreşa gundan û bajarvanî jî gihîşt asteke nû. Cotkaran malên ji kerpîçê bi

[2] BZ (beriya zayînê): ji bo sal û serdemên beriya jidayikbûna Hz. Îsa tê bi kar anîn; li gorî salnameya gregorî beriya mîladê

[3] Ian Morris: *Social Development*, Stanford University, 2010

[4] Heide Göttner-Abendroth: *Am Anfang die Mütter*, 2011

[5] Peter Akkermans, Glenn Schwartz: *The Archaeology of Syria*, 2003

heman şiklî li cem hev ava kirine. Lê avahiyên wekî zigurat yan xaniyên ku sazîbûnekê navendî destnîşan dikin, hîna li wir nebûn. Lewma mirov dikare bibêje ku di civaka gundan de jiyaneke wekhev li gorî pêdiviyên çandîniyê serwer bû.[6]

Di serdema Hîtîtiyan de Girê Sor wek bajarê *Masuwarî* hatiye nasîn. *Masuwarî* dîsa bûbû navendeke girîng a aborî û baweriyê. Qebir ango gorên mezin yên xwedawenda Îştar û xwedayê hewayê Hadad ku wek hevjînê xwedawend Nînhursag hatiye pîrozkirin, li vir hatine vedîtin. Her wiha careke din navê Girê Sor di serdema Aramiyan de hatiye guhertin. Di sedsala 9'an BZ'yê de ew êdî li bin navê *Til Barsip* bûbû paytexta mîrîtiya Aramî *Bit Adini* ku erdnîgariya herêma Firatê dihewîne. Di pirtûkên dîrokî de bi pirranî navê *Til Barsip* tê hildan. Lê belê her desthilatdar careke din navekî nû li bajêr dikir: Li bin dagirkeriya Assûriyan di sala 856'ên BZ'yê de navê Girê Sor bûye *Kar-Salmanasser* ango *'Keştîgeha Şahê Asûrî Salmanasser ê 3'yemîn'* û li bin dagirkeriya Yewnaniyan ew bûye *Bersiba*. Piştî serdema Yewnaniyan şêniyên bajêr careke din koçber bûn. Li gorî texmînê, ev warê şên ê kevnar bi sedan salan 'bê xwedî' maye. Hîna nû di sedsala 19'an de li derdora gir careke din çend malbat bi cih bûne û wan ji nû ve gundek ava kiriye. Di sedsala 20'an de arkeologên Fransî û Belçîkî gelek berhemên dîrokî û nirxên arkeolojîk yên Girê Sor derxistine û birine. Dawiya dawîn, şêniyên Girê Sor di encama siyaseta Kembera Ereban a rejima Beesê di sala 1999'an de careke din ji warê xwe hatine derxistin. Piştre ev navenda dîroka kevnar ya mirovahiyê, çanda dayikê û çanda şaristaniyan jî li bin gola bendava Tişrîn hatiye hiştin.

Dîsa nêzîkî ava Firatê li herêma Minbicê yek ji şûnwarên herî mezin ên serdema neolîtîk hatiye dîtin. Di pêvajoya 7.750 BZ'yê heta 6.780 BZ'yê de ***Til Halula*** 8 hektar rapêç dikirin û weke 'mega sîte' hatiye nirxandin. Di kolanên arkeolojîk yên sala 1991'ê de 21 malên çarqorzî bi sê heta pênç odeyan hatin kifş kirin. Dîsa di 9 malan de gor û hestiyên 107 kesan hatine dîtin. Mirî li binê binpêyên xaniyan dihatin veşartin û bi sîwaxa kilsê dihatin nixumandin.[7] Di nava 40 tebeqên li bin axê de daneyên bicihbûnê, çanda Til Xelefê û bipêşketina çandîniyê derketin holê: Wek mînak; 222 das ji kevirqespan û serê tîran hatin dîtin. Mirov dikare van wekî amûrên nêçîrê şirove bike. Di heman demê de dane destnîşan dikin ku bizin û pez hatine kedîkirin. Kifşa herî balkêş, neqşên bi şiklên bedena jinan bûn ku li ser binpêyê xaniyekî derketin. Tê texmînkirin ku ev nexşên herî kevin ên Rojhilata Navîn in, ku şiklê mirovan nîşan didin.[8]

Girê Keçikan (Til Banat) him bi navê xwe ve him jî bi daneyên arkeolojîk ve çanda kevnar a jinê destnîşan dike ku di qeraxên çemê Firatê de mirov bi cih bûne. Daneyên kolanên arkeolojîk derxistin holê ku avabûna Girê Keçikan xwe dispêre serdema 3 hezar BZ. Tê texmînkirin ku merasîmên taybet û kolektîf ji bo miriyan hatine lidarxistin da ku ruhê wan daîmî zindî bibe û hêzê bide avakirin û domandina jiyana civakî. Di çîrokên gelê herêmê de îro tê gotin ku Girê Keçikan ji aliyê 750 jinên ciwan ve wekî 'bajarekî jinan' hatibû avakirin. Peykerên xwedawendan û nexşên zirav li ser firaxên seramîk yên ku di bin axa Girê Keçikan de hatine vedîtin, wekî îsbatên rastiya vê çîrokê tên şirovekirin.

6 Klaus Schmidt: *Sie bauten die ersten Tempel - Das rätselhafte Heiligtum der Steinzeitjäger, Die archäologische Entdeckung am Göbekli Tepe,* München, 2008

7 F. Estebaranz, L.M. Martínez, J. Anfruns, A. Pérez-Pérez: *Short Fieldwork Report: Tell Halula (Syria)*, seasons 1992–2005

8 Michel Fortin: *Syria - Land of Civilizations, The enigmatic figures of Tell Halula*, Musée de la civilisation, Québec, 1999, p.238

Şopên çanda neolîtîkê weke peyker û sembolên jinê li herêmên Efrîn û Şehbayê vedigerin 12 hezar BZ. Di erdnîgariya Efrînê pirrbûna kevir û şikeftan bala mirov dikişîne. Li rojhilatê Efrînê qayîmbûna kevirê reş û bereketa axa wê balê dikişîne ser xwe. Kevirê reş di serdema civaka neolîtîk de ruh û can dida civakê. Ji ber vê yekê li her malekê kevirê reş ê bi qul ku remza pîrozî û oxirê ye tên daliqandin. Di axa Efrînê de, bi dar, giya, nebat, ber û mirovên wê şopa damara berxwedêr a xwedawendan xuya dibe. Navên şûnwaran wek Şikefta Qîzikan, Newala Qîzikan, Kelha Qîzikan û Şikefta Bûkê yên li gundê Hesendêra navçeya Bilbilê dîroka jinê ya veşartî dihewînin. Xelkê deverê bi xwe dibêje, çanda Îştar li vir hebûye.

Girê Cindirêsê yek ji wan navçeyan e ku tê de gelek şopên çanda Til Xelefê û çanda xwedawendiyê tên dîtin. Ev gir li ser rêya bazirganiyê ava bûye û bûye wekî cihekî ku herêmên rojhilatê Firatê û Anatolyayê bi hev ve girêdidan. Li binya gir du îbadetxane û qesreke serdema Bronzê hatine dîtin, li cem berhemên serdema Hîtîtiyan û çanda Qerqamîşê[9]. Her wiha bermahiyên şaristaniyên Asûrî, Helen, Roma û Bîzansê jî hatine dîtin. Navê 'Cindirêsê' bixwe jî balê dikişîne. Li ser etîmolojiya wî şiroveyên cuda hene.

Dayikeke bi navê Yadê Eyşê diyar dike ku peyva 'cin' bi Kirmanckî bi wateya 'jin'ê û peyva 'dirêse' jî ji rêsandinê tê.[10] Rêsandin jî tê wateya 'hilberînê'. Bi gotina Yadê Eyşê, wateya Cindirêsê '*Jin Dirêse*' ye. Lêkolînên etîmolojîk nîşan didin ku koka peyvê 'cin' bi wateya xwe ya jinê diçe heta zimanê Hûriyan. Hinek lêkolîner û mamosteyên ji Efrînê îşaret bi wê yekê dikin ku di zimanê Erebî de tîpa 'J' nîne. Lewma dema ku dewleta Sûriyê navê gundên Kurdan wergerandiye zimanê Erebî, Jindirêse bûye Cindirês. Tevî ku koka navê Girê Cindirêsê nehatiye misogerkirin, dîsa jî balê dikişîne ser wê yekê ku di herêmê de pirr pez hebûne û di demên kevinar de karê hirî, rîs û çêkirina ta ji wir derketiye. Her wiha mamoste Menan Cafer dide xuyakirin ku li navçeya Cindirêsê bi taybetî li aliyê Celêmê, nêzî Şaderê, Îska, Qaziklarê gelek şikeft hene. Di çîrokên kevinar ên van herêman de tê gotin, di van şikeftan de gelek cin hebûne: "*Îcar cinan dirêsandin, xezil dikir. Cil çêdikirin, kenzir çêdikirin, kortik çêdikirin. Tiştek wilo. Lê etîmolojiya vê peyvê wilo tekûz nîne.*"[11]

Gel qala wê yekê dike ku li cem mirovên mirî ku li bin Girê Cindirêsê dihatin veşartin, teşiyek jî dihat binaxkirin. Hinek gorên kevnar tenê ji bo jinan hatîbûn çêkirin. Dema ku em çûn ser goristanê, me dît ku di nav goran de tej derketibûn ku li erdê dihatin raxistin. Tej perçeyekî ne pirr mezin ji rîs e ku di tevnê de hatiye hûnandin. Ji ber ku mirovan bedena xwe pê distrand, cil û berg jê çêdikirin, tej wekî sembola starê dihat şirovekirin. Dema ku mirov diçûn ser dilovaniya xwe, tej pê re dixistin gorê. Bi vî rengî mirovan dikarî pêdiviyên xwe piştî mirinê jî pêk bînin. Ev dane didin xuya kirin ku di baweriya gelê herêmê de mirin wek domandina rêsandin û tevna jiyanê dihat dîtin.

Çanda Til Xelefê di salên 6000 BZ'yê heta 5300 BZ'yê li Mezopotamya Jorîn bi pêş ketiye û belav bûye. Çanda Til Xelefê li cîhanê bi bipêşxistina hilberîn û şewitandina ferfûran [seramîk] hatiye nasîn. Di kêleka germahiya şewitandinê de madena sifr jî wek berhemeke nû derketiye. Lewma ev

[9] Bajarê kevnar ê Qerqamîşê bi navên *Girgamêş* ango *Cerablus* jî tê nasîn

[10] Hevpeyvîn bi Yadê Eyşê re, bajaroka Cindirêse ya Efrînê, 2017

[11] Hevpeyvîn bi Menan Cafer ji Efrînê re, mamosteya Zanîngeha Rojava; li ser bingehê daneyên nêrînên gelêrî û lêkolînên Dr. Mihemmed Elî û Merwan Berekat, Qamişlo, 2020

serdem jî weke serdema sifr [Chalkolithikum] tê nasîn. Berhemên ferfûrê yên çanda Til Xelefê li seranserê Bakurê Sûriyê hatine dîtin û hemû bi heman şêwazan hatine xebitandin. Seramîk him bi rengekî sade û stûr, him jî bi rengekî zirav û bixemil hatine çêkirin. Neqş derbirinên çanda civaka xwezayî bûn: Cismên jinê û sewalên wek ga, mar û çûk; resmên wek roj, heyv, xaç an bivirên bi du serî 'labrys' ku bûne nîşana xwedawenda Îştarê û jinên Amazon. Ev neqşên hanê li ser firaxên ji axa sor pirranî bi boyaxên reş an spî hatine çêkirin. Bi vî rengî çîrok û bûyerên wê demê li ser firaxan dihatin neqşandin û nivîsandin. Dîsa gelek peykerên bi şiklên bedena jinê dihatin çêkirin. Sîng, zik û gerdena jinan pîroziya çanda dayika xwedawend destnîşan dikin.

Çavkaniyên destpêkê yên vê çandê xwe dispêrin serdema 8000 – 7000 BZ'yê yên ***gundê Til Xelef*** li ser ava Xabûrê nêzîkî bajarê Serêkaniyê. Li ser vê axa dewlemend şêwazên nû yên çanda jiyanê, çandinî û hilberînê hatibûn afirandin û bi pêşxistin. Gund û warên çanda Til Xelefê bi pirranî ji malên gulover pêk hatine ku ji kerpîç, ax û keviran hatibûn avakirin.[12] Li cem peykerên xwedawendan, hunerê seramîka rengîn bingehê jiyana komînal û çandiniyê jî hatine bipêşxistin. Li navend û şûnwarên çanda Til Xelefê bi hezaran mohr bi neqş û nîşaneyên çanda xwedawendan hatine dîtin. Ev yek, destnîşan dike ku jinan li gelek deveran pergalên aborî û kargerî bi pêş xistine û dane meşandin. Ji şaristaniyên Derya Spî û Qerqamişê li herêma Firatê, li herêmên Şehba, Efrîn û Dîlokê, li ser axa Rojava û Bakurê Kurdistanê, heta Girên Reşawa û Giwera nêzîkî Mûsilê li Başûrê Kurdistanê heta li Rojhilatê Kurdistanê şopên çanda Til Xelefê xuya ne. Wiha xuya dike ku li ser bingehê hilberîn, danûstandin, bazirganî, berjêwendiyên hevbeş û lihevhatinê, çanda Til Xelefê li ser axa Kevana Zêrîn li derdora 6000 sal BZ'yê tora têkiliyên gund û bajaran afirandiye. Hevkarî û parvekirina zanîn û berheman taybetmendiyên çanda dayikê ya serdema şoreşa neolîtîk bûn. Jiyana komînal a klanên dayikê, malovaniya gelek îcat û bipêşketinan dikir. Hesûdî, dizî û dagirkerî hîna nedihatin naskirin.

Ev yek bi bandora çanda hiyerarşîk a xanedaniya El Ubeyd hat guhertin ya ku di hezarsala 5'an a BZ'yê de xwe li Mezopotamya Jêrîn bi rêxistin dikir. Li wir yekem car pergaleke malbatî ava bûye ku desthilatdariya mêrê serdest li ser jin, zarok, ciwan û tevahiya civakê ferz kiriye. Bi vî awayî çanda El Ubeyd bûye bingehê şaristaniya Ûrûkê ku xwe li ser paradîgmaya dewletbûnê, çîn, baviksalarî û desthilatdariyê saz kiriye. Di salên 4500-3500 BZ'yê de eşîra El Ubeyd hewl dida serweriya xwe û çanda xanedantiyê bi rêya mêhtingehan li herêmên Mezopotamya Jorîn jî belav bike. Lê belê çanda Til Xelefê karibû pevajoyeke dirêj li Mezopotamya Jorîn taybetmendiyên çanda komînal li hemberî bandorên çanda desthilatdar a El Ubeyd û Ûrûkê biparêze. Lewma çanda jiyanê li perestgehên xwedawendan û bajarên Mezopotamya Jorîn ji bajar-dewletên derdora ziguratan li Mezopotamya Jêrîn cuda maye.

Derbarê çanda Til Xelefê de gelek mijarên girîng hene ku hêjayî lêkolîn û nîqaşê ne: Gelo çanda Til Xelefê ji yek çavkaniyê derketiye û belav bûye? Yan jî ev çand li cihên cuda bi rengên ku dişibin hev bi pêş ketiye? Çima ev çand li derdora salên 4500 BZ'yê ber bi dawiyê ve çûye û bandora çanda El Ubeyd û Sûmerî ango pergala desthilatdariya zilam û dewletê serwer bûye?

Gundê Til Xelefê piştî serdema neolîtîk malovaniya şaristaniyên cuda jî dikir. Di sedsala 10'an BZ'yê de koçerên Aramî bajarê *Guzana* wek paytexta mîrîtiya Bît-Bahiyanî li ser şûnewarê kevnar ê Til Xelefê damezrandin. Di berhemên çanda serdema Aramiyan de jî bandora jinê û baweriya xwedawendan balê dikişînin ser xwe, ruxmî ku êdî pergala şaristaniya dewletê serwer bûye. Qesra şahê Kabara wek 'Mala Hêlanî' (Mala Bilind) dihat nasîn. Dêriyê qesrê bi peykerên mezin yên

[12] Dr. Jörg Becker, *Tell Halaf – Ausgrabungsprojekt 2006 - 2010*, Besiedlungsperioden

xwedawenda Îştar û xwedayê Hadad hatibû xemilandin. Tacên li ser serên wan û sekna wan li ser serê şêran hêza van nîşan dide. Dîsa di kolanên arkeolojîk de li hola qesrê û goristana perestgehê gelek peyker û lewheyên serdema Aramiyan bi teşeyên jin û xwedawendan hatine vedîtin. Mînakên du peykerên mezin yên jinan ji kevirên bazalt weke parêzvanên miriyan li ber goristanên perestgehê sekinîbûn. Ew û gelek asarên din ji aliyê arkeolog û oryantalîstê Elman Max von Oppenheim ve di salên 1911 heta 1913'an de ji bin axê hatine derxistin. Bi gotina *"ev bûka min e"* Max von Oppenheim peykerên xwedawendan revandin û birin paytexta Elmanyayê. Di vê peyv û nêzîkatiyê de hişmendiya zayendperest a mêhtingeran eşkere dibe ku dest dirêjî jin û axa Rojhilata Navîn dikin. Xwedawendên Til Xelef di muzeya taybet a Oppenheim de li Berlînê dîlgirtî mane heta ew di bombabarana Şerê Cîhanê yê Doyemîn de hatin pelixandin û bûne hezar parçe. Hê nû di sala 2011'an de komeke arkeologên Elman careke din parçeyên xwedawendên şikestî anîn cem hev. Wekî di kesayeta jinan de birînên talan û şer hê jî di peykerên xwedawend yên Mezopotamya de xuya dikin. Her wiha 100 sal piştî revandina xwedawendên Til Xelefê hêzên hegemon careke din dest avêtin welatê xwedawendan. Li hemberî vî şerê parvekirinê yê ku bi armanca dagirkeriya xak û bedena jinan tê meşandin, jinên berxwedêr xwedî li çand û nirxên xwe yên dîrokî derketine û nûjen kirine.

Yek ji mînakên vê çanda hevbeşiya jiyanê peykerek ji sedsala 8 - 7'an BZ'yê ye ku li Til Xelefê hatiye dîtin: Ev peyker du kesayetên serwer, jin û zilamekî nîşan dike yên li ser kursiyên cem hev rûniştî ne. Heman mezinbûna bejin û heman sekna serbilind ya jin û zilam mirov dikare wekî nîşana rêveberiya hevbeş ya jin û mêr ango pergala hevserokatî şirove bike. Keval, tablet ango lewheyên din ji serdema Împaratoriya Asûrî derdora salên 700'î BZ'yê rista jinê ya diyarker, nîşan didin. Nivîsa lewheyekê qala jineke bi navê Belessa-pilakku dike ku ji malbateke dewlemend bû û deyn dida. Li gorî hevpeymana ku hatiye nivîsandin Belessa-pilakku faîzek mezin ji deyndarê xwe distand.[13]

Piştî serhildaneke di sala 808'ên BZ'yê de, bajarê Guzana ketiye bin dagirkeriyên Împaratoriya Asûrî, piştre jî yên Yewnan û Partan. Ber bi dawiya sedsala yekem a BZ'yê ve şênî û desthilatdaran gav bi gav dev ji Til Xelefê berda û derbasî Girê Fexêriyê bûn ku bûye cihê navendî yê bajarê Waşokanî. Gundê Til Xelefê yê hemdem di salên 1970'yî de ji nû ve hatiye avakirin. Di çarçoveya siyaseta 'Kembera Ereban' ya nîzama Beesê de, cotkarên Ereb li cem şûnwarên Til Xelefê li ser sînorê Bakurê Kurdistanê hatine bicihkirin. Gundiyên ku îro derdora Til Xelefê dimînin, xebatên kolanên li girên Til Xelefê û Serêkaniyê tînin bîra xwe ku li bin serwêriya dîroknasên rejîma Sûriyê û zanîngehên Elmanyayê, hatine meşandin: *"Gelek asar ji vir derxistine û gişt kişandine. Kesên ji gundên me tê de şixulîne. Carna zêr jî derxistin. Zêr dane aliyekî û birine Reqayê. Lê yên Elman zêde qîmet nedane zêra. Ew ketine pey nivîsan. Digotin, nivîs ji zêr bi qîmetir in û di dawiyê de kîtabek bizmarî derxistine. Lê em nizanin tê de çi hatiye nivîsandin û birine kuderê."*[14]

Girê Fexêriyê jî xwedî dîrokeke kevnar e ku xwe dispêre nişteciheûn û gundewariya serdema neolîtîkê. Sih kaniyên avê li cem ava Xabûrê xwezaya wê herêmê şîn dikirin û bûn çavkaniya jiyan û berheman. Lewma navên bajarê binya Girê Fexêriyê wekî Waşokanî, Sîkanî an jî Serêkaniyê hatin lêkirin. Di serdema Bronzê de jê û bi şûn ve ev bajar weke cihê pîroz ê xwedayê hewayê Hedad û xwedawenda Şala hatiye nasîn.[15] Di nîvê hezar sala 2'yan a BZ'yê de li bin navê

[13] Dr. Lutz Martin: *Eroberung mit Spaten und Zeichenstift*, in DAMALS 2-2011
[14] Hevpeyvîn bi Ednan re, Til Xelef, 2017
[15] Dominik Bonatz: *Tell Fekheriye*, German-Syrian research project report, 2011 [1]

Waşokanî bajar bûye paytexta Împaratoriya Mîtaniyan. Di dawiya hezar sala 2'yemîn de ji ber nakokiyên hundirîn hêza padîşahê Mîtanî lawaz bûbû. Êdî wî nikarîbû Waşokaniyê li hemberî êrîşên Hîtîtiyan û piştre yên Asûriyan biparêze. Di encamê de padîşah û xwedayên Asûrî desthilatdariya xwe li ser perestgeh û rêveberiya bajêr û herêmê misoger kirin. Nivîsên bi zimanê Aramî û Asûrî li ser peykerê mezin ê Hedad Yesî diyar dikin ku di sedsalên 9 – 8'an a BZ'yê de Hedad bûbû şahê Xabûrê, Gozana, Sîkanî û Azranê. Wî serweriya xwe ji perestgeha xwe ya navendî li bajarê Sîkaniyê meşandiye.[16]

Til Berak (Nagar) yek ji navendên tora çand û bazirganiya bajarên Kevana Zêrîn bû. Ev bajar îro li kantona Cizîrê nêzîkî Hesekê ye. Li derdora sala 5000'î BZ'yê Nagar bi 4000 şêniyên xwe, yek ji bajarên herî mezin ê cîhanê bû.[17] Daneyên arkeolojîk û lewheyên Til Berakê yên kevnar nîşan didin ku jiyan, civakîbûn û bajarvanî li vir jî bi şoreşa çandinî, hilberîna seramîk, avakirina avahiyên mezin ên îbadet û merasîman, kargerî û bazirganiyê bi pêş ketine. Til Berak bûbû rawestgehek ji bo kerwanên ku bazirganî û danûstandin di nava navendên çanda Til Xelefê li Bakurê Sûriyê de bi pêş xistine. Li ser vê navendê têkilî hatine meşandin bi bajarên wek ***Til Xelef***, ***Hemokar*** nêzîkî Til Koçer, ***Orkêş*** û ***Çaxirbazar (Eşnakkum)*** nêzîkî Amûdê, ***Xuêra (Harbu)*** nêzîkî Mebrûka, ***Girê Leylan (Şexna - Şebt Enlîl)*** nêzîkî Tirbespiyê, ***Til Bêder (Nabada)*** û ***Girê Biderî (Qehat)*** nêzîkî Hesekê, ***Girê Sor*** nêzîkî Kobanê, ***Qerqamîş (Girgamêş)*** û ***Til Rifat (Arpad)*** li herêma Şehbayê, ***Girê Endarê*** û ***Girê Cindirêsê*** li herêma Efrînê û bajarê kevnar ê ***Helebê (Armî)***. Têkiliyên bazirganan xwe gihandin heta ***Marî*** nêzîkî Baxozê û bajarên Sûmeriyan Ûrûk û Erîdu; bajar û herêmên Başûrê Kurdistanê weke Nînova, Mûsil û çiyayên Şengalê; ji herêmên Bakurê Kurdistanê weke Botan, Mêrdîn, Nisêbîn, Riha, Dîlok, Semsûr, Meletî, Amed û Wanê heta nişstecihên herêma Derya Spî.

Gundê ***Hemokar*** îro nêzîkî bajarê Til Koçer li ser sînorê Rojava û Başûrê Kurdistanê ye. Di dîrokê de Hemokar wekî bajarek xwedî cihekî stratejîk bû li ser rêyên bazirganiyê ji çiyayên Torosê û Helebê heta Şengal û Nînovayê. Dîsa ji ber pirrbûna avê û golên xwe, derfetên baş ji bo çandiniyê ava bûne. Nasnameya gelê kevnar a Hemokar û wateya navê bajêr hîn nehatiye zelalkirin. Hinek şirove dibêjin, koka navê Hemokar xwe dispêre zimanê Kurdî û tê wateya ku kesan '*hemû*'yan bi hev re '*kar*' meşandiye yan jî '*her tişt*' bi '*kar*' hatiye avakirin. Dîsa şiroveya peyva 'kar' bi zimanê Sûmerî tê wateya 'xwe gihandina tiştekî'. Her wiha misoger bûye ku 4 heta 3 hezar sal beriya zayînê li Hemokar di encama ked û karên hevbeş yên gelê nişstecih de sîstemeke nûjen a bajarvaniyê wek navenda hilberîn, bazirganî û parastinê hatibû sazkirin. Serjimara xelkê wê gihîşt 2500 kesî. Şêniyên Hemokarê bi kevirên reş [obsidiyan] ku ji herêma Wanê anîne, kêr [çako] û gelek amûrên din çêkirin ku di vê serdemê de li cihên din pirr kêm hebûne.
Derdora 3500 salan beriya zayînê li Hemokar şerê yekemîn ê parastina bajêr di dîroka mirovahiyê de qewimiye. Di kolanên arkeolojîk de îsbatên vî şerî xuya bûn: 2300 gilokên axê ji heman şiklî wek cebilxane, amûrên avêtine û gorên komî hatine dîtin. Tê texmîn kirin ku êrîşkar ji Mezopotamya Jêrîn, belkî ji Ûrûkê hatine û xwestin desthilatdariya xwe li ser herêma Xabûrê ava bikin. Piştî vê komkujiyê û hilweşandina bajêr bi hezaran salan li vir bajarekî din nehatibû avakirin.

[16] Dominik Bonatz: *Tell Fekheriye*, German-Syrian research project report, 2011 [2]

[17] Ian Morris: *Social Development*, Stanford University, 2010

Daneyên Hemokar destnîşan dikin ku bipêşketina bajarvaniyê li Kevana Zêrîn ne piştî şaristaniya Sûmerî ye, lê belê di heman wextê de li derdora 4 heta 3 hezar salan beriya zayînê ye. Lê belê, pêwîst e, baştir bê fêhmkirin ka pergal û jiyana van bajaran bi çi rengî bû. Avahî, kolan, pergala îzolasyona hewayê ji bo parastina ji hewaya germ û sar û her wiha sîstema parastina bajêr bi awayekî sîstematîk hatine înşakirin. Lê belê ti daneyên pergala hiyerarşîk li Hemokar nehatine dîtin. Berovajî, daneyên heyî nîşan didin ku hilberîn û jiyana komînal û hevbeş hatiye meşandin. Mînaka vê jî cihê navendî yê agirê ji bo çêkirina nan û xwarinê ye. Dîsa sembolên jinê weke şêr û mar li ser mohran û peykerên jinan hatine dîtin ku bandora çanda dayika xwedewand didin xuyakirin.[18]

Girê *Xuêra (Harbe)* cihekî din ê ku şaristaniyên kevnar û perestgehên sê serdeman li bin tebeqên axa xwe dihewîne. Tê texmînkirin ku nişstecihbûn li Xuêra 5 hezar sal BZ'yê dest pê kiriye. Daneyên arkeolojîk nîşan didin ku 2800 – 2350 BZ'yê çanda dewlemend û pergala bajarên Kevana Zêrîn li Xuêra jî bi pêş ketiye. Heta niha tenê bajarê jorîn ê Xuêra bi perestgeh, kargeh û firneyên seramîk li ser gir û bajarê jêrîn hatine vedîtin. Bajarê jêrîn bi şiklekî gilover û li derdora wî jî sûreke bilind hatiye avakirin. Avahiyên serdema yekem ji kerpiçê hatibûn lêkirin, lê di avakirina qesr û xaniyên serdemên paşê kevir jî hatine bi kar anîn. Gelek nivîsên bizmarî li ser lewhe, firax û peykerên ji dar, kevir, dep û bronzê li Xuêra hatine derxistin. Di nav wanan de serê ga yê ji bronzê jî hatiye dîtin ku wek nîşaneya pîroz a baweriya xwedawend tê şirovekirin. Ya herî balkêş jî rolyefa heft xwedawendan e ku li derdora 2300 BZ'yê ji kevir hatibû çêkirin. Di vê rolyefê de heft xwedawend li ser kursî li cem hev rûniştî ne.[19] Her yek ji wan di hembêza xwe de zarok yan jî sewalan digire. Di vê berhema hunerî de pirralîbûn, hêza kolektîf û rista pêşeng a jinê di têkiliyên bi civak û xwezayê re hatiye neqişandin. Lêkolîner dibêjin, bajarên jorîn û jêrîn bi giştî ji 2500 heta 3000 malan pêk hatine û li derdorê 15 hezar kes li bajêr mane. Çima şêniyên Xuêra – wek şêniyên bajarên vê herêmê hemûyan – li derdora 2200 BZ'yê warên xwe berdane, hîna nehatiye zelalkirin. Şopên şer an jî xirakirinê li Xuêra nehatine dîtin. Lê hatiye şopandin ku piştî berdana bajaran civak dîsa vegeriyaye şêwaza jiyana koçerî.

Piştî 800 salan di serdema Mîtaniyan de mirov careke din li Xuêra bi cih bûne. Di sedsalên 14 – 13'an BZ'yê de ji nû ve bajarokek li Xuêra hatibû avakirin. Îcar xelkê navê warê xwe kir '***Harbe***' ku maneya wê 'şer' ango 'xirabbûn' e. Daneyên arşîvê rave dikin ku bazirgan û dîplomatan Harbe wekî rawestgehekê bi kar anîye di navbera bajarên şaristaniyên Nînova û Qerqamîşê de. Her wiha nivîsên kevnar qala perestgeha xwedawenda Îştar dikin. Dîsa xeml û zêr ku li gora keçeke 11 salî hatin vedîtin, qedirgirtina keç û jinan di vê serdemê de destnîşan dikin. Lê bajar careke din di bin dagirkeriya Împaratoriya Asûrî de hatiye xirakirin û hilweşandin. Li gorî texmînan piştî vê serdemê, Xuêra bi sedan salan xalî mabû. Di serdema Îslamiyetê de goristanek li ser vê axê hatiye avakirin û îro gundekî piçûk li kêleka gir maye. Hinek şêniyên vî gundê di demên cuda de bi şandeyên arkeologên Elman re xebatên kolanê meşandine. Yek ji wan, bavê malbateke xizan a Ereb bi navê Huwedî ye. Piştî ku arkeolog di sala 2010'an de ji herêmê derketin, wî parastina bermahiyên dîrokî wekî erkeke xwezayî dîtiye. Dema ku DAIŞ'ê êrîşê herême kir, wî sond xwariye ku ew ê ji bo parastina van nirxên dîrokî li ser axa xwe bimîne. Rixmê ku tirsiya jî wî nedihişt ku ev cihê pîroz were talan kirin.[20]

[18] Clemens Reichel, *Artifacts from Hamoukar*, 2007

[19] Seminar für Orientalische Archäologie und Kunstgeschichte, Martin-Luther-Universität Halle-Wittenberg: *Tell Chuera, Syrien - Fundort und Grabungsbereiche*

[20] Hevpeyvîn bi Huwedî re, Girê Xuêra, 2017

Wekî din bajarê ***Marî (Til Herîrî)*** di serdema Sûmeriyan de wekî navenda sereke ya çanda xwedawendan û zanistê dihat nasîn. Marî îro nêzî bajarên Ebû Kemal û Baxozê li ser sinorê Sûriyê û Iraqê ye. Damezrandina Marî 3 hezar sal beriya zayînê ye. Bingehê aborî û çandiniya bajêr bi kolana cokên dirêj ji Ava Firatê hatibû avakirin. Plansaziyên berfireh yên bajarvanî û mîmariyê hatine bipêşxistin. Du çemberên parastina bajêr hatine amadekirin: Ya derve ji bo parastina bajêr li hemberî lehiyê û ya hundirîn jî ji bo parastina bajêr li hemberî êrîşên leşkerî.[21] Danûstandin û têkiliyên madî û manewî yên rêveberiyên Marî bi hemû navendên şaristaniyê yên li Mezopotamyayê heta bi deşta Haranê re hebûn. Li Marî gelek şûnewar û asarên dîrokî hatin dîtin ku dîroka van xwe digihîne 2500 BZ. Avahiyên Zîgurata Îştarê, xezîneyên Urê, pirtûkxaneya bi 20 hezar nivîsên cûrbicûr û arşîveke dewlemend agahiyên berfireh li ser jiyana siyasî, civakî û olî ya vê serdemê didin. Di encama êrîşên desthilatdarê Sûmer û Akad Hammurabî navbera salên 1760 heta 1757 BZ'yê de pirraniya bajarê Marî hatibû şewitandin û hilweşandin.

- **Şêrên Şêranê**

Yek ji navçeyên herî kevnar ên Kobanê ***Şêran*** e. Di serdema mîrîtiya Aramî *Bît-Adînî* de bi navê ***Hadatu*** ('ya nû') wek navendeke girîng hatibû nasîn û di sedsala 9'an BZ'yê de ket bin dagirkeriya Împaratoriya Asûrî. Ji ber ku gelek navendên şaristaniyan li ser cihên nişstecihbûna neolîtîk hatin avakirin, wiha dixuye ku kokên dîroka Şêran û qatên binyadî yên girên li derdora Şêranê jî vedigerin serdema neolîtîkê.
Osmaniyan navê Şêranê kiribûn *Arslan Taşi*. Lêkolînên arkeolojîk li Şêranê di sala 1836'an de bin serweriya Fransayê[22] hatin destpêkirin. Dîsa di salên 2007 û 2008'an de ji hêla dewleta Sûriyê û arkeologên zaningeha Bologna ya Îtalyayê[23] ve xebatên kolanê dihatin domandin û daneyên girîng derketin holê: Li bin bajarê Şêranê perestgehekê Îştarê, peyker û dîmên ji kevir [rolyef] ên xwedawenda Îştarê û yên xwedayê birûsk û hewayê Hadad, qesreke ji serdema Asûriyan û perestgeheke ji serdema Yewnaniyan hatine dîtin. Perestgeha Îştarê 736 BZ'yê di nava salekê de hatiye avakirin û Îştar wek xwedawenda bajêr li Hadatu hatiye pîrozkirin. Hadatu xwedî wateyeke stratejîk bû di warê bazirganî û leşkerî de. Bajar bûye rawestgeh û perestgeheke li ser rêya *'Harran Şarri'* di navbera Asûr û herêmên Xabur û Firatê de. Rê ji Kalhu/Nemrûd li ser Harran û Guzana re diçûn heta bi Nînovayê. Waliyê Kar-Salmanassar *Ninurta-bel-uşur* di sedsala 9 – 8'an de sûrek li hawîrdora Şêranê da avakirin. Sê deriyên sûrê hebûn: deriyek li aliyê rojava, yek li aliyê rojhilat û yek li aliyê başûr. Deriyên rojava û rojhilatê bajêr bi peykerên mezin yên şêran yên ji kevirên reş, hatibûn xemilandin. Li ser peykerên şêran bi 3 zimanan nivîs hatin nivîsandin: bi Aramî, bi Asûrî û bi hiyeroglîfên zimanê Luwî.

Mirov dikare vê yeke wiha şirove bike: Ruxmê ku herêma Firatê bi êrîş û zextên Împaratoriya Asûrî hatibû dagirkirin û zimanê Asûrî wek zimanê desthilatdar hatiye bi kar anîn jî, dîsa zimanên gelên herêmê dihatin nasîn. Pirrçandî û pirrzimanîbûna herêmê hîna beriya zayînê rastiyekê erdnigariya Rojava bû.[24] Her çiqas ev erdnigarî bû şahide şer û dagirkeriyên cûr bi cûr, gelek

[21] Henry Curtis Pelgrift: *Mari*, Ancient History Encyclopedia, 2016

[22] Lêkolînên ewil şandeyekê Fransî di bin rêveberiya Francis Rawdon Chesney de di sala 1836 de çêkirin. Di dawiya sedsala 19'an de 'Hamdy Bey' çend berhemên dîrokî birin Stenbolê. Lê arkeologê muzêya Louvre ya Parisê François Thureau-Dangin di sala 1928'an de şûnwar kolan û gelek asarên dîrokî birin Fransayê.

[23] Ev ekîp li bin rêveberiya Anas al-Khabour (Sûriye) û Serena Maria Cecchini (Italya) xebitiyê.

[24] Hannes D. Galter: *Militärgrenze und Euphrathandel. Der sozio-ökonomische Hintergrund der Trilinguen von Arslan Tash*, 2004

berhemên dîrokî wek peyker, navên xweda û xwedawendan, rolyef, mîmarî, nivîs û kevneşopiyên çandî û bawerî û bipêşketina zimanan destnîşan dikin ku danûstandinên çandî, ramanî û aborî di nava gelan de hertim zindî bûn.

Şêniyên Şêranê qal dikin ku gelek caran şandeyên hikûmeta Sûriyê û arkeologên ji derveyî welêt dihatin, "*gelek cih kolandin û pirr tişt birine"*. Di salên 1980'yî de îcar dewleta Sûriyê peykerên şêran bi dizî derxistine û birine gulistan û muzêyên Reqa û Halebê. Tê gotin ku li hemberî revandina şêran şêniyên Şêranê bi meşekê helwest nîşan daye da ku şêrên dîrokî werin vegerandin. Di encamê de hikûmeta Sûriyê mecbûr ma ku du şêran bibe Şêranê. Lê belê li şûna peykerên orîjînal peykerên qelp ên ji betonê dan xelkê Şêranê. Di sala 2014'an de çeteyên DAIŞ'ê dema êrîşê Kobanê kirin peykerên şêrên qelp li bajarokê Şêranê xira kirin; di meha Sibatê 2015'an de jî DAIŞ'ê şêrên eslî yên Şêranê li Gulistana Reşîd a Reqayê bi buldozeran ruxandin.[25] Dîsa gelê Şêranê behs dike ku li bin xaniyên Şêranê û gundên derdorê yên weke Tilêjbê "*bajarekî bin axê heye"* ku hîn nehatiye kolan.

Keleha Nebî Hûrî li navçeya Şera ya Efrînê jî yek ji şûnwarên kevnar e ku bi navê xwe bala mirovan dikişîne. Navê 'Nebî Hûrî' bi zimanê Erebî tê wateya 'resûl ango pexamberê Hûriyan'. Her wiha xwedayê 'Nebo' li hin deverên Mezopotamya heta sedsala 3'yan PZ[26] dihat pîrozkirin.[27] Dibe ku kelehê navê xwe ji wî girtibe. Hinek şêniyên herêmê jî vî navî wekî 'neviyên Hûriyan' şirove dikin. Tê texmînkirin ku ev cih yek ji wargehên herî girîng û pîroz ên Hûriyan bû. Xuya ye ku li cihekî stratejîk li ber Ava Avrînê hatibû avakirin. Ji ber vê, dagirkeran di serdemên Helen û Romayê de li vir dîsa baregehên leşkerî saz kirine. Her wiha derdor jî gelek mal, şanoyên antîk, perestgeh, cihên pîroz, bircên pîramîdan, goristan û pirên antîk hene ku weke binesaziyên desthilatdariya navendî hatine avakirin.

Her wiha li ser û li bin axa ***Girê Endarê*** yê Efrînê jî şopên gelek serdeman hene. Girê Endarê ji du beşan pêk tê. Heta niha tenê li tebeqeyên jorîn hatiye kolan. Li wir gelek berhemên dîrokî hatine dîtin ku aydê serdemên Hûrî, Hîtît, Bîzans, Pers û Îslamiyetê ne. Lê daneyên arkeolojîk dibêjin, dîroka nişтecihbûnê li Endarê kevnartir e û xwe digihîne serdema sifrê ya Til Xelefê. Bajarê qedîm, li beşa jêrîn hatiye avakirin. Li kelêka Girê Stêrkê di serdema Hîtîtiyan de li derdora sala 1300'î BZ de perestgeheke bi heybet hatiye avakirin. Her çendî teqez neyê zanîn ku ev perestgeh ji bo kê hatiye çêkirin jî, gelek berhemên dîrokî yên li derdora wê, nîşan didin ku ew perestgeh ji bo xwedawenda bereket, evîn û şer Îştarê hatiye damezrandin.
Parçeyên seramik, sênîkên piçûk, parçeyên cam û gelek amûr ku li vir derketine holê, bi xaç û nîşanên xwedawendan hatibûn xemilandin. Dîsa gelek peyker û resmên xwedawendan ji seramîk û kevirên reş xuya bûne. Li ser dîwar û li şûna îbadetxanê peykerên mezin yên sfenks û şêran hene. Ev bi awayekî hûrgiliyane û bi hostekariyeke mezin hatine neqişandin. Li ser rû û dîwarên perestgehê ji aliyê hundir û derve ve wêneyên sfenks û şêran balê dikişînin ser xwe. Neqşên îbadetgehê jî bi şêwaza xwedawenda çiyê hatine çêkirin û pê re elaqedar, şêwazên efsaneyî qala mirov û ajalan dikin. Destanên kevin dibêjin, sfenks[28] û şêr alîgîrên Îştarê û xwedawendên çiyayî ne.

[25] UNESCO: *Safeguarding Syrian Cultural Heritage - Arslan Tash*, 2017

[26] PZ (piştî zayînê): ji bo sal û serdemên piştî jidayikbûna Hz. Îsa tê bi kar anîn; li gorî salnameya gregorî piştî mîladê

[27] Dr. Mihemed Ebdo Elî: *Ezdî û Ezdayetî li Bakur Rojavayê Sûriyê*, Efrîn, 2008

[28] Tê wateya pêykerê ku nîv jin nîvê din jî şêr e. Serî jin e, gewdê wê jî şêr e.

Perestgeh ji kevirê reş ê bazalt û kilsê bi firehbûna 32 metre û dirêjbûna 38 metreyî hatiye çêkirin. Tişta herî balkêş jî 3 şopên lingên mezin li ser zemînê destpêka ketina perestgehê ne ku wek gaveke mezin ber bi deriyê holê ve diçin. Xelkê devera Endarê van weke şopên lingên xwedawenda Îştarê û nîşaneya hebûna ruh û giyanê wê şirove dike.

- **Çanda Xwedawendan**

Di dewama serdema neolîtîkê de li tevahiya herêmên Mezopotamya Jorîn, ceribandinên şêweyê rêveberiya civakî ya konfederasyonên qebîle, eşîr û keyaniyan hatin domandin. Mînakên van dibin konfederasyonên Hûriyan (3000 BZ'yê heta 1500 BZ'yê), Mîtaniyan (1500 BZ'yê heta 1200 BZ'yê), Naîriyan (1200 BZ'yê heta 800 BZ'yê) û Kommagene (163 BZ'yê heta 640 PZ'yê). Her wiha di tevahiya serdeman de şopên bawerî û çanda xwedawendan li erdnîgariya Bakurê Sûriyê xuya ne. Pirraniya gelên Mezopotamya wek Kurd, Aşûrî, Suryanî û Keldanî **xwedawenda Star-Îştar-Êştar-Înnana** wek nirx û parçeyek ji dîroka xwe dipejirînin. Îştar him çavkanî him jî dewama kesayet û çanda xwedawend û keybanûyan e ku li Mûsilê wek Semîramîs, li Palmîrayê wek Zenubya û li Efrînê wek keybanûya Hûriyan Puduhepa hatin nasîn û li cihên xwe şaristanî ava kirine.

Li bin gelek girên Rojava yên weke li Til Xelef, Girê Fixêriyê, Orkêş, Girê Endarê, Girê Sor û Şêran a Kobanê hwd. bermahiyên perestgehên Îştar, peyker û remzên wê wek şêr hatine dîtin. Navên gundan jî wek Gundê Stêrk an jî Girê Stêrk li Girê Endarê daneyên van rastiyan in. Nav yek be jî çawaniyên Îştarê li gor dem û cih diguherin: Peykerên qermîdî yên Îştarê ku li Girê Endarê hatine dîtin wê wek dayika xwedawend nîşan dide ku memikên xwe bi herdu destên xwe digire. Rîbanek li serê xwe girêdaye û porê xwe bi ser milên wê de berdaye ku di kêleka rûyê wê ve dadikeve. Dîsa li perestgeha Îştar li Endarê lewhayek hatiye dîtin ku Îştar wekî şervanek bi kincên rengareng nîşan dide. Di destê Îştarê de çek, li ser milê wê yê çepê tîr û kevan hene. Peykerên din yên xwedawendên Endarê hene ku kulîlka lotûs ango lîtavk di nava memikên xwe de radikin.

Qebira Îştar ya serdema Hitîtiyan ku li Girê Sor (Masuwarî) hatiye dîtin wê wek xwedawenda şer û parastinê destnîşan dike: Îştar şûr û tîrkevanê radike, li ser pişta şêr disekine, şêrî dajo û siwariya şêr dike; taceke bi qiloçên conega û remza stêrkê kiriye serê xwe. Sekna peykerên xwedawend didin xuyakirin ku Îştar hêz û serfiraziya çanda xwe heyanî serdemên Hitît, Asûr, Aramiyan û paşê jî parastiye. Ev bû nîşana xwedawendên Mezopotamyayê. Tevî ku bi hezaran salên paşê şandeya dîroknasên Fransayê, peykera xwedawendê rêvandin û birin mûzeya Louvre ya li Parîsê, Îştar heta roja îro dide xuyakirin ku wê hêz û serfîraziya çanda xwedawendan parastiye.

Li Efrînê jî mirov bi bandora çand û navên xwedawendan dihise. Dîroknas li ser koka navê Efrînê xwedî du nêrînên cuda ne: Hinek dibêjin ku ew çavkaniya xwe ji 'afirînerî', yanî xuluqkariya xelkê herême digire. Şiroveyên din jî didin xuyakirin ku navê bajar û herêmê xwe dispêre navê çemê 'Avrîn' ya ku lê diherîke.[29] Dayikên Efrînê jî bi pirranî bi nêrîna yeke re ne û xwedî şiroveyên balkêş in: *“Efrîn ji peyva afirandin, ji afratê pêk tê. Ji ber vê yekê bi qîmet û pîroz e. Bi zimanê Soranî ji jinê re dibêjin 'afret'. Ji Afirandinê tê.“* Dîsa dayik dinirxîne, dibêje, wateya vê ew e ku Xwedawenda Afrodît di ser vê axê re derbas bûye û navê xwe ji *“Efrîn dît”* girtiye.[30] Ev jî nîşan dide ku çanda Afrodît bi çanda Îştar û Înanna re bûbû yek û dibe ku bi rêya Fenîkiyan derbasî

[29] Hevpeyvîn bi Menan Cafer re, Qamişlo, 2020

[30] Hevpeyvîn bi dayikên Efrînê re, Şêrawa / Efrîn, 2017

şaristaniya Yewnanan bûbe. Her navekî ku li xwedawendan hatiye kirin, taybetmendiyên gerdûn, civak û xwezayê; jiyan û jinê di nava xwe de dihewîne. Bi ser de em dizanin ku mîtolojî û hêmanên ku xwe dispêrin çerxa xwedawendan li pey vê bûbûn çavkaniyê pirtûkên pîroz. Bi vî rengî watedar dibe çima navê Efrînê di pirtûka pîroz a Avestayê de derbas dibe. Her wiha gotinên Tewrat, Încil û Quranê li ser çiqilê dara zeytûnê ku kevokek spî di serdema tofana mezin de ji Nebî Nuh re tîne, balkêş e. Ev nîşana wê yekê bû ku ava tofanê daketiye û serdema aloziyê derbas bûye. Ji ber vê yekê kevoka spî û çiqilê zeytûnê wekî remza aştiyê tê qebûlkirin. Herêma Efrînê wekî warê zeytûnan û bi remza çiqilê zeytûnê tê zanîn.

Her wiha nasnameyên xwedawendên herêmî û yên qewmên cuda xwe dispêrin kesayet, taybetmendî û rista xwedawenda Îştarê. Wê wek xwedawenda hezkirinê û parastinê dibînin. Xwedawenda Minbicê *Atargatîs* an jî xwedawenda qebîleyên Hûrî S*awuşka* mînakên wan in. Stran, wêne, peyker, mohr û nivîsên ku ji serdema Hûriyan mane, qala girîngiya çand û baweriya xwedawendan dikin. Di nav wan de dayika xwedawendan *Hudena* hebûye, xwedawenda sondxwarinê *Îşhara* û xwedawenda bajarê Qerqamêş *Kubaba*, xwedawenda hilberînê û baxçeyên *Nikkal,* xwedawenda miriyan *Allani* ku berpirsyara cîhana binerd bû, hebûn. Wateya van xwedawendan di jiyana civakê de jî xuya bûye. Daneyên ku li kolanên arkeolojîk ên li Orkêşê (Girê Mozan nêzîkî bajarê Amûdê) derketine holê jî piştrast dikin ku jin di rêveberina jiyana siyasî, aborî û civakî ya Hûriyan de bi risteke girîng rabûne.

Hûrî wekî etnîsîteyeke resen di hezarsala 6'an BZ'yê li çiya û deştên Mezopotamya Jorîn bi cih bûye û şoreşa neolîtîkê bi pêş ve birine. Li gorî daneyên etîmolojîk û etnolojîk mirov dikare bêje ku Hûrî bûbûn dapîr û bapîrên Kurdan ku heta îroj li heman nişstewaran dimînin. Di serdema 3000 - 2750 BZ'yê de wan li ser bingehê çanda neolîtîk pêşengiya bajarvaniyê kiriye. Xuya dibe ku taybetmendiyên komînal ên van bajaran ji şêwaza dewlet-bajarê Sûmeran cuda û serbixwe bûne.[31]

Qabîleyên Hûrî li dijî hêzên desthilatdarên hegemon wekî Sûmeriyan, Babîlan û Asûriyan berxwedanên serketî meşandine. Abdullah Ocalan nakokiya Hûrî-Sûmer wekî nakokiyeke qebîle-şaristaniyê dinirxîne û balê dikişîne ser wê yekê ku *"ev pevçûnên di navbera qral û elîtan de li ser mayeyê civakî ye. Tevî vê yekê jî Asûrî û Hûrrî weke gel timî di nava hev de bi awayekî aştiyane jiyane. Di navbera komên qebîle û gelan de bingehê şerekî sîstemîk tineye."*[32]

- **Rêveberiyên Jin û Jiyanê**

Orkêş di dema Hûriyan de navendek girîng a siyasî, çandî û baweriyê bû. Xuya dike ku ev şûnwar jî ewilîn di serdema neolîtîk de bûye jîngeh a çanda xwedawendan. Lê belê bi taybetî di salên 3500 - 3000 BZ'yê de Orkêş weke paytexta Hûriyan bi navûdeng bû û gihabû asta xwe ya herî bilind. Orkêşê serxwebûna xwe hertim parastiye. Ew bûye xwedî sekneke serfiraz li hemberî êrîşên dagirkerên Împaratoriya Akad him jî li hemberî padişahê Marî ku xwestin serdestiya xwe li ser tevahî herême ferz bikin.
Axa dewlemend a li quntarên rêzeçiyayên Torosê ji Orkêşê re bûbû çavkanî ji bo bipêşxistina çandiniyê, avakirina xaniyan û hilberîna seramîkê. Li ser vî bingehî di serî de Orkêş wekî navendekî olî bi perestgeh û meydanên mezin ji bo merasîman hatiye avakirin. Li aliyekî derencên

[31] Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Civaka Demokratîk - Pirtûka Yekemîn*, 2009

[32] Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Civaka Demokratîk – Pirtûka Çaremîn*, 2011

fireh ber bi ezman û Perestgeha Şêrê ve diçûn ya li ser serê girê ji bo xwe gihandina xwedayan. Li aliyê din derencên kûr û tarî diçûn *Abî* - cihê pîroz ê bin axê – ji bo peydakirina hevdîtinên rû bi rû bi giyanên jiyana jêrîn re. Derencên di nav ezman, erd û binerdê de nîşana têgihîştina anîmîst û lêgerîna heqîqetê ne. Ew sembolên mîtolojîk in ku yekîtiya gerdûnê, çerxa jiyan, mirin û vejînê didin xuyakirin. Bihevgihîştina erd û ezman wekî zewaca pîroz ya ewilîn jî tê şirovekirin. Gengaz e ku merasîmên zewaca pîroz li Perestgeha Şêr a Orkêşê jî her sal hatibin lidarxistin. Di nava jiyan û civakê de perestgeh xwedî wateya girîng û muqedes bû. Ji bo vê, ew gefên li ser peykerê Şêrê Orkêş bi zimanê Hûrî hatine nivîsandin baş tên fêhmkirin ji bo çi wisa hatiye nivîsandin: "*Tiş-atal, endan [şah] a Orkêş perestegeh ji bo xweda Nergal ava kiriye. Bila xweda Nubadag vê perestgehê biparêze. Bila Nubadag her kesî biruxîne ku bixwaze vê [perestgehê] birûxîne; bila xwedê li duayên wan kesan guhdarî neke. Bila Xanima Nagar, [xwedawenda rojê] Şimiga û xwedayê bahozê 10 hezar caran çêran li wan kesan bikin ku bixwazin vê [perestgehê] birûxînin."*[33]

Bajarê Orkêş li dora perestgehê mezin bûbû; qesreke mezin û avahiyên kargeriyê hatine avakirin. Di heman demê de Orkêş bûbû rawestgehek ji bo bazirganên li ser rêyên ji Anatolyayê li Bakur heta bajarên Başûrê Mezopotamya û ji Derya Spî li aliyê Rojava, heta bi Çiyayên Zagrosê li aliyê Rojhilat. Salên 2250'î heta 2225'an BZ'yê banû *Uqnitum* û şah *Tupkîş* bûbûn rêveberên Orkêşê. Berhemên nivîskî, hunerî û nîgarî yên mohran didin zanîn ku jiyan, aborî û karê wan bi çi rengî bûn. Belgenameyên kargerî bi zimanê Akadî, pirtûkên perwerdeyê û ferhengek bi zimanê Sûmerî jî hebûn. Hemû kar û hevpeyman bi mohrkirinê fermî bûne. Balkêş e ku heşt mohr aydê banû Uqnitum û tenê pênc aydê şah Tupkîş bûn.[34] Mohrên banû Uqnitum û yên alîgîr û hevalên wê Tulî û Zamena hêz, hunera perwerdekirin û rêveberinê yê jinê li Orkêşê diyar dikirin. Peyker û nivîsên li ser lewheyan jêhatîbûna Uqnitum destnîşan dikin. Her wiha mohrek destnîşan dike ku peywendiya Uqnitum bi jina binerd re hebû ku şahî û merasîmên Abî li dar xistine û bang li giyanên Hûriyan dikir.[35] Bi vê re em fêhmdikin ku hêz û rista Uqnitum ne bi karên dinyewî re sînordar bû, di jiyana ruhanî de jî diyarker bû.

Dema ku padîşahê Akadiyan *Naram-Sin* bi şerên dijwar pirraniya Sûriye û tevahiya bajarên Hûriyan dagir kiribû, tenê Orkêş tevî gundên derdorê karibû yekîtî û serxwebûna xwe biparêze. Ev yek bi hevpeymanek di navbera padîşahên Akad û Orkêşê de hatibû misogerkirin. Tê texmînkirin ku li gorî vê lihevkirinê, zewaca di navbera keça padişaha Akadê *Tar'am-Agade* û paşhatiyê şah Tupkîş de hatibû zelalkirin. Wiha xuya dike ku bi rêya zewacê û têkiliyên malbatî li pêşiya êrîşên artêşa Akad hatibû girtin. Di sala 2225'an BZ'yê de Tar'am-Agade ketiye şûna Uqnitum. Ew bûye banûyeke ferwerî bi nav û deng. Lê navê hevserê wê nayê zanîn. Mohreke Tar'am-Agade dîmena wê wekî qehreman di şerê ajalan de dide xuyakirin. Li vir taybetmendiyên wê dişibin dîmenên desthilatdariya baviksalar.
Her wiha balkêş e ku navê *Uqnitum* jî navekî Akadî ye. Ji bilî wê, navên hemû mirovên din ku wekî şêniyên Orkêşê hatin ragihandin, navên bi zimanê Hûrî bûn. Nameyên ku li arşîva Marî hatin dîtin, bi nêzîkatiyeke dijber behsa 'gelê Orkêş' an 'civata Orkêş' dikin û wekî cih û gelekî berxwedêr pênasê dikin. Lê çiqas hewldanên ji bo parastina serxwebûna Orkêşê çêbûne jî, dîsa di derdora 2000'î BZ'yê de rêveberiya Orkêş lawaz bûbû û heftsed sal bi şûn ve wêran bûbû û ji

[33] Giorgio Buccellati: *Royal inscriptions, r2 – Tiš-atal*, A Digital Monograph, 2002 [werger ji zimanê Îngilîzî]

[34] Bryan Hill: *The Rediscovery of Urkesh: Forgotten City of the Hurrians*, 2015

[35] Giorgio Buccellati: *Vexwendinek ji bo serdan ya Girê Mozan - Orkêş ya Kevin*, 2014

mirovan vala bûbû. Sedemên vê hilweşandinê hê jî baş nehatine lêkolîn. Lê belê di heman pêvajoyê de serdema Hûriyan bi gişt jî ber bi dawiyê ve diçû.[36]

Her wiha gelek mohr û peykerên jin û mêran, xwedawend û xwedayan, banû û şahan ji bin axa Bakurê Sûriyê hatine derxistin ku dişibin ***sembolên pergala hevserokatiyê.*** Bermahiyên şûnwarên wekî Til Xelef, Girê Fixêriyê ango Orkêşê rêzdariya jinê nîşan didin. Şopên pergala hevserokatiyê ji serdema Mîtaniyan jî tên ragihandin. Nameya Mîtaniyan bi zimanê Hûrî destnîşan dike ku peywendiyên têkildarî zewaca prensesa Mîtaniyan ya Waşokaniyê Nefertîtî bi firewûnê Misrê re hatine meşandin. Nefertîtî bi hevserê xwe firewûn Akhenaton IV. re tevlî xebatên siyasî û nîqaşên îlahiyatê dibû. Di sedsala 14'an BZ'yê de keybanû Nefertîtî ji Waşokaniyê bûye yek ji jinên destpêkê yên ku di dîroka Misrê de piştî mirina hevjînê xwe bûye firewûn. Di dema desthilatdariya xwe de Nefertîtî qanûn derxist ku keç jî êdî dikarin bibin firewûn. Lêkolînên li ser hestiyên Nefertîtî eşkere kirin ku li serê wê dane û wisa hatiye kuştin.[37]

Wekî din xelkê li derdora ***Xerîbê Şemsê*** (Xurbeta Şemsê) li Efrînê got, jineke biyanî ev cih ava kiriye û di rêvebirinê de bi risteke girîng rabûye. Lê ne zelal e, xaniyê mezin û bilind ê Şemsê ku bi keviran xemilandiyê, çima û kengê xira bûye an jî çawa hatiye xirakirin. Her wiha li gorî çavkaniyên din dêra kevnar *Xirabşemsê*, yek ji avahiyên girîng ên Xirîstiyanan e ku di sedsala 4'emîn de hatiye avakirin. Navê wê weke dêra Bîzans jî tê hildan. Rêxistina Perwerde, Zanist û Çandê ya Neteweyêan Yekbûyî (UNESCO) sala 2010'an Xirabşemsê wekî yek ji 40 şûnewarên 'gundên kevnar ên Bakurê Sûriyê' wekî mîrateya çanda cîhanê pejirand. Balkêş e ku di nivîs û lêkolînên cuda de ev şûnwar û nêzikî 700 gundên li Çiyayên Kurmênc yên ku bi pirranî di sedsalên 8'emîn heta ya 10'emîn şêniyên wan ew terikandin, wekî 'bajarên mirî' tên binavkirin. Ev şûnwar û gundên vala ji kevirên mezin ên kilsê her yekî wekî muzeyeke dîroka veşartî û cihên tijî çîrokên balkêş xuya dikin. Wekî tebeqeyên van giran em fêr kirin, heqîqeta dîrokê seresere bi pirranî diyar nabe. Ji bo em bikarin xwe bigihînin agahî û zanînên heqîqî pêwîst e ku em hîn kûrtir bikolin, li dengê xweza û civakê guhdarî bikin.

III. 1.2. Dîrok di Roja Îro de Veşartî Ye

Gelek rêûresm û zanînên çanda komînal a dayikê zindî ne yên ku xwe dispêrîn serdema neolîtîk. Ew di çand û jiyana roja îro ya gelên Rojava de veşartî ne. Jin û civak mêvanperweriyê, parvekirina êş û kêfxweşiyê, rêûresmên cejn û pîrozbahiyan wekî nirxên exlaqî bi hezaran salan didomînin.

"[...] divê mirov çanda îdeolojîk a civaka neolîtîk a di tevahiya dîrokê de li ser piyan maye piçûk nebîne. Huqûqê dayikê, hevdugirtina civakî, xuşk û biratî, hezkirina civakî ya ji berjewendiyan dûr, rêz û hurmet, fikra qenc ango exlaq, alîkariya bêberdêl, rêz û hurmeta ji kesên civakparêz û hilberînerên nirxên rastî, dilsoziya bi cewherê têgînên pîroztî û xwedatiya xira nebûyî, hurmeta ji cîrên re, hesreta bi jiyana azad û wekhev gelek nirxên bê serûbinî sedemên bingehîn ên vê civakê ne, û di heman demê de heta jiyana civakî dewam bike wê qîmeta xwe jî her hebin."[38]

[36] Giorgio Buccellati û Marilyn Kelly-Buccell: *Bericht über die 13. Kampagne in Tall Mozan/Urkeş: Ausgrabungen im Gebiet AA*, Hezîran-Tebax 2000

[37] Weşanên Akademiya Jineolojiyê: *Destpêkek ji bo Jineolojiyê*, 2015

[38] Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Civaka Demokratîk - Pirtûka Yekemîn*, 2009

Çanda eşîr, civak û malbatê li ser bingehê çand û aboriya komînal her tim li hemberî zordestiya dewletê û kedxwariya desthilatdaran li ber xwe dida. Di serî de ev çanda jiyana komînal di ahenga navbera xweza û mirov de bi destê jinan hatibû avakirin. Di vê beşa pirtûkê de mînakên rêûresm, zanîn û şîfageriya dayikan, xeml û xêz, stran û çîrokên jinên Rojava hatin berhevkirin da ku em bikarin zêhniyet û taybetmendiyên vê çandê fêhmbikin û pê bihesînin. Ev mînak dikarin wekî daneyên jiyanî ya lêgerîn û berxwedanê li dijî tinekirina vîn, çand û nasnameya jinê werin şirovekirin.

Balkêş e ku di navên gund û girên Rojava de îro roj jî gelek navên jinan derbas dibin. Lê belê dîroka van navan bi misogerî kêm tê zanîn. Di nav gelan de agahî li ser dîroka kevnar weke serdema neolîtîk kêm in. Lê dîsa jî wek çanda jiyanê taybetmendiyên civaka xwezayi û çanda xwedawendan heta roja îro di jiyana civakî û gelek kesayetên jin de zindî ne. Her wiha erdnîgarî û şûnwarên Bakurê Suriyê pergala gerdûnê û çanda manewî ya civaka xwezayî vedibêjin.

- **Lêgerîna Sirr û Dirba Gerdûnê**

Efrîn yek ji wan herêman e ku di dîrok û roja îro de her dem wekî warê berxwedana Kurdan hatiye pênasekirin. Di bingehê vê berxwedanê de çand û dîroka neolîtîk, jiyan û civakbûnê hene. Li ser avabûn û navên herêma Efrînê ku bi navê 'Çiyayên Kurmênc' jî hatiye nasîn şiroveyên balkêş hene. Tê gotin ku sazmana Efrînê dişibe pergala salname û gerdûnê. Wekî tê zanîn sal ji 365 roj û 6 saet ango 52 hefte û her heftê jî ji 7 rojan pêk tê. Li gorî baweriya Êzdatiyê jî 7 ezman hene. Herêma Efrînê jî di nava xwe de 7 gelî û 7 bajarokan dihewîne. Girêdayî her bajarokekî jî nêzî 52 gund hene. Hejmara gişтî ya gundên Efrînê 366 e. Di tevahiya gundan de cihên pîroz yên ziyaretê hene. Piştre di encama siyaseta demografya ya dewleta Sûriyê de di avahiya herêmê de hindik guhertin hatibin çêkirin jî, damezrandina warên şên ên Efrînê nîzam û hejmarên salnameyê û gerdûnê tînin bîra mirov. Wek salek ji çar demsalan pêk tê, Efrîn jî di nav çar çiyayan de ye: Çiyayê Çil, Çiyayê Lêlûnê, Çiyayê Xastiyan û Çiyayê Hawarê. Ev daneyên hanê hêjayî lêkolîn û şiroveyên nû yên zanistî ne.

Qodên ezmanî û stêran diguhezîne Efrîn. Mînak, 90 girên wê hene. Ev girên hanê aliyekî xwe li Keleha Jinan, aliyê din jî li Keleha Semanê dinêrin. Di biniya wan giran de ku li hember hev in, Efrîn him dîroka xwe diparêze him jî li hemberî tehlûkeyan hevdu hişyar dike. 9 ziyaretên wê yên navendî û 90 gir û zîyaretên gundan yên bi navê jinan hene. Ji van ziyaretan hin jê li Geliyê Jinan hin jê jî li Şikefta Jinan dinêrin. Çanda ziyaretê xwe dispêre çanda xwedawendan. Mînakên wan li Mabata Xilnirê *Ziyareta Keçika Kej*[39] e û li Qestela Cindoyê jî *Ziyareta Parsa Xatûnê* ya ku ji hêla Êzdiyan ve wekî pîrozgeheke girîng tê dîtin. Li gundên navçeya Reco wek gundê Qewala daneyên çanda kevinar a Êzdatî xuya dibin. Her wiha li ser çiyayê herî bilind Hawarê, li pîrozgehên Qerecurnê û Girê Endarê, li gundên Xirab Şems û Kîmarê li ser çiyayê Lêlûnê jî çanda Îştar û baweriya resen a Zerdeştiyê şopên xwe hiştine.[40]

Navên warên dîrokî wek Çilkanî, Çilxane an Çilmîra vê rastiyê nîşan didin. Heta îro wateya peyv û hejmara 'çil' pêvajoya 'çêbûnê' û 'veguhertinê' ji me re vedibêje. Li gorî rêûresmên ku xwe di çanda civaka Kurdan de parastine, dema 40 rojan jiyanî ye: Heta roja çilê piştî hatina dinê ya zarokê pêwîst e zarok hertim li cem dayika xwe bimîne heta ew piştî çil rojan êdî bibe mirov. Vê

[39] Binêre: Çîroka 'Salihê Naso û Keja Gulîsor' di vê beşe de
[40] Dr. Mihemed Ebdo Elî: *Êzdî û Êzdiyetî Li Bakur Rojavaya Sûriyê*, Efrîn, 2008

demê malbata zarokê dan an nokan diqelîne û wekî xêr belav dike. Dema mirina mirov jî 40 rojên şînê tên girtin. Di roja çilê de êdî goştê miriyan dihele. Ji bo kesa/ê mirî birçî nemîne malbata wê/ wî di roja çilê de xwarina ku kesa/ê mirî herî zêde hez jê dikir wekî goşt, şîrînahî an fêkî wekî xêr belav dike û civaka li derdora xwe ji bo xwarinê vedixwîne.

Di ola Xirîstanan de jî beriya cejnên zayîn û vejîna Îsa Mesîh 40 rojan rojî tê girtin. Dîsa tê texmînkirin ku Hz. Îsa 40 rojan piştî vejîna xwe çû ezmanî cem xwedê. Her wiha di zimanê Kurdî de ji bo rojên herî sar yên zivistanê tê gotin 'çilê zivistanê'. Rojên herî germ ên havînê jî dibin 'çilê havînê'. Dîsa 40 roj jî wekî nîşana bereketê tên pejirandin. Ger ku 40 roj piştî çandina zad tovik dernekevin, wateya vê ew e ku mûsimê wê salê mirî ye. Gava bûkek 40 roj piştî zewaca xwe ducanî nebe jê re tê gotin 'bi çilik ketiye'. Dawetên kesên navdar û dewlemend 40 roj û 40 şevan dihatin lidarxistin ku jê re dihat gotin 'dawetên herî xweş'. Xemla jinan û bi taybetî ya bûkan bi hûnandina 40 keziyên porê dihat kemilandin. Bi ser de heyama ducanîbûnê ya jinê 40 hefte ne. Ji bo xêr û çerxa jiyanê wateya hejmara çil çiqas diyarker e, ev mînak nîşan didin.

Çavkaniya pîrozdîtina hejmara 40'î li cem gel û baweriyên Mezopotamyayê xwe dispêre venêrîna stêrkên ezmanê. Di salnameya Babîlê de ya ku li ser bingehê zanînên jinê yên serdema neolîtîk hatibû avakirin, tê texmînkirin ku stêrkên pêvir ango komika sêwiyan[41] yên komstêrka ga 40 rojan winda dibin. Dema herî bi bereket ji bo paleyî, cotkirin û çandina axê li gorî tevgera van stêran hatibû kifş kirin. Ji Mezopotamyayê heta Misr û Yewnanistanê karê çandiniyê li gorî vê salnameyê hatiye birêvebirin. Pîroziya hejmara çilê di sirr a zayîn, çêbûn, mirin û vejînê ya gerdûn, xweza û bedena jinê de digihîje hev. Pirbûna navên çiya û warên li Rojava û hemû devêrên Kurdistanê bi peyva 'çil' dide xuyakirin ku lêgerîna heqîqeta jiyanê li ser vê axê hertim zindî bûye.

- **Parvekirina Êş û Kêfxweşiyê**

Li gelemperiya Bakurê Sûriyê herêm û gund hene ku heta roja îro taybetmendî û kevneşopiyên xwe yên jiyana komînal parastine: Êş, kêfxweşî û pêdiviyên jiyanê di nava cîran, malbat û civakê de tên parvekirin. Dema zarokek tê dinê an jî bûyerên din bi kêfxweşiyê cîran serdana vê malbatê dikin û bi dayîna diyariyê pîroz dikin. Li hêla din sivikkirina êş û barên şînê, nexweşî û xizaniyê her kes wek erka xwe ya mirovbûnê dihesibîne. Li cem mala malbata miriyê/î, konên şînê ji bo jin û zilaman ji hev cuda tên vedan. Mirov û cîranên vê malbatê pêşwaziya mêvanan dikin: Qehwa tal (mirra), çay, cixare, xurme û avê digerînin. Xwarinê çêdikin û datînin. Di dema şînê de malbat, cîran û gundî heta 15 rojan hemû li binê konê şînê dimînin. Ew bi hev re digirîn û dilorînin. Nas an nenas, kî li cihên nêzik an dûr agahiya şînê bihîstebe, diçe cihê konê.

Di 40 rojên şînê de kesî cil û serê xwe nedişuştin, li muzîk guhdarî nedikirin û televizyon venedikirin. Jinan porê xwe hine nedikir. Zilaman riha xwe nediqusand. Bi vî rengî her kesî êşa şînê wekî êşa xwe dihesiband û parve dikir. Xizmên kesê mirî mesrafên kon û şînê di nav xwe de parve dikirin. Heger malbat feqîr be cîran û nasên din jî dibûn alîkar. 40 roj piştî wefatê, cîran tiştên ku kesa/ê mirî jê hez dikir wekî şîranî an goşt kom dikirin û didan malbatê. Piştre malbatê evên hanê wekî xêr di nav civakê de belav dikirin û xwarina çilê dida.

[41] Ev komstêrka ji 7 stêrkên sereke pêk tê. Navê van bi Erebî: *ath-Thurayya;* Tirkî: *Surraya*; Yewnanî: *Pleiades (di mîtolojiya Yewnanî de ew dibin heft keçên Pleione û Atlasê)*

Dayikek ji Kobanê bi navê Şemse rêûresmên şînê yên civaka xwe wiha dide nasandin: *"Li gundan malbat bi dorê xwarin di beroşên mezin de li ser agir çêdikin û tînin bin kon. Goşt û tirşikê çêdikin, savar an birinc çêdikin. Her kes dibe alîkar. Mesrefên kon malbatek bi tenê nikare rabike. Her cîran pênc hezar an çiqas dikare bide jixwe dide û dibe alîkar. Gava ku bavê min wefat kir hevjîna birayê min diçû xwarin çêdikir. Yanê mala bavê min xwarin çênekir. Hemû malbatên derdorê ketin rêzê û her roj yeke din xwarin çêkir. Gava ku xêsuya min wefat kir, îcar mala bavê min rabû û her tişt girt ser xwe. Karên bin konê jî her roj malbatek digire ser xwe. Malbata yeke jê mirî li bin konê dirûne û yên din xizmetê dikin. Ferq nake mirî jin be an peya [zilam] be, edet eynî ne. Dema ku jin dimire jin wê dişon û kefenê wê lêdikin. Dema ku peya dimire, peya bi vî karî radibin. Lê ji bo veşartina cenazeyê tenê peya diçin. Çênabe ku jin herin."* Li ser vê axaftinê dayikeke din bi navê Halîme jî xalek balkêş lê zêde dike: "*Lê mela terqînê*[42] *li ser navê dayikê dixwîne. Ferq nake cenazeya jin an mêr be ku tê binaxkirin, terqîn hertim li ser navê dayikê tê xwendin. Ji ber ku tenê dayik dizane zarok ji kî ye."*[43] Her wiha li gorî rêûresma Îslamî jî hertim jin Sûreya Yasînê ya Quranê li ser miriyan dixwînin.

Bi şertên şer û şoreşê re hinek guhertin di adetên şînê de çêbûne. Li aliyekî mixabin şehadet û mirin dibûn parçeyekî jiyana rojane. Li aliyê din parvekirina êş û bibîranînan dibû ji bûyerên civakî û siyasî. Di kesayeta her şehîdeke de di heman demê de tevahiya şehîdên azadiyê jî tên bibîranîn û doza wan tê şopandin. Herçiqasî her şehadet êşên nû yên mezin bi mirov re çêdike, bi watedarkirina jiyan û têkoşîna şehîdan di çanda civakê de guhertin çêbûne. Ne tenê malbat û cîran, her wiha komîn û saziyên civakê jî xwe ji bo vegirtina kon û pêşwazîkirina mêvanan berpirsyar dibînin. Êdî bûye adeteke civakî ku konên şînê bi pirranî ji bo sê rojan bên vegirtin. Berê li pirraniya herêman tenê zilaman karibû biçûna miriyan veşêrin. Li hinek cih û malbat hê jî ev adet didomîne. Lê belê di mêrasîmên şehîdan de ev kevneşopî hatiye guhertin. Jin û zilam bi hev re li hemberî şehîdên azadiyê rêz digirin û peywirên xwe yên dawiyê pêk tînin. Malbat bi sazî û civakê re şehîdên xwe radikin û dispêrin axê. Soza pêkanîna armanc û xeyalên her şehîdê hezkirin û hêza jiyanê ji nû ve ava dikin. Heta hindek dayik hene ku şehadeta zarokên xwe wekî daweta wan pîroz dikin. Her wiha gelek kes cerên tijî zad datînin ser goran. Di van adetan de çerxa jiyan, mirin û vejinê didome ku xwe dispêre feraseta gerdûna zindî ya serdema neolîtîk.

Halîme ferqa di navberê şînên şehîdan û şînên din de wiha dinirxîne: "*Di şînên berê de jina cilê xwe diqetandin, li xwe dixistin, xwe gelek diêşandin û difelîşandin. Bi gîrî û lorandin hevdu tesîr dikirin û êşa hevdu kûr dikirin. Her kes li ser êşa xwe digiriya. Lê di merasîmên şehîdan de ne wilo ye. Di merasîm û konên şehîdan de jin, dayik pirr nagirîn. Her kes hêz dide dayik û malbatê şehîda. Destê xwe didin û jê re dibêjin: 'Serê we sax be.' Sûretên şehîdan tên daleqandin û belavkirin. Wilo dilên dayik û malbatan jî rehet dibin. Jin li hevdu dinêrin, hêza hevdu dibînin û dibêjin: 'Ger dayik nagirî, ez jî nagirîm!' Dema ku şehîd jin be, jin tabuta şehîdan radikin û wê dispêrin binaxê. Axaftinên li ser jiyana wê hêz didin civakê."*[44]

Adetên şînê bi vî rengî li herêm û di nav gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemûyan de bi merasîmên şehîdên şoreşê re ji nû ve wate û teşe girtine. Ew wekî çandeke şoreşgerî belav bûn û wan ruhekî hevbeş ê gel û baweriyan ava kiriye.

[42] Dua ku melê di dema binaxkirina cenazeyê de wekî oxirkirinê dixwîne.

[43] Hevpeyvîn bi Şemse û Halime re li ser adetên şîn, cejn û zewacê, Kobanê, 2017

[44] Çavkanî li heman cihî

- **Mêvanperwerî û Cejn**

Çanda mêvanperweriyê nirxekî girîng e. Her mêvan bi rêzdarî û baldarî tê pêşwazîkirin. Malbat li xwedîderketin û parastina mêvaneke/î ya/yê ku di rewşeke tengav de tê, wekî erk û rûmeta xwe dinihêrin. Destvala vegerandina kesekê/î li ber deriya malê, wekî şermeke mezin tê hesibandin. Di demên şîn û şahiyan de malbatên gund û derdorê hemû xwe ji bo pêşwazîkirina mêvanan berpirsyar dibînin. Mêvan tenê li ser malên şînê yan jî dawetê namînin. Her malbat deriyê xwe vedike, çend mêvanan dihewîne û xizmeta wan dike. Hebûna gelek mêvanan wekî qedirdîtin di civakê de tê hesibandin. Dawet û cejn li Rojava bi rengekî komînal tên pîrozkirin. Berê şahiya dawetê hefteyekê bi def û zurnê didomand. Her roj maleke din xwarin çêdikir û belav dikir. Îro dawet bi pirranî tenê di rojekê de tê pîrozkirin, lê dîsa hemû cîran û nasên malbatê bi hev re dikevin govendê.
Nexasim di cejnên olî yên Êzdî, Xirîstiyan û Îslamî de cîran û malbat serdana hevdu dikin. Malbat xêrê li derdora xwe û xizanan belav dikin. Zarokên gund û taxan serê sibê kom dibin yek bi yek li malan digerin, cejnê pîroz dikin û şekir kom dikin. Di heman demê de rojên cejnê wekî rojên heq helalkirinê û lihevhatinên malbatî û civakî bi risteke girîng û pîroz radibin.

- **Cejnên Biharê**

Çanda kevnar ya gelên Rojava di pîrozbahiyên biharê de wek cejnên Newrozê, Çarşema Sor, Akîto û Paskalya zîndîbûna xwe diparêze. Di bawerî û kevneşopiyên kevnar ên Êzdiyan de, di gelek milan de çerxa jiyan, mirin û vejînê ya çanda xwedawendan zindî ye. ***Cejna Çarşema Sor***, bi navên 'Cejna Sersalê', 'Cejna Tawisî Melek', 'Bûka Salê' û 'Roja Afirandina Cîhanê' jî tê naskirin. Cejna Çarşema Sor yek ji cejnên herî girîng e û di meha Nîsanê de tê pîrozkirin. Bi vebûna gulên sor mizgîniya hatina Tawisê Melek, afirandina cîhanê, peydabûna xêr û bereketa axê dide.
Li gorî baweriya Êzdiyan, berê cîhan hemû av bû. Bi diyarbûna miliyaketên Xwedê re cîhan tê meyandin. Wê rojê Tawisî Melek ji ezmanan hatiye û nazilî ser rûyê erdê bûye. Di vê cejnê de, basimbar ji benên bi rengên spî û sor an jî rengên kesk û sor û zer tên çêkirin. Wateya basimbar xêr, bereket, pêşîlêgirtina qeda û belayê ye. Basimbar li destê jin, mêr, zarokan û her tiştekî pîroz ve tên girêdan. Piştî zivistanê, meha Nîsanê destpêka heşînbûna xwezayê ye. Di vê cejnê de, destên kûlîlkên rengîn ji xemla Nîsanê bi her cihekî girîng ve têne daliqandin. Di meha Nîsanê de Êzdî nazewicin, bûka dernaxin, ji ber ku meha Nîsanê pîroz e û *'ew bixwe bûka salê ye'*. Hêk tên boyaxkirin, ji ber ku hêk nîşana reseniya jiyan û gerdûnê ye; çar cewherên gerdûnê - ax, av, ba û agir - dihewîne. Adeta boyaxkirina hêkan çavkaniya xwe ji pîrozbahiya Çarşema Sor digire û di nav adetên baweriyên din de xwe didomîne.

Gelên Aşûrî, Suryanî û Keldanî ***Cejna Akîto*** wek cejna herî girîng a salê pîroz dikin. Cejna Akîto hîna beriya derketina ola Mesîhî di serdema Babîlan de li Mezopotamyayê di destpêka heyva Nîsanê de hatiye lidarxistin. Di 2'yê Nisana 2018'an de gelên Aşûrî, Keldanî û Suryanî sersala xwe ya 6767 pîroz kir. Pirozbahiyên cejnê her sal di roja yekem a heyva nû piştî 21'ê Adarê dest pê dikin û 12 rojan didomin. Her 12 roj bi merasîmên taybet tên pêşwazîkirin. Wek Çarçema Sor roja Akîto jî wek cejna hatina biharê, reşandina tovên genim, afirandina cîhan, erd û ezmanî tê pîrozkirin. Rêûrsemên cejnê xwe dispêrin çanda neolîtîk. Lê li gorî mîtolojiya Babîlê cejna Akîto bi mebesta misogeriya desthilatdariya Marduk û 'bidawîkirina tevlîheviya li ser rûyê cîhanê' hatiye lidarxistin. Em dikarin şirove bikin ku koka cejnê ji çanda xwedawendan e, lê di şaristaniya dewletê de wateya cejnê ji nû ve hatiye pênasekirin.

Di pîrozbahiyên ***Cejna Paskalya***[45] ya Xirîstiyanan de dîsa adetên baweriyên civaka xwezayî xuya dikin. Cejna Paskalya di ola Xirîstiyantiyê de weke vejîna Hz. Îsa tê pîrozkirin. Lê belê him dema cejnê him jî adetên pîrozbahiyê bandora çanda xwedawendan destnîşan dikin. Roja Paskalyayê her sal li gorî çerxa heyvê diguhere û her sal di roja yekşemê de piştî yekem heyva çardehşevî ya piştî roja 21'ê Adarê tê pîrozkirin. Rêûresmên pîrozbahiyê kêfxweşbûn li ser hatina biharê û bereketê nîşan didin. Hêk, mirîşk û kîvroşk nîşanên cejna Paskalyayê ne. Kîvroşk di baweriya Elewiyan de jî pîroz tê dîtin. Ew wek nîşana zêdebûnê û ya xwedawenda *Ostara* (*Eostre)* ya kabîlên German tê şirovekirin ku taybetmendiyên xwedawenda bereketê *Astarte* ya gelên Rojhilata Navîn dihewîne. Xuya dibe ku Cejna Paskalyayê ya bi Elmanî wek 'Ostern' û bi Îngilizî wek 'Eastern' tê binavkirin navê xwe ji xwedawenda bereketê girtine. Lewre di rêûresmên gelêrî de ji bo roja cejnê hêkên boyaxkirî û nanê taybet bi şiklê kîvroşk, mirîşk yan jî nanê weke keziyên hûnandî tên amadekirin.

Di 21'ê Adarê de gelên Arî ***Cejna Newrozê*** wek pîrozbahiya biharê û vegera roniya rojê piştî rojên tarî yên zivistanê pîroz dikin. Li gorî hinek şiroveyên mîtolojîk jî tê gotin ku roja Newrozê di heman demê de rastî roja daweta pîroz a Înanna û Dumuzî tê. Di heman demê de Newroz nîşana serketina berxwedana gelên Medî ye ku di sala 612'an BZ'yê de dawî li zordestiya hukûmdarê Asûrê Dehaqî aniye. Di têkoşîna azadiya gelê Kurd ya hemdem de roja Newrozê bûye xwedî wateya berxwedan û serhildanê. Ji ber vê, Kurd cejna Newrozê bi pêxistina agir, gerandina govendê û lidarxistina meşan li tevahiya gund û taxan pîroz dikin.

Her çiqas her pêkhate cejna xwe ya biharê di nava xwe de bi rengekî civakî û adetên xêrê pîroz dike jî, her wiha wek exlaqê civakê li gund û bajarên Rojava mirovên tevahiya pêkhateyan diçin serdan û pîrozbahiyên hev. Ev çanda parvekirina kêfxweşiyê û hûrmetnişandana çandên hevdu ye. Bi taybetî bipêşketina şoreşa Rojava yekîtiya civakê bi hêz kir. Çanda hevdugirtina civakê û nirxên hevbeş careke din zindî bûye. Aynûr a ji bajarê Hesekê dibêje: "*Îdê me yê mezin û piçûk Kurd û Ereb bi hev re pîroz dikin. Dema ku îdê me hebin, îdê Mesîhî hebin, em diçin ba hev. Ziyaretkirina hev tê wateya rêzgirtina ji hev re. Wisa hezkirin û têkilî xurt dibin. Niha sersalê jî her kes pîroz dike. Berê ne wisa bû, lê niha her kes nêzî hev dibe."*[46]

- **Çanda Eşîr, Civak û Malbatê**

Di şêwaza jiyana Bakurê Sûriyê de him çanda eşîran him jî pergala malbatê cihekî girîng di civakên tevahiya pêkhateyan de digire. Di çanda eşîr û malbatan de taybetmendî û teqalîdên taybet û herêmî hebin jî, civakbûnê wekî nirxekî hevbeş heta roja îro di gelek waran de xwe parastiye. Mînak li kantona Efrînê 7 eşîr hene: Eşîra Amkan ji Bilbilê heta Recoyê, eşîra Biyan li Bilbilê, eşîra Şêxiyan li Reco, eşîra Xastiyan li Mabata, eşîra Cumiyan li Cindirêsê, eşîra Şikakan li Şêranê û eşîra Robaran jî li Şêrawayê. Lê li gorî eşîrtî di civaka Efrînê de rista têkiliyên malbatî û exlaqê civakî hîn zêdetir li pêş in. Beramberî vê, li Kobanê û li herêmên Cizîrê çanda eşîran zêdetir bi bandor e. Her wiha çanda herêma Cizîrê wekî du beş tê dîtin: Xerbî û Aşitî. Aşitî xwedî taybetmendiyên asî yên eşîrên çiyayî ne û bi pirranî li navçeyên rojhilatê Cizîrê bi cih bûne. Xerbî deştî ne û bêhtir xwe dispêrin çanda nerm û malbatî ya eşîrên Mêrdîn û Nisebînê. Ew pirranî li

[45] Bi Kurdî jî weke 'Hêkesork' an jî 'Zadik' tê bi nav kirin

[46] Niqaş bi endamên Kongra Star a Hesekê re, 2017

navçeyên rojavayê Cizîrê wekî aliyê Amûdê dimînin. Li Qamişlo herdu çand di nav hev de ne. Him di warê ziman de him jî di warê taybetmendiyên civakî û kesayetê de cudatiyên wan xuya ne.

Di çanda eşîran de çanda civaka xwezayî, pergala civaka komînal, exlaqî û polîtîk di gelek aliyan de hatiye parastin û di hinek milan de wek bingehê pergala xweseriya demokratîk hatiye nûjenkirin. Koka eşîran xwe dispêre dîroka qebîleyên neolîtîk. Peyva '*eşîr*' wek '*yên ku heman şîrê dayika hev xwarine'* jî tê şirovêkirin. Çanda eşîran xwe dispêre yekîtiyên eşîrên wek Hûriyan ku xwe wek sazûmaniyeke federatîf ya qebîle û eşîran bi rêxistin kirine û şoreşa çandiniyê bi pêş xistine; Mîtaniyên ku çanda demokratîk a rêveberinê bi pêş xistine û qraliyeta Komagene wek federasyoneke pirr çandî, pirr neteweyî û pirr zimanî, yekîtî û aramî di nava gelan de misoger kirine. Sazûmanên eşîran jî ji jêr heta jor li ser bingehê hevbendiyên malbat, bavik û qebileyan bi pêş ketin. Rêveberiya eşîran bi qanûnên nenivîskî û rêgezên exlaqî dihatin meşandin. Konfederasyonên eşîran bi pirranî bi lihevhatinên eşîran û armanca xweparastina li hemberî êrîşên ji derve, hatine sazkirin. Bi vî rengî wan karibû yekîtiya di navbera eşîr û qebîleyên herêmê de xurt bikin.

Berpirsên konfederasyonê û yên eşîran wek 'reîsê eşîr', 'mîr' an jî 'beg' dihatin nasîn. Wan nûnerên ji malbat û bavikên cuda ji bo rist û karên jiyanê erkdar kirine. Hevjîna serokê eşîrê wekî berpirsyara jinan dihat dîtin. Şêx dibûn rêberên ruhanî. Mele dibûn berpirsyarên fitû û zanistê. Her wiha berpirsyariyên dadê, hêzên leşkerî, qasidî û têkiliyên derve, erkên debarê û çavdêriya ji bo pergala eşîrê dihatin peywîrdarkirin.

Konfederasyonên eşîran yên mezin hene ku wek eşîrên Kurd tên nasîn û di nav xwe de mozaîka bawerî û gelan dihewînin. Mînak Barazî û Milan bi pirranî bi Kurmancî diaxifin, Kurd in û bûne Misilman. Lê di konfederasyonên wan de eşîrên Ereb, Tirkmen, Kurdên Êzdî û Elewî jî cihê xwe digirin. Di nav konfederasyonên eşîran de modeleke konfederal ji bo xwe rêveberina civaka exlaqî û polîtîk hatibû avakirin. Sazûmanên xwe rêveberinê ji mal û malbatan di nava gundan de dest pê dikin û heta koordînasyonên bavik û eşîran diçin ku li welatên cuda bi cih bûne. *"Eşîrên berê weke komînên me yên îro ne. Ew koka Kurda ye. Komînên xwe hebûn. Navê komîn jî ji 'kom kirinê' tê. Berê tenê endamên eşîrê xwe komî ser hev kirine. Lê komînên îro her kesî digirin di nav xwe."*[47]

Gelê Kobanê dibêje, **odeyên gund** bi erka ***'meclîsên gund'*** radibûn. Pêdivî û pirsgirêkên jiyanê di odeyên gundan de dihatin nîqaşkirin û çareserkirin. Di heman demê de odeya gund wek cihê pêşwazîkirina mêvanan û wek stargehekê hatiye dîtin. Dema ku keç û xortan hevdu revandine an jî jiyana kesekê – mesela ji ber doza xwînîbûnê – di xeterê de bûya, wan karibû xwe bispêrin odeya gundekî din û alîkariyê bixwazin. Dozên ku li odeyên gundan nedihatin çareserkirin di **şêwra eşîr û gundan** de ji nû ve dihatin şopandin. Şopandinên şêwran ji bo gel wek perwerdeya li ser dîrok, çand û exlaqê civakî bûn. Mirov dikare bibêje, şêwrên gundan di heman demê de bûbûn wek ***'akademiyên civakê'***.

Lê belê her çiqas em dikarin eşîrê wek dewama klanên civaka xwezayî binirxînin jî, dîsa hişmendiya baviksalarî û hiyeraşîk jî li bin bandora serdestiya dewlet û saziyên olê xwe di nav eşîran de bicih kiriye. Pê re ferasetên feodal, çînî, milkiyetperest, olperest û zayendperest jî ketin nav avanî û jiyana eşîran. Herçiqasî taybetmendiyên eşîran li gorî herêman ji hev cuda bin jî, vê hişt ku li gelek cihan rêpîvanên exlaqî yên jiyana komînal bizivirin dogma û qanûnên hişk. Bi vî

[47] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, hevseroka TEV-DEM a Kobanê, 2017

awayî serdestiya bav û zilam di nav pirraniya eşîran de serwer bûye. Beriya her tiştî li rûmet û berjewendiya eşîrê an jî malbata xwe fikirîn di heman demê de dibû sedema dozên xwînî û parçebûna civakê. Li derve girtîbûna eşîrê û teqeziya gotinên mezinên eşîran dibûn asteng li pêşiya bipêşketin û îfadekirina vîna ferdan. Pîvanên wekhevî, hevgirtin û hevsengiya ferd û civakê yên ku taybetmendiyên civaka klanên dayikê bûn, di pergala eşîrtiyê de li bin bandora hişmendiya dewletê de zenûn bûne.

- **Çand û Aboriya Komînal**

Gundiyan – jin û mêr - karên hilberîn û jiyanê wek çandin, mûsim, paleyî, şivantî, lêkirina xanî hwd. bipirranî hevbeş meşandine. Dayika Bedriye bi serbilindî dibêje: "*Di gundan de pirr tiştên xweş hene. Weke ku dema paletiyê jin û mêr bi hev re di nava erd de xebat dikin, paletiyê dikin. Her wiha dûvre jî bi hev re dîlan û govendê digerînin, yanî weke eybekê nayê dîtin."*[48] Parvekirina kar û barên jiyanê di gotina pêşîn a dayik û pîran "*jin û mer, weke tevir û bêr"* de jî baş tê îfadekirin. Dayikek behs dike: *"Jinan herdem kedeke mezin daye. Ew di berbangê de radibûn, dew dikeyandin, diçûn bêriyê û karê çolê. Dema ku dihatin malê binê pez vedidan, paqij dikirin. Dîsa ew bi çêkirina xwarinê, karê malê û zarokan re mijûl dibûn. Piştî westandina karê rojê jî wan êvarê hirî an jî mû dirêsand. Wan şe dianî, mû pê şedikirin û ji wê hiriya rêsandî tevn çêdikirin."*[49]

Aborîya gundan hê jî bi pirranî li ser çandiniyê ye, wekî çandina genim, ceh, nok, nîsk, kemûn, reşreşk, garis, zeytûn, pembû hwd. û sewalvanî wek xwedîkirina pez, çêlek, bizin, mirîşk hwd. tê meşandin. Her wiha baxçevanî jî bi çandina pêwîstiyên malbatê wek pîvanz, bacan, xiyar, îsot, bamî, fasûlî û şînkayî di nava hewşê de beşeke aboriya komînal in. Jin hîna wan bi hev re kom dikin, zebze hişk dikin an jî ji wan dikin tirşî ji bo tedbîr û kara zivistanê. Jinên Ereb û Kurd yên gundê Gundorê yê nêzîkî Amûdê behsa ruhê wekhevî û hevkariyê dikin: *"Me bi hev re kar dikir. Em pêncî mal li ser sê tenûran bûn, me bi hev re nanê xwe çêdikir. Niha bi pirranî nanê firinê tînin. Em bêriya nanê destan dikin. Kêm malbat hene ku hîn nan çêdikin. Lê têkiliyê milet baş in. Em hemû bi hev re mezin bûn û bi hev re dibin alîkar. Çi kar tê xwestin em hemû bi yek destî çêdikin."*[50]

Bi hilberîna girêdayî axê ve taybetmendiyên civaka neolîtîk di kesayet û bixwebawerbûna dayikan de zindî ne. Ew gelek karan bi destê xwe dikin û dizanin amûrên serdema neolîtîk wek teşî, tevn, şûjin, das, cer, gêre, destar û conî bi kar bînin. Heta beriya bi çend salan, jinên ciwan ên gundê Helincê diçûn ***Şikefta Keçikan*** li bin Girê Mištenûr. Yadê Uweyş dibêje: "*Li Mištenûrê Şikefta Keçikan heye. Keçik diçûn, di wê şikeftê de hirî dirêsandin. Tê de gilî û gazincên xwe dikirin û stran jî digotin. Xort nêzî wir nedibûn. Dema havînê ew şikeft hênik bu ji ber wê keç diçûn wê şikeftê."*[51]

Pîrozdîtina berhemên dest û axa xwe bi rêûresmên cûr bi cûr didome. Mînakeke wê giyayê Hermelê ye ku heya niha him wekî gelek cûreyên derman him jî wekî xeml bi destê dayikan tê

[48] Koma nîqaş û lêkolînê ya Jineolojiyê 1, li ser dîrok û çanda jinên Kobanê, 2017

[49] Hevpeyvîn bi Emîna Remo re, gundê Xanaserê yê Dêrikê, 2017

[50] Hevpeyvînên bi Zubeyde Amer re, gundê Gundorê yê Amûdê, 2017

[51] Hevpeyvîn bi Yadê Uweyş re, gundê Helincê yê Kobanê, 2017

çêkirin û pîroz tê dîtin. Beriya bi 12 hezar salan hermelê tovên xwe li deverên şên ên Rojhilata Navîn belav kirine. Ev giyayê şîfaker bi pirranî li ser axa reş a girên kevnar çêdibe ku lê mirov hatine veşartin. Ji ber wan bermahiyên fosîl bi xwe re radike. Bi vî rengî em dikarin bibêjin, hermel dîrok û gerdûnê dihewîne. Salê carekê giyayê hermelê ku dişibe giyayê noka li gund û derdora malan tê şewitandin. Bêhna wê ya tûj malê ji nezer û ajalên wekî kêzik, dûpişk, mar û mişkan diparêze. Jin hermelê nexasim wek xemlê çêdikin û wek salnameyê jî bi kar tînin. *"Di libê wê de çar demsal xuya dibin. Jin pê fêhmdikin di her demsalê de çend meh û di her mehek de çend roj hene. Li gorî vê gulok gulok nokê wê pê ve dikin. Di dawiya wê rojê an wê mehê de çi bûyer qewimiye, piştî vê, jin wek niviştok di hundirê wê de xêz dikin. Yan sûret danîne yan jî nivîsandine û bi dawiya wê mehê ve kirine. Ev jî dibe xemlekî pirr xweşik û pîroz. Hermel li cihê ku insan tê re hertim biçe û bê, tên daleqandin ji bo şikandina nezera çavan. Mesele, li ser derî vedikin ji bo kes di bin re biçin û werin. Ev xêrê tîne. Kesên ku tiştên nebaş difikirin, van fikiran ber derî wê bihelin û wiha derbasê hundir bin."*[52]

Ev rêûresm yekbûna ax û mirov, ked û berhem, jiyan û mirin; bi kurtasî têgîhiştina gerdûna zindî ya serdema neolîtîk dide hîskirin. Meclîsa gundê Jinwar hermel wekî sembola gundê xwe hilbijartiye. Rûmet Heval dide zanîn ku hermel wekî *'xemlekî jiyanî*' di çanda jin û civakên Rojhilata Navîn ên wekî Ermenî, Kurd, Fars, Ereb û Tirkmen de xwedî wateya pîroz e: "*Ev tê wateya çanda resen ya civak jê fêde digirt. Dibe ku siriyetek wê ya din jî hebe û her civakek ji bo xwe tê de siriyetek veşartî dibîne. Ji bo me hermel him wekî xemlekî, him jî ji ber fêdeyên wê bal dikişand. Jinwar jî pê re pîroz dibe, xweşik dibe û xwe dixemilîne. Ev sala sêyemîn e ku li Jinwar ev xemil tên çêkirin."*

Heman rêûresm û felsefeya jiyanê em dikarin li gundan di miameleya mirovan bi sewalan re jî bibînin. Jineke ciwan ji bajarê Kobanê bi heyranî çavderiyên xwe parve dike: *"Di navbera çanda bajêr û gundan de pirr ferq û cudatî heye. Di gundan de têkiliya mirov bi lawiran re pirr xweş e, jê re carna navên dayikên xwe dibêjin. Girêdaneke pirr xurt heye. Dayik dibêjin, dema pêwistiya me bi şîre wê heye, divê em xêra xwe jê re bidin û bi hezkirin nêz bibin. Di dema zayina zarokekî de ji dayikê wê re elorê*[53] *çêdikin. Eynî tiştî, yanî elorê ji bo çêlekê jî çêdikin!"*[54]

Li gel eşîrên Ereb yên Minbicê jî gelek kevneşopiyên civaka xwezayî hene. Ruxmê ku bi gelemperî danûstandin di nav keç û xortan de nedihat pejirandin, di dema palehiyê de asayî dibû ku jin û zilam, keç û xort bi hev re kar bikin û ji bo kutana genim kom dibûn. Li hêla din dema nebarîna baranê, di hişkesaliyê de, zarok bi şev li gundan kom dibûn û banga baranê dikirin. Roja înê wek rojeke civakî derbas dibû: Êvara înê - yanî pêncşemê êvarê - her malê xwarinek amade dikir, li cîran û xizanan belav dikir. Roja înê jî tevahiya malbatan kom dibûn, xwarin dibirin û diçûn cihên ziyaretê.

Bênderên gund wek cihên ***'kooperatîf'***ê bûn: Genim, ceh, nîsk û nok bi hev re dihatin hêran; parvekirin û belavkirina berheman li vir dihat sazkirin. Beşek zad ji bo malên feqîr an jî kesên hewce dihatin veqetandin. Dayik dibêjin, "*Berê, me bi destan paletî dikir. Piştî wê dexlê xwe li ser bênderan kom dikirin. Îcar bi kerê û textekî, bi cercerê di ser re diçûn û dihatin û li hêlekê dixistin.*

[52] Hevpeyvîn bi Rûmet Heval re, Jinwar, 2019

[53] Li herêma Kobanê şîraniya ku ji ard, şekir û rûn tê çêkirin û hêzê dide mirov. Hindek herêmên din jî jê re hewdel yan jî pelûr dibêjin.

[54] Koma nîqaş û lêkolînê ya Jineolojiyê 1, li ser dîrok û çanda jinên Kobanê, 2017

Pişt re jî ew dikutan ji bo ku ew pelçiqa li ser here û di dema xwarinê de di qirika mirov de nemîne. Wisa ji bo qûtê xwe yê salê amadekarî dikirin. Ev kar jî jin pê radibûn."[55]

Jinên Koçerata dibêjin, heta bandora bajarvaniyê neket nav civaka wan, jin û zilamên koçeran karê xwe bi hev re dikirin. Bi bandora çanda bajêr civak ji çanda xwe dûr ketiye, hevbeşiya jin û mêr ji hev hatiye veqetandin: *"Karê jin û zilam hevbeş bû. Lê mixabin, bin navê pêşketinê karê jinê û rêveberiya jinê tine kirin. Bêhtir nifşê nû çanda xwe paşketî didîtin û digotin, 'em ê jî wek bajêr pêşketî bin.' Êdî zilam ji karê malê re û karên dî re digot, 'Ev karê jinê ye'. Mînak zilam berê pez didot. Dûvre dîtin şerm e, zilam pez bidoşe. Lewma niha jin pez didoşe. Dema ku karê jin û zilam ji hevdu cuda kirin, wê demê jin di aliyê koçeriyê de ket. Bes heya niha jina koçer azadiya wê heye gorî jinên din ên civakê."*[56]

Li gundê Til Nayif yê nêzîkî Amûdê ji ber ku berhemên axên derdora gund ji hevdu pirr cuda bûn, ji bo edalet pêk were gundiyan her payîz 'pişka xwe avêtiye'. Wiha kîjan malbatê wê salê wê kîjan erdî biçîne bi pişkê dihat eşkerekirin. Tê gotin, heta beriya bi çil salan di jiyana gundan de pere zêde tinebû. Danûstandin, pişgirî û parvekirin, exlaqê xwezayî yê jiyanê bû. Lê bi bipêşketina bazirganî û bazarên li bajêr, êdî pere û milkiyet ketin nav têkiliyên mirovan. Ev dibû sedema acizbûn û gelek pirsgirêkan.

- **Çand û Jiyana Jinan**

Pergala rêveberinê, perwerde û hilberîna komînal ya eşîran çiqasî civak ji bandora desthilatdariya dewletê parastibe jî, dîsa pergal û hişmendiya baviksalar û dewletperest bandora xwe li ser avanî û jiyana eşîran kiriye. Axa, mîr, beg û şêx carna bûne nokerên dewletê û zilm li gel dikirin. Dîsa cih, nêrîn û gotinên jinan li odeyên gundan pirr sînordar bûn, heta nedihatin qebûlkirin. Eyşe Efendî balê dikişîne ser çînayetiyê di helwestên beramberî jinê de: "*Di meclîsên gund û eşîran de nedihiştin ku jin, jinên feda tevlîbibin. Nedixwestin ku wana ber çav bibin. Tenê dihiştin ku jinên axa û qîzên axan derkevin û tevlîbibin. Dixwestin wana bidin pêş. Heta axa keçên xwe nedidan derve, didan pismamên hev. Xal û xwerzî. Zarokên xwe didan hevdu."*[57]

Li gel vê, jinên Kobanê dibêjin, jinên gundan xwedî ***'rêxistinbûneke xweser'*** a xwezayî bûn. Ew li malekê yan jî li cihekî di nava gund de kom dibûn, rojev dinirxandin û zanîna xwe parve dikirin. Pirr caran jî, jinan wek şêwirmendên hevjîn, bira yan jî kurê xwe tesîra xwe li ser naveroka nîqaşên odeyên gundan dikir. Jin wiha dinirxînin: "*Dema zilam dihate mal, digot, pirsgirêkeke wisa wisa heye û jinê jî ji wê pirsgirêkê re çare didît. Wisa jinan rêya rast nîşanî wan dida. Jin kombûnê çêdike. Tu car jin kok û eşîra xwe bernade. Li hember zilma zilam pirr [li] ber xwe dide û têkoşînekê dide meşandin, tenê ji bo mala xwe ji ser hev neçe. Jin girêdanê çêdike."*[58]

Jinên pîr li Dêrikê tînin bîra xwe ku dayikên wan behsa jineke jinebî dikir ya ku beriya bi sed salan li hêla Endîwerê rêveberiya 7 gundan kiribû. Jina ciwan bi navê Jîn ji gundê Girzîro ya Koçeratê jî balê dikişîne ser wê yekê ku jinên Kurd rêvebertiya eşîran dikirin. Ew dibêje ku di salên dawiyê de

[55] Çavkanî li heman cihî

[56] Hevpeyvîn bi Jîn re, gundê Girzîro, herêma Koçerata, Dêrik, 2017

[57] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

[58] Koma nîqaş û lêkolînê ya Jineolojiyê 1, li ser dîrok û çanda jinên Kobanê, 2017

çend jinên mezin di temenê pîrika wê de hebûn ku rêvebertiya eşîran dikirin: *"Jina rêveber bi navê Fatima Hebê hebû. Ew jineke bi nav û deng e, rêvebertiya sê eşîran dikir. Di dawî de ev jin bi bêbextî hat kuştin. Jina bi navê Tolan jî li gundê me rêvebertiya eşîra Mîra dikir. Ev deh sal e, ew miriye. Heger pirsgirêkek çêbûba û vê jinê gotiba 'çareser bikin', gotina wê pêk dihat. Baweriya milet pê dihat. Giraniya vê jinê li cem milet hebû, çi biryar gotiba, milet pêk dianî ji ber gotina wê edalet û wekhevî bû."*[59]

Her wiha li gelek gundan jin hebûn ku wek 'jinên zane' an jî 'jinên feda' dihatin nasîn. Ji bo dîtina çareseriyê zilam û jinên gund diçûn cem wan û li wan guhdarî dikirin. Dema ku rist û sekna jinê di nava civakê de bi bandor be, malbatên wan di nava civakê de bi navê dayikê tên nasîn. Mînak malbatên wekî 'mala Fatimê', 'mala Gulo', 'mala Emşe', 'mala Hediyê' an jî 'mala Xatûnê' di civaka Rojava de bi navûdeng in. Hinek dayik û bav jî bi navê keça xwe tên nasîn. Her wiha gelek gund li herêma Cizîrê jî bi navê jinê hatine avakirin wekî 'gundê Aliyê', 'gundê Xezalê', 'xirbê Kejê' û hwd. Rista pêşeng a jinê di çanda nava jiyanê de xwe dide xuyakirin. Weke mînak, di çanda Kobanê de jin serê govendê dikişînin.

Bandora dualî ya çanda eşîran li ser jiyana jinan di nav eşîrên Ereban de jî diyar dibe. Endama rêveberiya Mala Jinê ya Hesekê, Neda dide xuyakirin: *"Bandora eşîrên Ereb li ser jinê gelekî heye. Mînak eşîra Şedadê, quralên hişk li ser jinê ferz dike. Jin, bi tenê ji mal dernakevin. Dema jin li hemberî gotina zilam derkeve, ev wekî gûneh tê hesibandin. Jinek ku bê destûra mêrê xwe here cem malbata xwe, bi rêya eşîrê wê bê cezakirin. Lê di heman demê de jin hene ku di eşîran de rola rêveberiyê jî kirine û gotina wan bi cih dibû. Dîsa eşîr hene ku bi navê jinê tên nasîn. Li ser êla Xatûnî tê gotin ku ew li ser navê jinekê hatibû avakirin, navê wê Xatûn bû."*[60]

Bi taybet di jiyana gundan de gelek jin hîna çanda devkî, dengbêjî û hunera destan diparêzin. Li gelek malan hîna tevn û dezgehên kevnar hene. Jin hêza xwe ya afirandinê, xeyal û hestên xwe di stran û çîrokên xwe de dibêjin. Heman hizir û hest, xemgînî û şabûna xwe bi destê xwe dihûnin, dirêsin û dineqişînin. Di berhem û cureyên dewlemend ên tevn û neqşan de jin têkiliyên xwe yên xuliqkar bi xweza û jiyanê re diteyisînin. Bi hezaran salan, dayik zanîna van kar û huneran ji nifşekî didin nifşê din. Çêkirin û fêrkirina hunera destan wekî parçeyek ji şêwaza jiyanê û perwerdekirina zarokan hatiye dîtin.

Li herêmên Koçerata û Beravê yên Dêrikê rêûresmên jiyana komînal, eşîrî, welatparezî û rista jinê di nava jiyanê de hê jî xurt in. Berî ku sînor welat parçe bikin, çanda Koçeran ji zozanên Botanê xwe gihand herêma Koçerata û Til Koçerê heta Çiyayên Şengalê. Li van herêman heman şêwaza jiyan û aboriyê serwer bû ku li ser têkiliyên eşîrtî, civakî û bazirganiyê hatibû avakirin. Li vir jin di hilberînê, xebata çandinî û şivantiyê de bi roleke girîng rabûne. Vê jî sekneke bixwebawer ava kiriye. Gel ti carî nepejirand ku kesek ji bo çareseriya pirsgirêkan berê xwe bide nûner an saziyên dewletê. Civakê baweriya xwe bi edelata jinê bêhtir dianî. Dema ku jin ji bo çareserkirina pirsgirêkan diçûn malekê û piştî niqaşên bê encam girêkek li serikê kefya xwediyê malê xistibana, ew neçar dima vê pirsgirêkê çareser bike. Lewra tê gotin, bi pêşengiya jinan civak tê birêkûpêkirin. Şaha Hisên qala çanda civaka xwezayî û komînal a Koçeratê wiha dike: "*Wek tê zanîn gelê koçer bi xwedîkirina pez re mijûl dibin. Lewra di dema çêkirina penêr û mast de jin hemû bi hev re dibin alîkar. Di heman demê de di dema şuştina hirî û kutana genim û dan de jî jin*

[59] Hevpeyvîn bi Jîn re, gundê Girzîro, herêma Koçerata, Dêrik, 2017

[60] Niqaş bi endamên Kongra Star re, Hesekê, 2017

û mêr bi awayekî kolektîv bi hev re vî karî dimeşînin. Dîsa ew bawer dikin dema ku dibînin hespê wan li cihekî mexel hatiye, wiha dizanin ku ew cih bi ewle ye. Lê dema ku bibînin ew hesp serê lingê xwe li erdê dide, ew fêhmdikin ku li wir xeterek heye. Di sala ku pez pirr biçêre de tê fêhmkirin ku wê zivistan gelek sar û zehmet be."[61]

Çanda jinê li navçeya Mabata ya Efrînê heta dagirkeriya dewleta Tirk xwe pirr dida hîskirin. Li vir herî zêde Elewî diman. Baweriya gel bi gerdûna zindî û jinên zane wek Ded Fatme bandora xwe li ser jiyana civakê kir. Ev yek di şêwaza jiyana komînal, têkiliyên mirovan û têkiliyên mirov û xwezayê de xuya dibe. Ji gundê Şeytana heta gundê Zehra, ji gundê Sarya heta gundê Amara yên Mabata li her gundekî mîsalên van hene. Mînak, heta 2017'an li gundê Zehra, her roja çarşemê şêniyên gund hemû li hev kom dibûn, bi hev re xwarin çêdikirin û ew roj bi hev re derbas dikirin. Li gundê Şeytana mirov rastî gelek gotinên berxwedana jinan û rastiya jiyana komînal dihat: Jinên gund bi hev re karê tevnê, karê destan û çandiniyê heya perwerdeya xwe bi rêxistin dikin û bi rê ve dibin. Li gundê Stêrkê şopên çanda Îştarê berçav in: Di her malê de wêneyên Şahmaran û Tawus hene. Dîsa tê gotin, navê gundê Sarya tê wateya '*jinên li hespan siwar dibin*' û ji navê jinekê tê ya ku ji bo azadiyê canê xwe feda kiriye.

Jinên li gundê Ruta yê Mabata rave dikin ku ew zimanekî taybet dizanin ku tenê jin jê fêhmdikin. Ji bilî vê mînakê, zimanên jinan ji herêma Hewraman a Rojhilatê Kurdistanê û li Çînê jî tên ragihandin. Hinek kes hene ku li ber vê nêrînê radibin û zimanê jinên Rutayê wek 'zimanê çûkan' pênase dikin. Lê jinên gundê Ruta dibêjin: *“Ev ziman ne zimanê çûkan e, zimanê jinan e!”* Gava me pirsî, *“Çima we pêdivî bi zimanekî wiha dît?”* Wan wiha li me vegerand: *“Ji bo em li dijî zilamtiyê xwe biparêzin!”*[62]

- **Stranên Jin û Jiyanê - Evîn û Dilêşê**

Li herêma Koçerata Dêrikê dengbêjî, stran û govendên Kurdî ku çavkaniya xwe ji herêma Botanê digirin, hatine parastin. Gelek stran hene ku behsa zîrekbûna jinan dikin; wek *'Navê te Sînem Xanê lêêê, medhê [pesnê] te çûye dinyayê de... '* Her wiha ji bo her kar û bûyerê stranên taybet hene. Dema ku jinan dew dikeyand wan stran li ser ked, pez û çêkirina dew digotin. Dema hejandina dergûşa zarokan, ew li ser êş û serpêhatiyên Kurdan dilorînin.

Strana Şamîranê
Yek ji stranên paleyê ku jinan li hevdu vedigerand, strana jina zane û jêhatî ya Kurd bi navê Şamîran e. Şamîran xwest cokekê ji behra Wanê bigihîne heya geliyê Şaxê ji bo avdana şînatî û çandîniya Geliyê Şaxê. Jinên gundê Besta Sûsê maqamên stranê wiha li hev vedigerînin:

Şamîranê mala bavê	*- Mala bavê Şamîranê*
Me cok kişande ji behra Wanê	*- Me cok kişande ji behra wanê*
Me sêsed pala me berdanê	*- Me sêsed pala me berdanê*
Serê palê me du zêr danê	*- Serê palê me du zêr danê*
Me cok kişande li Geliyê Şaxê	*- Me cok kişande li Geliyê Saxê*[63]

[61] Hevpeyvîn bi Şaha Hisên re, Dêrik, 2017

[62] Hevpeyvîn bi jinên li gundê Ruta yê Mabata, Efrîn, 2017

Lê li ser rêya xwe Şamîran rastî gelek mîran tê. Şamîran soz da her mîrekî ku kî pê re bibe alîkar, ew ê bi wî re bizewice. Bi vî awayî soz da çend mîran ku bi bala xwe berdan karê cokê. Di dawî de cok gihîşt Geliyê Şaxê. Hingê Şamîran got: *"Min soz daye gelek mîran û min ev cokê xilas kir. Niha ew ê werin ta ku bi min re bizewicin."* Ji bo xwe ji zewacê xilas bike û nehêle ku xwînîbûn di nava mîran de derkeve Şamîranê piştî pêkanîna erka xwe, xwe kuşt. Jinên Botanê di vê stranê de didin zanîn ku şînbûn û bereketa axa wan encama fedekariya Şamîranê ye.

Strana 'Kaniya li Mala'

Stranên dawetê, yên li ser bûk û zava, evîn û xiyanetê dibin beşeke din yên stran û çîrokên Koçerata. Di strana *'Kaniya li Mala'* de ku jin li hevdu di dawetan de vedigerînin, keçek bahsa êşa xiyaneta evîndarê xwe dike. Keç heft salan li benda evîndarê xwe mabû ku pismamê wê ye. Lê dawiya dawîn derket holê ku pismamê wê bi yeke din re zewiciye. Ev çîrok peyama parastina dirustbûnê dide zavê û bûkê li hemberî helwestên nedirust yên zilaman hişyar dike.
Jina ciwan êşa xwe bi vî rengî tîne zimên:

Lolo pismamo kaniya nêv malaaaaa
Şore jê naçe lo bergê halalaa.. îşev talan e, way li ser konê xalaaa
Şore jê naçe lo bergê halalaa.. îşev talan e, way li ser konê xalaaa
Kaniya bêberê loo ava bêberê, lo lo pismamo way kaniya bêberê
Kaniya bêberê loo ava bêberê, lo lo pismamo way ava bêberê
Îsal heft sal ee lawik li seferêêêê, yaya dotmamêêê ketiyoo kuderêê
Kaniya bin kuçêê way avaa bin kuçêê, lolo pismamo kaniya bin kuçêêê
Kaniya bin kuçêê way avaa bi kuçêê, lolo pismamo kaniya bin kuçêêê
Îsal heft sal ee lawik zewicîîî, yaya dotmamêêê ketiyo narincêêê
Îsal heft sal ee lawik zewicîîî, yaya dotmamêêê ketiyo narincêêê

Dayikên gundê Besta Sûs ya Koçerata çîroka evîneke cuda li herêma Botanê tînin zimên. Ev strana jinekê ye ku hezkiriyê wê nexweş e û ji bo başbûna wî dike hawar.

Bi dilêşî jin dibêje:

Delalê dilê min nazik û nazedar eee
Ez evdala xwedê nizanim nazdariya xwe li kê kim
Min evdala xwe[dê] ne dayik e, wez li dayikê kiimm
Min evdala xwedê ne bab e, wez li babê kiimm loloooo
Ezê herim serê Herekolê kevrê biliiind, ez evdala xwedêê destê xwe sê cara raberî xwedê kiiim
Ez evdala xwedê, hûn nizanin girêdana qerepaşiyê li ser eniya Gever çi lewnî çêkiiiim
Ay lê lê lêêêêêê wayêêêê
Ay dilikê min evdala xwedê ketiye ber hewl û vê belayêêêêê
Îşev serê sê şevan û sê rojan eee delalê dilê min evdala xwedê girtî tayêêê
Ay lê lê lêêêêêêê wayêêê
Ezê berankî şerjêkim xêra xwedê û Şêx Evdilqadirê binya Bexdayêêêê
De belkî ji delalê dilê min evdala xwedê lêêêêêê bibe şifayêêêê

[63] Şevbihêrka jinên dengbêj ên gundê Besta Sûsê, Koçerat, 2017

Evîndarê nexweş lê vedigerîne û dibêje:

Ay lê zeriyêêêê û mala bavê te şewitiyêêê, ti rabe ev çi dem eeee
Sîng û ber û bedenê te kelha Xursêêêê, û memikê te sêvê ecem eeee lê lê wayêêêê
Ay rojekê eyd û erefataaan ay delala dilê minê, ez fitrika serê te mee lêê lêê
Ay delala dilêêêê minêêêê…..[64]

Strana 'Zerga û Mihemedê Seîd Axa'

Balkêş e ku pirraniya stranên dengbêjî û çîrokên Kurdî yên li ser evînê yan jî bêtarên ku hatine ser serê malbat an civakê bi devê jinê tên gotin. Yek ji wan stranên pirr trajîk û dilşewat strana *'Zerga û Mihemedê Seîd Axa'* ya Amûdê ye. Dilê Zerga Evdî ketiye Mihemedê Seîdê Axê ango Mihemedê Deqorî. Bavê Mihemed bi nav û deng e û wekî xwediyê Amûdê jî tê nasîn. Zerga ji malbateke feqîr e. Ferqên çînî û qaîdeyên eşîrî nahêlin ku Zerga bikare xwe bigihîne evîndarê xwe.

Zerga rewş û evîna xwe di strana xwe ya hestyarî de wiha dide xuyakirin:

Ez ne Milî me, ne Kîkî me,
Sibê, nîvro êvarê, pênc wext li ser vê riya Erebkendê,
li pêşiya gundê Tîl Hebeş rûniştî, li benda wî me
Xelk ji min siwal dike: Keçê tu kî yî li vir çi dikî,
Min got, li esl û feslê min nepirsin, hema ez ê tolekek ji
eşîra wî me
Heger hûnê min nas nakin, ez Zerga me Zerga Evdî,
dosta Mihemedê Seîd Axa lawikê Deqorî me.

Her çiqas Mihemedê Seîd Axa bêdeng mabe jî, wisa xuya dike ku ew ketiye ser baneyê xenî û bi îşaretên neynikê evîna xwe ji Zerga re eşkere kiriye. Ev yek hingê wekî adeta evîndaran bûye ku tîrêjên tavê bi neynikan didan çavê hevdu ji bo bikarin evîna xwe bi dizî ji hevdu re ragihînin. Lê belê Zerga nedixwest ku Mihemedê Seîd Axa bikeve rewşeke xeterê. Ji ber vê, ew wî hişyar dike:

Kuro ji bo min li ser xaniyan negere,
tirsim tu bi qeşmer be lo
Ma qey tu nizane li vê dinya derewîn ev dil dixwaze ku
her tim tu axa be lo, ax li min lo...

Lê belê agahî û xebera evîna Zerga di nav gelê bajar û navçeya Amûdê de zû belav dibe. Di vê rewşê de bavê Zerga radibe û bi darê zorê wê dide wekî jina sêyem a zilamekî kal bi navê Seîdê Hecî Şêxmus. Êşa vê yeke ji bo Zerga ji mirinê girantir e û ew nifiran dike:

Bavê min Evdî, xêrê bike, xêrê nebîne,
genimê sor biçîne, zîwan û xela lê rabe hilîne,

64 Çavkanî li heman cihî

Ez ê nedame Mihemedê Axê siwarê cîbê,

Ez ê dame Şêxmûsê Hiso ew kûçikê dûv şivana

Wî ez ê dame Şêxmûsê Hiso mêrê sê jinan

Ev sîng û berê min weke qeymaxeke ji wan qeymaxê

mastê mihan,

wê bê devê xwe yê genî lê bixe biherimîne.

Zerga kul û derdê dilê xwe wekî 'sênca sor çiloyê agir pê ketiye' pênase dike. Ew şewata dilê xwe ya kûr ji Mihemed re bi vî rengî gilî û gazind dike:

Kuro te ez nexwestim,

te ez nerevandim

Te ez nekuştim, te ez helandim lo

Te ez kirim şîşa tenûrê,

ji xwe re reş qelandim

Te ez kirim cûmek benîşt,

li ser devê qenc û xiraban

li odê camêran te ez gerandim

Te ez kirim tayê derziyê

ji xwe re, neqetandim.

Mihemed Axa, Kuro dîno

te yê nav û dilê min helandî,

tu heq û sebebê te li min tine, lo.

Te dil û navê min helandiye,

hêviya min ji rebê alemê heye ku te jî bihelîne, lo.[65]

Jiyana Zerga çawa dewam kir û ew kengê çûye ber dilovaniya Xwedê nayê zanîn. Lê belê pirr trajîk e ku Mihemedê Deqorî bi rastî di şewata sînemaya Amûdê de dişewite û bedena wî dihele. Dema ku wî hewl dida ku zarokan ji agir xilas bike, Mihemedê Deqorî tevî 283 zarokên Kurd jiyana xwe ji dest da. Di 13'ê Mijdarê 1960'î de rayedarên dewleta Sûriyê agir berdabûn sînemayê. Birînên vê komkujiyê û bibîranîna şehîdên bûyerê heta roja îro di nava civaka Rojava de zindî ne.

Strana hezkirina bê sînor

Sedîqa ji Endîwerê qala evîna xwe ya balkêş dike. Dema ew di ciwaniya xwe de li baxçe dixebitî, dengê gundiyekî bihîst û meqamên wî li wî vegerandin. Dema ku jina ciwan serê xwe hildaye, dîtiye ku ew dengê xortekî bû ku li aliyê Bakur li ser zevî dixebite. Jin û xortê ciwan bi kilam û hezkirina xwe sînorên dewletan û di nav olên Misilman û Mesîhî de ji holê rakirin:

[65] Çavkanî: *Azîz Ogur, Evîneke ji agir, Yeni Ozgur Polîtîka, 15-04-2017*

Jina ciwan distrîne:

Wele kurko delal cottarîkoo cotqadiroo
Ezîzê dilê mino sedê dirêj ke looo weree viroooo
Wele ezîzê dilê mino cotê memikê min rebenê ji berê cotê te çêêtrooooo

Xort li wê vedigerîne:

Wele keçkê dînêêê yek ji min be yek jiii te beee
Wele heçî ne li soz û qirarê xwe be, mirada dilêê lo xwe şa nebêêêê

Li ser vê jina ciwan ewil ji xwe re digot:

Wele keçkê dînê lawikê min xeyidîîî loo ji gundiya, ezîzê dilê mino kete ser rêka pişt xaniyaaa
Wele ne ji şermika bav biraka ba, minê vegerandaaa, bi heeeenek û laqiiiiirdiyaaa

Îcar jin dengê xwe rakir û bersiva xort da:

Wele kurko delal kaniya gundêêêêê me bi qelaaaaç e
Ezîzê dilê mino gustilka lawikê min dêranêêê ay lêê zîvêêê xaç eeee
Ezîzê dilê mino hegî dila dil hebandîîîî çi Fiiiileee lo çi Kuurrrmancooo[66]

Kombûna jin û zilaman li malên gund ji bo şevbihêrkan û çanda dengbêjiyê hîna parçeyek jiyana Koçeratan e. Di awazên payîzok û heyranokan de, jin hestên demsalên payîz û biharê, êş û kêfxweşiyên xwe yên dîrokî û hemdemî, yên civakî û ferdî vedibêjin. Carna meqamên sitranên kevin ji nû ve bi gotinên nû tên şirovekirin li gorî bûyer û hestên demê. Mînak stranên li ser şerên eşîran di demê bihûrî de, îro dibin stranên li ser berxwedan û şehîdan. Wiha îro jin di çîrok û stranên xwe de pêşeng û lehengên tevgera PKK'ê bi bîr tînin ku ew di zaroktiya xwe de nas kirine. Di destpêka salên 1980'yî de ew heval weke 'mêvan' bi dizî li malên wan diman. Kesayet, rabûn û rûnişta wan bandoreke nemir li ser jin, zarok û gelê Koçerata bi gişti çêkiriye. Jineke welatparêz bi navê Şîraz, biranînên xwe li ser Şehîd Ferhat Kurtay û berxwedana zindana Amedê bi vî awayî kiriye stran:

Di roja tu hatî hew tê bîra min
roja min û te ku hew tê bîra min
agir û pêtê berda dilê mino
agir û pêtê berda dilê mino
li bajarê Amedê heps û zindanê
dijminê xwînxwar dîn û harê
benzîn dirjandin bi canê şêrîn,
heval şewitandin bi canê delal, heval şewitandin
roja min û te Ferhad tê bîra min
agir û pêtê berda dilê mino
te heval ji bîr nabin
bira ji bîr nabin Zekî û Mezlûm

[66] Hevpeyvîn bi Sedîqa re, gundê Endîwerê Dêrikê, 2017

zarok mezin bûn
bi şer û cengê
Newroz pîroz bi agirê canê roja min
û te Ferhad tê bîra min
agir û pêtê berda dilê min û te.[67]

- **Çîrokên Egîd û Gulîmoran**

Eşîr û civaka Kurdan xwedî pergala exlaqî û ya xweparastinê bûne. Eşîran zû bi zû serê xwe li hemberî êrîşên ji derve ve neditewand û parastina hev dikirin. Wan piştevaniya hevdu li dijî neheqî, zilm û zordariye kirine. Her wiha di nav bavik û malbatê de hîmê parastinê li pêş bûye. Milê vê yekê yê civakî û erênî heye. Lê milê wê yê neyînî jî heye. Milê neyînî dihêle ku acizbûn an jî pirsgirêkên piçûk dikarin zû mezin bibin, heta bibin sedema 'dijminatî' yan jî 'doza xwînî' di navbera malbatan, gundan, bavik û eşîran de. Di encama têgeha hişk a namûsê de ya ku jinê wek milkê eşîr û malbatê dinirxîne, gelek xort û keç, zilam û jin mirine; bi dehan salan malbatan têkilî bi hevdu re qut kirine yan jî mişext bûne. Kuştin û mirin di bin navê 'tolhilanînê' de wek tiştekî 'xwezayî' ango 'adî' hatiye dîtin. Her wiha ev taybetmendiyên eşîrtî ji hêla dewletên serdest ve ji bo parçekirin, darizandin û dîlgirtina civakê gelek caran hatine bi kar anîn.

Li hemberî vê, di nava eşîrên Kobanê û Botanê de helwesta berxwedanê, girêdana wan bi çand û nirxên neteweyî û exlaqî ji xeta nokerî û xiyanetê hertim xurttir bûye. Ev rastî di dîrok û çîrokên ***Egîd û Gulîmor***'an de jî xuya dike. Egîd xortên mêrxas, gernas û camêr in ku di nava civakê de wek pêşeng û rêzan dihatin nasîn û nêrînên wan esas dihatin girtin. Gulîmor (por sor) jî jinên leheng, wêrek û bêtirs in ku di nava civakê de bi rêzdarî tên pêşwazîkirin. Mînakên kesayetên Egîd û Gulîmor'an di destanên kevin de zindî ne. Ev çîrok bi rêya stran û helbestan ji nifşekî digihiştin nifşê din, û hîmên evîndarî û lehengiyê destnîşan dikin. Gelek ji van çîrokan lêgerîna hezkirin û hevjiyana azad destnîşan dikin, yên ku ji astengiyên kevneşopiya eşîrtî, çînî û baweriyan dibihurin. Lê di heman demê de em di van çîrokan de teyisandina têgeha namûsê ya baviksalar dibînin ya ku jinê û bedena jinê wekî namûs û milkê zilam şirove dike.

Destana Derwêşê Evdî û Evîna Edûlê
Destana *Derwêşê Evdî yê Egîd û Edûlê ya Gulîmor* yek ji wan tekoşînên mezin ji bo xwe gihandina evînê û parastina welat vedibêje. Bûyerên destanê li herêma Wêranşarê di dema Paşayê Mila, Zor Temir Paşa de qewimîne. Heta îroj gelê Rojava serpêhatiyên xwe – bi taybetî bi bandora berxwedana Şengal û Kobanê – di vê destanê de dibîne. Derwêşê Evdî ji eşîra Êzdî Şerqiyan bû ku ji aliyê Şengalê çûne hêla Wêranşarê. Evîndara wî Edûlê, keça Temir Paşa Misilman bû. Evîna wan li sînorên olên wan nedialiqî. Ew li rêyekê geriyan ji bo bikarin bigihîjin hevdu. Gava ku bavê Edûle bi hezkirina wan dihise, Derwêş tê mişextkirin.

Di sala 1768'an de 1700 siwarên Tirk û Gêsan xwe ji bo êrîşa bi ser eşîrên Milan de amade dikirin. Wê demê Temir Paşa ketiye tengasiyê. Wî da xuyakirin ku ew ê Edûlê bide wî xortê ku di şerê li hemberî Tirk û Gêsan de serleşkertiyê bike. Lê kesekî ji eşîra wî xwe neda ber. Îcar Paşa neçar ma, ji Derwêşê Evdî alîkariyê bixwaze. Bi hêviya xwe gihandina evîndara xwe û gotina 'mirin heye

[67] Hevpeyvîn bi Şîraz re, gundê Zixatê yê Dêrikê, 2017

veger tineye', Derwêş ev erk qebûl kir. Tevî 11 hevalên xwe yên cengawer, Derwêş ji bo parastina erdê Milan berê xwe da Girê Edşanê. Derwêş bangewaziyên nokeriyê yên kurê axayê Gêsa bi şûn ve zivirandin dema ku wî teklîfa revandina Edûle dikir. Şerê Edşanê sê rojan bi dijwarî dewam kir. Bi sedan Tirk û Ereb û 10 hevalên Derwêş jî di şerê giran de jiyana xwe ji dest dan. Di dawiyê de Derwêş bi tenê ajot ser Tirk û Gêsa heta ku ew jî giran birîndar bû. Dema ku Derwêş li serê girê Edşanê bêhna xwe ya dawiyê dida, Edûlê xwe gihande wî. Dibêjin,*"Edûlê giriya, bi dilê şewat rûyê evîndarê xwe maç kir, serê wî da ser çonga xwe û bi êş got:*

Delal lo delal..!
Delalê min wayê delal, delalê min wayê delal, delalê min wayê delal, wayê delal!
Ez nemînim, ez nemînim, ez nemînim lo lo Derwêşo!
Derwêşê dilê min suwar bû li derê mala bavê min peya bû,
Derwêşê dilê min rebenê suwar bû li derê mala bavê min por kurê peya bû.
Xwedê xira bike destê min ji agirê cixarê, fîncana hatin û çûyina mêvana xalî nebû,
Min dî keçika cîrana xebera nexêrê ji min ra dianî, digo lê lêê por kurê ma tu nizane
Derwêşê dilê te xeyidî bervî mal çû.
Wê gavê çavê min mîna taviya berf û baranê ji hêsra xalî nebûn,
ez nemînim, ez nemînim, ez nemînim lo lo delalo ax!
Delalê min wayê delal, delalê min wayê delal, delalê min wayê delal, wayê delal!
Ez nemînim, ez nemînim, ez nemînim, ez nemînim lo lo Derwêşo!
Derwêşo lawo were mala bavê min bi mêvanî, Derwêşo berxo were mala bavê min por kurê bi mêvanî ax!
Ezê ji Derwêşê dilê xwe radînim kulavekî sorî xuristanî, ezê ji Derwêşê dilê xwe ra serjêkim mîha sor serberanî, gava dê û bavê min gotin lê lê por kurê kanî mîha sor ser beranî, ezê bibêm şivanê me lawê xelkê bû, şev bû tarî bû, ba bû, baran bû,
ji çolê nanî, gura xwarî,
ez nemînim, ez nemînim, ez nemînim lo lo delaloo ax!"[68]

Derwêş û hevalên xwe jiyana xwe ji dest dan. Derwêş û Edûl negihîştin hev. Lê di encama lehengiya Derwêşê Evdê de zordestiya Tirk û Ereb li ser herêmê hat şikandin. Tifaq û hêza eşîrên Kurd ên Misilman û Êzdî xurttir û mezintir bûye.

Abdullah Ocalan li ber vê çîrokê gelek nirxandinên civakî û siyasî li ser rastiya Kurdan bi pêş xistine. Di aliyekî de ew balê dikişîne ser lêgerîna evînê û vê şiroveyê dike ku di bin şertên dagirkeriyê de evîneke azad ne gengaz e. Bi ser de di şiroveyên xwe de wî fikarên xwe yên di warê xetera qirkirina li ser gelê Êzdî li Şengalê de hîna beriya komkujiyên DAIŞê aniye zimên:

"Destana Derwêşê Evdî di şexsê Edûlê de berxwedana hêvî jê birrî ya him Êzîdiyên dawî û him jî di şexsê wan de Kurdîtiya li dijî asîmîlasyon û îmhayê hewl dide li ser piyan bimîne, îfade dikir. [...] Derwêşê Evdî nûnerê dawî yê vê rêûresmê ye. Derwêş ji hespê dikeve û birîndar dibe, ya rastî ev ketin û birîndarbûna dîrok û civakbûnekê ye. Mirina hêdî hêdî ya Derwêşê birîndar li ser zimanê Edûlê dibe vegotineke wisa ku bi hêsanî têrê dike, dîrokeke hezar salan û rêûresmeke gel a herî kevin îfade bike. [...] ji bo bîranîna Destana Derwêşê Evdî ev rêz ketin hişê min:

[68] Strana gelêrî; Şevbihêrka jinên dengbêj ên gundê Besta Sûsê, Koçerat, 2017

Ez li Çiyayê Şengalê li cem Derwêşê Evdî bûma!
Li ser pişta hespên spîbozî min xwe berdaya Deşta Mûsilê.
Dema Derwêş derb xwar, min ew rakira, bibira çiyayên Kurdistanê.
Min ji wî re bigota 'Binêre, bi hezaran Edûlê û Duwanzdekan hene'
Min bigota, li van çiyayên xwedawendan lê textê xwe danîne, xweş razê.
Mirin ji ku, û çawa tê bila bê êdî xeman nexwe,
Kurdîtî û jiyana azad a misogerbûyî rastiyên ebedî ne."[69]

Çîroka Xezal û Teyar

Çîrokeke din a ku li nav civaka Rojava tê gotin û mijara hezkirinê tîne ziman ku ji sînorên qeydên olî dibuhre, çîroka Xezal û Teyar e. Li vir, behsa evîna keçeke Êzdî û kurekî Misilman tê kirin. Ruxmê ku hezkirina wan li gorî qanûnên baweriyê wekî guneh û sedema dijminatiyê tê dîtin, ew bi zanîna qeydên exlaqê civakî, bi hişyarî û ziravî tevdigerin. Bi vî rengî evîndar rê nadin ku dijmintî di navbera malbatan de pesda bibe û cudahiyên baweriyê evîna wan asteng bikin.

Çîroka Salihê Naso

Ev çîrok mînaka lêgerîna pîvanên evînê ya Salihê Naso yê Egîd û Kejê Gulîsor e: *Salih kurê mîrê Zirkiyan e û evîna dilê xwe digere. Lê ew naxwaze, ku ti kes ji bo dewlemendiya malbata wî keça xwe bide û naxwaze jî ku keçek di bin wê bandorê de ji wî hez bike. Lewma ew wekî mirovekî xizan di nav êl û eşîran de, li gund û bajaran digere. Vêga ew rastî Kejê Gulîsor tê ku keça Mîrê Palo ye û wê wek evîna dilê xwe hildibijêre. Ji ber Salih dixwaze bi lehengî û keda xwe dilê Kejê qezenc bike ew wekî xizmetkar li mala bavê Kejê dest bi kar dike. Gava ku mala bavê Kejê bi êrîş û talanên heftê û pênc siwarên Qadirê Axê rû bi rû dimîne, ew diçe cem Kejê û dibêje: "Ka tu şûr û mertala min, şûr û mertala Şamê ji dar deyne, ezê herim talana mala bavê te ji dest Qadir Axê û heftê û pênc siwaran vegerînim." Kejê vî tiştî ji xizmetkarekî mala bavê xwe bawer nedikir. Lê dawî Kej dibîne, ku Salih di gotinên xwe de gelek bi biryar e û jê re dibêje: "Vaye ji te re şûr û mertal. Gava te talan vegerand, hingê ezê devê te têxim navbera cotê memikan û te mîna zarokekî şeşmehî bimêjînim."*

Lê Salihê Naso nizane ku ew çend sal in ku Hesen Beg, Kejê ji xwe re dixwaze û bavê Kejê wê nade wî. Ji bo Kejê ji xwe re bike bermalî Hesen Beg kemînek davêje, dest û pêyên Salihê Naso girêdide. Lê belê Kejê berxwedide û nahêle ku Hesen Beg nêzîkî wê bibe. Ew xencerê dixe destekî xwe û şûşê jehrê dixe destê din û dibêje: "Kî ber bi min ve bê, ezê xwe bikujim." Îcar di tariya şevê de Salih û Kejê xwe ji destê Hesen Beg rizgar dikin û direvin. Ew digihîjin Geliyê Xiştamê, cihê diz û keleşan. Li vir Kej gazin dike: "Tu çawa evîndara xwe di destê diz û keleşan de dihêlî? Ma ev ji rewiştên mêran e?" Îcar Salih dixwaze bizanibe, ku Hesen Begê dest avêtiye Kejê an na û li wê vedigerîne: "Ezê çi bikim mastê ku xelkê qeymaq di ser re xwariye û di bin re ji min re herimandiye!"

Wê hingê Kej mebesta wî fêhmdike û dibêje: "Tu were, ez çawa ji dayika xwe bûme, hîna wisa me.' Wê gavê Salihê Naso, wek şervanekî bêhempa êrîş tîne ser diz û keleşan. Ji danzdeh dizan ew heşt dikuje û çar kes ku mayîn bi birînên xedar ji ber wî bazdidin. Piştî vê bûyerê, êdî ji Kejê re tu nîşanên din ne pêwîst in. Salih bi tamamî evîna wê qezenc dike."[70]

[69] Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk - Pirtûka Pêncemîn*, 2012

[70] Çavkanî: Mustefa Reşîd: *Stranên me yên gelêrî*, Strana Salihê Naso û Kejê Gulîsor, 2002

Ev tenê çend ji sedan çîrokên Gulîmor û Egîd'an in yên ku dîrok û sosyolojiya civaka Kurd tînin ziman. Tevî vê yekê, ev çîrok rastiya zayendperestiya civakê û feraseta namûsê jî destnîşan dikin, ev rastî jî dorê li jinê digire. Çîroka Şahmaranê ya ku bi gelek şiroveyên cuda tê gotin jî me hişyar dike ku di rastiya dinyaya me de hezkirin bi hêsanî çênabe, wêrekî û dilsozî jê re divê:

Çîroka Şahmaranê

Li binê rûyê erdê welatekî maran hebû. Dibêjin marên ji zilma mirovan reviyan ew welat ava kiribûn. Li wî welatî hemû mar di bin rêveberiya Şahmaran de bi awayekî azad, wekhev, di aramî û aşitiyê de dijiyan. Li ser rûyê erdê zilamek bi navê Camîsad hebû. Wî berê çîroka Şahmaran û bajarê maran bihîstibû û xeyala li wî welatê jiyanê dikir.

Camîsad xizan bû. Ji bo karibe debara xwe bike, ew û diya xwe ya pîr her roj diçûn daristanê, êzing dianîn bajêr û difirotin. Rojekê, ew li daristanê rastî bîreke tijî hingiv hat. Wî alîkarî ji hevalê xwe xwest da ku hemû hingivî ji bîrê derxîne, bifiroşe û dewlemend bibe. Herdu hevalan heta satila dawî hingiv derxistin. Lê di dawî de hevalê wî lê îxanet kir. Ew di binê bîrê de hişt û çû. Camîsad di bine bîrê de maye. Dibe şev, bala wî kişand ku di nav kevirên binê bîrê de şewqa ronahiyekê xwe dida der. Bi kêra xwe ya piçûk vê derê qul dike û derbasê cem ronahiyê dibe. Ew der welatê maran bû. Her cûrê gul û dar, fêkî û nebat tê de hebûn. Maran dora Camîsad girt û ew birin cem Şahmaranê. Bandora vî welatê xweş û him jî bedewbûna Şahmaran li Camîsad bûye. Wî xwest li bajarê Şahmaranê bimîne. Her çiqas jî Şahmaran û wezîrên wê mayina Camîsad ji bo bajarê maran wekî xeter didîtin jî, dîsa destûr dan mayîna wî.

Piştî demek dirêj Camîsad xwest bi Şahmaran re bizewice. Wezîrên Şahmaranê di destpêke de destûr nedan vê zewacê. Lê dawî bi hinek şertan qebûl kirin û sê pirs ji Camîsad pirsîn:

Pirsa yekemîn: Jiyan çi ye? Mirin çi ye?
Camîsad bersiva xwe dida: "Jiyan tiştek wisa ye ku heta niha ti kes an jî tu zindî sirra wê negihîştiye. Lê dîsa jî jiyan mafê hemû zindî û hebûnan e. Dîsa heta niha siriyeta mirinê jî nehatiye zanîn, lê mirin jî ji bo hemû zindiyan e. Jiyan û mirin du destbirakê hev in."

Pirsa duyemîn: Tişta ku hêza jiyanê digerîne çi ye?
Camîsad wiha bersiv dida: "Evîn, dilê jiyanê bi xwe ye. Jiyan bê evîn, evîn jî bê jiyan nabe."

Pirsa sêyemîn: Ger tu li vir bijî tu êdî nikarî vegerî jiyana xwe ya berê. Tu yê karibî li ber hesreta welatê xwe û jiyana xwe ya berê xwe bigirî?
Camîsad gotiye, "Erê" û soz dide ku ew êdî ji wir naçe.

Li ser vê sozê Şahmaran û Camîsad bi hevdu re zewicîn. Lê piştî demekê Camîsad ji Şahmaran re got: "Min pirr bêriya dayika xwe û welatê xwe kiriye. Destûr bide min, ez herim wana bibînim."
Şahmaran şertê zewacê anîn bîra wî û got: "Bawerî bi te kurê Adem nayê. Ger tu vegerî tu mecbûr bimînî tu yê cihê min û welatê min ji mirovan re bibêjî. Wê demê tu yê bibî sedema kuştina min û hemû hevalên min." Camîsad dîsa israr kir û li ser daxwaza Camîsad, ne bi dilê Şahmaran be jî destûra çûyîna wî da.

Camîsad vegeriya welatê xwe yê li ser rûyê erdê. Şahê wî welatî bi nexweşiyeke giran ketibû. Doktoran jê re gotibû: "Dermanê te xwarina goştê Şahmaran e û vexwarina xwîna wê ye." Lê kesekî nizanibû welatê Şahmaranê li kû derê ye. Îcar zanyaran li Şah şîret kirine: "Bila hemû

hemwelatî werin hemamê û serê xwe bişon. Çermê kî pûlpûlî be, ew cihê Şamaranê dizane." Wekî her kesî Camîsad jî neçar ma biçe hemamê û serê xwe bişo. Dema ku li hemamê xwe tazî kir, xuya bû ku çermê wî wekî çermê maran pûlpûlî ye. Wiha ji wî pirsa cihê Şahmaran kirin. Destpêkê ew bêdeng ma. Lê piştî êşkenceyên giran, wî devê bîra hingivî û cihê Şahmaranê ji leşkerên Şahê re nîşan kir. Leşkeran bîr xira kir û wiha Şahmaranê dîl girtin. Wan Şahmaran bir û anî pêşiya Şah. Dema ku Şahmaran li wir Camîsad dît, jê re got: "Min zanîbû, bawerî bi te kurê Adem nayê! Lê tiştê qewimî êdî paşde nayê. Diyar e ku hûn ê min bikujin. Lê qet nebe daxwaza min a dawiyê bi cih bînin. Dema we ez kuştim qedexa yekemîn a xwîna min bila Şah vexwe, qedexa duyem bila wezîr û ya seyemîn jî Camîsad vexwe!"

Şah xwîn vexwar û di cih de mir. Wezîr vexwar û pê re zane bû. Dema Camîsad xwîna Şahmaranê vedixwar çermê wî yê wek mara pûlpûlî careke din vegeriya çermê mirovan. Li ser vê wezîr bûye Şahê welat û Camîsad kir wezîrê xwe. Îcar destûr da Camîsad ku laşê Şahmaranê bibe welatê wê û li wir veşêre. Dîsa wî ferman da ku devê bîrê bê girtin. Wiha ne mirov êdî karibin biçin welatê maran û xirabiyê li wan bikin, ne jî mar dikarin derkevin ser rûyê erdê. Piştî ku Camîsad laşê Şahmaranê vegerand welatê maran ji bedena Şahmaran ya mirî keçek çardeh salî çêbûye. Keçik jî careke din dibe Şaha Maran û mar dîsa li welatê xwe bi Şahmaran re di nav aşitî, wekhevî û azadî de dijîn.[71]

Wêneya Şahmaranê ya rengîn ku dîwarên gelek malên Rojava dixemilîne, me hişyar dike da ku em di roja îro de siriyeta jiyanê rast fêhm bikin û bi dilsozî bijîn. Rastiya Gulîmor û Egîdan di roja îro de bi rêxistinkirî û bi awayekî zanetir dewam dike. Îro gelê Rojava keç û xortên ku cihê xwe di berxwedana li hemberî êrîşên DAIŞ, dewleta Sûriye û dagirkeriya Tirkiyê de girtine, jin û mêrên şoreşger wek Gulîmor û Egîdan tîne bîra xwe.

Dema ku me li gund û taxên Rojava ji dayik û pîran pirsa 'çîrokên kevn' dikir, piraniya wan wiha bersiv da: "*Ez tenê dikarim çîrokên berxwedanê û şervanan ji we re bêjim. Ew bûn jiyana min. Dayika min gelek çîrokên kevn zanibû, lê ew berê demek çû ser dîlovaniya xwe..."* Lewma me xwest van çîrokên qedîm careke din bibêjin ji ber ku hûrgiliyên wan gav bi gav tên jibîrkirin. Çavdêriya me ew e ku nifşekî jinan ku bi çîrok û dîroka devkî baş zanîbû, êdî xilas dibe.

Çîrokên Derwêşê Evdî, Zembîlfiroş, Şengê û Pengê, Rustemê Zal, Mem û Zîn, Siyabend û Xecê, Şahmaran, Binevşa Narîn û Cembelî û hwd. hê jî di bîra hinek dayikan de ne. Lê bi gişt zanîna serpêhatî, bûyer, qehremanî, kul û kederên civakî ku di çîrok, helbest û stranên kevnar de hatine vegotin, hêdî hêdî diçilmisin. Nifşên pîr û dayikan bi bandora şer û koçberiya salên dawiyê ve gelek bibîranîn û zanînên dîrokî ji bîr kirine. Baldariya nifşê jinên ciwan li şûna çîrok û hafiza civakî, zêdetir li ser çanda moderniteya kapîtalîst e. Ew di serî de daneyên zanista modern wekî çavkaniyên zanînê dipejirînin.

- **Jinên Şîfager**

Zanîna jinê li ser **tenduristiya xwezayî û şîfageriyê** jî hatiye ber 'ji bîr kirinê' û nemanê. Lê hîna reh û demarên çanda neolîtîk di warê zanîna tiba xwezayî ya jinê de zindî ne. Balkêş e ku dayikên

[71] Li ser bingehê şiroveya dayikeke gundê Beroj ê Koçerata hatiye nivîsandin.

Kurd jê re bi pirranî 'tiba Erebî' dibêjin. Lê belê hinek jî behsa 'dermanên Kurmancî' dikin. Pîriktî û rêbazên tiba xwezayî bi pirranî jinên bi temen mezin dizanin. Ew gazindan dikin ji ber ku jinên ciwan ji bo fêrbûna wan tiştan zêde xwestekê nîşan nadin: "*Berê li her gundekî pîrikek ji bo anîna zarokan hebû. Ew jin jî temen mezin bûn. Lê niha her kes emeliyeta qeyserî dike. Pîrikan digot, em nêzî wan jinên ku baweriyê bi me neyênin nabin. Her pîrikekê keça xwe fêr dikir. Lê divê keça wê zewicî ba. Ger nezewicî ba, nedibû. Digotin, guneh e. Diviyabû ku wê zarok anîbin, dayiktî kiribe ji bo bi êşa wê jinê bihese û ger zarok anîbe, natirse."*[72]

Jinên şîfager bi derman û rêbazên şîfager heta îro gelek nexweşî rehet kirine. Ew dibêjin: "*Hin nexweşî hene ku heya niha li cem bijîşkan nehatine dermankirin. Lê li cem me çêdibin."*[73] Jinên şîfager bi taybet dibin çare ji bo nexweşiyên wek boçik, ketina duvik û navikê, zerik, 'bi jehrî ketin', birînên çerm, bîrov û şewat, kuxika ji singê, nexweşiya çerm, îltîhabên hundirîn ên jinê, giriyê zêde yê zarokan û derxistina ba. Zubeyde qala rêbazên xwe yên encamgir dike: "*Dema hestî dişkest, min mûyê bizinê di nav zeytê de diqeland, datîna ser û girê dida. Ji bo xwîn were seknandin, me qehwe an jî paçik dişewtandin û datîna ser birînê. Wê xwîn dida seknandin. Jineke Êzdî hebû, dema çavê zaroka diêşiya wê çavê wan diquliband û bi zimanê xwe paqij dikir. Dermanê me yê kurmancî wisa bû. Nexweşî piştî du roj, sê rojan baş dibûn."*[74]

Jinên şîfager, bi pirranî dibin pisporên hinek nexweşî, rêbaz an giyayên taybet û xwe dispêrin zanînên qedîm. Pirraniya wan agahî û rêbazên şîfageriyê ji dayik an jî xizmên xwe fêrbûne. Dibe ku jinên cuda ji bo heman nexweşiyê rêbazên cuda bi serketî bi kar bînin. Wan fêrbûnên dayik û dapîrên xwe bi tecrûbeyên xwe û zanînên nû kemilandin. Gelek jin jî siftê ji bo êş û nexweşiyên xwe rêbazên şîfagerî wekî çareseriyê peyda kiribûn. Piştre, wan xwest fêrî hunera tiba xwezayî bibin da ku ew bikarin vê qenciyê li mirovên din jî bikin. Fezîla Îbrahîm ji gundê Gundorê ye, bi temenê xwe nizane, lê qal dike ku ew beriya 30 salan fêrî rakirina dûvik û navikan bûye:

"Destpêka ku ez fêrbûmê, ez bixwe êşiyam. Ez çûm gel jinek li Amûdê, wê hilanî. Min jê re got, 'ez dixwazim fêrbibim'. Wê got 'bila'. Destpêkê hinek pora xwe anî, hilanî û got 'destê xwe bidê'. Heger kurt be, ew dûvik ketiyê. Hêdî hêdî wê ji min re nîşan da, heta ez fêrbûm ez ê dûvik çawa bi tiliya xwe bihilînim. Navik jî ez fêrbûm. Ji dervê navik û dûvik ez tiştek din nizanim. Mirovên ji gund û gundên din jî tên gel min ji bo ez wan sax bikim. Heta yê zilaman jî ez çêdikim. Ew çend roja tên. Ez çêdikim heya sax dibin û nema tên. Beriya niha ti kes nebû yê zilama çêbikira. Jinan tenê yê jinan çêdikir. Ew ji xwe re wekî eybekê didîtin. Lê ne wisa ye. Niha min bûka xwe fêrî vî karî kiriyê ji bo dema ez bimirim jî yek cihê min dagire. Lê kêyfa wê bi vî karî re nayê."[75]

Zahîde Heskîlo ji Efrînê di civaka xwe de wekî şîfagereke baş tê nasîn. Di dermankirina nexweşiyên boçik û navikê de tev mizdan û badan, ew rêbaza lêxistina 'kasê hecemetan', yanê kasên ku agirekî piçûk tê de vêketiye jî bi kar tîne. Zahîde li ser rêbaza xwe ya dermankirinê dibêje: "*Niha milet bi vê yeke pirr bawer dikin û ji derên dûr tên cem min. Gel di nava xwe de ji*

[72] Koma nîqaş û lêkolînê ya Jineolojiyê 1, li ser dîrok û çanda jinên Kobanê, 2017

[73] Heypeyvîn bi Zahîde Heskîlo, Fehîme Ehmed û Şêxa Fedîle re, jinên şîfager li navçeya Reco ya Efrînê, 2017

[74] Hevpeyvîn bi Zubeyde Amer re, gundê Gundorê yê Amûdê, 2017

[75] Hevpeyvîn bi Fezîla Îbrahîm re, jina şîfager, gundê Gundorê yê Amûdê, 2017

hev re dibêje, 'filan kes dizane'. Wisa agahiya hemûyan çêdibe û tên gel min. Piştî ku ez ji wan re boçikê radikim, ew bi rehetî radibin, dimeşin û diçin malê xwe."[76]

Beriya hezaran salan jinan şîfaya hermelê vedîtiye ku wekî 'giyayê jinê' jî tê nasîn û li gelek şûnwarên Rojava çêdibe. Tê gotin ku hormonên jinê ostrojen û progestojen di hermelê de jî hene. Jin vî giyayê bi taybet wek derman di demên dûcanîbûnê de bi kar dianîn ji bo ku zayîn rehettir bibe. Gelek nerehetiyên ku sedema xwe ji guhertina hormonan digirin ên wekî heraret, xwêdan, guhertinên bedenî û hwd. bi hermelê rehet dibin. Li hemberî nexweşiyên hundir ava wê tê vexwarin. Ev derman êş û azara mirov kêm dike, hezma made û roviyan rehet dike. Wekî din ji bo nexweşiyên çerm ên wek bîrovê an ravê jî hermel baş e. Bi ava wê cihên laş ên nexweş tên şûştin. Her wiha feyda wê ji bo porê mirov heye, porê qayîm dike. Jinên şîfager zanîna xwe li ser hermelê wekî dermanê ruh û bedenê bi hezaran salan bi pêş xistine û parve kirine. Îro lêkolînên nûjen yên tiba xwezayî jî destnîşan dikin ku biqasî dused nexweşî bi hermelê baş dibin, derbas dibin.[77]

Her wiha rehetkirina gelek nexweşiyên nefsî û bedenî di civakên Bakurê Sûriyê de bi awayekî manewî tên çareserkirin. Ev çand bi rêya dest lê dayîn ji nifşekî derbasî nifşê din dibe. Bi taybetî jî divê kesê ku rahêje vê xebatê, xwedî bawerî, parastina sirrê û exlaqî be. Şêxa Fedîlê dibêje, wê piştî ku dapîra xwe ya şêx di xewna xwe de dîtibû, enerjiyek mezin bi xwe re dîtiye. Ew bi rêya bawerîdayînê û piştgiriya manewî dibe alîkar bi wan jinan re ku xof û nerehetiyên derûnî bi wan re hene: *"Di wê demê de gelek zextên pîskolojîk li ser civaka me hebûn. Di encamê de jin ducanî nedibûn. Dema ez ser de dixwînin û dua dikim, rehet dibin û pirraniyan wan piştre dibin xwedî zarok. Dîsa ez parêziyê didim wan, diyar dikim divê çi bixwin çi nexwin, wek tiştê tûj, nok, nîsk û tiştê qewrandî divê nexwin."*[78]

Çiqas rêbazên jinên şîfager ji hev cuda bin jî, sirra dermanên wan ew e ku ew tenduristiya ruh û bedenê girêdayî hev dibînin. Saxkirina mirov ji bo wan karekî exleqî, xêr û qencî ye. Li gorî adetên çanda dayika xwedawend ew kesayet û bedena jinê pîroz dibînin. Gelek dayik bi nêzikatiyên xwe yên xwezayî ji bedena xwe û ya jinê re nîşan didin ku wan cewherê xwe li hemberî ferasetên baviksalar yên 'eyb' û 'şermê' parastiye. Di nav xwe de dayik bi pirranî bi xwezayî li ser mijarên wekî anîna zarokan, nexweşiyên jinê û zayendî diaxivîn. Di gelek stranên gelêrî yên Kurdî de jî heman zimanê vekirî û xwezayî ji bo bedena jinê tê bi kar anîn. Di çanda civaka Ereb de yekem car mehik[79] bûna jineke ciwan tê pîrozkirin. "*Dema keçik cara yekemin dikeve dewrê, dayika wê kêfxweş dibe û ji her kesî re dibêje 'qîza min ket dewrê'."*[80] Berovajiyê vê di ola Îslamê de dîtina xwînê wekî 'heram' tê şirovekirin û gelek tişt wekî nimêj, rojîgirtin, xwendina Qûranê an jî çûyîna goristanê ji bo jinê dema mehikê wekî guneh tên hesibandin. Di pênase û nêzikatiyên jinê yên beden û tenduristiya wê bi xwe de nakokiyên dîrokî di navbera hişmendiya civaka xwezayî û zêhniyeta baviksalariyê de xuya dibin. Lewma hewldanên ji nû ve zindîkirin û girîngîpêdayîna tenduristiya xwezayî yên ku bi şoreşa Rojava re bi pêş ketine, wekî vekirina mieyanexane ya Şîfajin, gavên watedar in.

[76] Heypeyvîn bi Zahîde Heskîlo, Fehîme Ehmed û Şêxa Fedîle re, jinên şîfager li navçeya Reco ya Efrînê, 2017

[77] Hevpeyvîn bi Rûmet Heval re, Jinwar, 2019 (ji bo agahiyên zêdetir li ser giyayê hermelê li beşa 'Çand û Aboriya Komînal' binihêrin)

[78] Hevpeyvîn bi Zahîde Heskîlo, Fehîme Ehmed û Şêxa Fedîle re, jinên şîfager li navçeya Reco ya Efrînê, 2017

[79] Mehik ango heyvîk, heyvok jî ji bo dewreya xwînê ya jinê tê gotin.

[80] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Koçerê, 2017

- **Xeml û Xêza Jin û Jiyanê**

Di deqên li ser bedena jinên Kurd, Ereb û Mitirb de nîşanên çanda xwedawendan dibiriqînin. Remzên roj, heyv, xezal, dara jiyanê, şeh, xaç, mar û Şahmaranan ku jinan li rû û laşên xwe deqandine û remzên ku em li ser diwarên şikeftan, wêne û peykerên kevnar, li ser tirban, kevir, xemlên malan, berhemên hesinî, tevn û hûnandinan dibînin, yek in. Jin û keç enî, sîng, dest, mil, pê û lingên xwe bi remzên çanda xwedawendan xemilandine.

Rengê deqan bi teniya agir û şîrê dayikan ku zarokên keç anîne, tê çêkirin. Dayik sirra deqan vedibêjin: "*Bi şîrê dayika ku zarokê wê kûrik be çênabe, ji ber ku reng nagire. Tenê ya dayikên keçikan digire."* Xemla deqan qala êş, tirs, hêvî, xwezî, hezkirin û xweşikbûna jiyanê dikin. Dayik bawer dikin ku deq wan li hemberî nezera çavan, mirina zarokan, anîna hewiyê, pêvedana maran, êş û nexweşiyan diparêze. Deq bextxweş dike, evîn û şabûnê tînin; dihêlin ku hevîr û xwarin xweş derkevin, şîrê pez û bizinan zêde bibe. Di herdu nifşên dawîn de jin û keçên Kurmanc çêkirina deqan bi pirranî wek moda diecibînin û dibêjin: "*Me çêkir ji bo em xweşîk bibin, çeleng bibin."* Fezîla ji Amûdê çîroka deqên li ser dest û eniya xwe wiha tîne zimên: "*Em hîn piçûk bûn, me çêdikir. Jê re digotin makyaja keçika. Wê demê makyaj nebûn wek niha. Em diçûn daweta. Em bi dawetê Kurda û Ereba direqisîn. Her deqa ku me çêdikir maneyek xwe hebû. Gelek kes dema dergistî bûn navê dergistiyê xwe dinvîsandin. Ya min, min jî vî şeklê xezalê hez dikir. Min çêdikir ji bo xweşikbunê. Dayika min nedizanî. Min çêkir. Dema [wê] ew dît, li min xist. Wê got: Guneh e! Te çima çêkiriyê?"*[81]

Xuya dibe ku hinek dayik sirr û wateya resen a van xemla nizanin. Lewma ew nahêlin jî keçên wan deqan li bedena xwe bidin. Jinên bi nav û deng hebûn ku li herêmên xwe deq çêdikirin. Li Amûdê jinên deqandî bi pirranî dibêjin, deqên wan jinên Ereb ji wan re çêkirine. Di çanda eşîrên Ereb de deq wek nasnameya eşîrê tê dîtin. Endamên eşîran bi şêweyê deqên xwe hevdu nas dikin.

Estetîka jiyana xwezayî û çanda kevnar dîsa di cil û bergên jinan yên rengîn de xuya dibin. Li gorî taybetmendiyên xwezayî û çanda kevnar yên herêman şekl û rengên destmal û cilan tên guhertin. Mînak, jinên Kobanê xeftan, bervank, siqme, kiras yên ku didin serê xwe, şala hibrî ango bi zimanê Kobanê kitanê melesî yên spî û li ser wê şera kesrewan ya bi rengê xwe yê xweşik, di nava wê de tejî sirmeyên bireng, li ber eniya xwe jî desmaleke herîr girêdidin û kumê kofiyên xwe didin ser. Li ser desmala kofiyê pîlikên zêr û zîv berdidin.[82] Di cil û bergan de şîfreyên civakî jî xwe didin der. Jineke pîr dibêje: *"Dema ku li serê jineke ciwan kitan hebûya, her kesî zanibû ku ew zewicî ye. Ji ber ku kitan tenê jinên zewicî didan serê xwe. Jinên nezewicî kum didan ser serê xwe. Her tiştekî jî wateyeke wê hebû. Xeftan ji bo ku dema jinê karek dikir yan diçû çolê, tişt dikir pişta xeftanê xwe. Kofî jî ji bo ku dema av yan tiştekî giran didan ser serê xwe, serê wê tiştek nebe û bandor li qafê wê nebe. Pîrikên me heya berê vê bi demekê kofî dixistin serê xwe. Dema wê xew bikira datanîn û bi sibehê re dîsa dixistin serê xwe."*[83]

Li tevahî herêmên Rojava jinên pîr bi pirranî bi melûlî 'jiyana berê' wek bihuşteke ku hat windakirin, tînin bîra xwe. Ruxmê ku zehmetiyên bedenî û aborî vê demê zêdetir bûn, ew dibêjin:

[81] Hevpeyvîn bi Fezîla Îbrahîm re, gundê Gundor, Amûdê, 2017
[82] Broşûra Komîteya Perwerdeyê ya Civaka Demokratîk (KPCD) Kobanê, 2017
[83] Nîqaş bi dayikên li Taxa Kaniya Kurdan re, Kobanê, 2017

"Berê jiyan ji îro xweştir bû. Lê dema ku kerebe, televîzyon, pere û telefona destan ket nav jiyana me, jiyana me xira bû. Berê ti tişta 'eyb' cem me tine bû. Keç û xort tevahiya şevan bi hev re stran digotin û govend digirtin. Jiyana me wê demê xweş bû."[84]

Xweşikbûn û tehma jiyanê ya wê demê dayik wiha rave dikin: "*Cejna wan sebzeyan ku me destê xwe çandine, pirr cuda bû. Ew ji yên niha pirr xweştir û bi tehmtir bûn. Wê demê me pincar kom dikir û tevlî pîvazekê dikir. Cejna wî pincarî ji qawirmeya niha xweştir bû. Niha ne pîvok, ne kereng û ne jî pincar weke berê maye. Berê cot bi destan dihate kirin. Lê niha terektor derketine. Ew hemû tiştî ji bin erdê derdixe, ji ber wê ne xêr ne jî bereketa erdê weke berê nemaye. Ya din jî, niha av pirr kêm bûye ji ber wê jî bereketa erdê nemaye. Berê li van deran kanî hebûn, dora wê hemû dar û ber bû. Li kêleka avê tûzik û mendik çêdibû. Jinan diçûn ew komdikirin. Lê niha ew kanî hişk bûye, nemaye."*[85]

Wiha xuya dike ku bi bipêşketina bandora teknolojiyên modern û moderniteya kapîtalîst, çanda civaka xwezayî û xwedawendan hatiye cemidandin. Cihên ziyaretê yên wek Girê Xêlî li Koçeratê an jî Kevirê Bûkê li navçeya Reco ya Efrînê vê rastiyê ji me re nîşan didin. Li ser rêzekevirên ber Girê Xêlî, şêniyên Xaneserê dibejin: "*Ev mirov bûn ku govend gerandine û bûne kevir*."[86]

Li ser kevirên spî yên Recoyê jî şiroveyên cuda hene. Li gorî hinekan jineke ku li hemberî zewaca bi darê zorê serî rakiriye, gotiye, "*Bila ez bibim kevirek, lê nebim ya vî zilamî!"* Di cih de ew û hespê xwe bûne kevir. Çîrokeke din ya li ser Kevirê Bûkê dibêje, Fatma Nebî bihîstibû ku Hz. Alî wê hewiyê bîne ser û li ber vê yekê rabûbû. Dema Fatma nikare ji wî re bibe asteng, ew bêjingê dide destê xwe ji bo sawarê bêjing bike û ji malê derdikeve. Tê gotin, bavê Fatma Nebî wê dibîne û dipirse: *"Tu diçî kû derê?"* Ew jî bersiva wî dide: *"Min dît, bila dijminê min nebîne"* û dibe kevir.[87]

Bi vî rengî em dikarin bibêjin, kevirên Kurdistanê dibûn şahid û nîşanên serpêhatiyên jin, çîrok û dîroka civakê. Wekî çîrok û stranên kevnar, zanîn û hişmendiyên hezarên salan di formên keviran de jî xwe didin der. Lê belê xêz û şeklên wan yên hişk di heman demê de qala kul û êşên kûr dikin yên ku di encama hişmendiya desthilatdar de qewimîn. Li hêla din kevir dibin îfadeya berxwedan û serhildanê ku hebûna xwe di bin şertên şer û pevçûnan de parastine. Pêşîn jî, kevir wekî kereseyên avakirina malan bûbûn binyada civakbûnê. Heman raboriya dîrokî ku kevirî di nav xwe de dihewîne di adet û jiyana civakê de, di xêzên rûyên dapîran de, di çand û zanebûna dayikan de jî xwe dubare dike û hê zindî ye. Dibe ku bi meyzandineke seresere em nikarin vê bibînin. Nihêrînên serpilkî nahêlin ku em wateya hinek adet û bûyeran an jî gotin û kiryaran rast fêhmbikin. Lê heger em bi kûranî temaşe bikin, lêbikolin, bifikirin û pêbihesînin, em ê bibînin ku sirriyeta jiyan û siberojê di gelek ji wan daneyan de veşartî ye.

[84] Hevpeyvîn bi Xecê Hisên re, gundê Xanaserê, Dêrik, 2017

[85] Şevbihêrka dayikên Kobanê li Taxa Şehîd Xebat a Kobanê, 2017

[86] Hevpeyvîn bi Emîna re, hevseroka Komîna gundê Xanaserê yê Dêrikê, 2017

[87] Hevpeyvîn bi dayikên li navçeya Recoyê re, Efrîn, 2017

III. 1.3. Pêkhateyên Bakurê Sûriyê û Bingehê Neteweya Demokratîk

Rastiya Bakurê Sûriyê wekî mozaîka gel û baweriyan dikare were pênasekirin. Bi hezaran salan qewmên cuda li ser heman axê jiyane. Her qewm xwedî dîrok, ziman û çandeke taybet e. Lê di heman demê de dîrokeke hevbeş jî di ser wan re bihuriye û çandeke hevbeş a gelan hatiye avakirin. Bi êrîşên dewletên dagirker, siyasetên bişaftin û qirkirinê ve dîrok û çanda gelên xwecih wek Kurd, Aşûrî-Suryanî-Keldanî û Ermenî hatine înkarkirin. Gelek aliyên dîroka kevnar a qabîleyên Ereb jî di şiroveyên dîrokî yên netewe-dewletan de nehatine ronîkirin. Her wiha dîrok û serpêhatiyên gelên Tirkmen, Çeçen, Çerkes, Mitirb û Mehelmî yên ku beriya sedan salan koçî herêmên Bakurê Sûriyê kirine jî bi pirranî nedihatin dîtin.

Heman nêzîkatî ji bo dîroka ol û baweriyên cuda yên Mezopotamya jî lê ne. Ji ber van sedeman li gel zindîbûna rêûresm û adetên çanda dîrokî jî, zanebûna mirovan derheqê dîroka ol û gelê xwe de him jî derheqê dîroka pêkhateyên din de parçekirî ango tîke dimîne. Bi taybetî çavkaniyên nivîskî

û daneyên berçav li ser rista jinan di dîroka pêkhateyên Bakurê Sûriyê de heta niha pirr kêm hatin berhevkirin. Lewma di vê beşa pirtûkê de him agahiyên giştî yên derbare rastiya pêkhateyan, him jî li ser dîroka jinê di rastiya dîroka civaka xwe de tên parvekirin. Daneyên vê beşa bingehê xurt ê dîrokî yê neteweya demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriye destnîşan dikin ku di hevjiyana gelan de ava bûye.

1.3. a) Li dijî Yekîtiya Gelan Êrîşên Mêhtingeran

Ji 5500 salan ve, axa dewlemend û çanda dîrokî ya Rojhilata Navîn bûye hedefa êrîşên desthilatdar û mêhtingeran. Heta roja îro, erdnîgariya Bakurê Sûriyê gelek caran bûye navenda şerên emperyal: Şerên serweriyê yên Sûmer (3000 – 2000 BZ), Akad (2000 - 1600 BZ), Asûr (1300 - 612 BZ) û Pers (550 - 330 BZ), seferên arteşa Skenderê Makedonî (331 BZ) û dagirkeriya împaratoriyên Helen (301 BZ - 64 BZ), Roma (64 BZ - 395 PZ), Sasanî (253 - 298) û Bîzans (395 - 632); seferên artêşên Îslamî yên Xelîfeyên Emewî (632 – 750) û Ebasiyan (750 – 1258), Ewropiyên Xaçperest (1147 – 1149) û Moxolan (1260); dagirkeriyên Osmaniyan (1517 - 1918) û serweriya Fransa (1918 – 1946) heta Şêrê Cîhanê yê Sêyemîn û dagirkeriyên nûjen ku îro li Sûriye didomin. Bi kuştin, hilweşandin, destdirêjî û talanan her hêza desthilatdar dixwest pergal û feraseta xwe; ziman, çand û baweriya xwe li ser gelên herêmê ferz bike.

Hêzên dagirker ji bo bikarin berxwedan û lêgerînên azadiyê yên gelan bişkînin her tim komkujî, qirkirinên çandî, siyasetên guhertina demografya, koçberî û parçekirina gelan bipêşxistine. Ji bo vê jî, bi taybet ol, mezheb û nijadperestî wek amûrên desthilatdariyê, teslîmgirtina gelan û qirkirina jinan bi kar anîne.

Her desthilatdarî, ew qewm û eşîrên ku wî nikarîbû wan tine bikirana li gorî berjewendiyên xwe dixwest bi kar bîne. Ji bo hêza berxwedanê û yekîtiya eşîran bişikîne, her dewleta dagirker çend kesên eşîran didan pêş û peywirdar dikirin. Bi vê armancê desthilatdarên Fars *axatî* bi pêş xistine. Osmaniyan *begtî*, teriqetên olî wek Neqşebendiyan *şêxtî* û hêzên împeryal yên Fransî û Inglîzan *muxtarî* wekî avahiyên nokeriyê saz kirine. Bi vî rengî desthilatdariya dewletê ket nava demarên civakê. Li şûna wijdan, exlaq û çareseriyê, tebeqên hiyerarşîk li ser esasên berjewendî û serdestiyê hatine bicihkirin. Her wiha rejîma Beesê jî dixwest civaka Kurd bi rêya serokên eşîran û *sîxurtiyê* bixe bin bandora xwe. Lê di pirraniya eşîr, bavik û malbatên Kurd de rêûresm û adeta berxwedanê û dilsoziya wan bi nirxên exlaqî û çanda neteweyî ji xeta xiyanetê her tim xurttir bû. Heman rewşê careke din di şerê dagirkeriyê û qirkirina çandî de xwe dida pêş ya ku dewleta Tirk sala 2018'an li ser herêma Efrînê da meşandin.

Jin û pêkhateyên herêmê her tim hêz û vîna xwe ya berxwedanê, ji bîr û baweriyên xwe, çandên xwe yên qedîm û nirxên exlaqî yên hevbeş wergirtine. Her çiqas di nav her pêkhateyê de komên bijarte derketibin û nokertiya serdestan kiribin jî di her serdemê de gelan hevdu li hemberî êrîş û komkujiyan parastine. Nexasim jinên tevahiya pêkhateyan bi empatî, wijdan û civakbûna xwe ve, di her serdemê de li bindestan û parastina hevpariya gelan xwedî derketine û di vê mijarê de bi risteke sereke rabûne.

Li ser vî esasî, pêkhate, niştecih, netewe û baweriyên cuda bi sedan, heta bi hezaran salan li ser xaka Kurdistanê û Bakurê Sûriye bi hev re jiyane. Her wiha îro beşeke mezin gelên Mesîhî û Kurd li herêmên Rojava dijîn ku dapîrên wan ji ber zext û qirkirinên dewleta Osmanî û Komara Tirkiyê koçber bûne. Pêkhateyên din li Bakurê Sûriyê hene ku li gorî armancên siyasî, aborî û leşkerî yên desthilatdaran di serdemên cuda de li vir hatine bicihkirin. Lê belê pêkhateyên Bakurê Sûriyê bi

pirranî jiyana xwe ya civakî û aborî li cem hev û di nava hevdu de saz kirine. Cih bi cih, dem bi dem pevçûn û şer qewimîbin jî, bi gelemperî şivan û bêrîvanên Kurd, Ereb, Aşûrî, Keldanî û Suryanî di heman herêman de koçertî kirine, bi sewalkarî û cotkariyê hev hewandin û jiyana xwe bi rêzdarî domandine. Ji dehan salan ve li çendek herêman têkiliyên zewac û malbatî jî bi pêş ketine di nav mirovên ji pêkhateyên cuda bi heman baweriyan de. Bi vî awayî çandên jiyanê û zimanan tesîr li hev kirine.

Li gorî serhejmara ku dewleta Sûriyê di sala 2011'an de li tevahiya Sûriyê da çêkirin, hejmara kesên ku heta şer û aloziyan li Sûriyê û Rojava rûdayî, li Sûriyê diman, bi giştî 21 milyon û 124 hezar bû. Derbarê hejmara neteweyên cuda yên li Sûriyê û Rojava de xebateke fermî nehatiye meşandin. Lê li gorî çavkaniyên alternatîf ku navend û zanistên Kurd, Suryanî, Ereb û hwd. amade kirine ji nifûsa giştî ya Sûriyê di sala 2011'an de % 64 Ereb, % 15 Kurd, derdora % 8-10 Suryanî-Aşûrî-Keldanî, % 4 Ermenî, % 3 Tirkmen, % 3 Durzî û % 1 Çerkes bûn.

1.3. b) Pêkhateyên Bakurê Sûriyê:

- **Gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê**

Daneyên dîrokî destnîşan dikin ku dayik û dapîrên Kurdan wek Hûrî û Mîtanî ji serdema neolîtîk û pê ve li ser vê axê dijîn. Di bin şert û mercên desthilatdariyên cuda yên dewletên hegemon de Kurdan çanda xwe bi rêûresm û nerîtên civaka xwezayî di astên xwecihî de domandiye. Gelek nirxên çandî û exleqî xwe dispêrîn felsefeya xêrxwaziyê, peristina xweza, agir û ronahiyê. Ev bi taybet ji bo Kurdên xizan, kesên koçer û gundî yên têkiliya xwe bi eşîrê re qut bûye lê ye ku ji wan re *Kurmanc* tê gotin. Ji derveyî pergala eşîr û dewletê, wan *"weke malbatên piçûk li bajar û gundan, zêdetir jî bi nîv-koçeriyê, bi cotkarî û rêncbertiyê debara xwe kirine û bi vî awayî bi berxwedanê xwestine hebûna xwe dewam bikin."*[88]

Eşîrên Kurd li herêmên Rojava û Sûriyê

Çend eşîrên Kurdan hewl dida ku xwe ji desthilatdariya navendî veqetînin û ber bi dewletbûne ve biçin. Lê weke di dîroka xanedana Merwaniyan (990-1090) de vê yekê zêde encam negirtiye. Lewma gav bi gav gelek serokên eşîrên Kurdan ola Îslamê qebûl kirine û bi Xelîfeyên Emewî, Ebbasî, Selçûqî yan jî Osmaniyan re hevkarî bi pêş xistine da ku karibûna serweriya xwe li herêmên Kurdistanê misoger bikin. Çend arîstokratên Kurd û kesayetên wek Selahedîn Eyûbî jî li ser navê Îslamê bûbûn fermandar û hukimdarên desthilatdariya navendî ya Şamê.

Di sedsala 17'an de bi binketinên Împaratoriya Osmanî re di seferên Ewropî de wan hewl dida ku serdestiya xwe li Rojhilata Navîn û serweriya xwe li ser eşîrên koçer yên Kurd, Ereb û Tirkmen misoger bikin. Lewma Osmaniyan ji bo bicihkirin û jicihkirina wan eşîran 'qanûnên îskanê' derxistine, siyasetên tund û yên nerm li ser eşîran dane meşandin. Lê eşîran bi pirranî vîn û pergala xwe ya xweser a hundirê xwe parastiye. Hinek eşîran deverên xwe yên şên û gundên xwe ava kiribin jî, şêwaza jiyanê yê koçertiyê serwer bû heta ku di sedsala 20'an de rêyên koçertiyê di

[88] Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Civaka Demokratîk – Pirtûka Çaremîn*; Beşa 4-B 'Berxwedanên Qebîle, Eşîr û Qewman (Etnîsîteyan), 2011

navbera çiyayên 'ser xetê' û deştên 'bin xetê' de bi mayîn û têlên resandî ji hevdu hatine veqetandin. Ji vê û pê ve têkiliyên eşîrî û malbatî daimî ji sînoran bihurîne. Bi vî rengî eşîrên deşt û çiyayên Bagokê û Botanê wekî Kîkan, Hevêrkî, Sipêrtî, Botî, Mîranî, Batuwî, Deqorî, Gabarî, Teyî, Didêrî, Dekşûrî, Omerî, Zaxuranî, Şêxî, Demanî, û hwd. li herêma Cizîrê pergala xwe ya civakî û hilberînê saz kirine.

Li herêma Kobanê konfederasyonên mezin yên eşîran wekî *Berazî* û *Milan* serwer bûne û heta îroj bi bandor in. Tê payîn ku Konfederasyona *Beraziyan* derdora sala 1730'î li herêma deşta Pirsûsê bi beşdarbûna malbatên koçber ên eşîra ***Berazî*** ji Serhedê hatibû damezrandin. Pergala konfederasyonê ji deşta Pirsûsê heta Dîlok, Mereş, herêmên din ên Kurdistanê belav dibû bajarên Sûriyê yên wek Heleb û Hema heta Libnanê. Pirraniya eşîran Kurmanc bûne, bi zaravayê Kurmancî axivîne û ola Îslamê qebûl kirine wek eşîrên *Eladînan, Kêtikan, Meafan, Mîran, Oxiyan, Pîjan, Şedadî, Şêxan* an jî *Zerwan*. Lê dîsa eşîr di çanda xwe de heta roja îro hinek aliyan de çanda Zerdeştî û Êzdatiyê parastine. Her wiha eşîrên bi eslên cûr bi cûr wekî eşîra Êzdî *Dinan* (*Dinaî),* wek *Qeregêçan* ku xwe disperin Tirkmenan an wek eşîrên Elewî yên Mereşê jî tevlî Konfederasyona Beraziyan bûn.

Her wiha konfederasyona eşîrên ***Milan*** heye ku ji deşta Haranê û herêma Firatê heta Çiyayên Şengalê di gelek cihên Kurdistanê de bi bandor bûye. Konfederasyona Milan jî mozaîka bawerî û gelan dihewîne. Mînak koka eşîra *Berguhan (Baggaran)* Ereb e; eşîra *Tirkan* Tirkmen in; eşîra *Şerqî* Kurdên Êzdî ne. Eşîr û bavikên din ku di avakirina konfederasyona Milanê de cih girtine, ev in: *Eliya, Beskî, Bucax, Çekalî, Çemikan, Çiya Reş, Danan, Deşî, Dirêjan, Hecî Beyram, Xoşiyan, Îsê Adet, Îzolî, Canbegî, Kelandilan, Kassiyanî, Kewat, Keliş, Xelkan (Xellacan), Kum Reş, Mendan, Merd, Matmiya, Manli, Meşkan, Nasriyan, Porxa, Sanan, Şiwan Zeydan, Zirafkan, Heçkan* û *Xidrekan.*

Heta sedsala 19'an beg, şêx û mîrên Kurdan yên ku mezheba Sunî ya Îslamê pejirandîbûn, karibûn di bin hegemonya Osmaniyan de begtiyên xwe wek parçeyên Wîlayeta Diyarbekir (Amed) bi rê ve bibin. Bi teşwîqa sultanên Osmanî, sazîbûna beg û mîran wek çîneke arîstokrat a eşîran bi pêş ketiye. Osmaniyan bi alîkariya wan bac û leşker ji herêmên Kurdistanê girtine. Çend mîr û begên Kurdan li kêleka arteşa Osmanî şer kirine û heta hinekan di komkujiyên lîwayên Hemîdiye de li dijî Kurdên Êzdî û gelên Xirîstiyan de cih girtiye.

Zordarî û Berxwedan

Lê belê bi lêgerînên serxwebûnê û bipêşketina serhildanên eşîrên Kurd di sedsalên 19 û 20'an de artêşên Osmanî û Tirkan zext û qirkirinên li ser gelê Kurd bi giştî dane meşandin. Xelkê deşta Merdînê dibêjin, leşkerên dewletê gelek bîrên avê yên herêmê vegerandin gorên komî. Ji bo civak bê pêşeng bimîne, serokên eşîrên berxwedêr yan hatin mişextkirin yan hatin bidarvekirin. Jinên Kurd di nava van serhildanan de jî cih girtine û di her astê de têkoşiyane. Navên jinên Kurd ku pêşengiya raperînan kirine ji gelek herêman tên ragihandin û wan bandora xwe li ser tevahiya civakê kiriye: Ji lehengiya jinên weke Zadîne Xanim di berxwedana Kela Dimdimê ya sedsala 17'an de heta pêşengên serhildana Dêrsimê, Besê û Zarîfê di sala 1937'an de. Arteşên Osmanî û Tirk ku êrîşên hovane yên qirkirinê anîn ser jinên Kurd, li her cihî rastî berxwedanê hatine.

Piştî Peymana Lozanê (1923)[89] û tepisandina raperîna Şêx Seîd (1925) pêleke koçberiya Kurdan ber bi Rojava ve rûdaye. Pêşengên berxwedanan ên weke Nûrî Dêrsimî, Osman Sebrî an jî endamên malbata Bedirxan jî bi vî rengî yan derbasî Rojavayê Kurdistanê bûne yan jî çûne bajarên Sûriyê û Libnanê. Rêwşênbîr û begên Kurd li Libnanê û Rojavayê Kurdistanê rêxistina '*Xoybûn*'ê ava kirine.[90] Di nava salên 1920 û 40'î de li Rojavayê Kurdistanê di warê çand, huner, ziman û wêjeya Kurdî de xebatên girîng hatine meşandin. Rewşenbîr û hunermendên wek Cegerxwîn; Baqiyê Xido; Mihemed Şêxo; Rewşen, Celadet û Kamûran Bedirxan û hwd. pêşengiya hewildanên ronakbûnê kirine. Ew hemû di warê parastina çand û ziman de di nava Kurdên Rojava de xwedî risteke girîng bûne. Lê ji bilî Rewşen Bedirxan nav û kesayetên jinên ronakbîr ên vê pevajoyê pirr kêm tên zanîn.

Zubeyda Melê Elî ji gundê Topizê ya Amûdê bîranînên xwe li ser xalê xwe **Cegerxwîn** tîne bîra xwe: "*Bavê min mamosteyek hêja bû. Ji ber vê xelkê digot 'Melê Elî'. Bavê min û Cegerxwîn gelek li ser doza Kurmancan, li ser hukûmet û wan tiştan nîqaş kirine ji bo zilma hukûmetê û ya axan li ser gel rabin. Axa gelek tedê li felahan kirine. Cegerxwîn mirovekî girs, çav reş û gelekî spehî bû. Ew gelek zane bû. Xelk û alem hişyar dikir. Wî digot: **'Destê şêx maçî mekin!'** Ji beg, axa û hukûmetê neditirsiya. Li hemberî wan radibû tîliya xwe rakir, tilîlî dikir û digot: 'Bila gel ji wan bênamûsan netirse!' Lê wî gelek tade jî dît. Ji ber vê Cegerxwîn lêxist û çû cem melê Mustafa Barzanî. Lê ji ber ku ew îştrakî [komunîst] bû tol girtine. Barzanî wî ceza kir, du sal li hapis girt û got: 'Here cihê xwe.' Piştî ku hat berdan Cegerxwîn hat Qamişlo. Pismamekî wî li wir hebû. Ew tenê li malekê dima. Îcar xortên Kurd rabûn û her yek ji xwe tiştek jê re bir. Cegerxwîn mamosteyê xortên Kurdan bû. Ew derdora maseyekê kom dibûn dixwendin, helbest dinivîsandin û li ser siyasetê nîqaş dikirin. Cegerxwîn di hemû helbestên xwe de, navê xwe tê de gotiye ji bo xelk helbestên wî nedizin."*[91]

Bi rêya helbest û çîrokan Cegerxwîn rexne û ramanên xwe yên şareza bi zimanekî zelal û rengîn ragihandin civakê. Gotinên wî dibûn wek guhar. Tevî ku bêhtirî 50 salan di ser dîtina Cegerxwîn re derbas bûne, helbest û gotinên wî hîna di bîra Zubeyda de ne. Zubeyda balê dikişîne ser wê yekê ku gotinên Cegerxwîn, bi taybetî ji bo rastfêhmkirina roja îro lazim in û helbesta ***Fala Qereçiyê*** bi rengekî nûjen wiha dibêje:

Rokî yeke qereçî
ew pêxwas û zikbirçî
pêxwas û zikbirçî
di destkê darkî çinar
lê ye kîraskê zîwar
keça wê li milê wê
serjêr bûn hingilê wê

[89] Li gorî peymana Sèvresê (1920) bajarên Mêrdîn, Urfa, Nisêbîn û Cizîra Botan ser bi deverê Sûriyê bûn. Lê piştî bervêdana neteweperestên Tirk, salekê paşê Fransa û Tirkiyê di Peymana Enqerê de herêmên mezin ên wekî Mêrdîn, Urfa, Cizîra Botan û Dîlokê radestî Tirkiyê kirin. Di bazirganiyê li ser misogerkirina xeta sînorê eşîrên Kurd ji bo parastina berjêwendiyên xwe him bi Tirkiyê him jî bi Fransayê re ketin nav peyvendiyan. Sînor dawî di sala 1929'an de hat destnîşankirin.

[90] Rêxistina Xoybûnê di sala 1927'an de li Libnanê hatiye damezrandin û ji wir rêxistinbûna xwe li Rojavayê Kurdistanê belav kir.

[91] Hevpeyvîn bi Zubeyda Mele Elî re, gundê Topizê, Amûdê, 2017

Ew ê hatî nava gund
zarok lê kombûn weke kund
Ew ê hatî mala me
wê rahişte polê xwe
polê kevin û pirr xweşik
tê de hebûn sê qulik
min tilya xwe danî ser
pîrê xwarin çend keser
pîra weke melkemot
rahişt pol û paşê got:
Ey Seydayê Cegerxwîn
fala te weke dûrbîn
ev ne barê yek û do
dev jê berde bes e lo
Ev barekî pirr giran
te da ser xwe bê guman
ji bo xatirê me Kurdan
Alem Kurd û Tirk, Qefqaz
hemû mane belengaz
yê ku kuştin, yê ku man
ketine xaniya bê guman
Wan jî wekî me Kurdan
destê xwe dan berxwedan
Ew jî wekî me Kurdan
destê xwe dan berxwedan
Ayê, Seydayê Cegerxwîn
tu me daye dil û dîn.[92]

Lêgerînên Jina Kurd

Rewşen Bedirxan li Şamê xwendibû. Bi xebatên xwe yên wêje, zanyarî, siyaset û rewşenbiriyê ew bû xwedî ciheke girîng di dîroka Kurdistanê û jina Kurd de. Rewşen Bedirxan sala 1934'an bûye endama Komeleya Yekîtiya Jinan a li Sûriyê û wekî nûnera vê rêxistinê deh salan paşê beşdarî Kongreya Jinên Cîhanê li Misrê bû. Dûvre ew bûye yek ji 6 delegeyên Kurd ku di sala 1957'an de tevlî Kongreya li dijî Mêhtingeriyê li Yewnenîstanê bûn. Her wiha Rewşen Bedirxan gotarên kovara Hawarê nivîsandine û demekê edîtoriya kovarê kiriye. Di nivîsa xwe ya bi navê 'Kebanî û Mamoste' de ew rastiya jin û zilam bi vî rengî dinirxîne: *"Mêrên ku bexta netewan di destên xwe de dibin, li ber destên jinan xwedî dibin."* Bi vî rengî wê girîngî û bandora jinê, wekî mamosteya civakê nirxand. Sala 1956'an, Rewşen Bedirxan tevî Dr. Nûrî Dêrsimî, Hesen Hişyar, Heyder Heyder û Osman Sebrî Komela Zanyarên Kurd li Helebê ava kiriye. Piştre jî wê pêşengiya avakirina Yekîtiya Jinên Kurd li Başûrê Kurdistanê kiriye.[93]

[92] Hevpeyvîn bi Zubeyda Mele Elî re, gundê Topizê, Amûdê, 2017

[93] N. Gultekin: *Rewşen Bedirxan (1909-1992),* PolitikART, 2011

Di sedsala 20'an de gelek jinên eşîrên Kurd hebûn ku di civakê de bi nav û deng bûne. Di nav van de jin hebûn ku di şerên eşîran de şer kirine û warê xwe parastine. Her wiha jin hebûn ku ji bo lihevhatinan bûn xwedî gotin û biryar. Navên jinên jîr li Rojavayê Kurdistanê hebûn ku wekî Fesla Sadûn Axayê Gergerî heya niha di nav elên Ereb û Kurdan de bi rêzdarî tên bibîranîn. Ew xwedî kesayetiyeke bi hêz û bandor bûn wekî Xensa Xelecî ji eşîra Milan, Sara Xingê ji eşîra Mîrsinan, Bêgiya Haciya ji eşîra Mîran û Sultana Serhên.

Sultana Serhên di zaroktî û ciwantiya xwe de wekî 'Mîrê Zirav' hatiye nasîn, bi cil û bergên zilamên Çiyayê Bagokê û tiving bi milê xwe ve digeriya. Tê gotin ku piştî kuştina hevjînê wê Abdulkerîmê Eliyê Remo, Sultan jinebî mabû û hatiye cem xwuşka xwe ya li aliyê Tirbespiyê. Vêca piştî demekê, malbatê Sultan daye merekî Ereb. Lê wan li hev nekiriye û hev berdane. Ev wekî bûyereke gelekî eyb û şerm ji bo malbat û eşîra Sultanê hatibû dîtin. Tê gotin, di vê rewşa tengav de Sultanê hingê Şemsa Mihemed Axayê Deqorî nas kiriye. Herdu jinan dît ku derd û kulên wan yek bûn û bûn hevrêyên hev. Şemsa Xatûn di sala 1937'an de piştî ku serhildana bi pêşengiya Seîd Axayê Deqorî li dijî Fransiyan li bajarê Amûdê têk çûbû, mecbûr mabû ku tevî hevjînê xwe Seîd Axa koçî Çiyayên Şengalê bike. Tê gotin, li wir Şemsa Xatûn û Seid Axa li hev ketin û ji hev vediqetiyan.
Paşê Şemsa bi rêka Êzdiyên Şengalê vegeriya Rojava û ew tê gundê Xizna yê nêzîkî Tirbespiyê. Li wêdere hevaltiya Şemsa Xatûn û Sultana Serhên dest pê kiriye. Wan dixwest xwe ji gotegotên civakê xilas bikin û bi hev re jiyanekê din ava bikin. Bi vî awayî wan biryar daye û siwarê trêna Hicazê[94] bûne, pê çûne heta bajarê Mekkê. Li wir Sultan bûye mamoste û dersên Quranê dane zarokên Ereb. Herdu jin nêzîkî 30 sal li Mekkê jiyane heta ku çûn ber dilovaniya Xwedê.[95]

Serpêhatiyên Rewşen Bedirxan, Şemsa Xatûn û Sultana Serhên destnîşan dikin ku jinên Rojava hebûn ku di sedsala bihûrî de bi lêgerînên xwe yên li zanînê û jiyana azad ji sînorên ferasetên zayendperestiya civakî bihurîne. Çend ji wan di rêwîtiyên xwe de û di bin şertên mişextiyê de li gelek herêmên Rojhilata Navîn geriyane. Di kesayeta wan de civakên welatên din jî jinên Kurd û çanda Kurdan nas kirine.

Jiyana jinan bi pirranî di nav civaka zayendperest de bi êş û zehmetî derbas dibû. Ebdulferîd Mele Îbrahîm ku sala 1932'an li gundê Elgiêd ê ser bi navçeya Amûdê ji dayik bûye û piştre li Hesekê jiyaye qala zexmetiyên jiyana jinên Kurd dike: "*Jin di vê civakê de ne gelekî bi xêr bû. Bê rûmet dijiya. Jinê ava malê dianî, paleyî dikir, pez didot, ardû dida hev. Jiyana jinê bi vî rengî bû. Tijî koletî bû. Dema li hesabê zilam nehatiba jî wî dikarîbû serê jinê jî bişkîne. Ji ber dema malbatê jin dida mêr, bavê wê jê re digot: Mala mêrê te, tirba te ye!"*[96]

Hevjiyana Gelan û Nêzikatiyên Dewletên Mêhtinger

Dîroka hevjiyana gelan li herêma Hesekê Ebdulferîd Mele Îbrahîm bi vî rengî dinirxîne: "*Di dema serweriya Fransa de li bajarê Hesekê çend malên Mesîhî bi cih bûn. Her wiha taxeke Kurdên Bêrtî jî hebû. Paşê Erebên ji Dêrazorê lê bi cih bûn. Wekî din derdora Hesekê eşîrên Kurdan wekî Deqorî û Milan hebûn. Eşîrên Ereb wekî Cebûrî, Begara û El Giêdat hebûn. Têkiliyên di nav pêkhateyan de li ser bingeheke eşîrtî bûn. Tevî lîstikên Fransa jî jiyana wan bi hev re baş*

[94] Xeta trênê di navbera Şam – Medîne - Mekke de ku padîşahê Osmanî Ebdulhemîd di salên 1900-1908'an de dabû çêkirin

[95] Konê Reş: *Beriya Mêrdînê Û Rola Jinê Di Civaka Kurdî De*, 2012, www.pen-kurd.org

[96] Hevpeyvîn bi Ebdulferîd Mele Îbrahîm re, Heseke, 2017

dimeşiya. Jiyana gelêrî di nav civakê de xweş derbas dibû. Ger carna du eşîrên Kurd û Ereb ji hev bixeyidiyan jî dirêj nedikir; nedibû kîneke mezin; dijminatiyek kûr çênedibû. Di sala 1943'an de tê bîra min, di nav Cebûrî û eşîreke Kurd de şer çêbû. Yek ji hev kuştin jî, lê li hev dihatin û silh [aşitî] dibû, bi riya rûspiyên û eqilmendên wan çêdibû."[97]

Di dema tehekûma Fransiyan de ji sala 1919'an ve beşeke Kurdên li Sûriyê hewl dida ku têkiliyên dostanî bi rayedarên dewleta Fransa ava bikin. Kurdên li Efrînê, hinek kes li Şamê û çend eşîrên li herêmên Cizîrê û Cerablusê bi guman nêzî neteweperestiya Ereban dibûn. Ji ber vê hinan ji wan hêvî dikir ku Fransa piştgirî bide mafên neteweyî yên Kurdan. Lewma beşeke eşîr û begên Kurd dixwestin peywendiyên xwe bi Fransiyan re ji bo berjewendiyên xwe bi pêş ve bibin. Di heman demê de hişmendiya dagirkeran li hinek herêman bandora xwe li ser civaka Kurd çêkiriye. Ji bo nimûne di serdema dagirkeriya Fransayê de pergala eşîrtiyê li Efrînê ji holê rabû.

Beşeke din ya eşîrên mezin ên Kurdan ji desthilatdarên Fransî dûr sekînine an jî li hemberî dagirkeriya Tirkan û Fransiyan bi heman rengî rabûn. Mînak, eşîrên Dorika û Aşîta sala 1923'an li dijî mêhtingeriya Fransî li gundê Beyandûrê aliyê Tirbespiyê rabûn serhildanê. Şerên giran qewimîn û serokê eşîrên Kurdan Abbas Mihemmed Abbas ji aliyê mêhtingerên Fransî ve hat îdamkirin. Lê di dawiyê de berxwedana eşîrên Kurdan bi ser ket û arteşa Fransayê ji herêma Cizîrê vekişiya. Tê texmînkirin ku herêma Cizîrê ji sala 1923'yan heta 1930'î ji mêhtingeriyê rizgar bû. Gundê Dugirê ku ji aliyê eşîra Dorika ve li derdora sala 1650'î hatibû avakirin, wekî 'paytexta herêmê' hatibû hesibandin. Gelek Kurdên Bakur ku ji ber zextên dewleta Tirk hatin binya xetê, xwe sipartin gundê Dugirê.[98]

Eşîrên Kurd yên ku têkiliyên wan yên dîrokî bi eşîrên neteweyên cuda li ser axa Bakurê Sûriyê hebûne jî bi tifaqên li dijî mêhtingeriyan radibûn. Elî Axa Zilfo, helbestvan Qadrî Can û gelek şêniyên taxa Kurdan Hayy el-Ekrad ya Şamê tevlî berxwedana gelan li dijî mêhtingeriya Fransayê bûne. Mêhtingerên Fransî sala 1926'an 13 berxwedêrên Kurd ji taxa Hayy el-Ekrad ji ber rista wan a di 'Raperîna Mezin a Sûriyê' de dadgehkirin û bi dar vekirin. Pirraniya wan endamên eşîrên mezin bûn yên weke Berazî, Milî û Rişwan.[99]

Di navbera salên 1936 û 1939'an de li Cizîrê hewldaneke Kurd û Mesîhiyan bi armanca gihandina statuyeke xweser ji bo Cizîrê çêbû. Haco Axa, Metranê Dêra Suryanî-Katolîk Hanna Hebbê û şaredarê Qamişloyê Michel Dome serkêşiya vê hewldanê kirine. Lê belê di encama greveke giştî de ku sala 1936'an ji bo serxwebûna Sûriyê hatibû kirin, hevpeymanên nû yên Fransa û Sûriyê bi pêş ketin. Ji vê û pê ve neteweperestên Ereb bi piştgiriya hêzên taybet ên Fransî li dijî tevgera xweseriyê êrîş li dar xistin. Di heman demê de di bin navê 'Yekîtiya Îslamî' de neteweperestên Sûrî di nav Kurdên Cizîrê de kampanyayek meşandin da ku lihevhatina Kurd û Mesîhiyan ji holê rakin. Bi vî awayî di Tebaxa 1937'an de çend eşîrên Kurd jî beşdarî êrîşên komkujiyê li dijî taxa Mesîhiyan li Amûdê bûn ku di dawiyê de arteşa Fransî kiribû hênceta bombebaran kirin û şewitandina bajêr. Ev bûyer bûn sedema dubendiyan di têkiliyên Kurd û Mesîhiyan de.

97 Hevpeyvîn bi Ebdulferîd Mele Îbrahîm re, Heseke, 2017

98 Malpera Eşira Dorika: *Dugir paytaxta eşira Dorika ya pirr binavûdeng û gevina li Rojava yê Kurdistanê,* https://doreka.jimdo.com/gunde-dugire/

99 Winter Stefan: *The Other Nahdah: The Bedirxans, the Millis, and the Tribal Roots of Kurdish Nationalism in Syria.* Oriente Moderno 86 (*2006*)

Gelek caran eşîrên Kurdan bi gelê Ereb re ji bo rizgariya Sûriyê tekoşiyane. Lê ruxmê vê berxwedan û dilsoziya hevbeş jî piştî ku Komara Sûriyê sala 1946'an hat damezrandin, Kurd bêmaf û bê nasname hatine hiştin. Bi taybetî bi damezrandina Komara Yekbûyî ya Ereb ya Sûriye û Misrê, ji sala 1958'an û pê ve, û piştî wê li bin desthilatdariya Partiya Beesê, nijadperestiya dewleta Ereb li Kurdan dihat kirin. Vê yekê bandoreke neyînî li têkiliyên civakî yên di navbera gelan de dikir. Nexasim bi projeya 'El-Hizam el-Erebî' (Kembera Ereban) ya ku dewleta Sûriyê ji sala 1965'an ve bi pêş xist, parçekirina têkiliyên civakî, yên di navbera gelan de û yên di navbera Kurdan bi xwe de kir armanc. Dema dewletê erdên Kurdan yên li herêma Cizîrê desteser kirin, pirraniya Kurdan bêpar man. Tenê hinek axayên eşîrên mezin karîbû beşekê ji erdên xwe bi rêya 'wasta' û bertîlê biparêzin. Lê derfeteke wiha ji bo malbatên Kurd ên xizan tinebû. Bi vî rengî parçebûna çînî jî hatibû kûr kirin.

Ji bilî herêma Cizîrê li ser herêma Şehbayê jî polîtîkaya Kembera Ereban hat meşandin. Koka navê herêmê bi zimanê Kurdî 'Şahê Ba' ye û di salên 2400 BZ'yê de hatiye lêkirin. Avhewaya herêmê jî nerm û berhemdar e. Şehba ji bajarên Cerablus, Minbic, Bab, Ezaz û zêdetîrî hezar gundan pêk tê. Di warê cografya û bazirganiyê de Şehba cihekî stratejîk e. Pirraniya gundên li herêmê gundên kevnar ên Kurdan e. Lê belê di encama polîtîkayên asîmîlasyonê yên dewleta Sûriyê û Tirkiyê de gelek ji Kurdên Şehbayê zimanê xwe ji bîr kirine. Li hinek gundên li ser sînor, zimanê Tirkî serwer bûye, li cihên din jî ziman û çanda Erebî. Hikûmeta Beesê di navbera gundên Kurdan de gundên nû dan çêkirin û di wan de Ereb bicihkirin. Bi vî awayî Kurdên Şehbayê ji dawiya salên 1960'î ve ji hevdu, ji nasname û çanda xwe hatine qutkirin.

Li hinek cihan, civaka Kurd li ser esasê çanda xwe ya komînal û berxwedêr li dijî vê neheqiyê rabûye. Mînakek wiha li gundê Kelhê yê Koçerata qewimiye: *"Dayik û bavê min digotin li kûderê erdê paqij û mezin heba, dewletê dest didanî ser. Di şûna vê hinek erd nêzî çiyayê Kizwana didan wan, li cihê herî dûrî wan. Kesî ti qezenc jî ji wî erdî nedigirt. Tê bîra min, ez 13 salî bûm. Ez bawer im, sala 1976'an bû, di gundê Kelhê de gel li hemberî dewletê rabû. Serê şofêrê trektora şkandin û nehiştin erdê wan ji wan bistînin. Jin hemû li wir man û gotin: 'Em ê wan bikujin yê bi ser axa me de werê.' Ew erd beyar ma. Gel piştre ji bo dewlet ji wan nestîne tê de mal ava kirin. Ne ew gund bûya, ti kesî nekarî li himber dewletê rabe. Erd ji gelek miletî standin û eger ev şoreş nerabûba hê jî wê erd standiban."*[100]

Ji ber berxwedana eşîr û gundan dewleta Sûriyê li Kobanê nikaribû heman polîtîkayên Kembera Ereban bi cih bîne. Li şûna vê, dewletê zextên cuda li gelê Kobanê kirin: *"Di sala 1995'an de şêniyên 6 gundên me ku mirovê hev in aliyê gundê Girde girêdayî Kobanê li hemberî rejîma Beesê û nokertiya axa bi dewletê re rabûn. Hinek ji wan hatin kuştin. Piştî vê jin, zarok, zilam, her kes ket zindanê. Gundên me hatin vala kirin, koçber bûn. Li şûna wan leşkerên dewletê ketin tê de. Di vî berxwedanê de jinan nobet digirt û di her aliyê de ber xwe didan. Yên ku bi dehsalan di zindanê de mane an jî li zindanê hatin kuştin jî hebûn."*[101]

Di warê siyasî de Kurd heta destpêka salên 1980'yî li çarenûsa xwe ligel sê hêzên cuda yên îdeolojîk geriyane: yan ligel neteweperestên Ereb, yan di nav komunîstan de, yan jî di partiyên neteweperestiya Kurd de. Di sala 1957'an de damezrandina PDK Sûriyê weke partiya yekem a Kurdên li Sûriyê deng vedabû. Lê piştî ku hewldanên Dewleta Yekbûyî ya Ereb bi ser neketin,

[100] Hevpeyvîn bi Diya Ciwan re, hevjîna Şehîd Elî, Dêrik, 2017
[101] Perwîn ji Kobanê, nîqaşa bi endamên rêveberiya Kongra Star a Rojava re, Qamişlo, 2020

dewleta Sûriyê sala 1959'an êrîşên li dijî PDK'ê dest pê kirin. Nêzî 150 endamên partiyê hatin girtin. Bi armanca şikandina îradeya siyasî ya Kurdan êşkenceyên hovane li girtiyên siyasî kirin. Di heman demê de nakokiyên di navbera rayedarên partiyê de jî rûdan. Pirsgirêk û parçebûna partiyên siyasî yên Başûrê Kurdistanê rasterast bandora xwe li ser hêzên siyasî û civakî yên Rojavayê Kurdistanê jî dikir. Tevî nêzîkatiyên teng ên eşîrî û malbatî bi dehan partiyên piçûk dihatin avakirin. Partî hemû ji girsiyên civakê qut bûn, wan nikaribû vîna siyasî ya hevbeş ya Kurdên Rojavayê ava bikin. Piştî şikestina têkoşîna Mela Mistefa Barzanî li Başûrê Kurdistanê di sala 1975'an de hêviyên gelek Kurdên li Rojava jî şikestin. Wiha ew ji siyasetê vekişiyan.

Bi hatina *'hevalên APOcî'* ya Rojava re di destpêka salên 1980'yî de hêviya serxwebûna Kurdan ji nû ve geş bûye. Bi Şoreşa Rojava re yekîtî û hevgirtin di civakê de bi pêş ketiye. Lê cih cih bi taybetî li kantona Cizîrê hîna kevneşopiya hizbgirî didome. Wekî dayikeke ji Dêrikê gotî: *"Di nava gelek malbatan de sê partî hene"*. Herçiqasî jî pirraniya gelê Kurd yekîtiya neteweyî wekî armanca sereke dibîne û li hemberî êrîşên ji derve gelek car ruh û helwesta hevbeş bi pêş xistibe jî ferasetên hizibgiriyê carna hê jî dibin asteng li pêşiya avakirina vîneke hevbeş a siyasî.

Ziman û demografyaya Kurdên li Rojava û Sûriyê

Di warê ziman de zaravayê pirraniya gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê Kurmancî ye. Dewleta Sûriyê di fermiyetê de destûr neda bi kar anîna zimanê Kurdî. Lê belê malbatên Kurd û civaka Kurd bi israr bi zimanê xwe axivîne. Nexasim dayik bi ristekî girîng di fêrkirin û parastina ziman û çanda Kurdî de rabûne. Devokên herêmên Rojava ji hev cuda ne. Belavbûn û taybetmendiyên devokên zimanê Kurdî di asta Kurdistanê de li gorî cografyaya welat, warên hevbeş yên jiyana eşîran û civaka Kurd destnîşan dikin. Lewma devoka Kurdî ya navçeya Dêrikê ji devokên herêma Botanê ye; devokên Amûdê, Dirbesî û Qamişlo girêdayî yên Merdînî ne; devoka Kobanê û ya Rihayê, devoka Efrînê û Mereşê dibin yek. Lê belê, bi bandora siyasetên bişaftinê yên dewletên Sûriyê û Tirkiyê, bandora zimanê Erebî li ser devokên resen yên binxetê û bandora Tirkî li ser devokên serxetê çêbûye. Bi vê careke din xuya dibe, ka sînorên dewletan çiqas kêfî û bi zorê hatin kişandin.

Çend malbat jî li Rojava hene ku zaravayê wan ê eslî Dimîlî ango Zazakî ye. Beşek ji wan li gundê Dimilî yê navçeya Mabata ya Efrînê dijiya û beşeke din jî li gundê Zihêriyê yê Dêrikê dijîn. Bapîr û dapîrên wan piştî komkujiya Dêrsimê li hemberî Kurdên Elewî koçberî Skenderûnê bûne û paşê jî derbasî Lazqiyê bûne. Xeyda Mehemed Yûsif qala wê yekê dike ku malbata wan di çarçoveya plana 'Kembera Ereban' [Hizam el-Erebî] ji hêla rejîma Sûriyê ve wek 'Elewiyên Ereb' li Koçeratê hatine bicihkirin. Heta şoreşa Rojava ew weke 'malbata Ereb' di nava Kurdan de hatine nasîn. Ew bi dilêşî dibêjin, di encama siyaseta bişaftinê de ew fêrî zimanê xwe yê zikmakî nebûne: *"Zimanê dayikê ji bo me qedexe bû. Ji ber wê yekê, em neçar man ku em bi zimanê Erebî biaxifin. Çanda me hatiye jibîrkirin û binpêkirin. Sed mixabin malbata me, dîroka me ji me re eşkere nedikir. Ji ber ku gelek tirs hebû, diroka me ji me vedişartin û bersiv nedidan pirsên me."*[102]

Hebûna Kurdan di qeydên dewletan de hatibû înkar kirin. Bi taybetî pirraniya Kurdên herêma Cizîrê bê nasname hatibûn hiştin û bê welatiyê dewletê bûn. Lewma peytandina hejmara Kurdan li Sûriyê bi misogerî zehmet e. Li gorî lêkolînên ku Ajansa Nûçeyan Hawarê weşandine serjimara Kurdên li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê sala 2016'an bi giştî qederê 3,5 milyon e. Ji wan qederê milyonekê li kantona Cizîrê, 500 hezar li kantona Efrînê, 700 hezar li kantona Kobanê, 400 hezar

[102] Hevpeyvîn bi Xeyda Mehemed Yûsif û xwuşka wê, gundê Zihêriyê yê Dêrikê, 2017

li kantona Şehbayê û qederê 400 hezarî li Helebê, qederê 200 hezarî li Şamê û qederê 300 hezarî jî li heremên din wekî Reqa, Hims, Lazqiye û Hemayê dimînin.[103]

- **Gelên Aşûrî-Suryanî-Keldanî û Ermenî li Bêt-Nehrênê**

Aşûrî-Suryanî-Keldanî jî xwecihiyên esasî yên Bêt-Nehrênê ne ku tê wateya 'Navbera du çeman' ango Mezopotamya. Koka van gelan ji şaristaniyên Sûmer, Akad, Babil, Asûr û Aramî tê ku beriya bi hezaran salan ji Mezopotamya Jêrîn derketine. Şopên şaristaniyên wan ên qedîm li ser erdnîgariya Bakurê Sûriyê ji Ava Dîcle heta Derya Spî xuya dibin. Aşûrî, Suryanî û Keldanî zaravayên xwe yên cuda diaxifin. Lê koka zimanê wan, xwe dispêre zimanê kevnar ê Aramî. Xwedawend û keybanû yên wekî Îştar, Şahmîran û Zeynubya nirxên hevbeş ên çanda dîrokî ya jinan in.

Têkiliyên Dîrokî yên Aşûrî-Suryanî-Keldanî û Ermeniyan

Ator Ishaq ku wekî 'dayika Aşûr' di nav civaka xwe de tê nasîn û xwe wekî 'keça Til Temir û neviya Xabûr' pênase dike, têkiliyên di navbera Aşûrî, Suryanî û Keldaniyan de wiha dinirxîne: *"Tî cudahî di navbera çand û adetan de nînin. Keldanî ew bi xwe zarokên Akad in; Suryanî jî zarokên Sargon in û Aşûrî jî zarokên Aşûr in. Sargon û Akad û Aşûr birayên hev bûn. [...] Îcar her birayek dixwaze rêveberiya bajarekî bibe û bi dest bixe. Ji ber vê jî neviyên Sargon bûn Suryanî, yên Aşûr bûn Aşûrî û yên Akad jî bûn Keldanî."*[104] Lewma têkilî û nakokiyên dîrokî di nava wan de çêbûne. Mînak di sedsala 9'emîn a BZ'yê de Mîrektiyên Aramî wekî *Bêt Adini* di herêma Firatê de û *Guzana* li Til Xelefê rastî dagirkeriya Împaratoriya Asûr tên. Her wiha Ator Ishaq destnîşan dike ku siyaseta hêz û dewletên desthilatdar her tim parçekirina gelan armanc dikir: *"Em bi Keldanî, Aşûrî, Suryanî û Ermenî hatin bi nav kirin û her dêrek li halê xwe ye. Yên girêdayî Dêra Rojhilat hene û hinek jî girêdayî Dêra Rojava ne. Erd li ser Aşûriyan diaxive. Wargehê Aşûrî nikarîbûn tine bikirana. Neşkênandin, ji ber ku nikarin erdê bişkînin. Dîrokê nikarin bêdeng bikin, nikarin biguherin. Em miletekî şaristaniyê ne. Temenê me 7000 sal in, ewqas jî nikarin înkar bikin."*[105]

Koka gelê Ermenî ji qebîleyên Hayaşa-Azzî ve tê. Çavkaniyên dîrokî yên 3500 BZ'yê dibêjin, ev qebîle li çiyayên herêma Tuşpa (Wanê) jiyane. Wan tevî qebîleyên din yên xwecihî wekî eşîrên Kurd li herêma çiyayên Urartu (Ararat) Konfederasyona Naîrî ava kiriye. Ji 1300 BZ'yê heta 800 BZ'yê van qebîleyan karîbû xweseriya xwe li bin sêwana Konfederasyona Naîrî li hemberî serweriya Împaratoriya Asûr biparêzin. Van pergala xwe ya aborî û siyasî bi pêş xistiye û belav kiriye. Piştre xanedanên Ermenî keyaniyên xwe ava kirine. Di sedsala yekem BZ'yê de li bin serweriya Şah Tîgran II, Împaratoriya Ermenistanê gihand heta deverên Mezopotamyayê. Bi vî rengî piştî serweriya Asûran, Ermeniyên pêşîn li herêmên Bakurê Sûriyê bi cih bûne.

Bawerî û Zanist

[103] Nazdar Ebdî, Îdrîs Ebdullah: *Dosya Rojava-3, Deryaya deng, reng û baweriyan,* ANHA, 20-02-2016

[104] Hevpeyvîn bi Ator Ishaq re, Til Temir, 2017

[105] Hevpeyvîn bi Ator Ishaq re, Til Temir, 2017

Gelên Aşûrî-Suryanî-Keldanî û Ermenî ji sedsala 3'yan PZ'yê ve ola Xirîstiyantiyê pêjirandine. Di sala 301'ê de li Ermenistanê cara yekem Xirîstiyantî bûye ola dewletê. Bi ser de zanist, lêkolîner û fîlozofên wan gelan berhemên girîng afirandine: Bajarên wekî Antiochia, Edessa (Riha), Nisêbîn û Qinnesrîn bûn navendên baweriyê û zanistê. Vê bandora xwe li ser çand û exlaqê gelên Mezopotamya Jorîn kiriye. Zanyar, teolog û fîlozofên Aşûrî-Suryanî-Keldanî û Ermenî akademî, dibistan û pirtûkxane ava kirine. Wan pirtûkên muqedes şirove kirine û çavkaniyên fîlozofên antîk yên wekî Platon û Arîsto wergerandine zimanên xwe. Ronakbûn, fikir û nîqaşên teolojîk û felsefîk wan di nav gelên Sûriyê de belav kirine. Bi vî rengî bipêşketinên mezin di beşên zanista tenduristî, stêrknasî û felsefî de, di çand, huner, rêziman, wêje û mûzîkê de çêbûne. Jinên rahibe jî di manastiran de xebatên zanist û hunerî meşandine.

Dîroka Jinên Aşûrî-Suryanî-Keldanî û Ermenî li Benda Nivîsandinê Ye

Ji dervê jinên serdema Babîl û ezîzeyên Xirîstiyantiyê xwe gihandina çavkanî û agahiyên li ser jinên zane û pêşeng yên gelên Aşûrî-Suryanî-Keldanî û Ermenî zehmet e. Ew jin veşartî mane. Çima? Dibe ku gelek bibîranîn û çavkaniyan di qirkirinê de hatine tine kirin; ji ber ku qirkirina fîzîkî di heman demê de qirikirina çandê ye jî. Dibe ku dîroka hinek kesayetên jinên Aşûrî-Suryanî-Keldanî û Ermenî bi nasnameyên neteweyên serdest hatibûn nivîsandin û danasandin. Wekî din, dibe ku di nav civakê de xebateke taybet ji bo derxistina zanebûn li ser dîrok û kesayetên jin yên pêşeng nehatiye meşandin û ji ber vê bîranînên wan çilmisîne. Her wiha dibe ku pirtûk û çavkanî hebin yên ku wernegerandibin zimanên din. Bi rêya lêkolînên înternetê em gihîştin çend agahiyên li ser jineke rewşenbîr a Ermenî bi navê Sîbil. Ew ji 1863'an heta 1934'an jiyaye û bûye yek ji jinên rewşenbîr yên Ermenî ku di dema xwe de bandoreke mezin li ser civakê kiriye. Sîbil him mamoste him jî nivîskar û helbestvan bû. Li Stenbolê û Ermenistanê wê dibistan ji bo keç û jinan vekirine. Wekî din, wê perwerde û xebatên taybet ji bo zarokên sêwî yên ku ji qirkirina Ermeniyan filitîne dane meşandin.[106]

Serdema Komkujî û Mişextkirinan

Ruxmê ku tevahî desthilatdaran dixwestin ji berhemên întelektuel yên akademî û dibistanên Suryanî sûdê wergirin, zordariya împaratoriyên Roma, Bîzans û Xelîfeyên Îslamê li Mesîhiyan dibû. Di serdema navîn de ew bi êrîşên Moxolan û komkujiyan re, rû bi rû mane. Gelek kes koçber bûne. Pirraniya Suryaniyan ji bo hebûna xwe biparêzin di sedsala 15'emîn de vekişayane çiyayên bilind ên Tûr Abidîn yên herêma Midyadê. Di sedsala 11'an de Selçûqiyan êrîş anîne ser nişteciheên Ermenî yên van herêman û bakurê Gola Wanê. Piştî van êrîşan bi sed hezaran Ermenî koçberî herêmên Sûriyê bûne.

Di serdema Împaratoriya Osmaniyan de berê Ermenî û Suryanî wek miletên bi xweseriya çandî û olî dihatin nasîn. Lê bi lawazketina desthilatdariya sultanên Osmanî, dîsa politikayên qirkirinê dest pê kirine. Di navbera salên 1840-1896'an de Împaratoriya Osmanî di bin fermandariya Sultan Ebdulhemîd de komkujiyên mezin li dijî gelên Aşûrî-Suryanî-Keldanî, Ermenî û Kurdên Êzdî pêk hatine. Di bin bandora polîtîkayên serdestan de yên ku gelan li hemberî hev sor kirine, hinek begên Kurd jî beşdarî kiryarên komkujiyê yên Osmaniyan bûn.

[106] Hagop and Marilyn Arshagouni: *Armenian History Timeline*, 1998

Paşê di salên 1915-1917'an de di dema Şerê Cîhanê yê Yekem de Osmaniyan bi hevkariya Împaratoriya Elman fermana 'Seyfo'[107] li hemberî gelên Mesîhî lidarxistin. Di vê komkujiyê de qederê du milyon mirovên Ermenî, Aşurî, Suryanî û Keldanî hatine kuştin. Bi sed hezaran mirov hatine jicihkirin û di meşên mirinê ber bi çola Sûriyê ve ji tîna û birçîna mirine yan jî ji aliyê leşkerên Osmanî ve bi êşkenceyên hovane hatine qetilkirin. Nêzîkî bajarê Dêrazorê qirkirina herî mezin li hemberî Ermeniyan pêk hatiye. Bi giştî milyonek û nîv jin, zilam, zarok, pîr û kalên Ermenî di vê komkûjiya sîstematîk de jiyana xwe ji dest dane. Elenor, jineke Keldanî bi temenê mezin ku li bajarê Serêkaniyê dimîne, dibêje: "*Wekî Mesîhiyan em ji sala 1914'an ve hatin qetilkirin. Sultan Ebdulhamîd ji wezîrê hundirîn ê dewleta Osmanî Talat Paşa[108] re ferman da ku tevahiya Mesîhiyan werin kuştin û koka Ermeniyan were qelandin. Wekî şirîkê Împaratoriya Osmanî, dewleta Elman risteke mezin di vê qirkirinê de leyîstiye. Bê ku cudahiyê bixin nava Ermenî, Suryanî, Aşûrî û Keldaniyan, wan di fermana 1917'an de hemû Mesîhî di komkûjiyan re derbas kirin."*[109]

Dema qirkirinê pirraniya Aşûriyên ji herêma Hekarî koçî herêmên Babîl, Nînova û Dihokê kir. Her wiha di 7'ê Tebaxa 1933'yan de artêşa Iraqê li Sêmelê nêzîkî bajarê Dihokê komkujiyeke din pêk anî. Wan xelkê 11 gundên Xirîstiyanan kom kir û paşê hemû bi awayekî hovane qir kirin. Komkujiya Sêmelê bû sedema koçberbûna Aşûrî, Suryanî û Keldaniyan ji deşta Mûsilê. Ator Ishaq van kirinan bi vî rengî dinirxîne: *"Koçberbûna me ji Hekarî bi destê Osmaniyan pêk hat. Niha hin kes dibêjin, 'di komkujiya Sêmelê de hinek Kurdan em kuştin'. Ew Kurdê ku kuşt ne ji ber ku Kurd bû dikuşt, lê ji ber ku ji aliyê Inglîz û Tirkan ve hatibûn sor kirin. Yanî çend Kurd hebûn ku xwe firoştin. Ew kesayet in ku derûniya wan lawaz bû. Lê pere û çek, her tişt ji dewleta Osmanî û Inglîz bûn."*[110]

Ji Nû Ve Avakirina Jiyanê li Herêma Xabûrê

Gelên Mesîhî serweriya Fransa ya li Sûriyê ji bo xwe wek xilasiya ji komkujiyên Osmanî, dewleta Tirk û Şah Qazî yê Iraqê dîtine. Beşeke mezin wek koçberan ber bi herêmên Rojavayê Kurdistanê ve çûne û li vir jiyaneke nû ava kirine. Aşûrî, di dema Fransiyan de bi pirranî li bajarê Til Temir û li rex çemê Xabûrê hatine bicihkirin. Di destpêke de ew di wargeh û konan de diman, piştre jî xanî, dêr û gundên xwe ava kirine. *"Dapîr û bapîrê min ji me re dibêjin, 'em hatin û li vir rûniştin ji bo ku em dîsa vegerin li cihwarê xwe li Iraqê'. Lê bi domandina demê re wan li vir jiyana xwe ava kir û bi cih û war bûn. Malên ji axê lêkirin û erdê wan jî çêbûn. Wiha wan veger ji bîr kir û bûne Aşûriyên Sûriyê. Di destpêkê de li navçeya Til Temirê, piştî ji wir hatin belav kirin; her êl li gorî cihê ku jê hatiye, nav da gundê xwe. Mînak yên ku li Iraqê ji cihekî bilind hatin navê gundê xwe kirin 'Ser Sibîko' yanî 'Til Tewîl'. Ew tê wateya 'cihekî bilind'. Li cem me êla Tiyarê heye, yên ku ji Tiyarê hatin. Navê Til Temer bi Aşûrî 'Tiyarê' ye. Li cem me Txûma hene. Ev jî cihekî navdar e, bi dar û çandiniyê. Navçeya bi keskahî wateya wê 'Txûma' ye. Til Cuma navê gund ê bi Erebî ye, lê navê wê Aşûrî jî 'Helmond' e. Ew jî ji navçeya Helmond li Îraqê bû, bi xwe re veguhestin. Bi vî rengî bû ku her gundekî wateyeke xwe heye. (...) Li ser qeraxê çemê Xabûrê nêzî 34 gundên Aşûrî çêbûne. Ev xeta gundên Aşûrî berfirehiya wê nêzî 40 kîlometre dirêj û 10 kîlometre jî fireh e."*[111]

[107] Wateya 'Seyfo' bi Kurdî 'şûr' e. Gelên Aşûrî-Suryanî-Keldanî bi vê peyvê komkujiya mezin bi nav dikin ku arteşa Osmanî bi şûrên xwe li dijî jin, zilam, zarok, pîr û kalên Mesîhî meşand.

[108] Di 15'ê Adara 1921'ê de Talat Paşa li Berlînê hatiye kuştin. Bi vî awayî Soghomon Tehlerian dixwest tola malbata xwe û 1,5 milyon Ermenî hilîne ku di komkûjiyê de bi fermana Talat Paşa hatine qetilkirin.

[109] Hevpeyvîn bi Elenor re li dêra Keldanî ya Serêkaniyê, 2017

[110] Hevpeyvîn bi Ator Ishaq re, Til Temir, 2017

[111] Hevpeyvîn bi Ator Ishaq re, Til Temir, 2017

Nêzikatiya Dewleta Sûriyê û Hevjiyana Gelan

Madlên ji gundê Helmond bicihbûna gelê Aşûrî li herêma Xabûrê û navên gundan wiha dinirxîne: "*Me bi Aşûrî navê xwe hiştin weke berê. Dema ku Aşûrî hatin herêmê, ev cih daristan bû. Ne cihek bû ku jiyan lê hebû. Lê piştî ku ev der ji jiyanê re hatibû amade kirin, navçe û demografya wê tevî navên xwe hatin guhertin. Dema bajarbûn çêbû, dewletê tablo çêkirin û danîn. Îcar em neçar man ku biguherin û kirine Erebî. Dema ku Bees li vir bû desthilatdar, wana guhertin çêkirin. Demografî jî hat guhertin, kirin Ereb."*[112]

Avakirina jiyan û hevjiyana gelan li herêmê xwesûya Madlên a 70 salî bi vî rengî tînê bîra xwe: "*Kerebe û av tinebûn. Em diçûn Xabûrê, me teneke dadigirt û av dianî. Heşt zarokên min hebûn. Min bavê wan ji bilî salê du mehan nedidît. Ew diçû li ser terektorê kar dikir. Çêlekê min û sed serî pezê min hebûn. Min di pembo de kar dikir. Em diçûn, me giya kom dikir ji bo lawiran. Me bi peyatî dianî. Zarokên min piçûk bûn. Di biharê de em derdiketin zozanan. Me pezê xwe dibir û didotin. Li cem Ereban konê reş yên rîz hebû. Ew diçûn û pezê me dibirin û diçêrandin. Em jî li cem wan diman. Baldariya jinan li ser şîr û berhemên pez bûn. Me şîr germ dikir, tirş dikir. Me bi destê xwe mast, penêr, rûn û tore*[113] *çêdikir."* Dîsa Madlên dewam dike: "*Di destpêkê de, tu pirsgirêk di navbera miletan de tine bûn. Ev cudahî kî xistê? Rejîma Beesê ev cudahî xiste navbera me de. Milet berê wekhev dijiyan û hevbeş bûn. Bi hevdu re dijiyan. Jiyan sade bû, lê belê xweş bû. Aramî hebû. Ev dide xuyakirin ku gel berê bi hev re dijiyan bêyî ku astengiyan bikşînin û pirsgirêkan bibînin. Jiyan bi kêyfxweşî bû."*[114]

Keldanî û Suryaniyan li kantona Cizîrê bi pirranî li bajar û gundên Qamişlo, Dêrik, Hesekê, Amûdê û Serêkaniyê jiyana xwe domandine. Dewleta Fransî di avakirina dêrên Katolîk û Ortodoks û dibistanan de bûye alîkar. Rejîma Beesê gelên Mesîhî wek hindikahî nas kirine. Lê ji netewebûnê zêdetir, ew gel bi nasnameya xwe ya olî hatine nasîn. Wan karibû li dibistanên taybet û dersên di dema havînê de perwerdeya olî û zimanê dayikê bibînin. Lê belê di dibistanên fermî yên dewletê de zimanê Suryanî qedexe bû. Lewma gelek malbat, di jiyana xwe ya rojane de bi zimanê Erebî axivîne û tenê di merasîmên olî de wan zimanê xwe bi kar anîye. Dibistanên ku ji aliyê dêran ve hatine birêveberin, ji xwendekarên tevahiya pêkhateyan re vekirî bûn. Mînak 'Meqteba Amal' li Serêkaniyê bi navûdeng bû. Bi 400 – 500 xwendekarên xwe, keç û xort, yên Mesîhî û Misilman, yên Kurd, Ereb û Suryanî dibistana herî mezin a bajêr bû.

Lê belê nijadperestiya dewleta Sûriyê bandorekê neyînî li ser jiyan û rewşa gelên Suryanî, Keldanî û Aşûrî dikir. Di çarçoveya siyaseta 'Kembera Ereban' de dewletê erdên malbatên Suryanî li Hesekê jî desteser kirin. Endama Yekîtiya Jinên Suryanî Sîham Qeryo dibêje, ew hîna nû piştî şoreşê bi ziraviyên siyaseta nijadperest a nîzamê hisiyane: *"Di demê Hîzama Ereban de Erebên ji Reqayê anîn ser erdê me. Me bi xwe nedizanî. Bavê min jî yek ji wan bû ku erdê wî hem û birin û li Ereban belav kirin. [...] Heya ku em zarok bûn di dibistanan de jî fikrê me diguhertin û nedihştin ku em li ser fikrê Suryanî mezin bibin. Di dersa werzişê de serê sibê ji me re digotin: 'Bêjin: El*

[112] Hevpeyvîn bi Madlên û xwesûya wê re, gundê Til Cuma ya Til Temirê, 2017

[113] Mastê ku rûn jê tê derxistin û pişt re tê zuwakirin

[114] Hevpeyvîn bi Madlên û xwesûya wê re, gundê Til Cuma ya Til Temirê, 2017

Eruba, el Eruba, el Eruba!'[115] *Me jî fam nedikir û me digot. Tewr em pê re kêfxweş bûn, ji ber ku me nedizanî ku ew çi siyaset bû."*[116]

Ji salên 1980'yî ve dewleta Sûriyê polîtîkayên taybet ji bo koçberkirina gelê Aşûrî-Suryanî meşandin: Li aliyekî rejîma Sûriyê nêzîkatiyên bişaftinê ango Erebkirinê bi pêş xistin. Li aliyê din rejîma Tirkiyê bi çêkirina bendavan herêma Xabûr û berhemên çandiniyê ziwa kirin. Di heman demê de welatên Ewropî deriyên xwe ji koçberan re vekirin ji ber ku pêdiviya wan bi karkerên erzan hebû. Bi vî rengî bi gotina jineke Suryanî, "*herêma bereketê bûye wekî goristanê"*. Li gorî agahiyên ku rayedarên Yekîtiya Suryaniyan dane, beriya aloziyên li Sûriyê hejmara gelê Aşûrî-Keldanî-Suryanî yên li Sûriyê bi giştî qederê 2,5 milyon bû. Ji wan jî teqrîben 200 hezar li Rojava diman.[117] Xelkê gundê Helmond dibêjin, di rojên pîrozbahiya cejna neteweyî ya Akîto de berê li Çiyayê Kezwanê qederê 17 hezar Aşûrî kom dibûn.

Dayika Aşûr dide zanîn ku alaya gelê Aşûrî dîrok, xweza û rewşa welat nîşan dike: Çar şirîtên pêlpêlkî ku her yek ji rengên sor, spî û şîn pêk tên li navenda alê digihînin rojê û stêrka bi çar tîrêjên xwe. Çar şirît û çar tîrêj dibin nîşana çar demsal û çar aliyên cîhanê. Di rengên şirîtan de sor a xwînê, spî ya aşitî û aramiyê û şîn a ava Xabûr, Firat û Dîcleyê sembolîze dikin. Her yek ji çar şirîtan ji 3 xêzên bi 3 reng pêk tê ku rêza wan diguhere. Ev bi giştî dibin 12 xêz ku nîşana 12 heyvên salê ne. Balkêş e ku Aşûriyan ala xwe bi sê şêweyan didaleqînin ku rewşa welat radigihîne: Heger xêzên sor yên aliyê hundirîn li jorê bin 'rewşa şer' tê ragihandin. Heger xêzên şîn yên aliyê hundirîn li jorê bin wateya vê 'rewşa aşitiyê' ye. Wekî din heger xêzek sor û xêzek şîn ên aliyê hundirîn li jorê xuya bibin, vê demê 'rewşa asayî' ye, yanî ne şer ne jî aşitî ye.
Dema ku me di sala 2017'an de hevdîtin û hevpeyvînên xwe bi jinên Aşûrî re li bajar û gundên Til Temirê çêkirin, alaya Aşûrî bi xêzek sor û xêzek şîn aliyê hund*i*rîn li jorê hatibû daleqandin. Şopên şerê giran ê DAIŞ'ê; birînên komkujî, revandina bi sedan jin û mêrên Aşûrî û koçberiya gel xuya dibûn. Lê di heman demê de jin û malbatên ku careke din jiyan li herêma Xabûrê ava kirin, parastina xwe birêxistin kirin, banga vegera welat dikirin û hêviyên aşitiyê belav dikirin.

Ermenî yên ku karibûn xwe ji komkujiya Osmaniyan xilas bikin û xwe gihandin herêmên Rojava, bi pirranî li Kobanê û Minbicê, li gund û bajarên Cizîrê yên wek Amûdê, Serêkaniyê, Dêrikê, Qamişlo û Hesekê bi cih bûne. Her wiha beşeke piçûk jî derbasî kantona Efrînê bûye. Hostetî û zanebûna Ermeniyan, di warê zenaetkarî, necarî û hesinkariyê de ji bo avakirina avahî û bînesaziya bajarên wek Kobanê bi ristek girîng rabûne. Her wiha ev zanebûn ji bo cotkarên Kurd jî bûye çavkaniya bipêşxistina jiyan û hilberînê.

Lê birînên komkujiyê wek trawmayeke kûr ji nifşekî derbasê nifşekî din yê gelê Ermenî bûn. Li gelek herêmên Rojava me miriov dîtin ku gotin 'dapîra me Ermenî bû'. Ruxmê ku dapîrên wan bi pirranî newêrîn biaxivin li ser zilma ku li wan bûye, kulên wan yên giran xwe didan der: "*Dayika min pirr bêdeng bû, jixwe bê bawer bû. Ew ji Merdînê, ji Bakurê Kurdistanê bû. Dema ku qetliama Ermeniyan çêbûye dayika wê wunda bûbû. Mala kalikê min wê dibînin, digirin cem xwe û dizewicînin. Her kesê wê didît dibêje: 'Ew fileh e. Ew Ermenî ye. Ew ne ser dînê me ye, piştre bûye Misilman.' Ev êşa wê bandorek li ser zarokên wê dikir û li ser dayika min jî dikir.*

[115] Wateya 'El Eruba' bi zimanê Kurdî 'Her kes Ereb e!' ye.

[116] Hevpeyvîn bi endamên Yekîtiya Jinên Suryanî re, Heseke, 2017

[117] Nazdar Ebdî, Îdrîs Ebdullah: *Dosya Rojava-3, Deryaya deng, reng û baweriyan,* ANHA, 20-02-2016

Du kurmam ji dayika min hez dikirin. Xalê min jî nîne. Jin bi tenê ne. Kalikê min jî ji bo pirsgirêk dernekeve, dayika min tîne binxetê milê Amûdê. Ew bi salan neçûye cem malbata xwe. Him hesta wê ya xerîbiyê, him jî bandora dayika wê ser wêna dihişt ku her tim xwe tenê bibîne û bêdeng jiyan bike. Di piçûkaniya xwe de min her tim giriyê dayika xwe didît."[118]

Tevî êş û tengezariyan têkilî, danûstandin û dostanî jî di nav Ermenî û Kurdan de bi pêş ketine. Her wiha stranbêjên Ermenî yên wekî Aram Tigran ji Qamişlo û Gerapêtê Xaço ku piştî komkujiyê ji Bakur hatine Rojava, bala mirovî dikişînin: Herdu dengbêj, di kilamên xwe yên bi zimanê Kurdî û Ermenî de çîrokên êş û hezkirina herdu gelan dibêjin. Gelek Ermeniyên ku bi Kurdan re jiyane, fêrî zimanê Kurdî bûne. Dîsa piştî salên 1960'î piraniya Ermeniyên Rojava û Sûriyê koçberî Ermenistanê, welatên Ewropa û Emerîkayê bûne. Tê texmînkirin ku li Sûriyê bi giştî sed hezar, li Rojava nêzîkî 2 yan jî 3 hezar Ermenî dijîn.[119]

Di karên parastin û avakirina rêveberiya xweseriya demokratîk de Ermeniyan jî cih girtiye. Cihgira Meclîsa Gel a navçeya Dêrikê, Karîma Betha dibêje: "*Di vê şoreşê de me rûpelek nû vekir. Carna hinek kes ji nifşê kevn hene hîn bi guman û tirs nêzîk dibin. Lê belê nifşê nû cuda ye. Bi taybet jinê gelek bawerî da civakê. Em hemû yek in. Wekî jin me dît, êdî ne lazim e ku em pey zilam bimeşin, xizmeta wî bikin û li wî guhdarî bikin. Jinan zêhniyeta xwe guhertiye. Em dikarin biaxifin, em dikarin siyasetê bikin, em dikarin sîlehê rakin û xwe biparêzin. Têkiliyên me yên civakî bi malbatên Kurd û Ereb bi rêzdarî ne. Em hemû di nav hev de ne. Kêfa me gelek ji hev re tê. Divê em hemû bibin yek. Ger em bibin yek, em ê bigihin armanca xwe û ti sîlehê dinyayê nikare me bi bin bixe. Wextê darek bi tenê be ew ê di cih de were şikandin. Dema dar pirr bin nikarin bişkînin."*[120]

- **Gelê Ereb li Bakurê Sûriyê**

Dayik û pîrên gelê Ereb qederê 4 hezar salan beriya zayînê wek qebîleyên Samî li wan herêman jiyabûn ku îro weke Sehraya Mezin û Nîvgirava Ereban tên binavkirin. Îro mirov vê erdnîgariyê wek cihekê ziwa û hişk disêwirîne. Lê belê beriya bi 6 hezar salan, ev cihên hanê xwedî xwezayeke heşîn û berhemdar bûne. Li wê derê qebîleyên Ereb koçertî kirine. Ew xwediyê pergalên hilberînê, baweriya xwezaya zindî û xweparastinê bûne.

Dîroka Qebîlên Ereb

Bi guhertina hewayê û peydabûna şaristaniyên Mezopotamya Jêrîn, qebîleyên Ereb li tevahiya Bakurê Efrîka û gelek deverên Rojhilata Navîn belav bûne heta bi qûntarên çiyayên Toros û Zagrosê hatine. Cara yekem peyva '*arabî*' di nivîsên bizmarî yên Asûrî de hatiye dîtin. Di vê nivîsê ya sedsala 9'an a BZ'yê de ew wekî gelekî hatibû pênase kirin ku ji bakurê Nîvgirava Ereban derketine. Li gorî vê dibe ku koka peyva '*ereb*' ji peyva '*abar*' bê ku wateya wê '*rêwîtî*' an jî '*gerok*' e. Heman çavkanî qala şer û berxwedanên qebîleyên Ereb li hemberî serdestiya Asûriyan jî dikin. Li vir hatiye nivîsandin ka çawa desthilatdarên Asûrî dest danîbûn ser peykerên xwedawendên wekî Atarsamlin, Dâa, Nuhâa, Rudâu, Abirillu û Atarqurumâ li avşînoka Ereban Admutu û birine

[118] Hevpeyvîn bi Şervîn Amûdê re, Heseke, 2017

[119] Nazdar Ebdî, Îdrîs Ebdullah: *Dosya Rojava-3, Deryaya deng, reng û baweriyan,* ANHA, 20-02-2016

[120] Hevpeyvîn bi Karima Wetha re, endama Ermenî û cihgira hevserokê ya Meclîsa Gel a navçeya Dêrikê, 2019

Nînovayê. Di sedsala 10'an a BZ'yê de li ser erdnîgariya Bakurê Sûriyê gelek şerên dijwar di nav leşkerên keyaniyên Ereb û arteşa desthilatdarên Asûrî de qewimîne.

Çanda xwedawendan di nav qabîlên Ereb de nexasim di kesayetên sê xwedawendan yanî Al-Lat, Al-Uzza û Al-Manat de hatibû nasîn. Çavkaniyên nivîskî destnîşan dikin ku ***Al-Lat*** wekî 'xwedawenda mezin a heyvê' hatiye binavkirin. Bi qedrê wê hat zanîn wek dayika axê, afirînera qanûnên gerdûnî û hevpeymana civakî. Bi hezaran salan hevpeymanên di nav civaka Ereban de bi sonda *'li ser xwê, li ser agir û li ser xwedawenda herî mezin Al-Lat'* hatine mohrkirin.[121] ***Al-Uzza*** wek 'xwedawenda stêrka sibê' pîroz hat dîtin ji ber ku wê mizgîniya roja nû dida. Ew di heman demê de wek nîşana hêz, evîn û şerkeriya jinên ciwan hat şirovekirin. ***Al-Manat*** wekî 'xwedawenda stêrka êvarê' hat naskirin. Ew wekî kesayeta jina pîr û zane, di heman wextî de jî wekî xwedawenda çarenûs, mirin û hilweşandinê hat pêşwazîkirin. Peyker û wêneyên keviran yên her sê xwedawendan li gel hev li gelek cihên şên ên qabîleyên Ereb hatin çêkirin. Yekê ji van mînakan mirov dikare îro di pêşangeha mûzeya li paxtaxta Urdinê Ammanê bibîne.

Heta derketina holê ya Îslamiyetê li gelek deverên Mekkê û Medinê cihên ziyaretê hebûn ku wekî cihê rêzgirtina sê xwedawendan hatiye nasîn. Li wan cihên pîroz dar û kevirên bi şiklên taybet wekî remzên hêz û bereketê ya xwedawendan hatine perestin. Tê gotin, ew kevirê reş li Kabê ya Mekkeyê jî yek ji wan kevirên pîroz bû. Heta serdema Hz. Muhammedê Al-Uzza wekî xwedawenda sitarê ya bajarê Mekkeyê hatiye qebûl kirin.[122] Lê ji wê demê ve baweriya bi wan xwedawendan di nav piraniya gelê Ereb û umeta Îslamê de wekî pûtperestî tê şirovekirin.

Îslamiyet û Xelîfeyên Ereb

Qebîleyên Ereb bi şerkeriya xwe dihatin nasîn. Him di nav xwe de, him jî bi hêzên desthilatdar re her tim di nav pevçûn û têkiliyan de bûne. Lewma şaristaniya Îslamê bi armanca avakirina aştî û yekîtiyê di nav qebîle û eşîrên Ereban de derketiye holê. Lê piştî wefata Hz. Muhammed di demeke pirr kin de Îslam, bi desthilatdariya Xelîfe Omer veguheriye şaristaniyeke hegemonîk. Abdullah Ocalan vê peyvajoyê wiha dinirxîne: *"Hê di dema Emewiyan de şovenîzma Qureyş (şovenîzma qebîleyê) di bin navê Qewmê Necîb de (qewmê esilzade) veguheriye şovenîzma Ereb (şovenîzma qewm)."*[123] Bi vê ferasetê artêşên Emewiyan di sedsala 7'an de seferên xwe dest pê kirine û ketine gelek herêmên Sûriyê û Kurdistanê. Zimanê Erebî hê nû piştî sedsala 8'an weke zimanê fermî yê dewletê gav bi gav li Sûriyê hatiye belavkirin.

Di encama firehbûna erdên xelîfeyan û rêyên bazirganiyê de danûstandin di navbera ol, çand û gelan de bi pêş ketine û bandor li hev kirine. Nexasim anîna kaxizê ji Çînê di sedsala 7'an de pêşî li belavkirina nivîs û pirtûkên Erebî vekiriye. Her wiha wergerandina ber bi Erebî ve ya çavkaniyên zanist û felsefeya Yewnanî û Aşûrî îlham da tevgera ***Felasîfa Îslamî***. Ronakbîrên wekî el-Farabî, Ibn Sîna, Ibn Ruşd, Îshaq el-Kindî, el-Xezalî û Ibn Xaldûn bi şirovekirina çavkaniyên felsefeya antîk, yên Quran û Şeriatê li bersivên pirs û pirsgirêkên civakî geriyane. Têkiliyên di navbera ol û felsefeyê de bûne mijareke sereke ya nîqaşan. Cewhera tevahiya pirsan ev bû: 'Gelo

[121] Andrea Dechant: *Al-Lat – Arabische Mondgöttin*, Malpera Artedea, 14-05-2008: https://artedea.net/al-lat/

[122] Hüseyin İlker Çinar: *Die Religionen der Araber vor und in der frühislamischen Zeit*, 2007

[123] Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Civaka Demokratîk – Pirtûka Çaremîn*, Beşa 'Berxwedana Îslamî û Rastiya Wê Ya Êrîşê; Şerê Dema Feodal A Çîna Navîn (Bazirgan)', 2011

mirov dikare yekbûna fikirîna rasyonel û fikirîna olî ava bike yan na?' Nexasim di sedsala 11'an de geşedanên girîng di çand, zanist û felsefeya Erebî de çêbûne. Lê di bin desthilatdariya xelîfeyan de ramanên şoreşgerî dihatin tepisandin. Berhemên dewlemend ên madî û fikrî li gorî berjewendiyên çînên arîstokrat û desthilatdarên dewletê dihatin bi kar anîn û cemidandin.

Lêgerînên Jinên Ereb

Gelek jinên Ereb ên çîna jorîn bûne pêşengên zanist û ronakbûnê. Ew wekî jinên zanyar xebitîne, li Sûriyê û gelek welatên Rojhilata Navîn pergala dibistan û zanîngehan ava kirine.

Sitt al-Şam yek ji wan jinên Ereb e ya ku wekî pêşenga bipêşxistina huner û zanistê tê nasîn. Di sala 1186'an de wê medreseya al-Şamiyah al-Kubra li Şamê vekir. Wê mamosteyên herî baş anîne medresê û wê nehiştiye ew di heman demê de li cihên cuda jî dersan bidin. Ji ber ku wê xwest, mamoste baş bi xwendekarên xwe re elaqedar bibin. Sitt al-Şam tevahiya mal û milkê xwe dayê xebatên perwerdeyê. Li mala xwe wê mesdreseyeke din saz kiriye ku bûye medreseya pêşîn a Şamê.

Dîsa di dema Eyyubiyan de ji bo bipêşxistina warê perwerde û zanistê li Sûriyê û Misrê xebatên girîng hatine kirin, dibistan û weqf hatine avakirin. *Um Şems el-Mulûk* yek ji van jinan bû ku ev kar kirine. Wê li keleka gola Xatûniyê nêzîkî Hesekê medreseya yekem a keçan damezrand. Piştre wê pêşengiya avakirina medreseyên din li Heleb, Hema, Şam û Qahirê jî kiriye.

Rista girîng ku jinên Ereb di mijarên perwerde û zanistê de pê rabûne, bandora xwe domand. Di sedsalên 19 û 20'an de jinên rewşenbîr, xwendekar û nivîskar, fikir û çalakiyên xwe di mijarên azadiya jin û civakê de bi pêş xistine. Bi taybetî ji salên 1930'î – 40'î ve jinên Ereb di tevgerên neteweyî û li dijî mêhtingeriyê de jî daxwaza mafên jinê û wekheviya zayendan daîmî her tim anîne rojevê. Di vî warî de *Thuraya al-Hafiz* bi têkoşîna xwe ya siyasî ji bo mafên jinê li Sûriyê navdar bûye.[124] Lê bîrdoziya neteweperest a pan-erebîtiyê bandora xwe jî li ser siyasetmedar û tevgerên jin ên Ereb kiriye. Nêrînên nijadperest ên hebûn û nasnameyên jinên pêkhateyên din li Sûriye înkar dikir, di bipêşxistina tifaq û têkoşînên hevbeş de dibûn asteng.

Hevjiyana Gelan û Şovenîzma Dewletê

Qebîleyên *bedewî* wek tebeqeya jêrîn ya qewmê Ereban li ser erdnîgariya Rojhilata Navîn belav bûne. Ew bi pirranî ji derveyî pergala şaristaniyê mane; wan weke koçer û gundiyên deşt û çolan şêwaza jiyana eşîrtî ji xwe re esas girtiye. Eşîrên bedewî mîna Şemerî, Teyî, Şerabî, Înla û wekî din bi vî rengî bi sedan salan li herêmên Cizîrê, Mûsilê û Firatê jiyane. Pevçûnên demî di nav wan bi xwe de, an jî bi eşîrên Kurd re bi pirranî di bin bandora hêzên derve de qewimîne. Dîsa hinek eşîrên Kurd û Ereb hevalbendên xurt bi tekoşîneke hevbeş li hemberî dagirkeriyên Osmanî û Fransiyan ava kirine. Di salên 1920-21'ê de serhildana hevpar a gelên Kurd, Ereb, Elewî û Dûrziyan li hemberî mêhtingeriya Fransa li herêmên Çiyayê Zeviyê û Helebê bi pêşengiya Îbrahîm Hanano bi pêş ketiye. Di encama vê tekoşîna hevbeş de, arteşa Fransa neçar maye ku hêzên xwe ji Bakurê Sûriyê vekişîne.

[124] Tharwat Al-Batawi: *Frauen und arabisch-islamische Bildung - Pionierinnen der Wissenschaften*, Malpera Qantara, 29-05-2017

Piştî damezrandina dewleta Sûriyê wekî 'Komara Ereb a Sûriyê' neteweperestiya Ereb him wekî şêwazeke berxwedanê li hemberî împeryalîzm û siyonîzmê, him jî wekî amûrekî şovenîzmê dihat bi kar anîn. Hemwelatiyên Sûriyê hemû êdî wekî 'Ereb' dihatin pênasekirin. Eşkerekirina nasnameya gelên cuda wekî tehlûke dihat hesibandin. Xewla Diyad, jineke Ereb ji Til Temirê bandora vê siyasetê dinirxîne: *"Me got, Kurd wê netewa me ya Ereban hilweşînin. Ew ê bixwazin dewleteke Kurdan ava bikin û wê gelê Ereb nas nekin. Li bin navê netewperestiya Ereb dewleta Sûriyê siyasetên pirr qirêj meşandin da ku Kurd û Ereban ji hev dûr bixin."*[125]

Dewleta Sûriyê di çarçoveya siyaseta 'El-Hîzam el-Erebî' de Erebên xizan ku gundên wan di bin golên bendava Firatê de hatine hiştin, bi taybetî li herêma Cizîrê bicihkirin. Bi vî rengî hikûmeta Beesê siyaseta xwe ya neheq li ser herdu gelan meşandiye û xwestiye şovenîzma xwe bi pêş bixe. Ruxmê vê yekê jî danûstandina çandî û civakî ya di nav gelan de bi pirranî dewam kiriye. Helîma, jineke Ereb a ji Hesekê dibêje: *"Berê her sê milet yanî Kurd û Ereb û Suryan di sinetkirina kurikan de xwe digihandin hev û dibûn kirîvê hev. Wisa milet gelekî nêzî hev dibûn, weke birayê hev dibûn. Dema mirov baş binêre, em hemû - çi Kurd, Ereb an Suryan - cilê Meryem Elezra li xwe dikin. Sê rengê vî hene: qehweyî, şîn û sor. Li cem Kurdan, dema kurik nexweş dibû, wî dibirin dêrê ji bo temîdê. Dema em piçûk bûn heya niha em tev cîranên xwe diçûn cejna Newrozê. Hinek xelk hebûn, li vê tiştî dinêrîn: ka ev Kurd e, ev Ereb e. Lê gelek kes hene tevlî hev dibûn, weke eşîr û malbata me. Gelek kesan digot 'hûn bûne Kurd'. Me gelek jin ji Kurdan anîne û dane wan jî. Ti cudahî em di navberê xwe û Kurdan de nabînin."*[126]

Li gundan ku malbatên Kurd û Ereb ji sê nifşan zêdetir e di nav hevdu de jiyane, pirraniya şêniyên gundan bi herdu zimanan jî dizanin. Li ser vî bingehî berxwedana hevbeş a QSD'ê li hemberî faşîzma DAIŞ'ê û ji bo Sûriyeke demokratîk pêkan bûye. Tê texmînkirin ku beriya 2011'an hejmara Erebên li Rojava qederê 300 hezarî. Lê piştî vê ji ber şer û pêlên koçberiyê ber bi Bakurê Sûriyê ve, ev hejmar gelekî zêdetir bûye.[127]

- **Gelê Tirkmen**

Pirraniya elên ***Tirkmen*** ji sedsala 11'an û şûn ve, ji Asya Navîn hatine Bakurê Sûriyê. Çavkaniyên nivîskî yên herî kevnar derbare qewmên Tirk û Tirkmen de li Çînê hatin dîtin û xwe dispêrin sedsala 6'emîn PZ. Qebîleyên Tirk li ser erdnîgariya Asya Navîn wek koçer jiyane û baweriya xwe bi şamanîzmê dianîn. Di serdema xelîfên Ereb de pirraniya Tirkmenan ola Îslamê hebandine. Li bin desthildarên cuda, Tirkmen wekî hêzên leşkerî dihatin şuxilandin.

Tirkmenên ku di serdema Selçûqiyan de hatin herêma Bakurê Sûriyê, pêşî li gundê Qereqozaqê yê ser bi Kobanê bi cih bûne. Ji wir pirraniya wan li ser rêya çemê Firatê derbasî Anatolyayê bûne. Beşeke din jî li ser herêmên Bakurê Sûriyê hatin belavkirin û bi taybetî xwe li bajar û navçeyên Şehba, Minbic û Girê Spî bicihkirin. Navên hinek gund û bajarokên li wan herêman wek Hemmam el-Turkman şahidê vê pêvajoyê ne. Dîsa di serdema Împaratoriya Osmanî de sultanên Osmanî, Tirkmen li cihên stratejîk wek Lazqiyê, Heleb, Hims û Hemayê li gorî berjewendiyên xwe li ser

[125] Hevpeyvîn bi Xewla Diyad re, Til Temir, 2019

[126] Nîqaş bi endamên Kongra Star re, Heseke, 2017

[127] Nazdar Ebdî, Îdrîs Ebdullah: *Dosya Rojava-3, Deryaya deng, reng û baweriyan,* ANHA, 20-02-2016

erdnîgariya Sûriyê bicihkirine. Gelek wargehên Tirkmen ji aliyê arteşa Osmanî ve wekî bargehên dihatin sêwirandin.

Lê belê pirraniya Tirkmenên li Sûriyê dîsa li ser bingehê qebîletî û koçeriyê jiyane; debara xwe bi xwedîkirina sewalan kirine. Tirkmen dibû nasnameya el û tebeqa Tirkên xizan û kedkar yên ku li derveyî pergala desthilatdariyê mane. Beramberî vê, çîna serdest ya begên Tirk ên Selçûqî û Osmanî nasnameya 'Tirk' wekî nasnameya qewmî ya serdest bi pêş ve birin.

Pirraniya Tirkmenan baweriyên Elewîtî û Şîîtiyê pejirandin. Lê belê Tirkmenên ku li Sûriyê ne bi pirranî Sunî ne. Piştî damezrandina Komara Sûriyê, dewleta Sûriyê Tirkmen tenê wek 'gelê Misilman' hesibandin, lê wek pêkhateyeke neteweyî pênase nekiriye. Endamekî Tirkmen yê desteya hundirîn a Meclîsa Sivîl a Minbicê qal dike: *"Di dema nîzama Beesê de her tişt di destê Ereban de bû. Wekî Kurdan, em jî wekî Tirkmen tine bûn. Di saziyan de em tine bûn, zimanê me qedexe bû. Daimî em di bin çavê istîxbaratê de bûn."*[128] Li aliyê din dewleta Tirk jî her tim xwestiye hebûna Tirkmenan li Sûriyê ji bo siyaseta xwe ya nijadperest û dagirker bi kar bîne. Lê çand û rastiya jiyanê ya pirraniya Tirkmenan destûr nedaye van hewldanan. Ew weke civak danûstandin û jiyana komînal bi gelên din ên herêmê re ji xwe re esas digirin.

Li gorî hinek lêkolînan li tevahiya Sûriyê derdora 100 heta 200 hezar Tirkmen hene. Ji wan derdora 15 hezaran li herêmên Rojava dijîn.[129] Lê belê wek gelek pêkhateyên din jî, Tirkmen encax bi pêvajoya şoreşê û avakirina rêveberiya xweser li herêmên Bakurê Sûriyê yekem car dibûn xwedî mafên xwe yên çand û ziman. Nûnerekî Tirkmen hestên xwe dema damezrandina Meclîsa Sivîl a Minbicê di 5ê Nîsanê 2016àn de wiha îfade kirine: "*Dema ku Meclîsa Sivîl a Minbicê hat avakirin, cara yekem di cîhanê de her kesî bi zimanê xwe sond xwar. Kurd bi Kurdî, Çerkes bi Çerkesî, Tirkmen bi Tirkmenî... Wê demê hêsir ketin çavên min, ji ber ku cara yekem di parlamena vir de her kes bi zimanê xwe axivî."*[130]

- **Gelê Çeçen**

Çeçenên ku li Bakurê Sûriyê dijîn, di dawiya sedsala 19'an de ketine ber komkujiya Împaratoriya Rûsan û koçber bûne. Rastiya gelê Çeçen yê ku ji warê xwe yên çiyayên Qefqasyayê hatiye koçberkirin, ji aliyê dîrokê ve dişibe gelên Rojhilata Navîn. Wekî avabûna girên li deştên Mezopotamyayê bingehê girên Qefqasyayê di serdema neolîtîk de bi şoreşa çandînî hatibû avakirin. Ew gir wek 'Kurgan' tên binavkirin. Li gorî çîrokan, gelek bûyerên dîrokî li çiyayên Qefqasyayê qewimîne. Her wiha gelên Qefqasyayê xwediyê jiyana komînal û exlaqî bûn. Mêvanperwerî nirxekî esasî yê vê çanda pirrneteweyî, pirrolî û pirrzimanî ye. Bi vî rengî çil gelên niştecih yên kevnar û koçeran bi hezaran salan bi hev re jiyane. Ax û çavkaniyên dewlemend yên herêmên Qefqasyayê dubare dibûn hedefa qirkirin û dagirkeriyên hêzên hegemon yên wek Helen, Roma, Bîzans, Ereb, Fars, Moxol, Tirk û Rûsan. Lewma zêdetirî du hezar salan e ku gelên niştecih ên Qefqasyayê ji bo azadiya xwe li ber xwe didin. Li gorî texmînan di şerên salên 1763 - 1864'an

[128] Hevpeyvîn bi Ismet re, endamê Tirkmen yê desteya hundirîn a Meclîsa Sivîl a Minbicê, 2017
[129] Nazdar Ebdî, Îdrîs Ebdullah: *Dosya Rojava-3, Deryaya deng, reng û baweriyan,* ANHA, 20-02-2016
[130] Hevpeyvîn bi Ismet re, endamê Tirkmen yê desteya Hundirîn a Meclîsa Sivîl a Minbicê, 2017

de di navbera gelên Qefqas û Împaratoriya Rûs de nîv mîlyon insanên Qefqasî jiyana xwe ji dest dane û ji mîlyonekê zêdetir jî ji cih û warên xwe hatine kirin.

Çeçenan hêza xwe ya berxwedanê ji exlaq û pergala qebîle û eşîrtiyê wergirtiye. Di bawerî û kevneşopiyên resen yên Çeçenan de hişmendiya civaka xwezayî pirr diyar e. Pîrozkirina rojê di vê baweriyê de esas e. Li cem xwedayên cuda yên xwezayê, xwedawendên weke xwedawenda bereketê Tuşolî, xwedawenda malê Erda, xwedawenda heqîqetê Dika-Dela û xwedawenda aştiyê Kchoxa-Dela hene. Heya sedsala 18'an desthilatdarên Gurcistan, Rûsya yan jî Dêra Xirîstiyan a Ortodoks nikaribûn Çeçenan bikin Xirîstiyan; ne jî Xelîfeyên Ereb karibûn Çeçenan bikin Misilman. Lê belê di dawiya sedsala 18'an de sofiyên terîqetên Neqşîbendî û Qadirî ji Daxistanê hatine û bandora xwe li ser wan kirine. Bi vî awayî Çeçen tevlî berxwedana rêberên olî yên Daxistanê yên weke Îmam Şamîl bûne li hemberî êrîşên dagirker ên Împaratoriya Rûsya. Di encamê de bi piştgiriya Osmaniyan Çeçen û Daxistaniyan di sala 1834'an de dewleteke olî li ser bingehê şerîetê ava kiriye û bi hev re li dijî êrîş û komkujiyên Rûsyayê têkoşiyane. Lê belê bi tepisandina serhildana wan di sala 1859'an de nêzîkî mîlyonek Çeçen bi darê zorê hatine mişextkirin. Wan jî berê xwe daye deverên di bin serweriya Osmaniyan de. Piştî pênc salên koçberiyê, wan bi zor û zehmetiyan xwe gihand Bakurê Sûriyê. Dewleta Osmanî zêdeyî 12 hezar malbatên koçber ên Çeçen li herêma Serêkaniyê bicihkirin, lê gelek kes ji ber nexweşiyan mirine. Di vê serdemê de Çeçenan li Serêkaniyê dest bi çandiniya avî kiriye û cara yekemîn li herêmê pembû çandine. Bi vî rengî wan di hêla hilberînê de pêşketinên nû anîne herêmê.

Îro jî Çeçen bi dilsoziya xwe ya bi ola Îslamê re tên nasîn. Lê belê di hinek milan de hîn jî şopa çanda xwedawendan di jiyana Çeçenan de zindî ye. Nêzîra, jineke Çeçen a ji Serêkaniyê dibêje: *"Jin niha bi hêz in. Ew dikare parastina mafê xwe bike û çareseriye di navbera malbata xwe û eşîran de ava bike. Ruxmê adet dibêjin, divê li nêrîna zilamê bi temenê mezin tenê were guhdarîkirin, bi taybetî di mijara çareserkirina pirsgirêkên civak, eşîr û malbatan de jin esas tê girtin. Ji ber ku her kes bi edaleta jinê bawer dike."* Heta niha nifşê kal û pîran zimanê xwe, çand, govend, xwarin, cil û bergên ku ji welatê xwe anîne parastine. Lê belê Çeçenên ciwan di warê ziman de bi pirranî asîmîle bûne. Ew bi pirranî bi zimanê Erebî û carinan jî bi Kurdî diaxivin. Di pergala Xweseriya Demokratik de hewldanên nû ji bo fêrbûn û xwendina zimanê Çeçenî ji nû ve hatine destpêkirin.

Beriya şer û pevçûnên dawî yên li Sûriyê û Rojava li herêma Serêkaniyê qederê 5000 Çeçen hebûn. Li gorî texmînan niha bi qasî 2500 kesî mane.[131] Çeçenên Serêkaniyê ji du qebîleyan pêk tên: Aştoyî û Nexç. Nexç jî bi pirranî li bajêr dimînin. Hejmara qebîleyên Aştoyî ku bi pirranî li gundên derdora Serêkaniyê bi cih bûne ji Nexçiyan zêdetir e. Çeçenan bi nûnerên xwe cihê xwe di avakirina xweseriya demokratîk de girtiye û di saziyên wê de cihê xwe digirin.

- **Gelê Çerkes**

Çerkes pêkhateyeke din ya ku ji ber zordarî û qirkirinên çarên Rûsyayê ji Qefqasyayê di sedsala 19'an de koçber bûne û hatine Bakurê Sûriyê.

Çanda Çerkesan jî xwe dispêre baweriya pirrxwedayî û exlaqê civaka xwezayî. Gerdûn, xweza û tevahiya zindiyan pîroz hatine dîtin û parastin. Her qebîle an jî malbat xwedî dareke pîroz bûye ku

[131] Bêrîvan Osman: *Çeçenên Rojava li ku ne û ji ku ve hatine?*, ANHA, 19-10-2016

wek cihê civîn û biryardayînê hatiye bi kar anîn. Bêyî biryara meclîsa kal û pîran *'Xase'* darek nikare were jêkirin. Gelê Çerkes ji 12 eşîran pêk tê. Di pirraniya eşîran de pergaleke hiyerarşîk ya tebeqeyên civakî heye. Lê eşîrên ku li çiyayên bilind yên Qefkasyayê jiyane, bê cudahiya tebeqayan pergala civaka demokratîk û exlaqî meşandine. Tevahiya eşîran jiyan û civak li gorî zagonên nenivîskî *'Adyge Xabze'* bi rê ve birine. Hûrmet û bawerîanîna bi hev, berpirsyarî, disîplîn, mêvanperwerî û destvekirîbûn weke hîmên şerefê dihatin dîtin. Çavbirçîbûn, dewlemendî yan jî xwe mezin dîtin, şerm hatine hesibandin. Lewma desthilatdarî ti carî di destê elîtekê de kom nebûye û pêşiya dewletperestiyê hatiye girtin.

Qebûlkirina nasname, wêrekî û mêrxasiya zilam di nava civakê de li gorî van pîvanan hatiye nirxandin. Girêdayî van pîvanan taybetmendiyên jinê weke nazikbûn, biedeb û dilnizmî wekî exlaqê civakî hatine pênasekirin. Hurmetdayîna jin û ixtiyaran rêgezên civakî bûn. Lewma cihê ku jin lê hebe pêwîst bû ku şer û gengeşe lê bisekinin. Bi vî awayî jin di navbera kesan de yên ku ji hev dûr ketîne û ji hev aciz bûne, bûn hêz û vîna lihevanînê.

Di sedsala 5'an de di bin bandora Bîzansê de pirraniya Çerkesan bûne Xirîstiyan. Lê belê wan di heman demê de exlaq û kevneşopiyên baweriya xwe ya kevnar jî diparastin. Di bin bandora Teteran de baweriya Îslamê di nav gelê Çerkes de belav bûye. Di roja me ya îro de pirraniya Çerkesan Sunî ne, lê komek Xirîstiyanên ortodoks jî di nava wan de hene.

Eşîrên Çerkes jî di têkoşînên azadiyê yên gelên Qefqasyayê de xwedî risteke girîng bûne. Di roja 21'ê Adara 1864'an de kozika dawî ya berxwedana gelên Qefqasyayê ku 101 salan ajot, li hemberî arteşa mêhtinger a Rûsyayê têk diçû. Piştî vê, gelê Çerkes bi qirkirin, zordarî, êşên penabertî û mişextiyê re rû bi rû bûye. Nêzîkî mîlyonek Çerkesî ji ber van kiryarên dewleta Rûsyayê jiyana xwe ji dest dane. Bi sed hezaran Çerkes koçî welatên di bin serweriya dewleta Osmaniyan de kirin. Osmaniyan li gorî siyaseta xwe ya jeo-stratejîk ew bicihkirine. Piştî salên dirêj û zehmet, li ser rêyên koçberiyê, beşeke Çerkesan gihîşt Bakurê Sûriyê. Pirraniya wan li deverên Serêkaniyê, Minbic û Şehbayê hatine bicihkirin.

Di sala 1879'an de Osmaniyan çend malbatên Çerkes anîne Minbicê. 600 salên beriya wê, bajarê Minbicê di êrîşên Moxolan de hatibû hilweşandin. Hingê Osmaniyan erka ji nû ve avakirina bajêr da Çerkesan. Bi vî awayî wan dixwest li pêşiya serhildanên êlên Bedewî bigirin ku li dijî desthilatdariya Osmaniyan rûdidan. Her çiqas di serî de alozî di navberê êlên Ereb û Çerkes de derketibin jî, di demeke kin de bajarê Minbicê weke navendeke nû ya aborî û ronakbîriyê bi pêş ketiye. Sala 1932'an serjimara Minbicê 2000 bûye. Ji wan jî 800 Çerkes bûn û 100 Ermenî bûn ku ji komkûjiyên Osmaniyan xilas bûne.

Heta êrîşên DAIŞ'ê jî, qederê 300 kesî yan jî 12 binemalên Çerkes ji êlên Hetqo, Maratqo, Ktaw, Leêş, Bexwaşa, Ol û Beydanoqa li Minbicê jiyane.[132] Piştî ku şervanên QSD, YPG û YPJ'ê bajar di 12'ê Tebaxa 2016'an de rizgar kirin, xelkê bajêr careke din bajarê xwe ava kirin. Tevî eşîrên Çerkes pêkhateyên Ereb, Kurd, Tirkmen û Ermenî çand û serpêhatiyên xwe, di rêveberî û dezgehên xweseriya demokratîk de tevlî xebatên avakirina neteweya demokratîk dibin.

- **Qewmên Mitirb û Mehelmî**

[132] Şîlan Mihammed: *Minbic li hêviya siberoja azad e*, ANHA, 02-06-2016

Pêkhateyeke din ku li ser axa Bakurê Sûriyê dijî, wek '***Mitirb***' tê binavkirin. Pêşî peyva 'Mitirb' wek çêrr (gotina heqaretê) li hemberî vî gelî hatiye bi kar anîn. Lê di roja îro de kesên ji vî qewmî ne bixwe bi gotina 'Mitirb' xwe didin nasandin. Koka wan ji qebîleyên gelê Roman tê. Ew di sedsala 11'an de ji ber zextan li warên xwe ji Hindistanê derketine û derbasê herêmên Împaratoriya Bîzansê bûne. Qebîleyên Roman koçî welatên Rojhilata Navîn, Bakurê Efrîka û Ewropayê kirine û li tevahî cîhanê belav bûne. Wan jiyana xwe bi çanda eşîrtî bi rê ve biriye û bi taybetî bi muzîk û govendên xwe hatine naskirin. Zimanê gelên derdor bandora xwe li ser ziman û devokên Romanî kiriye. Qewmên Roman, bi pirranî di rewşa gerrokbûnê de jiyane û li tevahî cihan rastî nijadperestiya desthilatdaran û gelên xwecihî hatine. Bi taybetî li Ewropayê siyasetên qirkirinê li ser Romanan hatine meşandin. Qewmên Roman yên li welatên Rojhilata Navîn wekî li Efxanistan, Îran, Tirkiye, Libnan, Urdin, Filistîn û Sûriyê bi sedan salan jiyana xwe domandine. Li vir jî gelek caran zext û cudakerî li dijî wan hatiye kirin. Lewma gelek Roman asîmîle bûne, ola Îslamê û nasnameyên dewletên li wan dimînin, girtine. Li Sûriyê di bin desthilatdariya Hafiz Esed de ew bi darê zorê li hinek herêman hatine bicihkirin. Li gorî raporên dewletê di salên 1960'î de li Sûriyê, 100 – 250 hezar Mitirb hebûn. Zilamên Mitirb di çêkirina bêjingan û hesinkariyê de pispor bûn. Jinên Mitirb bi çanda deqkirinê û zanîna tiba xwezayî dihatin nasîn. Gelek jinên Kurd li herêmên Qamişlo, Amûdê û Serêkaniyê gotin, deqên wan jinên Mitirb çêkirine. Ji ber ku Mitirb li Rojava belav in, çanda wan hatiye helandin. Dîsa dibe ku ji ber pêşhukmên civakê, wan xwe wekî pêkhateyeke Bakurê Sûriyê bi nasnameya xwe birêxistin nekiriye.

Her wiha çend malbatên ***Mehelmî*** li Rojava dijîn. Mehelmî bi Erebî diaxifin, lê di zimanê wan de gelek peyvên Kurdî jî hene. Baweriya wan Îslama Sunî ye. Di nava civaka Mehelmî de çanda dîroka devkî û stranbêjî xwedî wateyeke girîng e. Li ser koka Mehelmiyan teoriyên cuda cuda hene: Li gorî teoriya yekem; ew Ereb in. Xelîfe Harûn el-Reşîd, ew di sedsala 8'an de ji herêma Kerkûkê wek leşker veguhestine herêma Merdînê. Pirraniya Mehelmiyan dîroka xwe bi vî rengî şirove dikin.[133] Li gorî teoriya duyemîn jî, koka Mehelmiyan xwe dispêre gelên Aramî ku di encama Seferên Osmaniyan ên di sedsala 16'an de ew bi darê zorê hatine bişaftin bi vî rengî Misilmantî û zimanê Erebî li ser wan hatiye ferzkirin.[134] Li gorî teoriya sêyem koka Mehelmiyan Kurd e. Ew di sedsala 7'an de bi ketina artêşa Îslamê ya Emewiyan a Kurdistanê hatin bişaftin û bûne Erebên Misilman.[135]

Çiqas teoriyên cuda jî hene, ev yek misoger e: Mehelmî heta serhildanên Kurdan di destpêka sedsala 20'an de tenê li 51 gund û bajarokên herêmên Êlih û Mêrdînê jiyane. Piştî tepisandina serhildana Şêx Seîd koçberiya Mehelmiyan dest pê kiriye. Beşek ji wan hatine Rojava, lê pirraniya wan derbasî Libnanê bûne. Dema şerê Libnanê di salên 1980'yî de dîsa bi hezaran Mehelmî koçber bûne û hinek ji wan dîsa hatine Rojava. Gelek Mehelmî wê demê li herêma Hesekê bi cih bûne.

1.3. c) Bawerî û Olên Mezopotamyayê

Bakurê Sûriyê bi pirrengî, pirrçandî, pirrzimanî û pirrneteweyîbûna xwe di heman demê de xwediyê ol û baweriyên cuda ye. Bawerî û merasîmên pîroz di bipêşketina civakîbûnê de li Mezopotamyayê bi risteke girîng rabûne. Her serdemek li gorî dema xwe çandeke manewî û

[133] Fred Donner: *Tribe and state in Arabia*, 1981

[134] John Anthony Brinkman: *A political history of post-Kassite Babylonia, 1158–722 B.C.*, 1968

[135] Lokman I. Meho, Farah W. Kawtharani: *The Kurdish community in Lebanon*, 2005

bawerî bi pêş xistiye. Şopên vê yekê li Til Xelef, Efrîn, Orkêş, Endîwer, Girê Spî, Minbic û gelek deverên din xuya dikin. Ji totem û çanda xwedawendan bigire heta olên yekxwedayî, cûr bi cûr mezheb û baweriyên din li ser vê axê jiyane û hebûna xwe di kevneşopiyên gelan de parastine. Heta roja îro nirx, adet û baweriyên olî di exlaq û jiyana gelên Rojhilata Navîn de cihekî navendî digirin. Mirovên bi baweriyên cuda di nav hev de û li kelekê hev de wekî cîran jiyane. Navên şûnwar û gundan wekî Girê Dêra, Nebî Sadî û Xirbê Cihûyan ku li herêma Girkêlegê her sê li cem hev in, rastiya çanda pirrolî didin xuyakirin.

- **Êzdayetî**

Çavkaniyên Baweriya Êzdayetî

Êzdayetî ola herî kevnar a Mezopotamyayê ye. Wê navê xwe ji peyva 'Ezdayî' bi wateya '*Xwedayê ku ez dame û afirandime*' girtiye. Çand û baweriyên civaka xwezayî dibûn kok û hîmên vê baweriyê. Êzdiyan, roj wekî nûra Xwedê diperêsin. Nûr ango ronahiya Xwedê dibe destpêka rastîyê, bingeh û kaniya ruhê mirovan. Êzdayetî ola qedîm a Kurdan e û di nav hezaran salan de çend qonax derbas kirine: Ji pîrozkirina agir û rojê, her wiha nirx dayîna çar cewherên gerdûnê: ax, av, ba û agir*;* hebûna du xwedayan – yek baş û yek xerab – heta baweriya bi yek xwedayê baş û melayketa sereke Tawisî-Melek. "*Di ola me [a Êzdî] de dibêjin: Xweda însan wek xwe çêkiriye. Tişta herî pîroz Xweda daye însan ku bihizire, bi çavên xwe meyze bike û di riya rast de bimeşe. Dema Xweda însan çêkiriye, ji bo xêrê çêkiriye ku însanekî aştîxwaz be û hezkirî be."*[136]

Pîrên Êzdî û hinek dîroknas destnîşan dikin ku baweriya Êzdayetî xwe dispêre eşîrên Xaltî yên ku di salên 1500'î BZ'yê de li derdora Gola Wanê û quntarên Çiyayê Araratê jiyane û li ser erdnîgariya Kurdistanê belavbûne.[137]

Zerdeştî

Li ser bingehê baweriya Êzdayetiyê di serdema Împaratoriya Medyayê derdora salên 550'yan BZ'yê de li herêma Urmiyê fîlozof û zana rabûn ên ku xwestin nûbûnan di baweriya gelan de biafirînin. Vana di kesayeta Zerdeşt de navdar bûn û bi yekkirina têgihîna Xwedê di kesayeta yezdanê baş Ahuramazda de şoreşeke mezin a zêhnî, exlaqî û civakî di dema xwe de bi pêş xist. Pirtûka pîroz a Zerdeştiyan *Avesta* ye. Di nava 300 salan de pirraniya gelên li herêmên çiyayên Zagros, Toros û Îranê Zerdeşt wekî pexember û ramanên wî wekî baweriya Zerdeştî pejirandin.[138]

Gelek rêûresmên Êzdatiyê û Zerdeştiyê wekî pîroz dîtina agir û rojê dişipên hev. Lê belê zanyarên Êzdî bal dikişînin ku herdu ol ji hev cuda ne û di gelek mijarên bingehî da nêrînên wan dijberî hev in. Êzdî bi taybet kesandina ruhê rûxîner û bedxwaz di kesayeta Ehrîman de wekî guneh dihesibîn. Li aliyê din tê texmînkirin ku Zerdeşt ji bo belavkirina baweriya xwe, tifaq li gel şahên Pers çêkiriye û bi rêya desthilatdariyê xwestiye gel qaneh bike. Di serdema xanedantiya Sasaniyan de

[136] Hevpeyvîn bi Gulê Cafer re, endama Yekîtiya Jinên Êzdî li Efrînê, 2017

[137] E. Cemîl Paşa: *Dîroka Kurdîstan bi kurtebirî-Enstituya Kurdî ya Brukselê* 1995; Kemal Tolan: *Kurtiyek ji dîroka Êzdiyên li rojavayê Kurdistanê,* 2013

[138] Dr. Mihemed Ebdo Elî: *Êzdî û Êzdiyetî Li Bakur Rojavayê Sûriyê*, Efrîn, 2008

ola Zerdeştî bûye ola fermî ya dewletê. Lewma beşeke Êzdiyan, Zerdeşt bi berovajîkirina olê û eşkerekirina sirrên Êzdiyan ji desthilatdarên Fars re tawanbar dikin.[139]

Li hinek herêman bi taybet li Rojhilatê Kurdistanê him gundên Êzdiyan him jî yên Zerdeştiyan hene. Girêdayî daneyên arkeolojîk wekî yên pîrozgeha Qerecurnê, Girê Endarê û gundê Kîmarê yên li herêma Efrînê lêkolîner rave dikin ku baweriya Zerdeştiyê hê jî di sedsala 600'an beriya zayînê gihandibû Çiyayên Kurmênc.[140] Li ser bandora ola Zerdeştî gelek nêrînên cuda hebin jî, hevseroka Komeleya Êzdiyên Efrînê Gulê Cafer vê mijarê wiha şirovedike: "*Li gorî me, Êzdî ji Zerdeştî kevntir in. Ji ber ku Zerdeşt di dema koledariyê de derketiyê. Ew ji tebeqeya pîra ye. Di demekê de ku vîna însan û civakê lawaz bûbû, wî carek din îradeya însanan vegerand. Zerdeşt îradeya civakê û jinê derxist holê. Ev vîn heya niha di jinên Kurd û Îraniyan de heye, ji ber ku ew bi Zerdeşt bandor bûne. Ema heya niha li gel me [Êzdiyên Efrînê] û Êzdiyên Şengalê nakokî hene, ji ber ku ew dibêjin: Zerdeşt ola me belav kir û agahî dane Farsan."*[141]

Di sedsala 7'an de xelîfeyên Ereb bi seferên leşkerî êrîş anîn ser welatên Kurdistan, Sûriyê û Îranê bi armanca Misilmankirina gelên bi baweriyên wekî yên Zerdeştî, Êzdî û Mesîhî. Di encamê de ola Zerdeştî ji ber êrîş, komkujî û rûxandina Împaratoriya Sasanî pirr lawaz ketiye û ola Îslamê li herêmê serwer bûye.

Ola Nûjen a Êzdiyan

Êzdî *Mishefa Reş* û *Kitêba Cilwa* wek pîrtûkên xwe yên pîroz dihesibînin. Lê belê di êrîşên qirkirinê yên li hemberî Êzdiyan de ev pirtûk yan hatin şewitandin yan jî revandin. Lewma ji pirtûkê zêdetir civaka Êzdî bawerî û zanîna xwe bi devkî di qesîde, dua, beyt, jandil û qewlan de parastine û parve kirine.

Enver, Êzdiyek ji gundê Gundorê yê Amûdê dibêje: "*Pirtûka me nîne. Cem me dibêjin 'ilmê me ser dilê me ye'. Yê ku daye, em jê re dibêjin 'baba qewla'. Wî qewlan bi zarokên xwe didan fêrkirin. Niha ev qewlên me, duayên me, beytê me, rêûrismê me, winda dibin."*[142]

Cîrana wî jî lê zêde dike: *"Newêribûn binivîsandina ji ber ku gelek ferman hatin ser serê wan; wê ew jî bihata şewitandin. Ji ber wê di singa xwe de veşartine. Ew gotinên kevin hebûn. Me kir û nekir, nedan me. Bi xwe re birin dema ku mirin. Ilmê devkî çawa ye? Ew, yek dide ya din. Dibe ku ew tişt werin jibîrkirin û kes li gorî xwe tiştina li ser zêde bike. Bi vî rengî gelek guhertin ketine ola Êzdiyan."*[143]

Şêxadî ango Şêx Adî kurê Misafir di dawiya serdema Ebbasiyan a destpêka sedsala 12'an de bi armanca parastina ol û hoza Êzdayetiyê rabû. Bi bandora felsefeya rojhilatê û sofîtiyê wî guhertinên bingehîn di rêûresma olê de pêk anîne. Şêxadî xwe gihand xelkê gelek herêmên Kurdistanê. Wiha wî pergala baweriyê û qeydeyên bawermendên Êzdî misoger kiriye û ji gel re

[139] Hayri Demir: *Çarşema Sor – Das ezidische Neujahrsfest*, 2011

[140] Dr. Mihemed Ebdo Elî: *Êzdî û Êzdiyetî Li Bakur Rojavayê Sûriyê*, Efrîn, 2008

[141] Hevpeyvîn bi Gulê Cafer re, endama Yekîtiya Jinên Êzdî li Efrînê, 2017

[142] Hevpeyvîn bi Enver re, gundê Gundorê yê Amûdê, 2017

[143] Hevpeyvîn bi jinên Êzdî re, gundê Qizlarçox yê Amûdê, 2017

ragihandiye. Di serî de Kurdên li Şêxan, Şengal, navçeyên din ên li deşta Mûsilê û li çiyayên Hekariyê Sexadî wek pêxamberê Êzdiyan pêjirandiye. Ji wir baweriya Êzdatiyê belav bûbû û gihiştibû heta Gola Wanê û Rojhilatê Kurdistanê, heta Heleb û Efrînê li Rojavayê Kurdistanê. Ji wê demê ve Lalişa Nûranî bûye perestgeh û navenda pîroz a baweriya Êzdiyan.

Navê Lalişê ji peyvên 'Lal' û '[H]iş' pêk tê ku mirov dikare wekî 'cihê fikirandina bêdeng' şirove bike. *Qewlê afirandina qinyatê* dibêje, Xweda li Lalişê sekinî û got: "*Eve heq war e!*" û havên avêt behrê. Tê gotin Xweda li Lalişê heft firîşte û ezman, kaniya spî û piştre jî qalibên Adem û Hawa ji ax, av, ba û agirî afirandin. Piştî wefata Şêxadî li Lalişê Quba Şêxadî, duvre jî qubên Melek Şêxsin, Şêx Mûsê Enzelî, Şêx Mişeleh, Şêşims û Şêx Mend hatin çêkirin. Ew bûn cihên pîroz ên rêûresmên Êzdiyan. Heta roja îro yekîtiya manewî û têkiliyên civaka Êzdî li derdora van cihên pîroz hatine parastin.

Ferzên Heqîqetê û Rêûresmên Civaka Êzdî

Xweşbînî û rêzgirtina tevahiya mirov û baweriyên wan, hîmên girîng yên Êzdiyan in. Gelê Êzdî ti carî hewl neda ku bibe desthilatdar ango ku serweriya xwe li ser qewm an jî baweriyeke cuda ava bike. Jixwe, Êzdatî ne baweriyek e ku bi rêya qanehkirinê tê belavkirin. Zarokek bi jidayikbûna xwe ji dayik û bavekî Êzdî, dibe Êzdî. Lê piştre jê tê xwestin ku ew li ser sê bingehên sereke - jê re dibêjin *sê herf* - û li gorî ferzên heqîqetê û baweriyê jî bijî.

Ferzên heqîqetê berpirsyariyên civakî û manewî li beramberî hev diyar dikin. Ew bûne bingehê domandina rêgez û pergala civaka Êzdî. Li gorî pênc ferzên heqîqetê divê her Êzdiyek xwedî pîr, şêx, hosteyê ruhanî, mamosteyê ruhanî û birayê yan jî xwuşka axretê be û wezîfeyên wan diyar bin. Ev ji bo her bawermendî lê ye, çi ji çîna ruhanî, çi ji mirîdan be. Bi vî awayî her Êzdiyek herî kêm bi pênc kesan re di nav têkiliyên manewî de ye. Ew pênc kes ol, qanûnên olî û civakî fêrî dikin. Di dema bihûrî de wan pênc kesan tevahiya merasîmên jiyanê yên wekî biskbirîn, morkirin, zewac û merasîmên miriyan bi rêvedibirin. Niha gelek caran tenê sê ferz tên bicihanîn, wekî şêx, pîr û bira/xwuşka axretê. Gulê Cafer li ser van ferzan dibêje: *"Divê her Êzdiyek şêxê xwe, pîrê/a xwe, bira yan xwuşka xwe ya jiyanê û axretê hebe da ku di şahî û xemgîniyê de xwedî li me derkevin. Ew bi hezkirin, berpirsyarî û li ser riya rast li gel me disekinin. Li gorî baweriya me dema keçeke wê bizewce divê govanek xwe ya jin hebe. Ev jî heya niha dewam dike."*[144]

Misoger kirina tebeqeyên civaka Êzdî di serdema Şêxadî de wekî rêbazeke parastina Êzdiyan li hemberî hewldanên tinekirin û bişaftinê tê nirxandin. Malbatên Êzdî li navçeya Amûdê wateya tebeqeyên şêx, mirîd û pîr bi vî rengî şirove dike: *"Dema ku Şêxadî hat, Êzdî ber bi qirkirinê ve diçûn. Di fermanên berê de jixwe Şêxadî çûbû Libnanê. Gelekî li wir mabû û li wir fêrî ola Îslamê bûbû. Paşê ew hat Mûsilê li cem waliyê wê derê. Jê re gotin: 'Miletekî asê li vir heye. Em dikin nakin ew nayê ser ola me. Tu ji vir î û koka te ji wan e. Belkî tu dikarî wan bînî, tevlî me bikî'. Îcar Şêxadî fikirî, wê çawa bike da ku vî miletî biparêze. Ew çû, hinek ayetên Îslamî anîn û xist nav gotinên wan da ku wan biparêze. Sicada nimêjê anî ji bo wan fêrî nimêjê bike û berê xwe bidin qublê (başûr). Heta niha ev merasîm li Lalişê heye. Ev ji bo çi ye? Ji bo ku pê Êzdiyan biparêze. Îcar wî got 'divê ola Êzdî belav bibe'. Îcar sînor hatin danîn û çîn çêbûn: Şêx çêbûn. Feqîr çêbûn. Mirîd çêbûn û Pîr çêbûn. Êzdî kirin çar tebeqe."*[145]

[144] Hevpeyvîn bi Gulê Cafer re, endama Yekîtiya Jinên Êzdî li Efrînê, 2017

[145] Hevpeyvîn bi endamên Mala Êzdiyan a Kantona Cizîrê re, gundê Qizlarçoxê yê Amûdê, 2017

Pirraniya Êzdiyan mirîd in. Şêx û pîr rêberên ruhanî ne. Yek ji erkên pîran ev e ku salê carekê serdana malên mirîdê xwe bikin, dua li nan û xwediyê malê bikin da ku mal û debara mirîd zêde bibe. Tebeqe wekî çînên sabît in. Bi hatina dinê ya her mirovê Êzdî re çîna wê/wî li gorî çîna malbatê diyar dibe û nayê guhertin. Sê pîvanên bingehîn misoger dikin ku zewaca Êzdiyekî/ê bi keseke/î neêzdî yan jî bi Êzdiyeke ne ji heman tebeqeyê re neyê qebûlkirin. Rabûna li ber vê ferzê, dibe sedema dûrxistina ji malbat û civakê heta dikare bibe sedema kuştinê. Wateya qedexekirina zewacê di navbera kesên ji tebeqên cuda de ev e ku têkiliyên binemalan li ser bingehê berpirsyariya li hemberî hev, pîrozî û manewiyatê tên domandin. Heger kesên ji çînên cuda bi hevdu re bizewicin, ev wekî zewaca xwuşk û bira, yanî wekî guneh tê hesibandin. Her wiha *herfê seyem* ango *derba xerqe* tayin dike ku Êzdiyên bersivê bidin oldarekî û destê xwe li feqîrekî bi xerqe an jî şêx û pîrê xwe rakin jî ji Êzdayetiyê tên derxistin.[146]

Mamoste Îlyas pergala tebeqan wiha dinirxîne: *"Ji çîna Mirîd re digotin: 'Ev yên pirr in. Bila ew di erdan de kar bikin. Ev çîna berhemê ye.' Ji çîna Şêx re digotin: 'Bila ew xwe ji perwerdeya olî re vala bikin. Êzdiyek li kû derê heba, bila herin cem wan.' Çênabe ku bizewicin, ji ber ku pêwîst e sînor di navbera şêx û mirîdan de hebin. Şêx dema ku derbasî malan bibe û bizewice wê xerabî jê derkevin û gotin li ser wan wê derkevin. Ev çênabe. Lewma weke zagonekê hatiye meşandin. Wiha derbasî malan bûn. Mêr li mal ba, ne li mal ba, ji şêx bi ewle bûn. Ew wek pêşeng bûn. Mirîd jî divê kar bike di erdan de û parek jê ya Şêx e. Ev tiştana weke ferz e li ser wan, nayê guhertin. Ji ber ku ev ne di destê me de ye. Dogmatîzm e, nayê guhertin. Sûda wê jî hebû û pirsgirêkên wê jî hebûn. Sûda wê hebû, ji ber ku perwerdeya olî jî hebû û şêx milet pêş dixist di milê olî de. Lê zirara wê jî hebû ji ber ku cudabûn kire di nav milet de."*[147]

Feqîr û *feqra* jî dibin beşên taybet yên civaka Êzdî. Bawermendên Êzdî ji her sê tebeqeyan yên ku bixwazin jiyana xwe fêdayê xizmeta Xwedê û baweriya xwe bikin, dikarin bi pejira mîr û bavê şêx bibin feqîr an jî feqra. Piştî ku îbadeta xwe bi dawî dikin, ew dibin xelkê Şêxadî. *"Li şûna cilê spî, feqîr cilê reş lixwe dikin. Nabe ku destê te lêbikeve. Divê tu destê wî maç bikî."* Peywîrên cuda yên olî jî hene yên ku ne girêdayi çînan in. Peywîrên wekî qewal, koçek an kebanî girêdayî biryar, zanebûn, sirûşt û exlaqê mirovan tên dayîn.[148]

Jinên Êzdî li ser Şopên Çanda Dayika Xwedawend

Ji bo parastina hebûna xwe, Êzdiyan hertim girîngî daye çanda xwe ya jiyana komînal û merasîmên olî. Di çîrok, qewl û rîtuelan de şopên çanda jinê û civaka xwezayî diyar in. Dema ku Êzdî duayên rojê dikin - wekî duayên sibê, duaya nîvro û duaya êvarê – ew berê xwe didin tavê. Tav wekî *nûra Xwedê* (ronahiya Xwedê) tê silavkirin. Dîsa dema kirina duayên di rojên taybet de, çira tên hildan. Ew nîşana rêzgirtina ji agir û ronahiyê re ne.
Endama Yekîtiya Jinên Êzdî ya Efrînê, Gulê Cafer, balê dikişîne ser bandora çanda xwedawendan di baweriya Êzdiyan de: "*Hemû duayên me girêdayê xwezayê ya dayika xwedawend in. Dema roj nû derdikeve em dibêjn:*

Nûr ji nûrê şifaqî
Sibhane ji te xaliqî!

[146] Pîr Dîma: *Lalişa Nûranî – Peristgeha Êzdiyan*, Yêkatêrînbûrg, Basko, 2008

[147] Hevpeyvîn bi mamoste Îlyas re, endamê Mala Êzdiyan û hevserokê desteya çand û hunerê ya Kantona Cizîrê, gundê Qizlarçoxê yê Amûdê, 2017

[148] Pîr Dîma: *Lalişa Nûranî – Peristgeha Êzdiyan*, Yêkatêrînbûrg, Basko, 2008

Melekan li ber tifqî.
Ji malê heta malê
Şêşims Xudanê sîqalê
Em li Şêşims nabirin xiyalê.

Duaya êvarê jî girêdayî jin û keçikan e. Behsa du stêrkên evîndar dikin. Bi taybet jinên pîr bi şopandina stêrkan re saet dizanîn. Di Cejna Pêxwînê de xuya dibe ku me taybetmendiya civaka xwezayî parastiye. Çiqas tovên nebatan hene, mîna dendik, tirş, genim, nîsk û wd. em bi giştî tînin gel hev û dihêrin. Keç û xort di vê rojê de dixwin ji bo mirazê xwe di xewnê de bibînin. Ev jî li pêncşema yekemîn a Sibatê ye û cejn li gel me nayê guhertin. Rengê şîn li gel me pîroz e, ji ber ku rengê ezmanî ye."[149] Lewma Êzdî cilên bi rengê şîn lixwe nakin.

Li gorî felsefeya Êzdiyatiyê jin û dayik wek xwedawend û nirxekî payebilind tên dîtin. Di bingehê xwe de afirîneriya wê ya tevahiya berhemên pîroz ên mirovahiyê heye. Lewra di kesayeta jinê de rêzdariyeke mezin a xweza, zindiyan hemûyan û mirovahiyê tê parastin. Jinan civak li ser hîmên wekheviyê, edaletê û aştiyê bi rê ve biriye û bi rêxistin kiriye. Jinên Êzdî dibêjin nêzî 300 qewlên jinê hene. Jinên pîroz wekî xwedawenda *Xatûna Fexran* ku zayîn û dayikan diparêze; xwedawenda lehî û tofanê *Pîra Fatê*; xwedawenda tenûr û nanî *Sitiya Ês* û gelek jinên zane di nav van qewlan de tên bibîranîn. Lê belê çavkaniyên nivîskî derheqê wan de pirr kêm in. Derbarê van jinên pîroz de Gulê Cafer balê dibe ser rista sereke ya Pîra Fat:

***"Pîra Fatê** dayika xwedawenda yekemîn ya Mezopotamyayê bû. Sirr û keremeta wê hebû, wê jî ji xwezayê biribû. Weke dayika xwedawend mirov dikare bi nav bike. Ew di gelek qewlên me de tê bibîranîn. Di ola me de dibêjin, Pîra Fatê nemiriye. Ew li ser pira selatê ye. Di roja qiyametê de Pîra Fatê xêr û şer dipîve ji mirov re. Pîra Fatê sirra deryaya vedît û girêdana wê bi jiyana mirovahiyê re bi jinê temsîl kir. Ew dibêje ku ew sirra deryaya di hundirê jinê de ye. Ew zaroka ku neh meha di zikê jinê de dijî bi vî awayî şirove kiriye. Pîra Fatê girêdana xwe bi erd û ezman, bi sirra vedîtina heft gerstêrkan re heye. Her yek jî bi firoşteyekê ve girêdayî ye û rojekê heftê temsîl kiriye. Ev zanista pirr kûr e. Di qewlan de dibêjin, heft firoşte, heft gerstêrk bi tevger hene. Ji ber vê li gel me hejmara heft bi wate ye. Niha di meclîsa me ya ruhanî de jî heft mêr nûnertiyê dikin. Ew mîr, bavê şêx, pîr, feqîr, qewal û koçek in. Her yek ji wan erkeke xwe ya olî heye."*

Li ser pirsa, gelo çima di meclîsa ruhanî de tenê mêr cihê xwe digirin, Gulê Cafer wiha li me vedigerîne: "*Ji ber ku di dema pêvajoya baviksalarî de şaman hebûn. Wan berhemên jinê dizîn û talan kirin. Gorên Pîra Fatê hîn di hundirê Şengalê de hene. Her gorek rojeke wê ya taybet heye. Ew jî girêdayî werzên salê ne. Cejna Pîra Fatê meha nehê [Îlonê] ye. Ji ber ku şamana dîroka dayika xwedawend talan kir û kuşt, ew jî di payîzê de bû. Lê di biharê de ji nû ve jiyan çêdibe. Lewma em dibêjin, Pîra Fatê nemiriye. Di payîzê de hemû şînkayî dimire û di biharê de ji nû ve şîn dibe. Pirr dayikên xwedawend derdikevin. Lê xwedawenda lehiyê Pîra Fatê ya yekemîn e. Piştî wê Xatûna Fexran ya ku jin û zarokan diparêze; Pîra Lubna xwedawenda baran, erd û roja pêxwînê; Sitiya Ês, Sitiya Hebîbe, Sitiya Zêneb derdikevin. Her xwedawend di tiştekî xwezayê de ye."*

[149] Hevpeyvîn bi Gulê Cafer re, endama Yekîtiya Jinên Êzdî li Efrînê, 2017

Rêûresm û cejnên ku xwe dispêrin çanda xwedawendan derbasê baweriya Êzdiyan û olên din jî bûne: "*Niha dema hişkayî çêdibe, qeşmerek kincê jinê lixwe dike û mal bi mal digerin. Ew jî avê lêdikin û gel çi bidin wê kom dikin: genim, zad û hwd. Piştre diçin li gel ziyaretê xwarinê çêdikin û dua dikin ji bo baranê. Ew ji Pîra Lubna ve hatiye, ji ber ku ew baranê dişîne. Yahûdî, Xirîstiyan, Êzdî û Îslam, di her olekî de her yek navekî lêdikin. Ema bi giştî wekî Xidir Îlyas bi nav dikin. Lê bingehê xwe ji Pîra Lubna hatiye. Di Êzdiyan de bi roja pêxwînê tê naskirin."*[150]

Li ser ***Sitiya Ês*** tê gotin ku ew jineke pirr hêja bû û çanda dayika xwedawend da kurê xwe Şêxadî yê duyemîn. Ew di nav civaka Êzdî de wekî jineke bi bandor tê nasîn. Rêveberiya wê di şert û mercên herî zehmet de çanda Êzdî parastiye. Dema Êzdî diçin Lalişê feqîr berate didin avahiya *Sitiya Ês*. Ev dibe nîşaneyek ji yên çûyî Lalişê re. Li Lalişê kolana bi navê *Sitiya Ês* jî heye.

Jinên **Feqra** heta roja îro li ser şopên çanda xwedawendan û jinên pîroz dimeşin. Ew jinên oldar in yên ku nazewicin û li Lalişê dijîn. Ji bo jinek bikare bibe Feqra, divê ew her tim ferzên baweriyê pêk bîne û erêkirina du pîr yan şêxan hebe. Feqra tevahiya jiyana xwe li gorî exlaq û pîroziyên baweriyê dijîn, bi kar û barên parestgehê rabin. Yek ji erkên wan çêkirina qendîl û çirayan e ku her roj li Lalişê tên pêxistin. Ji berpirsyara feqrayan re 'dayê kebanî' ango 'dadê' tê gotin. Ev nîşana girîngî û rêzdariya civakê ye. Yek ji feqrayên herî kevin ***Dayê Şêrîn*** bû. Ew di sala 1924'an de li Şengalê hatibû dinyayê. Di 30 saliya xwe de ew tevlî Feqrayan bûye. Bi ked, hezkirin û zanebûneke mezin Dayê Şêrîn bi navê 'Dayê Kebanî' li perestgeha Lalişê 62 salan xizmet kir. Heta ku ew di 92 saliya xwe de wefat dike jî ew ji Lalişê derneketiye. Dayê Şêrîn wekî yek ji kesayetên mezin ê civaka Êzdî tê nasîn.

Her wiha di dîroka Êzdiyan de jinên leheng ên şerker û siyasetmendar jî hebûne: "***Emîra Qedem*** *li hember Farsan şer kiriye. Ew bi xwe leşker bû. Di dema Osmaniyan de* ***Meryem Xatûn****, keça mîrekî Êzdiyê li gundê Bazre yê girêdayî Şêxan di sala 1873'an de ji dayik bû û bi çanda olê Êzdî hat mezinkirin. Ev jin siyasetmendarek pirr xurt bû û xwedî hêzeke ramanî bû. Her tiştekî xwe kiribû xizmeta civaka xwe. Wê xwe ji dost û dijiminê xwe re îsbat kir. Bi şêwaz û nêzikbûna xwe ya mirovî û di aliyê têkiliyên diplomasiyê de pirr xurt bû. Hevjînê wê Mîr Elî Beg jî nedipejirand ku xortên civakê leşkertiyê ji Osmaniyan re bikin û li dijî Osmaniyan derdiket. Piştî vê ew tê kuştin. Ji bo îmarata xwe neyê rûxandin û nekeve di bin destê Osmaniyan de, Meryem Xatûn rêveberî dikir. Ew bû yekemîn jina Êzdî ku bûye mîr û rêveberiyê herêmekê dikir. Wê pirtûkxane ava kir, civaka xwe perwerde kir û dewlemendiya xwe kir xizmeta civakê."*[151]

Dîsa jinên navdar wekî Edîla Xan, Helîme Xan, Sefiye Xatûn, Edle Xatûn, Meryem Xan, Zerîfa Osê û Dayê Zero jî hîn tên nasîn. Em dikarin bibêjin, di dîroka gelê Êzdî de, gelek jin di aliyên zanist, olî, civakî, hunerî, leşkerî û siyasî de bi ristên pêşeng rabûne. Lê navên wan pirr kêm ketine nav dîroka nivîskî. Lê belê wan hebûna xwe di qewl, helbest, stran û çîrokên devkî de domand û bandoreke mayînde li ser civakê û kesayeta jinên Êzdî kiriye.

Jinên Êzdî hene ku bi zanebûn û çavfirehbûna xwe wek otoriteyeke xwezayî di civaka xwe de dihatin qebûlkirin. Malbatên li gelek gund û herêmên Rojavayê Kurdistanê behsa jinên wiha dikin. Gundiyên Qizlarçox dibêjin: "*Jinên berê bi nav û deng hebûn. Mînakek diya Îlham Fatî, diya Silêman e. Digotin, milet gelek qala wê dikir. Dibêjin, ew gelekî çavfireh bû. Mêvanekî silav kirbe,*

[150] Hevpeyvîn bi Gulê Cafer re, endama Yekîtiya Jinên Êzdî li Efrînê, 2017

[151] Çavkanî li heman cihî

ew bê xwarin ji mala wan dernediket. Li mala Denef jî Eyşo hebû. Ew jî wilo bû. Yanî jinên Êzdî bi çavfirehbûna xwe û bi hezkirina mêvanan navdar in."[152]

Lê belê di encama fermanan de û di bin navê parastina ol û qewm de bi demê re pergala baviksalariyê hatiye kûrkirin. Rista jinê bi pirranî bi karê malê, zarok û çandiniyê re hatiye sînordarkirin. Li îradeya jinan di jiyana civakî û siyasî de pirr nehatiye guhdarîkirin. Derketina jinan bi tenê – nexasim a jinên ciwan – wekî şerm hatiye dîtin. Anîna pirr jinan di nav civaka Êzdî de jî hebû, lê belê kêm hatiye kirin. Bi pirranî dema ku jin û zilam demeke dirêj zewicî bûn û zarokên wan çênedibûn, wê demê zewaca duyemîn ji bo zilaman rewa hatiye dîtin. Zayendperestiya civakî, her wiha ferman û cudakeriyê li hemberî gelê Kurd û ola Êzdayetî dibûn sedemên lêgerîna azadiyê yên jinên Êzdî.

Fermanên li dijî Êzdiyan

Di dîrokê de gelek ferman û neyarî hatine serê Êzdiyan. Qirkirinên bedenî û çandî bi hevdu re hatine meşandin. Pîr û kalên Êzdî dibêjin: "*Em vegerin dîrokê dema ku nîvê ava Firatê bûye sor ji xwînê û nîvê din jî bûye şîn ji pirtûkên ku avêtine nav avê. Heya niha ti pirtûk li ser ola me nemaye. Lewma em dibêjin: Sirrê me di singê me de ye!"*[153]

Ji sedsala 16'an ve bi sed hezaran Êzdî di 72 fermanên Împaratoriya Osmanî de sîstematîk û bi hovane hatin qetilkirin. Ji ber gefên kuştinê beşa mezintirîn a Êzdiyan neçar mabû û qelibiye ola Îslamê. Bi vî awayî gelek eşîrên Kurdên Êzdî bi darê zorê bûne Misilman. Her wiha dewleta Osmanî li ser Êzdiyan xercên taybet û leşkerî jî ferz kiribû. Osmaniyan Êzdî ne wekî 'hindikahî' ne jî wekî 'baweriya xeyrî muslîm' qebûl dikirin. Nav û çêrê 'kafir' li Êzdiyan hat kirin. Bi vî awayî Êzdî bê maf bûn û rastî qirkirinan dihatin. Bi ser de Osmaniyan xortên Êzdî bi darê zorê dibirin leşkeriyê û yên ku nediçûn leşkeriyê cezayên giran li wan dibirîn.[154]

Têkiliyên navbera Êzdiyên Şengalê û yên li Rojavayê Kurdistanê

Mîrê Êzîdxanê ji bo hevgirtin û xwedîkirina Êzdayetiyê, hersal Tawis didan destên komek qewal-koçekan. Wî ew dişandin gund û bajarên Êzdiyan. Tawis remza Tawisê Melek û Êzdayetiyê ye. Her sal yek ji wan Tawisan ji Lalişê jî diçû cem Êzdiyên li herêmên Rojavayê Kurdistanê. Nivîskarên Êzdî[155] destnîşan dikin ku yek ji Tawisên Lalişê ji bo Êzdiyên li herêmên girêdayi Helebê dihat veqetandin. 'Tawisa Helebê' bi vî awayî gihandine Êzdiyên li navçeyên wekî Efrîn, Hema, Kilîs, Tirbespiyê, Qamîşlo, Hesekê, Amûdê û Serêkaniyê. Helbesta *Qesîdê Şêx Mend* dide xuyakirin ku têkiliyên baweriyê, çûn û hatina Êzdiyên Lalişê û civatên Êzdî yên li herêmên Heleb, Mêrdîn, Riha, Cizîr û Hekariyê her tim zindî bûne.

[152] Hevpeyvîn bi jinên Êzdî re, gundê Qizlarçoxê yê Amûdê, 2017

[153] Hevpeyvîn bi Enver re, gundê Gundorê yê Amûdê, 2017

[154] Xirîstiyan an Cihû ku nedixwestin bibin leşker karîbûn bedelên giran bidana Osmaniyan. Lê ev derfet nedabûn Êzdiyan. Di sala 1872'yan de fermandarê Osmanî, Muhammed Tahir Beg fermanek ji eşîra Êzdî ya Dasinî re şand û 15.000 leşker ji bo artêşa xwe xwestin. Lê mîr û muxtarên Êzdiyan ev ferman red dikirin û wan got: “Em, endamên ola Dasiniya (Êzdayetiyê), gorî rêbazên ola me nikanin bo artêşa nîzamî, leşkeriyê bikin. Em dixwazin wek Suryanî û Cihûyan, di şûna zilaman de dirav (pere) bidin." Di daxwaznameyê de nûnerên Êzdî 14 sedem rêz kirine ku nêletiya şertên leşkeriya bi rêgez û erkên ola Êzdayetiyê raber dikirin. (Binihêre: Gotara Veysî Aydin: Belgeyek girîng ji dîroka Êzdiyan, 16-01-2018)

[155] Mînak: Nivîskar Eskerê Boyik û Pîr Xidir Suleyman

Di pirtûka kevnar Şerefname ya li ser dîroka Kurdistanê de tê gotin ku Şêx Mend dema şerê li dijî êrîşên Xaçperestan a destpêka sedsala 13'an alîkariya fermandarên arteşa Selahaddin Eyyûbî dikir.[156] Lewma wan kir ku Şêx Mend bibe mîrêmîranê Kurdên li Şam û Helebê. Her wiha Kurdên li aliyê Efrîn, Kilîs û Qoserê jî bi vî rengî ketin bin parêzgeriya wî.

Şûnwarên Êzdiyan yên li Rojava

Gelek şopên Êzdayetiya kevnar di şûnwar, adet-teqalîd û ritûelên civaka Rojava de xuya ne. Sembolên pîroz ên li Lalişa Nûranî û yên li ser kevir, şûnwar, ferfûr û hunera destan li Rojava dişibin hev. Sembolên serekî yên ku koka kevnar a çand û baweriya Êzdayetiyê destnişan dikin ev in: *Marê Reş* yê ku di mîtolojiyên Mezopotamyayê û baweriya Êzdayetiyê de nîşana parastin û bereketê ye. *Tawis* ê ku nîşana Tawisî Melek û pirrengiya cîhanê ye. *Xaça* li hundirê xelekeke gilover de nîşana rojê û çar cewherên gerdûnê ye û xwe dispêre nîşanên serdema neolîtîk. *Stêrka Şeşgoşê* ya ku ji du sêgoşeyên wekhev pêk tê di baweriya Êzdayetiyê de nîşana wekhevî û yekîtiya jin û mêr e. Sêgoşeya ku serê wê hevraz li jor e - wekî di civaka xwezayî de - sembola jinê û xwedawenda ezmanî ye; ya ku serê wê li jêr e sembola mêr û xwedayê nêr ê Erdê ye. *Şe* wekî nîşana paqîjbûn û safbûnê di nav Êzdiyan de tê qebûlkirin. *Gopal* nîşana pîroz a kal û pîran ango zanebûnê ye. *Şibab* cûreyekî bilûrê ye yê ku di baweriya Êzdiyan de ketina ruhî ya nava bedena mirovî, yekbûna ruh û bedenê temsîl dike.[157] Ev hemû dibin rêgezên civaka exlaqî.

Çiyayê Lêlûnê yê Şêrawa yê herêma Efrînê ji baweriya Rojê re malovanî kiriye. Çend qebrên bi qubên xwe Qubên Lalişê tûnin bîra mirov lê hene. Her wiha gelek remzên baweriya Êzdatiyê li ser dîwarên perestgeh û avahiyan nîştecihbûna dîrokî ya Êzdiyan li herêmê diyar dikin. Tê texmînkirin ku Êzdiyên li navçeya Şêrawa gund û warên xwe di sedsalên 9'an BZ'yê heta sedsala 2'yemîn PZ'yê de ava kirine. Basûtê, Batût, Bafirîn û Basilê çend ji wan gundan in. 'Ba' tê wateya hewa an pêjnê. Dîroka gundê Basufanê ya ku ji 360 malên Êzdî pêk tê vedigire heta 700 salan BZ'yê.

Qebra Şêx Hemîd ku di şûnwarekî bi kevirên kevnar de hatibû avakirin, yek ji ziyaretên girîng ên Êzdiyan e. Keleha Seman a li aliyê Çiyayê Lelûnê, nêzîkî Gundê Kîmarê jî xwedî şopên girîng ên dîroka Êzdiyan e. Li ser deriyê dêra di ketina gund de rimek bi du tawisan hatiye neqişandin. Di navbera wan de giloverek heye ku weke rojê ye û di hundirê wê de sembola xaçê heye. Çend ji ziyaretên Êzdî yên herî pîroz xwe dispêrin çiyayên bilind yên Lêlûnê weke ziyareta Şêx Qeseb. Her wiha Qebra Porsa Xatûn û dara wê ya miradan li ser girê Porsê nêzîkî gundê Qestela Cindoyê ye.

Nêzîkî gundê Qibar, qebra Çilxanê li hundirê zinarekî li newaleke kûr yên Çiyayên Lêlûnê hatiye kolan. 300 metreyan li jorê vê qebrê, gora Şêx Adî heye. Tê bawerkirin ku ew ji malbata pêşengê ola Êzdî Şêxadî hatiye. Li gundê Şadêrê gorek bi qube hatiye çêkirin ku wek qebra Şêx Rikab jî pîroz tê dîtin. Li ser Girê Berekat yê Çiyayên Lêlûnê nêzîkî gundê Xezîwê ziyaretên Şêx Berekat û Şêx Xerîb hene. Her wiha ziyareta Menan li navçeyê Şera li ser girê Kefircennê pîroz tê dîtin. Ev mînakên cihên pîroz kûrbûna koka çand û baweriya Êzdayetiyê li herêma Efrînê tûnin ber çavê me.

[156] Şerefxan Bidlîsî: *Şerefname*, 1579 (çapa Weşanxaneya Apecê, 1998): *„Di destpêka sedsala sêzdehan de [...] fermanrewayên mezin ên Al-i Eyyûb, eleqeyek zêde didine Şêx Mend û wî dikine mîrêmîran ên hemû Kurdên li Şam û Helebê. Nav û dengê Şêx Mend li nahiya Quseyrêya nêzîkî wilayeta Antakyayê roj bi roj belav dibe. Bi vî awayî rutbeyên herî bilind ên eskerî û îdarî jê re hatin dan. Bi vî awayî ji her milî ve kurdan berê xwe dan balê; ji bilî vê, Kurdên li aliyê Cum [Efrînê] û Kilîsê rûdiniştin jî hatin û ketin bin siya parêzgeriya wî."*

[157] Pîr Dîma: *Lalişa Nûranî – Peristgeha Êzdiyan*, Yêkatêrînbûrg, Basko, 2008

Heta sedsala 16'an baweriya Êzdayetiyê ne tenê baweriya sereke ya Kurdên Efrînê, lê ya tevahiya Kurdan bû.

Êzdiyên li Rojavayê Kurdistanê û Zextên Dewleta Sûriyê

Ji derveyî yên xwecih, malbat û eşîrên Êzdî ji Bakur û Başûrê Kurdistanê jî ji ber zext û fermanên dewletên Osmanî û Tirk xwe li herêmên Rojava girtine. Wan li vir jiyana xwe ji nû ve saz kiriye. Di sedsala 20'an de Êzdiyên Rojava bi pirranî li herêma Efrînê û li bajar û gundên Serêkaniyê, Amûdê, Hesekê, Qamişlo û Tirbespiyê diman. Heta salên 1990'î li Bakurê Sûriyê zêdetirê 12.800 malbatên Ezdî hebûne. Ji wan qederê 600 – 650 malbatî li herêma Efrînê, 2178 li navçeya Amûdê, 2251 li navçeya Qamîşloyê, 2354 li navçeya Serêkaniyê û 5444 li Hesekê û derdora wê diman.[158]

Gelê Cizîrê qal dike ku bajarê Tirbespiyê navê xwe ji tirbeke Êzdiyan wergirtiye. Êzdiyên li gundên derdora Tirbespiyê û Qamîşlo bi pirranî ji eşîra Hevêrkiyan û hinek jî ji eşîra Hesenan in. Ew piştî şikestina serhildana Şêx Seîd li vir bi cih bûne. Êzdiyên eşîra Şerqiyan bi pirranî li derdora bajarê Amûdê gund û warên xwe ava kirine.

Êzdiyên ku li navçeyên Şêrawa, Şêra û Cindirêsê yên Efrînê û herêma Şehbayê diman bi pirranî ji eşîrên Dinadî, Feqîran, Reşkan, Şerqiyan, Qopanî, Dawidî, Kaçanî, Xaltî û Reşkan bûne. Tê gotin, heta salên 1930'î li herêma Efrînê 58 gundên Êzdiyan hebûne. Lê belê heta destpêka sedsala 21'ê tenê 22 gundên Êzdiyan karîbûn hebûna xwe biparêzin. Li gorî agahiyên ku hevserokê Komeleya Êzdiyan a Efrînê parve kirine, heta şerê Efrînê ku di Çilê 2018'an de bi êrîşên arteşa Tirk dest pê kir, li kantona Efrînê nêzîkî 30 hezar Êzdî hebûne.

Di salên 1950'î de li gelemperiya Sûriyê nêzîkî 40 gundên Êzîdiyan bi bandora polîtîkayên dewletê bi tevayî ola xwe guhertine û bûne Misilman.[159] Li bin nîzama Komara Ereb a Sûriyê neheqî li Êzdiyan hatine kirin him ji ber ziman û nasnameya wan a Kurdî, him jî ji ber nasnameya wan a olî. Şovenîzma nijadperest a Ereb hişt ku pirraniya Kurdên Êzdî yên Rojava pêşî xwe bi nasnameya xwe ya neteweyî îfade bikin. Nasname û baweriya olî wan encax karibû nava malê de û di malbata xwe de biparêzin. Kal û pîr çand û teqalîdên bawerî, exlaqê civakê û pergala çînî li ser bingehê şêx, pîr, mirîd û bavikan veguhestine nifşên nû. Desthilatdariya Beesê pîrozbahiyên Êzdiyan, avakirina navendên baweriyê û perwerdeyên olî qedexe kirine. Heta pêngava Şoreşa Rojava, Êzdiyên li Bakurê Sûriyê di gelek aliyan de nikaribûn pêdiviyên baweriya xwe bi cih bînin. Ji bo malbatên Êzdî karibin cejnên xwe yên weke Çarşema Sor an jî Îda Ezî li malên xwe pîroz bikirana, ew carna mecbûr diman ku rişwet bidana muwezifên dewletê. Li dibistanên Beesê şagirtên Êzdî bi mecbûrî tevlî perwerdeya ola Îslamê dibûn. Di bin van şertan de bi gelemperî zanîna nifşên nû li ser dîrok û baweriya Êzdî lawaz bûye û tenê wekî adet hatiye parastin.

Kurdên Êzdî yên kantona Cizîrê wekî Kurd bi giştî jî bê nasname û bê mafên hemwelatiyê bûne. Rayedarên dewletê tapûyên wan çirandin û dest danîne ser erd û milkên wan. Êzdiyên Cizîrê bi pirranî ji erd û milkên xwe mehrûm hatine hiştin. Bi vî awayî têkiliyên gelek kesan bi ax, xweza û welatê xwe re lawaz bûne. Wekî mirovên bê erd ew mahkûmê xizaniyê bûne. Di encama xizaniyê de koçberî jî her diçû zêde bûye. Bi ser de zextên olperest, neteweperest û siyasî yên dewletê bûne

[158] Lêkolînên Mala Êzîdiyan ya li bajarê Oldenburgê yê Elmanyayê.

[159] Faik Bulut, *Ortadoğu'nun Solan Renkleri - Bedeviler, Çerkesler, Nusayriler, Dürziler ve Yezidiler*, 2002.

sedemên koçberiya Êzdiyan. Malbat hebûn ku mirovên wan berê ji herêmên Bakurê Kurdistanê wekî Mêrdîn, Riha an jî Êlihê ji ber zilma dewleta Tirk koçî Elmanyayê kiribûn. Pê re siyaseta dewleta Sûriyê jî ji salên 1980'yî û pê ve rêya koçberiya Elmanyayê vekir.

Her wiha Êzdî di nav civakê de jî rastî nêzîkatiyên bi heqaret û cudahiyê hatine. Malbatên Êzdî yên gundên Cizîrê qal dikin ku berê cîranên wan ên Misilman li malên wan çay venexwarine. Dema ku wan şîr, mast an jî penîrê xwe dianîn sûkê, ew gelek caran bêyî ku wan bifiroşin vedigeriyane malê, ji ber ku hinek Misilman ji destê wan tiştek nedistandin. Bandora van nêzîkatiyan heta niha jî, wek birînên kûr di dilê hinek Êzdiyên Rojava de heye. "*Tu gengeşiya Êzdiyan bi kesên din re nebû. Nedixwestin ku kes wan biêşîne û ne jî kesekî biêşînin."* Lê xiyaneta ku pirrcarî li Êzdiyan bûye di têkiliyên cîrantî û dostaniyê de gumaneke mezin bi wan re peyda kiriye: *"Bi fermanan dayik, xwuşk û keçê me birin û hejmara me kêm dibû. Hinek li Sinceqê hene, ew ji me re dibêjin, 'hûn xalê me ne'. Em çûn koçeriyê li Çiyayê Kezwan. Erebên li wir jî digot, 'hûn xalê me ne'. Me got, 'Çawa?' Kengê vê gotin, hinga ferman rabû."*[160] Ruxmê ku mêvanperwerî û civakîbûn taybetmendiyên civaka Êzdî ne, tecrûbeyên dîrokî û jiyanê yên neyînî hiştin ku pêdiviya xweparastinê hîna zêdetir derkeve pêş. Vê jî bi xwe re girtîbûnek li hemberî derve anî.

Berxwedana Çandê

Li hemberî komkûjî, koçberî û zilmê civaka Êzdî dîsa hebûna xwe parastiye. Siyasetên bişaftinê bi temamî bi ser neketine. Her wiha gelek eşîrên Kurd di bin zextên dewletan de ola Îslamê di fermiyetê de qebûl kiribin jî, gelek rêûrêsmên baweriya Êzdayetiyê di çanda civaka Kurd de hîna zindî ne. Li gelek deverên Rojava bandora çanda Êzdayetî û ya Zerdeştiye di gelek aliyên çanda rojane de xwe dide der. Jinên Kobanê behsa çend mînakên zindîbûna vê çandê dikin:

"Cil û bergên jinan yên rengîn bi kitanên spî û kofî nîşana çanda Êzdî ne. Dîsa wekî Êzdiyan gelê Kobanê jî roja Çarşemê pîroz dibîne û karên giran di vê rojê de nake. Di çanda Kobanê de roja Çarşemê serşûştin, neynuk qutkirin, paqijî, çûyîna cihekî dor, şahî çêkirin û tiştên wisa nayên kirin. Ev roj li ba Êzdiyan jî wisa ye, weke ku li gel Misilmanan roja înê her tişt disekine."
Gelek kevneşopiyên baweriya Êzdî di çanda Kurdan bi giştî de hatine parastin: *"Ava germ li ser axê rijandin guneh e. Divê cihekî taybet yê agir hebe. Xûliya agirî li her derê nayê çêkirin û divê her tim li cihekî were komkirin. Nabe ku em avê li agir bikin. Gel me, pirî caran jinan resmê Tawusê melek li ser kiras an qumaşê spî çêdikirin û bi dîwaran ve dikirin. Vî karî bi êvaran li ber çira çêdikirin."*[161]

Hevbendiyên Civakî û Bandora Şoreşa Rojava

Li çend gundên Rojava Êzdî bi dehan an jî sedan salan ligel Misilmanên Kurd û Ereb an jî gelên Xirîstiyan bi hev re jiyane. Yek ji van gundan, gundê Gundorê nêzîkî Amûdê ye. Jineke ixtiyar a Misilman li ser dîroka hevjiyana gundê xwe dibêje: "*Em Kurdên Misilman û Êzîdî di gund de, me gelek ji hev hez dikir. Beriya niha me xwarin ji destê wan nedixwar. Wan jî digot, em ji destê Misilmana naxwin. Lê niha em dixwin. Em hemû bûnê weke malekî. Niha danûstandin û itifaqa me hemûya heye. Em dilê hev nahêlin. Dema cejna Êzdiya çêdibe, em diçin. Dema ku ya me çêdibe, ew tên îdê me û Ereb jî wisa ne."*[162]

[160] Hevpeyvîn bi Enver re, gundê Gundorê yê Amûdê, 2017
[161] Koma nîqaş û lêkolînê ya Jineolojiyê 2, li ser çanda Kobanê, 2017
[162] Hevpeyvîn bi Fezîla Îbrahîm re li gundê Gundorê yê Amûdê, 12-03-2017

Êzdiyên Gundorê jiyana gundê xwe wiha dinirxînin: "*Kî hatin, Êzdiya ew hembêz kirin. Deriyê me vekirî ye. Em xêrxwaz in. Tî ferq û cudahiya me tine ye. Niha çar êlên Ereb tê de ne. Malbat hene, xweş Kurdî diaxivin. Zimanê me yek e. Ne ji mafê me ye, em bêjin ev Ereb e an jî ji oleke din e. Em hemû însan in, ji hev fêhm dikin. Xîlafên civakî yan siyasî cem me nînin. Heya niha em di şevbihêrka de dirûnin."*[163]

Li ser pirsa, ka taybetmendiyên gundî çima bi vî rengî ne, ev şirove tê kirin: "*Ji ber ku mal ne xizmên hev in, bêhtir ji hev hez dikin. Lê ku xizmên hev bûna, wê bêhtir ji hev biqeherîna. Gundiyek nexweş bikeve, gundî tevahî li dorê dihewin. Dema ku yek dimire jî kon tê vedan. Her kes lê kom dibe û her kes dibe alîkar. Weke komeleyekê ava dikin, ji bo ku alîkariya wê malê bikin. Ev gelekî baş e. Pêwîst e ev tişt werin parastin."*[164]

Bi şoreşa Rojava re Êzdiyên Rojava careke din karibû bi nasname û kevneşopiyên baweriya xwe, azad bijîn. Di heman demê de derî li rêxistinkirina jinên Êzdî jî vebûye. Wan navend û rêxistinên xwe bi awayekî fermî saz kirin û nûneriya wan di nav pergala xweseriya demokratîk de heye. Gulêcan Fer a ji Efrînê, diyar dike ka wan çawa hê ji beriya şoreşê rêxistinbûna civaka Êzdî bi dizî bi pêş dixist: "*Me sala 2007'an li Helebê kongreya xwe ya yekemîn çêkir. Li Helebê komîte û rêveberên Yekîtiya Êzdiyan hebûn. Dema ku şoreşê dest pê kir, em amade bûn. Me yekser dest bi karê xwe kir. Sala 2012'an li gundê Basûfanê me yekemîn Mala Êzdiyan vekir. Piştî bi sedan salan, me zarokên xwe li gorî baweriya Êzdayetiyê perwerde kirin. Şoreş ji bo me firsendeke gelekî girîng bû. Ji ber vê yekê me bi lez û bez û bi xurtî dest bi karên xwe kir.*

Li kantona Efrînê yekîtiya hemû bawerî û hindikahiyan ava bû. Weke Êzdiyan, me jî cihê xwe di nav de girt. Êzdî yekem car [fermî] dibûn xwedî komîte û navendekê. Bi rengekî, me serbixwe perwerdeya baweriya xwe didît û xwe bi rêxistin dikir. Yekîtiya Êzdiyan sala 2013'an li navenda Efrînê ava bû. Me konferansa xwe ya destpêkê li wir kir. Yekem car sîstema hevserokatiyê hat avakirin û heft komîte tev komîteyên jin, hiqûq, perwerde, ciwan, çapemenî û çandê hatin damezrandin. Van komîteyan xwe digihand gundên Êzdiyên li Efrînê. Di dîroka Kurdan de, ji hezaran salan û vir ve yekem car di nava sîstema xweseriya demokratîk de ola Êzdayetiyê hate qebûlkirin. Bi rengekî serbixwe me dest bi kar kir."[165]

Êzdiyên kantona Cizîrê navenda xwe li gundê Qizlarçox nêzîkî bajarê Amûdê ava kiriye. Di pîrozbahiyan de, ji bo civîn, merasîmên olî û şînê gel ji tevahiya navçeyên Cizîrê li vir kom dibe. Xebatên ciwan, çandî û perwerdeyê jî tên meşandin.

Jinên Êzdî di bin banê Yekîtî û Malên Êzdiyan de rêxistinbûna xwe ya xweser bi pêş dixin û li hemberî zayendperestiya civakî disekinin. Ji ber ferzên zewacê yên baweriyê gelek malbatan hewl daye ku bi rêya zewaca di emrê piçûk de pergala ol, çînî û malbatê biparêzin. Lê zewaca di temenê piçûk de û zêdebûna zarokan bi taybet ji bo jinan dibin sedemên gelek zor û zehmetiyan. Lewra van salên dawiyê tê dîtin ku malbat û jinên ciwan ên Êzdî zêdetir girîngiyê didin bi xwendin û bipêşketinê. Şirîn, jineke Êzdî ji gundê Berzan ê Hesekê ye; ew qala guhertinan dike yên ku bi şoreşê re çêbûne: "*Ez di 16 saliya xwe de zewicîm. Heya refa sê, ez çûm dibistanê û piştre ez neçûmê. Dema ez diçûm dibistanê, hemû mamosteyên me Ereb bûn. Wan ji me hez nedikir; li me*

[163] Hevpeyvîn bi Enver re, gundê Gundorê yê Amûdê, 2017

[164] Hevpeyvîn bi malbatên mamoste Îlyas û Şêx Celal re ji gundên Gundor û Qizlarçoxê yên Amûdê, 2017

[165] Hîvda Hebûn: *'Em ê bi rengekî azad vegerin Efrînê', hevpeyvîn bi endama Yekîtiya Êzdiyan Gulêcan Fer,* ANF, Şehba 07-06-2018: https://anfkurdi.com/rojava-Sûriye/em-e-bi-rengeki-azad-vegerin-efrine-98173

dixistin, xeber ji me re digotin. Ji zarokên Ereban hez dikirin. Berê qîmetê jinê nebû, niha heye. Niha gelek tişt hatine guhertin. Em hemû bi hev re dijîn: Ereb, Êzdî û Kurd."[166]

Fermana 73'yan

Fermana 73'yan a ku 3'ê Tebaxa 2014'an li Şengalê dest pê kir bandoreke giran li ser civaka Rojava bi giştî û bi taybetî li ser Êzdiyan kiriye. Li aliyekî ji tirs û gumanê, pêleke nû ya koçberiya ber bi derveyî welat ve çêbûye. Vê hişt ku îro bi dehan gundên Êzdiyan ên li Rojava yan vala bin yan jî kêm kes di wan de dimînin. Bi pirranî tenê kal û pîr, malbatên feqîr û yên welatparêz li ser axa xwe mane.

Li aliyê din jî piştevanî û yekîtiya civakê li dijî êrîşên DAIŞ'ê xurtir bûye. Êş û hêrs li ser komkûjî û qirkirina jinê hatine parvekirin. Ruhekî hevbeş ê seferberiya gel bi pêşengiya berxwedana YPJ-YPG'ê bi pêş ketiye. Di rojên fermanê de gelê Rojava çû ber bi Şengalê ve. Wan tevî hêzên parastinê li ser korîdora mirovî 150 hezar jin, zilam û zarokên Şengalê xilas kirin. Her wiha rêveberiya xweser a Rojava derfetên bicihkirin û xwedîlêderketinê li herêma Cizîrê ava kirine.

Dîlgirtina jinên Şengalê bi xurtî tesîr li Rojava kiriye. Ev bûye sedem ku jinên Êzdî û bi nexasim ên ciwan, parastina ol û nirxên xwe pêwîst bibînin. Şopandina berxwedan û pêşketinên li Şengalê xwesteka wan a tevlîbûna nav xebatên siyasî û civakî, lêgerînên edalet û azadiyê jî xurtir dike. Yek ji wan jinên ciwan *Lava Cindo* (Êzda Êzîdxan) ye. Ew sala 1999'an li gundê Qizlarçox ê Amûdê ji dayik bûye. Ji bo ku gelê xwe li hemberî fermanên nû biparêze û azadiya jinê misoger bike, wê di ciwaniya xwe de pêşengî kiriye ji tevlîbûna ciwanên Êzdî ya nav gelek çalakiyên li Rojava û Şengalê re. Bi heman armancê wê di 19 saliya xwe de biryara tevlîbûna nav refên gerîla daye û çend mehan paşê di 30'ê Îlona 2018'an de di êrîşên hawayî yên arteşa Tirk li dijî herêmên Başûrê Kurdistanê de şehîd bûye.

Civaka Êzdî ya Rojava ji bo xwedîderketina li jin û zarokên Êzdî yên ku di pêngavên QSD'ê de ji destê DAIŞ'ê hatine xilaskirin, xwe berpirsyar dîtiye. Ew jin û zarokên hatin revandin û kolekirin, xof û trawmayên giran hatine serê wan. Heta, hinekan ji wan, zimanê xwe ji bîr kiriye. Piştgiriya civak û saziyên Êzdî li Rojava û gihandina malbatên li Şengalê dibûn gavên destpêkê da ku ew jin û zarok bikarin van êşên giran li pey xwe bihêlin û li eslê xwe vegerin. Bi taybetî jinên ku di encama tecawizên çeteyan de ducanî mane û zarok anîne, di rewşeke pirr zehmet de ne. Lewma jinên Mala Êzdiyan, alîkariyên jiyanî û derûnî di nav civakê de bi rêxistin dikirin. Her wiha ji bo bihurîna ji ferasetên zayendperest ên namûsê, nîqaşên bi pêşengên olî û civakê re jî tên meşandin.

Wekî din di berxwedana Efrînê a 58 rojan de jinên Êzdî jî bi risteke girîng rabûn. Bi armanca qirkirina çandî û olî dewleta Tirk ji roja ewil ve nexasim êrîş bire ser gund û cihên pîroz ên civaka Êzdî. Navendên wan ji aliyê artêşa Tirk a dagirker ve hatin teqandin. Gelek cih û gorên pîroz, şûnwarên dîrokî û yekane peykerê Zerdeşt li Rojhilata Navîn hatin rûxandin. Bermahiyên çanda civaka xwezayî hatin bombebaran, wêran û talankirin.

Piştî ku arteşa Tirk tevî çeteyên xwe 16'ê Adara 2018'an Efrîn dagir kir, beşeke mezin a Êzdiyan tevî gelên din ên Efrînê çûn wargehên li Şêrawa û Şehbayê. Êzdiyên ku li bin dagirkeriya dewleta Tirk li herêma Efrînê mane, talan, kuştin û êşkenceyên hovanê hatin serê wan. Ji bo parastina jiyana xwe, malbatên Êzdî careke din mecbûr mane xwe wekî Misilman bidin xuyakirin. Lê belê pirraniya Êzdiyên Efrînê ji bo vegereke bi ewlekarî û nasnameya xwe ya li axa xwe ya azad, berxwedana xwe didomînin. Li bin şertên giran ên wargehên li Şehbayê, wan careke din li bin konî

[166] Hevpeyvîn bi Şirîn re, gundê Gundorê ya Amûdê, 2017

navendeke xwe ava kiriye û bi pekhateyên din re pergala xweseriya demokratîk li Şehbayê jî dimeşînin.

Her wiha warên Êzdiyên Serêkaniyê jî di êrîşên Cotmeha 2019'an de ji aliye dewleta Tirk û çeteyên wê yên 'Arteşa Nişтîmanî' hatin dagirkirin û talankirin. Êşa mezin a hinek malbatan ew e ku hinek cîranên wan ên Ereb jî tevlî hêzên dagirker bûne. Wan dest daniye ser mal û milkên Êzdiyan dema ku Êzdî careke din bûne koçber li ser axa xwe.

- **Cihûtî**

Ola Musewî ji destpêkê ve weke senteza dîn û qewm şêwe girtiye. Di sedsala 16'an BZ de bi derketina Hz. Îbrahîm, baweriya yekxwedayî ya Musewî li vê herêmê belav bûye. Serîrakirina Hz. Îbrahîm ya li hemberî zilma Nemrûdê Babîlê û şikandina pûtan mirov dikare weke berxwedana qebîleyên li dijî zextên pergala dewletperest şirove bike. Tê gotin, dema Hz. Îbrahîm ji Rihayê derketiye, çûye gundê Kaniya Bûkê (Eyn Erusê) yê girêdayî Girê Spî. Heta roja îro jî xelk weke cihekî pîroz diçe serdana vî cihî. Qebîleya Îbrahîmî koçberî Kenan û Misrê bûye. Dema seferên Împaratoriya Asûrî di sedsala 8'an a BZ'yê de beşeke Cihûyan li herêmên Kurdistanê bi cih bûne. Tê texmînkirin ku di sedsala 12'emîn de nêzî 100 warên Cihûyan li Kurdistanê hebûne.

Şiroveyên Tewratê û Talmudê serweriya zilam di civak û malbatê de misoger kirine. Rista jinên Cihû li gorî şertên baweriyê, bi erkên malbatî û dayiktî hatibû sînordarkirin. Xwendin, peywirên olî û siyasî ji bo jinê şerm dihatin dîtin. Lê belê jinên Cihû ku bi ristên girîng di zanist û civakê de rabûne, her tim hebûn. Yek ji wan *Asenat Barzanî* bû ku di sala 1590'î de li bajarê Kurdistanê Mûsilê ji dayik bûye. Bavê wê Samuel, hê di zarokatiya wê de mamosteya wê bû û ew li ser Tewratê, Talmûdê û felsefeya Qabalayê perwerde kiriye. Piştî zewaca wê û mirina hevjînê wê, Asenat bûye berpirsiyara Yeşîwayê li Mûsilê û bûbû perwerdekera Tewratê û Torayê. Ew ji aliyê zanyaran û civaka Cihûyan li Kurdistanê ve wekî jina yekem a rabbi û seroka Yeşîwayê hatiye qebûlkirin. Navê Tanna'îtê lê kirine ku wataya wê 'hosteya olî' ye. Her wiha Asenat Barzanî wekî jineke fîlozof û zane dihat nasîn û jina yekemîn bû ya ku helbestên bi zimanê Îbranî nivîsandine. Sala 1670'yî Asenat li bajarê Amediyê yê Başûrê Kurdistanê wefat kiriye. Gora wê heta îro ji bo Cihû û Kurdan wekî cihekî pîroz û ziyaretê tê dîtin.

Li Bakurê Sûriyê, navên hinek gundên weke 'Tewratê', 'Dawudiyê' li aliyê Hesekê yan jî 'Xirbê Cihûyan' li aliyê Girkêlegê şopên nişтecihbûna qewmên Cihû li herêmê nîşan didin. Li Şam û Helebê û her wiha li navenda Qamişlo jî, tax û kinîştên kevin ên Cihûyan hene. Lê di encama şer û desthilatdariyên cuda de gelek Cihû ji herêmê derketine û koçber bûne. Tê texmînkirin ku heta sala 1943'an li Sûriyê bi giştî qederê 43 hezar Cihû hebûn. Lê bi avakirina dewleta Îsraîlê û bipêşketina siyonîzm û nijadperestiya Ereb ve gelek Cihû koçberî Îsraîlê bûne. Beşeke din jî çûne welatên Ewropî. Li gorî fermanên hukûmeta Sûriyê di sala 1950'î de Cihûyên Qamişloyê ji karên ziraetê hatine derxistin û bi gelemperî dewletê dest danîye ser milkê Cihûyan. Di sala 1978'an de tenê 4500 Cihû li Sûriyê mabûn. Tê gotin, di sala 2006'an de tenê malbateke Cihû li Qamişlo mabû ku xwe wek 'Cihû, Ereb û Sûrî' pênase dikir. Yên din an koçber bûne yan jî ola xwe guherandine. Îro Cihû li Qamişlo nemane, lê kinîşte û bermayên Cihû ji aliyê rêveberiya xweser a kantona Cizîrê ve tên parastin. Tê texmînkirin ku îro nêzîkî 150 hezar Cihûyên Kurdistanê li dewleta Îsrailê hene.[167]

[167] Fehim Taştekin: *Rojava - Kürtlerin Zamanı*, 2016

- **Xirîstiyanî**

Di sedsala 3'emîn a piştî zayînê de bajarê Rihayê (Edessa) bûye yek ji navendên hewariyên Îsa ku ola Xirîstiyaniyê li herêmê belav kirine. Xirîstiyanî di vê serdemê de wekî ola ku mafên bindest û feqîran diparêze, bi pêş ketiye. Li şûna feraseta tolhilgirtinê ya Musayî ya ku li ser esasê 'can bi can, çav bi çav, xwîn bi xwîn' bang ji bo tolhildanê bi heman rêbazan dikir, ola Îsayî banga bexşandina neheqiyan û aştiyê dikir. Dîsa helwesta Îsa *'yên bê guneh bila kevirê destpêkê bavêjin'* li hemberî recmkirina jineke ku bi zînayê hatiye tewanbarkirin, hêvî dida jinan. Piştî vê gotina Îsa, zilam hemû li ber xwe ketine û xwe bi paş ve kişandine. Li vir durûtiya feraseta namûsê ya baviksalar hatibû eşkerekirin. Ji ber vê gelek jin jî bûne dilsozên baweriya Hz. Îsa. Gelên Aşûrî, Suryanî, Keldanî û Ermenî ji mêj ve baweriya xwe bi ola Xirîstiyaniyê dianî. Wan baweriya xwe li hemberî êşkence û zordestiyên împaratoriyên Roma û Bîzansê parastiye. Di encama şiroveyên ciyawaz ên teolojîk û sazîbûnên dêran li navendên cuda hê ji destpêkê ve parçebûnên mezhebî derketine holê. Her qewmek bûye xwedî mezhebeke cuda: Suryanî bûne Ortodoks, Keldanî bûne Katolîk, Ermenî bûne Gregoryan û Asûrî bûne Nastûrî. Tê texmînkirin ku hejmareke piçûk ya Kurdan jî di serdemên cuda de baweriya Xirîstiyaniyê hebandine.

Rista Jinê di Ola Mesîhî de

Dêra kevnar a **Febronîa Nisibis** li bajarokê Hîmoyê yê nêzîkî Qamişloyê, qala dîroka berxwedana jinê li hemberî fermanên arteşa Romayê li dijî bawermendên Xirîstiyan dike. Febronîa rahibeyeke ciwan a ji Nisêbînê bû. Wê li hemberî zilm û êşkenceyên leşkerên Romayê li ber xwe daye û baweriya xwe parastiye. Febronîa qebûl nedikir ku ji baweriya Xirîstiyaniyê vegere û bi fermandarekî Romayê re bizewice. Ji ber vê di sala 304'an de ew di 19 saliya xwe de ji aliyê leşkerên Romayê ve bi hovanê hatibû êşkencekirin û şewitandin. Gel dibêje ku li cihê şehadeta Febronîa darek şîn bûye ku ji pelên wê ava sor wekî xwînê herîkiye. Xirîstiyanan ev dar wekî cihekî pîroz dîtiye û li vir Dêra Hîmo ava kirine. Heta roja îro du darên ziyaretê li cem dêra Febronîa tên xemilandin. Balkêş e ku di wêneyekî kevin de hundirê dêrê de Hz. Îsa û Hz. Meryem bi şikl û mezinbûna wekhev li ser kursî rûniştî hatine xêzkirin. Her çiqas wekî din pirraniya wêneyên Hz. Meryem wekî dayik û Hz. Îsa wekî zarok di hembêza wê de ango di temenê mezin de wek parêzvanê dayika xwe nîşan dikin. Mirov dikare bibêje ku di vî wêneyî li dêra Febronîayê de herdu wekî hevhêz ango hevserok tên destnîşankirin.

Bi sazîbûna dêran wekî stûnên desthilatdariya dewletan re têkiliyên malbat û civakê di ola Xirîstiyaniyê de jî li ser bingehê baviksalariyê hatin avakirin û tên meşandin. Zayendperestiya civakê di kar û barên dêran de jî xuya dibe: Tenê zilam dikarin bibin xwedî erk û berpirsyariyên serekê yên olî yên wekî keşe yan papaz. Her wiha di dêrên Ortodoks de qedexe ye ku jin bikevin cihê pîroz ê îbadetê yê li aliyê pêş ê dêrê. Lê li aliyê din, rojên taybet ji bo bibîranîna jinên pîroz tên lidarxistin ku bi îbadetên taybet tên pîrozkirin; weke mînak roja ***Hz. Barbara*** û ***Hz. Yuliyana***. Barbara di nav malbatekê dewlemend de bi baweriya paganîzmê di serdema Împaratoriya Romayê de mezin bûbû. Lê ew pê hesiya ku xwedê wê vedixwîne ola Hz. Îsayî. Bi alikariya jineke xizmetkar ku Xirîstiyan bû, ew têkiliyên xwe bi bawermendên Xirîstiyan re danîne û hatiye weftîzkirin. Dema ku Barbara hewl dida ku bavê xwe jî bîne ser rêya baweriya Xirîstiyaniyê, bavê wê êrîşî wê kiriye û lêdixistiye. Keça ciwan Yuliyana ev bûyer bihîstiye û bûyerê tesîr lê kiriye. Ji bo piştgiriya xwe bi Barbara re bide diyarkirin, ew bûye Xirîstiyan. Di 17'ê Kanûnê 206'an PZ de herdu jinên ciwan di bin êşkenceyên giran de hatibûn kuştin û serjêkirin.

Her wiha roja wefata ***Hz. Rîta*** di 22'ê Gulana 1457'an de wekî rojekî taybet tê bibîranîn. Hz. Rîta bi darê zorê hatibû zewicandin. Lê piştî hevjînê wê miriye, ew bûye rahibe. Bi zanebûna xwe li ser tenduristiyê û hezkirina xwe wê gelek mirov ji nexweşiyan û derdan xilas kirine. Navên gelek keçên Xirîstiyan heta roja îro jî li gorî roj an jî taybetmendiyên wan jinên pîroz tên hilbijartin.
Jinên rahibe sond xwarine ku ew ê dilsozê nirx û erkên olî bijîn. Wan têkiliyên zewacê red kirine û di nav komên rahibeyan de li mergenan [manastiran] diman û kar dikirin. Di nav civakî de ew wekî jinên 'pak' ango wekî 'bûkên Hz. Îsayî' dihatin binavkirin. Mergenên rahiban di heman demê de ji bo jinan dibûn cihên jiyana komînal û hilberînê, xwendin û zanistê.

Xirîstiyanên Bakurê Sûriyê

Aşûrî, Suryanî, Keldanî û Ermenî yên Cizîrê li herêmên wekî Serêkaniyê, Qamişlo, Hesekê û Dêrikê li heman gund û taxan dimînin. Ruxmê ku siyaseta parçekirinê li ser civaka Xirîstiyan hatiye meşandin û mezhebên wan ji hev cuda ne, ew diçûn û tevlî merasîmên li dêrên hevdu dibûn. Li şûna nasnameya xwe ya neteweyî, wan hîna zêdetir bi nasnameya xwe ya olî wekî 'Xirîstiyanên Sûriyê' xwe pênase dikir. Di bin nîzama Beesê de hinek mafên wan di warê baweriyê de hatin nasîn û pirraniya Xirîstiyanan xwe bi ewle hîs dikir; bi cîranên xwe yên Misilman û Êzdî re di nav têkiliyên civakî de bi rêzdariyê dijiyan. Heta destpêka şer û pevçûnên li Sûriyê, teqrîben ji sedî 10'ê nifûsa Rojava, Mesîhî bû. Pirraniya bawermendên Mesîhî yên Rojava îro li kantona Cizîrê dimînin, ji van ji sedî 75 Ortodoks, ji sedî 25 jî Katolîk in.

Li kantonên Efrîn û Kobanê jî dêrên kevnar, gund û malbatên Mesîhî hebûn. Lê pirraniya wan di salên 1980'yî de koçber bûne. Piştî ku gora Qidîs Marmaron li Gundê Beradê li Efrînê hatibû dîtin, ev gund di asta cîhanî de veguheriye heca bawermendên Xirîstiyanan yên bi mezhebê Maronî. Her wiha li ser xeleka Çiyayê Lêlûnê yek ji dêrên herî girîng Dêra Saman heye ku di sedsala 5'an PZ'ê de hatiye avakirin û heta dagirkeriya arteşa Tirk weke cihê heca Xirîstiyanan hatiye nasîn.

Gelên Xirîstiyan di Serdema Şoreşa Rojava de

Li bajarên wekî Dêrikê, Qamişlo, Til Temir, Serêkaniyê û Hesekê yên herêma Cizîrê jinên Suryanî, Keldanî û Aşûrî bi şoreşê re komînên xwe ava kirine. Li hinek bajarên weke Dêrikê, jin bi pirranî li ser bingehê baweriyê û li bin banê dêran tên cem hev. Xebatên civakî û mirovî yên dêran bi pirranî jin dimeşînin. Jin di hefteyê de rojekê ji bo îbadeta jinan li dêran tên cem hev. Lê li hinek cihên weke Heseke û Til Temirê, me bi jinên Sûriyanî û Aşûrî re hevpeyvîn kirin ên ku li ser bingehê siyasî û zanistî hewl didin, rêxistinbûna xwe û tevlîbûna xwe di nava sazî û siyaseta xweseriya demokratîk de bi pêş bixin. Lê hejmara wan jinan di nava pêkhateyên xwe de hîna kêm e. Ew qala wê yekê dikin ku ew di hêla têkoşîna azadiya jinê de ji ber otorite û dogmayên zayendperest ên dêran, carna zehmetiyan dikişînin.

Ji ber dogmayên dînî mafên jinan weke doza berdan an jî jiberxwekirina zarokan, tabû ne û nayên nîqaşkirin. Dîsa zewaca bi Misilmanan re yan jî kesên ji olên cuda re nayê pejirandin. Di mijarên zewac û malbatê de qanûnên medenî nayên bi kar anîn. Li gorî exlaqê Xirîstiyaniyê bi van mijaran dadikevin û qanûnên olî lê ne. Jinên Xirîstiyan li Hesekê sedema vê rewşê bi helwesta dewletê beramberî Xirîstiyanan şirove dikin: "*Li Sûriyê zewaca medenî tineye. Ji ber ku qanûna dewletê gava ku zilamekî Misilman bi jineke Mesîhî re bizewice, divê ew jin bibe Misilman. Dîsa gava ku jinek Misilman jî bi zilamekî Mesîhî re bizewice, divê ew zilam jî bibê Misilman. Mafê me nîne. Lewma em mecbûr kirin. Bûyerek çêbû, xortekî Mesîhî û jineke Misilman ji hev hez kirin û*

zewicîn. Piştî vê xort pirr nexweş ket û xwesteka wî ew bû di nav goristana Mesîhiyan de werê veşartin, lê dewletê qebûl nekir û nehişt."[168]

Bi êrîşên çeteyên wekî El Nusra û DAIŞ'ê birînên gelên Xirîstiyan li Bakurê Sûriyê cardin zindî bûne. Bi piranî tenê kal û pîrên Xirîstiyan li warê xwe mane. Ew bi pirranî bi êşa koçkirinê û dûrbûnê, zarok û neviyên xwe bi bîr tînin. Mînak li Gundê Xanîkê li ser Ava Dîclê berê 100 malbatên Keldanî hebûn. Lê îro tenê 20 mal mane.

Keşeyê dêra Ortodoks a Suryanî li Dêrikê da zanîn ku beriya bi 10 salan li Dêrikê 1200 malbatên Xirîstiyan hebûn, lê îro tenê 550 malbat mane. Her wiha çavkaniyên cuda diyar dikin ku nifûsa Xirîstiyanan li navçeyên Heseke, Qamişlo, Reqa û Dêrazorê di sala 2011'an de qederê 250 hezar bû. Heta sala 2015'an di bin bandora êrîşên çeteyan de hejmara wan daketiye derdora 100 hezarî. Dema şerê Til Temirê di bihara 2015'an de çeteyên DAIŞ'ê 270 jin, zarok û zilamên Aşûrî revandin. Piştî vê, pirraniya Mesîhiyan ji bajar û gundên xwe reviyane û koçber bûne. Gel dibêje, şervanên YPG-YPJ'ê û ciwanên herêmê ew parastine û rizgar kirine. Lê heta niha pirr kêm malbatên Aşûrî vegeriyane ser warên xwe. Malbat û gundên Mesîhiyan yên mayî jî, xebatên komîn û ewlekariya gundên xwe bixwe rêxistin dikin. Endamên wan di nav saziyên xweseriya demokratîk, Asayîş, Sotoro, Meclîsên Leşkerî yên Suryanî û Aşûrî û QSD'ê de hene.

Hin malbat hene ku Tevgera PKK'ê beriya Şoreşa Rojava nas dikirin û hez jê dikirin. Lê têkiliyên bi Kurdan re, naskirina fikr û ramana Abdullah Ocalan bi pirranî bi şoreşê re bi pêş ketine. Lê belê di beşeke civaka Xirîstiyan de hîna tirs û mesafeyek li hemberî Misilmanan heye. Ew kes guman dikin ku rojekê Ereb û Kurdên Misilman wê bibin yek û careke din mafê gelên Xirîstiyan werin binpêkirin. Lê belê bi cihgirtina di nav komîn û mekanizmayên hevbeş ên rêveberriyê de bawerî û hevgirtin bi pêş ket. Wekî din rêveberiya xweseriya demokratîk piştgirî daye ji nû ve avakirina dêrên ku ji ber şer yan jî bêxwedîbûnê ziyan li wan bûye.

Nûnera Yekîtiya Jinên Suryanî serpêhatiyên xwe wiha tîne ziman: "*Ez roja yekemîn tevlî xweseriya demokratîk bûm. Wê demê gelek rexne ji min re hatin. Ez li ser vê pirr aciz bûm, lê baweriya min bi xweseriya demokratîk hat. Lewma ez tevlî xebatan bûm, ruxmê ku mala min li Hesekê di nav cihe rejîme de ye. Sala 2013'an me yekîtiya xwe ya jinan nû ava kir. Beriya vê, tirsa min pirr hebû. Lê piştî ez tevlî xebatên xweseriya demokratîk bûme, tirsa min şikest. Moralê min bilind bû û min moralê derdora xwe jî bilind kir. Dema şerê Hesekê ji ber êrîşên DAIŞ'ê ez hatim Qamişloyê. Lê mêrê min li malê mabû. Wî tevî cîranên me, Kurd û Ereb taxên me parastin. Ev hêz hemû bi pergala xweseriya demokratîk ve bi pêşket û em bi vê gelekî serbilind in."*[169]

Jinên Xirîstiyan li komîngeha taxa Şehîd Xemgîn a Dêrikê şirove dikin û dibêjin, ew hîmên xweşbînî, jiyana hevpar û aştiyê yên xweseriya demokratîk di heman demê de wekî hîmên baweriya xwe dibînin. Pirraniya endamên komînê Keldanî, Suryanî û Ermenî ne. Lê çend malbatên Kurd ên Misilman jî di nav wan de hene. Hevseroka komînê Seyda Îbrahîm bi serbilindî sê wêneyên li ser diwarê komîngehê li pişt maseya xwe nîşan dide û dibêje: *"Ev ji bo me sê fîlozofên mezin in: Metranê Keldanî Mar Louis Raphael Sako, Papa yê Vatîkanê Fransîs û Serok Apo! Wan em anîn cem hev."*[170]

[168] Hevpeyvîn bi endamên Yekîtiya Jinên Suryanî re, Heseke, 2017

[169] Çavkanî li heman cihî

[170] Hevpeyvîn bi jinên Komîna Taxa Şehîd Xemgîn re, Dêrik, 2017

- **Îslamiyet**

Baweriya Îslamê di dawiya sedsala 6'an de bi pêş ketiye. Di vê pevajoyê de krîzeke mezin a exlaqî û manewî, alozî û şerên di nav civak û qewmên Ereb de qewimîne. Kedxwarî û zordestiya serdestan gihiştibû asta herî bilind. Bi taybetî mafê jinan gelekî dihatin binpêkirin. Jin ji mîrasê mehrûm dihatin hiştin, wek kole û cariye dihatin xebitandin, heta dema hevjînê wê wefat dikir, ew ji mafê welayeta zarokên xwe jî dihat bêparhiştin. Yek ji armancên derketina Hz. Muhemmed avakirina yekîtî û aştiyê di nava qebîleyên Ereban de bû. Li gorî vê di Quranê de hatiye ferzkirin ku mirov ji mafê hevdu re rêzdar bin, hev biparêzin, bi qedrê mirov û zindiyan hemûyan li gerdûnê bizanibin, aştîxwaz, zane û mafparêz bin. Weke di Peymana Medîneyê de xuya kiribû, xweşbînî di nav qewm û baweriyên cuda de pîvanên bingehîn yên Îslamê ne.

Rista Jinê di Ola Îslamê de

Di gelek ayetên Quranê de qaydên wekhev ji bo tevahiya civaka Îslamê, ji bo jin û mêran hatine zelalkirin. Erk û ferzên ku ji jinê tên xwestin ji mêran jî tên xwestin; ceza û mukafata her duyan jî wek hev tên destnîşankirin. Wekî din di Sûreya Lûqman de ayeta 14'an û Sûreya Ahkafê ayeta 15'an de ji mirovan tê xwestin ku bi başî nêzî dayikên xwe bibin ji ber ku wan ew bi zehmetî di zikê xwe de hewandiye û bi zehmetî anîne dinê. Di Sûreya Hicûratê ayeta 11'an de ji jinan hatiye xwestin ku henekê xwe bi hev nekin; lomeyan li nefsa xwe nekin, hevdu piçûk nexin û bi leqabên xerab bangî hev nekin. Yanî li gorî vê ayetê, tê xwestin ku jin ji hev hez bikin û bi qedrê hev zanibin.

Rista **Hz. Xetîce** di vesazkirina ol û çanda Îslamê de girîng bû. Nirxên manewî yên Îslamê dibûn parçeyek ji hîmên çanda hevbeş a gelên Rojhilata Navîn. Her wiha gelek jinên zane di zanista şerîetê û hedîszaniyê de cihê xwe digirtin. Çend ji jinên ku di vî warî de li cih û medresên cuda xebatên girîng meşandine û şiroveyên xwe bi pêş xistine, ev in: Sayyidah Nafisah bint el-Hesen, Umm al-Darda, Fatîma bint Muhemmed ibn Ehmed el-Semerqandî, Fatîma al-Batayahiyyah û Eyşa bint Ebû Bekir.

Di heman demê de jinên Misilman li gelek welatan pêşengiya civakê kirine, xwendin û zanist bi pêş xistine, wekî Razîa Sultan li Hindîstanê, Nana Asma li Rojavayê Efrîkayê, keybanû El-Adar El-Karima li Yemenê, keybanû Iffat li Erebistana Siûdî yan jî Tatar el-Hijaziyya û Xawand Bereka li Misrê.

Îslam wekî Ola Dewletê

Piştî wefata Hz. Muhammed û pê re, bi desthilatiya Muawiye ola Îslamiyetê ji aliyê serdestan gelek car wekî amûra desthilatdariyê li gorî berjewendiyên xwe hatiye bi kar anîn. Li herêmên Bakurê Sûriyê di dema Xelîfe Omer de Îslamiyetê bi darê zorê û dagirkeriya artêşên Îslamê ve wek ola dewletê hatibû serwer kirin. Ji sedsala 16'emîn û şûn ve bi desthilatdariya Împaratoriya Osmanî, Îslama Sunî êdî li pirraniya herêmên Rojhilata Navîn û derdora Derya Spî serwer bû. Bi taybet beg û eşîrên ku xwestine bi hêz û bandor bibin, ji bo berjewendiyên xwe derbasî ola Îslamê bûne. Dewleta Osmanî saziya şêxtî ava kiriye ji bo ku karibe eşîrên Kurd bi rêya şêxan bixe bin bandora xwe. Nirxên manewî yên baweriyê gelek caran hatine çewtkirin. Lê berovajî jî çand û nirxên civakî yên Îslamê ji bo gelek bindestan dibûn hêvî û hêza berxwedanê li hemberî zilm û dagirkeriyê.

Dîsa çend seyid û mela wek hevkarên dewletê dihatin bi kar anîn û demekê bandora xwe li ser hinek deverên Rojava kirin. Wan di gelek milan de pêşî li guhertinên demokratîk di nava civakê de girtine û ferasetên desthilatdariya zilam xurt kirine. Mînak di salên 1950'an de dewleta Sûriyê mala Seyda ji aliyê Qamişlo derbasê Kobanê kir. Armanca dewletê ew bû ku bikare bi rêya wan meylên xweser di civakê de kontrol bike. Gelê Kobanê dibêje, Mala Seyda, malbata mela Husseyin û jina wî Nefîsa girêdayî terîqata Neqşîbendî bûn û qaîdeyên hişk yên olî li ser civakê ferz kirine. Êdî ji bo jinê her tişt 'eyb' bû. Dema ku jin ji malê derketiba, ew mecbûr bûn çarşafa reş li xwe bikin. Bi vî rengî bandora jinê di civakê de hatibû sînordarkirin û civak ji cewhera xwe ya komînal hatibû dûrxistin.

Tê gotin, teriqata Neqşîbendî di nav gelê Cizîrê de zêde nedihat pejirandin. Bala mirovan dikişand ku ruxmê ku sînor bi giştî ji bo gel girtî bû, endamên teriqatê karibûn sînorê bi Tirkiyê re rehet derbas bikirana: *"Şêx Hisna hebû. Niha pirr bandora wê nemaye. Wana Neqşîbendî ne. Gundê wan Til Marûf, di navberê Tirbespiyê û Qamişlo de ye. Ew Şêxê Kurd in. Tê bîra mi, gelek kes ji Bakur, ji Batmanê, ji Sêrtê, ji Bîtlîsê dihatin cem wan. Heçko rêya Qamişlo tenê ji bo wan dişixulî. Lê belê Kurdên Rojava pirr zêde nediçûn cem wan. Jinên wan jî wekî şêx dihatin dîtin. Ji wan re digotin, 'Şêxa'. Wan jî jin li derdora xwe kom dikirin, lê pirr hindik bûn."*[171]

Îslama Civakî û Çandî

Di civakê de nirxên insanî û manewî yên ola Îslamê xwedî wateyeke girîng in. Dewletê çiqasî dixwest olê wekî amûrekî desthilatdariyê û parçekirinê bi kar bîne jî, ewqasî ew nirxên exlaqî dibûn bingehê hevgirtinên civakê û pêkhateyan.

"Îslam di Rojava de pirr hişk nebû. Gelan Îslam wekî bawerî û çand qebûl dikir. Kevneşopiyên çanda xwedawendan heta bandora Îslama polîtîk hîn xurttir û zêdetir bûn. Ev di şikile jinan de jî xuya bû. Por û dest û lingê jinan xuya dibûn. Ew tişt ne eyb bûn. Kurd di nav çanda Zerdeştî û Îslamê de mabûn. Ne tam Zerdeştî avêtin ne jî tam Îslam digirtin. Jin û dayikan di gelek aliyan de çanda civaka xwezayî parastine. Mînak pirr kêm malbat diçûna hecê Suudî Erebistanê. Gelek malbatan digot, 'Li şuna ku tê ewqas pera bide û biçe wir ji bo Xweda gunehên te tuhevê bike (efû bike), vî pera bide malbatên feqîr û Xwedê wê te afo bike. Di milê xêr de kevneşopiyên baweriyê meşandin.

Adet û teqalîndên Erebên bedewî yên li ser jinê pirr hişk in. Lê ya wan jî ne pirr zêde ji ber bandora Îslamê ye. Kevneşopiyên wan cuda ne. Pêçandina rêş û Îslama hişk bi bandora Îslama siyasî wekî Hizbullah li Sûriyê dest pê kir. Berê tine bû. Tabî, dogmatîzma Îslamê jî bandora xwe çêkiriye û nedihişt ku mirov pêş bikevin. Lê feodalîzmê jî li ser civaka Kurdên Rojava bandor dikir."[172]

Komek jinên Misilman yên Kurd li Dêrikê hîn di dema rejîma Beesê de rexistineke xweser ava kirine. Armanca wan ew bûye, ku ew ê bikarin baweriya xwe bi nasname û zimanê xwe fêrbikin û pê bijîn. Wan perwerdeyên olî û Quranê bi zimanê Kurdî li dar xistin û nêzîkî hezar ciwanî perwerde kirine. Ruxmê ku zexta muxaberata dewletê hebû, jinan di vê armanca xwe de israr kiriye û xebata xwe domandiye. Endamên saziyê dibêjin:

[171] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, endama Kongra Star, Qamişlo, 2017

[172] Çavkanî li heman cihî

"Sîstema dewletê gelek li me zext dikir da ku em bi zimanê Erebî li mizgeftan biaxifin. Lê me ev yek nepejirand. Herî zêde me di zimanê xwe de israr dikir. Di olê de ya ku herî zêde derdikeve pêş ew e ku divê her kes li gorî baweriya xwe û îqnabûna xwe tevbigere. Ev yek jî ji bo dayîna desmal serê xwe ango ji bo hemû pêdiviyê ku Îslam ferz dike derbasdar e. Xebatê me di salên 2005 û 2008'an de dest pê kir. Gelek endamên ku beşdar dibûn di asta herî jor de şahedeyê zanîngehê bi dest xistibûn. Gelekan ji wan bijîşkî, mihendîsî û mamostetî xilas kiribû. Armanca me ew bû ku em Îslama rast di nava civakê de bimeşînin.
Dûrî ji zêhniyeta nijadperestî û faşizmê, me xwest hezkirina xwede bi baweriyê re kûr bikin. Rexne yên me li ser nêzîkbûnên şaş hebûne ku mele û şêx pê radibûn. Wek mînak wan digot: 'Dengê jinan wek ewra ye. Pêwîst e jin cilê reş li xwe ke.' Lê ya rast me di Quranê de xwend ne bi vî rengî bû. Ji ber wê yekê, me xwest vê yekê sererast bikin."[173]

Bi Şoreşa Rojava re van jinan li bin banê saziya *'Komiteya Olî ya Parastina Mafê Jinan'* xwe bi rêxistin kirine û xebata xwe di çarçoveya xweseriya demokratîk de dewam dikin. Ew tînin ziman ku bi şoreşê re *"gelê me ji berê gelek rehettir bû. Yanî saziyên me çêbûn û xebatên me tên şopandin. Gelek pêşketin bi me ra çêbûn."*[174]

Îro pirraniya Kurd, Ereb, Tirkmen, Çerkes û Çeçenan li Bakurê Sûriyê baweriya xwe bi Misilmantiyê tînin. Tê texmînkirin ku îro ji sedî 80'yê nifûsa Rojava, Misilman in. Li herêmên Cizîrê û Kobanê zêdetir mezheba Şafiî û terîqetên girêdayî wê yên wekî Neqşîbendî, Rifaî û Qadirî hene. Endamên mezhebên Neqşîbendî û Qadirî bi pirranî Kurd in, yên Rifaî Ereb in. Di nav gelê Efrînê de him mezheba Şafiî him jî ya Henefî di nava Kurdan de hene.

- **Elewîtî û Şîa**

Mezhebê **Şîa** bi taybetî piştî sala 2003'yan ji aliyê nîzamê ve û bi bandora dewleta Îranê li Sûriyê hatiye belavkirin. Bawermendên Şîa bi taybetî li herêmên Hesekê, Şehbayê û Efrînê dijman.

Her wiha beriya dagirkeriya dewleta Tirk, baweriya **Elewîtiyê** jî yek ji çandên dewlemend ên herêma Efrînê bû. Li cem Elewiyên Ereb, Elewiyên Kurd jî hebûn. Li navçeya Mabata ya Efrînê û hin gundên wê bawermendên Elewî hebûn ku wek beşek ji Elewiyên herêma Mereşê baweriya xwe parastine. Di hevpeyvînên sala 2017'an de jinên Elewî yên Mabata dibêjin:

"Elewîtî, yek ji baweriyên ku di hemû serdeman de rastî qetilkirin û qirkirinê hatiye. Lê ruxmê hemû cûreyên hovîtiyê yên ku bi ser vê baweriyê de hatine ta roja îro jî xwe parastiye û dev ji rêgez û pirensîbên xwe yên exlaqî û civakî bernedaye. Yek ji rêgezên Elewîtiyê siriyet e. Ji bo ku xwe û baweriya xwe ji ol û mezhebên dîtir biparêze. Ji bo ku Elewî ji çand û baweriya xwe dûr nekevin û neyên bişaftin pirr bi baldarî nêzî mijara siriyetê dibin.

Para jinê jî di baweriya Elewîtiyê de hebû. Lê dîsa jî weke baweriyên din jiyana jinê heya astekê hatibû sînordarkirin û siriyet pirr nedidan jinê. Ew ditirsiyan ku jin bi rêya zewacê biqulibe baweriyeke din û pê re jî ev siriyet derkeve û belav bibe. Lewra jî zewacê bi derdor û baweriyê din re pirr kêm bûn. Lê li beramberî vê, jinên bi temenê [xwe] mezin dibûn cihê baweriyê û siriyetê.

[173] Hevpeyvîn bi endamên saziya 'Parastina mafê jinê di olê de' re, Dêrik, 2017

[174] Çavkanî li heman cihî

Wan li kêleka pîrtiyê jî cih digirtin. Ruxmê ku bi pirranî mêran cihê xwe di pîrtiyê de digirtin, lê para jinê jî di pîrtiyê de hebû. Ew jî dibû cihê baweriyê ji bo jinan ku li benda pîra xwe diman."[175]

Yek ji pîrên jin jî Dede Fatme bi eslê xwe ji Bakurê Kurdistanê bû. Pirranî zana yên rêûresmên Elewîtiyê yên mêr bi sîfetê 'dede' yê ku wateya 'bapîr' tên bi nav kirin. Ji bo zana yên jin pirranî peyva 'ana' ango 'dayik' tê bi kar anîn. Xîtaba Fatme wek 'dede' ango 'Ded Fatme' civak wekî nîşana rêzdariyê dinirxîne. Di navbera salên 1930-1940'î de Ded Fatme çûye gûndê Mabata yê girêdayî Efrînê. Jinên Mabata heta niha behsa wê dikin. Ew wê wek "*jineke pirr jîr û zane"* û wek *"jineke bi şekil û şemal"* pênase dikin ya ku bi gotin û şîretên xwe jiyan bi rê ve dibir. Jineke ji Mabatayê, Ded Fatmayê wiha tîne bîra xwe: *"Ded Fatme bi pîrên mêr re derbasî gundên navçeya Mabata dibû. Li wê derê dora deh heya panzdeh rojan dima. Dema ku jinên gund hatina Ded Fatme dibihîstin bi moral û kêfxweşiyeke mezin xwe digihandinê. Ded Fatme di wê demê de kombûna jinan çêdikir û bi wan re sohbet dikir. Ji ber ku Ded Fatme bi pirsgirêkên mirovan dizanî, jinan ew [weke]cihê baweriyê û çareseriya pirsgirêkên xwe didît. Ew jî bi pirsgirêkên wan re mijûl dibû. Her wiha şîret û nîqaşên ku çawa jin baweriya xwe biparêzin bi wan re parvedikirin. Kombûna jinan li derdora Ded Fatme weke perwerdeyeke ji jinan re bû. Nîqaşên li ser hezkirina jinan ji hevdu re, li ser mijarên malbat, xweza û girêdana wan bi baweriya xwe re çêbûne."*[176]

Elewiyên Dêrsimê piştî qirkirina Dêrsimê hatine herêmên Sûriyê û Rojava. Xeyda Mihemed Yûsif ya gundê Zihêriyê ya navçeya Dêrikê dibêje: *"Ez bi xwe jineke Elewî ji Dêrsimê me. Sedemê hatina me ya Rojava komkujiya dewleta dagirker a Tirk bû ku li ser gelê Kurd da meşandin. Bi taybet li hemberî mezheba Elewî bi destê Osmaniyan komkujî hatibû meşandin. Ev bixwe tê wetaya bişaftinê ji bo me Elewiyan. Zimanê dayikê ji bo me qedexe bû, him li Tirkiyê him li Sûriyê. Ji ber wê yekê em neçar mane ku em bi zimanê Erebî biaxivin. Lewma çanda me hatiye jibîrkirin û binpêkirin. Sed mixabin malbata me diroka me ji me re zêde eşkere nedikirin. Ji ber ku gelek tirs hebû, her dem diroka me ji me vedişartin û bersiva gelek pirsê me nedidan."*[177]

Li ser rewşa jinê û kevneşopiyên civaka Elewî xwuşka wê Xeyda dibêje: *"Ez dikarim bêjim ku çanda me gelek nêzî çanda civaka xwezayî ye. Bi taybet di têkiliyên nav herdu cinsan de wekhevî û hevsengî heye. Jina dayik di baweriya me de gelek bi qîmet e û hizra xwe dide ciwanên xwe. Di serî de ew ji bo xwedê îbadet dikin û bi îmamê Elî bawer in. Wêneyên şûr pêwîst e di her malê de hebe. Di nav me de gelek bi kal û pîran bawer dikin û bi rêz nêz dibin. Lê di heman demê de jinên ku rastî şidetê tên û nikarin xwe ji van nêzîkbûna xilas bikin jî hene. Ev ji hişmediya baviksalarî tê. Derbarê zewacê de di çanda me de, zewacê bi kesên ji mezhebê dîtir re çênabe. Tenê di nav mezheba xwe de çêdibe."* Sedema vê kevneşopiyê wê wiha nirxand: "*Sedema ku em jinên xwe nadin mezheba Sunî ew e ku ew gelek hişk in di milê jinê de."*[178]

Têkiliyên Elewiyan bi gelên li derdora xwe re berî şoreşê û piştî wê, Xeyda wiha dinirxîne: "*Dema ku partiya Bees Elewiyên ji Lazqiyê anî û di nav erdê Kurdan de bicihkirin, ev ne bi dilê Kurdan bû. Bi zora wan ew bicihkirin. Kurd ji vê yekê gelek tengav bûn. Gelên ku dewletê li vir bicihkirin, wan timaiya erdê çandinî kirin. Dewletê jê re digot 'pêşeroja we li vir e'. Siyaseta dewletê bi darê*

[175] Hevpeyvîn bi jinên Elewî re, gundê Mabata yê Efrînê, 2017

[176] Çavkanî li heman cihî

[177] Hevpeyvîn bi Xeyda Mehemed Yûsif û xwuşka wê re, gundê Zihêriyê yê Dêrikê, 2017

[178] Çavkanî li heman cihî

zorê bû. Di destpêka Şoreşa Rojava de hinek nêzîkbûnên Kurdên ji derdorên partiyên wekî ENKS'ê derketin ku digotin 'pêwîst e Ereb ji erdê me derkevin'. Bertekên gelek dijwar bûn. Gelê Ereb jî bi tirs û xof bû. Lê hizrê hevalên Tevgera Azadiyê li hemberî vê ferasetê sekinîn û çareserî pêş xistin. Projeya neteweya demokratîk ku hatiye pêşkêşkirin, di nava gel de rehetî da çêkirin."[179]

d) Wekî Encama Beşê

Hêzên dagirker û hegemon her tim xwestine cudahiyên neteweyî, bawerî û mezheban li hemberî gelên Bakurê Sûriyê bi siyasetên qirkirinê, dabeşkirinê û bişaftinê bi kar bînin. Armanca wan ev bû ku vîn û rêûresmên civaka xwezayî lawaz bikin. Mixabin gelên herêmê jî her tim hay ji hinek siyasetên desthilatdaran nebûn û carna tenê ji pencereyên xwe ve li bûyeran mêze kirine. Lewma carinan şikestin, êş, biyanîbûn û pêşdaraziyên di nav pêkhateyan de hatine avakirin. Lê dîsa çand û exlaqê demokratîk yê gelan nedihişt ku qutbûn û dijminatî di nav gel û baweriyan de bi pêş keve. Erebên xizan ku bi armanca avakirina 'Kembera Ereban' li Cizîrê hatine bicihkirin, di serî de malbatên Kurd bi pirranî ew wekî 'cîranên nû' pêşwazî dikirin. Li cihên ku jiyaneke hevbeş ava bû, siyaseta bişaftinê ya dewleta Sûriyê pûç bû û Ereb jî fêrî zimanê Kurdî bûn.

Bajar û gundên pirrolî û pirrneteweyî li Rojava hene ku şêniyên wan bi serbilindî behsa jiyana xwe û nirxên hevbeş ên civakê dikin. Wiha jineke Êzdî ji gundekî nêzîkî Hesekê diyar dike: "*Derdora me gişt Misilmanên Kurd û Ereb bûn. Em di nav hev de bûn. Em weke kulfetê malekê bûn. Wan dizanibû ku em xasê naxwin. Rojekê wan malan li ber me xas nexistin mala xwe, ji ber ku wan dizanibû ku em naxwin."*[180]

Malbateke Êzdî ji gundekî nêzîkî Amûdê jî rave dike: "*Di gundê me de ji mêjde Êzdî tê de ne, tev Kurdên Misilman û birayên Ereb. Ti ferq û cudahî tine ye. Dawetê me û ezayê me, adet û teqalîdê me yek in. Tu herî kîjan malê, mal bi wacibê xwe radibe. Gundê me ne wek ti gunda ye. Em her yek li ser dînê xwe ne. Ji berê de bav û kalê me bi hev re jiyane. Em jî bi hev re ne. Me şaştî li dura hev nedîtiye. Tu herî kîjan gundî pirsgirêk heye, lê gundê me ne wek ti gunda ye. Dema em diçûn Amûdê yan Hesekê û me digot 'em ji Gundorê ne'. Wan digot, 'ew gund mexlote ye'. Gundekî neteweya demokratîk e ku hemû netewe tê de bi hev re dijîn."*[181]

Hediye Yûsif dinirxîne ku çanda xweşbînî û hevjiyana pêkhateyan yek ji taybetmendiyên gelemperiya Sûriyê ye: "*Di Sûriyê de ji serdema neolîtîkê heta roja îro hemû pêkhate û netewe li ser vê axê bi hev re dijîn. Vê hişt ku di civakê de pirr zêde dijbertiya an nakokî di navbera ol û netewan de pêş nakeve. Mirov mêze dike Xirîstiyan û Misilman û Êzdî, Kurd û Ereb û Aşûrî bi hev re dijîn. Erê, her dîn û çandek bi pîvanên xwe ve girêdayî ye. Kevneşopî û adetên xwe heye. Pirr zêde kesekî ya xwe li ser yên din ferz nekiriye. Bi hev re jiyan wekî rastiyek xwezayî, bi rengekî demokrasiyê xwezayî di nava pêkhateyên herêmê de ava bûye. Dîsa Şoreşa Cotmehê ya Rûsyayê jî bandorek li ser Rojhilata Navîn û cîhanê daye çêkirin. Mînak li Libnan û Sûriyê bandora baş ya fikirê sosyalîst li ser kes û rastiya civakê hebû. Ji bo vê jî civaka Sûriyê ne civakeke wisa hişk e. Fikirên nûjen pirr zû tên qebûlkirin."*[182]

[179] Çavkanî li heman cihî

[180] Hevpeyvîn bi jinên Êzdî re, gundê Qizlarçoxê yê Amûdê, 2017

[181] Hevpeyvîn bi malbata Enver re, gundê Gundorê yê Amûdê, 2017

[182] Hevpeyvîn bi Hediye Yûsif re, hevseroka Meclîsa Damezrîner a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyê, Dêrik, 2017

Li gelek herêmên kantona Cizîrê bi dehan an sedan salan 'jiyana neteweya demokratîk' bi rengekî xwezayî pêk dihat. Jiyana hevbeş ya pêkhateyên Kurdên Êzîdî û Misilman, Ereb, gelên Mesîhî yên Suryanî/Keldanî/Aşûrî, Tirkmen an jî Çerkes dibûn bingehê pergala xweseriya demokratîk a Rojava. Niha zarokên wan di dibistanên xweseriya demokratîk de tevî zimanê xwe yê dayikê fêrî zimanên hevdu dibin.

Seferberiyên gelên Bakurê Sûriyê li dijî êrîşên DAIŞê û li hemberî dagirkeriya Tirkiyê vîna hevbeş ya pêkhateyan da xuyakirin. Li hemû herêman jin û zilam, ciwan û pîrên ji tevahiya netewe û baweriyan ji bo parastina ax û jiyana xwe ya hevbeş, bi şev û roj li ser lingan bûn. "*Wekî xelkê Hesekê li dijî kiryarê DAIŞ'ê, Kurd be, Ereb be, Suryan be ji bo parastina Hesekê em hemû bûn yek. Di milê parastinê de her kesî digot, 'ji bo em DAIŞ'ê di nava bajêr de nebînin bila zarokê me li eniyan bin.' Ev çend sal bi vî rengî meşiya û heta niha berdewam dike."*[183]

Yekîtiya gelan ku di şerê li dijî DAIŞ'ê de ava bûye di serdema berxwedana Efrînê de gihîşt asteke nû ya herî bilind. 58 rojan gelên hundir û derveyî Efrînê li dijî êrîş û bombebarana arteşa Tirk bê navber di nav çalakiyan de bûn. Dil, ruh û keda gelan dibûn yek. Şêniyên Reqa ku tenê çend heyvan beriya wê ji zilma DAIŞ'ê hatibûn rizgarkirin, wê gavê tevlî çalakiyên mertalên zindî ji bo parastina Efrînê dibûn. Bi deh hezaran mirov ji tevahiya pêkhateyên Bakurê Sûriyê û Şengalê ketin ser rê ji bo dorpêça li ser Efrînê bişikînin û êrîşên dagirkeriyê bidin sekinandin. Beramberî vê, dewlet û hêzên navneteweyî hemû bi kiryarên xwe yan jî bi bêdengiya xwe dibûn şirîkên binpêkirina tevahiya hevpeymanên mafên mirovan. Serpêhatiyên berxwedana Efrînê ji gelên Rojava re nîşan da ku ew tenê dikarin bi yekîtî û hêza xwe ya cewherî bawer bikin.
Dema ku di sala 2019'an de hukûmeta Tirk careke din gefa dagirkirina herêmên Rojava dixwar, gel careke din li bajar û gundan hemûyan seferber bû. Di çalakiya xwe ya hevbeş de jinên Kurd, Aşûrî û Ereb li Til Temirê dan xuyakirin: "*Me ev axê bi hev re, bi xwîna xwe ji zilma DAIŞ'ê rizgar kir. Bi hezaran mirovên me di vî şerê hevpar ji bo parastina axa me û azadiya me de şehîd ketine. Îcar em nahelin ku bajar û gundên me ji aliyê Împaratoriya Osmanî ya nû ve werin dagirkirin."*[184]

Nirxandinên jinên pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê destnîşan dikin ku wan ji ber siyaseta dewleta Sûriyê berê zêde hevdu nas nedikir, heta li hin deran ji hevdu şik û guman kirine. Lê pirraniya jinan di têkoşîna hevbeş û avakirina komîn û meclîsên rêveberiya xweseriya demokratîk de hevdu û nirxê hevdu nas kirine. Lewma, ew bi serfirazî rave dikin ku ew wekî jin bûne hêzek. Bi hest û zanebûna ku wan bi dest xistiye wekî jinên Til Temirê dibêjin, "***Êdî kesek nikare yekîtiya me parçe bike!"***[185]

III. 2. Çavkanî û Cûreyên Pirsgirêkên Jin û Civakê

Şopên çanda neolîtîk û neteweya demokratîk hebûna xwe; di erdnîgarî, çanda jiyanê û hilberînê ya Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê de heta îro jî parastine. Lê gav bi gav ew demarên

[183] Hevpeyvîn bi Leyla Saroxan re, endama Yekîtiya Jinên Rewşenbîr, Heseke, 2017

[184] Daxuyaniya jinên li çalakiya konê berxwedanê li Til Temir, 2018

[185] Hevpeyvîn bi Xewla Diyad re li Til Temir, 2018

resen ber bi ziwabûnê ve diçin. Pergala baviksalar a ku gav bi gav ji salên 5000'î BZ'yê ve li Mezopotamya Jêrîn bi pêş ketiye û ji wir belav bûye, ceribandina ewilîn a desthilatdariyê û cewhera pergala zordestî û kedxwariyê îfade dike. Em dikarin bibêjin, hişmendî û sazbûna vê pergalê bûbûn bingehê tevahiya pirsgirêkên jin û civakê ku heta îro li bendê ne bên çareserkirin. Di encama ferz kirina desthilatdariya zilamê li ser jinê de; bi zext, asîmîlasyon û qirkirinên çandî, bîra dîrokî û nasnameya jin û gelan lawaz bûye. Heqîqeta dîrok û çanda jinan di her serdema dagirkeriyê de dubare hatiye windakirin û berovajîkirin. Herçiqasî jî şopên çanda xwedawendan zindî ne jî qelsbûna zanebûnên dîrokî û çandî hişt ku jin di naskirina heqîqeta xwe û ya zilamî de, di fêhmkirina rastiya civaka xwe û ya pêkhateyên din de zehmetiyê bikişînin.

Zêhniyeta civakî ya ku di bin bandora pergalên desthilatdar de şikil girtiye, li dengê jinan guhdarî nake û girîngiyê nade bi zanebûn, çîrok û stranên kevin yan jî zanista dîroka devkî ya dayikan. Lewma civak nikare ji serpêhatiyên dîrokî sûd wergire û wekî çavkaniya çareseriyê binirxîne. Ev dihêle ku nifş bi nifş, zanyariyên civaka xwezayî kêmtir dibin. Wekî me di beşên berê de li stran û çîrokên dayikan guhdarî kir da ku em bikarin mirad û serboriyên wan hîn bibin, em dixwazin di vê beşa pirtûkê de jî li jinan guhdarî bikin da ku êş û zanîna xwe ya jiyanê bi me re parve bikin. Di çîroka jiyana her jinê de em dikarin pareke jiyan û aloziyên xwe jî bibihîzin û pêbihesin. Lewma serpehatî û nirxandina her jinê dikare ji me re bibe alîkar da ku em çavkanî û cûreyên pirsgirêkên jin û civakê hîn zelaltir fêhm bikin û rêyên çareseriyê bibînin.

Bi vê armancê hevpeyvîn hatin kirin li ser pirsgirêkên civak, malbat û jinan di encama zayendperestiya civakî û dewletê de. Nexasim ferasetên ol, malbat û namûsê di vê çarçoveyê de hatine şirovekirin. Pê ve girêdayî, rista mêhtingerî û nijadperestiya dewleta Sûriyê di parçekirina Jin-Jiyan-Civakê de hatin nirxandin. Her wiha jin behsa têkiliyên navbera şovenîzma dewletê û pirsgirêkên siyasî, aborî û koçberî yên civaka Kurd dikin. Wekî din pirsgirêkên civakê di warên perwerde, tenduristî û bandora herimandinên ekolojîk de û bi hişmendiya zayendperest û dewletperest ve girêdayî di vê beşê de tên şirovekirin.

Analîzên li ser çavkanî û cûreyên pirsgirêkên jin û civaka Rojava bi pirranî rewşa beriya şoreşê tînin ziman. Lê di heman demê de sedemên domandin yan jî guhertinên çawanî yên pirsgirêkan di pêvajoya şoreşê de jî tên ziman. Di eynika nirxandinên vê beşê de wê di beşên li pêşiya me de bandora Şoreşa Rojava li ser jiyana jin û civakê were nîqaşkirin.

III. 2.1. Pirsgirêkên Civakê yên Zayendperestî, Malbat û Jinê

a) Ferasetên Ol, Malbat û Namûsê

Heger em bixwazin çavkaniyên pirsgirêkên jinan û civakê fêhm bikin, pewîst e ku em pêşî berê xwe bidin pirsgirêkên hişmendiyê ku hevsengî û hevbeşiya jiyanê tine kirine. Hişmendiya zayendperest, hêza xwe ji mîtolojiyên kevnar û şiroveyên olî digire yên ku bi armanca dîlgirtina jinê dihatin bipêşxistin. Ruxmê ku li Sûriyê bi giştî ola Îslamê pirr hişk di jiyanê de xwe ferz nekiriye jî, girîng e ku em di vî warî de bandora olên yek xwedayî û bi taybetî ya Îslamiyetê li ser herêmê şirove bikin. Ji ber ku hişmendî û çanda civakê bi raydaya kodên baweriyê teşe girtiye. Di bin bandora ol û mezhebên Cihûtî, Xirîstiyantî û Îslamê de zayend, beden û vîna jinê wekî guneh hatiye pejirandin. Her wiha dayikbûn û îtaetkariya jinê jî hatiye pîrozkirin. Li gorî vê hişmendiyê

qanûnên hişk û têgihiştinên exlaqî yên zayendperest hatine çêkirin. Armanca van qanûn û têgihiştinan ew bû ku serweriya zilam li ser jin, zarok, mal û milk misoger bike.

Saziya zewacê û ya malbatê jî li gorî vê mebestê hatin avakirin. Feraseta xanedantiyê *'çiqasî zarok zêde bibin hêz, ewqasî jî karker, leşker, mal û milkiyet zêde dibin'* bûye binyata nasnameya zilamê desthildatdar. Heman feraseta feodal di eşîrên baviksalar de jî serwer bûye. Ji ber vê, di civakên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bi taybetî zarokên kur wekî rûmet, dewama qewm û hêza desthilatdariyê xwedî nirx in. Lê zarokên keç li gorî vê ferasetê wekî endamên demkî yên malbatê tên dîtin ku bi zewacê re bibin milkê malbata zilamê xwe. Tevahiya nêzîkatî û perwerdeyên keçan bi armanca amadekariya zewacê, wergirtina rista dayik û xizmetkara malê tên bipêşxistin. "*Adet û teqalîdên feodal ên hişk li ser jinê dihatin meşandin. Jin li cem zilaman ne dirûniştin, ne vedixwarin. Dubendî di nava cinsan de hebû. Jin wê tenê zarokan bîne û xwedî bike. Dema ku keç gihîştin temenê 13 – 14 salan ew dihatin zewicandin."*[186]

Mijara sereke parastina bekaretê ango 'keçanî' bû. Bekareta jinê û bi vê re beden, zayendî û tevahiya hebûna wê dibû namûsa malbatê. Ji bo zilam karîbana serweriya xwe li ser jin û zarokan misoger bikin jin wekî 'namûs' û milkê zilam hatin pênasekirin. Bav, bira, ap, pismam û hevser dibûn xwedî û parêzvanên namûsa jinê. Lê jinên bi feraseta baviksalar gelek caran bi xwe jî dibûn şirîkên wan. Pirr çîrokên gelêrî jî li ser mijara jin û namûsê dihatin gotin. Bi vî awayî êşa van bûyeran hatiye parvekirin. Lê di heman demê de keç û xort dihatin hişyarkirin da ku '*namûsa xwe biparêzin*'. Çîroka Hebhinarkê jî yek ji wan çîrokan e yên ku di kesayeta jinbava Hebhinarkê de bi bûyera xiyaneta jinê dadikeve.

Li Taxa Şehîd Xebat a Kobanê dayikekê **Çîroka Hebhinarkê** werga ji me re gotiye:

"Bavê Hebhinarkê xwe hazir kiribû. Wê biçuya Hecê. Wî gelek ji keça xwe Hebhinarkê hez dikir. Beriya ku biçe şîret li keça xwe kir: 'Tu biçe li qata 7'emîn birûne. Ger mal milkê min agir jî bigire divê tu ji cihê xwe nelivî.' Lê belê piştî ku bavê wê diçe bi demekê dewar dikevin nava erdê. Bavê wê her çendî ji jinbavê re dibêje: 'Biçe wan dewaran ji nav erd derxîne.' Lê jinbav lê guhdarî nake. Vêcarê Hebhinarkê diçe ku berde wan dewaran û jinbava wê mareke piçûk dixe nav misînê avê de. Dema ku Hebhinarkê avê vedixwe ew mar jî dikeve zikê wê de. Bi demê re ew mar di zikê wê de mezin dibe. Her kes wiha dizane ku Hebhinarkê ducanî ye. Dema ku bavê wê ji Hecê tê, her kes jê re dibêje: 'Te ewqas qîmet dida keça xwe. Lê li piştî te re keça te çi aniye serê te?' Vê carê ji bo ku namûsa xwe paqij bike keça xwe Hebhinarkê dibe çolekê. Li wir berdide. Dilê Hebhinarkê dixele. Ew marê ku di zikê wê de mezin bûye, ji devê wê derdikeve. Hebhinarkê marê ku ji devê wê derdikeve qet qet jêdike û parçeyên mar xwê dike û vedişêre. Piştî ku tevahî mar ji zikê wê derketiye, Hebhinarkê diçe malê. Parçeyên marê kuştî davêje ber bavê xwe. Wîha bav dihêje heqîqetê ku jinbava wê ew tişt aniye serê wê, fêhm dike û jinbavê diqewitîne." [187]

Pêwîst e ku jin di her kêliya jiyana xwe de miqate bin ji bo qet gumaneke piçûk derheqê 'paqijbûna' namûsê de belav nebe. Bi vî rengî 24 seatan çavdêrî tê kirin li tevahiya tevgerên jiyanê yên jinê. Heta destpêka sedsala 21'ê ji ber feraseta namûsê gelek malbatên Bakurê Sûriyê zû bi zû keçên xwe nedişandin dibistanê. "*Feraseta namûsê bi vî rengî di tevahiya welatên Rojhilata Navîn*

[186] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, endama rêveberiya Kongra Star, Qamişlo, 2017

[187] Çîrok bi cûreyên cuda û hîn dirêjtir jî tê vegotin. Lê belê şiroveya dayikekê di şevbihêrka dayikên li Taxa Şehîd Xebat a Kobanê de bi vî rengî bû.

de derdikeve pêş. Ji ber ku jin namûsa malbatê ye, ew nikare ji bin emirê bavê xwe, birayê xwe û zilamê xwe derkeve. Heta, ji ber ku kuştina keçekê weke paqijkirina namûsê tê dîtin, civak bi çavekî 'baş' lê dinêre."[188]

Li gorî çand û taybetmendiyên herêmên Rojava di radeya feraset û pêkanînên feraseta namûsê de hinek cudahî hene. Jin dibêjin, di civakên Koçerata û Efrînê de qalibên namûsê ne pirr hişk in. Lê di hinek cihên din de wekî li Kobanê nêzîkatî pirr tund in. "*Axa, mîr û began berê zilm li jinê kiriye. Nedihiştin ku jin ji gund derkevin û werine bajêr. Bi vî awayî wan qaşo navê 'şeref û namûsê' di şexsê jinê de diparast."*[189] Di doza namûsê de *'mutleq divê keç were kuştin'*. Xelkê Kobanî dibêje ku kuştinên di bin navê namûsê de û kevneşopiyên zayendperest yên wekî berdelî, piştî salên 1950-60'î bi bandora mele û seydayên Qadirî û Neqşîbendî zêdetir hatin bipêşxistin ku bi destê dewletê li Kobanê hatine bicihkirin.[190] Lê esas, feraseta namûsê di gelemperiya civaka Rojava de serwer bû û dibe sedema him kuştin him jî xwekujiyên jinan: "*Gelek caran, keçê jî xwe dikuşt. Tabî sedema wê jî nêzîkatiya zilam e. Gelek bûyer hebûn, keçan xwe daleqand, xwe dixenaqand yan jî xwe dişewitand. Min di zarokatiya xwe de bixwe ev bûyer didîtin û pirs dikir, 'çima wê keçê wiha kiriye?' Sedem ew bû ku dixwestin wê keçê bidin yekî bi temenê mezin, ango yekî ku keçê nedixwest pê re bizewice. Bi giştî li Kurdistanê wiha ye. Dema ku tê gotin, meseleya namûsê, vêga dibêjin 'keç xira kiriye' û tê kuştin. Lê belê xort ji xwe re dijî. Mentiqê Îslamê jî tê de heye ku keçê gunehbar dibîne û dibêje 'wê xort xira kiriye'."*[191]

Vê ferasetê tirseke kûr di dilê jinan de çandiye. Lewma jinan xwe mecbûr dit ku di her saniyê de her gotin, tevger û helwestên xwe li gorî gumanên li ser namûsa wê, bipîvin. Vê dihişt ku jin li şûna nihêrîn û daxwazên xwe, bendewariyên derdorê esas bigire. Êdî jin ne bi çavên xwe, lê bi çavên derdora xwe li bûyeran meyze dikin. Ji bo namûs û navê xwe biparêze jin li şûna vîn û ramanên xwe, yên derdora xwe didin xuyakirin. Bi vî rengî dudilî, şik û dilgiranî di kesayeta jinê de hatine bicihkirin; bixwebawerî û xwebûna jinê ji holê hatiye rakirin.

Serweriya zilam û ev feraseta namûsê qaşo weke 'fermana xwedê' di tevahî têkiliyên jin, zilam û malbatê de; di kevneşopî û têkiliyên eşîr, civak û dewletê de hatiye çandin û lê hatiye ferzkirin. Bi vî rengî hebûn û jiyana jinê bi anîna zarokan û xizmetkirina malbatê hatiye sînordarkirin û fetisandin. Lêpirsîna vê tabûyê weke guneh hatiye nirxandin û cezakirin. Jineke Kurd a bawermend ji Hesekê bandora dogmayên olî li ser jin û civaka xwe wiha dinirxîne:

"Adet û çanda ola Îslamê dihişt ku zext li ser jinê bê kirin û asteng li pêşiya jinê çêbin. Mesele tê gotin, 'ev guneh e, ev heram e, ev şerm e.' Dema ku hemû tiştên 'heram' bi xwedê ve tên girêdan, ev tişteke mezin e. Êdî xilas, tu nema dikarî lêpirsîna wan tiştan bikî. Hinek ayetên Quranê hene ku zilaman ji bo xwe bi kar anîne, ji bo li ser jinê bibe desthilatdar. Yek jî di Ayetê Quranê de heye ku dibêje, 'Zilam her tim li ser jinê hakim be.' Dema ku me ev ji melê pirs kir, wî digot 'ev tê wê wateyê ku zilam li hemberî jinê berpirsyar e ku hemû ihtiyacên jinê pêk bîne.' Lê di civakê de îcar ev gotin çawa tê bi kar anîn? Dibêjin, 'divê ku zilam li ser jinê desthilatdar be! Xilas, ev gotina xwede ye!' Dema ku ev gotin belav bû, êdî jinan nema pirs kir yan lêkolîn kir. Wan her tişt li ser xwe qebûl kiriye. Heta carekê tê bîra min, xwuşka min xeyidîbû. Diya min jê re digot, 'Ma xwedê

[188] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

[189] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, hevseroka TEV-DEM a Kobanê, Kobanê, 2017

[190] Koma nîqaş û lêkolînê ya Jineolojiyê 2, li ser çanda Kobanê, 2017

[191] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

ev tişt gotiye. Divê zilam li ser jinê re be. Ger ne wiha be çênabe! Xwedê welê helal kiriye.' Dema ku bi vî rengî tê gotin, tu êdî nikarî tiştek bêjî û tu mecbûr î gavekê şûnde bavêjî."[192]

Bi îzah û rêbazên wisa jin hatine bêdengkirin. Biryarên malbatî û civakî bi pirranî bêyî îrade û gotina jinê hatine standin. Gotina zilam li ser her tiştî bû. Bêyî destûra zilam, jinê gelek caran nikaribû pêdiviyên xwe yên heyatî jî pêk bianiya. Yadê Esma ji Girkê Legê trajediya wê rewşê dibêje: "*Destûra zilam nebûya, jinê jî nikarîbû ti tişt kiriba. Zarokek nexweş bû, digiriya. Dayika zarokê ne li malê bû. Em çûn cem dayikeke din ji bo şîrê xwe bide zarokê. Lê wê got, 'heta zilamê min neyê û destûrê nede, ez nikarim şîr bidim.' Ev jî hebû!"*[193]

Heta bin navê olê, hinek melayan şîrdayîna zarokên keç jî asteng kiriye. Yadê Fatma ji Şêranê çîroka xwe bi me re parve kir: Dema ku beriya 40 salan keça wê hatiye dinyayê kurekî cîrana wê jî çêbû. Di dema rojiyê de herdu dayikan hîna şîr dida zarokên xwe. Ji ber ku şîrê dayikan kêm bû, ew çûn cem melê û destûr xwestin ji bo rojiyên xwe bişikînin. Yadê Fatma bi êş di dilê xwe de behsa wan rojan dike: *"Keça min birçî û tî dibû. Dema rojiyê bû. Xesûya min ez şandim cem xoce ji bo ez pirs bikim, ez ê çi bikim. Xoce zane ye. Ev xoce kurapê min bû. Ez çûm cem û min got, 'Dergûşa min birçî ye. Tiştek tine ye, şîr tine ye ku ez jê re bidim. Em xizan in. Ji bo şîrê min çêbibe, dibe ku ez xwarin bixwim?' Ji min re got: 'Ger dergûşa te lawik bûya te dikarî bixwî. Lê bes dergûşa te keç e, çênabe tu bixwî. Heram e!' Kurik, hatin helalkirin. Xoce ji cîrana min re got 'tu dikarî bixwî'. Lê nehişt ku ez bixwim. Keça min ji birçîbûnê mir. Gunehê keçikê çi bû? Xwedê negot 'nexwe', lê xoce got."*[194]

Ruxmê ku civak bi bêedaletiya nêzîkatiyên hinek xoce, şêx û melayan hisaye jî mirovan newêriya li dijî wan derbikevin. Wan nihêrînên xwe yên zayendperest û feodal wekî 'qanûnên Xwedê' yên ku neyên lêpirsînkirin li ser civakê ferz kirine. Lewma keça Yadê Fatma ji birçîbûnê miriye, lê kurê cîrana wê dijî. Mînakên bi vî rengî gelek in.
Li daxwaz, nihêrîn û gotinên jinan nehatiye guhdarîkirin. Gotinên jinê wekî 'bê wate' hatine piçûkxistin ango wekî 'kufra Xwedê' hatine şermezarkirin. Lewma jin tirsiyane û wan fedî kiriye ku nihêrîn an jî gotinekê bibêjin. Ji ber vê yekê, jin bêdeng mane û hêza xwe ya fikrî û bixwebawerbûnê gav bi gav winda kirine. Hediye Yûsif feraseta namûsê wekî girêka kor dinirxîne ku gelek ziyan digihand jin û civakê: *"Bi polîtîkayên ku li hemberî jinê hatibûn meşandin di şexsê jinê de civaka Kurd esîr hatibû girtin. Jin her tiştê civakê bû. Namûsa wê bû, mala wê, milkê wê, adetên wê û çanda wê bû. Her tişt li ser pişta jinê re diçû û dihat. Ji ber vê jî pirr şerm bû ku jin ji malê derkeve û bi tena serê xwe biçe mala cîranekê. Pirr eyb bû ku jinek cil û bergê vekirî li xwe bike, di nava civakê de xwedî gotin be û wisa rehet biaxive."*

Jin weke amûreke zarokanînê hatiye dîtin. "*Di demê berê de ji bo ku mal û milk radestî xortan bikin, dixwestin herdem jina malê kuran bîne dinyayê. Ji ber ku kur di feraseta wan de ew bû ku zuriyetê didomîne. Her wiha yê ku starê li mal û jinan dike kur e. Ji jinan re tenê sandoqek û eyneyek dihat dayîn."*[195] Têgihîna feodal a baviksalariyê bûye sedem ku jinên ku zarokên wan

[192] Hevpeyvîn bi Leyla Saroxan re, Heseke, 2017

[193] Hevpeyvîn bi Yadê Esma re, Endama Kongra Star, Girkêlegê, 2017

[194] Hevpeyvîn li mala dayik û bavê Emînê, bajeroka Şêranê ya Kobanê, 2017

[195] Koma nîqaş û lêkolînê ya Jineolojiyê 3, li ser pirsgirkên civakî, Kobanê, 2017

çênedibûn yan jî dayikên ku zarokên kur neanîbûn wek 'bê qîmet' hatine dîtin. Jixwe, ev rewş her tim weke kêmasiya jinê hatiye nirxandin. Ji bo zêdebûn û rêzdariya malbatê bi pêş bikeve pirr jin anîn wek rûmeta zilaman hatiye rewakirin. Her wiha, zewaca di temenê piçûk de yan jî zewaca bi adetên wek berdêlî û heyrandinê, jiyana bi sed hezaran jinan (û mêran) tarî kiriye. Ev kevneşopî esas hemû bi armanca zêdekirina nifûsa malbatê, parastina mîrasê û pêkanînên siyaseta demografiyê hatine înşakirin. Vîn û daxwazên takekes û hevjînan tine hatin hesibandin. Jin, keç û xort dibûn amûrên berjewendiyên zilam û malbatê.

Yadê Soad ji Dêrikê mînaka dayika xwe wekî mînaka çîroka jiyan û êşên bi hezaran jinan parve dike: "*Dayika min kurekî wê tenê hebû. Bavê min jin anî ser dayika min. Min bi çavê xwe dîtiye ku bavê min, dayika min di lingê wê de girtiye û ji ser xanî avêtiye jêr. Dayika min li ber sêlê rûniştibû nan çêdikir. Mamê min teberê avêt, lingê dayika min şikand. Gerek mêrekî din ji jinê re mertal bûna heta ku jinê karibûya biaxiviya. 'Ez ê jineke din bînim ser te' wek hema hefsarê wê digirtin. Piştgiriya jinê jî tine bû. Jin dema ji mala bavê xwe derdiket, mala bav jê re digot, 'Êdî tu çûyî. Tiştekî me û te nema. Malbatî jî tu neyê malê. Di mala xezûrê xwe de jî ew li te bidin, serê te bişkînin, destê te jî bişkînin, ew te birçî û bê cil bihêlin, çi bînin serê te, gerek tu her tiştî li ser xwe qebûl bikî. Mala xezûrê te ye û êdî bûye mala bavê te.' Ji ber vê jî dema mêr, tî û xezûrê wê lê bidana jî şerm bû ku jin bîne ser ziman. Nikaribû ji birayê xwe re bêje, xesûya wê lê bidana nikaribû bixeyide. Heger bixeyide û biçûya mala bavê xwe jî, digotin, 'Ji mala mêrê xwe xeyidî, hat mala bavê xwe. Rûyê wê reş e'."*[196]

Pirrjinanîn di civakên eşîrî yên gelê Ereb û Kurdên li kantonên Cizîrê û Kobanê de wekî kevneşopî û 'mafê helal' yê zilam dihat pejirandin. Lê belê ev kevneşopiya baviksalar dibû sedema kûrkirina parçebûn û nemana baweriyê di navbera jinan de. Gotina 'zilam jinê ji xwe re tîne' ango 'zilam jinekê din tîne' dide xuya kirin ku vîna jinê di vê mijarê de tine bû. Jin wekî tiştekî dihatin kirrîn, anîn, dayîn û berdan. Xetera hewîtî û derdên hewîbûnê bandoreke giran li ser rewş û têkiliyên jinan ava kiriye. Zarok, nexasim zarokên keç jî di nav aloziyên dayikên xwe de mezin bûne. Jineke ciwan ji Dirbêsiyê serpêhatiyên xwe parve dike: *"Ez di nava bajarekî bi çanda eşîrtî de mezin bûm. Di çanda eşîrtî de herî zêde çandeke feodal li pêş e. Di wir de jin bi ti awayî ji dervî nêrîna zilam nikare tevbigere. Di nava çanda eşîrtî de anîna pirr jinan li pêş e, da ku neslê xwe yê eşîrî bidomîne. Mînak bavê min jî bixwe du jin anîn. Lê belê ew pisîkolojiyeke pirr giran û neyînî li ser me da avakirin. Kur dikare xwe xilas bike ji van nakokiyan û bireve derve. Lê belê jin di mal de dimîne. Her bi van nakokiyan re rû bi rû ye. Ev bandoreke giran a psîkolojîk li ser jinê dide avakirin."*[197]

Mijara pirrjinanînê mijareke pirr bi nakok e ku berovajîkirina têgehên exlaq û çandê ya di feraseta zayendperestiya civakî de dide eşkerekirin. Jinek ji gundekî li herêma Kobanê dibêje, beriya bi 15 salan ji ber zexta civakê û derdorê ew mecbûr mabû ku jineke duyemîn ji bo hevjînê xwe bixwaze, tevî ku hevjînê wê nedixwest, "*Em ji gotinên bavê xwe dernediketin. Me ji ber bavê xwe fedî dikir, min pirr jê re ihtîram digirt. Rojekê min xwest, ez ê cilan ji xwe re bikirrim. Wî nedihişt. Ew çû, wî ji min re kirrî. Min fedî dikir ez jê re bêjim ji kîjan cilan hez dikim. Wekî insaneke xerîb min ji bavê xwe fedî dikir. Ez bûm 18 salî, bavê min ji min re rave kir ku ez dame kurê birayê xwe.*

[196] Hevpeyvîn bi Yadê Suad re, Dêrik, 2017

[197] Hevpeyvîn bi Silîva re, endama Yekîtiya Jinên Ciwan, Dirbêsî , 2017

Berê qîzik bi hevdu re diguherîn. Em berdêlî bûn. Min cem xesû û tiyê xwe kar dikir. Karê giran bû. Pişti salekê qîzeke min çêbû. Ji min pirs kirin 'tu çima qîzîkan tînî?' Xelkê tahn da me. Peyayê min [zilamê min] rind bû. Digot, 'Kurik çi ye? Qîzîk çi ye? Her qîzika min bi heft kuran e. Xelk bila bisekine. Ez nazewicim.' Xwedê ser 3 qîzikan kurek da min. Lê kurê min 4 salî bû û mir. Dûvre min 5 qîzik anîn. Xelke zext çêdikir: 'Bila zilamê te bizewice'. Lê wî digot 'ez nazewicim. Jinên din hemû xwuşkê min in.' Qîzên min jî gişt xwendî û zane bûn. Baş û xirab ji hev derdixistin. Wekî peyan ji me re kar dikirin. Lê kurapê min dihatin mala min, digotin: 'Ew ji jinê ditirse, ji ber vê nazewice.' Îcar min got 'Kalo bizewice!' Jinan jî behs dikir: 'Çima ew xaniyê xwe lêdikin? Çima xawliya nû dikin? Kurê wan tine ye! Qet fedî jî nakin!'
Ma em li kû dere rûnin? Em jî insan in. Em ê li erdê rûnin? Min got, 'Kalo, bizewice. Bila zimanê guran li ser me dirêj nebe. Bila xelk li ser me şorê neke. Bila mala me ne ya xelkê be.' Wî careke din got, 'Ez nazewicim!'

Rojekê ez çûm min wa jinkê, wa qîzka dît û min jê re eciband. Maleke rind bû, digotin 'em ê bidin te.' Ez çûm cem kalo, min got: 'Min yek ji te re dît.' Wî got, 'ez naxwazim.' Lê di dawiyê de xwedê alîkariya me kir. Em çûn, me ev jin jê re xwest û anî. Wê jî 3 keçik anîn. Lê piştre 2 lawik jî anîn, ew niha diçin mektebê. Ez ji zarokên wê jî weke yên xwe hez dikim. Me xwedî kirin. Wanî ev jinka hatiye ser min. Ew niha jî wekî qîza min e. Ez nizanim hewiya min e. Dema ku ew 4 - 5 salî bû nexweş ketibû. Ta rabû. Ji ber vê jî lal e. Lê em ji hev fêhm dikin û bi hevdu re dimeşin."[198]

Di mînaka jiyana vê dayikê de em dikarin fêhm bikin çawa vîn, yekîtî û xwebûna jinê bi zextên dêrûnî yên zayendperest hatibûn astengkirin. Wekî din em dibînin ku di bin navê lêgerîna çareseriyê û qîmet dîtinê de jin bixwe jî pirr caran bi qeydên baviksalariyê û kevneşopiyên feodal tevdigerin. Lewma jinên ku difikirin ku ew ê bikarin di çarçoveya hişmendiya zayendperest de xilasiya xwe bi dest bixin, gelek car bixwe li ser jinên din jî pîvanên zayendperestiya civakê ferz dikin. Her wiha wekî ku gelek dayikan anî zimên, nêzikatiyên xedar yên xwesû, jintî yan jî jinbiran carinan ji yên zilaman dijwartir bûn. Zêneb ji Gundê Zindankê yê Efrînê li ser têkiliyên xwesû û bûkê dibêje: "*Xesû pirr bi hikim û hêz bû. Her tim şer dikir. Carnan ger şîvek xweş amade bikira şer dikir, ji bo ew bûk jê nexwe. Wê jî birçî xew dikir. Digotin, bûk bi dizî piştî xesûya xwe biçûya çolê û xwarinek xwe bi lez amade dikir û dixwar."*[199]

Dayikek ji Dêrikê mînakê ji jiyana xwe dide: "*Ez bûm 14 salî, ez zewicîm. Li min gelek zor dihat. Min nedixwest zû bizewicim. Lê di wê demê de nêrîna keçike nebû. Divê qebûl bikira. Ez zewicîm jî wek kolekî bûm. Hevjînê min ne wisa bû, ew bi min re alîkar bû. Lê mala bavê wî gelek tadê li me kirin. Dayika wî didît ku ez piçûk bûm. Lê hemû karê xwe yê malê bi min dida kirin. Digot 'vê bike û vê bike'. Dûvre me xanî kirê kiribû. Li vir jintiya min gel me bû. Zilamê wê esker bû, gel me dima. Wê jî gelek tade li min dikir. Ez gelek diqehirîm. Min eşa xwe dihela di dilê xwe de. Ew qehir bû nexweşî. Krîza dil bi min re çêbû."*[200]

Cudahiyên çînî jî tesîr li têkiliyên di navbera jinan de kirine: *"Jinên axa hebûn ku jinên din wekî kole ji xwe re dan karkirin û pê re nediaxiviyan. Têkiliyên wan ji civakê qut bûn. Wan tenê li gorî*

[198] Hevpeyvîn bi dayika Emînê re, bajeroka Şêranê ya Kobanê, 2017

[199] Hevpeyvîn bi Zêneb re, gundê Zindankê ya Efrînê, 2017

[200] Hevpeyvîn bi Diya Ciwan re, endama Kongra Star, Dêrik, 2017

çîna xwe danûstandin çêdikir. Axa û began nedihiştin jî ku her zarok here mektebê, fêrî ziman bibe û şehadê bistîne. Tenê yên wana bûn."[201]

Çi bi zanebûn be çi jî ne bi zanebûn, bi vî rengî jin dibûn şirîkên pergal û hişmendiya desthilatdariya zilam a ku dijminatiya jinan dike. Berovajiyê vê jî taybetmendiyên jinê yên serwext û çalak ku xwe dispêrin çanda hevgirtinê û rêveberina komînal a civaka neolîtîk jî nexasim di kesayeta gelek jinên pîr de xuya dibin. Tevî feraset û pêkanînên zayendperestiya civakî yên di warê ol, malbat û namûsê de hemûyan ew wekî otoriteyeke xwezayî û çavkaniya zanebûnê di nav malbat û civakê de tên peşwazîkirin.

Serpêhatiyên ku jinan bi me re parve kirin, balê dikişînin ser wê yekê ku ew jin hemû di temenekî piçûk de hatibûn zewicandin. Ji vê, em dikarin têderxin ku di pergala baviksalar de zewaca temenê piçûk wekî rêbazekê hatiye bipêşxistin ji bo jin di temenê piçûk de were teslîm girtin. Yanî, beriya ku jin bikare tecrûbeyên jiyanê şirovê bike, beden û vîna xwe nas bike, bixwebaweriya jinê tê şikandin. Jinên ciwan wiha bê parastin û bê pişgirî dimînin. Bi vî awayî, serdestiya zilamî di têkiliyên zewacê de tê misogerkirin.

b) Zayendperestiya Dewleta Sûriyê

Her wiha feraseta zayendperest ku ji pergala malbat û zewacê dest pê kiriye di warên dewlet û civakê hemûyan de hatiye belavkirin: Meşandin û şêwaza polîtîkayê; feraseta exlaq, çand û estetîkê; parvekirina kar û aborî; siyasetên demografiyê, pergalên tenduristî û perwerdê, qanûn û hiqûqa dewletê - hemû qadên jiyanê li gorî armanca misogerkirina serweriya zilam û dewletê hatine sazkirin. Hişmendiya dewletê û baviksalariyê di pergala malbatê de hev xurt dikirin:

"Nêzîkatiya dewletperest di civaka me de pirr hakim bû. Li cem dewleta mezin malbat jî wek dewleta piçûk e. Heta niha bandora vê zêhniyetê heye, wekî 'Mala min, dewleta min e. Ez bav im û ez serokê vê dewleta piçûk im. Divê her kes li hember min bi rêz û hurmet be. Gotina dawî divê ya min be!'"[202]

"Dema zilm û zordariya axa, mîr, muxtar, dewlet hakim bû li ser zilam û tade li wî bikra, zilam nikaribû bersiva wan bide yan jî dest li ber wan hilîne. Wê demê zilam dihatin, ew neheqî hemû di serê jinê de derdixist û diteqandin."[203]

Ferasetên paşverû yên zayendperest û qanûnên medenî yên dewleta Sûriyê jî hevdu xurt kirine. Ruxmê ku qanûna bingehîn a Komara Sûriyê di bin bandora qanûnên Yekîtiya Sovyetê de hatibû nivîsandin, di qanûnên medenî de ji bo hemwelatiyên Misilman, Şerîeta Îslamê wek çavkanî esas hatibû girtin. Di mijarên malbatê û mîratê de hemwelatiyên Xirîstiyan, Cihû û Durzî karibûn li gorî

[201] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

[202] Hevpeyvîn bi Hediye Yûsif re, Dêrik, 2017

[203] Hevpeyvîn bi Yadê Suad re, Dêrik, 2017

qeydên xwe yên olî tevbigerin. Lê belê li ser Êzdiyan qanûnên şerîetê hatibûn ferzkirin ji ber ku rejîma Sûriyê hebûna wan wekî olekê înkar dikir. Di gelek xalan de ferasetên zayendperest û olperest bi rêya qanûnên medenî hatin misogerkirin. Ji bo jinên Misilman zewac bi mêrên ji olên cuda re qedexe ye. Zilamên Misilman dikarin tenê bi jinên ji 'olên kîtabî' yanî yên Misilman, Cihû an Xirîstiyan re bizewicin.

Leyla Saroxan destnîşan dike ku şiroveyên li ser olê yên dewleta Sûriyê ji bo misogeriya desthilatdariya zilam hatine bi kar anîn. Mînak, li pêşiya dadgehê şahîdiya du jinan wek a zilamekî hatiye hesibandin: *"Di mesela îfadeya şahîdiyan de gotina du jina dibe wekî gotina yek zilamî. Li gorî şiroveyên civakê li ser Îslamê çi hincet dibêjin, dibêjin ku 'jin zarokan tîne. Barê wê giran e. Ji ber vê dibe ku xwe ji bîr bike yan tiştên cuda bîne bîra xwe'. Wan tiştan ji jinê re wiha dihatin qebûlkirin ku wêna wekî pirsgirêk nabîne. Şahîdiya jinê bi vî rengî jî di dewletê de û di civaka me de hatîbû dîtin û nebû mijara nîqaşê."*[204]

Li gorî qanûnên medenî yên Sûriyê wek di şerîetê de jin 'nîv mirov' bûn. Lewma para ji mîratê ya jinê jî nîvê ya zilam bû. Heman feraseta zayendperest ku dibêje 'aqilê jinê kêm e' ango 'jin zilamên kêm in' fîlozofên wek Eflatun, Arîsto û zanyarên cûr bi cûr jî parastin. Di civaka Rojava de gotina pêşiyan *'aqilê heft jinan di serê mirîşkekê de ye'* meşhûr e. Ev mentiq di qanûnan de jî xwe dide der bêyî ku ev neheqî bikevin ber lêpirsînê. Heta niha di Sûriyê de mafê miracaeta hevberdanê ji bo jinan tenê di rewşên pirr awarte de û bi zehmetiyên mezin ên hiquqî û civakî mumkin bû. Her wiha, piştî ku jin ji aliyê hevserê xwe ve hatiye berdan, zarok jê dihatin standin. Ji ber ku zarok wek milkê bav dihatin hesibandin.

Wekî din helwestên dadgeh û polîs kuştina jinan di bin navê 'namûsê' de rewa kiriye. Kujerên zilam di demeke kin de ji zindanê hatine berdan. Yên ku bertîl didan jî hê ji wê jî zûtir derketine, ji ber ku muazif û dozgeran aliyê zilaman digirt. *"Feraseta zayendperest di civakê de heye ku bingehê xwe ji dewletê digire. Dewleta Sûriyê berê jî zilamek ku jina xwe kuştiba 6 meh ango salek di hepsê de dihişt û berdida. Ji ber ku kuştin hebû, pêwîst e cezayek hebe, lê belê ji ber ku wî namûsa xwe paqij kiriye wekî tiştek baş hatiye dîtin."*[205]

Lê rewşa jinên ku ji ber zilm ango tundiya zayendperest zilamek kuştibûn, berovajî bû. Gelek jin hene ku bi kuştina zilamekî dihatin gunehbarkirin û bi salan di bin şertên giran de li zindanên Sûriyê mane. Hinek jin li pêşiya dadgehên dewletê hatibûn darizandin û 20-26 sal ceza li wan hatiye birrîn. Hinek jî bê hikum, li ser îddîayên şêlû dihatin tewanbarkirin û girtin bêyî ku bizanin heta kengê wê li zindanê bimînin.

"Zindanên Sûriyê Eynika Rewşa Jinê Ne"

Rojîn Remo ji Tirbespiyê di sala 2009'an de ji ber sedemên siyasî hatibû girtin. Ew rewşa zindanên Sûriyê wekî '*eynika dewletê*' û '*eynika jinê*' pênase dike. Wekî serweriya zilam li ser jinê, dewleta Sûriyê jî bi tundî û nêzikatiyên kêfî desthilatdariya xwe li ser jin û civakê ferz kiriye. Rojîn çavderî û serpehatiyên xwe wekî girtiyeke siyasî di zindanên Sûriyê de rave dike: *"Çima min got, zindan eynika dewletê ye? Dema ez hatim zindana Hesekê, min hinek tişt dîtin ku min weki din nikaribû bêjim. Di zindana Hesekê de sê xwuşkê hev hebûn. Ew li zindanê bûn ji ber ku wan bavê xwe*

[204] Hevpeyvîn bi Leyla Saroxan re, Heseke, 2017
[205] Hevpeyvîn bi endamên Dada Jinê ya Dêrikê re, Dêrik, 2017

kuştibû. Bavê wan her sê xwuşk tecawiz kiribû. Ji bo tola xwe hilînin wan tevî birayê xwe bi hev re bavê xwe kuşt. Şûna ku dewletê ew xelat bikira da ku di vê civakê de hinek exlaq pêş bikeve, dewletê ew girtin û avêtin zindanê. Ew salek bû her çar di zindanê de bûn, bê hikim an pirs û bersiv."[206]

Bi mînaka jineke Efrînî ya li zindana Mislimiyê ya Helebê Rojîn bal dikişîne ser wê yekê ku gelek kes bê sûc dihatin girtin û gelek salan li zindanên Sûriyê mane. Her wiha ew dide zanîn ku gelek jinên bê sûc, ango gelek jin ji ber derew û bêbextiyên kesên nas bi salan di hepsê mane, ji ber vê rewşê nexweş ketine û dîn bûne: "*Di beşa jinê ya Mislimiyê de zêdetirî 200 jinî hebûn. Digotin, gelek insan ji nêza [birçibûnê] û ji êşkencê tê de mirin. Nîzameke bi serê xwe ye. Jinên ku deh an bîst sal tê de ne, hebûn. Êdî bi rastî ev sîstem çi ji jinê dixwaze û dixwaze jineke çawa bide afirandin, me dît. Min di wê zindanê de dît çiqas vê sîstemê insanên bê sûc zilm dike. Mînaka keçikek ji Efrînê hebû. Dema ew ketibû zindanê 16 salî bû. Dema ku min ew dît ew 32 salî bû. Porê wê hemû spî bûbû. Wê jinê hêviya xwe ji jiyan û civakê qut kiribû. Birayê wê li ber çavê wê darve kirbûn. Cezayê muebedê ango 26 sal dabûne. Çima? Sûcê wê tine bû. Li Efrînê danê sibehê zû ew û birayê wê diçûn darê zeytûna kom dikirin. Rojek wan li bin axê cenaze ya însanekî dîtin ku hatibû kuştin. Ji tirsê wan qîr kiriye heta mirov kombûn û xeber dan dewletê. Dewlet hat, ew girtin û got 'we kuştiye'. Îsbatek jî tine bû. Mirovên weke wê pirr bûn. Dewletê wiha dikir ji bo bikare bêjê 'ez zû serwer bûm, min çareser kir'."*[207]

Bûyerên li zindanên jinan ên weke Dûma ya Şamê û beşa jinê ya Mislimiye eşkere dikin ka çawa rayedarên dewletê û gardiyanan desthilatdariya xwe li hemberî jinan bi kar dianîn. Li cem êşkenceyên giran ên fizîkî û derûnî dewletê hewl dida bi rêya fihûş, bazirganiya jinê, tecawiz û belavkirina madeyên hişbir di zindanan de vîn û rûmeta jinê careke din binpê bike û teslîm bigire. Wan her wiha gef xwarine li jinên ku ji zindanê derketin. Lewma ev rewşa girtiyên jin û zindanên jinan di civaka Sûriyê de kêm hat zanîn. Jinên ku nû hatin girtin, li hemberî tiştên ku dîtin, şok dibûn.

"Dema ez birim zindana jinê ya Şamê ber bi êvarê dengê sişwarê [makîna ziwa kirina poran] dihat. Min got, 'Di vê zindanê de çima jin xwe sişwar dikin? Çima makyaj û porê xwe çêdikin?' Ez şaş mam. Kamera mezin danîne hewşê. Min pirs kir: 'Ev ji ber çi ye?' Jinekê got: 'Ev kamera jinan dikişîne. Niha li milê din jî esker û berpirsyar li ber rûniştine. Kîjan jinê dixwazin ew ê ji xwe re bixwazin. Ji bo seatek an du seatan, ne ji bo temamî dixwazin. Ew diçin li wir wekî nêçîra.'
Ez herifîm êdî. Halê jin yê gihiştiyê, insanî diherifînê. Sîstema desthilatdar jin ji xwe re kirine fahîşe. Bi rastî gelek mirovê ku insan pê diêşiya hebûn. Ew hatin êşkencekirin, bêbextî li wan hatibû kirin. Jinên durist û paqij jî hebûn, wan xwe teslîmî wê sîstemê nekiribû."[208]

Li zindanan pergala zordestiya zayendperest û nijadperest a nîzama Beesê di her warî de xwe eşkere dikir. Zeynep Dilşêr jî ji ber xebatên siyasî yên tevgera jinên Kurd li Rojava li ser ixbarekê di destpêka sala 2011'an de beriya destpêkirina şoreşê, li Kobanê hatibû girtin. Wek girtiyeke jin a siyasî ew salekê di zindanên Heleb û Şamê de maye. Ew rewşa jinê li hemberî zordestiya dewletê wiha dinirxîne:

[206] Hevpeyvîn bi Rojîn Remo re, Qamişlo, 2016

[207] Çavkanî li heman cihî

[208] Çavkanî li heman cihî

"Li zindanên Sûriyê yên ku lêdan û êşkence dikin, yên ku cerdevanî dikin, hemû zilam in. Heta yên ku jinan teftiş (lêgerîn) û lêpirsîn dikin, zilam in. Tiştek pirr bi êş jî li hepsa Mislimiyê ya Helebê ew bû ku gelek girtî jin ên Kurd bûn. Em 41 jin di xirfekê de bûn. Ji 41 kesan, 15 ji Efrînê bûn. Ji ber kuştin û diziyê hatibûn darizandin. Ewan girtiyên jin yên li Helebê ji cewherê xwe derketibûn. Wan digot, 'jixwe cezayê me dirêj e; em roja xwe çawa derbas bikin, em ê derbas bikin.' Nêzîkatiyên pirr sivik hebûn. Jinan hevdu xapand. Zilam jixwe vê dixwaze, lê jin vêna nabînin. Fihûş di hapsê de pirr hebû. Hinek dayik jî li hepsê hebûn. Zarokên wan li derve û birçî bûn. Heskiriyên xwe li derve eyar dikirin ji bo roja ziyaretê werin û bi vî rengî li xwedî zarokan derkevin. Me bi wan re nîqaş dikir da ku em bikarin yekîtiya jinên Kurd li hepsê çêkin. Li zindana Dûma ya Şamê jî midûr û esker dihatin cem jinan. Yên ku dizî dikirin 2 roj li hepsê diman, dihatin berdan û piştî çend rojan careke din ji ber ku dîsa dizî kiribûn dihatin girtin."[209]

Gotinên girtiyên din û yên nûnerên rêxistinên sivîl ên Rojava jî piştrast dikin ku rayedarên Beesê bi rengekî sîstematîk bazîrganiya jinan didan meşandin. Nûnerên rêxistina mafê jinan SARA dan zanîn ku li ser girtiyên jin zext hatiye kirin da ku fihûşe bikin. Dema jin dihatin girtin, polîsan ew dibirin cem bijîşk û lewleb didanîn ji bo ku ew piştre ducanî nebin. Piştre jî midûr û cerdevanên zindanê pê '*karê bê exlaqî didan kirin'*. Girtiyên jin ên ku hatin berdan jî diyar kirin ku heger wan ev kirinên hanê qebûl nekirbana, dewletê wê ew kuştibana.[210]

Ji ber feraseta zayendperest a namûsê û bêbaweriyê, jinan nikaribû giliyê kesên sûcdar bikin ne jî wan karibû van neheqiyan bi kesekê re parve bikin. Wekî li zindanê, di civaka Bakurê Sûriyê de jî jiyana jinan di gelek aliyan de rasterast ketiye bin bandora dewleta navendî. Nexasim li bajarên ku nîzama dewletê tê de serdest in jin ji têkiliyên hevgirtî û dostanî yên civakî hatine dûrxistin. Jinên Kobanê destnîşan dikin ka çawa rejîma Beesê bi rêbazên zayendperest yên şerê taybet hewl dida baweriya jinê û ya civakê bişikîne:

"Jin şeref û namûsa Kurditiya li Kobanê bû. Weke ku dewleta Beesê dixwest destê xwe bavêje vê namûsê, ez dikarim mînakekê bidim: Li vir, li Kobanê emnî siyasî hebû. Mamosteyên Ereb nû anîbûn Kobanê. Mamosteyeke jin bi seyara xwe ya sor dihat dibistanê. Ew xistine di nav mamosteyên Kurd de ji bo tiştên nebaş, bê exlaqî di nav mamosteyên jin û peya de derbixîne. Piştre wê dest avêt civakê jî. Wê xwest dest bavêje jinên ku zilamên wan li derve dişixûliyan, yên ku derketine dervê welat. Lê mamosteyên Kobanê zû bi tevgerên wê fêhm kirine ku dixwestin tiştek wekî 'kerxanê' li Kobanê vekin, dixwestin dest bavêjin jin û keçikan. Tiştên kirin zû agahdar bûn. Ji ber vê, wê nikaribû wan tiştan ji bo dewletê pêk bianiya."[211]

Jinên ku tundiya cinsî wekî tecawiz û fihûş bi darê zorê li wan dihat kirin, heta dawiya emrê xwe bi birînên kûr û devgirtî jiyane. Jinên din jî ji ber xwe gunehbar ango 'qirêj' didîtin û nikarîbûn xwe li vê rewşê ragirin, xwe kuştin. Her wiha jinên din jî hebûn ku newêrîn ku bizivirin cem malbat û civaka xwe ji ber ku wan êdî 'namûsa xwe ji dest dabû'. Ji ber ku ew bêkes û bêçarê mane hinek ji wan careke din ketin nav torên laşfiroşiyê. Wekî din jinên din jî hebûn ku tundiya cinsî yan di zindanan de yan jî di civakê de li wan hatiye kirin ku êş û hêrsa xwe zivirandina tolhildan û berxwedanê li hemberî pergala desthilatdariyê û tevlî refên têkoşîna azadiyê bûne.

[209] Hevpeyvîn bi Zeynep Dilşer re, endama PYD, Qamişlo, 2017
[210] Hevpeyvîn bi endamên navenda Rêxistina SARA re, Qamişlo, 2016
[211] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

Li hemberî êrîşên zayendperest yên dewletê jinên di jiyana komînal a gundan de kesayetî û civakbûna xwe hîn zêdetir karibûn biparêzin. Lê belê li qadên di bin serweriya netewe dewletê de jin bi pirranî bê parastin bûn. Sê cûreyên mêhtingeriyê li ser jinan hatine meşandin: Zayendperestî, nijadperestî û çînayetî. Jinên Kurd ên xizan di her aliyî de di bin şertên herî zehmet de têkoşîna man û nemanê dikirin. Polîtîkayên zayendperest yên dewletê hundir û dervê zindanê kirine armanc da ku bikare jinê wekî amûrekê bi kar bîne, vîna jinê bişikîne û civakê teslîm bigire.

III. 2.2. Mêhtingerî û Nijadperestî: Parçekirina Jin-Jiyan-Civakê

Pergala mêhtingeriyê armanc dike ku desthilatdariya xwe li ser ax, mirov û çavkaniyên vî welatî misoger bike û ji bo berjewendiyên xwe bi kar bîne. Rêbazên mêhtingeriyê ku li ser welat û gelan tên meşandin xwe dispêrin mêhtingeriyê ku di dîrokê de li ser raman, beden û hebûna jinê hatiye meşandin. Ji şêwazên eşkere û hovane heta şêwazên veşartî û zirav, mêhtinger her amûrê bi kar tînin da ku berxwedan, vîn û nasnameya jinan bişikînin. Li şûna vê, dewletên mêhtinger armanc dikin ku hegemonyaya xwe di mêjî û çanda civakê de, di qadên siyasî, aborî, perwerde û leşkerî de serwer dikin. Wateya vê ferzkirina siyaseta tecawizê bi armanca tinekirina kesayeta jinê û jihevdexistina civakbûnê ye.

"Di encama fermanên li ser gelê Kurd, komkujî û qirkirinên siyasî de pêlên koçberiyê yên mezin ji gundan ber bi bajêr ve, ji Kurdistanê ber bi bajarên Sûriyê ve çêbûne. Ev bûye sedem ku civaka Kurd herdem di nava koçberiyê de bijî. Bi giştî çi komkujiya ku çêbûye herî zêde zext li ser jinê hatiye meşandin. Heta yên ku herî zêde di şertên koçberiyê de zehmetî kişandine, jin in."[212]

Bajarbûn li Rojava hîna nû piştî parçekirina Kurdistanê bi pêş ket. Beriya wê gel li gundên piçûk û weke koçeran dijiya. Ev çanda jiyanê, nêzîktirî çand û xwezaya jinê bû. Lê parçekirina Kurdistanê û daxuyaniya 'Komara Yekgirtî ya Ereb a Sûriyê' mêhtingerî li ser jiyana jinên Bakurê Sûriyê ji gelek aliyan ve zexmtir kiriye. Sînorên ku di navbera dewletên Sûriyê, Tirkiyê û Iraqê de hatin lêkirin, Rojava ji Bakur û Başûrê Kurdistanê veqetand. Di encamê de ax, jiyan û malbatên Kurd, Suryanî-Aşûrî-Keldanî, Mihelmî û Ermenî hatin parçekirin. Xizmên hev, xwuşk û bira bi darê zorê ji hevdu hatine dûrxistin. Ji ber ku dewletên li her du aliyan destûr nedida ku gelê xwecihî bi awayekî fermî derbasê aliyê din bibe, gel neçar ma ku tehlûkeyên rêyên qaçax bigire ber çavan. Serdanên malbatê, domandina têkiliyên malbatî û civakî, zewac, parvekirina hestên kêfxweşî û şînê tenê bi rêyên qaçax gengaz bûne. Li ser van rêyên di navbera gundên cîran de gelek mirovan jiyana xwe ji dest da yan jî ji ber mayîn û êrîşên leşkerên Tirk, Sûriyê û Iraqê birîndar bûn.

Jinên ku ji Bakurê Kurdistanê wekî bûk derbasê herêmên bin xetê dibûn ji civaka xwe, ji dayik, bav û hevalên xwe yên zarokatiyê dihatin veqetandin. Çiqas gelek ji wan bûkan dîsa bi xizimên xwe re dihatin zewicandin jî bi gelekan ji wan re her tim hiseke biyanîbûnê hebû. Ji ber bandora şêwazên cuda yên bişaftinê yên dewletên Tirk û Sûriyê, di hinek aliyan de taybetmendî, zêhniyet û zimanên heman civak, eşîr û malbatê bi rengên cuda hatibûn guhertin. Wan li dibistanên rejîmên cuda bi zimanên cuda xwendiye. Bi vî rengî têkiliyên civakî jî bi bandor bûn. Jinên ku wek bûk ji herêmên serxetê hatibûn, behs dikin ku wan di avakirina hevaltiyên jidil de, di parvekirina êş û

[212] Hevpeyvîn bi Asya Ebdullah re, hevseroka PYD, Qamişlo, 2017

pirsgirêkên xwe de zehmetî kişandiye. Bi taybetî dema tundiya zayendperest di nava malbatê de bi serê wan de hatiye, ew gelekî tengezar dibûn.

Wekî din bi parçekirina Kurdistanê re rêyên aborî, bazirganiyê û zozanan hatine qutkirin; bajar û gund ji hev hatine veqetandin, koçer mecbûr mane ku yan li herêmên 'serxet'ê an jî 'binxet'ê dêmanî bibin. Bi vî rengî jî çanda jiyanê û rista jinê hatiye guhertin. Jinên ku berê di jiyana aborî û civakî de xwedî gelek erkan bûne, niha di gund û bajaran de bi pirranî wekî 'jinên malê' di nav çar dîwaran de mane. Gelek dayikên temen mezin hene ku dibêjin: *"Berê dehan salan em ji gundê xwe, ji axa xwe qut bûne. Em çûn di nav çandek ku ne ya me ye. Heta niha em nebûnê yek."* Di bajaran de nêzikatiyên neteweperestiya Ereb ya dewletê bandora xwe li ser tevahiya warên jiyanê dikir. Ji ber vê, jinên Kurd çanda bajêr û mêhtingerî ti car di nava xwe de qebûl nekirine û bi hesreta vegera ser axa xwe dijîn, çand û zimanê xwe diparêzin.

2.2. a) Şovenîzma Dewletê û Pirsgirêkên Siyasî, Aborî û Koçberî yên Civaka Kurd

Komara Ereb a Sûriyê sala 1946'an hat damezrandin. Heta partiya Beesê di sala 1963'an de desthilatdariya xwe îlan kir, heft darbeyên leşkerî li Sûriyê pêk hatin. Di avakirina hikûmetan û siyasetê de ti carî dengê gelan esas nedihat girtin. Şerê desthildatdariyê yên komên otokratîk û leşkerî çêbû. Modela netewe dewleta Ereb mohra xwe li rejîma polîtîk ya Sûriyê xistiye. Hêz û rêxistinbûna gel li hemberî wan elîtên siyasî û leşkerî bê bandor maye. Bi vî awayî bi gelemperî mesafeyek di nav civakê û siyasetê de çêbû.

Destûra bingehîn a dewleta Sûriyê ku heta sala 2012'an lê bû, li ser bingehê bîrdoziya pan-erebîzm û bi bandora destûra bingehîn a Yekîtiya Sovyetê hatibû amadekirin. Sala 1973'yan benda 8'an tê de hatibû bicihkirin ku desthilatdariya Partiya Beesê wekî 'partiya pêşeng di civak û dewletê de' misoger kiriye. Ji bilî vê, pirraniya qanûnên Sûriyê li gorî hevpeymanên navneteweyî yên mafên mirovan hatibûn amadekirin. Gelek maf û qanûn di fermiyeta Komara Ereb a Sûriyê de hebûn. Lê di rastiya jiyanê de ew qanûn pêk nedihatin. Dema ku mirov hatine girtin ew bêyî ku li dadgehê werin dadgehkirin, bêyî ku parêzerekî yan jî malbata xwe karibîn bibînin, zêdetirî 10 – 15 salan di hepsan de hatine windakirin. Gelek kes jî nema hatine dîtin. Zindanên di bin erdê de mîna 'Hepsa Seydneya' li Şamê yan jî 'Hepsa Tedmor' bi nav û deng bûn. Ne girtiyan karibû rojê bibînin, ne jî kesekî karibû wan bibîne. Van kirinan di tevahiya civakê de tirseke kûr dida çêkirin. Xelkê digot, *'Heger tu li dijî dewletê rabî, ew ê bibe dawiya te!'*

Hêz û serweriya teqez a dewletê di rastiya Partiya Beesê de wekî destnedayî hatiye dîtin: "*Pirsgirêkên civakî bingehê xwe ji sîstema dewletê digirin. Her tiştek, her pirsgirêkek di jor de destwerdan lê dihat kirin. Dewletê li gorî xwe biryar standin, xistin meriyetê û li ser civakê [ew] ferz kirine. Yanî çawa di jor de Xweda heye di jêr de jî sîstema dewletê heye. Dewletê ti carî nekarî ji pirsgirêkan re çareseriyeke bingehîn bibîne. Tenê bi sîstemekê bertîlê ji civakê digire û bi ser wê pirsgirêkê de diçe. Lê, bingehîn çareser nake."*[213]

Bi vê nêzîkatiyê mirov ji kar û berpirsyarên siyasî û civakî hatin dûrxistin. Desthilatdariya Beesê hevsengiyek ji tirs û refahê, ji sîxurî, bertîl û wasta ava kiriye ku vîna mirov û civakê pûç dikir. Ji

[213] Hevpeyvîn bi endamên Meclîsa dada civakî re, Qamişlo, 2017, li Qamişlo

ber ku sîstemê nefesa civakê qut kiribû, civakê nikaribû di warê siyasetê de ji bo xwe bi xwe bifikire. Lewma, civakê nikaribû vîna xwe derxista holê, bibûya xwedî nêrîn û helwest. Bi vî awayî gelek kes bi nirxên xwe yên civakî û exlaqî re ketine rewşeke bi nakok. "*Heta digihîşt asta ku Hafiz Esed ji bo xwe ne dijmin didîtin. Ruxmê ku kuştinên bin navê kujerên nediyar, kesên winda û girtî pirr bûn."*[214]

Propagandayên pan-erebîzm û şovenîzmê bi dirûşmeya 'Uma Erebiye wahid e, Zed rîsela xalîde' [Welatê Ereban yek e, Xwediyê nameya pîroz e] li her derê hatine belavkirin. Ziman û çandên cuda wekî ji medeniyetê dûr, hatine dîtin. Desthilatdarên dewleta Sûriyê her wiha ji bo herêm û pêkhateyên Sûriyê hemûyan polîtîkayên taybet bi pêş xistine. Di encama vê de parçebûna di nav gelên Bakurê Sûriyê de hatiye gurr kirin. Metirsiya girtin, êşkence û kuştinê her tim wekî ewrekî gewr li ser serê gelan sekiniye.

Ji bo gelê Kurd li Rojava bi taybetî komkujiyên sînemaya Amûdê û ya zindanê Hesekê bûyerên ratekandî [trawmatîk] bûn. Di 13'ê Mijdara 1960'î de 500 zarokên dibistanên Amûdê di sînemaya bi 170 kursî de bi talîmata midûrên dibistanê hatibûn komkirin. Ji bo alîkarî ji bo têkoşîna gelê Cezayîrê were komkirin, wan zarokan biletên sînemayê kirîne da ku li filma "Gunehkariya Nîvê Şevê" temaşe bikin. Ji ber ti tedbîrên ewlekariyê tinebûn û wezîfedarên dewletê jî di dema nîşandana filmê de ne amade bûn, gelê Amûdê guman dike ku dewletê ev şewat qesden plan kiriye. 283 zarokên Kurd di agirê sînemaya Amûdê de zîndî şewitîne. Bedenên wan bûn rejî. Êş û birînê vê komkujiyê di civaka Rojava de hîna jî didomin.

Qetlîama ku rejîma Beesê di 24'ê Adara 1993'yan de li zindana Heseke pêk anî jî wekî komkujiyeke plankirî di bîra civaka Rojava de maye. Dema ku şewat di zindanê de derket rayedarên dewletê deriyên zindanê venekirine û 61 girtî di nav pêlên agirî de şewitîne. Tevî tundî û kuştinên 'kiryarê wan nediyar' polîtîkayên bipaşvexistina aborî, derfetên perwerde, tenduristî û jiyanî jî li ser tevahî navçeyên Rojava hatine meşandin. Bi vî rengî gel ne têr ne jî birçî hatiye hiştin û ji keda xwe hatiye biyanîkirin. Wiha Kurdên Rojava mehkûmî xizanî û koçberiyê bûne.

Zeftkirina Nasname, Ax û Aboriya Kurdan

Li gorî qanûna 'serjimarê ya Hesekê' ku di 5'ê Cotmeha 1962'yan de pêk hatiye, di rojekê de pirraniya Kurdên Cizîrê ji welatîbûna Sûriyê hatibûn derxistin. Wekî kesên 'mektûm' yan 'ecnebî' mafên wan yên hiqûqî, siyasî, aborî û medenî hemû ji destê wan hatibûn girtin. Di encama vê siyaseta demografiyê de civaka Kurd, ji çavkaniyên xwe yên jiyanê hat qutkirin. Kurdên 'ecnebî' an jî 'mektûm' nikaribûn ti milkan li ser navê xwe qeyd bikin. Avakirina kargeh, zanîngeh û malan li Rojava qedexe bûye. Ji ber ku nasnameyên Kurdan tine bûn, çûna bajarekî din karibû bibe sedema girtinê. Her wiha xwendina zarokên Kurd jî wisa hatiye astengkirin. Ev nêzîkatiyên dewletê dibûn asteng li pêşiya vebijark û qadên jiyanê yên civaka Kurd û siberojê zarokan.

Li ser bingehê vê siyasetê, Partiya Beesê di salên 1970'yî de projeya nijadparest 'El-Hîzam el-Erebî' [Kembera Ereban] bi pêş xistiye. Bi vî rengî dewleta Sûriyê tenê li herêma Cizîrê dest daniye ser 6 mîlyon û nîv hektar (yanî 65 mîlyon donum) erdê Kurdan. Ev erdên ziraetê dane 4000

[214] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

malbatên Erebên Mexmûrî yên ji herêma Tebqayê. Ev malbatên hanê bi taybetî di 41 gundên herêma Cizîrê de û li herêma Şehba jî li ser xeta sînor bi armanca cerdevaniyê hatin bicihkirin. Gelê Kurd li ser axa xwe bê erd hatiye hiştin û wek biyanî hatiye hesibandin.

Rojîn Remo ku di zaroktiya xwe de bû şahidê pêkanînên 'Kembera Ereban' hest û nêrînên xwe parve dike: "*Dewlet li ser xaka me demeke dirêj lêkolîn û siyaset meşandine ji bo helandinekê çêbike. Dema ez diçûm dibistanê, min nizanibû Erebî û dewlet di navbera her cihê Kurdan de Ereb xistine. Ew bi zanebûn Ereb ji derve anîne ji bo Kurdîtiyê pûç bikin û Kurdên heyî bikin Ereb. Dixwestin ku em ziman û çanda wan bigirin. Dema tu bi hev re jiyan bikî û zimanê te qedexe ye û yê wan serbest e, tu mecbûr dimînî. Yek, gundê Ereba anîn nav gundê me. Du, kemberên Erebî çêkirin. Derdora cihê Kurdan kirin çemberekî.*

Dema hatin kêleka me û bi cih bûn, em ewqasî pê nehesiyan. Vê sîstemê li ser Ereban jî zext dida meşandin. Ew anîn, lê ez xwediyê wî cihî bûm. Dewlet tiştê min ji min stand û da wan. Nanê min ji destê min derxistin, dida wan ji bo çavê min bimîne li destê wan. An tê birçî biminî û bimirî an tê berê xwe bidî koçberiyê, bajarên wan û li wir kar bikî. Li Şamê, li Helebê sîstemek wisa dan meşandin. Li Rojava ne kargeh çêkirine ji bo mirov tê de kar bikin, ne jî projekî din ya aborî çêkirin. Xêra vê axê nedihiştin. Hemû gel derxistin derve. 2005 nîvê miletê Cizîrê li Şamê bûn. Tu diçûyî hinek taxê Şamê, te digot qeyî tu li Dêrikê yî an li Qamişlo yî. Hinek taxên Efrîniya hebûn û yên Kobaniyan. Milet di kargehan de kar dikir. Westandinek zêde bi heqdestekî kêm didan. Ew tenê îdareya nanê xwe dikir."[215]

Dema ku dewletê erdên Kurdan desteser kirin, hinek axayan bertîl da memûrên dewletê ji bo parçeyek erd ji wî re bihelin. Hinek axayan jî erdên xwe li ser navên cuda dan qeydkirin û wan dîsa karîbû erdên xwe bidin çandin. Lê pirraniya Kurdan bê erd bûn, feqîr bûn. Wan tenê karibû di karên giran ên demsalê de, bi fermana çawişan, wek xizmetkar ji bo heqdestekî kêm bixebitin. Dewletê di karên girîng ên wek di sektorên neftê, ewlekarî û memûrtiyê de, bi pirranî karmendên Ereb wezîfedar dikirin. Nefta ku li herêmên Kurdistanê hat derxistin, li Tartusê û cihên din li dervê Rojavayê Kurdistanê hat rafînekirin û xebitandin. Rojava, mirov û çavkaniyên wê dibûn mêhtingeha dewleta Sûriyê.

Jixwe, ji bo jinên Kurd, ji bilî karê çandinî û karê malê, karên din nedihatin qebûlkirin. "*Di aliyê aborî de jinê pirr êş kişand. Digotin 'eyb e ku jina Kurd ji mal derkevê. Bila zilam biçin derve kar bikin."*[216] Jinên Ereb û Suryanî wekî hemwelatiyên Sûrî dikaribûn bibin mamosteyên dibistanê. Lê ev derfet ji bo jinên Kurd ên ku wekî 'ecnebî' dihatin hesibandin tine bû. Bi gişti, çavkaniyên aborî yên derveyî malê ji bo jinan kêm bûn. Lewma jin di hêla aborî de girêdayî malbat û hevjînê xwe bûn.

Li gundên Kobanê milet li hemberî pêkanîna projeya 'Kembera Ereban' a dewleta Sûriyê, li ber xwe dabû. Lewma rejîma Beesê li Kobanê siyaseta xwe guhert û hewl da ku armancên xwe bi rêya serekên eşîrê û seydayên terîqetên Neqşîbendî û Qadirî pêk bîne. Erd di destê axayan de mabû, lê tevahiya karên hilberînê di bin serweriya dewletê de dihatin meşandin. Bi vî awayî li Kobanê jî gel gav bi gav ji çandiniyê qut dibû û berê xwe dida bazirganiyê.

[215] Hevpeyvîn bi Rojîn Remo re, Qamişlo, 2016

[216] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê, Heseke, 2017

Xizanî bûye bela serê gelê Kurd li herêma Efrînê jî tevî dewlemendiya erdnîgariya Efrînê, ji ber ku nîzama Beesê ti derfet nedaye herêmê. Lê bi dayîna hemwelatî û nasnameya Komara Ereb a Sûriyê rejîmê siyaseta bişaftinê bi bandor kiriye. Ji bo derfetên aborî û xwendinê pirraniya xelkê Efrînê koçberî Helebê bûye. Bi vî awayî gelek kes di nav jiyana bajarê Helebê de ji çand û zimanê xwe dûr ketine û hewl didan siberoja xwe li gorî şertên pergala dewletê ava bikin.

Siyaseta navendî ya aborî ya dewletê çavkaniyên xwezayî û keda mirovan yên li herêmên Rojava, ji bo berjewendiyên xwe xerc kirine. Dewletê ferman dabû ku gelê Efrînê tenê zeytûn, gelê Kobanê û Cizîrê jî tenê genim û pembû biçînin. Hikûmeta Sûriyê genim, pêmbû û berhemên din pirr erzan ji xelkê dikirî û bi buhayekî zêde difrote derve. Bi vê polîtîkaya çandiniyê, dewletê gel dikir muhtacê xwe. Vê yekê, nedihişt ku gel bikare çandiniyê li gorî pêdiviyên xwe bimeşîne, pirralî bixebite û xwe têr bike.

Bi vî rengî koçberiya ber bi bajarên mezin ve hatiye teşwîqkirin. Taybetmendiya civaka Rojava cotkarî ye. Lê rêjeyeke mezin a gelê Rojava mecbûr dima ji bo debara xwe wek karkerên sinaî li deverên derveyî Rojava bixebite. "*Dewletê tenê dihişt ku gel di salê de 1-2 heyvan di erdê de kar bike û genimê xwe biçîne. 8 – 9 heyvan jî mirov êdî mecbûr mane wekî karkerê erzan li Şamê, Heleb an Reqayê kar bikin. Wisa dewletê bi zorê wan dikir karker."*[217] Hinek malbat bi giştî koçber bûne. Lê bi pirranî zilam bi tenê çûne da ku debara malbata xwe bikarin bikin. Mînak gelek xortên Kobanê yên ku di kolana bîrên avê de pispor bûne çûne welatên Kendava Ereban.

Bê erd hiştin û koçberî dibûn sedema ji hev veqetandina malbatan û biyanîbûna civakê ji ax û çavkaniyên xwe. Bi vî rengî pêşî li bipêşketina hilberîn û afirîneriya civakê hatiye girtin. Hilberîna zîraetê li gorî plansaziya dewleta navendî li her kantonê bi çend berheman hatiye sînordarkirin. Çandina baxçe û daran li hin deran hatibû qedexekirin ango nepêkan bû. Ji ber ku dewletê çavkaniyên avê desteser kiribûn û nedihişt ku gel bîran bikole. Lewma axa dewlemend a Rojava ji salên 1990'î ve ziwa bûye. Di sala 1992'yan de li Efrînê dewletê li cotkaran ji bo darên zeytûnê dermanek belav kiriye. Lê vî dermanî bi hezaran dar hişk kirine. Her wiha di şûna darên mirî de çandina darên nû hatiye qedexekirin.

Ruxmê ku rejîma Beesê di her aliyî de jiyan û aboriya civakê asteng dikir, serhildanên gel çênedibûn. Dewletê bi rêya erzaniya nan, av û kehrebê [elektrîkê] pêşî li nerazîbûnên gel girtiye. Desthilatdariya Beesê hewl dida bi siyasetên zirav û dirûşmeyên 'sosyalîst' û 'antî-emperyalîst' pergala xwe ya zordest û şovenîst binixumîne. Çendî di rastiya jiyanê ya gelê Kurd de rûyê zordest yê rejîmê her tim xwe dida der jî, gelek kes newêrin îtîrazên xwe eşkere îfade bikin. Endama Kongra Star Zelal Cîger vê rewşa bi nakok wiha dinirxîne:

"Polîtîka Esad ewqas nerm bû ku gelê Kurd nakokiyên kûr jiyan nedikir. Bertekek cîddî çênebû. Ew partiyên reformîst ku di salên 1960'î de bi bandora PDK'ê çêbûne, [wan] tenê digot 'bila av û kehrebê ji me re bînin!' Mijarên azadiya gel, azadiya ziman nehatin zimên. Av û kehrebê yê dewleta Sûriyê jî pirr e. Ji ber vê ji 1960'î û şûnde dewleta Sûriyê av, kehrebe û nan gihand hemû gundên Rojava. Bi vî awayî dewletê gel bi xwe ve girêda. Ev jî feraseta Reelsosyalîzmê bû. Gel digot, 'dewlet ji me re alîkar e, li me xwedî derdikeve.' Lê ger dewlet dewlemendiyên ku jixwe li Kurdistanê hene, dabûna gelê Kurd, îhtiyaca gel bi wan tiştan nedibû. Yekê ku li gorî hişmendiya dewletê wekê memûr li cem wî kar bikira bûye 'her tişt', ji ber ku dewletê zû bi zû Kurd wekî

[217] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

memûr qebûl nedikirin. Bi vî rengî dewlet gel her tim li hemberî hevdu hewijandin [tehrik kirin]. Vê siyasetê gelê Rojava cemidand û tawizand."[218]

Narîn Efrîn jî balê dikişîne ser wê yekê ku dewleta Sûriyê tevizandin û qutbûn di nava gelê Kurd de tetbîq û ava kirine: "*Ne azadî dida, ne jî hişt ku nakokiyên kûr û rabûnek li dijî pergalê derbikeve. Herêmên Kurdan jî ji hevdu qut bûn. Efrîn bi serê xwe bû, Kobanê cuda û Cizîrê jî cuda bû. Nayê bîra min ku gelê wan herêman hevdu baş nas kirin. Di warê ziman û civakîbûnê de herêm ji hev qut bûn."*[219]

Heta sala 2011'an pirraniya Kurdên li Sûriyê wekî gelên din jî hewl didan ku hebûna xwe di nav nakokî û hevsengiyên bi sîstema desthilatdar re biparêzin. Di vî aliyî de serhildanên bêdeng ên jinan ku di heman demê de xwe di bin pergala desthildatdariyê de bi rêk xistine, dişibin helwesta ku beşeke mezin ya civaka Kurd li hemberî rejîmê raber dikir: Ew nedihatin bişaftin, lê ne jî karibûn bibin aydê xwe.

2.2. b) Tepisandina Vîn, Çand û Ramanê

Ji bo Kurdan deriyên dewletê, encax bi sîxurtiya ji bo istîxbarata dewletê yan jî bi 'wasta' ango ehbapçawişti û bertîlê hinekî vebûne. Bi van pêkanînan jî di nava civak û mirovan de bê armancbûn, parçebûn û bipêşxistina nemana baweriyê ava bûye. Gumanên wek *'gelo cîranê min yan jî mirovên min ajanên dewletê ne?'* di nava civakê de tirs çêkiriye. Ev jî, wek şerê taybet yê li dijî yekîtiya Kurdan û gelên Sûriyê hatiye bi kar anîn.

Pirraniya gelê xizan ji dewletê dûr sekinî. Lê beşek ji çîna axa û began ji bo berjewendiyên xwe hevkarî bi dewletê re kiriye: *"Girêdana axa û began bi dewletê re hebû. Têkiliyên wan bi emnî û istîxbaratê re hebûn ji bo neyên girtin û bikarin rehet bijîn. Dema ku berpirsyarên dewletê yên mintiqê dihatin guhertin wan muxaberatan daweta kesên nû dikirin, pez jê re serjêdikirin. Diyariyên giran didan ji bo wastaya xwe cem dewletê. Gelê normal nediçû cem dewletê. Dema ku pirsgirêkek hebû gel diçû odeya gund cem axa û axa diçû cem dewletê."*[220]

Siyaseta sîxûrtiyê rehendeke girîng a şerê taybet li dijî yekîtî û vîna civaka Kurd bû, nexasim jî li dijî vîna jin û ciwanan. Bi taybetî, bi mohrkirina Peymana Adana re ya navbera dewleta Sûriyê û Tirkiyê, sala 1999'an zextên dewletê li ser gel gihandin asteke nû. Hediye Yûsif bal dikişîne ku pergala şerê taybet ewqas pirralî hatibû bi rêxistin kirin da ku ***'êdî civaka Kurd ji siya xwe ditirsiya'***. Di bin bandora vê siyasetê de gelek kes dibûn nokerên dewleta zilm li wan dikir:

"Bi taybet ji sala 2000'î û şûnde dewletê polîtîkayên helandinê û yên şidetê pirr dijwar li ser civaka Rojava da meşandin. Ev siyaset bi komploya navneteweyî re pêş ket û parçek ji komploya navneteweyî bû. Bi hezaran ciwanên me girtin û di zindanan de êşkence [li wan] kirine. Polîtîkayên tinekirina îradeyê li ser insanan hatine meşandin. Siyaseta istîxbarat û emnî hişt ku

[218] Çavkanî li heman cihî

[219] Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, endama fermandariya YPJê, Kobanê, 2019

[220] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

êdî civak ji siya xwe bitirse. Baweriya civakê bi civaka xwe da şikandin. Wisa çebû ku êdî bira bawerî nedida birayê xwe. Bandora wê ya neyînî çêbû. Dewletê xwest civaka me bi sixûrtiyê ji hev bixe."[221]

Di heman demê de dewleta Sûriyê avakirina cihên fihuşê û belavkirina madeyên hişbir jî wekî rêbazên şerê taybet li dijî civakê bi pêş xistiye. Bi van rêbazan dewlet rizandina rûmet û pûçkirina fikrê civakê kiriye armanc. Kesên ku ketin nav torên fihûş û muxederatê de êdî bê parastina civakê diman. Istîxbarata dewletê ew kes carna bi zext û gefan, carna jî bi rêbazên zirav û xapînok ji bo karên sixûrtiyê bi kar dianîn: "*Muxederat, yanê hêroyîn, heşîş û tişten wisa berê di nav civaka me de tine bûn. Lê ji bo fikrê ciwana li ser welatparêzî û azadiyê belav bike, dewlet ji ciwanên Kurd re karê muxederatê da fêrkirin. Muxederat di mekteban de dan belavkirin. Evana hemû beşên siyaseta tinekirina yekîtî û çanda gelê Kurd in."*[222]

Bi van rêbazên şerê taybet, dewletê di nava civaka Kurd de hestên gumanê, biyanîbûn û ji hev dûr ketin da avakirin. Di milê din de jî hikûmeta Beesê polîtîkayên taybet bi pêş xistine da ku gelên herêmê bikin dijminê hev. Tevî ku dewletê ziman û dibistanên Kurdî qedexe kirine û baweriya Êzdatiyê înkar kiriye; wê li aliyê din derfet daye perwerdeya ziman, avakirina dêr û dibistanên gelên Mesîhî. Nêzîkatiyên dewletê li gorî qewm, herêm, statûya civakî dihat guhertin ango bi giştî kêfî bûn. Bi vî awayî dewletê pêşhukm ava kirin û ew sor kirine.

Esma ji Rimêlan dibêje: "*Di civaka Rimêlan de kes bi kesî amin nedibû ji ber muxaberat gelek hebûn. Bawerî ya xelkê bi hevdu nedihat. Me hemûyan li vir jiyan dikir, lê me hevdu nas nedikir. Niha rewş cuda ye. Di wextê nîzamê de me nedikarî bi zimanê xwe biştexilin. Zarokê me bi Kurdî nikaribûn di nav hev de biştexilin. Di dibistanan de ji wan re digotin 'divê hûn di bin siya Beesê de xwe bi rêxistin bikin û em ê pilê we di bekeloriya de zêde bidin'. Yên ku bi nîzamê re bûn û rewşa Elewiyan baş bû. Tim yên Elewî, yên Ereb, yên Mesîhî kar didîtin. Lê yên Kurd kar nedidîtin. Jinekê got, dema ew nû hatibû Rimêlan, kesek ji cîranan nehat mala wê ji ber ku ew Kurd bû."*[223]

Dayikek ji Girkêlegê jî behsa bandora hişmendiya şovenîst a Beesê li ser şêniyên bajêr dike: "*Ji bo ku zarokên Kurd karibin bixwînin, pêwîst bû ku yek ji malbatê endamê partiya Beesî ba, yanî zilamê dewletê ba. Yên nîzamê hemû li Rimêlan bûn. Lê xanî ji bo zilamên xwe li Girkêlege jî kirê kiribûn. Malûmat ji wan re diçû. Tirs di nav gel de hebû. Ji ber wê, kes jî nedihatin Newrozê. Dema zarokên me di eskeriyê de bûn, qedexe bû ku wan di telefonê de bi dayika xwe ra Kurdî biaxiviyan. Heta qedexê bû ku me navên zarokan bi Kurdî qeyd bikira."*[224]

Dayikeke şehîdan ku gelek salan xebatên siyasî meşandin û serê xwe beramberî gefên îstîxbaratê netewand, bi vî rengî şerê taybet ê dewletê hatiye serê malbata wê rave dike: "*Dewletê zext li me dikir. Keça min muhendîstî di zanîngeha dewletê de xwend. Lê piştî xwendin xilas kir, wezifedar nekirin. Dewletê got, 'yan tu bibî ajanê me yan jî em wezife nadin te'."* Dema ku keçê evna red kir îstixbaratê dayika wê bir û zor li wê kir da ku ew keça xwe wekî sîxurê dewletê qeyd bike. Gava ku dayikê jî ev yek red kir rêbazên cuda bi kar anîn. Polîs êrîş anî ser civîneke jinên welatparêz. Ji

[221] Hevpeyvîn bi Hediye Yûsif re, Dêrik, 2017

[222] Hevpeyvîn bi Rojîn Remo re, Qamişlo, 2016

[223] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê re, Rimêlan, 2017

[224] Hevpeyvîn bi Yadê Esma re, Girkêlegê, 2017

bilî vê dayikê, jin hemû hatin girtin. Wiha dewletê dixwest wê wekî nokerê xwe bide xuyakirin. *"Dewletê wisa kir. Car caran hinek jin jî qezenc kirin û jin kirin sîxurê xwe. Mêrik bi navê Enwer [li Dêrikê] hebû. Wî digot, 'heftê îstîxbaratê min ê jin hene.' Carna ew diçû sûkê, [wî] heft fîstan digirt[in] û digot: 'Ez diyarî ji îstîxbaratê min ê jin re dibim.' Yanî êdî ew tesîra dewletê li ser jina jî hebû."*[225]

Dewletê dixwest bi rêya siyaseta tirs û sîxûrtiyê bikeve nava tevahiya şaneyên civakê da ku bawerî û hevgirtina civakê pûç bike. Ji ber ku jin di parastina nirx û çanda civakê de xwedî risteke serekî radibû, dewletê bi rêbazên şerê taybet êrîşê rûmet û kesayeta jinê dikir. Armanca desthilatdariya Beesê ew bû ku di kesayeta jinê de civakê teslîm bigire. Lê belê gelek jin bi sekna xwe û helwesta berxwedêr li dijî van kiryaran civak hişyar kirine.

III. 2.3. Pirsgirêkên Jinê û Siyasetê

Hişmendiya şovenîst û nijadperest ya Komara Ereb a Sûriyê, nehiştiye ku jin û gel bi vîna xwe di qada siyasetê de cihê xwe bigirin. Ew bipêşxistina nêrîn û xebatên siyasî li gorî pêdiviya civakê asteng kiriye û nehiştiye ku yekîtî û empatiya jinan di asteke xurt de pêşbikeve.

Beriya Şoreşa Rojava ji bilî tevgera jinên Kurd *Yekîtiya Star*, tenê du rêxistinên jinan ava bûne: *Îtihad el-Nîsa [Yekîtiya Jinan]* ya Partiya Beesê û *Jinên Şûî [Jinên Komunîst]*. Her du rêxistin jî wek şaxên partiyan ên jinan bûn û li gorî berjewendiyên wan tevgeriyane. Nasname, maf û vîna jinê bi wan rêxistinan re nehatiye xurtkirin. Bi endamtiya şaxê Partiya Beesê yê jinan, ji bo hin jinan rêyên di nav rayedariya dewletê de hatine vekirin. Her wiha, jinên Partiya Şûî jî bi pirranî wek 'alîgir'ên hevjînên xwe hatin dîtin û bi erka zêdekirina endaman tevgeriyane. Tenê hejmareke piçûk bi rengekî aktîf di siyaseta partiyê de cih girtibû. Lê endamên partiya Şûî bixwe dibêjin ku nêzîkbûneke stratejîk a partiya wan di mijara azadiya jinê de nehatiye raberkirin.

Partiyên Kurdan yên ku li ser kevneşopiya eşîrî hatibûn avakirin jî cih nedane jinê: "*Berî derketina Tevgera Azadiyê ya PKK zarokatiya min tê bîra min. Bavê min vê demê berpirsyarê Al Partî yê girêdayî Mela Barzanî bû. Em zarok bûn. Hevalên bavê min dihatin, dirûniştin. Dayikên me tenê xizmet dikirin. Çay û qehwa wan, xwarina wan dianîn û bi rastî pêlavê wan jî paqij dikirin. Di siyaset û welatparêziya wê partiyê de rola jinê ew bû. Em zarok bûn, çênedibû ku em derbasê cem wan mêran bibin. Nedihiştin ku em avekê jê re bînin. Çênebû ku jinek tevlî wan bibe. Di herî dawî de dixwestin hinek jinan tevlî xwe bikin. Lê ew jin jî hatin reşkirin û avêtin."*[226]

Ji ber van nêzîkatiyan bi gelemperî, tevlîbûna nava siyasetê ya jinên Bakurê Sûriyê qels maye. Di civakê de nihêrîna '*karê siyasî ne karê jinan e*' serwer bû. Pirraniya jinan jî siyaset ne wek karê xwe dîtine û jê dûr sekînine.

III. 2.4. Pirsgirêkên Civakê yên Perwerdeyê

[225] Hevpeyvîn bi Yadê Suad re, Dêrikê, 2017

[226] Hevpeyvîn bi Rojîn Remo re, Qamişlo, 2016

Heta sala 2011'an jî li gelek herêmên Rojava çûna dibistanan nexasim yên navîn û amedeyî ya jinên ciwan ji ya xortan gelekî kêmtir bû. Tenê hejmareke piçûk ya jinên ciwan ji kantonên Cizîrê û Kobanê dikarîbû li zaningehên Hesekê, Helebê, Şamê û Latqiyê bixwîne. Yan dewletê xwendina wan asteng dikir ji ber ku ew keçên 'ecnebî' yan jî 'mektûm' bûn yan jî malbatan destûr nedida. Lewma nisbet û asta xwendinê nexasim ya jinên temenê wan bêhtirî 30 salî, kêm e. Ji nîv mîlyon jinên ku li kantona Cizîrê dimînin, ji sedî 75'ê wan nexwendine yan jî di asta seretayî de xwendine. Rêjeya jinên ku zanîngeh xwendine, tenê ji sedî 3'yê ye.

Gelek jinên ku di zaroktiya xwe de nikaribûn bixwînin, vê wek kêmasiyekê hîs dikin ku bandoreke neyînî li ser bixwebawerbûna wan dike. Di dilê wan de her tim birînek maye ji ber ku dayik û bavên wan ew neşandine dibistanê. Jinên wek Şervîn ji Amûdê *'xwe hîn kêmtir didît'*, ji ber ku wê dibistan nexwendiye: "*Ji ber gund dûr bû û bandora feodalîzmê min nikaribû biçim dibistanê. Min ji dibistanê pirr hez dikir. Lê ji ber feodalîzmê derfet nedan min. Malbatê ev jî pirr eşkere nedigot, min jî dengê xwe nedikir. Lê ez pirr pê diêşiyam. Carna ez diçûm ser xanî. Min milê mektaba gundê din dimeyzand û ez digiriyam."*[227]

Xecê ji gundê Xanaserê yê Koçerata jî yek ji wan keçan bû ku bapîrê wê nedihêla ku piştî dibistana serêtayî ya li gundê xwe, biçin bajêr û xwendina xwe dewam bike: "*3 keçikan pêşiya me xwendin di emrê me de. Şûnde hiştin ku em herin dibistana li gund. Lê ji refa 7 û pê de nedihiştin keçik herin dibistanê. Ez digriyam û min digot, ez ê herim dibistanê. Lê em rênekirin. Digotin 'qey hûnê me bihetikînin. Xelkê bêjin, keçê xwe rêdikin bajêr. Li seyarê xelkê siwar dibin û diçin dibistanê'."*[228]

Hinek malbatan jî guh neda axaftinên derdorê û keçên xwe şandin dibistanê. Bi vê helwestê wan pêşiya xwendina keçên malbatên din jî vekir û guhertin di zêhniyeta civakê de çêkirin. Di dawiya salên 1970'yî de malbata Emîne, keça xwe wek keça yekem li bajarokê Şêranê şand xwendinê. Bavê Emîne qala serpêhatiyên xwe dike: "*Berê keçik ji Şêranê neçûbû mektebê. Eyb bû. Lê keçên me şeş in. Min gişt şandin mektebê. Ya yekem ji gund Emîne bû. Cîranan digot, 'Guneh e. Eyb e.' Min jî got, 'Ez ê qîza xwe bişînim, xilas!' Ew çû û wekî keça tenê li dibistanê xwend. Piştî vê, êdî yek bi yek keçên din diçûn. Min jî keçên xwe yên din hemû şandin: Yekê hiqûq xwend, yekê doktorî xwend, yeke din jî bûye mamoste."*

Dayika Emîne jî di zaroktiya xwe de dixwest bixwîne, lê di dema wê de ev derfet nedabûn wê: "*Nedihiştin em Quranê jî bixwînin. Tenê nimêj dane ho kirin [fêr kirin]."* Ji bo keçên wê zane bibin wê jî heta astekê piştgirî da xwendina keçên xwe. Emîne bixwe jî wê demê wiha tîne bîra xwe: "*Wê demê gotin, 'pirr eyb e ku keç diçin dibistanê'. Şerm e! Ez 6 – 7 salî bûm, min pantalon li xwe kir. Kalkê min hat pey min û ji min re pantalon qedexe kir. Kalikê min got, 'fistan li xwe bike!' Heta refê 7'an du keçên din di refa min de hebûn. Lê piştre wan dibistan terikand. Min dixwest xwendina xwe berdewam bikim û bavê min jî ez şandim. Li Kobanê keç hebûn, lê li Şêran di dibistana navîn de keç tine bûn. 40 xort bûn û ez wek keç bi tenê bûm. Lê asta min a serketinê ji hemûyan baştir bû; min li ser giyan dibir! Dema me rêza xwe digirt, ji bo em bikevin mektebê; ez diçûm pêşiya giyan disekînim. Dîsa di refa xwe de ez berê giyan dirûniştim. Dema ez derbasê refa 8'an bûm, êdî di rafa 7'an de heft keçên din dihatin. Lê di refa xwe de heya refa 9'an ez dîsa bi tenê bûm. Min di dawiya refa 9'an de şehde û bawername stand. Lê diya min bû sedem ku min dibistan terikand. Zarok piçûk bûn û karê malê pirr bû. Lewma ez çûm çolê, me pembû û baxçe diçand. Ez*

[227] Hevpeyvîn bi Şervîn ji Amûdê re, Heseke, 2017

[228] Hevpeyvîn bi Xecê Hisên re, gundê Xanaserê yê Dêrikê, 2017

çûm ber pez û min karê malê jî hemû dikir. Me tevahî cilê zarokan bi destan dişûştin; makîne tine bû."[229]

Gelek malbatan bi taybetî jî rêya çûna dibistanan ji gund heta bajêr yan jî heta bajarekî din dikirin 'pirsgirêk'. Feraseta namûsê dibû asteng ku jinên ciwan bikarin xwendina xwe ji derveyî venêrîna malbatê dewam bikin. Ji ber ku nîzama Beesê dixwest gelê Kurd wekî karkerên erzan bi kar bîne, wê li herêmên Rojava girîngî neda avakirina dibistanan. Zanîngeh tenê li bajarê Hesekê hebû ku dewletê wekî navenda desthilatdariya xwe bi rêxistin kiribû.

Dayika Mûrad bahsa ciwaniya xwe dike: "*Pirranî xort diçûn dibistanê, lê ji bo jina zehmet bû. Yek jê ez bûm. Min 12 sal li Qamişlo xwend. Lê zanîngeh li Hesekê bû. Saetek rê bû. Bavê min nehişt. Wî got, 'Tu qîz î. Çawa tu bi tenê herî ser va rêya?' Ji ber hinceta rê, gelek jin bê xwendin man. Ji vî milî ve jina gelek zehmetî kişand ji ber ku jin, wek namûs lê dihat meyzandin. Heger axaftin werê ser şerefa me, em ê bê şeref di civakê de bimînin û serê me nizm be."*[230]

Îlham Omer jî lê zêde dike: "*Gava ku jinek bixwaze biçe Şamê xwendina xwe berdewam bike û gelek jîr be jî malbat derfet nade û jê re dibêjin: 'Tu keçik î, çawa tu biçî Şamê?' Astengiyên malbatê û meselê aborî jî bandor dikir. Rewşa jinê di sê milan de hatiye astengkirin: Malbat û aborî û rejîmê nedihştin ku jin serê xwe rakê. Bi taybetî jinê Ereb û Kurd di bin van bandoran de bûn. Lê jinên Xirîstiyan hindekî vekirîtir bûn."*[231]

Keç û jinên ciwan yên Kurd ku çûn xwendinê jî pirr caran rastî helwestên nijadparest yên mamoste yan jî xwendekarên Ereb dihatin. Vê jî dihişt ku hewesa xwendinê were şikandin. Li gundên ku mamosteyên Kurd jî hebûn zarokan zêde zehmetî nedikişandin. Lê li cihên ku mamosteyên Beesî hebûn, şagirtên Kurd xwe li warên xwe wek biyanî hîs dikir. Jina ciwan a bi navê Nîştiman wiha qala zarokatiya xwe li gund û bajarê Kobanê dike: *"Jiyana gund û bajar pirr ji hev du cuda ye. Di gund de jiyan di gelek aliyê wê de xwezayî ye û dayik jiyanê bi rê ve dibe. Her wiha mamosteyên me jî bi me re jiyan dikirin. Lewre em di dibistanê de jêhatî bûn. Ji ber ku me û mamosteyan ji hev du fêhm dikir. Lê belê dema em derbasî bajêr bûn, êdî rewşa dinyayê tevlîhev bû. Êdî me zehmetî di berdewamkirina xwendinê de dikşand. Hatibû xwestin ku serê me girtî be. Lewre diya min nedixwest gotin were ser me. Him bandora feodalîzmê him jî bandora olê li ser civakê heye."*[232]

Di bin nîzama Beesê de nêzîkatiyên mamosteyan, li hemberî xwendekaran bi pirranî wekî nêzîkbûna fermandaran ji leşkeran re bû. Di cilên leşkerî, marşên leşkerî, sondxwarin û perwerdeya leşkerî ya keç û xortan de, neteweperestiya nîzama Beesê eşkere bû. Mamoste Menal dibêje: *"Bi giştî dibistan wek cihên perwerdê tên nasîn, lê armanca sîstema perwerdeya Beesê ne ev bû. Armanca wan ne ev bû ku mirov vebibe, dinyayê nas bike, bibe kesekî afirîner û xuliqdar ango bibe kesekî ku bikare mafekî biparêze. Dibistanên nîzama Beesê wek biryargehên leşkerî dihatin bi kar anîn. Heta cil û rengê dibistanê wek qişleke leşkerî bûn. Cihê dibistanan ne cih bûn ku zarok tê de zane bibin û tişta ji bo pêşketina xwe fêrbibin. Ew cih bûn ku zarok tê de were qeydkirin û fêrî feraseta 'yek ziman, yek al, yek netewe' bibin. Zarok bila tenê ferî yek rengî bibin. Ev jî rengê Beesê bû. Pêşxistina zanebûn û pirralîbûna jiyanê û zanist nebû. Berê di refên dibistana navîn de perwerdeya leşkerî jî hebû. Lê di van çend salên dawiyê de hatiye sekinandin.*

[229] Hevpeyvîn bi Emîne, dayik û bavê wê re, Şeran, Kobanê, 2017

[230] Hevpeyvîn bi rêveberiya Mala Jinê re, Qamişlo, 2017

[231] Çavkanî li heman cihî

[232] Hevpeyvîn bi Nîştîman re, endama Tevgera Jinên Ciwan, Kobanê, 2017

Cil tev bi rengê eskerî bûn. Dema dersa eskerî rakirin, cil jî hatin guhertin. Dewletê wê demê rengê pembe ji bo keçan û rengê şîn ji bo xortan derxistin. Dîsa hemû kirin yek reng. Dîsa dewletê ji xwe re qalibek danî."[233]

Derketina li hemberî qaîdeyan, axaftina bi zimanê Kurdî yan jî îfadekirina çand û vînê bi lêdan, heqaret û lêkirina 'xeteke sor' a li ser navê xwendekaran dihate cezakirin. Bi vî awayî 'kêmasiyeke' tenê, dikarîbû siberoja xwedekaran di kêliyekê de tine bikira. Xwendekaran, bi wan tadeyan fêhmkir ku yan wê li hemberî otoriteyan dernekevin, yan jî wê bi lez dev ji xwendinê berdin.

"Di sîstema Beesê de di zarokatî de îradeya zarokan dişkînin. Yek jî di warê ziman de çênedibû te Kurdî biaxiviya. Te bi şaştî biaxiviya te ceza dikirin. Mînak te mecbûr dikirin ku tu li ser dest û ling bimeşiyayî. Hinek xetê sor bin navê wan dixistin, xwendin li ser wan qedexe dikirin. Yek ji xwendinê hez bikira, divê ew teslîmî wan bibûya û li gorî şiyarê wan bimeşiya. Gerek tu qebûl bikî ku tu bêjî 'ji derve Sûriyê û Ereb ti kes nîne'. Vê sîstemê di riya dibistana de dest pê dikir. Însanê li gorî xwe ava kirine. Însanek bi îrada xwe, hebûna xwe û çanda xwe qebûl nekirine. Li gorî vê him bi zext him bi siyaseta zirav gel esîr girtine. Wekî sîstema istîxbarat di zindana de, di dibistanê de jî hebû. Zarok li ser zarokên din dikirin ajan. Sîstema Sûriyê sîstemeke istîxbaratî bû."[234]

Perwerdeya olê jî hatiye dayîn da ku xizmeta hişmendiya zayendperest û nijadperest a dewletê bike. Dersa olê tenê bûye perwerdeya li ser ola Îslamê. Mamoste jî ji aliyê dewletê ve dihatin tayînkirin. Mamoste Menal şirove dike ku waneya olê bi armanca serwerkirina feraseta dewletê dihat dayîn: "*Çi ji bo wan pêwîst e didan wekî şiroveyên 'wê wisa neke' û 'ev eyb e'. Di bin navê 'heram e' de tiştê ku ji bo dewletê xeter in, dibêjin. Lê rêgezên olî ku xizmeta civakê dikin, nabêjin."*[235]

Şagirtên Êzdî û Xirîstiyan yan mecbûr diman xwe înkar bikin û tevlî vê dersê bibin yan jî ji dersê dihatin derxistin. Mafê wan tine bû ku ew bikarin di heman demê de di çarçoveya baweriya xwe de perwerde bibin. Ji ber baweriyên cuda ne di heman astê de hatin dîtin, nêzikatiyên pêşhukmî jî carna di nav şagirtan de li hemberî şagirtên Êzdî yan Xirîstiyan xwe didan der.

Naveroka perwerdeya Sûriyê hebûna jinê di dîrokê de bi çend jinên navdar sînordar kiriye. Ji bilî Zenûbîa, Kleopatra û jinên di ola Îslamiyetê de nasname, dîrok û têkoşîna jinê di mufredatan de tine bûn. Ji ber agahiyên li ser jinên leheng û têkoşer nedihatin parvekirin, kesayetên ku keç bikarin ji xwe re mînak bibînin jî tine bûn. Tevahiya dersan li ser yek xetê dihatin dayîn: Pêkanîna pêdiviyên dewletê û misogerkirina desthilatdariya yekpare û zayendperest ku serdestiya zilam bi hêz dikir û vîna jinê binpê dikir. Bi vî rengî jî kesayeta jinê bi hestên lawazbûnê ango bêçarebûnê hatiye pêçan: "*Cudahî di nav keç û xorta de di civaka me de bi giştî heye. Ev sîstem ji navendê tê. Sîstema mêr wisa di malbatê de ye û di dibistanê de jî wisa ye. Di dibistanê de keçikek nedikarî li cem hevalekî xwe yê xort bisekine. Ew mafê xwe bixwe nikare dawe bike. Keçek bê çare yan wê bigirî yan xwe bigihînê yekî gazinda xwe bike. Ew cudahî ji wir dest pê dike."*[236]

Perwerdeya dibistanan keç li gorî feraseta zayendperest ji bo rista jina malê û dayikê amade dikirin: "*Waneyek hebû ji bo keç fêrbibin çawa karê malê rê ve bibin û çawa zarokan xwedî bikin.*

[233] Hevpeyvîn bi Mamoste Menal re, Dêrik, 2017

[234] Hevpeyvîn bi Rojîn Remo re, Qamişlo, 2016

[235] Çavkanî li heman cihî

[236] Çavkanî li heman cihî

Xortan ji vê waneyê derdixistin derve û waneyên cuda didanê. Di merheleya amadeyî de beşên xwendinê jî ji hev cuda dibûn. Ji bo jinê karê desta hebû. Tenê jin diçûn. Dersên karê desta yên xortan cuda bûn wek karê necartî, eletrîk û hedadî. Ev hemû karên cuda bûn ji bo zilam di pêşerojê de di wan karan de pispor bibin û xwedî bawernameya pisportî ya wî karî bibin. Keç nikaribû bikeve wan waneyan. Heta dibistanên wan jî cuda bûn. Têkilî di navbera wan de jî çênedibû ji merheleya amedeyî ve."[237]

Dema ku xwendekarên Kurd belgenameya zanîngehê distandin jî, pirraniya wan nikarîbû di warê pisportiya xwe de kar bike. Ji ber ku dewletê wezîfe neda wan, motîvasyona xwendin û lêkolînê lawaz bû. Xwendekaran, tenê dikaribû tiştên ku nîzamê ji wan xwestiye, dubare bikin. Beşên edebî, felsefe yan jî civaknasî jî ne bi şêwazên zanist û şirove dihatin fêr kirin. Wekî çavkanî jî tenê kitêbên dewletê hebûn. Pirtûkxane yên ku mirov tê de karibûn çavkaniyên dewlemend bixwînin û lêkolîn bikin, tine bûn. Lewma çanda xwendinê û meraqa lêkolînê di nav civakê de bi pêş neketiye. Ne gengaz bû ku xwendekaran pirtûkên dîrokî, hunerî yan li ser erdnîgariyê bixwînin ku ji derveyî feraseta nijadperestiya dewletê bûn. Şagirtan tiştên ku di pirtûkên dibistanê de hatibûn nivîsandin wek dersên Quranê ji ber kirin ji bo di dawiyê de şehdeyeke baş bistînin. Lê ev şehde jî bê wasta rê venekir ku ciwanên Kurd bikarin di pîşeyê pisporî de kar bibînin. Lewma xwendin ji armanc û naveroka xwe, ji têkiliyên xwe bi jiyanê re hatibû veqetandin: *"Dewlet nedihişt ku tu bixwe bifikirî. Ji ber vê civaka me fêrnebû ku mejiyê xwe bişuxilîne û pirr kêyfî ye. Tenê tiştên hatin gotin dubare dike. Wekî kompîtor tiştan hafiz dike, lê li ser zêde nake. Lewma kesên ku zanîngehê jî xwendine pirr tişt nizanîbûn."*[238]

Ev şêwaza fêrbûnê, îro jî bandora xwe li ser hişmendiya civakê dike. Li gel potansiyeleke xurt ya rewşenbîr, hunermend, helbestvan û resamiyê li Rojava hebû jî, ji ber nêzîkbûnên nijadperest û astengiyên dewletê ev potensiyal qels maye.

III. 2.5. Pirsgirêkên Ekolojîk û Tenduristiyê yên Civakê

Di rastiya Rojava de em dikarin pirr zelal bibînin ku pergal û hişmendiya desthilatdariyê çavkaniya esasî ya nexweşî û pirsgirêkên ekolojîk e. Heya beriya 40 - 50 salan gelek dar, daristan û avzê li ser erdnîgariya Rojava hebûn. Şêwaza jiyana civakê bi hevsengiya bi xweza û derdora xwe re bi pêş ve diçû. Rastiya xwezaya Rojava jî di lêkirina navên gund û bajarên Rojava de xuya dibe. Minak taxên bajarê Nisebînê ku bi çêkirina sînor re binxet mane di salên 1925-26'an di bin mêhtingeriya Fransa de wekî bajarê 'Qamîşlo' hatibû sazkirin. Bajêr navê xwe ji pirrbûna qamîşên avzêyên derdora çemê Çeqçeqê girtiye. Lê wekî gelemperiya Rojava hewîrdora Qamîşlo jî îro hişk e; bê qamîş û bê çem maye. Siyasetên netewe dewletan civakê ji şêwaza xwe ya jiyana di hevsengiya xwezayî de qut kiriye.

Miçiqîna Kaniyên Jiyanê

Pîr û kalên Kobanê tînin bîra xwe çawa di zaroktiya xwe de li derdora gola Kaniya Murşid dileyîstîn û masî digirtin. Ji vir çemek piçûk ber bi rojhilat ve diçû, ji navenda Kobaniyê re derbasî

[237] Hevpeyvîn bi Mamoste Menal re, Dêrik, 2017

[238] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

Deşta Pirsûsê dibû. Herêmeke şîn û bi xêr bû. Havînan koçerên Ereb pezê xwe li ser kaniya aliyê rojhilat diçêrand. Lewma ev cih wekî '*Kaniya Ereban'* ango *Ayn al-Ereb* hatibû bi nav kirin. Lê piştî ku dewleta Tirk ji salên 1980'an ve bi avakirina avbendên li ser Hewza Firatê dest pê kiriye, gol û kaniyên Kobanê miçiqîn. Ev projeya dewleta Tirk ku ji 22 bendav, golên mezin û 19 hêzgehên [santralên] elektrîkê pêk tê, bandoreke neyînî li ser tevahiya pergala ekolojî, jiyan û tenduristiya civaka Rojava kiriye. Kaniyên herêmên Rojava ziwa bûne û sal bi sal barîna baranê kêm bûye. Lewma berhemên çandiniyê kêm bûne. Gel bi taybetî di dema havînê de nikare pêdiviyên xwe yên avê pêk bîne. Ev yek jî bandorekê nerênî li ser hawirdor, paqijî û tenduristiya mirovan dike.

Heman rewş ji bo 360 kaniyên li derdora Çemê Xabûrê jî lê ye ku ji navçeya Serêkaniya serxetê derbasî Serêkaniya Rojava dibû û av dida herêmên Til Temir, Hesekê, Şedadê û Dêrazorê heta gihabû Ava Firatê. Nişstecihên Serêkaniyê qala wê yekê dikin ku Çemê Xabûrê heta sala 1995'an çemekî mezin, paqij û zelal bû. Wan ji çem av vedixwar, masî digirtin û pê avdaniya zeviyên xwe dikirin. Lê dewleta Tirk bi kolandina 4 hezar bîrên kûr, çêkirina avbend û kanalan, ava binerdî ya Serêkaniyê qut kir. Di encamê de kaniyên Serêkaniyê jî miçiqîn û di salên 2000'î de av ji binî ve qut bû. *"Serêkaniyê berê hemû avzê bû. Ji ber ku gelek kanî hebûn û av dida gelek cihan heya Heseke û Til Temir. Dewletê gelek kanalên avê çêkirin û kaniyên Serêkaniyê ziwa bûne."*[239] Niha binê Serêkanî vala bûye û ji sala 2002'yan ve axa Serêkaniyê daketiye xwarê. Lewma xetera hilweşandina bajêr heye. Hilweşandina hinek malan destpêkiriye yên ku li ser axa spî hatibûn avakirin. Lê şaredariya Serêkaniyê di Kanûna 2018'an de hişyar kir ku tehlûkeya hilweşandinê li tevahiya bajarê Serêkaniyê heye.[240]

Piştî ku bajarê Serêkaniyê ji çeteyên El-Nusra di sala 2013'an de hatibû rizgarkirin, dewleta Tirk ava qirêj ya kanalîzasyonê li ser coka miçiqî ya Xabûrê berda navçeyên Rojava. Ava qirêj bêhna xirab belavî derdorê dike û kermêşên ku li ser mezin û zêde dibin, nexweşiyan belav dikin. Xetera herî mezin jî ev e ku dirêjiya 8 km zeviyên çandiniya sebzeyên Serêkaniyê li ser ava kanalîzasyonê tê kirin. Hevserokê meclîsa bajaroka Til Xelefê Ebdullqadir di Cotmeha 2018'an de diyar kir ku ev nêzî 4 salan e ku çandinî li ser vê ava qirêj tê kirin û got, "*Ev av dibe sedema navçûn û pençeşêrê, di xwînê de bakteriyên xirab çêdike, dibe sedema jiberçûna jinên ducanî û gelek nexweşiyên din."*[241]

Her wiha di çend salên dawî de ava Çemê Çeqçeqê naherike. Di şûna ava çemî de ava karîzan û qirêj a bajarên Nisîbînê û Qamişloyê di cokên çemî de kom dibe. Ev jî rê li ber nexweşiyan vedike û metirsiyê çêdike li ser jiyan û tenduristiya şêniyên ku li derdora çemî dimînin.

Ji ber ku rejîma Sûriyê bi awayekî sîstematîk bipêşxistina pergala binesazî û tenduristiyê li Rojava paşvemayî hiştiyê, gelek gund û bajarokên Rojava bê xetên ava paqij û bê kanalîzasyon mane. Lewma kortên ava qirêj ên malan li ser zeviyan tên valakirin. Ev dibe sedema belavbûna nexweşiyên wekî tîfo, kolera, malariya [lerzeta], zerik, enfeksiyonên salmonella û amîba ku dikarin bibin sedema nexweşiyên giran û heta bibin sedema mirinê.

[239] Çavkanî li heman cihî

[240] Bêrîtan Medûsa, Sozdar Xelîl: *Ji şaredariya Serêkaniyê ji bo şêniyan bang!*, ANHA, 12-12-2018

[241] Bêrîtan Medûsa, Sozdar Xelîl: *Dewleta Tirk dibe sedem ku ava kanalîzasyonê ji bo çandina zebzeyan bi kar bînin*, ANHA, 10-10-2018

Mono-Çandinî

Ne tenê kêmbûna avê, lê belê siyaseta çandiniyê ya yek reng berhemê [mono-çandiniyê] ya rejîma Beesê jî bûye sedema birrîna dar û daristanên Rojava. Vê dihişt ku şêwaza jiyan û hilberina rengîn a ku xwe dispart kevneşopiyên civaka neolîtîk, bê pûçkirin. Jin û civak ji axa xwe hatine veqetandin. Bingehê jiyana xwezayî bi pirrengîbûn, pirralîbûn û sihet e. Berojaviyê vê di pergala mono-çandinî de yekrengbûn, yekalîbûn û nexweşî bi pêş dikevin.

Dewleta navendî pergala hilberînê li gorî berjewendiyên xwe saz kiriye. Ji ber vê yekê çandinî jî bi mentiqê endustriyalîzm û netewe dewletê hatiye birêxistinkirin. Çawa feraseta netewe dewletê xwe dispêre dirûşma 'ji bo her qewmî yek dewlet', pergala çandiniya 'mono-çandinî' jî dibe şêwaza ferzkirina vê ferasetê li ser xwezayê, ango bi gotineke din, 'ji bo her nebatê deverek'! Armanca vê jî hilberîna zêde bi makînayên mezin bû. Rojava, ji aliyê rejîmê ve weke embara genim a Sûriyê hatiye dîtin ku ji sedî 70'yê pêdiviya genimê Sûriyê pêk dianî. Wisa li ser hezaran donum erdên li Cizîrê û Kobanê tenê genim hatibû çandin. Dar hatin birrîn û çandina dar û baxçeyan qedexe bû. Wekî din li herêma Efrînê tenê wekî çavkaniya endustriya zeytûnan hatiye meyzandin. Çawa çandiniya yekberhemî ziyanê li axê dike û pêwîst dike ku di hilberînê de zibil û derman werin bi kar anîn, mirov jî bi berhemên yekalî nikare xwe têr bike û pêwîst dimîne çavkaniyên din yên aboriyê bibîne. Van şêwazên danehevkirinê û bi kar anîna çavkaniyên xweza û enerjiyê ziyanên mezin didan hewîrdora Rojava û tenduristiya mirovan.

Herimandina Hewa û Derdorê

Hevseroka Desteya Tenduristiyê ya Kantona Cizîrê Dr. Abeer Hassaf jî diyar dike ku tenduristiya civakê girêdayî ekolojiyê ye. Ew balê dikişîne ser wê yêkê ku hîna di dema rejîma Beesê de li Cizîrê rêjêya herî bilind a kanserê [penceşêrê] li tevahî Sûriyê hebû. Li gorî şiroveyên wê, zêdebûna nexweşiya kanserê li herêma Cizîrê ji ber kêmbûna heşînahiyan e, lewma maneya vê jî oksîjena kêm e.[242]

Ji sedî 75'ê bîrên petrol û xazê yên dewleta Sûriyê li navçeyên Cizîrê derdikevin. Berhemên neftê wekî çavkaniya esasî ya enerjiyê li tevahî warên aborî û jiyanê tên bi kar anîn. Lê şêwaza hilberîn û bi kar anîna neftê hewa û hewîrdora Rojava dilewitîne. Meqseda dewleta Sûriyê tenê derxistin û faydegirtina ji petrolê ye. Lewma tedbîrên ji bo parastina xweza û tenduristiya mirovan di asta herî nizm de bûn. Ji ber ku teknolojiya petrolê kevin bûye, yan jî xemsar hatiye bi kar anîn, li gelek herêmên hilberînê wekî li Dêrikê yan jî Tirbespiyê golên neftê li ser erdê kom bûne û xazên bi zerer hawayê qirêj dikin. Her wiha teknolojiya safîkirina petrolê yên herêmên Rojava tine bû yan jî kevin bûye. Ji ber vê yekê di şewitandina neftê de dumanên reş û xeternak derdikevin.

Şêniyên gundê Girzîro yê li keleka bîrên neftê yên herêma Koçerata, dan zanîn ku ji ber qirêjiya neftê nexweşiyên wekî pençeşêr li gund zêde ne. Li aliyekî rejîma Beesê herêmên Rojava bê binesazî û derfetên aborî hiştiye. Li aliyê din jî wê çend pîşesaziyên ku ziyanê li xwezaya navçeyên Rojava kirin, ava kirin. Karsaz, karmend û menfeetên van kargehan aydê dewletê ango şirketên derve bûn. Lê belê gemara wan li herêmên Rojava maye.

[242] Hevpeyvîn bi Dr. Abeer Hassaf re, hevseroka Deste ya Tenduristiyê ya Kantona Cizîrê, Qamişlo, 2017

Ew yek bala mirovî dikişîne ser xwe ku herî zêde jin bi nexweşiyên pençeşêr di nexweşxaneyên Heyva Sor yên li tevahiya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de li Kobanê hatine dermankirin. Pençeşêra mejî nexweşiya çaremîn e ya ku piştî nexweşiya şekir, îltîhabên sîngê û bilindbûna zexta xwînê di 5513 jinên nexweş ên li Kobanê de hatiye tesbîtkirin. Ji sedî 8,8'ê jinên ku li Kobanê sala 2019'an li nexweşxaneyên Hevya Sor hatine dermankirin, ji ber pençeşêra mejî û hinavan derman bûne.[243]

Şêniyên bajarokê Çelebiyê li kantona Kobanê diyar kirine ku piştî kargeha çîmento ya şirketa Fransî 'Lafarge'[244] sala 2010'an hatibû vekirin, gemara kargehê bandor kiriye li jiyana wan û tevahiya gundên derdorê. Hevserokê Meclîsa Gel a Çelebiyê Mahmûd dibêje, "*Dema rejîmê şirketeke Fransî li gundê Çelebiyê Xirabreşkê kargeha çîmento ava kiriye. Gundê me 10 km ji kargehê dûr bû. Dema ku me cil dişûştin û radixistin heta serê sibê cilê me gişt reş dibûn. Baran ku bariya, erda me reş dikir. Di erdê[n] zîraatê [yên] derdorê şirketê de şînatî miriye û dar pê re bandor dibûn. Him heywanan him mirovan jî ziyan didîtin. Piştî ku şirket di şerê DAIŞê de xirab bû, rewşa erd û tenduristiya gel dîsa baştir bû. Lê derfet tine bû ku lêkolînek zanistî û tenduristî were pêşxistin."*[245]

Hemşîre yên ku îro di nexweşxaneya Heyva Sor a Kurd ya Çelebiyê de dixebitin dan zanîn ku li navçeya wan gelek zarokên astengdar hatine dinyayê: "*Hinek hene ku lingê wan sist in, destê wan sist in ango pişta wan vekirî ye. Zarok zû zû mezin nabin."*[246]

Girîng e ku mijara pirsgirêkên ekolojîk û bandora van li ser av, erd û hewayê û her wiha li ser tenduristiya mirovan bi baldarî were şopandin û hîn berfirehtir bê lêkolînkirin. Wekî din, bi fêrbûn û teknolojiyên nû di warê bi kar anîna çavkaniyên enerjiya tavê, paqijî, avêtin û vezivirandina bermayiyan de çareserî ji bo gelek pirsgirêkên ekolojîk dikarin werin bipêşxistin.

Pirsgirêkên Tenduristiyê yên Jinan

Dewleta Sûriyê, binesaziya pergala tenduristiyê ya Rojava bi giştî di asteke lawaz de hiştiye. Nexweşxanê û navendên tenduristiyê yên dewletê hebûn. Lê derman û amûrên nexweşxaneyan ne li gorî pewîstiyên gel bûn û ji bo nexweşiyên giran têra pêdiviyan nedikirin. Ji bo emeliyat bibe, xelk bi pirranî mecbûr dima ku biçe Şamê. Lê belê wekî 'mektûm' ango 'ecnebî' gelek Kurd nehatin dermankirin ango di çûyin û hatinê de rastî astengiyan dihatin. Hinek nexweşxane yan jî doktorên dewletê, Kurdên bê nasnameya Sûriyê şûnde vedigerandin ku bi ji bo dermanbûn yan jî emeliyatê diçûn cem wan.

Wekî pirsgirkên tenduristiyê yên sereke yên ku dibin sedema gazinên jinan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê nexweşiyên şekir, mîde, dil, îltîhab, bilindbûna zextê, kêmbûna xwînê, êşên piştê, çok, serî û 'êşa canî' ne. Ev nexweşî him dibin mijar di nîqaşên jinan ên jiyana rojane de him jî di daneyên hejmarî yên saziyên tenduristiyê de herî zêde xuya dikin.

[243] Rapora Salê ya Nexweşên Jin yên ku ji Heyva Sor a Kurd (HSK) Sûd Wergirtine, ji 01-01-2019 heya bi 01-01-2020

[244] Di sala 2016'an derket holê ku rêveberên kargehê di salên 2013-15 de bi dagirkirina bajarên derdor ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hetan herêmê ji hêzên YPG-YPJ hatibû rizgar kirin bertîl dida çeteyan.
Çavkanî: ANF Parîs, *Rêveberên Lafarge yên ku bertîl dane DAIŞ'ê wê bên darizandin*, 09-12-2017

[245] Hevpeyvîn bi hevserokê Meclîsa Gel û şêniyên bajarokê Çelebiyê re, 2017

[246] Hevpeyvîn bi xebatkarên jin yên nexweşxanê ya HSK'ê li Çelebiyê re, 2017

Cûreyên nexweşiyan herî zêde bi 50.875 nexweşên jin re hatin teşxîskirin yên ku sala 2019'an çûne nexweşxaneyên Hevya Sor a Kurd ev in:

% 20 nexweşiyên jinan û zayînê
% 13 îltîhabên sîngê û mîkrobên di rêyên nefesê de
% 10 'kêmbûna xwînê'
% 9 nexweşiya şekir
% 8 bilindbûna zexta xwînê
% 7 îltîhaba mîzwê
% 3 pençeşêr (yên cûreyên xwîn, mêjî, sîng û hinavan)
% 3 xitimandina damarên dil û nexweşiyên dil [247]

Nexweşiyên din jî bi pirranî cûreyên cuda yên nexweşiyên hinavan, mîde, rovî, astim û nexweşiyên enfeksyonê ne. Pirraniya cûreyên nexweşiyê yên jinan çavkaniya xwe ji şert û mercên jiyanê digirin. Xwarinên bi kêm vîtamîn û zêde bi kar anîna şekir û zeytên nebaş, stres û zextên nefsî di jiyana malbatê de, pirsgirêkên aborî, koçberî û şer dibin sedemên sereke yên van nexweşiyan.

Daneyên nexweşxaneya Şifa Jin a gundê Jinwar[248] jî didin xuyakirin ku pirraniya nexweşî û êşên jinan vedigerin li şertên giran ên jiyanê. Jinên nifşan hemûyan gazinê ji '*êşa canê*' xwe dikin. Ew dibêjin: '*Her cihê min diêşe*'. Li cem westandinên bedenî di van êşan de stres û zextên nefsî xwe didin der.

Her wiha jinên bi temenên 15 heta 66 salî û jor, bi pirranî ji ber êşên mîde, pişt, çong û serî mexdûr in. Jinên ciwan jî herî zêde behsa êşa dewra xwînê dikin. Jinên bi temenên 21 heta 50 salî bi pirranî hemû kar û barên mal û zarokan radikin. Ev jin herî zêde ji ber êşên pişt û mîde nerehet in. Êşên piştê bi pirranî di encama karê malê û çandîniyê de çêdibin. Her wiha zêde anîna zarokan, bi taybetî bi rêya qeyseriyê [sezeriyan], dibe sedema êşên giran ên piştê. Stresa zêde û xwarinên nebaş êşên mîde û nexweşiyên rovî çêdikin. Jinên temenê wan ji 51 salan dibihure herî zêde ji ber êşên çongê û dexta bilind a xwînê [tansiyona zêde] li derman û çareyê digerin. Danehevên kar û zehmetiyên jiyanê, lê di heman demê de jî zêde kîlo û rûniştin di temenê mezin de dibin sedemên nexweşiyên van jinan.

Derveyî zanîna jin û mêrên şîfager agahiyên zanistî yên li ser mijarên tenduristî, anatomî û pêşîgirtina li nexweşiyan di civaka Rojava de kêm in. Hikûmeta Beesê xwendina ciwanên Kurd bi gişt asteng kiribû. Lê nexasim jî derfetên xwendina beşa tenduristiyê yan jî fêrbûna pîşeyên di warê tenduristiyê de hema hema ne gengaz bû. Kurdên ne hemwelatiyên Komara Sûriyê di saziyên tenduristiyê yên dewletê de nedihatin wezîfedarkirin. Bijîşk jî nikaribûn destûra vekirina muayenexaneyê bigirin.

Tevlîbûna jinên Kurd ya nav xwendin û xebatên tenduristiyê jî du caran hatibû astengkirin: Him ji ber nijadperestiya dewletê him jî ji ber zayendperestiya civakê. Lewma zanîna zanistî ya tenduristiyê di civakê de jî lawaz maye. Ev hemû dibûn sedem ku bi taybetî di warê beden û

[247] Rapora Salê ya Nexweşên Jin yên ku ji Heyva Sor a Kurd (HSK) Sûd Wergirtine, ji 01-01-2019 heya bi 01-01-2020

[248] Nexweşxane ya Şîfajin li gundê jinan a Jinwarê nêzîkî bajarê Dirbêsiyê di 3ê Adarê 2020'an de hatiye vekirin. Daneyên li ser nexweşiyên 359 jinên ku di 3 mehên ji 4ê Adarê heta 4ê Hezîrana 2020'an de bi armanca derman kirinê çûnehatin Şîfajin, li vir tên şirovekirin.

tenduristiya jinê de ji hinek xurafeyan dihat bawerkirin ku bingehê wan ji ferasetên namûsê yên baviksalar e. Mînak gelek jin bawer dikin ku serîşûştin di dema mehikê [dewreya xwînî] de dibe sedem ku xwîn qut dibe û di bedena jinê de îltîhab çêdibe.

Rewşeke bi nakok di warê bi kar anîna derman de jî heye. Gelek jin dermanên ku bijîşkan didin wan kêm yan jî qet bi kar nayînin. Hinek jin dibêjin, baweriya wan bi dermanên kimyewî nayê. Hinek din jî dibêjin, ji ber karê wan zêde yan jî xwendina wan kêm e, ji bîr dikin ku dermanên xwe bixwin. Lê belê dîsa gelek caran me bihîst ku jin gazindan ji bijîşkan dikin gava ku dermanên kimyewî nedane wan. A rastî ev rewş dide xuyakirin ku li aliyekî bawerî û zanîna jinê ya şîfagerî lawaz bûye. Li aliyê din jî jin him di pergala tenduristiyê ya modernîst de li çareseriyê digêrin, him jî baweriya xwe pê nayînin. Serpêhatiyên jinan dihêlin ku ji rê û rêbazên pergala desthilatdar ya zilam û dewletê gumanê bikin. Lê di warê xwe jê qutkirin û bi xwe afirandina çareseriyê de jî ew dudilî ne. Ev rewş cewherê qeyrana jinê di bin mêhtingeriyê de destnîşan dike.

Muna Xelîl ji Komîteya Tenduristiyê ya bajarê Amûdê, rewş û pirsgirêkên tenduristiyê yên jinan wiha dinirxîne: "*Berê şoreşê nexweşxaneyên dewletê bi beşên ji bo anîna zarokan li Amûdê û Qamişloyê hebûn. Bes derfet tine bû. Dewletê derman nedianî. Tiştek ji bo alîkariya jinan tine bû.*
Ji ber ku em ecnebî bûn, mektûm bûn me nikaribû zaningehê bixwînin ango bibin doktor. Pirsgirêkên tenduristiyê yên jinan pirr in. Gelek jin hîn nizanin xwe çawa li hemberî nexweşiyan biparêzin. Di warê paqijî û naskirina bedena xwe de nezanebûn heye. Jin nizanin çawa êşên xwe fêhm bikin û baş bikin, derman çawa bi kar bînin. Ji ber vê, em li ser perwerdeya tenduristiyê dixebitin. Lê, gel xwe ji vê dûr dike. Hinek jî ji wan mijaran ditirsin û dibêjin 'ji me re qala wan tiştan nekin!'
Zarokên astengdar çêdibin ji ber dayik û bav mirovên hev in û xwînê wan li hev nagire. Hinek jin jî dema ducanîbûna xwe derman vexwarine û nizanibûn ku ziyanê digihîne zarokê wan. Hinek jin jî hene dema dewrê xwînê, nizanin ji bo tenduristiya wan çi pêwîst e."[249]

Jin, yan ji ber xizanî yan jî ji ber şermê gelek caran bi êşên xwe yên giran jî naçin cem bijîşkan. Lewma nexweşiyên ku mirov bi teşxîseke zû karibûya derman bikira, gelek caran dibin nexweşiyên giran yan jî nexweşiyên ku vegirin gelek kesan. Bi taybetî ji bo pêşîgirtina li nexweşiyên pençeşêr yên ku li Rojava gelekî belav bûne yên wekî pençeşêra sîngê, ya malzarokê û hêkdanka jinê, muayeneyên nîzamî pêwîst in.
Di rapora salê ya 2019'an a Heyva Sor derheqê nexweşiyên jinan de ya ku balê dikişîne ser xwe ew e ku % 100'ê 195 nexweşên pençeşêra sîngê li Amûdê; % 80'yê 489 nexweşên pênçeşêra mejî û % 50'ê nexweşên pençeşêra hinavan li Kobanê û % 38'yê 544 nexweşên pençeşêra xwînê li Kampa Holê, wekî rêjeyên herî bilind yên cûreyên pençeşêrê yên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine ragihandin. Sedemên ferqa mezin ya hejmara nexweşên û cûreyên penceşêrê yên jinan li gorî herêman hêjayî lêkolînê ne.[250]

Dr. Abeer Hassaf destnîşan dike ku derbaskirina şerma jinan û naskirina bedena xwe pêwîst e, ji bo ku jin bikarin pêşiyê li xeterên pençeşêr û nexweşiyên giran bigirin: "*Ji ber şerm dikin, jin naçin doktor. Lewma nexweşiyên sivik dizivirin nexweşiyên giran. Mînak, em dikarin li pêşiya xetereyên*

[249] Hevpeyvîn bi Muna Xelîl re, endama Komîteya Tenduristiyê, Amûdê, 2017

[250] Rapora Salê ya Nexweşên Jin yên ku ji Heyva Sor a Kurd (HSK) Sûd Wergirtine, ji 01-01-2019 heya bi 01-01-2020

pençeşêrê yê sîngê bigirin ger ku jin salane werin muayenê an jî jin bixwe ferî bibin sînga xwe çawa muayene bikin."[251]

Jinên ku li kantona Kobanê xebatên tenduristiyê dimeşînin, dinirxînin ku jinên ciwan dema ku dikevin dewra xwînê, vê vedişerin: "*Wek şerm ango eyb dibînin. Diêşin, lê bi kesek parve nakin. Naçin cem doktor. Civak ji vê rewşê berpirsyar e, ji ber ku dibêjin, 'eyb e, şerm e.' Lewma keçik êşên xwe vedişerin ji bo kesek tiştek xirab li ser wan nefikire."*[252] Lewma pirraniya jinên bi pirsgirêkên jînekolojîk, naçin cem bijîşkan. Hemşîreyek rexne dike ku jinên ciwan bala xwe nadin pêdiviyên zanista nûjen û ne jî şîretên jinên şîfager: *"Berê ji keçikan re digotin ku piştî ku dewra wê xilas bibe, divê ku di ava xwê de rûne, ji bo îltîhab nagihîne wê. Bes niha kesek tiştek wisa çênake."*[253]

Balkêş e ku hîna di civakê de him mehika jinê him jî ducanîbûn wek 'nexweşî' tê pênasekirin. Ji ber feraseta zayendperestiya civakî jî herdu rewş ji bo jinan bi êş û hestên şermê dibihurin: "*Berê jî dema ku jin nexweş yan jî ducanî dibûn, fedî dikirin ku biçin cem doktor. Gelek jinan ji ber vê zarokên xwe li malê anîne dinyayê. Bi taybet, di dema zayîna zarokên kur de çirandin di laşê jinê de çêdibe. Berê jinan nizanibûn vê birînê bidirûn. Dema ku ev birîn vekirî dima pirr êş û ziyan digihand jinê. Niha jî ji ber qeyseriyên zêde, bedena jinê ziyan dibîne. Hinek dimirin jî."*[254]

Rapora sala 2019'an a Heyva Sor a Kurd derheqê nexweşiyên jinan de destnîşan dike ku nexweşiyên girêdayî anîna zarokan û zayendî, dikin ku jin êşê bikişînin. Nexweşiya sereke ya ku di muayeneyên jinên nexweş de hatiye tesbîtkirin îltîhaba vajîna ye. Ji 50.875 jinên nexweş 5806 jin ango bi % 11,4'ê wan re pirsgirêkên îltîhaba organên zayendî hebûye.[255]

Doktor Mêrîvan ji nexweşxaneya Şîfajinê ya gundê Jinwar ê nêzikî Dirbêsiyê jî balê dikişine ser wê yekê ku îltîhabên di organên zayendî de yek ji pirsgirêkên sereke ye yên ku dibin sedem jin biçin cem wan. Daneyên sê mehên piştî vekirina Şîfajinê di Adara 2020'an de destnîşan dikin ku bi taybet jinên 21 heta 30 salî ji ber van nexweşiyên îltîhabê çûne nexweşxaneya jinê. Hestên şermê bi pirranî nahelin ku jin biçin cem doktorekî mêr ango bikarin van pirsgirêkên xwe rasterast bînin ziman. Di encama danûstandin û muayeneyê de doktor û xebatkarên Şîfajinê cûreyê nexweşiyê fêhm dikin û derman dikin. Tenê hewldanên jinan ên xweparastina li hemberî îltîhabên di organên zayendî de têra vê yekê nakin. Divê hevjînê wê jî xwe derman bike da ku xwe û hevjîna xwe biparêze. Lê belê pirraniya jinan nikarin van mijaran eşkere bi hevjînê xwe re nîqaş bikin.[256]

Ji ber anîna gelek zarokan jî bi gelek jinan re pirsgirêkên tenduristiyê didin der yên wekî daketina malzarokê, êşên piştê, bêxwînî, xwîntîrî ango werîsê. Van salên dawiyê zêdebûna zarokanînê bi rêya qeyseriyê [sezeriyan] li Rojava balê dikişîne ser xwe: "*Gelek sezeriyan çêdibin. Hinek jin bixwe naxwazin xwezayî zarokê bînin, hinek jî êşê tehamûl nakin. Hinek doktor jî pê re tîcaret*

[251] Hevpeyvîn bi Dr. Abeer Hassaf re, Qamişlo, 2017

[252] Niqaşên perwerdeya Jineolojiyê bi xebatkarên jin yên qada tenduristiyê re, Kobanê, 2017

[253] Çavkanî li heman cihî

[254] Çavkanî li heman cihî

[255] Rapora Salê ya Nexweşên Jin yên ku ji Heyva Sor a Kurd (HSK) Sûd Wergirtine, ji 01-01-2019 heya bi 01-01-2020

[256] Hevpeyvîn bi Doktor Mêrîvan re, li ser bingehê daneyên arşîvfa Şîfajin, ji Adarê heta Hezîrana 2020'an, gundê Jinwar, 2020

dikin. Jinan ditirsînin û dibêjin, 'zaroka we di xeteriyê de ye'. Lê bi rast ne wilo ye. Doktor dibêjin, 'emelî divê' tenê ji bo pera bistînin. Min bixwe gelek bûyerên wiha dîtin."[257]

Lê ev meyl ne tenê li Rojava tê dîtin. Rêxistina Navneteweyî ya Tenduristiyê (WHO) di sala 2015'an de eşkere kir ku di asta cîhanê de kêmbûna anîna zarokan a xwezayî û zêdebûna sezeriyanê bi pêş dikeve. Ruxmê ku qeyserî tenê di % 15'ê ducanîbûnan de ji ber tenduristiya dayikê yan jî zarokê pêwîst dike, li gelek welatan rêjeya qeyseriyê dibe % 30 - % 50. Di rastiya Rojava de xebatkarên jin ên warê tenduristiyê di niqaşên perwerdeya Jineolojiyê de du sedemên esasî yên zêdebûna qeyseriyê wiha nirxandin:
Sedema yekem; jin hene ku di bin bandora meyl û propagandayên pergala modernîteya kapîtalîst de ji anîna zarokan a xwezayî direvin: "*Keçên niha ku tên cem me nexweşxanê, êşê tehamul nakin. Digirîn, xwe diqehirînin û dibêjin, 'bila doktor zikê me biçerîne û dergûşa me derxe! Em vê êşê tehamul nakin!' Zilamê wan jî bi doktorê re xwe diqehirînin û diçin nexweşxaneyên taybet. Ew jî naxwazin ku zarok bi rêya xwezayî bê dinyayê. Nifşê niha naxwaze ku laşê wan xirab bibe, dixwazin wekî keçik bibin. Lewma qeyseriyê çêdikin."*
Sedema duyem; îro derfetên muayene û mudaxeleyên tenduristiyê baştir bûne. Lewma jinên ku berê derfetên wan nebûn ku di rewşên pêwîst de qeyserî çêkiribana, îro dikarin herin nexweşxanê: "*Hinek jin jî tên ji ber ku pêwîstiya wan bi qeyseriyê heye ji bo zarok yan jî dayik nemirin. Di hinekan de serê zarokê dernakeve jêr yan jî xeteriyên cuda hene."*[258]

Berpirsyara beşa tenduristiyê ya Weqfa Jina Azad a Rojava, Şîlan Belo balê dikişîne ser pêwistiya hişyarkirina jinan derbarê xeteriyên anîna zarokan bi rêbaza qeyserî de: "*Ji sedî 70'yê jinan di van deman de baweriya wan bi zayîna qeyserî zêdetir tê. Ji ber ku bandora zayîna qeyseriyê nizanin."* Hemşîreya anîna zarokan [pîrik] Melka Hesaf şirove dike ku zarokên ku bi rengekî xwezayî ji dayik dibin, bêhtir bi hez in û xwe baştir dikarin ji nexweşî û hesasiyetan biparêzin: "*Jina ku zayîna qeyserî zaroka xwe tîne nikare şîr bide zaroka xwe. Heta 15 rojan bedana dayikê baş nabe û nikare hereket bike."*[259]

Li Rojava di dema rejîma Beesê de ti nexweşxaneyên taybet ji bo tenduristiya jinê û zarokanînê tine bûn. Mirov dikare vê bi vî awayî şirovê bike: Zêdebûna zarokên Kurd ne li gorî berjewendiyên Komara Ereb ya Sûriyê bû! Her wiha bala mirov diçe ser wê yekê ku li Rojava gelek zarok bi astengiyên derûnî yan jî fîzîkî ji dayik bûne. Yek ji sedemên vê, zewacên xizmên nêz in ku genên wan li hevdu nayên.

Bijîşka daxiliyeyê Leyla Ristem Osê balê dibe ser girîngiya tedbîrên taybet ji bo tenduristiya dayik û zarokan: *"Divê dayik berî ku ducanî bimîne û di serdema ducaniya xwe de li xwe baldar be. Divê kontrola grûba xwîna dayik û zarokê bên kirin. Divê kontrola enfeksiyona di şîrê dayikê de bê kirin. Her wiha divê kontrola kezeba reş a zarokê bê kirin. Ji bo tenduristiya zarokê şîrê dayikê jî gelekî girîng e. Ji bo zarok nexweş nekevin divê şîrê dayikê bixwin. Ji bo tedbîra li dijî nexweşiya zerikê ya zarokê dîsa teşxîsa zû gelek girîng e. Ger di dema xwe de mudaxele neyê kirin dê ev yek ji bo zarokê bibe sedema texrîbatên mezin. Lewma ji bo tenduristiyê teşxîsa zû û kontrola giştî ya salane xwedî girîngiyeke jiyanî ye."*[260]

[257] Hevpeyvîn bi Muna Xelîl re, Amûdê, 2017

[258] Niqaşên perwerdeya Jineolojiyê bi xebatkarên jin yên qada tenduristiyê re, Kobanê, 2017

[259] Şêrîn Zêrevan, Rojda Seydxan: *Ji bo jinan zayîna bi tendurist a xwezayî ye*, Jin News, Qamişlo, 28-07-2019

[260] Şêrîn Zêrevan: *Bijîşka daxiliyeyê hişyar kir: Teşhîsa zû girîng e*, JinNews, Qamişlo, 13-10-2018

Ka mirov çiqasî girîngiyê didin bi pêdiviyên tenduristiyê, bi şêwaza jiyanê û rewşa wan a nefsî re elaqedar e. Jinên navsere ku jiyana xwe li gundan bê pirsgirêkên mezin ên tenduristiyê derbas kirine, sirra xwe bi me re parve dikin: "*Dema ku hûn bi destê xwe bixebitin, ji pincar û jiyanê hez bikin û hêviya we hebe, hûn ê her tim sax bin û emrê we jî dirêj bibe!"*

Bandorên Derûnî

Zextên mêr û dewletê, zayendperestiya civakî, nijadperestî, xizanî, koçberî û şer bandorên giran li ser jiyan, tenduristî û derûniya jin û zarokan dikin. Lê birînên di ruhê mirovan de xuya nakin. Ew xwe bi şiklên cuda didin der. Zewaca bi darê zorê yan jî di temenê piçûk de, tundiya zilam yan jî ferzkirina têkiliyên cinsî bê xwesteka jinê, dikarin bibin sedem ku jin biqehirin, asabî bibin, ji nişkê ve bikevin, bigirîn yan jî xwe birîn bikin. Kul û derdên pirralî yên jinan dikarin bibin sedema xof, qeyranên dil û nefsî. Pê re, ne tenê zirar li tenduristiya jinê dibe. Di heman demê de bandor li têkiliyên jinê bi zarok, malbat û civakê re jî dibin. Malbat û derdor gelek caran nikarin li bertek û nerazîbûnên jinê serwext bibin. Gelek jin dibêjin, *"nexweşiyên nefsî di civaka me de hîna şaş tên fêhmkirin"*. Gelek caran ji ber ku lê serwext nabin û teşxîseke rast nayê kirin, jin tên sûcdarkirin. Dibêjin, *'ew xwe bi zanîn dixin vê rewşê'* yan jî *'ew dîn bûne'*. Gelek caran jî doktor dermanên giran ên derûnî didine wan. Ev derman mirovan gêj dikin û qeyranan kûrtir dikin. Lê bi pirranî sedemên qeyran û pirsgirêkên derûnî yên jinan ne jin in. Çavkaniya pirraniya wan pirsgirêkan, zextên feraset û pêkanînên pergala desthilatdar e. Hemşîreyek ji Kobanê dibêje, "*Şorekirin dermanê herî baş ji bo pirsgirêkên mirov e. Dermanên din wekî muxderet [madeyên hişbir] in. Bandora nebaş dikin."*[261]

Wekî hebûneke yekpare rewşa tenduristî ya mirovan him di ruh de him di bedena mirovan de eşkere dibe û bandorê li hev dikin. Çiqasî pirsgirêkên civakî û derûnî dikarin bibin sedema nexweşiyên fizîkî, ewqasî jî nerehetiyên bedenî dikarin pirsgirêkên derûnî bi xwe re bînin. Wekî hebûneke di gerdûnê de, tevahiya bûyerên ku li derdora wî/wê diqewemin bandorê li mirov dikin. Em dikarin bibêjin, rewşa aborî, civakî, hawîrdor û ewlekariyê – bi kurtasî tevahiya şert û mercên jiyanê – bandora xwe li ser tenduristiya mirovan dikin.

Pergala desthilatdariya zilam, mêhtingeriya netewe dewletê û moderniteya kapîtalîst texrîbatên giran li ser tenduristî û derûniya civakê çêkirine. Bi taybetî şer û koçberiyê di derûniya jinan û civakê de birînên kûr peyda kirine. Jin li aliyekî hêza berxwedanê û parastina jiyanê raber dikin. Lê belê li aliyê din jî gelek salên şer bi windahiyên giran, kuştina mirovên jê hezkirine, talan, dagirkerî û tirsa êrîşên nû jin westandin û bêparsengî di ruhê jinan de ava kirine. Di rapora Heyva Sor a sala 2019'an a li ser cûreyên nexweşiyên jin ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ji bo 50.875 nexweşên jin tenê 14 rewşên 'nexweşiyên derûnî' mîna krîzên nefsî û stres tên ragihandin. Lê belê di beşa 'nexweşiyên sinir û eseb' de bi gîştî 3184 rewş tên ragihandin. Nîvî ji wan jinan êşên serî, mîgrên bi wan re heye û westiyayî ne. Yên din jî bi pirranî nexweşiyên keps [epîlepsî], eseba kolonê û yên esebên kevnar in.[262]

[261] Niqaşên perwerdeya Jineolojiyê bi xebatkarên jin yên qada tenduristiyê re, Kobanê, 2017

[262] Rapora Salê ya Nexweşên Jin yên ku ji Heyva Sor a Kurd (HSK) Sûd Wergirtine, ji 01-01-2019 heya bi 01-01-2020

Wekî din di lîstik û derûniya zarokên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jî bandora tundî û êşên şer xuya dibe. Pedegoga zarokan Emîne Mihamed dide zanîn ku şer jiyana zarokan hildiweşîne û di temenekî piçûk de dixe bin barên mezin ên jiyanê: "*Hinek ji zarokên di nava şer de mezin dibin tirsonek û di her kêliya jiyanê de ditirsin. Ji dengên herî piçûk yê ku derdikeve vediciniqin û xewnên wan hemû dibin kabûs. Yan jî dibin zarokên ku meyila wan li ser şidetê ye, nikarin ji heywan, bedewiyên xwezayê û zarokên hevalên xwe hez bikin. Di her kêliyê de şer dikin û bi awayek xwezayî mezin nabin."* Her wiha Emîne rave dike ku em di wan wêneyan de ku zarok xêz dikin, cîhana zarokan ya rast dikarin bibînin: "*Zarokên di nav şer de mezin dibin wêneyên şer û hovîtiya şer xêz dikin. Di wêneyên zarokan de, termên miriyan, malên hilweşiyayî, zarokên bê dê û bav mayî, sembolên rêxistinên ku ji wan hez dikin û bajar, gundên xwe yên ku dixwazin vegerinê, hene."*[263] Wêne û derûniya zarokan destnîşan dike ku trawmayên şer, wê hê jî bandorê li ser jiyana wan wekî mezin û nifşên siberojê bike.

Ji bilî tundî, şer û koçberiyê, tiştên ku di şêwaza jiyanê de wekî 'pêşketin' hatine nîşandan, gelek caran bandorên nerênî û nexweşiyên nû bi xwe re anîne. Mînak, teknolojiyên nûjen wekî telefonên înternetê, dibin sedema lawazbûna têkiliyên civakî û zêdebûna nexweşiya pençeşêrê.
Li hêla din van salên dawiyê, gelek malbatên Rojava li şûna xaniyên xwe yên axê, xaniyên ji çîmento ava kirine. Gelek kesan ev yek bi hênceta 'paqijbûnê' kirine. Lê belê piştre ew pê hisiyane ku germahiya xaniyên çîmento di dema havînê de û sermaya wan di dema zivistanê de nerehetiyên cuda bi xwe re tîne. Hilberîna endustriyel di qada çandiniyê de xweza bê parastin hiştiye. Ev bûye sedem ku nexweşî û şewat dikarin zû belav bibin û hasilata hezaran donim zeviyî bi carekê tine bibe.

Mînakên wiha didin xuyakirin ku parastin û vegera çanda jiyana xwezayî ji bo çareseriya pirsgirêkên ekolojîk û tenduristiya civakê, xwedî wateyeke girîng in. Bîreweriya jinê ya li ser xêrdariya xwezayê û rastnaskirina bedena xwe, dikarin ferasetê bidin guhertin; wê feraseta ku pîroziya jiyanê înkar dike, dixwaze xweza û mirovan ji bo berjewendiyên xwe bi kar bîne. Bi xebatên perwerde, civakî, tenduristî û hilberîna komînal, zanîna aborî û jiyana ekolojîk a bi tenduristî dikare ji nû ve were avakirin. Dermana xweza, ruh û bedena mirov di vê şêwaza jiyanê yê bi hezkirin de veşartî ye.

III. 2.6. Pirsgirêkên Hişmendiyê

Pêwîst e ku em pirsgirêkên hişmendiyê yên civaka Rojava girêdayî pirsgirêkên jin û civakê hemûyan binirxînin ku li beşên jorê hatin şirovekirin. Wekî me nirxand, desthilatdarî çavkaniya sereke ya hemû pirsgirêkan e ku îro bûne bela serê jin û civakê. Di serî de ji bo zilam li ser jinê ango dewlet li ser civakê karibû serweriya xwe misoger bike, di milê hişmendiyê de du operasyonên esasî pêwîst bûn: Ya yekem avakirina hişmendiyeke desthilatdar bû ku serdestî û kedxwariya komekê li ser 'yên din' rewa dike. Ya duyem jî hilweşandina hişmendiya civaka exlaqî û polîtîk bû ku li ser bingehê çanda dayika xwedawend bi hezaran salan nirxên hevgirtî yên civakê parastine. Tevahiya mêhtingeran bi van êrîşên li dijî hişmendiya civakê hewl dida aqilê analîtîk ji wijdan û aqilê hestyarî qut bikin da ku yekîtiya jin, jiyan û civakê parçe bikin. Bi vî rengî ramanên

[263] Dilûcan Bozî: *Şer dibe kabûsê jiyana zarokan*, JinNews, 20-11-2019

afirîner û bîra kolektîf a civakê ku dibin exlaqê civakê, hatiye pûçkirin; hêza raman û polîtîk a civakê hatiye kêmkirin.

Ruxmê ku di çanda Rojava de bermahiyên nirxên serdema neolîtîk hîna zindî ne, operasyonên pergala zayendperest ya mêhtingerî û şovenîzma netewe dewletê şopên xwe di hişmendiya civakê û kesayetan de hiştiye. Li aliyekî dogmatîzm û bextdarî ya olî, li aliyê din ferasetên pozîtîvîst û polîtîkayên nijadperest ên netewe dewletê vîna ferd û civakê dorpêç kirine. Ji ber ku pirraniya gelê Kurd li Sûriyê bê nasname û bê maf hatibû hiştin, tiştek aydê wan nebû. Lewma wan ti derfet ji bo guhertina çarenûsa xwe û pêkanîna xeyalên xwe nedidît. Tevahiya hêz û biryardayînê di destê dewletê de bû. Tiştên ku hatin afirandin û çandin, dewletê karibû her kêlî birûxîne. Lewma gelek kesan keddayîna ji bo afirandina tiştên nû ango xwe perwerdekirina bi armanca bipêşxistina civakê wekî tiştekî bê wate didît. Ji ber ku mirovan nikaribû encama keda xwe biparêzin ango sûdê jê bigirin, lêgerînên mirovan di warê watedayîna jiyanê de lawaz bûye. Hişmendiya 'jixwe her tişt aydê dewletê ye' hişt ku nêzîkatiyên seresere û jiyana wê rojê bi pêş kevin. Bi vê ve girêdayî jî gelek caran helwesta bi feraseta 'bila piştî min tofan rabe!' xwe dide der.

Mijara paqijiya derdorê mirov dikare wekî eynika vê hişmendiyê şirove bike: Gelek tişt ku derdorê qirêj dikin, bê baldarî tên avêtin, ruxmê ku ziyana vê li xweza û dîsa xelkê deverê dibe. Lê belê dema ku zextên rayedarên dewletê çêdibûn xelkê newêribû çop û zibala xwe bavêje kolanê. Di vê mînakê de mirov dikare bibîne ku gelek kesan, li şûna ku xwe ji bo avakirin û xweşikkirina jiyanê berpirsyar bibînin, zedêtir xwe li gorî nêzikatiyên dewletê eyar dikirin. Dewlet him nanê erzan daye gel, him jî gel ji ax, ard, tenûrê û xuliqkariyê qutkiriye.

Siyaseta Beesê ya 'şekir û qamçî' bûye sedem ku mirov rê û rêbazên xwe li gorî sînorên dewletê bi pêş bixin da ku debara xwe bikin. Vê nêzîkatiyê nedihişt ku mirov karibûna raman, daxwaz û xeyalên xwe eşkere bikirana. Lewma mirov bi tiştên piçûk razî dibûn û armancên mezin ji bo siberojê nedan pêşiya xwe. Ev hişmendî ji bo jinên Kurd tevî hişmendiya zayendperestiya civakê hîn girantir dibû. Ji ber ku jin nebûne xwediyê gotin yan jî biryara derheqê jiyana xwe de ew fêr nebûnê nihêrînên xwe bi pêş bixin û bidin xuyakirin. Lewma enerjiya herikbar û têkiliyên xurt ên jinê bi jiyanê re qels bûne û bextperestî serwer bûye.

Wekî encama van destwerdanên li ser hişmendiya civaka xwezayî, jin û civak ji taybetmendiyên xwe yên exlaqî û polîtîk hatine dûrxistin. Bi vî rengî desthilatdaran hewl dida ku xwebûn û qabiliyeta jin û civakê ya xweparastinê ji holê rakin da ku bikarin wan li gorî berjewendiyên xwe bişivînin û talan bikin. Lewma em dikarin bibêjin, wekî êrîşên li dijî hişmendiya civakê dibûn bingehê bicihkirina pergala desthilatdar, ji nû ve kifşkirina dewlemendiya hişmendî û xwezayê dikarin bibin bingehê pergala demokratîk a gelan.

2.7. Wekî Encama Beşê

Çavkaniya pirsgirêkên jin û civaka Rojava hişmendî û sazîbûna pergala baviksalar e, ya ku bi dijberiya çanda şoreşa neolîtîk hatibû ferz kirin. Saziyên malbat, zewac û dewletê; feraseta namûs û milkê bûbûn dogmayên pîroz ku bindestbûna jinê rewa kirine. Serweriya zilam di kevneşopî û têkiliyên eşîr, malbat civak û dewletê de vîna jinên li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê tepisand. Li nihêrîn û xwestekên jinê heta yên derbare jiyana wê bi xwe de nedihat guhdarîkirin. Rist û

çarenûsa jinê dibû îtaet kirin, anîna zarokê û xizmetkirina malbatê. Wekî din her tişt ji bo jinê bû 'guneh', 'heram' û 'şerm'. Çîrokên evînê û stranên dilşewat ên jinên Kurd, behsa êşên vê rastiya zayendperest û li hemberî vê lêgerînên azadî û hezkirinê dikin.

Wekî kesayet û nasnameya jinê, ax û nasnameya gelê Kurd jî xwedî dîrokeke aloz a di navbera man û nemanê de ye. Nexasim modela netewe dewletê ku wekî binyata modernîteya kapîtalîst û amûra emperyalîzma Ewropayê hatibû avakirin pirsgirêkên jinan û gelên Rojhilata Navîn û Sûriyê girantir kirine. Ne tenê sînor axa hevbeş a gelên Kurd, Suryanî, Aşûrî, Ermenî û Ereb parçe kirine. Şovenîzma dewleta Sûriyê dibû sedem ku jin, jiyan, civak û hevpariya gelan ji hev bê veqetandin û jin hev sil û havî bibin. Bi siyasetên nijadperest ên bişaftinê hemwelatî, ax û aboriya Kurdan hatin zeftkirin. Rabûna gel bi destê hikûmeta Beesê bi komkujî, tundî, siyasetên sîxurtî û rêbazên şerê taybet hat şikandin. Gelek pirsgirêkên ferd û civakê di encama tepisandina vîn, çand û ramanên azad de derketin holê. Qadên siyaset, aborî û perwerdeyê li bin siya desthilatdariya misoger a Beesê mane. Lewma civak ji siyaset û aboriyê hatiye dûrxistin. Dewletê him civak xizan dikir him jî muhtacê xwe dikir. Ji ber vê, pirraniya malbatan hewl dida di sînorên pergala dewletê de bê nakokî debara xwe bikin. Perwerdeya dibistanan bi pirranî wekî amûreke ji bo bidestxistina şehadeyê [dîplomayê] hatiye dîtin. Bi van nêzîkatiyên dewletê re, nerazîbûn û bersivên civakê, armanc, reng û wateya jiyanê çilmisîne.

Ruxmê ku kar û barên herî giran yên jiyan û malbatê hemû li ser pişta jinê bûn, zayendperestiya civak û dewletê li pêşiya tevlîbûna jinê ya nav di qadên siyaset, civak û perwerdeyê de dibû asteng. Tevî ku gelek jinan dixwest xwe zane bikin û dengê xwe bidin xuyakirin, gelek caran ew neçar mane gavekê bi şûn ve biavêjin. Vê yekê hişt ku jin bi girîngiya hevgirtin û rêxistinbûna jinê bihisin.

Her wiha pirraniya pirsgirêkên ekolojîk û pirsgirêkên tenduristiyê yên jin û civakê jî çavkaniya xwe ji desthilatdariya dewletê digirin. Siyasetên aborî û demografiyê yên ku li gorî berjewendiyên dewleta navendî hatine meşandin, kaniyên jiyanê û hevsengiya di navbera mirov û xwezayê de rûxandin. Serdestiya yekane ya hikûmeta Beesê di warê aboriyê de ketiye dirûvê mono-çandiniyê yê pişesaziyî. Herimandina çavkanî û dewlemendiya xwezayê di heman demê de bûye sedema biyanîbûna jinê ji ked û axa xwe re. Gelek pirsgirêkên tenduristî û dêrûnî yên jinan bi vê yeke ve girêdayî ne. Her wiha tundiya zayendperest, şer û koçberiyê jî bi rengekî neyînî bandor li tenduristiya jin û civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê kiriye.

Di destpêka sedsala 21'ê de êdî pirsgirêkên zayendperestî, nijadperestî, siyasî, civakî û ekolojîk gihandin wê astê ku civaka Rojava û gelek kesên li Sûriyê êdî rêbazên zordestiyê û hîleyan nema qebûl kirine. Wan ji bo vekirina girêhişka desthilatdariyê, doza rêyên çareseriya demokratîk kir. Rabûna gelên Bakurê Efrîka û Rojhilata Navîn ya sala 2011'an ber bi Sûriyê belav bûye. Her wiha danehevên Têkoşîna Azadiya Kurdistanê ji salên 1980'an ve di civaka Rojava de guhertin û veguhertinên civakî dabûn destpêkirin û nasnameyeke siyasî ya gel û jinên Kurd afirand.

Li ser vî bingehî gelên Rojava derfetên şoreşê nirxandine û wekî rêya çareseriya pirsgirêkên civakî şopandine. Li hemberî fetisandina ku di nav van qeyranên siyasî û civakî de hatiye serê jinên Kurd, ew jî rabûne. Bi rêxistinbûn û berxwedana xwe, jinan dixwest êdî qalibên hişmendiya kevneperest a desthilatdariya zilam û mêhtingeriyê bişikînin. Ji bo çareseriya pirsgirêkên jinan û civakê, jinan hêvî û peywendiyên xwe bi jiyan, civak û siyasetê re ji nû ve zindî kirine.

III. 3. Bandora Şoreşa Kurdistanê û Şoreşa Rojava Li Ser Jiyana Jinan û Civakê

Bi Hevpeymana Lozanê û tepisandina serhildanên Şêx Seîd û Dêrsimê ji aliyê dewleta Tirk ve, gelê Kurd di sedsala 20'an de rû bi rûyî komkujî, qirkirinên spî û siyaseta bişaftinê bûye. Hebûna Kurdan hatibû înkarkirin. Ancax di encama xebatên xwendevanên şoreşger ên Kurd de ku ji sala 1976'an ve di serî de li herêmên Rojavayê Firatê hatibûn destpêkirin, Kurdîtî ji nû ve hinekî zindî bûbû. Ji bo pêşiyê li vejîna lêgerînên azadiyê yên gelê Kurd bigire, dewleta Tirk di dawiya sala 1978'an de - mehekê piştî Kongreya Damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) - komkujiya Mereşê pêk anî. Komkujiyên li Mereş, Meletî, Semsûr û Elezîzê û her wiha şehadet û girtinên bi sedan pêşengên şoreşger li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê li pey hev qewimîn. Rêberê PKK Abdullah Ocalan ew bûyer wekî ragihandina derbeyeke nû ya leşkerî li Tirkiyê şirove kiribûn. Ji bo tovên Tevgera Azadiya Kurdistanê karibûna şîn bibin û li çar aliyên Kurdistanê belav bibin, Abdullah Ocalan biryar dabû ku di ser Rojavayê Kurdistanê re biçe Libnanê: *"Ji serê salên 1979'an ve, min hewl da, ji du aliyan ve xwe bi tevdîr bikim. Ji aliyekî ve min dixwest amadekariyên têkoşîneke demdirêj li deşt û çiyan bikim, ji aliyê din ve jî min dixwest li derveyî*

welêt ji bo tevgerê riyekê vekim ku karibe pê bêhna xwe bide. Eger ez di vî warî de bi ser biketama bi awayekî vebirrî tevger ê mayînde bibûya."[264]

Bi vê armancê, Rêberê PKK dest bi amadekariyan kir û di rêyên bi tehlûke re derbasî Rojava bûye: *"Min di nîvê sala 1979'an de ji Ethem Akcan ê Pirsûsî re got, xwe amade bike em ê di sînor re derbas bibin. [...] Piştî çend rojan Ethem Akcan xeber şand ku ji bo derbasbûna di sînor re her tişt amade ye. Her tiştê amade jî suwarbûna li mînîbuseke gund bû. Ez li mînîbusê suwar bûm û bi gundiyan re li gundekî ser sînor daketim. Ez hê jî difikirim, gelo çiqasî rast bû ku ez li wê wesayîta modernîteyê suwar bûm. Encama di vî warî de gihiştimê ev e: Mirov bi tevahiya amûrên zêhnî û fizîkî yên modernîteyê kar bike, ji çarenûssipartina xwe ya xwedayên serdema pêşî bi tehlûketir e. Berêvarê amadekariyên gava duyemîn ketin dewreyê.*
Kûryeyê bi navê Cehnî got, 'De rabin!' û em rakirin. Eskerê nobedar têlên rêsayî rakirin û got, 'De hemşehriyê min bi lez biçe' û bi vî awayî em derbas kirin. Em li pey Ethem diçûn me pê li şopên wî dikir û bi meşa bizinan em ji zeviyê mayînkirî bihurîn."[265]

Bi hatina Abdullah Ocalan û mîlîtanên PKK ya Rojava ji sala 1979'an û bi şûn ve guhertinên mezin di civaka Rojava û bi taybetî di jiyana jinan de çêbûne. Pûtên kevin ber bi hilweşandinê ve çûn. Li gorî parçeyên din yên Kurdistanê erdnîgariya Rojava ya herî piçûk û serjimara Kurdan li vir a herî kêm e. Lewma, heta wê demê xelkê Rojava xwe wekî 'birayê piçûk' ango 'alîgirê' serhildanên Kurd li parçeyên din dîtibû. Axa Rojavayê Kurdistanê jî wek 'Başûrê Piçûk' dihat binavkirin. Li hêla din zextên dewleta Sûriyê dibûn asteng ku gelê Rojava kariba xwe wekî hêzekê bidîta, yekîtî û rêxistinbûna xwe ya çandî û siyasî bi pêş xistiba. Lewma, gelê Rojava bawer dikir ku tenê bi serketina şoreşên li beşên din ên Kurdistanê ew karibin hêviyên xwe yên azadî û serxwebûnê pêk bînin. Li ser vî esasî civaka Rojava bi dehan salan pişgiriya madî û manewî daye têkoşîn û tevgerên li Bakur û Başûrê Kurdistanê. Di serî de beşeke girîng a xelkê Rojava alîkarî dabû hewldanên Partiya Demokratîk a Kurdistanê (PDK) li Başûrê Kurdistanê a bi pêşengiya Mele Mistafa Barzanî. Lê bi ragihandina Aşbetal û şikestina vê tevgerê ya sala 1975'an de, hêviyên gel û pêşmergeyên kevin jî şikestine. Piştî wê gelek kesan xwe ji siyasetê daye alî.

Lê belê bandora tevgera PKK'ê li ser civakê cudatir bû. PKK'ê xwe nedispart çanda eşîrtiyê. Him li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê him jî li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê nifşa yekem a PKK'ê xwe di nav xwendekarên li zanîngeh û peymangehan de bi rêxistin kir. Lewma ev şoreşgerên Kurdistanê di nav gel de wekî 'telebe' yanî wekî xwendekaran dihatin nasîn. Wan xwe dispart rêxistinkirin, xizmetkirin û perwerdekirina gelê xizan. Têkoşîna wan ne ji bo xilasiya herêmekê tenê, lê ji bo yekîtiya neteweyî û azadiya tevahiya Kurdistanê bû. Li ser vî esasî gel danûstandina xwe bi tevgerê re bi pêş dixist. Gel him alîkarî û piştgirî dida tevgerê him jî ji tevgerê hêz, zanebûn û bawerî digirt. Têkiliyên ku di nav gel û pêşengên tevgerê de ava dibûn, dibûn bingehê vîn û bixwebawerî, guhertin û veguhertina civakê.

Jinên Rojava ku berê ji jiyana siyasî bêpar hatibûn hiştin, yekem carê karîbûn xwe beşdarî nîqaş, jiyan û xebatên siyasî û rêxistinî bikin. Bi taybetî jinên ku çand, ziman û welatparêziya Kurdî parastibûn di nav vê tevgerê de cewher û hebûna xwe, zindîbûna çand û exlaqê civaka komînal didîtin ku xwe dispart rêzdayîna vîn, ked û nirxên jinê. Lewma jinên Rojava bawerî zû dan tevgera

[264] Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk - Pirtûka Pêncemîn, Beşa 4.4. Bi Awayekî Rast Nîşandana Şerê Bîrbirinê û Ruhê Demekê*, 2012

[265] Çavkanî li heman cihî

azadiyê ya bi pêşengiya Rêber Abdullah Ocalan. Jê pê ve, jinan hêviyên azadiya welat û jiyana azad di rastiya tevgera PKK'ê de dît.

III. 3.1. Salên Destpêkê yên Tevgera Azadiyê li Rojava: '*Şînbûna civaka Rojava li ser koka xwe*'

Xeberên li ser hewldanên nû yên ku ciwanên şoreşger li Bakurê Kurdistanê dabûn destpêkirin, bi riya têkiliyên malbatî, civakî û bazirganî yên kolberan ji herêmên serxetê derbasê binxetê dibûn. Bi vî rengî jî çend malbat û ciwanên li Kobanê ji civînên gel ên li navçeyên Rihayê û bûyeran agahdar bûbûn. Bi taybetî rabûna gelê Kurd li Hîlwan û Siwêrekê li dijî dagirkerî û nokeriyê bi kelecan hatibû şopandin.

Piştî ku Abdullah Ocalan di şeva 1 – 2'ê Tîrmeha 1979'an de ji aliyê Rihayê ve nêzîkî Kobanê sînor derbaskiribû, ew hatibû gundê Elpelorê. Li wir ew tevî çend hevalên xwe nêzî 45 rojan li mala Xalid û Şemsê mabû. Xalid û Şemsê dibêjin, beriya Abdullah Ocalan bê gundê wan, çend 'telebe' li cem wan mabûn û bi dizî amadekarî kirine. Yek ji wan birayê Xalid bû. Wî li Zanîngeha Stenbolê xwendibû û li wir Abdullah Ocalan nas kiribû. Her wiha Xalid û Şemse dibêjin, hevaleke jin bi navê Gulistan jî li cem wan dima. Xalid dibêje, birayê wî jê re tenê gotibû: "*Mêvanên we wê werin. Ew Kurd in. Ji ber dijmin direvin. Kes ji Kurdan hez nake. Bila qîmetê wan li cem we hebe. Ew heval ji bo Kurdan kar dikin."*[266] Piştî ku Abdullah Ocalan sînor derbas kiribû birayê wî çûbû pêşiya wî. Birayê Xalid gotibû, ew di rê de ketin xetereke pirr mezin li kaşekî aliyê rojavayê Kobanê ku jê re tê gotin 'Alemê Reş'. Lê di dawiyê de ew bi awayekî saxlem gihiştin gundê Elpelorê. Şemsê û Xalid, herduyan wê demê nizanibû ku mevanên wan Abdullah Ocalan û mîlîtanên destpêkê yên PKK'ê bûn. Ew wan 'telebeyên ji Tirkiyê' li mala xwe wek mêvan qebûl kiribûn. Lê, disîplîna jiyanê, ruhê hevaltî û dilnizmbûna wan pirr bandor li wan kiriye.

Şemsê wan rojan bi hestyarî û serbilindî tîne bîra xwe: "*Me nizanibû ku Serokatî wê were. Tiyê min tenê gotibû, 'Xortek wê ji Tirkiyê were cem we. Me li Stenbolê bi hev re xwend û ew apê me ye'. Piştra, bi şev dereng Serokatî hat. Min ji wan re xwarin danî û cihê ji bo razanê amade kir. Serokatî 45 rojan li cem me ma. Ew û tiyê min bi zimanê Tirkî bi hev ra şore dikirin. Pirranî Serokatî diçû li ber hawizê avê û li bin siya darê rûdinişt. Wî pirr ji xwendinê hez dikir, her tim li bin siya daran pirtûk dixwend. Dema ku mêvanê me pirr dibûn Serokatî û tiyê min dihatin hundir, pirtûk dixwendin. Hevaleke jin di nav wan hevalan de hebû. Navê wê Gulistan bû. Ew jî 3 mehan li cem me ma. Ew jî ji Bakurê Kurdistanê bû. Ew tev hevalên din di oda xwe de rûdiniştin, nîqaş dikirin heya karê wan xilas dibû. Me cihê xortan di malê de danî, keç jî dihat cem keça min radiket. Keçeke wilo xweşik bû. Lê piştre me bihîst ku şehîd ket.*

Dema Serokatî li cem me bû, zaroka min piçûk bû. Ez diçûm min nan lêdixist. Dema ez vedigeriyam min didît Serokatî li ber dergûşê rûniştiye û dergûşê dihejînê. Carnan jî zarok digiriya wiya zarok dianî cem min û digot 'zaroka te digirî'. Min şîr dida zarokê û dîsa Serokatî zarok bi xwe re vedigerand, dixist dergûşê û ew dihejand heta ku min karê xwe xilas dikir. Ti carî xwe xerîb nedihesiband, wî xwe ji malê dihesiband."[267]

Ji vê rojê şûn ve Şemsê û Xalid bawer kirine ku wê rojekê Kurdistan rizgar bibe. Xalid tîne bîra xwe ku li ser pirsa *'Kurdistan wê kengê çêbibe?'* Abdullah Ocalan mînakek balkêş dabû kurapê wî.

[266] Hevpeyvîn bi Xalid û Şemse re, gundê Elpelorê ya Kobanê, 2017

[267] Çavkanî li heman cihî

Wî gotibû: "*Darek hebe, ev jî dareke mezin be, mirov bi carekê nikare here ser darê. Gerek mirov ast bi ast, gav bi gav here ser darê. Kurdistan jî weke vê darê ye. Dijmin gelek in."*

Şemsê jî dide xuyakirin ku bipêşxistina Şoreşa Kurdistanê tenê bi hişyarî pêkan bûbû. Ji ber zextên dewletê, malbata wan bi dizî û tedbîrên ewlekariyê tevgeriyaye: "*Wê demê tirs pirr bû. Piştî 45 rojan gundiyê derdora me nas kirin ku Serokatî li cem me ye. Ji bo neyê girtin, tiyê min ew bir Til Şihîrê û ji wir jî ew bir Helebê. Piştî ku Serokatî çû Helebê me hevdu careke din nedît.*

Pirr caran xelkê diçû, ji rejîmê re li ser mala me ixbar didan. Carekê min dew dikeyand û eskerên rejîmê hatin. Wan li malê giş nihêrî. Heta li meşka ku min tê de dew dikeya nihêrîn ka qilêş di nav de hene an na! Bi rehetî Kurdistan nehat standin. Hevalên me pirr zehmetî dîtin. Piştî ku me nas kir Serokatî mêvanê me bû, em pirr kêfxweş bûn. Ez pirr kêfxweş im ku Kurdistana me çêbû. Niha em di welatê xwe de azad in û em bê tirs tevdigerin."[268]

Hatina ewilî ya Abdullah Ocalan ya Rojava li ser herêma Kobanê kiriye ku dilsoziyeke taybet a manewî ya gelê Kobanê bi tevgera PKK'ê re bi pêş ketiye: "*Piştre dema ku Serokatî hat Helebê û Şamê, gelê Kobanê pêhesand. Pirraniya gel di perwerdeya Rêbertiyê re derbas bû û xwarin bi hev re xwarin. Gel bi hezaran çû Libnanê ji bo Serok bibînin. Keç diçûn Helebê ji bo perwerdeya Serokatiyê bibînin. Girêdaneke taybet ya gelê Kobanê bi Serok re çêbû. Di Kaniya Kurdan de û di taxa çarşê de jin diçûn, pûş kom dikirin, nanê hişk kom dikirin ji bo bifiroşin û alîkariya xwe bidin. Jinên ixtiyar û feqîr hêkên mirişkên xwe difirotin ji bo alîkariya xwe bidin. Ew bi xwe dihatin û israr dikirin ku alîkariya xwe bidin rêxistinê. Jinan karê destan çêdikirin, meh bi meh alîkariya xwe didan tevgerê. Jinan gustîl û bazinên xwe yên zêr dan ji bo alîkariyê. Jinan fedekartî dikir. Heta niha jî jin li ser lingan ne. Ev ji ruhê Apocîtiyê ve dihat. Koka Kurdiyetî ku di Kobanê de hebû, bi Apocîtiyê dîsa şîn dibû."*[269]

Heman ruh zû jî di nav herêmên Cizîrê, Efrînê û Kurdên li Helebê û Şamê de belav bûbû. Gelê Rojava ji Apociyan re mala xwe û dilê xwe vedikir. Nexasim berxwedana zindana Amedê û helwestên militanên PKK'ê yên wekî Mazlum Dogan, Hayrî Durmuş, Kemal Pîr, Sakîne Cansiz û Ferhat Kurtay li hemberî êşkenceyên faşîzma 12'ê Îlonê li Tirkiyê di nava gel de bawerî û dilsoziyeke mezin da avakirin.

Li gundên li ser xeta sînor, weke herêma Koçerata gelek malbatan Tevgera PKK'ê di destpêka salên 1980'yî de di kesayeta pêşengên tevgerê de nas kirine. Gotin, rabûn û rûniştinên van mîlîtanan wek fermandarê gerîla Egîd (Mahsum Korkmaz) têkiliyên saxlem ên dostanî û rêxistinê bi gelan re dan avakirin ku heta roja îro dewam dikin. Hinek malên welatparêz wekî 'biryargehên rêxistinê' bûne. Ew her tim bi hişyariyeke mezin tevgeriyane ji bo karibin endam û nirxên rêxistinê li hemberî sîxurên dewletê û nokeran biparêzin. Lewma gelek malbatan taktîkên cûr bi cûr bi pêş dixistin û nedihiştin ku kesek jî bê girtin. Li hêla din Tevgera Azadiyê jî pergala xwe ya rêxistinê li gorî pêwîstiyên ewlekariyê pirr veşartî dan avakirin. Heta, pirr caran xebera malbatên welatparêz bixwe ji hevdu tine bû. Lewma îro çend malbatên ji heman gundî dibêjin, *'Li gundê me tenê mala me welatparêz bû!'*

Bi vî rengî bi hezaran şoreşgerên Kurdistanê yên ku çûne çiyayên Bakur û Başûrê Kurdistanê yan jî ji çiya hatine Rojava, di cem wan re derbas bûne. Di van malên welatparêz de bi hezaran şervanan cilên xwe guhertine, serê xwe şûştine, çek û cebilxanên xwe girtine yan jî veşartine û şervanên gerîla yên birîndar hatine dermankirin. Dîsa li malên cuda civîn û perwerdeyên rêxistinê

[268] Çavkanî li heman cihî

[269] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

hatine lidarxistin. Gelek pêşengên ku paşê şehîd ketin jî di nava wan de bûn. Zarokên wan malbatên welatparêz bi çanda şoreşgeran mezin bûne û gelek ji wan zarokan piştre bixwe jî bûne şoreşger.

Şîraz ji gundê Zixatê yê navçeya Dêrikê ye, di zarokatiya xwe de nexasim kesayeta Ferhad Kurtay bandor lê kiriye. Piştre Ferhat Kurtay ji aliyê dewleta Tirk ve li Bakur hat girtin di 18'ê Gulana 1982'yan de wî tevî hevrêyên xwe Eşref Anyik, Necmî Oner û Mahmut Zengîn li hemberî êşkenceyên li zindana Amedê agirê berxwedanê di bedena xwe de pêxist. Şîraz naskirin û dilsoziya xwe ya bi mîlîtanên PKK'ê re wiha tîne bîra xwe: "*Berê 28 salan di vî gundî de Hevalê Ferhad Kurtay û hevalên wî wekî Apociyên yekemîn hatin mala bavê min. Wê demê ez 8 salî bûm. Heval ji milê Bakur û Başûr dihatin. Heta niha gotinên Hevalê Ferhad di bîra min de ne. Me bi rêya wî hevalî rêxistin nas kir û em tevlî kar û xebatan bûn. Dema ez zewicîm, zilamê min jî bi dizî karê rêxistinê dikir.*

Gelek cara bi şevê çar komên heval dihatin. Me cilê wan dişûşt û paqij dikir. Wan tiştan, me hemû veşartî dikir. Em bi şev nedirazan. Divê heya siharê ew cil ziwa bûna bêyî ku ji derve xuya bibin. Hevalên jin jî dihatin. Wan sûretên şehîdan didan me û behsa jiyana şehîdan dikirin. Cara yekemîn sûret dan min yên Hevala Besê û Ezîmê bûn. Carna 4 hevalên jin û 4 hevalên xort bi hev re dihatin û civînên xwe li vir çêdikirin. Wekhevî di navbera hevalê jin û zilam de hebû. Milet digot, 'eyb e'. Lê me her tim digot ku ti ferq û cudayî di navbera jin û zilam de nîn e. Şêr şêre, çi jin e çi mêr e. Mêjiyê insan çawa xwe bi rêxistin bike, wisa ye. Îradeya insan ne kêm e. Her insanek xwedî cesaretekî ye. Tişta ku jinê dikir, ti kes nikariya bike. Jinê hêza xwe ji îradeya xwe digirt.

Min û mala xezûrê xwe li hev nedikir. Wan digot 'çima heval tên cem we?' Lê me ya xwe dikir. Me kar û xebatên xwe dimeşandin. Rastî ew bû; ti kesî nikaribû îrada me bişkîne. Wê demê ti kesî ji tirsê rejîmê nikaribû bêje 'ez Kurdim'. Gundê me pirraniya xwe ne Apocî bû. Min nedizanî kengî dewlet wê bê di ser malê de bigire. Rastî kesekî nedizanî kî di mala min de heye. Wisa me hevalên birîndar diparastin. Gelek cara, dewlet dihat, lêpirsîn dikir. Min wisa li dewletê vedigerand ku wî ji xwe fihêt bike û paş paşkî vegere.

Min gelek feqîrtî û birçîbûn dît. Lê ya muhim ti muşkilê min û zilamê min nebûn. Zarokên min jî di destê hevalan de mezin bûne. Îro ew hemû di nav de ne, kar û xebat bi wan re dimeşînin. Jiyana min hema wisa derbas dibû. Xwesteka min gelek hebû ku ez biçim çiya bibînim. Lê her ez ditirsiyam dema ku ez biçim, wê heval çi bikin?"[270]

Necbîr jî di piçûkahiya xwe de li bajarê Tirbespiyê mîlîtan û xebatên Tevgera Azadiyê nas kirine û di temenê ciwan de biryar dabû ku tevlî nav refên gerîla bibe. Ew bicihbûna PKK'ê di civaka Rojava de wiha dinirxîne: "*Tevgera Azadiya Kurdistanê xwe di salên 1980'an de li vir bi cih kiriye. Vê hişt ku demarê me ziwa nebin. Ji bo nefesa azadiyê were, PKK'ê dixwest destê dewletê ji ser qirka gel rabike. Yên ku dixwest nefesa azadiyê bistînin, ew zû bi Tevgera Azadiyê re bûn yek. Dema ku gel dît, kî wan diparêze, gel zû malê xwe vekirin û tevlîbûna xwe çêkirin."*[271]

Gelê Rojava Abdullah Ocalan û fikrên wî hembêz kirin. Jinên ji tewahiya herêmên Rojava dibêjin, sê, çar salan piştî ku Abdullah Ocalan û mîlîtanên destpêkê derbasê Rojava û Libnanê bûbûn, zemînekî saxlem yê tevgerê li Rojava hatibû avakirin. Li hemû navçeyên Rojava û li bajarên Sûriyê yên wekî Şam, Reqa û Helebê ku tê de nifûseke mezin a Kurdan hebû, êdî têkiliyên rêxistinê di nava civakê de hatibûn bi pêş xistin. Bi taybetî ciwanên xwendevan pirr zû fikir û

[270] Hevpeyvîn bi Şîraz re, gundê Zixatê yê Dêrikê, 2017

[271] Hevpeyvîn bi Necbîr re, Tirbespiyê, 2017

felsefeya PKK'ê qebûl kirin û hejmareke mezin ji zanîngehan tevlî nav refên partiyê bûn. Pirtûka *'Berxwedan Jiyan e'* wergerandibûn zimanê Erebî. Vê pirtûk û nameyên pêşenga PKK'ê Sakîne Cansiz ji zindana Amedê, bandoreke mezin li ser gelê Rojava da çêkirin. Ev nivîs di civîn û perwerdeyên gel de hatin xwendin û nîqaşkirin. Di eynika kiryarên dewleta Tirk de gelê Rojava rastiya xwe careke din didît. Nakokiya bindestbûna neteweyî ku bi siyaseta rejîma Beesê hatibû tevizandin, ji nû ve zîndî bû. Li aliyekî hêrs li dijî pergala dagirkera faşîst dewleta Tirk û xwesteka tolgirtinê bi pêş ket. Li aliyê din jî sozyarî bi berxwedana gelê Bakur û şehîdan re xurttir bû. Bi wan hestan gelek jin û ciwan bûn şopdarên doza PKK'ê.

Civak û bi taybetî jinên Rojava di kesayet û helwesta Sakîne Cansiz de fêrbûne ku jin jî dikarin li bin her şert û mercî wekî mîlîtanên şoreşger li ber xwe bidin û parastina xwe ya siyasî bikin. Bi girtina jinan, bi êşkence û tecawizê ve dijmin xwestibû feraseta namûsê ya civaka Kurd li dijî girtiyên siyasî yên jin bi kar bîne. Lê belê ev hesab, berovajî zivirî. Berxwedana jinan li zindanê dibû mînaka lehengiya jinên Kurd. Di encama vê berxwedanê de gelek jinên li Rojava jî ji salên 1980'yî û şûn ve pê hesîn ku ew dikarin bi rûmet cihê xwe di nav siyaset û têkoşîna azadiya Kurdistanê de bigirin.

"Dema ku Hevala Sakîne li zindanê Amedê li dijî faşîzma dewleta Tirk li ber xwe dida, wê bandoreke mezin li ser civaka Rojava çêkir. Bi sedan, bi hezaran zarokên vê demê navê 'Sakîne' lê hat kirin. Wekî zarok, em bi destanên li ser cesaret, pêşengtî û sekna Hevala Sakîne hatin mezinkirin. Şehadetên Hevala Besê Anuş û Ezîme Demîrtaş di sala 1981'an de jî bandoreke mezin çêkir. Li ser kesayet û berxwedanên wan, hatiye nîqaşkirin. Ew di civaka Rojava de bûne destan. Em hemû di temenê piçûk de bi mînakên lehengiya wan qehremanan mezin bûne. Em fêrbûn, çawa van hevalên jin li hemberî zilm û faşîzma dewleta Tirk zimanê xwe û nasnameya xwe ya Kurdî, nasnameya xwe ya siyasî û wekî jina berxwedêr, parastine. Mînakên van jinên şoreşger ji bo me bûne bingeh."[272]

Gav bi gav jinên welatparêz ji mal derketin, tevlî civîn û xebatan dibûn. Qadên çalakiyê ku berê aydê zilam hatibûn dîtin, êdî dibûn warên hevbeş ên civakê. Jinan pêşengiya lidarxistina pîrozbahiyên girseyî yên Newrozê dikir. Di sala 1985'an de pîrozbahiyên Newrozê li tewahiya herêmên Rojava û li taxên Kurdan yên Şam û Helebê bi bandora pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an zivirîn xwepêşandanên siyasî ji bo azadî û serxwebûna Kurdistanê. Cara yekem jin jî bi rengekî girseyî daketin qadan û coşa Newrozê bi cilê Kurdî û govendê bi gelemperî pîroz kirin.

Jinên ku tevlî wan pîrozbahiyan bûne behsa baldarî û kelecana amadekariyên mezin ên Newrozên wê salê dikin: Jinan bi destê xwe al û sembolên têkoşîna Kurdistanê hûnandin û neqişandin. Komên stran û govendên Kurdî hatibûn avakirin ku bi mehan veşartî xebat li malan meşandibûn. Cara yekê jinên ciwan jî di nava xebatên hunerî de cihê xwe girtin û derketin ser dikê. Ev gaveke nû di nava civaka Rojava de bû ku jin li pêşiya bi sedan yan jî hezaran mirovî derketin ser dikê û wan stran gotin, helbest xwendin û govend gerandin. Bi vejîna çand û hunerê Kurdî jin jî ji qalibên eyb û şermê dibihurin û li ser koka çanda xwe vedijîn. Newroza 1985'an di bîra jinên Rojava de weke destpêka qonaxeke nû maye. Ji vê şûn ve ruh û hêviyên şoreşgerî di nav gel de belav bûne.

[272] Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

Hikûmeta Şamê ev qewmîn bi gumanên mezin şopandin. Lewma pîrozbahiyên Newroza 1986'an li gelemperiya Sûriyê hatin qedexekirin. Li hemberî vê qedexeyê jî serhildana yekemîn a gelê Rojava li dijî dewleta Sûriyê çêbû. Gelê Kurd li Efrîn, Kobanê, Cizîrê û li bajarên mezin ên Sûriyê, ji hemû astengan bihurî. Bi pevçûnên li hemberî hêzên dewletê re wan xwe gihand meydanên Newrozê. Vê serhildanê ruhê têkoşîn û welatparêziyê di nav gelê Rojava de xurttir kiriye.

Rojhilat Arîf bûye şahîdê pêvajo û bûyerên Newroza 1986'an li Efrînê: "*Sala 1986 ji bo Rojava saleke girîng bû. Li Kitix, cografyayek girêdayî navçeya Mabata ya Efrînê cara yekem pîrozbahiyeke Newrozê gelekî bi girseyî û bi kombûna giştî ya gelê Efrînê çêbû. Dewleta Sûriye vê helwesta neteweyî ya gelê Kurd, kombûna bi coşa gel, helbest û stranan tehmul nekir. Ji ber vê, bi zanebûn êrîşê gel kir.*
Derdora saet 4 îstîxbarat û hêzên polîs dixwestin êrîşê li ser dikê bikin. Jinên Kurd xwe li derdora dikê kirin çember. Wisa hunermendên xwe, spîker, belavokên Newrozê û amûrên teknîkê xilas kirin û şer dest pê kir. Ciwanên Kurd gelekî bi hêrs bûn, bi kevir û daran [êrîş] birin ser polîsên dewletê. Dewletê jî fîşek teqandin, mirov girtin û xwestin çav tirsandinek çêbikin. Jineke ciwan bi navê Jiyan ji navçeya Efrînê Raco wisa ji aliyê hêzên dewletê hat birîndarkirin. Gel wê radikir û êdî hêrsa gel zivirî serhildanê. Ji ber vê dewlet mecbûr dima xwe paş ve bikişîne. Gel Jiyan bir nexweşxanê. Vê demê hîn sax bû. Lê çend roj şûnde ew ji ber birîna xwe şehîd ket û bûye şehîda yekem a gelê Rojava."[273]

Bi serhildanên Newrozê yên sala 1986'an gel bi rastiya pergala dewletê, hêz û netewebûna xwe hisiya. Têkoşîn û nakokî di nav hevdu de bi pêş ketin. Gelê Kurd dît ku maf û nasnameya wî di sîstema Sûriyê de tine ye; sîstem vîn, çand û zimanê gelê Kurd înkar dike. Serhildana yekemîn a Kurdên Rojava di cejna Newrozê ya Efrînê de dibû bingehê rêxistinbûna gelê Rojava: *"Cara yekemîn gel serê xwe li hemberî dewletê rakir. Wan bi hezaran kevir avêtin ser hêzên dewletê. Vê bi xwe re zanebûn ava kir."*[274]

Piştî vê serhildanê dewleta Sûriyê mecbûr ma pîrozbahiyên Newrozê serbest bihêle. Ji bo li pêşiya pevçûnên nû bigire dewletê roja 21'ê Adarê bi awayekî fermî bi navê 'Roja Dayikan' kiriye roja betlaneyê. Tevî ku dewleta Sûriyê xebatên siyasî û çandî yên Kurdan asteng dikirin, tevgera PKK'ê heya salên 1986-87'an di nava nifş û beşên civaka Rojava hemûyan de hat naskirin. Bi dehan malbat li navçeyên Rojava hemûyan malên xwe ji şoreşgerên PKK'ê re vekirin û bi rengekî cihê xwe di nav xebatên tevgerê de digirtin. Bi sedan ciwanên Rojava tevlî nav refên şoreşê bûn. *Gelo çi dihişt ku gelê Rojava ewqasî zû baweriya xwe bi Apociyan bînî, bi ked û fedakariyên mezin xwedî li Tevgera Azadiyê derkeve?*

Jinên Rojava didin diyar kirin ku sirriyeta serketina tevgera Apocî di kesayet, bawerî û sekinên îdeolojîk ên mîlîtanan de veşartî ye ku ji civakê re dibûn mînak:

"Hevalên ku di destpêkê de hatin fikrê Serokatiyê esas digirtin. Nivîsandinên Serok û tevgerê dan gel û ji gel re dixwendin. Dîsa îradeya ku di sala 1982'yê de li zindana Amedê derketibû holê bandorek mezin çêkir. Dema ku belavok û pirtûkên berxwedana ciwanên Kurd li zindana Amedê gihandin Rojava, gel digot 'ew yên me ne'. Hevalên ku xebat di nav gel de meşandine ne tenê digotin 'miletek bindest, welatek bindest heye. Pêwîst e ku em ji bo wê têkoşîn bikin û xwe feda bikin.' Berî her kesî ew heval diçûn, her tiştê xwe hiştin û xwe feda kirin. Gotinên wan û pratîka

[273] Hevpeyvîn bi Rojhilat Arif re, Endama Akademiya Jineolojiyê, Qamişlo, 2020

[274] Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

wan bû yek. Milet bi vê baweriya xwe dianî. Kadroyên destpêkê yên vê tevgerê çavkaniya manewiyat û moral, çavkaniya exlaq û hûrmetê bûn. Ew bi rastî pirr mitewazî bûn. Dîsa wan çavê xwe ji rastî û şaşetî re nedigirt. Ji bo insanekî iqna bikin bi saetan li ber kabûka wan rûdiniştin û bi wan ra nîqaş dikirin. Van taybetmendiyên hevalan bala gel pirr dikişand. Gel digot, 'Ev insanên pirr cuda ne. Ew tiştê ku me winda kirî, em di rastiya wan de bi çavê xwe dibînin'."[275]

Li ser bingehê welatparêziyê civaka Rojava fikrên PKK'ê zû fêhm dikirin û ew qebûl dikirin. Xebatên çand, ziman û perwerdeyê bandoreke mezin kirine. Ramanên sosyalîst û rizgariya neteweyî xîtabî ruhê demê û ya ciwanên Kurd dikir. Lewma di serî de gelek xwendekar zû derdora fikir û pêşengên PKK kombûn. Armanca avakirina Kurdistaneke azad û serbixwe xîtabê hest û xeyalên gelê Kurd dikir.

"Her wiha çanda kadroyên PKK'ê bandorek pirr mezin li ser civakê ava kir. Zanînên wan ne tenê teorîk bûn, lê li gorî rastiya jiyana civakê ewqas tijî bûn. Felsefeya azadiyê di şiklê, pîvan û exlaqê ciwanan de xuya bûbû. Dilsozî, duristbûn û guhertinên ku di kesayeta ferdan de çêbûn bala gel dikişandin. Mînak, hinek insan hebûn ku di civakê de hatin nasîn. Çand, zêhniyet û seknê wan bi tevlîbûna nav PKK'ê re gelek hatine guhertin. Vê hişt ku baweriya mirovan bi tevgerê hîn xurttir bibe. Bi wî rengî her ku diçû tabana PKK'ê di Rojava de mezintir û firehtir dibû."[276]

Di serî de gelek welatparêz û mîlîtanên PKK'ê yên Rojava bi ramana *'em piştgiriyê didin Şoreşa Kurdistana Bakur'* dibûn sempatîzanên Tevgera Azadiyê. Piştgirîdayîna kesên hewcedar û bindest li gorî çanda civakê jî wekî nêzîkatiyekî exlaqî û pîroz dihat dîtin. Çawa dewleta Sûriyê kampanyayên alîkarî û piştgiriyê ji bo têkoşînên gelê Ereb li Filistîn û Cezayîrê li dar dixist, xwendekarên Kurd jî piştgirî bi têkoşîna gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê re li dijî faşîzma dewleta Tirk ji xwe re esas digirt. Bi tevlîbûna nav kar û perwerdeyên tevgerê re hişyarbûna gelê Rojavayê Kurdistanê li hemberî bipêşketin û têkoşîna azadiyê li çar aliyên Kurdistanê li ser bingehê xwe yê dîrokî careke din zindî bûye û xwe gihandiye bîreweriyeke siyasî:

"Bi derketina PKK'ê û rêxistinbûnê di nav xwendekaran de ronakbûnek nû bi pêş diket ku di nav gelê welatparêz de bal kişand û zû belav bû. Ji ber gel fêrbû ku alîkariyê bide têkoşînên li parçayên din ên Kurdistanê, wana ev fikr hembêz kir û ji bo alîkarîdayînê amade bûn. 1987-88'an û şûnde tevlîbûneke pirr xurt ya keç û xortan ji tevgera PKK'ê re çêbû. Malbat pirranî nedibûn asteng. Wan beşdarbûna ciwanan a şoreşa Bakurê Kurdistanê wekî tişteke pîroz didît. Lê belê ne gengaz bû ku tiştek wiha ji bo Rojava bifikirin."[277]

Hinek derdorên siyasî û civakî yên Rojava jî hebûn ku di vê mijarê de nerazî bûn û pirsîn, '*Çima Kurdên Rojava diçin tevlî tevgera Kurdên Bakur dibin? Kurdên wir pirr in, nêzî sîh milyon in. Çima civanên me diçin gerîlayê li çiyayên Kurdistana Bakur?'* Lê belê em dikarin bêjin ku bi van nîqaşan re civak zêdetir bi bandora siyaseta parçekirin û bişaftina hêzên dagirker hisiya. Gelek kes wekî bersiva van pirsan, digihiştin wê bîr û baweriyê ku *"di serî de pêwîst e ku em wekî gelê Kurd*

[275] Hevpeyvîn bi Necbîr re, Tirbespiyê, 2017

[276] Hevpeyvîn bi Şervîn re, Dêrik, 2017

[277] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

wan sînorên dijminê me di fikrê xwe de ji holê rabikin û ruhê netewî ava bikin. Çarenûsa Kurdan li çar aliyên Kurdistanê girêdayî hev e."[278]

Pirraniya gelê ku di serî de bawerî û pişgirî daye tevgera PKK'ê ji çîna feqîr a cotkar û karkeran bû. Lê gav bi gav mirovên ji her beşa civakê tevlî nav xebatan bûn. Tevlîbûna jin û xortên ciwan ji hinek malbatên li pêş, yên dewlemend yan jî ji eşîrên navdar li herêmên Rojava hemûyan bala gel dikişand. Gel didît ku van şoreşgeran dev ji pêwendiyên xwe yên malbatî û şexsî berdane û jiyana xwe tevlî doza azadiya welat kirine. Nêzikatiyên ciwanên ên ji çîna arîstokrat ji civakê re jî bi dilosoziya şoreşgeriyê re dihatin guhertin. Wan wekî hevalên xwe ji malbatên kedkar, bi heman nêzîkatiyên mitewazî û fedekar, bawerî dida gel. Wiha gel îqna bû ku ev tevger bi rastî ji bo rakirina pergala kedxwarî û parçebûna çînî têdikoşe û dikare yekîtiya gel a neteweyî ava bike.

Bavê Emîne mezinê êla xwe ya eşîra Omerî bû. Hîna di salên 1977-78'an de malbata Emîne li Bakurê Kurdistanê pêşengên Tevgera Azadiyê nas kir. Ji ber zextên dewleta Tirk ew tevî malbata xwe sala 1986'an ji Nisebînê derbasî bajarê Qamişlo bû. Salekê paşê Emîne li vir jî tevlî xebatên rêxistinê dibû. Emîne balê dikişîne ser wê yekê ku di çanda Apociyan de têgihîna milkiyeta taybet tine bû:

"Em bixwe êdî ne milkê malbatek û ne milkê kesekî bûn. Me xwe aydê vê tevgerê û vî miletî didît. Milkê taybet cem me tine bû. Me nedigot 'ev pakêta min e' lê belê me digot 'ev pakêt di berîka min de ye, lê ev ne ya min e.' Çi tişt cem me hebû, wekî kinc, pêlav, pirtûk an jî pênûs me li gorî pêdivî bi hevdu re û bi gel re parve dikir. Xwarin û vexwarin ji bo me ne girîng bû. Dema ku em diçûn malekê me nedigot 'em birçî ne'. Malhazirî çi heba me bi malbatê re dixwar. Ji bo me girîng ew bû ku em tiştê cem me heyî bidin milet û bikarin di çareseriya pirsgirêkên wan de bibin alîkar. Bi şev jî beriya saeta xewê me roja xwe ber çavan derbas dikir û ji xwe dipirsiya: Min di vê rojê de çi çêkiriye û çi ava kiriye? Me çend mal vekirine û çi daye gel? Me çi kêmasî kirin? Ger ku em ketine ferqê ku me di malek de hişk axivîn ango di rûniştina me de kêmasiyek derketiba, me xwe xwe lêpirsîn dikir. Dema ku dibû sibeh em carekê din diçûn cem vê malê û me mebesta xwe jê re digot an jî me raxnedayîna xwe dida."[279] Vê şêwaza xebat û têkiliyan hişt ku pîvanên sosyalîst ên tevgerê dibûn bingehê kesayet, çanda jiyana nû û yekîtiya civaka Rojava.

Nexasim malbatên ku xwe weke 'dostên tevgera azadiyê' pênase kirine, bi evîna Kurdistana azad her tiştê xwe bi şervanan re parve kirine û sirra rêxistinê parastine. Gelek jin dinirxînin ku şêwaza jiyan û danûstandina mîlîtanên jin bandoreke erênî li ser jiyan û têkiliyên malbatê kiriye. Gav bi gav ferasetên zayendperest û feodal diketin ber lêpirsînê û çandeke welatparêz li ser bingehê rêz û biqedrêhevzanînê bi pêş ketiye.

Mijareke din ku girîng bû ji bo qebûlkirina PKK'ê di nav civaka Rojava de nêzîkatiya PKK'ê ji ol û baweriyên gel re bû. Pirraniya tevger û dewletên sosyalîzma pêkhatî li gorî nirxandinên Karl Marx 'ol ji bo gel wekî afyon e' ol red kirine. Lewma gelek kesan ji gelên Rojhilata Navîn sosyalîzm wekî 'tiştekî biyanî' ango 'modernîst' didît. Lê belê PKK'ê baweriyên olî wekî rastiyeke civakên Rojhilata Navîn nirxand. Ev bûye sedem ku gelê Kurd feraset û çanda sosyalîst a PKK'ê dispart cewhera bawerî û nirxên xwe.

[278] Hevpeyvîn bi Dayika Ş. Elî re, gundê Qerebaba, Efrîn, 2017

[279] Hevpeyvîn bi Emîne re, Qamişlo, 2017

Şervîn Dêrik dide zanîn ku bi taybetî şiroveyên Abdullah Ocalan li ser tevgerên olî wekî tevgerên civakî û exlaqî yên serdemên xwe, dibûn bingehê lipeyxwehiştina dijberî û pêşhukmên kevneperest: "*Destpekê di nav gelê Misilman de propaganda li dijî PKK'ê dihatin meşandin, bi gotinên wekî 'PKK sosyalîst e, lewma înkara Xwedê dike'. Van gotinan jî di hinek cihan de bandor çêkirine. Lê nêzîkatiya Serokatiyê li olê pirr zelal bû. Ji ber vê zêhniyet û hinek nêzîkatiyên olperest yên ku di nav civaka Rojavayê Kurdistane de hebûn, bi nêzîkatiyên Serokatiyê dihatin guhertin. Serokatî û kadroyên tevgerê bi giştî ji olan re hûrmetek mezin nîşan dan. Serokatiyê wateya olê di exlaqê civakî de pirr baş şirove dikir. Li ser vî esasî, Serokatî ji olên Îslam, Xirîstiyan, Êzidî, Elewî û hemû olan re bi rengekî wekhev nêzik dibû û qedir dida. Vê bandoreke mezin li ser civakê çêkir. Di encamê de hemû zilamên oldar - mele, seyda, pîr û keşe – li derdora Serokatiyê kom dibûn."* [280]

Yek ji van Mele Evdirehmanê ji navçeya Hezro ya ser bi Amedê bû. Ew li dora salên 1889-1890'î hatibû dinyayê. Ji serhildana Şêx Saîd ve, ew li her çar aliyên Kurdistanê bi gelek rêxistinan re ji bo doza azadiya Kurdistanê xebitiye. Her wiha ew wekî kesayeteke alimê yê ilmê Îslamê di nava civaka Kurdan de dihat naskirin. Di temenê xwe ya nêzîkî 100 salî de Melê Evdirehman hat Akademiya Mahsum Korkmaz li Libnanê. Li wir, ew bi rojan bi Abdullah Ocalan re rûnişt û wî pê re nîqaş dikirin. Piştre, Melê Evdirehman di salên 1990 - 91'an de li navçeyên Rojava hemûyan geriya, wekî ciwanekî di civakê de kar dikir û bi sedan civîn ji gel re çêkirin. *"Wî wiha digot: 'Di Quranê de behsa Mehdî dikin. Li ser destê wî Mehdî de wê insaniyet were guhertin. Ez jî di vê baweriye de me ku ev Mehdî Serok Apo ye.' Bi sedan kesên bawermendên Îslamê pirr bandor bûn bi nirxandinên wî û tevlî fikrê PKK'ê bûn."*[281]

Mele Beşîr ji Tirbesipyê jî yek ji van oldarên Rojava bû ku tevlî nav xebatên Tevgera Azadiya Kurdistanê bû. Ew wekî mirovekî zane û xwende di civakê de hatiye nasîn. Dema ku yekem car Apocî hatin gundê wî, wî bi saetan bi wan re nîqaş kir. Dawiyê, Mele Beşîr gihişt wê qanetê ku raman û exlaqê PKK'ê û yê baweriya wî ya olî digihin hev. Wiha wî dest bi xebatê Tevgera Azadiyê kir. Di heman demê de Mele Beşîr bi nêzikatiyên xwe yên jiyanê rêya pêşiya guhertina hişmendiyên zayendperestiya civakê vekir û tevî şoreşgerên jin di nav civakê de xebat meşand. Her wiha wî piştgirî dabû tevlîbûna kurê xwe û keça xwe ya nav refên gerîla. Herdu zarokên wî jî li çiyayên Kurdistanê şehîd bûn.

"Dîsa hevdîtinên Serokatiyê bi ilimdar û oldarên Xirîstiyan re çêbûne. Serok pirr qîmet daye wan û civaka Xirîstiyan jî gelek girîngî da wê nêzîkatiyê. Eşkere bû ku ji olan re di hemû milan de nêzîkatiyek û hûrmetek wekhev heye. Ev nêzikatiya rêxistinê di milê civaka Êzdî de jî gelek guhertin da çêkirin. Berê di civaka Kurd de Misilman û Êzdî xwarin bi hev re nedixwarin. Lê nêzikatiya Serokatiyê ji ola Êzdiyan re û tevlîbûna kadroyên Kurdên Êzdî hişt ku Misilman Êzdiyan qebûl bikin û êdî ji destê hev xwarinê bixwin. Bi vî rengî guhertinên pirr mezin di civaka Kurdên Misilman û Êzdî de çêbûne."[282]

Em dikarin bêjin ku di nava salên 1980'yî de bi bandora felsefeya Abdullah Ocalan û xebatên mîlîtanên pêşeng ên PKK'ê bawerî û rastiyeke nû di civaka Rojava de hatibû avakirin. Di encama vê de civaka Kurd zimanê xwe û çanda xwe ya jiyana komînal li hemberî êrîşên şovenîst û

[280] Hevpeyvîn bi Şervîn re, Dêrik, 2017
[281] Çavkanî li heman cihî
[282] Hevpeyvîn bi Şervîn re, Dêrik, 2017

bişaftinê yên rejîma Beesê parastiye. Di çanda welatparêziyê de ku di beşeke civaka Kurd a Rojava de li hundir û derveyî welêt belav dibû, sentezeke nû ji rêûresmên çanda neolîtîk, nirxên exlaqî yên civakê û zanista sosyalîzma demokratîk hatibû avakirin. Li ser vî bingehî ruhê Apocîtî dibû hêzeke kolektîf. Li şûna kesayet û civaka bindest û qederî ya ku newêre li ser siberoja xwe bifikire yan jî çarenûsa xwe bikira ber lêpirsînê, nasnameyeke nû ya Kurdên berxwedêr û azadixwaz li Rojava derketiye holê. Ruxmê zextên dewleta Sûriyê û ferasetên zayendperestiya civakê, ev nasname û baweriya Tevgera Azadiyê bûn bingehê rêxistinbûnê, guhertin û veguhertinên civakî. Bi vî awayî, civaka Rojava ya ku ji aliyê dewletê ve bê erd, bê maf û bê nasname hatibû hiştin, bihareke nû dîtiye û careke din li ser koka xwe şîn bûye.

III. 3.2. Pêşengên Tevgera Azadiya Jinê li Rojava

Herçiqasî jiyana jin û malbatên welatparêz êdî di gelek aliyan de ji pirraniya civakê cuda dibû, dîsa pêwîst bû ku jinan li gelek eniyan têkoşîna xwe bimeşanda. Ji bo jinan karibûna pût û qalibên civaka zayendperest bişkînin û vîna xwe ya azad derxin holê, mînakên jinên pêşeng xwedî wateyeke girîng bûn. Di vî warî de hinek jinên ciwan îlham ji çîrokên dapîran li ser jinên Kurd ên berxwedêr werdigirtin. Hinek jin jî bi xwendina romanên li ser jiyana jinên şoreşger li Rûsyayê an jî bi çalakiyên jinên Filistîn û Cezayîrê li dijî dagirkeriyê îlham digirtin. Lê belê êdî gelek jinên ciwan herî zêde sirûş ji kesayet, têkoşîn û jiyanên jinên şoreşger ên Kurdistanê digirtin û dibûn hevparên jiyana wan. Bi vî rengî aso û rêyên nû li pêşiya jinên Rojava vebûn. Dema ku yek jina ciwan gavên wêrekî avêtin, xwe ji rist û kevneşopiyên zayendperest veqetand û rêyên nû kifş dikirin, bilezûbez çend jinên dîtir jî li pey wê diçûn. Bi vî rengî birêxistinbûn û tevlîbûna jinan a nav xebatên şoreşê li her navçeya Rojava gav bi gav bi pêş diket. Jinan him ji pêşketinên şoreşê hêz digirt, him jî hêz didan şoreşê.

"Heta derketina PKK'ê jinên di şoreşa Kurdistanê de pirr derneketibûn pêş. Rista keç û jinê xizmetkirina malê bû. Keç ji bo zewac û dayiktiyê dihatin amadekirin. Yê ku herî zêde bandora xwe wekî jin li ser civaka Rojava kiribû, Leyla Qasim bû. Dema ku Leyla Qasim di sala 1974'an de şehîd ket, gelek malbatên Rojava navê keçên xwe kirin Leyla. Ji Dêrikê heta Efrînê, navê gelek keçên vî nifşî Leyla ye. Wê demê, di gelê Kurd de hişyarbûnek çêbû û digotin, 'keçên Kurd jî dikarin şerê dewletê û desthilatdariyê bikin'."[283]

Dîsa derketina her jina ciwan ji nava pergala malbatê, wekî şoreşeke di nava şoreşê de bû. Bi danasandina doza PKK'ê û birêxistinkirina gelê Rojava li ser bingehê welatparêzî, mîlîtanên destpêkê, têkoşînek li hemberî bindestkirina jinê jî da destpêkirin.

Şervîn Dêrik rave dike ku vê helwestê hêz daye jinê da ku li mafê xwe bigere: *"Li ser vî esasî bi sedan hevalên me li hemberî malbat û civaka xwe serî hildan û ketin nav refên PKK'ê de. Di destpekê de civakê ew guhertinên hanê nedipêjirandin. Derketina jinê a ser çiyayî rastî hesasiyeta Kurdîtî dihat. Nêrînên wiha hebûn: Jin namûsa me ne. Pêwîst e em wê biparêzin. Civakê bawerî pê nedianî ku jin bi serê xwe wê li her derê bigere û 'tiştekî xirab' neke. Lê dema ku mirovan didît ku jina şoreşger a Kurd dev ji hemû berjewendiyên xwe yên şexsî berda, vê guhertinek di wijdanê civaka Kurd de da çêkirin. Lêpirsînên li ser nêrînên zayendperest di derheqê jinê de bi pêş ketin. Bi taybet, şehadetên jinan bandoreke mezin a manewî li ser civakê ava kiriye. Hêdî hêdî civaka Kurd ber bi vekirinê ve çû."*[284]

[283] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

[284] Hevpeyvîn bi Şervîn re, Dêrik, 2017

Di serî de malbatên welatparêz li Rojava mîlîtantiya jinê di kesayetên jinên PKK'ê de nas kirin ku di salên 1979 – 1982'yan ji Bakurê Kurdistanê derbasê Rojava bûne. Tê gotin, di nav mîlîtanên destpêkê yên PKK'ê de 17 jin hebûn ku di ser Rojava re derbasê Libnanê bûne. Di nav wan de şehîdên jin ên destpêkê yên wekî Sultan Yavuz (Leyla), Xanim Yaverkaya, Rahîme Kahraman (Saadet), Saîme Aşkin (Delal) û Çîçek Selcan hebûn. Ew di sala 1982'yan de beşdarî bernameya perwerdeyê ya yekem a akademiya navendî ya PKK'ê bûn.

Komên lêhûrbûnê ku ji 4 – 5 mîlîtanên jin pêk dihatin jî li cem malbatên Kurd li Beyrûd û Şamê diman û xwe perwerde kirin. Wan bi taybetî li ser mijarên elaqedarî jin û şoreşê lêkolîn û nîqaş meşandin. Bi vî rengî wan xwe ji bo pêngava vegera welat û erkên gerîlatiyê amade dikir. Her wiha gelek mîlîtanên jin ku ji seha perwerdeyê derbasê xebatên civakî li Rojava, Bakur û Başûrê Kurdistanê dibûn yan jî li benda rêya tevlîbûna nav refên gerîla dibûn, li cem malbatên welatparêz li tevahiya herêmên Rojava mabûn. Nexasim seknên bixwebawer yên şoreşgerên jin ku li ber destê Abdullah Ocalan perwerde bûbûn, bala gel dikişand. Her yekê ji wan jinan, bandoreke mayînde di civakê de hiştiye û pêşiya tevlîbûn û birêxistinbûna jinên wê herêmê vekiriye.

Şehîd Bêrîvan (Binevş Agal) yek ji wan mîlîtanên jin ên destpêkê bû ku bandoreke mezin li ser civaka Rojava kiriye. Binevş Agal ji malbateke Êzdî bû û ji Bakurê Kurdistanê koçberê Elmanyayê bûbû. Di destpêka salên 1980'yî de ew tevlî çalakî û xebatên Tevgera Kurd li Ewropayê bû. Bi xwesteka vegera welat û tevlîbûna nav şerê gerîla, ew sala 1985'an hatiye sehaya Rojhilata Navîn. Piştî şehadeta wê di Çilê 1989'an de ew wek 'Hevala Bêrîvan' û pêşenga serhildanên gel li Cizîra Botanê hatiye nasîn.

Lê beriya ku derbasê Bakur bibe, wê di salên 1986-88'an de li navçeyên Cizîra Rojava hemûyan weke li Serêkaniyê, Dirbêsî, Dêrik, Rimêlan, Girkêlegê, Tirbespiyê û Hesekê bingehekî xurt û mayînde yê Tevgera Azadiyê di nav gel de birêxistin kiriye. Gelê Rojava ew bi navê 'Hevala Salîha' nas kir û jê gelekî hez kiriye. Li her cihê ku lê mabû, wê cara yekem civînên jinan li dar xistin û komîteyên jinan ava kirin. Bi sekna xwe ya dilnimz, bi biryardarî û fedekariya xwe, di temenê xwe yê ciwan de ew bi rista pêşengiyê rabûye. Wekî otorîteyeke xwezayî 'Hevala Salîha' dilê tevahiya civakê – jin, zilam, zarok, ixtiyar, Misilman û Êzdî – qezenc kiribû. Him li herêma Cizîrê ya Rojava him jî li Cizîra Botanê wê yekser rêya tevlîbûna nav refên şoreşê li pêşiya gelek jinên ciwan vekir. Gelek xebatkarên jin yên ku Binevş Agal ew wê demê bi rêxistin kiriye heta roja îro karê xwe yê rêxistinî bi kelecan û hezkirina mezin dimeşînin.

Rêhevalên wê wateya kesayet û têkoşîna Binevş Agal di nav civaka Rojava de ji bo bipêşketina têkoşîna neteweyî û azadiya jinê bi van gotinan tînin zimên: "*Serokatiyê Hevala Bêrîvan erkdar kiribû. Dema ku ew derbasê qada Rojava bû, li tevahiya navçeyên Cizîrê digere, heta diçe Kobanê û Efrînê. Wê giraniya xwe wekî hevaleke jin dida nîşandan. Bi gel re li ser siyasetê nîqaş dikir. Bi zilamên ixtiyar yên rûspî û feodal re li ser civakbûnê nîqaş dikir. Her kesî şok derbas dikir. Hatina Hevala Bêrîvan a Rojava hiştiye ku tevlîbûna hevalên jin ji şoreşê re zêdetir bibe. Belkî wê demê zanebûna azadiya jinê ne pirr zêde di pêş de bû. Lê zanebûna azadiya welat dihişt ku him keç him jî xort amade dibûn û dixwestin ji bo azadiya welatê xwe biçin şer bikin."*[285]

Şehîd Bêrîvan di nav civaka Kurd a Misilman û ya Êzdî de xebat dimeşand. Ew bi malbatên herdu baweriyan re dima û jê dihat hezkirin. Jinên ji Hesekê, Tirbespiyê, Girkêlegê û Dêrikê hemfikr in ku Şehîd Bêrîvan di civaka Rojava ya giştî de ruhekî neteweyî daye avakirin û pêşengiya lipeyxwehiştina zêhniyetên olperest dikir. Li tevahiya navçeyên ku lê mabû, girîngiyeke mezin daye rûniştandina pergal û çanda Partiyê. Ruxmê ku di wê demê de hîna rêxistinbûna xweser a

[285] Hevpeyvîn bi Şervîn re, Dêrik, 2017

jinan bi fermî nehatibû ragihandin jî Şehîd Bêrîvan civîn û perwerdeyên taybet ji bo jin û keçan li dar dixistin. Bi nîqaşên li ser mînakên jiyanê, wê hewl dida vîna jinan, hêza wan a nirxandin û qenehkirinê xurt bike.

Yadê Suad ku pê re li herêma Dêrikê xebat meşandiye, dibêje, "*Di dawiya sala 1985'an û destpêka 1986'an de Hevala Bêrîvan li vir bû. Em bi hev re diçûn. Wê gund gund, bajar bajar mal vedikirin. Malên vê herêmê hemû malên Hevala Bêrîvan in. Sekna Hevala Bêrîvan me ji xwe re esas girt. Wek, zarokek çawa bi gotinê dayika xwe mezin dibe, em jî bi gotinê Hevala Bêrîvan fêrî PKK'ê bûn. Wê digot: 'Hûn li kû bibînin ku du jin ketine qirka hev, gerek hûn biçin helwesta partiyê nîşan bidin. Îd [cejn], şîn, seyran li kû hebe, gerek hûn biçin wir. Rastî, heqîqet û çanda şoreşê hûn bi wan bidin naskirin. Ger ew me ji derî re bavêjin, gerek em jî di şibaka [pencereyan] re dîsa biçin. Miletê me di bin zilma dewletê de maye û jin di bin zilma zilam de maye, lewma xwe nas nekiriye. Gerek em rastiyê bi wan bidin naskirin."*[286]

Gelek jinên ciwan ku tevlî wan civînan bûbûn, Şehîd Bêrîvan ji xwe re mînak digirtin û dixwestin tevlî rêxistinê bibin. Lê wê di serî de jinên ciwan erkdar dikirin da ku ew beriya tevlîbûna nav refên şoreşê, malbatên xwe îqna bikin. Wisa Şehîd Bêrîvan dixwest pişgiriya malbatan bi biryara zarokên wan û tevgerê re misoger bike.

"Hevala jin ku em herî pê bandor bûn di 1988'an de Hevala Bêrîvan bû. Birayê min yê ji min meztir li Helebê heval nas kirin û fikrê wan derbasê malbatê kir. Birayê min bi me re pirr nîqaş dikir. Wî got, 'Keç jî di nav şoreşê de hene. Hûn jî dikarin tevlî bibin, têkoşînê bikin. Qebûl nekin ku bizewicin û malekî piçûk çêkin!' Di serî de me bawer nedikir, ji ber hevalên ku me heta wê demê dîtibûn hevalê xort bûn. Ji bo me iqna bike ku hevalên jin jî hene, birayê min şevekê bi Hevala Bêrîvan re hat mala me. Dema ku me Hevala Bêrîvan bi hevalê xort re bi hev re dît, ji me re balkêş dihat. Em piçûk bûn. Em derdora wê civiyan. Em ecêb mabûn, bi uslûb û sekneka wê ya xweş, bi cilê wê yên xweşik. Me digot, 'Em bikevin berîka wê de. Em nema di malê de bimînin.' Bêrîvan yekemîn hevala jin bû, min dît. Dîtina wê hişt ku ez di zarokatiya xwe de bikevim nav hinek nakokiyan de. Dema ez mezin bûm, ev nakokî jî bi min re mezin bûn. Di salê 1990'î de min ji hevalan re got, 'ez jî dixwazim tevlî bibim!'."[287]

Şehîd Mizgîn (Gurbet Aydin) bi pirrengîbûna kesayet û têkoşîna xwe ne tenê li Rojava lê bi gelemperî di avakirina bingehê Tevgera Azadiya Jinê de risteke wê ya pêşeng hebûye. Wê bi dengê xwe yê xweş û tijî bi stranên resen û şoreşgerî yên Kurdî, xitabî hestên gel dikir û wekî 'Hozan Mizgîn' jî hatiye nasîn. Di sala 1992'yan de Hozan Mizgîn wekî fermandara gerîla li herêma Xerzan a Bakurê Kurdistanê di şerekî li dijî arteşa Tirk de şehîd bûye. Beriya şehadeta xwe, ew di gelek waran de bû xwedî kedeke mezin.

Di salên 1980'yî de Hozan Mizgîn him bi zindîkirin û sazbûna xebatên çand û hunerê Kurdî him jî di têkoşîna azadiya jinê de erkên dîrokî pêk anîne. Ew beşdarî yekem kongra damezrandina Yekîtiya Jinên Welatparêz ên Kurdistanê (YJWK) li Ewropayê bûye. Piştî ku li ber destê Abdullah Ocalan li Libnanê perwerde bûbû, Hozan Mizgîn di salên 1987-88'an de xebatên civakî li Rojava û

[286] Hevpeyvîn bi Yadê Suad re, Dêrik, 2017

[287] Hevpeyvîn bi Necbîr re, Tirbespiyê, 2017

Şamê jî meşandine. Dayikên welatparêz yên ji Qamişloyê dibêjin, Hozan Mizgîn ji bo perwerdekirina civakê bûye xwedî kedeke mezin. Pê re, wê dixwest çanda xwendina pirtûkan di nav jin û ciwanan de bi pêş bixe da ku zanebûn û meraqa wan a naskirina dîrok û çanda wan bi pêş bikeve. Xebatên perwerdeyê ji bo gelek jinên nexwende wekî tiştekî nû yan jî zehmet dihat ditîn. Lewma Hozan Mizgîn rêbazên nû yên dewlemend bi pêş dixistin ji bo ku bikare hezkirina jinê ya perwerde, têkoşîn û zanistê bide avakirin.

Diya Ciwan bi Hozan Mizgîn re li Şamê xebat ji bo birêxistinkirina jinan meşandiye. Diya Ciwan, şêwaza encamgir a Şehîd Mizgîn ku hêz daye jinê û pêşî li guhertinên civakî vedikir, wiha tîne bîra xwe: *"Di sala 1987'an de ez tevlî kar û xebatê jinê bûm. Ez diçûm, min jin kom dikirin ji bo civînê. Lê kes nedihat. Wê demê Hevala Mizgîn got, 'Em ê ji jinan re bêjin: Werin sohbetekê, em ê strana bêjin.' Em bi hev re diçûn malan. Kêfa jinan gelek dihat. Wê demê bi stran û axaftinan em gihandin gelek jinan ku me karibû nêzîkê xwe bikin. Jixwe, hezkirina min ya strana ji zarokatiyê ve heye. Lê pîrka min ji min re digot: 'Guneh e ku tu strana bibêjê. Wê alem bejê, keça wan dîn e.' Lê Hevala Mizgîn pêşiya min vekir. Ez ji Koma Berxwedan fêrî strana dibûm. Dema ku Hevala Mizgîn hefle [şahî] çêdikir, ez jî diçûm."*[288]

Şehîd Jiyan (Yildiz Durmuş) bi sekin û xebata xwe li herêma Efrînê û Helebê gelek qalibên kevneperest û zayendperest şikandine, pêşî li guhertinên civakî û tevlîbûna nav refan a şoreşgerên jin vekiriye. Wekî birayê wê Mehmed Hayri Durmuş wê jî baweriya xwe bi şoreşgeriya PKK'ê dianî û li dijî faşîzma Tirkiyê têdikoşiya. Piştî darbeya 12'ê Îlonê, Yildiz Durmuş jî hatibû girtin û 3 salan li girtîgeha Xarpetê li dijî êşkenceyên giran li ber xwe dabû. Piştî ku ji girtigehê hatibû berdan, wê berê xwe da xebatên yekîneyên propagandayê yên çekdarî û dûvre çûye seha perwerdeyê, cem Abdullah Ocalan li Libnanê.

Ji wir, Yildiz Durmuş derbasê nav xebatên gel li Rojava bûye. Ji sala 1984'an heta 1987'an wê li herêma Efrînê û Helebê civak li gorî pîvanên çanda welatpareziya demokratîk û azadiya jinê perwerde û bi rêxistin dikir. Jinên Efrînê ku bi Yildiz Durmuş re xebat meşandine, dibêjin, wan ji helwestên wê yên zelal û radîkal hêz digirt. Bixwebaweriya wê, wekî mîlîtaneke pêşeng a jin bal dikişand, bawerî û bixwebaweriya gelek jinan xurt dikir.

Bi vî rengî Yildiz Durmuş bingehekî xurt ê bîrdozî û rêxistinî ji bo avakirina tevgera azadiya jinê li herêmê danî. Bandora kesayeta wê pêşiya tevlîbûnên nav refên PKK'ê yên destpêkê yên jinan ji herêmên Efrîn û Helebê vekir. Yek ji wan jinên ku bi rêya Yildiz Durmuş tevlî nav refên PKK'ê bûye, Şehîd Şîlan Kobanê bû. Bi ser de ked û şehadeta Yildiz Durmuş bûye sedem ku gelek jinên ciwan û dayik tevlî nav xebatên siyasî û civakî bibin û heta roja îro jî ew xebatên xwe didomînin.

III. 3.3. Bandora Tevlîbûna Jinên Pêşeng li ser Civaka Rojava

Têkoşîn, jiyan û şehadetên destpêkê yên mîlîtanên jin di nav refên PKK'ê de rêyên nû li pêşiya jinên ciwan li herêmên Rojava hemûyan vekirin. Her wiha ji sala 1985'an û pê ve, êdî jinên ciwan di nav civaka Rojava bixwe de derketin û rêya şoreşgertiyê hilbijartin. Malbat û civak li hemberî tevlîbûna jinên ciwan heyirîn yên ku wan berê wekî cîran, xwuşk an jî xwendekara dibistanê nas dikir. Van tevlîbûnên nav refên PKK'ê yên jinan bandoreke taybet çêkir ji ber ku pirraniya jinên ku

[288] Hevpeyvîn bi Diya Ciwan re, endama Kongra Star, Dêrik, 2017

li şûna zewac û rista jina malê, rêya têkoşîna azadiyê bijartin ew jin bûn ku di nav malbat û civaka xwe de herî zêde dihatin hezkirin û rêz ji wan re dihat girtin.

"Nivşa yekem ku fikra Rêber Apo ji gelê Rojava re da nasîn, pirranî hevalên jin yên ji Bakur bûn. Danûstandina wan di civakê de û civînên ku wan bi jinan û gel re çêkirine bandorek mezin ava kirine. Xebat û kesayetên van hevalan wekî pîroz hatine dîtin. Axaftin û xîtabeta wan, welatparêzî û cesareta wan bala mirovan dikşand. Lê pirr zû hinek hevalên jin ên civaka Rojava jî ev fikir qebûl kirine û bi wan hevalan re tevgeriyane.
Nasnameyên hevalên ku ji dervê dihatin, veşartî bûn. Kesekî nizanibû ew keça kê ye, ji kîjan malbat an eşîrê ye. Lê dema ku heval ji civaka Rojava bi xwe derketin, vê bandorek cuda çêdikir. Êdî gel dît ku jinên ji nav malbatên ku tên zanîn, derdikevin û beşdar bibin. Bi naskirina fikrên Serok Apo re lêgerînên wan ên azadiyê pirr xurt bûne. Wan wekî pêşeng di nav civakê de xwe da qebûlkirin."[289]

Di destpêkê de şoreşgeran heman cilên weke yên gundiyên herêmê li xwe dikirin ji bo ku civak wan qebûl bike û aydê xwe bibîne. Ji bo şoreşgerên jin bikarin ji rêxistinê re deriyên nû vekin da ku fikir û felsefeya tevgerê bikarin bi civakê re parve bikin, wan li gorî rêûresmên civakî heta demekê cilên dirêj lixwedikir û destmal dida serê xwe. Mîlîtanên jin bi vî rengî ne tenê xwe û mirovên ku pê re têkiliyên rêxistinî ava kirine li hemberî zextên dewletê diparastin. Di heman demê de wan îhtîmala astengên şeklî ji holê rakir da ku karibin têkilî û danûstandinên cewherî ava bikin.

Dîsa derçûna jinên ciwan ji nav civakîbûneke ku heta wê demê girîngî nedabû bi gotin û vîna jinê, ne tiştekî hêsan bû. Feraseta feodal ku jin kiribû namûsa malbat û eşîrê, wekî nirxa herî girîng û tabû hatiye dîtin ku destnedayî ye û nayê nîqaşkirin. Derketina keç yan jî jinekê ji derveyî serwerî û kevneşopiyên malbatê, di nav civakê de wekî rûreşiya herî mezin dihat hesibandin. Lewma, gelek malbatên welatparêz ku bi keda xwe û baweriya xwe piştgirî dana Tevgera Azadiyê zehmetî kişandin dema ku keça wan biryara tevlîbûna nav refên şoreşê dida. Li gorî taybetmendiyên çanda civakî û malbatî, bandora ol û eşîrtiyê li herêmên Cizîrê, Kobanê û Efrînê tevlîbûnên jinan bi astengiyên cuda çêdibû, bertek û bandorên cuda bi xwe re dianîn. Lê belê em dikarin bibêjin, bi tevlîbûnên jinê ya nav refên tevgera PKK'ê re feraset û kevneşopiyên zayendperestiya civakî ya 5000 salan di nav civaka Kurd de hatin hejandin. Gelek jinên ku pêvajoya Tevgera Azadiya Kurdistanê di salên 1980'yî de ji nêz ve şopandin, dibêjin, "*jinên Rojava di nava PKK'ê de çirûskek dît û xwe pê girt. Di encamê de êdî pêlekê tevlîbûnê bi pêş ket."*[290]

a) Herêma Efrînê

Serê pêşî jin li herêma **Efrînê** tevlî nav refên PKK'ê bûn. Ji sala 1985'an ve jinên pêşeng ên wek **Rûken** (Xalîde Hesen), **Fîdan** (Zeyneb Silêman), **Ezîme** (Emîne Osman), **Perwîn** (Semîra Mustefa), **Nêrgiz** (Aysel Elî Ebdo) û **Jiyan Efrîn** (Leman Silêman) jiyana şoreşgertiyê bijartin. Her wiha li herêma Şehbayê tevlîbûna **Şehîd Canda** di sala 1990'î de bandoreke mezin li ser gel çêkir û bûye sedema tevlîbûna bi dehan jinên ciwan yên wê herêmê. Heta roja îro, ew bi kesayet, xebat û şehadeta xwe ve wekî mînakên jinên mîlîtan di nav civaka Rojava de tên bibîranîn.

[289] Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

[290] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

Di çanda Efrînê de ferasetên zayendperest, olperest û eşîrî li gorî herêmên din ên Rojava hinekî nermtir in. Dayik jiyana civak û malbatê dimeşînin. Ji ber ku gelek jinan çandinî kiriye û bi aboriyê re mijûl bûne, li gotina wan tê guhdarîkirin. Lê li hinek cihan nêzîkatiyên zilam û kevneşopiyên malbatî jî hişk û serwer in. Him otoriteya xwezayî ya jinê û vekirîbûna civakê, him jî têkiliyên nêz bi bajar û xwendekarên zanîngeha Helebê re hingê di salên 1980'yî de hinek firsend ji bo lêgerînên nû yên jinên Efrînê diafirandin. Wiha, tovên şoreşgeriya jina Kurd ku bi pêşengiya Şehîd Jiyan (Yildiz Durmuş) li Efrînê hatine reşandin, zû berhem dan.

Şehîd Fîdan Efrîn (Zeyneb Silêman) piştî ku bawernameya xwe ya dibistana amedehî girtibû, sala 1985'an ji jiyana malbatê vediqete û wekî şoreşgerekê tevlî nav refên PKK'ê dibe. Di serî de ew li Efrînê dimîne û li vir gelek kedê dide xebatên birêxistinkirin û perwerdekirina jinan. Salekê paşê Fîdan diçe Akademiya Mahsûm Korkmaz li Libnanê. Piştî perwerdeya xwe, ew dîsa vedigere Efrînê. Heta sala 1990'î ew di gelek waran de pêşengiya xebatên Tevgera Azadiyê li herêma Efrînê dike. Bala civakê dikişand ku kesayeta wê ya bihêz bi biryara xwe ya şoreşgeriyê re hîn zêdetir bi pêş diket. Piştî perwerdeya xwe ya duyemîn a li Akademiya Mahsûm Korkmaz, xeyala Fîdan pêk tê û ew wekî şervaneke gerîla diçe çiyayên Bakurê Kurdistanê. Di 14'ê Gulana 1991'ê de Fîdan tevî 6 hevrêyên xwe di şerekî giran ê li dijî arteşa Tirk de li çiyayê Engîzekê şehîd dibe. Him bi jiyan û têkoşîna xwe, him jî bi şehadeta xwe ve Şehîd Fîdan ji bo gelek jinên Efrînê bûye mînak û çavkaniya bixwebaweriyê.

Şehîd Rûken Efrîn (Xalîde Hesen) jî wekî yekê ji jinên şoreşger yên destpêkê yên herêma Efrînê tê naskirin ku bi kesayet û sekna xwe di nav gelê Rojava de jê hatiye hezkirin. Wê şopa xwe ne tenê li Efrînê hiştiye. Di sala 1987'an de ew wekî mîlîtan tevlî nav refên PKK'ê dibe. Piştre ew ji bo xebatên rêxistinê diçe herêma Cizîrê. Şehîd Rûken demeke dirêj li bajar û navçeyên Qamişlo û Amûdê xelkê û bi taybetî jî jinan bi rêbazên dewlemend bi rêxistin dike: Gund bi gund civîn û nîqaşên bi jinan re çêdike; jinên ciwan teşwîqê xwendina pirtûkan dike û pêşpirkan ji bo komkirina alîkariyê bi rêxistin dike. Rêbazên wê, dihelin ku jin armanc û bîrdoziya PKK'ê nas bikin û xwesteka wan a tevlîbûna nav refên ê bi pêş bikeve. Bi şêwaz û uslûba xwe ya germ, ew gelek têkiliyên dostane ji bo tevgerê ava dike.

Rûken di nav gel de bi rengekî dilnizm dijiya. Ruxmê ku gelek malbatan ew baş nas kirin û wekî 'keça xwe' hesibandin jî, ti kesî wê demê nizanibû ku Rûken ji Efrînê ye. Ew wekî şoreşgereke profesyonel tevdigire. Bi kesayeta xwe wê di dilê dayik û jinên ciwan de Tevgera Azadiyê jî da hezkirin. Piştî ku Şehîd Rûken wekî şervana gerîla çû çiyayên Bakurê Kurdistanê jî dayikên herêma Cizîrê her tim bibîranînên xwe li ser Şehîd Rûken parve kirine. Di 15'ê Cotmeha 1989'an de Şehîd Rûken li herêma Gabar a Botanê di şerekî li dijî arteşa Tirk de jiyana xwe ji dest dide. 24 salan piştî şehadeta Rûken Efrînê, yekîneyên xweparastina jinê yên ewil li Efrînê bi navê wê tên avakirin.

b) Herêma Kobanê

Li herêma Kobanê tevlîbûnên destpêkê yên **Dîcle Kobanê** (Eyno Miho) û **Şîlan Kobanê** (Meysa Bakî) gelekî deng vedaye û wan dîrok nivîsand: "*Li Kobanê nêzîkatiyeke feodal û mantiqê eşîrî serwer e. Ol bandora xwe li ser kiriye. Nêzîkatiyeke hişk heye. Encax di demê şoreşê de li Kobanê*

hinek guhertin çêbûn. Berê dema ku mêvanek dihat, jinê nikaribû biçe cem wî. Heta dema ku xwarin dianîn, jin tenê dihatin heta ber derî. Zilaman xwarin digirt û daniye ber mêvanan. Malbat keç pirr kêm dişandin dibistanan. Tenê belkî heta refê 6'an ji ber ku dewletê mecbûrî kiribû. Lewra hejmara xwendevanên jin li Kobanê pirr kêm bû. Ruxmê ku piştî tevlîbûna Hevala Dîcle ewqas tevlîbûn çêdibûn, dîsa di tevlîbûna her keçê de malbat pey diket û wekî meseleya namûsê didît. Hinek malbat dihatin serî li Partiyê dixistin û digotin: 'Keçên me bidin me. Cem me tiştek pirr eyb e dema ku keç ji malê diçin'."[291]

Şehîd Dîcle Kobanê (Eyno Miho) di sala 1968'an li gundê Korelî yê Kobanê ji dayik bûye û li malbateke welatparêz mezin dibe. Ew dibe yekemîn jina ji Kobanê ku li hemberî ferasetên paşverû û zayendperest hemûyan serê xwe radike û sala 1987'an rêya xwe wekî jineke şoreşger hildibijêre. Hingê ne pêkan bû ku jinek bi serê xwe dev ji malbata xwe berde û tevlî rêxistinê bibe, bêyî ku xetera kuştinên namûsê çêbe û helwestên dijwar ên eşîrî li dijî malbatê bên nîşandan. Lewra, wê bi pismamê xwe re li hev dike ku ew ê zewaceke şeklî çêkin û di cih de herdu tevlî nav refên PKK'ê bibin.

Gulsum, xwuşka Dîcle, rojên zaroktiya xwe tîne bîra xwe: *"Dîcle ji min piçûktir bû. Ew piçûka diya me bû, şîrîn bû. Me ji hev du gelek hez dikir. Ew ji xwendinê û ji hevalan jî gelek hez dikir. Heya refê 6'an me mekteb dixwend. Dikaneke me hebû. Me xwarin bi dizî ji wê derê ji bo hevalan dianî. Wê çaxê zilm pirr bû. Eşîrtî hebû. Ji bo gotinek neyê ser keçikan, nedihiştin ku em derkevin. Wilo Dîcle dane pismamê wê. Dane wî, lê nezewicî, hev du nebirin."*[292]

Di nav hevrêyên Şehîd Dîcle de bûyera zewacê bi vî rengî tê zanîn: "*Hevala Dîcle ji Kobanê di roja daweta xwe de beşdar bû. Ji aliyê eşîran ve nehatibû qebûlkirin ku jin beşdarê tevgerê bibin, gund gund bigerin û di nav gel de civînan çêbikin. Ev hemû zehmet bû. Hevala Dîcle bi kurmamê xwe nîşan kiribûn. Lê di roja xwe ya dawetê de herdu bi hev re derketine û tevlî Partiyê bûn. Ji bo ku civak nikaribe tiştekî li ser wan bêje."*[293]

Gulsum şêwaz û bandora tevlîbûna xwuşka xwe wiha şirove dike: "*Bavê min bendê nebû ku derbikeve. Lê malbata min, birayê min dengê xwe nedikirin ku ew tevlî hevalan bû. Min jî dengê xwe nedikir. Zaten tevlî bû. Lê eşîr, apê min û wan nedixwestin. Birayê min jî xwest tevlîbibe. Lê ew wahîd bû. Eşîrê zilm lêkir. Digotin 'bila nerin'. Apê min diqehiriya, pismamê min diqehiriya: Qîzeke wilo çawa tevlî partiyê bibe, bi hevalan here û were... Çênabe! Kengê Dîcle tevlî bû, ew êdî pirr nedihat mala me. Hevala Dîcle sê salan cem Serok li Libnanê û demekê jî li Şam û Helebê ma. Li Helebê ew cem Hevala Şîlan jî dima. Ew jî mirovê me ye û pirr zane bû."*[294]

Jinên welatparêz ku bûn şahidê xebata Hevala Dîcle li Şamê, bi rûmetdarî bandora wê li ser jin û civaka Kurd şirove dikin. Kesên ku ew nedîtibûn jî ji ber şêweyê tevlîbûnê, navê wê bihîstine. Şehîd Dîcle li hemberî van nêzikatî û kevneşopiyan têdikoşiya ji ber ku ji bo jinê her tişt wekî 'şerm' didîtin. Li gelek taxên Heleb û Şamê wê civînên taybet ji bo jinan li dar xistine. Wê demê, bi tenê derketina ji malê, li hev kombûn û hatina li gel hev a jinan hêzeke mezin dida jinê. Wiha manewiyateke bilind di têkiliyên di navbera jinan de hat avakirin. Jinan bi xwe ewlekariya civînan

[291] Çavkanî li heman cihî

[292] Hevpeyvîn bi Gulsum re, xwuşka Şehîd Dîcle, Kobanê, 2017

[293] Çavkanî li heman cihî

[294] Hevpeyvîn bi Gulsum re, Kobanê, 2017

misoger dikir. Tirs ji zextên dewletê jî hebû. Li hemberî vê, jin zêdetir bi doza azadiyê ve hatin girêdan û guhertin di jiyana xwe de kirin. Ji vê bi şûn ve li Şamê jî gelek jin tevlî xebatên civakî û 'cebhewî'[295] bûn. Beşek ji van jinan bi rizaya malbata xwe xebatên rêxistinî didan meşandin, beşeke din jî bêyî ku xebera malbatê jê hebe.[296]

Gulsum dide zanîn ku piştî pêvajoya Şam û Helebê xwuşka wê demekê li Kobanê jî xebat meşandiye. Dûvre ew çû Serêkaniyê. Li wir, wê di nav şertên giran de cardin jin û gel bi rêxistin kir. Di dawiyê de xwesteka Şehîd Dîcle pêk hat û ew sala 1989'an wekî gerîla çû Bakurê Kurdistanê. Heman salê, ew li herêma Botanê şehîd bû.

Li ser wê pevajoyê xwuşka wê dibêje: "*Li Serêkaniyê, wê cilê din yên dirêj li xwe dikirin ji bo dewlet bi wê nehese û neyê girtin. Zehmetiya wê pirr bû. Lê wê digot: 'Dema ku ez bikevim, ez ê li ser erdê Kurdistanê şehîd bikevim.' Pirr dem derbas nebû, ew zû li Bakur şehîd ket. Wê demê televîzyona Kurdî tine bû. Tenê ya Tirkî hebû. Me şehadeta wê li ser televîzyona Tirkiyê dît. Digotin leşkeran ew birin doktor: Ka jin e, ne jin e. Derket ku qîz e. Vê çaxê birin, ew bi makîne kaşkirin [kişandin]. Digotin: 'Hûn keçikê Sûriyê pêşiya kamera dibînin...' Wiha me wê di televîzyonê de dît. Hevala Dîcle wilo şehîd bû. Dîtina wê ji bo me pirr zehmet bû. Lê di aliyê exleqê de em gî kêfxweş bûn. Gel jî hemû zanibû ku qîzik e. Cenazeyê wê jî nehat. Li wêderê şewitandin an çi kirin em nizanin. Me nedît. Wê demê merasîmên şehîdan jî tine bûn. Bi dizî hinek kes ji Serêkaniyê hatin mala bavê min û merasîm çêkirin.*

Piştî şehadeta Hevala Dîcle ji eşîra me gelek tevlîbûn çêbû. Meta min û hinek mirovên me yên din jî hemû bûn yek û tevlî partiyê bûn. Birayê min jî çû cem Serok û perwerde dît. Wî ji Serok re got: 'Ez dixwazim tevlî bibim.' Lê Serok qebûl nekir, got 'tu kurê tenê vê malbatê yî û xwuşka te jî şehîd e. Çênabe. Li cihê xwe kar bike û mala xwe ji bo heval û rêxistinê veke.' Diya min û bavê min jî çûn cem Serok. Tev birayê min ew vegerîn û mala xwe ji hevalan re vekirin. Çiqas heval pey Hevala Dîcle dihatin, cem wan diman. Gelek heval bi bandora Hevala Dîcle ji Serêkaniyê tevlî bûn. Niha keça min jî di nav hevalan de ye û navê Hevala Dîcle rakir."[297]

Dema ku me sala 2017'an li navenda Kongra Star a Serêkaniyê hevpeyvînên ji bo lêkolîna vê pirtûkê çêkir, fotografê Hevala Dîcle li ser masê bala me kişand. Dayikên ku pêşengiya avakirina Mala Jinan û Kongra Star li Serêkaniyê kiribûn, hemûyan Şehîd Dîcle nas kiriye û bi serfirazî qala bandora xebat û şehadeta wê dikin ku hêza berxwedanê ya jin û ruhê welatparêzî ya gelê Serêkaniyê xurt kir.

Şehîd Şîlan Kobanê (Meysa Baqî) sala 1971'ê li Kobanê hatiye dinyayê, lê li Helebê mezin dibe. Malbata wê bi ziman û çanda Kurdî dijî û sala 1982'yan şoreşgerên PKK'ê nas dike. Şîlan di temenê piçûk de gelek mijaran meraq dike, bi malbat û hevalan re nîqaş dike. Ruxmê ku dewleta Sûriyê bi kar anîna zimanê Kurdî li cihên fermî qedexe kiriye Şîlan li dijî vê derdikeve û derveyî malê jî bi zimanê xwe yê zikmakî diaxive. Ji ber îsyankariya xwe Şîlan dema ku hîna diçe refa 7'an a dibistanê ji aliyê dewleta Sûriyê ve tê girtin û êşkence lê tê kirin. Bavê wê û hevalên wê jî tên girtin. Piştî vê bûyerê Şîlan êdî fermî dest bi xebatê rêxistinê dike û betlaneyên xwe li Akademiya Mahsûm Korkmaz li cem rêbertî û şoreşgerên PKK'ê derbas dike. Heta ku sala 1988'an wekî

[295] Binêre: Beşa III. 3.4. b) *Jinên Cebhewî* ya vê pirtûkê

[296] Lêkolîna 'Gavên destpêkê', Akademiya Jineolojiyê ya Rojava, 2019

[297] Hevpeyvîn bi Gulsum re, Kobanê, 2017

mîlîtanekê tevlî nav refên PKK'ê dibe, ew li Helebê him xwendina xwe didomîne him jî gel bi rêxistin û perwerde dike. Tevî ku malbata wê pişta wê digire jî Şîlan pê dizane ku biryara wê ya şoreşgeriyê serhildan e li dijî zextên zayendperest û feodal ên civaka Kobanê. Bi hevrêya xwe Dîcle re wan gelekî li ser vê mijarê nîqaş dikirin. Wekî Şehîd Dîcle, Şîlan jî biryareke zelal û xurt dide. Di raporeke xwe ya ferdî de ew wiha dinivîse: *"Jineke ciwan ji Kobanê jî dikare xwe rizgar bike. Ji bo îsbatkirina vê yekê ez dixwazim bi biryar bi pêş ve biçim."*

Hacer Zagrosê sala 1986'an li Zanîngeha Helebê xwendekarên Apocî nas kiribûn. Ew bandora Şehîd Şîlan li ser jin û civaka Helebê wiha tîne bîra xwe: "*Dema ku em behsa Helebê dikin, Şehîd Şîlan tê bîra mirov. Ew beriya min tevlî bû. Piştî ku ez ji perwedeya Akademiya Mahsûm Korkmaz derketim, Serokatiyê vesazbûna min ji bo Helebê çêkir. Serokatî gotibû, 'Tu biçî cihê Hevala Şîlan'. Wê demê min Hevala Şîlan nas kiriye. Ew ji min re dihat sankî ew 30 sal di nav şoreşê de ye. Wê xwe bi civak û erkên xwe re tam kiribû yek. 10 - 15 rojan ew bi min re digeriya. Wê mal bi min dan naskirin, jin û xebatên komîteyan bi min dan naskirin. Ez pirr bi şexsiyeta Hevala Şîlan bi bandor bûm û min gelek jê hez kir. Dema ku min hevalek wiha dilnimz, xwedî nasname, bi zêhniyet û çandeke pirr vekirî dît, min ew ji xwe re mînak digirt.*

Hevala Şîlan ji min re alîkar bû. Ev ji bo min bû wekî perwerdeya li ser sekna jinê. Danûstandinên wê bi gel re ji min re bûn mînakên mezin: Seknê wê pirr mutewazî, lê axaftinên wê pirr mezin bûn. Wê xwe piçûk nedikir. Ew bi bixwebawerî û hurmet li hemberî civakê tevgeriya. Aqil û zanebûna wê pirr mezin bûn. Propagandaya wê jî pirr kûr bû. Wê bi şeklê xwe, bi rûniştin û rabûna xwe jî mirov bi bandor dikir.

Ew diçû kîjan malê, ew mal ji bo şoreşê qezenc dikir. Bi helwestên xwe ew zêhniyeta feodalizmê ya paşverû, zêhniyetê ku hatiye asîmîlekirin, lêpirsîn dikir û di aliyê welatparêzî de bandor dikir. Kîjan zilamê feodal - çi ji Kobanê be, çi ji Efrînê be - li hemberî wê rûniştiba bi bandor dikir. Zilamê Kobanê feodal in, lê Hevala Şîlan bandor li wan jî dikir. Di serî de wê li însanan baş guhdarî dikir, piştre jî hêdî hêdî diket ruhê wan. Ew pirr hêdî û nerm, lê eşkere û giran diaxivî. Uslûba wê ya nerm mirov xweşik lê guhdarî dikir. Wiha wê guhertin di însanan de çêdikirin. Dema ku Hevala Şîlan ji Helebê derket gel her tim behsa bîranînên xwe bi Hevala Şîlan dikir, mînakên wê û rêbazên wê didan. Di Hevala Şîlan de kesayeteke îsyankar hebû. Dema ku jinek îsyankar be, pirr zorahiya jî dikişîne. Gelek êrîş li hemberî wê çêdibin. Lewra Hevala Şîlan gelek caran bû hedefa êrîşên zêhniyeta desthilatdariya zilam. Ew pirr diêşandin. Lê çi kirin jî Hevala Şîlan qet tawîz nedida."[298]

Di payîza 1991'ê de Şîlan Kobanê tevî komeke şervanên nû çû çiyayên Botanê. Tevî ku di serî de zehmetiyan jî dikişîne, wê ji jiyan û hevaltiya gerîla gelekî hez dikir. Ew wekî fermandarekê tevlî pêvajoya avakirina arteşa jinan bûye. Hevrêyên wê dibêjin, hertim wekî jineke mîlîtan, wê erkên pêşengiyê ji bo bipêşketina tevgera azadiya jinê û tevgera neteweyî jî hildigirtin û xeta şoreşger diparast.

"Berê hevalên zilam di têkoşîna leşkerî de em lawaz didîtin ji ber ku fîzîka me lawaz bû. Fîzîka Hevala Şîlan jî lawaz bû. Lê ruxmê vê, bi israra xwe çû Botanê û Zagrosê. Ew çû cihê herî zor û zehmet. 24 saet wê him bi fîzîkiya xwe re şer dikir him jî bi feraset û zêhniyetên zilamtiya desthilatdar re wê şer dikir. Ew her tim bi şervanên xwe re, bi jinê re bû. Ji ber vê wê bi şervanên xwe re têkoşîneke bi bandor li hemberî zilamtiya feodal meşand. Hevala Şîlan kesayeteke

[298] Hevpeyvîn bi Hacer Zagros re, hevseroka Kongra Gel, Qendîl/Başûrê Kurdistanê, 2018

rêxistinkirî û kedkar bû. Wê fikra xwe gelekî bi pêş xistibû. Bandora xwe li ser gel, li ser hevalên jin û hevalên xort jî gelekî hebû."[299]

Bi helwestên xwe yên zelal di mijara azadiya jinê, di parastina xet û nirxên şoreşgerî de Şehîd Şîlan di hemû demên zehmet de hêz û baweriyê di kesayeta xwe û derdora xwe de ava dikir. Bi taybetî piştî komploya navneteweyî ked û têkoşîna wê bi awayekî domdar bipêşveçûna tevgera azadiya jinê li Kurdistanê misoger dikir. Hêzên komploger ji hêz û bandora wê ditirsiyan. Lewma wan Şîlan Kobanê tevî sê hevrêyên wê 29'ê Mijdara 2004'an li ser rêya hatina Rojava di kemîneke nêzîkî bajarê Mûsilê de şehîd kirin.

Şehîd Dîcle û Şîlan herdu ji malbatên naskirî û welatparêz ên Kobanê bûn. Herdu malbat doza Tevgera Azadiyê û fikrên Abdullah Ocalan dipêjirînin û biryarên keçên xwe yên tevlîbûnê watedar dibînin. Ji ber vê, eşîr û civakê gelek zor û zehmetiyan ji wan re çêdikirin. Sedema van dijberî û nakokiyan feraseta hişk a namûsê ye. Ev nakokiya kûr di hestên malbatê di dema şehadeta Dîcle de jî xuya dibe: Li aliyekî têgeha çanda welatparêziya PKK'ê heye ya ku Abdullah Ocalan li ser bingehê hîmên azadiya jinê pênase dike. Li aliyê din feraseta zayendperest a namûsê disêkîne ya ku hebûn û tinebûnê girêdayî serweriya mutleq a zilam li ser zayenda jinê şirove dike. Ruxmê ku malbat dizane ku mebesta dewleta Tirk ew e ku bi êşkenceyên zayendperest jinên Kurd ên şoreşger reş bike, malbat dîsa ragihandina 'bekareta keça xwe' wekî rehetbûnê dibîne.

Her wiha tevlîbûna nav refên PKK ya Şehîd Dîcle û Şîlan, pêşî li nîqaş û lêpirsînên nêzikatiyên feodal û zayendperest di nava tevger û civakê de vekirin. Bi hezaran jin ji Kobanê û her devera Rojava ji wan jinên şoreşger wêrekî wergirt û rêya wan da ber xwe. Yanî Şehîd Dîcle û Şîlan serdemeke nû di têkoşîna azadiya jinên Kurd li Rojava da destpêkirin.

Gav bi gav jinên Kurd û civaka Kurd pêdivî pê didît ku feraseta namûsê ji nû ve pênasê bikin. Dahûrandin û nirxandinên Abdullah Ocalan li ser jin û malbatê di vê mijarê de dibûn hêz û piştgiriya herî mezin ji bo guhertina zêhniyeta kevneperest. Heger îro jinên Rojava dibêjin, '*namûsa me azadiya welatê me ye*' yan jî *'rûmeta me nasnameya me ya jina azad e'* û ji tecawizkaran hesab dipirsin, pêwîst e ku em bingehê van bipêşketinan di tevlîbûn û têkoşînên giranbiha yên Şehîd Dîcle û Şehîd Şîlan de bibînin.

c) Herêma Cizîrê

Tevlîbûnên destpêkê yên mîlîtanên jin ji sala 1987'an û şûn ve li herêma Cizîrê bi taybetî bi bandora kar û xebatên Şehîd Bêrîvan bi pêş ketin. Wê li herêmê rê li ber guhertinên mezin ên civakî vekir. Dîsa nêzîkatiyên şoreşgerên xort ên pêşeng ku ji herêma Cizîrê tevlî nav refên PKK'ê bûbûn wekî pakrawanên azadiyê Îsmaîl (Îsmaîl Îbrahîm), Herekol (Hisên Çawîş), Elî û Xebat Dêrik (Mahmûd Ramazan) ji navçeya Dêrikê; Rûstem Cudî ji Serêkaniyê û Mistefa Gulo ji Qamişloyê bala civakê kişandin. Nêzikatiyên wan ên beramberî jinê di gelek aliyan de ji zilamên din ên civakê cuda bûn. Wek mînak, wan bi jinên ciwan, bi dayik û xwuşkên xwe re li ser siyaset û doza PKK'ê nîqaş dikirin. Bi vî rengî gelek jinên li derdora wan pê hisiyan ku cihê jinê jî di nav têkoşîna azadiyê de heye û doza rizgariya welat di heman demê de doza azadiya jinê ye.

[299] Çavkanî li heman cihîÇavkanî li heman cihî

"Li Cizîrê civakek nîv feodal, nîv burjuwa heye. Gelek malbat hene ku bi navê dayikê tên naskirin. Gotina bav hakim e, lê dayikê jî hebûna xwe parastiye. Dayik karê malbatê û civakî dimeşînin ango dayik û bav bi hevdu re dimeşînin. Ev jî dibe bingehek ji bo hevjiyanê ku bi fikra PKK'ê ve hatiye stirandin. Di nav tevlîbûnên vê herêmê de him hevalên gundî, him yên xwendevan hebûn. Mînak hevalek wek Hevala Şervîn Dêrik di sala 1988'an de zanîngeh li Helebê dixwend. Lê belê zextên feodal li ser jinê nedihiştin ku bi giştî bipêşketina jinê pirr xurt bibe. Belkî di warê hejmara tevlîbûna Partiyê de herî zêde tevlîbûna jinê ji vê herêmê derket. Ji ber ku jinê nakokî jiyan dikir û pêdivî didît ku xwe ji vê serweriya feodal xilas bike. Jin ketin nav hewldanan de ku xwe bigihînin zanebûnê."[300]

Li navçeya **Dêrikê** tevlîbûnên jinên demeke dirêj di nav civakê de xebat meşandî û piştre tevlî nav refên PKK'ê bûn û çûn çiya, bandoreke mezin li ser civakê kir. Jinên şoreşger yên yekemîn ku ji gundekî derketin bi pirranî rastî astengên cûr bi cûr yên malbat yan jî eşîran dihatin. Lê ew bi vîn û israra xwe ketin ser rêya azadiyê. Di pey vê re bi dehan jinên ji heman gundan dihatin. Hinek malbatên welatparêz, êdî keçên xwe bi serbilindî bi rê kirine. Hinek jinên ciwan jî bêyî destûra malbatên xwe derdiketin. Li hinek jinan jî tundî dihat kirin û gef li wan dihatin xwarin, lê dîsa li dijî zor û zehmetiyan hemûyan serî hildan. Helwest û baweriya van jinên pêşeng, bandor kir li jinên ciwan û civaka derdorê jî.

Belkî hinek ji wan bûn jinên ewil ên malbat yan eşîrên xwe ku li dijî gotinên 'mezinan' derketin û biryara rêya jiyana xwe bixwe dan. Lê biryardarî û sekna wan jinên şoreşger helwestên gelek eşîr û malbatan dane guhertin. Her wiha tevlîbûnên jinên ji malbat û eşîrên nas, gumanên civakê di warê kevneşopiyên feodal û olî de kêm kirine. Jinên ku ji Dêrikê tevlî nav refên şoreşê bûne, dibêjin, tevlîbûnên wan 'fermî' hatin çêkirin: *"Heval dihatin malê û malbat iqna dikirin. Hevalên ku tevlî bûn jî îradeya xwe didan xuyakirin. Bi vî rengî qebûlkirinek çêdibû. Dema ku keçikê biryara xwe da, êdî kesekî nikaribû wê bide seknandin. Li hinek cihan nakokî, şer û nîqaş derketin, lê bi pirranî malbat mecbûr diman ku qebûl bikin..."*[301]

Bi vî awayî jinên şoreşger ên wekî **Sozdar, Warşîn, Şervîn, Zelal, Axîn** û **Canda** di salên 1987 – 1989'an de deriyê tevlîbûna nav refên şoreşê ji bo bi sedan jinên ciwan ji malbat, gund û taxên xwe vekirin. Ji vê bi şûn ve, li hinek gundên Koçerata û Beravê yên navçeya Dêrikê, kom bi kom jin tevlî nav refên şoreşê dibûn.

Şehîd Warşîn Dêrik (Meryem Reşîd) yek ji jinên destpêkê ye ku li herêma Dêrikê tevlî nav refên PKK'ê bûbû. Malbata wê pirr oldar bû. Lê belê bi bandora Hevala Salîha (Binevş Agal) sempatiya malbatê ji bo Tevgera Azadiya Kurdistanê çêbû. Wê bavê Warşîn îqna kiribû ku Warşîn tevlî xebatên jinên welatparêz bibe. Lê dema ku Warşîn xwest wekî jineke mîlîtan tevlî nav refên PKK'ê bibe, malbatê gelek nerazîbûnên civakê dîtin. Hat gotin, '*derketina keçekê û şerkirina wê di keleka xortan de haram û şerm e*'.

Ev ji bo bavê Şehîd Warşîn wekî ji bo gelek malbatên welatparêz ên oldar rewşeke pirr giran û bi nakok bû: Li aliyekî wan rêz digirt ji daxwaza tevlîbûna keçên xwe re. Lê li aliyê din di nav civakê

[300] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

[301] Hevpeyvîn bi Sozdar re, Dêrik, 2017

de ew bi rabûna li ber exlaqê olî û feraseta namûsê dihatin tewanbar kirin. Di vê rewşê de bavê Şehîd Warşîn, diçe bi melayekî welatparêz dişêwire. Vî melayî jî rêya Şehîd Warşîn wekî rêyeke pîroz ji bo xwedê û welat nirxand. Şiroveyên bi vî rengî bawerî didan malbata Warşîn û gelek malbatên welatparêz ên Rojava yên oldar da ku ew karibin êdî biryarên keçên xwe yên şoreşger bi serbilindî di civaka xwe de biparêzin. Hecî Emîna ku du keçên wê tevlî nava refên PKK'ê bûne, vê rewşê wekî 'şoreşa zêhniyetê' dinirxîne û dibêje, "*Ger tevahiya keçên min tevlî bibûna, ez ê li pêşiya wan nebûma kelem. Min wisa hîs dikir ku pêwîst e ew rêya me neşopînin. Bila ew di malbatekî teng de nebin. Min çûna wan a çiya û tevlîbûna wan di nava PKK de ji bo wan weke derbasbûna nava azadiyê didît."*[302]

Di sala 1987'an de **Sozdar Dêrik** (Besne Hisên Feqe) ji **gundê Girêsor** pêşengiya tevlîbûnên jinan kir. Ji ber ku malbata wê jî di nav civakê de dihat naskirin, tevlîbûna wê gelekî deng veda. Li pey wê, keçapa wê **Dîlan Dêrik** dihat ku wekî wê demeke dirêj di nav civakê de xebat meşandibû. Hevalên ku bi Şehîd Dîlan re mane, kela canê wê li ser bipêşketina jinê tînin bîra xwe: *"Rojekê, Hevala Dîlan di civînekê de saetekê axivî. Ew li ser vê pirr kêfxweş bû û digot: 'Êdî em baş pêş dikevin!' Piştre, ew derbasê çiyê bû û di avakirina arteşa jinê de cihê xwe girt. Di kongra 1'emîn a jinê de ew wekî endama navenda YAJK'ê hatibû hilbijartin. Piştre ew di şerê bi artêşa Tirk re li eyaleta Xerzanê ya Bakurê Kurdistanê şehîd ket."*[303] Gelek jinên din wek Şehîd Sozdar (Eyşe Ebdulazîz Hecî Mihamed), Şehîd Dîlan (Tolan Sebrî) û Şehîd Şevîn (Xanim Ebbas) bi bandora van jinên şoreşger di salên 1988 heta 1990'î de ji gundê Girêsorê derketin û tevlî nav refên gerîla bûn.

Li **gundê Til Xenzîr** bi pêşengiya **Şehîd Şervîn** (Necah Ebdullah Îbrahîm) gelek mîlîtanên jin ên wek Tekoşîn (Xizne Derwîş Ebdo), Hêvî (Medîne Hecî Yûsif) û Cahîde (Nehîme Omer Îbrahîm) beriya salên 1990'î biryara şoreşgertiyê dan. Ji ber tevlîbûna xurt ya a ciwanên Til Xenzîrê, Abdullah Ocalan navê vî gund guhertiye û navê ***'Girê Şeran'*** lê kiriye. Tevlîbûna nav refan a Şehîd Şervîn ku xwuşka Şehîd Îsmaîl bû û li Helebê zanîngeh dixwend, bandoreke mezin li ser herêmê çêkir. Wê di nav xwendekarên zanîngehê de fikra Apociyan nas kir û dest bi xebatên rêxistinê kir. Şervîn Dêrik, dibû yek ji fermandarên pêşeng ên artêşbûna jinê. Di yekem kongreya Tevgera Azadiya Jinê de ew wekî endama komîteya navendî ya YAJK'ê hatibû hilbijartin. Heta şehadeta xwe di şerekî giran ê li dijî arteşa Tirk de li herêma Kato Marînos a Botanê di payîza 1998'an de ew bi coş û zanebûnê bi erkên xwe yên şoreşgertiyê rabûye.

"Di kesayeta wan hevalên wek Hevala Şervîn, Hevala Sozdar û Hevala Dîlan de taybetmendiyên pêşengtiyê pirr di pêş de bûn. Piştî tevlîbûna wan hevalan, gel êdî nema li hemberî tevlîbûna jinan derdiket. Nêrîneke baş ji bo tevlîbûna jinê çêdibû. Bi derketina jinên şoreşger ji wan malbatan êdî giraniya tevgerê di nav civakê de hatibû avakirin. Bawerî çêbû ku ev têkoşîn wê her tim mezin bibe, fireh bibe û bi pêş ve biçe. Pê re, derfetên nû ji bo jin û rêxistina jinê jî di herêmê de çêbûn."[304]

Gundê Endîwerê jî ku berê xwe dide warê pêşengên şoreşa Kurdistanê, li Cizîra Botan û çiyayên Cudî malovaniya şoreşgeriya jinê dikir. Bi taybetî tevlîbûna nav refan a **Şehîd Sozdar Endîwer** a di sala 1988'an de bandoreke mezin li ser gelê Endîwerê û herêmê bi gişt î çêkiriye. Birayê Şehîd Sozdar dibêje, xwuşka wî, birayê wî Muhiyedîn û pismamê wî Zinar li Helebê dixwendin û li wir

[302] Hevpeyvîn bi Hecî Emîna re, Dêrik, 2018

[303] Hevpeyvîn bi Asya Ebdullah re, Qamişlo, 2017

[304] Çavkanî li heman cihî

bala wan jî çûbû ser PKK'ê: *"Diçûn dibistanê, lê di heman demê de di nava gel de jî dixebitîn. Di sala 1987'an de Şehîd Sozdar pirtûka Rêbertiyê ya bi navê 'Pirsgirêka Kesayetiyê' anî û ji min re xwend. Me xwend û nîqaş kir. Wê pirtûkê gelekî bandor li min kiribû. [...] Piştî tevlîbûna Muhiyedîn û Zinar, mala me ji xwe veguherîbû mala fermî ya PKK'ê. Lehengiya ku Muhiyedîn û Zinar nîşan dan, bandoreke mezin li min kir. Her duyan jî zanîngeh xwendibû, rewşenbîr bûn. PKK tercîh kirin û di vê astê de bi lehengî şehîd bûn. Xwuşka min Sozdar jî, ji ber îxaneta îstîxbarata PDK'ê li Başûrê Kurdistanê şehîd bû."*[305]

Rêhevaleke Sozdar a ku navê wê rakiriye dibêje: "*Hevala Sozdar jî ji malbateke mezin bû û berê xebat di nav civakê de meşandiye. Hevala Sozdar û Hevalê Zinar keçmam û kurmamê hev bûn. Ew dergistiyê hev bûn. Herdu xwendevan bûn û biryara tevlîbûna şoreşê dan. Vê bandoreke mezin li ser civakê çêkir. Hevalê Zinar di xebatên kuryetiyê de di dawiya sala 1989'an de şehîd ket. Hevala Sozdar demekê li herêmê kar dikir. Sekna wê pirr bi hêz bû. Paşê ew derbasê welat bû û pirr zû li herêma Zapê şehîd ket."*[306]

Tevlîbûna jin û mêrên ku dergistî yan jî hevjînên hev bûn, bala civakê pirr dikişand. Biryar û çîrokên wan di civakê de hatin nîqaşkirin û vê jî kir ku wateya zewac û evînê bikeve ber lêpirsînê. Mînakên wan destnîşan kirin ku di bin şertên dagirkeriyê û pergala desthilatdariya zilam de evîn û wekhevî di têkiliyên jin û zilam de nikarin bi pêş bikevin. Lewma ji bo xwegihandina têkiliyên azad û wekhev, jiyaneke nû û têkoşîn pêwîst bûn. Derketina PKK'ê, jiyan û têkiliyên rêhevaltiyê yên ku li gorî bîrdoziya PKK'ê hatin afirandin, ji bo gelek jinan dibûn hêvî û fersendek ya ku wan karibû pê xwe ji bindestî û zexta zewacê xilas bikin.

Di vî warî de Emîne ji bajarê Qamişlo serpêhatiyên xwe parve dike: *"Bavê min mezinê malbatê û êla xwe bû. Em Omerî ne. Çi pirsgirêk heba, xwînî heba, kuştinek heba, bavê min çareser dikir û berpirsiyar bû. Bandora bavê min li ser malbatê hebû. Heke jin biçe sûkê an di nav zilaman de rûne, bavê min ev tişt nedipêjirandin. Min dinêrî, her tişt di destê bavê min de heye. Wilo di piçûkaniya xwe de ez difikirîm: 'Çima zilam dikare her tiştî bike, lê jin çima nikare?' Lê dema heval ketin nava tevgerê min dît ku jin jî di nav de heye û îradeya jinê jî heye. Min got, 'Çima ez jî weke van jinan nebim?' û di sala 1987'an de ez jî bi hevalan tevgeriyam. Malbat ji min re digotin, 'Bizewice!' Lê min ji wan re digot, 'Bila kes behsa zewacê neke!' Min ji bavê xwe re got, 'Heger tu behsa zewacê bikî. Ez nan nadim te. Ez xizmetê ji te ra nakim.' Dema ku xwuşka min ya ji min mestir wê bizewice, bavê min berî rojekê ku wê bibin, gazî wê kir. Wî got, 'Tu wê biçê vê malê û xezûrê te heye, tiyê te hene, xesûya te heye, gelek kes tê de hene. Çi bibê bila bibê, yanî weke zext jî li te were, divê tu bi van kesan re bibî yek. Fikrê te û yê wan neyê li ser hev jî tu yê qebûl bikî. Roja ku tu ji vê malê derkevî, kefenê xwe jî bi xwe re bibe.'*

Min got ku wê sibe ev tiştana li ser min jî werin çêkirin. Min ev zilm qebûl nedikir û ez tevlî tevgerê bûm. Ez jina yekem ji êla Omeriyan bûm. Ez tevlî bûm, lê malbata me dinya xira kir. Digotin, 'Tu çawa bi zilaman re derdikevî û li derveyê malê radikevî?' Lê diya min gelekî bi van tiştan êşiya. Wê digot, 'Heke di demê min de ev tevger heba, ezê jî tevlî bibûma. Tu qet û qet çokên xwe nede erdê!'."[307]

[305] Bêrîtan Sarya: *'Ti tişt nikare li pêşiya karê min ê ji bo gel û Rêberê min bibe asteng'* Hevpeyvîn bi Bavê Fener re, ANF, Dêrik, 13-02-2017

[306] Hevpeyvîn bi Sozdar re, Dêrik, 2017

[307] Hevpeyvîn bi Emîne re, Qamişlo, 2017

Lê Emîne û gelek jinên din ku tevlîbûne, biryara xwe ne tenê wekî xilasbûneke şexsî didîtin. Heta roja îro, gelek jinên ku tevlî nav refên şoreşê dibin, bi vê yeke armanc dikin ku *'jinên din heman êşkence nekişînin'*. Wekî din di çanda mîlîtanan de exlaq û pîvanên jiyana komînal ji nû ve dihatin çandin. Lewma gelek welatparêzên Rojava mîlîtanên Tevgera Azadiyê wekî '*melyaket*' ditînin û bi nav dikirin.

"Me xebat meşandin, ji bo zirar ji civakê negihe jinê. Me ev rastî bi jinê re jî da naskirin. Yanî ne bi carekê, hêdî hêdî. Me pirtûkên Serokatiyê dixwendin û tiştên ku em fêrbûn, me lib û lib bi jinan re parve kir. Wan jî digirtin. Ne weke emirek. Çênabe tu wekî şideta zilam bi ser jinê de here, na. Me jin ava dikir. Em rojane û her dem em di nava milet de bûn. Nîqaşa herî mezin ew bû 'ka çima em Kurdên Rojava tevlî têkoşîna Kurdên Bakur dikin?' Me nîqaş dikir û bi wan dida fêhmkirin. Ji ber ku derfetên me kêm bûn, me pirtûkên ku me xwendibûn dibirin ji malekê re û me digot 'vê pirtûk di mehekê yan jî 15 rojan de bixwînin'. Piştre me dida maleke din. Her tişt bi qîmet û bi pîvan bû.

Ji bo hevalên kadro ne xwarin, ne vexwarin, ne jî kinc girîng bûn. Ya girîng ew bû ku tu tiştê heyî bidî milet. Di seatên xwe yên şevê de tu li ser xwe difikirî û te roja xwe di ber çavan re derbas dikir: Ka te çi kêmasî kirin? Tu di vê malê de hişk axivî yan na? Te muhaseba xwe dikir. Dema ku te dîtiba ku tu bi ser vê jinê yan ser vê malê de hişk çûye yan kêmasiyek derketiba, tu serê sibê careke din diçûyî wê derê û mebesta xwe jê re digot. Kadro bi vî rengî bûn. Kadro wek hunermend bû. Him siyasetmedar bû, him hunermend bû, him mamosteya civakê bû û him jî leşker bû. Mînak, em diçûn malekê û ji me re digotin, 'em dixwazin fêrî Kurdî bibin'. Me li hundirê wê malê perwerdeya zimanê Kurdî bi rêxistin dikir. Karê hemû saziyan me di hundirê wê malê de çêdikir. Bi vî rengî tevger bi xwe mezin dibû. Ew xebata ku dihat kirin, bingehê Şoreşa Rojava ava kir. Heke miletê me perwerde nekiriba, li Rojava ewqas kar nehatiba meşandin, niha ewqas sazî çênedibûn."[308]

Şehîd Adalet (Adalet Boran, navên tevgerê: Bêrîvan, Sultan) di sala 1969'an de li gundekî Siwêrekê li Bakurê Kurdistanê hat dinyayê. Ji ber zextên dewletê û eşîrê, ew tevî malbata xwe ya xizan û welatparêz di destpêka salên 1980'yî de binxet bû, çû Rojava. Li vir, wê dest bi xebatên gel kir û piştî perwerdeya li Akademiya Mahsûm Korkmaz, sala 1988'an tevlî nav refên PKK'ê bû. Wekî mîlîtanekê, wê bi vê şêwaza baldar, kedkar û dilnizm pêşengiya xwendin, perwerde û bipêşketina jinan dikir. Ew diçû serdana jinên li tevahiya taxên Qamişloyê, li wan guhdarî dikir û civînên piçûk li malan li dar dixistin. Komên piçûk ên jinan di heftiyê de carekê her tim li maleke cuda ya taxa xwe kom dibûn û perwerde dibûn. Bi vî rengî têkiliyên civakî û danûstandinên wekî rêxistinbûneke xwezayî di nav jinên Qamişloyê de bi pêş ketin. Jinan hev du naskir û wan hev hîs kir. Vê yeke, bixwebawerî û hevkariya jinan xurttir dikir. Adalet hewl dida ku jinên li her taxê erka xwe bigirin û xwe bi rêxistin bikin. Necah Gulo ji taxa Hilêliyê bibîranînên xwe bi jina şoreşger Adalet re, wiha tîne bîra xwe: "*Hevala Adalet xwest ku ez jî tevlî xebatan bibim. Lê min jê re got ku heya ez fêrî xwendin û nivîsandinê nebim, ez dernakevim. Min nedixwest ku kêmasiyek di karê min de derbikeve. Wilo, Hevala Adalet alîkarî da me û me her heftê carek zimanê Kurdî dibir. Me ji pirtûka Mazlûm Doxan 'Berxwedan jiyan e' perwerdeya xwe dibir. Di sala 1990'an de jî min di vê taxê de dest bi kar kir."*
Li ser xwasteka xwe, Şehîd Adalet di sala 1989'an de derbasê çiyayên Botanê bû. Di demeke pirr kin de wê taybetmendiyên fermandariyê di kesayeta xwe de bi pêşxistin û bi erka fermandariya

[308] Çavkanî li heman cihî

taximê rabû. Di 16'ê Tebaxa 1990'î de ew tevî 6 hevrêyên xwe di şerekî li dijî arteşa Tirk de şehîd bû.

Di heman salê de **Sûriye Xelîl** nav û çeka Şehîd Adalet rakir û di 19 saliya xwe de ji bajarê Qamişloyê tevlî nav refên Tevgera Azadiyê bû. Ew demeke dirêj di nav refên Arteşa Rizgariya Gelê Kurdistanê[309] de li herêmên Botan û Zagrosê têkoşiya. Di bihara 1998'an de Sûriye Xelîl (Adalet Qamişlo) li çiyayê Çarçela di şerekî li dijî arteşa Tirk de şehîd bû.

Li bajar û navçeyên herêma Cizîrê hemûyan ên wekî Hesekê, Serêkaniyê, Dirbêsiyê, Amûdê û Tirbespiyê jî birêxistinbûn û tevlîbûna jinan di dawiya salên 1980'yî de pêşî gav bi gav û piştre pêl bi pêl bi pêş diketin. Heta, jinên ciwan wekî li gundê Etbê yê Tirbespiyê serê salên 1990'î êdî mîna koman soz dan hevdu û berê xwe dan çiyayên Bakurê Kurdistanê. Wan tevlîbûnên girseyî yên jinan guhertinên di rewşa jinê ya gişтî de li Rojava bi xwe re dianîn: Jin êdî ji malê derdiketin, dibûn xwedî îrade, gotin û biryar. Jinan him hêz da têkoşîna azadiyê, him jî wan ji xebatên xwe û pêşketina têkoşînê hêz distand. Em dikarin bibêjin, ev serdem bûye qonaxeke bingehîn ji bo guhertinên civakî di encama bipêşketina têkoşîna neteweyî û ya azadiya jinê de.

Necbîr ji bajarê **Tirbespiyê** tevlîbûna xwe û vê pêvajoyê bi gişтî wekî 'pêngaveke şoreşgerî ya jinê' pênase dike: "*Gelek heval hatin û çûn. Bi riya wan re baweriya min jî çêbû da ku em jî bikarin hin tiştan bikin. Piço piço hevalên keç tevlî dibûn. Ji her bajarekî keçek tevlî dibû, paşî ji gundan jî û bi dehan jin pişt wan re tevlî bûn. Heya salên 1990'î, di sala 1992'yan de di bajarê me yê piçûk de em bîst û heft hevalên jin tevlî bûn. Tevî hevalên jin ku beriya me ji bajarê me tevlîbûn, em dibûn zêdetirî 30 hevalên jin. Tevahiya Rojava bi vî rengî bû.*

Birayê min di 1988'an de tevlî bû. Girêdaneke me pirr cuda wekî xwuşk û bira di navbera me de hebû. Wî gelek tişt dabûn min û min piştre li ser wan mijaran gelek lêkolîn çêkirin. Her ku diçû baweriya min bi tevlîbûnê xurttir dibû. Di sala 1990'î de min ji hevalan re got, 'ez jî dixwazim tevlî bibim.' Bi rastî wî çaxî wan pirr bawerî neda min. Temenê min jî hîn piçûk bû. Zextên dewletê li ser malbatan jî pirr bûn. Dema yek ji mal derdiket, zext li ser malbatê dikirin û hemû dikirin bin çavan. Hevalan wê demê got: 'Temam, bi me re were, heya ku tu biryareke saxlem bidî.'

Salek şûnde di 1991'ê de em êdî bûn komek hevalên jin. Em xwe xwe fêrbûn em çawa xwe birêxstin bikin. Ez wê salê tevlî bûm. Em derdora 16-17 hevalên jin bûn. Heval em hemû kom kirin û ji me re gotin: 'Hevaleke jin û hevalekî xort wê biçin akademiyê gel Serokatiyê. Hûn ê zelal bikin di nav we de wê kî herê.' Ya herî piçûk ez bûm. Lê ez pirr hareketlî bûm. Dibe ku vê bala hevalan kişandibe. Hemû hevalên jin gotin, 'Em dixwazin ku tu biçî'. Bi rastî şansekî dîrokî ji bo min vebû.

Di sala 91'ê de bi temenekî piçûk min berê xwe da sahayekî pirr mezin. Ez şanzdeh salî bûm û min Serokatî dît. Gava min a yekemîn di jiyana xwe ya şoreşgertiyê de min li wir avêt. Tiştên ku Serokatiyê gotiye heya niha ji min re dibûn wek rêgez. Dema em ji perwerdeya Serokatiyê derketin her kes zivirî cihê xwe. Ji ber ku kadro lazim bûn ku bikarin tevlîbûnê çêbikin û baweriyê bidin gel. Ez hatim û demekî kin mam li Tirbespiyê. Paşî ez rêkirim Serêkaniyê û ji wir ez derbasê çiya bûm."[310]

[309] Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan (ARGK): Li gorî biryarên kongreya 3'yemîn a PKK'ê di sala 1986'an de gerîlayên Hêzên Rizgariya Kurdistan wekî Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan hatiye birêxistinkirin û heta sala 2000'î têkoşîna gerîla bi stratejiya şerê gel ê şoreşgerî meşand. Ji sala 2000'î û şûn ve gerîlayên li çiyayên Kurdistanê li gorî stratejiya parastina rewa xwe ji nû ve wekî Hêzên Parastina Gel bi rêxistin kirin.

[310] Hevpeyvîn bi Necbîr re, Tirbespiyê, 2017

Li **Dirbêsiyê** jî tevlîbûn û şehadeta **Şehîd Berçem** (Eyhan Şîno) bandoreke mezin li civakê kir. Wekî kesayeteke jin a welatparêz û şoreşger, wê li herêma Dirbêsiyê xebatên rêxistinkirina civakê meşandin. Sekn û helwestên wê pêşî li tevlîbûna jinên li herêmê vekir û têkiliyên manewî û rêxistinî yên civaka eşîrî ya Dirbêsiyê bi Tevgera Azadiyê re xurt kir. Piştî ku di sefê 9'an a dibistanê de dev jê berdabû, ew di sala 1988'an de tevlî nav xebatên Tevgera Azadiyê bûbû. Sala 1990'î Berçem li Akademiya Mahsûm Korkmaz li ber destê Abdullah Ocalan perwerde bû. Piştre ew bi israra xwe wekî gerîla derbasê çiyayên Bakurê Kurdistanê yên herêma Merdînê bû. Di 21'ê Mijdara 1992'yan de ew li navçeya Dêrika Çiyayê Mazî ya ser bi Merdînê di şerekî dijwar de yê bi arteşa Tirk re şehîd bû.

Xwuşka wê Rojîn, lehengiya Şehîd Berçem wekî 'mêranî' pênase dike. Ew li ser bûyer û bandora şehadeta xwuşka xwe dibêje: "*Bavê min çûbû Bakur. Ew heftayek cem Hevala Berçem û hevalên wê li gundekî Dêrika Çiyayê Mazî mabû. Dema bavê min vegeriya, me şehadeta Berçem li ser televîsyonê di kanala Tirkan de dît. Cenazeyên hevalan derxistin ser televisyonê. Navê Berçem jî gotin. Ew wekî şehîda yekem li Dirbêsiyê hat îlan kirin. Kon 3 roj li erdê ma, ji hemû deran, ji Şam, ji Libnan, Helebê gel hat konî. Merasîmeke pirr xweş çêbû.*

Piştî şehadeta Hevala Berçem ez çûm Bakur li ser mezelê wê li gundê ku lê şehîd ketiye. Gundiyan qal dikir ku şerê wan 22 saetan berdewam kiribû. Heval hatibûn ixbarkirin, dema ku çûn malekê. Hevala Berçem û Hevala Medya di xendekê li keleka malê de herdu bi hev re mane. Wan şer dikir, gelek şer dikir. Hevalên wan xwe xilas kirin. Gundiyan digot, Medya nexweş ket û ji Berçem re gotibû: 'Here, tu dikarî xwe xilas bikî'. Lê Hevala Berçem got, 'Na, ez dev ji te bernadim.' Porê Berçem jî kin bû. Kesekî nedizanî ku keçik e. Ew şer kir heta 2 fîşek pê re mane. Di dawî de yeke li hevala xwe dide û yeke li xwe dide. Piştî şer xilas bû, fermandarekî mezin yê Tirkan hat, lingê xwe li ser serê wê dixist û digot: 'Min nizanibû ku tu jin î. Min bawer kir ku ez bi zilamekî re şer dikim.' Hevala Berçem hingî mêr bû. Gundiyan jî behsa mêraniya wê dikir.

Berçem li malê gelekî henûn bû. Danûstandina wê bi malbat û mevanan re xweşik bû. Dayika min carna ji me re digot, 'yeke bi eql, jêhatî û baş hebû, û ew jî çû.' Lê me nedizanibû ew ewqas mêr e. Dema Hevala Berçem tevlî bû, civakê henekê xwe bi me kiribû, digotin: 'Çima we hişt ku qîz here nav Apociyan. Eyb e. Bila xort herin.' Lê bavê min digot, 'Na, xilas. Madem daxwaza wê ye, serê min ji ber qîza min bilind e.' Piştra, di binê konî de gelek ciwanan sonda xwe xwarin û tevlîbûn."[311]

Lê hemberî bertekên kevneperest yên civakê, bavê Şehîd Berçem di helbestekê de ku wî li ser berxwedana *Hevala Berçem û Hevala Medya* nîvisand, serbilindiya xwe bi keça xwe aniye ziman. Birayê wê jî helbesta bavê xwe kir stran:

Hevala Medya
Hevala Berçem
Hûn çira me ne
Her çax û her dem

Berxwedana we
Bû şan û şeref
Kela gel rabû
Dij şîdet û xem

[311] Hevpeyvîn bi Rojîn re, xwuşka Şehîd Berçem, Dirbêsî, 2020

Li Çiyayê Mazî
Dêrika rengîn
Gundê Ulaqa
Bûye kela jîn

Şif û rûmeta
Gelê Kurdistan
Di dilê gel de
Hûn her tim dijîn

Bi hêrs û nefrîn
We bang kir dijmin
'Em teslîm nabin
Ticar natirsin'

Can pirr erzan in
Ji bona welat
Serbestî û azad
Em li bilerzin

We bi xwîna sor
Kurdistan avda
Bo gelê bindest
We canê xwe da

Hûn ser sozê man
Bi gelê xwe re
Rêça Şehidan
We qed bernedan.

Rojîn jî dibêje, ew bi şehadeta xwuşka xwe serbilind in û rêya wê bernadin. Kûrê Rojînê jî doza xaltika xwe şopand û niha wekî gerîla li çiyayên Kurdistanê ye.

d) Dayikên Şoreşger Keçên Xwe Yên Şoreşger Oxir Dikin

Heta destpêka salên 1990'î ruh û rastiya neteweya Kurd a nûjen li Rojavayê Kurdistanê li ser koka xwe ya dîrokî şîn dibû. Jinan him ji bo zindîkirina çand û siyaseta civaka Kurd dibûn av, him jî bi keda xwe bixwe vedijiyan. Ew gihîştin asteke welê ku çend jin û malbatên welatparêz amade bûn ku her tiştê xwe ji bo serketina şoreşê feda bikin. Heta, dayik derketin holê yên ku bixwe cesaret dan keç û kurên xwe ji bo ku biryara tevlîbûna nav refên şoreşê bidin. Êdî dayik û keç dibûn hevrêyên hev. Wan li cihên cuda ji bo heman dozê kar kir û têkoşiyan, û di têkiliyên xwe de wan pîvanên şoreşê esas digirtin. Her wiha feraseta namûsê dirûvê xwe diguhert. Malbatan tevlîbûna keça xwe wekî *'zewaca bi welatê xwe re'* ango *'zewaca bi doza şoreşê re'* şirove kir. Lewma li gorî exlaqê civakê ne pêkan bû ku ji soza xwe şûnde vegere. Vegerandina malê û îxanet, wekî rûreşiya herî mezin dihatin hesibandin. Hinek malbatan jî wêrekî û biryardariya keç û xwuşkên xwe wekî 'mêranî' terîf kir. Ji ber nasnameya jina têkoşer hê nehatibû ava kirin, wan nikaribû gotinên welê peyda bikin ku lehengiya jinê ya wê demê pênase bikin.

Reşîde Mihemed ji Efrînê ku di sala 1985'an de tevgera PKK'ê nas kiriye. Wê bi mîlîtanên destpêkê re xebat di nava civaka xwe de meşandiye û du keçên wê tevlî nav refên şoreşê bûne. Ew dibêje: *"Jinê bi rêxistinê cihê xwe di nav milet de girt. Me zarokên xwe bi îrada xwe tevlî partiyê dikirin. Hevala Sakîne hat mala me û got, 'ji ber hûn wisa difikirin pêwîst e keça te bi qebûlkirina te ji malê derkeve.' Ez rabûm û min ji keça xwe re tiştê lazimî, çenteyê wê hazir kir. Dema keça min derket, bavê wê jê re got: 'Barê te giran e. Ger tu nikarî, neçe. Ger tu dikarî, xwedê bi te re be.' Min jê re got, 'Tu bê exlaqî û xiyanetê neke. Fîşeka te bila di singê te de be, ne di pişta te de be.' Zor bû ji bo min, lê namûsa herî mezin ax e. Ew jî bindest e, ji bo azadiya wê her tişt hêsan e."*[312]

Serpêhatiyên **Yadê Fatma** ji Kobanê destnîşan dikin ku dayik û bavên ku piştgirî didan biryara zarokên xwe, cardin rastî helwestên nerênî yên civakê dihatin. Malbat, eşîr û civakê gelek zehmetî ji wan re çêdikirin. Lê dîsa jî wan parastina vîna zarokên xwe wekî erkeke exlaqî û ya tekoşînê pêk dianî: *"Qehreman hîna piçûk bû û xwest tevlî bibe. Ew çû Libnanê cem Serok. 3 mehan ma û perwerdeyê xwe dît. Bavê wî jî mala xwe terk kiribû û tevlî bûbû. Ez tenê mam. Hevalan ji Qehreman re got, bila vegere malê. 'Bavê te jî tevlîbû. Bira û xwuşkên te hîn piçûk in. Bila hinek mezin bibin. Piştre tu dikarî werî.' Dema ku Qehreman hat malê heftayekê xwarin nexwar, got, 'ez ê vegerim, an ez ê xwe bikujim!' Me dît wiha nameşe û min bangê hevalan kir. Ew çûn cem wî. Bavê wî jî pê re axivî ku xwest iqna bike ku li malê bimîne û got, 'Binêre, ez jî tevlî bûm. Ger tu jî derbikevî ji bo malbatê wê giran bibe. Dema ku tu û xwuşkên xwe hinek mezin bûn, ez ê werim malê û tu here.' Lê wî nexwest bisekine. Me dît çênabe. Ew dîsa çû. Du keçên min jî di komê de bûn. Wan jî piştî demekê got, 'em jî herin'. Min yek bi yek bi rê xist, çantê wan amade kir û ew çûn. Her sê zarok û bavê wan tevlî hevalan bûn. Min ji wan re zehmetî dernexist.*

Di serî de milet serê me dîn dikir, digotin, 'çawa sê zarokên xwe dişîne...' Civak û malbat pirr şore dikirin. Wê demê kesek nikaribû vêna bikira, wê dinya xira kiriba. Bavê min ez tehdît kirim, digot, 'Ger tu keça xwe rêbikî, ez ê her cihê te bişkînim.' Birayê min jî digot: 'Ger tu vê qîzkê bişînî ez ê te bikujim.' Bes me guhê xwe nedida. Min çantê keçên xwe amade kir û veşart. Baştir e ez eşkere bizanim û bi destê xwe rêbikim. Me zanibû karê wan çi ye, partiya me çi ye û em çi ne. Me zarokên xwe bi kêfxweşî, bi şekir û hefle ji malê rêkirin. Dema ku keça min rêket, min jê re got 'xwe di seyara de veşêre heta tu ji gund derkevî'."[313]

Helwestên şoreşgerî yên dayik û keçên Kurd yek bi yek li hemû herêmên Rojava û di civaka Kurd li bajarên Sûriyê de dibûn sedema hejandina ferasetên zayendperest û lêgerînên nû. Nexasim dayikên ku bixwe di jiyana xwe de gelek êş kişandibûn, nedixwestin ku keçên wan heman êşan bikişînin. Wan keçên xwe bi şanazî bi rê kirin nav jiyaneke nû. Çawa ku dayikekê li herêma Koçerata anî zimên: *"Me ji hevalên jin re dua dikir. Min ji keça xwe re digot 'Here! Min ewqas dît, bila tu nebînî. Tu ji wan hevalan ne çêtir î."* Du nifşên jin êdî ne tenê wekî dayik û keç hatin cem hev, lê her wiha dibûn hevrêyên hev.

III. 3.4. Çawa Bijîn? - Serpêhatiyên birêxistinbûna jinê li Rojavaya salên 1990'î

[312] Hevpeyvîn bi Reşîde Mihemed re, Efrîn, 2017
[313] Hevpeyvîn bi Yadê Fatma re, Kobanê, 2017

Wekî bersiva lêgerînên jinê û zehmetiyan a ku jinan weke birêketina xwe ya azadiyê dîtiye, Abdullah Ocalan bi taybetî ji sala 1991'ê ve giranî da dahûrandinên li ser rastiya jinê û malbatê li Kurdistanê. Tahlîlên wî di pirtûkên '*Jin û Malbat*' û '*Em çawa bijîn?*' de hatin weşandin û gihîştin civaka Rojava. Xwendin û nîqaşên li ser van pirtûkan, nêrînên nû di civakê de teşwîq dikirin. Jinan di pirtûk û axaftinên Rêbertiyê de rastiya jiyan û nakokiyên xwe didît, ya ku wan heta hingê nikaribû tahlîl bikirana yan jî bianiya zimên. Jinên welatparêz bîrewer bûn ku gelek pirsgirêk û êşên wan ên kûr ne çarenûsa jinê ne. Bi vê re jinan fêhmkir ku pirsgirêkên wan, nêzikatiyên tund û bêhûrmet beramberî jinê, bi rastî pirsgirêkên civakî ne ku çavkaniya xwe ji pergala desthilatdariya zilam digirin. Bi vî rengî lêpirsîn û îtîrazên jinên welatparêz li hemberî pergala zayendperestiya civakê di nav malbat û civaka xwe de dest pê kirin. Di heman demê de nirxandin û rexneyên Abdullah Ocalan, bandora xwe li ser nêrîn û nêzikatiyên zilamên welatparêz jî dikir.

"Beriya ku em Serokatiyê nas bikin, birayên min pirr oldar bûn. Wan dixwest hemû şêwazên jiyanê bi nêrînên xwe yên olî şekil bidin. Nêzîkatiyên wan ji malbatê re, ji hevjîna xwe, xwuşka xwe û dayika xwe re pirr cinsiyetperest bûn. Piştî ku me fikrê PKK'ê nas kir guhertinên balkêş çêbûn. Gelek malbatên me hebûn ku him zilam û him jî jin bûn xebatkarên tevgerê û di nava gel de kar dikirin. Wisa êdî pirsgirêkên malbatê dihatin nîqaşkirin. Guhertinên di parvekirina xebatên malbatê de çêbûn. Nêzîkatiya namûsê hatiye şikandin. Bi hezaran jinan wek 'cebhewî' kar dikir. Hinekan ji wan bi dizî, bê zanebûna hevjînên wan, derdiketin. Lê bi hezaran jin û mêr bi hev re ketin di nava xebatên rêxistinê de."[314]

a) Tevlîbûna Hevjînan: *Çûkên ku ji Qefesê Derdikevin û Difirin*

Têkiliyên zewacê em dikarin bişibînin qefesekê ku tê de di serî de jin dîl tê girtin. Lê belê di encamê de mêr jî vîn û azadiya xwe winda dike. Lêpirsîna têkiliyên malbat û zewacê tevî lêgerînên azadiyê dibûn sedem ku di salên 1990'î de hinek hevjîn û malbatên din jî rêya şehîdên pêşeng wekî Dîcle, Sozdar û Zinar bişopînin. Yek ji wan hevjînên ku bi hev re biryara tevlîbûnê nav refên şoreşê dane, Rûken û Mazlûm ji Minbicê bûn.

Rûken di nav malbateke welatparêz de mezin bûbû ku di sala 1984'an de şoreşgerên PKK'ê nas kirin. Lê bandora feodalî, eşîrî û olî li Minbicê di nav civaka Kurdan û ya Ereban de pirr xurt bû. Lewma ew bi temenê 17 salî hat zewicandin. Rûken nakokiyên ku wê di rastiya civaka zayendperest de didîtin û têkoşîna xwegihandina vîna xwe wiha rave dike:

"Malbata min eşîrî û girtî bû, lê di milê hevalan de vekirî bû. Çûn û hatina hevalan, danûstandin hebû. Ez bi kurê meta xwe re hatim zewicandin. Ez hatim xwestin, ne ku ez aşiq bûm... Me zêde hevdu jî nas nedikir. Zewaceke malbatî di cih de hatiye çêkirin. Piştî ku em zewicîn, ez derbasî mala wî bûm. Zext di malbatê de pirr bû. Ez ji hevalan qut bûm. Ev rewş li ser min pirr giran dihat, ji ber ku min ji hevalan pirr hez dikir. Lê malbata hevjînê min ne welatparêz bû.

Lê belê piştî salekê êdî min karibû hevjînê xwe qanih bikim ku em têkiliyê bi hevalan re daynin. Em herdu tevlî xebatan dibûn. Piştî demekê di sala 1992'yan de hevjînê min çû Akademiya Mahsum Korkmaz. Wî navê xwe kiribû Mazlûm û derbasî çiya bû. Ez jî fermî tevlî xebatên rêxistinê dibûm û heta 1993'ya li Rojava mam. Nakokiyên min bi malbata wî û di nav malbata min

[314] Hevpeyvîn bi Şervîn re, Dêrik, 2017

û malbata metka min de derdiketin. Wan digot, 'Keça we kurê me kir welatparêz û tevlî kir...' Lewre ew li hemberî min pirr aciz bûn. Di malbatê giştî de em herdu yên yekemîn bûn ku tevlî şoreşê bûn.

Min xwe hîs kir wekî çûkek ku bi salan di qefesekê de girtîbû û dema ku tu vê qefesê vedikî ew difire... Ji bo min wilo bû. Min dest bi jiyaneke nû dikir. Ji jiyaneke ku ez tê de ne ti tiştek bûm, gotina min nehatiye bihîstin, jiyaneke ku tê de hebûn û tinebûn wek hevdu bû; ez derbasê cihekî din bûm. Dema ku em diketin nava civakê de min di her jinê de rastiya xwe didît. Min rastiya pirsgirêkên civakî didît. Bi taybetî pirsgirêk û nakokiyên di navbera jin, mêr, xesû û bûk de hebûn. Wê demê rewşa min dihat bîra min beriya ku ez tevlî bûme. Min got, 'Ma ev qedera hemû jinan e? Gelo hêza min heye ku ez bikarim vê rewşa jinan biguherim?' Lêgerîneke min bi vî rengî dest pê kir. Min hîs kir ku barekî giran li ser min hebû. Dema ku me li ser dîroka jinê perwerde didît, me fêhmkir jin ji ber çi sedemê bi bin ketin û çawa wê bikarin bigihêjin serketinê. Di rastiya Serokatiyê de me fêhmkir ku jin encax dikarin bi hevgirtin û bi xwe rêxistinkirinê bi ser bikevin û bigihêjin azadiya xwe.

Hevalê Mazlûm ji min bêhtir bi min re girêdayî bû. Wî her meh ji min re nameyek dişand û tiştên ku hatin serî bi min re parve dikir. Hevalên jin ku pê re mane jî digotin, Hevalê Mazlûm ji hevalên jin bêhtir hez dikir, bi pêşketina hevalên jin re kêfxweş dibû. Piştre ez çûm çiyê û me hevdu dît. Wî digot, 'em hevalên hev in' û hevdîtina me ji xwe re wek quwetek dît. Li şûna ku em hevdu lawaz bikin, min her tim dixwest ku ez wî xurt bibînim. Ew jî bi vî awayî nêzîk dibû. Demeke dirêj em bi hevdu re nediman. Di sala 1997'an de Hevalê Mazlûm li Garê şehîd ket. Piştî ku şehîd ket, min hîs kir ku pêwîst e ez barê wî jî rakim. Em bi hev re man û yê ku wî tevlî kir jî ez bûm. Şehadeta Hevalê Mazlûm ji bo min ne tiştek e ku min zeîf dikir. Min pêwîst dît ku ez xurt bim û kesayetiyeke nû di xwe de ava bikim."[315]

Rûken serpêhatiyên xwe wek hêz û tecrûbeyên jiyanê nirxandin. Ew dizane ku ne tenê ew di qefesa zewacê de dîl hatiye girtin. Lewma wê lêkolînên xwe li ser zayendperestiya civakê dewam kirine û wê ew kûrtir dikirin. Bi lêhûrbûnên li ser kesayeta xwe û guhertinên kesayetê, wê dixwest ji jinên din re jî bibe alîkar da ku ew bikarin rewşa xwe tehlîl bikin. Bi demê re wê ji xwe pirsî: *"Çawa ez dikarim wan tecrûbên xwe bi zanebûna jinê bibînim? Çawa em dikarin vê zayendperestiya di nav civakê de derbas bikin? Guhertina zilam gerek bi çi rengî be? Dema ku zilamek li pêşiya pêşketina te asteng dibe, pêwîst e nêzîkatiya te çawa be? Zewac di nav civakê de tê çi wateyê? Bandora wê li ser şexsê mirov çawa ye? Mirov di vê têkiliyê de xwe çima zeîf hîs dike? Zilam di te de dixwaze çi bişkîne; hêviyên te dikare çawa bişkîne? Ango di warê cinsî de ew dikare te çawa bişkîne? Ew nêzîkbûna cinsî ya zilam di vê saetê de û di vê şevê de çi bandor li ser te dike, çawa te bê hêz dike?"*

Rûken nîqaşkirina van pirsan girîng dîtiye da ku jin bikarin xwe ji rewşa dîlgirtîbûnê rizgar bikin û bifirin. Serpêhatiyên wê destnîşan dikin ku jiyaneke di qefesê de ne çarenûsa mirov e. Wekî bersiveke ji pirsa '*Çawa bijîn*?' re wê li şûna malbateke teng Tevgera Azadiyê wekî 'malbateke mezin' û têkoşîna guhertin û veguhertina civakê ji xwe re hilbijart. Gelek kesan ji helwest û biryara Rûken û Şehîd Mazlum re hûrmet nîşan da û wan digot, 'xwezî min jî xwe ji vê qafesê derxista!' Lê belê hejmara yên ku bi hev re wêrektiya firrînê nîşan dane, kêm maye.

[315] Hevpeyvîn bi Rûken Ehmed re, endama rêveberiya Meclîsa Medenî ya Minbicê, 2017

b) Jinên Cebhewî

Bi taybetî di salên 1990-92'yan de gelek jin li bajar û gundên Rojava di asta herêmî de tevlî xebatên birêxistinkirina gel bûn. Di serî de gelek ji wan rastî nêzîkbûnên neqebûlkirina malbat û civakê dihatin. Nerazîbûn hebûn ji ber ku 'derketina jinê ji malê' ango 'gera jinan li derve' weke 'eyb' dihat dîtin. Lê perspektîf û dahûrandinên Abdullah Ocalan li ser azadiya jinê, ked û helwestên pêşengan di kesayeta jinên welatparêz de bixwebawerî û manewiyateke xurt ava kiriye. Bi vê bawerî û biryardariyê jinan sinorên desthilatdariya zilam li pey xwe dihiştin û hevgirtina jinan bi pêş dixistin. Li hinek deverên wekî li Dêrik, Heleb û Şamê jinên xwendevan pêşengiya birêxistinkirina xebatên cebhewî û tevlîbûna nav refên şoreşê dikir. Lê bi pirranî jinên cephewî jinên gundî û cotkar bûn, yên ku bi ruh, ked û baweriya xwe beşdarî têkoşîna azadiya Kurdistanê dibûn.

- **Şêwaza rêxistinkirin, xebat û perwerdeya jin û civakê**

Di destpêkê de jin bi pirranî bi rêya belavkirina belavokan mal li şoreşgeran vedikirin. Lê 'xebatên cebhewî'[316] ku ji sala 1987'an ve hatine meşandin, rêxistinbûna civakê da çêkirin. Di her taxê de xebatkarên cebhewî yên jin û yên zilam hebûn. Dema ku ew diçûn nav gel, ew bi pirranî wek komîte tevdigeriyan yên ku ji du xort û yek jinê yan jî ji du jin û yek xortî pêk dihatin. Jin û xortên cebhewî di serî de xwe perwerde dikirin, civîn û tekmîlên xwe digirtin da ku ew bikarin bi rista pêşengiya civakî rast rabin.

Dûvre wan civîn, perwerde û çalakiyên gel di malên gel de bi rêxistin dikirin. Jinên cebhewî dibêjin, ji bo ewlekariya gel û xebatê, wan girîngî da nepenîbûnê yanî sirriyetê. Carna wan zêdetirî 50 kesî li malekê kom dikirin û bi dizî civîn çêdikirin. Ji bo rewşa welat û têkoşînê fêhmbikin û binirxînin wan vîdeo yên axaftinên Abdullah Ocalan û çalakiyên gerîla bi gel didan temaşekirin. Di heman demê de jinên cebhewî ji bo ewlekariya kombûnan li derdora malan nobet digirtin. Ew li ser xebatên xwe yên wê demê bi serbilindî dibêjin, *'Erê, zehmetî pirr bûn lê girêdana me roj bi roj xurttir û bi hêztir dibû.'*

Yadê Esma ku di sala 1988'an de li Girkêlegê bi sê jinên din re karê cebhewî meşand, dibêje: "*Jin, zilam, ciwan me hemûyan bi hev re xebat meşandin. Gel wekî ku miroveke ku birçî be û ku dixwaze xwe bigihîne av û nan ji bo têr bibe, wiha xwe gihand Serokatî û PKK'ê. Coş û heyecanek di berxwedana gel de hebû. Em tev hevalên jin diçûn rêyên dûr ji bo em serdana dayikan bikin ku nû bi dergûş bûn. Em mal mal diçûn û her heyv me alîkarî kom dikir. Her kesî bi dilxwazî li gorî hêza xwe dida. Tekmîl û civînên me bi xebatkarên Girkêlegê, Koçerat û Dêrikê bi hev re bûn. Me perwerdeya jinan jî bi hev re didît. Dema ku îlana şehîdan çêdibû, gelek car hevalên nû soza xwe ya tevlîbûna şoreşê dida.*"[317]

Nexasim şehadeta wan jinên şoreşger yên ku li herêmekê berê xebatê cebhewî meşandibûn û piştre soza xwe dabûn û li Bakur yan li Başûrê Kurdistanê şehîd bûbûn, bandoreke pirr mezin li ser

[316] Cebhe bi Kurdî *enî ye*; peyva 'cebhewî' ji bo xebatkarên Eniya Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê (ERNK) dihat bi kar anîn.

[317] Hevpeyvîn bi Yadê Esma re, Girkêlege, 2017

civakê çêdikir. Merasîma **Şehîd Necbîr Dêrik** (Emîne Îsa) ji gundê Girêsor ê Dêrikê bi beşdarbûna hezaran kesî hatiye li darxistin, ev jî vê rastiyê nîşan dide. Necbîr wekî xwendekareke zanîngehê di sala 1986'an de tevlî xebatên cebhewî bû. Piştî demekê ew wekî jineke şoreşger tevlî PKK'ê bû û li Başûrê Kurdistanê gel bi rêxistin dikir. Dema serhildanên Başûrê Kurdistanê yên sala 1992'yan ew di kemîneke PDK'ê de hat şehîdxistin. Gelê Dêrikê îlana şehadeta Şehîd Necbîr zivirand serhildanê li hemberî xiyanet û hevkariya PDK'ê bi dewleta Tirk re. Ev cara yekê bû ku merasîma mîlîtaneke jin bi ewqas tevlîbûna gel li herêma Dêrikê çêbû û gel xwedî li nasnameya jina şoreşger derket.

Bi keda jinê, têkiliyên gel bi Tevgera Azadiyê re her diçû germtir, kûrtir û firehtir dibûn. Dema ku şoreşger û xebatkar diçûn, têkiliyên bi gel re ava dikirin û tevgera azadiyê didan nasîn gelek ji wan malan dibûn malên rêxistinê. Wiha tê gotin, "*di kîjan malbatê de jinan fikrê PKK'ê qebûl dikir, ev mal ji rêxistinê re vekirî bû. Jinê bi hemû hêza xwe, bi welatparezî, bi girêdana xwe ya axê û welat, bi hest û ramanên xwe hemû malbata xwe tevlî dikir."* Ev malên welatparêz, dibûn wekî malên komîn. Di hundirê wê malê de gelek sazî dihatin avakirin, xebatên jinan, ciwanan, perwerde û çandê dihatin birêxistinkirin.

Wekî din, dema ku pirsgirêk di malekê de hebû, jinên cebhewî hewl didan ku xwe bigihînin wê malbatê. Rêbazeke serketî ew bû ku jinên cebhewî vê jinê ji hundirê mala wê derxistin, bi xwe re di nav civakê de gerandin û tevlî xebatan kirin. Bi vî awayî bêhna wê jinê û nêrînên wê fireh dibûn. Malên ku li gorî pergala baviksalar wekî mekanekî taybet ji bo qutkirina jinê ji civakê dihatin dîtin veguherîn warên civakî ji bo birêxistinkirina jinan. Jinên berê di malan de dihatin bêdengkirin, niha di malan de bi jinan re nîqaş dikirin. Çi pirsgirêk hebû di navbera jin û zilam de wekî berdan, pevçûn, tundî yan fêhmnekirin, hemû dibûn mijarên nîqaşê. Li ser vî bingehî danûstandina jinê bi malbata xwe, bi dayik û bavê xwe, bi mala xwezûrê xwe, bi hawirdor û cîranên xwe re bi pêş diket.

Çiqas bi vî rengî naskirin û zanebûna jinê ya civakê bi hêztir dibû, ewqasî wê karibû êdî pirsgirêkên xwe û malbata xwe jî fêhm bike û çareser bike. Hewldan çêbûn ji bo perwerdekirina her kesî/ê û her beşa civakê: *"Ji bo tevlîbûna perwerdê me rê li ber kesekî nedigirt. Mînak hinek jin temenê wan dibû 60 sal, dihatin perwerdeya zimanê Kurdî. Ew diçûn, pênûs û lênûsa xwe dianîn û digotin: 'Perwerde bidin me heta em bikarin cihê xwe di nav xebatê de bigirin.' Yanî [yên] cebhewî ne tenê ji bo eniya şerê li Bakur, lê ji bo avakirina her parçê Kurdistanê xebat dimeşandin. Me digot: 'Sînor tine. Em sînoran nas nakin. Kurd li kû derê biêşe, em li wê derê ne.' Çandeke wilo hatiye avakirin di nav civakê de."*[318]

Dîlan Dêrik jî balê dikişîne ser wê yekê ku hevaltî û hezkirina jinê dibû bingehê bipêşketin û birêxistinbûna xweser a jinên Kurd: *"Di salên 1990-92'yan de ji tewahiya herêman tevlîbûnek pirr xurt a jinan hebû. Ew heval hemû pirr bi xwe bawer bûn. Manewiyatek pirr bilind û hevaltiyek pirr germ hebû. Me tenê 15 roj bi hev re perwerdeyek dît û me dest bi xebatê kir. Hezkirina kar û ji karê xwe manewiyat girtin, hebû. Dema ku civîn çêdibûn û her kesê behsa karê xwe dikir, ew dibû kêfxweşiyek mezin. Xuya bû ku em pêş diketin. Me bi saetan nîqaş dikir.*

Bi her gava nû ya me diavêt, me manewiyateke nû digirt. Ev hezkirin û manewiyat bandora xwe li ser tevahiya jin û civakê dikir. Em ji qonaxekê derbasê qonaxeke nû ya têkoşîna jinê dibûn. Wisa bingehê pergala xweser a jinê hat avakirin. Civînên jinan dihatin çêkirin. Alîkariya jinan xweser

[318] Hevpeyvîn bi Emîne re, Qamişlo, 2017

dihat komkirin. Perwerdeya xweser a jinan hebû. Jinan ji vê moral û cesaret digirt. Jinan rehet nîqaşên xwe dimeşandin. Me li ser her tiştê me didît, nîqaş dikir. Me li ser sedemên pirsgirêkên civakî lêkolîn dikir û pirtûka li ser kesayeta şoreşgerî me dubare dubare dixwend. Bi vî awayî me xwe pêş dixist."[319]

Bi hevgirtin û hezkirinê di nav xwe de jinan xwe daye qebûlkirin. Wan di heman demê de him erkên xwe yên civakî û malbatî him jî erkên xwe yên neteweyî, siyasî û rêxistinî bi cih anîne. Bi vê fedakariyê, jinên Apocî guhertinên mezin di civaka derdora xwe de afirandin. Dema ku xebatkarên jin ên ku wekî 'cebhewî' hatin binavkirin, salên 90'î tînin bîra xwe, gelek ji wan dibêjin:

"Berê, xebata me ya jinan xweş bû, serketî bû. Em mal mal digeriyan û me alîkarî kom dikir. Me komên jinan birêxistin dikirin û em bi hev re diçûn palehiyê. Ji bo em weke jin bikarin alîkariyê bidin rêxistinê em di dema mûsîmê de diçûn pambû û nok û nîskan. Di heman demê de me stranên xwe jî digotin. Ev wekî çûna heflê bû. Karekî bi rûmet û kêfxweşî bû."[320]

Dayika Rûqiye ji Efrînê dide xuyakirin: *"Bi xwe, me di malê de ti car karê erda nekiriye. Hin kesa ti cara kar di jiyana xwe de nekiriye lê ji bo Partiyê dikirin. Dema em diçûn, em bi êvara kom dibûn. Bi hejmarekî mezin bi stran û tilîliya me bi şev kar dikir. Pirr xweş bû. Me her tişt kom dikir wekî sîr, gûz, çilo, zeytûn, genim û her tişt. Jinan dema çilo difirot, perê carekê ji hevalan re dida wek alîkarî. Hemû milet wisa dikir."*[321]

Li tevahiya bajar û gundên Rojava jin bi serbilindî behsa vê demê, keda kolektîf û çalakiyên xwe yên hilberînê dikin. Tevî ku bingehê girseyî ya Tevgera Azadiyê li Rojava jî ji malbatên xizan û kedkar pêk dihat, jinên welatparêz ên çînên cuda jî tevlî çalakiyên hilberînê dibûn. Di encamê de naskirin û nirxdayîna kedê di tevahiya civakê de bi pêş diket. Jinên Kurd ji çînên cuda rastiya hevdu fêhm kirin û ji bo armanceke hevbeş westiyan, xwê dan. Ji bo hezaran jinên Rojava vê yekê tecrûbeyeke nû û girêdaneke domdar bi keda xwe re da afirandin.

- **Çîrokên Rêhevaltî û Desthilatdariya Zilam**

Kedkarên şoreşê dibêjin, têkiliyên di navbera cebhewiyên jin û mêr de 'wek xwuşk û bira' bûn. Ew di her rewşê de li hev xwedî derdiketin. Lê cebhewiyên jin rexne dikin ku cebhewiyên mêr carna jî wekî 'birayê mezin' nêzîkî wan dibûn. Têkiliyên rêhevaltî û têkoşîna jinê li dijî nêzîkatiyên serdest di nav hev du de hatine meşandin: *"Çawa di navbera xwuşk û bira de zewac û hezkirina cinsî çênabe, di nav me û hevalê xort de jî bi vî rengî bû. Lê di aliyê din de heta ku tevgera jin gihişt vê astê me pirr şer dikir li beramberî hevalên xort. Em li hemberî ferasetên wan derketin wekî 'ev jin e nikare, hêza wê têrê nake' ango yên ku digotin 'ez dikarim çiwalê genim rakim ma tu dikarî rakî?"*[322]

[319] Hevpeyvîn bi Dîlan re, Dêrik, 2017

[320] Hevpeyvîn bi endamên Kongra Star re, Amûdê, 2017

[321] Hevpeyvîn bi Dayika Rûqiye re, Efrîn, 2017

[322] Hevpeyvîn bi Emîne re, Qamişlo, 2017

Jinên cebhewî têkoşîna li dijî feraset û nêzîkatiyên desthilatdar him di têkiliyên bi hevrê û malbatên xwe de him jî di civakê de dan destpêkirin. Gelek jinan serê pêşî têkoşîna naskirina vîna jinê, li dijî malbata xwe meşand. Hinek jinan xwest tevlî xebatan bibin, lê hevserên wan gef li wan xwarin û tundî li wan kirin.

Mînaka Yadê Fatma ji bajarê Derikê destnîşan dike ku jinan gelek rîsk hildan ser xwe da ku karibin keda xwe tevlî şoreşê bikin. Piştî hewldanên hevserê wê ji bo dûrxistina Yadê Fatma ji xebatên rêxistinê bi ser neketibûn, wî gefa berdanê li Yadê Fatma xwar û jê re got: *"Yan tu wê bi hevalên xwe re bî yan tu wê bi min re bî!"* Yadê Fatma jî li şûna zilma zilam têkoşîna azadiyê hilbijart.

Ji ber tirsa ji zextên malbat û hevjînên xwe gelek jinên cebhewî jî bê agahî û destûra hevjînê xwe çûne ser kar. Diya Reşîd ji Efrînê ku di serê salên 1990'î de li Helebê tevlî karê cebhewî dibû, behsa hestên xwe yên wê demê dike: *"Destpêka min Partî nas kir, ez weke keçeke aşiqê xortekî bibe, ez jî aşiqê Partiyê bûm. Ez ewçax diya du zarokan bûm. Min du salan bi Partiyê re dida û distand, lê haya zilamê min jê nebû. Piştre heval hatin mala me û gotin ku bila zilamê malê jî fikrê me nas bike. Îcar zilamê min jî fikrê vê tevgerê qebûl kir. Ez weke teyrê baz bûm. Min dest bi karê cebhewî kir. Min li gelek taxên Helebê alîkarî ber hev dikir. Me her meh herî kêm du jin tevlî kar dikirin û pênc mal vedikirin. Rojên me daîmî tijî çalakî bûn. Em fêrî ziman jî dibûn û diketin perwerdeyan. Min heşt zarok anîn û ez pirr pê re westiyam. Lê ti carî karê rêxistinê ez newestandim."*[323]

Gelek dayikên din jî hene ku tevî hevjînê xwe xebatên cebhewî meşandine û hemwext dibûn hevjîn û hevrêyên hev. Ew dibêjin ji ber hevjînên wan jî rêxistin nas dikirin, wan ti carî rê li ber wan nedigirt. Ji vê zêdetîr jî hinek hevjînan her êvar şêwra karê xwe yê siyasî dikir û alîkarî dida hev. Bi vî awayî çanda Tevgera Azadiyê bandora xwe li ser jiyana malbatê û têkiliyên hevjînan dikir.

Li malên welatparêz êdî tevahiya malbatê – jin, zilam û zarok – tev mêvanên xwe bi hev re li derdora sofrayekê rûdiniştin û xwarin dixwarin. Şoreşgerên ku li malên gel diman, bi van malbatan re mijarên malbatî, civakî û siyasî nîqaş dikirin. Bi vî awayî çandeke nû ya welatparêz û demokratîk gav bi gav derket holê. Cih bi cih, hinek zilaman berpirsyariya çend karên malê digirt ser xwe, ev karên hanê berê tenê wekî 'karên jinê' dihatin dîtin. Ji nû ve jinan vîna xwe da xuyakirin. Ew dibûn xwedî gotin û li nihêrîn wan di biryarên malbatî de dihat guhdarî kirin.

Yadê Fatma di sala 1986'an de bi malbata xwe ve ji Kobanê çûye Şamê. Wê bandora naskirina Tevgera Azadiyê di nav malbatê de wiha dîtiye: *"Em li Şamê, xerîbiyê bûn. Piştî ku hevjînê min heval nas kirin pirr guhertin di wî de û di jiyana malbatê de çêbûn. Berê dema ku zilam dihatin mala me, ew di odê de dirûniştin. Me tenê di derî de çay yan qehwe yan xwarin ji wan re dianî. Wî ji me re digot: 'Bila dengê we neçe wan, bila we nebînin.' Berê me nikaribû xalê xwe jî silavek bida, digotin: 'Eyb e. Neyên vir.' Lê piştî heval hatin mala me, em ji vê zilm û zora berê xilas bûn. Me çawa hevalên Apocî nas kirin, wekî em firiyan. Me bi hevalan re roja xwe didît û em pê re meşiyan. Di serî de me hevalekî xort nas kir. Lê piştî demekê hevalên jin jî hatin. Min got, 'ew ji bo me hatin'. Deng kirina hevalan û nîqaşên me pirr xweş bûn. Em hemû cem hev dirûniştin, diçûn, dihatin. Em serbest diçûn serdana malan. Me gel di malan de kom dikir û heval dihatin civîn û nîqaş çêdikirin."*[324]

[323] Hevpeyvîn bi Diya Reşîd re, Efrîn, 2017

[324] Hevpeyvîn bi Yadê Fatma re, dayika Şehîd Qehraman, Kobanê, 2017

Her çiqas zilamên welatparêz yên piştgirî didan hevjînên xwe û di şêwaza têkiliyên malbatê de guhertin dabin çêkirin hebin jî, em nikarin bibêjin, bi gişti malbat bi vî awayî bûn. Jinên cebhewî yên kevin pirsa *'nêzîkatiya zilam ji bo azadiya jinê berê çawa bû?*' bi pirranî bi vî rengî dinirxînin: *"Ji hezarî yek zilam ji jina xwe re digot: Here têkoşînê bike! Zilam dixwest serdestiya xwe di malbatê de li ser jinê bimeşîne. Lê jin ber xwe dida. Çawa şoreşgerên me bê destûra malbatê derketibûn, jinên cebhewî jî pirranî bi vî rengî bûn. Zilam ti carî mecal nedaye jinê, nehiştiye ku çavê jinê derve bibînin. Zilam hene, bixwe xebatkar in. Lê nedihiştin ku hevjînên wan herin çalakiyên jinan. Heta niha jî qismek zilam hene, wilo difikirin. Lê jinên ku piçikî welatparêzî pê re hebe, dîsa tên."*[325]

Gelek jinên cebhewî hebûn ku ji aliyê malbat û civakê ve bi gelek zext û pêşhukmên zayendperest re rû bi rû mane. Pirraniya wan bi têkoşîna neteweyî re ji bo guhertina malbatê jî têdikoşiyan. Lê hinek jin ji ber zilmê mecbûr diman ku sirriyeta xebatên xwe ne tenê li hemberî dewletê, lê li hemberî hevjînê xwe û malbatê jî biparêzin. Bi taybetî li cihên bi bandora giran a çanda feodal, xebatên cebhewî yên jinan û tevlîbûna nav refên şoreşê ya jinan mîna 'şerm ji bo eşîr û malbatê' hatiye hesibandin.

Eyşe Efendî dibêje, jinên cebhewî li Kobanê di heman demê de li hemberî zextên malbat û yên dewletê li ber xwe didan. Li gorî wê jinên Rojava bi karê cebhewî dest bi siyasetê kirine: *"Lê ji ber bandora zêhniyeta eşîrtî ya paşverû jê re nehat gotin 'siyaset'. Me digot 'em alîkarî dikin'. Berê me li Kobanê ebayên reş*[326] *li xwe dikirin. Him adet bû, him jî me xwe pê diparast ji bo dewlet me nas nake. Bi welatparêziya xwe me karê xwe meşand. Em xwe xwe bûn Apocî. Kesekê em tevlî nekirin. Vê hişt ku em hemû zehmetiyan bibînin. Xeter yek ji aliyê malbatê, dido ji dewletê, sê ji eşîrê hebû. Ez bixwe li hember malbat û eşîr, li hemberî axa û began gişt sekinî bûm ji bo ez xebatên xwe bikim.*

Sala 1994'an Mamoste Osman cara yekem diket hilbijartinê. Min jî xebat meşand. Eşîr li hemberî vê derket. Namzetê wan yekê din bû. Bavê min bi sîlah hat Şêranê. Ez li ser sindoqê sekînim. Jinên cebhewî hemû li ser sindoqan sekînin. Ev wê demê 'tiştek pirr eyb' bû. Bavê min got: 'Tu çawa li hemberî eşîra xwe derdikevî û kar dikî?' Di dawiyê de namzetê axan derneket. Namzetê me mamoste Osman derket. Sê salan bavê min û birayê min nedihiştin ku ez serdana dayika xwe bikim ji ber ku ez Apocî bûm. Heta gelek caran min lêdan jî xwar. Lê ez bi morala karê xwe li ser linga me heta niha. Serketinên me dihêlin ku em di ruh de azad bibin. Ew perayên piçûk yên me kom dikir, hişt ku îro em xwe bi rê ve dibin."[327]

- **Zextên Rejîma Beesê**

Jinên cebhewî ne tenê rastî zextên zayendperestiya civakê dihatin. Dewleta Sûriyê jî bi rêbazên cuda dixwest jinan û civakê bitirsîne da ku ji siyaset û têkoşîna azadiya neteweyî dûr bisekinin. Lê berxwedana gelê Bakur û ya gerîla hînî jinên cebhewî kir ka çawa dikarin ewlekarî û parastina xwe li hemberî êrîşên dewletê bi rêxistin bikin.

Semîra serpêhatiyên xwe li Kobanê parve dike: *"Her tişt û xebatên me bi dizî bûn. Me nikaribû weke niha em li hev kom bibin û tiştên rêxistinî nîqaş bikin. Wê demê ji ber ku her kes ditirsiya zû*

[325] Hevpeyvîn bi Yadê Esma re, Girkêlege, 2017

[326] Qumaşê reş wekî hîcab ku bedena jinê hemûyî vedişêre

[327] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

zû kesek ji malên xwe dernediketin. Lê yên ku nedihatin civînan, em diçûn û me di mala wan de civîn çêdikirin. Wê demê ruxmê ku zehmet bû, lê pirr xweş bû. Me kasêtên Serokatî guhdarî dikir û li ser nîqaş dikir. Ev kasetên hanê, me li hemû cihan digerandin. Lê me heras [nobet] danîn ji bo ewlekariyê. Dema heval li mala me diman, ez heya sibê şiyar dimam û min nobet digirt ji bo ku heval neyên girtin. Lê dewlet pêhesiyabû ez bi hevalan re kar dikim. Ji ber vê, çav berdabû ser min. Di wê demê de girtin jî çêdibû. Kurê min çar car hatiye girtin. Carekê sal û nîvekê di zindanê de ma. Ez jî rojekê tevî zarokê xwe yê piçûk hatim girtin."[328]

Malbatên cebhewî li hemû navçeyên Rojava rastî zext û gefên dewletê dihatin. Rejîma Beesê siyasetên taybet li hemberî hemû nifş û ferdên wan malbatan bi pêş dixistin. Bi vî rengî rejîmê hewl dida ku hevgirtina malbat û civakê xira bike. Bavê Newal ji Amûdê ku mezinê eşîrê bû, ji ber karê xwe yê siyasî 28 salan li zindanên dewleta Sûriyê ma û gelek êşkence lê hatibû kirin. Newal bi ruhê welatparêziyê di nav malbata xwe de mezin dibû. Carna komên şoreşgeran ku hejmara wan digihîşt 50 kesî bi mehan di mala wan de diman û perwerde dibûn. Lê dîsa ferasetên feodal ên zayendperest di jiyanê de serwer bûn. Newal di 17-18 saliya xwe de hatibû zewicandin. Ligel vê yekê, di sala 1992'an de ew bi israra xwe bû cebhewî. Salek şûnde wê xwest wekî jineke şoreşger soza xwe bide û tevlî nav refên gerîla bibe. Lê belê ji ber du zarokên wê yên piçûk hebûn rêxistinê peşniyaza wê qebûl nekir û xwest ku ew xebatên xwe di nav civakê de dewam bike. Gelek jin û dayikên ciwan ku dibûn cebhewî wekî Newal, heman daxwaz kirin yan jî bi vê xeyalê xebatên xwe meşandin. Lê şert û mercên tenduristiyê yan yên malbatî destûr nedane. Lewma wan bi dehan salan têkoşîna xwe di nava civakê de him li hemberî kevneşopiyên zayendperest him jî li hemberî êrîşên rejîma Beesê bi heman ruh û dilsoziya şoreşgerî daye meşandin.

Newal Xalid têkoşîna xwe wekî dayik û cebhewî li Amûdê rave dike: *"Pirr zilm li ser jinê hebû û hîna jî heye. Min ji malbat û dewletê pirr zorî û zehmetî dît. Lê ez ji dewletê netirsiyam. Li kolanên Amûdê ji bo xebatên rêxistinî tenê jin digeriyan. Ez tevî zarokên xwe bi hevalan re derketim û gund gund jî digeriyam. Me belavok li ser çalakiyên gerîla û pêşketinên têkoşînê di nav gel de belav dikir. Malbatekê ez ixbar kirim. Dewlet hat û ez birim. Ez û hevalek rojekê man girtî.*
Dewletê zilamê min jî pirr tehdît kir. Zarokên min piçûk bûn û di nav koma çandê de cihê xwe digirtin. Dewletê gef li min xwarin û gotin: 'Em ê herdu zarokên te bibin'. Min jî got: 'Xwedê ev ziman kiriye devê me. Ziman û çanda me ne tiştek guneh e. Em çanda xwe, dîroka xwe û stranê xwe hez dikin. Zarokên me jî tambûrê lêdixin, kêfa wan tê. Ez nikarim wan ji komê derxim.'
Vê çaxê xeta sor xistin ser navê herdu zarokên min û nema dihiştin ku biçin dibistanê. Dewletê em gelekî êşandin. Zarokên min hatin tirsandin. Nefsiya wan ji ber zexta dewletê xirabû. Ruxmê ku me zehmetî dîtin, lê bi ruhê hevaltî em pêşketin û em bûn xwedî mejî."[329]

Diya Reşîd jî xebat û erkên xwe bê gumanên şexsî meşandin û li hemberî zextên dijmin jî bi soza xwe ve girêdayî ma. Tevî xebatên civakî wê sê salan kuryetiya li ser rêyên Kobanê, Cizîrê, Efrîn, Minbic û Reqayê meşandin û bi destê xwe pirtûk, al û kasetên partiyê dibir û dianî. Ruxmê zilamê wê jê aciz dibû dema ku ew ne li mal bû Diya Reşîd xebatên kuryetiyê domandin heta ku dewletê ew girt: *"Sala 1996'an ez li Tebqayê weke dayika yekemîn a ji Efrînê hatim girtin. Ez birim hepsa Derazorê û ya Şamê. Salekê ez bi heşt hevalên jin re li zindanê mam. Me di zindanê de tekmîla xwe digirt, perwerdeya xwe didît û me bîranînên xwe parve dikirin. Dewletê gelek êşkence li min*

[328] Hevpeyvîn bi Semîra re, endama Kongra Star, Kobanê, 2017

[329] Hevpeyvîn bi Mira Zoro, Mesude Aziz û Newal Xalid re, endamên rêveberiya Kongra Star a Amûdê, 2017

kirin. Ez tehdîd kirim û gotin: 'Tu jinek î, tu dayik î. PKK bi we dikene!' Ez pirr pê bandor bûm. Lê piştre heval hatin û moral dan min. Dema ku ez ji zindanê hatim berdan dewletê bi min kaxizek da îmzekirin da ku ez careke din karê siyasî nekim. Min îmze kir, lê min ti carî karê xwe berneda. Dîsa min dest bi kar kir. Dewletê nedihişt em rehet birûnin. Lê ruxmê wê jî ez nedisekinîm. Min soz daye Serok Apo ku ez ti car ji Partiyê qut nebim."[330]

Bi taybetî dilsoziya jinan bi Abdullah Ocalan re û perspektîfên wî ji bo têkoşîna jinê dibûn çavkaniya hêz û bixwebaweranîna jinên Rojava. Vê hêza manewî dihişt ku ne zextên zayendperest yên civak û malbatê ne jî zextên dewletê karibin bipêşketina têkoşîn û rêxistinbûna jinê bidin sekinandin.

c) Têkiliyên Abdullah Ocalan bi Gel û Jinan re

Gelek jinên welatparêz pergala birêxistinbûna jinê ku li Rojava ji dawiya salên 1980'yî ve gav bi gav bi pêş ketiye, wekî '*pergala Rêber Apo*' dinirxînin. Zêhniyeta civak û malbatê, jin tenê weke 'milk û namûs' didît û wiha pê re miamele dikir. Lê Abdullah Ocalan bawerî û berpirsyariyên mezin dane jinan. Li Akademiya Mahsum Korkmaz a li Libnanê, li malên Şam û Helebê wî civîn û nîqaşên berfireh bi jinan re bi pêş dixistin. Di van civînan de jinên Kurd û jinên pêkhateyên din jî beşdar dibûn. Ew hemû dibêjin, bi rêya van kombûnan û danûstandinên Abdullah Ocalan, wan hêza xwe ya çareseriyê û bixwebawerî bi pêş xistiye. Li ser vî bingehê piştgiriya jinan û tekoşîna azadiya jinê di malbatan de, di hemû warên civakî û siyasî de bi pêş ketine û rêxistinbûna xweser a jinên Kurd hatiye avakirin.

Gelek jinên Rojava cara ewilî Abdullah Ocalan di pirozbahiyên 15'ê Tebaxê yên salên 1990'î û 1991'ê de li Akademiya Mahsûm Korkmaz li Beqaa dîtin. Van pîrozbahiyan nêzî 15 hezar mirovan gihandin hev. Nêzîkî 30 salan paşê, dayik hîna bi kelecan û hestyarî behsa amadekariya çûyîn û hevdîtinên xwe dikin. Bi vî rengî, gelek jin car yekê ji mal û navçeya xwe derketin û bi Kurdên herêmên din ên Rojava re bi heman ruhî rabûn. Jiyana gelekan jî bi vê pîrozbahiyê hat guhertin.

Yadê Esma van rojan bi hesret tîne ber çavê xwe: *"15'ê Tebaxê 1991'an em çûn Libnanê cem Serokatiyê. Wê demê em hişyar kirin. Ji bo me wekî xewnekê bû. Şeş rojan em li cem Serok man. Bi hezaran kes ji tevahiya navçeyên Rojava hatibûn. Tu yê bêjî qey Kurdistan rizgar bûbû. Ji heyecan, coş û hezkirinê, sê rojan me nikarîbû xwarinê bixwin. Bi xweziya wan rojan! Malbatan zarokên xwe anîn Libnanê û diyarî Serokatiyê kirin. Ka di dinya de tiştek wiha heye? Dayik ji malbatên feqîr ku paşeroja wan zarokên wan in, diçûn zarokên xwe diyarî Tevgera Azadiyê kirin. Ez bawer nakim ku di ti şoreşa cîhanê de tiştek wiha çêbûbe."*[331]

Yadê Hemîde ji gundê Helincê li ser serpêhatiyên xwe dibêje: *"Em ji bo 15'ê Tebaxê bi gelê Efrîn, Qamişlo û Kobanê çûn kampa Serok ya Libnanê. Pênc rojan em bi hev re diçûn. Em çûn ser Goristana Şehîd Hemze. Serok heft saet û nîvan li ser lingê xwe sekinî û ji me re civîn çêkir. Piştî vegera min, ez tevlî karê rêxistinê bûm. Wê demê hevjînê min li Cezayîrê bû. Dema ez çûm Libnanê tiyê min pirr aciz bû. Wî digot çawa jinek wê bi tenê biçe Libnanê. Wê demê got, 'Bila birayê min li ser te bizewice'. Bi rast hevjînê min ku li Cezayîrê bû li ser min zewicî ji ber ez bi rêxistin û siyastê re elaqedar dibûm."*[332] Ruxmê ku zexta malbat û dewletê li ser Yadê Hemîde pirr

[330] Hevpeyvîn bi Diya Reşîd re, Efrîn, 2017

[331] Hevpeyvîn bi Yadê Esma re, Girkêlege, 2017

[332] Hevpeyvîn bi Yadê Hemîde re, gundê Helincê yê Kobanê, 2017

bû, wê xebatên rêxistinê dewam kirin. Bi serbilindî ew dibêje, wê deriyê mala xwe hertim ji civîn û Apociyan re vekirî hiştiye.

Ne tenê di pirozbahiyên 15'ê Tebaxê de Abdullah Ocalan bi gel û jinan re civiya. Wî mirovên cuda vexwendin cem xwe da ku li ser mijarên siyasî û civakî nêrînên wan nas bike û nêrînên xwe bi wan re parve bike. Wekî din ji bo çareseriya pirsgirêk, alîkarîdayîn û perwerdekirinê gelek caran wî gazî kesên hewcedar dikir. Bi vî rengî civakê êdî xwe bi tenê nedidît. Ji ber ku Abdullah Ocalan derdê gel û yê jinan dikir derdê xwe, wî karibû bi her kesê/î re têkilî û danûstandinên eşkere û encamgîr ava bike. Bi vî rengî, Akademiya PKK'ê dibû navnîşana çareseriyê ji bo pirsgirêkên gel ên cûr bi cûr. Bi sedan jinên nedikarîn derdên xwe bi kesê/î re parve bikirana, bi hêviyên mezin berê xwe didan Akademiya li Libnanê. Bi vî rengî, danûstandineke zindî di nava civaka Rojava û Tevgera Azadiyê de bi pêş ket. Tehlîlên civakî û perspektifên Abdullah Ocalan dibûn bersiv ji pirs, nakokî û lêgerînên gel û jinan re.

Fatma ji Qamişloyê di zarokatiya xwe de mîlîtanên PKK'ê nas kirin. Ew bandora Abdullah Ocalan li ser civaka Rojava wiha dinirxîne: "*Bi taybetî hevalên jin yên perwerdeya Saha Serokatiyê dîtibûn hêzeke mezin didan gelê Rojava. Ew bi civakê re, bi nirx û kevneşopiyên civakê re dibûn yek û xwe dixistin dilê civakê. Gelek kes ji gel bixwe jî çûn û Serokatî dîtine. Carna Serokatî bi xwe jî bang li malbatan dikir û wezîfedar dikirin. Bi dehan malbat tevlî civînên Serokatiyê bûne û li perspektîfên Serokatiyê guhdarî kirine. Ew hemû di şoreşa Rojava de xwedî ked in û şoreş bi rê ve birin. Serokatiyê avakirina rêxistinbûna gel esas didît. Welatparêzî bi mirovan dida nasîn û nîqaş dikir: Însanek welatparêz divê çawa be? Digot ku 'ger hûn nikarin madî bi me re alîkar bin, manewî bi me re alîkar bin, bi me re kar bikin. Ger hûn vê jî nikarin, ji me re dua bikin da ku em bi ser kevin.'*
Serok ti car gel nedixist bin daxtê de. Her tim bi uslûbekî nerm xitaba gel kir. Serokatî ruhê însanan tehlîl dikir û fêhm dikir. Mesela gelek malbat ku zarokên wan tevlîbûn, xwe gihandin Serokatiyê bi daxwaza ku ew zarokên wan vergerîne malê. Ji ber ku bi meselê zêde nizanibûn. Lê wextê ku ev malbat ji cem Serok vedigerîn ji sêdî 99 ew dihatin guhertin. Bi danûstandin, nîqaş û civînên Serokatiyê ku lê guhdarî kirin, êdî fedî dikirin ku behsa zarokên xwe bikin. Serokatî bi uslûbeke xweş ruh û erkên welatparêzî bi van însanan da fêhmkirin."[333]

- **Şênberkirina Nasnameya Jinê**

Ji bo jinên ku di civakê de nedihatin dîtin û li wan nedihat guhdarîkirin, bikarin nihêrîn û vîna xwe derxin holê, Abdullah Ocalan elaqeyeke taybet nîşan dida. Wî him mîlîtanên jin him jî jinên di nav civakê de amade dikirin da ku ew bikarin têkoşîneke encamgir li hemberî zayendperestiya civakê bimeşînin û kesayeta xwe ava bikin.

Li ser vê babetê jî Fatma çavdêrî û têgihîştina xwe parve dike: *"Ez bixwe di gelek civînên Serokatiyê de bi hevalên jin re amade bûm. Wî her tim dixwest kesayeta jina azad, ya jina mîlîtan ava bike. Jin ji hemû zehmetiyan re amade dikir. Hinek hevalên jin hebûn ku gelekî dixwestin biçin çiyê. Lê Serok dixwest wan berê zêdetir di warê siyasî û bîrdozî de bi pêş bixe û bi hêz bike. Ew hişyar dikirin: 'Binêrin hûn ê biçin di nav guran de!' Min wê demê wate nedida. Ez fikirîm: 'Ma ew ê biçin çiyê. Li wir hemû heval in ku li keleka hev in. Jin be, zilam be hemû hevalên hev in. Çima Serok dibêje ku 'hevalên jin wê biçin nav guran?" Niha ez ketime vê ferqê çima Serok wê demê*

[333] Hevpeyvîn bi Fatma Tahir re, hevseroka Deste ya Malbatên Şehîdan Kantona Cizîre, Amûdê, 2017

zilam dişiband guran. Wî dixwest kesayeta hevalên jin xurt bike ji bo ew bikarin li hemberî zêhniyeta desthilatdariya zilam xwe biparêzin."[334]

Abdullah Ocalan bi erkên taybet, xebatên hesas û girîng ên rêxistinê, baweriyeke mezin dida jinan. Wî çend jin weke kurye wezîfedar kirin. Wan weke qasidên rêxistinê not, rapor û şervan bi tedbîrên ewlekariyê û sirriyetê gihandin cihên pêwîst. Keda wan jinên kurye hişt ku pergal û têkiliyên rêxistinî karibin bi ewle werin meşandin. Yek ji wan jinên kurye, qala wê yekê dike ku Abdullah Ocalan gelek ked dida ji bo ku jin bi erka kuryetiyê bikare nasnameya siyasî ya jinê û hêza xwe ya xweparastinê jî bi pêş bixe:

"Dema ku ez ji bo xebatê kurye diçûm Akademiyê, Serok her tim gazî min dikir û ez tevlî civînên hevalan dikirim. Wî dixwest manewiyata min xurt bike û baweriyê bide min. Vê nêzîkatiyê di nava min de ruhek çand ku ez heta îro jî barê tevgerê li erdê nahêlim. Bi danûstandinên xwe Serokatiyê însan ava dikir û her tim her tişt hesab dikir. Xwuşka min û birayê min şehîd bûn. Rojekê min grûbek heval ji cem Serokatiyê girt ji bo ku ez derbasê welat bikim. Wê demê min got, 'Serokê min, ez jî dixwazim herim'. Min got, belkî ew min naşîne ji ber ku ez piçekî qelew bûm. Lê hevalên din jî hebûn ku weke min bûn... Serokatî keniya û got, 'Ne ji bona vê. Tu dikarî herî. Lê di malbata we de du şehîd hene. Dayika te wê çawa rabike? Tu dikarî li vir jî kar bikî'."[335]

Jinên kurye gelek salan bi şev û roj li ser rêyên dûr bûn, di tren û otobusan de radiketin. Ji bo ew bikarin li ser wan rêyan xwe li hemberî nêzîkatiyên şaş biparêzin, Abdullah Ocalan perspektîfek wiha dabû wan: *"Ger kesek dixwaze xwe nêzîkî we bike, hema nasnameya xwe ya siyasî bêjin ji bo ku ew kes derheqê we de neçe nêrînên şaş. Her tim bi zanebûna hûn siyasetvan in tevbigerin."*

Fatma dibêje, wê bi vê perspektîfê girîngiya nasnameya siyasî ya jinê di pratîka xwe de fêhm kiriye: *"Di wan heft salan de min li ser wan rêkan bi çavê xwe dît ku dema min nasnameya xwe ya siyasî eşkere dikir, her kes bi hesab û hurmet nêzîkî min dibû. Dema ku ajokarên taksî yan otobusan ji min re digotin: 'Tu wekî keçikê bi tenê di vê nîva şevê de çi dikî? Tu diçî kû dere?' Min digot, 'Ez hevala PKK'ê me. Ez leşkera Serok Apo me. Karê min heye.' Wê demê wan bê pirseke din digot, 'ser seran, ser çavan' û bêdeng dibûn. Serok bi vî awayî jî dixwest nasnameya jinê wekî siyasetmendar bide pêş. Wî dixwest, jin bi nasnameya xwe siyaset û têkoşînê bike."*[336]

- **Hevdîtinên bi Hevjînên Şervan û Şehîdan re**

Bi taybet gelek jinên hevjînên wan tevlî nav refên gerîla bûbûn yan jî şehîd bûbûn, dihatin cem Rêberê PKK'ê û alîkarî dixwestin. Carna Abdullah Ocalan ji bo hevjînên gerîla û şehîdan kombûn û perwerdeyên taybet li dar dixistin. Mînak wî di sala 1988'an de perwerdeyeke 10 rojan li ser erkên hevjînên şehîd û şervanan meşand. Li wê derê, wî perspektîf û piştgirî da van jinan ji bo bikarin li hemberî paşverûtiya civakê bisekinin û bikarin bi helwestên xwe zarok, malbat û civakê bikişînin aliyê xwe. Bi dahûrandinên xwe Abdullah Ocalan nexasim alîkarî dida hevjînên şehîdan da ku ew ji derveyî îradeya xwe careke din neyên zewicandin û di civakê de werin qebûlkirin. Di demên betlaneyên havînê de hevjînên şehîd û şervanan carna tevî zarokên xwe diçûn akademiyê li Libnanê û piştre li Şamê. Li wir wan hevrê û doza hevjînê xwe yan jî dayik û bavê xwe nas dikirin.

334 Çavkanî li heman cihî

335 Çavkanî li heman cihî

336 Çavkanî li heman cihî

Ketina nav çanda jiyana kolektîf û perwerdeya akademiyê dibû hêzeke girîng ji gelek jin û zarokan re, ew jin û zarokên rastî zordariya civak û dewletê dihatin.

Di çîrokên jiyanê yên hevjînên şehîd û şervanan de nakokî û veguhertinên di salên 1990'î de di malbat û civaka Rojava de qewimîne pirr zelal xuya dibin. Lewma em dixwazin ji devê wan guhdarî li serpêhatiyên sê dayikan bikin ên ku hevjînên wan *'malbata xwe ya piçûk terk kirin ji bo tevlî malbata mezin a PKK'ê bibin'*.

Diya Ciwan 22 salî û dayika sê zarokan bû, dema hevjînê wê Elî çû çiyê û tevlî nav refên gerîla bû. Elî Dêrik di sala 1986'an de wekî xwendekarê zanîngeha Şamê tevgera Apocî nas kir û biryara tevlîbûna nav refên şoreşê dabû. Serê pêşî, wî biryara xwe bi hevjîna xwe re parve nedikir. Lê belê wî hewl dida ku fikra tevgerê bi malbata xwe bide nasîn. Di 15'ê Nîsana 1995'an de Elî tevî 24 hevrêyên xwe li Serhedê şehîd bû.

Diya Ciwan wiha behsa bandora tevlîbûn û şehadeta hevjînê xwe dike: *"Şehîd Elî ji me re behsa Partiyê dikir. Bangî me, yanî bangî jinan jî dikir û digot, 'Werin hûn jî li me guhdarî bikin. Ferq navbera jin û mêr nîne û di navbera her çar parçên Kurdistanê de jî nîne. Heval ji her çar parçan digihin hev. Jin wek mêr bi hemû karan radibin.' Em ecêb man. Çawa dibe ku jin biçe çiyê û ji malbata xwe qut bibe?*

1989'an şûnde me ew nema dît. Sê zarokê min hebûn. Dayika wî û bavê wî yê ixtiyar hebûn. Cara dawiyê berê derbasê çiya bibe, Hevalê Elî tev hevalê xwe hat cem me. Ji min re got, 'Ez li ser vê riyê me. Ez nizanim çi çêbibe. Heger tiştek bi min bibe, tu li bin konê min bisekinî û bersivê bidî ji ber tu qencî û xirabiyên min nas dikî. Bihesibîne ez birayê te me û tu van her sê zarokê min xwedî bikî. Bila ew şagirtê Serok Apo bin û wan ji hevalan qut neke. Wekî din tu serbest î.' Êdî min fêhmkir. Dayika wî pirr ez êşandim û digot ku min kurê wê rêkiriye. Bavê min jî dixwest min bibe mala xwe. Lê destê min ji zarokên min nedibû. Ez pirr bi wan ve girêdayî bûm. Malbat û civakê em qebûl nedikirin. Min kirasekî nû li xwe kiriba derdora min digotin, 'ne xema wê ye'.

Di sala 1990'î de ez çûm cem Serok. Min xwest perwerdê bibînim û derbasî çiyê bibim. Jiyana min ya malê cehenem bû. Min her tişt ji Serok re got. Roja din Serok bi min re rûnişt û li ser jiyana civakî bi min re axivî. Wî ji min re digot, wekî jin ez dikarim xwe çawa biparêzim, çawa zarokên xwe xwedî bikim, ez çawa di civakê de bikarim xurt bibim û karê rêxistinê bikim. Serok deh rojan bi min re mijûl bû. Serok got, 'Tu jinekê qezanc bikî baş e. Hûn herdu dikarin herin malan vekin. Lê divê tu xesûya xwe û xezûrê xwe tehemul bikî. Di serî de tu mala xwe bi rê ve bibe. Şerê malê esas e. Tu vî şerî bi ser nexî, tu nikarê şerê çiyê jî bi ser bixî.'

Wê demê hevjîneke şehîdan li Tirbespiyê hebû, ew careke din dan zewicandin. Ew jin 18 salî bû, zarokek wê hebû. Serokatî got, 'Çima wisa bû? Ger hûn bi wê jinê re biban heval ew nedizewicî. Ew jin wê pirr êşê bibîne û wê hemû tiştan ji mêrê xwe qebûl bike. Ji ber, ew ê bêje 'tu jinebî yî' û pehînekê jî lê bide. Serê xwe ji ti zilamî re netewînin! Baweriya xwe bi ti zilamî neynin. Mêrê ku dibêje, 'ez ji te hez dikim' derewa dike. Hûn hevjînên şehîdan in. Bila her kes hûrmet û nirx bide we.'

Serok xwe gelekî bi me re westand ji bo em rastiya mêr nas bikin û jiyana xwe bi mêr ve girênedin. Lê me bi mala xezûrê me ve girêdidan. Serok digot, 'Hûn ê dayik û bavê şehîdan jî xwedî bikin ji ber şehîdan dayik û bavê xwe jî ji we re hiştine'."[337]

Piştî vê nîqaşê Diya Ciwan çû malê û tevlî xebatên cebhewî bû. Di destpêke de ew çar jin bûn, piştre ew bûn 12 jin ku bi hev re civînên xwe çêdikirin û alîkarî dan hev. Tevî ku bavê Diya Ciwan û hinek kesên din li hemberî xebatên wê rabûn, wê rêya doza hevjînê xwe domand. Dema betlaneya havîna 1997'an hat, Diya Ciwan cardin tevî zarokên xwe çû cem Abdullah Ocalan. Wê demê agahî gihabûyê ku Elî şehîd bûye: *"Serok li ser şehadeta Hevalê Elî bi min re axivî û xwest ku ez şehadeta wî îlan bikim. Wî ji me re got, 'Ez karê we û perwerda zarokan dişopînim. Çi bibe bila bibe, divê hûn rêya şehîdan bernedin. Xwe bidin qebûlkirin. Yên ku şaş nêzîkî we dibin, wê rojekê poşman bibin'."*

Diya Ciwan piştrast dike ku şîretên Abdullah Ocalan ji wê re û ji bo guhertina nêzîkatiyên malbat û civakê, ji wê re dibûn alîkariya herî mezin: "*Piştî şehadeta Hevalê Elî, malbat nêzîkî min dibûn. Ew gihatin qenaetê ku ez bi zarokê xwe ve girêdayî me û tiştek bê exlaqî nakim. Birayê min yê mezin şeş sala bi min re neaxivî, lê piştre hat û lêborîna xwe xwest. Dema ku xesûya min li ser kezeba xwe digiriya, min didît ku ya ku kezeba xwe winda dike û ya ku mêrê xwe ne weke hev e."*[338]

Necah Gulo hê di zikê diya xwe de wek berdêlî bi kurmamê xwe re hatîbû zewicandin. Di temenê xwe yê 15 salî de ew wekî bûk çûbû mala xesûya xwe. Di sala 1980'yî de mîlîtanên PKK'ê diçûn mala wan û malbat wek welatparêz piştgirî dida Tevgera Azadiyê. Çûn û hatina şoreşgeran di jiyana Necah û hevjînê wê de guhertinên mezin bi xwe re anîn: "*Dema Partiya Karkerên Kurdistan hat, cara ewil min hevaleke jin dît. Navê wê Hevala Leyla bû. Dema ku me xwarin datîna li ber hevalan, wan bangî min kir û xwest bi me re nîqaş bikin. Dema wilo gotin, ev bû weke, ez tiştekî nû bibihîzim û weke insan têm hesibandim. Lê hingî min got, 'Heval, ez ê çawa werim nav zilaman de rûnim? Qey hûn dixwazin ku ev mal min bikuje?'*

Hevjînê min, Hevalê Mistefa û çend hevalên wî grûba ewil bû ku ji taxa me tevlî bûn. Di destpêka 1986'an de ew çûn Akademiya Mahsûm Korkmaz. Piştî vê, Hevalê Mistefa çar salan kar kir di nav gel de. Di sala 1988'an de ez jî carna bi Hevala Bêrîvan re derdiketim. Dema ku ez tevlî xebatên di nav civakê de bûm ji bo min bû, wekî ji tariyê nûka derketim ronahiyê. Min gelekî zehmetî kişandin, ji ber min ji bilî malbata xwe kes nas nedikir. Zarokê min piçûk bûn, li ser destê min bûn. Min karê xwe yê malê dikir heya yekê şevê, da ku ez roja din bi hevalan re ji bo karê rêxistinê derkevim.

Şevekê min dît Hevalê Mistefa nerazaye û difikire. Wê demê wî ji min re got, wî soza xwe ya tevlîbûna PKK'ê daye. Wî got, 'Ez ê biçim. Tu jî nêrîna xwe bide.' Min bersiva wî da, 'Tu dixwazî ku ez dilê te xweş bikim yan rastiyê bêjim?' Wî got: 'Na rastiyê bêje'. Min got, 'Tu wê herî kû derê û min bihêlî bi van çar zarokan ve? Ez ciwan im. Li ser min giran tê.' Wî got, 'Va te qebûl nekir. Lê min êdî soza xwe daye û ez ê herim. Tu dixwazî bi mala bavê min re bijî? Tu dixwazî here mala bavê xwe yan bizewicî? Tu serbest î.' Min got: 'Madem te biryara xwe dayî û tu gihayî qenaetekê, here! Oxira te ya xêrê be.' Wê demê hê kurê me yê piçûk di zikê min de bû.

[337] Hevpeyvîn bi Diya Ciwan re, hevjîna Şehîd Elî, li Dêrikê, 2017

[338] Çavkanî li heman cihî

Di sala 1990'î de ez û her sê zarokê xwe tev malbatên şoreşgeran û hevjînê şehîdan çûn Libnanê cem Serokatiyê. Em heftekî man. Serokatî şev û roj civîn bi jinan re û bi zilaman re çêkirin. Di 15'ê Tebaxê de civîna giştî hat çêkirin. Serokatî hemû jin ji bo civînê kom kirin. Hinek dayik hatibûn ji bo zarokên xwe vegerînin malê. Serokatiyê got, 'Ez van keç û xortên li dora min zane dikim. Eger hûn dixwazin wan bibin, bibin. Hûn dikarin piştgiriyê bidin zarokên xwe û ya ku dikare bi hevalan re kar bike, bila bike. Ji xwe bawer bin û ji hev hez bikin, alîkariya hev bikin.' Ji bo min dîtina Serokatiyê pirr bi wate bû û perwerdek bû, wekî ez ji nû ve werim ser dinyayê. Piştre em bi coş û moral vegeriyan. Bi vî moralî em diketin nav xebatên gel.

Roja ku Hevalê Mistefa wê here çiyê, civîn û perwerdeya min hebû. Me hev himbêz kir. Min got, 'Soz heya dawî ez vê riyê berdewam bikim. Divê dengê te bi qehremanî werê min û çiqas tu di tengayî de derbas be jî, divê tu sirrê xwe nedî kesî.' Wî got, 'Divê tu werî çiyê.' Min got, 'Zarokên me hûr in. Lê heya ji min werê, ezê werim welat.' Wî serê min maç kir û ez çûm civîna xwe. Dema ku Hevalê Mistafa xatirê xwe xwest, em di hundirê xwe de deh perçe bûn, lê me hêstir nebarandin. Di 9'ê Gulana 1991'ê de di encama îxanetê de Hevalê Mistafa ji aliyê dewleta Tirk ve hat şehîd xistin.

Piştî şehadeta wî ez li bin konê wî axivîm. Ewqas zehmet, ewqas êş. Zarok piçûk bûn, lê rojekê kesekê hêsirê min nedît. Piştre ji malbatê gelek kes tevlîbûn, her salê yek tevlî dibû. Her diçû girêdana me bi doza wan re bêhtir dibû. Berê ku Serok ji Sûriyê derbikeve, careke din ez û kurê xwe çûn cem Serokatiyê. Em nêzî çar mehan di perwerdê de diman. Serok wê demê ji min re got, 'Bila ti kes weke jina filankes yan diya behvanî bang li te neke. Bila her kes bi navê te bang li te bike. Perwerdeya xwe baş fêhm bike."[339]

Di hevpeyvînên bi hevjînên şehîd û şervanan re derket holê ku pirraniya hevjînên wan hê nû piştî ku soza xwe ya tevlîbûnê dabûn, ev biryar bi hevjînên xwe parve kirine. Gelek jin jî ji ber gumanên xwe yên siberojê û nasnekirina rêxistinê, li ber tevlîbûna nav refan a hevjînên xwe radibûn, û wan dixwest wan vegerînin malê. Lê belê bi naskirin û bipêşketina têkoşînê re gelek ji wan piştî demekê ji bo biryarên hevjînên xwe hûrmet raber kirin. Jinên ku karibûn Abdullah Ocalan bibînin ji hevdîtin û perspektîfên wî hêzeke mezin digirtin da ku ew bikarin bi vîna xwe bijîn û berpirsyariya zarokên xwe rakin. Wekî din hinek jinan piştgirî da biryara tevlîbûna nav refên şoreşê ya hevjînê xwe, ji ber ku heman xwestek di dilê wan de jî hebû. Lê bi taybetî, dema ku zarokên wan hebûn bi pirranî bav diçûn û dayik diman. Jinan careke din fedekarî dikir û berpirsyariya giştî ya malbatê digirt ser xwe.

Yek ji wan dayikan **Yadê Fatma** ango dayika Şehîd Qehreman e. Hîna beriya tevlîbûna nav refên PKK'ê ya hevjînê xwe, wê li mala xwe Apocî wekî endamên malbatê dihesibandin. Piştî ku hevjînê wê ji malê derket, îcar Yadê Fatma şeş salan li cem şoreşgeran jiya. Wê demê, wê ne tenê berpirsyariya zarokên xwe digirt ser xwe. Ew di heman demê de dibû dayika zarokên din ên ku dayik û bavê wan li çiyê bûn. Yadê Fatma serpêhatiyên xwe wekî malbateke şoreşgeran wiha tîne ziman:

"Rojekê hevjînê min hat cem min. Em bi hev re rûniştin û wî ji min re got: 'Ez dixwazim herim. Tu çi dibêjî?' Min got, 'ger tu herî, here.' Ez fikirîm ku ew ê biçe çiyê. Me hevdu qeneh kir. Tiştek bi zorê tine bû. Me hingî heval dîtibûn û me ew nas dikirin. Ew çiqas bi fikrê tevgerê germ bû, ez ji

[339] Hevpeyvîn bi Necah Gulo re, hevjîna Şehîd Mistafa, Qamişlo, 2017

wî germtir bûm. Wî ji min re got, 'Tu xurt î. Tu yê zarokan xwedî bikî.' Me gelek nîqaş kir. Roj û şevek heya serê sibê me nîqaş kir. Me ji hevdu fêhmkir. Lê malbata wî pirr aciz bû, digotin, 'em zarokên te meyze nakin. Bila ji birçîna bimirin. Tu êdî ne kurê me yî!' Dayik û bavê min jî qeherîn, lê dengê xwe nekirin.
Zarokên min tevî zarokên din mezin bûn yên ku dayik û bavê wan li çiyê bûn. Sê ji wan zarokan li cem me diman, diçûn dibistanê û dixwendin. Hinek zarokên hevalên şehîd û gerîla li cem malbatên din jî nêzî me diman. Serok her hefte yan 15 rojan carekê dihat cem zarokan yan jî wî zarok bang dikirin cem xwe. Ew diçûn, moral çêdikirin yan jî tevlî morala hevalan dibûn."[340]

Zozan vê demê 4 salî bû. Ew wê demê wiha tîne bîra xwe: "*Em hemû di komê de bûn. Çi mêvan dihat Serok bangê me dikir. Serok civîn ji me re çêdikir. Em zarok tenê bûn. Em gelek bûn, zarokên şehîdan û yên ku dayik û bavê wan di nav hevalan de bûn. Serok ji me re xwarin çêkir. Wî ji me re çîrok digotin û me jî stran digotin. Me bi hev re gelek sûret kişandin. Em diçûn cem hevalan û me helbest û stran digotin heya em ewqas westiya bûn ku em bi xew ve diçûn."*[341]

Beşdarbûna jinan û hevjînan a nav Tevgera Azadiyê, heqîqeteke nû di jiyana civaka Rojava de derxist holê. Heman heqîqetê xwe di rastiya jinên ku hevjînên wan rêya şoreşgertiyê hilbijartî de da der. Çi jina ku biryara hevjînê xwe pejirand, çi jina ku di serî de li dijî vê sekinî, di encamê de doza hevjînên wan, fikra azadiya jinê û çanda welatparêziyê bandor li pirraniya wan kir. Bi vê bîreweriyê, ew li hember zehmetiyên aborî û civakî li ser lingê xwe sekînine û wan zarokên xwe bi hêza xwe xwedî kirine. Wan ew nihêrîna misoger a di civaka Kurd de da guhertin ya ku dibêje *'jinek bê zilam nikare bijî'*.

d) Têkiliyên Civakî wekî Bingehê Tevgera Azadiya Jinê û Hevaltiya Gelan

Di têkiliyên malbatî de bi bandora têkoşîna tevgera PKK'ê guhertin û veguhertinê çêbûn. Heman tişt ji bo têkiliyên civakî jî lê ye. Bermahiyên çanda civakî ya neolîtîk wekî hevkarî û hevgirtinê nexasim li gundan dibûn bingehekî xurt ji bo rêxistinbûna jinê. Jinan li wir têkiliyên cîrantiyê bi awayekî xwezayî zivirandin têkiliyên siyasî. Dema ku jin di jiyana rojanê de kom dibûn, derd û kêfxweşiyên xwe parvedikirin rojevên nû avabûn. Li gund û taxan tevî mijarên malbatî û civakî êdî tevlîbûnên kesên nas, çalakiyên gerîla û pêşketinên siyasî jî dihatin nîqaş kirin. Alîkarî ji bo rêxistinê wekî xêr dihat berhevkirin. Aso û qadên çalakiyê yên jinan herdiçû firehtir dibûn. Pêşketin zû çêdibûn. Ji ber ku jin dixwestin xwe ji zextên zayendperest xilas bikin him jî ew xwe û çanda xwe ya resen di kar û pergala rêxistinê de vedîtibû. Pergala rêxistinê li ser bingehê dîrokî yê civaka komînal bi wateyên nû hat hûnandin.

Ev yek jî di têkiliyên bi jin û cîranên ji pêkhateyên cuda de xuya dibû. Ji ber ku jiyana jinan bi pirranî li derveyî saziyên dewletê derbas dibû, bandora şovenîzma rejîma Bees li ser jinê li gorî zilam kêmtir bû. Jinên tevahiya gelên Rojava di parastina çand û zimanê xwe yê resen de bi risteke girîng rabûne. Hemwext, jinan di têkiliyên xwe ligel cîranan de bi xwezayî danûstandin û jiyana hevbeş a gelan domandin. Gelek jinên li gund û bajarên Rojava bi çand, ziman û baweriyên cuda li cem hev jiyane, fêrî ziman û rêûresmên hevdu bûne. Li ser vî bingehî jinên Kurd li Rojava ji salên 90'î ve bi awayekî domdar têkiliyên dostanî û rêxistinî bi jinên Suryanî, Aşûrî, Ermenî, Keldanî û

[340] Hevpeyvîn bi Yadê Fatma re, Kobanê, 2017

[341] Hevpeyvîn bi Zozan Bekir re, berdevka Desteya Jinê ya Kantona Kobanê, 2017

Ereb re bi pêş xistine. Piştî ku di sala 1986'an de Şehîd Ezîz wekî şoreşgerê Ereb ê yekemîn ji bo azadî û yekîtiya gelan tevlî nav refên PKK'ê bû, jin û xortên Ereb û ji pêkhateyên din jî dan ser rêya wî. Bi vî awayî naskirin, hezkirin û bawerî di nav gelan de bi pêş ketin û gihiştin rehendeke siyasî ya ku di şoreşa Rojava de bûbû bingehê neteweya demokratîk.

Zelal Cîger diyar dike ku bingehê civakî yê şoreşa Rojava bi perspektîfên Abdullah Ocalan di salên 1990'î de hatibû avakirin û vî bingehî tevahiya civakê hembêz dikir:

*"Bi rastî **Serokatî di salên 90'î de li Rojava pergala neteweya demokratîk dabû avakirin.** Belkî hinek rengê vê cuda bû, lê gelek aliyên wê dişibin hev. Wê demê her kesê cihê xwe di nava kar de digirt. Komîteyên zarokan, ciwanan, ixtiyaran, oldaran, jin û jinên ciwan, xortên ciwan, cotkaran, karkeran, rewşenbîr û hunermendan hebûn. Bi vî rengî Serokatî pergalek ji bo tevahiya civakê dabû avakirin.*

Em di salên 1988-89'an de ciwanên 13 – 14 salî bûn. Me pirtûkên Serokatiyê digirtin û ew dixwendin. Alfabeya Kurdî û dîroka Kurdistanê fêrî zarokan kirin. Belkî akademiya me tine bû, lê her mal wekî akademiyekê bû. Her meh ji aliyê Partiyê ve belavok dihatin weşandin. Pêşketinên siyasî û rêxistinî, rewşa şer û perspektîfên ji bo gel hemû tê de dihatin ragihandin. Em mal mal diçûn û me ji her kesê re dixwend. Paralelê sîstema dewletê, me sîstema xwe dida meşandin. Gelek pirsgirêkên me yên civakî hebûn, me bixwe ew çareser dikirin. Ev hemû bûne avantajek ji bo Şoreşa Rojava. Serokatî li Rojava dikir hedef ku ji sîstema dewletê derbasî sîstema neteweya demokratîk bibe. Lewre bi neteweyên din re jî hevdîtin dida çêkirin. Danûstandina Serokatiyê bi tevahiya netewe û beşên civakê re hebû, nêrîn parve dikirin û alîkariya hevdu kirin. Heta 1999'an vê berdewam kir."[342]

e) Wekî encam

Tevlîbûna jinên pêşeng ji têkoşîna azadiya Kurdistanê re di destpêka salên 1990'î de nîşan daye ku jin dikarin di her aliye jiyanê de bibin xwedî fikir, gotin û helwest. Bi vî awayî gelek jinên li Rojava di salên 1990'î de hişyar bûn û doza azadiya welat aydê xwe dîtin. Wan êdî qîma xwe tenê bi rista dayik û jina malê nedianî.

Pirsa '***Çawa bijîn?***' xîtabê jinan û civakê hemûyî dikir, lêpirsîn û lêgerînên nû bi xwe re anîn. Gav bi gav jinan rista guhdar û temaşevan li pey xwe dihişt û li bersivên aydê xwe digeriyan. Wekî gava yekem, li navçeyên Rojava hemûyan zêdetir jin ruxmê astengiyên malbatî û zextên dewletê, êdî ji 'qefesa malê' derdiketin û bi ruhê welatparêziyê tevlî xebatê û çalakiyan dibûn. Bi taybetî jinên ku wekî cebhewî xebat meşandin di gelek mijaran de bi rista rêveberiya civakê radibûn. Ew jinên ku berê bi tenê êş kişandin, gihandina hev û piştgirî di nav jinan de dan avakirin. Çîrokên wan ên jiyanê destnîşan dikin ku gelek ji wan êşên zayendperestiya civakî û zextên dewletê zivirandin sedema têkoşînê û avakirina rêxistinbûna jinên welatparêz.

Di salên 1990'î de çanda welatparêziyê dibû çandeke nû ya jiyana civakê. Li hemberî pênasekirina Kurdîtiyê bi têgihînên eşîrî ango kevneperest, çanda welatparêziyê netewebûna Kurdan bi têgihînên demokratîk û sosyalîst pênase dikir. Di vê têgihîn û çanda welatparêziyê de ya ku xwe dispêre nirxên komînal di çanda kevnar a gelê Kurd de, jinan hebûna xwe didît. Di rêxistinbûnên

[342] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

civakî yên welatparêz de hemû ferdên malbatê – jin, zilam, ciwan û zarok – karibûn çand, ziman û dîroka xwe nas bikin. Bi taybetî avakirina komên çand û huner dibûn amûreke girîng a têkoşînê li hemberî siyaseta bişaftinê ya dewletê. Gelek zarok û ciwanên Rojava yên ku di koman de cih girtin, nasnameya xwe ya neteweyî, pîvan û nirxên welatparêziyê nas kirin, piştre tevlî nav refên têkoşîna azadiyê dibûn. Her wiha gelek jinên ciwan jî bi rêya xebatên çand û huner, bandora ferasetên baviksalar ên şermê ji ser kesayeta xwe avêtin û li pêşiya gel hunerên xwe pêşkeş kirine.

Çanda manewî ya welatparêzî û hevaltiyê hêz daye jin û dayikan da ku li hemberî zextên zayendperest yên malbat û hevjînan li ber xwe bidin û vîna xwe derxin holê. Li ser vî bingehî jinan xwe perwerde dikir, dibûn axaftvan û çalakvan. Bi ked û têkoşîna xwe, jinan ji nû ve xwe nas kir û wan rêyên nû yên jiyanê kifş kirin. Hinek hevjîn û malbatan bi bandora çanda welatparêziyê guhertinên demokratîk di jiyan û têkiliyên xwe de jî pêk anîn. Li şûna serweriya gotina bav li ser tevahiya jiyana malbatê, di hinek malbatên welatparêz de dayik û bav êdî li nihêrînên hevdu û li yên zarokan jî guhdarî dikir. Her wiha hinek jin û xortên ciwan êdî zewacên kevneşopiyê wekî armanca jiyana xwe nedipejirandin. Li şûna ku bikevin 'qefesa zewacê', wan jiyana şoreşgeriyê neqandiye. Herçiqasî çend hevjînan biryareke wiha bi hev re dabe jî, piştî zewacê di pirraniya malbatan de bav biryara tevlîbûna nav refên şoreşê bi serê xwe daye û dayik tevî zarokan, li pey xwe hiştine. Vê yekê û serpêhatiyên hevjînên şoreşger û şehîdan, destnîşan dikin ku zextên baviksalar li ser jinê domandine û jiyana gelek jin û zarokan tarî kirine.

Beramberî vê tahlîlê û perspektîfên Rêber Abdullah Ocalan yên ku bi rêya belavok û kasetên vîdeo gihandin gelê li navçeyên Rojava hemûyan ji bo jinan dibûn çavkaniyeke nû ya zanîn û zelalbûnê. Gelek jinan bi vî awayî karibû sedemên nakokî û pirsgirêkên xwe yên jiyanê fêhmbikin û li çareseriyê bigerin. Her wiha derfeta beşeke jinên Rojava jî çêbû ku Rêberê PKK'ê bibînin û yekser derd û tengasiyên xwe nîqaş bikin. Di hevpeyvînên bi van jinan re yên ji bo vê lêkolînê de xuya dibe ku her yeke ji wan di hevdîtin û nîqaşên bi Abdullah Ocalan re perspektîfên girîng girtine ku jiyana wan da guhertine. Li aliyekî ew cesaret, hêz û bixwebawerî digirtin da ku tabûyên zayendperest bixin ber lêpirsînê, ji sînorên pergala desthilatdar derbas bibin û vîna xwe temsîl bikin. Li aliyê din Abdullah Ocalan bi pêşniyazên xwe rêbazên têkoşîn, xweparastin û guhertina civakê nîşanî jinan dikirin. Wî bawerî daye jinan da ku ew vîn û helwesta xwe di malbat û civakê de bidin qebûlkirin û tevlî xebatên rêxistinê bibin. Bi vî awayî pirsgirêk û nakokiyên 'takekesî' dibûn gavên ber bi guhertinên demokratîk ên li nava malbat û civakê ve.

Serpêhatiyên takekesî û kolektîf yên rêxistinbûna jinê yên ku di salên 1990'î de qewimîn, bingehekî xurt ji bo birêxistinbûna tevgera azadiya jinê li Rojavayê Kurdistanê ava kirin. Her wiha bi zanebûna polîtîk û çalakbûna jinê di salên 1990'î de ne tenê nasname û hevgirtina jinên Kurd bi pêş diket, di heman demê de hîmên çanda welatparêziyê girêdayî nirxên demokrasî, wekhevî, têkoşîna azadiyê û hevaltiya gelan di civaka Kurd de ji nû ve hatin şirovekirin. Bi vî awayî ceribandinên pêşîn ên avakirina ruh û saziyên neteweya demokratîk jî li Rojava bi gewde bûn.

III. 3.5. Roja Reş - Bandora Komploya Navdewletî li ser Jin û Civaka Rojava

Gelê Kurd li çar parçeyên Kurdistanê û nexasim jinên Kurd hebûna xwe û hêviyên xwe yên siberojê di kesayeta Abdullah Ocalan de ji nû ve peyda kirine. Gelek jinan ev heqîqet bi gotinên *"yê ku çav daye me, yê ku ziman daye me, yê ku mejî daye me, Serok Apo ye"* pênasê dikin. Lewma

gel û jinên Kurd komploya navdewletî wekî êrîşeke dijwar li hemberî hebûna xwe û tevahî nirxên xwe didîtin.

Di 20 salên Abdullah Ocalan li Libnan û Sûriyê de, gelê Rojava rasterast bi wî re di nav danûstaninê de bû û xebatên wî ji nêz ve şopandin. Abdullah Ocalan di van salan de her tim gel û bi taybetî jin hişyar kirine li ser wê yekê ku dibe rojekê ew yan jî mîlîtanên partiyê nema di nav civakê de amade bin yan jî kêmasiyan bikin. Li ser vî esasî, wî gel perwerde dikir û hewl dida ku vîn û bîreweriya xwerêvebirina civakê ava bike. Lê belê ti carî kesekî nexwest bifikire ka bi rastî rojeke wiha wê were. Lewma civaka Rojava bi derketina Abdullah Ocalan ji axa Sûriyê di encama gefên şer ên dewleta Tirk û hêzên navdewletî de di 9'ê Cotmeha 1998'an de ji binî ve hejiya. Gelek jin dibêjin, tirseke kûr û tenêbûnê girtiye canê wan, û wan xwe bêkes dîtiye.

Pêvajoya komployê bi dîlgirtina Abdullah Ocalan di 15'ê Sibata 1999'an de gihîşt asta xwe ya herî bilind. Gelê Kurdistanê bi giştî vê roja reş wekî dîlgirtina vîn û hebûna xwe hîs kir. Vê hestê xwe him bi rengê şîngirêdanê û hewaran dida der, him jî wek teqîna hêrsê. Tevahiya civaka Kurd li her derê serî hilda. Li hêla din, jinên ku ev roj dîtî, didin xuyakirin ku gelek mirov bi taybetî yên navsere ji nişkê ve jiyana xwe ji destdane ji ber ku dilê wan nikaribû xwe li ber vê êşê bigirta.

"Jinên Rojava Serokatî ji bo xwe wek 'lûleya nefesê' didît. Dema ku Serok hat girtin, dijmin dixwest nefesa jin û civakê qut bike. Jinan cesaret kir çalakiyan bikin. Jinan karê xwe nesekinand. Girêdana xurt a jinan bi Serokatiyê re him aliyê xwe yê hestyarî û aliyê xwe yê siyasî jî hebû. Jinê xilasbûna xwe jî di kesayet û doza Serok da didît. Wê hîs dikir ku xilasbûna wê û xilasbûna Serokatiyê girêdayî hev in."[343]

Beramberî vê êrîşa topyekûn derket holê ku di sosyolojiya jin û civaka Kurd de guhertinên mezin qewimîne. Wan nema serê xwe tewan ji wê çarenûsê re ku hêzên mêhtinger ji bo gelê Kurd pêş didît. Rêxistinbûn û zanebûna dîrokî ya jin û civaka Kurd nedihişt ku careke din serhildaneke Kurdan bi girtina serokê wan were tepisandin. Ruhê berxwedanê ku bi têkoşîna tevgera PKK'ê di civakê de hatibû çandin, derûniya bindestî û bêçarebûnê bi bin xist. Wekî bersiva komploya navdewletî, bi hezaran keç û xortên ciwan ji hemû beşên civaka Rojava tevlî nav refên gerîla bûne. Ev yek destnîşan dike ku bi perwerde û bandora Abdullah Ocalan ya li ser civaka Rojava, nifşekî nû yê şoreşgerên Kurdistanê hatibû amadekirin.

Remziye Mihemed ku bi temenê 20 salî di sala 1998'an de li bajarê Qamişloyê dest bi xebatên jinan ên civakî kir, rewşa gel di vê pêvajoyê de dinirxîne: "*Dema ku Serok ji Sûriyê derket, me civîn li pey civînê ji gel û ciwanan re çêdikirin. Girtina Serok bandoreke pirr hestyarî ava kiriye. Bi dehan ciwan sozên xwe dan û çûne çiyê. Keçên ciwan pirr li dora me hebûn. Yên ku soz dan û çûn gelek bûn. Hinek jî hebûn, malbatên wan nedihiştin ku biçin. Di nav wan de hinek dîsa çûn, hinek jî tevlî xebatên civakî bûn. Di taxa me de 35 xebatkar çêbûn."*[344]

Jinên Kurd bê dudilî û bêtirs li tevahî herêmên Rojava û Sûriyê pêşengiya çalakî û meşan kirine. Wekî nîşana şînê û şermezarkirinê, wan cilên reş li xwe kirine û kon danîne. Li bin konî û li malan, jinên Kurd li seranserê Rojava û Sûriyê ketin greva birçîbûnê. Dayika Rûqiye şahidiya vê roja reş li Helebê kiriye: *"Dema Serok hat girtin gel pirr êşiya. Li taxa Şêx Meqsûd jin di malekê de kom*

[343] Hevpeyvîn bi Rûken Ehmed re, Minbic, 2017

[344] Hevpeyvîn bi Remziye Mihamed re, endama Kongra Star û hevseroka Deste ya Maliyê ya Kantona Cizirê, Qamişlo, 2017

bûn. Bi gîştî em şok mabûn, çawa Serok were girtin. Meşek hat tenzîmkirin. Jin li pêş dimeşîn. Me wêneyên Serok rakirin. Em digirîn û dimeşîn."[345]

Li bajaran hemûyan gel zend û bend badidan. Li cihên ser xeta sînor, wek li Kobanê û Serêkaniyê gel di şeva 15'ê Sebata 1999'an de bi tevahî derket û berê xwe da sînorê Tirkiyê. Wan dixwest tola xwe rakin û ji komplogeran hesab bipirsin. Hêrsa gel ewqas mezin bû ku rejîma Sûriyê newerîbû mudaxele bikira. Lê bi rêbazên zirav dewletê dîsa hewl dida ku serhildana gel lawaz bike û bide sekinandin. Ew rojên şîn û berxwedanê wiha di ser jinên Kobanê re bihurîne: *"15'ê Sebata 1999'an bi şev gel bi tevahî ji mal derketin û çûn ber xeta sînor. Piştre, zilamên dewletê hatin. Ew mal bi mal çûn cem serokên eşîr û muxtaran û xwestin ku bi wan gel bidin sekinandin. Lê hêzên dewletê bi xwe cesaret nekirin ku bikevin pêşiya gel. Dewlet bêdeng bû, nikaribû tiştekî bike. Me dest bi greva birçîbûnê di malên mezin ên malbatan de dikir. Me berdewam kir heta ku me dît Serok sax e û bangewaziya hevalan çêbû."*[346]

"Di çalakiyên li dijî komploya navdewletî de jinan cilê reş lixwe kirine. Beşdarbûna jinê di greva birçîbûnê de li pêş bû. Em hemû li malekê kom bûn. Jinên ku bi tenê li mala xwe bûn jî li wir diketin greva birçîbûnê. Xemgîniyeke giran bû. Jinan komploya li dijî Rêber Apo wekî komploya li hemberî xwe, li hemberî hemû jinan hesiband. Nîzam ji berxwedana jinê tirsiya ji ber vê bi taybetî zext li ser jinê çêdikirin. Dema jin çûn civînê, ew digirtin. Dewletê zanibû ku mijara namûsê di civaka me de hesas e. Ajanên dewletê gotinên xirab li ser jinan belav dikirin ji bo eşîr pêşiya vê jinê bigire û gengeşiyên di nav civakê de çêbin. Dewletê amadekarî çêkir ku êrîşê vê malê bike ku em wekî jin tê de ketibûn greva birçîbûnê."[347]

Di bin dirûşmeyên '*Kesek nikare Roja me tarî bike!'* û '*Bê Serok jiyan nabe!'* nêzîkî sed Kurdên li hundir û derveyî welêt agir berdane canê xwe. Bi vî rengî wan helwesta xwe li dijî komplo û hêzên komploger danî holê. Tê gotin ku li Rojava bi dehan jin bi heman ruh û rêbaza çalakiyê tevlî vê berxwedanê bûn. Jinên ciwan wekî **Leyla Beqî** û **Zelîxa Ebdî**[348] dibûn remza wan çalakvanên jin ku di nav wan de şehîd û gazî çêbûn. Endamên Saziyên Malbata Şehîdan didin zanîn ku gelek malbat ji tirsa dewletê eşkere nekiribûn ku keç yan jî miroveke wan wekî şêwazeke çalakiyê li dijî komployê xwe şewitandiye. Misogerkirina hejmar û navên hemû jinên fedaî yên vê pêvajoyê, bi xebat û hewldanên taybet mumkin e.

Her wiha di roja reş de çend jinên Rojava biryar dane ku *"heta Rêber Apo azad nebe em ê şîn girêbidin"*. Dayikên pêşeng wekî **Dayika Eqîde**[349] û bi dehan jinên din ji xwe re soz dan ku heta dîlgirtîbûna Abdullah Ocalan bidome, ew ê tenê cilûbergên reş li xwe bikin û ji tevahiya tiştên kêfxweşiyê dûr bisekînin. Heta roja îro, wan jiyan, hest û çalakiyên xwe di gihandina azadiya Abdullah Ocalan de kilît kirine.

Yek ji wan jinan ku gihîşt vê qanaetê **Yadê Soad** a ji Dêrikê ye. Li ser sedem û wateya biryara xwe ew dibêje, *"Her însan ji bo xwe biryarekê dide. Em li ber televîzyonê rûniştibûn dema ku xebera girtina Rêber Apo derket. Min êdî dinya nedidît. Ew roja ku destê min û destê Serok di nav hev de bûn û wî ji min pirsî 'Tu çi dixwazî?' hat li pêş çavê min. Dema ku min dît çawa Rêber Apo girtin û*

[345] Hevpeyvîn bi Dayika Rûkiye re, Efrînê, 2017

[346] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

[347] Hevpeyvîn bi endamên Kongra Star re, Xeta Xerbiyê Kobanê, 2017

[348] Ew herdu ji Kobanê bûn û di encama çalakiya xwe şehîd ketin. (Çavkanî: Saziya Malbata Şehîdan, Kobanê)

[349] Dayika Eqîde (Eqîde Elî Osman) di encama êrîşên dagirker a arteşa Tirk de di 13-10-2019'an de li Serêkaniyê jiyana xwe ji dest da. Binêre: Beşa 'Şerê Dagirkeriya Tirkiyê' ya vê pirtûkê

xistin teyarê ew kêlî hat ber çavê min. Di wê roja reş de dema Rêber Apo ket destê dijmin, min jiyana dinyayê hemû li xwe heram kir. Min ne tenê cilên reş li xwe kirin. Min xwe ji mala xwe jî dûr xist. Min zarokên xwe û hevjinê xwe jî berda. Bes em man mîna hevalê hev di nav malê de. Wî jî deng nekir, rêz jê re digirt heta wefat kir. Min got, bê Rêber Apo her tiştê jiyanê ji min re heram e."[350]

Yadê Esma û xwuşka wê Ayhan jî di roja reş de biryar dane ku ew ê cilûbergên reş li xwe bikin heta ku Abdullah Ocalan li zindanê be. Yadê Esma dibêje, *"Berê nirxê jinê tine bû. Ger Serok nebûya, em nebûn. Em ê kolê malê bana û mirî bana. Jineke ku mafê wê nayên parastin, jineke mirî ye."* Ew qaneh e ku Abdullah Ocalan karîbû pêşengiya azadiya jinê bike ji ber ku wî xwe xist şûna jinê û bi ruhê jinê re bûye yek. Lewma Yadê Esma xwe deyndar û berpirsyar dibîne ku rewşa Serok fêhm bike û hîs bike. Ew û gelek jinên Rojava, vê nêzikatiyê wekî rêbazeke têkoşînê dibînin. Ji ber vê yeke, wan jî porê xwe qut kir dema ku dewleta Tirk bi zorê wekî rêbaza êşkence li zindana Îmralî porê Abdullah Ocalan qut kir.

Jin û gelê Kurd, roja reş ya 15'ê Sibata 1999'an weke mîladekê şirove dikin. Dema ku mirov dixwazin dîroka hinek bûyeran di jiyana xwe de bînin bîra xwe, ew demê li gorî '*beriya girtina Serokatiyê*' û '*piştî girtina Serokatiyê*' dabeş dikin û pênase dikin. Lê belê, girêdana xurt a jinê bi Abdullah Ocalan re hiştiye ku xebat û rêxistinbûna jinên Rojava piştî vê mîladê dewam bike û hîn bi hêztir bibe. 18 salan paşê, dayikeke peşeng a şoreşa Rojava diyar dike: *"Dema Serok hat girtin, min got, dinyayê sekinî. Heya min got, serê me jî çû û zimanê me jî çû. Lê jinan hêvî ji Serok digirt û bi hêviyên xwe, em gihan vê rojê."*[351]

a) Berxwedana li dijî Qirkirina Siyasî û Civakî

Komploya navdewletî bi îmzekirina Peymana Edanê ya di navbera dewletên Sûriyê û Tirkiyê de di 20'ê Cotmeha 1998'an de hat zeximkirin. Ji wê û şûn ve herdu dewletan hevkarî û zextên xwe li dijî Tevgera Azadiyê û welatparêzên Kurd dijwar kirine. Dewleta Sûriyê hewl daye bi rêbazên wek kirina nezaretê, girtin, êşkence û 'windakirina mirovan' vîna gelê Kurd bişkîne û bandora ramanên Abdullah Ocalan ji holê rake. Gotinên wekî *'Serokê we hat girtin. Her tişt xilas bû! PKK nemaye!'* hatin belavkirin. Ji bo dewlet bikare Tevgera Azadiyê tine bike, wê pêwîst dît ku rêxistinbûn û yekîtiya gel parçe bike. Lewma bi taybetî şoreşgerên bi eslê xwe ji Bakurê Kurdistanê yên ku di xebatên rêxistinkirina gel li Rojava û Sûriyê cihê xwe girtine, bûne hedefa wan êrîşan. Bi dehan kes hatine girtin û radestî dewleta Tirk hatine kirin. Di nav wan de jinên siyasetvan ên bi eslê xwe ji Rojava jî hebûn. Ji bo ku ev jin bi salan di zindanên Tirkiyê de dîl werin girtin, dewletê îdia kir ku ew welatiyên Tirkiyê ne.

Rejîma Bees wekî din siyaseta sîxuriyê meşand ji bo bawerî û hevgirtina civakê bişikîne. Dewletê nexasim armanc kir ku kesên ji eşîrên berxwedêr, ji malbatên şehîd û şervanan wekî sîxur bi kar bîne. Him bi rêbazên tirsandinê him bi rêbazên şerê derûnî bi ser malbatên welatparêz de diçû da ku wan ji nirxên xwe yên exlaqî û polîtîk qut bike û gumanê li hemberî hev di civaka Kurd de çêke. Mînak, tê gotin ku dewletê ji bo ixbara ku bi kêra girtina endameke PKK'ê bê, 75 hezar Lîra wek xelat waed dikirin.

[350] Hevpeyvîn bi Yadê Suad re, Dêrik, 2017

[351] Nîqaşên bi beşdarên Perwerdeya Akademiya Kongra Star re, Rimêlan, 2017

Dewleta Sûriyê di warê şerê taybet de îlham ji dewleta Tirk digirt û rêbazên nû ceribandin. Ji propagandayên reş li dijî Tevgera Azadiyê û mîlîtanan heta bi amûrên çanda moderniteya kapîtalîst. Di wan salan de yekem car rêzê fîlmên dewleta Tirk li ser kanalên televizyona dewleta Sûriyê bi binnivîsa Erebî hatin weşandin. Bi vî rengî him siyaseta asîmîlasyonê ya dewleta Sûrî him jî ya dewleta Tirk bandora xwe li ser civakê kir. Bi taybetî di nifşên ciwanan de hewesên çanda arabesk û madiyatê bi pêş ketin. Beşeke ciwanên Rojava hewl dida ziman, şêwaza jiyan û modayên rêzêfîlm û stranên Tirkî, teqlîd bike. Di encamê de feraset, ecibandin û nêzîkatiyên ferdperest û xemsar ên çanda moderniteya kapîtalîst pêre belav bûn. Bi vî awayî êrîşên zirav lê bi bandor li dijî çanda jiyana komînal, polîtîk û exlaqî ya civaka Rojava hatin meşandin. Gava ku hewesên jiyana burjuwa dihatin fîtandin, li aliyê din serê gelê Rojava di rastiya jiyana xwe de bi pirsgirêkên aborî yên herî mezin re di belayê de bû. Rejîma Sûriyê, siyaseta birçîhiştinê li ser civaka Kurd ferz kir da ku warê xwe bi cih bihêle û ferdên wê li bajarên Sûriyê wekî karkerên erzan bişuxilin. Wekî yekûna van siyasetên dewleta Sûriyê, civaka Rojava di destpêka sedsala 21'ê de xwe di nav aloziyên mezin de dît.

Di vê rewşa zehmet de tesfiyekariya ku di nav Tevgera Azadiyê de hatibû bipêşxistin êrîş dibir ser nirx û pîvanên şoreşgerî yên ku ji bo civaka Rojava her tim pîroz dihatin dîtin. Hemwext, bi şerê taybet ê dewletê re kesên ku hêviya wan nema yan jî ketin pey berjewendî û têkiliyên şexsî ji têkoşîna azadiyê qut bûn, bandoreke neyînî çêkirin. Di vê pêwendê de êrîşên taybet li dijî xeta azadiya jinê û birêxistinbûna wê ya xweser çêbûn. Bi vî rengî di nav beşeke civakê de nêzîkatiyên bi guman û rêşbînî derketin holê û hinek kesan xwe ji xebatên rêxistinê paşve kişandin.

"Komployê di milê manewî û girêdana gel ya bi Serokatiyê de êş û birînek mezin çêkir ku mesafeyek di têkiliyên civakê de bi xwe re anîbû. Dema tesfiyeyê di serê gel de hinek nakokî ava kiribûn. Hinek kesên girêdayî va yên tesifiyecî, bi zanebûn hinek malbat êşandibûn. Gelek nêzîkatiyên cuda derketibûn. Lê dîsa jî wan tiştan di gel de şikandin û bê bawerî, çênekiribû. Yên ku Rêber Apo nas kirin, digotin, heya tîpekî wî li ser pelekî hebe jî, ev şoreş wê bi wê tîpê bimeşe û bi ser bikeve. Bawerîk wisa hebû. Lê dema dihat gotin, 'tu jî tekoşînê yan xebatê bike' gelek kesan bi hêncetên cûr bi cûr xwe paşve da. Gel ketibû nav giranbûnekê de û ji bo gavekê bavêje, çokên wî sist bûbûn. Baweriyek hebû, lê nizanibû bi çi rêbazê wê têkoşîn bike."[352]

Li hemberî vê rewşê tevgera jinê li Rojava ji nû ve dest bi hemleya birêxistinkirinê û çalakiyan kir. Civîn û nîqaşên bi jinan, bi xebatkarên jin û zilam re li ser perspektîf û parêznameyên Abdullah Ocalan hatin lidarxistin ku ji girava Îmraliyê nû gihandibûn. Nexasim li ser pirs û nakokiyên derheqê paradîgmaya nû de, hatiye sekinandin. Di serî de gelek kes zehmetiyan di fêhmkirina rexneyên Abdullah Ocalan li ser dewletê de dikişînin. Hinek kesan pêşkeşkirina *civaka demokratîk, ekolojîk li ser bingehê azadiya jinê* wekî modela çareseriyê li şûna xeyala dewleta Kurd, wekî gaveke paşve şirove kirin. Lê belê bi xwendina parêznameyan, bi guhdarîkirina gel û nîqaşên berfireh, gav bi gav zelalbûnek derket holê. Di bîra gelek welatparêzên Rojava de bi taybetî ked û pêşengiya Şehîd Şîlan Kobanê di vê pêvajoyê de hîn zîndî ye.

Endameke rêveberiya Tevgera Jin li ser hewldanên ji nû ve rêxistinkirina gel li Rojava dibêje: *"Di sala 2003'an de Serokatî perspektîf ji bo xwe rêxistinbûn li her parçayê Kurdistanê li gorî rastiya parçê dabû. Me girîng didît ku em ê mîrasê Serokatî ji nû ve zîndî bikin û gel bi rêxistin bikin. Di civînên ku me di destpêkê de li Kobanê çêkir gel pirr bawerî nedianî. Hinekan digot: 'Em fêrî çanda PKK bûne. Em niha çawa tenê wek parçeyek xwe bi rêxistin bikin?' Hinek ji dewletê*

[352] Hevpeyvîn bi Necbîr re, Tirbespiyê, 2017

tirsiyan. Hinekan jî digot, 'Temam êdî em ê tenê parçê xwe esas bigirin. Yên din me elaqedar nakin.' Hinekan jî digot, 'Em hene!' Gelek nîqaş çêbû. Di dawî de wekî rêxistina nû PYD di 20'ê Îlona 2003'yan de hatiye damezrandin. Hîna pirs hebûn, çiqas PYD bikare bibe bersiv. Lê hêzeke esasî hebû ku ev pêngav pêş xist. Di vê demê de Hevala Şîlan ristek girîng leyîstiye ji bo Rojava ji bandora tesfiyekariyê xilas bike û kombûn û yekîtî di nav gel de çêbike."[353]

Di vê pêvajoya giran û nediyar de helwestên jinên pêşeng û biryardariya rêxistina jinê, hêzeke mezin jî daye gel û Tevgera Azadiyê bi gişt: "*Rêxistinbûna jinê li Rojava heta 2004'an wek pergala cebhewî meşiya. Civîn û perwerdeyên xweser ên xebatkar û xebatên jinê hebûn. Dîsa rêxîstinbûna xweser a baskê jin di nav PYD'ê de hatiye avakirin. Wek jin, me di sala 2003'yan de dest bi hamla ji bo azadiya Serokatiyê û çalakiyan kir. Me wê demê biryar girt ku em ê wekî jin cara yekemîn çalakiyên xweser li hemberî dewleta Sûriyê çêbikin. Meşa yekemîn a jinan me li Kobanê çêkir. Di serî de jin bi guman pirs dikirin, 'Em ê çawa bi tenê biçin?' Zilaman jî pirsgirêk derxistin. Du hefta, me civîn û serdana malan çêdikir heta me ev meş bi rêxistin kir. Me meşa xwe êvarê bi beşdarbûna 500 jinî çêkir. Gelek zarok jî hatin. Kesekî bawer nedikir, lê serketinek mezin bû. Dewlet jî hat, lê êrîş nekir. Ji ber tirsa dewletê û zilaman jin zû meşiyan. Lê meşa me bi hêz bû."*[354]

Gav bi gav gel li hemû herêmên Rojava gumanên xwe li pey xwe hiştin û helwesta xwe ya berxwedanê li dijî êrîşkariyên dewletê derxist holê. Dayika Hogir ji Qamişlo dibêje, ew di wê pêvajoyê de bi hêza gel hisiyaye: "*Ruxmê hemû êşên me di qonaxê piştî komployê de di dawiyê de ji bo me hêz û serketinek bû. Erê, em êşiyan. Yên ku çûn çûne, yên ku man mane. Yên ku tesfiyekarî çêdikirin, hatin zelalkirin. Yên ku girêdayî ne, hatin xuyakirin. Pê re, em bêhtir xurt bûn. Mirovan xwe ji bo nebiyên xwe neşewitandin, lê ji bo Serok xwe şewitandin. Gel har bû, berxwedan zêdetir bû. Ji ber têkiliyên Tirkiyê û Sûriyê, me hemû karê xwe bi dizî dikir. Bi bûyereke di 12'ê Adara 2004'an de li Qamişloyê gel ji Efrînê heya Cizîrê wek lehiyê rabûn. Em bi vê hêza miletê xwe bi bawer in. Wisa em ê ser bikevin."*[355]

b) Raperîna 12'ê Adara 2004'an

Di 12'ê Adara 2004'an de hêrsa gel li hemberî zordestiya dewletê teqiyaye. Dema maça futbolê di navbera tîma Qamişlo û ya Derazorê de nijadparestên Ereb bi piştevaniya hêzên dewletê êrîşî Kurdan kirin. Di êrîşên nijadperest yên li stadyuma Qamişloyê de heft Kurdan jiyana xwe ji dest da. Lê helwesta xweparastinê ya gel veguherî raperîna li dijî dewletê. Bi carekê rabûna gel, wekî agirekî ji Qamişloyê heta bi Hesekê, ji Dêrikê heta bi Kobanê û Efrîn li tevahiya bajarên Rojava belav bûbû. Kurdên li Heleb û Şamê jî bi heman hest û hêrsê daketin kolanan. Gel çend bajarên Rojava ji destê hêzên dewletê girtin. Jin di vê serhildanê de bi rista pêşengiyê rabûn û wan tevahiya beşên civakê kirin yek. Her wiha rejima Beesê dixwest vê raperînê bi tundî û barandina guleyan bitepisîne.

33 ciwanên Kurd, jin û zilam di bûyerên 12'ê Adarê de ji aliyê alîgîr û hêzên Beesê ve hatin şehîd kirin. Her wiha dewleta Sûriyê bi dehan jin di wan rojan de girtin û êşkence li wan kir. Li Efrînê hêzên dewletê, Nazê Keçel a bi eslê xwe ji Dêrikê girtin. 16 salan paşê ew hîna 'winda' ye. Di

[353] Hevpeyvîn bi Besta re, endama Kongra Star, Qamişlo, 2019

[354] Çavkanî li heman cihî

[355] Heypeyvîn bi endamên rêveberiya Mala Jinê re, Qamişlo, 2017

encama zextên dewletê û raperînê de gelê Rojava bi xurtî hişyar bû. Îro gelê Rojava rabûna gel a 12'ê Adarê weke 'destpêka Şoreşa Rojava' şirove dike.

Wekî li hemû bajarên herêma Cizîrê, gelê Dêrikê jî bi rojan serî hilda. Yadê Soad cihê xwe di rêza pêş ya çalakiyan de digirt. 13 salan paşê ew bûyer û wateya van rojan wiha şirove dike: *"Berxwedana Rojava ne îro dest pê kiriye. Berxwedana gel a li hemberî nîzamê 2004'an de dest pê kiriye. Dema dengê Qamişlo derket, herderê Rojava bûbû Qamişlo. Jinên Dêrikê jî rabûn. Di navbera 24 seatan de kesek ji dewletê li vir nema. Ji wê demê ve ferq û cudahî di navbera milet de nema. Ne em tenê, tevahiya gel, hemû partî derketin kolanê. Wê demê Hevalê Hisên û Hevalê Welîd li Dêrikê şehîd ketin.*

Dema ku em diçûn jî jinan pêşengî dikir. Me rê ne dida ku xort li pêşiya me bimeşin. Hinek xortên me yên germ hebûn, hemû der anîn xwarê. Me nedihişt ku dest bidin dêr, mizgeft û firinê. Ew yê me ne. Lê her tiştê dewletê çi hebûna hatin xerakirin. Me ji xortan re digot, 'Hûn li paş bimînin ji bo paşerojê hûn karibin tiştekî bikin.' Şoreşa Rojava ji wê demê ve dest pê kir. Jinên Rojava êdî tedbîrên xwe digirtin. Herdem em amade bûn. Me bê cil xew nedikir. Heta pêlavên me jî di lingê me de bûn. Ji wê demê ve Rojava destê hev girtin."[356]

Bi rûyekî bi ken Zelal Cîger behsa enerjiya gelê Kobanê ya van rojan dike: "*Li Kobanê serhildanek pirr mezin çêbû. Dewlet hemû hêzên xwe û muhazifên xwe ji Kobanê derxistin. Pirr tiştên komik jî çêbûn: Qeymeqamê Kobanê jî hemû zarokên xwe ji malê derxistin û çû. Lê pêşiya mala wî kamyonê xwe bê şofêr hiştibû. Vêga, gel hatin cem hev û kamyon def kirin ser mala wî û mala wî hilweşandin. Çend rojan dewletê nikaribû were Kobanê. Gel ewqas bi hêrs bû ku stûnên kehrebê jî şewitandin. Ew fikirîne ku ew aydê dewletê ne. Lê piştî vê, dîtin ku kehrebe û av li ser wan qut bû. Îcar digotin, 'Me çi kir ji xwe re?'*

Berê ji bo gelê Rojava dihat gotin ku ji şer û nakokiyan dûr e. Ev rast bû. Lê siyaseta dewletê di salên 1999 heta 2011'an de hişt ku bertekên gel li hemberî dewletê derkevin. Dema ku gel rû bi rû bi qetlîamê ma û kuştin bi çavê xwe dît, êdî wî dewlet wekî dijmin didît. Heta wê demê gel bi vî rengî nedifikirî."[357]

Piştî serhildanên 12'ê Adarê, dewleta Sûriyê ti guman derheqê dijminatiya xwe ya li hemberî Kurdan de nehişt û pêleke nû ya êrîşên li dijî siyasetvan û civaka Kurd li dar xist. Rejîma Bees bi rêbazên xedar û 'nerm' yên qirkirinê dixwest vejîna vîna berxwedanê bişikîne.

Şêniyên Qamişlo dibêjin, piştî 12'ê Adarê ajanên dewletê madeyên tiryakê yên cûr bi cûr li ciwana belav kirine. Li hinek qehwexaneyan jî van ajanan heb xistin nav vexwarinên ciwanan bêyî ku ew pê zanibin. Dîsa zilamên îstîxbaratê jî destavêtin jinên ciwan da ku bikarin wan ji bo menfaeta xwe bi kar bînin. Bi vî awayî laşfiroşî, tiryakfiroşî û qumar wekî amûrên şerê taybet bi destê endamên îstîxbaratên Sûriyê û Tirkiyê li Qamişlo û li cihên din ên Rojava hatine bipêşxistin. Van dewletan dixwest bi rêya bêhişkirina ciwanan, şikandina vîna jinê û rizandina civakê, pêşiyê bigirin li zîndîbûna fikir û çalakiyên siyasî û beşdarbûna şoreşgerî ya ciwanan.

[356] Hevpeyvîn bi Yadê Suad re, Dêrik, 2017

[357] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

Di heman demê de rejîma Sûriyê bi dehan siyasetvan û welatparêzên Kurd girtin û xwest wan bi êşkenceyên xedar teslîm bigire. Pêşengên civakê yên wekî Mamoste Osman û Ebû Cûdî bi êşkenceyê li zindanê hatin şehîd kirin. Heta wê demê jin pirr kêm ji ber sedemên siyasî li Sûriyê hatibûn girtin. Lê piştî serhildanên 12'ê Adarê, bi dehan jinên Kurd – ji jinên ciwan heta bi dayikên navsere - bi taybetî hatin girtin. Lê hesabên ku dewleta Sûriyê bi vê rêbazê kirin, pûç bûn, ji ber ku jinan tevî girtin û lêdanê jî gavek paş ve neavêt û xebatên xwe bi biryardarî domandin. Wekî din li hinek cih û deman girtina jinên pêşeng bûbû sedema xwepeşandên gel û pevçûnên bi dewletê re: *"Li Kaniya Kurdan dewletê du jin girtin. Bi vê re, gelê Kobanê hîs kir ku şerefa wê tê şikandin. Ji bo vê, gel derket û meş li dijî dewletê çêkir. Îcar dewletê êrîş kir û pevçûnên dijwar derketin."*[358]

Bi helwesta jinê li dijî zextên dewletê re nêzîkatiyên êşîrî û feodal ên beramberî jinê jî hatin guhertin. Dema ku jin ketibûn zindanê, civakê ev yek nema wekî rewşeke şerm ji bo jinê didît. Lê hêrsa xwe li hemberî dewletê raber kir û rêzdariya xwe ji bo sekna berxwedêr a jinê. Êdî xelkê bi girseyî jinên ji zindanê derketî pêşwazî kirine. Yek ji van jinên ku hatin girtin, Eyşe Efendî bû. Piştî Şoreşa Rojava, ew li ser wê demê dibêje:

"2005-6'an gelek kes hatine girtin û êşkence dîtin. Li çar parçêyên Kurdistanê tim qetlîam û êşkence çêbûn. Lê heta wê demê li 'Başûrê Piçûk' tiştên di vê astê de çênebûn. Tirs û xofek ket dilê gel de. Heta niha gel bin vê bandorê de ye û ji ber vê ditirse ku wê dewlet dîsa were. Dewleta Beesî, Beesiyetiya xwe xist hundirê malan û mejiyê zarokan. Zêhniyeta Beesî, tirs xist hundirê dilê mezinan. Tu diçûyî kû derê, her tim pey te bû. Wekî xebatkar me 'arbê' li xwedikir û em derketin."[359]

Jin fêrbûne ka çawa bikarin xwe biparêzin. Xebatkareke jin ku wê demê li Girkêlegê xebatên rêxistinî bi awayeke veşartî meşandine jî dibêje, ew wekî jin mecbûr mane li gorî pîvan û rista jinê ya civaka zayendperest rabin û rûnin: "*Ji bo nîzam me negire, hevalekê em hişyar dikirin. Wê digot, 'Ti carî li çavê zilaman yan jî rûyên eskeran meyze nekin! Tenê jinên Apocî meyze çavê zilaman dikin. Jinên din serê xwe datînin! Gelek hevalên jin bi vê awayî deşîfre bûn û hatine girtin. Pêwîst e ku hûn xwe biparêzin'."*[360]

Jin li mêran eşkere dikin û dibêjin, zilam ji girtin û êrîşên dewletê zeditir tirsiyan. Li çend herêm û bajaran êdî tenê xebatkarên jin xebat û têkiliyên rêxistinê domandine. Wan di bin şertên zor û zehmet de xebatên bi rîsk ên weke rêveberî, cebhewî û quryetiyê meşandine. Wisa jin li ser dewamkirina têkiliyên rêxistinê di nav herêman de, gihandin û ewlekariya şoreşgeran û dermankirina şervanên birîndar sekinîne. Jinên cebhewî dibêjin, wan tenê bi şev karîbû xebatê bimeşînin. Ji ber zilma dewletê, gel tirsiya ku kesek wan bibîne dema ku xebatkar bi roj biçin mala wan. Lewma, gelek malbatan hatina xebatkaran bi roj qebûl nekir. Îlana şehîdan, alîkarî komkirin, civîn û perwerde, jinan her tişt bi şev dikir. Wekî din jinan şêwazên çalakiyên afirîner bi pêş xistin.

Remziye bi rûyekî bi ken dibêje, "*Piştî serhildana Qamişlo, ji 2004'an heya 2011'an tim jin li kolanan bûn. Me çalakî, meş û daxuyanî çêdikirin. Jin carna jî dihatin girtin, lê ne ditirsan. Em deh jin jî bana, me meşa xwe dikir. Hema ribek saetê me kolan digirt û dîsa belav dibûn berî ku hikûmet were. Me çalakiyên korsanî çêdikirin."*[361] Bi vî ruhî û vê biryardariyê jinên Rojava dixwestin pêngaveke nû dest pê bikin.

[358] Hevpeyvîn bi Besta re, Qamişlo, 2019

[359] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

[360] Nirxandina Feryal di nîqaşên perwerdeya Kongra Star de, Girkêlege, 2017

c) Pêngava Avakirina Yekîtiya Star

Jinan pêwîst didît ku êdî rêxistineke bi nasnameya xwe û li gorî pêdiviyên jinên Rojava ava bikin. Di sala 2004'an de bi vê armancê amadekariyên kongreya jinê dihatin meşandin. Yadê Esma tevlî nîqaşên amadekariya kongreyê dibû: "*Heta 2005'an me bi navê cebhewî xebat meşandin. Wê demê me nikarîbû baş bi dayikan re biaxifin û pirsgirêkên wan çareser kirbana. Me tenê alîkarî kom dikir. Em diçûn û dihatin. Lewma sala 2005'an kongreya damezrandina Yektitiya Star çêbû. Lê ez neçûm, ji ber ku ez di bin çavdêriya dewletê de bûm. Berê ez hatibûm girtin jî. Lewma çênedibû ku ez wê kongrê bixim xeterê. Muxaberat ketibû pey min."*[362] Ruxmê ku Yadê Esma di kongreyê de ne amade bû, ew wekî endama koordînasyona Yekîtiya Star hatibû hilbijartin.

Beşdareke kongreyê li ser wateya kongreya damezrandina Yekîtiya Star dibêje: "*Me kongreya yekemîn a jinên Rojavayê Kurdistanê bi rengekî veşartî di 12 - 15'ê Çilê 2005'an de çêkir. Yekîtiya Star wê demê hatiye avakirin. Hilbijartina Koordinasyona Yekîtiya Star di vê kongreyê de çêbû. Ji ber zextên dewletê hemû delege nikaribûn amade bibin. Lê dema ku dîmen û nûçeyên kongreyê li televizyonê derketin, ev bû moraleke mezin ji bo gel û bi taybetî ji bo jinan. Vêga, propagandayên reş vala derketin ku wê demê hatibûn belavkirin wekî ku 'Êdî keseke ku têkoşînê bike nemaye. Her kes çû mala xwe.'*

Lewma îlana Yekîtiya Star wekî bombeyekê teqiya. Her kes şaş maye û digot, 'demek xebat û têkoşîn hîna heye û wê berdewam bike!' Ev pirr girîng bû û komkirineke nû ya jinê da çêkirin. Piştî vê, êdî me xebatên xwe bi nasnameya Yekîtiya Star meşandin. Me meclîsên jinê yên bajaran û gundan ava kirine. Me plansazî û xebatên taybet çêkirin ji bo ku em bikarin pirsgirêkên jinan ên malbatê û yên tundiya li dijî jinê çareser bikin. Ev mijar bûn rojeveke girîng a xebatên me. Çalakiyên xweser û yên giştî hatin pêşxistin."[363]

Beşdarvên kongreyê dibêjin, piştî ewqas salên kedê, wan piştî kongreyê hîs kir ku wan cara ewil tiştek ji bona 'xwe' çêkiriye û ava kiriye: "*Berê, jin her tim pêşî li malbata xwe, zilamê xwe fikirî. Wê hesab dikir, ew ê çi bêjin, pêdivî û nêrînên wan çi ne. Niha jinê rêxistina xwe bi nêrîna xwe ava kir û xebatên xwe meşandin. Ev bû wekî dermanekî ji bo êşên jinê û gavek ber bi xwebûna jinê ve."*[364]

Di dema damezrandina Yekîtiya Star de nîqaşên li ser Konfederalîzma Demokratîk, li ser avakirina komîn û meclîsan di rojevê de bûn. Endamên koordînasyona wê demê dibêjin, wan xwest nîqaşên xwe bizivirînin gavên berbiçav: "*Me got, pêwîst e, em ê bicerîbînin. Me li du gundên Efrînê dest pê kir: Gundê Şîtka û gundê Çema, me ji bo avakirina komînên jinan guncav dîtin. Hêza jinên wan gundan hebû. Li Şîtka me komîna yekemîn a jinan ava kir. Komîna yekemîn a giştî jî me li Çema çêkir. Tabîî, kêmasiyên xwe û nezanî hebûn. Lê dewletê cidî girt û êrîşê wan komînan kir. Endamên komînê hatin girtin. Lê dîsa me meclîsa jinan a Efrînê damezrand bi beşdarbûna jinan ji hemû nahiyan. Dewletê êrîşê wê jî kir. Hinek jin girtin û meclîs belav kirin. Dema Şoreşa Rojava dîsa li Efrînê şoreşê di van herdu gundan de dest pê kir."*[365]

[361] Hevpeyvîn bi Remziye Mihamed re, Qamişlo, 2017

[362] Hevpeyvîn bi Yadê Esma re, Girkêlege, 2017

[363] Hevpeyvîn bi Besta re, Qamişlo, 2017

[364] Hevpeyvîn bi Rûken Ehmed re, Minbic, 2017

[365] Hevpeyvîn bi Besta re, Qamişlo, 2019

Tevî ku êrîşên dewletê dewam kirin, li Heleb, Şam, Kobanê û Cizîrê meclîsên jinan ên bajaran hatin avakirin. Ev meclîsên hanê ji hejmareke piçûk a wekî 10 - 15 jinan, pêk hatin. Lê gelek kes dibêjin, ruhê wan jinan moraleke mezin da civakê. Salekê pişti damezrandina Yekîtiya Star li Kobanê, Efrîn, Heleb, Cizîrê û Şamê êdî konferansên herêmê hatin lidarxistin û rêveberiyên Yekîtiya Star ên herêman hatin hilbijartin. Bi vî rengî, xebat û têkoşîna azadiya jinê firehtir bû û xwe gihand pirraniya gund û bajarên Rojava. Ji bo dayikên şehîdan bikarin rêya zarokên xwe bişopînin û bi risteke aktîf di civakê de rabin di sala 2007'an de rêxistina Dayikên Aştiyê bi konferanseke taybet li Kobanê hatiye avakirin.

Endamên Yekîtiya Star radigihînin ku xebatên rêxistinê hemû li bin gef û zextên dijwar ên dewleta Sûriyê hatine meşandin: *"Dewlet wê demê wek agir bû, her tim li pey me bû. Gef li jinan û hevjînên wan dixwarin. Gelek hatine girtin. Xebatên giştî sekinîn, gelek zilam newêrin xebatên siyasî bimeşînin. Lê karê jinê berdewam dikir. Beşdarên meşan ji sedî 75'ê jin bûn. Hejmara kesên ku hatin meşan kêm bû, derdora 40 - 50 kesî. Lê îradeya wan jinan girîng bû. Çalakiyên wekî greva birçîbûnê, daxuyanî û civîn pirr bi dizî di malan de ji bo moral hatin çêkirin."*[366]

Di bin van şertan de **Kongra 2'yemîn a Yekîtiya Star** di 9 û 10'ê Tebaxa 2007'an de li gundê Iniz ê Qamişloyê bi rengekî pirr veşartî hatiye lidarxistin. Endameke komîteya amadekariyê behsa şert û mercên kongreyê wiha dike: *"Ne xwediyê malê, ne kesekî din nizanîbû em li vê malê çi dikin. Du rojan me di salona malê de kongra xwe çêkir. 60 jin ji hemû herêman tevlî bûn û zarokên dayikan jî tevlî bûn. Nîqaş û biryarên vê kongreyê pirr dewlemend û bi hêz bûn. Hilbijartinên rêveberiyê jî çêbûn. Lê tiştên pirr komîk jî çêbûn: Diya Hogir pêşniyar kir ku ji bo zarokan televizyoneke taybet bi zimanê Kurdî were vekirin. Me got, projek wisa ji derfetên me dibihure. Yanî ger ku em biryar bigirin û nikarin pêk bînin, nebaş e. Lê zarokên ku li kongreyê hebûn wê demê giriyan. Îcar em mecbûr man, em vê pêşniyarê qebûl bikin!"*[367]

Tevî ku Yekîtiya Star di wê demê de nikaribû Zarok TV ava bike, xebatkar û endamên rêveberiyê dibêjin, xebatên wan bi giştî piştî vê kongreyê baş bi pêş ketine.

Kongra 3'yemîn ya Yekîtiya Star di 12'ê Gulana 2009'an de li gundê Kefer Sixîrê li herêma Şehbayê pêk hat. Beriya û piştî kongreyê gelek xebatkarên jin û endamên rêveberiya Kongra Star li seraserê Rojava hatibûn girtin. Li hemberî êşkenceyên dijwar ew dibûn xwedî sekneke bi hêz û vîna siyasî. Yek ji xebatên girîng ên Yekîtiya Star di vê pêvajoyê de kampanyayê ji bo azadiya girtiyên siyasî bû. Li ser rewş û encama kongra 3'yemîn delegeyên wê demê dibêjin: *"Cihê me yê kongrê pirr teng bû û diwarê xanî ketibû xwarê. Lê 55 jin tevlî bûn û me got, 'Rojek wê were em ê kongra xwe bi beşdarbûna hezaran jinî çêbikin'."*[368]

Ji ber zextên dewleta Sûriyê heta sala 2011'an xebata Yekîtiya Star bi dizî û veşartî hatiye meşandin. Jinên li navçeyan hemûyan di vê pêvajoya giran a navbera salên 1999 û 2010'an de fêrbûn ka çawa vîn, moral û yekîtiya xwe li hemberî zordestiya dewletê û zextên zilam biparêzin; ka çawa xwe û civakê birêxistin bikin; ka çawa çalakî û siyaseta xwe bi pêş bixin.

d) Wekî Encama Beşê

366 Çavkanî li heman cihî

367 Çavkanî li heman cihî

368 Çavkanî li heman cihî

Jinên Rojava û gelê Kurd hemû dîlgirtina Abdullah Ocalan di 15'ê Sibata 1999'an de wekî rojeke reş û dîlgirtina xwe bi xwe hîs kiribû. Bi taybetî bi jinan re hesta tenêbûnê ya kûr peyda bûye. Di heman demê de siyaseta qirkirinê ya hikûmeta Beesê li dijî gelê Kurd her çûye, dijwartir bûyê. Li aliyekî dewleta Sûriyê hewl dida bi zextên giran, girtin û êşkenceyê Tevgera Azadiyê û vîna siyasî ya civaka Kurd bişikîne. Li aliyê din şerekî taybet ji bo rizandina hevgirtin û civakîbûnê hat bipêşxistin. Rêbazên hişk û nerm; tundî, xizanî, koçberî û amûrên çanda moderniteya kapîtalîst li hemberî civakê hatin bi kar anîn. Ev yek di beşeke mezin a civaka Rojava de dibû sedema tirs û xwe paşvekişandinê.

Lê belê, gelek jinan bi rêbazên cuda berxwedana xwe li dijî komploya navdewletî domand. Her wiha êrîşên nijadperestên Ereb di 12'ê Adara 2004'an de dibûn sedem ku gelê Rojava ji bo parastina hebûna xwe rabe ser xwe, serî hilde. Di vê serhildanê de ruhê berxwedan û welatparêziyê careke din di tevahiya civakê de zindî bû.

Di vê pêvajoyê de jinên Rojava jî pêwîst dît ku birêxistinbûna xwe ji nû ve saz bikin. Bi xebatên perwerde, kombûnên veşartî û çalakiyên piçûk wan manewiyata Tevgera Azadiyê û hevgirtina jinê careke din zindî kiriye. Bi armanca birêxistinbûna jinê li dijî cûreyên zayendperestî, nijadperestiyê hemûyan û ji bo çareseriya demokratîk a pirsgirêka Kurd, jinên Rojava tevgera xwe bi navê *Yekîtiya Star* damezrand. Bi vî rengî, têkoşîna azadiya jinê di civaka Rojava de bûye xwedî nasnameyeke xweser a rêxistinî. Bîrewerî û zanîna van serpêhatî û têkoşînan bûye bingehê pêşengiya jinê di Şoreşa Rojava de.

III. 3.6. Jin Weke Hêza Pêşeng a Şoreşa Rojava

Di dawiya sala 2010'an de serhildanên gel li Tûnis, Misrê û gelek welatên Rojhilata Navîn dest pê kirin. Nexasim çalakiyên li qada Tahrîr ya Misrê li Sûriyê û Rojava deng vedan. Rewş û ruhekî şoreşgerî bi pêş ket. Pê re, di nav Tevgera Kurd û Tevgera Azadiya Jinê de jî nîqaşên li ser dibetiyên bipêşxistina şoreşê li Sûriyê dest pê kirin. Di serê sala 2011'an de Yekîtiya Starê û PYD'ê civînên xwe li Heleb, Efrîn, Kobanê, Şam û li Cizîre çêkirin. Xebatkarên ku tevlî van civînan bûn dibêjin, wê demê tirsa dewletê hîn di gel de hebû. Lewma li hinek cihan malbatan nexwest mala xwe ji bo civînan vekin. Lê di civînên xebatkarên jin û yên giştî de biryar û plansaziyên xurt derketin. Dema ku encamên civînan hatin parvekirin, rewş hêdî hêdî guhert: *"Heyecana me gel jî bi bandor kir. Piştre rojevek ava bû, meşan dest pê kir û tirs hatiye şikandin."*

Di mehên Çile û Sibata 2011'an de endamên PYD'ê û yên Yekîtiya Starê li Helebê û bajarên Rojava kolan bi kolan bi gel re civîn li dar xistin. Gelek nîqaş dihatin meşandin, li pirs û nihêrînên gel dihat guhdarîkirin. Pirsên bingehîn ên ku di van civînan de dibûn rojev, ev bûn: *Rê-rêbaz û taybetmendiyên vê şoreşê pêwîst e çawa bin? Em ê gel çawa biparêzin? Em ê kengê û çawa dest pê bikin? Wekî gelê Kurd em ê têkoşîna xwe çawa bikin? Wekî jin em ê bi rista xwe çawa rabin?*

Di encama wan nîqaşan de plansaziyên ji bo birêxistinkirina civakê li ser bingehê projeya Xweseriya Demokratik hatin çêkirin. Li dijî rejîma Beesê û li dijî 'muxalefetê' di bin bandora hêzên derve de 'xeta 3'yemîn' wekî stratejiya şoreşê hatibû diyarkirin. Bi vî awayî rê li ber bi kar anîna hêza civak û rêxistinên gelê Kurd ji bo berjewendiyên hêzên cuda, hatiye girtin. Li ser bingehê tecrûbeyên têkoşînê yên salên bihurî gelê Rojava dest bi rêxistinkirina parastina xwe û rêveberina xwe kir. Armanca van hewldanan ew bû ku gelê Kurd bikare nûnertiya vîna xwe bike û pêdiviyên xwe pêk bîne. Her wiha bang li dewleta Sûriyê hat kirin da ku hêzên xwe ji herêmên

Rojava vekişîne bêyî ku şer û pevçûn biqewimin.

Di sala 2011'an de xebatên rêxistinkirina gel ji bo şoreşê mal bi mal, mirov bi mirov hatine meşandin: *"Em bi pirsgirêkên gel re mejgul bûn û me alîkarî ji bo şoreşê kom kirin ji Kurdan, ji Ermenî, ji Suryanî, ji Ereban, ji her kesî. Me mal bi mal gel bi rêxistin kir û ji bo çalakiyan amade kir. Gel înîsyatîf xist destê xwe û biryar stand: Bila ev cihê sûtemeniyê, mazotê biha nefiroşe! Gel dest da ser û mazot bi rêzê dan. Qeymeqam jî xistin rêzê. Nobet di taxan de gel bi xwe bi rêzê digirt. Kom bi kom perwerdeya leşkerî di taxan de hat dayîn. Ev ciwanên destpêkê hatin YPG'ê û niha pirranî şehîd ketin."*[369]

Pêngava şoreşê rûpelekî nû di dîroka jinên Rojava de vekir: Li tevahiya bajarên Rojava, jin ji malên xwe derketin tevlî civîn û meşan dibûn. Jin bi rengên xwe, bi cilên Kurdî û alên Yekîtiya Star, bi tîlîlî û dirûşmên xwe meşiyan. Rêxistinbûna Yekîtiya Star a herî xurt li Helebê bû. Di pêngava şoreşê de him berxwedana jinan li Helebê dest pê kiriye him bingehê gelek saziyan di serî de li Helebê çêbûye û piştre derbasê cihên din bûye.

Endama rêveberiya Kongra Star Besta behsa ruh û çalakiyên jinê yên bihara 2011'an dike: *"Me li Helebê dest bi civînên kolanan dikir. Vê moraleke mezin da gel. Me li ser bafeloya mizgeftan bang li gel dikir ji bo civînan. Kolan kolan me civîn çêkirin. Vê bandoreke mezin çêkir û dewlet jî şaş ma. Nikarîbû êrîş bike. Dewlet bi xwe di rewşeke tengav de bû û nexwest Kurdan jî li hemberî xwe rake. Di serî de me çalakiyên xwe di bin şiyara 'An azadî an azadî' de meşandin. Dîsa hemleya ji bo berdana girtiyên me hebû. Meşa yekemîn ku bi dirûşma 'Em ji bo Rojava xweseriya demokratîk dixwazin' hat lidarxistin, meşa jinan a Yekîtiya Star li Helebê bû. Piştre jinên li Qamişlo û Kobanê jî xwedî li vê dirûşme derketin û meşên jina çêkirin. Li Helebê me konê 'Avakirina xweseriya demokratîk' jî danî. Demeke dirêj berdewam kir. Me gelê Efrînê jî beşdarî çalakiyên Helebê dikir ji bo cesaretê bigirin."*[370]

a) Meşên Înîyê û Serhildanên Gel

Xwepêşandanên gel di 15'ê Adara 2011'an de li bajarên weke Deraa û Himsê dest pê kirin û li seranserê Sûriyê belav dibûn. Rejîma Beesê jî bi tundî û komkûjiyan bersiv da. Li aliyekî girsiyên gel bi daxwaza demokrasiyê li hemberî dîktatoriya Beesê rabûn. Lê li aliyê din jî hêzên olperest wekî Ixwan el-Muslimîn xwe bi navê 'muxalefet'ê bi rêxistin kirin. Dewletên herêmî yên wekî Tirkiye û Îranê ketin nav û xwestin vê rewşê ji bo berjewendiyên xwe bi kar bînin. Dîsa dewletên hegemoniyal ên wekî Rûsya û DYE'yê jî destê xwe werdan bûyeran. Bi vî rengî şer her diçû girantir û dirêjtir dibû. Siyaseta qirkirinê û bi taybetî komkujiyên rejîma Beesê di 12'ê Adara 2004'an de xetera komkujiyên nû li hemberî gelê Kurd li Rojava dan ber çav. Lewma nexasim di dema meş û çalakiyan de li Rojava hişyariyeke mezin pêwîst bû.

Li ser nîqaşên wê demê Necah Gulo dibêje: *"Şoreşa gelan dest pê kir. Me xwe bi rêxistin kir li ser esasê ku em ê xweseriya xwe îlan bikin. Hinek kesan dixwest me reş bikin û digotin: 'Hûn hevalê nîzama Esed in. Hûn li himber rejîmê dengê xwe nakin.' Me guh neda wan. Me meş û çalakiyên xwe bi rengê xwe dewam kirin û me dest bi xebatên saziyên xwe dikir. Her me çi dikir yan ava dikir, van partiyên din digotin, 'ev ne dema wê ye!' Em rexne dikirin. Lê wekî jin me xwe bi gotina*

[369] Hevpeyvîn bi Besta re, endama Kongra Star, Qamişlo, 2019
[370] Çavkanî li heman cihî

Serok girt 'yê şer dike azad dibe, yê azad dibe xweşik dibe, yê xweşik dibe tê hezkirin.' Wisa me xebat û têkoşîna xwe meşandin."[371]

Di Adara 2011'an de meş û çalakiyên 8'ê Adarê, salvegera komkujiya Qamişloyê di 12'ê Adarê de û yên Newrozê dibûn destpêka pêngava şoreşa gelê Rojava. Paşê jî hemleya meşên gel dewam kir. Di wan meşên bi pêşengiya Kongra Star û PYD'ê de civaka Kurd helwest û daxwazên xwe ji bo guhertinên demokratîk li Sûriyê û avakirina pergala xweseriya demokratîk li Rojava da xuyakirin. Piştî vê her roja înîyê meşên girseyî bi mijar û dirûşmeyên cuda dihatin lidarxistin. Dirûşmeyên meşê li gorî rojev û bûyerên wê hefteyê dihatin diyarkirin. Bi pirranî jinan pêşengiya meşan dikir. Dayik rabûn di meşan de keçên xwe tevlî nav refên yekîniyên xweparastine kirin. Her roja înîyê coş û tevlîbûna meşan, her diçû zêditir dibû. Bi taybetî şehadeta ji pêşengên PKK'ê Rustem Cûdî di 10'ê Cotmeha 2011'an de li herêma çiyayên Xakurkê û Xebat Dêrik di 14'ê Çileyê 2012'an de li Qamişloyê, bandoreke mezin a hestiyarî li ser gelê Rojava çêkirine. Di merasîmên van şehîdan de milet bi hezaran hat cem hev û peyama domandina têkoşîna wan ji bo serxistina şoreşê da. Hêza rêxistinbûnê ya gelê Rojava êdî xwe dida der. Lewma nêzikatiyên hinek hêzan bi hesabên cuda jî bi pêş diketin.

"Hêzên navdewletî pirr leyîstok çêkirin ji bo Kurdan bikişînin aliyê xwe. Muxalifan jî dixwest me bikişînin aliyê xwe, rejîmê jî dixwest me bikişîne aliyê xwe. Lê me zelal kir: Em aliyê sêyemîn in. Em ji bo xwe kar dikin. Hinek hêzan dixwest ku em li bajarên xwe ala Sûriyê yan jî ala muxalefetê rakin. Nexwestin ku rengê Kurdan xuya bibe û digotin, 'xweseriya demokratîk nabe!' Li dijî vê me xwest bersiva xwe bi rengên Kurdî yên Kesk û Sor û Zer bidin. Ji ber ku tiştek di destê me de tine bû, me perdeya xemla Newrozê wekî aleke mezin bi kar anî. Zarok hemû hatin û rakirin. Pirr kêfa gel hatiye. Piştî vê kongra TEV-DEM'ê çêbû, li vir bûye biryar ku ev ala me ye: Kesk û Sor û Zer. Dirûtina wê rehet bû!"[372]

Li Kobanê meşên dirêj yên jin û mêrên ciwan ji bo azadiya Abdullah Ocalan û avakirina xweseriya demokratîk pêngaveke nû bûn. "*Dema ku meşên înî dest pê kirin di dawiya meşan de ciwan û gel her hefte saziyek din ya dewletê dorpêç kirin û dest danê ser. Li şûna sazî û kargehên dewletê, saziyên gel wekî Mala Gel, Mala Jinê û Navenda Ciwanan di van avahiyan de bi cih bûne. Tabî, vê jî hesteke cuda da avakirin, berê me bi dizî kar dikir, niha jî me eşkere û fermî saziyên xwe vedikirin."*[373]

Yekîneyên Xweparastinê jî ji bo ewlehiya tax û saziyan nobet digirtin û dewriye derdixistin. Wan rayedarên rejîmê hişyar kirin ku ew ê êdî nehêlin ku hêzên rejîmê bikevin taxa Kurdan. Cih bi cih bi taybetî li herêma Cizîrê êrîş û provokasyonên dewletê pêk hatin. Lê belê li hemberî vê gel û hêzên parastinê nerazîbûna xwe nîşan da. Bi girtina çend endamên meclîsa gel û ciwanên Kurd, dewletê hewl dida gel bitirsîne û bitepisîne. Nexasim jî ciwanên Kurd ku ji leşkeriya dewletê reviyan, hatin girtin. Li hemberî vê, Yekîneyên Xweparastinê jî çend leşkerên dewleta Sûriyê girtin û dan xuya kirin ku ew ê wan lekeran bernedin heta ku ciwanên Kurd neyên berdan. Hingê, rejîma Beesê cara ewilî gavek bi şûn ve avêt û ciwanên Kurd berdan. Vê yekê werêkiyeke mezin da gel da ku li hemberî êrîşên dewletê helwestê nîşan da. Li çend bajarên wekî Serêkaniyê gel li hemberî girtina ciwanên Kurd derket û bi keviran bersiv da hêzên dewletê.

[371] Hevpeyvîn bi Necah Gulo re, Qamişlo, 2017

[372] Hevpeyvîn bi Besta re, Qamişlo, 2019

[373] Hevpeyvîn bi Sarya re, endama Yekîtiya Jinên Ciwan, Kobanê, 2017

Bi vî rengî qonaxeke nû dest pê kir. Xelkê şoreş hembêz kir. Yên ku herî zêde xwedî lê derketin û ji roja ewilîn ve li ser piya bûn, jin bûn. Gotineke Efrîniyan dibêje: ***Kevir li ser çayirê rabûye, ew çayirê me zer şîn hat.*** Dema ku tirsa dewletê rabû, Şoreşa Rojava li ser koka xwe şîn dibû. Beranberî rabûna gel, rejîma Sûriyê xwe mecbûr didît ku ji bihara 2011'an heta destpêka sala 2012'an pirraniya girtiyên siyasî yên Kurd berde. Piştî berdana girtiyan, Yekîtiya Star dest bi pêngava jinûveavakirina rêxistinê kir.

b) Avakirina Komîn û Meclîsan

Kongreya 4'an a Yekîtiya Star bi beşdarbûna zêditirî 100 jinî di 29 û 30'ê Tîrmeha 2011'an de li gundê Çema yê Efrînê hat lidarxistin. '*Jin wê çawa wekî hêzeke rêxistinkirî di pêvajoya şoreşê û avakirina pergala xweseriya demokratîk de cihê xwe bigirin?'* Ev dibû rojeva sereke ya nîqaşên vê kongreyê. Li gorî vê, biryarên ji bo birêxistinkirina hêzên xweparastina jinê, avakirina komîn û saziyên jinan ên wekî pergala xweser a jinê, hatin dayîn.

Piştî ku delegeyên kongreyê dîsa gihîştin herêmên xwe, gund bi gund, tax bi tax, li navçeyên Rojava hemûyan xebat ji bo avakirina komînên jinê hatiye destpêkirin. Di heman demê de meclîsên jinan ên bajaran hatin avakirin ku ji 150 heta 200 jinî pêk dihatin. Dîsa jin di nav konferans û saziyên giştî de jî xwedî risteke çalak bûne û wan nûnertiya daxwazên jinan dikir. Bi vî awayî 'kotaya zayendan' hatibû diyarkirin ku nûnertiya jin û zilaman bi rêjeya herî kêm a ji sedî 40'ê di tewahiya mekanîzmayên rêveberinê de misoger kiriye. Bi gotineke din, dema ku sazî û dezgehên nû yên xwebirêvebirinê dihatin avakirin, pêwîst bû ku herî kêm ji sedî 40'ê jin di wan de di her astayê de cihê xwe bigirin. Têgihîştina ku siyaset û rêveberiyê wekî karê zilaman dibîne û dema ku li ser berendamên karekî difikire têne navê zilaman tîne bîra xwe, bi vî rengî dihat guhertin. Wekî nûnerên Yekîtiya Star bi hejmar û tevlîbûneke bi bandor, jinan cihê xwe di sazkirina pergala xwerêvebiryê, saziyên civakî û siyasî de digirt, çawa ku di meclîsên gel, Tevgera Civaka Demokratik TEV-DEM û PYD'ê de cihê xwe digirt. Di Meclîsa Gel a Rojava de cara ewilîn pergala hevserokatiyê hatibû pêjirandin û nêzî niviyê endamên meclîsê jin bûn.

Remziye jî di vê kongreyê de amade bû û wekî endama meclîsa Yekîtiya Star hatiye hilbijartin. Ew serpêhatiyên xwe wekî nûnera jin di qonaxa avakirina rêveberiyên gel de wiha parve dike: *"Kongra çaremîn li Efrînê di destpêka şoreşê de çêbû. Bi hatina şoreşê re tevlîbûna jinan di kar de zêde bû. Xebatên Yekîtiya Star berfireh bûn. Gelek jinên xwendevan yê ciwan tevlî bûn. Gelek komîteyên nû hatin avakirin wekî yên aborî, yên siyasî, ya parastinê û sazî çêbûn. Dema me komîta jinê di meclîsên gel de ava dikir me zehmetî nedidît. Li hemû bajaran meclîsên taxan çêbûn û komîteyên jinan baş bi rola xwe radibûn. Ji ber tecrûbên jinan hebûn. Bi karê dayikên aşîtiyê, dayikên şehîdan û meclîsên Yekîtiya Star bingehek hatibû avakirin. Me dît ku jin di kîjan karî de cihê xwe girtibana, ew kar bi ser ket. Lê di avakirina komînan de li gundan me zehmetî dikişand. Jinan him fihêt dikir him jî berê nekiribûn. Piştî me civîn çêdikirin û hêdî hêdî dihat fêhmkirin kar wê çi be."*[374]

Bi gelemperî tê gotin ku di warê fedekariyê de ti pirsgirêka jinan nebûye. Lê belê pirraniya jinan di serî de xwe wekî 'alîgirên şoreşê' didîtin. Wekî rista dayik û jina ciwan di malbatê de wan xwe di karê civakî û siyasî de jî berpirsyar didît û ked dida. Lê belê ji bo erka rêveberiyê, nexasim di nav

[374] Hevpeyvîn bi Remziye Mihemed re, Qamişlo, 2017

sazî û meclîsên giştî yên gel de pirraniya jinan xwe hîn amade nedidît. Erkên nû dibûn sedem ku jin bi bandora feraseta zayendperest di kesayeta xwe de û di civakê de ketin nav têkoşînê. Bêyî vê têkoşînê, pêkan nedibû ku jin bi ristên nû di civakê de rabin û pêşengiya şoreşê bikin.

Piştî avakirina meclîsên taxan amadekariya hilbijartinên meclîsên bajaran yên giştî hatin meşandin. Remziye wekî namzet ji bo serokatiya giştî ya meclîsa Qamişlo hat pêşniyazkirin. Pêşî ew jî wekî gelek jinan dudilî bû: *"Min nedixwest. Min her tim karê xweser kiriye, yê giştî min nekiriye. Min xwest ku hinek jinên din werin hilbijartin. Lê min dengê herî zêde girtin. Ez mecbûr mam îradeya gel nas bikim. Wê demê sîstema hevserokatiyê nebû. Du cihgirê min yên zilam çêbûn. Hinekî zehmetî hebûn di destpêkê de ji ber ku xebatên giştî û yên avakirinê bûn. Lê me bi hev re tensîq dikir. Me xebatên hemû komîtan şopandin û di gundan de me meclîs ava kirin."*[375]

Wekî seroka meclîsa bajêr Remziye êdî xwe berpirsiyar didît û cesaret dida jinên din da ku ew jî xwe ji bo erka rêveberiyê amade bibînin: *"Di meclîsan de xebatên jin û mêran bi hev re dihat xwestin. Lê jinan ji bo rêveberiyê xwe nedida pêş. Wan digot, 'çi kar ji me bê xwestin em ê bikin'. Me di vir de jin dehf didan. Me digot, 'madem hûn kedê didin û kar dikin, gerek hûn netirsin ji rêvebirina wî karî'. Zilam her tim şexsê xwe didan pêş. Lê hêdî hêdî jinê jî xwe da pêş."*

Kurdên Rojava van hilbijartinan wekî gaveke dîrokî tecrûbe dikin. Cara yekê ew ê nûnerên xwe di nav civaka xwe de hilbijêrin. *"Li Efrînê dema ku me sindok ji bo hilbijartina li navçeya Şiyê danî, dayikeke şehîdan hat, ev sindok xemiland. Wê gul danîn ser û maçî kir. Wê digot, 'ev ya min e, ya kurê min e.' Em hemû giriyan. Hestên wiha bi me re çêbûn."*[376]

Hingê hîna sazî û hêzên rejîma Sûriyê li herêmên Rojava hemûyan hebûn. Cih cihan dewletê provokasyon û astengî derxistibin jî meclîsên bajaran pergala xwerêvebirinê bi rêya komisyonên xwe meşandine. Bi avakirina meclîs, komîn û saziyên gel, tevahiya pergala rêveberinê gav bi gav ji destê dewletê hatiye derxistin û ketiye destê civakê. Li şûna saziyên dewletê gel êdî diçû saziyên xwe yên wekî Mala Gel û Mala Jinan ji bo çareseriya pirsgirêkên xwe yên rojane. Ji ber ambargoya dewletê û welatên derve derfet kêm bûn. Lê meclîs û sazî dîsa li ser pêkanîna pêdiviyên civakê sêkînin wekî belavkirina mazot û nanî, bipêşxistina xebatên tenduristî û perwerdeyê, parastina tax û bajaran. Lewma rojekê qeymeqamê Kobanê bang li hevseroka Meclîsa Gel a bajarê Kobanê Eyşe Efendî dike. Ew li xwe mikur tê û jê re dibêje, "*Hinekên opozîsyonê dibêjin ku nîzam wê bikeve. Ew wekî slogan dibêjin. Lê we pêk anî! We sîstema me nehişt. Dewlet tenê li ser kaxizê maye."*[377]

c) Mala Jinê

Di vê pêvajoyê de gelek jin jî ji ber pirsgirêkên xwe û ji ber dozên tundiya zayendperest serî li Mala Gel xistin. Wekî pêdivî hatiye dîtin ku saziyên jinê werin avakirin da ku jin bikarin yekser bi alîkarî û piştgiriya jinê pirsgirêkên xwe çareser bikin. Lewma Mala Jinê wekî muxateb û navenda hemû xebatên jinê hatiye avakirin. Mala Jinê him bûye sazîbûna yekemîn a jinên Rojava him jî bûye saziya yekem ji bo parastina jiyan û mafên jinê li tevahiya Sûriyê. Damezrînera Mala Jinê ya Qamişlo Îlham Omer dibêje: *"Dema şoreşê 2011'an dest pê kir, me di meha Adarê de Mala Jinê*

[375] Çavkanî li heman cihî

[376] Hevpeyvîn bi Besta re, Qamişlo, 2019

[377] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

vekir. Lê hîna rejîm li cihê xwe bû. Tirs hebû. Tehdîd ji me re dihatin, him ji aliyê rejîmê him ji aliyê zilam. Lê em li himber sekinîn. Dîsa em reş dikirin. Ji me re digotin: 'Hûn ê çawa pirsgirêkên jin û civakê çareser bikin?' Bi çavekî piçûk li me meyze dikirin."[378]

Saziya Mala Jinê nû hatibû avakirin. Lê belê rêveberî û endamên Mala Jinê xwe bi zanîna mîrasa 30 salên têkoşîna azadiyê ve digirtin. Ew dibêjin, bîrdoziya azadiya jinê, tecrûbeyên wan yên xebatên rêxistinê û naskirina civakê dibûn çavkaniya hêza wan. Ya herî girîng jî ew bû ku wan dixwest êşa her jinê ji dil hîs bikin û bibin alîkar. Îlham Omer dibêje, xwesteka wan ew e ku jin ji jinê hez bike: *"Hezkirina me ji jinê re heye. Heta ku jineke fahîşetî kiriba yan tiştên ne baş kiriba. Weke Serok gotiye: Yekî ku tenê mûkî wê paqij mabe, wê rizgar bikin. Em dipirsin, di bingehî de çi heye heta ew jin gihiştiye wê astê? Ev bingeh xwar e, ji ber vê jin tê xwarkirin! Jin ne sûcdar e. Hezkirina me ji jinê re wisa ye."*[379]

Li ser vê bingehê Mala Jinê rêbazên xebatê xwe bi pêş dixistin. Tenê çend heftê piştî vekirina Mala Jinê, wan êdî karîbû çend daweyên jinê çareser bikirana ku bi salan bê çare mabûn. Ne meclîsên malbat û eşîran, ne jî saziyên dewleta Sûriyê çare ji wan re dîtibûn. Mala Jinê bi rêbaza guhdarîkirina li her du aliyan û bi qenaetkirina *'ya rast û ya heq çi ye'* xebitiye. Roj bi roj miracaetên jinên Kurd û Ereb zêde dibûn.

"Dema jinê dît ku Mala Jinê ava bûye û êdî mafên jinê tên parastin, jin weke lehiya avê hatin û [wan] xwe bi me girt. Piştre him jin û him jî zilam dihatin Mala Jinê ji bo çareseriya pirsgirêkên xwe. Wê demê koçberên me, ji ber şerê li Helebê û Şamê dest pê kiribû zivirîn ser axa xwe. Di vir de me nas kir çiqas bi bandora dijmin û malbatê li ser civaka me hatiye leyîstîn. Hin êşên jinan hebûn, em gelekî pê diêşîyan. Mînak, me guhdarî lê dikir ku jinekê 'her tişt dikir' [fihûş dikir] ji bo aborîya mala xwe û bikare du zarokê xwe xwedî bike. Zilam jî destek dida vî tiştî, digot 'bila herê bi min re alîkar bê.' Di destpêkê de em nexweş diketin. Ewqas bandorê li nefsiya me dikir dema ku me dît civaka me çiqas xira bûye."[380]

Lê dîtina êşa jinê ne jî heqaret û êrîşên li hemberî avahî û endamên Mala Jinê karîbûn xebat û têkoşîna wan bide sekinandin. Berovajiyê vê, hevgirtin û bawerî di nav jinan de bi pêş diket. Endamên Mala Jinê hêz û moral distandin ji her jina ku wan karîbû wê ji mirinê yan êşkencê xilas bikirana: *"Ez ji karê xwe hez dikim. Jinek li kû be êşa wê hebê, em dixwazin xwe bigihînînê. Dema ku me heqê jinekê stand em pê re kêfxweş dibin."*[381] Di encama xebatên Mala Jinê de jinan zêdetir pêwîst dîtiye ku perwerdeya civakî, rêxistinbûna jinê û hêza xwe ya parastinê xurt bikin. Dîsa jinên ji pêkhateyên cuda fêhm kirine ku jin ji pêkhateyan hemûyan di bin tundiya zayendperest de heman êşê dikişînin û li mafê xwe digirin.

d) Şoreşa Ziman

Pêngava şoreşê di heman demê de bûye şoreşa ziman û çanda Kurdî. Li hemberî tevahiya qedexe û zextên şovenîzma Ereb ya rejîma Beesê, gelê Kurd li Rojava di jiyana rojanê de zimanê xwe

[378] Hevpeyvîn bi endamên rêveberiya Mala Jinê, Îlham Omer û Diya Murad re, Qamişlo, 2017

[379] Çavkanî li heman cihî

[380] Çavkanî li heman cihî

[381] Çavkanî li heman cihî

parastibû. Bi rêya xebatên çand û ziman yên ku bi dizî di malan de hatin meşandin, beşeke zarok û ciwan fêrî stran, govend, xwendin û nivîsandina Kurdî dibûn. Bipêşketinên di sala 2011'an de çêbûn, pêşî li bi kar anîna zimanê Kurdî li gelek warên jiyanê vekir. Sazî û dikanan tabelayên xwe yên bi zimanê Kurdî daliqandine. Gund û bajarên Rojava xwe ji pênaseyên dewletê xilas kirine û dîsa li navên resen ên bi Kurdî vegeriyane.

"Di havîna 2011'an de me hemleya şoreşa ziman li Kobanê li Qada Azadiyê bi perwerdeyeke ziman dest pê kir. Bi hezaran gel ku ji palehiyê dihatin derbasê Qada Azadî bûn û vekirî dersa zimanê Kurdî didîtin. Ev çalakî belav bû. Dibistana me ya ewil ya ziman me li Efrînê vekir. Dûvrê li Cizîrê û Kobanê. Dibistanên me 2 - 3 gurfê di malekê de bûn. Piştre dibûn 3 - 4 mal. Dema ku gel didît dewlet nayê ser van, êdî gelek kes dihatin mala xwe bixwe ji bo xebatên perwerdeyê pêşwazî dikirin."[382]

Xeyala avakirina dibistanên Kurdî û sazîbûna xebatên çand û ziman bi têkoşînê bi cih hatiye anîn. Saziya Zimanê Kurdî û navendên çand û huner bûne saziyên ewil ên ku bi avakirina pergala xwerêvebirinê li Helebê û gelek bajarên Rojava hatin vekirin. Dewreyên perwedeyê ji bo mamostetî bi zimanê Kurdî hatin vekirin bi armanca avakirina bingehê pergala perwerdê bi zimanê Kurdî. Rejîma Beesê ev xebat wek şikestina serweriya xwe didîtin. Lewma hêzên rejîmê êrîşên cûr bi cûr li hemberî van saziyan bi pêş xistin. Jinên Kurd di parastin û bipêşxistina saziyên çand û ziman de dibûn xwedî risteke hêja. Ji dayikên nexwendî ku yekem car lênûs û pênûs girtin destê xwe û tevlî perwerdeya ziman dibûn heta mamosteyên jin ku ji dibistanên dewletê veqetiyan. Di Îlona 2013'an de dibistana yekemîn li Qamişlo dest bi perwerdeya bi Kurdî kir. Piştre pergala nû ya perwerdeyê bi zimanê zikmakî li dibistanên serêtayî, navîn û amadeheyî gav bi gav hatiye rûniştandin.

Mamoste Menal ji Dêrikê yek ji wan mamosteyan e ku bi keda xwe tevlî pêvajoya avakirina pergala perwerdeya nû ya bi zimanê Kurdî bû. Ew dibêje: *"Di destpêka Şoreşa Rojava de me berê xwe da perwerdeyê. Pêngava yekemîn ya me dest pê kir pêngava zimanê dayikê bû. Hejmara herî zêde ya ku kesê pê rabûn jin bûn. Me perwerdeya xwe ji ziman dest pe kir. Ji ber ku ziman bingehê her tiştê ye. Dema me zimanê Kurdî derbasî dibistanê kir ev bi tekoşinek bû. Em dikarin bêjin şoreşek di hundirê şoreşê de bû. Wê demê jî sîstema Beesê zêde li ber xwe da. Demê şoreşê dest pê kir di gelek cihan de destketiyên me çêbûn û dewletê zêde li ber xwe neda. Lê dema me destê xwe avêt dibistanan, hingî bûye wek ji nû ve şoreş rabû û ji nû ve teqînek çêbû.*

Dewlet jî dizane dema ku perwerde ji destê wê çû, hingî ew têk çûye. Ji ber nifşê ku tu rake, êdî wê xwedî dîrok û paşeroja xwe bibe. Tu vî nifşî bi çi rengî û bi çi zêhniyetê rakî û fêr bikî wê bandoreke mezin bike. Lewma di vir de dewletê [dibistan] qebûl nekirin û di navbera me û dewletê de şer çebû. Di gelek cihan de yekser mûçeyên karkerên dewletê qut kirin ji bo zextê li ser wan bike. Bi vî mûçeyî xelkê xwe û zarokên xwe xwedî dikirin. Ji ber vê, li cem qismekî tirs çêbû û ew li mala xwe man. Lê em nesekînin. Heger em dibêjin ku em ê jiyaneke nû ava bikin, gerek em ji perwerdeya zarokan dest pê bikin. Rengê fêrkirinê çawa be? Perwerde bi çi rengî be ji bo zarok fêrî jiyana rast û fikrê rast bibin, ji bo zarok bibe zarokeke afirîner û zarokeke xuliqkar?"[383]

[382]Hevpeyvîn bi Galia Nîmet re, ji fermandarên YPJê, li Heseke, 05-08-2017

[383] Hevpeyvîn bi mamoste Menal Mihemed Emîn re, Dêrik, 2017

Bi vî rengî xebatên çand û ziman wekî xebatên ji bo veguhertina zêhniyeta dewletê, ji bo bipêşxistina çanda demokratîk û vîna azad a kesayetê hatin destpêkirin. Her wiha mirov dikare berxwedanê ji bo sazîbûna perwerdeya ziman jî wekî rêbazeke xweparastinê bi pêşengiya jinê pênase bike.

e) Hêza Xweparastinê ya Jinê

Birêxistinkirina parastina cewherî li hemberî xeterên komkujiyên dewleta Sûriyê di vê pêvajoyê de mijareke jiyanî bû. Pevçûnên ku li Rojhilata Navîn diqewimîn, xetera qirkirinê nûjen kirin. Êrîşên dijwar ên li dijî xwepeşandanên gel li herêmên Deraa, Hema û Himsê nîşan dan ku rejima Beesê ji bo domandina desthilatdariya xwe wê her cûr û amûra tundiyê bi kar bîne. Wekî din komên çekdarî ji aliyê hêzên derve ve di nav muxalefetê de hatine sazkirin. Îhtîmala provokasyon û êrîşan xuya dibû. Tecrûbeyên dîrokî yên gelê Kurd û yên têkoşînên azadiya jinan destnişan kirine ku bêyî hêzeke rêxistinkirî ya parastinê ew ê nikaribin vîn û hebûna xwe biparêzin. Lewma bi avakirina pergala xwerêveberiyê re xebateke taybet ji bo avakirina zanîn û birêxistinbûna xweparastina civakî hatibû destpêkirin. Jinan pêşengiya avakirina pergala parastinê ya civakî kir. *"Li ser herêm û qadên giştî, pirranî hevalên jin sekînîn. Vê bandoreke mezin di nav civakê de çêkiriye. Gel matmayî ma ku jinan di birêxistinkirina xebat û hêzên leşkerî de li hemberî dewletê di vê astê de berpirsyarî digirtin û bi rista xwe radibûn. Lê bi demê re civak fêrî vê rista nû ya jinê bû."*[384]

Meryem Kobanê di avakirina hêza parastina jinê de cihê xwe girtiye. Ew zehmetî û kelecana van gavên destpêke wiha şirove dike: "*Komkujiya 2004'an ji bo me hişyarî bû. Ji bo em bikarin gel û pergala xwerêveberiyê li hemberî hemû xeter û hêzên çekdarî biparêzin, 2011'an me dest bi avakirina komên piçûk ên xweparastinê kir. Cara yekem me hêzên xweparastinê li Helebê, piştre li Efrînê, Kobanê, Dêrikê, Qamişlo û cihên cuda wekî komên piçûk yên veşartî di nav civakê de bi rêxistin kirin. Yên ku pêşengtiya sazkirina xebatên leşkerî û xweparastinê dikirin, hevalên jin bûn."*[385]

Tîm û taximên xweparastinê ji bo birêxistinkirina ewlekariya taxên xwe û kombûnên gel, berpirsyar bûn. Wekî din tax bi tax perwerdeyên bi kar anîna çekan hatin dayîn. Bi vî awayî bingehê pergala parastinê û asayîşê ji sala 2011'an ve hatiye bipêşxistin. Jinan di vê pêvajoyê de him wekî berpirsyariya giştî erk girtine him jî ji bo bipêşxistina hêza parastina cewherî ya xweser a jinê wan gav avêtine. Ji bo ev gav were avêtin, têkoşîneke taybet bi rêbazên dewlemend li dijî ferasetên zayendperestiya civakê pêwîst bûn. Plansaziyên ji bo bipêşxistina hêza cewherî û ewlekariya jinê, hatin bipêşxistin. Li gorî vê, perwerdeyên xweser, tîm û taximên jinê yên xweparastinê hatin birêxistinkirin. Pêşî tîmên jinan ên veşartî li Heleb, Efrîn û Dêrikê hatin ava kirin, piştre jî li herêmên din ên Rojava. Birêxistinbûn û çalakiyên wan di nav civakê de deng vedidan û dibûn rênîşanek ji bo biryardariya têkoşîna azadiya jinê di nava şoreşê de.

"Çalakiya me ya yekemîn li hemberî cihekî fihûşê li navenda Girkêlegê bû. Taximeke jinan bi navê 'jin parastina kolanan dikin' ev cihê fihûşê şewitand. Me daxuyaniyeke çapemeniyê jî da. Me got, 'Kî bazirganiya jinan dike, em ê cihê wan bişewitînin û vî kesî bikujin!' Dema ku pergala dewletê li Dêrikê lawaz ketibû, li hemberî zilamên ku jin difirotin, serxweş dikirin û dibirin, çalakî hatin lidarxistin. Bi rêya van çalakiyan gel fêhm kir ku hêzeke jinê ya parastinê heye ku ji bazirganên

[384]Hevpeyvîn bi endama fermandariya YPJê Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

[385] Çavkanî li heman cihî

jinê wê hesab bipirse. Me da xuyakirin ku em ê li dijî êrîş û destdirêjiya li hemberî jinê têbikoşin. Wan çalakiyan bandorekê mezin di civakê de ava kir."[386]

Endamên Xweparastina Jinê li gelek bajarên Rojava perwerdeyên xweparastinê yên sê rojan ji bo jinan bi rêxistin kirine: *"Me da fêrkirin jin çawa dikarin çekan bişuxilînin; dema ku yek ket mala wan, ew ê çawa bikarin xwe biparêzin. Dîsa me ji jina re 'rêbazên xweparastinê bi çav' da fêrkirin. Ne tenê parastina bi çek, lê hişyarbûn û çavdêrîkirina derdora xwe girîng bû ji bo mirov karibin taxa xwe li hemberî êrîşên ji derve biparêzin. Ji ber ku şer li Sûriyê êdî belav dibû. Tabî zehmetî hebûn ji ber ku ev tiştekî nû bû. Berê hevalên jin hebûn yên ku ji malê derketin, çûnê çiyê û pêşengî kirin. Lê rewşeke wiha ku jin him li mala xwe be, him parêzvana tax û welatê xwe be, hîna nehatibû dîtin. Li gorî çanda feodal a civaka Kurd ev wekî tiştekî ne pêkan, wekî eyb dihat dîtin.*

Bandora şerê taybet jî hebû yê ku rejim di salên dawiyê de li ser nifşê ciwanan pêş xistibû. Tiştên wekî tiryak û fihûşê, dîsa xizanî û koçberkirinê, hewesên moda yên modernîteya kapîtalîzmê û di kêliyê de jiyan dibûn sedema krîz û ji xwe biyanîbûnê. Ji ber vê jî me di rêxistinkirina xort û jinên ciwan de zehmetî kişandin. Ciwanên ku ketin ferqa van nakokiyan, zû li derdora me kom dibûn.

Lê di aliyê malbatan de pirsgirêk derdiketin. Wan digot: 'Ger keça me ji malê derbikeve bila tevlî bibe. Ev keçeke dergîstî ye. Çênabe ku ew di nav xortan de kar bike, nobetê bigire û bi mehan li dervê malê bimîne.' Pirsgirêkên wiha derketin. Lê ji bo em rê li pêşiya tevlîbûna jinên ciwan vekin, me rêbazek bi pêş xist: Pêşî me ciwanên mirovê hevdu tevlî xebatan dikirin. Mînak pismam û dotmam di heman grûbê de cihê xwe digirtin. Vê hinekî bawerî dida malbatê. Dema ku me biryara birêxistinbûna xweser a jinan da, êdî ev nêzikatiyên bi guman bi pirranî şikestin. Di dawiya 2011'an de me plansazî çêkir ku em ê her heftê li bajarekî tîmeke hevalên jin ava bikin."[387]

Bipêşxistina perwerdeyên xweser yên jinan girîng hatiye dîtin ji bo jin bikarin nakokiyên xwe û yên civakî fêhm bikin, vîna têkoşînê û hêza çareseriyê li cem xwe ava bikin. Bi vê armancê perwerdeyên bîrdozî û leşkerî bi rengekî veşartî hatin lidarxistin. Gav bi gav pergala civîn û perwerdeyên xweser hatiye bicihkirin.

Ji fermandarên YPJ'ê Narîn Efrîn serpêhatiyên xwe di avakirina pergala perwerde û birêxistinkirina xweparastina jinê de wiha parve dike: *"Me xwest perwerdeyeke xweser a jinan çêbikin da ku hevalên jin bikarin tevlî bibin. Meraqa jinê çêbû, xwesteka jinên ciwan pirr bû. Bi vî rengî me akademiya yekem a Şehîd Şîlan di destpêka 2012'an de li Efrînê vekir. Ji derveyî hevalên jin ên ji Efrînê, hinek jinên ji herêmên Cizîre û Kobanê jî tevlî dewreyên akademiyê dibûn. Bi rizgarkirina herêman jî li herêmên din cihên perwerdeyê girêdayî vê akademiyê hatin vekirin, wekî li Dêrikê û li Kobanê.*

Lê piştî dewreyên perwerdeyê xilas bûn, me jin dîsa şandin malê. Me ji wan re digot: 'Xilas. Hûn niha endamên me ne. Dema ku tiştek çêbibe em ê gazî we bikin.' Me bi sedan heval perwerde kirin. Yên ku dixwestin bi temamî tevlî bibin, biryara xwe dan û li cem me man. Ev ne hejmareke hindik bû. Lê belê hejmareke zêdetir me dişand malê bi [wê] erkê ku ji bo parastina welat amade bibin ger rewşeke awerte derbikeve. Lê wekî din karek tine bû ku pê re nasnameya wan jinan bikare derbikeve [holê].

[386] Çavkanî li heman cihî

[387] Çavkanî li heman cihî

Ez çawa ketim ferqê vê rewşe: Li Efrînê min li cihekî ku cilan difiroşe jineke ciwan dît ku li cem me perwerde dîtibû. Min ew hembez kir û pirs kir: 'Tu çi dikî?' Wê got: 'Ez cila difiroşim. Lê min du car perwerdeya we dît. Ji ber ku we ez dîsa şandim malê, pêwîst e ez karekî din bikim. Niha ez cila difiroşim.'

Vê hevalê ez dam fikirandin. Di serê min de bû nakokiyek: Em çima wan jinên ku perwerdeya me dîtin û dixwazin karekî bikin, dîsa dişînin malê? Wê demê em wek rêveberî kombûn û me nîqaş kir: Divê ku em cihekî bibînin ji bo ku ev jinên ku em perwerde dikin, bikarin bi me re bimînin û xwe pêş bixin. Mînak, ew dikarin xwendin û nivîsandina xwe pêş bixin û perwerdeyên taybet li ser çekan bibînin. Me dît ku navend, cihên perwerdeyê, nav û rêxistinbûneke jinê di qada parastinê de lazim e. Êdî me perspektîfek pêş xist ku hemû hevalên ku perwerde dîtine û naxwazin herin malê, bikarin li cem me li navendan bimînin. Lê di hefteyê de carekê dikarin herin serdana malbata xwe û werin. Hinek heval jî hebûn ku qet neçûn malê ji ber ku nexwestin."[388]

Li ser bingehê ku di salên 2011-12'an de gav bi gav hatibû avakirin, amadekariyên ji bo diyarkirina nasname û rêxistinbûna jinê di qada parastinê de hatin kirin.

f) Şehîda Yekemîn a Şoreşa Rojava

Şer û şehadeta ewilî li Helebê qewimî. Çeteyên dewletê û yên muxalefetê herduyan beriya her tiştî jin kirin hedef. Li hemberî vê jî jin dibûn pêşengên berxwedanên ewilî. Şehîda yekemîn a Şoreşa Rojava, endama Meclîsa Yekîtiya Star **Gulê Selmo** ye ku di rêveberiya Helebê de cihê xwe digirt. Zarokên wê bi xwe nebûn, lê her heval û ciwanên taxa Şex Meqsudê, hemû wekî zarokên wê bûn. Dema ku di 10'ê Adara 2012'an de pevçûn çêbû di nav kesên ji êşîra Begara yên girêdayî rejîma Beesê û ciwanên Kurd de Gulê Selmo ket nav û xwest vê meselê hal bike. Lê guleyên ji çekên kesên girêdayî rejîmê Gulê Selmo şehîd kirin. Diya Reşîd li ser dem û bandora şehadetê dibêje:

"Rojên me timî bi çalakî bûn. Beriya ku şer bikeve Helebê hevalan digot: 'Gerek hûn xwe fêrî çekê bikin, şer wê bikeve taxê.' Şerê destpêkê yê Begaran bû. Hevala Gulê nehişt ku tiştek were serê zarokên Kurd. Zarokên wê tinebûn. Wê digot: 'Ev keç û xort tev zarokên min in. Mala min ya partiyê ye.' Wê karê cebhewî dikir û ji dil de xwe dida kar. Di şerê Begaran de ew birîndar bû. Ew 3 rojan li nexweşxaneyê ma û piştre ji ber birîna xwe şehîd ket. Îcar erd û ezman xerab bû. Miletê me rabû serhildanê. Tiştek di Helebê de nema ku pê re neçû goristanê. Gundê Hevala Gulê ne gundekî dostê tevgerê bû. Lê dema ku me çadira wê danî ji her cihekî insan dihatin."[389]

Serhildana gel li Helebê piştî şehadeta Gulê Selmo bi rojan û bi tevlîbûna deh hezaran dewam kir. Ji ber vê sedemê, dewletê meşa Newroza 2012'an qedexe kirbû û gef li gel xwarin. Lê 150 hezar mirov ku ji wan, ji sedî 75'ê jin bûn, bi hêrseke mezin meşa Newrozê kirine. Bi vî rengî gelê Helebê xwedî li Newroza xwe him jî bibîranîna Şehîd Gulê derket. Şehadeta Gulê di heman demê de dibû nîşana veguhertina pîvanên rêzgirtina jinê. Tê gotin, di dîroka Rojava de cara yekem di merasîma Şehîd Gulê ya bi heybet de cenazeyek li ser milên jinan hatiye hilgirtin û veşartin. Wekî din civakê bi çavê xwe dîtiye ku nirxê jinê êdî bi hejmara zarokên ku wê aniye dinê nayê pîvan. Gulê Selmo bi ked, helwest û hezkirina xwe ketiye dilê hezaran. Piştî şehadeta wê, şerê li Helebê roj bi roj

[388]Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

[389]Hevpeyvîn bi Diya Reşîd re, Efrîn, 2017

dijwartir bû. Beşeke mezin a gelê Rojava berê xwe da warên xwe li herêmên Efrîn, Kobanê û Cizîrê. Lê bi taybetî di taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê de beşeke din a gel ma û wê ji bo parastina taxa xwe şer dikir.

g) Şoreşa 19'ê Tîrmeha 2012'an

Heta 19'ê Tîrmeha 2012'an, li gelek gund û bajarên Rojava, pergaleke wisa hatibû avakirin ku gel li derveyî dewletê, bi xwe jiyana xwe bi rê ve dibir. Di heman demê de rejîma Beesê li hemberî rewşa aloz û êrîşên li dijî rayedar û navendên dewletê, dihejiya. Komên çekdarî bi navê 'Ceyş el-Hurr' dor li Şamê, Hema û Helebê girtibû. Di nav van koman de çeteyên olperest û yên girêdayî dewleta Tirk ên wekî Cebhet El-Nusra serweriya xwe ava kiribûn. Çeteyan wê demê Qerekozax û Minbic jî girtin û amadekariya êrîşên li dijî Rojava kirin. Şeva 19'ê Tîrmehê, Ceyş el-Hurr xwe gihand Şexlerê û gef li Kobanê xwarin. Li hemberî vê rewşê, Meclîsa Gel a Kobanê biryar da ku hêzên dewletê ji bajêr derxe û bajarê xwe bi xwe bi rê ve bibe û biparêze. Şahidên vê biryarê û roja dîrokî dibêjin: *"Di saziyên xwerêveberiya gel de, di plansazî û pêkanîna vê hemlê de gelek jin, fermandarên jin jî hebûn. Hêzên me yên eskerî kêm bûn. Lê gel hemû avahiyên dewletê dorpêç kirin û leşkerên rejîmê esîr girtin. Hemû saziyên dewletê him eskerî him civakî, gel dest dane ser."*[390]

Di êvara 18'ê Tîrmehê de ji endamên Tevgera Jinên Ciwan ên Şoreşger ên li Kobanê re agahiyek hatibû: *"Hat gotin ku êdî hemû bajar ji saziyên dewletê were paqijkirin. Ber bi êvarê bû. Ciwan û endamên komiteyên parastinê ji bo parastina taxên xwe derketin û rê girtin. Heta roja din hemû cihên dewletê ku di bajar de mabûn, wekî cihên hêzên leşkerî, emnî û girtîgehê ji destê dewlet hatin standin. Dewlet tengav bûbû. Serê sibê jî li ser avahiya girtîgehê ala kesk û sor û zer hatiye vekirin. Bi vî rengî mizgîniya rizgarbûna bajêr belav bû. Ev kêfxweşiyek mezin bû. Bi roj jî gel dihat û diçû wan cihan, [li wan cihan] lênêrîne ku wan berê tê de êşkence dîtibûn."*[391]

Yek ji wan jinên ku berê li emnî eskerî ya Kobanê hatibû girtin û çend hefte beriya roja rizgariya Kobanê ji êşkencegehên dewleta Sûriyê derketibû bi serfirazî dibêje: *"Ez bûm şahîde Şoreşa 19'ê Tîrmehê. Ev hesteke pirr bi nirx bû. Heyecan û ruhê wê demê pirr cuda bû. Hestên tolhildanê hebûn, lê em bi rêxistinkirî bûn. Biryar hatibû standin ku em li Kobanê dest pê bikin û dewletê ji Kobanê derxin. Gelê Kobanê bi înat bû. Komên çalakiyê hatin birêxistinkirin. Her yek çû cihekî, li ser navendên dewletê û yên emnî. Lê şerên mezin çênebûn. Leşker û berpirsyarên dewletê yan teslîm bûn yan jî ji bajar derketin. Ev mecal ji wan re hatibû dayîn. Ruhekî pirr zindî li Kobanê hebû. Wekî kole ku dibin azad ango yeke birçî ku xwarinê dibîne û têr dibe. Jin jî bi rengê xwe tevlî pêngavê bûn. Çawa gelê Kurd rabûna dewletê wekî rabûna zilmê ji ser xwe didît, aslinde jinê jî ev roj wekî roja xwe didît. Bi cilê Kurdî xwe xemilandin û derketin qadan."*[392]

Di heman rojê de komite û yekînîyên xweparastinê wekî hêza leşkerî ji bo parastina Şoreşa Rojava bi navê Yekîneyên Parastina Gel (YPG) xwe fermî dan xuyakirin. Yek ji pêşeng û fermandarên vê pêngavê Jînda ji bajarê Til Temir bû. Di 19'ê Tîrmehê de wê ji raya gîştî ya cîhanê re ragihand: ***"Me Kobanê ji hêzên rejîma Sûriyê rizgar kir. Wek Yekîneyên Parastina Gel (YPG) em ê êdî bajarên Rojava bi xwe biparêzin!"***

[390]Hevpeyvîn bi Besta re, Qamişlo, 2019

[391] Hevpeyvîn bi Sarya û Amara re, endamên Yekîtiya Jinên Ciwan, Kobanê, 2017

[392] Hevpeyvîn bi Zêneb Dilşer re, endama PYD, Qamişlo, 2017

Şoreşa 19'ê Tîrmehê û daxuyaniya YPG'ê wekî çirûskeke ji Kobanê pêl bi pêl li Rojava belav bûbû. Du rojan paşê agirê şoreşê li Efrînê pêket. Raperîna gelê Efrînê di 21'ê Tîrmehê de li Mabata dest pê kir. Piştre derbasê Şiyê, navçeyên din û navenda Efrînê bû. Li her cihî gel û hêzên xweparastinê dor li baragehên leşkerî û saziyên dewletê girtin û dest danîn ser çek û saziyan. Bêyî ku şerekî giran biqewime pirraniya leşker û rayedarên rejîmê teslîm bûn. Hejmarek leşker dîl hatibûn girtin. *"Em bi rengekî pirr însanî nêzîkî esîran bûn. Me baş li wan meyze kir. Ji ber ku me xwest ku ew ferqa di navbera zindana Kurdan û zindanên dewletê de nas bikin."*[393] Di encama hevdîtinên diplomatîk de him girtiyên siyasî yên Kurd ji zindanên rejîmê, him jî polîs û leşkerên dewletê ji zindana Efrînê hatin berdan. Piştî ku hêzên dewletê ji herêma Efrînê hatibûn derxistin, li vir jî saziyên gel ketin şûna wan.

Dayikên Efrînê ku ji 20 salan zêdetir ji bo azadiya Kurdistanê di bin şertên giran de ked didan, bi hestyarî dibêjin, wan bawer nedikir ku ew ê vê rojê bibînin. Dayika Rûqiye dibêje: *"Me bawer nedikir ku li Efrînê û Rojava şoreşek were avakirin. Hertim me didît ku şer li Bakur heye. Ew roj wek xewnekê ji me re bû."*[394] Dayika Şehîd Dara jî hestên xwe yên roja rizgarkirina Efrînê wiha tîne ziman: *"Kî bawer dikir ku jinên me wê rabin, sîlehê rakin û şer bikin? Jin tim kole di hundir de bû. Karê malê bike û bê deng be! Niha jinên me giştî bûne şêr! Serokatî gulek li ser çiyê çand, wê bêhna xwe li ser dine gî belav kir."*[395]

Jinên Efrînê ji roja ewilî ya şoreşê ve him di avakirina hemû saziyên rêveberiya xweser û civakî de him jî di parastina şoreşê de bi risteke pêşeng rabûn. Çawa wan li hemberî hêzên dewletê serî hilda, wan li hemberî paşverûtiya civakê jî serê xwe hildaye: *"Cara yekemîn em weke jin diçûn li ser bendên kontrolê yên asayîşê bisekînin. Di destpêkê de gel matmayî ma ku jin li ser bendê sekinîne. Hineka bi kêfxweşî pêşwazî dikir ku jin bûne xwedî vîn û hêzekê. Lê hineka jî bertek nîşan didan. Bi taybet dadmendek hebû ji Helebê dihat. Wî nepejirand ku nasnameya xwe pêşkêş bike. Em weke jin, me di ya xwe de israr kir ku divê rêzdarî bide jinan. Me ji wî re got: 'Eger tu nasnameya xwe nedî, tu wê nekevî Efrînê.' Ew ma, heya saet 2'an û neket Efrînê. Wî wê demê got, 'we ji me re xwe îspat kir ku hûn weke jin xwedî li gotinên xwe derdikevin' û dîsa çû Helebê."*[396]

Kobanê û Efrîn bêyî şerên mezin ketibûn destê gel. Dûvre bi pêşengiya jin û ciwanan serhildanên gel li Cizîrê jî bajar bi bajar belav bûne. Di 22'ê Tîrmehê de hêzên YPG'ê xwestin wekî tedbîrên ewlekariyê li navçeya Dêrikê arteşa Sûriyê ji nuqta û baragehên li ser xeta sînor derxin. Lê hêzên rejîmê li ber xwe dida û şer qewimî. Hingê xelkê Dêrikê bi înîsyatîfa xwe, bi dar, ber û çend tivingan derket kolanê û serî hilda. Li hinek cihan leşkerên rejîmê fîşek berdan xelkê. Lê xelkê li ber xwe da. Heta êvarê xelkê qereqol û navendên hikûmetê hemû yek bi yek xist destê xwe. Yadê Soad ku tevlî vê serhildanê bû, dibêje: *"Bi vî awayî me Dêrik rizgar kir. Her cihê ku hevalan digirt, me hinek heval li wir dihiştin ji bo dewlet careke din nekeve wir û em bi pêş de diçûn. Jinan serkêşiya berxwedana vê şoreşê kir. Tenê Ketîbe li dervê bajêr mabû. Ji ber ku cebilxaneya leşkerên Sûriyê li wir bû, dev ji wir bernedidan. Heval Bawer li ber qereqola dewletê ya li navenda bajêr şehît ket. Ew bu nîşana serketina Şoreşa Rojava. Piştre em hatin, dewlet nemabû. Wekî jin, me jinan biryar girt ku ew qereqola dewletê bibe Mala Jinê. Pêşniyaza me hat qebûlkirin. Heta niha jî Mala Jinê ye. Di vê Şoreşa Rojava de jinê fêhm kir ku her tiştê wê jî biçe,*

[393] Hevpeyvîn bi Ehlem re, hevseroka Komîna Penaberên Efrînê, Til Temir, 2018

[394] Hevpeyvîn bi Dayika Rûqiye re, Efrînê, 2017

[395] Hevpeyvîn bi Dayika Şehîd Dara re, Efrîn, 2017

[396] Hevpeyvîn bi Deliye Henan re, hevseroka TEV-DEM a kantona Efrînê, Efrîn, 2017

ew dikare bi ser bikeve."[397]

Van serketinên gel ji bo gelê Qamişlo, Hesekê, Dirbêsî û bajarên din jî dibû cesaret û hêvî. Gelê Rojava ew roj bi ruheke hevbeş weke rojên azadiyê bihurandin. Li her cihî gel bi coşeke mezin derket kolanan û dor li saziyên hikûmetê girt. Hejmareke mezin ya jin û xortên ciwan tevlî nav refên YPG'ê bû. Jinên Amûdê dibêjin, ew li bendê bûn ku gelê Amûdê jî wê rabe. Lê hîna deng ji Amûdê derneketibû. Lewma wan înîsiyatîf xist destê xwe: "*Şoreşa Tîrmehê li Amûdê şoreşa jinan bû. Di destpêkê de em 20 jin bûn, dayik bûn. Wek li bajarên din me jî xwest dewletê ji Amûdê derxin. Em li ser şarihê ber cihê hikumetê li bin germayiya havînê rûniştin. Hinek kesan digot, 'Hûn li vir çi dikin?' Me jî got, 'Heya dewlet neçe, em ranabin!' Êdî gel kom bû û pevçûnê dest pê kir."*[398]

Bi înîsyatîfa jin û ciwanan nîvê bajêr ji destê rejîmê hatibû girtin. Wan derdora cihê ewlekariya dewletê jî dorpêç kiribû, lê hêzên dewletê derneketine. Îcar şandeke Dayikên Aşitiyê çû cem rayedarên dewletê û xwest ku ew hêzên xwe vekişînin bêyî ku xwîn bê rijandin. Di dawiyê de dewletê qebûl kir ku heta saet 3'yê şevê derkeve bi şertê ku gel derdora cihê wan vala bike. Hingê gel rabûye û dora cihê qeymeqam girtiye. Bi vî rengî bajarê Amûdê jî di 24'ê Tîrmehê de hatiye rizgarkirin.

Li pey hev li gelek bajar û bajarokên herêma Cizîrê rêveberiya gel hatiye ragihandin. Xelkê ew roj wekî rojên azadiyê dîtine. Hêviyên şoreşê belav bûne. Beşdarbûna beşên civakê hemûyan di warên xebatê de bi pêş ketiye. Wekî din, tevlîbûna jinan û gelên Ereb, Suryanî, Keldanî û Aşûrî ya nav xebatên sazî û meclîsan zêde bûye. Lê hîna guman hebû, gelo gel wê karibe bajarên xwe biparêze. Ji ber ku bajarên Tirbespî, Rimêlan û Çilaxa û her wiha çend taxên bajarên Qamişlo, Serêkaniyê û Hasekê hê jî di bin serweriya hêzên rejîmê de bûn. Ji bo parastina destketiyên şoreşê, li aliyekî xebatên siyasî û civakî li ser esasê yekîtiya gelên Rojava hatine meşandin. Li aliyê din jî pergala ewlekariyê û bendên kontrolê li ser rêyên hundir û derveyî bajaran hatine avakirin. Dayikên ku bi çek li ser milê xwe di bendên kontrolê de disekinîn, seyare û nasnameyên ajokaran kontrol dikirin, dibûn sembola vê şoreşê. Li aliyekî ew mecbûr mane ku têkoşîna xwe li hemberî nêzikatiyên zayendperest û yên piçûkxistina li mala xwe û li hemberî ajokaran dewam bikin. Lê li aliyê din de ew bi bixwebaweriya xwe ya nû ji aliyê gelek kesan ve bi kêfxweşî û rêzdarî hatine pêşwazîkirin.

h) Avakirina Hêzên Asayîşê û Asayîşa Jinê

Ji bo misogerkirina ewlekariya bajaran piştî pêngava 19'ê Tîrmehê sazîbûneke nû pêwîst hat dîtin. Jinên ku di avakirina pergala Asayîş û Asayîşa Jinê de cihê xwe girtine, qala zehmetiyan dikin ku wan di pêvajoyên destpêkê de dîtine. Çavkaniya pirraniya pirsgirêkan jî ferasetên desthilatdar bûn. Ayten, endama rêveberiya Asayîşa Rojava dibêje, saziya Asayîşê tenê di encama têkoşîna li hemberî hişmendiya dewletê de xwe di nav civakê de dabû qebûl kirin:

"Bi derfetên kêm û hêza xwe ya cewherî me dest bi şoreş û xebatê kir. Di serî de cudahî wekî ewlekariya hundirîn û parastina li hemberî êrîşên ji dervê nebû. Bi xwezayî her kes xwedî li erkên

[397]Hevpeyvîn bi Yadê Suad re, endama rêveberiya Meclîsa Malbatên Şehîdan a Dêrikê, 2017

[398] Hevpeyvîn bi Mira Zoro, Mesude Aziz û Newal Xalid re, endamên rêveberiya Kongra Star a Amûdê, 2017

şoreşê derdiket. Asayîş bi xwe gel e. Lê di avakirina vê saziyê de pirr zehmetî hatin kişandin. Çekên me kêm bûn. Di serî de gel bi keviran nobet digirt û li ser hacizan [benda kontrolê] sekinî ji bo bikare xwe biparêze. Di sala 2012'an de Asayîş fermî wekî sazî hat avakirin. Ev pêwîst bû ji ber ku li hinek bajaran wekî Qamişlo, Hesekê û aliyê Serêkaniyê him nîzam tê de hebû, him jî êrîşên Cebhet El Nusra dest pê kirin. Piştî vê, navendên li Efrîn û Kobanê hatin avakirin. Hevalên jin jî di avakirina navend û karê Asayîşê de cih girtin. Lê hejmarek kêm bû. 11 an 12 endamên jin bûn."[399]

Endamên Asayîşa Jin li herêmên Cizîre, Kobanê û Efrînê dibêjin, di destpêkê de civakê beşdarbûna jinan a Asayîşê qebûl nedikir. Gelek kesan bawerî pê nedianî ku jin bikarin li ser haciz bisekînin, biçin dewriyê û operasyonan. Lê jinên ciwan û dayikên ku cara yekê jineke bi cilên Asayîşê li ser hacizan didîtin, pê hisiyane ku ew jî dikarin vî karî bikin.

Rewşen sala 2013'an tevlî nav xebata asayîşê li Efrînê bû. Ew dide zanîn ku wê wekî jin di serî de gelek zehmetî kişandine, lê di demekê kin de bipêşketinên mezin çêbûne: *"Hezkirineke min ji karê leşkerî re hebû, ji ber vê yekê ez bi hezkirin tevlî xebatê asayîşê bûm. Di destpêkê de hejmara jinan kêm bû. Me di hundirê asayîşê de xebatên cur bi cur dan meşandin. Derketina ser hacizan [bendên kontrolê] ji bo min pirr zehmet bû. Min bi xwe pirr şerm dikir ku ez ê milet bisekinînim. Lê ev zehmetî bi demê re derbas bûn. Di nava demeke kin de hejmara me pirr zêde bû, ji 20 endaman em gihîştin 450 endamên jin li ser asta kantonê."*[400]

Şadiye Mistefa dayika sê zarokan e. Ew salekê beriya Rewşênê tevlî nav refên asayîşê bûye. Wê xwest bi vî karî re zêhniyeta civakê bide guhertin ya ku dibe sedema zehmetiyên jinê. Ew di koma destpêkê ya jinên asayîşê de bû ya ku li Efrînê li ser bendên kontrolê bi erka xwe rabûne. Ew bi xwe bawer dibêje: *"Min şerm nedikir dema min erebe sekinandin. Di vî karî de min îrada xwe derdixist. Ev erka me ye."*[401]

Asayîşê û Asayîşa Jinê xwe ji hundirê civakê bi rêxistin kirin. Endamên rêveberiya navendên asayîşê didin xuyakirin ku ji ber bandora zêhniyeta Beesê di serî de zehmetî çêbûne: *"Him gel li asayîşê carna wekî 'polis' dinêrî. Him jî endamên asayîşê hebûn ku xwe bi vî rengî didîtin. Wisa nêzikatiyên şaş li hemberî kesên ku wekî 'sûcdar' hatin dîtin ji aliyê hinek kesan ve derketin. Lê me li hemberî vê zêhniyetê têkoşîn dikir. Ji ber ku zêhniyeta me ne ya dewletê ye. Me hewl dida ku em bi mirovan kêmasiyên xwe bidin fêhmkirin û bi rêya perwerde û civînan [wan] derbas bikin. Perwerdeyên me pirranî li ser uslûb û rêbazên me, nêzîkatiya me ji gel re bûn. Mînak, tu çawa mirovan iqna bikî. Bi nêzîkatiyek demokratîk û wekhev em dixwazin pirsgirêkên civakê çareser bikin. Em dikarin bêjin ku ji sedî 85'ê hatin guhertin. Bi têkoşîn ji bo rûniştandina şewazekî rast û derbaskirina ferasetên dewletperest ve pêşketineke mezin çêbû. Dema ku pêşketin di rêbazên asayîşê de çêbûn, wê demê gel jî nêzikatiya xwe guhert. Gava ku gel dît ku ew dikarin li cem asayîşê çareseriya pirsgirêkên xwe bibînin, gel jî êdî qebûl kir."*[402]

Endamên Asayîşê bi risteke girîng di parastina civakê li hemberî êrîşên çete û hêzên dewletê de rabûn. Jinan jî di tîmên Asayîşê de cihê xwe girtine ku pêşî li zerar û ziyanên li gel girtine: *"Gelek*

[399] Hevpeyvîn bi endamên rêveberiya Asayîşa Jin a Rojava, Qamişlo, 2017

[400] Hevpeyvîn bi endamên Asayîşa Jinê ya Efrînê re, Efrîn, 2017

[401] Çavkanî li heman cihî

[402] Hevpeyvîn bi endamên rêveberiya Asayîşa Jin a Rojava, Qamişlo, 2017

teqandin li ser hacizan çêbûn. Bi sedan endamên Asayîşê di bendên kontrolê de şehîd ketin ji bo seyarên bombabarkirî nekevin bajêr. Endamên Asayîşê xwe kirin mertal û şehîd ketin ji bo parastina civaka xwe. Parastina hundirîn û derve hevdu temam dikin. Dijmin napirse ev YPJ ye, ev Asayîş e. Em jî bê ferqî, gelê xwe li hemberî êrîşan diparêzin. Hevalên Asayîşa Jinê ku canê xwe feda kirine ji bo seyareyên teqemeniyê nekevin bajaran jî hene. Mînak Hevala Nesrîn ji Hesekê li ser haciz bû. Dema ku seyera çeteyan bi teqemenî hat, ew çû pêşiya seyera teqmeniyê ji bo seyarê bide sekinandin û ji aliyê çeteyan ve hat şehîd xistin. Du hevalên me yên jin jî di şerê Qamişlo de bi rejîmê re li ser haciz bûn û pirr ber xwe didan. Ew jî di nav şerekî pirr dijwar de şehîd ketin."[403]

Her wiha bi sedan endamên Asayîşa Jinê jî beşdarî hemleyên li dijî êrîşên DAIŞ'ê û hêzên dagirker bûne: *"Ji ber ku karekî ji bo parastina gel e, xwestekek pirr zêde heye. Piştgirîdayîna YPJ û YPG'ê bi moraleke mezin çêdibe."*[404]

Di avakirina Asayîşê de serê pêşî bi pirranî jinên Kurd cihê xwe digirtin. Lê belê pêre pêre jinên ji pêkhateyên Rojava hemûyan jî tevlî karê parastina civakê dibûn. Pê re, têkoşîneke hevbeş a jinan li dijî ferasetên zayendperestiya civakê di nav sazî û civakê de hatiye meşandin. Jinan bi beşdarbûna kar û xwebirêxistinkirina di nav hêzên Asayîşê de him di kesayeta xwe de him jî di nihêrîna civakê ya li jinê de gelek guhertin çêkirin. Di kesayeta xwe de wan qalibên girtîbûn û şermê li pey xwe hiştin û ew bi xwe bawer bûne. Wan bi civakê daye fêhmkirin ku jin di her xebat û qada têkoşînê de dikarin bibin xwedî ked û biryar. Di heman demê de bi nêzîkatiyên xwe wan di gelek cihan de bawerî dida gel ku Aşayîşa Rojava wekî parêzvanên civaka xwe tevdigerin.

i) Wekî Encama Beşê

Em dikarin bibêjin, jin ji rojên ewilî yên şoreşê ve di hemû waran de li hemberî êrîş û astengiyan bi vîn, zanebûn û biryardarî têdikoşiyan. Jinên Kurd di Şoreşa Rojava de xewn û xeyala xwe ya jiyana bi ziman, çand û nasnameya xwe, pêk anîn. Cara yekê jinan berpirsyariyên civakî, siyasî û parastinê wergirtin ji ber ku wan hêviya siberojeke azad ji bo xwe û zarokên xwe di vê şoreşê de dîtîn. Lewma gelek jinan êdî guh neda şîret û gefên derdorê ku rist û namûsa jinê wekî xizmetkariya zilam û malbatê pênase kirine. Jin ji her beşa civakê ji mal derketine û di rêxistinkirina meş û serhildanên gel de; di damezrandina komîn, meclîs, dibistanên Kurdî û saziyên jinê de û di avakirina hêza xwe ya parastinê de bi risteke pêşeng rabûne. Gelek karên ku heta vê rojê hîna kesekî nedikir, wan bi serketî meşandiye. Bi vî rengî jinan ji rojên destpêkê ve reng û dengê xwe daye şoreşê. Ew dibêjin, wan sê şoreş di nav hev de kirine: *"Şoreşa ku di Sûriyê de ava bû, di hundirê vê de Şoreşa Rojava ya Kurdan û di hundirê wê de Şoreşa Jinê."*[405]

III. 3.7. Avakirina Xweseriya Demokratîk û Şerê li dijî DAIŞ'ê

[403] Çavkanî li heman cihî

[404] Çavkanî li heman cihî

[405] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî, Kobanê, 2017

Piştî pêngava serketî ya Şoreşa 19'ê Tîrmeha 2012'an, pergala xweseriya demokratîk di her warê jiyanê de li herêmên rizgarkirî hemûyan hatiye sazkirin. Di heman demê de ji gelek bereyan ve êrîş li dijî Şoreşa Rojava bi pêş ketine. Hêzên navdewletî, Tirkiye, dewleta Sûriyê û PDK'ê li hemberî herêmên xweseriya demokratîk siyaseta tecrîd, ambargo û şantajê xistin dewrê. Bi vî rengî wan hêzan hewl dida pêşiyê li şînbûn û belavbûna şoreşa gelêrî bigirin. Lê belê dema ku derket holê ku bi wan rêbazan ew ê nikaribin encamê bigirin, bi giranî êrîşên leşkerî dihatin bipêşxistin. Komên olperest yên wekî Cebhet el-Nusra di bin banê 'Ceyş el-Hur' de ji aliyê dewleta Tirk û DYE'yê ve ji bo şerê li hemberî xweseriya gelê Rojava, dihatin amadekirin. Li gorî vê armancê, şerê yekemîn di Cotmeha 2012'an de li Efrînê rûda. Çeteyên di bin banê 'Ceyş el-Hur' de êrîş birin ser gundê Êzdiyan Qestela Cindoyê. Di berxwedana du rojan de cara yekê şervanên jin jî tevlî şer bûn.

Fermandara wan hest û fikrên xwe yên wê kêliyê wiha tîne ziman: *"Dema şer derket, me wekî taqwiyê du hevalên jin jî şandin. Ez bixwe jî ketim gumanê 'ecaba ew ê bikarin şer bikin an jî ew ê şehîd bikevin? Ew ê bi xwe bawer bin an na?' Heya min biryar da ku ez wan bişînim ji bo min pirr zehmet bû. Lê di dawiyê de min got, 'Bila biçin. Ger şehîd jî bikevin, ew ê dîrokê binivîsin.' Roja din ez çûm cem wan. Min dît ku wan hevalan heta serê sibê di mewziya xwe de şer kiribû. Wan bi xwe û hemû hevalên xort jî ji cesaret û tevlîbûna wan pirr moral girtibû."*[406]

a) Pêvajoya Şerê Serêkaniyê

Heyvekê paşê, qonaxa yekemîn a şerê Serêkaniye di 8'ê Mijdara 2012'an de bi êrîşeke berfireh destpêkiriye û heta 17'ê Kanûnê dewam kiriye. 3 hezar çeteyên El-Nusra ji aliyê sînorê Tirkiyê ve ketin bajêr û dor li bajêr girtin. Çeteyan bi taybetî êrîş bire ser taxên Kurdan û gelên Xirstiyan, malên wan talan kirin. Hêzên rejîmê vekişiyan. Piştre balafirên rejimê qaşo li çeteyên El-Nusra xistin, lê belê, ya rastî, wan taxên gel bombebaran kirin ji bo xelkê ji bajêr koçber bikin. Wî çaxî tenê hejmareke piçûk a şervanên YPG'ê li bajêr hebû. Wê karibû taxekê biparêze heta hêzên teqwiyê hatin.

Şikriya, ji xelkê Serêkaniyê ye û dayika çar zarokan e. Di dema şerî de li bajer bû û wekî dayikên din jî piştgirî daye şervanan: *"Dema ku çeteyên 'artêşa azad' ketin Serêkaniyê wan di camîyan de bang kir 'malên we, jinên we û pereyên we li me helal in'. Wan digot: 'Bila jin ji malê dernekevin'. Lê ez bixwe derdiketim, bê ku ez bitirsim. Hêzek di hundirê min de hebû, ji ber ku şervanên me ji derve bûn. Ji her çar aliyan ve em dorpêç kirin. Çeteyan dixwest me bifetisînin. Lê me ew şikandin. Bi rastî tirs hebû, lê miletê wê derneket. Tenê dema balafirên şer yên rejîmê li ser Serêkanîyê gerîyan, hingî milet li ser zarokê xwe tirsiya û derket. Me zarok derxistin. Lê ciwanê me derneketin. Belkî em feqîr bûn, çekên me kêm bûn. Lê jinên me digotin, 'Bi daran jî bê, em ê ser bikevin. Di rûyê dijmin yê hov de bidin.' Jinan êş jî kişand, lê li ber xwe dan û pişta zarokên xwe girtin. Jin bûn piştek ji qîz û xortan re, bûn hêza zarokên xwe. Wan ew bê nan û av nehiştin. Ji ber ku dayik zayîneke pîroz e."*[407]

Ji vegotinên jineke Ereb xuya dibe ku armanca vî şerî tinekirina jiyana hevbeş a gel û baweriyên cuda li Serêkaniyê bû. Jin û Kurd bi taybetî bûn hedefa êrîşên qirkirinê ji ber ku ew bi risteke pêşeng di avakirin û parastina hevgirtina civakê de rabûne: *"Em hemû razabûn. Ji nişkê ve seat diduyê şevê deriyê Tirkiyê vebû û Cebhet El-Nusra hatin, bi ser me da girtin. Destpêkê wan got:*

[406] Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

[407] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Serêkaniyê re, Serêkaniyê, 2017

'Em hatin şerê rejîmê bikin û biçin.' Leşkerê rejîmê sê rojan li ber xwe neda û hemû hatin kuştin. Duvre gotin, em ê şerê Kurdan bikin. Cebhet El Nusra bang dikir û digot: 'Wan bikujin û keçê Kurdan bibin ji xwe re'. Destpêkê Ereban xwe neda ber. Kurdan tenê li ber xwe da. Bajarê me bûbû du parçe. Ereban xwe dabû milê Cebhet El-Nusra û milê jor yê Kurdan bû. Sê cara balafirên rejîmê li bajar xist. Vê demê nû milet derket. Ereb gelek neman di bajêr de û Kurdan li ber xwe da. Ez ji Serêkaniyê derneketim, ruxmê mala min qesif kirin. Parçe li min ket û dixtor nebû. Ez birim gundekî. Bê benc, parçe derxistin. Wê demê milet bêhtir ji hev hez dikir û hîn tekoşîna wan xurtir dibû. Me nan ji şervanan re çêdikir. Piştî bajar rizgar bû, Kurd çûn cem Ereban û gotin, 'Werin ev erdê me û yê we ye. Em bi hev re jiyaneke hevbeş li ser axa Serêkaniyê ava bikin'."[408]

Di vî şerê parastin û rizgarkirina bajêr de hêzên YPG'ê bi giştî, lê bi taybetî fermandar û şervanên jin tecrûbeyên girîng bi dest xistin. Cara yekemîn jinên Rojava wekî hêzeke leşkerî di her astê de tevlî şer dibûn. Jinan ev şer koordîne kir û bi rê ve bir. Wekî din bi dehan jinên ciwan di dema şer de hatin û tevlî nav refên şervanan bûn. Yek ji wan jina ciwan a Êzdî **Bêrîvan Aldar** (Dildar Eyo) bû ku piştre di 17'ê Tebaxa 2013'an de li gundê Keşto yê Serêkaniyê şehîd bûye.

"Hevala Bêrivan keçeke ji Serêkaniyê bû. Malbata wê hemû li ser rêya Bakur derdikeve Ewropayê. Ew bi wan re heta Bakur diçe. Lê dema ku li televizyonê rewşa Serêkaniyê dibîne, ew nikare xwe bigire û bi tena serê xwe ji sînor ji Bakur derbasê Rojava dibe û tevlî YPG'ê dibe. Dema şerê El-Nusra tîma wan dikeve pevçûnê bi dijmin re. Di dawiyê de Hevala Bêrîvan xwe xilas kiribû, lê ew ferq dike ku Hevala Şîlan tine ye. Dema ku dipirse, hevalên din dibêjin ku ew birîndar e û ew nikarin wê xilas bikin. Îcar Hevala Bêrîvan dizivire ji bo ku here û Hevala Şîlan xilas bike. Wisa Hevala Bêrîvan û Hevala Şîlan bi hev du re şehîd dikevin."[409]

Meryem Kobanê wek endama fermandariya YPG'ê tevlî şerê Serêkaniyê bû. Ew li ser qonaxa yekemîn a vî şerî dibêje, *"Hinek heval birîndar bûn, hinek jî şehîd ketin. Hinek hevalên jin yên birîndar jî wek esîr ketin destê çeteyan. Lê yên ku di şer de li berî her tiştî înîsiyatîf girtin û li dijmin xistin dîsa hevalên jin bûn. Tişta herî bi zehmetî jî ew bû: Em ê çawa ji malbatan re bêjin ku keçên wan ketin destê dijmin, bê ku me hîn çareseriyek dîtibe? Ev rewşeke pirr giran ji bo me û malbatan bû. Dayikan digot, 'xweska şehîd ketiba, lê ne di destê wan de ba.' Bavê Şehîd Jînda got 'xweska canazeyê keça min niha cem min ba, ez ê kêfxweş bame. Lê bila ne di destê wan çeteyên Ereb de be.' Ev ji bo gel wekî meselaya namûsê bû. Lê me ji wan re soz da ku em ê keçên wan xilas bikin û di dawiyê de me ew vegerandin. Ev pirr girîng bû. Me cenazeyên çeteyên ku di destê me de bûn li hemberî hevalên me yên esîr guhertin. Hevalên jin ku esîr ketibûn jî berxwedaneke pirr xurt nîşan dan. Teslîmiyet qebûl nedikirin."*[410]

Di 17'ê Kanûna 2012'an de şer hatibû sekinandin. Lê hîna çete di beşeke bajêr de hebûn. Wê demê êrîşên çeteyan li dijî gel dewam kirin. Berdevkê meclîsa Serêkaniyê, Avdo Xelîl bi komployekê hat şehîd kirin. Lewma hêzên YPG'ê amadekariya hemleyên nû meşand û şerê li dijî El-Nusra fermî îlan kir. Şerekî giran dewam kir heta di qonaxa sêyemîn a şer de Til Xelef û Menacîr jî di 5'ê Mijdara 2013'an de ji çeteyan hatin rizgarkirin.

"30 roj şûnde, hamleya duyemîn bû. Me dîsa dest bi şer kir. Vê demê me hinek teredût kir û hevalên jin pirranî di eniya paş de hiştin. Lê di hamleya sêyemîn de me hevalên jin danîn ser

[408] Hevpeyvîn bi endamên Weqfa Jinên Azad a Rojava re, Serêkaniyê, 2017

[409] Hevpeyvîn bi Galia Nîmet re, Heseke, 2017

[410] Hevpeyvîn bi Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

cebhan. Bi vî rengî cesaret û bixwebaweriya jinê hîn zêdetir pêş ket. Li ser cebheyê li ser rêya Hesekê Hevala Warşîn hebû. Wê koordîne dikir û her tim pêş ve diçû. Hevala Rojna, Hevala Jiyan, Hevala Zîlan, her yekê li ser cebheyekê sekînî. Vê hişt ku di şewazê şer de guhertinên pirr cuda çêbûn. Ew xwedî li hêzên xwe derketin. Hevala Kurdistan jî bû weke destan. Ew bi BKC'ya di destê xwe de - me jê re gotibû 'Xezal' - diket nav malan de û çete girtibûn. Êdî çete ji ber tirsa jinê ji mala derdiketin û direviyan. Digotin, 'Jinên PKK'ê wek cina ne. Ji nişka ve di bin erdê de derdikevin û BKC li hemberî me didin şuxilandin.' Ew di şokê de diman. Piştî şerê Serêkaniyê baweriyek pirr cuda di jinê de çêbû."[411]

Şervanên jin ku nû tevlî nav refên YPG'ê dibûn, pê hisiyan ku ew jî dikarin şer bikin û axa xwe biparêzin. Xelkê Serêkaniyê û yên derdorê ku piştgirî dabûn berxwedana Serêkaniyê, baweriyeke mezin bi hêza xwe û hêza jinê anîn. Tişta ku wan di vê pêvajoyê de bi çavê xwe dîtî, ferasetên zayendperestiya 5000 salan derizandin, qelişandin. Ji fermandarên YPJ'ê Galia Nîmet rave dike: *"Baweriya gel bi serketinê pirr xurt bû. Wek tê zanîn ku mijara namûsê mijareke pirr bi bandor e di nava civakê de. Lê belê gel êdî wiha bi YPG'ê bawerî tanî ku li ber tevlîbûna keçên xwe nedibûn asteng."*[412]

Dîsa Şikriya li ser encama şerê Serêkaniyê dibêje: *"Berê, dema şerek çêdibû, digotin 'jinan bidin aliyekî, ji ber ku namûs in.' Lê di vê şoreşê de jin pî bi pî bi xortan re şer dikin. Jin wê xwe biparêzin û xortan jî. Ew bi hev re welatê xwe diparêzin û gavên serketî ta niha diavêjin. Ez dîsa dibêjim, hêza herî zêde ya ciwanan û jinê bû."*[413]

Koma Botan di strana xwe a '***Şoreşa Waşokanî***' de wateya dîrokî ya şerê Serêkaniyê bi coş û kelecan dibêje. Dewreş û Edûlêyên hemdemî, careke din serê xwe li hemberî dagirker û neyaran rakirin:

Li paytextê Mîtanî

Avber aşê li ser kanî

Destarê xweş dihêre

Şoreşa li Waşokanî

Hatin parêzvanên gel - bijî bijî YPG, bijî bijî YPG

Ketine cenga giran

Rengê Derweş û siwaran

Dikin şerê Turanan

Herbê li hember mûxlaçiyan

Hatin parêzvanên gel - bijî bijî YPG, bijî bijî YPG

[411]Çavkanî li heman cihî

[412]Hevpeyvîn bi Galia Nîmet re, Heseke, 2017

[413]Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Serêkaniyê re, Serêkaniyê, 2017

Ev dora kezî hûnanê

Li çeperan berxwedanê

Meydan qada şêranê

Li çeqelan ra bi wêrane

Hatin parêzvanên gel - bijî bijî YPG, bijî bijî YPG

Dengvedana daholê li Waşokanî tê holê

Her hêlê û hêlê û hêlê ji Eşrefiyê re hêlê

Her hêlê û hêlê û hêlê ji Gir Hesenê re hêlê

Her hêlê û hêlê û hêlê ji Gir Zîro re hêlê

Her hêlê û hêlê û hêlê ji Rojava re hêlê

Wekî di stranê de tê gotin, hemwext bi şerê Serêkaniyê re di zivistana 2012'an û bihara 2013'an de YPG'ê têkoşîna xwe ji bo rizgarkirina navçeyên Cizîrê ji hêzên rejîma Beesê domand. Di encama vê pêngavê de pergala rêveberiya xweser û xweparastinê li bajar û gundên Til Temir, Rimêlan, Girzîro, Çilaxa û Tirbespiyê jî hatiye avakirin. Li aliyekî jî dewleta Sûriyê mecbûr ma ku hêzên xwe pêre pêre ji pirraniya herêma Cizîrê vekişîne.

Li hemberî vê îcar rejîmê berê xwe da taxên Kurdan li Helebê. Êrîşên li hemberî taxên Eşrefiye û Şex Meqsûdê her diçû girantir dibûn. Di heman demê de çeteyên Ceyş el-Hur wekî El-Nusra û Ehrar El-Şam êrîşên xwe li dijî erdên Rojava – ji Efrînê heta Til Koçerê - berfireh kirin. Li eniyên şer hemûyan jinên Rojava li hemberî hêzên cuda, lê belê li hemberî heman zêhniyetê û hovîtiya baviksalariyê şer kirine.

Di 2'yê Cotmeha 2013'an de fermandara YPJ'ê Jînda Til Temirê di şerê Qestela Cindoyê de berxwedaneke mezin raber kir. Salekê paşê, wê li Kobanê damezrandina YPG'ê û avakirina xweseriya demokratîk ragihandibû, li kantona Efrînê heta guleya xwe ya dawî şer kir û jiyana xwe ji dest da. Wekî Efrîn, Heleb û Serêkaniyê li gelek cihan şerên destpêkê ji aliyê fermandarên jin ve hatin koordînekirin. Li gelek cihan jî fermandarên YPJ'ê û YPG'ê bi şewazekî hevbeş şerên giran meşandine. Bi vî awayî, wek şervan û fermandar bi ked û vîn, fedekarî û keda xwe li seranserê Rojava jinan tecrûbeyên girîng yên şer bi dest xistin.

Her wiha di destpêka sala 2013'an de li **Helebê** him êrîşên çeteyan him jî yên rejîmê li dijî taxên Şex Meqsûd û Eşrefiyê dest pê kirin. Her du hêzan dixwest li wan texan serwer bibin û pergala rêveberiya xwecih bi pêşengiya Kurdan têk bibin. Berpirsyariya giştî ya qada parastinê li Helebê fermandara YPJ'ê Nûjîn bû. Wê di nav civakê de tîmên jin jî dan avakirin ku bi biryardarî tevlî şer dibûn. Di bersivdayîna êrîşên li dijî taxên Kurdan de li Helebê jinên ciwan jî bi risteke girîng rabûn. Civakê bi serbilindî digot: *"Ew keçên, ew zarokên ku bi çîrokên hevalan mezin bûbûn, niha cihê xwe di nava şoreşê de girtin."*[414] Heta hêzên dijmin jî yên ku jin tenê wekî kole diditîn, îtîraf kirine ku ew li hemberî hêza berxwedanê ya jinê şaş mane.

[414] Hevpeyvîn bi Hêvî Mistefa re, hevseroka Meclîsa Gel a Kantona Efrînê, Efrîn, 2017

"Şêniyên Şex Meqsûdê mînaka rêveberiya xweser û xweparastinê ava kiribûn. Çete hatin û wan got, 'hûn vê taxê îşev teslîmî me bikin.' Gel jî red kir û êrîşên çeteyan dest pê kirin. Mela derketin û ji mizgeftê bang li gel kirin. Bi hezaran gel hatin ji bo parastinê. Hinek kes çek, hinek bombe, hinekan jî kêr anîn ji bo taxa xwe biparêzin. Gel mewziyên xwe girtin. Rastiya şerê gelê şoreşgerî qewimî. Di dawiyê de çete ji ber gel reviyan. 20 cenazeyên çeteyan di destê me de bûn. Lê belê 3 hevalên me jî ketin destê wan. Di nav van de fermandara giştî Hevala Nûjîn jî hebû. Lê gelê Kurd li Helebê piştre jî 6 salan heta niha berxwedana xwe bi hêzên YPG û YPJ'ê re bi hev re domand."[415]

Di rizgarbûna herêmên Rojava hemûyan de şervanên jin tevlî şer bûn û pêşengî kirin. Şervanên jin û mêr li keleka hevdu bi ruhê hevaltiyê şer kirin. Di nav tabûrên gîştî de hêza jinê wek tîm yan taximên jinan hatibû birêxistinkirin. Lê belê hîn rêxistinbûna jinê pirr diyar nebû. Ji bo vîn û nasnameya jinê di qada leşkerî ya şoreşê de darîçav û xurttir bibe, birêxistinbûna hêza xweser a jinê û navlêkirin pêwîst hatiye dîtin.

b) Avakirina Tabûrên Jinan

Tevî ku di gelek eniyan de şer qewimî, di bihara 2013'an de li pey hev li hemû herêmên Rojava tabûrên jinan hatin avakirin. Meryem Kobanê li ser pevajoya birêxistinkirina tabûrên jinan li herêma Cizîrê dibêje:

"Piştî ku me hemû bajar ji destê dewletê girtibûn, di van bajaran de me navendên hêzên jinên herêmî vekirin. Li Dirbêsî, Hesekê, Dêrikê û bajarên din. Bi vî rengî jinên ciwan bixwe dihatin serlêdana tevlîbûnê dikirin. Tîm û taximên jin li her cihî zêde dibûn. Hevalên jin ên zewicî, yên nezewicî êdî dihatin û diman. Navendên me wekî mala gel bûn û têkiliyên bi gel re germ bûn. Gel êdî rastiya me nas kir.

Îcar me biryar da ku em hêzên xwe ji nû ve birêxistin bikin. Him wek YPG him wek hêza jinê me dît ku şewazekî nû pêwîst bû. Ji ber ku me êdî alanên fireh û bajar digirtin. Berê me digot, 'bila her kes gundê xwe biparêze'. Lê vê êdî têrê nedikir. Hêzeke profesyonel pêwîst bû. Me wê demê biryar da ku em tabûrên hevalê jin ava bikin. Êdî yên ku tevlî vê xebatê dibûn, her roj nikaribûn biçin malê. Endamên van tabûran encax di mehê de carekê yan her 10-15 rojan carekê karibûn biçin malê. Ji ber ku quwet ji bo parastina axê pêwîst bû."[416]

Narîn Efrîn birêxistinkirina hêzên parastina jinê li herêma Efrînê şopand. Li wir bi xebat û perwerdeyên Akademiya Şehîd Şîlan re bingeheke xurt hatibû avakirin:

"2013'an em gihîştin astake ku pirr beşdarbûna jinan çêbû. Li her herêmê kom bi kom perwerde hatin dayîn û rêveberiyên jinê hatin avakirin. Li ser vê bingehê, me tabûrên jinê ava kirin. Dema me hêza perwerdekirî anî cem hev, hîna cilên wan ê leşkerî tine bûn. Li Efrînê hevalan kumaşek anî bi rengê eskerî û cilê xwe bi xwe dirûtin. Rê wê demê girtî bûn. Dewletê çûn û hatin asteng dikir. Ji ber vê, derfet kêm bûn. Lê wekî hêza leşkerî ya jinê pêwîst bû ku me şekilek jî bidana xwe.

[415] Hevpeyvîn bi Besta re, Qamişlo, 2019

[416] Hevpeyvîn bi Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

Her herêmê kumaşek ji xwe re dît û cilên xwe ji xwe re dirûtin. Tabûra Efrînê bi rengekî bû, ya Kobanê bi rengekî bû, ya Qamişlo û Dirbêsiyê her yekê bi rengekî bû.

*Îlana **tabûra yekemîn a jinan di 23'ê Sibata 2013'an de li Efrînê bi navê Tabura Şehîd Rûken** dengvedaneke mezin çêkir. Hevala Rûken hevala yekemîn e ku di salên 1980'yî de ji herêma Efrînê tevlî gerîla bûbû û li çiya şehîd ketiye. Bi vî rengî me xwest dîrok û mîrasa jinên Rojava bidin xuyakirin. Vê bandoreke mezin li ser civakê û jinên ciwan çêkir. Hinek rojnamevanan jî dixwestin reportaj çêbikin. Lê hinek hevalên xort jî henekê xwe bi me dikirin: 'Bi wan keçên nazik hûn ê çi bikin?' Wan hêza me tenê wekî hêzeke manewî didît."*

Piştî vê **tabûra duyem di 25'ê Sibata 2013'an de bi navê Tabura Şehîd Berçem li Dirbêsiyê** hat îlankirin: *"Tabûra Şehîd Berçem li îyaleta Dirbêsiyê bi beşdarbûna 250 hevalên jin ji navçeyên Til Temir, Amûdê, Hesekê, Dirbêsiyê û Serêkaniyê hatiye avakirin. Bandora şerê Serêkaniyê li ser avakirina vê tabûrê hebû. Xwesteka tevlîbûnê pirr bû. Tenê li Amûdê 100 hevalên jin yên herêmî hebûn ku derketin û parastina cihê xwe dikirin. Cihê tabûrên jinan, me dûrê nuqteyên hevalên xort çêkir ji bo em bikarin di hevalên jin de bixwebawerî û hakîmiyetê di karê leşkertî de pêş bixin."*[417]

Îlana **tabûra sêyemîn a jinan di 5'ê Adarê 2013'an de li bajarê Dêrikê bi navê Tabura Şehîd Sozdar** çêbû: *"Hevalên Dêrikê nîqaş kirine kîjan heval ji herêma wan di destpêke de tevlîbû û bandoreke mezin li ser civakê çêkir. Wisa wan bi xwe navê tabura xwe lêkir. Me nikaribû kumaja bi rengê leşkerî li wir bidîtiba. Lewma hemûyan cilên reş li xwe kirin."*[418]

Di roja jinên cîhanê de tabûra çaremîn bi navê Tabûra Şehîd Adalet li bajarê Qamişlo hatiye avakirin: *"Li Qamişlo îlana tabûra jinan di 8'ê Adara 2013'an de bi hejmareke mezin çêbû. Ev wekî diyariyekê ji bo hemû jinên cîhanê bû. Em bi nêzikî 30 seyarên tijî hevalên jin bi çek û rextên xwe çûn û tevlî meşa 8'ê Adarê bûn. Meşa jinan sekinî û li me temaşe kir. Vê bandoreke pirr mezin çêkir û piştre bi sedan jin hatin serlêdana tevlîbûnê kirin."*[419]

Ji ber serweriya taybetmendiyên civakî yên feodal û pergala baviksalarî li herêma Kobanê di destpêkê de tevlîbûna jinan a xebatên leşkerî gelekî zehmet bû. Lê bi vekirina şaxê Akademiya Şehîd Şîlan û birêxistinkirina xebatên leşkerî yên xweserî jinê li herêma Kobanê jî beşdarbûna jinan bi pêş ketiye. Li ser vî bingehî **tabûra pêncemîn a jinan jî di 23'ê Adara 2013'an de bi navê Tabûra Şehîd Dîcle** hatiye îlankirin. Bi vî rengî 5 tabûrên jinan wekî bingehê arteşa jinê li Rojava hatin avakirin.

"Hezkirina vê xebatê pêş ket. Dema ku hevalên jin bi cilên leşkerî, bi çek û rextên xwe diçûn nav civakê, nêrîna civakê jî dihat guhertin. Wan ne wekî berê li jinê meyzand. Heybeta jinê bi rengekî nû derketibû holê. Vê jî dihişt ku jin êdî ne wekî cins tenê bên ditîn, lê wekî hebûneke xweser û pîroz. Piştî avakirina tabûran, me biryar da ku em konferansa yekemîn a hêzên parastinê yên jinê çêbikin."[420]

[417]Çavkanî li heman cihî

[418]Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

[419]Çavkanî li heman cihî

[420]Hevpeyvîn bi Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

c) Damezrandina Yekîneyên Parastina Jinê YPJ

Konferansa damezrandina Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ) di 1 heta 4'ê Nîsana 2013'an de li Dêrikê bi tevlîbûna 336 delegeyan, şervan û fermandarên jin ji navçeyên Cizîr, Efrîn, Kobanê û Helebê hatiye lidarxistin.

"Piştî avakirina tabûrên jinan pêwîst bû ku şeklê wan ê rêxistinî bidin xuyakirin û hêza wan bixin yek. Ev bingehê avakirina YPJ'ê bû û bi vî rengî em çûne konferansa yekemîn a hêzên jinê ku bi beşdarbûna hevalên ji hemû taburên jinan, bi nûnerên hemû herêman pêk hat. Belkî di dîroka Rojava de keleceneke wisa hîna nehatibû dîtin."[421]

Di konferansê de him derheqê nav, al û şewazê birêxistinkirina yekîneyên jinê de biryar hatin dayîn, him jî tecrûbeyên şer û birêxistinkirina hêzên jinan ên leşkerî hatin nirxandin. Li gorî vê, rêziknameya YPJ'ê hatiye amadekirin. Rêxistinbûna YPJ'ê li ser bingehê sê şiklan yanî wek yekîneyên berxwedanê, yekîneyên profesyonel û yekîneyên herêmî hatiye diyarkirin. Biryar hatiye dayîn ku Akademiya Şehîd Şîlan ku berê li Efrinê hatibû avakirin, bibe akademiya navendî ji bo perwerdeyên fermandariya jinê û li herêman hemûyan şaxên akademiyê werin avakirin.

Delegeyên konferansê nixandin ku di 2 salên piştî destpêka şoreşê de geşedaneke girîng di beşdarbûn û zanebûna jinê ya têkoşîna leşkerî de çêbûye. Lê belê nihêrîna hevbeş ew bû ku ev ast ne bes e. Nîqaşên taybet çêbûn ji bo têgihîn û birêxistinbûna hevbeş a parastina jinê di nav beşên civakê hemûyan de were bipêşxistin û yekîtiya gelên Rojava li hemberî êrîşên zayendperest, olperest û nijadperest were misogerkirin.

"Me got, pêwîst e em xwe bigihînin hemû kesîmên civakê. Weke hêzên leşkerî me girîng dît ku em xwe bighînin hemû netewên ku di Sûriyê de dijîn, wekî jinên Ereb, Aşûrî, Suryanî û Ermen. Me xwest felsefeya xweparastinê bi wan bidin fêhmkirin û feraseta 'jin jî dikare xwe û xaka xwe biparêze' belav bikin."[422]

Konferansa YPJ'ê bi biryarên xurt û hilbijartina meclîsa fermandariya YPJ'ê serketî bi encam bû. Di 4'ê Nîsana 2013'an de damezrandina YPJ'ê fermî hat ragihandin: *"4ê Nîsanê me wek roja îlanê hilbijart ji ber ku jinên Rojava xwe bi keda Rêbertiyê nas kirin û hêza xwe ya têkoşînê derxistin holê. Wekî bersiva keda Rêbertî û biryardariya têkoşînê ji bo azadiya Rêber Apo, me ev roj hilbijart. Piştî konferansê me ala xwe li ser hemû navendên xwe yên bajaran vexist û rengê xwe nîşan da."*[423]

Encam û biryarên konferansê bi hemû şervanên YPJ û YPG'ê re hatine parvekirin. Her wiha serfermandariya YPJ'ê hatiye avakirin ku ji penc kesan pêk hatibû. Her yek ji herêmekê berpirsyar bû. Şiklê birêxistinbûna xweser hatiye rûniştandin û xebitandin. Ji bo koordînekirina kar û têkoşîna hevbeş, civînên hevbeş bi serfermandariya YPG'ê re çêdibûn. Fermandarên jin êdî bi nasnameya xwe wekî nûnerên YPJ'ê tevlî pêngav û xebatên gîştî dibûn. Ev bipêşketin hemû di encama

[421]Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

[422]Hevpeyvîn bi Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

[423]Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

têkoşîna jinê de hatin bidestxistin û wan hêz dida jinên di qada leşkerî û civakî de. Endama fermandariya YPJ'ê Narîn Efrîn balê dikişîne ser wê yekê ku piştî konferansê jî hê pêwîst bû ku jin ji bo naskirina vîna xwe têbikoşin:

"Li ser navê hêzên me gelek nîqaş çêbûn. Navê Yekîneyên Parastina Jinê - YPJ, hemû hevalên li Konferansê qebûl kirin. Bandora hevalên xort li ser konferansa me nebû. Lê piştî konferansê hinek hevalên xort li hemberî vî navî nêrînên xwe gotin, wekî 'We çima navê xwe wiha kiriye? Hûn ê tenê jinan biparêzin?' Gelek nîqaş derketin. Lê belê em hemû bi xwe bawer bûn. Me hevalên xort rexnê kirin ku pirr teng û bi nêrîna zayendperest difikirin. Me wekî jin ev nav hilbijart ji ber ku dema em jinê diparêzin, em mirovahiyê diparêzin, em xwezayê diparêzin, em jiyanê diparêzin! Di avakirina YPJ'ê de, di encama Şoreşa Rojava de me dît ku em ne alîkar in. Em wekî jinên Rojava bi xwe jî hêzeke rêxistinî ne.

Hevalê me yên ciwan ên YPJ'ê, pirr zêde ne di ferqê vê nakokiya cinsî de bûn. Mesela ji malbatekê kurên wan di YPG'ê de û keçên wan di YPJ'ê de ne. Me di heman mewziyan de li dijî êrîşan şer dikir. Hevalên YPG'ê ji hêza YPJ'ê re wekî 'xwuşka wî' ye, 'keçmama wî' ye yan jî wekî 'alîkarê wî' nêzik dibûn. Pêşî hevalên xort YPJ wekî hêza şer nedidît, wekî hêza ku alîkar dibe didîtin. Em li dijî vê derketin û me xwest ku hêz û vîna me ya serbixwe xuya bibe. Bi perwerdeyên xwe me xwest zanebûna jinê di vî aliyî de kûrtir bikin. Ji ber ku jineke ku xwe ji zêhniyeta desthilatdariya zilam qut neke, nikare bibe rêxistinek û vîna xwe derxe holê. Me xwest ku jin fêr bibe bi xwe bifikire, bi xwe biryara xwe bide û bi xwe bawer be. Dîsa me xwest hezkirin û rêhevaltiyê di nav hevalên jin de pêş bixin ji bo em bikarin xwe wekî hêzeke pêşeng avabikin.

Dema ku me tabûrên xwe û pergala xwe ya xweser bi rêxistin kir, me pêwîst didît ku çekên me yên giran jî hebin. Dîsa di civaka Rojava de jinên ku zanîbûn seyaran bajon, pirr hindik bûn. Lewma di çend taburên jin de ewilî hevalên xort ajokarên me bûn. Ev ji bo me nakokiyek bû. Me biryar girt ku hevalên YPJ'ê jî fêrî ajotinê bibin û bibin ajokar. Li ser vê mijarê nîqaş û nakokiyên bi hevalên xort re derketin. Lê me israr kir. Dema ku dîtin hevalên jin çawa dajon, êdî bêdeng man. Me dewreyên ajotinê li Efrînê, Kobanê û Cizîrê vekirin. Hedî hedî hemû ajokarên tabûrên YPJ'ê dibûn hevalên jin.

Vê di civakê bi giştî de jî bandorek çêkir: Jin seyaran dajon, çekan radikin, xwe bi xwe rêxistin dikin û tevdigerin. Gelek kesan hûrmet nişan da. Lê hinek kesan jî propagandaya reş dikir. Carekê li televizyonekê, yeke ji partiyeke li dijî me digot, 'Ew wan keçikan dirêvînin û dibin'. Qaşo em endamên xwe bi zorê ji malbatên wan dirêvînin. Lê rêgeza bingehîn a xebatê me tevlîbûna her kesê bi dilxwaziya xwe ye. Jixwe, navendên YPJ'ê di keleka mala malbatê ya wan jinên ciwan de bûn. Derdora navendên me vekirî ye. Kî bixwaze were, tê, kî dixwaze here, diçe. Ev propagandayên vala bûn. Lê hinek malbat hatin, dixwestin keçên xwe bibin. Lê keçan ji dayik û bavê xwe re digot: 'Ez nayêm. Kesek ez bi zorê neanîme. Kes jî nikare min bi zorê bibe. Ez parêzvana welatê xwe me. Ez parêzvana jina me!'

Me perwerdeyên ziman, çand û dîroka Kurdî û yên siyasî û leşkerî didan. Di kesayet û nêzîkatiyên hevalên ku tevlî YPJ'ê bûyîn de guhertinên mezin çêbûn. Pîvan û uslûba wan, rêzgirtina wan li hemberî civakê bal dikişand. Bi vî rengî me hêdî hêdî baweriya civakê qezenç kir. Nêrînek wiha

pêş ket: 'Cihê herî bi ewle ji bo keça min di YPJ'ê de ye'. Êdî hinek bav an dayik dihatin bi xwe keça xwe dianîn û digotin: Heval, keça min perwerde bikin!"[424]

Ji nû ve birêxistinkirin û perwerdekirina hêzên YPJ'ê li herêmên Rojava di bin şertên şer de hat meşandin. Çeteyên El-Nusra di Gulana 2013'an de careke din êrîşê gundwarên Efrînê kir. Dema ku delegeyên konferansa YPJ'ê yên Efrînê hîn nû gihiştin cihê xwe, ew rasterast ketin nav şer. Di vî şerî de ku sê rojan dewam kir, şehîdên ewilî ên YPJ çêbûn: Bêrîvan (Xemlîn Nûcan) ku wekî delegeya Efrînê tevlî konferansa yekemîn a YPG'ê bûbû û Silava (Meryem Mihemed) ku di konferansa yekemîn a YPJ'ê de wekî endama meclîsa YPJ'ê hatibû hilbijartin.

"Di şerê duyem de ku li Efrînê çêbû, hevalên YPJ'ê cihê xwe girtin. Hevala Silava û Hevala Bêrîvan jî di vî şerî de hebûn. Hevala Silava di cebheyê aliyê Şerawa de bi tîmekê li ser tepê bû. Hevala Bêrîvan di grûba êrîşê de bû. Dema êrîş çêbû, Hevala Bêrîvan dikeve pevçûnê û şehîd dikeve. Lê agahiya me wê demê tine bû. Çeteyan digot, ew sax ketiye destê wan. Lewma me nikaribû Hevala Bêrîvan îlan bikirana. Rojekê şûnde di 29'ê Gulana 2013'an de Hevala Silava şehîd ket. Agahiya şehadeta Hevala Bêrîvan şûnde hat. Em herdu hevalan jî wekî şehîdên yekemîn yên YPJ'ê dihesîbînin. Coş û girêdana wan hevalan bi rastî pirr xurt bû. Hevala Silava jî di konferansa YPJ'ê bi mîkrofonê li pêşiya hemû hevalan axifîbû. Wê, wê demê dîrok û erdnîgariya Efrînê û YPJ'a Efrînê ji hevalan re danasîn, îdîa û heyecana xwe parve kir."[425]

d) Pêngavên Rizgarkirina Herêma Cizîrê

Di heman pêvajoyê de şer û pevçûnên li herêma Cizîrê jî dewam kir. Li aliyekî êrîş û provokasyonên hêzên dewleta Sûriyê li bajarên Hesekê û Qamişlo çêbûn. Li aliyê din jî qonaxa sêyemîn a şerê Serêkaniyê û êrîşên Cebhet El-Nusra li dijî Til Temirê qewimîn. Li hemberî vê hêzên YPJ û YPG'ê dest bi pêngava rizgarkirina navçeyên Cizîrê hemûyan kir. Di salên 2013 – 2015'an de şerên li hemberî êrîşên El-Nusra û DAIŞ'ê heta dawiya hemleya *Şehîd Rûbar Qamişlo* di 10'ê Tîrmeha 2015'an de bi gelek berdêlên giran dewam kir. Fermandarê YPG'ê Rûbar Qamişlo (Nûrşîn Faris Iniz) wek şoreşgerek di bipêşxistina Şoreşa Rojava û koordînekirina pêngavên rizgarkirina navçeyên herêma Cizîrê de bi ristekî pêşeng rabû. Di 14'ê Gulana 2015'an de ew di operasyona dawî ya rizgarkirina Çiyayê Kizwanan de şehîd bû.

Ji Fermandarên YPJ'ê Galia Nîmet bûyerên di qonaxa destpêkê ya pêngavê de qewimî, wiha dinirxîne: *"Şerê El-Nusra li Rojava belav bû. Piştî êrîşên li ser Efrîn û Serêkaniyê, di 16'ê Tirmeha 2013'an em û El-Nusra li aliyê Dêrikê li gundikî nêzî Siwêdikê ketin nav şer de. Bi şer re rabûneke civakî çêbû. Êdî her kes bi xwezayî ket nav de û bi rêxistin bû. Nan û ava şervanan, tedawiya birîndaran her tişt, civak xwedî lê derket. Di nav şer de meclîsên gel û têkiliyên bi eşîrên Ereb re dihatin avakirin. Ev gavên pirr girîng bûn.*

Piştre, şerê El-Nusra derbasê aliyê Çilaxa û Tirbespiyê bû. Li vir çeteyan xwe di nav şêniyên Ereb de bi rêxistin kiribû û ji bo feydegirtina ji petrolê soz dabûn. Roja eydê bi carekê wan êrîşî 8 nuqtayên me kir. Belgeyên civînên dijmin, ên beriya ku êrîşî me bikin, diketin destê me de. Yek ji wana dibêje, 'em ê jinên YPJ'ê çawa parve bikin?' Li ser vê emîrê wana dibêje, 'behsa keçên wana neke. Ew ne wek keçikan in. Ji zilaman zêdetir şer dikin.' Lewra dema ku hevalekê jin dîl hat girtin

[424] Çavkanî li heman cihî

[425] Çavkanî li heman cihî

ji aliyê fizîkî zêdetir di aliyê ruhî û nefsî de êşkence li hevalên jin dikirin. Di aliyê fikrî de bi mentiqê namûs tehdît kirin. Piştre, dixwestin wê bê hêvî bikin. Wan bi her awayî şerê pisîkolojîk dimeşand da ku ew heval ji xwe re bixistana sîxur."[426]

Lê helwest û berxwedana şervanên YPJ'ê ew hewldan pûç kirin. Ruhê berxwedanê û tevlîbûna jin û xortên ciwan ji refên hêzên parastinê re her zêdetir dibû. Êdî jinên ciwan ji gelek malbatên ku berê ji doza siyasî dûr sekinîbûn û her wiha ji pêkhateyên Rojava hemûyan, YPJ ji bo xwe wekî deriyê ber bi jiyaneke azad û bi rûmet ve didîtin. Ev helwest bi berxwedana li hemberî êrîşên hovanê yên DAIŞ'ê gihîşt asta xwe ya herî jor. Çete niha bi navekî nû û taktîkên nû gef li jiyana jinê, li gelên Rojava û li tevahî mirovahiyê dixwarin. Jinan êşên herî giran di vî şerî de dîtin: bi êşkence û kuştinê re rûbirû man, şehadetên zarok an hevjînên xwe bihîstin, koçber bûn. Gelek jinên Cizîrê dibêjin, di bin wan şertan de vîna wan, girêdana wan bi axa xwe û nirxên şoreşê ve hîn qayimtir dibû. Bi şehadetan û serketinên YPG û YPJ'ê li dijî çeteyên El-Nusra û DAIŞ'ê rabûna gel û tevlîbûna jinan a nav refên têkoşîna azadiyê, gîhiştiye asteke nû. Birexistinbûna xwezayî ya civakê berfireh dibû.

Dayika Sûriya, yek ji wan dayikan e ku di berxwedana gelê Rojava de bi dil û keda xwe cihê xwe girtiye. Ew bi eslê xwe Mihelmî ye û li Libnanê mezin bûye. Piştre ew hatiye Rojava û di 19 saliya xwe de bi Kurdekî ji gundê Til Marûfê nêzîkî Qamişloyê re zewiciye. Ji ber ku hevjînê wê zû wefat kir, wê şeş zarokên xwe bi tenê mezin kirin. Kurekî wê di têkoşîna azadiyê de şehîd ketiye. Dayika Sûriya, bi hestyarî qala wê rojê dike ku ew tev keç û nêviyên xwe ji ber êrîşên DAIŞ'ê ji gundê xwe derketine: *"Me ji gundê xwe gelekî hez dikir. Min rojekê nedixwest ez ji gund derkevim. Şeva ku em derketin, gelek bi êş bû. Ez hevseroka meclîsa gund bûm. Çi karê ji min dihat xwestin, min dikir. Vê dema cara yekemîn heval perwerdeya çek da me jinan. Çek jî da me ji bo em bikarin parastina hara [taxa] xwe bikin. Şerê li Til Birak jî hebû. Lewma hêza YPG'ê di Til Marûfê de nemabû. Beriya ku DAIŞ digihine gund, hevalekî ji me re agahî anî û em saet duyê şevê derketin. Di gund de 700 mal hebûn, lê di şer de 20 mal tenê mane. Milet tirsiya û reviya. Me nedixwest em derkevin. Me digot, em ê li gel hevalan bin. Lê wan ji ber zarokên me, nehêla. Em wê şevê bi meşê çûn. Seyare nebûn heta em nû gihîştin Qamişloyê.*

Şeva ku em ji gund derketin, min sîleha xwe bi xwe re anî. Ew sîleh bi gelek zehmetî û xwîna şehîda gihandin me. Di vê şoreşê de me gelek şehîd dan. Lawê min her dihat li ber çavê min. Dema ku ew çû, min jê re got, 'Biçe. Xwedê bi te re be.' Me dît jinên Şengalê çawa hatin firotin. Em gelek pê êşiyan. Lê bi rastî, dema ku em niha wan dayikan dibînin, çawa li ser piya kar dikin û sîlehê radikin li ser milê xwe ji bo parastina civaka xwe, em bi wê gelekî kêfxweş dibin. Ruxmî ku gelek êş di jiyanê de dîtin, wisa bi hêzeke xurt û îrade jiyana xwe diparêzin."[427]

- **Fermana Şengalê û Berxwedana Dayikan**

Fermana 73'yan a li hemberî gelê Ezdî li Şengalê, bandoreke mezin li ser jinên Rojava çêkir. Bi hezaran mirov – zarok, jin, zilam, kal û pîr – diketin ber êşkenceya hovanê û dihatin kuştin. Armanca van êrîşên DAIŞ'ê tinekirina çanda komînal û nirxên exlaqî bû ku wekî bermayiyên çanda dayikê ya serdema neolîtîk li Şengalê û di çanda gelên herêmê de hîna zindî ne. Di kesayeta

[426] Hevpeyvîn bi Galia Nîmet re, Heseke, 2017

[427] Hevpeyvîn bi Dayika Sûriyê re, Tirbespî, 2017

jinên Şengalê de DAIŞ'ê dixwest hêza civakî, vîn û berxwedana jinê bişikîne. Lewma wan derdora 5 hezar jinên Ezdî revandin û li bazaran wekî kole firotin.

Jinên YPJ'ê ew êrîş wekî êrîşeke li hemberî xwe û jinan hemûyan hesîband. YPJ'ê xwe berpirsyar didît ku tola jinên Ezdî rake û jinên dîlgirtî rizgar bike. Bi vê biryardariyê hêzên YPJ'ê ji herêma Cizîrê bi destpêka êrîşên qirkirinê di 3'ê Tebaxa 2014'an de berê xwe dan Çiyayên Şengalê. Hêzên YPJ û YPG'ê tevî yên gerîla YJA Star û HPG'ê, bi şerekî lehengane û canfeda korîdorek ji bo gelê Şengalê ber bi axa Rojava ve vekirin. Bi vî awayî bi deh hezaran mirov ji komkujiyê hatin xilaskirin. Gelê Rojava, wekî seferberiyê bi derfetên xwe hemûyan tevlî vê hemleyê dibû û xwedî li koçberên Şengalê derket. Gelek jin ji beşên civakê hemûyan wekî hêzên parastinê, xebatkarên tenduristiyê û hêza civakî ya tevgera jinê tevlî vê seferberiyê dibûn. Li hemberî vê qirkirinê gelek jinan ji nû ve pêdiviya xweparastina jinê watedar dît. Hejmareke mezin tevlî nav refên hezên YPJ'ê yan jî Asayîşê dibû. Dîsa gelek jinên ciwan heta dayikên navsere biryar dan ku fêrî bi kar anîna çekan bibin û tevlî nav refên Hêzên Parastina Civakî yên Jinê[428] bibin ji bo bikarin xwe û taxa xwe biparêzin. Bi heman rengî, jinên Êzdî jî di nav hêzên parastinê de cihê xwe girtine û bingehê avakirina Yekîneyên Jinên Şengalê YJŞ'ê danîne.

Yadê Fatim bi temenê xwe yê 42 salî dapîr e û endama Hêzên Parastina Civakê ya Jinê ye li Dêrikê. Ew li ser sedema biryara xwe ya tevlîbûna nav refên HPC Jinê dibêje, "*Dema DAIŞ'ê êrîş kir, dilê min êşiya ku ez tevlî şer bibim. Tirs bi min re çênebû. Min xwe xist di nav vê hêza parastinê de ji bo wek jinê Şengalê li me newê. Gelek sazî hebûn ku min karibû tê de kar bikirana, bes min got, 'Bila ez fêrî sîlehê bibim. Sibe dijmin were, ez civaka xwe biparêzim. Heger ew dijmin xwe nêzî mala min bike, bila ez bikarim parastina xwe bikim, ya zarok û mal û taxa xwe jî'."*[429]

Hevrêya Yadê Fatim, Besê dibêje: *"Em gelekî êşiyan dema êrîşî Şengalê kirin. Ew jin û keç revandin, di bazaran de firotin, komkûjî çêkirin. Em gelekî pê aciz bûn. Em bi rojî bûn jî em çûn Kampa Newrozê. Ji me re behsa wan jinan kirin ku hatîn şewitandin li Mûsilê. Jinên Ezidî bi hatina me hêz girtin û gotin: 'Me zanî ku hinek li pişta me ne ku dilê wan li ser me êşaye.' Dema hemlê dest pê dikir hevalên me yên jin tevlî dibûn. Min astengî dikişand ji bo malê. Zarokên min piçûk bûn û hevjînê min jî diçû hemlê. Ji bo vê, min nedikarî tevlî bibim. Hevalên min yên jin diçûn cebhê û ez dimam. Ji min re gelekî zehmet bû. Her roj ez sê caran dihatim navenda HPC'ê. Min nobet digirt. Çi kar dihat ser milê min, min pêk dianî."*[430]

Bi tevlîbûna hemleyan re bixwebaweriya endamên HPC Jinê jî bi pêş diket. Berpirsyara HPC Jinê ya Dêrikê, Şêrîn tevlî hemleyên rizgarkirina Şengal, Holê û Şedadê bûbû. Ew dayika kurekî çar salî ye, helwest û erka xwe bi serbilindî tîne ziman: *"Her tim ez xwedî cesaret bûm. Min serî ji ti kesî re netewandiye. Ez natirsim jî û ez xwe nadim alîkî. Em diçûn hemlê. Me mewzî digirtin, hevalên YPJ û YPG'ê pêşde diçûn. Nuqtê pişt wan, me digirtin. Me şerê xwe jî dikir, li me şer nekir. Hevalên YPJ'ê digot ku 'Bila dayik tevlî şer nebin. Bila nuqta bigirin.' Bi zora xwe, me xwe tevlî şer jî dikir ji bo em bibînin çawa heval şer dikin û pêş dikevin. Dema ku civîna amadekariya hemleya Şedadê çêbû, pirranî hevalên jin destê xwe hildan û gotin, 'em dixwazin tevlî hemlê bibin.' Ji sed kesî bîst hevalê jin û heft hevalê zilam destê xwe hildan ji bo tevlî bibin."*

[428] Hêzên Parastina Civakê yên Jinê (*HPC Jin*) ango *Parastina Jinê* wekî beşeke Tevgera Jin a Kongra Star û di nav HPC de hatiye bi rêxistin kirin. Jinên *HPC Jin* bi dilxwazî xwe li hemû herêmên Rojava ji bo parastina gund û taxên xwe bi rêxistin dikin.

[429] Hevpeyvîn bi endamên HPC Jinê re, Dêrik, 2017

[430] Çavkanî li heman cihî

Li ser pirsa *'dayikan çawa ev hêz di xwe de dîtiye ku tevlî hemleyan bibin'*, Yadê Fatim dibêje: *"Bi rastî YPJ'ê cesareta herî mezin da dayikan. Jinên Asayişê jî wisa. Em ji wan ne çêtir in. Çiqas cesaret bi jinê me yê ciwan yê YPJ'ê re heye, bi me re jî heye. Xwesteka te hebe, çi kar be bila bibe, tu dikarî bikî. Jina ku dibêje 'ez nikarim bikim' ne rast e. Em dikarin her tiştî bikin. Heger êrîşek bê û ez nikaribim parastina mala xwe û zarokên xwe bikim, ez ji çi re me? Mirin carek e, bila mirineke bi şeref bê. Ez li ser vê axê bimirim çêtir e ji dijmin were min biperçiqîne, birevîne û di sûkan de bifiroşe."*[431]

Tevî jinên ciwan, dayik jî di vê pêvajoyê de tevlî nav refên YPJ'ê dibûn. Di nav wan dayikan de mînakên wekî dayika Evîn ji Hesekê derketin ku heta fîşeka xwe ya dawiyê şer kirine. Endama fermandariya YPJ'ê Şîlan Qamişlo dide xuya kirin: "*Di gundê Aşra şer pirr giran bû. Nêzîkî tabureke hevalan diketin nav şer de. Li her cihî mayîn hebûn. Piştre dijmin wan hevalan bi rengekî veşartî xist dorpêçê. Pêvçûneke pirr giran çêbû, heta heval karibûn xwe ji vê dorpêçê derxin. Li wir hevaleke YPJ'ê bi navê Evîn ji Hesekê hebû. Ew dayika 3 zarokan bû. Dema ku heval xwe paş ve kişandin, ew qut bû. Hevalan bawer kir ku ew şehîd ketibû. Lê piştre dîtin ku kesekê bi tenê di nav eraziyê de hîna li hemberî DAIŞ'ê şer dikir û agir bi eraziyê ketibû. Derdora wê hatibû girtin. Hevala Evîn heta fîşeka xwe ya dawiyê şer kir û di dawiyê de xwe bi bombaya xwe teqand. Ew dayikek bû. Zêde perwerde jî nedîtibû. Lê baweriya wê bi azadiyê, bi baweriya ku bi şerê parastinê wê bigihine azadiyê pirr xurt bû. Mînakên wiha pirr in."*[432]

Hêzên YPJ-YPG'ê biryar dane ku ew ê her parçeyê axê yê ku çeteyan dagirker kiribû ji nû ve rizgar bikin. Bi vê armancê pêngava rizgarkirina herêmên Cizîrê li navçeyên Til Hemîs, Til Birak, Rebîa, Hesekê, Til Temir û Çiyayên Kizwanan heta dawiya pêngava Şehîd Rûbar Qamişlo dewam kiriye.

- **Parêzvanên Herêma Xabûrê**

Piştî komkujiya li hemberî Êzdiyên Şengalê, ji armancên DAIŞ'ê bû ku bi taybetî gelên qedîm yên Xirîstiyan qir bike. Bi vê armancê çeteyan di bihara 2015'an de êrîşê gundên Aşûriyan û bajarê Til Temirê li herêma Xabûrê kir. Endama fermandariya YPJ'ê Şîlan Qamişlo li ser vî şerî dibêje, *"Nêzîkî du mehan hêzên YPJ û YPG'ê li Til Temir şerekî pirr dijwar meşandin heta şikinandina DAIŞ'ê di xeta Xabûrê de dest pê kir. Him li Kobanê şer dijwar bû, him jî di vê xetê de. DAIŞ'ê hemû hêzên xwe teqwîye kirin ji bo em neçin Çiyayê Kizwana. Bi vî awayî wan xwest Hesekê ji Cizîrê qut bikin."*[433]

Dayik û jinên ji hemû neteweyan di eniya çemê Xabûrê de jî tevlî berxwedanê bûn. Jinên Kurd, Aşûrî û Ereb ji bo parastina tax û gundên xwe çek rakirin, ji bo şervanên YPJ, YPG, Asayîş û Parêzvanên Xabûrê xwarin çêkirin, xwedî li birîndar û şehîdan derketin. Jinên Til Temirê dibêjin, piştî revandina 300 jin û zarokên Aşûrî tirs û koçberî di nav civakê de belav bû. Lê dîsa jî gelek jin ji bo parastina bajarê xwe mane. Fatma Salih dayikeke Kurd e ku bajarê xwe neterikandiye: *"Her kesî xwest jinên xwe ji vir derxe ji bo ku nekevin destê DAIŞ'ê û weke jinên Aşûrî û Êzidî li bazaran werin firotin. Ev tirs hebû. Lê belê dema ku em bi xwe bi şer re rû bi rû hatin, em neditirsiyan. Me pêwîstiya xweparastinê didît û me perwerde li ser çek û parastinê bir. Wekî jinên*

[431] Çavkanî li heman cihî

[432] Hevpeyvîn bi endama fermandariya YPJê Şîlan Qamişlo re, Dirbêsî, 2017

[433] Çavkanî li heman cihî

Til Temirê me tevahî tiştê ku hatin li ser milê me, me kir. Li her taxekê komeke me ya jinan hebû ku wir parast. Me her cih parast ku me zanibû DAIŞ tê re were. Jinên leşkerî û yên ne leşkerî jî, me hemûyan wê demê çek rakir û giştan xwe parast."[434]

Ator Ishaq rewşa gelê Aşûrî û xetera qirkirinê ya wê demê dinirxîne: "*Piştî ku ew ewrê reş hat ser Xabûr û tevahiya welat... Koçberî çêbû, gund hatin şewitandin, kenîse hatin rûxandin. Dema ku dêr hatin rûxandin, 300 kes – jin, zarok û zilam - bi destê DAIŞ'ê hatin revandin. Gel bê dilê xwe, bi darê zorê hat koçberkirin. Lê belê yên ku mane, mane ji ber ku wê tekoşîn bikin ji bo ku bidomîne û bimîne li ser vî erdî. Ne hêsan bû li ser vî gelî. Em û gelek jin, keç û mêrên Aşûrî man û me li ber xwe da. Lê me xwe amade nekiribû ji bo em bikarin artêşekê ava bikin an jî em bikarin xwe biparêzin. Çekê me tinebûn ku em pê parastina xwe bikin. Me bawer nedikir ku wê êrîşek ewqas hovane bi ser me de were. Bi rastî rojeke reş bû li ser tevahiya pêkhateyan. Ne tenê li ser gelê Aşûrî. Em miletê Xabûrê; Ereb, Kurd, Aşûrî, Çeçen, Çerkes û Êzdî bi tevahî pêkhate, em li vê navçê diman. Di herêma Cizîrê de em bira û xwuşk bûn di jiyana xwe de. Roja ku miletê Aşûrî êşiya, ew êş bûbû ya tevahiya gelên li vir."*[435]

Madlên Xemîs jî wekî dayikeke Aşûrî biryar dabû ku ji bo parastina warê xwe bimîne û beşdarî hêzên leşkerî yên Aşûrî *Heres El Xabûr El Aşûrî* bibe. Ew dibêje, "*Destpêkê dema ku Parêzvanên Xabûrê hatin damezrandin, ez jî weke tevahiya milet bermalî bûm. Ez ne karker bûm û ne jî tiştek bûm. Min ti astengî nedidît. Ez bi kesî re têkildar nedibûm, ne ji aliyê siyasî û ne jî leşkerî. Em gelekî aram in. Ez dibêjim, weke Aşûrî em nikarin çekan rakin, bikujin, şer bikin û ne tekoşînê bikin. Em ditirsin û hinek dikevin, dema ku em dilopa xwînê dibînin. Ji ber vê, dema ku krîzê li Sûriyê dest pê kir pirraniya milet biryar da ku koçber bibin. Hinek kesan jî digot: 'Em jî xwedî erd in, xwedî şaristanî ne. Weke Aşûrî em tên naskirin.' Yanî em hizirîn ku li vir bimînin, li ber xwe bidin û tekoşînê bikin. Nabe ku her kes dev ji her tiştî berde û here. Roja damezrandina Hêza Parastvanên Xabûrê hat. Ez yek ji wan bûm ku di destpêkê de tevlî Hêzên Parastina Xabûrê bûn. Gelek jinên Aşûrî tê de cih nedigirtin. Em pênc bûn û me pêşniyar kiriye ku em perwerdeya rakirina çekan bibînin ji bo ku em bêhtir fêhm bikin."*[436]

Madlên hevrêyên xwe bi bîr tîne, ew jinên Aşûrî ku bi wê re di vê berwedanê de cih girtin û şehîd bûn: "*Şahîda Şahmîran ango bi navê wê tevgerî Yam Tigêsa (Dayika Şervanan) berpirsiyara mutbexê bû. Wê ji şervanan re xwarin amade dikir. Wê moral dida wan û ew xurt dikirin. Dema ew êrîşa DAIŞ'ê çêbû jê re gotin metirsî li ser ewlehiya jinan heye, digotin: 'Êrîş gelekî nêzîkî me bûye. Pêwîst e tu ji vê derê herî, li vir nemînî.' Lê belê Şahîda nepejirand û got 'Belê ez jin im, lê ez ji vir naçim. Hûn zarokên min in û ez dayika we me. Ti dayîk dev ji zarokên xwe bernade. Tiştê ku were serê we, bile were serê min jî, ez ji we ne çêtir im.' Wisa ew li vir ma û heta ku şehîd bû li ber xwe da.' Şehîd Wîdad jî maye, li ber xwe da û şehîd bû. Weke ku me bihîst DAIŞ'ê serê wê jêkir."*[437]

Him di şerên li dijî Ceyş el-Hur û El-Nusra yên sala 2013'an de him jî di şerê DAIŞ'ê yê sala 2015'an de şervanên Hêzên Parastina Xabûrê bi şervanên YPJ û YPG'ê re ji bo parastina ax û gelên

[434] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Temirê re, Til Temir, 2017

[435] Hevpeyvîn bi Ator Ishaq re, Til Temir, 2017

[436] Hevpeyvîn bi Madlên Xemîs re, endama Hêza Parastina Xabûrê û Meclîsa Gel a Til Temirê, li Til Temirê, 2017

[437] Hevpeyvîn bi Madlên Xemîs û xwesûya wê re, gundê Helmond ê Til Temirê, 2017

herêma Xabûrê şer dikirin. Dayika Aşûr balê dikişîne ser hevkariya dewleta Tirk bi çeteyan re û dide xuyakirin ku ev tifaqa qirkirinê li hemberî tifaqa gelên Xabûrê bi bin ket:

"Navçeya me rojekê di destê Artêşa Azad de bû, rojekê di destê Cebhet El-Nusra de bû û rojekê di destê Ensar El-Şerîa de. Em meh û nîvekê di dorpêçê de man. Mehek û nîvê me av venexwar. Ji ber ku 'Artêşa Azad' ev der dorpêç kiribû, av nedihat. Me nikaribû ne sebze, ne nan, ne jî av bidîta. Me tevahiya Kurd, Ereb û Aşûriyan, me tevan ava bîrê vedixwar. Ji min bawer bikin, ev navçe ber bi xerabûnê ve diçû berî ku hevalên me yên YPG'ê werin vir. Her kes li ser vî tiştî şahid e. Çemê Xabûrê û bi taybetî navçeya Aşûriyan ziwa kirin. Heta ku di wê êrîşa hovane ya DAIŞ'ê de Tirkan ava Xabûrê vekir. Kaniyên ku ava wan 30 - 40 sal in nedihat, dan herikandin da ku rê li pêşiya YPG'ê bigirin. Ji bo ku şervan neyên û pêşiyê li van hovan negirin, yên ku êrîşî gundên Xabûrê kirin û miletên me revandin. Ev siyaseta Tirkan e.
Em spasiya Yekîneyên Parastina Gel dikin û tevahiya yekîneyên ku jê re bûn alîkar. Hêzên leşkerî yên Suryanî, yên Ereb û Aşûrî, hemû pêkhate di nava YPG'ê cihê xwe girtine. Xilasbûna me vedigere wan. Mayîna me û domandina jiyana me li vir piştî êrîşa hovane ya DAIŞ'ê vedigere ser xwîna şehîdan. Bi yekîtiya ku vê xwînê çêkirî, bêhtir pêşketin li ser vê axê ji hemû pêkhateyan re çêbûne. Yanî me di mewziyên şer de nedizanîbû û nedipirsî kî ji kû ye. Me şehîdên Aşûrî, Ereb û Kurd bi hev re radikirin. Me nedigot, 'îro şehîdek Aşûrî li cem me heye' an jî 'ev şehîdek Ereb e'. Dema şehîdek li cem me hebû, em bi hev re beşdarî merasîmê dibûn."[438]

Di encama berxwedana hevbeş de çeteyan nikaribû bikevin navenda bajarê Til Temirê. Gundên Xabûrê û Çiyayên Kizwanan jî bi pêngavên hevbeş li pey hev heta Gulana 2015'an hatin rizgarkirin. Di şerên parastina Til Temirê yên salên 2013 û 2015'an de rastiya neteweya demokratîk hatibû avakirin. Pê re jî jin û gelên herêma Xabûrê bi vî ruhî bajar û gundên xwe ji nû ve avakirin û bi hev re bi rê ve birin. Ew bi aramî jiyane. Heta di Cotmeha 2019'an de êrîşên dewleta Tirk dest pê kirine û ew careke din neçar mane malên xwe berdin û di mewziyên berxwedanê de şer bikin.

- **Encam û Serpêhatiyên Pêngavê**

Piştî rizgarkirina navçeyên Xabur, Eyn Îsa û Girê Spî, şervanên YPJ û YPG'ê ji aliyê herêmên Cizîrê ve, Cizîr û Kobanê gihandin hev. Di 10'ê Tîrmeha 2015'an de endama fermandariya YPG'ê Sozdar Dêrik da zanîn ku di 65 rojan de hêzên wan qederê 11 hezar kîlometreyên bi çarçik erd ji destê çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirine.[439] Fermandar û şervanên YPJ'ê rave dikin ku ew bê navber, hemle li ser hemleyê her di nav şer de bûn. Di bin şertên giran de wan 24 saetan taktîk û çalakiyên nû ji bo serketina vê hemleyê bi pêş xistine.

Di nav şervanên YPJ'ê de hevalên jin ên înternasyonalîst ji welatên cuda jî hebûn. Wan şoreşa Rojava wekî hêviyekê ji bo têkoşîna azadiyê ya jinên cîhanê didît û wan dixwest bi hemû hêza xwe di parastina vê şoreşê de cihê xwe bigirin. Yek ji wan, şervana YPJ'ê Rûken ji Holanda ye ku di salên 2014-15'an de tevlî şerên pêngava Cizîrê bûye. Ew serpêhatiyên xwe yên wê pêvajoyê wiha dinirxîne:

[438] Hevpeyvîn bi Ator Ishaq re, Til Temir, 2017

[439] Daxuyarniya Fermandariya Giştî ya YPG: *Pêngava Fermandar Rûbar Qamişlo bi serketî dawî bû,* ANF Qamişlo, 10-07-2015

"Bi taybetî ji ber êrîşên li ser Şengalê min xwest ku ez tevlî xebatên YPJ'ê bibim. Ez ketim nava tabûra hereketlî. Erka me parastin û rizgarkirina herêmên kantona Cizîrê bû. Dawiya Îlona 2014'an em bi tabûra xwe derbasê Mebrûka bûn. Dema ku DAIŞ'ê êrîşê Kobanê kir, me xwest ji hêla Mebrûka ve rê vekin ji bo hevalên me li Kobanê nekevin dorpêçê. Lê em bi ser neketin. Ji tabûra me gelek heval şehîd ketin. Bi giştî derdora sed hevalî li Mebrûka şehîd ketine. Ev tam komkujiyek bû. Piştî vê, me xwe paş ve kişand aliyê Serêkaniyê û em derbasê aliyê Til Koçerê bûn. Lê wê çaxê êrîşên DAIŞ'ê li ser Til Koçer, Rabîa û Cezaa dest pê kirin. Dema ku pêngavên nû dest pê kirin weke Til Hemîs, Til Birak, Til Xenzîr û Til Temirê em hertim di eniya pêş de bûn. Piştî vî şerî jî em dîsa hatin Mebrûka. Dûvra pêngavên Silûkê û Girê Spî hebûn. Ew şer hemû, di nava pevajoyekê de qewmîn ku ji salekê kêmtir bû. Tabûra me ji yekîneyek hevalên jin û yekîneyek hevalên xort pêk dihat."[440]

- **Şewaza Şer û Fermandariya Jinê**

Şîlan Qamişlo wekî endama fermandariya YPJ'ê di koordînasyona gelek şerên vê pêngava li herêma Cizîrê de cihê xwe digirt. Ew dinirxîne ku jin ji bo parastina ax û nirxên civaka xwe bibawerî û bêyî hesabên ferdî tevlî şer dibûn û bi erka pêşengiyê radibûn:

"Di sala 2014'an de şerê li Kobanê û erişên DAIŞ'ê li ser Cizîrê pirr giran dibûn. Jinan ev şer koordîne kir û di her astê de wan fermandarî kir. Rastiya peyva 'Şoreşa Rojava şoreşa jinê ye' heye. Nêzîkî du mehan hevalan şer kir heta karîbûn xeta çeteyan ber bi çiyayê Kizwana ve bişkînin. Şerekî pirr dijwar bû heta şikandina DAIŞ'ê di xeta Xabûrê de dest pê kir. Di hemleya Holê de jî pêşengtiya pirr xurt ya jinê hebû. Di her 3 - 4 baskan de hevalên jin bi risteke pirr mezin rabûn. Hevala Stêrk her tim li ser baskê êrîşê bû. Sê salan wê hevalê bi vî rengî şer kir heta ew li gundekî şehîd ket ku şer tê de pirr dijwar bû. Hemleyên Şedadê û Tîşrînê û herî dawiyê hemleya Minbiç jî bi vî rengî bûn.

Di wan şeran hemûyan de jinan bê hesab şer kir û tecrûbeyeke mezin qezenc kirin. Berê gelek caran dihat gotin ku 'hevalê jin di şer de praktisyen in', yanî di milê pratîkê de xurt in. Lê di vî şerî de min dît ku hêza jinê ji vê astê derbas kir. Hevalên jin ne tenê praktisyen bûn, ew bi fikrê xwe tevlî dibûn. Di hemû plansaziyan de hevalê jin nêrîn û pêşniyarên xwe tevlî dikirin. Min dît ku hêzên YPJ û YPG'ê herî zêde baweriya xwe bi jinê tînin. Di koordîneyê de zêditir li hevalên jin tê guhdarîkirin. Çima? Ji ber ku westandinek pirr zêde çêdibe û ev duyarsiztiyê [xemsariyê] bi xwe re tîne. Di hevalên xort de ev seransertî heye. Fedekariyeke ku ji xewa xwe kêm bike, ji kêfiyeta xwe kêm bike di hevalên jin de hîn zêdetir e. Ji ber ku manewiyata jinê xurt e, ew hîn zêdetir li ser hevalên xwe difikire. Jin şev û roja xwe dike yek."[441]

Rûken jî heman çavderiyê parve dike. Li ser nêzikatî û zehmetiyên ku şervanên xort û jin di vî şerê giran de kişandine ew dibêje, "*Têkoşîna jinê ji bo beşdarbûna şerî hîn berdewam dike. Zilam hîn difikirin 'em baştir in'. Lê di demên zehmet de bê xew, bê av, bê nan zilam hîn zêditir zehmet dikişînin, di şer kirinê de jî. Ew nikarin vêna tehmûl bikin. Vîna jinê û hêza jiyanê ya jinê xurttir in. Jin baştir dikarin li gorî şert û mercan xwe eyar bikin. Her kes milên xwe yên xurt û yên lawaz hene. Di rewşên wiha de pêwîst e ku em bikevin ferqê milên hev du yên xurt û hev du temam bikin.*

[440]Hevpeyvîn bi Rûken Derya re, endama YPJê, Dêrik, 2017

[441] Çavkanî li heman cihî

Beşeke din a têkoşîna me jî parastina pîvan û exlaqê şer e. Li hemberî dijminê xwe jî raberkirina nêzîkbûneke însanî di nava YPJ û YPG'ê de hebû: Ger derfet hebe, tu dijminê xwe teslîm bigire, nekuje, êşkence lê neke. Kuralên me yên zelal hene. Ji bo nefretê li hundirê te zêde mezin nebe, em di refên YPJ û YPG'ê de wan mijaran nîqaş dikin. Ev pirr girîng e. Ji ber ku gava ku em dişbihin dijminê xwe, tê wê wateyê ku me winda kir! Lewma em di eniyê de jî nîqaş û perwerdeyan dimeşînin. Di vî warî de jî jin bi risteke esasî radibin. Ew di pêkanîn û parastina exlaqê şer de hişyar in. Ji ber ku em ji bo jiyaneke rast têkoşînê dikin. Ji ber vê, pêwîst e em li gorî vê nêzîk bibin. Bi rêbazên şaş tu nikarî xwe bigihînî tiştekî rast.

Ger tu bizanî ku hevalên te di nava şer de ne, mirov nikare bisekine. Dema ku tu bi xwe biçî şer, tu dikarî rewşê binirxînî, tu dikarî moral bide hevalan. Ji dûr ve meyzandin, dema ku hevalên te di nava pêvçûnan de ne, mirov dîn dike. Her heval cihekî xwe yê teybet heye. Her kes bi rista xwe radibe û hev du temam dike. Gelek hevalên pirr ciwan hebûn. Min vê demê fêhm kir, çiqas em dikarin ji ciwanan fêr bibin. Bi dilnizmbûna wan ez gelek bi bandor bûme."[442]

Narîn Efrîn şirove dike ku di pêngavên rizgarkirina herêmên Rojava, li Efrîn, Kobanê û Cizîrê hemûyan de rista jinê wekî şervan û fermandar pirr mezin bû: *"Heta di nav gel û ciwanan de fermandariya hevalên jin hîn zêditir hat qebûlkirin û bawerî dida. Ji ber ku jin di xebatên xwe de pirr bi kûranî û pirralî difikirin. Heger tu niha ji hezaran hevalên ku cihê xwe di van şeran de girtine û hîn sax in, bipirsî, 'Kîjan fermandar tu dixwazî ku fermandarê/a te be?' ew ê bi pirranî bibêjin: 'Bila fermandara min hevaleke jin be'. Ji ber ku jin karê xwe ji dil dike, di karê xwe de titîz û bi biryar e. Ew tenê li plan û taktîk nafikire. Di heman demê de ew rêhevaltî, rêzgirtin û hezkirina xwe tevlî dike. Beriya ku ew şervaneke xwe bişîne şer, ew ekîd bi wê/wî şervanê xwe elaqedar dibe, wê/wî nas dike. Dema ku tu şewazê fermandarî û rêveberiya jinê û ya hevalên xort bînî li hemberî hev, cudahî pirr xuya dibe. Jin pirr ferqê naxe nav fermandar û şervanan ango gel de. Ew kelecana ku bi hevalên jin re heye bi hevalên xort re kêmtir e. Bi pirranî hevalên xort ji xwe razî ne. Lê jin hîn zêditir pêdiviya azadiyê û şoreşê dibînin û têkoşînê ji bo nasnameya xwe jî dikin. Lewma germayiya hevalên jin di pengavên rizgarkirina herêman de hîn zêditir bû."*[443]

Her wiha Şîlan Qamişlo diyar dike ku şewazê fermandarî û rêhevaltiya jinê dibû misogeriya serketinên YPJ û YPG'ê li hemberî çeteyên ku bi rêbazên hovane û çekên giran şer dikirin: *"Jin li hemberî pêwîstiyên jiyanê hişyar e, li hemberî pirsgirêkeke rêxistinî ku derketiye, hişyar e. Di koordînê de gav bi gav şopandina wan tiştan girîng e. Her astengî an aloziyek ku di gavek de wê derbikeve, jê re çareserî fikirandin, girîng e. Jin vê empatiyê ava dike, alternatîfan destnîşan dike. Ev taybetmendiyên hanê di koordînekirinê de pirr girîng in. Bi vî rengî baweriya şervanan tê qezenckirin. Cihên ku jinan koordîne kiribana bi rastî serketî bûn. Heval bi coş û moral diçûn. Ji ber ku kesên ku li wan difikirin di pişta wan de hebûn. Wisa baweriyeke pirr mezin çêbû. Nêrîna ku 'jin nikare' an jinê piçûk dibîne bi rastî rabû ji ber ku jinê bi keda xwe kiriye. Bi eqilê xwe, bi hemû hêza xwe tevlî dibû. Êdî jin pêwîst nabînin ku xwe îsbat bikin heta ku ji aliyê hevalên xort ve werin qebûl kirin. Cihê ku jin tê de nîne, em li wê derê lawaz in û kaybên zêde didin.*

Şerên ku ji aliyê hevalên jin ve hatin koordînekirin û bi hêza jinê meşiyan, serketî bûn. Ji ber ku hesabên şexsî yên hevalên jin ku bi pey bikevin, nînin. Ew hemû dinyaya xwe, hêza xwe û fikrên xwe dixe xizmeta hevalên xwe û di serketinê de xwe kilît dike. Lewma bi ser dikeve. Min ferq kir ku

[442] Çavkanî li heman cihî

[443] Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

bi taybetî ji bo jinê şer, li ser hev du, pirr zor e. Ji ber ku tu bi hestên jinê şer koordîne dikî. Şev û roj tu şiyar î. Pêwîst e ku tu bi her tiştî re mijul bibî: Birîndar hene, şehadet hene. Ev pirr zor e ji ber ku ev bûyer hestên te hertim têxin hereketê. Bi her şehadetê re parçek ji dilê te diçe. Dilê te diparitî, lê cihaz di destê te de ye û pêwîst e ku tu bi hêz û bi moral biaxifî. Lê di dilê xwe de tu dişewitî. Tu di vê zanebûnê de yî ku tu ji bo hevalên derdora te çiyayek î ku ew bikarin pişta xwe bidinê. Ji bo morala hevalên te nekeve û ew xwe belav nekin, pêwîst e ku tu hertim xurt bî. Ji ber ku belavbûn û bê moralî di nav şer de zêdetir windayiyan bi xwe re tîne."[444]

Her wiha Rûken ji Hollanda jî balê dikişîne ser wê yekê ku li hemberî êşa şehadetan parastina hêzkirina jiyanê pirr girîng e: "*Me gelekî li ser vî mijarê nîqaş kir. Hinek heval piştî şehadeta hevalên xwe êdî nedixwestin bijîn û xwe baş nediparastin. Ev nîqaşeke pirr girîng bû. Pêwîst e ez bifikirim, ez çawa bikarim armanc û xeyalên vê hevalê pêk bînim û bijîm. Em bi hevdu re û bi hevalên zehmetî kişandî re elaqadar dibûn. Me hewl dida ku em wan hevalan tevlî jiyanê bikin û lêhûrbûna wan dîsa bixin rêya jiyanê."*[445]

Jinan di vî şerî de ne tenê têkoşîneke leşkerî bi rê ve dibir. Wan di heman demê de têkoşîneke dijwar li hemberî bandora zêhniyeta pergala desthilatdariya zilam di kesayeta xwe de dimeşand û wan xwe ji fêrbûnên kevin xilas dikir. Di rastiya şerî de jin fêr bûye ka çawa eqilê xwe yê hisî û yê analîtîk bike yek.

"*Çiqas tu bikarî pêwîst e ku tu li ser taktîka şer û hemû ziraviyên wê bifikirî û bixî meriyetê. Di heman demê de jî tu hêzên xwe jî motivê bikî, perspektîfê bidî wan. Tu hemû hûrgûliyên bi hasasiyet bifikirî. Di encamê de mejiyê te tijî ye. Ji sedî 5'ê tu bi şerê ku diqewime re şer dikî, lê ji sedî 95'ê tu bi xwe re daîmî şer dikî ji bo tu hestên xwe xurt bikî. Pêwîst e ku tu li gorî erka xwe tevbigirî. Axaftina te, mîmîka te, tevgerandina te, kenê te, her tişt pêwîst e di xizmeta armanca te de bê. Tu têdikoşî ku tu eqil û dilê xwe bikî yek. Di şer de ev xala herî girîng e. Di kêliya şer de pêwîst e ku tu wan bikî yek ji bo tu bi rastî hêz bê û bi rê ve bibî. Di wan kêliyan de tu hemû hêza xwe, hêza zayenda xwe keşf dikî. Tu xwe nas dikî û bixwebaweriyê qezenc dikî. Tu ferq dikî ku tu ji vê zêdetir jî dikarî bikî. Hemû tabuyên ku di mirov de jî çêbûne tu derbas dikî, wekî 'ecaba ez wekî jin dikarim şer koordîne bikim an nikarim?"*[446]

Fermandar û şervanên jin bi van lêpirsînên di dilê xwe de bi hîm û rêbazên zirav yên pergala desthilatdariya zilam dihisiyan. Wan dîroka xwe di eynika rastiya şerê hemdem de careke din didît. Lêhûrbûnên li ser serpêhatiyên dîrokî û hemdemî yên jinan, ew li hemberî nêzikatiyên desthilatdar hişyar dikirin. Bi vî rengî jinan rê û rêbazên nû yên têkoşîna azadiya jinê di nav şoreşa Rojava de bi pêş dixist û wan erkên xwe yên siberojê zelal dikir.

"Berê zilam hinek erk û kar pirr pirole dikirin. Lê di vî şerî de hatiye fêhmkirin ku gelek car zilaman xwe li ser keda jinê mezin dikir. Gelek caran jin hemû karê zor dikirin, lê navê zilam derdiket. Lê ev perde niha hatiye rakirin. Lewma hêza hevalên jin pirr derdiket holê. Ez bi xwe jî bûm şahîd ku di gelek cihan de êdî zilam di plansazîçêkirin, îdarekirin, quwet motivekirin, xulukkarî û pratîkê de di siya jinê de dima.

[444]Hevpeyvîn bi Şîlan Qamişlo re, Dirbêsî, 2017

[445]Hevpeyvîn bi Rûken Derya re, Dêrik, 2017

[446]Hevpeyvîn bi Şîlan Qamişlo re, Dirbêsî, 2017

Wek jin me karê pratikê yê şer hemû meşandin, kedên pirr mezin dan, lê belê di teorîkirina wan tecrûbeyan de em heta niha kêm mane. Em pênase nakin. Me nirxandinên xwe li ser hunerê şer bi çavê jinê hîna nenivîsandiye. Di mijara şiroveyên jinê yên şer de me berhemên nivîskî bi pêş nexistin. Lê pratîk û şiroveyên jiyanê pirr in. Di hunerê şer de jin bi eqilê xwe pirr guhertin çêkirin. Pirr xulukar, bi xwezaya xwe herikbar e di şer de. Lê ev tecrûbe nehatin nivîsandin.

Mirov dikare bêje ku wekî dema neolîtîkê lê hatiye. Di dema neolîtîkê de jî jin civakê bi re ve dibe, hemû pêwîstiyên wê pêk tîne. Ji parastin û komkirina civakê bigire heta peydakirina xwarinê û rêxistinkirina hemû karên civakî, jin bi otoriteya xwe ya xwezayî her tişt dimeşîne. Lê belê berhema wê ya nivîskî nebû. Lewma ev dîroka jinê di siyê de maye. Heta di vê dawiyê de dîsa tê keşifkirin. Bi rastî mirov dikare şoreşa Rojava bişibîne şoreşa neolîtîk. ***Şoreşa neolîtîk ji bo jinê bû çi, Şoreşa Rojava ji bo jinê jî ev e.****"*[447]

Ji bo ku hêviyên şoreşa Rojava neyên şikandin û berhemên vê şoreşê wekî berhemên şoreşa neolîtîk yên vê axê neyên dizîn û talankirin, jinên Rojava hewl didin ku pergala xwe ya parastin, perwerde û rêxistinbûnê di nav civakê de bi pêş bixin û daimî bikin.

e) Damezrandina Rêveberiya Xweser ya Sê Kantonên Rojava

Di 6'ê Çileyê 2014'an de rêveberiya xweseriya demokratîk a Rojava bi erêkirina hevpeymana civakî li bajarê Amûdê fermî hatiye ragihandin. Bi armanca avakirina civakeke demokratîk û ekolojîk li ser hîmên azadiya jinê û neteweya demokratîk modela xwe birêvebirinê ya civakî di astên komîn, herêm û tevahiya Rojava de darîçav bû. Rêgezên hevbeş û înîsyatîfên herêmî yên kantonên Cizîrê, Kobanê û Efrînê hatin zelalkirin. Wekî din peywîr û xebatên dezgehên rêveberiyê hatin pênasekirin. Li gorî vê, berpirsyarî, taybetmendiyên bingehîn û dabeşkirina xebatên Meclîsa Zagonsaz, rêveberiyên kantonan li ser bingehê meclîsa kantonê û 22 desteyên rêveberiyê tevî serok û du cihgirên seroka/ê meclîsa kantonê, meclîsa dada civakî, desteya hilbijartinê û dadgeha zagonî ya bilind û yên meclîsên herêmî li hemû kantonan xuya bûne. Nûnertiya hemû pêkhateyên neteweyî û olî yên kantonan û beşdarbûna jinan herî kêm bi rêjeya ji sedî 40'î wekî pîvana hilbijartin û erkdarkirinê di dezgehên rêveberiyê hemûyan de hatiye misogerkirin.

Li ser vî bingehî rêveberiya xweser a kantona Cizîrê di 21'ê Çileyê 2014'an de, ya kantona Kobanê di 27'ê Çileyê 2014'an de û ya kantona Efrînê di 29'ê Çileyê 2014'an de hatin ragihandin û dest bi xebatên xwe kirin. Di destpêka sala 2016'an de Meclîsa Gel a Şehbayê li Efrînê bi tevlîbûna 150 delege û 300 mêvanên ji pêkhatiyên herêmê hemûyan kongreya xwe li dar xist. Meclîs û rêveberiya xweser a herêmê di kongreyê de hatin hilbijartin û li navçeyên ku ji DAIŞ'ê hatine rizgarkirin dest bi xebatên xwe kirin.

Li kantonên Cizîrê û Kobanê, zilam wekî serokên kantonê û jin wekî yek ji cihgirên serokî hatin hilbijartin. Li kantona Efrînê, Hêvî Mistefa wekî seroka kantonê û du zilam wekî cihgirên wê hatin hilbijartin. Bi ser de di nav serok û cihgirên serokan de nûnertiya pêkhateyên kantonê jî li ber çav hatibû girtin. Ragihandina rêveberiya xweseriya demokratîk bi vî awayî gaveke dîrokî bû. Ji bo jin û civakeke ku bi hezaran salan ji derveyî mekanîzmayên biryardayînê, saziyên îdarê, qanûnî, aborî, civakî û siyasî hatibûn hiştin, avakirina modeleke nûjen û alternatîf a rêveberiyê pêngaveke bi

[447] Çavkanî li heman cihî

kelecan û berpirsyariyeke mezin bû. Endamên rêveberiyên destpêkê, nebûna tecrûbeyên wan di rêveberina saziyên dewletê de him wekî avantaj him jî wekî dezavantaj dinirxînin.

Naverok û modela rêveberiya xweseriya demokratîk wekî vebijêrka civakê li dijî pergala desthilatdariya dewletê hatibû sêwirandin. Lê belê, ji ber nebûna dewleta Kurdan bi dehan salan wekî sedema bindestbûna Kurdan hatibû nirxandin, gelek kesan ragihandina rêveberiya xweser hevwateya avakirina pergala dewletê li Rojava şirove kiriye. Ev nihêrîn li aliyekî ji bo gelek kesan dibû wekî dermanê derûniya bindestbûnê. Lewma di zimanê gel de rêveberiya xweser wekî 'hikûmet', deste wekî 'wezaret' û berdevkên wan wekî 'wezîr' dihatin binavkirin. Di van pênaseyên gel de kûrbûna hişmendiya dewlet û desthilatdariyê eşkere dibû. Pê ve girêdayî li aliyekî hestên bi serbilindî û serfirazî xuya dibûn, lê li aliyê din jî cih cih şiroveyên bi guman li ser çêbûna çîneke nû ya desthilatdaran derketin holê.

Ji ber vê ferasetê, gelek jin dibêjin, dema wan berpirsyariyên rêveberiyê girtine ser xwe, bi wan re hiseke biyanîbûnê peyda bûye. Lê di dawiyê de wan dît ku ji bo rast pêkanîna erkên rêveberiyê û serketina modela xweseriya demokratîk ked û wijdan ji her tiştî girîngtir bûn. Di vî warî de gelek jin bi risteke pêşeng rabûne di rûniştandina feraset û şewaza demokratîk de.

Hevseroka Desteya Maliyê ya Kantona Cizîrê Remziye Mihemed nakokiyên xwe di dema erkgirtinê de wiha tîne ziman: "*Ji bo amadekariya rêveberiya xweser hevdîtin bi partî, saziyên civakî û pêkhateyên ku li vir dijîn re dihatin çêkirin. Min bi xwe ev kar nedişopand ji ber ku ez bi karê meclîsê re mijûl bûm. Mereqa min jî çênebû ku ez bişopînim. Ji ber navê 'hikûmetê' li ser bû, kêfa min jê re nedihat. Lê di civîna dawî ji bo avakirina rêveberiya xweser de ez wekî seroka desteya maliyê hatim hilbijartim. Bi rastî, ez hinekî aciz bûm. Hema bibêje, di şevek û rojekê de em bûn 'wezîr'. Me soza xwe li pêşiya Meclîsa Zagonsaz da. Îhsasê min xerîb û ecêb bû. Yanî tirs hebû ji ber ku min ti carî karekî wisa nekiriye, wekî sazîbûn û mekteb. Min di civakê de kar kiriye. Min nedixwest ez ji gel û civakê qut bibim û bi karê mekteb û teknîkî re mijûl bibim.*
Piştî sozê em ji Amûdê çûn şahiya mezin li Qamişlo. Hemû hevalên me yên rêveberiyê axaftin kirin. Di dawî de ji min re gotin, 'Tu axaftina dawî bike û vê qadê weke Qada Xweseriya Demokratîk îlan bike.' Ev tiştek pirr watedar bû, kêfa min hat. Di dawî de ez li pêşiya ewqas gel axifîm.

Ji 22 deste em çar jin serokên desteyan bûn û yê din cihgirên jin hebûn. Ji ber ji dervê Kurdan di nav pêkhateyên din de jin pirr nebûn. Jinên rêxistinkirî ji partiyên cuda jî tine bûn. Yanî me rêveberî îlan kir, hê ji binî tiştek tine bû. Tenê hevpeymana civakî ji aliyê Meclîsa Zagonsaz ve hatibû imzekirin. Lê hê jî ne cihê kar, ne jî rêziknamên me yên desteyan amade bûn. Ji bo her desteyê serokê/a wê û du cihgir hatibûn hilbijartin. Em li hev rûniştin. Me rêziknameyên xwe amade kirin û dan meclîsa tenfîzî û wan da [Meclîsa] Zagonsaz. Wek desteya maliyê me zû xebatên xwe dest pê kirin ji ber pêdivî û hewcetî hebûn. Xebatên rêveberiyên me ji sifrê dest pê kir. Me zehmetî kişandin di hêla derfetên madî û peydakirina cihên desteyan de. Di aliyê din de gelek cebhên şer vebûn û rojane şehadet çêbûn. Dîsa em di dorpêçê de bûn. Divê ku em li gorî derfetên heyî kar bikin."[448]

Hêvî Mustafa beriya ku bûye seroka kantona Efrînê, di dibistanên dewletê de li bajarê Helebê mamostetî xwendibû. Di heman demê de wê di xebatên Yekîtiya Starê de cihê xwe girtibû. Li ser vî bingehî ew serpêhatiyên xwe wekî yekem seroka kantonê di pergala rêveberiya xweseriya demokratîk a Rojava de wiha rave dike: *"Dema rejîmê ne tenê jin, kesek nedibû bifikiriya tevlî*

[448] Hevpeyvîn bi Remziye Mihemed re, Qamişlo, 2017

biryaran bibe. Divê çi biryar ji Şamê bihata, ew pêk bianîna. Dema amadekariya rêveberiya xweser hate çêkirin, ez wekî seroka kantonê hatim pêşniyazkirin. Min got, 'Ev çi ye, gelo? Eceba ez ê karibim? Barekî giran e.' Dema rêveberî hate ragihandin, bala raya gişt hate kişandin. Gelek hevalan ji min re telefon vekir û wan digot, 'Em li kêleka te ne.' Bi rastî jî sala destpêkê ez gelekî bi tirs bûm. Min digot, 'Bila kêmasiyek çênebe. Bila nebêjin seroka kantona Efrînê jinek e. Binêrin kar li wir zeîf e.'

Min hemû hêza xwe da kar. Min her digot, serokên dinyayê kes hene wan amade dikin. Lê me her tişt ji sifrê dest pê kir. Ji şeklê me û cihê me bigire heya axaftinên ragihandinê, me amade dikirin û didan ragihandinê. Di merheleya avakirinê de hîn ekîb yan komîte nebûn. Em navçe bi navçe digerîyan ji bo em xebatên rêveberiyê bidin nasîn. Beşeke ji civakê bi feraseta wasta xwe nêzî me dikir. Beşeke bi awayekî hesûd dinêrî. Hinekan jî digot, 'Em qurban bin'. Ji bo vê gotinê me bêhtir kar dikir. Carê jî digotin, 'Em bi hêvî ne ku tu weke bavê xwe derkeve.' Ew çax barê min hîn girantir dibû. Ez bi ti carî ji binketinê hez nakim. Dema ewil nan nebû ku em bixwin. Lê min înternet anî û çareseriyan lêkolînê dikir: Rêveberî çawa ye, hikûmet çawa ne? Xîtab çawa ne?"[449]

Bêrîvan Hesen a ku di sala 2017'an de bûye hevseroka Meclîsa Gel a Kantona Kobanê, behsa zehmetiyên guhertina zêhniyeta desthilatdariya zilam dike ku wan di dema avakirina rêveberiya xweseriya demokratîk de kişandine: *"Dema ku milet derbasî saziyan dibû, rasterast zilam ji xwe re muxateb digirtin, hema berê xwe didan wan. Wê demê qebûlkirina jinê di nava saziyan de pirr kêm bû. Gel, bi taybetî zilaman bawer nedikir ku hêza jinê heye ku ew jî dikare bi kar rabe û pirsgirêkan çareser bike. Wê demê jinan wekî serok yan jî wekî cihgir cihê xwe di serokatiya desteyan de digirt. Me dît ku hêza jinê heye ku dikare di hemû qadan de cihê xwe bigire weke qada perwerdê, spor û xebatên jinê û yên gişt jî."*[450]

Zilam fêr bûbûn ku heger jin li cihekî hebe, ew ji bo xizmetkirinê yan jî temamkirina wî heye. Lê belê jinan bi naskirina karê xwe ve vîn û nasnameya xwe di nav siyasetê de derxistin holê. Jinên Kobanê bi taybetî ji bo rûniştandina pergala xweser a jinê wekî bingehê vîna kolektîf a jinê di pergala rêveberiya xweseriya demokratîk de têkoşiyan: *"Me dixwest ku em hêzê bidin hevalên jin ên ku weke cîhgir cihê xwe di nava desteyan de girtine. Ji bo ew di hemû aliyan de xwe tevlî xebatê bikin, me ji wan re digot: 'Hûn jî berpirsyar in û ji we tê xwestin ku hûn hemû jinên di desteyan de jî bi rê ve bibin.' Lê di vî warî de me gelekî zehmetî dikişandin. Di aliyê fermî de mafê te heye, lê divê ku tu di aliyên îdeolojîk û rêxistinî de jî hêza pêkanînê ava bikî. Ev dibû sedem ku me her tekoşîn dikir ji bo ku em xwe îsbat bikin. Wê demê hêza jinê jî derket. Êdî rexneyên di vî warî de jî pêş ketin ku bê me hinek kar tê meşandin. Me xwest ku em bi hevalên xwe yên xort bidin fêhmkirin ku biryarên ew bi tena sere xwe digirin, wisa bi tenê jî dimînin."*[451]

Hêvî Mistefa jî şirove dike ku wê di warê guhertina hişmendiya zayendperest û desthilatdar a zilam û jinan de zehmetî kişandine: "*Herî zêde hêza me bi pirsgirêkên hev ne qebûlkirinê re derbas dibû. Destpêkê ez pirr pê diêşiyam. Lê me pirtûkên Serokatiyê xwendin û min fêhm dikir rastiya jinê ya ku ji cinsê xwe hez nake, çawa ye. Li ser asta rêveberiyê mehê carekê jinên di nava rêveberiya xweser û desteyên wê de civîna xwe çêdikin. Em pêşniyar û nêrînên wan digirin. Em nahêlin zilam derbarê jinan de biryaran bigirin. Jin ji sîstema îdarî ya saziyan dûr bû. Dema ewil*

[449] Hevpeyvîn bi Hêvî Mistefa re, Efrîn, 2017

[450] Hevpeyvîn bi Bêrîvan Hesen re, hevseroka Meclîsa Gel a Kantona Kobanê, 2017

[451] Çavkanî li heman cihî

jinê xwendiye, lê welatparêzeke li malê bû. Di saziyên dewletê de kar nekiriye. Ji ber wê nizanibû çawa saziyek tê rêvebirin."[452]

Remziye Mihemed jî astengiyan dinirxîne ku di aliyê peydakirina endam û pisporên pêwîst ji bo pêkanîna karên rêveberiya xweser li kantona Cizîrê de derketine pêşiya wê: *"Zehmetiyên herî mezin me bi kesên xwendevan û kesên ku imkanatê wan heyî re kişandin. Wan ratibekî bilind dixwest. Lê me nedikarî ewqas bidin wan. Lewma gelek kesan bi me re kar nedikir, yan jî dema ku li cem me tecrûbe standibûn, diçûn cem mûnezemên ku ji derve hatin. Ji ber ratibê wan bilind bû. Mûnezeme qaşo alîkarî dikin, lê endamên me yên xwendî dibirin. Dema deriyê Sêmalka heşt heyva hatibû girtin, gelek zehmetiyên aborî çêbûn. Mazot nebû. Gel darê li kolanan dibirîn û dişewitandin; pêlav û cilê xwe dişewitandin ji bo xwe germ bikin. Bi avakirina rêveberiyê me xwest van pirsgirêkên milet kêm bikin wek kehrebe, mazot, pêdiviyên rojane. Li gorî derfetên heyî me çareser dikirin. Ji ber ku em demekê ji hemû bajarên Sûriyê û dewletên derdor qut bûn, em demekê ji keskatî, bacan û fêkî qut bûn. Me xwest çandiniyê vegerînin ser erdên xwe. Hin bi hin bi riya avakirina kooperatîvan me giranî da pêşxistina çandinî û sewaldariyê.*

Di dema nîzama Beesê de ti karê binesaziya bajêr li Rojava nehatibû kirin. Ji rêyan bigire heya xetên avê, bajarê me hemû bê sîstem bûn. Em mecbûr bûn ku her tiştî ji nû ve ava bikin. Xebateke mezin ji me dihat xwestin, lê derfetên madî û endeziyar nebûn. Belkî heya niha jî em nebûn bersiv ji pêdiviyên civakê re. Lê dîsa di hêla aborî de gelek pêşketin çêbûn. Ya herî girîng jî aramî li bajarê me bû. Li gorî hemû bajarên din ên Sûriyê wekî Hims, Şam an Hema, gavên me di hêla parastina xwe de serketî bûn."[453]

Her wiha di her sê kantonan de desteyên jinê wekî yek ji 22 desteyên rêveberiya xweser hatin avakirin da ku li gorî pêdiviyên jinên Rojava xebat û projeyên taybet bi pêş bixin. Seroka Desteya Jinê ya Kantona Cizîrê, Emîne Omer destnîşan dike ku wan bi moraleke mezin dest bi karê xwe kiriye: *"Di destpêkê de cihê me nebû. Kar diket ser milê çend jinan. Tenê serok û du cihgir hebûn. Lê belê me hîn di sala 2014'an de gelek proje çêkirin. Bi taybetî ji bo ku em tundiya li ser jinan bi dawî bikin û xwedî li zarokan derbikevin. Me baxçê zarokan li Amûdê, Qamişlo û Hesekê ji bo zarokên jinên karker vekirin. Ji bo zarokên astengdar me malek vekir, ji ber ku hejmareke pirr mezin hebû. Dîsa me mala zarokên bê dê û bav vekir. Zarokên ku li ser wan tundî tê meşandin û zarokên sêwî li wê derê dimînin. Çi pirsgirêkên ku li pêşiya me derdikevin, em bi hev re riya çareseriyê jê re dibînin."*[454]

Hevseroka Meclîsa Gel a Girê Spî, Zelîha Ebdî bi eslê xwe ji bajarê Reqayê ye, ew balê dikişîne ser wê yekê ku ferqên di şewazê fikirîna jin û mêran de di karên rêveberiya xweser de berbiçav bûne: *"Rêveberiya xweseriya demokratîk bi rengê jinê şîn dibe, şîrîn dibe. Dema ku zilam siyasetê dinirxîne, pirranî li gorî berjewendî û desthilatdariyê dinirxîne. Lê hevalên jin li gorî însaniyetê û pêdiviyên jiyanê dinirxînin, çawa em ê Rojava bikin mînak ji bo tevahiya mirovahiyê."*[455]

Şêwaz û rêbazên jinê, nihêrîn û nirxandinên jinê di gelek pêvajoyan de dibûn hêza çareseriyê ya rêveberiya xweseriya demokratîk. Çavkaniya hêz û ramanên jinê yên ku di astên cuda yên rêveberiyê de cih girtine hêz, tecrûbe û bîrdoziya Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê bû. Jinan ne wekî ferd lê wekî nûnerên Yekîtiya Star cihê xwe di pergala rêveberiyê de girtiye. Bi vî rengî jinan

[452] Hevpeyvîn bi Hêvî Mistefa re, Efrîn, 2017

[453] Hevpeyvîn bi Remziye Mihemed re, Qamişlo, 2017

[454] Hevpeyvîn bi Emîne Omer û Emel Kûriya re, endamên rêveberiya Desteya Jinê ya Kantona Cizîrê, Qamişlo, 2017

[455] Hevpeyvîn bi Zelîha Ebdî re, hevseroka Meclîsa Gel a Girê Spî, 2017

xwe berpirsyar dît ku nûnertiya rêgez û biryarên Yekîtiya Star bigirin ser xwe û di vî warî de têkoşîna azadiya jinê bi pêş ve bibin. Di heman demê de wan zanîbû ku hêza birêxistinkirî ya jinê palpişta wan e.

f) Bipêşxistina Maf û Qanûnên Jinê

Yekîtiya Star kongreya xwe ya 5'an di 19 û 20'ê Nîsana 2013'an de bi dirûşme û armanca *'Ji bo ku ti jin bê rêxistin nemîne'* li dar xistibû. 350 jin wekî nûnerên sazî û meclîsên jinê yên herêmî ji Rojava, Sûriyê, Libnan û Ewropayê amade bûn. Di nîqaşên kongreyê de rewş û asta rêxistinbûna jinê di nav şoreşê de hatibû nirxandin. Delegeyên kongrê biryarên girîng dan da ku Yekîtiya Star xwe bigihîne tevahiya jinên civakê, rêxistinbûna xwe û têkoşînê li dijî zayendperestî encamgir bike. Li gorî perspektîfên vê kongreyê, nûnerên jin di rêveberiya xweseriya demokratîk de jî pergala xwe ya civîn û koordînasyonê ava kir. Bi vî rengî jinan mekanîzmayên xwe yên xweser ji bo parvekirin û hevbeşkirina rojev, nihêrîn û hewldanên xwe bi pêş xistine. Bi vî rengî siyaset, sazîbûn û qanûnên ji bo bihurîna ji kevnesopiyên zayendperest û parastina mafê jin û keçan hatin nirxandin.

Meclîsa Zagonsaz bi 101 endaman hatiye avakirin. Di nava endamên wê de 43 jinên ji hemû pêkhateyan hene. Endama Dîwana Meclîsa Zagonsaz Perwîn Mihemed dibêje, wan di tevahiya 11 komîteyên meclîsê de nûnerên jin û berdevkên wan erkdar kirine. Her wiha jin hemû di guftûgo û çêkirina zagonan de peywîrdar in. Perwîn rista zagonan di pevajoya şoreşê de û ji bo guhertin û veguhertina civakê wiha dinirxîne:

"Meclîsa Zagonsaz, meclîsa yekemîn e ku di xweseriya demokratîk de qanûnan saz dike û çêdike. Ji ber ku em rejîma berê red dikin û em yeke nû didin avakirin ji wê re qanûn divê. Çiqasî em li çareseriyê di exlaqê civakê de digerin û dûrî zêhniyeta qanûnê dikevin, ewqasî baş e. Lê gelek mijar hene, em dixwazin bikin qanûn ji bo ku em karibin sererastkirinê di fêrbûnên kevin de çêbikin û ya nû bi gel bidin naskirin. Mînak, berê pirrjinî hebû û weke qanûna dewletê dihate naskirin. Heta niha jî ev rastî heye. Em ji bo ku bi milet bidin fêhmkirin ku ev yek mafê jinê û hebûna jinê binpê dike, qanûnek pêwîst e. Destpêkê, bila qanûn hebe ku bibe milkê civakê û hêdî hêdî wê bibe çandek û pîvaneke ku civak bi xwe wê pêk bîne. Em bi vê armancê tevdigirin."[456]

Ji ber ku zagon li gorî pêdiviyên jinê û yên civakê tên amadekirin, endamên Meclîsa Zagonsaz rewşa civakê, karê rêveberiya xweser û yê desteya jinê daîmî dişopînin û nîqaş dikin: *"Çiqas ji bo wê rewşê zagon pêwîst in? Zagon çiqasî tên pêkanîn, nayên pêkanîn? Di kîjan milî de şaştî yan kêmayî hene di zagonên me de? Em li ser van pirsan disêkinin ji ber ku zagonên me ne sabît û domdar in. Em gelek mînakên zagonên welatên cuda û yên navnetewî tînin û li wan dikolin. Em bend bi bend nîqaş dikin, di filan mijarê de çawa nîqaş kirine, çawa pê daketine, çawa erê kirine? Her wiha komîteya me jî bi saziyên têkildar van nîqaşan dimeşîne.*

Mînak, me zagona jinê pêşîn bi saziyên olê re, bi Mala Jinê, Yekîtiya Star û saziyên jinan re nîqaş kir. Mînak nêrînên van di mijara pirrjinîbûnê de çi ne? Her wiha me di nav civakê de, bi komîn û meclîsên gel re jî nîqaş kirin. Mînak me du sed endam li bajarê Dêrikê kom dikirin û civîn ji wan re çêdikir. Li ser reşnivîsa amadekirî me bi gel re nîqaş dikir. Mînak, em dixwazin mafê mîratê yê jinê û zilam wekhev be, yanî çima needaletî hebe? Pirsên milet gelek hebûn. Bi vî rengî me şeş

[456] Hevpeyvîn bi Perwîn Mihemed re, endama Meclîsa Zagonsaz, 2017

mehan li hemû herêman nîqaş dikir. Piştî wê me reşnivîseke sererastkirî amade kir. Ew reşnivîs jî ji komîta me ya jinê, desteya jinê û komîta mafan re hat pêşkeşkirin û weke reşnivîsa zagonekê ji nû ve hat sazkirin. Ev reşnivîs me dawî êdî da 101 endamên Meclîsa Zagonsaz ku çûn û ew bi sazî û pêkhateyên xwe re nîqaş kirin. Ji ber ku ew wekî nûnerên sazî û pêkhateyên xwe cihê xwe di meclîsê de digirin. Zêhniyeta zilam gelekî li vir hakim e. Hemû kes ji rêxistin yan partiyên cuda ne. Her sê pêkhateyên olî hene: Êzidî, Mesihî û Misilman. Her olekê û baweriyekê nêrîn û qaydeyên wan di van mijaran de hene. Me xwest ku em bikin zagoneke ku her netewe û bawerî wê hembêz bike û kesek wê li dijberî xwe nebîne. Di rûniştina dawî de bend bi bend me nîqaş kir û da dengdanê."[457]

Di encama van xebatan de Meclîsa Rêveberiyê ya Kantona Cizîrê di rûniştina xwe ya 27'an a sala 2014'an de '***Rêgezên Bingehîn û Ferweriyên Giştî yên Jinê'*** li ser bingehê hevpeymana civakî û erêkirina Meclîsa Zagonsaz ji bo parastina jinê ji zilm û zorê û misogerkirina mafên wê yên rewa di 1'ê Mijdara 2014'an de pejirandin. Ev qanûn bûye yek ji qanûnên ku herî zêde bandora xwe li ser jiyana jin, malbat û civaka Rojava kiriye û herî zêde di aliyê erênî û neyînî de hatiye nîqaş kirin. Bi kurtasî em dikarin bêjin ku ev qanûn li pêşiya lêpirsînên tabû, hişmendî û kevneşopiyên baviksalar vekir.[458]

Jinên tevahiya pekhateyên herêman yên ku ji dagirkeriya çeteyan dihatin rizgarkirin, ji xebatên Mala Jinê û derfetên qanûnên jinê îlham girtine. Piştî ku bajarê Til Koçerê di 26'ê Cotmeha 2013'an de ji çeteyên Cebhet El-Nusra hatibû xilaskirin, mamosteya Kurd, Ehlam Elî tevî xwendekarên xwe – bi pirranî jinên Ereb yên ciwan ji gundên nêzîkî bajêr – dest bi birêxistinkirina xebatên Mala Jinê kir. Ew bi xebata Mala Jinê ya Qamişloyê hisiyaye û jê sûd wergirtiye. Bi vî rengî, wan Mala Jinê ya Til Koçerê li mala serokê El-Nusra vekiriye piştî ku ew ji bajêr reviyabû. Şagirtên jin ji otorîteya xwezayî ya mamoste Ehlem hez dikin. Mamoste Ehlem li ser gavên xwe yên destpêkê dibêje, "*Min bi şagirtên xwe yên dibistanê re fikir û felsefa Rêber Apo parve kir û ew jî hatin tevlî kar bûn. Ev bûye sê sal em bi hev re di Mala Jinê de kar dikin. Li gundê min jinan pirr êş dikişand û hertim bindest bûn. Ji civakê re pirr perwerde lazim e heta maf û rastiya jinê qebûl bikin."*[459]

Endama lijneyê sulhî, Sumeya bi serbilindî rave dike ku ew ji sedî 95'ê dozên jinan ên ku tên cem wan, bi hêza xwe çareser dikin: *"Em hemû bi hezkirin û qenaeta xwe tevlî vî karî bûne. Em fonê nastînin. Pirr caran em wek Mala Jinê diherin ziyareta malan. Em dibînin jin ji zilamê xwe ditirse û wek zilamê wê dibêje, 'ji wan re qehwakê çêke û bila zû rabin, herin' heta zilam nayê bi me re rûnanê. Ew nikare bêje, 'ez dixwazim derkevim, zêhniyeta xwe biguherim'. Ji ber ku kes vî mafî nade. Hîna pirr xelk ji Mala Jinê ditirsin û naxwazin ku jinên wan werin Mala Jinê. Ew dibêjin, 'Mala Jinê zêhniyeta jinên me diguherîne'. Heger em zêhniyeta zilam neguherînin, pirr zehmet e ku em zêhniyeta jinê biguherin. Pirraniya pirsgirêkên ku tên cem me pirsgirêkên malbatî ne, wek zewaca bi temenê piçûk û berdanê. Dema nû Mala Jinê ava bû, jin nedihatin, pirsgirêkên xwe nedigotin. Lê ji du salan û vir ve êdî hinekî pêşketin çêbû. Jinê hêz girt, dibêjin 'em êdî nikarin zilmê tehmûl bikin'."*[460]

[457] Çavkanî li heman cihî

[458] Bandora Qanûna Jinê di beşa *'Bandora Şoreşê li ser Rewşa Jin û Civakê'* ya vê pirtûkê de hîn berfîrehtir tê şirove kirin.

[459] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Koçerê re, 2017

[460] Çavkanî li heman cihî

Emel him endama Mala Jinê him jî hevseroka navenda kahrebê ya bajar e. Ew dibêje, *"Dema YPJ û YPG'ê Til Koçer rizgar kir, me hîs kir ku em ji zindanê derketin. Wê demê hevalekê pirtûka Rêber Apo ya Sosyolojiya Azadiyê da min. Min bersiva hemû pirs û nakokiyên xwe yên jiyanê tê de dîtin. Me piştî şoreşê fikir û felsefa Rêber Apo nas kir û me jê hez kir. Wiha em tevlî wan xebatan bûn. Berê malbatan nedihişt keç ji malê derkevin. Lê niha em ji gund tên navendê. Xelk pirr li ser me diaxife, lê ji bo me nema xem e. Wê di rojeke nêz de ev axaftin jî rabin û wê xelk keçkê xwe li ser biryara wan bihêle. Adet û teqalîdê malbatên Kurd û Ereb wek hev in. Tenê di aliyê cilan de ferq heye. Jinên Ereb hemû kirasan li xwe dikin, jinên Kurdan şal jî li xwe dikin. Lê belê zêhniyet wek hev e. Dayik û bav dema keçkê xwe mezin dikin ji bo her tiştî ku ew naxwazin keçik bike, dibêjin 'eyb'. Hîna ev zêhniyet heye, lê hinekî kêm bûye."*[461]

Jinên Til Koçerê dibêjin, li gorî bajêr pergala komînan û tevlîbûna jinê ya xebatên civakî û parastinê li gundên derdor baştir bi pêş ketiye. Nexasim tevlîbûna jinên ciwan a nav hêzên YPJ, Asayîş û HPC Jinê bala civakê dikişîne ser xwe: "*Dema keçikek sivîl di kolanekê re bimeşe, her kes li ser wê diaxife. Lê dema şervaneke YPJ'ê di kolanê de dimeşe, bi cilên eskerî û tev kilêşê xwe, her kes silavê lê dike. Mirov hurmetê jê re digirin û dibêjin: Ev jin welatê xwe diparêze, me diparêze!"*[462]

Tevî pêngavên ji bo pêkanîna şoreşa zêhnî û civakî, rêveberiya xweseriya demokratîk li ser hewldanên ji bo naskirina vîn û statûya siyasî ya gelê Rojava di warê dîplomasiya navneteweyî de sekinî. Lê belê hêzên mêhtinger û împeryal her tim deriyên sazî û konferansên navneteweyî ji nûnerên gelê Rojava re girtine. Ji vê zêdetir, dewleta Tirk rêbertiya çeteyên El-Nusra û DAIŞ'ê dikir da ku bi qirkirina gel û jinan bikare erdnîgariya Rojava dagir bike. Li ser esasê vê armancê û vê plansaziya dewleta Tirk, di salên 2014 - 2015'an de li herêmên Rojava hemûyan şerên dijwar di navbera YPJ-YPG û çeteyên DAIŞ'ê de qewimîn.

g) Di Berxwedana Kobanê De Dîroka Jinê Ji Nû Ve Hatiye Nivîsandin

Di dîroka Şoreşa Rojava û têkoşîna azadiya jinê de berxwedana Kobanê xwedî wateyeke bêhempa ye. Piştî pêngava şoreşgerî ya 19'ê Tirmeha 2012'an gelê Kobanê, gund û bajarê xwe bi xwe bi rê ve dibir. Sara, endama Kongra Star a Kobanê li ser vê pevajoyê dibêje: "*Mala Jinê, dadgeh, dibistan, meclîsa gel ava bûne. Bi pirranî cihê wan di avahiyên dewletê yên berê de bû. Me taxên xwe bi navên nû yên Kurdî bi rêxistin dikirin. Karê me pirr xweş meşiya. Gel pirsgirêkên xwe bi xwe çareser dikir. Lê dijmin salekê tehmul nekir û 20'ê Tîrmeha 2013'an ji aliyê Şerqî ve dest bi êrîşê kir."*[463]

- **Şerê li dijî El-Nusra**

Şerê Kobanê bi êrîşên çeteyên El-Nusra li ser şênî û saziyên Kurdan di şeva 19'ê Tîrmêhê qulibî 20'ê Tîrmeha 2013'an de li Girê Spî dest pê kir. Çeteyan ji wir berê xwe da Kobanê. Li hemberî vê,

[461] Çavkanî li heman cihî

[462] Çavkanî li heman cihî

[463] Hevpeyvîn bi Sara, Edlê û Semîra re, Kobanê, 2017

hêzên YPJ-YPG'ê tevî gel parastina xeta gundên Kobanê kiriye. Şerê şoreşgerî yê gel hatiye meşandin û bi ser ketiye: Jin, ciwan û ixtiyaran, her kesê/î ku karibû rahêje çekê, ketiye kozikan û ji bo parastina warê xwe, şer kiriye. Gelek jinên ciwan di vî şerî de hêza xwe nû nas kirine.

"Berê ku şer dest pê dike di hêza YPJ'ê ya Kobanê de 45 hevalên jin hebûn. Lê ew ne hêzê herêmî bûn. Ji ber zêhniyeta eşîrtî civaka Kobanê ev qebûl nedikir ku jinek him di nav hêzên leşkerî de be him jî di nav jiyana malbatê de. Feraseta civaka feodal ev bû: Yan jin ê wekî şoreşger tevlî bibe yan jî li malê be! Rojekê piştî salvegera rizgarkirina Kobanê ji destê dewletê, di 20'ê Tirmehê 2013'an de şerê me bi Ceyş el-Hur û El-Nusra re li Girê Spî dest pê kir. Di nav hefteyekê de bi carekê sed hevalên jin tevlî bûn. Hejmara hevalên jin ji ya hevalê xort zêditir bû. Malbat dihatin bi xwe keçên xwe dianîn navenda YPJ'ê. Wan dixwest ku keça wan perwerde bibe û tevlî bibe ji bo ew bikare gundê xwe biparêze. Bav diçû mewzî, keça xwe bi xwe re dianî. Pirr balkêş bû. Gel digot, 'Em nahêlin ku herriya me bikeve destê çeteyan!"[464]

Endama fermandariya YPJ'ê Narîn Efrîn jî dide xuya kirin ku *"zehmetiyên ku berê di tevlîbûnên jinê de li Kobanê dane der, êdî derbas bûne. Ew tabû hatine şikandin. Êdî bawerî û quweteke mezin hebû. Êrîşa yekemîn di salvergera yekemîn a Şoreşa Rojava de ji aliyê Girê Spî li ser gundên Kobanê çêbû. Hevalên jin wek tabûrek bi seyara xwe, doçka xwe û fermandariya xwe ketin vî şerî. Li Kobanê wek şehîda yekemîn Hevala* ***Necbîr*** *li ser doçka şehîd ket. Ew doçkacî û leheng bû. Heval ketine çemberê wê hewl dida [wan] xilas bike."*[465]

Wekî şehadeta Necbîr Kobanê, berxwedan û şehadeta **Peyman Kobanê** jî bandoreke mezin li ser gelê Kobanê û Girê Spî çêkir. Şervana YPJ'ê Peyman bi xwe ji gundekî Kobanê bû. Hevrêyên wê dibêjin, di şerê dijwar yê li gundê Gir Hiso de hevrêyên li cem wê hemû şehîd ketibûn. Ew bi xwe jî di vî şerê de birîndar bûbû û di dawiyê de bombeya xwe bi xwe de diteqîne ji bo nekeve destê çeteyan. Şehîda seyemin a jin li Kobanê mamoste **Viyan Amara** bû. Berî ku şer dest pê bike ew di xebatên Saziya Zimanê Kurdî û avakirina dibistanan de bi risteke pêşeng rabûye. Wê di nav mamoste û şagirtiyên Kobanê de hezkirina zimanê Kurdî bi pêş dixist û bi xwe jî hat hezkirin. Dema ku şer dest pê kir, seferberî çêbû. Şagirtên mamoste Viyan dibêjin, wê roja ku çeteyan êrîşî Girê Spî kir ew hatiye, çeka xwe girtiye û bi hêrseke mezin çûye eniya şer. Dema ku çete bi çekên giran, top û tangên xwe ketin gundê Kendalê, Viyan Amara bi şerekî fedaî pêşengtiya berxwedanê kir. Di encama vê berxwedanê de bi dehan çete hatin kuştin û êrîşên El-Nusra di vê eniyê de hatin şikandin. Şervanên YPJ-YPG'ê jî dest danîn ser tang, gelek çek û cebilxaneyên çeteyan. Dayikên Kobanê dibêjin, dema ku şervanan tangeke dijmin anî bajarê Kobanê, êdî baweriya her kesî bi hêza xwe ya parastinê çêbû. Piştî şehadeta Viyan Amara ku pêşenga vê berxwedana serketî bû, bi sedan jinên ciwan da ser rêya wê û tevlî nav refên YPJ'ê bûn yan jî bûn mamosteyên zimanê Kurdî.

Şehîd Necbîr, Şehîd Peyman û Şehîd Viyan li hemberî hêzeke zêde ya dijmin heta dawiyê şer kirin û mewziya xwe bernedan. Helwesta wan ya berxwedanê di vî şerî de bûye çandeke berxwedanê ya YPJ û YPG'ê. "*Em ketin nav şerekî dijwar de, lê di şerê Kobanê de nasnameya jinê derket [holê]. Baweriyeke mezin çêbû. Heya DAIŞ'ê êrîşê bajarê Kobanê kir, jin hertim di nav şer de bûn. Di şer de jin wek fermandar hatin qebûlkirin. Nasnameya hevalên jin di kesayetên Hevala Necbîr, Hevala*

[464]Hevpeyvîn bi Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

[465]Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

Peyman, Hevala Viyan û Hevala Sozdar de derketin [pêş]. Hevala Sozdar ji gundê Yaramaz a Kobanê bû. Di nav saleke hundirê YPJ'ê de bûye fermandarek a ku êrîşên li ser çeperên çeteyên DAIŞ'ê da meşandin. Di kesayeta Hevala Sozdar de bipêşketinên pirr mezin di hundirê salekê de çêbûn. Her kesî ev li ber çavê xwe dît. Li cihên ku hevalên jin lê hebûn, bawerî, hişyarbûn û exlaqdarbûn zêdetir bû."[466]

Endama fermandariya YPJ'ê Meryem Kobanê jî guhertinên ku bi tevlîbûna şer di kesayetê jinên Kobanê de çêbûne bi mînaka kesayeta Şehîd Sozdar Yaramaz dinirxîne. Di 5'ê Mijdara 2013'an de Hevala Sozdar li Gundê Bîrkino tevlî kervana şehîdan bû: "*Li Kobanê ji bo jinan tê gotin 'eksîk', yanî 'jin kêm aqil e, nikare'. Lê li hemberî vê keç û jinên Kobanê taybetmendiyên xwe yên neolîtîk jî diparastin. Bi cesaret û bi xwe bawer in. Hevala Sozdar ji malbateke welatparêz ji gundekî Kobanê bû. Ew di mewziya herî pêş de bû. Lê ew hat û pêşniyar kir ku ew ê vê mewziyê tenê wek hevalên jin bigirin û hevalên xort derbasî cihekî din bibin. Wê got, 'Em ne rehet in dema ku em şev û roj di nav hev de bin. Wek hevelên jin, em dikarin mewziya pêşiya hevalê xort bigirin, baweriya me heye.' Min jî qebûl kir. Hevalên xort pirsgirêk derxistin, lê di dawiyê de wan itîraf kir ku ew bi xwe di nobeta xwe de pirr sist in. Lewma dixwestin ku hevalên jin li cem wan hebin ji bo zêdetir hişyarî hebe. Bi vî rengî hevalên jin di mewziya herî pêş de, tenê 200 metroyan dûrê çeteyên El-Nusra bi cih bûn. Wan hemû tedbîrên xwe ji bo şer û ewlekariyê girtin. Yek ji wan jî birîndar nebû."*

Heta payîzê şerê El-Nusra li du eniyan dewam kir. Li gundê Sûskê li ser sînorê Tirkiyê şervanên YPJ û YPG'ê di 16'ê Îlona 2013'an de çalakiyeke dîrokî kirin: *"Di çalakiya Sûskê de cara yekem di dîroka YPJ-YPG'ê de me ewqas çek li ser dijmin rakirin. 40 çek hevalên me dest dan ser. 3 - 4 hevalên jin di nav grûba çalakiyê de bi risteke pirr xurt di baskê êrîşê de leyîstin. Wan cesaret da. Jinan bi vî rengî tola xwe ji zayendperestiya civakê distand. Ev eşqa azadiyê bû. Bi eşq jiyan û xweparastinê hişt ku ev hêz di her hevaleke de bi pêş bikeve."*[467]

Di encama windahiyên giran de El-Nusra û komên din ên girêdayî Ceyş el-Hurr daxwaza rewestandina şer kirin. Lê ji Îlona 2013'an ve êdî pevçûnên bi çeteyên DAIŞ'ê re jî bi pêş ketin. DAIŞ'ê li deverên Reqa, Minbic û Cerablusê xwe bi cih kiribû û hewl dida ku desthilatdariya xwe ya xwînrêj li ser Bakurê Sûriyê belav bike. Komên Ceyş el-Hurr wekî El-Nusra jî bi pirranî tevlî DAIŞ'ê bûn. Gelê Kobanê ji aliyê aborî, leşkerî û siyasî ve di bin dorpêçê de bû. Rêyên çûn û hatinê di her çar aliyan de hatibûn girtin. Av, mazot û kahrebe li ser bajêr hatin qutkirin. Gel di peydakirina pêdiviyên xwe yên jiyanî yên wekî derman û şîrê zarokan de zehmetiyên mezin kişandin. Lê belê dorpêç û siyaseta birçîhiştinê nikaribû vîna gel bifetisînin. Bi rêbazên wek kolana bîrên avê, hevgirtin, tedbîrên erzaq û ewlekariyê gelê Kobanê hewl dida çareseriyan bibîne û jiyana xwe bidomîne.

- **Şerê li dijî DAIŞ'ê**

Di sala 2014'an de xuya bû ku êrîşên li dijî kantona Kobanê di çarçoveya konsepteke berfireh a navdewletî de dihatin bipêşxistin. Plansaziya dewleta Tirk û şirîkên wê ew bû ku piştî ketina çeteyên DAIŞ'ê ya Kobanê, ew ê dor li kantonên Efrîn û Cizîrê jî bigirin û wan dagir bikin. Bi qirkirina Kurdan, wan dixwest pergala xweseriya demokratîk li Rojava hilweşînin. Li gorî vê armancê, rayedar û arteşa Tirk bi her awayî çeteyên DAIŞ'ê amade kiribûn. Hevseroka Meclîsa Gel a Kantona Kobanê ya wê demê, Eyşe Efendî ji bo vê pîlanê dibêje, "*DAIŞ'ê ne tenê şer kir ji*

[466] Çavkanî li heman cihî

[467] Hevpeyvîn bi Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

bo bikeve Kobanê. Piştre dixweste Efrîn û Cizîrê jî bigire. Ev pîlana Rojhilata Navîn a hêzên împeryal a Emerîka û Tirkiyê û Rûsyayê bû ku berê hatibû amadekirin. Tê de Rojava hatibû firotin. Ji milê PDK'ê ve Kobanê û Efrîn hatibûn firotin. Lê ev pîlan di Kobanê de hatiye şikandin. Nexşeya Rojhilata Navîn û siyasetên hêzên navnetewî bi serketina berxwedana Kobanê hatine guherandin. Cara yekem di dîrokê de dinyayê ji me re got: Kurd hene!"[468]

Li gorî vê pîlanê di Sibata 2014'an de çeteyên DAIŞ'ê ketin bajarê Sirînê û dest bi pêla yekemîn a êrîşên li dijî gundên kantona Kobanê kirin. Li gelek cihan şerê giran rû da. Şervanên YPJ û YPG'ê yên gelekî hêja şehîd bûn. Lê belê bi ruhê berxwedana Şehîd Viyan hêzên YPJ û YPG'ê careke din li gundê Kendalê êrîşên çeteyan şikandin. Li hemberî berxwedanê ku bi pêşengiya YPJ û YPG'ê li gundên Kobanê bi piştgiriya gel bi pêş ket, çeteyên DAIŞ'ê windahiyên mezin dan. Hingê wan fêhm kiriye ku ew ê nikaribin bi rehetî bikevin Kobanê.

"Bi taybetî dema ku jinan cihê xwe di nava şer de girt wê demê heybeteke xwe cuda hebû. Ji ber ku jinan gav paş ve neavêt. Jin teslîm nedibûn. Bi wêrekî tevlî şer dibûn, li dijî çeteyan disekinîn. Çete jî ji hevalên jin ditirsiyan. Wan digot, 'Bila ew nêzî me nebin! Ji ber ku jin nêzî me bibin teslîm nabin, lê wê xwe bi me de biteqînin.' Lewre êdî kes nikare bi çavê berê li jinan binêre. Berê bi çavekî cinsî li jinê dihat nêrandin. Lê belê tevlîbûna jinê ya şer hişt ku jin êdî wekî hêzeke pîroz bê dîtin. Êdî gel bixwe dihat, keçên xwe didan şoreşê da ku tevlî bibin. Hinek malan jî du keçên xwe bi hev re dianîn ji bo tevlî bibin. Her wiha, dema ku xort tevlî dibûn, wan xwuşka xwe jî bi xwe re dianî û tevlî dikir."[469]

Pêla duyemîn a êrîşên DAIŞ'ê li ser gundewarên Kobanê di Tîrmehê de jî negihîşt armanca xwe. Yekîneyên YPJ'ê dîsa di parastina gelek gund û girên Kobanê de pêşengî kir û tevî şervanên YPG'ê, mil bi mil ve şer kir: *"DAIŞ'ê di Tîrmehê de di eniya xerbe de êrîş kir. Li vir berxwedana Hevala Berfîn bi grûbeke hevalan re çêbû. Di bin fermandartiya Hevala Berfîn de dîsa hevalên jin di mewziya herî pêş de bûn. Dijmin êrîş kir gundê nêzî Ava Firatê. Bi berxwedaniya wan hevalan bi rastî dijmin şaş û paşo bû. DAIŞ'ê gotibû, 'Em ê herin wan hemûyan bi dest bigirin. Kesek nikare xwe ji me xilas bike!' Lê di kesayeta Hevala Berfîn, Hevala Hêlîn û hevalên din ên pê re, rastî berxwedanê hatin. Cara yekem hevalên jin bi serê xwe çûn û çalakî kirin ser vê quweta DAIŞ'ê. Wekî grûba hevalên jin ew çûn, mayin datanîne û çek li ser dijmin rakirine. Hevala Hêlîn Amed piştre li Girê Sêvê şehîd ket."*[470]

Piştî fermana li dijî Şengalê, çeteyên DAIŞ'ê dest bi êrîşeke topyekûn û dijwar li dijî Kobanê kir. Di 14'ê Îlona 2014'an de çeteyên DAIŞ'ê ji hemû aliyan ve bi çekên giran, top û tangan êrîşê gundên Kobanê kir. Beriya vî şerî fermandariya YPJ'ê bi hemû hêzên xwe li Kobanê civînên awerte çêkiribûn. Di van civînan de hatibû nîqaşkirin, *'ji bo wek Şengalê li Kobanê neyê, pêwîst e em çi bikin?'* Fermandar û şervanên YPJ'ê wê demê soz dabûn ku her yek wê xwe bi rêxistin bike ji bo ew bikarin tola jinên jinên Şengalê rakin. Wan biryar da ku ew ê heta dawiyê ji bo parastina jinê, ax û gelê Kobanê bi hêza xwe hemûyî şer bikin.

- **Berxwedana Mekteba Serzorî**

Li ser bingehê vê sozê di vê pevajoya şer de berxwedana yekemîn li dibistana gundê Serzorê, 35

[468] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

[469] Hevpeyvîn bi Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

[470] Çavkanî li heman cihî

kîlometreyan li aliyê rojhilatê Kobanê, tê meşandin. Di 15 - 16'ê Îlonê de 13 şervanên YPJ û YPG'ê bi pêşengiya Peyman Tolhildan, Berfîn Çiya, Gulistan Qendîl, Mizgîn Cûdî, Berçem Cûdî û Rodî Efrîn de xwe kirin mertal ji bo hêzên dijmin bidin sekinandin. Pirraniya şervanan nû bûn û bi xwe ji Kobanê bûn. Tevî ku wan karibûn vekişin jî, ew bi biryar û bîrewer dimînin, û heta fişeka xwe ya dawiyê şer dikin. Di şerê şev û rojekê de ew derban li tangên dijmin dixin, 70 çete kuştin û nehiştin ku êrîş werin ser gundên din. Gotinên bi coş yên şervanan li dibistana Serzorî li ser cihazê ji hevrêyên wan ên li çeperên dervê re dibûn ruh û xeta berxwedanê ya Kobanê: *'Em paş de nakişin. Em ê li vir dijmin bişkînin. Dijmin ancax li ser cenazeyê me re here Kobanê!'*

Meryem Kobanê ku bi berxwedêran re li ser cîhazê di têkiliyê de bû, dibêje, "*Bi sedan çîrokên berxwedana jinê hene. Çîroka berxwedanê ya mekteba Serzorê dîrok nivîsand. Di roja yekemîn a şer de penc hevalên jin tê de hebûn. Piştre du hevalên xort çûn cem wan û çend hevalên din jî hatin. Dijmin bi hemû hêza xwe, bi tang û topan, bi sedan çete wekî kerî êrîşê vê mektebê dikir. Lê hevalan digot, 'Em nahêlin ku destê dijmin bigihînine me.' Heval Peyman hebû. Porê wê pirr dirêj bûn. Ew di qata jor de bû. Dijmin di qata jêrê de bû. Wê demê wê ji me re li ser cîhazê digot, 'Ez ê her têlê porê xwe bixim benek ku ez pê dijmin bixeniqînim. Ez ê çawa bihêlim ku destê xwe bigihînin porê min?' Ev felsefe û hezkirina jiyanê ye. Wekî çîroka mîtolojîk ku jin porê xwe bixe şûrek ji bo xwe li hemberî xirabiyê biparêze. Penc hevalên jin tev hevalên din yên xort heta deqîqa xwe ya dawiyê dibêjin, 'Me mirin bi bin xistiye. Em ê bi ken biçin mirinê. Em nahêlin ku lingê qirêj pê lê Kobanê bikin."*[471]

- **Koçberiya Gel ber bi Bajêr ve**

Şer bi lez û dijwarî li ser xetên gundên Kobanê belav bû. Qirîna jin, mêr û zarokên Şengalê ku meha beriya wê rastî qirkirinên hovane yên DAIŞ'ê hatibûn, hîna di guhê gelê Kobanê de bû. Bi kiryarên xwe, çeteyan da xuyakirin ku ew dixwazin heman qirkirinê bînin serê jin û gelê Kobanê jî. Endameke YPJ'ê dibêje: *"Ez di xeta Xerbî de bûm, aliyê Cerablus. 15 heval şehîd ketin, şeş ji wan hevalên jin bûn. Cenazeyên wan ketin destê çeteyan. Wan cenazeyên hevalên jin birin, di nav şahrê de tazî kirine û teşhîr kirine. Ji wan re digotin 'ew fahişe û kafir in'. Pirr tiştên dervê exlaq dikirin. Bûyerên wisa kîn û hêrsa me hîn zêdetir dikir."*[472]

Ji ber tirsa qirkirinê bi hatina DAIŞ'ê re xelkê gundên Kobanê berê xwe dan navenda bajêr. Endama rêveberiya Yekîtiya Star a Kobanê Sara dibêje, ew hîna di civînê de bûn û li ser plansaziyên parastinê wan nîqaş dikir dema ku koçberên gundan gihan bajêr: *"Me plan kiribû ku em nuqteyên ewlekariyê deynin li ser rêyan. Lê dema ku em hîna di civînê de bûn miletê me ji gundan dihat û digot: 'DAIŞ hat û ket gundê me.' Li cem DAIŞ'ê sîlehên giran hebûn. Di destê hevalên me de tenê keleş [çekên AK-47 ango kalaşnîkov] hebûn. Pirraniya malbatan jî bê sîleh bûn. DAIŞ ji gundekî derbasê gundekî din dibû. Tirs ket dilê milet. Ji ber ku berê jî êrîş li ser Şengalê hebû, komkujî û ewqas jin ketin destê DAIŞ'ê. Malbatan tenê zarokên xwe rakirin û reviyan. Herî kêm kesek neket destê wan."*[473]

[471]Çavkanî li heman cihî

[472]Hevpeyvîn bi Sarya û Amara re, Kobanê, 2017

[473] Hevpeyvîn bi Sara, Edlê û Semîra re, Kobanê, 2017

Dewleta Tirk ji bo derbasbûna koçberan deriya sînor vekiribû. Lê belê helwest û kiryarên dewleta Tirk hemûyan nîşan dida ku vekirina sînor ne bi armanceke insanî ye, lê bi hesabên cuda pêk hatiye. Bi qutkirina gel ji axa xwe û valakirina bajêr re dewleta Tirk pîlanên xwe yên qirkirinê xistin meriyetê. Armancên wê tinekirina tevgera azadiyê û parçekirina civakê bû. Dewleta Tirk zanîbû ew ê nikaribe berxwedana gel bide sekinandin bêyî ku gelê Kobanê ji ax, çand û zimanê wî qut bike. Lewma rayedarên Tirkiyê beriya destpêka êrîşên çeteyên DAIŞ'ê kampên AFAD'ê wekî amûrên kontrol kirin û bişaftina gelê Rojava amade kiribûn. Gelek jin ku ji tirsa komkujiyê reviyan, dibêjin, di dilê xwe de ew bi tehlûkeya van pîlanên qirêj hisiyane û dudilî bûne.

"Beşek milet sînor derbas kir, beşeke din jî li bajêr sêkinî. Belkî rewş biguhere û ew bizivirin. Gelek malbatan xwe mehrûmî her tiştî kiribû ji bo bikarin mala xwe ava bikin. Terkkirina vê malê jî tiştekî pirr bi zehmet e. Jinan dema ku sînor derbas dikir, zarokek di hembêza wan de hebû, yek jî bi destê xwe dikişandin. Lê wan dîsa li paş xwe dinêrî û difikirîn, 'em ê kengê vegerin?' Destê te ji welatê te nabe. Me hertim digot, 'em bindest in'. Lê dema ku tu bi zorê ji welatê xwe derdikevî tu bi êşa welatê xwe girantir dihesî."[474]

Di wan rojan de berxwedana şervanan bi ruhê berxwedana mekteba Serzorî di hemû eniyên Kobanê de dewam dikir. Meryem Kobanê vê qonaxê wiha dinirxîne: "*Parastina gundan bi rastî zor bû. Hêza me nebû ku me karîbûna hemû gundan biparêzin. Ji ber komkujiya Şengalê me rêbaza xwe guhert. Me got, em ê li gorî hêza xwe derdora bajar bigirin û bi ewle bikin ji bo di gundan de komkujî neyên kirin. Lê ev kêmasiyek bû. Pêwîst e kesek ji bajar û gundan neçûba. Em hîn di gundan de bûn û me dît ku bajar vala kiribûn. Ev şaş bû. Me dikaribû jin û zarokan derbas bikin. Lê kesên ku karibana şer bikirana, yên ku destê wan çek digirt, yên ku karibûn mewziyan çêbikin, erdê bikolin û alîkariyê bikin, karîbûn neçin. Me vêna baş bi rêxistin nekir. Ji bo vê, gelek koçberî çêbû. Di bin navê parastinê de ewqas koçberî şaş bû. Li hemberî dijminekî ewqas xedar parastina civakê esas e. Lê me karibû rêbazên cuda pêş xistebana. Şer bê gel çênabe. Hêzên din bi pera leşkerên xwe tînin. Lê em hêzeke manewî ne. Em hêza xwe ji gel digirin. Ji ber ku em ji bo gel şer dikin. Dîsa gel hebû ku bi îradeya xwe ma. Wan bi xwe got: 'Em naçin!' Dayika heft zarokan, zilam û zarokên xwe şandin. Lê ew bixwe ma. Wê got, 'Zilamê min pirr cesûr nîne. Bila ew biçe'. Lê ew bixwe maye û di nav şer de pirr xwînsar bû. Dema çete êrîşê derî kirin ew ket nav vî şerî de."*[475]

- **Berxwedana Xeta Gundan û Mişteûrê**

Di şerê giran û bênavber de ku di xetên gundên Kobanê qewimî pêşengên berxwedanê yên wekî fermandara YPJ'ê Zozan Kobanê û fermandarê YPG'ê Êrîş jî şehîd bûn. **Zozan Kobanê** eniyek koordîne dikir û bi dilsoza peyama berxwedana Serzorî bû. "*Dema ku talîmata paşve kişandinê hatiye dayîn, Hevala Zozan got, 'Heval, ez paş xwe dinêrim Kobanê xuya dike. Ez ku ve paşve bikişînim? Wekî şoreşgerekê xurura min qebûl nake, ez xwe paş ve bikişînim. Pêwîst be ez xwe di dijmin de parçe parçe bikim. Ez gavekê pêş de bavêjim, lê ez gavekê paşde navêjim.' Wê heta dawiyê şer kiriye. Di dawiyê de jî birîndar bû, lê heta şehadetê bi kîn û cesaret li hemberî dijmin şer dikir."*[476]

Bi pêşengiya fermandarên YPJ'ê **Rêvana Rojava** (Medîne Mamo) û **Arîn Mîrkan** (Dilar

[474] Çavkanî li heman cihî

[475] Hevpeyvîn bi Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

[476] Hevpeyvîn bi Sarya û Amara re, Kobanê, 2017

Gencxemîs) ve destaneke din a berxwedana jinê li Kobanê hatiye nivîsandin. Di 26'ê Îlona 2014'an de Rêvana Rojava bedena xwe li gundê Gulmetê kir mertal. Piştî derbên giran xwarin, çeteyên DAIŞ'ê hîna nû serê Cotmehê bi tangên xwe, xwe gihandin gundên derdora bajarê Kobanê. Hevrêyên wê li ser wate û bandora çalakiya wê ya fedaî dibêjin:

"Çalakiya fedaî ya yekemîn di şerê Kobanê de Hevala Rêvana çêkir. Ew keçeke Kobanê bû. Ew piştî avakirina YPJ'ê li Kobanê nû tevlî bû. Tenê perwerdeya şervanên nû dîtibû. Lê ruhê wê ya fedaîtî, zanebûn û ruhê wê yê demê û yê jinê pirr xurt bûn. Wê xwe feda kir ji bo li pêşiya DAIŞ'ê rê were girtin. Di xeta xerbî de ew birîndar bû û şer kir heya hevalên xwe yên birîndar hemû xilas kirin, bombeyên wan li cem xwe kom dike. Hevalên li cem xwe hemûyan dişîne cihekî ewle. Piştre dizivire û xwe di nav hêzên dijmin de diteqîne."[477]

"Dema ku tang digîhin binya Mişteniûrê, Hevala Rêvana digot, 'Ez ê nehêlîm ku çavê min bibînin ku DAIŞ'î di kolanên Kobanê de dimeşin.' Çalakiya wê bandoreke pirr cuda da avakirin. Ew birîndar bû. Lê bi bombên di destê xwe de ew dike wekî miriyan. Wextê ku çeteyan cenaze didîtin, ew kom bi kom direviyan ser wana. Dema ku Hevala Rêvana çalakiya xwe kir cenazeyê wê û yên dijmin tevlîhev bûn. Piştî vê û şûnde, careke din çete nediçûn ser cenazeyên hevalan. Bi taybetî wan destê xwe neda cenazeyên hevalên jin. Berê dihatin, pê dileyîstin, serê wan careke din jêdikirin, parçe parçe dikirin. Lê piştî çalakiya Hevala Rêvana, xofek ji cenazeyên hevalên jin ket dilê dijmin. Hevala Rêvana bi çalakiya xwe guhertinek di şer de da avakirin. Şehadeta wê bûye çalakiya parastina bedena xwe û bendana jinan bi tevahî."[478]

Arîn Mîrkan jî di berxwedana Girê Mişteniûr de biryara çalakiya fedaî dide. Di 6'ê Cotmehê de ew bi teqandina bedena xwe, vîna jinên berxwedêr nîşan dide û bipêşveçûna tangên DAIŞ'ê asteng dike. Her wiha hevrêyên wê di çeperên li ser serê Mişteniûrê bi hêza çalakiya wê berxwedana xwe didomînin. Şervana YPJ'ê Delîla Gever di berxwedana Mişteniûrê de jî careke din wekî bikarhênera bisvîngê[479] bi rista xwe rabûye. Rêhevalên wê dibêjin, "*Hevala Delîla kû dere tangek bidîta, wê lêdixist. Êdî wê bisvînga xwe weke keleş bi kar dianî."* Heta şehadeta xwe di 7'ê Cotmehê de Delîla bi vê lehengî û pisportiyê şer dikir. Di dawiyê de Nûjîyan ji koma xwe ya li ser serê Mişteniûrê bi tenê mabû. Şervana YPJ'ê Amara Kobanê wiha behsa wê dike: *"Hevala Nûjiyan, bi moral di çemberê dijmin de ber xwe da. Bê hêvî nema. Ew bi tena xwe jî ma, lê got, 'ez Mişteniûrê bernadim! Hûn tenê dikarin ser cenazeyê min re derbas bibin.' Bi rastî jî wisa kirin. Pê lê cenazeyê Hevala Nûjiyan kirin, heya derbas bûn."*[480]

Bi vî rengî DAIŞ'ê di 5'ê Cotmehê de Girê Mişteniûrê girt. Lê di kesayetên Arîn Mîrkan û Rêvana Kobanê de êdî rista pêşeng a YPJ'ê di cîhanê de hatiye nasîn. Ev bû mijara meraq û sedema piştgiriya jinên cîhanê. Narîn Efrîn dide xuyakirin ku di vê pevajoyê de gelek rojnamevan dihatin û wan dixwest çavkaniya hêza berxwedana jinê fêhm bikin:

"Hevala Arîn û Hevala Rêvana ji çi bi bandor bûn ku bi bombaya xwe çûn ser dijmin û xwe teqandin? Ew bi ruhê Zîlanan û Bêrîtanan bi bandor bûn. Lewma perwerdeya dîroka jinê ya

[477] Hevpeyvîn bi Sorxwîn Rojhilat re, endama YPJê, Kobanê, 2017

[478] Hevpeyvîn bi Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

[479] çeka RPG 7

[480] Hevpeyvîn bi Sarya û Amara re, Kobanê, 2017

Kurdistanê û ya cîhanê pirr girîng e. Ew ji mînakên berwedana jinê li çiyayên Kurdistanê sûd wergirt û bi vê zanebûna ku ew nasnameya hemû jinan temsîl dikin, wan çalakiya xwe kir. Berê şerê Kobanê, êrîşên li ser Şengalê hebûn. Ewqas jinên Êzdî hatin revandin. Lewma ruhekî tolhildanê hebû. Berxwedan ne tenê bi çek, lê bi zanebûna dîrokî, bi moral û hezkirina te ya mirov çêdibe. Li şûna ku dinya fikrê me meraq bike, zêdetir şiklê me dan pêş. Xweşikbûna YPJ'ê di aliyê fizîkî de dan pêş. Lê jinan ev hêz ji bo şerkirina li hemberî dijminekî ewqas hovane ku zilam jê direvîn, ji kû dere stand? Ev hêz encama fikir, felsefe û îdeolojiyekê bû. Nasnameya YPJ'ê bi şerê Kobanê ve di dinyayê de hat naskirin, lê belê YPJ di asta Rojava de tevlî şer bû û [li] ber xwe dida."

Li ser bingehê vê zanîn û felsefeyê, berxwedana gel û şervanan bi pêşengiya jinê di bin dorpêça çeteyên DAIŞ'ê de li navenda bajarê Kobanê dewam kir.

- **Şerê Bajêr**

Gava ku dorpeç teng bû, êdî pirraniya gelê Kobanê bi kul û birînên giran di dilê xwe de sînor derbas kir û çû Bakurê Kurdistanê. Lê jin û zilam, pîr û ciwanên ku heta rizgarkirina Kobanê di berxwedana dîrokî de cihê xwe girtine jî hebûn. Ew dibêjin, şervanên jin heta dawiyê bi rûyekî ken di mewziyên xwe de şer kirine. Her kesa/ê ku bûye şahide şerê bajer yê ji 6'ê Cotmeha 2014'an heta 26'ê Çileyê 2015'an, piştrast dike ku berxwedana Kobanê bi sekn, vîn û lehengiya jinê bi ser ketiye. Asya Ebdullah wekî hevseroka PYD'ê di berxwedana Kobanê de cihe xwe girtiye. Ew dide xuyakirin ku rêveberiya jinan a bajêr wekî dil û stûna navmalê ya berxwedanê bû:

"Wekî rêveberiya jinê, me di vê demê de pergalek rêveberiyê li gorî rewşa awerte çêkir. Berê şer bikeve bajêr, me depoyên derman û xwarinê amade kirin. Her kesî bi moralekî mezin xebatê xwe meşandin. Êvarê em digihiştin hev û me plansaziyên roja din derdixistin. Piştî vê, rewş giran bû. DAIŞ ketibû bajêr. Êdî her kesî çek rakir ji bo bikare xwe û derdora xwe biparêze. Biryara her kesî zelal bû: ***Em ê li Kobanê bin û têbikoşin. Em ê li ser axa xwe azad bijîn. Ji dervê vê em ti jiyanê qebûl nakin!*** *Hemû heval bi vê nêzîkatiyê têkoşiyan. Ewqas berxwedan çêbû. Ewqas şehadet çêbûn. Tu çi bikî jî, pêwîst e hêza te ya berxwedanê li gorî vê be. Roj hebûn 30 heval şehîd ketin û 70 - 80 heval birîndar bûn.*

Ez ji bo xwe wek şansekî dibînim ku ez şahidê vê berxwedanê bûm. Em şahidê berxwedana hevalên jin bûn, sekna û têkoşîna wan. Bi dehan hevalên jin ên rêveberiyê hebûn ku ji bajar derneketin. Komek hevalên jin hebû, tenê ji bo hevalên birîndar xizmet dikirin. Ew di bin van şertên herî giran de li vê derê bûn. Mazot û xaz tine bû. Wan hevalên jin karton û zibal kom dikirin ji bo bikarin agir pêxin û ji bo hevalên birîndar xwarinê çêkin. Dîsa her kesî bi moral karê xwe dikir. Komeke hevalan hebû, tenê cenazeyên hevalan radikin û vedişartin. Hejmarek hevalan hebû ku bi hevalên birîndar re elaqedar bûn. Grûbek hevalan hebû ku tenê cilê hevalên birîndar dişûştin, ziwa dikirin û cil dişandin cebhê. Her kar bi wate bû. Tevahiya xebatê bi ruhekî hevaltî û manewiyateke bilind meşandin. Pirr caran hevalên birîndar xwe dayatma dikirin ku dîsa biçin şer bikin. Ruhek wiha hebû."[481]

Sara, Edlê û Semîra sê ji wan jinan bûn di nav van xebatên berxwedanê de cihê xwe digirtin. Wan nexwest Kobanê biterikînin. Ew bi keda xwe, bi dil û canê xwe li cem şervanên xwe bûn. Sara bibîranînên xwe wiha parve dike: *"Dema ku şer nêzîkî bajêr bû, ji dervê YPG û YPJ'ê kesek di*

[481] Hevpeyvîn bi Asya Ebdullah re, Qamişlo, 2017

bajêr de nemabû. Cîranên me gişt çûbûn. Ez, keça xwe Şîlan û hevjînê min Mehmûd, em çûn ber sînor. Min ji Mehmûd re got, 'soz bide tu yê min ji bajêr dernexî!' Erdoxan wê demê sînor vekir ji bo hemû gel ji bajêr derbikeve û bajar wê vala bibe. Beriya vê, derbasbûn tenê bi dizî çêbû. Lê îcar grûbên mezin ên heval, ên ciwanan ji aliyê Bakur hatin, derbasê sînor bûn ji bo tevlî şer bibin. Me moral digirt û digot, 'Çete nikarin bikevin Kobanê!' Lê piştre me dît ku Kaniya Kurdan ket. Wê rojê şer pirr giran bû. Em çûn cem hevalên xwe. Bi carekê Edlê rabû û got, 'Rabe. Em herin. Em jin in. Çek bi me re tine ye. Em jî biçin Bakur.' Ew çû ber derî û dîsa vegeriya û got 'Weleh, ez narim! Ez ji hevalan ne çetir im. Ger hemû heval şehîd bikevin, ez jî bi wan re bimirim!'

Ez çûm cem hevalê birîndar. Min cilên wan dişûştin. Îcar Mehmûd telefon kir, 'Sara, divê tu derkevî!' Min jî got, 'Ez dernakevim! Wê rojê me soz dabû hev. Ez ji vê sozê venagerim!' Her zarokeke me jî li derekê bû. Hevalan jî xwest me iqna bikin da ku em ji ber zarokan derbikevin. Mehmûd jî zext li ser min çêkir. Di dawî de em derbasê sînor bûn. Lê ez pirr acîz bûm. Ez pirr hêdî meşiyam ji bo fişekek li min bikeve û ez ji bajer dernekevim. Min xwe hîs kir, wekî ez îxanetê dikim. Moralê min ber televisyonê Tirkan diket. Her tim digotin, 'ha Kobanê ket, ha Kobanê ket.' Gişt derew digotin. Şeş rojan em man li Pirsûsê. Edlê jî bi hevalên birîndar re hatibû ser sînor û hatibû girtin. Dema ku Edlê ji hepsê derket, me biryar da ku em bi hevdu re vegerin. Ez û Şîlan, Edlê û Semîra em vegerîyan. Zarokê din, min teslîmî malbatê kirin."[482]

Edlê serpêhatiyên xwe wiha tîne ziman: "*Dema ku Hevala Sara derbas bû, me cilên birîndaran dişûştin. Hevalan ji me re got, ' Edlê, hûn ê derkevin. Tu yê hevalê birîndar bi xwe re derbasê sînor bikî.' Min got, 'Ez naçim.' Lê min bi sîlehê jî nizanîbû. Min nexwest ser serê hevalan jî bibim bela. Dema ku em hatin derî, min hevala birîndar wekî xwuşka xwe nîşan da. Lê pirsgirêk derketin û em şandin hepsê. Em ketin greva birçîbûnê. Hevalên me berxwedaneke baş kirin. Em anîn dadgehê. Îfadeyên me jî gişt yek bûn. Dixwestin me bibin doktor ji bo fêhmbikin ez keç im an jin im. Lê min nehişt. Piştî şeş rojan em hatin berdan. Min xwe gihand Sara û Semîre û min got, 'Em ê vegerin!' Em her çar derbas bûn. Dengê topan dihat."*[483]

Semîra li ser çûn û hatina xwe di navbera binxet û serxetê de dibêje, "*Min bawer nedikir ku şer wê bikeve bajarê Kobanê. Miletê gundan di destpêkê de hat û çû ber sînor. Milet têl vekirin û derbasê sînor bûn li ser esasê ku zû vegerin. Me jî xwarina hevalan li taxa Kaniya Kurdan çêdikir. Em bi biryar bûn ku em ê [li]ber xwe bidin. Gelek şehîd çêbûn. Em 4 - 5 kes mane. Birîndar li cem me bûn. Hevalan got, 'Hûn jî herin. Her kesê ku nikare silahê rake. Bila here.' Em her çar derbas kirin. Gava ku em gihandin aliyê Bakur, me dît ku leşkerên Tirk û DAIŞ'î li ser sînor sekinîn. Em her çar li malekê li Pirsûse hatin cem hev û me biryar da ku em vegerin Kobanê. Di nav topan de bi şev em gihan. Xortekî ji Amedê şehîd ket. Beriya ku şehîd bikeve dengê wî dihat. Wî got 'Dayê, li min binêre'. Min kefiya wî rakir û got, 'Ez dayika te me.' Min wê demê soz da ku ez ê bimînim."*[484]

Piştî vê rojê Edlê, Sara, Şîlan û Semîra êdî nema ji hev qut bûn. Lê şer li hundirê bajêr her diçû girantir dibû. Di dawiyê de tenê taxek di destê şervanan û xelkê berxwedêr de mabû:

"Wê şeva ku em gihan Kobanê, şer pirr giran bû. Me topên ku diketin dihejmartin, em gihand 150'î. Mala ku em bi tenê tê de bûn jî ji betoneke zirav bû. Roja din, em hatin cem hevalên din. Rojekê teqîneke mezin li ber mekteba reş çêbû. Em çûn aliyê nexweşxanê. Hevalên birîndar xwe bi

[482] Hevpeyvîn bi Sara, Edlê û Semîra re, Kobanê, 2017

[483] Çavkanî li heman cihî

[484] Çavkanî li heman cihî

zorê digihandin. Hinek hevalan yên din radikirin. Hinek destê wan yan lingê wan tine bû. Doktor jî bê benc ew amaliyat dikirin. Esman ji teqînê sor bû. Tirkan jî derî girtin. Dema ku birîndar dihatin, derî digirtin heta heval ber derî şehîd diketin. Wê demê nû derî dîsa vedikirin. Lihêf li ser hevalan, hemû ji xwînê sor dibû. Hinek birîndarên giran di vî halê xwe de ji hevalên xwe pirs dikirin: 'Çawa çêbû? We mewzî berda yan heval tê de hene?' Bi her şehîdê ku me rakir, me soza xwe nû dikir. Êvarê dema ku kehrebe qut dibû, em li cem hev rûniştin, me ji xwe re moral çêdikir. Dinya tarî bû, me hevdu nas nedikir, lê me bi hev re stran digotin."[485]

Edlê dibêje, şev ji bo wê hertim bi zehmetî derbas bûne ji ber ku li şervanên li mewziyan difikirî. *"Him şer bû, him me her sêyan şîva hevalan bi hev re çêdikir. Me digot, 'ger ku mirinek hebe, bila bi hev re be.' Em xwuşk û dayikên hev bûn. Çiqas ji destê me hat, me dikir. Me kesek bê nan nedihişt, cilê şil li kesekî nedikir. Cilê şehîdan me dişûştin û li şervanan dikirin, yên şervanan me dişûştin û li birîndaran dikir. Her roj sibeh û êvarê me xwarina şervanan, ya birîndaran û doktoran çêdikir. Ev dibûn derdora 1.100 kesî. Me xwarinên wekî birinc, sarme, bilxur, lopik û kutilk çêdikir ji bo quwet bê hevalan. Ber êvarê me dest pê dikir heta 3'yê şevê me şîv çêdikir. Em wek dayik di nav hevalan de bûn. Me mewzî nedigirt. Lê me moral û alîkarî da wan."*[486]

- **Çîroka Pîrê**

Dema ku Edla zarok bû jineke pîr ji wê re çîrokek gotibû. Di 4 meh û 4 rojên şerê Kobanê de yên ku hatine serê wan, Edla gelek caran ji xwe pirsiye, wê jina pîr çawa bi van tiştan zanibû. *"Wê digot, 'wê demek were ku zilam cilê dirêj li xwe bikin û serê mirovan jêbikin. Mirov wê mirovan serjê bikin û xwîn wê li kolan biherike.' Wek zarok me digot, 'Pîrê, ev çi çîrok e? Mirov wê çawa mirovan serjê bikin?' Lê di wê şevê de ev çîroka pîrê hat ber çavê min. Me şehîdek anî. Keçikek ji Pîrsûsê bû. Me laşê wê rakir û dît ku serê wê tine ye. Min vê demê got: 'Dayê, te dît? Ev dem hat ku mirov mirovan serjê dikin!'*

Pirr heval li cem me şehîd diketin. Me cenazeyên wan digihandin ambulansan ku ji Bakur dihatin. Di pirr hevalan de mayin teqiya bûn. Parçeyên laşê wan me di bataniyan de kom dikirin. Morga me tijî bû. Ji ber vê, me cenazeyên hevalan li ser erdê li cem morgê dirêj dikir. Hevala Laleşîn şehîd paqij dikirin. Hevalên din jî dibûn alîkar. Di bin berf û baranê de me li sê cihan mezelên hevalan dikolan ji bo em wan veşêrin. Piştî şer me ew hemû birin goristana şehîdan. Dema ku min bihîst ku birayê min Lezgîn şehîd ket, min dîsa şîva hevalan çêdikir û ji xwe re giriyam. Ez ne tenê li ser birayê xwe giriyam, lê li ser hemû şehîdên ku me dan. Şevekê saet yekê em rabûn. Me di keleka dibistanê de 24 hevalên şehîd bin ax kirin. Min êdî nikaribû rabikira. Ewqas hevalên me yên qehreman me sipartin axê. Min ji xwe pirs kir, eceba li pey van şehîdan ez ê bikarim bijîm? Gelê Kobanê wê bikare careke din di vî bajarî de bijî?"[487]

Wekî Sara, Edlê û Semîra bi dehan dayik û jinên ciwan ên Kobanê xebatên girîng ji bo serketina şervanên YPJ û YPG'ê meşandin. Şervanên YPJ'ê dibêjin ku hinek jinên ciwan hebûn ku "*bi înîsiyatîf û fedaîtî diçûn, cebilxanê ji mezwiyan re dianîn û birîndar digihandin nexweşxanê. Birînên xwe bi xwe pêçan. Weke ku bi salan e di nav şer de ne. Ruhê wan ê hevaltiyê pirr xurt bû."*[488]

[485] Çavkanî li heman cihî

[486] Çavkanî li heman cihî

[487] Çavkanî li heman cihî

Di nav dayikên berxwedêr de dayikên wekî berpirsyara Asayîşê Hîva hebûn yan jî dayikeke Ereb ya ku digot, *'Ez naçim!'* Wê dixwest ku zarokên wê şahidê vê dîrokê bibin. Lewma wê digot, "*Heger ew bijîn, bila zanibin ka ev dîrok çawa hatiye çêkirin. Bila wehşeta dijmin li ser axa Kurdistanê bibînin. Heger şehîd ketin jî ew bi xwe bibin malê vê dîrokê."*[489]

- **Gelê Koçber û Berxwedana Serxetê**

Meclîsa Rêvebiriya Xweser a Kantona Kobanê û saziyên civakî hemû yên wekî Saziya Malbatên Şehîdan, komîteya tenduristiyê, ragihandin, têkiliyên derve û wekî din xwe di pêvajoya şerî de wekî du beş bi rêxistin dikirin. Beşek tevî hevserokên kantonê Enwer Muslim li hundirê bajêr dima û tevlî têkoşîn û xebatên berxwedanê dibû. Beşa din a revêberiya xweser tev hevseroka meclîsa kantonê Eyşe Efendî çû cem gelê Kobanê ku sînor derbas kiribû. Wan kampeke xweser li ser xeta sînor a Pirsûsê ava kir, pêdivî û ewlekariya gel li wir bi rêxistin dikir. Dîsa wan tevî gelê Bakurê Kurdistanê û alîgirên ji Tirkiyê û gelek neteweyên cuda, piştgirî da berxwedana li hundirê bajêr. Hevseroka Meclîsa Gel a Kantona Kobanê zehmetî û rûmeta erka xwe wiha tîne ziman:

"Ti rojê min ewqas êş nekişand wekî wê rojê ku em derbasê sînor bûn. Ez ber derî sekinîm. Koçberiya gel, wekî Misilman dibêjin, 'roja qiyametê' bû. Em derbasê Bakur bûn, min gel li wê derê jî dît. Em çûn, me civîn çêdikirin ji bo gelê Rojava ku di konên ser sînor de mane. Min her tim digot, 'rojek were ez ê mizgîniya xêre bidim we.' Roja ku Kobanê neket, min got, 'Mizgîniya min ev e: Kobanê neket! Erdogan derew kir. Dewletên navnetewî hemûyan derew kir. Bi quweta zarokên me Kobanê neket.' Deriyê Kobanê vekirî bû, sînor jî vekirî bû. Gel dihat, navê xwe qeyd dikir û êvarê derbasê sînor dibûn. Xortên Kobanê navê xwe qeyd kirin ji bo tevlî YPG'ê bibin. Ji hinekan du, sê xwuşk yan bira li Kobanê di nav şer de bûn. Dema ku me xwest wan bidin sekinandin, dayikên wan dihatin û wan digotin 'Qurban heyran, navê kurê min qeyd bike, bila em derbas bin.' Dayikên wiha di vê şoreşê de hene. Bav û qîz, xwuşk û bira hev du di çeperên şer de dîtine. Gel bi întîharwarî daketiye şer, tenê ji bo Kobanê nekeve. Eşîr hene, bi salan dijminatiya hev dikirin. Wan di çeperên şer de hev du dîtiye û bi hev re li hemberî DAIŞ'ê şer kirine. Heta roja îro jî têkiliyên wan baş in.
Bi hezaran rojnamevan jî di vê demê de hatibûn. Dema ku êdî teyaran lêdida her kesî dida tîlîliyan û li çepikan dixist. Rojnamevan şaş man û digotin, 'Hûn xerîb in. Teyara li malên we dixe, zarokên wê lêdixin, şehîdên wê çêdibin û hûn didin tîlîliyan. Hûn çima wilo dikin?' Me jî digot, 'Li DAIŞ'ê dixin. Rast e, malên me xirab bûn. Zarokên me jî şehîd dikevin, lê Kobanê neket!'."[490]

Berdevka Desteya Jinê ya Kantona Kobanê Zozan Bekir jî dide xuyakirin ku wan karê xwe di bin şertên koçberiyê de birêxistin kiriye. Ji ber sedema şer û koçberiyê bi gelek jinan re pirsgirêkên dêrûnî çêbûne. Lewma endamên desteya jinê semîner û nîqaşên taybet bi jinan re li dar xistin. Dîsa Zozan balê dibe ser wê yekê ku pirsgirêkên di bin şertên koçberiyê de rê li ber pirsgirêkên din ên cûr bi cûr vedikin. Herî zêde, weke pirsgirêkên jinê, mijarên zewaca di temenê piçûk de û berdana hevjînan hatine rojeva wan. Zozan dibêje, du nêzîkatî di dozên zewaca di bin 18 salan de derketine pêş: "*Gel digot, 'Bila keçên me nebin belaya serê me, bila em ji wan xilas bibin'. Ya dîtir jî ew bû*

[488] Hevpeyvîn bi Sorxwîn Rojhilat re, Kobanê, 2017

[489] Hevpeyvîn bi Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

[490] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

ku hinek kesan digot, 'Bila keça min tevlî tevgera azadiyê nebe'."[491] Ji bo şopandina wan dozan û çareseriya pirsgirêkên jinê û civakê di hundirê kampên koçberan de komîteya lihevanînê û Malên Jinê hatin avakirin. Ev gaveke erênî bû: "*Vê komîtê ev pirsgirêk çareser dikirin. Heyanî wê demê êdî rizgarkirina Kobanî nêz bû. Hîna tam îlan nekiribûn û hîna bajar ji mayinan nehatiye paqijkirin. Lê gel ji xwe, ji kêfxweşiya xwe derbasê Kobanî dibû. Gel, pirr kes di konan de û di bin xaniyên xirabe de diman. Pirr mayin bi gel de teqiyan. Me civîn ji gel re çêkirin û dîsa jî gel digot, 'Çi dibe bila bibe, em ê li ser axa xwe bijîn'."*[492]

Di wan rojan de ku rewş li hundirê bajêr herî xeternak bû, şervanên YPJ û YPG'ê ji piştgiriya gelê li ser sînor ku bi şev û bi roj li ser lingan bû, hêzeke mezin wergirt. Bi hezaran mirov li ser bangewaziya seferberiyê hatin û tevlî berxwedana li serxetê û binxetê dibûn. Şervana YPJ'ê Delîla ev rewş ji aliyê binxetê dişopand: "*Gelê welatparêz hemû li ser sînor, di navbera me, dewlet û DAIŞ'ê de mabûn. Her roj şehadetê wan jî çêdibûn ji ber ku DAIŞ'ê hawan avête wan. Gelê Bakur jî 24 saetan li ser lingan bû, gelê Kurd ê çar parçeyan tevlî vê berxwedanê bû. Tenê têl di navbera me de hebû. Gel bûye şahidê berxwedan û şehadetên ku çêbûn. Bi sedan [kes ji] gel hatin, li ser têlê re derbas bûn û tevlî berxwedanê bûn."*[493]

Meryem Kobanê jî rêzdariya xwe ji bo helwesta gel raber dike: "*Gelê Kurdistanê li ser sînor edata bi bedena xwe çeperek ava kiribû. Min digot, 'Ger ez bijîm û derbikevim li hemberî vî miletî pêwîst e ez bi rûmet bim. Berxwedan êdî tenê têrê nake. Ji ber ku ev gel serketinê dixwaze.' Van kêliyan di min de enerjiyek da avakirin ku min got, 'divê ku em ser bikevin!' Ev hêza me ya veşartî ye ku di her kêliyê de dernakeve. Dema ku tu hest û biryara xwe dixî yek, wê demê potansiyelek heye ku ev enerjî biherike."*[494]

- **Eniya YPJ'ê – Gulîmorên Kobanê**

7'ê Cotmeha 2014'an ew roj bû ku Erdogan gotibû, *'Kobanê ket, wê bikeve!'* Di 10'ê Cotmehê de DAIŞ ket navenda Asayîşa Kobanê. Piştre tenê ji sedî 10-20'ê bajarê Kobanê di destê YPJ û YPG'ê de mabû. Di bin êrîşên pirr dijwar de şervanan û gel di taxên dawiyê de şer kir. Şahidên vê pêvajoyê hemfikir in ku biryardarî û helwesta hêzên YPJ'ê di van kêliyan de dibûn xala werçerxê ya şer: *"Me got, 'ger her kes jî biçe Kobanê berde, em wekî hevalên jin, em ê helwesta Hevala Zîlan nîşan bidin.' Her kesî bi tilîlîyan bersiva min da. Ew biryardariya hevalên jin û tilîlîyên wan wekî nîşana serketinê bûn. Hevaleke keç a 16 salî li cem min bû. Navê xwe Têkoşîn bû. Dema ku rewş pirr tengav bû, min xwest wê bişînim cem hevalên din ji ber ku belkî ew bikarin wê xilas bikin. Dema ku min ji wê re wisa got, wê sîleha xwe rakir û ber bi dijmin ve reviya. Bi vî rengî got, 'Heger tu li vir bimînî, ez ê jî li vir bimînim. Ev dijminê min e jî. Mafê min ê şerkirinê jî heye. Emrê min ne diyar e. Bi sedan zarokên Kurd hatin qetilkirin.' Gelek hevalên bi vî rengî hene, yên ku hîn sax in û yên ku şehîd jî ketin hene."*[495]

[491] Hevpeyvîn bi Zozan Bekir re, Kobanê, 2017

[492] Çavkanî li heman cihî

[493] Hevpeyvîn bi Delîla re, endama YPJê, Girkêlege, 2017

[494] Hevpeyvîn bi Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

[495] Çavkanî li heman cihî

Narîn Efrîn dibêje, "*Di vî şerî de hemû hevalan rextê xwe yê xweteqînê çêkiribû. Di vî bajarê piçûk de mehelek di destê me de mabû. Biryara me hemû ew bû: Ger ev bajar biçe, em ê jî tê de biçin. Ger em bi bin ketibane, me mafê xwe yê jiyanê ji xwe re nedidît. Biryareke pirr xurt hebû û dinyayê pişgirî da me. Ji ber ku dijminê me ji bo dinyayê hemûyî xeter bû. Dema ku rojnamevanên dinyayê hatin cem me, me ew şandin çeperên şer. Vêga wan dît ku bi rastî jin fermandariya şer dike. Berê bawer nedikirin. Kengê bawer kirin, dema ku ew çûn çeperên şer û hevaleke jin ji wan re xaniyek muqabilê nîşan da û got, 'Li wê derê DAIŞ heye!' Wan hevalên jin li ser qarnasê, bi keleş û bisivîngê dîtin. Wan bi çavê xwe dît, çawa hevalên jin çeperên xwe, piştî dîwarên kunkirî parastin û fermandara wan jî jin bû."*[496]

Şervanên YPJ'ê serpêhatiyên xwe ji rojnamevanên biyanî re jî bi heman rengî dinirxînin: "*Di Kobanê de YPJ'ê nasnameya xwe derxist, meyzandina oryantalîst li gel û jinên Kurd da guhertin. Ew pêşdaraziyên wekî 'ew nizanin, nikarin' hatin şikandin. Rojnamevan şaş diman: 'Her mewzî ku ez diçim fermandar jin in. Yên ku taktîk belî dikin û şer dimeşînin jin in.' Fermandarên jin di her aliyê de tevlî jiyan û şer dibûn. Wê him koordîne dikir, him xwarina hevalan amade dikir. Him pêşengî dikir, hevalên li cem xwe bi rêxistin dikirin û bi rê ve dibirin, him bixwe jî di nav de bû. Rojnamevan bi fikr û zanîna me bi bandor bûn, digotin: 'Em çi dipirsin hûn dizanin bersiva vê bidin!' Hinek hevalên înternasyonalîst jî hatin cem me. Ruxmê ku me ji zimanê hev fêhmnedikir, wan ji nêzikatiyên jiyanê û enerjiya hevalên jin ewqas hêz digirt."*[497]

Dayikên Rojava jî şervanên YPJ'ê dişibandin 'Gulîmoran'. Ew bi serbilindî behsa çalakiyên keçên xwe dikin. Gelek dayik awazên kevin ên çîrokên Egîd û Gulîmoran bi navê şervan û bûyerên berxwedana Kobanê ji nû ve şirove kirine: "*Di civakê de jî şerê hevalên jin pirr bandor kir, ji ber ku hevalên jin mewziyên xwe nedihiştin. Jin li kîjan cebhê bûn, her hevala/ê cem xwe lê xwedî derdiketin, hevaleke birîndar nedihiştin û mutleqa ew xilas dikirin. Leşkerên arteşên dewletan ji ber DAIŞ'ê her tiştê xwe hiştin û reviyan. Lê hevalên jin di taxekê de, di çend malan de çeperên xwe parastin. Dema DAIŞ dihat jin ji mewziyên xwe dernediketin heya fîşeka xwe ya dawiyê wan şer dikir û di dawiyê de bombeya xwe bi xwe de diteqand. Sembola vê berxwedanê jî hevaltî, jiyan û berxwedana hevbeş bû. Vê li nav jinên cîhanê jî deng veda. Lewma gelê Bakur û gelên cîhanê hemûyî bi me re rabûn."*[498]

Sorxwîn ji bajarê Mako yê Rojhilatê Kurdistanê yek ji hezaran şervanên YPJ'ê ye ku di çarçoveya seferberiyê de xwe gihand Kobanê. Di Cotmeha 2014'an de wê tevî qederê 200 kesî sînor derbas kir ji bo tevlî şerê parastina Kobanê bibe. Sorxwîn dibêje, wê hingê niyet û rista dewleta Tirk di şerê Kobanê de fêhm kiriye: "*Leşkerên Tirk li ser sînor bûn. Lê wan em nedan sêkinandin, digotin: 'Herin, hûn ê hemû werin kuştin!' Ev konsepta tesfiye bû. Jixwe, bi gihiştina Kobanê, em ketin di nav agirî de. Her roj bi dehan birîndar û şehîd çêbûne. Lê bawerîya rizgarkirina Kobanê hatiye parastin. Bi seferberiyê re her kes dihat - ciwan, kal û pîran. Zanebûna me ya şerê bajêr nebû. Ji ber tecrûba şer nebû, gelek kes zû şehîd diketin. Çete di şerê bajêr de pispor bûn. Hêza me yekbûna gelan bû. Ji gelek welatan piştgirî çêbû: Ji Çînê, Elmanya, Îtalya, Tirkiye, ji her welatî kes dihatin û dixwestin bi me re şer bikin. Cara yekem tabûrek ji çepê Tirkan ya MLKP'ê hat û bi me re ket şer. Berxwedana Kobanê bû hêviya cîhanê. Rola jinê li vir pirr girîng bû."*[499]

[496]Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

[497] Hevpeyvîn bi Delîla re, Girkêlege, 2017

[498]Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

Sorxwîn rave dike ku DAIŞ li hemberî şêwaza şerkirina jinê şikestiye. Wê bi xwe rist û lehengtiya jinê di nav çeperên şer de bi vî rengî dîtiye: *"Li aliyê Kaniya Kurdan şer pirr giran bû. Di çeperên Kaniya Kurdan de em 21 komên hevalan bûn. Du fermandarên van koman hevalên xort bûn, yên din hemû jin bûn. Di cîhazan de hertim dengê hevalên jin dihat. Şehîd Gelhat li ser vê cebhe bû. Wî jî wek teqwiyê hevalên jin daxwaz kirin. Feraseta 'jin nikarin şer bikin' ango 'bila jin neçin grûba êrîşê' di şerê Kobanê de têk çû. Jinan hevgirtin ava dikir, civakbûn çêdikir. Jin diket kîjan grûbê yan mewziyê de him şer dikir, him dayiktî dikir. Ew bi hevalên nû û ciwanan re elaqedar bû. Ew ji bo nobetê hemû şevê hişyar bû ji ber ku DAIŞ sizmalî dihat. Jinê dema ku hevalek li cem wê şehîd diket, sîlahê wê digirt û pê re şer dikir. Wê di şûna vê hevalê de jî şer dikir. Cenazeyê wê hevalê li cem me dima heta derfet ji bo rakirinê çêdibû. Çend hevalên ku birîndar bûn min dîtin, di mewziyê de xwe xwe birîna xwe pêçandin û şer dikirin. Şêwazek wiha hebû 'Em nahêlin ku Kobanê bikeve!' Mînak, Hevala* ***Nûda*** *di destê xwe de birîndar bû. Hîna destê wê baş nebû û doktoran jî destûr neda. Lê ew hat û careke din şer kir ji bo Kobanê nekeve. Piştî sê rojan bi sê fîşekên di pişta xwe de şehîd ket.*

Şehîd Destîna Qendîl *ji Başûrê Kurdistanê jî bûye mînaka lehengtiya jinê. Ew bi 13 hevalên din re di avahiyekê de bû, derdora wan çeteyan girtibû. Wan li qata jorê pirr ber xwe dida. Di dawiyê de Hevala Destîna bangê tewahî hevalan li ser cîhazê kir û xatirê xwe xwest. Ew hîna diaxife, vê demê DAIŞ binya avahiyê mayin dike û diteqîne.*

Şehîd Nefel Botan *jî pispora me ya BKC bû. Wê navê BKC'ya xwe kir xezal. Me jê re cihê dijmin terîf dikir. Wê jî bi îsabet lêdixist. Ew bi risteke pirr girîng di vî şerî de rabû. Ewqas êrîş dihatin ser me. Hevala Nefel çend grûbên heval bi sekvaniya xwe bi BKC'yê xilas kirin. Grûbeke neh kes hebû. Ew pênc rojan di çemberê de bûn. Têkilî bi wan re qut bû. Cebxaneya wan jî xilas bû. Her heval, parçek lêketibû. Lê DAIŞ'ê ji ber sekvaniya Hevala Nefel nikarîbû xaniyê wan bigire. Fermandarê wan bi wan re pirr aciz bû. Şêwaza şerkirina jinê di DAIŞ'ê de şikestinek çêkir."*[500]

Her wiha komeke ji pênc şervanên jin çalakiyên bi bandor li dijî tangên dijmin dikirin. Di vê berxwedanê de fermandara êniyê ***Gulan*** tevî şoreşgerên YPJ'ê ***Rûken Rojhilat, Sorxwîn, Evrîm*** û ***Eylem*** cihê xwe girtin û şehîd bûn. Di şerê bajêr de bi dehan şervanên YPJ'ê yên wekî ***Şehîd Hebûn Dêrik, Şehîd Ozgur ji Helebê, Şehîd Rojen Rojhilat*** û ***Şehîd Zehra Penaber*** bi berpirsyarî, ruhê xwe yê hevaltî, fedakarî û lehengiya xwe bi ristekî dîrokî rabûn. Sekna wan dibû sedem ku jin û xort, ciwan, kal û pîrên ku di seferberiyê de beşdarî şer bûne û hîna nizanibûn çekan bi kar bînin, bixwazin di bin fermandariya jinê de şer bikin. Ji ber ku wan dîtîbû ku *'hevalên jin mewziyên xwe û hevalên xwe bernadin'*.

Şervana YPJ'ê Delîla jî bi bangewaziya seferberiyê re ji Bakurê Kurdistanê di dema şerê giran de hatibû Kobanê. Ew dibêje, gelek jin û xortên ciwan hebûn ku hîna ava Kobanê venexwaribûn û şehîd bûbûn. Yek ji wan ***Hêlîn Bagok*** bû ku bi kelecan û coşeke mezin berê xwe dabû şerê Kobanê: *"Hevala Hêlîn şeveke tenê li Kobanê maye. Eynî şeva ku derbas bû, dijmin pirr dijwar êrîş dikir. Hevala Hêlin bi ser dijmin de çû û şehîd ket. Hevala* ***Sarya Ozgur*** *ji çepê Tirkan jî hevaleke wisa bi moral û coş bû. Ew mayincî bû. Di çeperan de me bi hev re şer kir. Ew jî pirr zû şehîd ket."*[501]

[499] Hevpeyvîn bi Sorxwîn Rojhilat re, Kobanê, 2017

[500] Çavkanî li heman cihî

[501] Hevpeyvîn bi Delîla re, Girkêlege, 2017

Her wiha Delîla dualîbûna derûniya şer şirove dike. Ew destnîşan dike ku gelek kesên ku ji nişkê ve ketin nav şerê dijwar, gelek zehmetî kişandine. Bi derfetên kêm rasthatina hovîtî, tang û çekên giran ên dijmin, ne karê her kesî bû: "*Çekên me nebûn. Tenê çend keleş hebûn. Li aliyekî berxwedan hebû. Lê li aliyekî jî tirs û rev hebûn. Kesên ku nû hatin, [wan] dît ku di keleka wan de hevalên wan çawa şehîd ketibûn. DAIŞ'ê serê wan jêkir. Wê demê bi hinek kesan re hêvî nema, rabûn û çûn. Di milekî de qehremantiyên pirr mezin hebûn. Lê di milê din de jî ev psikolojî hebû: 'Kobanê ket'. Li hemberî vê nêzikatiyeke întîharwarî hebû wek 'jixwe em xilas nabin'. Her kesî bombeya xwe amade dikir. Di şexsê min de jî wiha bû. Lê dema ku min qehremantiya hevalên jin û xort û ya gelê Kobanê didît, ev halê ruh dihat guhertin. Herî zêde fedaîtî, keç û jinên Kobanê çêkirin. Piştî ku koalisyonê dest bi lêxistina DAIŞ'ê kir, vê jî bandoreke erênî di warê leşkerî û psîkolojîk de çêkir. Lê heger felsefeya Rêber Apo nebûya, me nikarîbû li hemberî wehşeteke wiha ya dijmin xwe li ser lingan bigirtana. Jinên ciwan ên YPJ'ê li Kobanê hêza xwe ji nirxandinên Rêbertiyê û mînakên hevalên şehîd digirt."*[502]

Şerê li dijî DAIŞ'ê ne tenê şerekî leşkerî bû û ne tenê bi taktîkên şer dihat meşandin. Armanca DAIŞ'ê qirkirina jinan û gelan, tepisandina vîn û hêviyên azadiyê di sedsala 21'ê de bû. Lewma em dikarin bibêjin, şerê ku li Kobanê hatiye meşandin, esas şerekî bîrdozioyê di rastiya Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de bû. Hêzên YPJ'ê jî bi bîreweriya vê rista dîrokî tevdigeriyan.

"Kîna DAIŞ'ê li hemberî Kobanê bi rastî pirr cuda bû. Wê hemû hêzên xwe ji derve anî bûn ji bo Tevgera Azadiyê Kurdistanê li vir bişikîne. Dema ku Kurd şikestibana jî hafiza dîrokî ya Rojhilata Navîn û bi taybetî ya jinê wê bişikesta û winda ba. Me wekî jin li hemberî DAIŞ'ê ne tenê şerekî çekdarî dikir. Di aliyê bîrdozî de jî me şer dikir li hemberî îdeolojiya zilam a desthilat, ya ku jin wekî xenîmeta şer dibîne. DAIŞ'ê dixwest di sedsala 21'ê de dagirkeriyê li ser jinê misoger bike; dengê jinê û hêviyên jinê tine bike. Serketinên me wekî YPJ ne tenê di milê leşkerî de ne, lê di milê sosyolojîk, psîkolojîk û civakî de hene. Ji ber vê, me li Kobanê got, 'Em ne tenê li ser navê jinên Kurd şer dikin. Em li ser navê hemû jinên Rojhilata Navîn û yên cîhanê destê xwe dideynin ser tetikê.' Di şerê Kobanê de me bi bîrdoziya azadiya jinê zilamtiya desthilatdar bi bin xist. Bibinketina DAIŞ'ê bibinketina pergala serdestiya zilam e."[503]

Li ser vî bingehî şervanên YPJ'ê zagon û exlaqê şer li hemberî dijminekî faşîst û hovane jî parast. "*Dijminên ku me digirt itîraf kirine ku wan ti carî hêvî nedikir ku em wan sax bihêlin. Ji ber ku hovîtiya ku wan li hemberî gel û şervanan didan meşandin, ne normal bû. Şerekî psîkolojîk bû. Di keleka te de zarok û jin serjê dikirin. Bedena wan parçe parçe dikir. Me wehşeta wan didît. Lê wek jin û bi giştî jî me exlaqê şerê xwe parast."*[504]

Tevî Gulîmoran, Egîdên şerê Kobanê, fermandar û şervanên YPG'ê jî dîrok nivîsandine. Di nav wan de bavên Kobanê yên wekî ***Apê Nemir*** hebûn ku di temenê xwe yê 67 salî de tevî sê zarokên xwe di keleka şervanên jin û ciwan de di çeperên herî pêş de şer dikirin. Tevî ku ew çend caran birîndar bû jî wî bi ruhekî ciwan berxwedana xwe dewam dikir û digot, '*Kobanê neket, lê Erdogan ket*'.

[502] Çavkanî li heman cihî

[503]Hevpeyvîn bi Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

[504] Hevpeyvîn bi Delîla re, Girkêlege, 2017

Her wiha fermandar ***Gelhat Gabar*** (Ercan Kaya) bi coş, zanebûn û ruhê xwe ya fedaî bûye yek ji Agîtên şerê Kobanê. Wî taktîkên nû yên şer bi pêş xistin ku bûn bingehê serketina berxwedanê. Wekî fermandar wî him şerê gştî yê bajêr koordîne dikir, him jî heta şehadeta xwe di 29'ê Cotmeha 2014'an de di eniyên herî pêş de bi şervanên xwe re li ber xwe dida.

Fermandar ***Ebû Leyla*** (Feysel Sadûn) jî yek ji leheng û egîdên şerê Kobanê ye. Piştî ku wî di şerên li dijî êrîşên dewleta Sûriyê û DAIŞ'ê yên li dijî gelê Heleb, Eyn Îsa, Girê Spî û Minbicê cih girtibû, wî wekî fermandarê tabûra Şems El-Şemal tevî şervanên xwe berê xwe da bajarê ku lê ji dayik bûye, Kobanê. Hevrêyên wî dibêjin, Ebû Leyla di kêliyên herî giran ên şer de her tim bi bawerî û rûyê xwe yê bi ken hêz û moral dida wan. Armanca şerê wî, avakirina siberojeke azad ji bo hemû zarokên Sûriyê bû. Ji bo ku keça wî jî sedema dûrbûna bavê xwe ji malbatê fêhm bike, Ebû Leyla di dema şerê kolanên Kobanê de nameyek jê re nivîsand û got:

"Rêya me wisa ye. Ev erka me ye, ji bo siberoja te û siberoja zarokên mîna te, divê em biparêzin, bixebitin û şer bikin. Da ku hûn dema mezin bûn, çawa me ji bavên xwe re digot, 'we ji bo me nekir', ji min re nebêjin. Ez ji bo te û zarokên mîna te şer dikim. Zehmetî û tevahiya tiştên ku em dikin, ji bo siberoja te û zarokên mîna te ye. Da ku hûn di vî welatî de azad û aram bin. Şoreş ji bo te û welatê me Sûriyê ye. Min pirr bêriya te kiriye. Yara min Leyla, tu yê bi bavê xwe çi sax be yan şehîd bikeve, serbilind bî. Bavê te Ebû Leyla ji Kobanê."[505]

- **Destana Kobanê**

Viyan Peyman (Gulîstan Talî Cinganlo) ji Rojhilatê Kurdistanê jî yek ji Gulîmorên YPJ'ê ye ku destana berxwedana Kobanê nivîsandiye û dengê wê gihandiye cîhanê. Dema şerê bajêr wê di strana xwe ***'Kobanê'*** de bi şêwaza dengbêjî destana şer û lehengiyên Kobanê bi dilêşî û serbilindî gotin:

Way li minê lê dayê

Wele ez ê îro di nava dilê xwe dinalim

Dibêm ey wax li min, ey wax li min, ey wax li min

De ez ê îro berxwedana Kobanê bikim

Helbesta ser zimane

Bigerînim nava hemû alema însane

Ax li minê, way li minê, way li minê, lê dayê

Welê ezê çavê xwe digerînim derdora Kobanê

girtiye mijê bi dûmane

Şer e, ceng e, cenga giran e

De îro dengê tang û topan e

[505] Dicle Ehmed: *Keça Ebû Leyla: Xewna bavê min pêk hat*, ANHA, Kobanê, 06-03-2019; https://hawarnews.com/kr/haber/keca-eb-leyla-xewna-bav-min-pk-hat-h14205.html

Bêhna barudê radibe êrşê li ezmane

Ax li minê, way li minê, way li minê

Welê dîsa keç û xortê Kurdane

Bi singa xwe bûne mertale

Hemberî tang û topane

Ax way li minê, way li minê, way li minê, lê dayê

Wele daye ez ê dêna xwe bidime kolanê

Kobanê hêsirê çavê dayikanê

De îro qêrîna ketiye nava zar û zêç

Kal û pîranê, way li minê

Hêsirê çavê zarokan wekî çemê Firatê

Kolanê Kobanê diherikin

Ax li minê, way li minê, way li minê, lê dayê

Wele dayê ez ê îro rabim bi çil û çar zimanî

Bixwînim, bidim pesnê berxwedana Serzorî

De tê de fermandar Peymanê bi yanzdeh rên

Mohra xwe li dîroka reş danyanê

Ax li minê, way li minê, way li minê, lê dayê

Wele dayê, îro dîsa, îro dîsa derdora Kobanê ferman e

Fermana Nemrutan e

De îro darê zilmê xwe dihejîne

her çar milê Kobanê dorpêç dikine

Ax li minê, way li minê, way li minê, lê dayê

De ez ê rabim di nava dilê xwe binalim

Ez ê rabim tembura xwe bihejînim

De serê min agirê Mişten bifiqînim

Ax li minê, way li minê, way li minê, lê dayê

De îro dengê Rojena radibe Rojhilatê Kurdistanê

Xwe berdide nava dilê Kobanê

De dîsa Geverê Nûjiyan tê de serê govendê dihejîne

derdora Kobanê bi xemla xwe dineqşîne

Ax li minê, way li minê, way li minê, lê dayê

Wele îro Arîna ciwanê pekrewana dozê ye

dibe parçakî bomba Zîlanê

Xwe berdide nava dilê dagirkerê her çar milê Kobanê

Ax li minê, way li minê, way li minê, lê dayê

Wele îro xewn û xeyalê Gelhata xwe dipêçe

Bejn û bala Bahoza diqîrîne, dibê:

Ev der ne Geliyê Zîlan e, ne meydana Çarçira ye, ne jî Helebce ye

De ev e Kobana rengîn e

Bûye sembola hemû berxwedana li cîhanê

Wele ez ê rabim dêna xwe didime Kobana rengîne

Xwe ber bi Azadiyê ve dihejîne

Wele îro dirijîne çavê neyar û dijminane

Ax li minê, way li minê, way li minê, lê dayê

Welê dayê ezê diqîrim, dinalim, dibêm

Ev çi dem e, çi dewran e, çi çax e, çi zeman e?

Ma ne şerm e li cîhanê Kurdan re cih nemaye

Ax li minê, way li minê, way li minê, lê dayê

De ez ê dîsa nava dilê xwe dinalim, dibêjim

Ax li minê, way li minê, way li minê, lê dayê

Viyan Peyman ji hevrêyên xwe yên nemir re soz dabû ku heta rizgariya Kobanê ew ê ji Kobanê dernekeve. Wê soza xwe bi cih anî. Piştî rizgariya bajêr, wê têkoşîna xwe dewam kir. Di 6'ê Nîsana 2015'an de Viyan Peyman di şerê li dijî çeteyên DAIŞê de jiyana xwe ji dest da. Lê dengê wê hê jî di guh û bîra her kesî/ê de ye. Wê alema insanan bi destana berxwedana Kobanê da hesandin.

- **Roja Rizgariya Kobanê: Kêliyên Azadiyê û Xemgîniyê**

Di 1'ê Çileyê 2015'an de şervanên YPJ û YPG'ê ala reş a DAIŞ'ê li ser Girê Mištenûrê veçirandin û ala mezin a kesk û sor û zer daleqandin. Bi vî rengî wan ji dost û dijmin re da xuyakirin ku serweriya terora DAIŞ'ê li ser Kobanê hatiye şikandin. Operasyonên şervanan dewam kirin heta di 26'ê Çileyê 2015'an de rizgarkirina navenda bajarê Kobanê hat ragihandin.

Yek ji serpêhatiyên herî girîng ên berxwedana jinê li Kobanê dibe, ew bû ku di encama têkoşîna leşkerî, siyasî û bîrdozî ya ji bo rizgarkirina Kobanê de ruhekî hevbeş ê jinan hatiye avakirin. Jinên ku berî bi sînor, bi ferasetên zayendperest, neteweperest û olperest ji hevdu hatibûn veqetandin, bûn xwedî heman hest û ramanî. Di hevpeyvînan de yên bi dehan jinên Kobanê re û bi dehan jinan

re yên ku ji cihên cuda hatin û tevlî berxwedana Kobanê dibûn, me pirsî ka ragihandina rizgarkirina bajarê Kobanê piştî 134 rojên şer û berxwedanê, wan çawa dîtiye û hingê çi hîs kiriye? Di bersivan hemûyan de him kêfxweşî, him jî êş û xemgînî hat ziman: Kêfxweşî ji ser serketina vîna berxwedanê ku wekî 'nepêkan' hatibû xuyakirin û êşa kûr a berdêlên giran ên ku hatin dayîn wekî daneheva şerê Kobanê di dilê her kesî de kom bûne.

Dema ku rizgarbûna Kobanê hatiye ragihandin Edlê û Sara li gel hev bûn. **Edlê** li ser vê rojê dibêje: *"Em him digiriyan, him me dida tîlîliyan. Me nizanibû em çi bikin. Lê ew qehremanên me ku ev bajar xilas kirine, hemû li ber çavê me bûn. Em wan ti carî ji bîr nakin. Em deyndarê wan şehîdan in. Dinya binguhhev bû. Têl rabûn, sînor nema. Her kes li ser piyan bû. Lê bêhna xwînê ji Kobanê dihat. Xwîna wan qehremanan."* Piştî kêliyeke bêdengiyê, **Sara** li ser zêde dike: *"Hestên pirr tevlîhev bi me re çêbûn. Yanî em dizanin heta tevahiyê Kurdistanê azad nebe, em jî ne azad in. Dema seferberiyê keç û xortan sînor rakirin, gelê her çar parçeyan yekbûn di nav xwe de çêkir. Ev ruh hertim hebû. Lê di şerê Kobanê de em fizikî, wek beden jî gihandin hev. Lê êşên Kobanê pirr mezin in. Bi sedan hevalên ku êvarê sînor derbas kirin ji bo şer bikin, roja din êdî nema dijîn. Ji ber keda wan hevalan mirov şerm dike. Me ewqas nekir wek wan hevalan ku di mewziyan de şer dikirin."*[506]

Amara Kobanê yek ji wan şervanên jin bû ku di çeperan de şer kirine. Ew di wê koma şervanên YPJ û YPG'ê de bû ku çû ser Girê Mişteûrê û bi daleqandina ala kesk û sor û zer mizgîniya rizgariya Kobanê ji cîhanê re ragihand. Ew dibêje: *"Di roja rizgariya Kobanê de du hest di nav hevdu de bi min re peyda bûn. Li aliyekî coş û moral li aliyê din xemgînî. Bi hezaran xeyalên hevalan ji bo vê rojê hebû. Gelekan ji wan Mişteûr nedît, tenê bihîstin. Dema ku me dîlan li ser Mişteûr girt, rondik ji çavê me bariyan. Zayîneke nû bû, lê pirr bi êş bû jî."*[507]

Gelek şervanên ku li Kobanê şer kirinê, lê belê nikarîbûn Mişteûrê bibînin beriya şehadeta xwe ji hevrêyên xwe xwestibûn ku ew li şûna wan biçin ser Girê Mişteûr û dirûşmeyên azadiyê bi qîrîn bibêjin. Meryem Kobanê jî bi munesebeta serketina berxwedana Kobanê wesiyeteke şehîdan pêk anî: *"Şehîd Hêlîn Torî ji min re gotibû, 'Kobanê pirr tarî xuya dike.' Dema ku me dijmin bi gişti ji Mişteûr dûr xist, me motor anî jor û ronahî vekir, ruxmê ku hîna dijmin nêz bû. Lê min got pêwîst e ku em xeyala şehîdan pêk bînin. Gel li ser sînor ev ronahî wekî mizgînî dît. Lê dema ku ez dimeşiyam, hestek bi min re peyda bû, weke ku ez li ser bedenên mirovan dimeşim. Ji ber ku di bin her bosteke axa Kobanê de cenazeyên hevalan hebûn. Ji bo vê, ez pirr nazik dimeşiyam. Hemû hevalên ku li Mişteûrê û li Kaniya Kurdan şehîd ketine, careke din hatin ber çavê min. Weke ku em bi hevdu re dimeşin. Ev hesteke pirr zor bû."*[508]

Şervana YPJ'ê **Sorxwîn** di hemleya rizgarkirina deriyê sînor de birîndar bû pîştî ku çeteyên DAIŞ'ê di 29'ê Kanûnê de ji aliyê Tirkiyeyê ve êrîş kiribûn. Lewma Sorxwîn roja rizgariya Kobanê li nexweşxaneyeke aliyê Bakurê Kurdistanê derbas kir: *"Min roja rizgariya Kobanê di televisyonê de dît. Ez du saetan giriyam. Min hemû hevalan li ber çavê xwe dîtin. Ji sedî 90'ê bajer ketibû destê çeteyan, lê dîsa me xilas kir. Lê windahiyên pirr giran me dan. Gelek hevalên me, dayik û bavê zarokan şehîd ketin. Bavê ku li Kobanê şehîd ketin, hevjîn û 10 – 12 zarok li pey xwe hiştin.*

[506] Hevpeyvîn bi Sara, Edlê û Semîra re, Kobanê, 2017

[507] Hevpeyvîn bi Sarya û Amara re, Kobanê, 2017

[508] Hevpeyvîn bi Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

*Min li Bakur nikaribû tedawiya xwe dewam bikirana, polîs li pey me bû. Hinek hevalên me ku nîv mirî bûn, li nexweşxanê girtin û birin. Ji ber vê, ez derketim û min bi kopalan sînor derbas kir. Ez dîsa hatim Kobanê. Taxên ku me di wan de şer kiriye hemû xirab û hilweşiya bûn. Lê li cihekî di nav hewşê de darek hebû. Kavil, kevir û hesin ketibûn ser darê. Tenê şitileke wê darê xuya bû, lê ew ji nû ve şîn dibû. Min jî bi dengekî bilind bang li hevalan kir: '**Meyze kin, jiyan xwe li Kobanê nû dike! Ewqas barê giran li ser wê darê heye, lê wê gişt çirand û serê xwe radike û dibêje, ez heme!**'."*[509]

Heman hest bi koçberên Kobanê yên li aliyê Bakurê Kurdistanê re jî peyda bûn. Di nav berf û baranê de ew vegeriyan bajarê xwe ku ji sedî 90'ê wî hatibû ruxandin. Wan di bin kavilên xaniyên xwe de dest bi ji nû ve avakirina jiyana xwe kir. Li ser mizgîniya rizgarkirina Kobanê, nêzîkî sê salan paşê, ev dîmen tên ber çavê şêniyên Kobanê: *"Dema ku deriyê Kobanê vebûye, gel vegeriya. Jinek hat, solê xwe di lingan de bû. Satilek av pê re bû. Aliyê Tirkiyê lingê xwe şûştine û pêxas derbasê aliyê Kobanê bû. Jineke din hat, ketiye Kobanê xwe kir xwarê, erdê Kobanê maç kiriye. Hinek hatin, wan herrî xwar. Ez şahide wan tişta me. Ez caran, niha li gorên şehîdan dinêrim û ji xwe re dibêjim: Li Kobanê ne zêr û zîv, ne jî bîrên petrolê hebûn. Lê bi hezaran kur û keç canê xwe ji bo parastina Kobanê feda kirine. Dilê gel, jin û ciwanên cîhanê li Kobanê lêxistiye."*[510]

Servanên YPJ'yê yên Kobanê dibêjin, girêdana bi axê ve û vegera gel girîng bûn. Ew pê hesîne ku rastiya şerê Kobanê qalibên hişk ên feodal şikandine. Bi vî awayî rê li pêşiya bihurîna ji nihêrîn û nêzîkatiyên civakê yên zayendperest hatibû vekirin. *"Ixtiyaran ku berê xwe nêzikî hevalan nedikir, hatin lingê hevalan, hevalên jin maç dikirin. Digotin, 'yên ku hiştin ku em vê rojê bibînin, hûn in. We xwe ji me re kir mertal.' Qedirê hevalên jin digirtin. Şehadetên Hevala Rêvana û Hevala Arîn hiştin ku milet bibîne ku jin dev ji têkoşîna xwe ji bo gelê xwe bernade. Gel ji tişta ku bi çavê xwe dîtiye, bawer kir. Zilamên Kobanê digotin, 'Zilamtî bi me re nemaye. Em reviyan, çûn. Lê keçên me li vir ji bo me şer kirine'."*[511]

Tevî êş û windahiyên giran, berxwedana jinan li Kobanê bûye çavkaniya serbilindî û bixwebaweriya jinên Rojava û cîhanê. Li ser vî bingehî xebatên ji nû ve avakirina rêveberiya xweser û birêxistinbûna Kongra Star li kantona Kobanê hatine meşandin û pêngava rizgarkirina gundên derdora Kobanê jî wiha dest pê kir.

- **Eniya Kobanê û Cizîrê Digihîjin Hev**

Du rojan piştî ragihandina rizgarkirina bajar, pêngava rizgarkirina xetên gundên Kobanê dest pê kir. Vê pêngavê heta rizgarkirina Girê Spî di 15'ê Hezirana 2015'an de û rizgarkirina Sirînê di 27'ê Tîrmeha 2015'an de dewam kir. Bi vî rengî kantonên Cizîre û Kobanê gihiştin hev û dagirkeriya DAIŞ'ê li ser herêmên Rojava hat bi dawîkirin.

Di van pêngavan de dîsa gelek fermandar û şervanên YPJ'ê yên ku nû ji şerê bajer derketibûn, bi rista pêşengiyê rabûne. Di nav wan de fermandara eniyê *Hebûn Dêrik* û sekvana pispor *Nefel* (Mizgin Alan) jî hebûn ku di vê pêngavê de şehîd bûn. Bi şev û roj bê xew hêzên YPJ'ê dîsa di nav şer de bûn. Cardin, wan lêhûrbûnên xwe hemû di bipêşxistina taktîkên şer de kilît kirine. Di vê pevajoyê de gelek jinên ciwan nû tevlî nav refan dibûn.

[509] Hevpeyvîn bi Sorxwîn Rojhilat re, Kobanê, 2017

[510] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

[511] Hevpeyvîn bi Sarya û Amara re, Kobanê, 2017

Piştî serketina qonaxa dawiyê ya pêngavê hêzên YPJ'ê tecrûbeyên xwe di Konferansa Berxwedana Kobanê de nirxandin. 105 delege beşdarî konferansê bûn, konferans ji 4'ê Îlonê heta 8'ê Îlona 2015'an hat lidarxistin. Delegeyan bi rexne û rexnedayînê li hemberî şehadetên giranbuha yên vê pêvajoyê, asta rêxistinbûna YPJ'ê û şewazê fermandariyê tehlîl kir. Ev ji bo amadekariya pêngavên nû pêwîst hat dîtin. Ji ber ku şerên giran û bênavber him hestiyariyeke mezin da avakirin, him jî derfet neda ku perwerdeyên bîrdozî li gorî pêdiviyên şervan û fermandaran werin meşandin. Di nîqaşên konferansê de bal hat kişandinî ser wê yêkê ku YPJ nasnameya xwe di şerê Kobanê de ava kiriye û doza jinên Kurd bi cîhanê daye naskirin. Nêzikatiyên berê yên wekî 'şer karê zilaman dîtin' yan jî jin di refên YPJ-YPG'ê de tenê wekî 'hêzeke manewî' dîtin, li paş hatin hiştin. Her wiha delegeyên konferansê kemasiyên xwe di aliyê şer û zêhniyetê de girêdayî sedemên vê yên bandora zayendperestiya civakî û moderniteya kapîtalîzmê nirxandin û gihandin encamê: *"Rehmeta şer tine! Kemasiyek piçûk, gotineke şaş dikare bibe sedema windahiyên mezin. Di wê kêliyê de çi pêwîst e, divê tu bikî ji bo tu bikarî serketinê misoger bikî."*[512] Ji bo bipêşxistina naskirina kesayeta xwe, zanebûna bîrdozî û rêbazên têkoşînê, biryarên li ser bihêzkirina xebatên pewerdeyên xweser hatin dayîn.

- **Komkujiya Kobanê**

Piştî rizgarkirina bajar û gundên Kobanê, pirraniya gel zû vegeriya. Bi hêz û keda xwe xwelkê Kobanê hewl dida ku malên xwe, jiyana xwe û binesaziya bajêr careke din ava bike. Malbatên ku ji ber sedema şer û koçberiyê ji hev veqetandîbûn nû gihandina hev û plansaziyên ji bo siberoja zarokên xwe çêdikirin. Jiyana Kobanê ji nû ve şîn dibû. Di vê rewşê de komkujiya ku DAIŞ'ê di 25'ê Hazîrana 2015'an de pêk anî, birîneke kûr hiştiye. Bi sedan zarok, jin û zilam bi çavê xwe dîtine çawa cîran, zarok û mirovên wan bi awayekî hovane li gund û malên xwe hatine qetilkirin. *"Ya herî xirab jî ew bû ku dema qetliamê DAIŞ'ê cilê YPG'ê li xwe kiribû. 7 - 8 endamên Asayîşê şehîd xistin. Lê hinek cihan jî dema wan nasnameyan wan dipirsin. DAIŞ'ê digot, 'Em heval in. Em ê herin Kobanê'."*[513] Bi vî rengî DAIŞ careke din ketiye bajêr û sekvanên xwe li ser xaniyên stratejîk bicihkirin. Di vê komkujiyê de bi giştî 251 şêniyên bajar û gundên Kobanê jiyana xwe ji dest dan.

"Ew dayik, ew gel bi çiqas hêvî hatibûn û xwe gihandibûn Kobanê. Dijmin dixwest vê hêviyê tine bike, bişikîne. Qetliama bi fîşeka û kêra hat çêkirin. Di serî û dilê zarokan de fîşek hebûn. Em dibêjin, zarok paşeroja civakê ne. Lê vî dijminî li mêjî û dilê paşeroja civakê xist. Wî ev mesaj da gel: Em paşeroja we reş dikin! Dayik bi porê wê xeniqandibûn. Dayikek şehîd xistibûn, lê zaroka wê ya piçûk hiştibûn. Di nav xwînê de wê zarokê sînga dayika xwe derxist û dixwest şîrê wê vexwe. Ev dîmenekî pirr giran bû. Ciwanên Kobanê reviyan çek û rextên xwe girtin ji bo dijmin ji Kobanê derxin. Ji wan jî şehîd çêbûn."[514]

Şehîd hemû di nav xwînê de li erdê bûn. Hevjînê Sara jî yek ji wan Kobaniyan e ku di roja komkujiyê li ber deriyê mala xwe şehîd bû. Ji malbateke 11 kes, ji hinek malbatên din 7 yan 5 kes hatibûn qetilkirin. Gelê Kobanê ku di dema şer de koçber bûye, hîna wehşeteke bi vî rengî neditibû. Lê ev dîmenê xof ku malbatên Kobanê di tax û gundê xwe de dîtine, birîneke kûr hiştiye. Dayikên Kobanê bi dilê êş dibêjin, *"Kobanê ne carek, du caran birîndar bû. Her tişt ji nû ve tê*

[512]Hevpeyvîn bi Meryem Kobanê re, Kobanê, 2017

[513] Hevpeyvîn bi Sara, Edlê û Semîra re, Kobanê, 2017

[514] Hevpeyvîn bi Sorxwîn Rojhilat re, Kobanê, 2017

avakirin, lê can careke din venagere!" Gelek kes ku beriya komkujiyê dixwestin ji xerîbiyê vegerin warê xwe, ji ber tirsê biryara xwe guhertine. Ruxmê ku hêzên Asayîş, YPJ û YPG'ê di demeke kin de karîbûn çeteyan bêbandor bikin û ji Kobanê derxin, tirsa wan hîna maye.

Sê salan piştî şerê Kobanê û du sal û nîvan piştî komkujiyê, jinên Kobanê dibêjin, di encama şer û berxwedanê de gelek guhertinên erênî û neyînî di rewşa jin û civaka Kobanê de qewimîn. Li aliyekî şer û komkujî tirsek çêkir. Bi taybetî zarok hene ku ji ber bandora kiryarên komkujiyê kabûsan dibînin yan li hemberî dengên wek teqînê dikevin panîkê. Li aliyê din ezmûna pêvajoya koçberiyê, qutbûna ji axa xwe li cem gelek jinan girêdana bi warê xwe ve xurttir kiriye. Lewma ew dibêjin, *"Ger careke din wê şer derkeve, êdî em naçin. Em careke din xaka xwe bernadin. Em ê [li] ber xwe bidin."* Bi taybetî dayikên navsere bi xemgînî û hesreta zarokên xwe dijîn. Hinek xizmên wan dixwestin vegerin, lê belê ji ber komkujiyê venegeriyan. Dîsa bi bandora koçberiyê û jiyana li metropolên Tirkiyê yan Ewropayê, hinek guhertinên di feraset û şêwaza jiyanê de yên wekî girîngîdayîna bi madiyatê û hewesên çanda kapîtalîst derketine holê. Ev jî dibin sedema helandina têkiliyên komînal ên civakê û pirsgirêkên malbatî. Her wiha derketiye holê ku piştî şerê Kobanê, istixbarata Tirk dest avêt hinek kesên civaka Kobanê da ku bi polîtîkayên şerê taybet bandora têkoşîna azadiya jinê û yekîtiya civakê bişikîne. Di çarçoveya van hewldanên dewleta Tirk de fitne û propagandayên reşkirinê tên belavkirin. Şebekeyên bazirganiya jinê û ya tiryakê hewl didin bi torên xwe civakê û ciwanên Kobanê teslîm bigirin û ruhê berxwedanê pûç bikin. Di vî aliyî de jinên Kobanê gumanên xwe di warê xeterên helandina civakê de tînin ziman.

Lê belê li aliyê din rista pêşeng a jinê di berxwedanê de hişt ku bi giştî bixwebawerî û lêgerînên nû yên jinan bi pêş bikevin. Feraset û sînorên feraseta feodal û zayendperest ku jin dîl girtibûn, nermtir bûn. Gelek jin êdî nêzikatiyên serdestiya zilam wekî çarenûsa xwe qebûl nakin û dawa mafê xwe dikin. Jinên ku berê ji mala xwe dernediketin û newêrin nihêrînên xwe bigotana, îro tên navenda Yekîtiya Star û saziyên civakî, tevlî nîqaşên civînan, karê komîn û meclîsan dibin. Nûnertiya jinê di xebatên civakî, siyasî û parastinê de di warê çendanî û çawanî de bi pêş ketiye.

Tevlîbûna jinan a nav refên YPJ'ê îro ji aliyê malbat û civakê ve bi pirranî wekî erkeke pîroz tê dîtin. Dîsa zanîn û xwesteka jinê ji bo tevlîbûna nav refên HPC Jinê jî bi pêş ketiye. Jin dixwazin perwerdeyên çekan bibînin ji bo bikarin xwe biparêzin. Her wiha derfetên xwendin û kar ji jinan re vebûn. Îro gelek jinan di pîşê û qadan de dişuxilin ku berê wekî 'karê zilaman' dihatin pênase kirin. Di warê aborî de jinan derfet ava kirine ji bo ew bikarin debara xwe bi xwe bikin. Bi bipêşxistina birêxistinbûna jinê di warê aborî û civakî de jinê xwe heta astekê ji bindestî û siya zilamî xilas kiriye. Têkilî, hevgirtin û parvekirin di nav jinên ji beşên cuda yên civakê de bi bandora êş û hêviyên hevbeş xurttir bû. Têkoşîna jinan li hemberî şidet û zextên zayendperest di nav malbatê de bi piştgiriya rêxistinbûna komînan û saziyên jinê dewam dike.

h) Hêza Xweparastinê Bûye Nasnameya Nû Ya Jinên Rojava

Heta destpêka Şoreşa Rojava jin bê hêza birêxistinkirî ya parastinê bûn. Lewma beramberî zordestiya dewletê, jinan tenê karîbû bêdeng û veşartî têkiliyên hevgirtinê ava bikirana. Wekî din, beramberî zextên civaka zayendperest û tundiya zilamî, jinan bi pirranî êşên xwe bi tena serê xwe kişandine, hêsirên xwe bi dizî paqij kirine û hawarên xwe daqurtandine. Lê belê di bin şertên şoreşê de jinên Rojava hêza xwe ya têkoşîn û berxwedanê ji nû ve peyda kiriye. Wan him pêdivî

him jî derfet dîtin ku hêzên xwe yên parastinê yên leşkerî û civakî bi rengekî girseyî damezrînin. Li ser esasê perspektîfên Abdullah Ocalan, her wiha yê zanîn û rêûresmên rêxistinî û têkoşînê yên ku ji salên 1980'yî ve di civaka Rojava de hatibûn danîn, nifşekî nû yê jinên pêşeng, pêwîstiya jinê ya xweparastinê rast nirxand. Li gorî vê, wan rasterast dest bi avakirina hêza jinê ya xweparastinê kir. Li seranserê Rojava bi hezaran jin li pey hev tevlî perwerde û rêxistinên jinan ên xweparastinê bûn.

Girîngiya avakirina Yekîneyên Parastina Jinê YPJ'ê nexasim bi destpêka êrîşên qirkirinê yên çeteyên El Nusra û DAIŞ'ê careke din derket holê. Gelek jin û beşên cuda yên civakê, dema qirkirinê û revandina jinên Êzdî yên Şengalê ji nû ve wate û piştgirî dane xebatên xweparastina jinê. Ew pê hesiyan ku jin û gelên Rojava tenê bi rêya hêzên xwe yên leşkerî û ewlekariyê wê karibin hebûna xwe li hemberî êrîşên dagirker û tecawizkar biparêzin. Lewma qada xweparastinê wekî yek ji stûnên pergala xweseriya demokratîk hatiye birêxistinkirin. Jinan him wekî pêşeng di sazkirina pergala gişтî ya parastinê de cih girtiye, him jî wan hêzên xwe yên xweser ava kirine. Bi vî rengî ***Yekîneyên Parastina Jinê*** (YPJ) di qada leşkerî de, ***Asayîşa Jinê*** di qada parastina hundirîn de û ***Hêzên Parastina Civakî*** *ya Jinê* (HPC Jin) di qada civakî û komînan de hatin birêxistinkirin. Asayîşa Jinê û HPC Jin erka parastina jinê û civakê li hemberî tevahiya cûreyên êrîş û tundiyê girtin ser xwe. Van rêxistinan bi tevlîbûna bi dehan jinan dest pê kiriye; di nava 4 – 5 salan de wan gihand astekê ku bi hezaran endamên ji tevahiya pêkhateyan di nav wan de cih bigirin û li herêmên Bakurê Sûriyê hemûyan xebatên xwe bimeşînin.

Dîsa Asayîşa Jinê û HPC Jin wekî rehenda xweparastinê di pergala meclîsên jinê û Yekîtiya Star de cih digirtin û nûnertiya xwe didîtin. Bi vî awayî endamên meclîsên jinê û Yekîtiya Star zanebûn û hişyariya xwe di mijara xweparastinê de bi pêş xist. Her wiha, endamên Asayîşa Jinê û HPC Jinê jî di warê bîrdoziya azadiya jinê û tehlîlên pirsgirêkên jinê û yên civakê de ji nû li meseleyê hûr bûne, serê xwe pê êşandine. Hevbeşbûna nihêrîn, rojev û xebatên jinan di waran hemûyan de hêzeke nû afirandiye. Nêzikatiyên qebûlnekirin û piçûkdîtina jinê di civakê de, jinan bi helwest û keda xwe guhertine: *"Ji ber ku jinên asayîşê li pirsgirêkên jinê xwedî derketin, nêzîkatiyên civakê yên bê baweriyê dihatin guhertin. Asayîşa Jinê him bi giliyên jinan li hemberî zilam, him jî bi giliyên zilam li hemberî jinê re elaqedar bû û ew çareser dikirin. Baweriya jinê bi jinê çêbûye."*[515]

Her wiha bi avakirina mekanên xweser, miracatên jinan û tevlîbûnên nav refên Asayîşa Jinê zêdetir bûn: *"Me Asayîşa Jinê fermî bi Asayîşa Gişтî [ya Rojava] îlan kiribû. Lê belê berê yek navend hebû. Asayîşa Jinê di navenda gişтî de wekî rêxistinbûneke xweser cihê xwe girtibû. Lê piştre me di hemû bajaran de navendên xweser ên Asayîşa Jinê vekirin. Bi taybetî di mijarên tundî û destdirêjiya li hemberî jinê de jinan navnîşaneke ji bo çareseriya pirsgirêkên xwe dît. Vê jî hişt ku beşdarbûna endamên jin ên asayîşê zêdetir bibe. Ev girîng bû ji bo me. Endamên Asayîşa Jinê yên ciwan û yên temenê wan 45 - 50 salî jî hene ku di destpêka şoreşê de bi keda xwe tevlî vê xebatê bûn. Him jinên xwendevan, him yên nexwende hene. Lê yên nexwende di milê fikir û zekayê de pirr xurt in. Keç hene û jinên zewicî jî hene. Jinên Kurd, Ereb, Suryan, Tirkmen û Çerkes hene. Her kes di nav de heye."*[516]

Hêba wekî jineke ciwan a Ereb cihê xwe di rêveberiya Asayîşa Jinê ya Dêrikê de digire. Ew bi malbata xwe re di destpêkê şoreşê de ji herêma Helebê hatiye Dêrikê. Cihgirtina jinên Kurd di nav

[515] Hevpeyvîn bi endamên rêveberiya Asayîşa Jinê ya Rojava, Qamişlo, 2017

[516] Çavkanî li heman cihî

hêzên parastinê de bala wê dikişand: *"Di civaka Ereb de jinê ti carî di cihên wisa de cih negirtiye. Qedexe ye, şerm e. Herî zêde tevlîbûna jinan a nav asayîşê bala min kişand, ji ber wê ez tevlî bûm. Dema min cara yekem çek rakir, ez jê re gelek xerîb bûm. Lê hevalên min gelek ji min re bûn alîkar û ez bihêz kirim. Piştre ez çûm gelek cihên ku parastin hewce bû. Vê li cem min bawerî da avakirin. Serê pêşî civakê tevlîbûna jinan a nav asayîşê nedipejirand, xelkê digot, 'jinek Helebî bûye asayîş'. Civaka me ya Ereban jî digot: 'Tu Ereb î. Çima tu tevlî asayîşa Kurdan dibî? Çi karê te bi Kurdan û doza wan heye?' Lê min israr kir û li cem xwe gelek bipêşketin dît. Niha di asta herî jor de cihê xwe di rêveberiyê de digirim. Pêwîst e em zêdetir têbikoşin da ku zêhniyeta baviksalarî li paş bê hiştin."*[517]

Luzî jî endama Asayîşa Jinê ya Dêrikê ye. Ew Suryanî ye û beriya şoreşê bi malbata xwe re li Şam û Himsê maye. Hevjînê wê di nav hêzên asayîşa Suryan, Sotoro de kar dike. Dema beşa jinê ya Sotoro hat avakirin jî, Luzî dixwest di asayîşa giştî de bimîne. Ew sedema vê wiha rave dike: *"Ji ber ku pisgirêkên me herdu gelan yek in, ez dixwazim li gel asayîşa giştî bim. Dema ez hatim Dêrikê, merasimên şehîdan gelek bandor li min kirin. Gelek nakokî di mêjiyê min de çêbûn. Ciwanên gelê Kurd ji bo parastina axa welatê xwe şehîd dikevin. Lê çima gelê Suryan ciwanên xwe dişînin dervê? Ji ber wê yekê ez tevlî Asayîşê bûm. Ez bi tevlîbûna xwe ya asayîşê gelek şanaz û bextewar bûm. Hemû heval û malbata min alikarî û piştgiriyê didin min."*[518]

Heta sala 2017'an nêzîkî 20 beşên cuda yên karê asayîşê tevî akademiyên wan beşan, hatin avakirin. Di nav hemû beşan de jin jî cihê xwe digirin. Li wir perwerdeyên bîrdoziyê ji bo avakirina neteweya demokratîk û civaka exlaqî û li ser esasê parastina jinê tên dayîn. Endamên rêveberiya Asayîşa Jinê dibêjin, bi van perwerdeyan çawaniya endaman û bîrewerîya wan li ser parastina mafên qanûnî û mafê mirovan bi pêş ketiye. Wekî rêgeza xebata asayîşê, lêpirsîna jinan ji aliyê endamên Asayîşa Jinê ve tê kirin. Di dozên malbatê, yên jin û zilam de jî divê endameke Asayîşa Jinê amade be.

Her wiha endamên Asayîşa Jinê rave dikin ku ew bi feraseta desthilatdariya zilam di saziya xwe û di civakê de têkoşîneke xurt dikin: *"Carna bawerî bi jinê nedianîn. Lê jin bi xwe bi ked û serketinên xwe gelek nêzikatî dane guhertin. Zêhniyeta dewletê di jinê de ne wekî di zilaman de ewqas kûr e. Em jî dixwazin vê zêhniyeta desthilatdar him di civakê de, him di saziyê de, him jî di kesayetê de ji holê rakin. Bi vîn û israra xwe me encam girtin. Di warê parastina pîvanên xwe de, me gavek şûnde neavêt. Lê me gelek gav pêş ve avêtin. Armanca me avakirina zêhniyeta neteweya demokratîk di kesayet, sazî û civakê de ye."*[519]

Hebûn û hêza jinê di warê civakî de jî di gelek aliyan de xwe dispêre nasnameya jinê ku bi vîn û têkoşîna jinê di warê parastinê de derket holê. Endamên HPC Jinê dibêjin, têkoşîna wan li hemberî ferasetên zilam yên desthilatdar him di mala wan de, him jî di saziyên wan de dewam dike. Lê bi gelemperî endamên Asayîşa Jinê û Parastina Jinê bi israr û sekna xwe pêşî li guhertinên nihêrîn û jiyana civakê vekirine û cesaretê didin jinan. Di encama têkoşînê de hebûna jinan li ser bendên kontrolê ango hacizan îro bûye tiştekî 'asayî'.

Gelek jinên ku bi xwe pirsgirêkên wan ên malbatî hebûne yan jî bi tundiya zayendperest re rû bi rû

[517] Hevpeyvîn bi endamên Asayîşa Jinê ya Dêrikê re, 2017

[518] Çavkanî li heman cihî

[519] Hevpeyvîn bi endamên rêveberiya Asayîşa Jinê ya Rojava, Qamişlo, 2017

mane, îro cihê xwe di nava saziyên YPJ, Asayîşa Jinê û HPC Jinê de digirin. Jinên Kurd, Ereb, Suryan û Tirkmen ku me bi wan re hevpeyvîn çêkir, gotin, ew bi tevlîbûna xwe ya nav Asayîşa Jinê yan jî HPC Jinê re di jiyana xwe ya malbatî de jî bûn xwedî nihêrîn û hêza biryardayînê. Ew êdî fêrbûne ka çawa dikarin xwe, jinên din û civakê biparêzin. Ev hest û zanebûn ruhekî nû di kesayeta jinan de ava kiriye. Endameke HPC Jinê ji Dêrikê bi kenê di çavê xwe de dibêje, *"Êdî di hundirê malê û dervê malê de jin xwe û mafên xwe diparêzin - dayik tax û bajarên xwe diparêzîn!"*[520] Di nav şer û berxwedanê de jinan xwe gihandiye asteke nû ya bixwebaweriyê.

Dayik û jinên ciwan ên di nav HPC Jinê de diyar dikin ku ew berî her tiştî hêza xwe ji manewiyata şehîdan û perspektifên Abdullah Ocalan digirin. Çendî pergal û sazîbûna xweser a jinê darîçav dibû û bi pêş diket, ewqasî jî îrade û xwesteka jinan ji bo tevlîbûna nav xebata parastinê xurtir bûye. Bi serbilindî ew dibêjin, *"Berî şoreşê jin tine bû, lê niha em li her derê hene"*.

Pergala xweparastina jinê herçiqasî di rastiya Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de li Kurdistanê û Bakurê Sûriyê hatibe avakirin jî, pêdiviya jinê ya xweparastinê pêdiviyeke gerdûnî ye. Hilweşandina exlaq û manewiyata civakê di encama êrîşên modernîteya kapîtalîst de, jin li hemberî êrîşên zayendperest, qirkirinê û kedxwariyê bê parastin hiştine. Lewma jinên hemû neteweyan hewce dibînin xweparastinê bi rêxistin bikin. Gelek jinên ku dixwazin li dewletên hegemon yên moderniteya kapîtalîst li dijî vê pergalê têbikoşin ji berxwedana YPJ'ê hêviyeke nû peyda kirine. Ji ber vê yeke, bi dehan jinên înternasyonalîst di lêgerîna xwe ya azadiyê de tevlî nav refên YPJ'ê bûne.

Şoreşa Rojava jinên ji parzemînên Ewropa, Emerîka, Efrîka, Asya, Awustralya û Rojhilata Navîn li Rojava anîn cem hev. Şehîdên wek ***Avaşîn Têkoşîn Guneş*** (Îvana Hoffmann), ***Toprak Çerkes*** (Tugba Arik), ***Sarya Ozgur*** (Sibel Bulut), ***Kader Ortakaya*** û ***Destan Temmuz*** (Ayşe Deniz Karacagil) ji Tirkiyê, ***Lêgerîn Çiya*** (Alîna Sanchez) ji Arjantînê û ***Hêlîn Qereçox*** (Anna Campbel) ji Brîtanya bûn sembola ruhê hevbeş û têkoşîna înternasyonalîst a parastina jinê. Fermandarên YPJ'ê yên ji Rojava li ser tevlîbûna înternasyonalîstan dibêjin, *"Tevlîbûna hevalên înternasyonalîst em bi nirx dibînin. Yên ku ji welatên dûr hatin û yên ku li ser navê çepên Tirk dihatin, em bi hevdu re di cebhê de bûn. Me ti ferq di nav xwe û wan de hîs nedikir. Ne di milê çandî, ne di milê pîvanê de. Me wekî quwetê xwe ew didîtin. Wan jî xwe aydê me didît. Di milê ruh û çandê de em dibûn yek."*[521]

Di ***'Komcivîna Jin û Parastinê'*** de cara yekem pêdiviya avakirina têgihîn, rêbaz û pergala hevbeş a xweparastina jinan di asta Rojhilata Navîn de hatiye guftûgokirin. 160 delegeyên ku nûnertiya 16 hêzên leşkerî yên jinên azadîxwaz dikirin, cara yekem di 2 û 3'ê Nîsana 2017'an de li Kobanê hatin cem hev. Bi diruşma '*Hêza xweser a jinan misogeriya civaka azad e'* jinên ji hêzên parastinê yên warên civakî û leşkerî serpêhatiyên xwe yên têkoşînê û bandora şer li ser jin û civakê nirxandin. Pêwîstiya domandin û kûrkirina wan nîqaş û xebatên hevbeş hatiye dîtin, da ku ti jin li Rojhilata Navîn û li cîhanê êdî bê parastin nemîne.

Lê pergala desthilatdar hêz û hêviyên ku di xeta azadiya jinê de hatine avakirin ji bo xwe weke xetera herî mezin dîtin. Lewma di şeva 25'ê Nîsana 2017'an de arteşa Tirk bi balafirên şer sînorê Sûriyê derbas kirin û biryargeha YPJ'ê li Qereçoxê hedef girt. 20 şervan û fermandarên YPJ û

[520] Hevpeyvîn bi endamên HPC Jinê re, Dêrik, 2017

[521] Hevpeyvîn bi Şîlan Qamişlo re, Dirbêsî, 2017

YPG'ê di êrîşên hawayê de şehîd ketin. Ev êrîş di demekê de pêk hat ku şervanên YPJ û YPG'ê di eniya Reqa de tevî koalisyona navdewletî li hemberî çeteyên DAIŞ'ê şer dikir. Lê belê hêzên navneteweyî hemû li hemberî komkujiya Qereçoxê bêdeng man. Endama fermandariya YPJ'ê Şîlan Qamişlo êrîşên li dijî Qereçoxê bi Komcivîna Jin û Parastinê re têkildar dinirxîne: "*Di komcivîna parastina jinê de me xeta xwe ya Serokatiyê zelal kir. Ev mesaja me ji bo hêzên dagirker û komploger bû. Wan mesaja me girt: Hûn çi jî bikin, jin bi Serokatiyê û nirxên xwe ve girêdayî ne. Jin bi nasnameya xwe wê hebe. Nasnameya jinê felsefeya Serokatiyê ye. Me ev da xuyakirin. Piştî vê, li biryargeha YPJ'ê xistin.*

Şoreşa Rojava û dengê jinê di nav vê şoreşê de bûye hêvîya tevahiya gelên bindest. Dijmin jî bi rista pêşeng a jinê di nav vê şoreşê de baş zanîbû. Dagirkeran bi xistina li biryargeha jinê, dixwest vê hêza jinê û hêviyên gelên bindest tine bikin. Yên herî bindest û pêşeng jî jin in. Ev mentiqa kapitalîzme ye: Di destpêke de jinê bixe. Ji ber xetera herî mezin ji bo pergala kapîtalîzmê, hêza jinê ye. Di Şoreşa Rojava de dinyayê ev hêza me dît ku berê jî hebû. Komkujiya Qereçoxê wek gefxwarinê pêk hat. Ji me re digotin, 'Hûn ê yan ji xeta Serokatiyê qut bibin yan em ê we bikujin!' Bi vê êrîşê dixwestin dagirkeriya xwe bi me bidin qebûlkirin. Ji bo vê, pêşengên xeta îdeolojîk û siyasî hedef girtin. Qereçox êrîşeke li ser nirxên me, nasnameya me û îdeolojiya me ye."[522]

h) Wekî Encama Beşê

Jinên Rojava di şerên giran li hemberî dagirkeriya DAIŞ'ê de bi hevrêyên xwe yên YPG'ê re him axa xwe rizgar kirine him jî nasnameyeke nû ya jinên Rojava ava kirine. Jinên ku berê wekî 'zayenda kêm' yan jî 'namûsa zilam û malbatê' dihatin pênasekirin, hebûn û vîna xwe nîşan dan. Di şerên Serêkaniyê û Kobanê de, di pêngavên rizgarkirina herêmên Cizîrê û Girê Spî de jin dibûn pêşengên şer. Wan tirs û bawerîpêneanîn di kesayeta xwe de bi bin xist û bi vî rengî bawerî da hevrê û civaka xwe. Li dijî êrîşên qirkirinê, jinan bi hezkirina jiyanê, bi hevalbendî û lehengiyê li ber xwe dida. Ev sekna jinê ku di kesayeta şervanên YPJ'ê de bûye sembola vîna azad û wêrekiya jinê, di gelek aliyan de feraseta zayendperestiya civakê hejand.

Bi vî awayî têkoşîna hêzên YPJ'ê ji bo jinên civaka Rojava bûye wekî sparteka ji bo gavên nû di jiyana malbatî, civakî û siyasî de. Jinan bi avakirina nirx û avahiyên nû, bersiv da êş û hilweşandinên şer. Li ser vî esasî jin di her sê kantonên Rojava de bi risteke girîng di avakirin û sazibûna rêveberiya xweseriya demokratîk de rabûn. Jin bi hişyarî tevdigeriyan ji bo ev modela xwerêveberina civakê di bin bandora hişmendî û ferbûnên dewletperest de neyê şewişandin. Ji vê zêdetir, jinan birêxistinbûna xwe ya xweser di hemû saziyan de bi pêş xist, dest bi pêngav û projeyên nû kirin da ku feraseta demokratîk û ruhê azadîxwaz ê pergala xweseriya demokratîk bê parastin û darîçav bibe.

[522] Çavkanî li heman cihî

III. 3.8. Di Avakirin û Parastina Neteweya Demokratîk de Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê

Pergala xweseriya demokratîk di kantonên Efrîn, Kobanê û Cizîre de di bin şert û mercên şerên dijwar de ji sala 2014'an ve hatiye rûniştandin. Pê re ceribandinên nû yên rêveberina hevbeş a pêkhateyan û ya herdu zayendan derketiye holê. Hîm û rênîşana avakirina vê pergalê, pêşnûmayên Abdullah Ocalan bûn yên derbarê xweseriya demokratîk, civaka exlaqî û polîtîk, konferderalîzma demokratîk û neteweya demokratîk de. Di pênc pirtûkên *Manîfestoya Civaka Demokratîk û Şarestaniya Demokratîk* de Abdullah Ocalan wan têgihînan wekî pergaleke alternatîf û çareseriyê li hemberî pergala desthilatdariya zilam, netewe dewletê û moderniteya kapîtalîst şirove dike. Wekî din Abdullah Ocalan têkiliya navbera xweseriya demokratîk mîna gewde û neteweya demokratîk mîna zêhniyet û ruh wekî têkiliyeke sîmbiyotîk rave dike. Yek bê ya din nabe. Lê bipêşxistina her yekê ya din xurttir dike. Di pirtûka pêncemîn a Manîfestoya Şarestaniya Demokratîk de Abdullah Ocalan dibêje:

"Di neteweya dewlet de miletperestî mohra xwe li zêhniyeta hevpar dide, lê di neteweya demokratîk de bîreweriya pişgirî û azadiyê mohra xwe li zêhniyeta hevpar dide. Lê netewe bi tenê bi rewşên xwe yên zêhnî bêne pênasekirin ev danasîn wê kêm be. Çawa ku zêhniyet bê gewde nabin, netewe jî bê gewde nabin. [...] Gewdeyê neteweyên xwedî zêhniyeta azadî û pişgiriyê xweseriya demokratîk e. Bi awayekî bingehîn xweseriya demokratîk ew e, kom û ferdên zêhniyetên weke hev parve dikin xwe bi îradeyên xwe bi rê ve dibin. Mirov dikare ji vê re rêveberiya demokratîk an otorîteya demokratîk jî bibêje. Danasîn û pênaseyeke deriyên wê li gerdûnîtiyê vekirî ne."[523] Bi vê ve girêdayî Abdullah Ocalan xwegihandina azadiya jinê û hevjiyana azad wekî cewher û pîvana neteweya demokratîk pênase dike: *"Di pêvajoya netewebûyînê de azadbûyîna jinê gelekî girîng e.* ***Jina azadbûyî civaka azadbûyî ye.*** *Civaka azadbûyî jî neteweya demokratîk e."*[524]

Di vî warî de em dikarin bêjin ku bi avakirina rêveberiyên xweseriya demokratîk li Rojava, rê li pêşiya zindîbûna zêhniyeta neteweya demokratîk vebûye. Wekî din kargerî û projeyên rêveberiyên herî serketî derketine yên ku bi ruhekî hevbeş tevgeriyane, li ser bingehê pêkanîna pêdiviyên civakê, hûrmetdayîna vîna jinê û rêzgirtina ji cudahiyên neteweyî, bawerî, çandî û ramanî re. Li ser vî esasî hewldanên avakirin û yekparekirina gewdeyê xweseriya demokratîk û zêhniyeta neteweya demokratîk ji sala 2015'an ve li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav bûne û didomin.

Hevseroka KONGRA-GEL, Hacer Zagros pêvajoya avakirina neteweya demokratîk li Rojava û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê wiha dinirxîne:

"Neteweya Demokratîk yekem car bi Şoreşa Rojava pêk hat. Di milê aborî de, bi rêya meclîs û komînan, saziyên demokratîk rêveberiyên civakî hatin avakirin. Di nav komîn û meclîsan de cudahiyên îdeolojîk, yên partiyan, yên fikrî, yên çandî, yên pêkhateyan hene. Lê her kes di bin banê vê pergal û rêvebiriyê de xwe bi nasnameya xwe bi rêxistin dike. Bi vî rengî gel di bin banê meclîsan de îradeyeke hevbeş a xwerêveberinê ava dike.

[523] Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Şarestaniya Demokratîk - Pirtûka Pêncemîn*, Beşa 6.C. KCK û Şaxên Netewebûyîna Demokratîk, 2012

[524] Çavkanî li heman cihî

40 salan keda Rêber Apo hebû. Gelê Kurd fikr û felsefeya wî ya netewbûna demokratîk nas kiriye. Ji bo vê, di 19'ê Tîrmehê de gel bi rêxistinbûnê ket vê pêvajoyê. Gelê Kurd ji avakirina rêveberiya xweser bi tifaqa gelên Ereb, Suryan, Tirkmen û pêkhateyên din re amade bû. Gelan hemûyan bi hev du re, bi yekîtiyeke di nava pêkhateyên etnîk, netewî û olî de ev sîstem înşa kir û ew bi rê ve bir. Encameke pirr erênî derketiye [holê] û civak pê razî bû.

Li hemberî nakokiyên mezheb û olî yên ku nakokiyên herî kûr li Rojhilata Navîn in, di modela neteweya demokratîk ya Bakurê Sûriyê de 'Komîteya Ol û Baweriyan' hatiye avakirin. Hemû bawerî, yên Misilman, Sunî, Şîa, Elewî, Xirîstiyan, Êzdî û wekî din xwe bi nasnameya xwe ya xweser bi rêxistin dikin û li bin vî banê hevbeş tên cem hev. Hemû hev du nas dikin, qebûl dikin. Her baweriyek nûnerên xwe dişîne meclîsa giştî û rêveberiyê. Çi sazî tê avakirin, nûnertiya hemû ol û pêkhateyan tê de heye. Lewma nabe pirsgirêk û nakokî. Ji ber ku vîna çand û baweriya her kesî tê qebûlkirin. Wisa ferq û cudahî gihandin hev. Çi zindiyek hebe, çênabe ku ji bo rengê xwe, ji bo fikrê xwe, ji bo cinsê xwe were înkarkirin."[525]

Bi hev gihandina hev a her beş û nasnameya civakê, yek nakokiya bingehîn maye di navbera zêhniyeta desthilatdar û ya neteweya demokratîk de. Di serî de nakokiya cins û zordestiya li ser jinê, pirsgirêk û nakokiyên civakî hemû xwe dispêrin zêhniyeta desthilatdar. Lewma pirsa bingehîn niha ev e: *Em çawa xwe ji zêhniyeta dewletê rizgar bikin û xwe li gorî zêhniyeta neteweya demokratîk înşa bikin û bi rê ve bibin?*

Li hemberî feraseta desthilatdar ku parçe dike û civakê îdare dike, Abdullah Ocalan balê dikişîne ser wê yekê ku zêhniyet û saziyên neteweya demokratîk yekpare ne. Neteweya demokratîk û şaxên wê ew wekî *'organîzmayeke zindî ya yekpare'* terîf dike ku hev du temam dikin û ji tevahiyê nayên qutkirin.[526] Perwerdeyên civakî yên ku li ser şax û rehendên netewebûyîna demokratîk hatin lidarxistin, encamên girîng bi xwe re anîn. Endamên meclîs, komîn û saziyan bi rêya perwerdeyan armanc û naveroka xebat û erkên xwe di dîmenê giştî yê neteweya demokratîk de dibînin. Bi vî rengî jin û kesên ji nava civakê yên ku berê derveyî siyasetê, sazî û mekanîzmayên biryarê dihatin hiştin, gihîştin hewes û wê bîreweriyê ku ew jî dikarin di avakirin û birêvebirina civaka xwe de xwe bidin ber berpirsyariyê.

Hacer Zagros balê dikişîne ser wê yekê ku piştî ceribandinên modela neteweya demokratîk di kantonên Rojava de gav bi gav li nav bajarên pirraniya xelkê wan Ereb û pêkhateyên din de belav bûye û xwe li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi rêxistin kiriye: *"Çawa bajar ji desthilatdariya DAIŞ'ê tên rizgarkirin, gelê wan bajaran xwe bi xwe birêxistin dike û pergala xwe ya xweseriya demokratîk ava dike. Hêzên xwe yên leşkerî û yên parastina cewherî, saziyên xwe yên çand, huner, perwerde, tenduristî, dîplomasî û ziman ava dike. Pergala aborî û hiqûqî ava dike û xwe bi rê ve dibe. Bi avakirina vê pergalê ve rêveberiya xwe ya hevbeş îlan dike. Hevbeşbûna jin û zilam û hemû pêkhateyan tê de heye."*[527]

a) Bi Rengê Jinê Avakirina Neteweya Demokratîk

[525] Hevpeyvîn bi hevseroka KONGRA-GEL Hacer Zagros re li herêma Qendîlê ya Başûrê Kurdistanê, 2018

[526] Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Şarestaniya Demokratîk - Pirtûka Pêncemîn*, 2012

[527] Hevpeyvîn bi Hacer Zagros re li herêma Qendîlê ya Başûrê Kurdistanê, 2018

Neteweya demokratîk û hevjiyana azad dibûn mijarên sereke yên nîqaş û perwerdeyên Yekîtiya Starê: *Ji bo avakirina vê zêhniyetê rêxistinbûneke çawa pêwîst e? Rêbazên perwerdeyê li gorî vê divê çawa bin? Bi kîjan xebat û projeyan em dikarin rastiya hevjiyana azad û neteweya demokratîk di şoreş û civaka Rojava de ava bikin?*

Li gorî biryarên Kongreya 5'an a Yekîtiya Starê pêngava birêxistinkirina endam, komîn û meclîsên jinê wekî bingeh û bedena neteweya demokratîk hatiye meşandin. Tevî ku rewşa şer li gelek herêmên serxet û binxet herdiçû dijwartir bûbû, civîn û perwerdeyên ji bo berfirehkirina birêxistinbûna jinê nesekinîn. Di encamê de Kongra Star heta destpêka sala 2016'an li kantona Cizîrê 700 komîn û li kantona Efrînê zêdetirî 100 komînên jinê li gund û taxan ava kirin. Ji ber rewşa şer û koçberiyê li Kobanê xebatên komînan hîna nû piştî vegera gel bi avakirina 7 komînên jinê ji nû ve dest pê kir. Her wiha di asta bajar û herêman de jî meclîsên jinê wekî sîwan û koordînasyona xebatên hevbeş a komîn û saziyan hatin avakirin.

Lê belê rêveberiya Yekîtiya Star nirxand ku asta birêxistinbûyîn teng dima beramberî pêdiviyên jinan û yên şoreşê. Yekîtiya Star wekî Tevgera Jinên Kurd a Rojava hatibû damezrandin û bi vê nasnameyê hatiye naskirin. Lewma endam û alîgirên Yekîtiya Star hema hema hemû jinên Kurd ên welatparêz bûn. Lê bele di çarçoveya avakirina pergala xweseriya demokratîk û perspektîfa neteweya demokratîk de Yekîtiya Star pêwîst didît ku yekîtî û hevbeşbûna jinên hemû pêkhateyên Rojava bi armanca misogerkirina şoreşa jinê zêdetir bi pêş bixe. Bi vê perspektîfê di destpêka sala 2016'an de konferansên kantonan hatin lidarxistin û amadekariyên kongreya 6'an a Yekîtiya Star hatin meşandin.

Hemwext bi berxwedana xweseriya demokratîk ya gelê Bakur li bajarên serxetê re, Yekîtiya Star kongreya xwe ya 6'an bi dirûşmeya ***'Bi rengê jinê neteweya demokratîk ava bikin!'*** li dar xist. 600 jinên ji hemû herêmên Rojava û tewahiya beşên xebatê di 25 û 26'ê Sibata 2016'an de li bajarê Rimêlan kom bûn. Di encama nîqaşên kongreyê de biryar hat dayîn ku şekil û navê rêxistinê wekî Kongra Star were guhertin. Bi vî awayî hemû komîn, meclîsên herêmî, sazî û dezgehên jinan ên li Rojava di bin sîwana Kongra Star de kom bûn. Wekî din jinên ku di saziyên giştî yên civakî û partiyên siyasî de xebat dimeşandin, karibûn di çarçoveya kongreyê de xwe bi rêxistin bikin û li saziyên xwe nûnertiya Kongra Star bikin.

Sara Xelîl wekî yekê ji delegeyên Kobanê, tevlî kongreyê bû. Ew di kongreyê de wekî endama rêveberiya Kongra Star hatiye hilbijartin. Girîngiya guhertina nav û şeklê rêxistina jinê, ew wiha şirove dike: "*Navê Yekîtiya Star bû Kongra Star ji ber ku bi vî awayî her pêkhate dikare bi nasnameya xwe tê de cihê xwe bigire. Me rêxistina xwe berfirehtir kir. Di Yekîtiya Star de tenê jinên Kurd cih digirtin. Lê niha di Kongra Star de hemû pêkhate bi çand û zimanê xwe hene."*[528]

Rêvebera Kongra Star a kantona Cizîrê Welîda Botî dide diyarkirin ku wan piştî kongra 6'an pergala konfederal û ya hevserokatiyê di hemû sazî û karan de daye rûniştandin. Komîteyên cuda hatin avakirin ji bo bipêşxistina xebatê li ser bingehê şaxên neteweya demokratîk: *"Kongra Star ji komîteyên civakî, perwerde, parastin, dada jinê, aborî, çand, tenduristî, têkiliyên dîplomasî û ragihandinê pêk tê û bi hişmendiya neteweya demokratîk xwe bi rêxistin dike. Têkilî û hevkarî bi jinên Ereb re piştî kongrê hatin xurtkirin. Ji niha û pêde herî zêde çalakkirina komînan di nav civakê de tê xwestin."*[529]

[528] Hevpeyvîn bi endamên rêveberiya Kongra Star a kantona Kobanê re, Kobanê, 2017

[529] Hevpeyvîn bi endamên rêveberiya Kongra Star a kantona Cizîrê re, Qamişlo, 2017

Komîteyên Kongra Star him di asta Rojava him jî di nav meclîs û komînan de hewl dida ku xwe bi rêxistin bikin. Ji ber ku li her derê ji bo avakirina komîteyan hemûyan hîna bingehek tinebû, ji bo birêxistinkirina komînên jinan çar komîteyên esasî hatine diyarkirin. Di serî de Komiteyên perwerde, tenduristî, dadê û parastinê hatin avakirin da ku jin bikarin pêdiviyên xwe yên bingehîn di komînên xwe de pêk bînin. Bi ser de komîteya aborî ji vê pêvajoyê ve di her sê kantonan de giranî daye avakirina kooperatifên jinê wekî kooperatifên firin, xwaringeh, çandinî û sewaldariyê.

Bi avakirina saziyên nû wekî akademî, kooperatîf, weqf, navend û mektebên jinê di her warî de jinên nû û jinên bi pîşeyên cuda jî xwe di nav xebatên Kongra Star de didîtin û tevlî xebatan dibûn. Bi vî rengî Kongra Star wekî nasname û hêza birêxistinkirî ya jinên Rojava di warên civakî û siyasî de berçav bûye.

b) Rizgarkirina Jinê û Herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji Faşîzma DAIŞ'ê

Tevî xebatên ku ji bo avakirina feraset û bedena neteweya demokratîk li her sê kantonên Rojava hatine meşandin, pêngavên nû yên leşkerî pêwîst bûn. Hîna xetera êrîşên nû yên çeteyên DAIŞ'ê li ser kantonên Rojava dewam dikir. Lewma piştî rizgarkirina bajar û gundên Hesekê di 1'ê Tebaxa 2015'an de û navçeya Holê di 13'ê Mijdara 2015'an de hêzên YPJ û YPG'ê amadekarî ji bo pêngavên nû meşandine. Armanca van pêngavan ew bû ku tevahiya gelên Bakurê Sûriyê ji zordestiya DAIŞ'ê werin xilaskirin û kantonên Rojava hemû bigihin hev.

Fermandariya YPJ'ê helwesta xwe li dijî xetera DAIŞ'ê dabû xuyakirin: "*Dema ku êrîşên DAIŞ'ê li dijî Şengalê dest pê kirin, me digot 'DAIŞ li kû be, cihê berxwedana me jî wê li wir be. Ev dijminê insaniyetê ye û yê jinê ye, lutka desthilatdariya mêr e. Ji bo vê jî li kû derê bibe, bila bibe, em ê li dijî wê şer bikin."*[530]

Fermandariya YPJ'ê dilsozê daxuyaniya xwe maye. YPJ'ê armanc kir ku li şûna faşîzma DAIŞ'ê hişmendî û bedena neteweya demokratîk wekî projeya çareseriyê ji bo tevahiya Sûriyê were belavkirin. Li ser vî esasî ew tevlî pêngavên Minbic, Tebqa, Reqa û Derazorê bû ku ji 24'ê Gulana 2016'an heta bibinketina leşkerî ya DAIŞ'ê di 21'ê Adara 2019'an de dewam kirine. Fermandar û şervanên YPJ'ê di van pêngavan hemûyan de dîsa bi risteke dîrokî ya pêşengiyê rabûn. Pêngavên rizgarkirina herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li pey hev di bin fermandariya QSD'ê de û bi hevkariya koalisyona navdewletî li dijî DAIŞ'ê hatine meşandin.

Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) di 15'ê Cotmeha 2015'an de damezrandina xwe wekî rêxistinbûneke leşkerî ya hevbeş a hemû pêkhateyên Sûriyê ragihand. QSD, li ser bingehê rêgezên neteweya demokratîk têkbirina DAIŞ'ê û avakirina pergaleke azad, wekhev û demokrat li Sûriyê ji xwe re kiriye armanc. YPJ'ê di avakirin û fermandariya QSD'ê de bi hêz û nasnameya xwe cih girtiye û bi ked, lehengî û fedekariyeke mezin beşdarî hemleyên QSD'ê hemûyan bûye. Tev hêzên YPJ û YPG, hêzên leşkerî yên eşîr û komên demokratîk yên gelê Ereb, meclîsên leşkerî yên herêmî û yên gelên Suryanî, Keldanî, Aşûrî û Ermenî jî tevlî hêzên QSD bûn.

Şîlan Qamişlo dibêje, pêngava Minbicê bûye yekem hemle ku di bin fermandariya QSD'ê de hatiye meşandin: *"Danasandina nasnameya QSD'ê di nav civaka Ereb de girîng bû. Li Minbicê bi pirranî Ereb hene. Kurd, Suryan, Çerkes û Tirkmen jî hene. Pêkhateyên Sûriya demokratîk tê de hebûn. Ereb jî ne hemû yên Sûriyê ne, yên ku ji Misrê û ji cihên din berê koçber bûne jî li Minbicê*

[530] Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

hene."[531]

Çend komên leşkerî yên QSD'ê hebûn ku di avahiyên xwe de jin qebûl nedikirin. Lê ew jî mecbûr mane YPJ'ê weke hêzeke esasî ya fermandariyê nas bikin. Di nav pratîka şer de pêşhukmên gelek zilaman hatin guhertin, ji ber ku wan hêza jinê di koordînekirin û meşandina şer de bi çavê xwe dîtiye. Şervanên YPJ'ê êdî ne tenê di nav gelê Kurd de, lê di nav gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dibûn sembola nasname û rista nû ya jinê ku bi şoreşê re bi pêş ketiye.

- **Pêngava Rizgarkirina Minbicê**

Galia Nîmet ku wekî fermandareke YPJ'ê di fermandariya QSD'ê ya pêngava Minbicê de berpirsyarî girt ser milê xwe, rista jinê di nav vê pêngavê de wiha dinirxîne:

"Şerê Minbicê ji destpêkê heya kêliya dawî, hevalên jin hemû koordînê kirine û bi rê ve birine. Gelek hevalên Ereb jî tevlî vê hemleyê dibûn. Hemle giran bû. Her roj şehadet hebûn. Di hemû çeperan de hevalên jin cih digirtin, şer koordîne dikirin û hertim [bi] pêş ve diçûn. Nêzîkî 25 rojan şer xitimî. Pêwîst bû ku teqwiyê were. Şerê sîng bi sîng pêwîst bû. Hevala Sozdar koordîneya gişti ya hemlê bû. Wê taktîkên nû [bi] pêş dixistin da ku em karibin bikevin bajêr. Jinan fedakariyên mezin kirin, wekî Şehid Sema ku 2 meh û 20 rojan heta şehadeta xwe bê navber kar dikir û şer dikir, yan jî Şehîd Newroz û Şehîd Bengî. Di wan şeran de gelek hevalên jin wekî Hevala Koçerîn çalakiyên fedayî dikirin. Şehîd Rojbîn di rizgarkirina sawirme de bi qehramantî şer kir."[532]
Şîlan Qamişlo jî diyar dike ku di şerê Minbicê de gelek fermandar û şervanên YPJ'ê bi ruh û şêwazeke fedaî şer kirine û şehîd bûne:

*"**Hevala Koçerîn** ji Dêrikê di nav vê hemlê de çalakiya fedaî çêkir. Koma wan di nav hemleya bajêr de gelek êrîş birin ser dijmin ji bo çemberê bişkînin û hevalan xilas bikin. Şehîd Koçerîn, ev heval ji nav dijmin derxistin û di dawiyê de bombe bi xwe de teqand dema ku êdî bi xwe nikarîbû xwe xilas kiriba.*

***Hevala Silav** ji Wanê wekî gula wê hemlê, wekî pêşenga wê hemle bû. Ew fermandara tabûrê bû. Her cihê ku ew diçû, bi ruhê fetihkirinê diçû, hertim pêş ve diçû. Her cihê ku ew diçû, teqez digirt. Tax bû, gund bû, digirt. Cihê ku ew diçû, pişta min rast bû. Wê bawerî dida û bi baweriyê diçû. Ew hertim pirr rehet û sakîn bû, xwînsar bû û hevalên xwe pirr xweş bi rêxistin dikirin. Hevalan xetek li hemberî dijmin digirt û carna ji sibê heta şevê di pevçûne de bûn. Seyara xwe di nav wan de teqandin. Grûbeke din a DAIŞ'ê li ser wan sizma dikir. Kesên bombebarkirî yek bi yek hatin û xwe di nav wan de teqandin. Min ji wan pirs kir: 'Hevala Silav, rewşa we çawa ye?' Wê jî bersiv da: 'Pirr baş e.' Min pirs kir: 'Mesefe di nav we û cihê çete de çiqas e?' Wê digot: '15 metre û nîv.' Yanî ew bi dijmin re di nav hev de bûn. Lê ew ewqas rehet bû. Heta ji dengê wê mirov hêz digirt. Hevala Silav di roja dawiyê ya hemleyê de di nav bajêr de şehîd ket. Di hemû dema hemlê de wê bi sekna fermandariya jin a pêşerojê qehremantî û pêşengî dikir.*

***Hevala Bengî Dîren** (Ayla Orak) jî li ser milekî bû. Hevala Bengîn wekî sembola guhertin û veguhertina kesayetê tê bîra min. Ew heta wê demê di qadên bi şerên pirr dijwar de nemabû. Lê*

[531] Hevpeyvîn bi Şîlan Qamişlo re, Dirbêsî, 2017

[532] Hevpeyvîn bi Galia Nîmet re, Heseke, 2017

ew pirr bi xwestek û baldar bû. Du roj berê me hemû bajar bigirtana, ew bi destê sekvanê DAIŞ'ê şehîd ketiye. Şehîd Bengî bi hevalan re civîn çêkir. Dema ku ji civînê tê, ew li cihekî ku em qet li bendê nebûn ku tê de wê şehadet çêbibe, DAIŞ'ê ji dûr ve bi sekvanî ew şehîd xist.

Hevala Şîlan Rojhilat *û hevaleke ciwan ji Qamişlo jî bi sekvanî şehîd ketin. Ev hemû windahiyên giran bûn ji bo tevger û hevalên jin. Lê wê serketineke mezin bi xwe re anî. Ew êş û birînên şer tenê bi serketinê tên tedawîkirin. Şehîdên pêngava Minbicê mîraseke pirr mezin li pey xwe hiştin. Nêzikî 80 heval ji vî baskî şehîd ketin. Tevî yên din nêzikî 300 şehadetan di vê hemlê de çêbûn."*[533]

Tevî ku DAIŞ'ê bi awayekî hovane êrîş birin ser jin, gel û şervanan jî, Şîlan Qamişlo balê dikişîne ser wê yekê ku hêzên YPJ'ê û bi giştî yên QSD'ê di bin mercên şer de pîvanên exleqî yên şer diparastin: *"Ji aliyê DAIŞ'ê ve hovîtiyek mezin hebû. Cenazeyên hevalan yên ku li cihên cuda şehîd ketibûn di nav bajêr de daleqandin. Lê cem me exlaqê şer dihat parastin. Hesta tolhildanê û nefret li hemberî dijmin zêde bû. Jixwe, bê hesta tolhildanê tu nikarî şer bikî. Tiştek ku te dide şer kirin, yek hezkirina te ji civak, gel û axê re ye û dido hesta tolhildanê beramberî dijmin e. Em hatin cihekî û gundiyan ji me re got ku li wir DAIŞ gorên komî çêkirine. Jinên ku wan ji Şengalê revandibûn, kuştine û xistine wê gorê. Hovîtiya bi vî rengî me pirr dîtiye. Lê li hemberî vê, me nêzikatiya xwe ya exlaqî li hemberî cenaze û girtiyên DAIŞ'ê parast."*[534]

DAIŞ'ê di nav endamên xwe de propagandaya reş li hemberî Kurdan û hêzên YPG û YPJ'ê kiribû û ew wekî 'kafirên PKKê' didan nasîn. Lê endamên wan di nav şer de fêrbûn ku wan hêzên ku wan wekî dijmin didîtin, bi rengekî insanî nêzîkî wan dibûn. *"Mînak; hevalê me yekî DAIŞ'ê birîndar kiribûn. Piştre me dît ku yekî piçûk di temenê 14 salî de bû. Hevalên me serê wî girêdan û pansûman kirine, wan ew ji qada şer derxist û şand nexweşxanê. Dema ku doktorên koalisyonê jê pirs dikin, 'Kî birîna tê wisa baş çêkir?' Wî digot, 'PKK'ê birîna min çêkir!' Lê hevalên me jî bersiv dan: 'PKK li vir tine. Em YPG ne. Me birîna te pansûman kir.'*

Yekî din yê DAIŞ'ê bi bombayên xwe hat ber me. Wî cilê sivil li xwe kiribûn. Min ji hevalan re got, 'Fîşekê ser serê wî re bavêjin.' Dema ku hevalê me fîşek avêtin, me dît ku zilam çekê xwe û êleka xwe ya teqemeniyê avêt û teslîm bû. Ew hatibû ji bo xwe di nav me de biteqîne. Hevaleke me pirs kir: 'Te çima xwe di nav me de neteqand?' Wî got: 'Min fêhm kir ku hûn ne kafir in. Lê em çar kes bûn. Dema ku ew sê kesên din jî tên, bang li wan bikin. Ew ê jî teslîm bibin.' Teslîmiyet bi vî rengî pirr çêbûn. Dawiya dema ku me çemberê derdorê bajêr teng kir, endamên DAIŞ'ê kom bi kom dihatin û teslîm bûn. Ew jî nîşan dike ku baweriya wan bi exlaqê me hebû.

Milet jî baweriya xwe bi exlaqê me dianî. DAIŞ li hinek cihan milet di malan de girtibû, ji bo nikaribin birevin da ku ew bikarin wan wekî mertal bi kar bînin. Wan kesên ku reviyane kuştine. Lewma hevalên me jî bi çekên giran li DAIŞ'ê dixistin heta ku karibûn gel di nav wan de derxistiba. Hêzên me daimî di nav şer de bûn, lewma hêzên me pirr perwerdekirî jî nebûn. Lê pîvanên xwe yên exlaqî hebûn."[535]

Herdu fermandar jî dinirxînin ku rista pêşeng a jinê di vê hemlê de bandoreke mezin li ser hemû hêzên QSD'ê û civaka Ereb li Minbicê çêkiriye. Bi vî rengî ferasetên baviksalar hatin hejandin.

[533] Hevpeyvîn bi Şîlan Qamişlo re, Dirbêsî, 2017

[534] Çavkanî li heman cihî

[535] Çavkanî li heman cihî

Dîsa qirkirinên ku DAIŞ li dijî jinan ferz kiribûn, hatine sekinandin. Galia Nîmet dibêje: *"Cihê ku hevalên jin [lê] hebana, hevalên xort bi psîkolojiyeke pirr rehet tevlî şer dibûn. Dema şerê Minbicê min şeş hezar xortên Ereb di cebhan de koordîne kirin. Tabûrek hevalê jin yên Ereb jî li cem me hebûn. Heta di nav şeran de zilaman her dixwest bi hevalên jin re bin, dixwestin ku hevalên jin wan koordîne bikin. Hinek tişt bi çavê xwe dîtin. Lewma di zêhniyeta wan de guhertin çêbû. Ev tiştekî pirr girîng e. Di nav civakê de berê wan li jinê ti car guhdarî nekiriye, jin tine hesibandin. Lê belê vî şerî hişt ku jin ji bo wana bibe cihê hêz û baweriyê. Baweriya gelê Ereb bi jinên Kurd hat, ji ber ku fedaîtiya wê di nav şer de dîtiye. Vê bandoreke wiha li ser jina Ereb da avakirin ku ew êdî diçû pêşiya DAIŞ'ê û ew çarçefa xwe ji ser xwe diavêt, pê lêdikir û agir pê dixist. Di dema rizgarkirina Minbicê de jinên Ereb em pêşwazî kirin wekî ku tiyê azadiyê bûn."*[536]

- **Jinên Leheng ên Minbicê**

Hîna dema ku pêngava rizgarkirina Minbicê dewam dikir, jinên ewilîn tevlî nav refên YPJ'ê dibûn. Fermandarên YPJ'ê dibêjin, keçên Minbicê kom bi kom dihatin dema ku ew hîna di nav hemlê de bûn. *"Me ji wan pirs kir: 'Hûn me nas dikin?' Ewan digot, 'Me we di televisyonê de dîtiye. Em dixwazin tevlî bibin.' Jineke ciwan tevlî bû. Malbata wê hat, dixwest wê bibe. Lê wê got, 'Ez nayêm!' û ji me re got, 'Min bişînin cihekî din ji bo malbat neyê pey min. Ez dizanim di nav YPJ'ê de azadî heye, xweserî heye. Ez dizanim jin di nav YPJ'ê de pirr pêşketî ne. Ez li malê bûm, ez fetisî me.' Jinên ciwan ên Ereb ku tevlî me bûn, bi pirranî xwendevan bûn. Zanebûn û danehevên wan hebûn. Ji bo vê pirraniya şervanên jin ên Ereb ku hatin nav me ji Minbicê derketin."*[537]

Yekemîn jina ciwan a Minbicê ya ku ev gav avêt Sara Silêman (Zîlan Heleb) bû. Xwuşka wê Nofa jî da ser rêya wê. Nofa Silêman niha hevseroka Komîteya Parastinê ya Meclîsa Sivîl a Minbicê ye û dibêje, wê û xwuşka wê pirr ji xwendinê hez dikir. Lê dema ku DAIŞ ket Minbicê, dibistan hemû hatin girtin û xwendina keçan qedexe bû. Bavê wan li Helebê kar dikir û pirr caran pere ji malbata xwe ya li gundekî Minbicê re rêdikirin. Lê ji ber ku DAIŞ'ê rê girtibû, pere nedigihan. Lewma Nofa, Sara û xwuşkên xwe karê zîraetê dikirin.

DAIŞ'ê her tişta ku Sarayê jê hez dikir qedexe kiribû, wekî xwendin, lixwekirina şal û cilên bi rengên zelal û gera bi keçên cîranan re. Nofa û Sara dibûn şahidê wê yekê, ka çawa DAIŞ êrîşî Minbicê kir û jin recm kirin: *"Jin ji serê xwe heta lingê xwe reş kirin. Ji cilên reş pê ve nedihiştin tiştekî din li xwe bike. Qedexe bû ku rûyê jinê li derve be yan jî destên wê xuya bibin. Eger destên wê li dervê didîtin, 60 caran bi qamçî lêdixistin. Carekê jî jinek bê sûc girtin. Tenê cilên wê yên reş qetiya bûn. Di bin re hindik kirasê wê xuya dikir. Ew jin birin û di navenda Minbicê de recm kirin, gotin ku ev jin bi zilaman re têkiliyê datîne. Hingî ew jin êşkence kirin. Herî dawî zilamek hat û got, 'Bes, ev jin diezibe' û kevirekî mezin li serê wê xist. Ew kuşt ji bo DAIŞ hîn bêhtir êşkencê lê neke. Dema ku jinek li dijî van qeydên wan derketa û li ber xwe bida, ew jin dikuştin. Jinek hebû, nedixwest ku bi yekî DAIŞ'î re bizewice. Lê wê nikaribû bigota 'ez wî nazwazim'. Wê jinê jehr vexwar. Piştî ku DAIŞ'î hatin ji bo wê jinê bibin. Bavê wê got 'Keçka min jehr vexwariye.' Wan got: 'Tişt nabe' û heta piştî ew keçik mir, dîsa jî birin."*[538]

[536]Hevpeyvîn bi Galia Nîmet re, Heseke, 2017

[537] Hevpeyvîn bi Şîlan Qamişlo re, Dirbêsî, 2017

[538] Hevpeyvîn bi Nofa Silêman re, Hevseroka Komîteya Parastinê ya Meclîsa Sivîl a Minbicê, 2017

Sara di temenê xwe yê ciwan ê 13 salî de nikaribû vê zilmê qebûl bike. Dema ku wê di nûçeyên televizyonê de YPG û YPJ didît û didît çawa li hemberî DAIŞ'ê şer dikin ji bo gel û jinan rizgar bikin, ji nû ve bi wê re hêviyek û kêfxweşiyek peyda bû. Wiha wê biryar da tevlî nav refên YPJ'ê bibe û navê kod Zîlan hilbijart. Xwuşka wê dibêje: *"Şehîd Zîlan kesayeteke pirr xurt bû. Eger kesî ew biêşanda, wê tola xwe bi destê xwe radikir. Piştî demekê, em koçber bûn. Ji ber ku DAIŞ'ê êrîşî gundê me kir. Wê demê em bê war mabûn. Ji cihekî em diçûn cihekî din. Herî dawî em çûn cihekî, dîsa DAIŞ'î li wir hebûn. Wê demê Şehîd Zîlan got, 'Bes e. Êdî ez nikarim tehmûlî vî tiştî bikim. Êdî ez ê biçim tevlî rêxistinê bibim.' Wê demê ew ji bajarê ku DAIŞ tê de reviya. DAIŞ'ê ew da sekinandin û jê pirsî, 'Ka çima te xwe nesitirandiye? Kanî destmala te ya şerhî?' Şehîd Zîlan ji wan re got, 'Ez van tiştan li xwe nakim.' DAIŞ bi siyarê li dûv wê çû. Lê ew negirt. Dema ku reviya, ber êvarê nuqta hevalan li ser gir dît. Heta hevalan fîşek avêtibûnê. Lê wê gotibû, 'Ez ne DAIŞ im. Ez dixwazim tevlî we bibim.' Piştî wê, bi hevalan re çû û perwerde bû. DAIŞ'ê em tehdîd kirin. Ji me re got, 'Em ê 4 milyonan bidin we. Hûn jî serê Zîlan bidin me.' Paşê wan mala me li gund jî bombebaran kir.*

Piştre min bihîst ku Hevala Zîlan çûye Reqayê. Wê deme rewşa wê pirr baş bû. Bi dilgermî şer dikir. Dema ku heval diçûn şer wê jî xwe bi wan re xist seyarê. Piştî ku heval ji seyarê dadiketin, ferq dikirin ku Zîlan jî hatibû. Jê pirsîn,'Tu çima hatî?' Wê jî gotibû, 'Ji ber ku ez dixwazim şer bikim.' Ew anîbûn cebhê. Lê di xeta sêyemîn de bi cih kiribûn. Gava ku DAIŞ'ê êrîş kir, Hevala Zîlan birîndar bûbû. Ew 2 rojan di nexweşxanê de ma û piştre şehîd bû. Dema şehîd ket, temenê wê 14 salî bû û 9 mehan di nav refên YPJ'ê de mabû. Ew berî Minbic rizgar bibe çû û dema ku Minbic rizgar bû, şehîd ket."[539]

Dayika wan, Henan, jî dibêje ku di heman nexweşxaneya Minbicê de ku keça wê Sara tê de ji dayik bû, şehîd jî ket. Henan Filistînî ye. Ew li wargeheke penaberên Filistînî ya li Şamê ji dayik bû. Nofa li ser dayika xwe dibêje ku *"jineke wêrek û bê tirs e"*. Ji malbata wê jî şehîdên di doza azadiya gelê Filistînê de hene. Di zarokatiya xwe de wê dîtibû ku jin û zilamên şoreşger mil bi mil şer dikirin. Henan qal dike: *"Dema min YPJ dît, ez pirr kêfxweş bûm û min moral jî da wan. Ji bo min jî dîtina jinê bi cilên leşkerî û kelêşê di deste wan de pirr bi wate bû. Bi taybetî dema min YPG û YPJ bi hev re didîtin, min pirr wate dida. Ji ber ku li welatê min li Filistînê jî jin û zilam bi hev re şer dikin."*[540] Lewma Henan ji biryara keça xwe Sara re rêz digirt û guh neda axaftinên derdorê ku tevlîbûna keça wê wekî 'şerm' û 'guneh' nirxandin. Lê Nofa zehmetiyên wê demê tîne bîra xwe: "*Piştî Şehîd Zîlan tevlî nav refên YPJ'ê bû, xelk pirr li ser wê axifî. Mirovên me digotin, 'Heger ew vegere, em ê lingê wê bişkînin'. Pirr axaftinên nexweş li ser wê hatin kirin. Lê dayik û bavê min bi Zîlanê pirr serbilind bûn. Wan digot, 'Em pirr kêfxweş in ku keçka me bûye YPJ'. Êdî piştî Zîlan şehîd ket, şehadeta wê bandor li pirr keç û xortên Minbicê kir û ew tevlî nav hevalan bûn."*[541]

Lê belê, dema ku piştî şehadeta Zîlanê, birayê wê Mahmûd (Şêro Minbic) û xwuşka wê Nofa jî dixwazin tevlî nav hêzên parastinê bibin, ev yek ji dayika wan re gelekî giran dihat. Nofa dibêje, *"Piştre birayê min Mahmûd tevlî bû. Dayika min ev qebûl nedikir û digot, 'Xwuşka te tevlî bû. Lê tu tevlî nebe'. Cilê eskerî jê danîn. Birayê min giriya. Wî got, 'Xwuşka min tevlî bû. Ez ê jî tevlî bibim'. Rabû, cilên leşkerî li xwe kirin û çû. Piştî birayê min tevlî bû, min her tim ji xwe re digot,*

[539] Çavkanî li heman cihî

[540] Hevpeyvîn bi Henan Mizhil re, dayika Şehîd Zîlan Heleb, Minbic, 2017

[541] Hevpeyvîn bi Nofa Silêman re, Minbic, 2017

'Xwuşk û birayê min çûn, ez ê jî biçim'. Şehadeta Zîlanê ji ber çavên min nediçû. Min got, 'Çima ez ê li malê bim? Ez ê jî herim'. Dayika min ji min re got, 'Xwuşka te û birayê te tevlî bûne. Çima tu jî diçî? Tu neçe'. Min jî jê re got, 'Ez êdî nikarim şehadeta wan ji bîr bikim, û ez naxwazim bizewicim. Ez ê tevlî bim, ez ê riya xwuşk û birayê xwe bişopînim'. Dema ku birayê min Mehmûd şehîd ket, me cenazeyê wî nedît. Ji ber ku DAIŞ'ê ji wan re kemîn danî û cenazeyê wî û yên hevalên wî şewitandin."[542]

Henan dilêş û bi serbilindî hestên xwe li ser rêya zarokên xwe wiha tîne ziman: "*Dema zarokên min şehîd ketin, ez pirr aciz bûm. Min dixwest ez wan sax bibînim, ne ku ez wan wekî şehîd bibînim. Beriya kurê min şehîd bikeve, min zarokê xwe rêkirin Helebê cem bavê wan. Min xwest kurê xwe jî bibim. Min ji wî re got, 'Xwuşka te çû, şehîd ket. Ez nikarim tehemulî şehadeta te jî bikim. Ez ê te bi xwe re bibim Helebê.' Lê ew dîsa vegeriya cem hevalên xwe û hevalên xwe şandin cem min. Ji wan re gotibû, 'Ji dayika min re bêjin, bila qusûra min efû bike. Ez ji welatê xwe dernakevim.' Piştre ez çûm Helebê û mehekê mam. Ez vegeriyam û 10 roj şûnde xebera şehadeta wî ji min re hat.*

Dema Minbic rizgar bû, ez pirr kêfxweş bûm ku xelkê Minbicê ji destê çeteyên DAIŞ'ê xilas bû. Ez bi zarokê xwe serbilind bûm. Minbic ne tenê bi berxwedana zarokê min azad bû. Bi sedan şervanên vî gelî li ber xwe dan heta em gihaştin vê roja ku em azad li bajarê xwe tevdigerin. Aniha ji bo siberoja zarokê min xwendin girîng e. Her tim ez ji wan re dibêjim, 'bixwînin!' ji bo zarokên min karibin rehet bijîn. Zarokên min piçûk in, lê tirsê nizanin. Heta dawî ez bi wan bawer im. Ez dizanim min çawa ew mezin kirin. Ji zaroktiya xwe ve zarokên min rast in û durist in. Heta dawî serê min bi wan bilind e."[543]

Nofa jî rave dike ku rêya ku wê tevî xwuşk û birayên xwe hilbijartiye rêya yekane ya rast bû: *"Piştî ez tevlî nav refên YPJ'ê bûm, kesayeta min xurt bû. Min di xwe de pirr guhertin dîtin. Hêz û cesaret bi min re ava bû da ku ez tola xwuşk û birayê xwe û şehîdan hemûyan rakim. Ji dervê vê kîjan îhtîmalên berxwedanê hene? Dema ku DAIŞ'ê bajarê me dagir kir, serhildanek çêbû. Jin jî tevlî serhildanê bûn. Hinekan ji wan nîqabên xwe avêtin. Lê dûv re jî hemû hatin kuştin. Jineke din wekî serhildana li dijî DAIŞ'ê xwe kuşt. Lê ew jî bi awayekî hovane hate cezakirin. Ji bo heşt saetan, laşê wê di destê DAIŞ'ê de ma, êşkence û destdirêjî lê kirin."*[544]

Şervanên YPJ'ê ku di pêngava rizgarkirina Minbicê de cihê xwe girtine, hemû didin xuya kirin ku ew li Minbicê rastî ruhekî berxwedêr û potansiyeleke şoreşgerî ya civakê hatine. Minbic bajarê yekem li Sûriyê yê ku li hemberî hinek ferweriyên DAIŞ'ê di sala 2014'an de serî hilda. Di vê xwepêşandanê de jinan çarşefên reş wekî sembola koledariyê avêtin. Jin qala wê yekê dikin ku jinek hebû li hemberî çeteyên DAIŞ'ê sekînî û him çarşefa xwe derxist, him jî ala Sûriyê diçirand. Di vê kêliyê de DAIŞ matmayî ma û nikaribû tiştek bikira. Lê piştre xwepêşander hatin girtin û 250 kes bi êşkenceyên hovane hatin bidarvekirin. Bi vî rengî rabûna gel hatibû tepisandin. Lê di asta ferdî de gelek jinan hewl dida ku rûmeta xwe li hemberî zilmkariya DAIŞ'ê biparêzin.

- **Berxwedana Jinê li Gundê Heya Sirîr**

[542] Çavkanî li heman cihî

[543] Hevpeyvîn bi Henan Mizhil re, Minbic, 2017

[544] Hevpeyvîn bi Nofa Silêman re, Minbic, 2017

Mînakeke helwesta berxwedêr a jinên Minbicê, çîroka Suheyla ji gundê Heya Sirîr e. Suheyla 20 salî ye. Ew li cem dayika xwe û tevî jinap, xwuşk û birayên xwe yên piçûk bi rengekî komîna jinan a xwezayî dimîne. Bavê wan ji ber sedema nexweşiyê beriya bi çend salan miribû. Zilamên din ên malbatê ji 5 salan zêdetir li welatên Kendavê dixebitin û carinan hinek pere ji malbatê re dişînin. Bi vî rengî jinên malbata Suheyla, jiyan û aboriya xwe bi xwe bi rêxistin dikirin.

Jinapa Suheyla Azîze, yekem dayik bû li gund ku keçên xwe li derveyî gund li bajarê Minbic, Heleb û Lazqiyê dan xwendin. *"Xelk pirr li ser keçikê min axifîn, wan got, 'Keçik in. Çima dixwînin? Çima bi tenê tên û diçin?' Min guhê xwe girtin. Min li axaftinên kesî guhdarî nekir. Min got, 'Bila keçikên min bixwînin. Ev ked û siberoja zarokên min e.'* Piştî demekê malbatên din jî keçên Suheyla mînak girtin û kêçên xwe şandin zanîngehê. Azîze li ser jiyana xwe dibêje, *'Em jin tenê ne. Bi salan em bi tenê jiyana xwe bi rêxistin dikin, yanî jin dikare her karî bike. Lê dema DAIŞ hat, jiyana me li binguhê hev ket. Jiyana me reş bû. Cilên reş li me kirin. Heta nedihiştin çavên me xuya bikin. Nedihiştin jin bi zilaman re bimeşin, nedihiştin jin biaxifin. Heta bira nikaribû bi xwuşka xwe re bimeşiya. Jina ku zilamê wê ne pê re bû yan tine bû yan jî li derve kar dikir, pirr ditirsiya ji ber nêzikatiyên DAIŞ'ê pirr nebaş bûn. DAIŞ'ê qîza xaltîka min bir. Keçik reviya çû Libnanê û heta anha tu agahiya me li ser tine ye. Qîzeke xaltîka min ya din jî amadekariya zewacê dikir. DAIŞ hat, ew birin û bi yekî DAIŞ'î re zewicandin. Xelkê bi ti rengî DAIŞ qebûl nekir. DAIŞ'ê cixare qedexe kiribû. Lê her kesî, heta jinan jî bi dizî vedixwar. Carekê xwuşka hevjinê min bi cilên rengîn derket û rûyê wê vekirî bû. Dewriya DAIŞ'ê ew dît û hicûmî mala me kir."*[545]

Suheyla sedema vê bûyerê vedibêje: "*Li gundê me xortek hebû, ew wahîd bû. Rojekê dema DAIŞ mêr hemû li mizgeftê kom kirin, ew rabû û wî got, "Ez fêhm nakim. Hûn li ser Xwedê dipeyivin, lê hûn êşkence dikin û me dikujin. Ma hûn difikirin ku Xwedê vê qebûl dike?" Piştî vê DAIŞ'ê serê wî xortî jêkir û laşê wî 3 rojan li navenda gund daliqand. Bavê wî jî girtin û êşkence lê kirin. Vê bûyerê ez gelekî êşandim.*

Roja înê ez bi kirasê sor ji mal derketim û çûm mala birayê xwe. Min got, her kes li mizgeftê ye. Lê dema ez hatim, du kesên DAIŞ'ê li pêşiya min bûn. Yek ji Cezaîrê bû û bi min re axifî. Lê min baş fêhm nekir ew çi dibêje. Min meşa xwe dewam kir. Ez gihiştim malê, bû wexta nimêja nîvro. Apê min meleyê gund bû. DAIŞ'ê jê pirsîbû: 'Tu wê keçkê nas dikî?' Wî gotibû: 'Na.' Lê zarokekî li mizgeftê ji wan re got, 'Erê, ew keçikê nas dike.' DAIŞ'ê bi apê min sond da xwarin û careke din pirsî, 'Tu wê keçkê nas dikî?' Êdî wî gotibû: 'Erê, ez nas dikim.' Ew hatin malê û ji apê min re gotin: 'Bi hesin li vê keçkê bixe heta ew hesin bişike.' Apê min got, 'Temam, ez ê lêxim.' Wan got, 'Niha li ber çavên me lêxe.' Apê min bi hesin li min xist. Lê hesin neşikest. Min got, 'Bes e! Tu çiqasî li min bixî, ev hesin naşike.' Li min xist heta ku westiya bû û dev ji min berda. Di wan kêliyên ku li min dixist de, ez negiriyam. Lê piştî ew çûn, ez pirr êşiyam û pirr giriyam. Heta çend rojan jî laşê min ji ber lêdanê dêşiya. Tevî ku apê min bû jî. Dema li min dixist, pirr ez êşandim. Te digot, belkî ez dijmina wî me. Piştî li min xist, ji min re got, 'Dema tu derkevî dervê cilên reş û girtî li xwe ke.' Piştî wê, ez ji mal derneketim. Min ew cilan li xwe nekirin. Min axaftina wî pûç kir. Piştre heta niha nehat, lêborîna xwe jî nexwest."[546]

[545] Hevpeyvîn bi Suheyla, Azîze û Wetfa re, li gundê Heya Sirîr ê Minbicê, 2017

[546] Hevpeyvîn li gundê Heya Sirîr

Îro Suheyla li heman odeya ku apê wê lêxistibû bi rûyekî bi ken û kirasê xwe yê sor li pêşiya me rûdine û dibêje, *"Piştî gundê me ji DAIŞ'ê rizgar bû û em ji DAIŞ'ê xilas bûn, ez bi kirasê zer derketim ser rê. Xelk ji Minbicê dihat û her kesî li min dinihêri. Ew matmayî diman ji ber ku kêm zêde hîna DAIŞ hebû. Ji ber tirsê ti kesî cilên rengîn li xwe nedikirin. Lê dema DAIŞ hebû, min cilên reş li xwe nekirin. Niha jî ez rengê xwe didim xuyakirin."*[547]

Suheyla helwesta xwe bi serbilindî tîne ziman û balê dikişîne ser wê yekê ku him cesareta takekesî ya jinê him jî yekparebûna civakê ji bo parastina rûmeta xwe û exlaqê civakî girîng in: *"Jina ku li ber xwe dida, qaîdeyên DAIŞ'ê pêk nedianî, bi xwe bawer ba, xurt ba, DAIŞ nêzî wê jinê nedibû û jê ditirsiya. Lê jina ku nikaribû ji wan re bêje 'na' û ji wan ditirsiya, wan ew jin pirr diêşand weke ku ne insan be, nêzî wê dibûn. Heger gund gişt yek ba, DAIŞ'ê nikarîbû pirr qaîdeyên xwe bide ferzkirin. Lê li gund her kes tirsiyabû, ji ber vê bi hev re nedibûn yek."*[548]

Di hilbijartinên meclîsa komînê yên gundê Heye Serîr de ku 300 malbat lê dimînin, Suheyla wekî hevserok hatiye hilbijartin. Ew niha hewl dide ku yekîtiya civakê bi pêş bikeve û mafên jinan werin parastin. Nexasim jî ew tevî xwuşka xwe Wetha ku di Meclîsa Zagonsaz de cihê xwe digire, xebatê dimeşîne da ku jinên ciwan bi zorê û di temenê piçûk de neyên zewicandin. Her du bi hêvî ne, lê ew dizanin ku hîna xebat û têkoşîn lazim in heta ku mafê jinê bi giştî werin qebûlkirin û pêkanîn.

- **Avakirina Jiyana Neteweya Demokratîk li Minbicê**

Civaka Minbicê eynika dîrok û çanda Mezopotamyayê ye. Koka wê xwe disiperê çanda xwedawendan a serdema neolîtîkê. Hîna di roja îro de keskahî û daran bereketa erdên vê herêmê nîşan didin. Jixwe navê bajêr ji peyva Aramî 'Manbug' tê ku maneya wê 'kanî' ye. Li ser vê kaniya avê perestgeha navendî ya xwedawenda Atagartis hatibû avakirin. Hinar û masî remzên xwedawenda Atagartis bûn ku wekî xwedawenda bereket, erd û avê hate perestin. Minbic bi navê Yewnanî 'Hierapolis' [bajarê pîroz] jî hate nasîn û wekî navenda çand û baweriya xwedawend û bazirganiyê binavûdeng bûbû. Di serdemên dîrokî hemûyan de li vir gelek qewm û pekhateyên olî jiyane. Wan bi çandinî, xwedîkirina sewalan û bazirganiyê derbara xwe dikir. Lê di heman de jî dîroka gelê Minbicê ji serdamên împaratoriya Romayê û Xaçperêstan heta serdemên Ebasiyan, Selçûqiyan, Moxolan û Osmaniyan bi şer, zilm, talan û dagirkeriyê derbas bûye. Eşîrên Kurd, Ereb, Çerkes û Turkmen, gelên Suryanî, Aşûrî û Ermenî serpêhatiyên berxwedana hevbeş li dijî dagerkerî û zordestiyê parve kirine, lê di heman demê de serpêhatiyên xiyanet û pevçûnan jî. Bajarê Minbicê di van serdemên dîrokî de çend caran hat hilweşandin û ji nû ve avakirin.

Li ser vî bingehê dîrokî ku şopên xwe di kesayeta jin û bîra dîrokî ya gelan de hiştine civaka Minbicê di havîna 2016'an de careke din dibû xwedî serpêhatiyên berxwedan û ji nû ve avakirinê. Endamên Meclîsa Leşkerî ya Minbicê û yên Meclîsa Sivîl a Miweqet ku bi pêngavê re hatin avakirin, dibêjin, di milê çanda civakê de him taybetmendiyên eşîrî him jî rewşenbîrî li Minbicê xwe dan pêş. Tevî ku DAIŞ'ê di nav civakê de propagandayên reş li ser şervanên QSD'ê belav kiribûn jî wan zêde encam nedigirtin. Di pêşwazîkirina şervanan û pergala xweseriya demokratîk de nêzikatiyeke germ û xwezayî hebû. Ruxmê ku ewqas zext li ser jinan hatibû meşandin,

[547] Çavkanî li heman cihî

[548] Çavkanî li heman cihî

hejmareke mezin a jinên Minbicê ji birêxistinkirina civakê re vekirî bûn. Bi gotina fermandareke YPJ'ê, *"serê jinan girtî bû, lê mijiyê wan vekirî bû."*[549]

Bi pêşveçûna hêzên QSD'ê ve endamên Meclîsa Medenî gund bi gund bi rexistin kirina pergala komînal a xweseriya demokratîk kirin, heya gihiştin navenda bajêr. Endama Meclîsa Medenî, Selcan di vê pêvajoyê de cihê xwe digirt: *"Milet taqîb dikir ji bo dema cilên şervanan bibîne, xwe bigihîne wan. Ne tenê xwe xilas bike, lê ji bo cihê DAIŞ'ê jî nîşan bide. Ew diketin pêşiya şervanan ji wan re nîşan didan, alîkarî dan di milê leşkerî de. Di şexsê YPG'ê û YPJ'ê de xilasiya xwe dîtin û bi hemû milan ve xwe bi me girt. Bi taybetî dema hevalên jin didîtin xwe digihandin, ji ber ku bi xilaskirina mirovên sivîl bi bandor bûn. Gel pirr tirsiyabû ji DAIŞ'ê. Dema derdora bajêr hat girtin DAIŞ'ê pirr zilm li milet kir. Her der mayîn kirin û sekvan danîn ji bo milet berê xwe nede YPG'ê û QSD'ê. Bi sedan mirov bi mayîn û fîşekên wan hatin kuştin. Gelek malbatan ruxmê vê zextê dihatin, xwe xilas dikirin. Dema te milet didît, te dizanî ku her tiştê derveyî insaniyetê dîtine. Dema ew xilas dibûn, wek ku ji nû ve ji dayik bûne, ebayê xwe ji xwe dikirin û diavêtin. Ji heyecanê hinek jin digiriyan, didan tilîliyan yan çixare ji destê şervanan digirtin, vedixwarin. Ew bi hefteyan bê xwarin mabûn. Dema rûyê şervanên YPJ'ê didîtin, birçîbûn û tîbûn ji bîr dikirin. Germahî û hezkirin hebû.*

Gelek malbat parçe bûbûn, yên ku zilam yan zarokê wê miribûn heya gihiştinê me. Dîsa gel ji Minbicê koçber nebû. Girêdana wî bi axa xwe re heye. Li taxekê şer hebû, li taxa din jiyan hebû. Mirov du meh û nîvan di bin top û teyaran de jiyan. Li her taxeke ku rizgar dibû, milet rasterast vedigeriya malên xwe. Çîrokên milet yên jiyana bi DAIŞ'ê re pirr in. Çawa milet qetil kirin, serjê kirin, recim kirin. Dema Minbic rizgar bû, nefeseke jiyanê hebû. Lê tirsek jî hebû. Ji ber ku di pirr wehşiyetê re derbas bûbû. Lewma bawerîk çênebû ku bêje, 'ez êdî dikarim xwe biparêzim'. Cih cih, piştî rizgarkirina bajêr şer derdiket. Ji ber vê, gelek kesan cilên xwe yên reş neavêt. Ji ber ku digotin, 'Ger DAIŞ were û di vî halî de me bibîne, wê me serjê bike."[550]

Wekî xelkê Kobanê, xelkê Minbicê jî bi dîtina şervanên jin raydar bûye. Fêrbûnên hezaran salan li bin guhê hev û din ketine. Lê belê ji bo zilamên Minbicê adet û teqalîdên berê yên zayendperest biparêzin, wan şervanên YPJ'ê wekî 'jinên awerte yên ku ji derve hatin' hesibandin, wan digot: *"Em zilam in û cesaret nakin li hemberî DAIŞ'ê şer bikin. Hûn jin in, şer dikin û temenê we jî piçûk e. Êdî baweriya me bi jinê heye. Me fêhm kir ku jin dikare her tiştî bike. Lê jinên me ne wisa ne. Jinên Kurdan ne wek yên me ne. Hûn zane ne, pêşketî ne. Cesareta we heye."*[551] Bi vê hincetê zilaman dixwest serweriya xwe biparêzin û li pêşiya guhertinên civakî wekî tevlîbûna nav siyasetê ya jinên Minbicê, bigirin. Lê belê jinên ku ji bo rêxistinkirina civakê kar û xebat meşandine, bersiva van hincetan dida û digot, *"Ne wisa ye. Ev jin jî yekê vê civakê ne. Ferq nîne. Mînak Kobanê û Minbic pirr nêzî hev in. Ev keçik jî wek keça te ye. Lê wê xwe bi pêş xist, xwe zane kir. Berê bi wê re jî cesaret nebû. Lê derfeta bipêşketinê pê re çêbû, xwe perwede kir heya gihişt vê astê."*[552]

Selcan destnîşan dike ku wan ***di nav hemleya leşkerî de, hemleya birêxistinkirina komîn û meclîsên gel û hemleya tevlîbûna jinê*** jî meşandiye: *"Em dikarin bêjin me sê hemle bi hev re bi rê*

[549] Hevpeyvîn bi Şîlan Qamişlo re, Dirbêsî, 2017

[550] Hevpeyvîn bi Selcan re, endama meclîsa jinê ya Minbicê, Minbic, 2017

[551] Çavkanî li heman cihî

[552] Çavkanî li heman cihî

ve birin. Dema me komînên gundan ava dikirin, me projeya neteweya demokratîk û ya hevserokatiyê bi şêniyên gund dida nasîn û nîqaş dikir. Di cewherê xwe de civakeke nerm e. Lê me dît ku hinek adet û teqalîdên civakê hene, yên ku nahêlin ku jin û zilam werin cem hev. Zilaman digot, 'Nabe ku jin were, bikeve hevserokatiyê û ew jî wek min, bi min re kar bike. Jin tenê dikare di mal de kar bike, xizmetê ji mal û zarokan re bike.'

Lê piştî ku dîtin, hemû endamên Meclîsa Medenî ku bi xebatên civakî re mijûl dibin jin in û ev sîstem xizmeta civakê dike, fikir hêdî hêdî dihat guhertin. Me digot: "Em hûrmet nîşan didin ji adet û teqalîdên we re. Lê tiştekî em rênîşanî we didin, ew ê sudê li jin û civaka we bike. Ev jî wekhevî û edalet e. Hûn bi xwe gazinan ji sîstema DAIŞ'ê dikin. Em jî dixwazin edaleta rast li ser rûyê erdê pêk bînin.' Îcar digotin, 'Rast e. Dema jin di malekê de nebe, ew mal xirabe ye. Civakeke ku jin tê de nebe jî nameşe. Di mehek, du mehan de jin tevlî bûn. Ji ber ku dîtin ku ev proje baş e, zû tevlî bûn."[553]

Endama Meclîsa Medenî Şevîn ji Reqa bandora pergala desthilatdar li ser civakê dinirxîne. Ew balê dikişîne ser wê yekê ku heta vê demê her desthilatî feraseta xwe li ser civakê ferz kiribû. Lê nexasim siyaseta tirs û qirkirinê ya ku DAIŞ'ê di 2 salan de li Minbicê meşandibû, dibû sedema qelaştina têkiliyên bawerî û hevbendiyên jin û civakê: *"Li gorî taybetmendiyên civakî yên berê di civaka Ereb de jin û zilam bi hev du rûdinişt in. Lê DAIŞ'ê wilo kir ku êdî xwuşk û bira nema karibûn bi hev re rûnin. Hevjînan êdî bi hev re nikaribû derketibana sûkê. Zilam 50 metroyan li pêşiya hevjîna xwe dimeşiya. Ji ber ku heger jinek kêmasiyek çêkiriba ji zilamê wê jî hesab dixwestin. Jin hatin recmkirin. Mirov hatin bidarvekirin. Her tişt li ber çavê civakê çêbû. Dema ku mirov serjêkirine bang li zarokan kirin û digotin, 'Pê li serê wê bike!' ji bo zarok bi serê mirovan wek bi gogê bileyzin. Dîtina cenaze êdî ji bo civakê wek tiştekî adî [normal] bûbû. Ew tişt bi zarokan dan fêrkirin.*

Cîran êdî nikaribû biçe cem cîranekê. Pê re guman çêdibûn: 'Eceba ew ê fesadiya min bike?' Jinan, keçên xwe vedişartin ji bo DAIŞ wan nerevîne. Pergaleke taybet ya DAIŞ'ê hebû ji bo tesbît bikin di kîjan malê de keç yan jinên nezewicî hene. Keçikek xweşik ba, bûk jî ba, ew didane berdan û ji yekî DAIŞ'î re dixwestin. Dema ku zilamê wê di 'cihadê' de bimira, hevalê wî ev jin dixwest. Sîstemeke pirr gemar bû. DAIŞ'ê zarok perwerde dikirin û wek casûs bi kar dianînin. Jinên ciwan jî wekî 'hisbî' bi rêxistin dikirin, ji bo ku li jinan bixin û êşkencê li wan bikin. Hinek çîrokê wan hene, pirr bi êş in. Mînak, dayikek bang li keça xwe kir, pê re aciz bû û digot, 'Ger tu neyê, welleh ez ê tê bikujim!' Vê demê yeke DAIŞ'î ji vê dayikê re got, 'Te bi navê xwedê sûnd xwar, wê demê tu mecbûr î ku tu keça xwe bikujî!' Kêr dan destê dayikê. Wê kêr rakir, lê ji destê wê ket. Lê dawiyê dayik mecbûr kirine ku keça xwe serjê bike. Rewşên wisa li Minbicê qewimîn.

Vê di civakê de şikandinek çêkir. Tirs û bêbawerîbûn da avakirin. Gel bi xwe, van mînakan dide û dibêje, 'cehaletê di nav me de dest pê kir'. Civakek bê dibistan, ya ku derve nabîne, di bin çarçava reş de hatiye fetisandin. Vê di gelê Ereb de û bi taybetî di gelê Minbicê de êşeke cuda bi xwe re anî."[554]

Di civaka Minbicê de ji bilî birînên kûr yên dagirkeriya El Nusra û DAIŞ'ê him bandora çanda eşîra him jî ya zêhniyeta dewleta Beesê heye. Li gorî texmînan li herêmê nêzî 80 eşîr û êlên Ereb,

[553] Çavkanî li heman cihî

[554] Hevpeyvîn bi Şevîn ji Reqa re, endama Meclîsa Medenî ya Minbicê, 2017

Kurd û Çerkes hene. Di nav eşîrên Ereb de eşîra Bûbena ya herî mezin e. Di rastiya eşîrên Minbicê de dubendîtiya çanda berxwedanê û nokertiyê bi dewletê yan jî hêzên desthilatdar eşkere dibe. Tevî cudahiyên di milê çandê de sazûmanên eşîrî him di civaka Ereb de, him jî di civakên Kurd û Çerkes de li herêma Minbicê karîger in. Ji qanûnên dewletê zêdetir, rêgez û kevneşopiyên eşîrî di meşandina jiyana rojanê û têkiliyên civakî de serwer in.

Li aliyekî di nav eşîran de nirxên civaka xwezayî wekî hevgirtin û piştgirîdayîna hev hatine parastin. Nexasim di eşîrên piçûk de yên ku bi dewletê ve ne girêdayî ne û cûrekî 'rêxistina malbatê' temsîl dikin, meyla çanda jiyana komînal heta astekê hîna xuya ye. Berovajî vê, di adet û teqalîdên eşîrên mezin de pergala hiyeraşîk û zêhniyeta feodal a baviksalar pirr hişk û serwer in. Otorîte û peyva serokêşîr teqez e: "*Mesela eşîreke 5000 kesî heye. Serokê vê eşîrê xwedî kîjan nêrînê be, tevlî kîjan pergalê bibe, pêwîst e hemû 5000 endamên eşîrê jî tevlî vê nêrîn û pergalê bibin. Ev li pêşiya civakê tevahî, lê taybet ji bo jinê astengek e. Pêwîst e em têkoşîna xwe li gorî vê rastiyê, lê ji bo guhertina vê rastiyê bimeşînin."*[555]

Selcan bandora zêhniyeta eşîrî û dewletperest li ser amadekariya hilbijartinên yekemîn yên komînan dinirxîne: *"Li vir yek, bandora eşîra heye, ya din jî zêhniyeta dewletê heye. Di eşîrên mezin û hikimdar de rista jinê pirr lawaz e. Ew nikare ji malê derkeve û pirranî nexwendiye. Her zilamek sê yan çar jinan tîne ji ber ku ew dixwazin neslê xwe zêde bikin, xwe mezin bikin. Eşîrên piçûk û nehikimdar bi şeklê malbatê mane. Jinê van eşîran jî hinek rehettir tevdigerin. Dema me li gundan hilbijartinên meclîsê çêdikirin me bi taybet xwest ku jin û xwendekar tevlî bibin. Ji ber ku ji bo avakirina projeya xwerêveberinê mirovên xwedî fikir, kesayetên vekirî û akîf lazim in. Lê di destpêkê de rê li pêşiya ciwana digirtin ji ber ku wan dixwest ciwanên xwe li ser çanda xwe mezin bikin. Yên ku di hilbijartinan de xwe pêşniyar dikirin, pirranî mixtar bûn bi zêhniyeta dewletê ya berê. Ya din jî di gund de kîjan eşîr mezin e, ew hildibijartin.*
Lê piştî sê, çar mehan wan fêhm kir ku di vî karî de desthildatdarî û fêdeya şexsî tine ye. Mezinbûna eşîr yan xitmek di destê wî de têrê nake ku yek bibe hevserok. Pêwîst e ku ew di milê pratîkî de kar bike, xizmeta gel bike. Ew ê ji bo parastin û silha civakê kar bike. Îcar gelek zilam bi xwe hatin meclîsê û gotin: 'Ez nikarim' û xwe jê kişandin. Bi vî awayî civak îqna bû ku pêwîst e yên ciwan jî tevlî bibin.

Di warê beşdarbûna jinê de jî xwesteka jinê hebû. Lê di destpêkê de ne bi îradeya xwe ket hilbijartinê. Çênebû, ji ber ku hîn proje û pergala xweseriya demokratîk nas nedikir. Gelek zilaman digot, 'Encax ez û jina xwe em bibin hevserok.' Ev ji çanda eşîrî tê. Feraseta wan qebûl nedikir ku bi jineke din re kar bikin. Pirranî zilaman pêşniyerên xwe digotin. Lê jin bêdeng bûn, çavê wê li zilam bû. Zilam bêjê 'erê' wê bêjê 'erê', bêjê 'na' wê bêje 'na'. Lewma ewlî gelek jin bi nêrîna zilam bûn hevserok. Jinan di serî de bi îrada xwe nûnerê xwe nehilbijart, zilama ew hilbijart. Lê dema ku jin tevlî kar dibûn, didîtin ku zanebûn û nêrînên wan pêwîst in. Bi vî rengî fikir û vîna jinê bi xebat û xwedîderketina li erkên xwe pêş diket. Dema em bi hemlê re ketin bajêr, rê û mecalên nû ji jinê re vebûn. Êdî jin bi xwe hatin, xwestek û nêrînên wan çêbûn."[556]

[555]Hevpeyvîn bi Rûken Ehmed re, Minbic, 2017

[556] Selcan

Piştî ku pergala komîn û hevserokatî di yek, du gundan de hatibû avakirin, endamên Meclîsa Medenî ev gund di civînên gundên din de wekî mînak nîşan dan. Bi vî awayî tiştên ku li gorî ferasetên baviksalar û dewletperest 'çênedibûn' gav bi gav çêbûne.

Di 12'ê Tebaxa 2016'an de navenda bajarê Minbicê jî ji faşîzma DAIŞ'ê hatiye rizgarkirin. Di demeke kin de gelek malbat û kes bi hêviyên avakirina jiyaneke nû û aram vegeriyane bajêr. Endama Tevgera Jinên Kurd, Rûken Ehmed yek ji van jinan e ku di avakirina birêxistinbûna jinê û rêveberiya xweser a herêma Minbicê de bi kelecaneke mezin cih girtiye û behsa guhertinên civakê dike:

"Piştî 26 salan ez vegeriyam Minbicê. Berê di nav Kurd û Ereban de danûstandinek hebû. Lê me [bi] Çerkes, Tirkmen û Ermen û [bi] rewşa wan nizanibû. Nêrîna me ev bû: Ereb desthilatdar in, Kurd jî bindest in. Ewqas. Lê niha em dibînin, gelek pêkhate hene, ewan jî wekî me zilm dîtine. Çerkesan jî ji desthilatdariya Ereban pirr zilm dîtiye, lê çanda xwe parastin. Çanda wan di aliyê exlaqê civakî de jî nêzîkî ya Kurdan e. Nêrîna jinên Çerkes di civakê de bi bandor e, ew xwedî vîn û nêrînên siyasî ne. Ermen û Çeçen jî hene di meclîsa me de.

Jin bi hêvî û bawerî tevlî xebatan dibin. Ji sedî 10'ê wan belkî wekî miwazif ji bo berjewendiyên xwe tevlî dibin. Lê ji sedî 90'ê wan jî bi bawerî û hêza ku me daye avakirin, tevlî siyasetê dibin û dibin hevserok. Şeş komiteyên rêveberiya xweser me li Minbicê ava kirin. Ew hemû bi pergala hevserokatî tên meşandin. Jinên ku ji bo van xebatan hatin pêşniyarkirin, xwe nedane paş. Di avakirina komînan de di serî de zilaman pirsgirêk derxistin. Li zora wan diçû ji ber desthilatdariya wan diçû. Lê em ji bo vê têdikoşin. Dema ku dor tê axaftinê, zilam diaxife, xwe li ser keda jinê mezin dike. Lê hemû cihên ku jinan tê de berpirsyarî girtiye baweriya civakê bi wan komîn û saziyan zêdetir tê. Cara yekem niha jinên Ereb di nav Asayîşê û quwetên leşkerî de cihê xwe digirin. Berê tiştên wiha di bajarê Minbicê de nebûn."[557]

Şevîn jî balê dikişîne ser taybetmendiyên Minbic yê cuda, ji ber ku ne tenê neteweyek yan pêkhateyek tê de heye. Ew jiyana pirçandî û pergala pirneteweyî wekî dewlemeniyekê ji bo hemûyan dinirxîne: *"Kurd, Ereb, Tirkmen, Çerkes, Çeçen û Ermen bi hev du re dijîn. Berê têkiliyên wan ji dervê danûstandinên jiyanî pirr bi hev du re nebûn. Lê îro di rêveberî û saziyan de hemû bi hev re kar dikin. Parvekirin û hev du naskirin hîn zêdetir bi pêş dikeve."*[558]

Jiyana Nor dibe mînakek ji bo serpêhatiyên gelek jinên Ereb ku îro di nav Hêzên Ewlekariya Hundirîn de kar dikin. Nor li gundekî nêzîkê Minbicê mezin bûye. Xwesteka wê ya xwendinê hebû, lê malbatê nedihişt bixwîne. Bavê wê ew di 13 saliya xwe de zewicandiye. Li gorî nihêrîna Norê, rewşa jinê di bin zexta pergala eşîrî de û di bin desthilatdariya DAIŞ'ê de pirr ji hev du cuda nîne: *"Ji temenê 10 salî ve keç mecbûr bûn serê xwe bigirin. Zewaca di temenê zaroktiyê de beriya DAIŞ'ê jî hebû. Ez 13 salî zewicîm û zilamê min 25 salî bû. Rewşa keçên gund hemûyan wisa bû. Keçeke min çêbû û me li hev nedikir. Di dema DAIŞ'ê de min nikarî xwe jê bidim berdan, ji ber jina berdayî, DAIŞ'ê ji xwe re dibir. Ji bo wê, min tehemûla wî dikir. Dema ku Minbic rizgar bû, min xwe jê da berdan. Ez çûm cem malbata xwe û ez tevlî nav Hêzên Ewlekariyê bûm. Armanca min bi vî karî parastina keça min e. Min got, ez nahêlim tişta ku hat serê min were serê keça min.*

[557]Hevpeyvîn bi Rûken Ehmed re, Minbic, 2017

[558] Hevpeyvîn bi Şevîn re, Minbic, 2017

Min xwest ku destê min jî di avakirina Minbicê de hebe. Çawa hevalan em ji zordariya DAIŞ'ê rizgar kirin, em jî dikarin jinên bindest rizgar bikin."[559]

Nor berê nizanîbû ku ji derveyî Ereban neteweyên din jî li Minbicê hene, lê îro ew bi jinên Kurd, Çerkes û Tirkmen re dixebite û berpirsê nuqteyên ewlehiyê ye. Ew bi bişirîneke li ser rûyê xwe dibêje, *"Bi rizgarkirina Minbicê û beşdariya min a nav hêzên ewlekariyê re, ez ji nû ve ji dayik bûm. Ez bûme ez bi xwe. Ji bo siberojê ez dixwazim ku hemû jinên Sûriyê rizgar bibin, ne tenê jinên Minbicê. Çawa em li vir bi rolekî radibin di civakê de hemû jinên Sûriyê jî dikarin weke me bibin. Ji bo ku ti ferq û cudahî navbera Ereb, Kurd, Tirkmen û Çerkesan nebe, her kes bi zimanê xwe biaxife, û bi rengî xwe tevger bike."*[560]

Fikr û projeyên Abdullah Ocalan ên derbarê azadiya jinê û neteweya demokratîk de bandor gelek jinên ji pêkhateyan hemûyan kiriye. Wekî din jinên ku bi salan di Tevgera Azadiya Jinê ya Kurdistanê de xebat meşandin, lêhûrbûn û tecrûbeyên xwe yên siyasî, civakî û rêxistinî parve kirine. Bi vî rengî danehev û felsefeya têkoşîna jinê û gelê Kurdistanê li Minbicê dibûn çavkaniya avakirina pergaleke hevbeş û demokratîk a birêvebirina civakê û sazkirina pergala xweser a jinan.

"Jin ne tenê wekî şekîl lê bi nêrîn û vîna jinê li her saziyê cihê xwe digirin û saziyên xwe ava kirine. Ev jî hemû bûye bingehê pêşêroja jinê. Me dersên xwe ji şoreşên dinyayê girtibûn. Me nexwest ku jin tenê wekî kesayet, wek şexs tevlî bibe, lê wekî hêzeke rêxistinkirî. Em girîngiyê didin çaresseriya pirsgirêkên civakî di milê exlaqî de. Bi vî rengî jî em jinan bi rêxistin û perwerde dikin. Tevlîbûna jinan ji perwerdeyên me re pirr û bi xwestek e. Cara yekem bi vî rengî jin jî ji malê derdikevin. Me komek jin ji bo perwerdê şandin akademiyên civakî li aliyê Cizîrê. Berê jin ji gundê xwe bîle derneketibûn. Bi xebatê re zanebûna jinê jî çêbûye. Jin dikare xwe tehlîl bike, quweta xwe bibîne. Pirraniya jinan pêşketinên mezin çêdikin û pirraniya civakê jî vê rista nû ya jinan qebûl dike. Bertek niha pirr kêm bûne."[561]

- **Rêxistinbûna Xweser a Jinê**

Ji bilî nûnertiya jinê wekî hevserok û beşdarbûna jinan di meclîsên leşkerî, medenî û zagonsaz de avakirina sazî, meclîs û rêxistinên xweser ên jinan, bûye gaveke girîng û nû li Minbicê. Tenê sê meh û nîvan piştî rizgarkirina bajêr, di 25ê Mijdara 2016'an de Mala Jinê wekî saziya jinê ya yekemîn li Minbicê hate vekirin.

Piştî rizgarkirina herêman ji çeteyên El-Nusra yan jî DAIŞ'ê yek ji saziyên destpêkê ku dihatin avakirin, Malên Jinê bûn. Jinên ji tevahiya pêkhateyên wan herêman di sazkirina Malên Jinê de cihê xwe girtine da ku jin karibin ji bo çaresseriya pirsgirêkên malbatî û civakî piştgiriyê bidin hev. "*Destpêkê di nav gel de qebûlnekirin û nêzîkatiyên bi guman hebûn. Lê piştre gel wekî lehiyê dihat."* Nadja, yek ji damezrînerên Mala Jinê dide zanîn ku di meha yeke de ewqas jin bi miracaetên xwe dihatin ku ew mecbûr mane ji serê sibehê heta nîvê şevê bixebitin: *"Dozên berdanê pirr dihatin. Hinek jin dihatin 3 - 4 salan zarokên xwe nedîtibûn. Bi sedan jin dihatin. Te nikarî nefes bigirta. Her roj herî kêm 50 jin dihatin û daweyên wan dihatin halkirin. Pirsgirêkên ku bi salan bê çarê mane, jinên nexwendî yên li Mala Jinê [ev] çareser kirine ji ber ku em civaka*

[559] Hevpeyvîn bi Nor re, endama Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên Minbicê, 2017

[560] Çavkanî li heman cihî

[561] Hevpeyvîn bi Rûken Ehmed re, Minbic, 2017

xwe û zimanê wê nas dikin. Dema ku jin û zilaman dît ku em ji pirsgirêkên civakê re dibin bersiv, hûrmet raber kirin. Wan feraseta me ya edaletê didît. Em li jin û zilaman li her duyan guhdarî dikin, kêmasiyan zelal dikin û li gorî çarçoveya qanûnên jinê çareseriyê nîşanî wan didin. Gelek pirsgirêk dema ku em van bi hev re şirove dikin, jin dibêjin ku wan berê bi wan tiştan nizanîbû. Karê me yê şewîrmendiyê dibe wekî perwerdekirina jinan û civakê."[562]

Ji 25 Mijdara 2016'an heta 1'ê Hezîrana 2017'an Mala Jinê li ser 610 dozan sekinî. Mala Jinê bêhtirî nîvê wan bi hêza xwe û bi rêbazên lihevanînê çareser kirin. Lê 285 ji wan dozan, ji bo lêpirsînê birine dadgehê ji ber ku binpêkirinên cidî yên mafê jinê tê de hebûn. Qanûnên jinê yên ku li kantonên Rojava lê ne, heta wê demê li Minbicê wekî hişmendî û rêgez dihatin şopandin. Ji ber feraseta eşîrtî di hêla qebûlkirina qanûnên jinê de zehmetî tê kişandin. Nexasim mijarên wek qedexekirina zewacên di temenê piçûk de û zewaca bi pirr jinan re di civakê de bi nakok in. Heta di çand û exlaqê civakê de ev rewş nayên şermezarkirin, çareserî tenê bi rêya qanûnê ne pêkan xuya dike. Lewma Mala Jinê û Meclîsa Jinê ya Minbicê di serî de xebatên perwerdeyî û ronakkirina civakê plan kirin. Piştre ew ê pêşnumaya qanûnê ji bo herêma Minbicê amade bikin û ferweriyên giştî yên jinê li herêma xwe diyar bikin. Xebatkareke ciwan a Mala Jinê dibêje, *"Tişta yekem ya ku divê were qedexekirin, zewaca di temenê zaroktiyê de ye. Divê her keç zanibe ku heger mafê wê tê binpêkirin, ew dikare ji Mala Jinê piştgiriyê bistîne."*[563]

Gelek jinên Minbicê yên ji pêkhateyên cuda ku serpêhatiyên xwe yên bi êş bi me re parve kirin, DAIŞ wekî 'ewrekî reş' pênase kirin ya ku jiyana wan tarî kir. Jineke ciwan hest û fikirên xwe piştî ku Minbic ji DAIŞ'ê rizgar bû, bi van gotinan tîne ziman: "*Piştî ku ewrê reş hatiye qewitandin, em niha tîrêjên rojê ji nû ve dibînin. Her wiha em dibînin, çiqasî em berê jî dîlgirtî bûn beriya ku ev bahoz bi ser me de hat... Piştî bûyer û êşa bi ser me de hatî hemûyî, êdî em nema dikarin neheqiyê qebûl bikin. Perwerde ji her tiştî ji bo me girîngtir e."*[564]

Gelê Minbicê di heft salan de di bin pênc pergalên cuda de jiyaye. Her çar rejîmên berê - ji serweriya Partiya Beesê heta Ceyş el-Hurr, El-Nusra û DAIŞ'ê - qaîdeyên cuda li ser jinan ferz kirin û bi zorê cilên cuda li wan kirin. El-Nusra jin mecbûr kirin ku çarşefê li xwe bikin. Piştre DAIŞ'ê li ser jin û keçan bi zorê ferz kir ku nîqab û lepikan jî li xwe bikin. Ji bo jinên zewicî nîqabên rengê qehweyî ferz bûn, ji bo keç û jinên nezewicî nîqaba reş. Yek li ber vê rabûya cezayên dijwar lê dihatin birrîn heta bi kuştinê jî. Ferweriya li ser şiklê cilûbergan bûbû sembola rejîmên zalim û dagirkeriyê li ser civak û bedena jinê. Ji ber vê yekê, jinan roja rizgariya Minbicê bi cilên rengîn û şewitandina nîqabên reş pîroz kir.

Di pergala xweseriya demokratîk de jinan niha derfet bi dest xist ku bikarin cilê xwe bi xwe bidirûn. Lê belê heta kîjan astê vîn û hêza her jinê heye ku ew bikare modela cilê xwe bi xwe bisêwirîne û rengê qumaşê hilbijêre? Di menzereya bajarê Minbicê de şewazên cuda yên cilê jinan balê dikişînin: Pirraniya jinan cilê rengîn li xwe dikin û destmalê didin serê xwe. Jinên ciwan bi şal an jî unîformên Meclîsa Ewlekariyê bixwebawer li sûkê digerin. Lê dîsa jî jinên bi nîqabên reş û lepik jî hene. Endameke Mala Jinê behs dike ku jin bi şiklê cilê xwe nîşan dikin gelo ew alîgîr an jî dijberên kîjan pergalê ne.

[562] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Minbicê re, 2017

[563] Çavkanî li heman cihî

[564] Nîqaşên perwerdeyî yên Jineolojiyê bi endamên meclîsa jin a Minbicê re, 2017

Endamên meclîs û saziyên jinê bi civîn, perwerde, nîqaş û çalakiyan hewl didin ku zanebûn û bixwebaweriya jinên Minbicê xurt bikin. Daxwaza gelek jinan heye ku ew xwe îfade bikin, ramanên xwe bi pêş bixin û wan di pratîkê de pêk bînin. Ya girîng ew e ku cilên jinan ne tektûk, yekreng bibin ne jî li gorî şablonên qediyayî werin amadekirin. Bi hûnandina qûmaşên bi neqşên çanda xwe, rêxistinbûna hevbeş û ceribandinên nû, derfet li pêşiya jinên Minbicê vedibe ku jiyan, civak û xwe jî ji perspektîfên cuda nas bikin. Li cem gelek jinên Minbicê ev wêrekî, hêz, kelecan û bawerî xuya dibe ku ew ê ji bo jiyan û siberoja civaka xwe, xwe bidin ber berpirsiyariyê.

- **Dewama Pêngavên Rizgarkirina Herêmên Bakurê Sûriyê**

Dema ku bibinketina DAIŞ'ê li Minbicê xuya bû, çeteyan beşeke mezin a hêzên xwe kişand aliyê Cerablus û Tirkiyê, wan beşeke din jî kişand aliyê Reqa û Derazorê. Dema DAIŞ reviya, wê kesên sivîl jî revandin, bi xwe re birin û wekî mertalê zindî ew bi kar dianîn. Şervanên jin ên Meclîsa Leşkerî ya Minbicê diyar dikin ku *"dema DAIŞ ji Minbicê derket, wan gelek jin û keç revandin. Lê ji ber tirs û feraseta namûsê, heta vêga jî pirr malbat li keçên xwe yên winda napirsin. Ew wan wekî 'mirî' yan 'tine ye' dihesibînin."*[565] Di nava jinên revandî de dîsa jinên Êzdî jî hebûn ku DAIŞ'ê di qirkirina Şengalê de ew revandibûn û wekî kole bi kar dianîn.

- **Pêngavên Cerablus, Bab û Şehbayê**

Piştî rizgarkirina bajarê Minbicê, yek ji armanca hêzên YPJ û YPG'ê ew bû ku ew korîdora DAIŞ'ê di navbera Tirkiyê û Bakurê Sûriyê li Rojavayê Ava Firatê de bibirrin û her sê kantonên rêveberiya xweseriya demokratîk a Rojava bigihînin hev. Bi vê armancê şervanan berê xwe da herêmên Cerablus, Bab û Şehbayê. Cerablus ku bi navê xwe yê dîrokî Karkameş jî tê nasîn, wekî bajarê xwedawenda Kubaba ji serdema neolîtîk ve bi navûdeng bû. Li wir wekî li tevahiya herêma Şehbayê bi sed salan e ku netewe û baweriyên cuda wekî Kurd, Tirkmen, Ereb, Ermenî û Suryanî jiyana xwe bi rêzdarî li cem hev domandine. Lê belê dagirkeriya çeteyên El-Nusra û Ehrar El-Şam ku di sala 2011'an de dest pê kir û ji sala 2014'an ve bi zordestiya DAIŞ'ê dewam kir ev pergala xwezayî ya hevaltiya gelan, têk bir. Nexasim gelên Xirîstiyan û gelê Kurd dibûn armanca zext û komkujiyan. Ji ber qirkirinên li dijî gel û jinan, bi deh hezaran mirov ji warê xwe hatin qewirandin. Bi vî rengî qirkirineke etnîkî li ser civaka Babê û cihên din yên Şehbayê hat meşandin û ev herêm ketin bin zordestiya çeteyan.

Ji bo li cihên herêma Şehbayê di bin parastina hêzên girêdayî QSD'ê de pergala xweseriya demokratîk were rûniştandin di Adara 2016'an de rêveberî û meclîsa Şehbayê hatine avakirin. Dîsa amadekarî ji bo rizgarkirina hemû navçeyên di navbera kantona Kobanê û Efrînê de hatin meşandin. Nexasim bi pêngavên di destpêka meha Hezîrana 2016'an de zêdetirî 100 gundan ji çeteyên DAIŞ'ê hatin rizgarkirin. Jinên li herêma Şehbayê jî tevlî hemleyan bûn û hêzên xwe ava kirin. Destpêkê Tabûra Jinê ya *Şehîd Jiyan Ehrez* hat birêxistinkirin. Piştî perwerdeyên îdeolojîk û leşkerî di 8'ê Hezîrana 2016'an de avakirina ***Eniya Parastina Jinên Şehba*** hatiye ragihandin. Jinên Ereb, Tirkmen û Kurd ji herêmên Minbic, Bab û Ezazê tevlî xebatên eniyê bûnê. Wan bi nasnameya xwe di berxwedana li hemberî êrîşên dagirker ên dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê de cihê xwe di eniya pêş de girt. Aljîn Gîvara (Zenubya Xilo) yek ji fermandarên Eniya Parastina Jinên Şehbayê bû ku di karên sazbûnê de cihê xwe girtiye. Di 2'ê Îlona 2016'an de ew di şerê li hemberî çeteyên DAIŞ'ê de şehîd ket û bû şehîda yekem a Eniya Parastina Jinên Şehbayê.

[565] Nîqaşa bi şervanên jin ên Meclîsa Leşkerî ya Minbicê re, Akademiya Ş. Roksan a Minbicê, 2017

Piştî rizgarkirina Minbicê di Tebaxa 2016'an de hêzên demokratîk û şoreşger meclîsên hevbeş ên leşkerî li navçeyên wekî Bab û Cerablusê damezrandin. Vê demê careke din rist û armanca Tirkiyê di şerê li dijî gelên Bakurê Sûriyê de derket holê. Ji ber ku cihgirên dewleta Tirk li ser axa Sûriyê yanî çeteyên El-Nusra û DAIŞ'ê lawaz ketibûn, êdî dewleta Tirk di 24'ê Tebaxa 2016'an de fermî dest bi dagirkeriya Bakurê Sûriyê kir. Fermandara YPJ'ê Şîlan Qamişlo rewşa hingê wiha rave dike: "*Piştî rizgariya Minbicê, em çûn aliyê Cerablusê jî. Hêzên koalisyonê ev plan veto kirine. Me got, em bi hêz û înîsiyatîfa xwe diçin. Em heta gundekî 5 km beriya Cerablusê çûn. Beriya Tirk bikevin vê derê şerekî pirr tûj di navbera hêzên me û DAIŞ'ê de li wir çêbû. Me hemû deriyên qada Cerablusê girtin û em li derdora Cerablusê di şer de bûn. Vê demê tangên Tirkiyê hatin. Du roj me di van gundên ku me girtin de, li hemberî arteşa Tirk şer kir û 3 tangên wan me îmha kirin. Dema ku arteşa Tirk dît ku nikare bi hêzên bejayî bi pêş ve biçe, balafirên şer rakirin. Bi lêxistina balafiran pênc heval li cihekî şehîd ketin. Nuqta bi nuqta li cihê quwetên me xistin. Westandina hevalan ji hemleya Minbicê hîn hebû û xuya bû, ger em bimînin me yê wendahiyên pirr giran dabana. Ji ber vê, biryar hat dayîn ku em quwetên xwe ji Cerablusê paş ve bikişînin.*"[566]
Dîsa bi vê pêngavê ve hêviya siberoja azad di nav gelê Cerablusê de şiyar bû. Her wiha beşeke ciwanên Cerablusê jî berê xwe da Minbicê û li wir tevlî hêzên Meclîsa Leşkerî ya Minbicê ya di bin banê QSD'ê de bûn.

Zîlan Intîqam yek ji jinên Ereb ên Cerablusê ye ku di dawiya sala 2016'an de beşdarî Meclîsa Leşkerî ya Minbicê bû. Malbata wê, ew di 15 saliya xwe de bi darê zorê daye zewicandin. Zîlan dayika çar zarokan e û zarokên wê du ta heşt salî ne. Ew dibêje, "*Destpêka Ceyş el-Hur ket Cerablusê, pirsgirêk di navbera min û zilamê min de çêbûn. Ceyş el-Hur jî jin pirr piçûk dixistin û bi çavekî piçûk li jinê dinihêrî. Mafên jinê tine bûn. Nêzikatiyên wan wek yên DAIŞ'ê bûn. Lê dîsa, wek DAIŞ'ê keçik nedirevandin û mişkile di nav bajar de dernexistin. Dema DAIŞ ji Minbicê derket, hat Cerablusê. Li Cerablusê du rojan di navbera DAIŞ û Ceyş el-Hur de alozî çêbû. Piştî du rojan, DAIŞ ji Cerablusê derket û rejîma Tirkiyê hat. Heta niha di wir de ye.*

Min zilamê xwe berda. Zarokê min niha li cem bavê xwe li Cerablusê ne. Min zarokên xwe xwestin. Lê wî nedan min. Min QSD li ser televîzyonê dîtibû. Piştre dema ez çûm serdana birayê xwe li Minbicê, min ew bi xwe dîtin. Min dît ku QSD di nav civakê de reng daye bi hêza xwe. Wan bandor li min kir û ez hatim tevlî wan bûm. Ez dixwazim tola hemû şehîdan rakim û jinê ji bindestiyê, ji zêhniyeta zilam û zayendperestiya civakê rizgar bikim. Ji bo azadiya zarokên xwe ez li ber xwe didim û heta dawî ji bo azadiya gelê xwe û welatê xwe şer bikim."[567]

Heqîqetên civakî gelek caran di metelokan de tên gotin. Eyşe Efendî mîsalek bi me re parve kir ku bandora berxwedana YPJ'ê û avakirina Eniya Parastina Jinên Şehbayê li ser civaka Babê diyar dike. Rojekê zilamekî Ereb jê re gotiye: "*Kalê Ereban egalê xwe danîn, pê çongê xwe girêdan û digot, 'Heger di Babê de dijmin bi ser me de werin, êdî em nema dikarin birevin.' Jinên Kurd gihîştin vê astê, kitana serê xwe danîn û lingê xwe girêdan û di Babê de ser me re hatin. Ev ne xewn e, ne xeyal, ne jî pesn e. Ev rastî ye.*"[568]

Beşdarbûna jinên Ereb a nav refên Yekîneyên Parastina Jinê, nexasim bi pêngava rizgarkirina Minbicê re li gelek herêman bi pêş ketiye. Sekin û têkoşîna jinên Kurd bandor li jinên Ereb kiriye.

[566] Hevpeyvîn bi Şîlan Qamişlo re, Dirbêsî, 2017

[567] Hevpeyvîn bi Zîlan Intîqam re, şervana Meclîsa Leşkerî ya Minbicê, Akademiya Ş. Roksan a Minbicê, 2017

[568] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

Wan di eynika şervanên YPJ'ê de hêza jinê û hêza xwe jî didît. Bi hezaran jin ji beşên civaka Ereb a li Sûriyê hemûyan, tevlî nav refên YPJ, QSD û hêzên ewlekariyê bûne, da ku ew bikarin çarenûsa xwe wekî jin bi xwe diyar bikin û warê xwe ji zilma DAIŞ'ê rizgar bikin. Ev di civaka Ereb de rewşeke pirr nû û ne ji rêzê ye.

- **Pêngava Xezeba Firatê**

Bi armanca rizgarkirina herêm û bajarê Reqayê ji zilma DAIŞ'ê hêzên QSD'ê şeva 5ê Mijdara 2016'an Hemleya Xezeba Firatê dan destpêkirin. Fermandariya giştî ya QSD'ê ji hêzên demokratîk ên cîhanê û gelên herêmê re ragihand ku ew ê hemleya Xezeba Firatê bi israr bimeşînin da ku ew *"paytexta terora cîhanî ya DAIŞ'ê dorpêç bikin û birûxînin. Wê Reqa bi saya şervan û hêzên xwe ku ji Kurd, Ereb û Turkmenan pêk tê, qehremanên di bin sîwana QSD'ê de, bi beşdarbûneke aktîv a YPG/YPJ'ê û bi awayekî koordîneyî bi Koalîsyona Navneteweyî, rizgar bibe. Em bang li gelê xwe yê qehreman dikin da ku dûrî baregehên dijmin bikeve û ber bi herêmên ku wê bên rizgarkirin ve were û tevlî hêzên me bibe. Ji ber ku baregehên dijmin wê bibin hedefa hêzên me û hêzên Koalîsyonê."*[569]

Ev hemle li ser esasê pênc qonaxan hatiye meşandin û xwedî wateyeke stratejîk bû. Ji ber ku ji sala 2014'an ve DAIŞ'ê bajarê Reqa wekî navenda sazîbûn û îdarekirina rejîma xwe ya faşîst bi kar dianî. Him di warê şerê leşkerî de, him jî di warê têkoşîna siyasî û têkoşîna azadiya jinê de têkbirina DAIŞ'ê li Reqayê pêwîst bûbû. Pergala qirkirina jinê li Reqayê bi rengekî sîstematîk hatiye meşandin: Bi hezaran jin wekî jinên Êzdî ku ji Şengalê hatibûn revandin, di bazarên Reqayê de hatine firotin, êşkence li wan hatiye kirin û ew hatine kuştin. Jineke ciwan ji Reqayê radigihîne ku rêxistineke taybet ya jinên DAIŞ'ê hebû: "*Pirranî jinên ku ji derve, ji welatên din yên Ereban, Tirkiye û Ewropayê hatibûn, tê de cih girtin. Ew diçûn malbatan û çav li keçên bedew gerandin ji bo ku wekî bûk ji bo leşkerên DAIŞ'ê bibin. Ger malbatekê nexwesta keça xwe bide wan, gef li wan xwarin. Digotin, ew ê malê tevî malbatê tê de bifecirînin. Keçên ku wan bi xwe re birin destpêkê wekî kole bi kar dianin, piştre jî ji bo çalakiyên xwekujiyê li dijî 'kafiran' perwerde kirin. Dîsa wan zêr û pere ji bo DAIŞ'ê kom dikirin. Jinên ku ne li gorî wan bûn yan cilê wan ne li gorî qanûnên wan bûn, ew qemçî kirin yan dixistin qefesan."*[570]

DAIŞ'ê şerek li hemberî jinan bi her cûreyê êşkenceyê meşand. Bi êşkenceyên fizîkî, cinsî û psîkolojîk wê dixwest kesayet, nasname û hebûna jinê tine bike. Du salan piştî rizgarkirina Reqayê zêdetirî 5.700 termên mirovan di gorên komî yên DAIŞ'ê yên li Reqayê de hatin dîtin. Ji derveyî vê gelek term jî hatibûn şewitandin û xebatên ji bo ronîkirina qirkirinê û komkujiyan hemûyan hîna didomin.[571] Roksan Ronî ji Reqayê dibêje, girtina jinan di qefesên hesînî de yek ji rêbazên şerê taybet ê DAIŞ'ê li hemberî jinan bû û di encama zilmê de gelek jinan eqilê xwe avêtiye û careke din nehatine ser xwe: "*Min pirr caran dît ku DAIŞ'ê serê mirovan jêdikir û di nava sûkê de serê bi dar dixistin û li pêşiya dikanan datanîn. Dema jin diçû sûkê, heger dest yan çavê wê xuya bikirana, ew dixistine qefesekê di nava tirban de. Ew jina dixistin wê qefesê û serekî qut jî pêre dixistin qefesê. Bi heftiyan ew jin di wê rewşê de diman. Heta pirr jin jî wisa dîn bûn."* Bêrîvan Reqa jî radigihîne ku di dirûvê wan jinan de ku ji zindanên DAIŞ'ê li Reqayê derdiketin, dehşeta

[569] Daxuyaniya Fermandariya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD): Hemleya Rizgarkirina Reqayê destpêkiriye, 06-11-2016

[570] Nîqaşa bi şervanên jin ên Meclîsa Leşkerî ya Minbicê re, Akademiya Ş. Roksan a Minbicê, 2017

[571] Nûçê Ronahî TV, 05-02-2020

hatiye serê wan hemû xuya bû: *'Te digot, ev jin dîn bûye, hingî di hepsê de êşkence lê dikirin û pirr tiştên xerab dianîn serê jinan."*[572]

Li hemberî vê rastiyê gelek jinên Ereb wekî Roksan û Bêrîvan bi sonda tolhildanê, rizgarkirina jinê û bajarê Reqayê tevlî hêzên leşkerî bûne. Wan biryara xwe daye ku ji bin desthilatdariya malbatê û kevneperestiya civakê derkevin û êdî bindestiyê qebûl nekin. Bi vî awayî YPJ'ê jî û şervanên jin ên ku di bin banê QSD'ê de tevlî şerên Hemleya Xezaba Firatê bûne, rizgarkirina Reqayê wekî erkeke bîrdozî, siyasî, leşkerî û mirovî nirxandin. Yekîneyên Jinên Şengalê (YJŞ) jî bi hêzeke taybet tevlî vê pêngavê bû. Armanca wan bi taybetî tolgirtin û rizgarkirina jin û zarokên Êzdî bû ku ji Şengalê hatibûn revandin. Dîsa tabûrên jinên Ereb ku di bin sîwana QSD'ê de hatine damezrandin, weke *Tabûra Şehîd Hebûn Ereb* li Tebqayê, *Tabûra Şehîd Amara ya Jinên Ereb* di pengava Dêrazorê de û du Tabûrên jinên ciwan ên Reqayê tevlî hemleya Xezaba Firatê bûn. Fermandar û şervanên jin di tevahiya qonax û astên şer hemûyan de bi risteke pêşeng rabûn.

Di **qonaxa yekemîn** a Xezeba Firatê de ku 10 rojan dewam kir, şervanên QSD'ê herêmeke bi qasî 550 km² tevî 34 gund, 31 gundik û bajarokê Til Seminê li bakurê Reqayê rizgar kirin. Di heman demê de Meclîsa Sûriyeya Demokratîk (MSD) xebatên ji bo avakirina rêveberiyeke medenî di herêmên rizgarkirî de dan destpêkirin.
Qonaxa duyemîn a Xezeba Firatê di 10'ê Kanûna 2016'an de hate destpêkirin. Herêmeke bi rûbara 1300 km² li aliyê rojavayê Reqayê di nav de 2 bajarok, 97 gund, bi dehan gundik û kela dîrokî ya Kela Ceberê, ji çeteyên DAIŞ'ê hatin rizgarkirin.
Di **qonaxa sêyemîn** a Xezeba Firatê de ya ku di 5'ê Sibata 2017'an de hate ragihandin, pêngavên li bakurê Dêrazorê û li rojhilatê Reqayê hatin meşandin. Şervanên Meclîsa Leşkerî ya Dêrazorê nû beşdarî pêngavê bûn. Fermandariya QSD'ê da zanîn ku di vê qonaxa pêngavê de 1640 km² rûbera erd bi dehan gund, gundik û bi hezaran sivîl ji çeteyan hatin rizgarkirin. Di van herêman de mayînên ku çeteyên DAIŞ'ê çandibûn hatin rakirin û gel bi silametî vegeriya cih û warên xwe. Her wiha Meclîsa Sivîl a Reqayê ya Miweqet di 27'ê Adara 2017'an de dest bi avakirina pergala xwebirêvebirinê li gundewarên rojhilatê Reqayê kir. Di aliyê rojavayê Reqayê de hêzên QSD'ê balafirgeha leşkerî ya Tebqayê rizgar kir, derdora bajarê Tebqa û bendava Firatê girtin.
Qonaxa çaremîn a Xezaba Firatê bi armanca rizgarkirina herêmên mayî di 13'ê Nîsana 2017'an de hate destpêkirin. Piştî şerên giran şervanên QSD'ê bendava Firatê û di 10'ê Gulana 2017'an de bajarê Tebqayê rizgar kirin. Endama Femandariya QSD'ê Rojda Felat rizgarkirina Tebqa û Bandava Firatê ku kehrebê li pirraniya herêmên Sûriyê belav dike, wekî serketineke dîrokî nirxand. Wê diyar kir ku di vê hemleyê de hêzên wan bi hezaran sivîl xilas kirine. Bi taybetî jinên ku çeteyan wek kole bi kar dianîn û hejmarek jinên Êzdî yên ku çeteyan di êrîşên li dijî Şengalê de revandine jî hatin rizgarkirin. Rojda Felat got, ji bo hêzên QSD û YPJ'ê *"rizgarkirina bajarê Tebqa û bendava Firatê tolhildana me ji bo jinên Êzîdî ye. Niha li ser Bendava Firatê em dibêjin, ev bendav dê bibe bendava azadiyê û biratiya gelan."*[573]

- **Serpêhatiyên Rizgarkirina Tebqayê**

Cemîle Hisên salên zilma DAIŞ'ê û roja rizgarkirina Tebqayê li bajarê xwe tevî her sê zarokên xwe dîtiye. Hîna berîya DAIŞ bikeve Tebqayê, zilamê wê ew berdabû. DAIŞ'ê kurê wê yê 10 salî li taxa wî girtîbû ji ber ku cilên sporê li xwe kiribûn. Bi ciletê êşkence lê kirin, çermê wî rakirin û

[572] Nîqaşa bi şervanên jin ên Meclîsa Leşkerî ya Minbicê re, Akademiya Ş. Roksan a Minbicê, 2017
[573] Rojda Felat: *Rizgarkirina Tebqa û Bendavê tolhildana jinên Êzidî bû,* Malpera YPG, 12-05-2017

qamçî lêxistin. Bi hestyarî Cemîle bi saetan qala mînakên hovitiya DAIŞ'ê li Tebqayê dike. Ew behsa bi dehan kirinên xedar dike ku bi eqilê mirovan neyên fêhmkirin. Lê dîsa ew dibêje, *"Çiqas jî ez bêjim, kêm e. DAIŞ'ê jiyan kiriye dojeh. Jin yan keç ku DAIŞ'ê ew bi tenê li kolanan dîtibana, ew bi 'fihûşê' tawanbar dikirin, dibirin û recm dikirin. Zilam jî êşkence kirine, çermê wan radikirin, serê wan jêdirin, pê bi gog dileyîstin û diavêtin ser kolanê. Lê cenazeyên jinan dişewitandin. Heta hestiyên jinan nedihiştin. Muzîk û cilê spî yên bûkan jî qedexe bûn. Carekê DAIŞ'ê bûk û zava dîtin. Bûkê cilên spî li xwe kiribûn. Herdu birin ber bîrên aliyê bendava Tebqayê, avêtin bîrê û xeniqandin.*

Dema Tebqa nû dagir kirin, DAIŞ'ê digot, 'werin tevlî me bibin û hûnê xweş bijîn'. Berpirsyarên DAIŞ'ê dewlemend bûn. Lê yên ku tevlî wan nedibûn ji birçîbûnê dimirin. Nan pirr biha bû. Yên ku dixwestin derkevin derve, biçin welatên Ewropayê yan cihekî din, ew dibirin. Cihekî mezin bi zeytê qelandî amade kirbûn. Ew mirov zindî dixistinê û diqelandin yan jî dixistin derraseyê [batozê] û dihêrandin. DAIŞ ket malên xelkê, malên kesên koçber bûbûn. Keçên Êzdî jî anînê wir û kirin cariye. Lê cilê reş li wan nekirin ji bo bên naskirin ku kole ne. Rûyê wan nedigirtin ji ber ku digotin 'ew kafîr in.' Çar keçên Êzdî anîn taxa me. Ewqas tecawizî wan kirin, wekî kole bi kar dianîn û êşkence li wan dikirin. Axaftinên pîs ji wan re digotin. Me tehemul nedikir.
Her tişt di bin navê Îslamiyetê de kirin. Xirîstiyan, Elewî, Kurd û yên ne Misilman, pêwîst bû pereyên mezin bidin. Lê dîsa hatin kuştin ger neçûbana. Tebqa wekî cihekî taybet ji bo Misilmanan dixwestin çêbikin. DAIŞ'ê ji endamên xwe yên li Ewropayê re telefon vedikir û digot: 'Werin, li vir bijîn. Gelek jinên xweşik hene û zilamên wan jî gişt tirsonek in.'

Hisbê jin yê DAIŞ'ê derdora malan digeriyan, dema ku dengê keçekê li cihekî derketiba ew diçûn wê malê, keç dibirin û didan yekî DAIŞ'î. Ew bi taybetî diçûn malên xizan ji bo keçan bibin. Ew hatin cem me jî. Wan dixwest min bizewicinîn û zarokên min bibin baregeha xwe. Zarok li cihekî kom dikirin, mêjiyê wan dişûştin û perwerdeya leşkerî didan ji bo şer bikin. Min qebûl nekir. Ez û zarokên xwe em çend rojan ji mal derneketin. Îcar hatin mala me û careke din ez xwestim. Min got: 'Ez 50 salî me. Ez nazewicim. Ez bi xwe li zarokên xwe meyze dikim.' Rojeke din ez ji mal derketim û ser çavê min vekirîbû. Zilamekî DAIŞ'ê ket pey min û li min heqaret kir. Min gotinên wî lê vegerandin. Wî jî êrîşê min kir. Lê piştre sekînî, ji ber ku zilamên di sûkê de jê re digotin 'eyb e ku tu li jineke pîr dixî!' Êdî hemleya hevalan jî bi pêş ve diçû. DAIŞ'ê êdî cesaret nedikir pirr tiştan bike."[574]

Cemîle li ser serpêhatiyên xwe di rojên şerê li bajêr û rizgarkirina Tebqayê de dibêje, "*Çend rojan beriya wê, hinek kesan di cihekî veşartî de li televizyonê temaşe kiribû û bihîstibûn ku YPG û YPJ'ê hemleyeke taybet ji bo rizgarkirina Tebqayê daye destpêkirin. Cîranên me hemû DAIŞ'î bûn. Wan giradê xwe û zarokên xwe hemû rakirin û derketin. Em ewqas kêfxweş bûn ku em ji wan xilas bûn.*

Dema ku hemleyê dest pê kir, him heval ketin van deran û şer kirin, him jî balafiran lêdida. Ez tenê bi zarokê xwe çûm cihekî din li bajêr. Ji ber ku di taxa me de gelek DAIŞ'î hebûn, balafiran li nêzîk dixist. Çar rojan şerekî pirr giran hebû. Balafir û topan lêxist. Her kes wê demê ji bajêr derket, yên çete û yên ne çete jî. Lê ez bi zarokên xwe ve mam. Me di wan çar rojan de tenê nanek û fêkî xwar. Kesek tine bû. Kesî em dernexistin. Min xwe ji ber çeteyan veşart. Wan dixwest me bibin yan

[574] Hevpeyvîn bi Cemîle Hisên re, endama Akademiya Jinên Sûriyê li Tebqayê, 2018

Reqa yan Dêrazorê. Carekê top ket nêzîkî me, zarok gelekî tirsiyan. Lê piştî vê bêdengî bû. Zilamekî ixtiyar hebû. Wî bang li me kir, got, 'Êdî em rizgar bûn!' Bi dengê wî ez derketim derve. Min dît ku hemû şervanên YPG, YPJ û QSD'ê li vir kom bûn. Min got, 'Ecaba ez xewnekê dibînim?' Ez ji kêfxweşî giriyam. Hevalên YPJ'ê ji min re gotin, 'Xaltik, negirî. Em hemû ji bo we hatin, ji bo em we rizgar bikin. Çima tu digirî?' Dest û lingê min ricifîne. Min nikaribû bawer bikim. Min got, ecaba DAIŞ'î hîn li cihekî ne? Dema ku min bi rastî fêhm kir ku DAIŞ çûbû, dilê min rehet bû. Hevalê ku hatin, gotin, 'Yadê, em birçî ne. Nan li cem te heye?' Lê ti tiştekî me nemabû. Îcar heval çûn û ji me re xwarin anîn. Hevalan digot, 'Niha, em ê bi hev re bimînin. Tu li gel me be. Em him parastina te bikin û em ê xwarina xwe bi hev re bixwin. Lê pirr zêde tevnegere, ji ber ku hîna şer dewam dike. Dema ku çete te bibînin dibe ku êrîş bikin.'

Piştî ku Tebqa bi giştî rizgar bû, gel hêdî hêdî vegeriya malên xwe. Vê carê komîn û meclîs hatin avakirin. Min berpirsyarî girt û di lijnê sulhî de kar kir. Perê min tine bûn ji bo ez bikarim zarokên xwe têr bikim. Mala min bi giştî xira bû. Lê heval hatin û ji min re maleke nû dîtin û zarokê li min meyzandin. Jiyana min ji sedî sed hatiye guhertin."[575]

Wekî di pêngava rizgarkirina Minbicê de, li Tebqa jî bi hemleya leşkerî re hemleyên avakirina komînan û birêxistinkirina jinan dihatin meşandin. Endamên Meclîsa Jinê ya Tebqayê didin xuyakirin ku wan pêşî li gorî pêdiviyên derûnî û aborî yên jinan li bajêr û gundan komîte ava kirine: "*Armanca me ya serekê ew bû ku em bikarin ji jinên di şer de zilm dîtî madî û manewî alîkar bin. Piştre me hevserokên komînan hilbijartin û bi rêya hilbijartinê meclîs ava kirin. Me xwest vîn û hêza xwebirêveberina jinê derxin holê. Bi xebatên meclîsa jinê re gelek bipêşketin çêbû. Wekî jin em gihiştin hev."*[576]

Hemwext Meclîsa Medenî ya Tebqayê wekî beşeke pergala rêveberiya xweser li Bakurê Sûriyê hat avakirin. Li vir jî pergala hevserokatiyê û beşdarbûna wekhev a jinan lê bûn. Endamên jin ên meclîsê bi serbilindî dibêjin, rêjeya jinê di rêveberiyê de ji sedî 50'yê û di komisyonên meclîsê de ji sedî 60'ê ye. Dema ku wan piştî rizgarkirina Tebqayê dest bi karê xwe kiriye, endamên rêveberiyê hemû bi dilxwazî û di şeş mehên destpêkê de bê fon xebitîn. Piştî êşên giran û hilweşandinên ku di bajêr de çêbûne, xizmeta gel mijara herî li pêş a Meclîsa Medenî bû:

"DAIŞ'ê hemû cih û binesazî wekî nexweşxane, dibistan û rêyên avê xira kiribûn. Ji ber vê, me ewilî xizmeta tenduristî, pêdiviyên nan, av û çandîniyê dîsa bi rêxistin kir. Beriya şer hemû netewe û bawerî di vê herêmê de hebûn. Tebqa wekî 'Sûriya piçûk' bû. Me bangewazî li hemû gelan kir ji bo vegerin ser axa xwe. Ev girîng bû. Ji ber ku DAIŞ'ê dixwest pirçandîbûna Tebqayê tine bike. Tenê Erebên Misilman di bajar de hiştibûn. Lê Kurd, Tirkmen, Çerkes û Xirîstiyan piştî rizgarkirina Tebqayê dîsa vegeriyan. Mal û milk li xwediyên wan dîsa hatin vegerandin. Nûnertiya hemû pêkhateyan di meclîs, rêveberî û saziyan hemûyan de çêbû. Ji pêkhateyekê yek kes jî hebe, ew cihê xwe tê de digire."[577]

Bi vî rengî bingehê neteweya demokratîk li Tebqayê li ser koka xwe ya dîrokî ji nû ve hat danîn. Her wiha ji bo Reqayê jî amadekariyên avakirina pergala xwebirêveberinê bi rengê neteweya demokratîk hatin meşandin. Di 18'ê Nîsana 2017'an de civîna damezrandina Meclîsa Medenî ya

[575] Çavkanî li heman cihî

[576] Hevpeyvîn bi endamên meclîsa jin a Tebqayê re, 2018

[577] Hevpeyvîn bi endamên jin ên Meclîsa Medenî ya Tebqayê re, 2018

Reqayê bi beşdarbûna delegeyên ji tevahiya pêkhateyên Bakurê Sûriyê, hate lidarxistin. Di vê civînê de hevserokên meclîsê hatin hilbijartin û 14 komîte ji bo birêxistinkirin û birêvebirina karên civakî, aborî, siyasî û ewlekariyê hatin sazkirin. Di heman demê de bipêşveçûnên şervanên QSD, YPG û YPJ'ê ber bi Reqayê ve dewam kir heta ew di destpêka meha Hezîranê de gihiştin bajêr.

- **Cenga Mezin a Jinan**

Qonaxa pêncêmîn a Hemleya Xezeba Firatê di bin dirûşmeya 'Cenga Mezin' ji bo rizgarkirina tevahiya bajarê Reqayê ji çeteyên DAIŞ'ê di 6'ê Hezîrana 2017'an de dest pê kir. Şervanên QSD, YPG û YPJ'ê di şerên dijwar û bê navber de ku 133 rojan dewam kirin mal bi mal, tax bi tax bajarê Reqayê ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirin. Di vî şerî de şervanên azadiyê ji herêmên Sûriyê hemûyan, ji çar parçeyên Kurdistanê û înternasyonalîst ji gelek welatên cîhanê cihê xwe girtin da ku 'paytexta DAIŞê' têk biçe. Di rojên şerê giran li eniya Raqayê de şervanên YPJ'ê dibêjin, careke din rist û vîna jinê di vî şerî de him li ser dijmin him jî li ser civakê bandoreke mezin çêkiriye. Gelek şervanên jin bi xwe jî hêza xwe ya veşartî di kêliyên şer de nas kirine.

Şervanên YPJ'ê yên wekî Nûcan dibêjin, nakokiyên wan di aliyê desthilatdariya zilam li ser malbatê û bandora pergala kapîtalîzmê li ser ciwanan de ji bo gelekan ji wan dibûn sedema lêgerandina jiyaneke din. Nûcan bi dîtina hêzên YPJ'ê ve ji xwe re ev pirs kiriye: "*Ewqas jin çekan radikin, çima ez nikarim çekê rakim?"* û biryara tevlîbûna nav refan daye. Ew rewşa jinê di Cenga Mezin de wiha dinirxîne:

"Min vîna jinê di şer de nas kir. Ewqas jinên ciwan ku di sîstemê de rastî her cûre qirêjiyê hatine, çek rakirin, li dijî dijminekî ewqas hov şer dikirin ku kesekî nikaribû li hemberî wî bisekine. Jinên ku di malê de bê nirx û bê îrade dihatin nîşandan, di qada şer de hemû xwedî ewqas îrade û hêz in. Reqa mînak e. Di bin vê tavê de vîna hevalên YPJ'ê pirr xurt e. Mirov carna bi rojan birçî, tî, bê derfeta xweşûştinê dimînin, lê dîsa moralê hevalan bilind e. Her kenê hevalekê moralê herî mezin dide te. Dema ku tu kenê di rûyê hevaleke jin de dibînî, tu dibêjî 'min îro xwarina herî xweş xwar!' Kesekî heta niha nikaribû li hemberî wan çeteyan şer bike. Lê YPJ bi çek û tilîliyên xwe li hemberî DAIŞ'ê disekine û dijmin ji wê ditirse. Hêza me ya herî mezin îdeolojiya me û hevaltiya me ye. Ti carî em hev du nahêlin, em ji hev qut nabin. Tişta ku ez herî zêde jê ditirsim ew e ku hevalek ji cem min qut bibe û ez nikaribim wê xilas bikim. Ez di şer de tenê ji vê ditirsim. Ji dervê vê, ez ji tiştekî natirsim."[578]

Şînda Kobanê di şerê Kobanê yê sala 2014'an de tevlî nav refên YPJ'ê bû. Piştî ku wê li Hesekê û Minbicê şer kir, ew niha gihan Reqayê. Ew wateya tevlîbûna xwe ya vê pêngavê bi coş şirove dike: *"Em niha li Reqayê di eniya pêş de ne. Li Reqa jin û zilam her du hatin kolekirin. Dema ku ew me dibînin bi kêfxweşî me pêşwazî dikin. Ev ji bo me jî pirr xweş e. DAIŞ li kû derê hebe, destdirêjiya jinê dike. Dema ku em wêna dibînin, hêrsa me hîn zêde dibe. Ji bo me esas e ku em ê jinê Reqayê ji zilma DAIŞ'ê xilas bikin. Bi her bajarê ku me rizgar kirî, em jiyaneke nû didin avakirin û sîstemeke nû didin rûniştandin."*[579]

Her wiha şervanên YPJ'ê dinirxînin ku *'nêzikatiya jinê li hemberî gel jî hestyar e. Em naxwazin ku kesek biêşê. Em bi gelê xwe re dijîn û pê re hestyar dibin.'* Dinya ji bajarê Silêmanî yê Başûrê

[578] Hevpeyvînên bi şervanên YPJ'ê re li eniya Raqayê dema pengava rizgarkirina navenda bajêr, 2017

[579] Çavkanî li heman cihî

Kurdistanê hatibû Rojava, ji bo tevlî şerê li dijî DAIŞ'ê bibe. Wekî gelek şervanên YPJ'ê ew di pêvajoya vê pêngavê rastî gelek jinên ciwan ên Ereb hatiye ku dixwestin tevlî YPJ'ê bibin:

"Dema ku ez tevlî hemla Reqayê dibûm, kelecaneke pirr mezin di min de çêbû. Em çûn, me jinên Ereb û jinên Ezdî ji destê DAIŞ'ê derxistin. Di mewziyan de, di şer de hertim hevalên jin li pêş bûn. Dema me gund rizgar kirin, me alîkarî da gel û em bi jinên Ereb re axifîn. Jinên Ereb bi heyranî me meyzandin. Pirraniya wan YPJ û YPG bihîstîbûn. Lê agahiya wan pirr nebû ji ber ku DAIŞ'ê televisyon qedexe kiribû. Me xwe bi wan da naskirin. Gelek jinên Ereb tevlî bûn yan dixwestin tevlî bibin. Beşdarbûna jinan ji gelek netewên cuda pirr bandor li wan kir. Em jî bi beşdarbûna wan pirr kêfxweş bûn."[580] Fermandar û şervan bi serbilindî tînin ziman ku hinek ji jinên ku wan ji dîlbûna DAIŞ'ê xilas kirin, hatine û tevlî nav refên YPJ'ê yan YJŞ'ê bûne.

Roksan yek ji wan jinên ciwan ên Ereb e yên ku bi rizgarbûna gundê xwe li herêma Reqayê tevlî nav refên şervanan bûye. Ew dibêje, *"Dema hevalan mintiqa me rizgar kir, jiyana me vegeriya weke berê. Em di aliyê nefsî û manewiyata xwe de rehet bûn û em ji cilê reş xilas bûn. Her tim DAIŞ'ê em tirsandibûn, digot, 'Kurd wê werin, keçkê we bibin. Heger keçkan li derve bibînin ew ê wê bikujin.' Dema şer nêz bû, êvarê DAIŞ hîn di gundê me de bû. Serê sibê em rabûn, DAIŞ tinebû, reviyabûn. Heval hatin û civîneke piçûk ji me re çêkirin û wan got, 'Netirsin, hûn di silametiyê de ne. Eger hûn jî bixwazin di silametiyê de bin, ji me re bêjin kî di gundê we de bi DAIŞ'ê re ye yan jî ger we DAIŞ dît ji me re bêjin.' Hevalên YPJ'ê navendeke xwe li gundê me ava kirin. Wê demê de kesayeta wan ya xurt pirr bandor li min kir. Min ji wan hez kir û ez tevlî wan bûm. Malbata min nedixwest ku ez tevlî wan bibim. Lê min li wan guhdarî nekir ji ber ku ew derketin derveyî Sûriyê. Armanca min ew e ku ez hemû jinan rizgar bikim û dema ez di nav civakê de bim, ez karibim jinan kêfxweş bikim."*[581]

Jînda û hevrêya wê Berxwedan wekî endamên YPJ'ê di tîmên êrîşê de şer dikin. Ew beriya bi hefteyekê hatin tevlî hemleya Reqayê bûn. Jînda dibêje, *"Hêviya xelkê Reqa di destpêkê de nebû. Lê dema ku me nîvê Reqayê xilas kir, bawerî çêbû. Berê DAIŞ'ê gel pirr tirsandibû ku em ê malê wan bibin, wan bikujin. Ji ber vê, nîvê milet jî bi DAIŞ'ê re ji bajêr derketibû. Gelek kes li bajêr nemane. Dema em çûn êrîşê, em du hevalê jin di grûbê de bûn. Hevalên xort nexwestin bihêlin ku em biçin pêş. Lê me israr dikir heta em çûn. Li bajêr gelek sekvan hene."*

Şervana YPJ'ê Berxwedan behsa bûyerên bi kêfxweşî û yên gelekî bi êş dike ku di vê hemleyê de bi serê wan de hatine: "*Em du hevalê jin di tîma êrîşê de ne ku li herî pêş diçin. Çete di şokê de dimînin. Gel jî dema me dibîne xwe diavêje me û dibêje, 'Em çend salan li benda we mane.' Dema ku me hemle di nav bajêr de dest pê kir, hinek jin ji destê DAIŞ'ê reviyan. Li ser rêya kanalên avê, wan xwe gihand me. Jineke ji Şengalê hebû. Wê jî dixwest xwe bigihîne azadiyê, lê nikarîbû xwe xilas bikira. DAIŞ'ê ew girt, êşkence lê kir û ew şewitand. Vê bandoreke pirr mezin li ser me çêkir. Çima me nikaribû wê xilas bikin?"*[582]

Ji bo rizgariya jinan û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji zordestiya DAIŞ'ê di qonaxên pêngava Xezeba Firatê hemûyan de gelek şervanan canê xwe feda kir. Her wiha di nava van cangoriyên azadiyê de gelek fermandar û şervanên jin hebûn ên ku bê dudilî û bê hesab şer kirin.

[580] Çavkanî li heman cihî

[581] Nîqaşa bi şervanên jin ên Meclîsa Leşkerî ya Minbicê re, Akademiya Ş. Roksan a Minbicê, 2017

[582] Hevpeyvînên bi şervanên YPJ'ê re li eniya Raqayê dema pengava rizgarkirina navenda bajêr, 2017

Yek ji van, fermandara YPJ'ê **Rozerîn Amara** ye ku di destpêka şoreşa Rojava de tevlî nav refên YPJ'ê bû. Bi armanca misogerkirina azadiya jinê, wê têkoşîneke xurt di kesayet û têkiliyên xwe de meşandiye. Ji sala 2011'an ve Şehîd Rozerîn Amara di gelek pêngavên YPG û YPJ'ê de wek şervan û fermandar bi risteke pêşeng rabûye. Ew him bi sekna jina şoreşger û him bi helwesta xwe di şer û jiyanê de ji gelek hevrêyên xwe re bûbû mînak. Di qonaxa rizgarkirina bajarê Tebqayê ya Pêngava Xezeba Firatê de jî ew berpirsyariya xwe serketî pêk tîne. Piştî şerekî dijwar fermandara YPJ'ê Rozerîn Amara di 15'ê Gulanê 2017'an de li bajarê Tebqayê şehîd bû.

Her wiha, şervanên jin ên înternasyonalîst jî di gelek eniyan de tevlî Pêngava Xezeba Firatê bûn. **Destan Temmuz** (Ayşe Denîz Karacagîl) ya bi eslê xwe Tirk jî piştî çalakiyên Berxwedana Gezî ya Stenbolê berê xwe da nav Şoreşa Rojava. Li vir bi navê Destan Temmûz wekî jineke înternasyonalîst wê di nav refên Tabûra Azadî ya Înternasyonal û MLKP-KKÖ de bi kelecana şoreşgerî û hezkirina jiyanê cihê xwe girt. Di 29'ê Gulana 2017'an de Destan Temmûz di pêngava rizgarkirina Reqayê şehîd bû. Hevrêyên wê çeka wê li erdê nehiştine û bipêşveçûna pêngavê ber bi bajarê Reqayê ve domandin.

- **Binketina DAIŞ'ê û Avakirina Jiyana Neteweya Demokratîk li Reqayê**

Di 17'ê Cotmeha 2017'an de bajar bi giştî ket bin kontrola hêzên QSD'ê de. Xebatên paqijkirina bajêr ji mayîn û şaneyên veşartî yên çeteyan hîna dewam kirin. Du roj şûnde şervan û fermandarên jin bi daxuyaneke girseyî mizgîniya têkbirina DAIŞ'ê li Reqayê ji raya giştî û cîhanê re ragihandin. Şervanên YPJ'ê, Yekîneyên Jinên Şengalê, Tabûrên Jinên Ereb û Hêzên Parastina Jinê ya Bêth Nehrên dan zanîn ku rizgarkirina bajarê Reqayê bûye tolhildana jinên Êzdî û têkçûna hişmendî û pergala zilamê serdest. Dîsa wan bal bire ser wê yekê ku bi vî şerê re yekîtî û ruhekî hevbeş di navbera jinên Ereb, Kurd, Suryanî, Aşûrî û pêkhateyên Bakurê Sûriyê hemûyan û jinên berxwedêr yên cîhanê de hatiye avakirin.

Meryem Îbrahim yek ji wan jinên li bajarê Reqayê bû ku bi hesret li benda şervanên YPJ'ê bû. Ew hingê 41 salî bû. Di ciwaniya xwe de wê heta refê 8'an xwendiye. Wê gelekî dixwest xwendina xwe dewam bike. Lê malbat û eşîra wê bûn asteng. Lewma wekî dayik wê xwest ku zarokên wê bixwînin û xeyala wê ya xwendinê pêk bînin ku di dilê wê de mabû. Lê dema ku çeteyên DAIŞ'ê ketin Reqayê, wan dibistanên zarokan girtin û careke din ev xeyala Meryemê pûç kirin. Meryem kulên rojên ku DAIŞ ketiye Reqayê wiha tîne bîra xwe:

"Dema ku çete hatin, ez û zarokên xwe derketibûn li ser ava Firatê. Em li ser pirê sekinîn. Me bi çavê xwe dît ku seyarek hat bi du zilamên çete û du jinên ciwan ên Êzdî tê de. Yek ji jinên Êzdî ji seyera derket û xwe ji pirê avêt xwarê, ya din jî çeteyan ew girt û çûn. Dema ku min dît wan jinên ciwan xwe çawa dikujin, ji bo di destê wan çeteyan de nemînin, dinya li ber çavê min reş bû. Min got, em di nava mirinê de dijîn. Sûretê wan keçan ji ber çavên min nema diçû. Dexta min rabû û ez ji ser hişê xwe çûm. Cîrana min hat serdana min. Hevjînê min jê re gotibû, ez ne baş im ji ber ku min dît jinên Êzdî xwe çawa ji pirê avêtine. Cîrana min jî got, 'Ez niha çûm bazara pez. Keçik anîbûn wê derê û her yek bi 200 dolarî difirotin. Êdî ev tişt ji min re normal tên. Tu çima xwe ewqas diezibînî?' Hingê zêdetir bandor li min bû: Çawa dibe ku keçik wekî pez tên frotin?!

Dema me li ser televizyonê dît QSD çawa bi pêş ve tê û çawa jinên Kurd bi cilê leşkerî li pêş şer dikin, ev ji me re wekî xewnekê bû. Me digot, 'Ecêbe em ê jî rojekê van tiştan bibînin?' Dema şer nêzîk bû, hawanek li paşiya mala me ket. Cîranên me giriyan, lê ez keniyam. Zilamê min got, 'Tu çima dikenî? Mirin hatiye li peşiya te ye.' Min got, 'Tenê bila ev hêzên demokratîk ên Kurdan bikevin bajarê me û bila ez bimirim. Tişt nabe!' Dema em ji malê derketin, bi carekê heval li pêşiya min sekinîn. Min xwest tilîlî bikim. Lê tiyê min destê xwe da ser devê min û got, 'Em destpêkê binihêrin çawa nêzî me dibin, piştre tilîlî bike!'

Lê hesreta min bû ku ez wekî bersivê ji sûretê jinên Êzdî re ku xwe ji pirê avêtin û di bazaran de hatin firotin, dengê xwe bilind bikim û bigihînim dinyayê. Bila çete min jî bikujin. Ev ne xema min bû. Min dengê xwe rakir û got, 'Gelê Reqa, we em di destê çeteyan de hişt. Niha di vê deqîqeyê de hesreta me pêk hat û em ê bi hêzên demokratîk re bajarê xwe ji nû ve avabikin!' Ez ê ti carî wê rojê ji bîr nekim. Min leşkerên jin ên Kurd dîtin û wan destê xwe da min. Em ê niha serbixwe û azad bijîn bi alîkariya wan jinên leşker."[583]

Di 20'ê Cotmeha 2017'an de Meclîsa Medenî ya Reqayê li hundirê bajêr fermî dest bi xebatên xwe kir. Ji roja destpêkê ve jin bi dilxwazî û kelecanê him tevlî xebatên meclîsa medenî bûn, him jî komîn, meclîs û saziyên xweser ên jinan bi rêxistin kirin. Endama rêveberiya Meclîsa Jinê ya Reqayê Xewla Îsa yek ji wan jinan e ku tevlî xebatên ji nû ve avakirina jiyana bajêr bû. Ew sedemên xwe yên beşdarbûna karê meclîsa jinê bi me re wiha parve dike:

"Me rojane li navenda Reqayê hovîtiya ku li ser jinê, li ser mirovan hatiye meşandin, didît. Lê em lal bûn. Me nikarîbû li ser vê bipeyvîn. Mafê me yê axaftinê tine bû. Dema ku hemleya rizgarkirina Reqayê gihişt nêzî bajêr, DAIŞ'ê bang dikir: 'Kafirên Kurd hatin û dixwazin dest bavêjin keçên we.' Lê em kêfxweş bûn. Me got, 'çi bibe bila bibe, em ê ji DAIŞ'ê xilas bibin!' Hemû tiştên ku DAIŞ'ê anîn serê me, wan digot, 'Kurd li we wê wiha bikin'. Xelkê ku dixwest ji bajêr derkeve jî dihat kuştin. Lê malbatên DAIŞ'ê bi xwe jî çûn, koçber bûn ji ber ku tirsiyan ku Kurd ji wan wê hesab bipirsin.

Beriya ku hemleya rizgarkirina Reqayê dest pê bike, min xwe xilas kiribû. Ez derbasê kampa penaberan a Eyn Îsa bûm. Lê malbata min di dorpêça DAIŞ'ê de mabû. Ew wekî mertalên zindî hatin bi kar anînin. Xwuşka min birîndar bû. Xwuşkeke min a din jî eqila xwe avêt. Heta niha ev bandora nefsî li ser wê heye. Lê bi rizgarkirina bajêr re min dît ku nirxê jinê dîsa heye. Ev hemû bûn sedemên min ji bo ku ez tevlî xebata jinê bibim."[584]

Her wiha Xewla Îsa dide xuyakirin ku piştî ku Reqa ji DAIŞ'ê hatibû rizgarkirin wan dest bi avakirina komîn û meclîsên rêveberiya xweser û yên jinan kiriye: "*DAIŞ pênc salan li vî bajarî desthilatdar bû û her tim biryarên nû derbarê tinekirina jinan de derxistin. Niha em hewl didin ku êşa jinan a pênc salan çareser bikin. Ji ber ku jinên Reqayê hemûyan gelek êş dîtine, avakirina sazî û rêxistinên jinan pirr girîng bû. Em niha wekî rêveberiya jinê ya Reqayê hewl didin ku em xwe bigihînin tevahiya jinan ji bo ku em bikarin pêwîstiyên wan çareser bikin.*

Em ne tenê karê meclîsê dimeşînin, em bi tevahî pirsgirêkên jinan li gundan û li bajarê Reqayê re mijûl dibin. Di hundirê salekê de me li vê herêmê 15 meclîsên jinê ava kirin. Dîsa di nava şaredarî

[583] Hevpeyvîn bi Meryem Îbrahîm re, endama meclîsa jinê ya Reqayê, 2018

[584] Hevpeyvîn bi Xewla Îsa re, endama rêveberiya meclîsa jinê ya Reqayê, 2018

û saziyan hemûyan de me komîteyên jinê ava kirin. Em bi wan re di têkiliyê de dixebitin. Nûnerên meclîsa jinê di wan komîteyan de hene. Dema me sazî û meclîsên jinê nû sazkirin, nêzikatiyên zilaman wekî ku 'rizgarkirina Reqayê tenê ji bo jinan, ne ji bo me hemûyan e' derdiketin holê. Lê dema ku karê me bi pêş ve çû, êdî zilam bi xwe jî bi serlêdanên xwe dihatin cem me. Meclîsa Jinê êdî wekî navnîşana pirsgirêkên civakî û her du zayendan tê dîtin.

Tenê gelê ku li aliyê rojhilatê Reqayê di komînan de hatiye birêxistinkirin derdora 60 hezarî ye. Em bi jinên vê derê re bi rêya meclîsê di têkiliyê de ne. Hejmara gel li gorî berê zêdetir e. Ji ber ku penaberên Dêrazorê jî hene û gelek milet di kampên penaberan de hene. Hejmareke mezin a gelê Reqayê vegeriya. Yên ku hîna di konan de dimînin, hene ji ber ku malên wan xira bûne. Gel niha bi çavê xwe dibîne ku rastiya heyî ji propagandaya DAIŞ'ê cuda ye. Berevajiyê wê, ew dibîne ku em yekîtiya gelan dixwazin û mafê herdu zayendan diparêzin.

Berê gelek Kurd û Suryan li Reqa hebûn. Em hemû bi hev re dijiyan, pirsgirêk di nav me de tine bûn. Me nedizane kî Kurd e, kî Ereb e û me nedizane ka qedexe li ser ziman û çanda Kurdan heye. DAIŞ'ê civak ji hev qut kir û nakokî ava kirin. Kurd û Suryan ji bajêr derxistin. DAIŞ bi alîkariya dewletên derve mezin bûbû. Lê me bi têkoşîna hevbeş a jinên Kurd, Suryan û Ereb DAIŞ bi bin xist. Hêviya me dîsa çêbû. Bi keda şehîdan hemûyan em îro li vir bi aramî jiyana xwe ji nû ve ava dikin."[585]

Di qonaxa avakirina rêveberiya xweser de endamên Meclîsa Medenî ya Reqayê bi gelek jinên li Reqayê re hevdîtin çêkirine, li nihêrînên wan pirsîne û ji bo beşdarbûna xebatê ew vexwendine. Yek ji wan Meryem Îbrahim bû. Ew dibêje, wê ti car hêvî nedikir ku ew ê rojekê wekî jineke Ereb di rêveberiya bajarê xwe de cihê xwe bigire: "*Min gotibû, dema ku QSD were, wê leşkerên Kurd îdareya me bikin. Ji ber ku Kurdan em xilas kirin. Ereb jî pê re bûn. Lê ez şaş mame ku ez niha wekî jineke Ereb a medenî cihê xwe di nav îradeya bajer de digirim. Ji min re heta niha wekî xewneke tê û ez hîn nikarim bawer bikim ku ev jiyan niha ya min e."*[586]

Wekî li herêmên din ku ji zordestiya DAIŞ'ê hatibûn rizgarkirin, li Reqa jî jiyan bi nûnertiya jinên ji hemû pêkhateyan û ruhê neteweya demokratîk tê birêvebirin. Besme bi eslê xwe Çerkes e; ew jî wekî endama Desteya Jinê di Meclîsa Reqayê de cihê xwe digire. Malbata wê beriya bi 50 salan ji Rûsyayê hatiye Sûriyê. 21 sal in ew bi zilamekî ji Reqayê re zewiciye û li vî bajarî dimîne. Di dema nîzama Beesê de wê wekî mamoste kar dikir, ji zarokan û karê xwe gelekî hez dikir. Lê piştî ku Ceyş el-Hurr, El-Nusra û DAIŞ hatine, jiyana wê wekî ya hemû jinên Reqayê hatiye guhertin: "*Me gelek êş ji çeteyan dît. Sala 2013'an kurê min ê 15 salî winda bû. Ez derketim û çûm cihên emnî ji bo li wî bipirsim. Zilamê min nikaribû ji malê derketiba, ji ber ku ew berê bi nîzamê re şuxilîbû. Piştre kurê min berdan. Lê ji êşkenceyên giran rewşa wî pirr xirab bû. Em mecbûr mane ku ji Reqayê derkevin. Min kurê xwe bire Tirkiyê. Niha, ev şeş sal in, min kurê xwe nedîtiye. Beriya ku şer bikeve bajêr, em çûn Himsê. Em salekê man. Lê dema ku Reqa rizgar bû, em dîsa vegeriyan Reqayê."*

Dema ku malbata Besme wekî 200 hezar malbatên koçber vegeriya Reqayê, şandeyek ji Meclîsa Medenî ya Reqayê çû serdana wan jî, li rewşa wan û pêdiviyên wan pirsî. Bi vî rengî têkiliyên nû ava bûne û Besme jî tevlî nav xebatên Meclîsa Medenî dibe. Ew diyar dike ku kurê wê yê piçûk di

[585] Çavkanî li heman cihî

[586] Hevpeyvîn bi Meryem Îbrahîm re, Reqa, 2018

êrîşên balafiran de birîndar bû û astengdar maye. Mala wê jî di dema şer de hatibû rûxandin. Lewma ew niha li cem malbateke din dimînin û hewl didin ku dîsa xaniyê xwe çêkin. Tevî van zehmetiyan, Besme dibêje, ew gelekî kêfxweş e ku ew vegeriya bajarê xwe:

"Zilamê min ji Reqayê ye û min li vir gelek salan jiyana xwe derbas kirin. Hevjînê min û zarokên min jî li vir in. Dîroka me û bibîranînên me li Reqayê gelek hene. Ez niha bi jiyana xwe pirr kêfxweş im. Ez jinek im ku ji karê xwe û jiyana xwe hez dike. Ez di mala xwe de cilan didirûm, xeyatî çêdikim. Niha em di bin rêvebiriya xweseriya demokratîk de rehet dijîn. Em jinên Ereb, Kurd, Tirkmen, Çerkes hemû alîkariya hev dikin û em bûn wekî malbatekê. Çi kar di hundirê vê malê de heye, em bi hev du re parve dikin. Ez ji jinan hez dikim ku serê xwe ji serdestiya zilam re netewînin. Piştî DAIŞ'ê min gelek ji wan jinan nas kirin û hêz ji van jinan girt. Piştî temenê xwe yê 50 salî, ez bûme jineke ciwan."[587]

- **Pêngava Bagera Cizîrê û Têkçûna Leşkerî ya DAIŞ'ê**

Ji qonaxa sêyemîn a Hemleya Xezeba Firatê ve hêzên QSD, YPJ û YPG'ê tevî Meclîsa Leşkerî ya Dêrazorê dest bi rizgarkirina gund û bajerokên li herêma Dêrazorê kirin. Hemwext bi dorgirtina li Reqayê, Pêngava Bagera Cizîrê bi armanca rizgarkirina herêma Dêrazorê û tinekirina DAIŞ'ê dewam kiriye. Bi taybetî, dema ku DAIŞ li Reqayê ketibû tengavê, pirraniya endam û hêzên wê çûbûn herêma Dêrazorê û deverên ber bi sînorê Iraqê ve. Dîsa DAIŞ'ê esîr, jinên ku hatine kolekirin û gelê çavtirsandîkirî, wekî mertalên zindî bi xwe re birin.

Pêngava Bagera Cizîrê ji aliyê Meclîsa Leşkerî ya Dêrazorê di 9'ê Îlona 2017'an de fermî hatibû ragihandin. Hîna di hefteyên destpêkê yên pêngavê de bi hezaran mirovên sivîl ji zordestiya DAIŞ'ê hatin rizgarkirin. Her ku hêzên QSD, YPG û YPJ'ê bi pêş ve diçûn, hejimara koçberên ku xwe disipartin herêm û saziyên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, zêdetir dibû. Hejmara zêde ya koçberan ji zarokên piçûk, jin û kesên navsere pêk dihat. Ji bo xwe ji çeteyan xilas bikin, gelek ji wan bi saetan bê av di germahiya çolê de meşiyane heta ku xwe gihandine şervanan. Ji bo peydakirina pêdiviyên jiyanî û ewlekariya bi deh hezaran malbatan li kampên penaberan li Dêrazorê û herêmên din yên rêveberiya xweser hatin bicihkirin.

Bi pêşveçûna Pêngava Bagera Cizîrê re li herêma Derazorê jî bi pêşengiya Meclîsa Sûriyeya Demokratîk (MSD), pergala komîn û rêveberiya xweser hatiye birêxistinkirin. Piştî civînên bi nûnerên pêkhate û eşîrên herêmê re Meclîsa Medenî ya Dêrazorê hatiye damezrandin. Di Cotmeha 2017'an de yekem komîn li bajarokê El-Cirniyê yê li rojhilatê Çemê Firatê di encama civîna gel de hatiye avakirin. Di 2'yê Mijdara 2017'an de Meclîsa Medenî ya Dêrazorê navenda xwe ya giştî vekir. Hevserokên meclîsê dan zanîn ku tevî derfetên kêm, meclîs xebatên ji bo vekirina dibistanên zarokan, birêxistinkirina komînan, sererastkirina binesazî û xizmetguzariyê di gund û bajerokên rizgarkirî de dimeşîne. Bi vê re gavên destpêkê yên birêxistinkirina jinê jî li herêma Dêrazorê hatin avêtin.

Mîna li hemû herêmên ku ji DAIŞ'ê hatina rizgarkirin, li Dêrazorê jî wekî yekem saziya jinê Mala Jinê hat vekirin û bi erkên girîng rabû. Jinên li vê herêmê ji ber feraset, adet û teqalîdên feodal û zayendperest yên eşîrî li derveyî jiyana civakî û siyasî hatibûn hiştin. Li ser vê yeke jî jinên Dêrazorê bi salan rastî zilm, êşkence û destdirêjiya çeteyên DAIŞ'ê hatibûn. Lewma jinên Dêrazorê dibêjin, bi rizgariya gund û bajerokên wan *'ji bo jinan serdemeke nû dest pê kir.'*

Mala Jinê li Dêrazorê dibû navnişana çareserkirina pirsgirêkên jinan û yên civakê. Endamên

[587] Hevpeyvîn bi Besme re, endama deste ya jinê ya Meclisa Medenî ya Reqayê, 2018

rêveberiya Mala Jinê, didin xuyakirin ku wan ji sedî 80'yê miracaetên jinan karibû çareser bikin. Lê Mala Jinê ya Dêrazorê ne tênê bi dozên ferdî re mejul dibe. Ji bo bixwebawerî, çalakbûn, hêza çareseriyê û biryardayînê ya jinan bi pêş bikeve Mala Jinê giranî daye xebatên perwerdeyê, serdanên malbatan û nîqaşên li ser maf û erkên jinê.

Navenda Jinan li navçeya Cezratê ya Dêrazorê di 15'ê Çileyê 2017'an de hate vekirin û bi komîteya lihevhatinê ya girêdayî Mala Jinê, li ser çareseriya pirsgirêkên jinan û bipêşxistina zanebûna jinê disekine. Endama Rêveberiya Mala Jinê ya navçeya Cezrat Eyşe El-Nehar dibêje, *"piştî ku şervanên QSD'ê herêm rizgar kirin, jin bi coş û heyecaneke mezin tevlî hemû warên jiyanê bûne. Di komîn û meclîsan de wekî hevserok kar dikin, di heman demê de di xebatên siyasî û leşkerî jî de rola jinan aktîf e."*[588]

Dema bipêşveçûna Pêngava Bagera Cizîrê di Çileyê 2018'an de dewleta Tirk ji bo piştgiriya çeteyan bike, eniyeke nû vekir. Bi şerê dagirkeriyê li hemberî kantona Efrînê, arteşa Tirk him dixwest deverên nû yên talanê ji xwe û çeteyên xwe re veke, him jî bike ku bêhna çeteyên DAIŞ'ê bê ber wan yên ku li rojhilatê Firatê hatibûn tengavkirin. Ji ber helwesta hêzên navdewletî ya ku piştgirî daye şerê dagirkeriyê yê dewleta Tirk li Efrînê, QSD'ê beşeke hêzên xwe ji herêma Dêrazorê wekî teqwiyê şandin eniya Efrînê. Bi vê re jî leza Pêngava Bagera Cizîrê kêm bû.

Di 10'ê Îlona 2018'an de berdevka Pêngava Bagera Cizîrê, Lîlwa Abdullah ragihand ku bi şev qonaxa dawîn a pêngavê bi dirûşmeya '*Şerê Tinekirina Terorê*' dest pê kiriye. Armanca vê qonaxê, wekî dorpêçkirin û tinekirina rêxistina DAIŞ'ê li baregeha wê ya dawîn li herêma rojhilatê Firatê nêzîkî sînorê Iraqê hatiye pênasekirin. Hêzên pêngavê her wiha plansaziyên xwe ji bo rizgarkirina gel û erdnîgariya navçeyên Hecîn, El-Sûse û El-Şefa çêkirin. Di daxuyaniya xwe de Lîlwa Ebdullah wiha peyivî:

"Em wek Hêzên Sûriyeya Demokratîk di tinekirina terorê li herêmê çemê Firatê de bi israr in. Lê em bi berpirsyariyên xwe yên mirovî jî radibin. Di vê çarçoveyê de, hêzên me korîdoreke mirovî nêzî bajarokê El-Bhera vekir da ku sivîlan rizgar bikin. Her wiha tîmên me yên taybet kampeke lezgîn ji bo pêşkêşkirina xizmetên lojistîk û tenduristî ji koçberan re amade kir. Di heman demê de, hêzên me derbarê agahiyên li ser kesên ku hatine revandin û çarenûsa wan ne diyar e de, dê erênî nêz bibin û dê bi erka xwe ji bo diyarkirina çarenûsa kesên hatine revandin rabin."[589]

Di encama şerê giran ê qonaxa dawiyê de dîsa bi dehhezaran mirov li eniyên Baxoz û El-Sûseyê hatin rizgarkirin. Di nav wan de gelek kes hebûn yên ku bi mayîn û çekên çeteyan hatibûn birîndarkirin. QSD'ê da xuyakirin ku ew pêşveçûna hemleyê li gorî tedbîrên ewlekariyê ji bo gelê sivîl dinirxînin. Şervanên QSD'ê korîdor vekirin û ew parastin da ku sivîl karibin xwe bigihînin herêmên ewle. Her wiha heta zivistanê bi hezaran endam û malbatên çeteyên DAIŞ'ê neçar man xwe radestî hêzên QSD'ê bikin.

Di vê pêvajoyê de careke din Erdogan hewl dida ku emrê DAIŞ'ê dirêj bike. Lewma wî gef bi êrîşên dagirkeriyê li dijî herêmên Cizîrê, Kobanê, Girê Spî û Minbicê xwarin. Lê di dawiyê de ew hewldanên dewleta Tirk bi ser neketin. Hêzên QSD'ê li bajerokê Baxozê, nêzî sînorê Iraqê dor li çeteyên DAIŞ'ê girtibû. Piştî şerê dijwar şervanên QSD, YPG û YPJ'ê bargehên dawî yên DAIŞ'ê li Bakurê Sûriyê di destpêka Adara 2019'an de rûxandin. Ji ber vê yekê çeteyên dawîn jî xwe radestî hêzên QSD'ê kirin.

[588] Daxuyaniya Kongra Star: *Mala Jinê li Dêrazor cihê çareserkirina pirsgirêkên jinan e*, 11-04-2018

[589] Daxuyanî: *Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) qonaxa dawîn a Hemleya Bagera Cizîrê ragihand*, 11-09-2018

Her wiha di vê qonaxa Şerê Tinekirina Terorê de hêzên YPJ'ê careke din di her astê de û bi tîmên xwe yên pispor bi risteke sereke rabûn. Wan bi dehan jin û zarok, nexasim ên Êzdî ji destê çeteyan rizgar kirin û gihandin cihên bi ewle. Saziyê ku ji bo rewşa Êzdiyên ku hatine revandin li bajarê Dihokê hatibûn avakirin, ragihand ku heta dawiya pêngava Bagera Cizîrê bi gişt 1423 jinên Êzdî di pêngavên cuda de û her wiha bi rêya Mala Êzdiyan a Kantona Cizîrê û Desteya Jinê ya Herêma Cizîrê ji koledariya DAIŞ'ê hatine rizgarkirin.[590]

Di 8'ê Adara 2019'an de şervanên YPJ'ê yên ku tevlî vê qonaxa pêngavê bûn, destketiyên xwe di şerê li hemberî pergala faşîst a desthilatdariya zilam de pîroz kirin. Pîrozbahiya YPJ'ê ya Roja Jinên Kedkar yên Cîhanê li gundê Sûsê pêk hat ku li beramberî bajarokê Baxozê ye. Di van kêliyan de hîna şaneyên dawiyê yên çeteyan li hemberî têkçûyîna xwe li ber xwe dida. Lê belê çend rojan paşê êdî bibinketina DAIŞ'ê li Baxozê misoger bû. Şervanên YPJ'ê ala dawî ya DAIŞ'ê xist xwarê û li şûna wê ala YPJ'ê daliqand. Fermandarên YPJ'ê ev serketin wekî diyariya Newrozê diyarî hemû jinên cîhanê, nexasim jî diyarî jinên Êzdî kirin û Newroz li jinan hemûyan pîroz kirin. Bi serketinên YPJ'ê re jinên li qada civakî jî li herêmên nû rizgarkirî pîrozbahiyên 8'ê Adarê û Newrozê sala 2019'an bi hêz û moralekî mezin pêşwazî kir. Li Dêrazorê cara yekemîn bi sedan jin beşdarî meş û xwepêşandanên girseyî yên 8'ê Adarê bûn.

Di encama pênc salên şer û berxwedanê de fermandariya QSD'ê roja Newoza 2019'an bibinketina leşkerî ya DAIŞ'ê li ser axa Bakur û Rojhilatê Sûriyê da zanîn û di 23'ê Adara 2019'an de li herêma Baxozê bi merasîmeke leşkerî fermî ji tevahiya cîhanê re ragihand.

Ev serketin li herêma bajarê kevnar a Marî pêk hat ya ku navê xwe ji xwedawenda Mezopotamya ya baxozê Mer wergirtiye. Li ser axa perestgehên pîroz ên xwedawendên Ninni-Zaza, Îştarat, Îştar û Ninhûrsag şervanên YPJ'ê tola xwe ji pergala desthilatdariya zilam rakirin. YPJ'ê ev serketina dîrokî bi merasîmeke taybet a 27'ê Adarê li jinên cîhanê hemûyan pîroz kir û serketin wiha nirxand:

"Di mehên dawî yê şerê dijî DAIŞ'ê de şerekî pirr dijwar û gelek giran meşiya. Tevî şert û mercên zivistanê şervanên me bi ezmekî mezin, bi moral, sond û biryardariyek xurt şer kirin. Soza ku dabûn mirovahiyê, şehîdên azadiyê û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi cih anîn. Cîhanê hemû bi heyraniyeke mezin şahidi ji vê heqîqeta mezin ya şervanên me re kir. Di serî hêzên YPJ-YPG'ê û hemû hêzên parastinê di bin sîwana Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê de di 3 mehên vê salê de tekoşîna herî dijwar li hemberî çeteyên DAIŞ'ê dan meşandin. Hemû qirêjî, hovîtî û berhemên DAIŞ'ê yê dawî di şerê Bahozê û Hejîn de bi pêşengiya şervanên me yên tolhildêr de hate paqijkirin. DAIŞ'îyên ku bi derketina xwe re cîhan hemû di nava tirs û xewnên mirinê de pêçandibû, di Bahozê de çunk li ber şervanên jin tewandin. Di vê pêngavê de bi sedan jin û zarokên Êzîdî yên bi salan bû di bin esareta zilma DAIŞ'ê de bûn hatin rizgar kirin. Ev serkeftina dîrokî ya ku di encama 11 hezar şehîdan de hate bi dest xistin li seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi şahî û moralekî mezin hate pîroz kirin."[591]

Di pêngavên ji bo rizgarkirina herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji faşîzma DAIŞ'ê de hêzên QSD'ê zêditirê 11 hezar şehîdan dan û 24 hezar şervanên QSD'ê di şer de birîndar bûn. Tevî ku dagirkeriya DAIŞ'ê têk çû, xetera wê hîna xilas nebûye. Bermahiyên çeteyan yên wekî mayînên di nav mal û erdan de him jî wekî şaneyên veşartî ku xwe ji bo êrîşên nû ji nû ve birêxistin dikirin, hebûna xwe domandin. Mînak, di 2'yê Nîsana 2019'an de komeke çeteyên DAIŞ'ê tevî malbatên xwe teslîmê şervanên YPJ'ê bûn ku tevlî operasyonên paqijkirina herêmê ji bermahiyên çeteyan

[590] Daxuyaniya Kongra Star: 2019 - *Saleke tijî serhildan, berxwedan û sûcên li dijî jinan*; 28-12-2019

[591] Daxuyaniya YPJ'ê: *Tekoşîn, Şer û Berxwedana Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê a Sala 2019'an*, 05-01-2020

dibûn. Di vê demê de jineke DAIŞ'ê xwe di nava hêzên YPJ'ê de teqand. Di encamê teqînê de şervanên YPJ ***Amara Rojhilat*** û ***Guneş Botan*** şehîd bûn ku di şerên Helebê, Kobanê, Minbic, Reqa, Şedadê, Efrîn û herî dawî Dêrazorê de bi biryardarî û rengekî çalak di eniyên herî li pêş cihê xwe girtibûn.

Bi şerê pêngavên rizgarkirina herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi dehhezaran çete tevî malbatên xwe û penaberên din li kampên penaberan ên wekî Eyn Îsa û Holê bi cih bûne. Yên ku kiryarên wan ên li dijî mirovahiyê hatine tesbîtkirin ji aliyê Asayîşa Rojava ve hatin girtin. Di heman demê de xebatên ji bo dadgehkirina wan û avakirina dadgeheke navneteweyî li dijî qirkirinên DAIŞ'ê dihatin meşandin.

Heta êrîşên dagirker ên artêşa Tirk a dagirker li dijî kantona Efrînê di 20'ê Çîleyê 2018'an de dest pê kirin di Dadgeha Parastina Gel a Bakur û Rojhilat Sûriyê de zêdetirî 8 hezar çeteyên DAIŞ'ê, Cebhet El-Nusra û yên komên din hatin dadgehkirin. Pirraniya tawanên wan, endamtiya rêxistinên terorîst, pêkanîna êrîşên teqemeniyê û qetilkirina sivîlan li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn.

Lê bi şerê artêşa Tirk li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê re yê ku di 9'ê Cotmeha 2019'an de dest pê kir, karên dadgehê careke din rawestîne. Dadgeh bi xwe bi êrîşan re rû bi rû mabû. Dîsa arteşa Tirk û çeteyên wê bi taybetî êrîş birin ser cihên kamp û girtigehên DAIŞ'î lê ragirtî. Bi vî rengî bi sedan çeteyan karî birevin û dîsa tevlî nav komên çekdarî bibin. Derbarê dadgehkirina çeteyên DAIŞ'ê yên ji derveyî Sûriyê de Meclîsa Edaleta Civakî hevdîtin bi gelek hikûmetan re meşandine. Lê belê daxwazên rêveberiya xweser li ser bingehê avakirina dadgeheke navneteweyî ji bo dadgehkirina sûcên DAIŞ'ê li dijî mirovahiyê, ji aliyê dewletan ve hatin paşguhkirin. Li aliyê din, pirraniya rayedarên dewletan teslîmgirtina çete û malbatên ku hemwelatiyên wan in, red kirine.[592]

Li gorî derfetên xwe saziyên rêveberiya xweseriya demokratîk û yên jinan yên wekî Rêxistina SARA û Weqfa Jinên Azad a Rojava di kampên pênaberan de bi taybetî ji bo jin û zarokên mexdûr alîkariya tenduristî, mirovî û derfetên perwerdeyê bi rêxistin kirine. Van saziyan xebatên perwerde û semîneran bi pêş xistine da ku jinan û zarokên penaber, ji tirs û bandora bîrdoziya DAIŞ'ê xilas bike. Lê belê beramberî vê, çete jî di nav kampên pênaberan de careke din hewl didan ku zext û terorê li ser koçberan bimeşînin.

Nexasim piştî êrîşên dewleta Tirk ên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 9'ê Cotmeha 2019'an de çeteyên DAIŞ'ê ji nû ve xurt û zîndî bûn. Bi taybetî rewş li Kampa Holê pirr xetenak bûye. Bi dawiya pêngava Bagera Cizîrê de pirraniya koçber û malbatên çeteyên DAIŞ'ê ji herêma Baxozê li wir hatin bicihkirin. Bi vî rengî serjimara xelkê kampê bû qederê 70 hezarî. Di nav wan de zêdetirî 40 hezar jin û zarokên çeteyên DAIŞ'ê û koçberên ji herêmên cuda yên Sûrî û Iraqê hene. Koçberên ku stuyê xwe ji fermanên çeteyan re neditewandin, careke din dibûn armancên gef, êrîş û kuştinên DAIŞ'ê. Heta destpêka sala 2020'an bi dehan jin û koçberên Iraqê ji aliyê jinên DAIŞ'î li Kampa Holê bi êşkenceyê hatin qetilkirin yan jî konê wan hatin şewitandin. Rastiyeke pirr nakok û paradoks e ku bi deh hezaran jin ji gelek welatên Rojhilata Navîn, Mexrib, Asya û Ewropayê xwedî li bîrdozî û rêxistineke faşîst di bin navê dîn de derdikevin ku herî zêde dijminatiya jinan û jiyanê dike. Em dikarin vê yekê wekî encama rûxandina nirxên manewî hemûyan û qeyrana kûr a pergala desthilatdar binirxînin.

- **Çalakbûna Jinên Dêrazorê**

[592] Ehmed Semîr, Sîma Brokî: *Amadekariyên destpêkirina darizandina çeteyên DAIŞ'ê,* ANHA, 19-02-2020

Piştî têkçûna dagirkeriya DAIŞ'ê jinan li navçeyên Dêrazorê pêngavên nû yên birêxistinkirin û perwerdeyên jin û civakê dan destpêkirin. Bi damezrandina meclîsa jinê ya Dêrazorê re di navçeyan de jî xebatên ji bo avakirina komînên jinê dihatin meşandin. Mînak, di Nisana 2019'an de li herêma Zixêr a gundewarê Dêrazorê pênc komînên jinan hatin avakirin. Dîsa Mala Jinê û meclîsa jinê ya Dêrazorê pêngavên hişyariyê li dijî zewicandina jinên di temenê piçûk de û cûreyên cuda yên tundiya li dijî jinê meşandin.

Di 25'ê Mijdara 2019'an de bi sedan jinên Dêrazorê daketin kolanê, şerê dagirkerî û tundî li hemberî jinê bi dengê bilind şermezar kirin. Jinên li bajarokê Kisra yê gundewarê rojavayê Dêrazorê bi diruşma '*Dagirkerî tundî ye! Bi berxwedana Hevrînan em ê dagirkerî û faşîzmê têk bibin!'* meşeke mezin li dar xistin. Endama Rêveberiya Jinan a Dêrazorê, Hiyam El-Ehmed di vê meşê de axivî û got, jin piştî rizgarkirina herêmê ji DAIŞ'ê di her warê civakê de bi risteke çalak rabûne. Jinên bajarokê Hecînê û navçeya Baxozê jî bi pêşengiya Mala Jinê ya Hecînê gihiştin hev û bi bibîranîna xuşkên Mîrabel re encamên neyînî yên cûreyên tundiya li dijî jinan nirxandin. Li cihê ku di bihara 2019'an de baragehên dawiyê yên DAIŞ'ê hatin rûxandin, jinan hêza berxwedanê û hevgirtina jinan peyda kiriye.

Eşkere ye ku metirsiya DAIŞ'ê tenê bi rêya têkoşîna leşkerî û tedbîrên ewlekariyê nayê çareserkirin. Her çiqas li dijî faşîzma DAIŞ'ê parastineke leşkerî pêwîst e, ewqasî jî têkoşîneke bîrdozî, zanistî û civakî hewce ye da ku pêşî li belavbûna fikr û tawanên dijmirovahî were girtin.

c) Şerê li dijî Dagirkeriya Tirkiyê

Di nav aloziyên ku li Rojhilata Navîn û Sûriyê de ji sala 2011'an ve qewimîn, dewleta Tirk ket pey xeyala avakirina împaratoriyeke nû ya Osmanî. Destpêkê, dewleta Tirk hewildanên xwe yên dagirkirina axa Bakurê Sûriyê bi rêya komên îstîxbaratê û çeteyên girêdayî xwe pêk dianî. Ji sala 2016'an ve dewleta Tirk êdî rasterast di serî de li herêmên Cerablus û Şehbayê bi hêzên xwe yên çekdarî ket nava axa Sûriyê. Ji wir arteşa Tirk bandora xwe bi rêya çeteyan jî li ser deverên aliyê Hema, Himsê, Helebê û Idlibê belav kir. Li hemberî van binpêkirinên hiqûqa navneteweyî û serweriya Sûriyê, saziyên navdewletî yên wekî NY'ê bêdeng û bê helwest man. Ji vê zêditir, hêzên hegemon ên wekî Rûsya û Emerîkayê pêngavên dewleta Tirk ên dagirkirina axa Bakurê Sûriyê li gorî berjewendiyên xwe dinirxandin.

- **Berxwedana Serdemê ya Efrînê**

Hewldanên dewleta Tirk ên dagirkirina herêma Efrînê bi rêya çeteyan di salên 2012 û 2013'an de ji ber berxwedana YPJ û YPG'ê bi bin ketibûn. Lê Erdogan dest ji pîlana xwe berneda. Xelkê Efrînê 7 salan di dorpêça rejîmê, dewleta Tirk û çeteyên wê de mabû. Rêyên Helebê, Kobanê û Cizîrê qut bûn. Di dema çûnûhatinê de gelek caran xelk revandibûn yan jî kuştibûn. Lewma di peydakirina gelek pêdiviyên jiyanî de, bi taybetî jî di peydakirina mazotê de gelek zehmetî dihatin kişandin. Lê dîsa jî xelkê Efrînê bi hêza xwe ya cewherî jiyana xwe bi rêxistin dikir. Nexasim jin bi risteke pêşeng di avakirin û meşandina pergala xweseriya demokratîk de rabûne. Li ser bingehê çavkaniyên herêmî û zanebûna civaka xwezayî, jinan hilberîn, aborî û çanda komînal a Efrînê di bin şert û mercên ambargoyê de ji nû ve zindî kirine. Xebatên Kongra Star li ser bingehê komîn, meclîs, akademî û kooperatîfan rêxistinbûnek ava kiribû ya ku jinên ji beşên civaka Efrînê hemûyan hembêz dikir.

Di komînên zarokan de 30 – 40 zarokî xwe bi pergala hevserokatî, komîteyên çand, aborî û sporê bi rêxistin kir û şahiyên zarokan li dar xistin. Cara yekem li Efrînê Jineolojî wekî waneyeke di dibistanan de hatiye dayîn. Dîsa gelek sazîbûnên wekî avakirina zanîngehê bi zimanê Kurdî an jî Akademiya Parastina Jinê yekem car li Efrînê hatine ceribandin. Di gelek aliyan de pergala xweseriya demokratîk ku li ser bingehê şax û rehendên neteweya demokratîk li Efrînê hatibû bipêşxistin, dibû mînak ji bo xebatên kantonên din ên Rojava.

Ji ber şerên dijwar ên li Helebê bi sed hezaran Efrînî vegeriyabûn ser axa xwe. Di heman demê de Efrîn dibû stargehek ji bo koçberên din ên Sûriyê. Bi taybetî malbatên Ereb ji Şehba, Ezaz û Helebê jî hatibûn Efrînê da ku jiyana xwe di nav ewlekariyê de bidomînin. Beriya şerê li Sûriyê xelkê Efrînê hema hema hemû Kurd bûn; Kurdên Êzdî, Misilman û Elewî. Bi ser de civateke piçûk a Xirîstiyan û gelê Ermenî jî hebûn. Miletên Efrînê bi rêzdariya ji hev re û bi piştevaniya hev, bi hev re û di nav hev de jiyane. Xelkê Efrînî dibêje, wan penaberên ji miletên din ku ji derve dihatin bi heman xweşbînî û mêvanperweriyê hewandiye. Ruxmê ku di warê peydakirina derfetên aborî, mazot û xaniyan de gelek zehmetî hebû jî, tiştên heyî dihatin parvekirin. Di dema êrîşên ewil ên El-Nusrayê de koçberiyeke qismî çêbûbû, lê piştre sekînî. Malbatên Efrînê dibêjin, *"Me zehmetî kişand, lê her kesê/î karê xwe dikir. Me ji axa xwe, ji civaka xwe hez dikir û me li ber xwe dida. Pirr kêm kes derketin Ewropayê."*[593]

Li gorî tecrûbeyên şerê El-Nusrayê jî pergaleke parastinê hatibû amadekirin. Tevlîbûna Erka Parastinê, ya YPJ û YPG'ê di pirraniya malbatên Efrînê de wekî erkeke xwezayî dihat dîtin. Dema ku dewleta Tirk piştî rizgarkirina Reqayê di payîza 2017'an de gefên dagirkeriyê li dijî kantona Efrînê careke din gurr kirin, civaka Efrînê bi hestên welatparêz digot, '*Em ê li ser axa xwe bimînin û li ber xwe bidin!*' Gel li dijî lêkirina dîwarê parçekirina welêt bi destê dewleta Tirk li ber xwe dida. Di dawiya Cotmeha 2017'an de bi pêşengiya Kongra Star rêze çalakî li ser sînor hatin lidarxistin û rastî êrîşên dijwar ên arteşa Tirk hatin:

"Derdora Efrînê hemû sînorê Tirkiyê ye. Em çûn ser sînor aliyê Reco. Me çalakiyên mertalên zindî çêdikir ji bo em Erdogan bidin sêkinandin. Arteşa Tirk li aliyê din li hemberî me sekinîbû. Em jî sekînin. Sîleh li cem me tine bûn, tenê al di destê me de hebûn. Dema em ketin govendê bi carekê leşkerên Tirk ji wesayîtekê bi çekan fişek li ser me barandin. Li wir Hevala Fatma Sîleman ji Mabata şehîd ket û du jin jî birîndar bûn. Hevala Fatma dayika çar zaroka bû û di rêveberiya Kongra Star a Cinderêse kar dimeşand."[594]

Piştî şehadeta endama Kongra Star Fatma Silêman, gel dîsa çalakî û berxwedan li tevahiya navçeyên Efrînê domand. Serketinên YPJ û YPG'ê di berxwedanên Kobanê û Helebê de, her wiha rizgarkirina herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bixwebaweriya gel xurttir kiribû. Her wiha bendewariyên gel hebûn ku li gorî qanûnên navneteweyî yan jî li gorî berjewendiyên dewletên hegemon wekî Rûsya û Emerîkayê pêşî li êrîşên dagirker ên dewleta Tirk were girtin.

Lê belê di 20'ê Çileyê 2018'an de saet 4'ê piştî nîvrojê arteşa Tirk dest bi êrîşên qirkirinê kir. Bi carekê 72 balafirên şer rabûn û li Efrînê xistin. *"Berê Erdogan gef xwaribû ku ew ê êrîş bike. Heta wê demê me zêde bawer nedikir. Me got, belkî wê şerê cebhê çêbe. Lê me bawer nedikir ku ew ê bi balafiran şer bike."*[595]

[593]Hevpeyvîn bi malbatên komîna penaberên Efrînê re li gundê Til Nasrî yê Til Temir, 2018

[594]Hevpeyvîn bi Elham Omer re, hevseroka komîna penaberên Efrînê, gundê Til Nasrî yê Til Temir, 2018

Dayikên Efrînî ku salek û nîvê piştî van rojan, li Kampa Berxwedanê ya li Şehbayê dimînin, dibêjin, wan li gundên xwe kar û xebatên xwe dikirin, hinek jî li dawetan bûn û hinek jî perwerde dibûn dema ku ji nişke ve balafiran dest bi bombebarandinê kir û êrîşên di erdê re dest pê kirin. Di navbera çend deqîqeyan de tevahiya jiyana wan li bin guhê hev hat xistin. Dayika Şehîd Çiya, wê demê li navçeya Mabata di rêveberiya HPC Jinê de cihê xwe digirt. Ew dibêje, wê demê hestên hêrsê û tirsê di nav hevdu de bi xelkê re peyda bûne:

"Dema 72 balafir rakirin, gel digot 'em ji teyaran natirsin, em ji namûsê ditirsin.' Tirsa dîlgirtinê pirr zêde bû. Gel li berxwe da, berxwedanek pirr mezin kirin. Digotin, 'Heta nefesa dawî jî em ê dernekevin'. Zehîr dibariya, dîsa jî gel qîr dikir, digot, 'Em Efrînê bernadin.' Gelek şehîd û birîndar çêbun, gelek kes jî bi birîndarî ketin destê dijmin. Ev gelekî bi êş bû. Em wek jin, wek dayik gelekî diêşiyan lê me digot bila şehadet çêbibe, bila kes nekeve destê dijmin."[596]

Di dema êrîşan de rê, xetên înternet û telefonê qut bûne. Gelek malbatan êdî nema karibû xwe bigihînin hev. Agahiya kesekî ji kesekî din nebû. Malbat ji bo jiyana zarok û hevjînên xwe yên di nav Asayîş, YPJ-YPG'ê de bûn, ditirsiyan, endamên parastinê jî ji bo gelê xwe ditirsiyan.

"Ez di vê rojê de ji gundê Şîtka çûbûm navenda Efrînê. Me dengê balafiran bihîst û em derketin dervê. Wê demê me dît ku rewş cîddî ye. Kurê min li cihekî dûr bi tenê bû. Dayika min jî li cihekî bi tenê bû. Keçikên min û birayekî min di nav YPG'ê de bûn. Me didît ku balafir nuqtayên YPJ û YPG'ê bombabaran dikin. Ev pirr bi êş bû. Rê hemû qut bûn. Min nizanibû tiştek bi wan hatiye yan na. Heya saet 5'ê serê sibê bombabarana balafiran bê navber berdewam kir. Hêzên YPJ û YPG'ê li Efrînê hemû zarokên Efrînê bûn. Her dayikê wekî min di wan saetan de bi heman hestên bi êş jiya."[597]

Dewleta Tirk ne tenê êrîşî bendên kontrolê yên Asayîş, mewziyên YPJ û YPG'ê dikir. Gund, bajar, dibistan, nexweşxane, wargehên penaberan, destgehên nan û avê du mehan, bi şev û roj bi balafiran û bi çêkên giran hatin bombebarankirin. Armanca vî şerî penaberkirin yan jî tinekirina nişteciyên Efrînê bû. Arteşa Tirk wekî din cihên pîroz ên îbadetê û dîrokî jî kirin hedef da ku şopên dîroka jinê û çanda xwedawendan li herêma Efrînê ji holê rake. Lewma balafirên arteşa Tirk di 26'ê Çileyê 2018'an de perestgeha kevnar a xwedawend Îştarê li Endarê û gelek şûnwarên din jî rûxandin. Leşker û çeteyên dewleta Tirk goristan, cihên pîroz yên gelê Êzdî û dêrên Xirîstiyanan bi armanca pêkanîna qirkirina çandî, wêran kirin.

Gelê hundir û derveyî Efrînê li hemberî van êrîşan bêdeng nema. Rêveberiya xweseriya demokratîk seferberî ji bo parastina Efrînê û destketiyên şoreşê ragihand. Ji roja destpêkê ve pêkhateyên Rojava, yên Bakurê Sûriyê û heta gelê Şengalê hemûyan berê xwe da Efrînê; xelkê Efrînê jî berê xwe da sînor. Ji meşên girseyî û çalakiyên mertalên zindî heta girtina çeperan gel her cûre berxwedan bi pêş dixist. Arteşa Tirk jî bi taybetî gundên li ser xeta sînor bi balafirên şer û hawanan bombebaran dikir. Bi vî awayî dewleta Tirk dixwest zextê li ser gel çêke da ku biçin kampên penaberan. Lê belê şêniyên gundê Hemamê dibêjin, *'Kes neçû!'* Xelk tenê qademekê xwe dida paş û bi şev diçû gundên hinekî dûrî sînor. Dema êrîş sekinîn, serê sibê ew dîsa vedigeriyan gundê xwe. Xelkê nedixwest dev ji gundên xwe berde. Li hinek cihan xelk diket şikeftên xwezayî ji bo xwe biparêze. Lê êrîş nedisekînin. Balafiran çar, pênc caran li ser hev lêdixist da ku şikeftan hilweşînin.

[595] Çavkanî li heman cihî

[596] Hevpeyvîn bi jinên Efrînê re li Kampa Berxwedanê, Şehba, 2019

[597] Hevpeyvîn bi Elham Omer re, gundê Til Nasrî yê Til Temir, 2018

Fîdan, hevjîna şehîda ji gundekî nêzîkî bajarê Efrînê ye, ew dibêje: "*Dema teyare radibûn em 60 jin ketin şikefta cem mala apê min. Balafir bi şev û roj bê navber digeriyan. Em hemû jin bûn. Hinek tirs jî di nav me de hebû. Gelek jin birîndar bûbûn, yên hinekan destê wan, lingên wan, çavên wan çûbûn. Gelekî bi êş bû. Gelek zarok jî birîndar bûbûn."*[598]

Koçberên Efrînê dibêjin, ew hertim li bendê bûn ku biryarek ji aliyê hêzên navdewletî ve ji bo sekinandina êrîşên balafiran derkeve, lê balafir nehatin sekinandin. Di encama bazara di nav hêzên hegemon û dewleta Tirk de Konseya Ewlekariyê ya NY'yê di 24'ê Sibata 2018'an de 'agirbesta 30 rojan li Sûriyê' ragihand. Ev biryar di raya giştî de wekî gaveke erênî û insanî ji bo parastina gelê li Xuta hatibû nîşandan. Lê rastiya vê biryarê ji bo gelê Efrînê berovajî bû. Ji vê demê û bi şûn ve êrîşên li ser gund û navendên Efrînê dijwartir dibûn. Her wiha dewleta Tirk dest bi veguhastina zêdetirî 10 hezar çete û malbatên wan ji Xûta ber bi Efrînê ve kir. Biryara 'agirbestê' bû pêngaveke nû ya projeya dewleta Tirk ji bo qirkirina etnîk û guhertina demografya Efrînê.

"Ger balafir hatiban sekinandin, berxwedana gel wê serketî ba. Gel ji bo parastina gundên xwe amade bû. Nobet digirtin. Lê bi balafiran di nav gundan de gel şehîd kirin. Gel nizanibû xwe çawa li hemberî êrîşên hawayî û çekên modern ên NATO'yê biparêze. Ji sedî 90'î şehadetên gel û yên hevalên YPJ û YPG'ê bi balafiran û fuzeyên balafirên keşfê çêbûn."[599]

Elham Omer wê demê li Weqfa Jinên Azad a Rojava dixebitî. Ew bûye şahîdê çawa piştî bombabarana balafiran leşkerên Tirk û çete dihatin û ketin malên gel: *"Her tişt didizîn û talan dikirin. Mînak, ew ketin gundekî li navçeya Raco. Dayikek bi tenê di wî gundî de li ber pezê xwe mabû. Êvarî wê bi dizî ji me re telefon vekir û got, çete ketin gundê me û em girtin. Tev pez em birin û nahêlin ku em bi kesekî re biaxifin. 2 - 3 rojan dengê vê dayikê qut bû. Leşkeran li wê dayikê dixist, piştre bi zorê cilê YPJ'ê lê kirin û çek dan destê wê ji bo kû bêjin 'me jinek YPJ'ê girt.' Gelek êşkence û leyîstok bi milet re çêkirin. Şerê taybet meşandin."*[600]

Leşker û çeteyên dewleta Tirk li hemberî şervanên YPJ'ê jî her cûreyê tundiya zayendperest meşandin, wekî di mînaka şehadeta Barîn Kobanê de jî eşkere bû. Çeteyan êşkence û destdirêjiya bedena Şehîd Barîn kir û dîmenên kirinên xwe yên xedar li ser medyayên civakî belav kirin. Bi vî rengî dixwestin vîna berxwedan û pêşengiya jinê bişikînin ku di eniyên Efrînê hemûyan de careke din derket holê. Lê ew bi ser neketin. Li hemberî êrîşên hovane hêrsa şervanên YPJ û YPG'ê yên ku 24 saetan di şerê giran de bûn, hîn mezintir dibû. Wan dikir ku kuştiyên arteşa Tirk û çeteyên wê çêbin, tevî ku wan bi teknolojiya herî nûjen a NATO'yê ji sê aliyan ve êrîş dibire ser kantona Efrînê.

Jinên Efrînê û bi hezaran şervanên YPJ û YPG'ê sekna leheng a Şehîd **Avesta Xabûr** (Zalûx Hemo) ji xwe re kir mînak û bedena xwe li hemberî êrîşên dagirkeriyê kirin mertal. Avesta Xabûr di 27'ê Çileyê 2018'an de li hemberî tangeke arteşa Tirk çalakiyeke fedaî kiribû. Vê tangê hewl dida li aliyê gundê Hemamê sînor derbas bike. Bi vî ruhê Berxwedana Serdemê gelek ciwanên Efrînê, endamên jin û zilam yên Hêzên Parastina Civakî û Asayîşê çekên xwe rakirin û şer kirin. Her wiha dayik, bav û zarok bi hemû derfet û keda xwe dibûn hevparên vê berxwedanê.

[598] Hevpeyvîn bi jinên Efrînê re li Kampa Berxwedanê, Şehba, 2019

[599] Hevpeyvîn bi malbatên komîna penaberên Efrînê re li gundê Til Nasrî yê Til Temir, 2018

[600] Hevpeyvîn bi Elham Omer re, gundê Til Nasrî yê Til Temir, 2018

Elham yek ji wan dayikan bû yên ku tevî keçên xwe cihê xwe di Berxwedana Serdemê de digirtin:

"Di nav şer de dayikan alîkariya hevalên cebhê dikir, xwarin çêdikirin. Di nav hawanên ku li derdora me diketin de me xwarin çêdikir. Yên ku di cebhê de bûn, zarokên min, zarokên bira û xwuşka min, zarokên cîranan bûn. Gund bi gund bi dorê me sê roj û şevan xwarin ji bo hevalan çêdikir. Rojekê hevalên YPJ'ê bang min kirin, digotin: 'Were ba me, keça xwe bibîne'. Rê pirr xeter bûn. Ez tirsiyam, lê dîsa çûm. Min keça xwe dît. Lazim bû ku ez wekî dayik wê biparêzim. Lê li şûna vê, wê moral û hêz da min. Keça min got, 'Em nahêlin ku dijmin bi hêsirên me keyfxweş bibe. Heta dawî em ê şer bikin. Dibe ku ez şehîd jî bikevim, lê ez dev ji axa xwe bernadim.' Morala van hevalan pirr bilind bû."[601]

Dayika Şehîd Çiya wek endameke HPC Jinê li navçeya Mabata jî her tim li kêleka şervanên YPJ û YPG'ê bû: "*Me cebxane ji wan re dibir. Seyare nikaribûn derkevin çiya. Karê ku bi roj nedihat kirin, me êvarî dikir. Pêwîst dikir ku me hîn zêdetir bikira. Gelek kes şehîd ketin. Me nikaribû şervanên xwe biparêzin. Em derdiketin çiya, ji bo şehîd û birîndarên xwe bînin. Şervanan, hevalên xwe yên şehîd bi ruhekî hevaltî li ser pişta xwe dikirin û dadixistin jêr. Nedihiştin ku em alîkariya wan bikin. Min vê qebûl nedikir. Min xwe jî wek wan didît, ferq di navbera me de tinebû. Dema me xwarin dibir ji hevalên YPJ û YPG'ê re, wan digot, 'Hûn çima ji me re tînin? Gelê me birçî ye. Em nikarin bixwin. Bibin ji gel re, bi taybetî jî bila zarok birçî nemînin.' Di wê rewşa şerê dijwar de jî li gelê xwe difikirîn."*[602]

Hecer Silêman dide xuya kirin ku ew jî heta roja 42'yan a şer li gundê xwe yê navçeya Mabata mabû û xebat dida meşandin: "*Dema şer derket, ferq û cudahî neket navbera jin û zilaman. Her kesî mil da milê hev û xwestin xizmetê bikin. Wek jin me alîkariya şervanên xwe dikir, me xwarin çêdikir. Me ti carî xwe paş de nekişand. Em netirsiyan, heta me henekê xwe jî bi dijminê xwe dikir. Lê balafiran bi awayekî hovane li me dida."*[603]

Tevî berxwedana gel û şervanan jî şehîd û birîndar roj bi roj zêditir dibûn, dorpêça derdora Efrînê her diçû tengtir dibû: "*Piştî ku êrîş nesekinîn em çûn bajarê Efrînê. Wê demê tevahiya milet li navenda Efrînê kom dibû. Me got, navenda bajêr dûrî sînor e û hemû gelê sivîl tê de ye, li wir saxlem e. Ne mimkun e ku vir jî bombebaran bikin. Lê hîn di rê de çend caran top û bombe li derdora seyara me ketin. Li seyare û cihên sivîl dixistin, lê Tirkan digot, 'me li hedefên leşkerî xist'. Hinek malbat bi giştî şehîd û birîndar bûn. Yên ku milê wan qut bûn, yên lingê wan qut bûn, hebûn. Li hundirê bajar jî xistin. Dema ku em wek gel, wekî mertalên zindî diçûn navçeya Cindirêsê her tim keşif li ser serê me bû. Wê demê bi balafirên şer êrîşî hemû gundên derdora me dikirin. Me her çiqas şehîd û birîndar jî dan, gel heya dawiyê dev ji çalakiyên xwe berneda û tevî zarokên xwe li ber xwe dida."*[604]

Berxwedana Efrînê dibû mînakeke dîrokî ya ruhê hevbeş û înternasyonalîst a berxwedana jinê û ya gelan. Ciwanên ji hemû pêkhateyên Bakurê Sûriyê, ji çar aliyên Kurdistanê û şervanên înternasyonalîst wekî Şehîd **Hêlîn Qereçox** ji Brîtanyayê di nav refên YPJ û YPG'ê de tevlî têkoşînê dibûn. Wan bi dil û can şer kir û amade bûn ji bo parastina pergala xweseriya demokratîk û şoreşa jinê jiyana xwe feda bikin. Di çarçoveya seferberiyê de xelkê wekî din bi şiklê kerwanên sivîl ji herêmên Cizîre, Kobanê, Minbic, Reqa û Şengalê ji bo piştgiriya berxwedanê wekî

[601] Çavkanî li heman cihî

[602] Hevpeyvîn bi jinên Efrînê re li Kampa Berxwedanê, Şehba, 2019

[603] Çavkanî li heman cihî

[604] Hevpeyvîn bi Elham Omer re, gundê Til Nasrî yê Til Temir, 2018

mertalên zindî xwe gihand Efrînê. Di 22'yê Sibatê de dema ku kerwanê xelkê gihişt navçeya Şêrewa ya Efrînê, dewleta Tirk bi tang û mûşekan êrîşeke giran bire ser wan. Di vê êrîşê de sivîlek şehîd bû, 12 sivîl jî giran birîndar bûn.

Bi dirûşma ***Jin rabin ser piyan ji bo Efrînê!*** Kongra Star pêşengiya çalakî û berxwedana jinan dikir. Di bangewaziya pêngavê de nûnerên Kongra Star di 8'ê Sibata 2018'an de li Efrînê got, *"Li hemberî binpêkirinên zagonên navneteweyî û mafên mirovan ku li pêşiya çavên tevahiya cîhanê li Efrînê diqewimin, bipeşxistina hevgirtin û têkoşîna hevbeş a jinên cîhanê wê bibe çeka me ya herî xurt. Bi rabûna jinan li ser şopên xwedawenda Îştarê em e pergala şer û desthilatdariya zilam ji holê rakin. Em bang li tevahî jinên azadîxwaz yên cîhanê dikin: Ji bo parastina nirxên mirovahiyê, Rabin Ser Piyan ji bo Efrînê! Werin, em hevkarî û çalakiyên xwe xurt bikin ta ku em şoreşa jinê li tevahiya cîhanê belav bikin!"* Wekî bersiva bangewaziyê, jinan li gelek welatên Ewropa û Emerîka Latîn çalakiyên piştgiriyê li dar xistin. Wekî din şandeyên piştgiriyê yên jinên Rojhilata Navîn û karwanê girseyî yê jinan ji bo beşdarbûna meşa 8'ê Adarê çûn Efrînê û piştgirî dan jinên berxwedêr.

Lê arteşa Tirk komkujî û êrîşên balafiran li ser gundan û navenda Efrînê dewam kirin. Zêdetirî 300 sivîlî, di nav wan de gelek zarok jî hebûn di wan êrîşan de jiyana xwe ji dest da. Ji ber komkujiyên li gundan, bi sed hezaran gundiyên Efrînê koçberî bajêr dibûn. Bi vî awayî derdora nîv milyon mirovî li navenda bajêr kom bûn. Di warê ewlekarî û pêdiviyên jiyanê de zehmetiyên mezin çêbûn. Dengê balafiran li ser bajêr qut nedibû. Dayik dibêjin, *"Ji ber zarok ditirsiyan û digriyan, em jî ji bo wan ditirsiyan. Dema ku dengek dihat, êdî zarokên me tirsiyan, digotin, 'werin, em bibezin qabuyan.' Paşê zarok xwe bi xwe fêrbûn û dema dengek derdiket, baz didan. Zarok li ser rêya dibistanê dihatin kuştin. Zarok ji birçîna dimirin ji ber ku şîr tinebû. Ji ber ku dayikan nikaribû derman peyda bikin, zarok di rêya nexweşxaneyê de dihatin şehîd xistin. Piştî ku em ji Efrînê derketin jî vê psîkolojiyê bandor li zarokan kiribû."*[605]

Jinên Efrînê didin xuyakirin ku piştî ku xelkê gundan hatibû bajêr, êrîşên hovane li ser navenda Efrînê hîn zêdetir bûn: "*Li Efrînê jî gelek balafiran li me da, gelek mal, seyare, motor û heta însan şewitîn. Didîtin ku gelê medenî li wir heye. Ruxmê wê jî dîsa bi balafiran li wir didan. Me nikaribû biçin şehîdên xwe jî rakin û bînin. Vê rewşe bandorek pirr mezin li ser gel kir. Gel nema zanibû ku bi kû ve biçin, pirr tirs çêbû. Xwîn û baran tevlîhev bibû, ava sor diherikî."*

"Her roj 30-40 şehîd çêdibûn. Ev gelekî bi êş bû. Bi her hevaleke/î me ya/yê ku şehîd diket perçeyek ji canê me diçû. Dayikên wan dema dikirin hawar, em jî wek wan dayikan, em bi êşên wan dihesiyan."[606]

Piştî 58 rojên berxwedana lehengane, tangên artêşa Tirk dor û bi deh hezaran çeteyên wê li navenda bajarê Efrînê girtibûn. Ji bo pêşî li qirkirinekê were girtin, rêveberiya Efrînê di 16'ê Adara 2018'an de biryar da ku rêya derketinê ji gel re bibîne. Bi vî awayî di salvegera 30'emîn a komkujiya Helebceyê de zêdetirî 300 hezar jin, zilam, zarok, kal û pîr ji bo parastina canê xwe, tenê bi cilên li ser xwe ji bajarê Efrînê derketin. Ji ber ku seyare nebûn malbat bi zehmetiyên pirr mezin di bin baranê de bi saetan dimeşiyan. Heta ku wan xwe gihand herêma Şehbayê, li ser rêya koçberiyê careke din êrîşên arteşa Tirk bi ser wan de hatin. Careke din şehîd û birîndar çêbûn. Hinek dayik û bavan di rê de zarokên xwe ji dest dan. Hinek malbat jî hîna nû çend rojan paşê

[605] Hevpeyvîn bi jinên Efrînê re li Kampa Berxwedanê, Şehba, 2019

[606] Çavkanî li heman cihî

gihaştin hev. Jinên ducanî zehmetiyên herî mezin kişandin. Hinekan ji wan di rê de zaroka xwe anî dinyayê. Zarokên hinek dayikan ji ber wan çûn. Jinên Efrînê bi dilgiranî vê rojê wekî 'roja reş' tînin bîra xwe.

Fikret Ebdullah beriya şoreşê li Helebê dima û xeyal nedikir ku rojekê wê jin ji malê derkeve, biçe karekî bike, çekê rake û şer bike. Li Efrînê, wê kelecana şoreşê dît û wek hevseroka Meclîsa Gel a Şêrawa xizmeta civakê dikir. Ew destnîşan dike ku di rojên berxwedanê de gel yekîtiya xwe û hêviyên mezin ava kiribûn**:** *"Kesek nefikirî ku ji Efrînê derkeve. Kesek nefikirî ku Efrîn wê bindest bibe, agir pê keve. Her kesî digot, 2 roj, 3 roj in, wê teyare bisekinin û şer xelas bibe. Gelê Efrînê 57 rojan li ber xwe da û xwe îsbat kir. Di vî şerê dawî de hezkirina gelê Efrînê li hemberî hev du zêde bû. Hîn zêdetir hev du nas kirin. Li hev du xwedî derketin. Lê derketina ji Efrînê roja 16'ê Adarê rojeke reş bû. Dema gel derdiket, hîn şervanên me jî şer dikirin. Tişta herî xerab jî gel bê bawerî ma, baweriya xwe winda kir, hêviyên xwe wenda kirin. Ev gelekî bi êş bû. Min bawer nedikir ku rojekê ez gelê Efrînê bi vî şeklî bibînim."*[607]

Bi ya jinên Efrînê, vê rêwitiya wan a bi kul û êş pîlangeriyên komkujiyên mezintir pûç kiriye: "*Derketina me ji Efrînê pirr bi êş bû. Me gotibû, em ê bimînin. Lê di dawiyê de me dît ku biryara Erdogan ne tenê dagirkirin û talankirina axa Efrînê ye. Armanca wî qirkirin û tinekirina gelê Kurd e. Ji ber vê, her çiqas derketina me ji Efrînê pirr bi êş û zehmet bû jî, me dîsa li hemberî qirkirinê li ber xwe dida. Erdogan gel ji Efrînê derxist. Lê niha darê zeytûnan jî qut dike. Hinek malbat vegeriyane Efrînê. Lê ji wan pirs bikin, çi hatiye serê wan! Qaşo Erdogan şerê YPG'ê dike. Lê li gel êşkencê dikin, dikujin, ticareta jinan û xortan dikin. Pirr malbatên em nas dikin ku vegeriyan, leşkerên Tirk zarokên wan dibirin. Heta niha jî ew nizanin ka zarokên wan dijîn yan na."*[608]

Dema ku nêzîkî 250 hezar malbatên Efrînê gihiştin herêma Şehbayê zehmetî hîn jî xilas nebûn. Di sermayê de, dibin baranê de çend rojan li derve yan jî di malên nîvhilweşiyayî de diman heta wan wargehên xwe ava kirin. Pêşî Kampa Berxwedanê, piştre jî Kampên Serdem, Efrîn, Veger û Şehbayê tevî rêveberî, komîn û saziyên xweser dihatin sazkirin. Jinên Kampa Berxwedanê qala wê yekê dikin ka wan di bin şertên herî giran de careke din jiyana xwe çawa bi rêxistin kiriye:

"Gel bi giştî li kolanan mabû, li nav erdan radizan, di seyaran de radizan. Zarokên me hemû birçî bûn. Bi rastî pirr bi êş bû. Gelek kes, bi pirranî zarokan jî jiyana xwe ji dest da. Hinek malên vala hebûn, lê em ditirsiyan ku vekin ji ber ku berê DAIŞ li vir pirr mal mayîn kiribûn. Heta 10 rojan hinek mal hatin vekirin, gel derbasî malan û kampê bû. Her kes li Şehba bi cîh bû, kes nedifikirî ku dûrî Efrînê bikeve. Her kesî digot 10 - 20 roj şûnde wê şer bi dawî bibe û em ê vegerin Efrîna xwe."

"Em hatin Şehbayê hîn tiştek tine bû. Ne komîn, ne meclîs, tiştek tine bû. Bi taybetî jinan gelekî astengî dikişandin. Zilam dikarin biçin her derê. Lê jinan gelek zehmetî dîtin. Ruxmê van hemûyan jî me tekoşîn kir. Bi rastî ruhek hebû, ruhê berxwedanê hebû. Her kesî xizmeta hevdu dikir. Ruhekî gelê Kurd heye ku ferq û cudahî nedixist navbera ti kesî, her kes bi hevdu re dibû alîkar."[609]

[607] Hevpeyvîn bi endamên meclîsa jinê ya Ehrezê re, Tebax 2019

[608] Hevpeyvîn bi Elham Omer re, gundê Til Nasrî yê Til Temir, 2018

[609] Hevpeyvîn bi Hecer Silêman re, Kampa Berxwedanê, Şehba, 2019

"Wek jinên Kongra Star em li Şehbayê jî nesekinîn. Me got, em dixwazin alîkariya gel bikin. Wîsa me bi seyarê li Til Rifatê mal bi mal nan belav dikir. Dema em hatin, me gelek êş kişand, him di milê jinê de him di milê gştî de gelekî zehmet bu. Yên ku me nas nedikirin, digotin qey rêxistina me nemaye. Zewaca duyemîn, pirr zewacî gelek zêde bû. Berdana jinan pirr zêde bû. Keçên 13, 14 salî dihatin zewicandin. Ji ber wê jî jinan gelek êş kişandin."[610]

"Piştî 4 - 5 rojan wekî endamên meclîsê, me komîn ava kirin. Gel pirr belav bû û bê bawerî bû. Digotin: Li vir zilamên nîzamê hene. Ew ê me îdam bikin. Gelek kesan nedixwest bikevin hilbijartina komînan. Tirs gelek hebû. Lê me hewl da ku em moral bidin gel. Bi taybet wekî jin me gelek êş û astengî dîtin, yên ku zarokên wan piçûk bûn: Şîr tine bû, xwarin tine bû. Rojên pirr bi êş bûn. Lê dema ku komîn hatin avakirin, milet xwe ji vê êşê xilas kir. Dema ku tenzîm çêbû, bipêşketin jî çêbû. Lê hinek milet jî derbasê Helebê bû."[611]

Jinên Kampa Berxwedanê dibêjin, li hemberî zehmetiyên koçberiyê hemûyan tevî şerê taybet û zextên zayendperest ku derketin holê, wan dît ku rêxistinbûna wan a xweser misogeriya wan a jiyanê ye. Ew dibêjin, zanebûna wan û naskirina civakê ji nû ve avakirina komîn û saziyên Kongra Star, lidarxistina civînên gel û perwerdeyên civakî li Şehbayê zêdetir bi pêş ketiye. Bi vî awayî ew li hemberî feraset û kevneşopiyên desthilatdariya zilam têdikoşin. Her wiha bi vekirina saziyên çandê û dibistanên zarokan, hêviyên paşêrojê dîsa zindî dibûn. Tevî ku bi rêxistinbûna jin û civakê li kampan, bipêşketinên girîng çêbûne jî, pirsa sereke ya her jinê ev e: ***'Em ê kengî vegerin Efrîna xwe?'***

"Jiyana Efrînê wek bihuştê bû, mirov di carekê de ji bihuştê derkeve û were cihekî wek kampê bi rastî jî gelekî zehmet e. Em niha di xebatên kampê de cihê xwe digirin. Gelek kes hatin. Lê ev kamp ne cihê me ye, cihê me Efrîn e. Em ê heta kengî di kampan de bimînin? Zivistan gelekî sar e. Herrî heye, gemar heye zarok gelek zahmetiyan dikişînin. Havîn jî gelekî germ e. Di hundirê konan de jî jiyan nabe, bêhna plastîkan tê. Hertim em avê dikişînin, gel nexweş dikeve. Yanî jiyana kampan gelekî zehmet e. Em dixwazin vegerin Efrînê û înşellah em ê vegerin." [612]

Malbatên li kampên Şehbayê nêzîkî Efrînê li benda vegera xwe ne. Beşekê ji gelê Efrînê jî koçî herêmên Heleb, Kobanê û Cizîrê kiriye. 118 ji van malbatên Efrînê, li gundê Aşûrî Til Nasrî nêzikî bajarê Til Temirê bi cih bûne. Ji ber ku xwediyê gundê Til Nasrî jî êşên şer û koçberiyê dîtine û li hemû cîhanê belav bûne, wan biryar dabû ku malên xwe li gelê Efrînê vekin. Bi vî awayî gundê Til Nasrî careke din bûye şahidê hevgirtina gelan û berxwedana li dijî dagirkerî û faşîzmê. Di 7'ê Adara 2015'an de şervana înternasyonalîst Îvana Hofmann li wir di şerê li hemberî DAIŞ'ê de şehîd bûbû. Komîngeha koçberên Efrînê tenê çend metroyan dûrî cihê şehadeta Îvana hatiye avakirin. Li wir hevseroka komînê Elham û çar endamên din serpêhatiyên xwe yên rojên şerê Efrînê bi me re parve kirin. Elham bûyer û hestên xwe yên dema derketina ji Efrînê bi hêrs û bi hêsirên çavê xwe tîne ziman: *"Dema ku em reviyan, ez nizanim ez ê zarokê xwe çawa xilas bikim. Min pirr dayik di kolanan de dîtin ku zarokê xwe winda kirine. Ka edalet? Ka mafên mirovan? Ma Kurd ne insan in? Li Ewropa heywaneke piçûk tê kuştin qiyamet radibe. Li Rojhilata Navîn bi sed hezaran insan tên kuştin, lê Ewropa ewqas qîmet wekî dide wan heywanan nade însanên me. Bi*

[610] Hevpeyvîn bi Ranya Hesen ji Efrînê re, endama Meclîs a Jinê ya Ehrezê, Şehba, 2019

[611] Hevpeyvîn bi jinên Efrînê re, Kampa Berxwedanê, Şehba, 2019

[612] Çavkanî li heman cihî

xwedê, em Kurd in. Em çi bikin? Dinya hemû ji me re bû dijmin. Çima?

Hevalên YPJ û YPG'ê jî insan in, ew jî dixwazin bijîn. Lê dijmin tiştek ji me re nehişt. Keça min şehîd ket. Ez ne poşman im. Ez bi keça xwe serbilind im. Ew ji bo axa xwe şehîd ket. Lê me hîn merasîma keça xwe çênekir. Ew rojên ku em ji Efrînê derketin, hevalên wê ew sipartin axê. Gelek dayik di vî şerî de nikaribûn cenazeyên zarokên xwe bibînin. Dema ku em gihandin Şehbayê, fermandara keça min telefon ji min re vekir. Wê demê, wê ji min re got ku keça min şehîd ketiye. Xwesteka keça min hebû. Digot, 'ger ku ez şehîd bikevim vê stranê ku min jê hez kir ji bo min bêje.' Min li ser telefonê ev stran jê re got."

Neh mehan piştî agahiya şahadeta wê, Elham hîna merasîma keça xwe çênekiriye, ji ber wesiyeta keça wê ew bû ku merasîma wê li mala wê were çêkirin, "*Ger 10 salên din jî di ser re biçin, ez ê xwesteka wê bi cih bînim. Gelek dayik û bav li Şehbayê jî hene, hîna zarokên xwe îlan nekirin. Ew jî li bendê ne da ku vegerin ser axa xwe û zarokên xwe li wir îlan bikin."*[613]

Dayikeke şehîdan ji navçeya Şiyê li Kampa Berxwedanê jî bi heman hest û biryardariyê dibêj, "*Rast e, bedena me li vir e lê mêjiyê me li Efrînê ye, li ser tirba şehîdên me ye. Bila daran bişewitînin, bila gundan xira bikin, dar jî dîsa tên çandin, mal jî dîsa tên avakirin. Zarokên me jî çûn, lê em nikarin bê Efrîn bijîn. Dîsa em dibêjin, bedel çi bibe bila bibe, em ê canê xwe bidin, lê em Efrînê ji Erdoxan re nahêlin."*[614]

Di dawiya nîqaşên me yên li Kampa Berxwedanê de dayikên navsere û jinên ciwan hawar û bangên berxwedanê bi stran û helbestên xwe tînin ziman.

Dayikeke Efrînî distire:
Erê demane demane demane,
lê xayînê berê xwe bide hidûtê du dewleta ne,
lê anê Tirkiye wêrane,
Kurmancê me mane
li bin kona ne
Hoyy felek, oy felek oy felekê yemane.

Hawar e, hawar e,
qêrîne bi salan e.
Lo lo Tirko lo lo wêrano,
her berê xwe bide hidutê du dewleta ne.
Lê anê Tirkiye wêrane,
Kurmancê me mane
binê kona ne.
Oy felek oyy felek, oy felek.

Jineke ciwan jî bi helbesta xwe bersivê dide:
Dayikno, keçên min em giş xwediyê Efrînê ne,
Em giş xwediyê qurbaniya ne,
Her bin darek zeytunê xwîn rijiyaye
me qurbanek daye.

[613]Hevpeyvîn bi Elham Omer re, gundê Til Nasrî yê Til Temir, 2018

[614] Hevpeyvîn bi jinên Efrînê re, Kampa Berxwedanê, Şehba, 2019

Her ber kevirekî çiyayê Lêlûn
me qurban dayî, xwîn rijiye.
Keçên min, dilê min,
Kêr gîha hestî,
Em ne xwedanê kar û berxa ne
Em xwedanê qurbanê dil û kezebê ne.
Em Kurd in, em serbilind in,
Em Kurd in, xwedî keramet in, xwedî şeref in

Pênaberên Efrînê yên li Til Nasrî diyar dikin ku gefên dewleta Tirk û helwesta hêzên navdewletî piştî şerê Efrînê, nehatiye guhertin. Ew balê dikişînin ser wê yekê ku xetera dagirkeriyê û qirkirinê li ser gelê Kurd li ser tevahiya erdnîgariyê Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav bûye:

"Em ji Efrînê hatin Şehbayê, ji Şehaba hatin Cizîrê. Îro jî dîsa Erdogan gefên şer li dijî Rojava dike. Niha pê ve, em ê herin kû derê? Ez ji vir naçim ti derê! Ger Erdogan hat, bila were, min bikuje. Ji kuştinê wêdetir tiştek heye? Çi bike, bila bike.

Niha Emerika dibêje, 'ez ê hêzên xwe paş ve bikişînim'. Heman tişt Rûsyayê li Efrînê jî got û kir. Heta niha di dîrokê de her dewletê îxanet li me kir. Her kes bazara xwe li ser serê me dike. Me zarokên xwe dan. Em ê dîsa jî zarokên xwe bidin ji bo azadiya axa xwe. Lê em nikarin di bin zilm û zordestiyê de bijîn. Em Kurd wekî mirovên bindest hatine vê dinyayê û em ê wisa jî biçin. Ez nikarim xwe bixim Ereb yan Tirk. Zimanê min heye, lê ez nikarim bi kurê xwe re biaxifim. Ew 13 salî ye. Dema em çûn cihekî aliyê rejîmê, wî ji min re got: 'Yadê li ser telefonê bi Kurdî naxife. Rejîm wê were, me bigire.'

Hinek saziyên ji dewletên derve hatin cem me û pirs kirin: 'Hûn ji me çi alîkariyê dixwazin?' Me jî got 'Ji me re bibin alîkar ji bo ku em vegerin Efrînê'."[615]

Lê ev daxwaz pêk nehatiye. Rêxistina Mafên Mirovan a Efrînê da zanîn ku ji destpêka dagirkirina Efrînê heta Mijdara 2019'an zêdetirî 1200 bûyerên tundiya li dijî jinan ên bi destê artêşa dewleta Tirk û komên girêdayî wê hatine belgekirin.[616] Li hemberî binpêkirina mafên mirovan û zagonên navneteweyî, li hemberî komkujiyan, qetilkirin û revandina jinan û tevahiya sûcên dema şer ên dewleta Tirk ku hê jî dewam dikin, saziyên navneteweyî hemû bêdeng mane. Vê yeke cesaret da Erdogan da ku hewldanên xwe ji bo dagirkirinê tewahiya axa Bakur û Rojhilatê Suriyê û tinekirina pergala xweseriya demokratîk bi piştevaniya dewletên hegemon dewam bike. Lê li hemberî van êrîşên qirkirinê, bi dehhezaran jinên Efrînê li kampên Şehbayê û deverên din tevî jinên ji pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemûyan li ber xwe didin û çalakiyên xwe bi dirûşma ***'Jin ax û rûmeta xwe diparêzin, dagirkerî û DAIŞ'ê têk dibin'*** dewam dikin.

- **Dewamiya Şerê Dagirkeriyê û Berxwedana Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê**

Piştî têkçûna baregehên dawî yên DAIŞ'ê dewleta Tirk sala 2019'an careke din pîlanên xwe yên dagirkirina tewahiya axa Bakur û Rojhilatê Sûriyê eşkere kir. Di salvegera 20'an a komploya navdewletî de, di 9'ê Cotmeha 2019'an de dewleta Tirk şerekî nû bi bombebarana balafiran a li dijî gundewarên Serêkaniyê da destpêkirin. Dîsa arteşa Tirk bi balafir û obusan êrîşî herêmê bi

[615]Hevpeyvîn bi Elham Omer re, gundê Til Nasrî yê Til Temir, 2018

[616] Daxuyaniya Rêxistina Mafên Mirovan a Efrînê: *Hezar û 200 bûyerên tûndiya li dijî jinan hatin belgekirin*, Ronahî TV, 27-11-2019

dirêjahiya 460 kîlometreyan kir. Bajar û gundên di navbera herêmên Dêrik û Girê Spî de heta Eyn Îsa û Til Temirê dibûn hedefa êrîşên hawayî û bi çekên giran.

Di sala 2017'an de dewleta Tirk ji bo misogerkirina parçebûnê Kurdistanê dîwarekî bi dirêjahiya 520 km li ser xeta sînor ava kiribû. Vê carê dewleta Tirk li hinek cihan parçeyên diwarê sînor rakir da ku hêzên bejahî û çeteyên arteşa Tirk bikevin axa Bakurê Sûriyê. Bi vî rengî di serî de bajarên Girê Spî û Serêkaniyê ji çar aliyan ve hatin dorpêç kirin. Di heman demê de êrîşên hawayî li ser bajar û gundan bi dijwarî dewam kir. Li çend cihan jî çekên kîmyewî wekî fosfora spî hatin bi kar anîn. Desteya Jinê ya Herêma Cizîrê ragihand ku di navbera 9 û 28'ê Cotmeha 2019'an zêdetirî 251 mirovên sivîl ji ber êrîşên dewleta Tirk jiyana xwe ji dest dane û zêdetirî 1.100 sivîlan jî birîndar bûne. Di nav van de hejmareke mezin a zarokan bû.[617] Ji wê û bi şûn ve jî komkujiyên li dijî gel û zarokên herêmê bi tang, top û balafirên arteşa Tirk dewam kirin.

Pirraniya malbatên ji hemû pêkhateyan ji ber tirsa qirkirinê ji bajarên Girê Spî û Serêkaniyê reviyan û xwe gihandin herêmên din ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê wekî Hesekê û Reqayê. Zêdeyî 300 hezar mirovî yên ku piştî şerên El-Nusra û DAIŞ'ê nêzîkî çar salan jiyaneke aram jiyan, careke din bûn penaber li ser axa xwe. 86 hezar xwendekar ji ber rewşa şer ji mafê xwe yê perwerdeyê bêpar hatin hiştin. Mal û dikanên şêniyên Girê Spî û Serêkaniyê hatin talankirin. Komîteya Aboriyê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriye da zanîn ku ji 9'ê Cotmehê heta 5'ê Mijdara 2019'an dewleta Tirk û komên girêdayî wê dest danîn ser gelek berhemên gel, wekî 42.700 ton genim, 33 hezar ton ceh û 2600 ton pemboyê li embarên herêmên Serêkaniyê û Girê Spî. Wekî din 278 hezar sewal û 370 hezar serî pez hatin dizîn.[618] Ji ber şer û dagirkeriyê, gelê Serêkaniyê û Girê Spî nikaribû di payîza 2019'an zeviyên xwe cot bike. Hêzên dagirker pirraniya zengîniya talankirî bire Tirkiyê. Her wiha gelek avahî, amûr, kooperatîf, kargehên pîşesazî û binesaziyê hatin desteserkirin. Bi vî awayî gel ji mal û warê xwe, ji nan, av û kehrebê hatiye kirin.

Êrîşên dewleta Tirk li ser aboriya gel û pêdiviyên jiyanî bi armanca tinekirina aboriya komînal û teslîmgirtina vîna gel hatine bipêşxistin. Komîteya Aboriya Jinê ya Kongra Star ragihand ku bi taybetî jinan ziyaneke mezin dîtiye. Bi hezaran jinên ku di kooperatif, kargeh û saziyên aboriya jinê û xweseriya demokratîk de xebîtin bêkar man. Pergala hilberînê ji hev hatiye xistin. Jinên kedkar di bin mercên şer û dagirkeriyê de li cihên kar û çandiniyê rastî tundiya çeteyan hatine. Careke din pergala tecawiz û qirkirinê li ser jinên li Serêkaniyê û Girê Spî tê ferzkirin. Dagirkeran ragihand ku li gorî qanûnên şerîetê, derketin û karkirina jinan li derveyî malê qedexe ye.

Dîsa jin û malbatên ku ji mal û warê xwe hatine dûrxistin, di jiyana koçberiyê de bi xizanî, birçîbûn û zehmetiyên mezin yên madî û manewî re rû bi rû dimînin. Hunermend Mizgîn Tahir, yek ji wan sedhezaran mirovan e ku careke din koçber bûye. Wê şeva êrîşên balafiran li dijî Serêkaniyê xwe gihand Hesekê û ji wir bi malbata xwe re derbasê Qamişloyê bûye. Wekî hemû penaberên Serêkaniyê ku em bi wan re axifîn, ew jî dibêje, '*heger êrîşên balafiran nebana, em ji bajarê xwe dernediketin*'. 20 roj piştî derketina ji bajarê xwe, Mizgîn lêpirsîna edaletê û erkên dayiktiyê dike. Ew ji berpirsyar û temaşevanên vî şerê dagirkeriyê dipirse:

[617] Daxuyaniya Komîteya Qada Civakî ya Kongra Star: *Ji Bo Raya Giştî Ya Cîhanî û Netewên Yekbûyî*, 28-10-2019

[618] Daxuyaniya Komîteya Aborî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê: *Rapora talanê ya Serêkaniyê û Girê Spî hate eşkerekirin*, ANF, 20-11-2019

"Devera aram li dinyayê, jiyana aram li dinyayê gelo wê li kû peyda bibe, heger ne li Rojava be? Zarok bi aramî diçûn dibistanê, dayikan zarokên xwe amade dikirin, gulîkên wan şehdikirin û ew bi rêdikirin dibistanê. Ma aramî çawa ye? Aramî ew e ku dayik zarokên xwe li ser destê xwe hiltîne û pêşkêşî dinyayê dike. Dinyaya lal, kerr û kor ku zarokê xwe pêşkêş dike û dibêje, ez ê vî cenazeyî bi kû ve bibim? Min qîza xwe amade dikir ku here dibistanê. Aramî hebû li bajarê min, mafê jinê dihat parastin. Li kû mafê jinê tê parastin li cem yekî kû rêvebiriya DAIŞ'ê dike, li kû? Eger ne li Serêkaniyê be, wê li kû hebe aramî?

Te mirovên ku ji axa xwe hez dikir, ji mala xwe hez dikir, ji xwezaya xwe hez dikir te her kes koçber kir. Sibehê zû radibûn diçûn darên xwe av didan, dayik diçû karê xwe dikir, zarok diçûn dibistana xwe. Ma ji derveyî wê aramî çi ye, ma aramî wê li kû dê çêbibe? Ji koçberiyekê heta koçberiyekê, ma bazar û şerefa dinyayê li kû ye? Tu li ser xwîna zarokên Kurd bazarê dikî, tu bombeyên fosfor li ser zarokên Kurd dibarînî û tu yê Kurdan bi kû ve bibî? Naqedên, naqelên ev Kurdên dilsoz û yên kû ji axa xwe hez dikin. Em ê bimînin li ser vê axê, em ê li ber xwe bidin û em ê dîsa zarokên xwe amade bikin û bişînin dibistanê da ku bi ziman û çanda xwe rabin. Wê her malek dibistanek be û wê her dayikek mamosteyek û rêveberek be. Em ê bi aramî di nava çar dîwaran de bijîn. Palan û bazarên dinyayê li ser xwîna zarokên Kurdan dibin, li ser zarokên aştîxwaz ku nizanin bi ku dê ve herin. Tu dixwazî çeteyan derbasî vê axa aram bikî û bila dinya gişt jî piştgiriyê te be, tu yê bi aramî nejî.

Sibê wê zarokên te ji te re bêjin, tu yê çi jê re bêjî? Ez dixwazim ji dayikek û bavek Tirk re bêjim, tu yê sibe çi ji zarokê xwe re bêjî û tu yê bi kîjan hişmendiyê vî zarokê xwe xwedî bikî? Tu yê bêjî min zarokek kuşt kû ez çeteyekê têxim mala wan, talan bikim mala wan, berbat bikim, bajarê wan bombe bikim û xirab bikim.

Baweriya min bi gelan tê ku ew gel in, yên kû dikarin dîktatoran bixînin. Banga min ji gelan re ye, ji hundirê dilê her dayikekê re ye, ji hundirê bavekî re ye kû tu zarokê xwe bi dilsozî li ser rastî, li ser aşitî û li ser biratiyê xwedî bikî. Dîrok wê rehma xwe bi we neyne, dîrok wê hesab ji we bixwaze. Çawa hûn niha bi serê zarokên Kurd dikin, wê dinya li we bizivire. Xweza û dayika xwezayê ji we re nahêle, vî mafî nade her kesî, vî mafî nade we. Wê bide mirovên dilbirehim, dide mirovên dilsoz yên kû ji welatê xwe û axa xwe hez dikin."[619]

Van mirovên dilbirehm û dilsoz di ***Berxwedana Rûmetê*** ya li dijî dagirkeriyê de şev û rojên xwe kirine yek. Di serî de şervanên YPJ, YPG û QSD'ê çeperên xwe girtin û li dijî hêzên dagirker gelek çalakiyên bi bandor kirin. Wekî din, gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemû di meş û çalakiyên girseyî de ruhê yekîtiyê û helwesta xwe ya hevbeş nîşan da. Pêşengiya jinê ya di vê pêvajoyê de di kesayetên Hevrîn Xelef, Amara Rênas û Dayika Eqîdê de darîçav dibû. Bi pêşengiya van sê jinên leheng, bi sed hezaran jin li qadên siyaset, leşkerî û civakî seferber bûn. Bangewaziya Kongra Star a bi sernavê ***'Jin Rojava diparêzin'*** di qada navneteweyî de deng veda. Li çar aliyên cîhanê jin ji bo parastina Şoreşa Rojava û li dijî hevkariya welatên xwe bi dewleta Tirk re bi rojan li ser kolanan bûn, çalakî û meş li dar xistin. 303 tevger û rêxistinên jinan û nêzî 2 hezar kesayetên jin, deklarasyoneke hevbeş weşandin bi daxwaza *'Sekinandina şerê dagirkeriyê yê dewleta Tirk li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê – demildest!'* û radestî saziyên navdewletî kirin. Her wiha li gelek welatan jinan komiteyên piştgiriyê saz kirin da ku rêxistinbûna jinên cîhanê ji bo parastina destketiyên şoreşa jinê ya li Rojava xurttir û daimî bikin.

- **Berxwedana Rûmetê**

[619] Hevpeyvîn bi Mizgîn Tahir re, Qamişlo, 2019

Ji 9'ê Cotmeha 2019'an ve şervanên QSD, YPG û YPJ'ê di tevahiya eniyan de tevî endamên Hêzên Parastina Civakî, Asayîş, Meclîsên Leşkerî û ciwanên ji pekhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemûyan li dijî êrîşên dagirkeriyê ji bo parastina ax û civaka xwe ketin şerên giran.

Şervanên YPJ'ê di şerê çaremîn de yê ku di salên Şoreşa Rojava de li bajarê Serêkaniyê qewimî, careke din di hemû eniyan de bi vîneke mezin pêşengiya berxwedanê dikirin. Fermandarên YPJ'ê yên wekî **Zeynep Felat** û **Nêrgîz Şewiş** di Berxwedana Rûmetê bi ked, fedekarî û biryarbûneke bilind heya dawî li hemberî balafir, tang û topên arteşa Tirk û hovîtiya çeteyan şer dikirin. Şervanên jin ên Kurd, Ereb û înternasyonalîst di çeperên şer de têkoşîneke hevbeş ji bo parastina bajêr meşandin û ruhekî hevbeş bi wan re çêbûye. Şervana YPJ'ê **Nûda Heleb** yek ji bi dehan jinên ciwan ên Ereb bû ku bi coş û lehengî tevlî şerê Serêkaniyê bûn. Xwesteka wê ya bipêşketinê pirr bû. Hevrêyên wê dibêjin, ew bi şervanên ji neteweyan hemûyan re dibû yek. Dema ku Nûda tevî fermandara xwe ji bo parastina rêya Til Xelefê çû pêş, ew her du li wir şehîd bûn.

Şervana YPJ'ê Bermal Dilgêş wiha behsa kêliyên berxwedana 10 roj û şevan a Serêkaniyê dike: "*Destpêkê dema ku êrîş kirin, bi balafir û çekên giran êrîşên xwe dan destpêkirin. Lê van êrîşan ti carî li ser hêza me ya moral û baweriya bi serketinê bandora xwe ya neyînî çênekir, kêm nekir. Berovajî, tişta min di hevalên me de didît, ruhekî fedaî bû. Di nava vê berxwedanê de ku gel, zarok, kal, pîr, dayik û ciwan li kêleka şervanên xwe şer dikirin, bi balafiran êrîş birin ser gelê sivîl jî.*

Destpêkê dema ku me dît dijmin dihat, me operasyon da destpêkirin. Me digot, wê çete werin lê me dît ku leşkerên dewleta Tirk bi tangên xwe û çekên xwe yên giran xwestin pêşde werin. Lê hevalên me li tangên wan xistin û dan sekinandin. Piştî wê, çeteyên girêdayî dewleta Tirk ketin tevgerê. Wê demê herî zêde çekên xwe yên giran, obîs û hawanên xwe bi kar dianîn. Di roja destpêkê de jî dema ku êrîş kirin, ti tirsek neket dilê me. Berovajî wê, me hîn zêdetir hêrsa xwe mezintir kir. Çeteyan tekbîr dikişand. Me jî bi dirûşmeya 'Bijî berxwedana Serêkaniyê!' bersiva wan dida. Ji dûr de bi çekên xwe yên giran li cihê me dixistin."

Bermal balê dikişîne ser wê yekê ku arteşa Tirk deriyê sînor vekirin û çekên xwe yên giran ji wir derbas kirin û êrîşên xwe dewam kirin: "*Hevalên me bersiva wan dida û pirr caran wesayîtên wan tine dikirin. Dema ku bersivên me didîtin û derbe dixwarin, êdî dengê wan qut dibû. Ji bona ku derbe nexwin, bi hejmareke mezin dihatin û çekên xwe yên giran û balafirên xwe dixistin dewrê. Hêzeke dijmin ya ku ji bêjahî de êrîş bikin tine bû. Ez karim bêjim, li Serêkaniyê ruhê berxwedanê bi ser ket. Ez bi xwe jî bi moşekên balafira keşifê birîndar bûm. Armanca wan şikandina eniyê bû ya ku em lê bûn. Em birîndar bûn, lê cihê me vala nema. Piştî em birîndar bûn jî hevalan cihê me tijî kir."*[620]

Dewleta Tirk û çeteyên wê nexasim êrîşên giran dianîn ser nexweşxane û ambulansên ku sivîl û şervanên birîndar radikirin. Ji ber vê, gelek birîndar û xebatkarên tenduristiyê di rêyan de şehîd bûn. Di rojên dawiyê de nexweşxane ji aliyê leşker û çeteyên dewleta Tirk ve hatibû dorpêçkirin. Hêzên YPJ û YPG'ê li qata jorê ya nexweşxanê ji bo parastina birîndaran bi şev û roj şer kirin, ji bo bijîşk bikarin di jêrzemînê de amaliyatên birîndarên giran çêbikin. Bermal li ser rewşa nexweşxaneyê dibêje:

"Destpêkê dema ku ez birîndar bûm, mudaxeleyeke pirr zêde çênebû ji ber ku êrîş li ser nexweşaxanê jî hebûn. Em hevalên birîndar li qata bodrumê diman. Em 4 rojan li wir man. Lê em hemû jî bi moral bûn. Ji ber ku baweriya me hebû ku em ê derkevin. Pirr caran grûb dihatin, lê

[620] Bermal Dilgêş: *Li Serê Kaniyê Rihê Berxwedanê Bi Serket*, Navenda Ragihandina YPJ, 27-11-2019

dijmin nedihişt ku heval werin, birîndaran xilas bikin. Pirr caran gel di rê de ji ber yoxuntiya şer şehîd dibûn. Atmosfera wê giran bû lê baweriya me jî mezin bû. Hevalan derdora me diparast. Erkdarên bijîşk hejmareke kêm bû, lê moralê ku didan me jî bilind bû."[621]

Di rojên berxwedana Serêkaniyê de çend caran karwanên girseyî yên sivîlan ji bajarên Cizîrê hemûyan bi rê ketin da ku dorpêça li ser Serêkaniyê bişikînin. Ev karwanên sivîlan bi xwe jî dibûn armanca êrîşên çete, balafir û moşekên arteşa Tirk. Di 13'ê Cotmeha 2019'an de balafirên şer li karwanekî milet û rojnamevanan xist gava ku vî karwanê wesaîtan xwe gihandibû navenda bajêr. Rojbîn Ekîn ku wekî rojnamevan bi vî karwanê re hatibû Serêkaniyê û di êrîşê de birîndar bû, di gotara xwe ya bi navê *'Rêwîtiya ji bo berxwedanê û şopên demê: Serêkaniyê'* de li ser kêliyên êrîşê wiha dinivîse:

"Em ji wesayîtên xwe peya bûn, dengê tilîliyên dayikan ji sûkê dihat. Wekî ku welatê xwe hembêz bikin, şervan hembêz dikirin dayikan. Her kes li ba hev bû. Dema gihîştinê ya wisa bû ku min nikaribû bi ti gotina razdar bînim ziman. Min ew dema gihîştinê, tenê dikarîbû bi çend kareyan bikşînim.
Dûre, dema ku ez bi teqînekê hilpekiyam... Ez li erdê bûm, li aliyê min ê rastê germahiyek û hîsa şewatê û tevizîn. Min nizanibû dijîm yan na. Gelo dema ku jê re dibêjin, di navbera mirin û jiyanê de ew dem bû... Di nava çend saniyeyan de min çavên xwe vekirin. Kareya pêşî min dît sê bedenên parçebûyî bûn. Li derdora min tiştek ku hereket bike tinebû. Di guhên min de tenê vizîniyek hebû... Destpêkê min destên xwe da stûyê xwe, min dît şil e, dûre min destên xwe da çaqa xwe ya çepê ya min hîs nedikir. Saxlem bû. Wê demê min ji xwe re got "Tu dijî, divê tu rabî" û min hewl da ez rabim. Wê demê bi hesta ku ez tenê ji bo şahidiyê sax mabim, min hewl da ez kameraya telefonê vekim, diviyabû yekê ew bazara can qeyd bikira. Min nikarîbû.
Çend metre li pêşiya min dayikek bi fistanê reş ser devûrû xwe dirêjkiribû. Dûre hîn bûm ew dayika Eqîde bû... Ew dayika ku piştî Komploya 9'ê Cotmehê her dem kincên reş li xwe dikir û diyar kiribû ku heta Rêber Apo azad bibe ew ê li xwe bike..."[622]

Tevî **Dayika Eqîde** (Eqîde Elî Osman) 11 mirovan di vê êrîşê de jiyana xwe ji dest da û 74 kes birîndar bûn. Di nav şehîd û birîndaran de gelek rojnamevan, jin û zarok jî hebûn. Dayika Eqîde ji Dêrikê bi moralekî bilind li gel gelek dayik û keçên şoreşger ber bi Serêkaniyê ve bi rê ketibû da ku piştgiriyê bide berxwedana şervanan. Wekî endama rêveberiya Kongra Star û Meclîsa Dada Jinê, Dayika Eqîde gelek salan ji bo serketina şoreşa jinê xebat dimeşandin û tevlî berxwedana li dijî dagirkeriyê bû.

Berxwedan û nêrazibûnên li dijî şerê dagirkeriyê yê dewleta Tirk him li Bakur û Rojhilatê Sûriyê him jî di qada navneteweyî de her diçû dijwartir dibûn. Li hemberî vê berxwedanê, Emerîka di 17'ê Cotmehê de û Rûsya di 22'yê Cotmehê de bi Tirkiyê re li ser şertên 'agirbestê' li hev kirin. QSD'ê da xuyakirin ku ew ê piştgiriyê bide hewldanên li pêşiya girtina qirkirina etnîkî û sekinandina şer. Di encama berxwedanê û hewldanên siyasî de korîdoreke insanî hatiye vekirin da ku birîndar ji dorpêça li ser nexweşxaneya Serêkaniyê karibin xilas bibin. Lê belê dewleta Tirk û çeteyên wê piştî daxuyaniya 'agirbest'ê êrîşên xwe domandin.
Hejmareke mezin a birîndaran ku bi rojan bê agahî ji derve mabûn, dema derketinê hestên dualî bi wan re peyda bûne. Şervana YPJ'ê Bermal dibêje, "*Dema ku ez piştî çend rojan ji nexweşxaneyê derketim, baran dibariya. Dema ku em derketin jî di aliyekî de em bi êş derketin lê di aliyê din de jî ji ber berxwedana ku hat meşandin, em kêfxweş bûn. Niha ez li vê derê me. Lê baweriya me ya*

[621] Çavkanî li heman cihî

[622] Rojbîn Ekîn:*'Rêwîtiya ji bo berxwedanê û şopên demê: Serêkaniyê',* Malpera *Women Defend Rojava*, 08-12-2019

ku em ê bi ser bikevin heta dawiyê di dilê me de ye. Em ê vê carê hîn bi kîn û hêrseke mezintir bi ser dijmin de biçin. Em soza vê jî didin."[623]

Hemwext bi berxwedana Serêkaniyê re di eniyên herêma Firatê, Girê Spî û Til Temirê jî şerên dijwar qewimîn. Li wir jî şervanên YPJ, YPG, QSD'ê û yên meclîsên leşkerî ji bo parastina ax û rûmeta xwe şer kirin. Bi pêşengiya fermandara **Zîn Amara,** bi sedan şervanên Kurd, Ereb, Tirkmen, Aşûrî, Suryanî û Ermenî çeperê xwe bernedan. Heta şehadeta xwe di 13'ê Cotmeha 2019'an de ew di eniya Silûkê de li dijî êrîşên tang, top û balafirên arteşa Tirk û çeteyên wê bi risteke pêşeng di meşandina berxwedanê de rabû. Zîn Amara ji şerê Serêkaniyê yê sala 2013'an û berxwedana Kobanê heta şerê têkbirina DAIŞ'ê, di gelek eniyan de bi lehengî, hevaltî û berpirsyariya xwe baweriyeke mezin dabû hevrêyên xwe. Wê bi sedan şervanên YPJ û YPG'ê perwerde kirine û him wekî perwerdekar, him jî wekî fermandareke şer jê dihat hezkirin.

Heman rojê nûçegîhana çapemeniya YPJ'ê, **Dilovan Gever** jî di bombabarana balafirên arteşa Tirk de şehît bû. Ew li keleka şervanên di eniya Girê Spî de bû û wê hewl dida kirinên dewleta Tirk û qehremaniya berxwedanê bi kameraya xwe tomar bike da ku heqîqeta vî şerî bê zanîn.

Di eniyên Berxwedana Rûmetê hemûyan de jinên ji tevahiya pêkhateyên neteweya demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê têkoşîneke hevbeş bi armanceke hevbeş meşandin. Şervana YPJ'ê **Yildiz Taner** a bi eslê xwe Turkmen, li eniya Eyn Îsa li dijî êrîşên dagirkeran tevlî berxwedanê bû û di 19'ê Cotmehê de şehîd bû. Yildiz Taner gotibû, dîtina şervanên jin yên Kurd di şerê Helebê de û bihîstina têkoşîna YPJ'ê li hemberî DAIŞ'ê bandor li wê kiribû. Ji ber vê, ew sala 2017'an li Helebê tevlî nav refên YPJ'ê bû. "*Lêgerînên min ez anîm nav rastiya tekoşîneke wiha bi hêz. Min jî weke jineke Turkmen xwest ez mafê xwe zanibim, ev der ji bo naskirinê zemînekî bi hêz e. Dawî de ji bo tevahiya jinan dibêjim, pêwîst e jin bi mafên xwe bizane û ji bo wan şer bike."*[624]

Di nav jinan de ku ji bo parastina ax û nasnameya xwe çek rakirin, Madlên Xemîs jî heye. Di sala 2017'an de me bi wê re li gundê wê Helmondê li ser ava Xabûrê, hevpeyvîneke dirêj li ser dîroka gelê Aşûrî, qirkirina Seyfo û têkoşîna jinên Aşûrî çêkiribû.[625] Wê li dijî êrîşên El-Nusra û DAIŞ'ê di salên 2013 û 2015'an de şer kiriye. Niha jî ew wekî endama rêveberiya Meclîsa Parêzvanên Xabûrê di berxwedana li dijî êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk de cihê xwe digire. Piştî qirkirinên ku Împaratoriya Osmanî û dewleta Tirk di destpêka sedsala 20'an de li dijî gelên Aşûrî, Suryanî, Ermenî û Keldanî meşandibû, sala 2019'an gelên Xirîstiyan careke din bi metirsiya komkujî û qirkirinên bi destê dewleta Tirk re rû bi rû ne. Lê rewş niha cuda ye, ji ber ku di pêvajoya Şoreşa Rojava de têkiliyên xurt ên hevgirtinê di nav gelan de hatine avakirin û hemû gel bûn xwedî hêzên xwe yên parastinê. Madlên xeterên şerê dagirkeriyê ku dewleta Tirk di 9'ê Cotmehê 2019'an da destpêkirin û rewşa gel û jinên Aşûrî wiha dinirxîne:

"Metirsî ne tenê li ser gelê Aşûrî, lê ji bo tevahiya gelên herêmê û hemû pêkhateyên wê heye. Çi Aşûrî, Suryan, Ermenî, Keldanî, Kurd an jî Ereb, em li vir li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hev re dijîn. Him Misilman him jî Xirîstiyan, em bi biratiya gelan di wateya wê ya rastîn de dijîn. Ti ferq û cudahî di navbera me de tine ye, ji ber ku gava dijmin êrîşî navçeyekê dike, ti cudahiyê di navbera Aşûrî, Kurd an jî Ereban de nabîne. Her tiştî wêran dike, dişewitîne û xirab dike. Rehmê ne li mirov û ne jî li keviran dike. Ev dijmin ti cudahiyê di navbera hilweşandina dêr an jî

[623] Bermal Dilgêş: *Li Serê Kaniyê Rihê Berxwedanê Bi Serket*, Navenda Ragihandina YPJ'ê, 27-11-2019

[624] Yildiz Turkmen: *Ez Ji Bo Naskirina Nasnameya Xwe Beşdar YPJ'ê Bûm*, Navenda Ragihandina YPJ'ê, 25-11-2019

[625] Binêre: Beşa 3 ya vê pirtûkê: Bingehê Neteweya Demokratîk û Pêkhateyên Bakurê Sûriyê

mizgeftekê de nabîne. Ji ber vê yekê ez dibînim xetereke pirr mezin e. Weke gelên herêmê ku bi hev re dijîn, divê em li dijî hemû êrîşên ku li ser xaka me pêk werin, bisekinin.
Em weke gelên Aşûrî, bi taybetî jin, di her demê de rastî gelek komkujiyan û zilmê hatine. Ji ber vê yekê divê em berpirsyariya xweparastinê bigirin ser milê xwe û bi ser de karê malê, adet û kevneşopiyên xwe jî biparêzin. Jin ji mêj ve bi fedakariyê tên zanîn. Kesa herî bikêr e, ku dikare her tiştî bike.
Niha ev dagirkerî û êrîşên dewleta Tirk a Erdoxan û komên girêdayî wê, xetereke mezin derdixin holê. Ev metirsiyeke mezin di nava gelê herêmê de çêdike. Bi taybetî jî li ser gelên Asûrî, Suryan, Keldan û Ermen, ew gelên ku ji hêla Osmaniyan ve rastî komkujiyan hatin, weke komkujiyên Seyfo û Sêmelê metirsî bêhtir e. Ger dewleta Tirk êrîş û binpêkirinên ku komên çekdar ên terorîst pêk tînin bidomîne, em wê weke qirkirineke li dijî van gelên resen û jêbirina şaristaniya bi hezarê salan dibînin. Ji ber vê, ez berxwedana jinên berxwedêr silav dikim, jina ku li rex rêhevalên xwe bi çekan li eniyên pêş disekine, da ku axa xwe biparêze."[626]

Tamara Garabet Sarkîs wekî jineke Ermenî û dayika 8 zarokan, di eniya Berxwedana Rûmetê de cihê xwe digire. Ew 33 salî ye û endama Tabûra Ermeniyan Şehîd Nûbar Ozanyan e ku sala 2019'an hatiye avakirin. Bi destpêkirina şoreşê re ew tevlî nav refê Hêzên Xweparastinê û YPJ'ê bû û wê li dijî êrîşên El-Nusra, DAIŞ'ê û dewleta Tirk li Serêkaniyê şer kir. Ew dibêje: "*Ji bo xwe, zarokên xwe û tevahiya mirovahiyê biparêzim, ez tevlî hêzên leşkerî bûm."* Di hevpeyvîneke bi rojnamevan Bêrîtan Sarya re di 28'ê Cotmeha 2019'an de ew wiha dipeyive:

"Şoreş çawa ku pêk hat ez jî bûm beşek ji wê. Zewicî me û 8 zarokên min hene. Keça min a piçûk bi min re qet nema. Dema ku ew ji dayikbû şoreş pêk hat. Ez jî neçar mam zaroka xwe li malê bihêlim û ji bo parastina gelê xwe rahêjim çekê. Wê demê çekên me zêde nebû. Min rahiştibû çeka malbata xwe. Tirkiyeyê Ceyş El-Hur ji sînorê Bakur derbas kir ku êrîşî me bikin. Me jî; Kurd, Ereb, Suryan û Ermen bi hev re dest bi parastina xwe kirin. Me êrîşên wan têk birin. Wê demê QSD nebû, lê belê me fikrên Rêbertî nas dikirin. Li mala me pirtûka Rêbertî hebû, me dixwend. Fikrên mezin ên Rêbertî kir ku em jin xwe nasbikin. Nêrînên wî yên di pirtûkan de em xurt kirin. Di sala 2012'an de dema ku çeteyan li Serêkaniyê êrîş kirin jin û gelan bi hêza ji fikrên Rêbertî wergirtî li ber xwe dan."

Wê demê Tamara endameke YPJ û QSD'ê bû. Lê dema ku Tabûreke Ermeniyan hatiye avakirin, ew kêfxweş bû ku ji bo parastina gel, ziman û nasnameya wê, hêzeke taybet a parastinê çêbû. Bi vê tabûrê, Tamara di eniya Serêkaniyê de tevlî Berxwedana Serdemê bû.

"Çawa ku dijminê me di sala 1915'an de 1,5 milyon Ermen qetil kir, careke din bi heman rengî êrîş kir. Bi têgihiştina 'jiyana azad di bin pêlava dagirker û kujeran de nabe' em jî tevlî parastina Serêkaniyê bûn. Dewleta Tirk careke din êrîşî jin, zarok û gelên Kurd, Ermen û Ereban kir. Gundên me vala kir. Em neçar man ji Serêkaniyê derkevin, lê belê berxwedana me bi dawî nebû û wê bi dawî nebe. Artêşa Erdogan artêşeke qirêj, bêexlaq û bêwijdan e ku dûrî ji mirovahiyê ye; mirovan, jin, zarok, extiyar her kesî qetil dike. Em ê artêşa Erdogan têk bibin. Erdogan bi çekên kîmyewî êrîş dike. Gelo çima dewletên dinyayê bêdeng dimînin? Di bin çekên kîmyewî de qîrîna zarokên me bilind dibe, bedenên wan bi çekên kîmyewî tên helandin. Ji ber ku em xaka xwe, zarok û jiyana xwe diparêzin Tirkiye ji me re dibêje 'terorîst' û dinya li ber vê tiştekî nake. Mafên me nîne gelo? Mafên mirovan ên ku dinya qalê dike li kû ne?"[627]

[626] Hevpeyvîn bi Madlên Xemîs re, Til Temir, 2019

[627] Bêrîtan Sarya: *Şervana Ermen: Nebin hevparê êrîşa dewleta Tirk*, ANF, 28-10-2019

Pirraniya jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê zanîbû ku ew ê li hemberî êrîşên dagirkeriyê tenê bikarin baweriya xwe bi hêza xwe ya cewherî û hevgirtina gelan bînin. Êdî ti baweriya wan nebû ku wê hêzên dewletî wan biparêzin. Dersên dîrokî û hevdemî, bi taybetî helwesta hêzên hegemon û saziyên navdewletî di mijara dagirkeriya Efrînê de dibûn sedem ku jin û civak siyasetên ku li ser axa wan tên meşandin, zelal bibînin û binirxînin. Lê dîsa jî jinan bi çalakî û berxwedana xwe bang li wijdanê mirovahiyê kir. Ji ber ku di çanda resen a Rojhilata Navîn û ya gelên cîhanê de wijdan, edalet û exlaq her tim nirxên girîng bûn. Ji bo hebûna hêviyê û wateya jiyanê jî parastina van nirxên mirovahiyê teqez pêwîst e.

Em dikarin êş û birînên kûr yên ku tevî hêrsa li hemberî dagirkirina axa wan di dilê dayik û jinan de vebûne wekî hestên serî rakirinê li dijî xemsarî û derewên rayedarên hêzên navneteweyî şirove bikin. Siyaset, têkoşîn û berxwedanê li gorî pîvanên exlaqî, wijdan û edaletê dibûn hêza jinên Rojava yên ku pêşengiya şoreşê kirin. Bi vê nêzikatî ew ji bo jinên li gelek welatên cîhanê bi xwe bûn mînak û hêviyek a ku hatibû windakirin. Zalim û kedxwar herî zêde ji vê hêz û bandora jinê ditirsin, careke din wan bi rêbazên qirkirinên hewl didan ku vîn û kesayeta jinên şoreşger bişikînin.

- **Êrîşên li dijî Pêşengên Şoreşa Jinê**

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ji destpêka vî şerî ve jî careke din bi taybetî jinên têkoşer kirin armanca êrîşên xwe yên hovane. Di 12'ê Cotmeha 2019'an de çeteyên dewleta Tirk seyareya Sekretera Giştî ya Partiya Sûriya Misteqbalê[628] **Hevrîn Xelef** xist kêmînekê. Hevrîn Xelef wekî nûnera jinên azadîxwaz yên Sûriyê ji aliyê çeteyan ve hate girtin û piştî êşkenceyên giran, hate qetilkirin.

Tevî ku di 17'ê Cotmehê de biryara agirbestê hatibû ragihandin jî, dewleta Tirk û çeteyên wê kirinên xwe yên li dijî mirovahiyê domandin. Di şeva 21'ê Cotmehê de şervana YPJ'ê Amara Rênas ku ji bo parastina gel û axa xwe di eniya Çelebiyê ya kantona Kobanê de cihê xwe digirt, ji aliyê çeteyên dewleta Tirk ve dîl hat girtin. Wekî di şerê Efrînê yê 2018'an de Barîn Kobanê bûyê armanca êşkenceyên zayendperest, Amara Rênas jî bi heman şêwazê ji aliyê çeteyan ve bi êşkencê hat şehîd kirin. Di heman rojê de dema çeteyan êrîş bire ser gundê Mişrefa yê navçeya Eyn Îsayê, şervana YPJ'ê Çîçek Kobanê ku di vî şerê dijwar de birîndar bû, dîl girt û ew revandin.

Dîmen û daneyên din ên sûcên di dema şer de ku leşker û çeteyan dewleta Tirk di vî şerî de li dijî jinan kirin, feraseta zordestiya zilam bi rengekî xwînxwar derdixin holê. Tecawiz, parçekirin û dagirkirina bedena jinê, di vî şerê dagirkeriyê de careke din wekî amûreke şer û dagirkirina axê hatin şuxilandin. Kongra Star ev êrîşên li dijî bedena jinê bi tundî şermezar kirin û da xuya kirin ku ev pêkanînên di şexsê Şehîd Amara û Şehîd Hevrîn de, êrîşên li dijî bedena jinan hemûyan in.

Li hemberî van êrîşên bi armanca tinekirina şoreş û berxwedana jinan, jinên li tevahiya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriye, li Kurdistanê û welatên cîhanê, bi çalakiyên şermezarkirinê bersiv da. Nexasim di meşên girseyî yên 25'ê Mijdara 2019'an de Şehîd Hevrîn, Amara û Dayê Eqîdê bi peyamên xurtkirina têkoşînê ji bo têkbirina dagirkeriyê û biserxistina şoreşa jinê, hatin bibîranîn.

- **Parastina Rojava Parastina Şoreşa Jinê Ye**

[628] Partiya Sûriya Paşêrojê

Di berxwedana Kobanê de nasname û têkoşîna jinên Kurdistanê di kesayeta şervanên YPJ'ê de di dinyayê de hat nasîn. Di heman demê de vê berxwedan hêz û bixwebawerî da jinan hemûyan ku li Rojava di qadên civakî, siyasî, aborî, leşkerî, çand, huner, ziman û zanistê de xebat ji bo avakirina jiyaneke azad û civakeke demokratîk, dimeşandin, wan jê hêz girt. Jinên ku herêmên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li hemberî hovîtiya DAIŞ'ê, rûmeta xwe parastine û li benda rojên azad bûn, bi wan hêviya wan çêbû. Jinên ku li dereke cîhanê li çareseriyên civakî digeriya û li dijî qirkirina jin, civak û xwezayê têdikoşiya ji wan îlham girt. Bi vî awayî berxwedana jinên YPJ'ê hêz, hêvî û xeyalên jinên ji rastiyên cuda anîn cem hev. Li ser vî bingehî têkiliyên nû yên hevgirtin û hevpariyê di navbera jinên bi nasnameyên cuda de hatin avakirin. Nasname, gotin û destketiyên jinên têkoşer, di qada civakî û siyasî de diyarker dibûn. Bersiva jinan li dijî qirkirinên DAIŞ'ê yên li dijî jinan û gelan, xurtkirina têkoşîna azadiyê û rêxistinbûna jinê bû.

Hêzên desthilatdar li hemberî vê yeke li rê û rêbazên nû geriyan da ku bikarin pêşiyê li belavbûna şoreşa jinê û têkoşînên azadî û demokrasiyê ya gelan bigirin. Lewma her ku têkçûna DAIŞ'ê nêzîktir dibû, dewleta Tirk karîbû projeya xwe ya dagirkirina Bakurê Sûriye bi pejir û piştevaniya hêzên împeryal gav bi gav bi pêş ve bibe. Bê guman li dijî êrîşên dagirkeriyê yên arteşa duyemîn a NATO'yê şervan û gelên Rojava berxwedaneke leheng bi pêş xistin û rûmeta xwe parastin. Dîsa ji bo parastina Şoreşa Rojava çalakiyên piştgiriyê yên jin û gelan li gelek welatên cîhanê belav bûn. Lê belê mekîneya mirin û hilweşandinê ku bi berxwedaneke hevbeş li Kobanê hatibû sekinandin, li Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spiyê nesekinî.

Narîn Efrîn sedemên vê rewşê dinirxîne û girîngiya têkoşîn û birêxistinbûna jinên cîhanê destnîşan dike: "*Dijminê ku me li beranberî li Kobanê şer kir, DAIŞ bû. DAIŞ wê demê ji bo tevahiya dinyayê xeter bû. Gelê Bakur, gel û jinên cîhanê hemû bi me re rabûn. Li Efrînê dinya ne bi me re bû. Dinya dewleta Tirkiyê wek dagirker nedidît. Li gorî vê nêz nedibû. Dinyayê, Erdogan û siyaseta wî ya qirêj meşrû kir. Şehîd Viyan jineke ji Kobanê bû. Fermandara cebheyekê bû. Li şerê Kobanê yê li dijî El-Nusra wê fermandartî kir û şer kir. Eynî wê jina YPJ'ê li Efrînê jî şer kir, lê bi balafirên dewleta Tirk şehîd ket. Çima dinyayê ev jin, ev şervanên YPJ û YPG'ê ku li Kobanê li dijî dijminê mirovatiyê şer kirine, li Efrînê xist kategoriyeke din? Çima li Kobanê bû qehraman, çima li Efrînê kirin 'terorîst'?*

Hevsengiyên dinyayê li hemberî me cuda bûn. Berjewendî esas hatiye girtin. Berxwedana YPJ'ê li Efrînê ne ji ya li Kobanê kêmtir bû. Bi sedan hevalên jin şehîd ketin. Li hemberî vê berteka jinan çi bû? Li Kobanê civaka dinyayê, jinên cîhanê piştgirî dan me. Vê bawerî û moral da me. Dewleteke fermî ne li pişta me bû. Ger em tenê piştgirî didin, dema ku welatê me yê fermî jî piştgirî dide, wê demê me wekî jin jî ev feraseta desthilatdariyê li pey xwe nehiştiye. Em di siyaseta xwe de hîn ji zilamê desthilatdar ne qut in. Ji ber ku helwesta me ya serbixwe nîne, em di bin bandora siyaseta desthilatdar de dimînin.

Pêwîst e em serbixwe bifikrin, serbixwe xwe rêxistin bikin û têkoşîn bikin da ku em bikarin hevgirtina jinên cîhanê pêş bixin. Ez bawer im ku ti jinê di hundirê xwe de vê rewşa ku li Efrînê qewimî, qebûl nedikir. Me gelek mesajên piştgiriyê yên jinên cîhanê yên tekakesî jî girtin. Lê ev têrê nake, pêwîst e ku ev hest bizivire çalakiyê. Ger jinên dinyayê li hemberî siyaseta dewletên xwe hemû rabana û bigotana 'van jinan em xilas kirin û em deyndarê wan in. Lewma pêwîst e em tiştekî ji bo wan jinan bikin.' Vê demê Efrîn wê nedihatiba dagirkirin, ne jî bi sedan hevalên YPJ'ê ku Kobanê rizgar kirine, bi balafirên Erdogan li Efrînê nedihatin şehîd xistin. Hêza jinan li cîhanê pirr mezin e. Li welatê xwe jin dikarin bandorekê li ser siyaseta vî welatî bikin. Ew nebe, em

nikarin xwe ji vê pergala ku jin û jiyanê tine dike, rizgar bikin. Pêwîst e em nehêlin ku zilam yan NATO yan dewletek çarenûsa me diyar bike.

Berxwedana Serêkaniyê jî ji ya Kobanê ne kêmtir bû. Li wir jî bi sedan heval bi balafirên dewleta Tirk şehîd ketin. Ne bawerî, ne jî cesareta hevalan kêm bû. Li vir jî hevalên jin [li] ber xwe didan, paşde nezivirîn. Lê çekên me li hemberî balafiran tine bûn. Li Kobanê jî hevsengiya çêkan tine bû. Lê herî kêm êrîşên azmanî vê demê tine bûn. Helwesta jinan û gelên cîhanê li hemberî dagirkeriya dewleta Tirk xurt bû. Lê nikaribû siyasetê dinyayê bide guhertin. Gavên pratîkî çênebûn. Lewma gel mecbûr ma ji bajarê xwe derkeve û îro di bin çadiran de ne. Guhertinên demografîk tên meşandin. Çênabe ku em wek jin vê siyasetê qebûl bikin. YPJ hîn di nav berxwedanê de ye. Hêviyên me yên rizgarkirina hemû herêmên ku hatin dagirkirin û têkçûna siyaseta desthilatdar, hene. Biryardarî û têkoşîna me wek YPJ'ê berdewam dike. Lê em ji jinên cîhanê re dibêjin ku divê her jin xwe li hemberî şoreşa jinê û hêza wê berpirsyar bibîne. Dema ku jin li welatekî serketinekê bi dest bixin, ev bandorê li jinên li hemû cihên cîhanê dike."[629]

Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di aliyek de bi têkoşîneke hevbeş li dijî dagirkeriya dewleta Tirk û DAIŞê, di aliyê din de bi pêşxistina feraset û sazîbûnên neteweya demokratîk ve gavên girîng avêtin da ku vîn û siyaseta jinê ji bandora mêhtingeriyê rizgar bikin. Ew pîvanên xwe yên civaka exleqî û polîtîk cardin zîndî kirin. Li ser bingehê hêza xwe ya cewherî, wan di serdema Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de serketina xwe li dijî hilweşandina nirxên mirovahiyê û çanda xwedawendan misoger kiriye.

d) Avakirina Ruh û Saziyên Hevbeş ên Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê

- ***Çanda Hevjiyana Jinan û Gelan***

Ji salên 1980'yî ve gelek Kurdên Rojava bi xeyala avakirina Kurdistana serbixwe dest bi xebat û têkoşîna azadiyê kirine. Li hemberî parçekirin û înkarkirina neteweya Kurd; li hemberî komkujî, asîmîlasyon û nijadperestiya dewletên dagirker, Kurdan xwest ku dewleteke yekbûyî ya Kurdan saz bibe. Bendewariyên gelek Kurdan ji Şoreşa Rojava jî di vî alî de bi pêş ketine. Lewma pêşî di fêhmkirin û pêjirandina modela neteweya demokratîk de zehmetî hatine kişandin. Jinên ku wekî cehbewî ji mêj di nava xebat û têkoşînê de cihê xwe girtine, dibêjin, ew di warê fikir û felsefeyê de projeya Abdullah Ocalan rast dibînin û dipejirînin. Lê bele hinek ji wan di hêla hestyarî de hîna bi xeyala dewletbûna Kurdan dijîn. Dema ku mirov dipirse, ew vê 'dewleta Kurdan' çawa xeyal dikin, derdikeve holê ku tiştên ku jin xeyal dikin ji dewletbûnê zêdetir *'aramî, wekhevî û azadiya her kesî'* ne. Bi rastî, tiştên ku jinên Kurd jê mehrûm mane û lêdigerin ev çand û rengên jiyanê ne ku dewletan di jiyana wan de rûxandin û tine kirin.

Her wiha rastîya neteweya demokratîk di civaka Rojava de xwe dispêre çanda civaka dîrokî ya Hîlala Zêrîn. Li ser şopên çanda komînal a dayika xwedawend, şêwaza jiyana neteweya demokratîk hinek aliyên xwe di hemû serdeman de parastine. Wekî din siyasetên nijadperest û olperest ku ji aliyê hêzên dagirker û dewleta Sûriyê ve hatin meşandin, bandora xwe li pêkhate û têkiliyên di nav wan de kir. Bi taybetî, di demên nediyar de an jî li hemberî zehmetiyên aborî carna birînên kûr ên dîrokî zindî dibin an jî nêzîkatiyên nijadperest li ser esasê berjewendiyên takekesî

[629] Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

yan malbatî derdikevin holê. Mînak dema ku Şoreşa Rojava dest pê kiriye, di serî de gumanên hinek kesên Ereb, Elewî, Suryanî, Ermenî û Aşûrî çêbûne. Bandora siyaseta şovenîst a nîzama Beesê û propagandayên nijadperest, tirs dane avakirin ku gelên ne-Kurd hemû ji erdnîgariya Rojava bên derxistin. Dîsa beriya ku herêmên nû yên Bakur û Rojhilata Sûriyê hatine rizgarkirin, DAIŞ û dewleta Tirk jî propagandayên reş belav kiribûn, wekî 'Kurd wê hikumdariya xwe li ser we ava bikin, milkê we û keçên we bibin'. Her wiha di serê gelê Kurd û gelên din ên bindest de cih cihan guman çêbûne. Girêdayî bûyerên xiyanetê û qirkirinê ku di dîroka wan de pêk hatine û şovenîzma dewleta Ereb, gelên bindest jî di warê bawerî anîna bi gelan hemûyan de zehmetî kişandine.

Li hemberî guman û pêşhukmên nûjen û dîrokî, zêhniyet û bedena neteweya demokratîk bûye dijjehr. Nexasim jin di avakirina têkilî û pirên dostaniyê di navbera çand û gelan de her tim bi risteke pêşeng rabûne. Têkilîyên germ, yên cîrantî û civakî her tim hatine parastin. Bi birêxistinkirina komînên Kongra Star re parvekirina bi jinên netewe û baweriyên cuda re di asteke nû de bi pêş ketiye. Endamên Kongra Star dibêjin, *'Berê têkiliyên me tenê bi malbata xwe û civaka Kurd re bi sînor mabûn. Lê niha me him civaka xwe, him jiyan û êşên jinên pêkhateyên din jî naskirin.'* Jinên Ereb, Suryanî, Aşûrî û Keldanî dibêjin, têkoşîn û sekna jinên Kurd bandor li wan kiriye, wan hêz û bawerî ji wan girtiye. Jinên Ereb, Suryanî, Ermenî û Tirkmen ku wekî endamên Asayîşa Jinê, YPJ'ê yan jî saziyên Kongra Star erk girtine, di hevpeyvînan de dan xuyakirin ku wan xebatên hevbeş bi jinên Kurd re bi zanebûn tercîh kirine û vê yekê wekî dewlemendiyekê dibînin.

Piştî rizgarbûna herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, parvekirina ezmûnên têkoşîn û jiyanê di navbera jinên ji pêkhateyên cuda de di asteke nû de bi pêş ketiye. Parvekirina hest û ramanan asoyê jinan hemûyan firehtir û dewlemendtir kiriye. Hacer Zagros balê dikişîne ser guhertina taybetmendiyên têkiliyan di navbera jinên ji netewe û baweriyên cuda de:

"Beriya şoreşê têkiliyên civakî bi rengekî xwezayî hebûn, lê ne di asteke pirr jor de. Pirr nakokî tine bûn. Lê bi giştî têkiliyên pirr nêz û samîmî, têkiliyên bi zanebûn û yên siyasî tine bûn. Têkiliyên di nav tax û gundan de wekî cîran hebûn. Têkilî sînordar bûn, lê di têkliyan de dijbertî jî nebû. Piştî şoreşê, têkiliyên bi zanebûn pêş ketine. Niha di bingehê têkliyên jinên Kurd û Ereb, Kurd û Suryan, jinên Misilman, Êzdî û Xirîstiyan de zêhniyeteke hevbeş heye. Têkiliyên siyasî, rêxistinî û yên bîrdozî çêbûn. Van têkiliyan pirek ji yekîtiya gelan re çêkirin. Sînorên siyasî, yên jeostratejîk û demografîk ku berê hebûn, di van têkliyan de hatin rakirin. Esasê têkiliyan ku bi şoreşê re ava bûne, armanca hevbeş a azadiya jinê ye.

Bi hezaran jinên Ereb niha dixwazin bigihînin kesayeta jina mîlîtan ya ku di rastiya tevgera jinê ya Kurd de hatiye avakirin. Jinên Ereb vê ji bo xwe wekî nasnameyeke azad û demokratîk dibînin. Ew dixwazin xwe bigihînin nasnameya Avesta, ya Barîn, ya Arîn, ya Sakîne, ev nasname hemû di şoreşa me de ava bûne. Bi hezaran wisa ne, jinên Suryan, Ermen, Tirkmen, Çerkes, Arnawut, bi hezkirineke gelekî mezin tevlî xebat û têkoşîna azadiya jinê dibin. Sînor nemaye. Li ser rêya têkoşînê li dijî desthilatdariyê di yekîtî û rêxistinbûna jinê de derket holê. Têkiliyên ku beriya şoreşê bi rengekî xwezayî hebûn, bi şoreşê re bûn têkiliyên bi zanebûn û hezkirinê. Niha di kesayeta jinê de civak ji nû ve tê avakirin."[630]

Di şerê hevbeş li hemberî çeteyên El-Nusra û DAIŞ'ê de hevpariya jin û gelan ava bûye. Jin, zilam

[630] Hevpeyvîn bi Hacer Zagros re, li herêma Qendîlê ya Başûrê Kurdistanê, 2018

û ciwanên tevahî pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Suriyê di refên Asayîşê, YPG-YPJ û QSD'ê de jiyana xwe ji bo parastina ax û jiyana hevbeş û azad fêda kirine. Dîsa nûnertî û tevlîbûna tevahiya pêkhateyan di pergal û saziyên xweseriya demokratîk de gav bi gav firehtir û zêdetir bûye. Jinên pêkhateyan hemûyan di nav hevserokatiyên komîn û meclîsan de, di rêveberî û saziyên xweseriya demokratîk de cihê xwe digirin, nûnertiya jin û pêkhateyên xwe dikin. Pê re naskirina çand, nihêrîn û rastiya hev du jî bi pêş ketiye.

Li kantona Cizîre li wan bajaran ku rêjeya nifusa Ereb û Kurd nêzîkî hev e, di sala 2017'an de di pergala hevserokatiyê de bi pirranî hevseroka jin Kurd bû û hevserokê zilam Ereb bû. Lê li Çilaxa hevseroka şaredariyê jineke Ereb û hevserokê wê jî zilamekî Kurd bû. Hevseroka şaredariya Çilaxa Suad Huseyîn serpêhatiyên xwe wiha dinirxîne: *"Bi destpêkirina Şoreşa Rojava, bi hizrê Rêber Apo re guhertin ji bo tevahiya jinan çêbûn. Di pêvajoya nîzamê de zilaman nedixwestin û nedihiştin ku jin bixebitin. Gava ku ez diçûm cihê kargehê, zilaman ez dixistim xurfeyeke paş û derî li ser min digirtin ji bo kes min nebîne. Berî şoreşê jinên Ereb gelek êş û ziyan didîtin. Ruxmê ku karkirina derveyî malê ji bo jinan 'eyb' dihat dîtin jî, jin dixebitîn. Jinek çiqas ratib anîbe malê, qîmeta jinê ewqas bû. Heta niha jî pirsgirêkên jinên Ereb dewam dikin. Lê guhertinên girîng jî hene. Berê ez di kargeha xwe de hatim veşartin. Lê îro ez hevseroka şaredariyê me. Ji bo min weke jin ev tê wateya pêkanîna xeyalên xwe. Lê heta niha zilam rêvebirina jinê bi rehetî napejirînin û nakokî derdikevin. Min dît ku zilam ji bipêşketina jinê ditirsin."*[631]

Di Sibata 2017'an de li Akademiya Şehîd Farûq a nêzîkî Hesekê, dewra yekem a perwerdeya xweser ya jinên Ereb hatiye lidarxistin. Pirraniya jinan ji gund û bajarên Şedadê, Til Koçer û Minbicê bûn ku nû ji faşîzma DAIŞ'ê hatibûn rizgarkirin. Nîviyê beşdaran jî ji bo tevlîbûna xwe ya vê perwerdeyê bi birayê xwe, bavê xwe yan jî xalê xwe re şer kiribûn. Di dawiyê de hinekan karîbû malbata xwe îqna bikin, lê hinek jî bê destûra malbatê hatin. Jin hemû bi kelecaneke mezin beşdarî nîqaşên perwerdeyê bûne. Di encama dersên li ser dîroka jinê û zayendperestiyê de, ew DAIŞ'ê wekî encama desthilatdariya zilam dinirxînin. Gelek beşdarên perwerdeyê dibêjin, êşên ku wan beriya dagirkeriya DAIŞ'ê jî ji ber zayendperestiya di nav malbat û civaka xwe de kişandine, dişibin êşên ku DAIŞ'ê li ser jinan ferz dikirin. Berê ew hêz bi xwe re nedîtine ku li hemberî van neheqiyan rabin. Jineke Ereb ya ku sê salan di dorpêça DAIŞ'ê de li Şedadê jiyaye, dibêje, bi naskirina têkoşîna jinên Kurd, zêhnê wan ronî bûye: *"Wek jinên Ereb, em ji jinên Kurd hînî gelek tiştan bûn. Nexasim jina Kurd a şervan ji bo me gelekî mînak e. Me bi çavê xwe dît, çawa li pêşiya DAIŞ'ê sekinî û jinên Ereb rizgar kirin. Niha di vê akademiyê de me rastiya civaka xwe û rastiya jinê nas kir. Dema em perwerde dibûn, me xwe hîs kir weke kesekî kor ku dinyayê nû dibîne. Jinên Kurd bûne piştgirî ji bo jinên Ereb. Hûn li me guhdarî dikin, êşa me nas dikin û em bi pêş dikevin. Niha em careke din bê îradebûnê qebûl nakin. Pêwîst e ku jinên Ereb jî rêxistina xwe ava bikin. Piştî rizgariya ji çeteyên DAIŞ'ê me dayikbûneke nû dît."*[632]

Her jin bi êş û hêrs qala bi dehan bûyerên êşkence û kuştinê dike ku wan bi çavê xwe dîtine. Lê dema ku me pirsa mînakên berxwedanê yên jinên Ereb li dijî DAIŞ'ê dikir, ji nişkê ve her kes zîndî dibû. Her jinê herî kêm bi yek yan didu mînakên serîrakina jinan li hemberî DAIŞ'ê zanibû. Bi serbilindî behsa wan bûyeran dikin, wekî yên ku Celîla li herêma Şedadê dîtine: "*Tenê karê çolê me dikir. Me pembû diçand. Heya refa şeşan min xwend. Belkî em çûbana dibistanê, em bibana tiştek mezin. Havînê me li hewşê çandinî dikir. Du jinên hisba DAIŞ'ê hatin û wan got, 'Çima kirasê we yê rengîn xuya dike?' Me got, 'Dinya havîn e. Ma em çawa bikin?' Wan got, 'Em ê we*

[631] Hevpeyvîn bi endamên Kongra Star re, Çilaxa, 2017

[632] Nîqaşên perwerdeyê, dewreya xweser a jinên Ereb, Akademiya Ş. Farûq, 2017

bibin, celd bikin'. Em çûn di mal de. Îcar me li wan da û me got, 'Herin. Em bi we re nayên'. Ew çûn, li seyarên xwe siwar bûn û nema hatin. Bavê min û malbata min got, 'We qenc kir ji wan'."[633]

Di van mînakên berxwedana jinan de derdikeve holê ku gelek jinên civaka Ereb serê xwe netewandine. Her çiqas zilmkarên DAIŞ'ê her peyv, her tevger heta her nefesgirtina jinê karibûn bikin hinceta êşkence û qetilkirina wê, gelek jinan bi helwesta xwe rûmet û kesayeta xwe parastine.

Me xwest hîn zêdetir çavkaniya hêza berxwedanê ya jinan di çanda eşîr û dîroka civaka Ereb de nas bikin. Ji ber vê me pirsa çîrokên kevin û kesayetên jin yên leheng, yên bi nav û deng di dîroka Ereban de dikir. Wê demê pirraniya jinan wiha bersiv da: *"Me nexwendiye. Em dîrokê nizanin. Lê di gundê me de jinek hebû, ew gelek leheng û jêhatî bû. Her kes bi çîroka wê dizane."*

Çiqas jî pirtûkên li ser van kesayetên jin ên berxwedêr nehatine nivîsandin, di bîra civakê de çîrokên wan hîna winda nebûne. Jineke Ereb ji Tirbespiyê çîrokeke wiha ya dayika dapîra xwe dibêje: "*Diya dapîra min çûbû ber çemê Xabûrê. Kurikek ket çemî de. Her kes kom bû, lê nedikarîn xwe bavêjin çemî. Ji ber ku av kûr bû. Hingê diya dapîra min cilê xwe hemû ji xwe kirin û çû kurik ji çemî derxist. Wê ji xwe re digot, 'Milet çi bêjin, bila bêjin. Ez ê kurik derxim.' Hingê civakê fesadî dikir û digot, 'Ji xwe fedî nake'. Lê dema DAIŞ hat, civakê gelek behsa vê jinê kir û got, 'Niha ew jin hazir baya, ew ê li ber DAIŞ'ê rabûya û bêdeng nedima'."*[634]

Tevî ku di kesayeta gelek jinên Ereb de çand û vîna berxwedanê xuya dibe, kokên vê çandê di dîrokê de hîna kûr nehatine lêkolan û bi nihêrîna jinê nehatine şirovekirin. Heger xebatên bi vî rengî hatibin meşandin jî, pirraniya civakê ji van bêpar hatiye hiştin. Gelek jinên Kurd bi bandora nirxandinên Abdullah Ocalan li ser serdema neolîtîk û çanda xwedawendan, dîrok û çîrokên kevnar ên civaka xwe meraq kirine. Hinekan dixwend û lêdikola, hinekan jî bi baldarî li çîrokên dayik û dapîrên guhadarî kiriye û ew şirove kirine. Bi vî rengî zanebûneke civakî hatiye bidestxistin.

Lê belê li gorî nîqaş û hevpeyvînên ku me bi jinên Ereb re kirin, çavdêriya me ew e ku hîna jinên Ereb derfet nedîtine ku çavkaniyên dîroka xwe ya dewlemend berfireh kişf bikin. Mînak, di perwerdeyên Jineolojiyê de gelek jinên Ereb anîn ziman ku wan heta vê demê pê nizanibû yan jî wate nedaye çanda xwedawendan a ku beriya Îslamiyetê di nav qabîleyên Ereb de serwer bû. Jinên xwende û lêkoler dibêjin, ew derbare dîtina çavkaniyên berhemdar li ser dîroka jin, civak û çanda Ereban de zehmetiyan dikişînin. Lewma zanînên gelên Sûriyê di mijarên dîrokî de bi pirranî xwe dispêrin Quranê yan jî pirtûkên dibistanê yên dewletê. Bi danasandina rêbazên lêkolîn û zanînê yên Jineolojiyê gelek jinên Ereb meraq û daxwaza xwe ji bo lêkolana dîroka xwe diyar kirine. Bipêşxistina xebatên bi vî rengî wê rê li pêşiya ji nû ve avakirina nasnameya jina afirîner û têkoşer di civaka Ereb de veke.

Herçiqasî jinên pêkhateyan hemûyan di rêxistinên Kongra Star û ya xweseriya demokratîk de bi nasnameya xwe cih digirin û xebatê hevbeş dimeşînin jî pêdiviya jinan xuya dibe ku rêxistinên taybet bi nasnameya xwe ya neteweyî yan jî baweriyê ava bike. Heqîqeta jinê di hemû civakan de bi destavêtinên pergala desthilatdariya zilam û dewletê hatiye berovajîkirin. Bi feraset û mîtolojiyên zayendperest, nijadperest û olperest jin ji koka xwe, ji çavkaniyên xwe yên jiyan û

[633] Çavkanî li heman cihî

[634] Çavkanî li heman cihî

zanînê hatin qutkirin. Di pêvajoya Şoreşa Rojava de jinên ji pêkhateyan hemûyan bi lêpirsîna vê rewşa biyanîbûnê dest pê kirin. Ji ber ku di rastiya şoreşê de wan dît ku gelek tabû, qedexe û sînorên ku li ser jinê wekî qanûnên teqez hatibûn ferzkirin, bi rastî berevajiyê xwezaya jinê û exlaqê civakî ne. Lewma jin hewce dibînin ku di rastiya çand û dîroka gelê xwe û baweriya xwe de li heqîqata xwe bigerin.

Ji bo derxistina holê ya heqîqata xwe, xwegihandina kesayet û mafên xwe, li aliyekî cesaret divê. Ji ber ku jin hingê mecbûr dimînin ku elimandinên kevn, adet û teqilîdên civaka xwe yan jî qeydên eşîrên xwe bixin ber lêpirsînê. Bi vê re tirsa dûrxistina ji malbatê yan jî helwestên nerênî yên civakê bi jinan re peyda dibin. Li aliyê din tirsa wan heye ku eşkerekirin û lêpirsîna nêzîkatiyên zayendperest yên li dijî jinê, wê ziyanê bigihîne nav û rûmeta netewe, ol yan jî eşîra wê. Di vê biwarê de bi taybetê jinên ji pêkhateyên bi hejmareke kêm yan jî yên ku ketine ber qirkirinê, zehmetiyan dikişînin. Sermeselê, xebatkarên Mala Jinê li hemû navçeyên Rojava diyar kirin ku miracaetên jinên Xirîstiyan li cem wan tine ne yan jî pirr îstîsna ne. Li bajarên wekî Qamişlo, Heseke, Dêrikê, Serêkaniyê, Tirbespî yan jî Til Temirê ku tê de hejmareke têra xwe ya civaka Xirîstiyan li wan heye jî rewş bi vî rengî bû. Bi vî rengî xuya dibe ku jinên Xirîstiyan ji bo çareseriya pirsgirêkên xwe yên malbatî yan jî pirsgirêkên ku bingehê wan zayendperestiya civakê ye, Mala Jinê wekî navnîşana xwe nabînin.

Li ser vê pirsê me bi nûnera jinên Suryanî, cihgira Desteya Jinê ya Kantona Cizîrê Emel Kûriya re di meha Nîsana 2017'an de nîqaş kir. Wê bal kişand ser pêdiviya avakirina saziyên xweser yên jinên Suryanî: *"Pirsgirêkên jinên Suryanî gelek hene. Lê ew van pirsgirêkan eşkere nakin û bi rêya kîlîseyan dixwazin çareser bikin. Lê ev nabe çareseriyeke bingehîn. Ji ber vê yekê, divê saziyên Mala Jinê yên jinên Suryanî werin avakirin. Bi vê rêbazê em dikarin pirsgirêkên jinên Suryanî zanibin û nîqaş bikin. Tirs ji ber êrîş û qirkirinên DAIŞ'ê û windakirina baweriya xwe heye. Ji ber vê, gelek hemwelatiyên me yên Suryan ji herêmê çûne û berê xwe dane welatên dûr."*[635]

Ev yek destnîşan dike ku pêwîst e jinên ji pêkhateyên cuda di pergala xweseriya demokratîk de hîn zêdetir sazîbûnên xwe yên xweser li ser bingehê çand û baweriya xwe ava bikin da ku jinên wan pêkhateyan bikarin pirsgirêkên xwe eşkere parve bikin û rêyên xwe yên çareseriyê bibînin. Bi vî rengî derfetên nû wê çêbin da ku jinên pêkhateyan hemûyan bikarin xwe li ser koka xwe, ji nû ve înşa bikin.

Mala Jinê wekî rêxistinbûneke di rastiya şoreşa jinê ya Rojava de hatiye avakirin. Tecrûbe û berhemên ku di xebatên vê saziyê de derketin holê, ji jinên Suryanî yên li herêma Cizîrê re dibûn bingehek ji bo gaveke nû di têkoşîna xwe de biavêjin. Di encama hewldanên Yekîtiya Jinên Suryanî de vekirina Mala Jinên Suryanî 'Eşterot' di 29'ê Îlona 2019'an de bi merasîmekê li bajarê Qamişloyê hatiye pîrozkirin.

Di mînakên vekirina Mala Jinên Suryanî û lêgerandina jinên Ereb ji bo keşif kirina dîroka xwe de, hêz çareseriyê ya feraset û rêbaza neteweya demokratîk diyar dibe. Rêgeza *'Yekîtî di Cihêrengiyê de'* hêzê dide bipêşxistina rêxistinên xweser yên her pêkhate, kom û nasnameya civakî. Jinên her pêkhateyê tecrubê û berhemên nû ava dikin û di heman demê de ji danehevên jinên din sûd werdigirin. Bi rêya sazî û meclîsên hevbeş yên ku bi Şoreşa Rojava re hatine sazkirin, danehevên jinê ku di herêmekê yan jî beşeke civakê de hatin avakirin, dibin destketiyên jinan hemûyan. Bi vî rengî feraseta neteweya demokratîk li pêşiya jinê rê vedike da ku jin bi reng û nasnameya xwe bibin hêza çareseriya pirsgirêkên civakî û dîrokî.

[635] Hevpeyvîn bi endamên rêveberiya Desteya Jinê ya kantona Cizîrê re, Qamişlo, 2017

- **Înîsyatîfa Jinên Sûriyê**

Damezrandina Înîsiyatîfa Jinên Sûriyê bûye yek ji pêngavên destpêkê ji bo avakirina rêxistinbûneke hevbeş a jinên Sûriyê li ser esasê neteweya demokratîk. Êş û daxwazên hevbeş yên jinên Kurd, Ereb, Aşûrî, Suryanî û Keldanî di salên destpêkê yên şoreşê de jê re dibûn bingeh. Ji bo pêşî li parçekirina jinan û gelan li ser esasê nijadperestî û olperestiyê were girtin, 150 jinên ji pêkhate û rêxistinên cuda yên Sûriyê bi pêşengiya Yekîtiya Star di 28'ê Adara 2013'an de li bajarê Qamişloyê hatin cem hev. Wan nihêrînên xwe li ser rewşa siyasî û civakî li Sûriyê û Rojhilata Navîn parve kirin. Wan wiha nirxand ku jinên li gelek cihan wek li Tûnis û Misrê, di serhildanên gel de rabûn, lê belê nikaribûn mafên ku hêvî kirin, bistînin. Lewma damezirînerên înîsiyatîfê pêwîst dîtin ku hevkarî û yekîtiya jinên Sûriyê bi pêş bixin. Wan bawer kir ku tenê bi yekîtî jin wê bikarin di avakirina pergaleke demokratîk ya Sûriyê de bibin xwedî gotin û biryar. Bi vê armancê Înîsiyatîfa Jinên Sûriyê wekî platformeke hevbeş a rêxistin, sazî û kesayetên jin ji tevahiya pêkhateyan hatiye sazkirin.

Wekî xebata yekem, wan pêşnûmayek derbarê mafên jinê de amade kir. Bi vî rengî wan nihêrînên hevbeş yên jinên Sûriyê ji bo destûreke bingehîn a nû û demokratîk a Sûriyê da xuyakirin. Lêkolînên li ser daneyên derheqê tundiya li dijî jinê de, bandora şer û rewşa jinê li girtîgehên Sûriyê hatine destpêkirin. Di encama van hewldanan de têkiliyên rêxistinî û civakî di nav jinên ji pêkhatiyên cuda de bi pêş ketin. Wekî din biryara avakirina Meclîsa Jinên Sûriyê wekî sazîbûneke daimî û hevbeş di civîna damezrandina înîsiyatîfê de hatibû dayîn. Jinên ku ev xebat şopandin, dibêjin, avakirina Înîsiyatîfa Jinên Sûriyê di wê demê de wekî pêşbînî û tedbîr ji bo siberojê bû û gaveke girîng bû. Ew didin xuyakirin ku bi vî awayî jinan '*şoreşek li hundirê şoreşê*' çêkiriye û vîna xwe ji bo avakirina siberoja xwe û bihurîna ji pêşhukmên nijadperest û olperest, danîne holê. Bi vî awayî Înîsiyatîfa Jinên Sûriyê peşengiya avakirina Meclîsa Suriyeya Demokratîk (MSD) jî kir. Di encama nihêrîna hevbeş a jinan de di kongreya damezrandina MSD'ê de ya ku di 8 û 9'ê Kanûna 2015'an de li Dêrikê pêkhat, pergala hevserokatiyê jî hate pejirandin.

Li ser bandora rola jinê di xebatên MSD'ê de hevseroka Meclîsa Gel a kantona Kobanê, Bêrîvan Hesen dibêje, "*Dema ku sîstema MSD'ê hatiye rûniştandin, jinên ji Şam, Heleb, Hima û deverên din yên Sûriyê jî tevlî sîstema neteweya demokratîk dibûn. Yanî ev keda ku hatiye dayîn, îro li ser asta Sûriyê [bi] pêş dikeve. Jinên Ereb ku cara ewil dihatin û tevlî civîn û xebatan dibûn, li hemberî rastiya vê kedê matmayî diman. Lê tiştê ku hişt ku pêşketinên bi vî rengî çêbibin pergal û zêhniyeta xweseriya demokratîk e. Ji bo hêz û rengê jinê li hemû cihan derbikeve holê, em dixwazin xwe bigihînin hemû jinên Sûriyê."*[636]

- **Meclîsa Jinên Sûriyê**

Înîsiyatîfa Jinên Sûriyê di 5'ê Sibata 2016'an de li Dêrikê Konferansa *'Jinên Sûriyeyê ji bo Aşitî û Demokrasiyê'* li dar xist. Ji vê û şûnde amadekariyên ji bo kongreyeke li ser asta Suriyeyê li herêman hemûyan hatin meşandin. Di encama van xebatan de konferansa damezrîner a Meclîsa Jinên Sûriyeyê (MJS) di 8'ê Îlona 2017'an de li bajarê Minbicê pêk hat. Di vê konferansê de 202 nûnerên jin ên partî, rêxistin, sazî, yekîtî û kesayetên serbixwe yên gelek herêm û bajarên Sûriyeyê

[636] Hevpeyvîn bi Bêrîvan Hesen re, Kobanê, 2017

beşdar bûn. Rojeva serekê ya konferansê bipêşxistina rola jinan ji bo çareseriya aloziya Sûriyeyê bi rêya diyaloga demokratîk bû. Tevî hilbijartina berdevk û koordînasyona MJS'ê li ser asta Sûriyê, biryara firehkirina rêxistinbûnê û avakirina mektebên herêmî yên MJS'ê jî hatiye dayîn.

Cumana El-Elî wekî berdevka jinên Reqayê cihê xwe di rêveberiya Meclîsa Jinên Sûriyê de digire. Ew girîngiya xebatê MJS'ê ji bo siberoja Sûriyê û guhertinên siyasî wiha şirove dike: "*Damezrandina MJS'ê piştî damezrandina MSD'ê hatiye nîqaşkirin ji bo vîna jinê di siyaseta Sûriyê de xuya bibe. Ji ber şer û pevçûnên hundirîn li Sûriyê, pêwîst e çareserî di çarçoveya destûra bingehîn a nû ya Sûriyê de [bi] pêş bikeve. Berê mafê jinê tê de nehatin parastin. Siyaseta Sûriyê ji sedî 99'ê zilaman dan diyarkirin. Ji sedî 1'ê nûnertiya jinê nebû. Vê bandora xwe li ser siyaset û qanûnên Sûriyê çêkir. Em niha li ser destûreke nû ji bo siberoja Sûriyê dixebitin. Pêwîst e tê de mafên jinê werin parastin. Delegeyên MJS'ê ji hemû herêmên Sûriye hene. Em bi wan re nîqaş dikin û karê xwe koordîne dikin ji bo em destûreke nû ya bingehîn ava bikin. Ji bo çareseriya giştî ya Sûriyê, şandeke 7 jinan wekî delegeyên MJS'ê jî tevlî hevdîtinên Sûrî - Sûrî dibin, yên ku vê dawiyê li Eyn Îsa hatin [bi]pêşxistin."*[637]

Cumana El Elî balê dikişîne ser sererastkirina feraset û pergala hiqûqê li Sûriye ku heta niha di bin bandora olê de hatiye meşandin: "*Pêwîst e em siyaset û qanûnan dûrê olê binirxînin. Ji ber ku hêzên wekî DAIŞ'ê yên ku niha li Sûriyê şer dikin bi rêya olê mafên jinê ji holê rakirine. Di 5'ê Cotmeha 2018'an de me civîneke mezin li Kobanê bi beşdarbûna hiqûqnasên jin ji hemû herêmên Sûriye çêkir. Me li ser nêrînên jinê ji bo destûra nû ya Sûriyê nîqaş kir. Li wir ev nêrîn derket holê ku pêwîst e em qanûnên xwe dervê qanûnên olî derbixin. Ji ber ku jinên Mesihî hene, yên Misilman hene, jinên ku baweriya wan a olî nîne. Lewma çênabe ku em qanûnên jinê li ser bingehê olê ava bikin."*[638]

Endamên MJS di asta Sûriyê û herêman de xebatên xwe bi koordîne dimeşînin ku di heman demê de înîsiyatîf û pêdiviyên taybet ên herêman li ber çav digirin. Tevî astengiyan hewildanên nû ji bo bipêşxistina sazibûna MJS'ê hene. Cumana El-Elî diyar dike ku ***'êşê ku me di bin serweriya DAIŞ'ê kişandin, bûne çavkaniya hêza me ya îro'***. Li ser vî bingehî ew behsa armanc û bipêşketina xebatên xwe dike:

"MJS xebatên xwe bi lijneyan dimeşîne, wekî lijneya qanûnî, ya aborî, ya arşîvê, ya dîplomasiyê û ya rêxistinkirinê. Ev lijneyên hanê xwe di asta bajaran de jî bi rêxistin dikin. Bi taybetî lijneya hiqûqî niha pirr aktîf e, ji bo em amadekariya xwe ji bo destûreke nû ya Sûriyê bigihînin encamekê. Ev lijne li ser rewşa jinên di girtîgehan de jî disêkînin. Em bi giştî rewşa jinê di girtîgehan de lêkolîn dikin: Hepsên nîzamê, yên Ceyş el Hur, yên li cem DAIŞ'ê û yên li cem QSD'ê. Em ji vir li Reqa dengê jinên Reqayê ji bo destûreke nû digihînin jinên li Sûriyê hemûyî. Pêwîst e were zelalkirin ka jin wê çawa mafê xwe di dadgehan de bikare biparêze. Di dozên berdanê de li gorî adetên eşîrî zarok ne aydê jinê ne û jin nikare milkê xwe, zêrê xwe li cem xwe bigire. Li herêma Reqa çanda eşîrî serwer e. Em niha li ser vê dixebitin, em dikarin mafê jinê di rewşa berdanê de çawa biparêzin. Em li ser pêşniyazên xwe nîqaş dikin û encamên nîqaşê xwe digihînin MSJ'ê ji bo ku ev mafê jinê siberojê werin parastin.

Mijareke din a esasî jî rewşa jinên ciwan e. Em dixwazin beşa jinên ciwan jî di nav meclîsê de ava bikin. Me mektebên herêmî yên MJS'ê jî ava kirin û tevlîbûna jinan zêdetir dibe. Navenda me niha

[637] Hevpeyvîn bi Cumana El-Elî re, endama Meclîsa Jinên Sûriyê (MJS), Reqa, 2018

[638] Çavkanî li heman cihî

li Qamişlo ye. Lê em amadekariyê dikin da ku em navenda xwe di paşerojê de bibin Reqayê. Ji ber ku êşa herî mezin a jinên li Sûriyê, jinên Reqayê dîtine. Wekî din hewildanên endamên me li herêma Siwêde [bajarekî nêzîkî Şamê, di bin kontrola nîzama Beesê de ye] heye ku mekteba xwe fermî li wir vekin. Wan destûrname amadekir û teslîm kir. Lê hîna bersiv nehatiye. Siwêde ji bajarekî Durizî ye. Lewma rejîm îsal [2018] li vir pêşiya êrîşên DAIŞ'ê vekir ji bo Duriziyan ji vir derxin. Ev leyîstikek bû, wekî rewşa ku li Şengalê hat serê jinên Êzidî. Bi taybetî jinên Durizî pirr êş dîtine. Jin digirtin û ser jêdikirin. QSD ket tevgerê ji bo ku jinên Durizî rizgar bikin. Ji bo xwedî derketina li jinên Durizî me wekî MJS'ê jî girîngî da nûnertiya xwe ya li Siwêde. Heger ew were qebûlkirin, ew ê bibe gaveke dîrokî û li pêşiya vekirina mektebên MJS'ê li bajarên Sûriyê hemûyan wê rê vebe.

Di salên destpêkê de me pirr zehmetî kişandin. Jinên ku li herêmên nîzamê dixebitin, nikarin pirr aktîf bibin. Hinekan jî ji tirsa xwe da paş. Ji ber pirsgirêkên çûn û hatinê em civîna xwe salê carekê li dar dixin. Ji ber ku gelek nûnerên me ji herêmên di bin kontrola nîzamê de tên. Dema ku endamên me tên Bakurê Sûriyê, nîzam jî dizane ku ew ji bo civînan tên û astengiyan çêdikin. Lê em bi rêya skype û medyayên civakî daîmî di têkilîyan de ne. Çar endamên me yên MJS'ê li derveyî welat jî hene: Yek li Ewrupayê, yek li Qetarê, didu li Siûdî. Ew jî bi rêya skypê tevlî civînan dibin. Lê îsal 60 delegeyên me karibûn ji Şamê bi teyarê werin Qamişlo û tevlî civîna salê bibin. Wisa xuya dike ku nîzam jî êdî dixwaze ku çareseriyek were nîqaşkirin."[639]

Ji bo jin di avakirina civaka demokratîk û siyaseta çareseriyê de karibin xwedî nihêrîn, rist û biryar bin, Meclîsa Jinên Sûriyê li Tebqayê û Reqayê akademiyên xwe ava kirin. MJS armanc dike ku bi rêya van akademiyan asta bîrewerî û parastina mafên jinan li tevahiya Sûriyê bi pêş bixe. Akademiyên Meclîsa Jinên Sûriyê li Tebqa û li Reqayê di 2'yê Sibata 2018'an de hatin vekirin. Endamên rêveberiya akademiyê didin zanîn ku heta dawiya sala 2018'an wan heft dewreyên 25 rojî bi beşdarbûna 30 ta 35 jinan di her akademiyê de li dar xistiye:

"408 jin dewreyên xwe qedandin. Endamên sazî û jinên ji civakê tevlî bûn, yên ku dixwazin tevlî xebatê bibin an jî dixwazin xwe bi pêş bixin. Me rewda vekir ji bo jinên bi zarok jî karibin tevlî bibin. Encameke baş hat girtin. Yek bi yek em li ser pirsgirêkên wan disekinîn. Armanca me guhertina zêhniyetê ye ku di bin zextên DAIŞ'ê, eşîrî û Beesê de şekil girtiye. Xebateke giran û stratejîk e. Ji bo guhertina zêhniyetê dem û israr pêwîst e. Mijara jin û ol, mijara herî hesas e. Lê bi mînakên jiyanî tê fêhmkirin.

Em dixwazin jinan amade bikin ji bo beşdarî saziyan û avakirina civaka demokratîk bibin. Em teşwîq dikin ku jin bi fikrên xwe tevlî bibin û berpirsyariyê ji bo civaka xwe bi xwe rakin. Bê mêjî xebat nayê meşandin. Bi perwerdeyê ve birêxistinbûn, zanebûn û hezkirin tê avakirin. Têkiliyên di nav jinan de û hezkirina di nav wan de bi pêş dikeve. Di hemû saziyan de jin niha bi hev re xwe bi xwe [bi] rê ve dibin. Jin vê hêzê di hundirê xwe de dibînin. Heger mirov birçî be, perwerde encamê nagire. Bê aboriya xweser jin di navbera zilamê xwe û bavê xwe de, tê û diçe, nikare vîna xwe ya azad ava bike. Ji bo vê, em niha projeyan [bi] pêş dixin ku jin karibin pêdiviyên xwe jî bi dest bixin. Piştî perwerdeyê em hewl didin ku jin derfetê bibînin perwerdeya xwe di jiyanê de pê bînin."[640]

639 Çavkanî li heman cihî

640 Hevpeyvîn bi endamên rêveberiya Akademiya Jinên Sûriyê re, Tebqa 2018

- **Meclîsa Jinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê**

Bi rizgar kirina herêmên Minbic, Tebqa, Reqqa û Derazorê û avakirina pergala xwerêveberinê di van herêman de nîqaşên li ser ji nû ve destgirtina pergala rêveberiya xweseriya demokratîk ketin rojevê. Pergala ku di Çileyê sala 2014'an de wekî pergala rêveberiya sê kantonên Rojava hatibû sazkirin, êdî têra herêmê nedikir. Li gorî rastiya nû pênase û sazumanên nû pêwîst bûn. Weke encama civînên MSD'ê û nîqaşên bi rêveberiyên herêmî, bi tevgerên jin û saziyên pêkhateyan re biryara birêxistinkirina Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye dayîn. Li ser bingehê pergala komîn û meclîsên herêman, nûnerên hemû pêkhate, komên civakî û partiyên siyasî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di bin banê rêveberiya xweser de gihandina hev. Di 6'ê Îlona 2018'an de Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê fermî hatiye ragihandin. Di hevpeymana rêveberiya xweser de pergala hevserokatî û nûnertiya wekhev a jin û zilam di saziyan hemûyan de hatiye misogerkirin. Pê re Desteya Jinê ji bo bipêşxistina xebat, sazîbûn û projeyên taybet li gorî pêdiviyên jinê hatiye erkdarkirin.

Her wiha li keleka vê, jinên tevger û pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêdivî pê dîtin ku rêxistinbûneke xweser û hevbeş jî ava bikin. Bi vê armancê, jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 14'ê Hezîrana 2019'an de kongreya xwe ya yekemîn bi dirûşmeya '*Yekîtiya jinên azad misogeriya Sûriyeya demokratîk e*' li bajarê Amûdê li dar xist. 150 nûnerên jin yên tevahiya pêkhate û herêmên xweser yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, yên partiyên siyasî û saziyên civakî di vê kongre de gihiştin hev. Ji bo jin bikarin yekîtiya xwe di înşakirina neteweya demokratîk de avabikin û di çareseriya pirsgirêkên civakî û siyasî de siyaseteke hevpar bi vîn û rengê jinê bi pêş bixin, biryara damezrandina **Meclîsa Jinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê** hat dayîn.

Di 27'ê Tîrmeha 2019'an de Meclîsa Jinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tevî rêveberên jin ên li herêmên Reqa, Tebqa, Dêrazor û Minbicê, pêngavê çalakiyan li dijî gef û dagirkiriya dewleta Tirk ragihand. Bi dirûşmeya *"Em bûn yek, em bi ser ketin. Em ê li ber xwe bidin, da ku xwe biparêzin"* jinan li bajaran hemûyan daxuyanî dan, meş û çalakî kirin. Di çarçoveya vê rêzeçalakiyan de di 1'ê Îlona 2019'an de yekemîn **Komxebata Jinên Êlên Ereb** ên herêmên Reqa, Tebqa, Dêrazor û Minbicê li Keleha Caber a bajarê Tebqayê hat lidarxistin. Heta wê demê kombûnên eşîrî tenê wekî civînên zilamên eşîran dihatin fêhmkirin û lidarxistin. Di encama nîqaş û xebatên neteweya demokratîk de, jinên êlên Ereb 'yekemîn komxebata li ser asta Sûriyê û cîhanê' li dar xist.

Zêdetirî hezar jinên ji êlên cuda yên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşdarî komxebatê bûn. Ew bûn xwedî helwesteke hevbeş di warê bipêşxistina maf û rista jinê de, him jî li hemberî gefên şer û dagirkeriyê yên dewleta Tirk. Hevseroka Meclîsa Sivîl a Dêrazorê Leyla El-Hesen encamnameya komxebatê ragihand û got, "*Komxebat bi armanca balê bikşîne ser rola jinên di qebîle û eşîran de di pêvajoya bê de û banga yekrêziyê bike li hemberî gefên Tirkiyê yên dagirkirina herêmê ku beşek ji xaka Sûriyê dagir kiriye, pêk hat. Jinan bi navê eşîran teqezî li ser girîngiya yekîtiya xaka Sûriyê û redkirina destwerdana derve û hemû cûreyên dagirkeriyê kir.'* Her wiha bal hat kişandinî ser rola jinê di aştî, lihevanîna civakî û berxwedanê de. Di dawiya encamnameyê de hat diyarkirin: *'Keda herî mezin a rizgarkirina herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya jinan e, jin dê berxwedana xwe dewam bikin heta rizgarkirina tevahiya herêmên Sûriyê."*[641]

[641] ANHA/ Tebqa: *Komxebata jinên êlên Ereb bi dawî bû*, 01-09-2019

Sekretera giştî ya Partiya Sûriyê Misteqbalê ya Sûriyê Hevrîn Xelef jî beşdarî vê komxebatê bû. Mehekê paşê, di 12'ê Cotmeha 2019'an de, ew ji aliyê çeteyên dewleta Tirk ve hat qetilkirin. Di hevpeyvîneke bi rojnamevan Ruba El-Elî re, Hevrîn Xelefê wateya dîrokî ya komxebatê nirxand:

"Lidarxistina komxebateke wiha li herêma Firatê ji bo me û ji bo tevahiya jinan bûyereke dîrokî ye. Ev komxebat li ser asta Sûriyê bi taybet û Rojhilata Navîn bi giştî ya yekemîn e. Em bi vê gavê serbilind in û em dikarin bêjin, ev kombûna girseyî ji hêla jinan ve delîl e ku jin dikare ji paş maskeya ku li ser wê di dirêjahiya salan de hatibû ferzkirin, derkeve. Komxebat di demekê de pêk hat ku dewleta Tirk gefxwarina xwe ya dagirkirinê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêde kiribû. Jinan helwesta xwe ya li dijî dagirkeran jî bi awakî vekirî diyar kir.
[...] Di pêvajoyên berê yên dewleta Sûriyê de me dît ku çawa rola jinê di meclîs û saziyan de hat paşguhkirin û di cihên girtina biryaran de ji qîmeta wê kêm dikir. Lê piştî rizgarkirina herêman bi zendeyên jinên leheng û şehîdên jin pêwîst bûye ku tevahiya jinên herêmê bi erkên xwe rabin û tiştên ku li ser tevahiya astan jê têne xwestin pêk bînin. Di vê çarçoveyê de komxebata me xwedî roleke girîng e, û barê me jina giran dike. Lazime em têkoşîna xwe xurt bikin û li xwe xwedî derkevin."[642]

e) Parastin û Avakirina Siberojeke Azad

Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li her warî bi risteke pêşeng di avakirin û parastina neteweya demokratîk de rabûne. Di pêngavên rizgarkirina herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji faşîzma DAIŞ'ê de û di berxwedana li dijî dagirkeriya dewleta Tirk de jinên pekhateyan hemûyan bi heman armancê gihiştin hev. Li hemberî metirsiyan hemûyan, şîarên '***Jin ax û rûmeta xwe diparêzin'*** û '***Bi rengê jinê neteweya demokratîk ava bikin!'*** bûn rojev û rastiya jiyan û têkoşîna hevbeş a jinan. Pêvajoya şoreşê li ser esasê nirxên dîrokî û çanda civakî ya şoreşa neolîtîk û danehevên 30 salî yên Tevgera Azadiya Gelê Kurdistanê, wekî 'Şoreşa Rojava' hatibû destpêkirin û binavkirin. Lê belê pergala xweseriya demokratîk, raman û perspektîfên Abdullah Ocalan di warê azadiya jin û civakê de ne tenê ji aliyê civaka Kurd û xelkê sê kantonên Rojava ve hatin pejirandin. Nexasim li herêmên ku ji zilma DAIŞ'ê hatin xilaskirin, projeya neteweya demokratîk wekî modela çareseriya pirsgirêkên civakî, hêvî û cesaret da civakê û jinan.

"Ev şoreş ne şoreşa gelê Kurd tenê ye, şoreşa gelan, ya jin û civakên bindest hemûyan e. Di civaka Kurd de çandek hebû: Di dema şerên berê de yan jî dema ku eşîran bi hev du re şer dikir him mêr him jî jin bi rengekî cihê xwe di nav wan şeran de digirtin. Weke rêbaza xwezayî ya xweparastinê. Dîsa tecrûbeya dîrokî ya tevlîbûna jinan a nav refên PKK'ê hebû. Ji ber vê di civaka Kurd de di şikandina qalibên feodal de bi avakirina YPJ'ê û tevlîbûna jinan pirr zêde zehmetî nehat kişandin. Bawerî bi jinê re hebû. Hêdî hêdî ev çand dikete nav civaka Ereb jî. Xortên Ereb zû tevlî bûn, lê tevlîbûna keçan pirr zehmet bû. Jinên ji civaka Ereb ku bi Kurdan re di nav hev de jiyane, zû elîmîn. Erebên li Qamişlo, Dêrikê û Helebê çanda me elîmîne. Lê li qadên ku nû hatine rizgarkirin, zehmetî hebûn. Li milê Minbicê beşeke civakî xwendevan bûn. Ev bûye avantaj. Li cihên din hîn zêdetir dûrbûnek hebû. Yên herî girtî eşîrên aliyê Şedadê bûn."[643]

642 Ruba el-Elî: *Şoreş jinê azad dike,* Yeni Ozgur Politika, 07-09-2019

643 Hevpeyvîn bi Şîlan Qamişlo re, Dirbêsî, 2017

Her wiha jinên Şedadê jî behsa bipêşketinan dikin. Hûriya dibêje, piştî xilasiya wan ji DAIŞ'ê di civaka wê de gelek tişt hatine guhertin. *"Berê jina Ereb nedikarî here sûkê. Lê niha em bi pêş dikevin û emrê xwe yê derbas bûyî em hesab nakin. Jin niha li Şedadê dixwaze derbikeve û hemû karan bike. Heya dixwaze bibe asayîş. Ji ber ku hevalên me yên di cebhan de şer dikin, hêz dane jinê, bawerî danê. Civaka me gelekî girtî ye. Lê baweriya me bi me hat, rê li ber me vebû û em kêyfxweş in niha."* [644]

Cîrana wê dide xuyakirin ku rastiya şer û zilma li dijî jinê, girîngiya xweparastinê anî ber çavê jinên Sedadê: "*Ji ber me gelek êş dît, divê jin bizane xwe çawa biparêze, erdê xwe û mala xwe çawa biparêze. Carekê me bihîst, DAIŞ'ê êrîşî malekê kir. Sê jin bi tenê li wir diman û nikaribûn xwe biparêzin, ji ber ku nizanibûn çekan bi kar bînin. Ez naxwazim wisa bibe. Bila jin jî fêrî sîlehê bibe. Ez xwe ji zilaman bêhtir bi hêz dibînim û dikarim her karî bikim û sîlehê dûrî jinê nabînim."*[645]

Hevpeyvînên bi jinên ji pêkhateyên cuda, destnîşan dikin ku tevlîbûna jinan a nav refên YPJ'ê û avakirina hêzên parastina jinê, li gorî rastiya herêm, pêkhate yan jî tevgerên cuda bûye bingehê avakirina qada xweparastinê wekî yek ji rehendeyên neteweya demokratîk. Bi armanca azadiyê ve girêdayî rêxistinbûn û zanebûna jinê di vî qadê de feraset û nêzîkatiyên zayendperestiya civakê ser û bin dikin. Her wiha pêngavên rizgarkirina herêmên Şedadê, Hol, Minbic, Tebqa, Reqa û Dêrazorê, dînamîkên guhertin û veguhertina civakê di nav gelê Ereb de gihandin asteke nû. Ev yek xwe di xwesteka jinên Ereb a tevlîbûna nav refên YPJ'e de û nêzîkatiyên civak û malbatan ên beramberî vê mijarê, dide der. Di civakekê de ku jin li gorî zêhniyet û kevneşopiyên eşîrî û dînî teqez wekî 'namûs' û milk dihatin dîtin, niha bi hezaran jin rêyên nû yên jiyanê ji xwe re hildibijêrin. Pirraniya malbat û eşîr pêşîn li ber tevlîbûna jinan rabûne. Lê belê bi naskirina fikir, çand û exleqê Tevgera Azadiyê re gav bi gav qebûlkirin û piştgirî bi pêş dikeve.

Fermandarên YPJ'ê dibêjin, gelek malbat û eşîr dihatin navendên QSD'ê yan YPJ'ê û dixwestin keçên xwe vegerînine malê. Bav, bira yan jî mezinên eşîrê bawer dikirin ku ew ê bikarin wekî berê bi gotinekê, bi emirekî daxwaza xwe li ser keç yan xwuşka xwe ferz bikin. Lê belê gelek jinên ciwan ku berê li malê bêdeng serê xwe li ber bav û bira tewandin, niha li pêşiya mezinên eşîrê biryara xwe ya tevlîbûnê diparêzin û sedemên biryara xwe bi wan didin fêhmkirin. Malbat jî her diçe bi bandora vîn û helwesta keçên xwe, di dawiyê de biryara wan bi rêzdarî pêşwazî dikin.

"Gelek hevalên jin ku tevlîbûn, keçên eşîran in. Berê ger keçik çûbû cihekî, ji mala xwe derketiba, eşîrê ew dikuşt. Lê ji ber ku eşîr niha dizane em kî ne, keç êdî nayê kuştin ger bizivire malê. Civak û eşîrên Ereb berxwedana jinê nas kirin. Hevalê jin li hemberî meclîsa eşîrî helwesta xwe bi xwe didin xuyakirin. Hinek îqna dibin. Yên ku îqna nabin jî em didin qebûlkirin ku tiştek bi darê zorê li hemberî vê jinê nekin. Berê digotin, 'Hûn keçên me bi zorê dibin'. Lê dema ku fêhm dikin ne bi vî rengî ye, êdî nikarin tiştekî bêjin. Tevlîbûna nav YPJ'e jixwe bi zorê çênabe, nikare li ber xwe bide. Encax ew bi dilê xwe were û tevlî bibe."[646]

Narîn Efrîn jî dibêje, di berxwedana YPJ'ê de guhertinên civakî û yekîtiya gelan bi pêşengiya jinê hatiye avakirin: "*Têkoşîna YPJ'ê bandoreke taybet jî li ser jinên Ereb çêkir. Tevlîbûna jinên Ereb*

[644] Nîqaşên perwerdeyê, dewreya xweser a jinên Ereb, Akademiya Ş. Farûq, 2017

[645] Çavkanî li heman cihî

[646] Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

ne sembolîk e, ne yek yan du jin in. Bi sedan jinên ji hemû herêmên Sûriyê hatin tevlî YPJ'ê bûne. Ji ber ku wan dît ku YPJ ne tenê nûnertiya jinên Kurd, lê hemû jinan dike û ji bo hemû jinan li ber xwe dide. Jinên Ereb di nav şer de, di perwerdeyên me de, wek şervan û fermandar tevlî bûne û ji bo her fedekariyê amade ne.

Di şerên Til Hemîs, Serêkaniyê, Girê Spî û Efrînê de hevalên jin ên Ereb şehîd ketin. Li hemû deverên Rojava bi dehan hevalên jin ên Ereb şehîd ketin. Vê li ser civaka Ereb bandoreke pirr mezin çêkir û rê vekir li ber wê yekê ku jinên Ereb cihê xwe di nav siyasetê de bigirin. Bi vî awayî jinên Ereb bûn şirîkên me yên pêşengtiya şoreşa jinê him bi hejmara xwe, him bi bîr û baweriya xwe.
Ewqas kesên demokratîk, sosyalîst di nav vê civakê de hene, ji bo vê, ev têkoşîneke hevbeş e. Ev ji bo me jî heyecaneke pirr cuda ye. Rengareng jinên ji hemû gel û netewan beşdar dibin. Di berxwedanê de hevaltiyek ava bû, birayetî û xwuşkîtiya gelan pêş ket. Gelek hevalên Ereb dema soza xwe di dawiya perwerdê de didin, soz didin ku ew ê Efrîn yan jî Serêkaniyê rizgar bikin. Yanî ruhekî hevbeş di refên YPJ û YPG'ê de hat avakirin. Çandek hevbeş a şoreşgerî pêş dikeve. Mînak hevalên Ereb stranên li ser berxwedana Efrînê çêkirin."[647]

Tora hêzên xweparastina jinê ku di Şoreşa Rojava de hatiye hûnandin, gav bi gav firehtir û rengîntir bûye. Jinên Suryanî li ser bingehê ramana azadiya jinê û bi armanca parastina destketiyên şoreşê di 30'ê Tebaxa 2015'an de *Hêzên Parastina Jinê ya Bêth Nehrên* (HSNB) ava kirine. Jinên Suryanî ji salên 1990'î ve di warê civakî û siyasî de wekî *Yekîtiya Jinên Bêth Nehrên* xwe bi rêxistin kirin. Xebatên Yekîtiya Jinên Bêth Nehrên û beşdarbûna jinên Suryanî, Keldanî û Aşûrî di nav komîn û saziyên xweseriya demokratîk de bi şoreşa Rojava re bi pêş ketin. Lê belê pêwendiyên jinên Xirîstiyan bi qada leşkerî re pirr kêm bûn. Rêjeya jinên Suryanî di nav hêzên leşkerî wekî YPJ, QSD, û Meclîsa Parêzvanên Xabûrê de li gorî rêjeya beşdarbûnên jinan ji pêkhateyên din pirr kêm bû. Wekî din beşdarbûna jinê di Meclîsa Leşkerî ya Suryanî (MFS), Parêzvanên Xabûr a Aşûriyan û hêzên asayîşê Sotoro de jî lawaz hat dîtin. Jinên Suryanî vê rewşê bi sê sedemên esasî ve girêdidin yên ku di nav pêkhateyên Xirîstiyan yên li Sûriyê de serwer in: Sedema yekem, bandora çanda lihevkirinê ya ola Îsewî ye, ya duyem nebûna nakokiyên kûr bi pergala dewleta Sûriyê re ye û ya seyem jî serwerbûna şêwazeke 'zirav' yê baviksalariyê ye.

Fermandara HSNB'ê Înanna yek ji şervanên destpêkê yên HSNB'ê bû. Ew bi xwe li Elmanya mezin bû û ji bo hemşîre perwerde dibir. Dayik û bavê wê beriya 30 salan ji herêma Tur Abdîn koçî Elmanyayê kiribûn. Bi bandora komkujiyên DAIŞ'ê li ser gelê wê û şehîdên ewil yên Suryanî di sala 2015'an de Înanna biryar da ku biçê welatê xwe û tevlî hêzên parastinê bibe. Li hemberî vê qirkirinê, wê nikaribû jiyana xwe wekî berê dewam kiriba: *"Hinek kes ji min re dibêjin 'tu werêk î'. Lê ji bo min wekî erkeke xwezayî bû ku ez hatim û vî karî dikim."*[648]

Înanna dide xuyakirin ku bi gişt hişyarbûna jinên Suryanî di mijarên azadiya jinê û pêdiviya xweparastinê de lawaz bûbû. Lewma wan di avakirina hêzên xwe yên leşkerî de zehmetî kişandine: *"Li gorî rewşa jinên Kurd û Ereb, jinên Suryanî hinekî serbest in. Lê ruxmê vê, yan jî belkî ji ber bindestbûna xwe jinên Kurd hîn zêdetir çalak in. Jinên Sûrî yên Xirîstiyan xwe pirranî azad dihesibînin. Ew dikarin serbest tevdigerin. Lê belê jinên Suryanî di cewherê xwe de ne azad in, tenê di şikl de. Lê dendika her jinê heye ku tiştek dikare jê derkeve.*

[647] Çavkanî li heman cihî

[648] Hevpeyvîn bi fermandar û şervanên HSNB'ê re, Dêrik, 2018

Destpêkê me di tevlîbûna jinên ciwan ên vir de zehmetî kişand. Her dayik û bav dixwaze ku keç û kurê wê kêfxweş û ewle bijî. Wan digot, 'Ev ne karê keçan e. Kî li we meyze bike? Ev karekî bi xeter e! Ka xort nînin ku dikarin vî karî bikin û alîkariya we bikin?'
Gelê me bawer nedikir ku me hêza xwe ava kiriye. Ew hatin akademiya me, şaş diman û digotin: 'Bi rastî hûn hene!' Niha hinekî fêrbûne. Girîng e ku em nêzî gelê xwe bin da ku em bikarin baweriyê bidin avakirin. Wê demê hemû pirsgirêk çareser dibin."[649]

Akademiya HSNB'ê dewreyên perwerdeya leşkerî û bîrdozî ji bo şervanên jin yên Suryanî, Keldanî û Aşûrî li dar dixe. Carna jî tektûk jinên Ereb yan jî Kurd tevlî wan dibin. Li ser sazkirina xebatên perwerdeyê Înanna dibêje: "*Dema destpêkê hinekî zehmet bû ji ber ku jinên gelê Suryanî û bi giştî jinên Rojhilata Navîn fêrî nebûn cihê xwe di nav hêzên leşkerî de bigirin. Ew fêrî vê dîsîplîn û hişyarbûnê nebûn. Ji bo her yekê ji me zehmetî hebû, yên bedenî jî. Lê di dawiyê de me bi ser xist. Heke vîna te xurt be, tu rêya xwe jî peyda dikî. Di dewra yekemîn a meheke de em 30 - 35 jin bûn. YPJ û MFS'ê perwerdeyên me yên çekdarî dikirin. Perwerdeya me ya bîrdozî li ser dîroka gelê me û dîroka jinê hevalên me yên Yekîtiya Jinên Bêth Nehrên dida."*

Tîmên HSNB'ê bi nasnameya xwe tevlî hemleyên rizgarkirina Hol, Şedadê û Reqayê bûn û tecrûbeyên şer bi dest xistin. Înanna dibêje: "*Di Hamleya Holê de em di eniya paş de bûn ji bo em hawaya şer û cebhê nas bikin. Lê li eniya Şedadê em du mehan di yekniyên êrîşê de bûn. Li Hol û Şedadê em bi MFS'ê re tevgeriyan. Lê li Reqayê me tevî YPJ'ê şer kir. Em fêrî gelek tiştan bûn."*[650]

Fermandara HSNB'ê Nahrîn Mîşel Gewriyê tevlîbûna hêzên xwe ya nav pêngava Xezaba Firatê wekî bersiveke li dijî desthilatiya zilam û feraseta desthiladariyê dinirxîne: "*Jinên me çek girtine destê xwe, xwe di her aliyê de îsbat kirine. Ev têkoşîna me, zilaman jî diguhere. Em ji bo azadiya jinên Keldanî, Suryanî, Aşûrî, Kurd, Ereb li eniyê Reqayê cihê xwe digirin. Em û YPJ'ê bi hev re tola jinan ji DAIŞ'ê radikin. Baweriya me ew e ku wê bi têkoşîna li dijî DAIŞ'ê jiyaneke azad, wekhev û demokratik bê avakirin."*[651]

Înanna dide zanîn ku pirraniya jinên Aşûrî û Suryanî yên ji DAIŞ'ê hatin rizgarkirin, nikarin li ser bûyer û êşên xwe biaxivin. Lê belê hinek jin diwêrin. Kesayeta xurt a Rîtayê pirr bandor li Înannayê kiriye: "*Rîta 4 sal girtiya DAIŞ'ê bû û çend caran hatibû firotin. Niha ew li cem me ye û têkoşîna azadiyê berdewam dike. Ez guhertinên civakî dibînim. Jin niha zêdetir vekirî ne. Berê dema zilam amade bûn, jin nediaxivîn. Lê niha ew bi xwe bawer in. Hêvî heye. Ev pirr xweş e."*
Şervanên Înanna jî li ser zêde dikin: "*Ji bo me pirr girîng e û serbilindiyek e ku yekîneya me ya jinên Suryanî a xweser heye. Jinan yekîtiya xwe ava kir."*[652]

Bingehê yekîtiya jinan di neteweya demokratîk de bi birêxistinbûna pirralî û xweser ya jinên bi nasnameyên cuda dest pê kir. Niha bi heman pêdivî û armancan digihîjin hev. Mînak, di 22'yê Îlona 2019'an de yekemîn akademiya hevbeş a Hêzên Xweparastinê-Jin li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi beşdarbûna jinên ji hemû pêkhateyan hate vekirin. Sînor, tirs û pêşhukmên ku bi hişmendiya zayendperest, olperest û neteweperest ya desthilatdaran di jiyana jinan û navbera gelan

[649] Çavkanî li heman cihî

[650] Çavkanî li heman cihî

[651] Jinên Beth Nahrîn: *Ji bo hemû jinan ber bi Reqqa ve dimeşin*, ANHA, 08-03-2017

[652] Hevpeyvîn bi fermandar û şervanên HSNB'ê re, Dêrik, 2018

de hatin xêzkirin, her diçe nerm dibin û ji hev de dikevin. Bi vî rengî lêgerînên nû û enerjiyeke nû derdikeve holê.

"Ji destpêkê ve di aliyê gelan de pejirandina pergala neteweya demokratîk ji dil çêbû. Gel dibîne sîstemeke nû ye. Gel alîkariya rizgarkirina bajarê xwe dikir û dest bi înşayê dikir. Lê zor û zehmetî di milê zêhniyeta desthilatdar de derdikevin holê.
Di kaosa sedsala 21'ê de nakokiyên neteweyan, mezhebî, etnîk, civakî, çandî û cinsî li cîhanê hemûyî xwe didin der. Nakokiya esasî ya desthilatdarî ye. Şerên ku niha li cîhanê hemûyî tên meşandin şerên desthilatdariyê ne. Neteweya demokratîk ji van pirsgirêkan hemûyan re dibe formula çareseriyê. Her kes nasnameya xwe dixwaze, nûnertiya vîna xwe dixwaze, her kes edaleta civakî dixwaze. Ev jî tê wateya ku vîna her kesî pêwîst e were naskirin. Neteweya demokratîk rengan hemûyan qebûl dike û wekî dewlemendiyekê dibîne. Jixwe, jiyan yekreng, homojen çênabe. Civak çiqas rengareng be, ewqas pêşketî ye. Di vê pergalê de em dikarin çareseriya pirsgirêkên jiyan û civakê hemûyan bibînin. Tişta herî balkêş di bajarên ku nû hatine rizgarkirin de xwedîlêderketina jinan e. Jin bi hezkirineke mezin derdikevin holê û xwe di her qadê pergalê de tevlî dikin. Ji ber ku jin û zilam wekhev di sîstemê de cihê xwe digirin. Jin azadiya xwe tê de dibîne. Lewma bi hezaran jinên Ereb cihê xwe di nav vê pergalê de digirin."[653]

Endama Meclîsa Jinan a Reqayê Xewla Îsa destnîşan dike ku niha erka wan ya herî girîng perwerdekirina civakê ye. Ew bawer dike ku bi perwerdeyeke rast ew ê bikarin tirs û hilweşandinên di ruhê mirov û civakê de li pey xwe bihêlin ku wekî şopên zordestiya DAIŞ'ê xuya dibin:
"Dema DAIŞ'ê, mirovan nikaribû bigihin hev. Jinan nikaribû bigihin hev ji ber ku zilam ji DAIŞ'ê tirsiyan û nedihiştin ku em derbikevin. DAIŞ'ê tirseke ewqas kûr [di dilê mirovan de] çandiye ku hîna, niha jî gelek kes ditirsin. Bîrdozî û zêhniyeta DAIŞ'ê gelek bandor li civakê kir. Di nav bajêr de hûn hîna gelek jinan bi cilên wan ên reş dibînin. DAIŞ rêxistineke terorîst e ku ne tenê di nav Sûriyê de, lê bi taybet ji derve hatiye avakirin. Ji bo kesek dengê xwe neke, wan di destpêkê de bi kuştin û girtina mirovan tirs dane avakirin. Dewlet jî ji DAIŞ'ê ditirsin. Lewma di serê mirovan de fikireke bi vî rengî çêbû ku DAIŞ daimî ye û ne mimkun e ku DAIŞ têk biçe. Bê hevîbûn çêbû. Hemû têkiliyên me bi dinyaya derve re hatin qutkirin. Televizyon, telefon, înternet qedexe bûn. Yên ku bi dizî ewana bi kar anîn, dihatin cezakirin yan jî kuştin. Me nizanibû li dinyaya derve çi heye.

Beriya DAIŞ'ê jî me derdora xwe nas nedikir. Em ji taxa xwe dernediketin. Lê niha em dizanin rewş û pirsgirêkên jinê di van bajaran hemûyan de çi ne. Em tên û diçin, û em alîkariyê didin hev. Bi rêya civîn û semîneran, em ji malbatan re yên ku zarokên wan di nav DAIŞ'ê de ne, niha didin fêhmkirin ku DAIŞ rêxistineke terorîst bû. Ew bûn sedema xirabûna bajêr û sersebeba êşên gel. Li bajarên wekî Minbic, Tebqa, Reqa, Derazorê ku demeke dirêj li bin desthilatdariya DAIŞ mane, tenê ew sazî hebûn ku jinan tê de êş dîtine. Lê niha me di wan bajaran hemûyan de cara yekemîn saziyên ji bo mafê jinan ava kirin.

Niha dibistana zarokan ji nû ve hat vekirin. DAIŞ xwendin qedexe kiribû û dibistan kiribûn navendên xwe yên leşkerî. Zarok niha piştî pênc salan, careke din refa yekemîn dixwînin. Ew pênc salan ji perwerdeya xwe şûnde mane. Ez bixwe di refa duyemîn a zanîngehê bûm. Lê min nikaribû

[653] Hevpeyvîn bi Hacer Zagros re, li herêma Qendîlê ya Başûrê Kurdistanê, 2018

xwendina xwe xilas bikim. Rast e, bajarê me di şer de xirab bûye. Lê niha ya herî girîng ev ku em kesayet ava dikin."[654]

Ji bo kesayetek bi fikr û vîneke azad were avakirin, zanîna dîrokî û polîtîk girîng e. Di vî warî de perwerdeyên di akademiyên civakî û jinê de, nexasim jî dersên Jineolojiyê bi xwestek û meraqeke mezin tên pêşwazîkirin. Dema ku serpêhatiyên bi êş, rast tên tehlîlkirin, ew dikarin bibin sedema gavên nû ber bi azadiyê ve. Çiqas nîqaş û lêpirsîn li ser ziyanên ku ferasetên desthilatdariyê li şexs û civakê bi rengekî eşkere û kollektîf bi pêş bikevin, ewqas jî wê gengaz be ku têkiliyên baweriyê di nav civakê de werin nûjenkirin.

Ji nû ve pênasekirina exlaq û nirxên civakî li ser bingehê pîvanên çanda dayika xwedawend a Mezopotamyayê, dikare bibe dijjehra ferasetên desthilatdar. Bi vî awayî bingehekî rast ji bo bipêşketina zêhniyet û sazûmaniyên xweseriya demokratîk û neteweya demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikare were xurtkirin. Ji bo li pêşiya xeterên dagirkeriyê û zordarên nû were girtin, yekîtî û birêxistinbûn ji bo parastina ax û civakê şertekî bingehîn e.

"Heman tişt ku li Reqa çêbû, niha li Efrînê çêdikin. Gelê resen ji axa xwe derdixînin, Ereb û çeteyên xwe li wir bi cih dikin. Demografiya herêmê diguherin. Heman siyaset ku li Reqa meşandin niha li Efrînê dimeşînin. Parçekirina Sûriyê heye. Di nav welatê me de sînor çêkirine. Dewleta Tirk axa me dagir dike û hemû dewletên navneteweyî ji vê re bêdeng dimînin. Êşa me li Efrînê berdewam dike."[655]

Tevî ku jinên her pêkhate û herêmê bi zehmetiyên xwe re têdikoşin, ew bi hev du dihesin û xwe li hemberî hev berpirsyar dibînin. Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê gihiştin vê bîreweriyê ku hema êrîşek li hemberî kîjan herêm, gel yan jî jinê tê kirin, ev di heman demê de êrîşek e li dijî hebûn û siberoja hemûyan. Lewma, tevî cudahiyên xwe, ew di qadên civakî, siyasî û leşkerî de girîngiyê didin bi bipêşxistina nêrîn, çalakî û sazîbûnên xwe yên hevbeş.

III. 3.9. Bandora Şoreşê li ser Rewşa Jin û Civakê

Ji sala 2011'an ve di rewşa jin û civaka Rojava de guhertinên mezin û bi lez çêbûne. *Çawaniyên van guhertinan bi çi rengî ne? Bandora Şoreşa Kurdistanê, bi taybet ya Şoreşa Rojava li ser jin û civakê çi ye? Avakirina pergala xweseriya demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di bin şertên Şerê Cîhanê yê Seyemîn de bandoreke çawa li ser çand û rehendên jiyanê çêkiriye? Çareseriya pirsgirêkên jin û civakê çiqas bi pêş ketiye? Hişmendiya neteweya demokratîk li ser bingehê azadiya jinê û hevjiyana azad di kîjan astê de hatiye bipêşxistin û tevahiya civakê hembêz dike? Jin û civaka Rojava di kîjan astê de dikarin pêdivî û xwestekên xwe pêk bînin?*

Yek ji armancên girîng ên vê lêkolînê ew bû ku em bersivên van pirsan bibînin. Bi vê mebestê me di sala 2017'an de bi qederê 300 jinan re hevpeyvîn çêkir. Me li serpêhatî, zanyarî, nakokî û bendewariyên wan guhdarî kir. Dîsa me li ser bingehê pirsên jorê di komîn û akademiyên Rojava de bi jinan re nîqaş kirin, li nihêrîn û tehlîlên wan hisand. Her wiha daneyên çendanî ji raporên salane yên saziyên Mala Jinê, Asayîşa Jin û Dada Jin jî hatin nirxandin. Li ber ronahiya van nîqaş,

[654] Hevpeyvînên bi endamên meclîsa jinan a Reqayê re, 2018

[655] Çavkanî li heman cihî

hevpeyvîn û daneyan, wekî Akademiya Jineolojî me rewşa jinê û civaka Rojava, pirsgirêkên civakî û bipêşketinê şirove kirin.

Ji bo em bikarin bandora şoreşê li ser jin û civakê pirralî fêhm bikin, me di vê beşa pirtûkê de bala xwe daye rehendên **Polîtîka**; **Jiyana Hevjîn, Malbat û Civakê; Rewş û Siberoja Jinên Ciwan; Etîk û Estetîk; Tenduristî û Ekolojî; Aborî; Demografya; Perwerde û Zanistê.**

Wekî rêbaz di serî de her rehend bi nihêrîna Jineolojiyê tê pênasekirin û girêdayî vê pirsên lêkolînê tên nîşandan. Piştre dane û nihêrîn tên parvekirin yên ku derheqê mijarên pirsan de derketine holê. Di dawiya her rehendê de jî em li ser bingehê van daneyan wekî encam şirove û analîzên xwe parve dikin. Nirxandinên me li ser rewşa jin û civakê xwe dispêrin daneyên ku para bêhtir sala 2017'an hatin berhevkirin.

a) Polîtîka:

Jineolojî polîtîkayê wekî '***dîtin û pêkanîna karên herî baş ji bo jiyana civakê***' pênase dike ku xwe dispêre çand û hunera dayikê wekî hêza sereke ya avakirina civakîbûnê. Di serdemên dîrokî hemûyan de jinê nihêrîn û çalakiyên polîtîk bi pêş xistine da ku pêdiviyên madî û manewî yên malbat û civakê werin dabînkirin û bi rengekî wekhev û adilane bên parvekirin.
Abdullah Ocalan di pirtûka Sosyolojiya Azadiyê de dide xuya kirin: *"Peydakirina karên baş hêsan nîne. Ji ber ku ji bo peydakirina karên baş, naskirineke baş divê, ango jê re zanîn û zanist, wekî din jî dîtin yanî lêkolîn û lêgerîn divê. Kengî têgîna başiyê jî li vê zêde dibe, hingê zanîna exlaqê jî ferz dibe. Çawa ku tê dîtin, polîtîka hunerekî gelekî zor û zehmet e. Xusûseke mirov pê dixapin ew e, bi têgînên hecmên wan mezin ên weke dewlet, împaratorî, xanedan, netewe, şîrket, çîn û hwd. di zikhev de li polîtîkayê difikirin. Eger bi diyardeyên bi vî rengî û yên weke wan re di zikhev de mirov li polîtîkayê bifikire, dibe maneya wê kêm bike. Polîtîka rastî di pênaseya xwe de veşartî ye: ji bilî demokrasî, wekhevî û azadiyê ti koma têgînan nikare berjewendiyên heyatî yên civakê rave bike. Hingê mirov dikare bibêje, bi awayekî bingehîn polîtîka ew e, di her şert û mercî de ji bo vî wesif an jî dewamkirina hebûna civaka exlaqî û polîtîk çalaktiya azadî, wekhevî û demokratîkbûnê ye."*[656]

Li hemberî vê têgeha polîtîkayê ya ku Abdullah Ocalan wekî '***hunera azadiyê'*** jî pênase dike, pergala baviksakariyê pênaseyeke cuda bi pêş xist da ku vîn, gotin û biryar di destê çend kesên desthilatdar de kom bibûya. Bi vê pênaseya serdestan, polîtîka ji civak û nirxên exlaqî hatiye qutkirin û bûye '*karê zilamê serdest û dewletê*'. Pê re têgeha polîtîkayê bi pirranî hevwate bi menfaetê dewletê û rêbazên hîle, xepandin, gefxwarin û tundiyê hatiye şirovekirin. Li gorî vî mentiqî şer jî wekî '*amûra herî întensîf a polîtîkayê*' hatibû pênasekirin. Van ferasetan, silbûnek, biyanîbûnek di navbera jinê û polîtîkayê de, di navbera civak û polîtîkayê de bi xwe re anîye.

Di şoreşa Rojava de hewildan hatine bipêşxistin da ku jin û civak ji nû ve nasname û vîna xwe ya polîtîk ava bikin, karên herî baş ji bo jiyan û siberoja azad a civakê nas bikin û bi rê ve bibin. Ev ceribandin li dijî bandora feraseta desthilatdariyê û êrîşên dewletan tên bipêşxistin; ev feraset û êrîş heta niha di raya gştî de wekî 'polîtîka' dihatin pêşkeşkirin. Wateya vê ew e ku ji bo aliyên jiyanê hemûyan ji birêxistinkirina jiyana malbat û komînan heta bi karên aborî, dîplomasî û xweparastinê têkildarî siyasetê ne.

[656] Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Şarestaniya Demokratîk - Pirtûka Sêyemîn*, 2011

Di vî warî de hewce dike ku him rêbaz û bandorên 'polîtîkayên serdestan' li ser jin û civakê werin tehlîl kirin, him jî asta ku jin û civaka Rojava di dîtin û pêkanîna pêwîstiyên bingehîn ên civakê de xwe gihandiyê, were nirxandin. Bi vî awayî bersivên van pirsan derbikevin holê: *Pirsgirêkên esasî di warê polîtîkayê de çi ne? Ji bo çareseriya van çi pêwîst e? Ji bo serketina şoreşa jinê ya Rojava, divê em kîjan karên baş, çawa bimeşînin?*

- **Bandora Polîtîkayên Zayendperest û Dagirker**

Pirsgirêka bingehîn a di warê polîtîkayê de nenaskirina vîna siyasî ya jin û gelê Kurd, ya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Zêneb Dilşer rave dike: *"Wekî gelê Kurd, çiqas em şer bikin jî ger ku em di milê siyasî de projeyên xwe pêş nexin û vîna me neyê qebûlkirin, milekî me kêm dimîne. Ji bo jinê jî heman tişt lê ye. Ger nasname û biryara wê neyê qebûlkirin, garantiya destketiyên wê tine."*[657]

Ji ber jin bi rengekî sîstematîk li derveyî qada siyasetê dihatin hiştin, pirraniya jinan jî siyaset aydê xwe nedidîtin. Têgihiştina polîtîkayê wekî 'karê zilaman' ango 'karê desthilatdaran' hişt ku jin bawer nekin ku ew ê bikarin wekî kirde tevlî siyasetê bibin. Rêbazên neexlaqî yên ku di bin navê polîtîkayê de tên meşandin û helwestên zayendperest wekî piçûkxistin yan jî nihêrîna jinê paşguhxistin, jin wekî 'alîgir' dîtin, dibin sedem ku gelek jin bixwazin ji xebatên siyasî dûr bisekinin yan jî xwe paş ve bidin. Ferasetên desthilatdar carna jî bandora xwe li ser şêwaz û nêzîkatiyên wan jinan dikin yên ku di qada siyasetê de kar dikin. Jinên ku li şûna pênaseya polîtîkayê wekî *hunerê azadiyê* û bipêşxistina hêza kolektîf a jinê, bi zêhniyeta desthilatdar tevdigerin, nikarin ji sînorên pergala baviksalarî bibihurin. Dema jin nihêrînên zilam esas digirin yan jî li benda pejirandina zilam dimînin, vîn û rengê jinê winda dibe, lêhûrbûnên li ser esasê dîtina *karên baş* lawaz dibin û têkiliya polîtîkayê bi exlaq û azadiyê re ji nû ve nayê hûnandin.

Pergala hêzên emperyal û netewe-dewletan bi awayekî sîstematîk vîna jinê, mafê çarenûsê ya gelan û rewabûna pergala xweseriya demokratîk tine dihesibîne. Ev berdewamiya feraset û pêkanînên pergala mêhtingeriyê ye ya ku bi hezaran salan li ser gelên resen ên herêmê hatiye ferzkirin. Di rastiya Şerê Cîhanê yê Seyemîn de moderniteya kapîtalîst rûyê xwe eşkerê kiriye: Ti tişt tine ku hêzên dagirker ji bo misogeriya berjewendiyên xwe nakin. Pîvanên exleqî û zagonên gerdûnî ne tenê ji aliyê DAIŞ'ê ve, lê ji aliyê dewlet û saziyên navdewletî ve jî tên binpêkirin. Dî vî warî de polîtîkayên dewleta Sûriyê û Tirkiyê, yên Emerîka, Ewropa û Rûsyayê ji hev ne cuda ne. Ti dewlet vîna azad ya jin û civakê nas nake. Li gorî berjewendiyên xwe ew dikarin di mohleta kêliyekê de nêzikatî û polîtîkayên xwe biguherin. Dostên îro, sibe dibin dijmin. Bi operasyonên medyayê ew dikarin her tiştî, her tawan û her qirkirinê wekî 'rewa' bidin nîşan. Ji bo ku ev hez bikarin polîtîkayên xwe yên mêhtinger serwer bikin, ew li kêleka şerê leşkerî, şerên taybet, ên bîrdozî, derûnî û aborî dimeşînin. Tinekirin û dagirkirina warên jiyanê, cihwarên resen û çavkaniyên xwezayî, guhertina demografiyayê, qirkirinên çandî û etnîkî, belavkirina agahiyên şaş û parçekirina civakê li gorî armancên kedxwarî û desthilatdariyê, hemû parçeyên vê siyasetê ne.

Yek ji encamên herî giran û neyînî yên vê siyasetê ji bo jin û civakê, nezelaliya siberojê ye: *Gelo wê sibe şer be yan aramî be? Gelo em ê sibe jî xwe bixwe rê ve bibin yan jî wê rejîma Sûriyê yan jî hêzeke din a dagirker pergaleke mêhtinger li ser me ferz bike? Gelo em ê li ser axa xwe bijîn yan jî em ê neçar bimînin û koçber bibin? Gelo em ê bikarin pêdiviyên jiyanê peyda bikin yan jî em ê di*

[657] Hevpeyvîn bi Zêneb Dilşer re, Qamişlo, 2017

encama şer, talan û embargo de birçî bimînin? Gelo wê zarokên me bikaribin bi zimanê xwe xwendina xwe berdewam bikin, bibin xwedî kar û nasnameya xwe?

Pirsên bi vî rengî, gumanên hebûn û tinebûnê bandorê dikin li jiyana 4 - 5 milyon mirovên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Mirov dikare vê yekê wekî dizîna siberojê jî bi nav bike. Êş û birînên 9 salên şer li Sûriyê nikarin sax bibin, ji ber ku rewşa aloz bi tirs û xeterên jiyanî dewam dikin. Rewşa bêewlehî û bêistiqrariyê nahêle ku mirov bikarin plansaziyên demdirêj û xeyalên siberojê bikin. Jineke ciwan a Kurd dibêje, hîna beriya Şoreşa Rojava bapîrê wê ji malbata xwe re hertim digot: *"Em Kurd in. Divê em ti car ji bîr nekin ku em bêwar in. Lewma bila giradê we zêde nebin. Bila her tim danehevek di destê we de hebe û xwe ti car bê çek nehêlin!"* Şîretên dapîr û bapîrên Kurdan xwe dispêrin zanebûna dîrokî, û ew jî di encama ferman û mişexbûnên hatin serê gelê Kurd de, hatiye bidestxistin. Gelek pêkhateyên din ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî xwedî heman zanebûna dîrokî û hemdemî ne.

Lewma pirraniya civakê hewl dide jiyana xwe ya rojane xilas bike. Bi vî rengî vîna mirovan tê şikandin, aso û hilbijêrkên jiyanê tên tengkirin. Metirsî û gumanên siberojê li ser derûniya jin û bi taybetî li ser ya dayikan hê jî bandoreke girantir dikin. Ji ber ku ew xwe ji bo siberoja malbat û zarokan berpirsyar dibînin. Li gorî çavdêriyên me di nav jinên Rojava de li gorî şert û mercên aloziya siyasî ya Sûriyê sê meylên esasî, wekî rêbazên domandina jiyanê bi pêş ketine:

Ya yekem meyla têkoşîn û berxwedanê ye. Bi armanca avakirin û parastina siberoja azad û aram bi hezaran jin di hêzên parastinê, partiyên siyasî, rêxistin û rêveberiyên civakî de cihê xwe digirin. Di warên jiyanê hemûyan de ew polîtîkayên xwe ava dikin û têkoşîna xwe li dijî êrîşên ferasetên zayendperest dimeşînin. Wekî endama dîwana Asayîşa Jinê ya Hesekê, Xalîda berpirsyariya xwe wiha dinirxîne: *"Di hemû saziyan de jin cihê xwe digirin. Tevî ewqas şer di heft salên şoreşê de di hêla civakê de jî gelek guhertin û serkeftin hatin dîtin. Ev qas sazî bi xwîna şehîdan hatin avakirin, gerek em karê xwe yê komîn û meclisan aktîv bikin û fireh bikin."*[658]

Ya duyem meyla zewac û domandina jiyana ji adetê ye. Di gelek hevpeyvînan de hatiye ziman ku ji ber şer û aloziyên polîtîk bi mebesta ewlehiya siberojê keç hê jî di temenê piçûk de tên zewicandin yan jî daxwaza zewacê dikin. Mirov dikare vê jî wekî hewldanên dewamkirina jiyaneke 'adî' [normal] di bin şertên awarte de binirxîne. Her wiha li dijî metirsiya qirkirinên etnîk, em dikarin xwesteka anîna zarokan jî wekî rêbazeke parastina hebûnê û domandina qewmê xwe şirove bikin. Jinên Efrînê ku wekî koçber li wargehên herêma Şehbayê dimînin, balê dikişînin ser wê yekê ku di nava salek û nîva piştî derketina wan a ji Efrînê de hejmara anîna zarokan, jinên ducanî û zewacê zêdetir bûye: "*Hin jin hene dibêjin, 'ji bo zarokên me neçin şer, neçin perwerda, bila zû bizewicin.' Keçên xwe di temenekî piçûk de didin mêr."*[659] Lê belê xuya dibe ku destgirtina zewac û zêdebûna fizîkî wekî rêbazên çareseriyê bi taybet di bin şertên aloziyên siyasî û aborî de gelek caran dibin sedema qeyranên din.

Meyla seyemîn jî koçberiyê ber bi derveyî welat e: *"Destpêka şoreşê nan tine bû, kerebe tine bû. Dema êrîşên DAIŞ'ê jî dest pê kirin, gelek diçûn Ewropayê û Başûr. Jinan digot, 'Bila zarokên me bixwînin û bi ewlê bin.' Lê gelek malbat jî li wan dewletan ji hevdu dûr ketine, zarok ji çanda xwe dûr ketine. Jin vê êşê dikişînin. Ew dixwazin vegerin. Bes ew ditirsin wê careke din şer derkevê."*[660] Di anketa WJAR'ê ya sala 2016'an de jî pirsa sedema zewicandina keçên temenpiçûk ji welatên

[658] Nîqaş bi nûnerên Kongra Star, Hesekê, 2017

[659] Hevpeyvîn bi Hacer Silêman re, Kampa Berxwedanê, Şehba, 2019

derve re hat kirin. Ji sedî 85,5'ê beşdarên anketê jî sedemên aborî, 'rehetî û lêgera li jiyaneke xweştir' wekî sedemên sereke dîtine. Li gorî nihêrînên din jî 'reva ji rastiya heyî' û 'şibandina xeyrî xwe' dibin sedemên derketina derveyî welat a jinên ciwan bi rêya zewacê.[661]

Nexasim heta sala 2014'an beşeke jinan xeyal dikir ku bi rêya koçberiya ber bi derveyî welat ve siberoja xwe di aramî û ewlekariyê de bibihurînin. Dîsa gelek malbatan, herî kêm yek ji kurên xwe dişandin derveyî Sûriyê da ku qaşo li cihekî ewle be û ji bo debara malbatê kar bike. Lê belê piştre gelek kesan didît ku koçberî nebû çareserî, lê bû sedema pirsgirêkên girantir. Wekî din koçber wekî amûreke polîtîkayên qirêj ên dewleta Tirk û bi armanca qirkirina etnîk li hemberî gelên Rojava tên bi kar anîn.

Tevî siyaseta koçberkirinê hêzên dewletperest bi rêbazên hişk û nerm, bi gurkirina zayendperestiya civakî, nijadperestî, olperestî û ferdperestiyê dixwazin civakê parçe bikin û li hemberî hev bidin şer kirin. Bi qutkirina avê û ambargoyan, siyaseta tî û birçîhiştinê tê meşandin. Her wiha hewldanên taybet ên dewleta Tirk û rejîma Sûriyê çêdibin ku bi rêyên sîxurtî, belavkirina madeyên tiryakê û bazirganiya jinê, çand û exlaqê civakê hilweşînin. Wekî din destwerdan hene ji bo ku pêşî li lihevhatin û yekrêziya partiyên siyasî yên Kurdan di mijarên esasî de were girtin. Hêzên netewe-dewlet û moderniteya kapîtalîst baş dizanin ku ew ê tenê bi rûxandina têkiliyên hevgirtin û baweriyê di nav civakê de hêza polîtîk a civakî bikarin lawaz bikin.

Her çiqas li hemberî van siyasetên desthilatdar hişyarbûnek di nava civakê de çêbû û tedbîrên ewlekariyê jî hatine girtin, bandora rêbazên şerê taybet li ser feraset, jiyan û têkiliyên civakî jî xuya dibe.

- **Nasnameya Siyasî ya Jinê**

Cara yekê di dîrokê de nasnameya siyasî ya jinê li ser bingehê danehevên 30 salan ên têkoşîna Tevgera Azadiya Kurdistanê bi Şoreşa Rojava re derket holê. Bi taybetî ked, perwerde û perspektîfên Abdullah Ocalan ji bo avakirina bîrewerî, nasname û helwesta polîtîk ya jinê diyarker bûn. Li ser vî bingehî jinan cesaret û bawerî raber kiriye da ku di her astê de bi berpirsyariyê rabin, polîtîkayên xwe diyar bikin û bimeşînin. Hîna di sala 1991'ê de jinên Kurd ên welatparêz yekem car dibûn namzet di hilbijartinên Meclîsa Sûriyê de. Herçiqas jî dengên ku wan girtin têrê nedikir ku bikarin doza gel û jinên Kurd di meclîsa dewletê de temsîl bikirana, dîsa jî gelek jinan wê demê didît ku hêza jinê ya siyasî bi pêş ketiye. Bi rêxistinbûna xweser a jinê re, qabiliyeta jinê di qada polîtîkayê de hîna zêdetîr darîçav bûye:

"Rêxistinbûna xweser a jinê, nasnameya polîtîk a jinê pêş xistiye. Sekina xurt a jinê di sîstema xweser a jinê de derketiye. Perwerdeyên xweser jî girîng bûn. Zanista jinê û zanebûna jinê li ser rola jinê di şoreşan de pêş ketiye. Bi zanebûna dîroka jinê û pergala desthilatdar ku keda jinê ji bo berjewendiya xwe bi kar dianî, em hişyar bûn û me girîngiya stratejîk a rêxistinbûna jinê dît. Dema ku rêxistinbûna jinê fireh bû, guhertina civakê û zêhniyetê jî pê re pêş ket. Vê bingehê şoreşê ava kiriye."[662]

[660] Hevpeyvîn bi Dayika Sûriyê re, Tirbespî, 2017

[661] Weqfa Jina Azad li Rojava (WJAR): *Encamên anketa 'Nêrînên li ser rastiya zewaca di temenê piçûk de'* bi 1676 beşdarên jin û mêr re, 2016

[662] Hevpeyvîn bi Asya Ebdullah re, Qamişlo, 2017

Berê nasnameya polîtîk a kesayetî di civakên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bi pirranî girêdayî kevneşopî û berjewendiyên eşîrtî, malbatî û herêmî yan jî nasnameyên olî û neteweyî hatine diyarkirin. Mînak, jinan di hevpeyvînan de gotiye, mezinê eşîrê dida xuyakirin ka divê endamên eşîrê hemû piştgiriyê bidin kîjan hêza siyasî. Dîsa gelek kes bi bandora malbatê, hinek kes yan jî bûyeran nasnameyeke siyasî ji xwe re pejirandin. Ji bo pirsa sedemên ji bo bijartinên siyasî, pirr caran bersivên wiha hatin dayîn: *"Bavê min Berzancî bû, ji ber vê ez jî Berzancî me."* Yan jî *"Min ji hevalan pirr hez dikir, ji ber vê ez Apocî me".* Yan jî *"Cîraneke min pirr baş hebû ku di partiya Pêşverû de bû, ji ber vê ez jî bi wan re me."* Hê jî bandora vê kevneşopiya bijartinên li gorî bandora eşîr, malbat yan jî derdorê heye. Lê belê wekî me di beşa *'Bandora Şoreşa Kurdistanê û Şoreşa Rojava Li Ser Jiyana Jinan û Civakê'* de da xuyakirin, gelek jin jî bi bijartina xwe ya nasnameya Apocî li ber kevneşopiyên malbatê rabûn. Em dikarin bibêjin, bi taybetî bi bipêşketina xebatên perwerdeyê yên akademiyên jinê û yên civakî bi Şoreşa Rojava re agahî û zanebûna siyasî di gelemperiya civakê de bi pêş ketiye.

"Di warê perwerdê de pêşketinên mezin çêbûn. Jin di destpêkê de hîn zêdetir hestyar tevlî bû. Niha zêdetir tevlîbûn bi zanebûn pêş ketiye. Nakokiya cinsê û têkoşîna cinsê jî pê re pêş ketiye."[663] Nasnameya siyasî ya jinê li Rojava bi xebat û rêxistinbûna Yekîtiya Star û piştre Kongra Star darîçav bû. Dîsa avakirina rêxistinbûnên hevbeş wekî Meclîsa Jinên Sûriyê û Meclîsa Jinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bipêşxistina biryar û daxuyaniyên hevpar ên jinên ji pêkhateyan hemûyan û ji gelek partiyên siyasî zivirîn nasname û hêzeke hevbeş a jinan di siyaseta demokratîk de.

- **Beşdarbûn û Bandora Jinê di Polîtîkayê de**

Bi destpêka şoreşê re qada polîtîkayê ji civakê û jinan re vebûye. Ji birêxistinkirina komînan heta bi berpirsyariyên wekî rêveberên Kongra Star, hevserokên partiyên siyasî, meclîs, desteyên xweseriya demokratîk û di xebatên dîplomasiya navneteweyî de jin bi risteke girîng rabûne. Her wiha gelek jinên ciwan bi şoreşê re, nû ketin nav xebatên siyasî. Pê re, wan jî bîrewerî, birêxistinbûn û kesayeta xwe bi pêş xistiye. Helwest û çalakbûna jinê, Şoreşa Rojava di civakê, platfomên neteweyî û navneteweyî de wekî şoreşa jinê da nasîn.

Di hevpeyvînên me de derket holê ku ferqeke mezin di navbera jinên nerêxistinkirî û jinên rêxistinkirî de heye. Ew jinên ku felsefeya Abdullah Ocalan bandor li wan kiriye, tevlî perwerde û xebatên siyasî û civakî bûne, bi pirranî guhertinên mezin di jiyana xwe de çêkirine. Ew dibêjin, ew derbarê naskirina îradeya xwe, xwe îfade kirin, bixwebawerî, têkiliyên malbatî û civakî de 'ferqeke weke ferq di navbera şev û roj de' dibînin. Dîsa gelek jinên ku bi awayekî çalak cihê xwe di nav siyasetê de digirin, bi gelek astengiyan re rû bi rû dimînin û di heman demê de di gelek eniyan de têdikoşin. Jineke Kurd a siyasetvan vê rewşê wiha rave dike: *"Ji bo ez karibim beşdarî siyasetê bibim, ez li hemberî zêhniyeta sê dewletan têdikoşim. Yanî li hemberî malbata xwe, malbata hevserê xwe û hevserê xwe, ez her tim di nav têkoşînê de me."*[664]

Heta li hinek jinan, ji ber xebatên wan ên siyasî, gefên kuştinê jî dihatin xwarin. Hevseroka TEV-DEM'ê ya Efrînê, Deliye Henan dibêje, *"Weke jin me pirr israr dikir, divê ku hejmareke mezin a jinan di rêveberiya xweser de cihê xwe bigire. Ji ber ku bi hezaran jin jî pirr ked dane. Ez mînaka*

[663]Hevpeyvîn bi Besta re, Qamişlo, 2019

[664]Nîqaşên bi beşdarên Perwerdeya Akademiya Kongra Star re, Rimêlan, 2017

xwe bidim, pirr gef ji aliye malbatê ve ji min re dihat, heya asta kuştinê. Wan digot, 'Em nepejirînin ku jin here di meclîsa de rûne!' Bi nêrînek çewt li me meyze dikirin ji ber ku em ji mal derdikevin û heya êvarê dimînin. Nêzîkatiyên wisa li hemberî me derketin. Lê me di ya xwe de israr dikir û me digot, 'rojek were, ew ê li gotinên xwe poşman bibin.' Di rêvebiriya xweser de me israr kir ku divê di her saziyekê de jin cihê xwe bigirin. Piştî demekê guhertin hate çêkirin û di her saziyê de, wekî rêveber û cihgir jin hatin erkdarkirin û ev xal di rêzikname de nû lê zêde bû."[665]

Tevî ku pirsgirêkên civakî, feraset û nêzikatiyên zayendperest hîna di rojevê de ne, pirraniya jinan êdî rêbazên têkoşînê nas kirin. Ji bipêşketinên bidestxistî ev jin ji bo çalakiyên nû sûdê werdigirin. Bipêşketin û guhertinên civakî bandor li jinên birêxistinnekirî jî kirine. Ew jî ristên nû yên jinan di civak û siyasetê de girîng dibînin. Lê belê heya niha jî beşeke jinan di nav civakê de heye ku şoreşê aydê xwe nabîne û bi wê najî. Ji ber ku nihêrîn û yekîtiya jinan di mijara azadiya jinê de hîna negihiştiye asta yekrêziyê di nava jinên civakê hemûyan de hîna jî lawazî hene di guhertin û veguhertina civakê û têkoşînê de li hemberî kevneşopiyên feodal û zayendperest de. Her wiha jinên siyasetvan balê dikişînin ser ferqên têgihîna siyasetê ya jinê û ya zilamî:

"Di feraseta zilamî de jin nikare siyasetê bike. Lê dîsa zilam pêdihese ku hêza siyasî û leşkerî ya jinê heye. Çiqas jî nikare vê qebûl bike, di dawiyê de zilam fêhm dike ku jin hevbeşa wî ya siyasetê ye. Di malê de jî wisa ye. Jina ku bi zanebûna siyasî bi zilam re bide û bistîne, dikare gelek guhertinên baş di civakê de jî çêke. Lê ji ber ku di siyaseta jinê de kêmanî hene, berdan çêdibe, xwekujî çêdibe, tiştên ne exlaqî derdikevin [holê]: Jin di temenê 13 salî de tê zewicandin, jin ser hêwiyê dihere, daxwaza mîrasa xwe nake."[666]

"Li pêşiya jinê hertim du erk hebûn: Di aliyê civakê de îdarekirina malbatê û wezîfên civakî û di aliyê din de erkên têkoşînê. Jinê hertim di nav herduyan de hevsengiyek çêkiriye. Ev bû tecrûbeyek girîng û cesaret da avakirinê da ku ew bikare herdu karan bi hev re rê ve bibe. Qalib û sînorên kevn ku ji jinê re dihatin danîn bi vî rengî dihatin şikandin. Hevalên ku di nav kar de ne û xwedî malbat in, gelek hene. Lê bi rastî me dît jiyana jinên ku ne di nav kar de ne di aliyê psîkolojîk û pirsgirêkan de hîn zêdetir zehmet e. Wan jinan nizanibû pirsgirêkên xwe çawa çareser bikin, mafên xwe yên xwezayî çawa bi kar bînin û çawa têkoşîn li hemberî bêedaletî û zextan bidin meşandin. Jinên dûrê rêxistin, perwerde û civînan hîn di rewşeke girantir de bûn. Jinên din belkî di warê erkên têkoşînê de barekî girantir radikirin, lê di aliyê moral û xwebaweriyê de ew hîn zêdetir rehet in. Hezkirina wan ya jiyanê hîn xurtir e."[667]

Jin him bi hejmarê him jî bi nihêrîn û çalakbûnê risteke pêşeng rabûne di avakirina pergala xweseriya demokratîk û rûniştandina xeta siyasî ya çareseriya neteweya demokratîk de. Di tevahiya qonaxên şoreşê de jinan di avakirina polîtîka, pergala siyasî û hevpeymana civakî de nihêrîn û vîna jinên Rojava nimandiye.

"Di dîrokê de Kurd bi îxanet, bi girêdanên ji derve re û bi aborî re hertim dihatin şkandin. Me berê her tim ji bo hêzên din kar dikir, şer dikir. Lê me ji bo xwe tiştên pêwîst nedikir. Niha cara yekem civaka Kurd bi tevahî karekî siyasî yê rast dimeşîne. Jinan xeta seyemîn a Şoreşa Rojava parastiye di aliyê xebatên siyasî, civakî, parastin û çandî de. Di siyasetê ku hatiye meşandin de rengê jinê hebû. Civînên komînan, karê civakî, parastina taxan, xebatên perwerde, çandî,

[665] Hevpeyvîn bi Deliye Henan re, Efrîn, 2017

[666] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

[667] Hevpeyvîn bi Asya Ebdullah re, Qamişlo, 2017

hilbijartin, vekirina Mala Jinê û Dada Jinê, hevserokatî û hwd. Ev hemû karên siyasî ne. Nisbeta jinê di nav van kar û xebatan de ji sedî 40'ê gihand ji sedî 60'î. Îro jin parastina siyasetê û jiyanê dike."[668]

Lê dîsa li qada siyasetê zêdetir pewîstî bi beşdarbûna jinê tê dîtin. Gelek siyasetvanên jin di hevpeyvîn û nîqaşan de anîn ziman ku di warê bipêşxistina pêngavên nû û afirandina rêbazên dewlemend ên siyaseta hundir û derve de qelsbûnek heye. Bi rûniştandina pergala xweseriya demokratîk re, bipêşketinên mezin çêbûn, lê li aliyê din jî kelecan û ruhê rojên ewilî yên şoreşê kêmtir bûye. Şêwazeke burokratîk ê ku xwe dispêre feraset û fêrbûnên dewletê, dikare li pêşiya herikandina enerjî û afirînerbûnê bibe asteng. Ji komînan heta bi asta endamên rêveberiya xweseriya demokratîk, hîna nêzîkatiyên bi bendewarî xwe nîşan didin. Wateya vê ew e ku di civakê de siyaset û birêvebirinê bêhtir wekî karê îdarê tê şirovekirin û ne wekî 'peyda kirin û pêkanîna karên baş ji bo berjewendiya civakê'. Mînak, li şûna ku hevserok û endamên komînê pêşengtiya paqijkirina gundê xwe yan jî çandin û avadana baxçeyekî komînê bikin, gelek caran hevserok daxwazên wiha pêşkeşî meclîs û komîteyan dikin. Tevî ku wan karibû van karan bi hevkariya endamên komînê di demeke kin de bi xwe çareser bikirana, ew li bendê dimînin da ku rojekê şaredariya navçê karkeran ji bo pêkanîna van karan ji wan re bişîne.

Her wiha bi civakîbûn, firehbûna kar û erkên siyasî re, carna jî nerazîbûn û rexneyên jinan bi pêş dikevin ku gelek salan di nav xebatên Tevgera Azadiyê de girtine. Hinek dibêjin, manewiyat û têkiliyên hevaltî 'berê' xurttir bûne. Hinek jî rexne dikin ku kesên di demên zehmet de ked nedidan yan jî bi dewletê re kar dikirin, îro di astên cuda yên qada siyasetê û saziyan de bûne xwedî erk. Ji destpêka şoreşê ve hewildan çêbûne da ku tewahiya civakê tevlî şoreşê bibe, ji saziyên dewletê veqete. Lewma bangewazî çêbûn da ku her kes xizmeta gel bike û cihê xwe di avakirina pergal û saziyên xwebirêvebirinê de bigire. Ev nêzîkatî carna dibû sedema lêpirsînên derbarê hevsengiya di nav siyaset û edaletê de. Dema kesên nû wezîfê digirtin hinek welatparêzên kevin wisa hîs dikir, weke pêwîst bi qedrê keda wan nehatiye zanîn.

Endama Meclîsa Zagonsaz, Perwîn rave dike ka çima beşdarbûna hinek kesan bûye mijara nîqaş û nerehetiyan di nava civakê de û ev mijar çawa hate dîtin: *"Berê dijmin em parçe kirine û ji hev dûr xistin. Pêwîst bû ku em bi vê nêrînê lênenêrin ji bo emê bikarin deriyê xwe vekin. Serokatî gotiye, heta tayek porê mirov saxlem hebe, em wî bikişînin û bidin guhertin. Bi vê baweriyê ve me bi dehan kes hembêz kirin yên ku ez bi xwe dizanim çiqas ez êşandime. Belkî wan bi fermî ajantiya dewletê nekiriye. Lê mînak, dema min li ser karekî bi ciwanekê re guftûgo kiriba, ji bo ku tevlî kar û xebatê biba, ew ê di pişt min re bihata, hêviyên wî ciwanî bişkanda. Wan dihat, karê ku me dikir, xerab dikir. Gelek ji wan bi vê şoreşê re hatin li kêleka me sekinîn û kar kirin. Bi rastî yên ku tevlî nav refên YPGê bûn û yên ku şehîd ketin jî hene. Wan bi keda xwe êdî xwe da îsbatkirin ku nema van şaştiyan bikin. Vê şoreşê kir ku gelek kes dane zelalkirin. Kî bi te re bi exlaq û wijdan kar û xebatê dike, bedelê wê hene. Pêwîst e netirse û pêwîst e ji malbata xwe dest pê bike. Nayê qebûlkirin ku mirov rojane tevlî çalakiyan bibe û zarokê xwe derxe Ewropê.*

Rastiyek di vê şoreşê de heye, ger tu rast nêzîk nebî, tu wê bikevî yan tu wê xwe rast bikî û dewam bikî. Wekî tu satilekê dagirî bi mastê spî. Ew zelal e, lê xaleke reş wê tê de xuya bike. Di şoreşê de yan tu wê xwe paqij bikî yan jî tu xwe bide alîkî. Ev şoreş e ku bi ewqas nirx û bedelên mezin hatiye avakirin, kesek nikare li ser kêfa xwe vê xera bike. Yên ku xerabûnê bikin, çiqas bixwazin xwe veşêrin û biparêzin jî, herî direng piştî salek an du salan tên naskirin. Yên ku ji bo

[668] Hevpeyvîn bi Eyşe Efendî re, Kobanê, 2017

berjewendiyên xwe yên kesayetî hatin û tevlî bûn, yên ku xwestin leyîstokan bikin, derketin holê. Rastî û heqîqeta her kesî/ê zelal dibe. Lê ez nikarim tenê bêjim jî ez ê bi wijdanî pê re bibim. Divê ez bi exlaq û wijdanê xwe kedê jî bidim."[669]

Di nav van bûyer û nîqaşan de xuya dibe, tevî ku hemû beşên civakê di pergaleke hevbeş a komîn û rêveberiya xweser de cihê xwe digirin, di avakirina hest û ruhekî hevbeş de hîna astengî hene. Şoreşek tenê pêkan e, heger tevahiya civakê bikare xwe di nav de bibîne û barê şoreşê di hemû aliyan de bi hev re rake. Çiqasî siyaset wekî 'pêkanîna karên baş ji bo tevahiya civakê' bi tevlîbûna her kesî/ê girêdayî nirxên exlaqî wê bi pêş bikeve, ewqasî jî wê vê şoreşê bigihîne armancê. Di vî warî de çand û nirxên welatparêziyê yên Tevgera Azadiyê bingehekî xurt ava kiriye. Naskirina koka vê şoreşê, zanebûna dîroka berxwedanê û xwedîderketina li keda salan, dikarin bibin hîmên çandina ruh û hestên hevbeş. Li ser vî bingehî têkilî û danûstandinên navbera kesên ku bi şoreşê re nû xwe tevlî siyasetê kirine û yên ku bi salan ji bo azadiya gelê Kurd û hemû mirovên bindest têkoşiyane, dibe ku heqîqeta civaka polîtîk û exlaqî ava bikin.

Jinên ku di nav xebatên polîtîk de cihê xwe digirin, wekî nihêrînên hevbeş didin xuya kirin ku ji bo beşdarbûna jinê û şêwaza jinê di siyaseta Rojava de xurttir bibe, divê jinên birêxistinkirî xwe bigihînin tevahiya civakê û jinan hemûyan. Dema ku em têgihiştina polîtîkayê wekî karekî civakî û pêkanîna karên jiyanê dibînin, wateya vê ew e ku siyaset di jiyana malbatê de dest pê dike.

Beşdarbûna jinan di xebatên siyasî û civakî de zanebûn û bixwebawerî da avakirin. Ev yek potansiyeleke girîng ji bo guhertinên demokratîk di jiyan û têkiliyên malbatê de jî dihewîne. Lê ji bo ku saziya malbatê ji ferasetên zayendperest karibe were xilas kirin, nêrîna hevbeş û hevpariya jinan hemûyan esas e. Wateya wê ew e ku jinên ji pêkhate û beşên civakê hemû derheqê xebatên civakî, çandî, aborî, ewlekarî, perwerde û tenduristiyê de nîqaş û biryarên hevbeş bi pêş bixin û karên jiyanê bi hev re pêk bînin.

- **Pergala Hevserokatiyê**

Rêxistinbûn û nasnameya polîtîk a jinên Rojava ya ku bi damezrandina Yekîtiya Star hatibû afirandin, dibû bingehê pêkanîna pergala hevserokatiyê. Abdullah Ocalan pergala hevserokatiyê û nûnertiya wekhev a jin û zilamî, wekî 'miftê' ji bo çareseriya pirsgirêkên azadî û wekheviya her du zayendan pênase dike. Girêdayî vê, ew misoger kirina tevlîbûna jinê ya nav siyaseta demokratîk, mafê jinê ya gotin û biryarê di hemû têkiliyên zayendan de wekî şertê bingehîn ê azadiya jinê û wekheviyê diyar dike.

Ji destpêka Şoreşa Rojava ve jinan di kongre û nîqaşên li ser sazkirina pergala xweseriya demokratîk hemûyan de girîngiya pergala hevserokatî anî rojevê. Bi vî awayî jinan dixwest çanda demokrasî, berçavbûna vîn, nûnertî û rûyê jinê di siyaset û civaka Rojava de bi pêş bixin. Li ser pêşnûmaya delegeyên Yekîtiya Star di kongreya damezrandina TEV-DEM'ê ya Mijdara 2011'an de pergala hevserokatiyê wekî şêwaza rêveberiyê hatiye pejirandin. Di serî de pergala hevserokatiyê di Meclîsa Gel a Rojava de ket meriyetê. Lê belê pergala rêveberiya meclîsên bajar û kantonan heta demekê ji aliyê serok û du cihgiran ve dihat meşandin. Di asta rêveberiya kantonê de cara yekê pergala hevserokatiyê li kantona Efrînê hat ceribandin.

[669]Hevpeyvîn bi Perwîn Mihemed re, endama Meclîsa Zagonsaz, Amûdê, 2017

Hêvî Mistafa pêşî wekî seroka Meclîsa Gel a Kantona Efrînê hatibû hilbijartin. Piştre ew bûye hevseroka yekem a kantonê. Ew behs dike ka destpêkê di fêhmkirina vê pergalê de kîjan zehmetî hatin kişandin: *"Weke jin em bi şans bûn ku rêxistina jinê hebû. Îdeolojiya Rizgariya Jinê ya ku Rêber Apo diyar kiribû û mîrasa jinên têkoşer li Rojava hebû. Bavê min jî em li ser feraseta 'şêr şêr e çi jin çi mêr e' mezin kirin. Min digot, zilam hemû wek bav û birayê min in, lê derket, ne wisa ye.*
Destpêka şoreşê nêzî du salan ez wekî seroka meclîsa Efrînê bi tena xwe bûm. Dema em weke dîwan rûniştin, sê zilam bi min re dirûniştin. Dema gel pirsgirêkên xwe dianî, wan her tim terefek digirt. Min jî digot, 'Nabe em aliyekî bigirin. Dema şîkayetek hebe, di her du aliyan de kêmasî hene.' Piştre em bûn hevserok. Wê demê ev pirs hat kirin, 'Çima bi taybet li Efrînê sîstema hevserokatiyê heye?' Gelekan got, 'Ji ber ku mamoste Hêvî bi tenê nikare, ji ber hevaleke jin nikare bi tenê vî karî bike, hevserokek dane kêleka wê.' Destpêkê ne zilam amade bû ji bo vê yekê, ne jî ez. Zilam bi feraseta 'tiştê berê giştî şaş in û ez hatime sererast bikim' tevgeriya. Cara ewil bi xurûr hat. Lê dema dît ku hêza wî ji ya min ne zêdetir e, ew xurûr daket û gihîşt astekê ku êdî ji min moral dixwaze. Lê piştre hinek guhertin çêbûn. Piştî salekê ez gihîştim wê qeneetê pergala hevserokatiyê pêşketinên girîng çêkirin. Niha li her derê sîstem bûye hevserokatî."[670]

Bi ragihandina hevpeymana civakî re pergala hevserokatiyê di Çileyê 2014'an de li kantona Cizîrê jî ket meriyetê. Hevseroka Meclîsa Gel a Kantona Cizîrê Hediye Yûsif têkoşîn û pêşketinên ku bi vê gavê re derketin holê, wiha dinirxîne: *"Sîstema hevserokatiyê tegihîneke nû ye. Cara yekemîn ev wekî sîstemeke nû li Rojavayê Kurdistanê dikeve meriyetê. Bê gûman zêhniyeta desthilatdarî berdewam e. Bi vê tecrûbeya nû re jinê hîn îradeya xwe ya siyasî nû nas kiriye û dikeve nava lêhûrbûnê. Jin dibe xwedî erk, xwedî berpirsyartî li hemberî civakê. Di heman demê de divê zilam cara yekem desthilatdariyê parve bike. Zilam jî dibîne ku bi tena serê xwe nikare bibe xwedî biryar di jiyanê de. Ji ber ku jinek di kêleka wî de heye. Ger ku ew beşdarê biryarê nebe, wê serhildanek li hemberî sîstema wî ya desthilatdar çêbibe. Niha em hewl didin ku em îradeya hevbeş û biryarên hevbeş di hundirê jiyanê de pêş bixin û asta înîsiyatîfa jinê pêş bixin. Pergala hevserokatî dikare pêşiya guhertinên civakî, pêşiya jiyana hevbeş û îradeya hevbeş veke. Edalet û rengê jinê bêhtir wê di nava sîstema hevserokatiyê de derbikevê pêş.*

Bê guman perwerdekirina jin û mêran jî di vî mijarê de pirr girîng e. Heta niha ne tecrûbeya jinê ne jî ya mêr hebû. Jin jî û mêr jî pêwîst e ji nû ve fêhm bikin çawa sîstema hevserokatiyê bimeşînin û îradeya xwe temsîl bikin. Her wiha di gelek deveran de mêr ji vê sîstemê aciz dibû, xwe wek serok dihesiband û jin jî wekî alîgîra xwe. Di cihên din de jî jin bi hêrsa îqtîdarê derket pêş û zilam li paş hişt. Her wiha di hinek cihan de jî nimûneyên baş û nêzîkatîyên erênî derketine, wek hevserokên ku hevdu fêhm kirin, nêrînê hevdu girtin, erk parve kirin û bi nîqaşên hevbeş bi hev re çûyîna biryaran. Baş meşandina sîstema hevserokatiyê berpirsyariya hevbeş li hemberî jiyanê, li hemberî jin, mêr, zarok û civakê dixwaze."[671]

Li kantona Kobanê sîstema hevserokatiyê piştî pêvajoya şer û koçberiyê di Tîrmehê 2017'an de hatiye îlankirin. Hevseroka Meclîsa Gel a Kantona Kobanê Bêrîvan Hesen 24 salî ye. 4 mehan piştî avakirina pergala hevserokatiyê li Kobanê ew tecrûbeyên xwe şirove dike: *"Sîstema hevserokatiyê pêwîstiyek bû. Di aliyê azadiya jinê de me gelek zehmetî û astengî dikişandin. Jin*

[670] Hevpeyvîn bi Hêvî Mistafa re, Efrîn, 2017

[671] Hevpeyvîn bi Hediye Yûsif re, Dêrik, 2017

rastî gelek zorê dihat. Me qebûl nedikir ku zilam yekalî biryar distandin û bi tena serê xwe nîqaş dikirin. Pêwîstiya me bi sîstemeke alternatîf hebû. Ev jî sîstema hevserokatiyê ye. Ne tenê di asta kantonê de divê sîstema hevserokatiyê di desteyan de jî pêş bikeve û bê rûniştandin.
Heya niha jî tekoşîna zêhniyetê tê kirin. Mînak ger belgeyek be, hevalên xort dixwazin îmzeya xwe li jor bixin û ya hevalên jin jî li jêr be. Ev tişt gelek caran bûn mijarên rexneyan. Em her dibêjin, divê ku hevserok li rexê hev bin. Lê pirsgirêka zêhniyeta zilam her derdikeve holê. Têkoşîneke pirr xurt lazim e heya ku em karibin vêna derbas bikin. Pirr caran min ji hevalê kêleka xwe re digot, 'Tu di bin desthilatdariya dewletê de hatibûyî perçiqandin. Em jî di bin desthilatdariya zilam de hatibûn tinekirin. Lê em her du alî di guhertina vê zêhniyetê de berpirsyar in.' Jin dixwaze xwe bi pêş bixe û li kêleka xwe mêr jî bi pêş bixe. Lê di mêr de hesûdî heye. Ew naxwaze jin bi pêş bikeve.

Gelek caran em nîqaşên bi hevalên jin re bi pêş dixin, ji bo hertim nebêjin 'ya zilam rast e'. Em dibêjin, 'Tiştê hûn pê ne qaneh in, serê xwe jê re nehejînin, bêjin, 'ev ne rast e'. Jin heya niha xwe di hinek aliyan de kêm dibîne, mafê zilam dibîne û yê xwe nabîne. Van tiştan em dixwazin bi riya perwerdeyan derbas bikin."[672]

Berdevka Desteya Jinê ya Kantona Kobanê, Zozan jî destnîşan dike ku fêrbûnên pergala dewletê dibin asteng li pêşiya rastpêkanîna pergala nû: *"Di sîstema dewletê de tenê zilam dibû serokê saziyan. Ji ber vê jî me zehmetî di sîstema hevserokatiyê de didît. Ji ber, zilam xwe bi tenê dîtibû. Zilam her tim dixwest, bi xwe di pola yekemîn de be. Lê bi riya civînan me bi hevalên jin da naskirin ku rola herdu hevserokan yek e. Dema ku yek bi pirsgirêkek dihat, dîrek berê xwe dida [cem] hevalê zilam. Di wî warî de me hevalên jin rexne kirin. Me jê re got, 'Pêwîst e ku hûn xwe di vir de îsbat bikin. Hûn zêhniyeta wî zilamê ku xwe ferz dike, bidin guhertin.' Berî her tiştî têkoşîna zêhniyeta jina azad pêwîst e ku heyanî zêhniyeta zilam bi xwe re sererast bike."*[673]

Di pirraniya hevserokên ku di asta meclîsên kanton, bajar û komînan de hatine hilbijartin, temenê zilam ji yê jinê mezintir e. Ev jî dibe sedem ku jin him li dijî nakokiya cinsan, him jî li dijî nêzîkatiyên feodal û jerontokrat jî têbikoşin. Gelek jin, ciwan in û bi hevserokên zilam re xebatê dimeşînin. Ev zilamên hanê di asta xwendinê de yan jî bi tecrûbeyên salan ên karê îdarî, rêxistinî û jiyanî xwedî danehevan in. Hevserokên jin ên ciwan destnîşan dikin ku carna nêzîkatiyên 'wekî bav nêzî keça xwe dibe' derdikevin holê. Li hemberî van helwestên şaş ew bi pirranî 'bi hurmet rexneyên xwe' di jiyana rojane û civînan de bi pêş dixin. Jinên ciwan didin xuya kirin ku xwendina pirtûkên Abdullah Ocalan, perwerdeyên xweser û lêhûrbûnên li ser projeya neteweya demokratîk ji wan re dibûn çavkaniya hêz û çareseriyê:

"Hevserokê ku min pê re kar meşand, beşa hiqûqê bi dawî kiribû û tecrûbeyên wî zêdetir bûn. Lê ruxmê ku tecrûbeyên wî zêde bûn, hin caran weke miwazifekî dewletê tevdigeriya. Li hemberî wî, xwendina min ne ewqas bilind bû, lê zû zû min pirsgirêk çareser dikirin. Ji ber, mêjiyê min ji milê rûniştandina sîstema dewletê dûr bû. Min giranî dabû xwendina pirtûkên Serokatiyê."[674]

Hevseroka Xeta Beravê ya navçeya Dêrikê, Dilber heya refê 12'an xwendiye. Piştî vê, bavê wê nedihişt ku ew biçe zanîngehê. Di sala 2015'an de ew wekî hevseroka meclîsa xeta gundan hatiye

[672] Hevpeyvîn bi Bêrîvan Hesen re, Kobanê, 2017

[673] Hevpeyvîn bi Zozan Bekir re, Kobanê, 2017

[674] Hevpeyvîn bi Bêrîvan Hesen re, Kobanê, 2017

hilbijartin. Ew tecrûbeyên xwe yên du salan parve dike: *"Emrê hevalê min yê hevserok ji min mezintir e û ji malbateke welatparêz e. Hevseroka jin a pêşiya min, jê re tiştek nedigot. Wî bi serê xwe kar dikir. Wî jî tiştek nedigot û li wî jî xweş dihat. Piştî hibijartinê, wextê ez ketim ser kar, wî ji min re nedigot, dema civîn çêdibûn. Lê bi uslûbekî rêzdar min jê re digot: 'Wisa nabe. Ez bi van hilbijartinan hatim vêdêre. Divê tu min tine hesab nekî. Ez hevala te ya kar im û ez ji karê xwe hez dikim.' Niha jî her kes ji hevaltiya me matmayî dimîne. Her kes min nas dike û em baweriyê didin hev. Ez dinêrim, çi kêmasî hene û tiştek gerek be, ez ji wan re dibêjim. Ewil dizanim êşa jin dikişîne di kar de çi ye. Niha ez xwedî tecrûbe me."*[675]

Asya Ebdullah wekî hevseroka PYD di xebatên dîplomatîk de û di berxwedana Kobanê de jî cihê xwe girt. Ew dibêje, rûniştandina pergala hevserokatiyê him di warê zêhniyetê de him di warê pergala rêxistinê de bandoreke erênî li ser karê PYD'ê yê giştî kiriye: *"Niha, ev pênc sal in, em vê pergalê dimeşînin. Jinê karibû ferasetên kevnperest bi têkoşîna xwe ji bo rast avakirin û meşandina sistemê biguhere. Têrê nake ku pergala hevserokatiyê tenê di asta jorê de were meşandin. Pêwîst e di her sazî û her astê de hebe. Niha di tevahiya hilbijartinan de êdî bi xwezayî hejmara jin û zilam, wekhev derdikeve. Di meclîsa partiya me de nîvî jin û nîvî zilam in. Sîstema hevserokatiyê ji bo demokratîkkirina tevahiya pergala Rojava sîstemeke stratejîk e. Bingehê vê jî rêxistinbûna xweser a jinê ye. Li kû dere rêxistinbûna me ya jinê xurt be, pergala hevserokatiyê jî ji jêr heta jor baş tê meşandin. Lê dema ku rêxistinbûna jinê lawaz be, valatî û pirsgirêkên zêhniyetê derdikevin."*[676]

Gelek hevserok dibêjin, têkoşîna ji bo naskirina vîna jinê di nav saziyan de bûye bingeh ji bo bihêzkirina xebatên komînan. Li komînên ku herdu hevserok bi têgihîştin û berpirsyarî hevbeş tevdigerin, zindîbûn çêdibe. Bi perwerde û ceribandinên pergala hevserokatiyê li hemû herêman bixwebawerî û xwesteka jinan ji bo xwedana ber erkan di warê siyasî û rêveberiyên xweser de bi pêş ketine: "*Dema me rêveberiya xweseriya demokratîk ava kiriye û tê de pergala hevserokatiyê û nûnertiya wekhev da rûniştandin, bi hezaran jinî xwe wek bernamzet nîşan da. Deriyek vebû û jinan digot: 'Pêwîst e em vê derfetê binirxînin û bimeşin, ji bo em azad bibin'. Li hemberî sîstema baviksalarî ya desthilatdariyê pêngavek çêbû."*[677]

Ev yek di hilbijartinên hevserokên komînan yên di Îlonê 2017'an de jî xuya bû. Tevlîbûna jinan him weke namzet him jî hilbijêr xurt bû. Bi giştî 728.450 hilbijêrên jin ji herêmên Cizîrê, Firatê û Efrînê dengên xwe dane. Ji 12.319 namzetên jin 3.815 jin weke hevserokên komînan hatine hilbijartin. Bi vî rengî, pergala hevserokatiyê di komînên Bakurê Sûriyê hemûyan de bi awayekî fermî hatiye rûniştandin. Jinên ku wekî endamên lijneya hilbijartinê erkdar bûne, dan zanîn ku li herêma Firatê li gorî hejmara zilaman jin zêdetir çûne ser sindokan. Qonaxa duyemîn a hilbijartinên pergala federaliya demokratîk a Bakurê Sûriyê ji bo hilbijartina endamên meclîsên rêveberiya herêmî pêk hat. Di van hilbijartinan de jî ji 4.173 namzetên jin bi giştî 2.516 jin weke endamên meclîsên rêveberiyên herêmî hatine hilbijartin. Bi vî rengî pergala nûnertiya wekhev a jin û zilaman di çerx û mekanîzmayên biryardayînê de hatiye rûniştandin.

Pergala ku bi şoreşa jinê li Rojava hatiye avakirin, bandora xwe li ser tevahiya gel û pêkhateyan çêkiriye. Ji bilî PYD'ê jî hinek partiyên din ên siyasî û rêxistinên Suryanî sîstema hevserokatiyê

[675]Hevpeyvîn bi Dîlber re, hevseroka Meclîsa Gundên Xeta Beravê ya Dêrikê, Endîwer, 2017

[676]Hevpeyvîn bi Asya Ebdullah re, Qamişlo, 2017

[677]Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

wekî modela rêxistinî ji bo xwe pejirandin. Li herêmên ku bi salan di bin zordestiya DAIŞ'ê de man û hatine rizgarkirin jî pêkhateyên herêmê meclîsên xwe bi pergala hevserokatiyê ava kirin û wisa jî wan dimeşînin. Li wir jî vîn û têkoşîna jinan li dijî ferasetên baviksalar û dewletperest diyarker bû. Jinên Minbicê dibêjin, pêşî gelek zilaman erka hevserokatiyê wekî muxtariyê ango desthilatdariyê didît: *"Hinekan digot: 'Ez bûme hevserokê komînê, her tişt di destê min de ye. Divê mohra min hebe. Em bûne dewlet.' Nakokiyên wisa hebûn. Li gundekî hevdu qebûl nekirin. Ji ber bandora sîstema dewletê, nêzîkbûnên wisa çêbûn. Lê hêdî hêdî hat fêhmkirin ku hevserokatî xizmetkirin e. Beriya tu li xwe bifikirî, divê tu li yên derdora xwe, hemû malbatên gundî bifikirî. Tu nikarî bêjî, 'Ev eşîra min e. Ev birayê min e.' Ev tişt derdiketin, lê gav bi gav sererastkirin çêdibe."*[678]

Endamên Meclîsa Jinê ya Minbicê balê dikişînin ser wê yekê ku gelek zilam hîna di meseleya parvekirin û karkirina bi jinê re di pergala hevserokatiyê de zehmetiyê dikişînin: *"Bi ferasetên zilamî re jin jî zehmetiyan dikişînin. Zilam dixwaze pirr ferdî kar bike. Zilaman jin piçûk didîtin. Lê dema avakirina pergalê, wan zanebûn û keda hevalên jin ji bo civakê didît. Wiha, ew ecêb man û ketine ferqê ku em karê xwe dizanin û dikarin civakê îdare bikin. Niha em gihandine qonaxekê ku êdî hevalê zilam bi pirs û pirsgirêkên xwe tên cem hevalên jin û parve dikin. Ew dibêjin, 'Jin kar dikin û di dema xwe de li ser karê xwe disekinin, ji demê re nahêlin.' Vê jî baweriyek da çêkirin."*[679]

Tevî ku pergala hevserokatiyê di nava tevahî komîn, meclîs, kooperatîf û saziyên xweseriya demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bi tekoşîna jinan hatiye rûniştandin jî hîna di warê zêhniyet û pêkanîna vê de pirsgirêk hene. Helwesta gelek hevserokên mêr li herêman hemûyan hîna ev e ku ew xwe wekî 'serok' û jinê jî wek 'hevserok' yan jî 'alîgirê xwe' dibînin. Di aliyê hevserokên jin de jî carinan nêzîkbûnên paşverû ango desthilatdar derdikevin holê. Bi vî warî de rexne hene ku hinek hevserokên jin hîna nihêrînên zilaman yan jî tenê nihêrîna xwe ya şexsî dikin esas û vîna jinên ku nûnertiya wan dikin, paşguh dikin.

Lê di encama gelek hevpeyvîn û nîqaşên bi jinên di nava xebatên siyasî û civakî de em dikarin bibêjin, têkoşîna azadiya zayendî êdî ne şexsî ye, lê civakî û siyasî ye. Yan jî bi gotina endama rêveberiya Mala Jinê ya Dêrikê: *"Şerê cinsî ji malê derket û bûye şerê hevserokan."* Di heman demê de pergala hevserokatiyê hêz da jinan da ku li nava mal û malbata xwe jî têkoşîna naskirina vîna jinê bi israr bimeşînin: *"Jinê çiqas zor jî didît, tim li hemberî zilam disekinî. Vê jî hişt ku zilam jî êdî nikaribe li dijî jinê bisekine. Zilam tadê lê dike, lêdixe, rê li pêşiya wê digire, derî li ser wê digire, pera nadiyê ji bo bikare mesrefa xwe bide, lê jin dîsa rêya xwe berdewam dikin. Gelek jin hene, zilam jê re digot 'ger tu derkevî û xebat bikî, êdî nema were mala min. Ez ê te berdim.' Lê jin diçûn û careke din dihatin mala xwe. Jinan digot: 'Ev mala min e, zarokên min in. Tu herî derbikeve.' Ev helwestekê pirr girîng a jinê ye."*[680]

Em dikarin bibêjin, rûniştandina pergala hevserokatiyê di astên rêveberiya xweser, saziyên siyasî û civakî hemûyan de bi rastî dibû mifteyek ji bo xurtkirina vîn û têkoşîna azadiya jinê. Raberkirina pergaleke alternatîf li ser bingehê nûnertiya wekhev a herdu zayendan bi rengekî çêker, feraseta

[678]Hevpeyvîn bi Selcan re, Minbic, 2017

[679]Hevpeyvîn bi Şevîn re, Minbic, 2017

[680]Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

takekesî ya baviksalar hejandiye ya ku gotinên zilamê serdest, serokê eşîrê û dewletê, dikir ferman. Bi vî awayî ne tenê di feraseta siyasetê û çanda rêveberinê de şêwazeke nû derdikeve holê. Di heman demê de serdestiya zilam û biryarên yekalî di jiyana malbatan de jî dikevin ber lêpirsînê.

- **Kurteencamên Lêkolînê Derbarê Qada Polîtîkayê de**

Ji bo mirov biyanîbûn û silbûna di navbera civak û polîtîkayê de li pey xwe bihêle, girîng e ku jin û her ferda civakê bikare cihê xwe û muxatebên ji bo pirsên xwe di nav pergala xweseriya demokratîk de bibîne. Di vî warî de hê jî lawaziyan di rêxistinbûna komîn û meclîsan de hene. Lewma gelek kes bêhtir wekî temaşevan yan jî şirovekar û ne wekî çalakvanê/a siyasî tevdigerin. Pênaseya polîtîkayê wekî *'dîtin û pêkanîna karên herî baş ji bo jiyana civakê'* û *'hunera azadiyê'* tenê dikare bi beşdarbûna tevahiya civakê bi pêş bikeve. Ji bo vê yekê ji nû ve zindîkirina çanda komînal a civakê esas e.

Bi parvekirina agahiyên li ser kargerî û rojeva saziyên xweseriya demokratîk, nîqaşên hevbeş li ser pirsgirêk û pêdiviyên civakê di nav rêveberiyên rehendan, xelkê gund û taxan de ev kêmasî tên halkirin. Li cihên ku li nihêrîn û pêşniyazên gel derbarê rojeva siyasî, karên aborî û civakî de tê pirsîn, zindîbûnek derdikeve holê. Dema ku daxwaz û pirsgirêk ji aliyê komîn û endamên komînê ve tên çareserkirin, şêwaz û zêhniyeta burokratîk jî li paş tên hiştin. Wiha mirov û komîn hêza xwe ya polîtîk nas dikin. Di vî warî de girîng e ku nihêrînên komînan bigihînin sazî û merciyên peywendîdar û encamên nîqaşên li ser wan pêşniyazan di demeke kin de bi civakê re bên parvekirin. Bi vî awayî herikbarî û şefafbûn di navbera civak û saziyan de û berpirsyariya jiyanê bi pêş dikevin.

Girîng e ku perwerde û têkoşîna ji bo rast fêhmkirin û pêkanîna pergala hevserokatiyê wekî berpirsyarî û nûnertiya hevbeş a jin û zilam, werin domandin. Lê belê cihgirtina jinê di nava siyasetê de, ne tenê bi erka hevserokatiyê sînordar e. Perwerdeyên li ser feraset û şewaza siyaseta demokratîk li ser bingehê zanebûn û rêbazên tekoşîna azadiya jinê û bipêşxistina hevjiyana azad ji bo bihurîna ji ferasetên desthilatdar, xwedî risteke girîng in. Di vê çarçoveyê de armanc ew e ku têgihîna berpirsyariya hevbeş di beşên xebat û jiyanê hemûyan de were rûniştandin.

Bi nîqaş û daxuyaniyên rojane di tevahiya mijarên siyasî, dîplomasî û civakî de meclîs û saziyên hevbeş yên jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê vîn û rojevên hevbeş yên jinan didin xuyakirin. Nexasim di rewşên aloz de parvekirina analîz û şiroveyên bi ziman û nihêrîna jinê girîng e da ku polîtîkayên jinê diyarker bibin. Bi vî awayî jin xitimîna siyaseta desthilatdar çareser dikin û şêwaza siyaset, tifaq û têkiliyên demokratîk dimeşînin. Esas dîtina zanebûn û beşdarbûna civakê di karên polîtîkayê de yek ji rêbazên herî encamgîr a xweparastinê ye li hemberî gef û êrîşên zayendperest û mêhtingeriyê.

b) Jiyana Hevjîn, Malbat û Civakê

Çavkaniyên dîroka Mezopotamyayê destnîşan dikin ku beriya modela malbatê wekî şaneya desthilatdariya zilam û dewletê, şêwazên jiyana komînal girêdayî rêgezên wekhevî, parvekirin û berpirsyariya li hemberî hev hebûne. Dayik di birêvebirina jiyana klanê, peydakirina pêdiviyên

jiyanê, parastina nirx û ferdên civakê de bi risteke pêşeng rabûye. Lê belê şiklê malbat û zewacê yê ku wekî saziya pîroz a xanedantî, desthilatdarî û dewletê hatiye sêwirandin, dibû qefeseke ku di kesayeta jin û zarokan de tevahiya civakê dîl girt. Tevî ku vê modela malbata baviksalar, heta îro rê li ber pirsgirêkên civakî yên pirr giran vekiriye jî, hewildanên li pey xwe hiştina wê bi giştî zêde encam nedane.

Di şoreşên cîhanê û têkoşînên rizgariya neteweyî de çareseriya pirsgirêka azadiya jinê û veguherandina malbatê, wekî 'mijareke di rêza duyemîn yan seyêmîn' de bi paş ve hatiye avêtin; ew hatiye paşguhkirin. Jinên şoreşger wekî Alexandra Kolontay yan jî tevgerên femînîst nakokiya jin û malbatê wekî pirsgirêkeke bingehîn şirove kiribin jî guhertineke bingehîn çênebûye, neçûye serî. Her wiha guhertinên ku di şikl û têkiliyên malbatê de bi bandora moderniteya kapîtalîzmê çêbûne, ne jin ne jî civak ji bindestbûnê rizgar nekirine. Berovajiyê vê, bi pêşkeşkirina ferdperestî wekî rêya xilasiyê, qeyranên jin û civakê hê jî girantir û kûrtir bûne. Di encama rizîna tevnên civakî de jin li hemberî êrîşên zayendperest û kedxwariyê bi pirranî bê parastin û bê hêvî mane.

Li hemberî vê, dahûrandinên Abdullah Ocalan li ser rastiya jin û malbatê, birêxistinbûna Tevgera Azadiya Jinê û diyarkirina hevjiyana azad wekî pîvan û modela çareseriyê di şoreşa Kurdistanê de bûn mijarên stratejîk. Van analîzan û pê re jî danehevên Tevgera Azadiya Jinê dibûn sedem ku têkoşîna azadiya jinê û veguherandina demokratîk a malbatê di Şoreşa Rojava de wekî mijareke bingehîn û pîvana serketina şoreşê hatiye nirxandin. Di vî warî de me li serpêhatî û nihêrînên jinên temenên cuda û ji gelek beşên cihê yên civaka Rojava guhdarî kir, bi endamên saziyên jinê li ser çavderî û tehlîlên wan me nîqaş kirin. Pirsên me yên esasî ev bûn: *Şoreşa Rojava bandoreke çawa li ser jiyana jinê, li ser têkiliyên malbatî û hevjînan çêkir? Pirsgirêkên malbatê û zayendperestiya civakî yên ku îro herî bi lez divê bên çareserkirin çi ne? Jin dikarin di kîjan astê de bibin xwedî gotin û biryar? Hilbijêrkên jinê yên jiyanê çi ne? Jin dixwazin çawa bijîn?*

Bi rêya berhevkirin û nirxandina raporên saziyên ku dozên jinê dişopînin ên wekî Mala Jinê, Rêxistina SARA, Meclîsa Dada Jinê û Asayîşa Jinê, me xwest fêhm bikin: *Di salên şoreşê de pirsgirêkên sereke yên jinan kîjan in? Gelo di asta tundiya li dijî jinê ya li nava malbat û civakê de guhertinek heye?*

Li ser bingehê daneyên hejmarî derheqê dozên jinê de tevî nîqaşên takekesî û komî yên bi jinên li nava civakê û saziyan re me xwest bigihînin bergeheke giştî derheqê pirsgirêkên jin û malbatê de. Lê şirovekirina daneyên çendanî hertim jî xeteran dihewîne. Ev rêbaz wekî rêbazeke sereke di feraseta pozîtîvîst a zanistê de tê bi kar anîn da ku bi hejmaran 'heqîqatên objektîf' ava bike. Lê belê em dizanin ku heqîqata jiyanê ji vê wêdetir e. Lewma pêwîst e em sedemên tundî û neheqiyên li dijî jinê, sedemên kêmbûn yan jî zêdebûna hejmara dozan bi rengekî hişyar û pirralî binirxînin.

Dîsa em balê dikişînin ser wê yekê ku raporên saziyan ên salên 2013'an heta 2019'an pênaseyên cuda di warê şideta li hemberî jinê de bi kar anîne. Mînak, têgihînên wekî 'bêexlaqî' dihatin bi kar anîn ku li şiroveyê vekirî ne. Ango, di heman raporê de bûyerên 'destdirêjî' û yên 'tecawizê' wekî du rewşên sûc ên cuda hatine nirxandin. Bi ser de bi rizgarkirina herêmên nû ji dagirkeriya DAIŞ'ê di navbera salên 2016 û 2019'an de xebatên Mala Jinê û dada civakî li deverên nû jî bi pêş ketine. Lewma raporên ku di asta giştî de hatine amadekirin, her sal erdnîgariyên nû bi hejmareke zêdetir a serjimarê û taybetmendiyên cuda yên civakî dihewînin. Ji bilî vê, ji ber rewşa şer li gelemperiya Sûriyê her sal koçberiya pêkhateyên Sûriyê ber bi herêmên ewletir yên li Rojava ve rûdaye. Li gorî vê jî rêjeya nifûsa giştî hatiye guhertin. Pêwîst e em van rastiyan li ber çavan bigirin dema ku em daneyên statîstîk û bîlançoyan binirxînin.

Pirsgirêkên ku di salên dawiyê de herî zêde dihatin rojeva saziyên jinê û dada civakî dozên 'anîna

pirjinan', zewaca jinan di emrê piçûk de, pirsgirêkên malbatî, tundiya li hemberî jinê û dozên hevberdanê ne. Daneyên di destê me de xwe dispêrin **bîlançoya bûyerên tundiya li dijî jinê ya salên 2013 heta 2016'an a Rêxistina SARA** li ser asta kantonên Cizîrê, Kobanê û Efrînê. Wekî din derheqê dozên jinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de me karibû **bîlançoya 6 heyvên dawiyê ya sala 2017'an a Asayîşa Jinê, bîlançoyên Dîwana Edaletê ya Herêma Cizîrê yên salên 2018 û 2019'an, ya Meclîsa Dada Jinê ya sala 2018'an û yên Asayîşa Jinê û Asayîşa Gişti yên sala 2019'an** binirxînin.

- **Rewşa Jin û Malbatê**

Qadeke ku feraseta zayendperestiya 5000 salan herî zêde xwe bi pergal kiriye û daye rûniştandin, jiyana malbat û hevjînan e. Heta niha ti şoreşê nikaribû di vî warî de azadiya jinê misoger bike. Balkêş e ku di hevpeyvînên me yên bi gelek jinên Rojava de, ew herî zêde bi kelecan behsa mînakên guhertina jiyana xwe ya malbatê dikin. Hinek malbat bi tevahî endamên xwe - jin, zilam û zarok – cihê xwe di qadên têkoşînê û saziyên civakî de digirin. Bandora çand û perwerdeyên şoreşê li ser kesayetan guhertinên di jiyana malbatê de, di pîvan û têkiliyên hevjînan de bi xwe re anîne. Jinên Kurd rave dikin ku bandora ol û eşîrtiyê di nifşê niha de li gorî nifşên pîr û dayikan kêmtir bûye. Ew didin xuyakirin ku di gelek malbatan de rêbaz û şêwaza serdestiya zilam nermtir bûye.
Lê dîsa jî feraset û gelek kevneşopiyên zayendperest heta roja îro bindestiya jinê misoger dikin. Di vê mijarê de jin balê dikişînin ser rista zilam û rista jinê di domandina zêhniyet û nêzîkatiyên zayendperest de. Gelek jin hîna zilam wekî 'reis' û 'stara jinê' dipejirînin. Lewma bixwebawerî û yekîtî di nav jinan de hîna negihaye asteke welê ku bikare feraseta baviksalariyê di warên jiyanê hemûyan de ji holê rake. Di milê din de jin nexasim di nav xebatên saziyên civakî de fêrbûne ku hevgirtina jinan dibe mifteya çareseriyê ji bo pirsgirêkên kûr yên jin û malbatê. Şeş salan piştî destpêka şoreşê me xwest fêhm bikin ka jin encamên têkoşîna azadiya jinê û guhertinên di rewşa jin û malbatê de çawa dinirxînin.

Gavên destpêkê yên damezrandina pergala Dada Civakê û Dada Jinê ji sala 2011'an ve li Rojava hatin avêtin. Teorî û pratîk di nava hev de bi pêş ketine. Ji bo çareseriya pirsgirêkên civakî li tevahiya bajaran lijneyên lihevhatinê, dîwana edaletê ya bajêr û dîwana edaleta civakî ya bilind wekî merciyê îtirazkirina biryaran hatine avakirin. Erkgirtin di van saziyan de bi hilbijartinên di nav meclîsên TEV-DEM'ê de çêdibû. Balkêş e ku li gelek cihan jinan ji zilaman pirtir deng standine. Ev yek baweriya civakê bi edaleta jinê destnîşan dike. Tevî ku gelek jin ewilî bi xwe bawerî neanîn li hemberî vê erka giran, di demeke kin de derket holê ku rêbazên jinê, nêzikatiyên bi zanebûna civakî, bi hesta edaletê û empatî zêdetir encam girtine û hatin pêjirandin. Xwendevanên ku beşa hiqûqê xwendibûn û bi têgihîştina miwazifê dewletê nêzî karê xwe dibûn, nikarîbû pirsgirêkên civakî zêde çareser bikin. Ji vê zêdetir, civîn û rêxistinbûna jinan a xweser di warê dada civakî de risteke erênî rabûne ji bo sererastkirina feraset û nêzîkatiyên li dozên jin û malbatê.

Endamên Dada Jinê ya Dêrikê di sala 2017'an de serpêhatiyên xwe yên şeş salan wiha dinirxînin: *"Destpekê em bi xwe bê tecrûbe bûn. Dema jinan pirsgirêkên xwe ji me re digotin, em pê re digiriyan. Îradeya me û înîsiyatîfa me gelek kêm bû. Me ji xwe re digot, 'Em ê van pirsgirêkan çawa hal bikin?' Heta demekê hevalê zilam çi digotin, me digot, 'wek we ye'. Ji ber ku em wisa fêrbûn. Gelek kes di civakê de û hinek hevalên me yên zilam jî em qebûl nedikirin. Ji me re digotin, 'Ma hûn mamoste ne. Hûn çawa di dadgehê de kar dikin?' Lê hêdî hêdî her yekê ji me xwe bi*

xwendina pirtûkên Serokatiyê ve kesayet û fikrê xwe pêş dixist. Dema pirsgirêka jinekê hebû, em wek jin li gel hev dirûniştin û me ji bo çareseriya vê pirsgirêkê nîqaş dikir. Hezkirin û baweriya me bi hevdu re dihişt ku em pêş bikevin. Bi pirsgirêkên ku me bi xwe çareserî jê re didîtin em bûn xwedî hêz. Dema dadgehên li Rojava bi giştî dihatin vekirin û me pirsgirêk çareser dikirin, civakê didît ku em cihê çareseriyê ne."[681]

Dîsa jinên avaker ên pergala dada civakî, behsa zehmetî û têkoşînên xwe di lipeyxwehiştina ferasetên zayendperestiya civakî de dikin. Ew balê dikişînin ser wê yekê ku li şûna qanûnên hişk yên dewletê pergala neteweya demokratîk xwe dispêre çand û exlaqê komînal ê civakê. Heta ragihandina hevpeymana civakî û qanûnên jinê di sala 2014'an de endamên dada civakî û Mala Jinê dozên jinan li ser bingehê exlaq, wijdan û pîvanên edaletê şopandin. Lê belê li bin bandora zêhniyeta serdest a zilam, olperestî û dewletê, têgihîna 'exlaq', hest û nihêrinên edaletê di gelek aliyan de hatibûn berovajîkirin. Gelek diyardeyên ku vîn, nasname û hebûna jinê ji holê radikin, bi hişmendiya zayendperest wekî 'exlaq' ango 'kevneşopiyên civakî' dihatin binavkirin. Jinên ku li hemberî vê serî rakirine jî wekî 'jinên bêexlaq' dihatin teşhîrkirin. Endamên dada civakî ji ber van ferasetan di raberkirina helwestên hevbeş ên rast û wijdanî li hemberî pirsgirêkên civakî de gelek caran nakokî bi wan re peyda bûne. Nexasim di dozên ku wekî 'meseleyên namûsê' yan jî 'bêexlaqî' binavkirî de nakokiyên hişmendiyê derketine holê. Bi ragihandina 'rêgez û ferweriyên giştî yên di mijarên jin û malbatê de' ji aliyê rêveberiya xweseriya demokratîk ve pîvan bêhtir zelal bûn.

"Heya beriya du salan qanûnên Dîwana Edaletê nû hatine derxistin, em gelekî civakî nêzî pirsgirêkan dibûn. Her pirsgirêka ku me bi hev re hal dikir û digihand biryarê, ji bo me dibû perwerdeyek. Bi rastî karekî pirr zehmet e. Ji ber [ku] bi wan biryaran bandor li jiyana mirovan dibe. Ji ber vê, divê di milê wijdanî, exlaqî û azadiya jinê de bingehekî te hebe. Ji bo tu bikarî tewazûnekê di navbera çand û exlaqê civakê û qanûnê de çekî divê tu insaneke têgihiştî bî. Bingehê min ê exlaqî ku min wekî jineke di malbata xwe de girt û fêhmkirina min a civakê li ser nêrînên min bandorê dike. Çiqas me fêhm kir, em li gorî vê nezî dozan dibin û edaleta me ya civakî jî ewqas e. Vê nakokiyê em bi nîqaşan çareser dikin. Ya baş di dada me de kesek bi tenê biryarê nade. 3 yan 5 kes bi nîqaşê, bi hev re [dozê] digihînin biryarekê. Nêrînên ewqas kesan, zelalbûnekê ava dikin ku tu bigihînî biryareke rast."[682]

Pirraniya nêzikatiyên bi guman ku li hemberî xebatê dada civakî dihatin raber kirin çavkaniya xwe ji sîstema hiyerarşîk a dewletê digirt. Pergala hiqûqî ya dewleta Sûriyê li ser bertîl û wasta dihat meşandin. Kesên dewlemend yan jî yên Beesî bi bertîl û wasta, xwe xilas dikirin. Ji bo ev hînbûnên xirab ên şaristaniyê di pergala dada civakî de belav nebin, mekanîzmayên kolektîf û şefaf ên biryardayînê girîng in. Nexasim bi avakirina platformên dadgeha gel ji bo dozên ku civakê bi giştî elaqerdar dikin, encamên erênî hatine girtin. Di serî de gelek kes bi guman nêzîk dibûn. Lê bi taybetî dozên ku ji bo darizandina kuştinên jinê di bin navê 'namûsê' de yan jî bûyerên bertîlê dihatin vekirin, nirxandin û pêşniyazên gel ji bo mehkûmkirina tawanên zayendperest û êrîşên li dijî exlaqê civakî, asteke girîng destnîşan kirin. Nexasim tevlîbûn û nihêrînên jinan di van dozan de diyarker bûn. Ji ber ku civakê xwe wekî hêza biryar û çareseriyê dîtiye, qanehbûn û bawerî derheqê hukimên dadmend de bi pêş ketine. Beşdarên platforman vê rêbazê wekî *'perwedeyeke*

[681]Hevpeyvîn bi endamên Dada Jinê ya Dêrikê re, Dêrik, 2017

[682] Çavkanî li heman cihî

civakî' û *'ji nû ve zindîbûna cewherê civaka exlaqî û polîtîk'* dinirxînin.

Lê belê ji bo pirraniya jinên ku ji ber pirsgirêkên malbatî, neheqî yan jî tundiyê li çareseriyê digerin, Mala Jinê dibe navnîşana yekemîn, beriya ku mekanîzma û çerxên Dada Civakê bikevin meriyetê. Xebatkarên Mala Jinê bi dilxwazî û bêyî ku heqdestek bistînin ji bo parastina mafê jinan têdikoşin. Bi vê xebatê re zanebûna jinê li ser rewşa jin û malbatê bi gelemperî bi pêş ketiye. Di nirxandinên endamên Mala Jinê de him êş û pirsgirêkên hevbeş ên jinên Rojava tên ser ziman, him jî taybetmendiyên cuda bi dîrok, bawerî û çanda pêkhate û herêman ve girêdayî.

Feryal û Şukriya rewşa jinên li Hesekê û gavên destpêkê yên xebatê Mala Jinê wiha dinirxînin: *"Destpêka dema me Mala Jinê vekir, me gelek êş kişandin. Li Hesekê her sê mikewin hene. Ji ber qanûnê me nebûn, jina Mesîhî digot 'qanûnê me rûhanî ne, girêdayî dînê me ne'. Ji bilî civîn û perwerdeyan wan xwe nêzî me nedikir. Di dilê jina Ereb de jî tirsa girêdayî olê hebû, gelekî di bin bandora şerma adet û teqalîdan de bû. Rewşa jina Kurd hinekî cudatir bû ji ber jina Kurd di şoreşê de xwe nas kir û gelek gavên bi hêz avêtin.*

Dema qanûnên jinê sala 2014'an derketin civakê ew ji ber bandora olê qebûl nedikirin. Mînak jina Misilman divê serê xwe bitewîne, li ber zilaman neaxive, bi destê xwe silav li zilam neke. Heya ku jin nedigiha asteke xerab, jin nedihatin cem me. Lê dema her roj lêdixist û bê exlaqî pê re dikirin, hingî dihat. Du rê li pêşiya jinê bûn, yan bihata cem me yan xwe bikuşta. Dema me gazî zilam dikir, wî qebûl nedikir, digot: 'Çima hûn ji nişkê ve hatin û dixwazin jiyana me biguherînin?' Lê dema me nîqaş dikir û zilma DAIŞ'ê dîtin, ew ketin ferqekê ku ev ne dînê Îslamê ye. Beriya şoreşê ti sazî nebûn jinê bi hev ve girêbide. Ji vê wêdetir jinê jin dişkand. Jin li ber deriyan dirûniştin û behsa hev dikirin, şer û pevçûn çêdibûn. Niha hêdî hêdî jin zane bûye. Em nabêjin bi temamî rabûye, lê gelekî ber bi başbûnê ve diçe. Tişta ez li ser xwe qebûl nakim, divê ez li ser jineke din jî qebûl nekim."[683]

Li hêla din endamên rêvebiriya Mala Jinê ya Til Temirê dibêjin, jinên hemû pêkhateyan, jinên Kurd, Aşûrî û Ereb bi pirsgirêkên xwe yên cûr bi cûr tên cem wan. Bi israr û têkoşîn ew rêbazên çareseriyê bi pêş xistine û pergala edaleta jinê di nav civakê de gav bi gav dane qebûlkirin: *"Hizrek paşverû ya desthilatdariya mêr hebû, digotin: 'Va jina li min gilî bike, dawe li min radike, ez ê wê jinê berdim.' Ji ber ku tecrûbeyeke nû bû, me di meha yekem û duyem de gelek zehmetî û astengan dikşandin. Yanî dozek nêzîkî pênc roj, şeş roj dirêj dikir ji ber ku em bê perwerde bûn. Lê niha em saetek yan dido bi wan re dirûnin û çareser dikin. Niha zilam jî fêrbûn û bi xwe jî tên û alîkarî ji bo çareserkirina pirsgirêkên bi hevjînên xwe re dixwazin."*[684]

Ji bo rewşa jinên li Serêkaniyê endama Mala Jinê, Asya dide xuyakirin ku zêhniyeta baviksalariyê hê jî jinan ji civakê û ji hev du dûr dixe: "*Tevî ku jin li ber xwe didin, kar dikin û pêş dikevin, gelek caran bav nahêle ku keç biçe civîn û karan. Bav li himber wê disekinin û wê didin zewcandin. Hin jin hene li hemberî vê yekê li ber xwe didin. Lê ya herî zor ew e, dema jin zilmê li jinê dike, bêbextiyan li hev dikin, li ser hev diaxvin û hev du dişkînin. Ev yek jî, dîsa zilam çêdike. Salek yan jî du salan piştî zewacê, zilam dixwaze jineke din bîne. Jina yekê pirr êş û zilm dîtiye. Lê ji bo li ser zarokê xwe bimîne, xwe bêdeng dike. Aboriya jinê nîne. Ji ber vê, dema ku zilamek jinê ji malê*

[683] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Hesekê re, Hesekê, 2017

[684] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Temirê re, 2017

diqewtîne, jin nema dizane çawa xwe û zarokên xwe xwedî bike."[685]

Li gorî nihêrînên endama Mala Jinê ya Serêkaniyê, Şervan Mihemed rewşa jinên li bajarê Serêkaniyê ji rewşa jinên li gundên derdor baştir e. Her wiha ew dibêje, di kesayetên zilaman de jî cudahî xuya dikin: *"Hin zilam hene piştî vê şoreşê guhertine û bi mafê wekhev ê jin û zilamî bawer in. Lê hin zilam jî hene, qebûl nakin ku jin li mafê xwe bigere û giliyê wan bike. Niha li gorî berê pirr xweş e. Jin dikare derbikeve û kar bike. Jinên hemû netewan li bajêr tên Mala Jinê û mafê xwe dixwazin. Lê rewşa jinên li gundan pirr zehmet e. Zilam hîn wek berê ye, jinê qebûl nake. Jin her tiştî dike, zarokan xwedî dike, sewalan xwedî dike û avdaniyê dike. Lê berhema karê jinê dikeve destê zilam. Lewma em dixwazin di gundan de civînan ji jinan re çêkin da ku jin jinê rake û mafê xwe zanibe."*[686]
Nûnerên Mala Jinê ya Qamişloyê diyar dikin ku qanûnên jinê dibûn amûreke xurt ya têkoşînê li hemberî tundiya li dijî jinê. Her çiqas qedexekirina cûreyên cuda yên şidetê nikare tundiya li dijî jinê bi giştî bide sekinandin jî, misogerkirina pîvanan rê vedike li pêşiya derbaskirina feraset û diyardeyên zayendperest yên hezaran salan:

"Di dema şoreşê de gelek jinan xwe bi me girt. Wan ji biryarên Mala Jinê yên qedexekirina jina diduwa, berdêlî, heyrandin û zewaca temenê piçûk hêz girt. Berê di van rewşan de kesekî nikaribû mudaxelê kiriba. Jinan ev êş dikişand. Mînak; dema kurap diket rêya dotmama xwe û ew diheyrand. Heger dotmam pê re nezewicanda, nediştin ku ew bi zilamekî din re bizewice. Gelek jinan dixwest bi xortên din re bizewicin, lê digotin, 'Çênabê. Em herin wan bikujin'. Xilas, ew jin bi tenê dima. Kes nêzî wê nedibû. Ev bû çandek di nav civaka berê de. Zarokên du malbatan bi hev re dileyîstin, mezinan digot, 'Ev yên hev in' û berdelî dikirin. Xilas. Ev keç mezin dibû û ji yek din hez kiriba, mecbûr ma li gorî vê gotina mezinan bimeşe.
Me got: 'Ev êş çima?' Me ev tişt qedexe kirin û rakirin. Heger çêbibe û em xeberê bigirin em dîrek mudaxele dikin. Civakê nikarî tiştek bikira, lê niha wek tevgera jinan a Kongra Star em dikarin mudaxele bikin. Piştî ku komîn hatin avakirin, mafê komînê yê mudaxelê jî heye. Erê, di şoreşê de çavên gelek jinan vebûn, lê hîn tundî li ser jinê heye."[687]

Di nirxandinên endamên Mala Jinê û Dada Jinê de derdikeve holê ku di encama birêxistinbûn, perwerde û têkoşînên jinê de şiyarbûnek li ser rewş û parastina mafê jinan di nav civak û malbatan de hatiye çêkirin. Tevî helwestên neyînî jî, qanûnên jinê fêrbûnên zayendperest kirin ber lêpirsînê. Bi vî awayî nîqaşên nû li ser têgihîna exlaqê civakê bi pêş ketine. Lê hê jî têkoşîna ji bo guhertina zêhniyeta zilamê serdest û pêkanîna wan rêgezên azadî û wekheviya jinê dewam dike.

- **Daneyên Çendanî û Şiroveyên li ser Bilanço yên Cûreyên Tundî li dijî Jinê**

Lêdan, tundiya bedenî û nefsî, kuştin, xwekujî, destdirêjî, tecawiz, revandin, zewaca di bin temenê 18 salî re, pirrjinanîn û desteserkirina mîrasê cûreyên tundiya li dijî jinê ne ku di têkiliyên malbatî de û girêdayî zayendperestiya civakê ji aliyê saziyên jinê ve yên wekî Mala Jinê, Asayîşa Jinê, Rêxistina SARA û Meclîsa Dada Jinê hatine şopandin. Dîsa di raporên Mala Jinê û Dada Jinê de dozên hevberdanê û tundiya li dijî zarokan jî hatine nirxandin. Li gorî daneyên raporên salane yên

685 Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Serêkaniyê re, 2017

686 Çavkanî li heman cihî

687 Hevpeyvîn bi Îlham Omer û Dayika Mûrad re, endamên rêveberiya Mala Jinê, Qamişlo, 2017

van saziyan, dîmenê rewşa jinê û cûreyên tundiya zayendperest ên ku dibin metirsî ji bo jiyan û mafên jinê bi vî rengî xuya dikin:

Lêdan û tundiya li dijî jinê li nava malbatê:

Bûyerên lêdan û tundiya li dijî jinê yên ku di navbera salên 2013 heta 2016'an de hatin ragihandin (ji derveyî sala 2015'an) zêde bûne: Di sala 2013'an de gilî derheqê 1130 bûyerî de; di sala 2016'an de derheqê 2475 bûyeran de gilî hatiye kirin. Li kantona Cizîrê rêjeyê miracaetan di bajarên mezin ên wekî Qamişlo û Hesekê de yê herî zêde ne. Dîsa di bilançoya 6 heyvên dawiyê ya sala 2017'an a Asayîşa Jinê de balkêş e ku ji gelemperiya dozên li Bakurê Sûriyê ji sedî 73 li Efrînê hatibûn vekirin. Li gorî daneyên raporên heta sala 2017'an balkêş e ku di salên 2018 û 2019'an de li gorî raporên Meclîsa Dada Jinê hejmara dozên di mijarê tundiya li dijî jinê de gelekî kêm bûne. Ji bo sala 2018'an 99 miracaet û ji bo sala 2019'an 288 doz hatine ragihandin.

Dema ku em dixwazin li gorî van daneyan sedemên kêmbûn yan jî zêdebûna tundiyê şirove bikin pêwîst e em di serî de van pirsan zelal bikin: Gelo di raporan hemûyan de 'lêdan û tundiya li dijî jinê' bi heman şêwaz dihatin pênase kirin? Yan jî hinek cûreyên şidetê di nav malbatê de di raporên Meclîsa Dada Jinê de bi pênaseyên cuda di beşên din ên raporê de hatine bicihkirin? Dîsa em dizanin ku bi gelemperî li welat hemûyî agahiyên hejmarî yên li ser tundiya li dijî jinê tên parvekirin, tenê nisbeteke ji tundiyê xuya dibe. Bûyerên bi rastî diqewimîn zêdetir in. Lê ji ber ku tundiya di nava malbatê de wekî mijareke 'taybet a malbatî' yan jî 'bi şerm' ango 'ji rêze' tê dîtin, gelek jin êşên xwe naynin ziman. Lewma em jî dipirsin: *Gelo di navbera salên 2011 û 2019'an de tundî li dijî jinê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kêmtir bûye? Yan jî miracaet û dozên li ser vê mijarê, kêmtir bûne?*

Bi vê pirsê ve girêdayî, Hemîde Mistefa ji Mala Jinê ya Cindirêse li kantona Efrinê di sala 2017'an de da xuyakirin: "*Pirsgirêkên jinê ji berê de hene, lê bi awayekî veşartî bûn. Dayikên me bi mafê xwe nedizanîn û di bin navê şermê de bêdeng bûn. Bi taybet di dema rejîmê de tirs hebû. Lewma jinê serbest mafê xwe nedixwest. Lê bi şoreşê re jinê derfet dît ku mafê xwe bistîne. Li ser vî bingehî niha pirsgirêk derdikevin holê."*[688]

Îlham Omer ji Qamişlo dide zanîn ku di navbera salên 2011 û 2017'an de di encama têkoşîna li hemberî tundiya li dijî jinê de gelek guhertin di jiyana malbatan de çêbûne: *"Pirsgirêkên jinên Kurd û Suryan kêm bûne. Lê jinên Ereb hîn bi gelek pirsgirêkan re bi rû tên. Bi taybet li herêmên ku nû hatine rizgarkirin, wekî li Tîl Koçer û Tîl Hemîs. Jin hemû karan dike, lê mafê wê winda ye. Jin gelek êşiya. Ew ji me re dibêjin: 'Werin herêmên me û perwerde bikin. Qanûnê hûn tînin, em pê kêfxweş in.' Niha em giraniya xebatên xwe didin wir."*[689]

Herçend kiryarên lêdanê qedexê ne û di Dada Civakî de tên dadgehkirin hîna gelek zilam 'lêxistina jina xwe' wekî 'mafekî xwezayî' rewa dibînin. Ew dîsa jinan tawanbar dikin. Li gorî nihêrînên van zilaman, helwestên jinê dibin sedema lêxistinê. Herî zêde nexwestina têkiliyên cinsî, li ber gotina zilam rabûn, nexweş çêkirina xwarinê û karê malê, derketina jinê ji malê yan jî kêmasiyên zarokan qaşo wekî sedemên tundiya li dijî jinê tên mebestkirin. Şidet li hemberî jinê di nav malbatê de hemwext bandorê li zarokan jî dike. Pirraniya zarokan ji ber fêrbûna şidetê di nav malbatê de bi

[688] Hevpeyvîn bi Hemîde Mistefa re, endama Mala Jinê ya Cindirêse, kantona Efrinê, 2017

[689] Hevpeyvîn bi Îlham Omer û Dayika Mûrad re, endamên rêveberiya Mala Jinê, Qamişlo, 2017

xwe jî şidetê bi kar tînin yan jî bi tirs dibin.

Bi taybet di têkiliyên zewacê de yên ku ne bi xwesteka her du hevjînan pêk hatine, pevçûn, lêxistin û tundiya li dijî jinê zêdetir e. Endamên Mala Jinê ya Til Koçerê dibêjin, di salên dawî de hinek bipêşketin di warê adetên zewacê de çêbûne: *"Berê biryara zewacê ne di destê keçikê de bû. Bavê wê ew dizewicand bêyî ku nêrîna wê bigire. Lê niha pirraniya malbatan ji keçka xwe pirs dikin beriya ku wê bizewicînin. Jê re dibêjin, 'biryar ya te ye'. Malbat hemû ne wek hev in. Hinek hene biryara keçka li cem wan girîng e. Lê hinek jî hene nêrîna keçkê nagirin û wê di temenê 13 an 14'an de didin zilamekî kal. Tu keç naxwaze êşa ku dayika wê kişandî, careke din bikşîne û bê dilê xwe bizewice."*[690]

Em dikarin bibêjin, girtina pêşiya zewacên bi temenê piçûk û zewacên bi zorê, naskirina vîn û mafê jinê tedbîrên herî girîng yên li dijî lêxistin û tundiya zayendperest di nava malbatê de ne. Dema ku feraseta zayendperest ya ku jinê wekî 'milkê' zilamî dibîne li paş tê hiştin û li şûna vê di pîvanên exlaqî yên civakê de jin wekî hebûneke aydê xwe bi mafên wekhev tê dîtin, êdî kesek nema dikare tundiyê li dijî jinê rewa nîşan bide û pêk bîne.

Kuştina Jinan

Di navbera salên 2013 û 2016'an de her sal nêzikî 23 tawanên **kuştina jinan** hatine dadgehkirin. Ev tawan herî zêde li Qamişlo û Efrînê hatin kirin. Rapora Asayîşa Jinê destnîşan dike ku bi tenê di 6 heyvên dawî yên sala 2017'an de 18 jin di nav civakê yan jî malbatê de hatine kuştin. Her wiha Meclîsa Dada Jinê ragihand ku di sala 2018'an de 15 jin û di sala 2019'an de 23 jin hatine kuştin. Bîlancoyên Asayîşa Jin û Asayîşa Giştî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê nîşan dikin ku kuştinên jinan dibin ji sedî 14'yê hemû tawanên kuştinê yên sala 2019'an.

Wekî di hemû tawanên tundiya li hemberî jinê de, dibe ku hejmara kuştina jinan jî di rastiyê de hîn zêdetir be. Lêkolînên li gelek welatên cîhanê jî eşkere dikin ku pirr caran kuştinên jinan wekî 'xwekujî' yan jî 'qeza' tên veşartin. Her wiha jinên ji tevahiya saziyan diyar dikin ku beriya şoreşê bûyerên kuştina jinê yên bi hinceta 'paqijkirina namûsê' hîn zêdetir bûne. Fitne û fesadiyên ku di nav civakê de belav bûne, zû dikaribûn bibin sedama kuştina jinan. Rastiya van bêbextiyên li hemberî jinê hebû yan tine bû ne girîng bû; li ser bav yan jî bira hatibû ferzkirin ku keç yan jî xwuşka xwe bikujin da ku namûsa malbat û eşîrê paqij bikin.

Jineke ji taxa Kaniya Kurdan a Kobanê behsa kuştina xwuşka xwe du salan beriya şoreşê dike: *"Xwuşka min ji ber şorê xelkê hatiye kuştin. Tişteke wê tine bû. Lê bêbextî lêkirin, digotin 'bi kurekî re reviya'. Birayê min hat, got, 'Va şore li ser xwuşka me derketiye, em nikarin xwuşka xwe sax bihêlin!' Eşîr jî giş ketin pey namûsê. Jiyana me çetîn bû. Tenê ser gotinên hinekan xwuşka min bi 7 - 8 fişekan hatiye kuştin. Wê demê YPJ tine bû. Heger hebûya, niha ba, ne xwuşk, ne bira wisa nedikir."*[691]

Endamên Dada Jinê ya Dêrikê dibêjin, di salên 2012 û 2013'an de zêdetir dozên kuştinê û hewildanên kuştinê yên têkildarî feraseta namûsê dihatin rojeva wan. Bipêşveçûna şoreşê kir ku paşê ev doz kêmtir bibin. Ji ber ku di dadgehên dewleta Sûriyê de ev sûc herî zêde bi cezayê girtîgehê yê şeş mehan dihatin dadgehkirin, ne di hiqûqa dewletê de, ne jî di feraseta zayendperestiya civakê de kuştina jinê wekî tawaneke li dijî mirovahiyê nedihat dîtin. Lewma

[690] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Koçerê re, Til Koçer, 2017

[691] Hevpeyvîn bi jina li taxa Kaniya Kurdan re, Kobanê, 2017

Dîwana Edaletê xebat û nîqaşên hiqûqî û civakî bi pêş xistine da ku kuştina jinê wekî her kuştinê were şirovekirin û dadgehkirin. Lê dîsa di salên destpêkê de hinek bûyer diqewimîn ên ku dibûn ezmûnên ji bo rûniştandina hişmendiya rast a dada civakî.

Jinên Dîwana Edaletê ya Dêrikê qal dikin ku di sala 2012'an de agahiya wan li ser kuştina dayik û zarokê wê çêbûyê ku di dawiya sala 2010'an de qewimîbû. Dihat gotin, vê dayikê bi zilamekî din re yê ku jê hez dikir, reviyabû. Tevî ku silha wan çêbû, dema ev dayik hat mala bavê xwe, ew ji aliyê bav, mam û kurmamê xwe ve bi rengekî pirr hovane hatiye kuştin. Zaroka wê ya yek salî jî pê re kuştine. Dema ku dayika vê jinê pişti çar mehan pê dihesê, wê ji bav u mamê keça xwe pere û xaniyek xwestiye da ku li ser kuştina keça xwe bêdeng bimîne. Lê belê dema ku tiştên xwestiyê wernegirtiye, ew diçe dadgehê û giliyê kuştinê dike. Endamên Dada Jinê, nêzîkatiyên xwe û yên civakê yên wê demê dixin ber lêpirsînê:

"Lijna sulhî dihat ji me re digot 'Ev mesela namûsê ye. Jin ne baş bû ji ber wê ew kuştin.' Lê insan bi vî rengî yekî nakuje. Ew zarok jî kuştin. Tu elaqa wê zarokê nebû. Ev mesele li ser me gelek giran hat. Hewildanên girtina kujeran çêbûn. Lê belê wan bazda Başûrê Kurdistanê û ev doza kuştinê wisa ma. Dema biryar derket Dîwana Edaletê îstînaf kir. Di dawiyê de Tevgera Jinê bi gişti biryar da ku bi vî rengî nabe û divê ku bav, mam û kurmam bên girtin. Bi perê ku wan da dayîkê li ser navê jina ku hate kuştin weqfa jinê li Dêrikê vekirin. Piştî ewqas salan mamê wê doh hat gund. Ji me re xeber hat û me niha girtiye muebed. Piştî vê meselê çendên din jî hatin. Lê belê êdî nêzîkatiyên me cuda bûn. Her tim li ser me giran tê çawa dibe ku jinek bê kuştin. Dema tu li ser pirsgirêken wan difekî tu dibînî hemû nêzî hev in. Ew hemû dibin nakokiyên navbera jin û heqîqeta civakê ku heyî."[692]

Di destpêka şoreşê de kêm zêde li her herêma Rojava zehmetiyên ji bo rûniştandina helwesteke rast beramberî tawanên qaşo li ser navê namûsê dihatin kişandin. Mînak, di sala 2011'an de jineke li Serêkaniyê jî ji aliyê hevserê xwe ve bi behaneya ku ji malê reviyaye, hatibû kuştin. Wê demê pergala dada civakî hîna li Serêkaniyê tam nehatibû rûniştandin. Lewma rêveberiya Yekîtiya Star pêşniyaz kir ku komîteyeke taybet were avakirin û raya civakê li ser hukmê vê dozê were girtin: *"Komîte çû raya civakê girt. Hafteyeke şûnde ew hatin cihê me yê Yekîtiya Star û wan got, 'ew zilam hatiye berdan'. Îcar me ji dadgehê pirs kir: 'We çima ew zilam berda?' Gotin, 'We xwest ku em li nêrîna civakê bipirsin. Civakê jî got 'wî namûsa xwe paqij kiriye. Ji ber vê jinê heq kiribû ku were kuştin. Zilam baş kiriye, namûsa xwe paqij kiriye.' Vêga me wekî Yekîtiya Star careke din dawa rakir û bir dadgehê. Di encamê de me zilam xist hepsê. Yanî li vir em dikarin bibînin ku hîna ev feraseta cinsiyetperest di civakê de heye ku bingehê xwe ji zêhniyeta dewletê digire."*[693]

Endamên Mala Jinê ya Amûdê rave dikin ku 'kuştinên namûsê' bi şoreşê re kêmtir bûne. Bûyera kuştina Felek Îsmaîl a 35 salî û şêwaza dadgehkirina kujerê wê bandoreke mezin li ser civakê çêkir. Felek Îsmaîl di 31'ê Tîrmehê 2016'an di şeva zewaca xwe de bi awayeke hovane ji aliyê mêrê xwe ve hatiye qetilkirin. Malbata Felekê û jinên bajarê Amûdê bi pankarta "Na ji zilamê hov re" daketin kolanên bajêr û kuştina Felek Îsmaîl şermezar kirin. Dadgeha kujerî bi rêya platforma gel hat lidarxistin:

"Dema ku vî zilamî jina xwe kuşt, em çûn, me cenazeyê jinê rakir û bir nexweşxanê. Dîsa hemû jin xwedî lê derketin û cenazeyê wê veşartin. Jinan nehişt ku zilam xwe nêzîkî wê bikin. Zilam hat girtin û di mehkema wî de jî em hemû amade bûn. Wekî jin me daxwaz kir ku ew heta ebeden li

[692] Hevpeyvîn bi endamên Dada Jinê ya Dêrikê re, Dêrik, 2017

[693] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

zindanê bimîne. Mehkemê jî wiha biryar da. Berê jin ser navê 'namûsê' gelek dihatin kuştin. Lê niha ev kêm bû. Berê zilamekî dîtiba ku xwuşka wî bi xortekî re biaxiviya, wî karibû ew bikuşta."[694]

Endamên rêveberiya Kongra Star didin xuyakirin ku berê wan nikaribû li ser bûyerên jinên ku ji aliyê hevserên xwe ve hatine kuştin, eşkere nîqaşê bikin. Lê bi rêbazên dadgehên gel û perwerdeyan, ew van mijaran niha eşkere bi gel re nîqaş dikin. Ew hesab ji kujer û şirîkên wî dipirsin da ku di feraseta civakê de ev tawan êdî neyên pejirandin. Lê endamên Kongra Star wekî kêmasî dinirxînin ku wan hîn xwe negihandiye her kesa/ê di nava civakê de. Dema ew lêkolînên li ser bûyerên kuştina jinê dikin, ew pê dihisin ku *"hemû jin bûn yên ku carekê jî nedihatin civînên me yan jî meşên me. Jinên bê rêxistin bûn yên ku hatine kuştin. Di vê rastiyê de me dît ku me hîn hemû jinên li Rojava bi rêxistin nekirine û lingên pergala me tam li ser erdê nesekinîne. Em bûn xwediyên komînan lê dîsa me nikaribû jiyana wan keç û jinan biparêzin."*[695]

Bi tehlîlkirina bûyerên bi êş, rêveberiya Kongra Star li Efrînê sala 2016'an xwe li tiştekî nû ceriband: *"Di encamê de me belkî 20 jin ji kuştinê xilas kirin ên ku têkiliyên wan ên cuda cuda hebûn. Me ji hemû malbatan re got, 'Heger xeterek ji bo jiyana keça we hebe, hûn bi xwe werin cem me û agahiyê bidin me. Ne lazim e ku keç were kuştin û ne jî lazim e ku hûn biçin hepsê. Em ê xwedî li keçê derkevin'. Bi rastî jî malbat dihatin û agahî dan me. Me keç digirt cem xwe û piştre me bi malbatê re jî nîqaş dikir û ew îqna dikirin. Keç carna çend heyv yan salekê li cem me dima. Piştre ew dîsa diçû malê yan jî hinek jî hebûn tevlî xebatan dibûn. Me sîstemek ava kir ku civak jî guhert. Civakê didît ku ew jinên ciwan dikarin gelek karan bikin, aqilî ne û dikarin tiştên baş bikin. Dema ku tu çareseriyekê dibînî, civak baweriyê bi te tîne."*[696]

Bi kampanya, xebat û perwerdeyên tevgera jinê li dijî kuştina jinê û feraseta namûsê ku jinê dîl digire, hişmendiya zayendperest ya ku jinê dikuje, êdî dikeve ber lêpirsînê. Di pergala dada civakî de jî kuştina jinê wekî her tawana kuştinê tê dadgehkirin bêyî ku ceza bê sivikkirin. Her wiha bi şoreşê re saziyên taybet ji bo parastina jinên metirsiya kuştinê li ser wan, hatine avakirin. Bi vî rengî jiyana bi hezaran jinan hatiye parastin. Lê belê domandina xebatên perwerdeyê bi armanca guhertina hişmendiya zayendperest girîng e da ku ti 'sedem' ji bo kuştina jinê di civakê de nema rewa bê dîtin.

Rewşeke pirr trajîk e ku di civakekê de ya ku li hemberî êrîşên qirkirinê yên çeteyên DAIŞ'ê û dewleta Tirk li ber xwe dide, di heman demê de bûyerên kuştina jinê bi destê bav, bira yan jî hevser çêdibin. Ji bo van kirinên hanê bi giştî ji holê rabin, Kongra Star di dema şerên herî dijwar de jî çalakiyên xwe ji bo parastina mafê jinan domandin û bûyerên qetîlkirina jinan şermezar kirine. Nihêrîn û ceribandinên girêdayî têkoşîna li dijî qirkirina jinê destnîşan dikin ku bi rêya naskirina vîn û xwebûna jinê wekî rêgezeke exlaqî ya civakê, guhertinên bingehîn dikarin bi pêş bikevin û qirkirina jinê dikare were sekinandin.

Xwekuştinên Jinan

Diyardeyên xwekuştinên jinan di sala 2013'an de nehatibûn ragihandin. Lê belê di sala 2014'an de 8 bûyer, di sala 2015'an de 16 bûyer û di sala 2016'an de jî 12 bûyerên xwekuştinên jinan hatin

[694] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Amûdê re, Amûdê, 2017

[695] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

[696] Hevpeyvîn bi Zelal Cîger re, Qamişlo, 2017

tomarkirin. Dîsa di 6 heyvên dawiya sala 2017'an de li gorî bilançoya Asayîşa Jinê 7 jinan xwe kuştiye û 26 jinan hewl daye ku xwe bikujin. Di nav van bûyeran de rêjeyên bilind yên xwekuştinên li kantona Efrînê û li navçeya Dêrikê bala mirov dikişînin. Dîsa li Kobanê di navbera 2 salên pişti pêvajoya şer de 7 bûyerên xwekuştina jinan hatine tomarkirin. Di daneyên sala 2018'an ên Meclîsa Dada Jinê de ti bûyera întîhara jinan nehatiye ragihandin. Lê belê di sala 2019'an de 5 bûyerên xwekuştinê hatine tomarkirin. Wekî din di bîlançoyên Asayîşa Jinê û Asayîşa Giştî de balkêş e ku nisbeta xwekuştin û hewldanên xwekuştina jinan li gorî yên zilaman gelekî kêmtir e. Li gorî vê, rêjeya xwekuştinên jinê di nav bûyerên xwekuştinê de ji sedî 15'ê ye; di nav 91 hewldanên xwekuştinê de yên ku li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine ragihandin, rêjeya jinan ji sedî 4'ê ye.

Li gorî daneyên li ser xwekuştina jinan hatine tomarkirin, rêjeya întîharên jinan li gorî ya zilaman li Bakur û Rojhilatê Sûriyê nisbî kêm xuya dike. Rêjeya întîharên jinan li ber yên zilaman li pirraniya welatên cîhanê li derdora ji sedî 30'î ye. Tevî ku jin bi êş û zextên girantir re rû bi rû dimînin, girêdana wan a bi jiyanê ve û berpirsyariya wan li hemberî zarok yan jî civakê nahêle ku jin zû bi zû biryara xwekuştinê bidin. Dîsa di nêzikatiya bûyerên xwekujiyê de jî ferasetên zayendperest derdikevin holê. Mînak, tê gotin: *"Dema keçek xwe dikuje namûs tê bîra mirovan. Lê dema xortek xwe dikuje tê gotin, 'Çi guneh e, tiştekî ew aciz kiriye!'."*[697]

Girêdana jinê bi jiyanê re her tim xurt bûye. Çîrokên jiyanê yên dayikan, didin xuya kirin ku jinan di rewşên herî zehmet de xwe ji bo domandin û parastina jiyanê berpirsyar dîtiye û hêzeke mezin raber kiriye. Ji ber ku daneyên li ser bûyerên xwekuştinê beriya şoreşê li herêmên Kurdistana Rojavayê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê tine ne, em nizanin gelo bûyerên întîharê bi şoreşê re zêde yan jî kêm bûne. Di olê de jî xwekujî wekî guneh tê hesibandin. Lewma bûyerên xwekujiyê di nav malbat û civakê de pirr eşkere nayên parvekirin, sedemên van nayên nîqaşkirin. Lê belê çend jin serpêhatiyên xwuşk yan jî cîranên xwe bi me re parve kirine yên ku dema beriya şoreşê bi xwe jiyana xwe bi dawî kirine. Pirraniya wan ji ber zextên zayendperest û tundiya zilamî, xwe neçar û bê rûmet, hebûna xwe bê wate yan jî wekî bar ji bo malbatê didît.

Ji sala 2011'an ve aloziyên di jiyana jin û civakê de gelek zêde bûne. Jin li bin şertên şer û şoreşê de li hemberî êrîşên dijminan şerê parastina jiyan û civakê dane. Jin ji bo domandina jiyana malbatê di bin merçên şer, xizanî û koçberiyê de hêzeke mezin raber kirine. Her wiha bi sazkirina rêveberiya xweser gelek derfet, sazî û qadên nû yên jiyanê bi taybet ji bo jinan avabûne. Her întîhar di vî rewşa aloz a ku bi têkoşîna parastina jiyanê re derbas dibe, bibe sedema lêpirsînan: *Ev jin çima nikaribû rêyeke çareseriyê bibîne da ku bi destê xwe dawî anîna jiyana xwe? Ev jin çima hêviya xwe ya jiyanê bi giştî winda kiriye?*

Hevpeyvînên bi jinên ji temenên cuda û nûnerên Rêxistina SARA û Kongra Star re sedemên cuda yên întîharên jinan derdixin holê. Pirraniya van bi tundî û zextên hişmendiya zayendperest ve girêdayî ne. Ev tundî û zext dibin sedema înkarkirina vîn û rûmeta jinê û hestên kûr yên tenêbûn, bênirxbûn û bêçaretiyê di kesayeta jinê de ava dikin.

Rewşeke ku di gelek bûyerên întîharê yên jinên ciwan de hatiye tesbît kirin, zextên li ser jina ciwan bûn da ku ew bi zilamekî re bizewice ku ew naxwaze. Dîsa asteng kirina dîtin an jî zewecê bi xorteke re ku ew jê hezdikir jî gelek car wekî sedema xwekuştinê hatiye destnîşan kirin. Endamên navenda Rêxistina SARA ya Qamişlo dibêjin: *"Gelek kes ku xwe intihar kirin bi ser me re derbas bûn. Bavek dixwest keçê xwe bidana bê dilê wê. Keç xwe kuşt. Me ev zilam darizand û*

[697] Hevpeyvîn bi xebatkarên Saziya Zarokên Sêwî ya Kantona Cizîre, Rimêlan, 2017

kirin zindanê ji bo bibe mînak ji bavên din re. Ev jin guneh e. Bila yekî bi dilê xwe bikira. Çima xort bi dilê xwe dike, çima bila ya keç ne bi dilê xwe be?"[698]

Rêveberiyên şaxê Rêxistina SARA ya li Kobanê jî hema pirsgirêk û lêpirsînan tînin ser ziman: *"Keçek û xortekî li Kobanê xwe kuştin ji ber herdu malbat li hember hezkirina wan dibûn asteng. Ev bûyer bûye hişyarek. Piştî vê êdî malbat nema weke berê li dijî daxwaza zarokên xwe derdikevin."*[699]

Her wiha endamên SARA dinirxînin ku gelek jin dixwazin guhertin û pêşketin di jiyana xwe de çêbikin. Lê belê ji ber tirsa wan ji civakê an jî axaftinên derdor heye, ew newerin an jî nizanin xwe çawa ji zilma zilamê rizgar bikin: *"Ji ber zexta derûnî jî xwekuştin pêşdikevin. Heta astek jin xwe ker dikin. Lê di dawî de nema dikarin tehmul dikin. Dema jin di rewşek wiha de tên cem me, em dibin alîkar, mafê wan yê xwezayî ji wan re didin naskirin. Lê heger jin nayên cem me, em nikarin mudaxele bikin."*[700]

Di payiza 2017'an de rêveberiya jinê ya Kobanê, komîteyeke taybet ji bo lêkolîna bûyerên întîhara jinê ava kiriye ji ber ku di nava du mehan de pênc jinan xwe kuştibû. Berdevka Desteya Jinê dibêje, wan berê nedîtibû ku li Kobanê di nav demeke kin de ewqas întîhar çêbûne. Ew encamên lêkolînê li ser sedemên van bûyeran wiha dinirxîne: *"Jin bi xwe re di nav têkoşînê de ye. Tiştên ku ew bixwaze, ew nikare di rastiya jiyana xwe de pêk bîne. Jin beriya şoreşê û niha, ne wek hev e. Jin ketin nava lêgerînan de û ew hinek tiştan wekî berê qebûl nakin. Zilm û zexta zilamî jî heye. Lê belê hinek rewşên cuda jî hene. Mînak; saziyên ji derve bandoreke neyînî li ser civaka Kobanê çêkirin. Ew di bin navê 'alîkariya civakî û derûnî' de çanda xwe li ser civakê û bi taybet nifşê ciwanan ferz dikin. Gelek jin jî di nav van saziyan de dixebitin. Lê çand û nefsiya civaka me cuda ne. Rêyên çareseriyê ku ew sazî nîşan didin pirsgirêk û nakokiyên nû di nava civakê û malbatên me de ava dikin."*[701]

Alozî, êrîş û êşên ku bi şer û koçberiyê ve girêdayî diqewimin, yan dikarin bibin sedem ku mirov hîn zêdetir bi jiyanê ve bên girêdan û li ber xwe bidin yan jî dikarin bibin sedem ku jiyan li ber çavê mirovan reş bibe. Rewşên aloz him gelek xeteran him jî derfetên nû di zik hev de dihewînin. Jinên Rojava jî di salên bihurî de ev herdu rastî – xeter û derfetên nû – dîtine. Beşeke jinan vê nakokiyê wekî fersenda xwebirêxistinkirin û bipêşxistina têkoşînê nirxandiye. Lê belê gelek jin jî di vê rewşa aloz de, li hemberî gefên şer, hovitiya DAIŞ û arteşa Tirk, ji binî ve tirsiyane û xwe bêzar dibînin. Dema ku ew di rewşa êrîşên ji derve de piştgiriya malbat û civakê jî nabînin yan jî ji aliyê mirovên herî nêz ve jî rastî zordariyê tên, ew dikare biguhere qeyraneke kûr, bi xof û hêvînemayî. Çavderiyên endamên Dada Jinê ya Dêrikê jî vê şirove piştrast dikin: *"Çend dosyayên xwekuştinê cem me hene. Heger em li tehlîla wan meyze bikin, em dibînin dema ku çareseriyê nema dibînê, jin xwe dikuje."*[702]

Dermanê sereke ji bo pêşîgirtina li qeyranên bêçaretî, fikrandin û hewildanên xwekujiyê di rewşa aloz a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, parastin û xurtkirina têkiliyên manewî yên civakî ye. Jinên ku li ber xwekuştinê bûn, dibêjin, wan gavek paş ve avêt, dema ku cîranek yan jî hevaleke wan li derî

[698] Hevpeyvîn bi endamên navenda Rêxistina SARA re, Qamişlo, 2016

[699] Hevpeyvîn bi endamên Rêxistina SARA re, Kobanê, 2017

[700] Çavkanî li heman cihî

[701] Hevpeyvîn bi Zozan Bekir re, Kobanê, 2017

[702] Hevpeyvîn bi endamên Dada Jinê ya Dêrikê re, Dêrik, 2017

xist û li rewşa wê pirsiye. Hêviya jiyanê bi wate û nirxdayîna mirovan, bi civakîbûn, parvekirin û piştgiriyê xurt dibe. Ji serpêhatiyên jinên di Şoreşa Rojava de em fêhm dikin ku wan hêza têkoşînê li dijî her cûreyê zilm û zordariyê li ser vî bingehî di kesayeta xwe de ava kiriye.

Destavêtin, Tecawiz û Revandina Jinan

Giliyên jinan li ser tawanên destavêtin, tecawiz û revandinê, navbera salên 2013 û 2019'an sal bi sal kêmtir bûne: Ji 37 bûyerên tecawiz yan jî revandinê ku di sala 2013'an de li asta Rojava hatibûn ragihandin, ev hejmara daketiye 12 bûyerên di sala 2016'an de. Dîsa bilançoya Asayîşa Jinê ya heyvên Temmuz heta Kanûna 2017'an vê çavdêriyê piştrast dike. Di vê fetrê de bi gştî 5 jin rastî tecawizê yan jî revandinê hatine. Lê belê ji bilî vê 19 bûyerên 'istîlaya cinsî' jî hatin ragihandin.
Di sala 2018'an de li gorî daneyên Dîwana Edaletê ya Herêma Cizîre 10 tawan, li gorî rapora Meclîsa Dada Jinê jî 6 tawanên tecawizê hatin dadgehkirin. Heman salê Dîwana Edaletê ya Herêma Cizîre 13 tawanên 'destavêtin' û 6'ên revandina jinan tomar kirine.
Di sala 2019'an de Dîwana Edaletê ya Herêma Cizîre li ser 3 dozên tecawizê sekinî û Asayîşa Gştî li ser 21 dozên di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê de. Heman salê Dîwana Edaletê ya Herêma Cizîre 11 tawanên destavîtinê û Asayîşa Jinê jî 20 tawanên destavîtinê tesbît kirine. Her wiha Asayîşa Jinê li ser 10 û Asayîşa Gştî jî li ser 26 dozên revandina jinan sekinîne.

Tundiya zayendî yek ji cûreyên tundiyê ye ku ji bilî birînên bedenî jî birînên herî kûr di kesayet û ruhê mirov de çêdike. Tundiya zayendî ji aliyê zilam ve wekî amûreke dagirkeriyê bi armanca şikandina vîn, nasname û rûmeta jinê bi rengekî sîstematîk tê bi kar anîn. Lê di hişmendiya zayendperest a civakê de bi pirranî jin di bûyerên tecawuz yanî destavêtinê de wekî 'sûcdar' tên gunehbarkirin, heta cezakirin. Jinên piştî ku tundiya zayendî li hatiye kirin, gelek caran di bin navê 'paqijkirina namûsê' de ji aliyê malbata xwe ve yan dihatin kuştin yan jî neçar dihatin hiştin ku bi zilamê tecawuzkar re bizewice. Bi vî rengî gelek jin heta dawiya emrê xwe her roj di rewşeke 'ji mirinê xirabtir' de jiyane. Gunehbarkirina jinan, her wiha hestên şermê û birînên kûr, ji bo gelek jinan dibin astengiyên li pêşiya gilîkirin û dadgehkirina tawanên tundiya zayendî. Hîna di warê pênase û binavkirina van tawanan de zehmetî tên kişandin.

Di encama têkoşîna azadiya jinê de tecawuz wekî amûreke şer, dagirkerî, êşkence û desthildatdariya zilam hatiye deşîfrekirin. Hişmendî û kiryarên tundiya zayendî wekî 'çanda tecawuzê' tên şermezarkirin. Gelek jinên ku ji aliyê komên wekî DAIŞ'ê hatine revandin yan jî van koman tecawuzî wan kiriye, piştî rizgariya xwe ji aliyê civak û malbata xwe ve hatine hembezkirin. Tevî ku destketiyên girîng di warê parastina jiyan û rûmeta jinan de çêbûne jî, hê jî ev têkoşîn li hemberî têgihîna şaş a namûsê dewam dike.

Ji bilî rewşa şer û êşkenceyên dewletê, di asta cîhanê de bûyerên destavêtina jinê para bêhtir di têkiliyên malbatî û hevjînan de diqewimin. Birîn û zererên van bûyeran bandoreke girantir li ser derûniya jinê dikin. Ji ber ku di vê rewşê de ew kes êrîşî jinê dikin yên ku bawerî didan yan jî jê hez dikirin. Her wiha jin bi pirranî di jiyana xwe ya rojane de dubare rastî wan tecawuzkaran tên.

Dîsa gelek jin têkiliyên cinsî yên ku hevserê wan bi zorê li ser wan ferz dikin, wekî 'tecawuz' pênase nakin. Ew xwe neçar bibînin ku wekî 'qedera jinê' xwe li vê tundiyê ragirin. Helwestgirtin li hemberî kiryarên tecawuza di nav malbatê de ne tenê wekî rûreşiyeke ji bo vê jinê, lê ji bo rûmeta tevahiya malbatê tê fêhmkirin. Lewma binavkirin û gilîkirina tundiya zayendî di têkiliyên malbatî de ji bo jinê hîn girantir e heta hema bibêje ne pêkan e. Lê di heman demê de jî ji bo jinê kişandina vê êşê bêyî ku ew bikare vê yekê bi kesekê/î re parve bike, bêyî ku bikare ji êrîşkar hesab bipirse, gelek caran dikare bibe sedema pirsgirêkên giran ên derûnî heta intîharê.

Pênasekirina tundiya zayendî wekî kirinên cinsî hemûyan yên ku ji derveyî vîn û xwesteka herdu aliyan pêk tên, girîng e. Di vî warî de pêwîst e jin bizane ku mafê wê yê xwezayî ye ku vîna xwe bide xuyakirin û têkilî yan jî nêzîkatiyên cinsî red bike yên ku ne li gorî dilê wê ne. Endamên saziyên jinê balê dikişînin ser wê yekê ku perwerde û semînerên xweser li ser mijarên wekî jin û malbat, tenduristî û mafên jinê, rêbazên girîng in ji bo jin bikarin êşên xwe yên veşartî parve bikin û hêzê ji hev du bigirin.

Zewacên bi Temenê Piçûk

Di salên 2013 û 2014'an de ti doz derheqê zewicandina jinên ciwan de yên temenê wan di bin 18 salan de nehatibûn vekirin. Lê di sala 2015'an de 20 bûyer û di sala 2016'an de 31 bûyer bûne rojev. Asayîşa Jinê da zanîn ku di 6 heyvên dawiya 2017'an de 44 bûyerên zewaca di temenê piçûk de hatine ragihandin, ji wan 35 li kantona Cizirê û 5'an li kantona Kobanê rûdane.
Di sala 2018'an de Dîwana Edaletê ya Herêma Cizîre 16 doz û Meclîsa Dada Jinê di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê de 52 dozên zewaca bi temenê piçûk ragihandin. Wekî din di sala 2019'an de li Dîwana Edaletê ya Herêma Cizîre de 46 dozên derheqê zewaca jinên temen piçûk de bi rê ve çûne.

Zewicandina keç û jinên ciwan ên di bin 18 salî re heta destpêka şoreşê di gelek eşîr û malbatên Kurd û Ereb ên li Bakur û Rojhilatê Suriyê de wekî kevneşopiyekê hatiye kirin. Lê belê bi qedexekirina zewaca di temenê piçûk de di çarçoveya qanûnên jinê de û bi bipêşxistina helwestên li dijî vê diyardeyê, gelek nîqaş li derdora vê mijarê di civakê de bi pêş ketine. Bi vî rengî hinek guhertin çêbûne da ku di nihêrîna civakê de zewacên bi temenê piçûk hîn zêdetir wekî neheqiyeke li dijî jinê bên dîtin. Lewma heta sala 2014'an ti doz bi vî rengî nedihat vekirin.

Anketa Weqfa Jinên Azad a Rojava (WJAR) ya ku di sala 2016'an de hatiye kirin, eşkere dike ku zewaca jinên di temenê piçûk de bi pirranî weke 'çandeke kevnare ji bo parastina şerefê' hatiye dîtin û pêkanîn. Bi vî awayî gelek keç ji ber zewacê di zarokatiya xwe de ji derfetên xwendin û bipêşketine bêpar hatine hiştin. Gelek ji wan hîna beriya ku bedena xwe nas bikin û karibin vîna xwe bidin xuyakirin, dibûn bûk û dayik. Ev rewş tevî erkên giran ku ji wan dihatin xwestin, gelek caran dibû sedema pirsgirêkên tenduristî, derûnî û malbatî. Ji ber vê jî tê nirxandin ku zewaca di temenê piçûk de yek ji sedemên sereke yên hevberdanê ye.

Anketa WJAR'ê dide xuyakirin ku nihêrînên civaka Rojava li ser mijara zewaca di temenê piçûk de hêdî hêdî tên guhertin: 1676 kes ji wan % 52 jin in û % 48 mêr in, beşdarî anketê 'Nêrînên li ser rastiya zewaca di temenê piçûk de' bûne. Pirraniya van jî ji nifşê ciwanan bûne. Ji % 86'ê beşdarên anketê zewaca di temenê piçûk de rast nabînin û ji % 66'ê wan vê adetê ne weke 'çand', lê weke 'pirsgirêk' bi nav dikin. Wekî din ji % 90'ê beşdarên anketê, maf nadin bav ku keça xwe di temenê piçûk de bide zewicandin û ji % 70'yê wan tevlî van zagonê dibin ya ku ji bo qedexekirina zewaca di temenê piçûk de hatiye çêkirin.[703]

Lê belê mijara zewacê di temenê piçûk de hîna yek ji mijarên sereke ye yên ku wekî pirsgirêk tên rojeva saziyên jinê û di nav civakê de bi nêzîkatiyên cuda tên nîqaş kirin. Hinek kes dibêjin, ji ber rewşa şer, alozî û koçberiyê bi şoreşê re zewaca keçên di temenê piçûk de pêwîst e û lewma zêdetir bi pêş ketiye. Lê dema ku em ji nifşê dayikên di ser 30 salî re li temenê wan ê zewacê dipirsin, derdikeve holê ku gelek ji wan jî di bin 18 saliya xwe de zewicîne, yanê beriya rewşa aloz li Suriyê hatibûn zewicandin. Wekî din ji ber ku derheqê vê mijarê de jî daneyên hejmarî yên beriya

[703] Weqfa Jina Azad li Rojava (WJAR): *Encamên anketa 'Nêrînên li ser rastiya zewaca di temenê piçûk de'*, 2016

sala 2012'an nayên peydakirin, em nikarin rewşa kêmbûn yan jî zêdebûna zewaca bi temenê piçûk di serdema şoreşê de misoger bikin. Lê belê li ser sedemên vê diyardeyê gelek şirove hene. Pirraniya wan xwe dispêrin xwesteka bav û dayikan a 'stirandina keça xwe'.

Xebatkarên Kurd û Ereb ên Mala Jinê ya Cindirêsê ya kantona Efrînê, sedemên zewicandina keçan bi temenê piçûk wiha nirxandine: *"Civak dibêje 'bila keçek çavê xwe li malê mêrî xwe veke û li ser destê hevjînê xwe mezin bibe.' Lê piştî ew keç nikare xasuyê û xwuşka hevjînê tehmûl bike û pirsgirêk dest pê dikin. Ew jî her tişt dikin ji bo keç çavê xwe li dinyayê veneke, bibe xizmetkar û tiştî nizanibe."*[704]

Bi giştî wan rave kiriye ku piştî derketina qanûnên jinê, zewaca di temenê piçûk de kêmtir bûye. Lê belê balkêş e ku piştî koçberiya gelê Efrînê di encama şerê dagirkeriya dewleta Tirk a sala 2018'an de cardin gelek malbatan keçên xwe dan mêr, beriya ku ew bibin 18 salî. Endamên Meclîsa Kongra Star a Kampa Berxwedanê hemû dibêjin: *"Dema em dibînin ku niha zarokek 13 salî tê zewicandin, em pirr pê diêşin."* Lê sedema vê yekê, ew bi du nihêrînên cuda şirove dikin: Nihêrînek dibêje, ji ber bi derketina gel ji Efrînê valatî di rêxistinbûna gel û ya jinan de çêbûne. Lewma bi hatina Şehbayê re zilaman ji nû ve derfet peyda kirine ku desthilatdariya xwe ferz bikin û paşverûtiyê di nav civakê de vejînin: "*Gelek kesan digot, 'Şoreşger nemane. Pergala me nemaye*'."[705]

Nihêrîna din jî ev e ku hîna li Efrînê pirsgirêkên wiha di nav civakê de hebûne, lê belê birêxistinbûna civakê û perwerdeyên jinan têrê nedikirin da ku vîna jinê bi qenaetek ji dil di nav civakê de were naskirin. Rozerîn Koçan ku li Efrînê endama meclîsa belediyê bû û niha di şahredariya Kampa Berxwedanê de kar dike, vê rewşê wiha dinirxîne: *"Pirsgirêkên ku em niha li Şehbayê dibînin, zewaca di temenê piçûk de, zewaca duyemîn û wekî din hîn pirsgirêkên Efrînê ne. Berê şoreşê rêxistin di nav milet de bû. Lê piştî şoreşê me saziyên xwe ava kirin û me tê de kar kir. Lê qutbûnek ji gel çêbû. Ji ber vê, gelek kêmasî û xirabûn, wekî zewac di temenê piçûk de çêbûn. Lewma me nizanibû çi tê serê jin û malbatê. Şehba piçûk e û rêxistinbûneke xurt çêbû, ji ber vê, niha pirsgirêk xuya dibin. Sîstema Kongra Star a meclîs û komînan baş rûnişt. Ji ber em zêdetir derbasê malbatan dibin, em êşa keçên malbatê dibînin. Heger me li Efrînê jî wekî niha kar kirba, rêxistina xwe baş rûniştandiba, em negihîştin vê astê."*[706]

Wekî din hinek kes li Şehbayê û navçeyên cuda yên Rojava dibêjin, hinek malbat keçên xwe zû didin zewicandin ji bo ew tevlî YPJ'ê nebin. Daxwaza wan ew e ku keçên wan li malê bimînin û ji malbatê re xizmetê bikin. Her wiha hîna gelek jinên ciwan piştî zewacê dev ji xwendin û karê xwe yê derveyî malê berdidin ji ber ku zilam yan jî xwesû naxwazin ku bûka wan karê derveyî malê bike. Bi vî rengî jin di temenê ciwan de ji têkiliyên civakî tên qutkirin û bi erkên mal û malbatê tên sînordarkirin.

Li gorî çavdêriyên endamên Dada Jinê ya Dêrikê jî hinek malbat hene ku bi destpêka aloziyên li Sûriyê re hîn zûtir hewl didin ku keçên wan mêr bikin. Ji ber zanîngehên li Heleb û Şamê wê demê hatibûn girtin, jinên xwendekar nikarîbû xwendina xwe dewam bikin: "*Hinek malbat ew wekî firsend didît da ku keça xwe bizewicînin. Gelek malbat ne wisa ne, lê hene. Heya carna wan dixwest saziyên me tedexul [mudaxele] bikin. Wan digot, 'Ma wê çi bibe emrê kecikê 17 salî ye.*

[704] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Cindirêsê re, 2017

[705] Hevpeyvîn bi Emîne Mihemed re, endama meclîsa jinê ya Ehrezê, Şehba 2019

[706] Nîqaşa bi nûnerên Meclîsa Kongra Star a Efrînê û saziyên jinê li Kampa Berxwedanê re, Şehba, 2019

Salek maye ku bibe 18. Tiştek pê nîne.' Lê wan ji bîr dikir ku qanûnek heye. Divê em wê pêk bînin."[707]

Endamên Dada Jinê ya Kobanê jî zehmetî û kêmasiyên di pêkanîna zagonê û guhertina kevneşopiyên baviksalariyê yên zewacê yên li herêma Kobanê de tînin zimên: *"Zagona ku keçik di temenê 18 salî de bizewice li vir pirr pêk nayê. Di hin cihan de zewac di temenê 16 û 15'an de çêdibin, paşê Mala Jinê pêdihese. Heya niha li gel me kurapê keçikê li pêşiya wê disekine û nahêle bi kesekî din re bizewice. Berdêlî jî hîna pirr heye. Lê bi avakirina lijneya lihevkirinê, ev terzê eşîrtî hinekî li paş hatiye hiştin."*[708]

Beramberî vê, endamên Mala Jinê ya Dêrikê didin xuyakirin ku di civaka Kurd a herêma wan de kevneşopiyên heyrandin û berdêlî *'ya ku [pê] yek di agirê yeke din de dişewite'* bi şoreşê re kêm bûne: *"Dema acizbûn di navbera du malbatan de derdikeve, ji bo heyfa xwe ji hev bihilînin, keçên hevdu diguherîn. Jinên herdu malbatan dibin qurbaniyên kîna wan. Niha ev rewş pirraniya xwe di nav civaka Ereban de derdikeve [holê]. Lê heyrandin kêm bûye, dema qanûnên jinê derketine. Hingî, dibe di van çend salan dawî de jî nemîne."*[709]

Berpirsyariya pêkanîna qanûnên jinê aydê tevahiya civakê ye. Lê belê hîna pirsgirêkên zêhniyetê û lawaziyên xebitîna komînan hene. Lewma, endamên Mala Jinê di vê mijarê de hişyar in. Xebatkarên Mala Jinê ya bajarê Tirbespiyê serpêhatiyên xwe wiha parve dikin: *"Dema ku em dibihîzin wê zewaceke qasir çêbibe, em diçin û didin sekinandin. Em qanûnên jinê ji wan re dixwînin. Destpêkê qebûlnekirin li hemberî qanûnê û reşkirinek li hemberî Mala Jinê hebû. Bûyerek çêbû. Yek ji malê nedirust bû, digot keç 18 ye, lê temenê keçê piçûk bû. Em çûn me qanûnên xwe xwendin. Bav û dayika keçkê digot, 'Mala Jinê ser serê me'. Lê jinê got, 'Min keça xwe daye birayê xwe. Ew ê aciz bibê.' Me got: 'Em ê çareser bikin.' Temenê keçkê 14 bû. Niha salek derbas bûye, hîna keçik di mal de ye. Dibe ku her kes qebûl nake. Lê pêşketin bi qanûnê re çêbûn. Êdî her kes tê, pirsa xwe li me dike. Em dixwazin hêdî hêdî qelen jî rakin û em li hemberî berdêlî jî disekinin."*[710]

Her wiha li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên ku ji sala 2016'an û şûn ve hatine rizgarkirin yên wekî Minbic, Tebqa, Reqa û Derazorê zewacandina keçan di 14 – 15 saliyê de bi gelemperî wekî kevneşopiyeke eşîrî tê dîtin. Li van herêman meclîsên jinan ji bo guhertina vê adetê û zêhniyeta baviksalariyê xebatên perwerdeyê dimeşînin. Gelek jin dixwazin ku zewaca di temenê piçûk de li herêmên wan jî bê qedexekirin û wekî tawaneke di pergala dada civakî de were dadgehkirin. Lê belê hîna guman li ser dibetiyên pêkanînê hene. Lewma li van herêman li şûna nêzikatiyeke hiqûqî, hişyarkirin û perwerdekirina civakê esas tê dîtin.

Xebatên Kongra Star û saziyên jinê ku li hemberî zewaca bi temenê piçûk û kevneşopiyên zewacê yên ku vîna jinê û hevjînan tine dihesibînin, hatine meşandin, rojeveke girîng di civakê de ava kirin. Nexasim nifşê ciwanan piranî piştgiriyê dide biryara qedexekirina van şewazên zewacê. Lê

[707] Hevpeyvîn bi endamên Dada Jinê ya Dêrikê re, Dêrik, 2017

[708] Hevpeyvîn bi endamên Dada Jinê ya Kobanê re, Kobanê, 2017

[709] Navenda Lêkolînê ya Jineolojiyê ya Dêrikê: *Encamên lêkolînê li ser sedemên hevberdanê*, 2018

[710] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Tirbespiyê re, 2017

belê jin li navçeyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemûyan diyar dikin ku nêzîkatiyeke hiqûqî ji bo guhertina van kevneşopiyan kêm e. Ji bo dijberiya van pêkanînan li dijî exlaqê demokratîk ê civakê were fêhmkirin û guhertinên bingehîn di zêhniyetê de çêbin, xebatên perwerde, birêxistinbûna jinê û xwegihandina malbat, keç û jinên ciwan rêbazên encamgîrtir in.

Pirrjinanînê

Dozên **'pirrjinanînê'** jî di salên 2013 û 2014'an de nehatibûn ragihandin; lê di sala 2015'an de 17 doz û di sala 2016'an de 76 doz di vê mijarê de hatine vekirin. Di 6 mehên dawî yên sala 2017'an de Asayîşa Jinê 52 bûyerên pirrjinanînê ragihand, ji wan 29 li kantona Efrînê û 17 li kantona Kobanê rûdane. Her wiha sala 2018'an Dîwana Edaletê ya herêma Cizîre 82 tawan û Meclîsa Dada Jinê jî 136 tawanên pirrjinanînê tomar kirine. Di sala 2019'an de bi tenê Dîwana Edaletê ya Herêma Cizîre bi 124 dozên pirrjinanînê re elaqedar bûye.

Wekî pirsgirêka zewaca keçan bi temenê piçûk pirsgirêka pirrjinanînê jî heta derketina qanûnên jinê ne wekî 'pirsgirêkekê', lê para bêhtir wekî kevneşopiyeke olî û eşîrî hatiye dîtin. Lewma ev qanûn jî li her derê bûye mijara nîqaş, pirs û nakokiyan. Ji bilî civaka Xirîstiyan, di pirraniya pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de zewaca zilamekî bi zêdetîrî yek jinê re wekî nîşana hêz û rûmeta zilamî dihat dîtin. Hiqûqa dewleta Sûriyê jî ev rewş girêdayî qaîdeyên olî nirxandiye û pejirandiye. Lewma gelek kes - bi taybetî zilam – ji qedexekirina pirrjinanînê ne razî ne. Kêm kesan êşa jin û zarokan didît û fêhm dikir, ya wan jinên ku li dijî hev dihatin bi kar anîn. Hejmara dozên pirrjinanînê destnîşan dike ku hîna di hinek beşên civakê de zehmet e xelk qaneh bibe. Lê belê adet û nihêrînên li ser vê mijarê li gorî taybetmendiyên civakê û herêman jî diguherin.

"Bi gişti qanûnê bandoreke erênî li ser civakê çêkiriye. Lê belê zilam qedexekirina anîna pirr jinan bi îdîa red dikin ku, dema bi jineke duyemîn re nezewicin, ew ê 'mecbûr bimînin' ku têkiliyên cinsî yên derveyî zewacê çêbikin yan jî êrîşî jinan bikin..." Dîsa tê gotin: *"Zewaca bi pirr jinan re li gorî Quranê helal e. Ew dibêjin, 'Quran dipejirîne ku zilam jinekê, du, sê û çar jinan jî bîne.' Lê em dibêjin, 'Berdewamiya wê ayetê jî heye: 'Heger hûn nikarin bi edaletê çêbikin, çênekin û hûn nikarin çêkin jî.' Ew beşa destpêkê dibêjin, lê berdewamiya wê nabêjin."* Lewma endamên Mala Jinê û jinên oldar ev nêzîkatî wekî *"kêm şirovekirina Quranê li gorî feraseta zayendperest a zilamî"* rexne dikin."[711]

"Gelê Suryanî piçûk nazewicin û pirrbûna jinan jî cem wan nîne. Lê cem Ereban û Kurdan ev gelek heye. Ew dibêjin, 'Keça me bimîne di malê de û nezewice. Ev xeterek e, wê bikevê şaştiyan. Divê em xwe jê xilas bikin.' Bi fikra xwe jê xilas dikin, keçê davêjin stûyê zilamekî. Carna piştî mehekê yan du mehan wê bi ser wan de vegere bi xeyd."[712]

Nexasim dema ku di têkiliya zewacê de zarok - bi taybetî zarokên kur - çênabin gelek zilam û jin jî rewa dibînin ku, bi gotina civakê *'zilam jineke din bîne'*. Di vê mijarê de jî xuya dibe ku zewac û rista jinê hîn wek amûreke zêdebûnê tê dîtin. Zarokên kur wek hêz, serbilindî û dewama qewm bi qedr in. Lê zarokên keç wekî '*endameke demkî ya malbatê*' yan jî derd tên hesibandin. Di vê mijarê

[711]Hevpeyvîn bi Leyla Saroxan re, Hesekê, 2017

[712] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Hesekê re, 2017

de Zehîde Zekeriye ji Mala Jinê ya navçeya Cindirêse ya Efrînê balê dikişîne ser nêzîkatiyên baviksalariyê yên çors: *"Dema zarokên jinê nedibûn wî mêrî digot, 'ez ê bizewicim'. Li gorî civaka me eger jinek zarê wê tine be, wê bi hêsanî mêr wê bavêje û biçe bizewice. Li gorî wî, jin bê nirx e. Ev him bi me re derbas bûye, him jî di Mala Jinê de derbas bûye."*[713]

Endamên Dada Jinê ya Dêrikê dibêjin ku di beşeke civaka Dêrikê de bi bandora Tevgera Azadiyê hîna beriya Şoreşa Rojava êdî zewaca bi pirr jinan re nema dihat pejirandin: *"Beriya qanûnên jinê derbikevin, wek çandeke di nav milet de çebûbû ku dujinî nabe. Lê dema qanûn derket, doz nû hatin gel me. Gelek zilam jî wek mafekî ji xwe re dibîne ku du jinan bîne û ti kes hesab jê naxwaze."*[714]

Gelek hewldanên zilaman ji bo pûçkirina qanûnê hene: Hinek diçin Başûrê Kurdistanê, Şamê yan jî cihên din li Sûriyê da ku zewaca duyemîn çêkin. *"Herî zêde jinên ku zarokên wan çênabin, zilamên wan diçin herêmeke din û li wir dizewicin. Piştî demekê jî ew vedigerin tevî jina xwe ya nû û dibêjin, 'beriya zagona jinê derkeve ez zewicîme'. Wisa jina xwe dixapînin. Jin hertim ji bo zarok û mala xwe fedekariyê dike, lê zilam vê fedekariyê nake."*[715]

Hinek zilam jî di fermiyetê de jina yekem berdidin, lê belê piştî zewaca duyemîn dîsa herdu têkiliyan dewam dikin. Hinek jî hewl didin ku daxwaza xwe bi maqamên xweseriya demokratîk fermî bidin qebûlkirin: *"Zilam niha hesabê me dikin. Tên dipirsin dema ku yek dixwaze jina diduyan bîne. Em jî ji wan re şirove dikin, çima nabe. Zilam jinan jî dişînin cem me da ku Mala Jinê kaxizekê bide wan ji bo bikarin cara duyem bizewicin. Lê çênabe. Zilam dixwazin jinan bînin li hemberî hev û bişixulînin, ji bo li ser zilam bi hev bikevin. Em ji jinê re armanca zilamî didin fêhmkirin. Vê demê jin jî li ber vê radibe."*[716]

Carinan jin jî bi daxwaza destûrdayîna zewaca bi pirr jinan re ji bo hevjînê xwe miracaetî saziyên jinê dikin. Lê pirr caran derdikeve holê ku ew jin ditirsin ku zilamê wan ji bo zewaca bi jineke din re wan berdin. Li Malên Jinê yên li tevahiya navçeyên Rojava bûyerên wiha dubare qewimîne. Endameke rêveberiya Mala Jinê ya Qamişloyê mînaka xwe dibêje: *"Xwuşka zilamê min hatibû. Zilamê wê ew şandibû ji bo kaxezekê ji Mala Jinê bigire ji bo ew jineke din bîne. Min ji vê jinê pirsî, 'Va bi dilê te ye?' Wê got, 'Na bi mirina min e. Ez bimirim çêtir e ji wê yekê ku yek were ser min.' Jin ti car naxwaze yek bê ser."*[717] Endamên Mala Jinê ya Til Koçerê didin xuyakirin ku gelek jin ji wan re eşkere nakin dema zilamê wan li ser wan bi yeke din re dizewice. Ji ber gumanên civakî û yên siberojê ew dipirsin: *"Çima zewaca bi pirr jinan re hatiye qedexe kirin? Em vê biryarê qebûl nakin. Em bi temenê xwe mezin bûne. Heke em ser hewiyê nexwazin, ma wê kî me bixwaze?"*[718]

Her wiha carinan xuya dibe ku endamên Mala Jinê bi xwe jî di navbera rêgezên azadiya jinê, nêzîkatiyên qanûnî, yên hestyarî û kevneşopiyên zayendperestiya civakê de tên û diçin. Mînak hinek endamên rêveberiya Mala Jinê ya Kobanê ji bo pêkanîna qedexekirina zewaca bi pirr jinan re dibêjin, *"Divê mirov di rewşên taybet de nerm nêzîk bibe. Mînak heger jin û zilam 30 salan*

[713] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Cindirêsê re, 2017

[714] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Dêrikê re, 2017

[715] Hevpeyvîn bi endamên Rêxistina SARA re, Kobanê, 2017

[716] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Amûdê re, 2017

[717] Hevpeyvîn bi Îlham Omer û Dayika Mûrad re, endamên rêveberiya Mala Jinê, Qamişlo, 2017

[718] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Koçerê re, 2017

zewicî bin û zarokên wan çênabin, bila zilam careke din bizewice... Mafê wî jî heye..."[719]

Di gelek nihêrîn û bûyerên jiyanê de ev nakokî ya di navbera ferasetên zayendperest û pîvanên civaka demokratîk de eşkere dibe. Ev yek îşaret dike bi girîngiya xwegihandina têgihiştin û pîvanên hevbeş yên çand û exlaqê malbata demokratîk. Lewma gelek xebatkarên saziyên jinê daxwaza perwerdeyên taybet dikin. Ew perwerdeyên li ser taybetmendiyên malbata demokratîk him ji bo endamên saziyan xwe him jî ji bo jin, zilam û zarokan li hemû komînan pêşniyaz dikin.

"Belê, zagona me heye. Lê belê divê em mejiyê vî zilamî bidin guhertin. Ji ber ku dema wî çavê xwe vekiriye, fêrî van tiştan bûye. Yanî adetên wan in. Zilamê ku jinek û deh zarokên wî hebin, dîsa jî wê jineke din bîne. Ew dibêje: 'Ez ê bizewicim ji ber ku mêrên din ên malbatê jî hemûyan du jin yan jî sê jin anîne.' Lê bi perwerde û bi zimanekî xweş divê ev bê guhertin."[720]

Tevî kêmasiyan, xebatkarên Mala Jinê di şeş salên xebat û têkoşîna xwe de gelek guhertinên erênî di jiyana jin û malbatê de bi çavê xwe dîtine. Ked û têkoşîna jinên li navçeyên Bakur û Rojhilatê Suriyê hêmûyan hêvî û biryardariyê nîşan didin. Li ser vî bingehî gelek endamên jin yên meclîs û saziyan, xebatên xwe didomînin da ku xeter û pirsgirêkên têkiliyên pirrjînanînê ji bo jin û malbatê werin fêhmkirin û li paş bên hiştin. Bi armanca ku biryara qedexekirina zewaca bi pirr jinan re di nav tevahiya civak û herêmên Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriye de ji dil were pejirandin û pêkanîn, xebat û têkoşîn dewam dikin.

Berdan

Dozên berdanê yên ku di navbera salên 2013 û 2016'an de hatine vekirin sal bi sal zêde bûne. Di sala di 2013'an de saziyên jinê li ser 151 dozên berdanê û di sala 2016'an de li ser 371 dozên berdanê sekinîn. Herî zêde doz li navçeyên bi bajarên mezin ên wekî Qamişlo, Efrîn û Hesekê hatine vekirin. Dîsa li herêma Cizîrê balkêş e ku hejmara dozên berdanê her sal li navçeyeke cuda bilind dibûn. Mînak li gorî sal û cihên din di sala 2013'an de hejmara dozan li Dêrikê bilindtir bû; di sala 2014'an de li Tirbespiyê gelek doz hatine vekirin. Piştî pêvajoya şerê Kobanê, heta sala 2017'an li kantona Kobanê bi giştî 51 dozên hevberdanê hatine vekirin, ji van 33 di dada civakî de fermî bûne. Rapora Meclîsa Dada Jinê dide xuyakirin ku daweyên hevberdanê di sala 2018'an de daketine 106 dozan.

Heta şoreşê berdan tenê yekalî çêdibû. Wateya berdanê ew bû ku zilam hevjîna xwe berdide û zarokan ji destê wê distîne. Lewma gelek jin ji berdanê ditirsiyan. Bi şoreşê re jinan jî mafê wekhev yê berdanê bi dest xistiye. Bi vê re gelek şiroveyên li ser zêdebûna bûyerên berdanê di nav civakê de bi pêş ketine. Nexasim tê îdîakirin ku herî zêde jin daxwaza berdanê dikin. Pirraniya şiroveyên civakî jî 'zêdebûna berdanê' wekî metirsiya hilweşandina malbatê destnîşan dikin. Lê belê, heger em hejmarên ku di raporên saziyan de xuya dibin, binirxînin, rêjeya berdanê ne di asteke ewqasî bilind de ye wekî pirr car tê nîşandan. Li gorî serjimara Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS) ya meha Îlona 2016'an li herêma Cizîrê bi giştî 2500 jin hebûne yên ku hatibûn berdan yan jî bi xwe hevjînê xwe berdane. Ev dibe ji % 0,8'yê hemû jinên di ser 18 salî yên herêma Cizîrê re.

Daneyên li ser berdanên yekalî ku ji aliyê zilam ve li gorî hiqûqa dewleta Sûriyê an jî bi rêya

[719] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Kobanê re, 2017

[720] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Temirê re, 2017

oldaran ve hatine pêşxistin tine ne. Lewma em nizanin hejmara bûyerên berdanê yekalî yên zilam di salên berî 2011'an de û piştî 2011'an çiqas in. Xebatkarên Dada Jinê ya Kobanê bi misogerî dibêjin, *"yê ku herî zêde berdanê dixwaze, mêr e."*[721] Wekî din pirr caran dema ku zilam dixwazin hevjîna xwe berdin, ew bêxetiyê dixin stûyê wê da ku jin dîsa sûcdar xuya bike. Jinên ku hatine berdan, bi pirranî bi zehmetiyên mezin û bêdeng li mala bavê xwe jiyana xwe domandine. Endamên Dada Jinê ya Dêrikê didin xuyakirin: *"Jin hene yên ku hatine berdan û mafê wan hatiye xwarin. Ji ber vê, gelek jinên din jî beramberî neheqiyê di hundirê mala xwe de bêdeng dimînin û dibejin: 'Em sitirîne. Dema em ben berdan em ê bihetikin.' Hîn gelek guhertin divê, heta civaka me bi vî çavê mêze neke. Divê gavên zû bên avêtin."*

Endamên Mala Jinê ya Rimêlanê dibêjin, *"Pirsgirêkên sereke yên dibin nakokî di navbera jin û zilam de lêdan, destavêtin, xizanî û bêkarî ne. Her wiha ji ber vê yekê, jin û zilam hev berdidin. Dîsa zilam jinên bihêz napejirînin, ev jî dibe sedema berdana jinê."*[722] Rêveberiyên Mala Jinê li Efrîn, Kobanê û Cizîre hemfikr in ku yek ji sedemên sereke yên berdanê, zewaca di temenê piçûk de ye: "*Sedema bingehîn a berdanê ya keç û xortan jî hev nasnekirin û hev du fêhmnekirin e. Ji ber vê, ew nikarin bi hev re pirsgirêkan li pey xwe bihêlin. Tiştê balkêş derdikeve di hin dozên berdanê de. Gelek caran, pirsgirêkên di navbera xesû û bûkê de dibin sedema berdanê. Ji ber, xesû wek dayikekê ji wê bûkê re nêzîk nabe. Divê ev feraseta xesûtiyê were şikandin."*[723]

Di sala 2018'an de Navenda Lêkolînê ya Jineolojiyê ya Dêrikê lêkolînek li ser sedemên berdanê meşandiye. Di encama vê lêkolînê de jî zewaca bi temenê piçûk; zewaca li gorî kevneşopiyên berdêlî û heyrandinê; bandora çanda Hollywood, Bollywood û erebesk ya ku bi rêya film û teknolojiyê di civakê de belav bûye; zextên hevjîn û malabata wî wekî sedemên esasî yên berdanê hatine eşkerekirin. Rapora lêkolînê destnîşan dike ku ji bilî neanîna zarokan, esas a zarokên kur, daxwazên têkiliyên cinsî yên zilam gelek caran dibin sedema pirsgirêkên cidî di nav hevjînan de. Lewma hinek jin berdanê dixwazin ji ber ku ew nema zextên xerîzên zilamî qebûl dikin.
Li aliyê din jî jin hene yên bi daxwazên madî zext li ser zilamî ava dikin. Bi vî rengî pirsgirêkên aborî jî dibin sedema berdanê. Di dawî de lêkolîna ku li Dêrikê hatiyê kirin, digihîje wê encamê ku di dema şoreşê de jin zêdetir hişyar bûye, wê mafê xwe nas kiriye. Wekî din qanûnên jinê jê re bûne alîkar da ku nema serê xwe ji zextên zilamî hemûyan re bitewîne. *"Xwesteka jinê ya berdanê bi pirranî ji ber qebûlnekirina koletiyê û xwestina mafê xwe pêş dikeve. Ne ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî."* Her wiha li hemberî şiyarbûna jinê jî gelek caran acizbûna zilamî derdikeve holê ku carinan vediguhere pirsgirêkên hevjînan û heta bi hevberdanê jî diçe.[724]

Henîfe Elî ji Mala Jinê ya Efrînê dibêje, pirsgirêka berdana jinan di destpêka şoreşê de zêdetir bûbû, lê belê piştre hin bi hin dîsa kêm bûye: *"Çima destpêka şoreşê zêde bû? Ji ber koçbertî çêbû. Vê yekê bi xwe re gelek pirsgirêk derdixistin holê. Hinek ji ber rewşa xwe ya aborî, hinek ji ber pirsgirêkên mal û malbatê çûn. Dema jin û mêr ji ber koçberiyê ji hev veqetiyan, gelek zilaman piştî demekê digot, 'ez ê wê berdim û jineke din bînim'."*[725]

[721] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Kobanê re, 2017

[722] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Rimêlanê re, 2017

[723] Hevpeyvîn bi Henîfe Elî re, endama Mala Jinê ya Efrînê, 2017

[724] Navenda Lêkolînê ya Jineolojiyê ya Dêrikê: *Encamên lêkolînê li ser sedemên hevberdanê*, 2018

[725] Hevpeyvîn bi Henîfe Elî re, Efrîn, 2017

Her wiha endamên Malên Jinê hemûyan, balê dikişînin ser wê yekê ku ew dixwazin pêşiyê li zêdebûna berdanê bigirin û hewl didin pirsgirêkên malbatî bi îqnakirina herdu aliyan çareser bikin. Pirraniya jinan, saziya zewac û malbatê li gorî ferasetên olî û kevneşop wek saziyeke pîroz û yekane dibînin.

Dîsa yên ku herî zêde zext û zehmetî him ji pirsgirêkên malbatî him jî di rewşa berdanê de dibînin zarok in. Zarok gelek caran di nav dayik, bav û malbatên wan de tên perçiqandin. Li gorî qanûna jinê mafê dayikê ye ku zaroka/ê xwe heta temenê 15 salî xwedî bike. Piştre li ser bijartina zarok dimîne, heger ew bixwaze li cem dayikê yan jî li cem bavê xwe bimîne. Lê belê di rastiya jiyanê de hîna gelek astengî di pêkanîna vê zagonê de hene.

Her wiha piştî doza berdanê, gelek jin jî ji ber fesadî ango zextên civakî xwe sûcdar dibînin û ji ber vê dudilîbûn yan jî pirsgirêkên nefsî bi wan re çêdibin. Nexasim dema ku dayika bi zarok piştî berdanê careke din bizewice, gelek caran mêrê wê yê nû zarokên ji zewaca berê, qebûl nake. Gelek zarok ji ber van nêzîkatiyan bê xwedî mane û li kolanan mezin bûne. Lewma bi pêşengiya Desteya Jinê ya xweseriya demokratîk malên taybet ji bo zarokên sêwî hatine avakirin.

"Divê em bizanin mafê wan zarokan biparêzin. Bila jin wî zilamê xirab berde. Lê mala bavê wê dibêjin, 'Em nikarin wan zarokan xwedî bikin'. Ev êş li gel me heya niha heye. Ger aboriya wê jinê û zaroka wê hebe, wê ji sedî sed bi azadîya xwe bijiya. Lê zehmetî hene. Niha dadgeh û Mala Jinê serê zarokê 5 hezaran [Lîra] serê mehê didin. Lê 5 hezar têrî zarokê rojekî nake. Jineke ku xwedî çar zarok be wê bi 20 hezaran çi bike? Wiha mecbûr dimîne yan wê êşê bikişîne yan jî zarokan bide bavê wan. Ew jî êşa herî mezin ji bo dayik û zarokan e. Erê, di hundirê şoreşê de gavên mezin hatin avêtin. Lê hîn jin negihştiye mafên xwe."[726]

Endamên Mala Jinê ya Til Koçerê didin xuyakirin, heger ne bi giştî be jî, bi şoreşê re guhertinên berbiçav di civaka Kurd û Ereb de û di nêzikatiyên malbatê beramberî jinan de çêbûne: *"Berê jina berdayî, nikaribû xortekî bixwasta. Heger bizewica, yan ser hewî yan ser sêwiyên xwe bizewiciya û eyb bû ku ji malê derbikeve. Civak sûc dikir stûyê wê. Lome li zilam nedikirin. Lome li jinê dikirin. Jina berdayî pirr zilm didît. Lê niha ji berê baştir bûye, pêşketin heye. Niha ez dibînim hebûn û tinebûna jina xurt a ku kar dike di malê de jî diyar e. Mînak jina ku nikare bi zilamê xwe re bijî, eger aboriya wê hebe, dikare dev ji zilamê xwe berde û here cihekî din, zarokê xwe xwedî bike. Lê jina ku aboriya wê tine be, mecbûr e bi wî zilamî re bijî. Tiştê ku dihêle jin di bin desthilatdariya zilam de be, aborî ye. Niha jin dikare kar bike û aboriya xwe xurt bike. Lê her kes nahêle ku jin kar bike."*[727]

Herçiqasî li gorî qanûnên jinê mafê hevberdanê ji bo jin û zilam wekhev tê dîtin û mafê dayik û zarokan tên parastin, dîsa jî di pratîkê de rewşa berdanê di gelek aliyan de ji bo jinê girantir e. Lewma endamên Mala Jinê dibêjin, *"Qanûnên jinê baş in, lê kêm dimînin. Mînak dema berdanê lazim e ku mal aydê jinê be. Ji ber ku heta doz tê dîtin, jin li kolanê dimînin. Perê ji bo xwedîkirina zarokan jî têrê nake."* Bi giştî hîna feraseta zayendperest a ku berdanê wekî 'guneh' dibîne û jina berdayî wekî 'gunehkar' dinirxîne li cem pekhateyan hemûyan serwer e. Lewma jin zû bi zû berdanê naxwazin. Li gorî şertên baweriyê jinên Xirîstiyan qet nikarin têkiliya zewacê biqedînin. Heger tundî yan jî sedemên din yên giran hebin jî dêra Xirîstiyan destûra berdanê nade.

[726] Hevpeyvîn bi Îlham Omer û Dayika Mûrad re, endamên rêveberiya Mala Jinê, Qamişlo, 2017

[727] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Koçerê re, 2017

Herçi mijara berdanê ye, gelek nihêrîn û nêzikatiyên cuda di civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê de peyda dibin. Di encama dane û şiroveyan de em dikarin bibêjin, hîna berdan bi pirranî bi înîsiyatîfa zilamî pêk tê, ew jî dixwaze bi jineke din re bizewice. Nexasim dema ku zarok yan jî zarokên kur çênabin, zilam vê yekê wekî kêmasiya jinê dide diyarkirin û zewaca duyemîn ji xwe re 'heq' dibîne. Sedema daxwazên berdanê ku ji aliyê jinan ve tên bipêşxistin jî bi pirranî tundiya fizîkî û derûnî ye ya ku di têkiliyên malbatî de li wan tê kirin. Ji ber ku beriya şoreşê, ne qanûnên dewletê, ne kevneşopiyên olî û civakî, ne jî derfetên aborî destûr nedidane jinê ku xwe bide berdan, rast e ku bi şoreşê re jin li gorî berê zêdetir daxwaza berdanê dikin. Lê jin vê biryarê bi hêsanî nadin.

Tevî ku bi şoreşê re hinek derfet çêbûne jî da ku jin bikarin piştî berdanê jiyaneke nû ava bikin, şertên olî û fêrbûnên zayendperestiya civakê, bandoreke mezin li derûniya jinê kirine. Di dêrûniya gelekan de berdana zilamî wekî sûc û guneh hatiye tomarkirin. Lewma him gelek xebatkarên saziyên jinê, him jî gelek jinên ku di têkiliyên zewacê de bi salan e lêdanê dixwin, êşkence û heqaret li wan tê kirin, di biryardayîn û pêkanîna berdanê de gelekî dudilî ne. Jiyana bê serweriya zilam li gorî hişmendiya zayendperest a civakê, hîna wekî kêmasiya jinê tê nirxandin. Ji ber ku jin dizanin ku doza berdanê bi pirranî bi gelek zehmetî û zextên derûnî ji bo wê û zarokên wê derbas dibin, ew zû bi zû newêrin yan jî hevdu teşwîq nakin da ku ji têkiliyên di wan de şidet li wan tê kirin, veqetin. Li şûna ku dayik ji bo zarokên xwe jiyaneke aram ava bikin, ew bi pirranî xwe neçar dihesibînin 'ji bo zarokên xwe' êşa tundiya zilamî bikişînin. Lê belê pirr caran ew pê nahisin ku ew bi vî rengî jî zarokên xwe diêşînin.

Tevî ku li gorî gotina Îlham Omer ji Mala Jinê ya Qamişloyê *"ji sedî 90'ê jinan koletiyê nema qebûl dikin"*[728] jî zextên derûnî, aborî û civakî hîna dibin asteng lê pêşiya jinê û nahêlin jin bibin xwedî biryar û çalakî di pêkanîna jiyaneke bi vîn û rûmet de.

Tundiya li dijî Zarokan

Di raporên saziyên jinan de **tundiya li dijî zarokan** tenê di sala 2015'an de wekî 4 bûyeran hatiye ragihandin. Wekî din Meclîsa Dada Jinê di rapora xwe ya sala 2018'an de ragihand ku 6 zarok bê xwedî hatine hiştin.

Zarok gelek caran wekî 'siberoja civakê' tên binavkirin. Lê belê di rastiya jiyana malbat û civakê de nirxa zarokan û pêdiviyên wan ên madî û manewî gelek caran tên paşguhkirin. Ji ber xizaniyê gelek zarok di temenekê piçûk de jî di karên giran ên pîşesaziyê de yan jî palehî de dixebitin. Her çiqas di pergala perwerdeya xweseriya demokratîk de lêxistin û tundî li hemberî zarokan hatiye qedexekirin jî, dîsa gelek malbat lêxistin û cûreyên cuda yên tundiyê wekî 'rêbazên terbiyekirina zarokan' dibînin û bi kar tînin. Ev yek bandoreke neyînî li ser derûnî, kesayet û têkiliyên zarokan dike. Gelek ji wan nêzîkatiyên bi şidet û hêrs bi xwe diteyisînin şêwaza têkiliyên xwe bi xwuşk, bira û zarokên din re. Wekî din dema ku ew mezin dibin, gelek ji wan careke din tundiyê di têkiliyên xwe yên zewac û malbatî de bi kar tînin.

Her çiqas dayik jî gelek caran şidetê li zarokan dikin, dîsa tundî li hemberî zarokan jî bi feraseta baviksalariyê tê meşandin. Li ser zarokên keç bi pirranî qaîdeyên hişktir tên ferzkirin û ew bi pirranî zêdetir bi zext, qedexe û tundiyê re rû bi rû dimînin. Wekî din birayên wan rehettir dikarin

[728] Hevpeyvîn bi Îlham Omer û Dayika Mûrad re, endamên rêveberiya Mala Jinê, Qamişlo, 2017

bileyizin yan jî bixwînin. Ji ber ku di pirraniya malbatan de tenê ji keçan tê xwestin ku karên malê bikin û xizmeta malbatê bikin. Jinên ku me bi wan re hevpeyvîn kir, hema hema hemû dibêjin, nêzîkatiyên dayik û bav yên ji zarokên keç û kur re ji hev pirr cuda ne: *"Ew ji kur re dibêjin 'here derkeve, xwe zana bike'. Lê ji keça xwe re dibêjin, 'dernekeve, eyb e!'"*

Di pirsgirêkên malbatî de zarok gelek caran wekî amûreke zextê li hemberî dayika xwe tên bi kar anîn, nexasim di rewşên berdanê de. Tevî bandora şer û erişên DAIŞ'ê, dewletên Tirkiye û Sûriyê li ser civakê bi aloziyên malbatî jî bipêşketina zarokan asteng dikin. Mamoste Necah, endama rêveberiya saziya Cîhana Zarokan ji bo zarokên sewî li kantona Cizîrê, rewşa zarokan wiha dirnixîne: *"Hinek zarok, bê xwedî dimînin. Mesela di dema berdanê yan zewaca nû ya dayikan de zarok tenê hatine hiştin. Gelek zarokan di malbata xwe de tundî dît. Bandora şer, şidet û koçberiyê li ser zarokan zêde ye. Cihekî aydê zarokan tine ye. Leyîstokên wan çek û tebance ne."*[729]

Mala zarokên sêwî ji aliyê Desteya Jinê ve di sala 2015'an de hatiye damezrandin. Zarokên bi serpêhatiyên cuda, li wir bi hev re hînî çandeke nû ya jiyanê dibin. Hinek zarok hene ku bê dayik û bav, bê malbat mane, û heta temenê wan bibe 18 jî wê li saziyê bimînin. Hinek zarok hene yên ku demekê dimînin, bi pirranî 3 ta 7 mehan dimînin heta ku pirsgirêkên dayik û malbatê çareser bibin. Hingê ew bi pirranî dîsa vedigerin cem dayik yan jî malbata xwe.

Di vegotinên pedagogê Cîhana Zarokan de tade û neheqiyên ku di rastiya malbatê de tên serê zarokan, eşkere dibin: "*Destpêka me sazî vekir bêhtirî 50 zarokan hatin. Yên bebek bê dayik û bav, me dan malbatên bê zarok. Sê zarok li cem me hene, bav û dayikên wan dev ji wan berdan. Dayik zewicî ne û ev zarok jî li gel ap yan jî mirovên xwe bûn û gelek êşkence û zor ji destê wan dîtin. Ev gihîşt astekê ku ji malê reviyane. Ew di kolanan de hatin dîtin. Ti kes li wan xwedî derneket û pirsa wan nekir. Wan di malbata xwe de zaroktiya xwe nedîtiye.*

Em niha bi wan re dibin alîkar ji bo vegerin zaroktiya xwe. Du keç hatin cem me, ji malbatê hatibûn qewitandin û bi kêran êrîşî zarokan dikirin. Niha pirr hatine guhertin. Beriya du hefteyan dayikek hat û zarokê xwe anî gel me. Keça wê du salî ye. Rewşa wê keça piçûk di milê tenduristî, paqijî û xwarinê de gelek xirab bû. Diyar bû ti kes bi wê re elaqedar nebûye. Kurê wê jî got, 'ew ne dayika min e' û nexwest wê bibîne. Civak zû qebûl nake ku zarokê wan biçin cihekî din. Bes dema dawî, min dît ku gelek jî hene barê xwe sivik dikin û zarokê xwe tînin gel me. Hinek zarok jî hene, diya wan li girtîgehê ye. Dema lawik be li cem me be, telefon pey telefonê tê. Lê dema keçik be, ew ji wan re nabe xem. Ji ber, lawik wê rajê navê bavê xwe û keçik bêpar be. Divê malbat ferq û cudahiyê di navbera kur û keç de nekin. Tiştekî din jî heye, dema zarok tê dinyayê divê 'helal' yan jî 'heram' ji bo zarokan nebêjin. Divê dayik xwedî lê derkeve. Ka wijdan, ka exlaq? Ev zarok çi gunhê wê heye ku hat ser dinyayê û şîrê diya xwe venexwar?"[730]

Xebatkarên Cîhana Zarokan hewl didin ku ji zarokan re hawirdoreke bi hezkirin û fêhmkirin ava bikin da ku ew bikarin êşên xwe li pey xwe bihêlin, fêrî çanda hevaltî û parvekirinê bibin: *"[Li] Gel me lêxistin qet nîne. Em di milê psîkolojiyê de eleqdar dibin, ji ber [ku] her zarokek ji derekê tê, di rewşên cuda ra derbas bûye. Em wek dayik nêzî wan dibin, di civatê wan de em dirûnin û çîrokan ji wan re dibêjin. Em wan himbêz dikin. Em bi hev re derdikevin, dileyizin û diaxifin. Em şîretan li wan dikin û didin xuyakirin çi şaş e û çi rast e. Li gorî temenê wan, em şirove dikin.*

[729]Hevpeyvîn bi endamên rêveberiya Saziya Cîhana Zarokan re, Rimêlan, 2017

[730] Çavkanî li heman cihî

Dayikek heye, xwarinê ji wan re çêdike û cilê wan dişo. Herî direng piştî du hefteyan fêrî zarokên din û saziyê dibin.

Zêhniyeta 5 hezar salî di serê pîr û kalê me de zû nayê guhertin. Pêwîst e em ji van zarokan dest pê bikin, wan li ser zêhniyeteke paqij mezin bikin. Dema ez bi dayikan re diaxifim, gelek ji wan dibêjin 'zaroka duh hatiye, tiştên nû bi min re fêr dike'."[731]

Di nava 4 salên piştî damezrandina Navenda Parastina Zarokan ya sala 2015'an de hewildan û projeyên cuda ji bo xwedîderketina li zarokên hewcedar ên li herêmên xweseriya demokratîk hatine bipêşxistin. Li bajarên Qamişlo, Hesekê, Til Temir û Çilaxa di nava du salan de çar navendên şewirmendiyê yên psîkolojîk ji bo jin û zarokan hatine avakirin. WJAR'ê bi armanca xwedîderketina li zarokên şehîdên komkujiya Kobanê navendeke mezin bi navê 'Keskesora Alan' ava kir. Li gundê jinê Jinwar'ê jî zarok tevî dayikên xwe fêrî jiyaneke nû dibin. Di hevpeymana şêniyên gund de hatiye misogerkirin ku tundî li hemberî zarokan qedexe ye. Dîsa baxçeyên zarokan û du navendên taybet ên perwerdeyê ji bo zarokên bi pêdiviyên taybet ango zarokên astengdar hatine vekirin. Her wiha dada civakî projeyên taybet ên zarokan bi pêş xistine ji bo zarokên ku ji aliyê DAIŞ'ê ve dihatin bi kar anîn, bikarin fêrî mirovatiyê bibin û ji bandora zêhniyeta faşîst xilas bibin. Ev û gelek projeyên din jî, hemû gavên bi nirx in. Lê belê pêdiviya bi xebatên civakî û projeyên ku bikarin siberoja zarokên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ava bikin, her diçe zêde dibe.

Desteya Jinê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk di 28'ê Cotmeha 2019'an de ragihand ku hejmara zarokên ku di encama êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk de hatine kuştin, birîndar bûne yan jî dayik û bavên xwe ji dest dane, ji sedan bihuriye. Zarokên ku di êrîşên arteşa Tirk ên li dijî Efrînê û herêmên rojhilatê Firatê de dayik û bavên xwe ji dest dane û lewma li Navenda Parastina Zarokan tên xwedîkirin, heta dawiya meha Cotmeha 2019'an gihiştibû 70'yî. Wekî din rewşa zarokên di kampên penaberan yên wekî Eyn Îsa û Holê de gelekî xeternak e. Piştî şikestina DAIŞ'ê bi deh hezaran malbat di wan kampan de zarokên xwe hîna li ser bîrdoziya faşîst a DAIŞ'ê perwerde dikin.

Wekî çavderî, em dikarin bibêjin, li cihên ku zarokên sêwî di nav xelkê civakê de wekî komên piçûk bi şiklekî malbatî bi hezkirin û elaqadariyê dijîn, zarok dikarin di demeke kin de bipêşketinên mezin çêkin. Him di warê perwerdeyê de him jî di warê avakirina kesayet û vîna azad a zarokan de sazîbûnên piçûk û xwezayî ji cihên mezin û fermî zêdetir dikarin encamê bigirin.

Hêja ye ku rewşa zarokên di nav malbat û civakê de bi giştî û bi dîqet were şopandin. Nexasim avakirina derfetên madî û manewî da ku zarok dema berdana hevjînan bikarin li cem dayika xwe bimînin, wê bibe gaveke girîng ji bo gelek zarok û dayikên ji hev tên qutkirin. Her wiha elaqedarbûna malbat û civakê bi zarokan re bi taybet li bin şertên şer, koçberî û misogernebûna siberojê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pirr girîng e. Birîn û bandorên neyînî yên van şertan, malbat û civak tenê bi hezkirin û bawerîpêdayîna zarokan dikarin derman bikin.

Desteserkirina Mîrasa Jinê

Sal bi sal jin zêdetir ji bo **standina para xwe ya ji mîrasê** doz vekirine. Di sala 2013'an de tenê 5

[731] Çavkanî li heman cihî

jinan ji bo bi destxistina mafê xwe yê mîrasê doz vekiribû. Lê di sala 2016'an de 46 jinan doza mafê xwe yê wekhev kirine. Her wiha di sala 2018'an de Meclîsa Dada Jinê ragihand ku 31 dozên jinan yên girêdayî mafê mîrasê hatine şopandin.

Cara ewilî di dîrokê de jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di pergala xweseriya demokratîk de bûne xwedî mafên wekhev ên mîrasê. Lê tevî ku jin li hundir û derveyî malê herî zêde kedê dide, hîna gelek caran jin bêpar dimîne û keda jinê tê xwarin. Endamên Dada Jinê ya Kobanê, didin xuyakirin ku nexasim li cihên ku çanda eşîrtiyê li pêş e zehmetiyên di pêkanîna qanûna mîrasa wekhev de hene. Lê belê li gelek cihan jî jin êdî dawa mafê xwe dikin. Gelek ji wan jinên ku mafên xwe bi dest xistine jî ji jinên din re dibin mînak û rê nîşanî wan didin.

Endamên Mala Jinê ya Til Koçerê dibêjin, bi vekirina doza derheqê mafê mîrasê de endameke ya nû çêbûye: *"Jinek hat Mala Jinê ji bo em pirsgirêka wê çareser bikin. Ew jin deh salan li dûv mîrasa xwe bû, lê kesî mîrasa wê nedida. Piştî hat Mala Jinê, me mîrasa wê lê vegerand. Me jê pirsî 'dema tu hatî cem me wek jin, te negot, dema ez biçim Mala Jinê û dawê vekim, piştre xelk wê li ser min biaxifê?' Wê got, 'Na. Xelk bila rojekê, du rojan biaxifê û wê ji bîr bike.' Piştî ku me pirsgirêka wê çareser kir û em bi wê re sekinîn, wê ji me hez kir û ji karê me hez kir. Wisa ew hat, tevlî karê me bû."*[732]

Pirsgirêka bêparhiştina jinê ne tenê di mijara mîrasê de derdikeve holê. Gelek jinên ku hevserê wan koçî derveyî welat kirine, di rewşekê tengav de mane. Xebatkarên Mala Jinê ya Amûdê balê dikişînin ser zehmetiyên wan jinên ku bê mal û milk hatine hiştin: *"Di encama şerê li Sûriyê de gelek kes, ji sedî 20'ê nifûsê ji cihê xwe derketin. Gelek zilam çûn, jin û zarokê xwe hiştine. Hinek kesan zarok li cem mala bavê xwe hiştine. Em dixwazin tiştek were kirin ji bo ku ev jin bikarin mafê xwe bistînin û zarokên xwe xwedî bikin. Pêwîst e mal û milkê zilam li ser jinê were qeydkirin. Hinek zilam diçin li Başûr yan ji Tirkiyê cardin dizewicin, lê jin û zarokên wî li vir ji her tiştî bêpar dimînin. Zilam tê mûsîma xwe radike, diçe û tiştekî nade jin û zarokên xwe. Niha pênc jin wiha hatin cem me. Ji bo vê rewşê qanûnek pêwîst e."*[733]

Zêhniyeta baviksalariyê ya ku bav wekî xwediyê malê û tevahiya ferd û tiştên tê de jî aydê wî dibîne, dibe sedema bêparhiştina jin û zarokan. Ji ber vê hişmendiyê tedbîrên hiqûqî di çarçoveya qanûnên jinê de pêwîst hatine dîtin. Hinek jin niha hewl didin ku mal, erd û milkê hevjînan hemûyan li ser navê herduyan tomar bikin, ji ber ku ked û pêdiviyên jinê gelek caran hatine binpêkirin. Nexasim jinên ku hevjînê wan ji welat derketiye, gelek caran bê maf û bê par mane. Lewma parêzvanên mafê jinan daxwaz dikin ku mafê milk ê jinê di qanûnên xweseriya demokratîk de hîn berçavtir were parastin da ku jin bikarin jiyana xwe di mala xwe de li ser erdê xwe bidomînin.
Wekî girêdayî cûreyên din ên tundî û kevneşopiyên zayendperest jî hatiye nirxandin, qanûnên ji bo parastina mafê mîras û milkê jinê, dikarin ji bo avakirina rojev, eşkerekirina neheqiyan û bipêşxistina pîvanên edaletê bi risteke erênî rabin. Ji bilî qanûnan, girîng e ku exlaqê parvekirina nirx, mal û berheman hemûyan li gorî pêdiviya mirovan ji nû ve were xurtkirin. Exlaqê civakî yê ku milkê taybet wekî şerm didît û aboriya diyariyê bi pêş dixist, bi hezaran salan li ser erdnîgariya Kevana Zêrîn hebû. Li ser bingehê vê çandê, jiyana hevjînan, malbat û civakê jî dikare ji nû ve jîndar û watedar bibe.

[732] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Koçerê re, 2017

[733] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Amûdê re, 2017

Wekî encama nirxandinên li ser daneyên çendanî û şiroveyên derheqê bilançoyên cûreyên tundiyê yên li dijî jinê de; em dikarin bibêjin, pirraniya pirsgirêk, cûreyên tundiyê û cudakeriyên ku di civak û malbatê de heta roja îro tên serê jinê, çavkaniya xwe ji têgihîna baviksalar a 'namûsê' digirin. Wekî 'milk' û 'namusê' nihêrîn li jinê û bedena wê, dibe sedem ku tundiya li hemberî jinê bi hinceta 'parastin yan jî paqkirina namûsê' rewa bê dîtin. Ji ber ku jin bixwe milk e, gelek kesan bêparhiştin, bêgotin, bêbiryar û bêmafhiştina jinê wekî rewşeke xwezayî qebûl dikin. Heta ev nêzîkatî di feraset û jiyana malbatî û hevjînan de bidome, ne pêkan e ku tevahiya cureyên şideta li hemberî jinê ji holê werin rakirin. Lewma guhertinên bingehîn ango radîkal di hişmendî û têgihîna exlaq û namûsê de pêwîst in.

Daneyên bîlançoyan destnîşan dikin ku bi giştî di navbera salên 2013 û 2016'an de sal bi sal zêditir bûyerên tundî û neheqiya li dijî jinê dihatin ragihandin. Lê daneyên rapora Rêxistina SARA yên salên 2013 heta 2016'an li gorî daneyên raporên Meclîsên Dadê û Asayîşê yên salên 2017 heta 2019'an jî zêdetir xuya dikin. Dibe ku sedema vê ew be ku ne hemû serlêdanên ku ji saziyên civakê re hatine kirin derbasî mekanîzmayên fermî yên dadê û asayîşê bûne. Heta ku rewşeke sûcê edlî nebe, gelek pirsgirêk di asta lijneyên lihevhatinê û saziyên civakî de tên çareserkirin. Lewma daneyên van dozan di bilançoyên Asayîşê û Dadê de xuya nabin. Heger em van daneyan û daneyên salên 2017 heta 2019'an bînin beramberî hev, em dikarin bibêjin, bi giştî hejmara ragihandina bûyerên tundî û neheqiyan di heman astê de maye. Lê belê daneyên wan sê salên dawiyê erdnîgariyeke hîn berfirehtir û bi nifûseke zêde digirin nav xwe. Dîsa di wê pevajoyê de li hemû herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên ku ji dagirkeriya DAIŞ'ê hatibûn rizgarkirin, Mala Jinê û saziyên Dada Jinê hatine damezrandin. Bi vî rengî têkoşîna li dijî tundiya li hemberî jinê berfirehtir bû û zedêtir derfetên ji bo gilîkirina binpêkirina mafê jinan hatine avakirin.

Wekî me di serî de got, em dikarin sedemên cuda ji bo vê rewşê şirovê bikin. Lê misoger e ku bi şoreşê re her ku diçe zêdetir jin li hemberî binpêkirina mafên xwe dawiyê li bêdengiya xwe tînin, miracaetî saziyan dikin û li mafê xwe digerin. Çalakî, perwerde û sazibûnên jinê bi armanca bidawîkirina tundiya li hemberî jinê û avakirina têkiliyên malbatî û hevjînan li ser bingehê rêzdarî, naskirin vînê, berpirsyarî û mafên wekhev di gelek waran de bandor li jiyana civakê kiriye. Di sala 2017'an de endamên Mala Jinê yên sê kantonên Rojava rave kirine ku him hejmara miracaetan him jî asta bûyerên tundiyê yên ku jinên Kurd ragihandine li gorî salên destpêkê kêm bûye. *"Destpêkê bûyerên pirr giran dihatin pêşiya me. Dest û lingê jinan hatibûn şikandin. Zilaman çek li hev du kişandin. Lê niha bûyerên ewqas giran kêm bûn."*[734] Endamên Mala Jinê ya Tirbespiyê vê rewşê wiha şirove dikin: *"Bi giştî pirsgirêk û serlêdan kêmtir bûn. Ji ber ku gelan fikrê me nas kirin."*

Bi taybetî ragihandina qanûnên jinê, gelek cûreyên neheqî û tundiya li hemberî jinê pênase û eşkere kirine. Bi vî awayî nîqaş û lêpirsîna 'adetên kevin' yên zayendperestiya civakê bi pêş ketiye. Têkoşîn û xebatên ji bo guhertinên bingehîn ên demokratîk di çanda jiyanê û feraseta civakê de hîna didomin. Lê her jina ku gavek bi wêrekî avêt, hêz daye bipêşveçûna jinên derdora xwe jî. Wekî din her zilamê ku rêzdarî beramberî vîn û daxwazên jinê raber kiriye, zilamên derdora xwe jî daye fikirandin da ku ew jî hinekî din dev ji fêrbûnên xwe yên desthilatdar berdin.

"Hinek jin niha beriya ku bi zilamekî re bizewicin, şertên xwe didin xuyakirin. Dibêjin, 'Dema ez bi te re bizewicim, ez ê dîsa van karan bikim. Ez ê dev ji karê xwe yan jî xwendina xwe bernedim.'

[734] Çavkanî li heman cihî

Ev encama pêşketina zanebûna jinê ye. Hîna kêm jinên wiha ne, lê mînakên van hene. Rêxistinbûna jinê ji bo her jina li malê pişlek e. Zilam jî mecbûr dimîne li gorî vê hesabê xwe bike."[735]

Herçiqasî jin balê dikişînin ser wê yekê ku hîna "*têkoşîn li hemberî zayendperestiya hundir û derveyî malê pewîst e"* jî bi nirxandina qonaxên şoreşê re ew pê dihisin ku ew bixwe hêza çareseriyê ne û "*encama keda ku hatiye dayîn ne piçûk e"*. Bi bipêşketina rêxistinbûnên civakî û naskirina fikrên Abdullah Ocalan re di têkiliyên gelek malbat û hevjînan de gav bi gav guhertinên demokratîk bi pêş ketine. Bi vî awayî vebijêrkên nû yên jiyanê ji bo jin û nifşê ciwanan peyda bûne.

- **Vebijêrkên Jiyanê**

Li gorî cihên din yên Kurdistanê li Rojava gelek jinên bi temenê 30 salî û mezintir hene ku ne zewicî ne. Daneyên serjimara sala 2016'an didin xuyakirin ku rêjeya jinên nezewicî li kantona Cizîrê % 26,7'ê ye. Her wiha % 7'ê jinan ji ber wefata hevjînê xwe bi tenê mane û % 0,8'ê jinan hevjînê xwe berdane yan jî hatine berdan. Van daneyan didin xuyakirin ku yek ji sê jinên Cizîrê ya di ser 18 salan re ne di têkiliyeke zewacê de ye.

Di nav jinên nezewicî de jin hene yên ku heyrandina pismamê xwe ne qebûl kirine û ji ber vê kevneşopiya baviksalarî nikaribûn bi kesekî din re bizewicîne. Lê pirranîya jinên nezewecî yên ku em bi wan re peyivîn, diyar kirin ku bi tesîra Şoreşa Kurdistanê, jiyana şoreşgeran û felsefeya Abdullah Ocalan, wan têkiliyên zewacê red kirine. Ji ber sedemên cuda, ew nebûne mîlîtan û neçûne çiyê. Lê belê wan çand û exlaqê şoreşê ji xwe re kiriye mînak da ku ew bikarin wekî jin vîna xwe biparêzin, di nava civakê de bijîn û ji bo azadiya jinan û ya gelê xwe kar bikin.

Fatma ku ji salên 1990'î ve xebatên rêxistinê meşandine serpêhatî û helwesta xwe di mijara zewacê de wiha tîne zimên: *"Di hêla malbata min de gelek daxt çêbû da ku ez bizewicim. Lê tevgerê her tim ev biryar ji min re hiştiye: Ne digot bizewice, ne jî digot nezewice. Heta îro gelek kes ji min vê pirsê dipirsin: Tu nebûyî kadro, çima tu nazewicî? Ez jî her tim dibêjim, 'jineke ku xwe westand da ku PKK'ê baş fêhm bike, ew jin nikare bi her zilamî re bijî! Yê ku PKK nas kiriye bi zilaman re najîn. Ev heqîqet e.' Bi zilamên heyî re jiyan nabe. Encax bi zilamekî re ku vê mijarê di [nava] xwe de hal bike, yê ku bi rastî jinê wekî milkiyeta xwe nabîne, jiyan dibe. Lê ev zilam jî hîna tine ye. Gelek hevalên jin ên ku me bi hev re kar dikir, dema zewicîne, di dawiyê de ji hev qut bûn. Ji ber ku nikarîbûn xwe û îradeya xwe wekî jineke normal teslîmî zilamekî bikin. Û zilam jî nikaribû jina bi kesayeta azad qebûl bike. Ji bo vê lihevkirin çênebû.*

Dapîra min jî digot, 'Nanê mêran bê minet e. Xweska keçka min jixwe re bistriya berê ku bimira'. Min ev gotin gelek caran ji devê dayika xwe jî bihîst. Dayika min her tim dixwest ku ez bibim jina zilamekî. Lê bi hatina Şoreşa Rojava re metirsiya jinan li ser pêşeroja wan kêmtir bû. Êdî hewce nabînin ku ji bo parastina xwe û debara xwe, xwe bispêrin zilamekî. Jixwe, her tim berovajî bû. Di dawiya emrê xwe de her tim jin e ku zilam diparêze û lê mêze dike. Piştî ku tevger û saziyên me çêbûn, metirsiya jiyanê kêmtir bû. Ev feraseta ku pirr kûr di [nava] me de hatibû çandin, êdî hêdî hêdî rabû. Jinek ku piçek eqilê xwe heye, zû bi zû zewacê qebûl nake û xwe navêje bahrê. Ew ê

[735] Hevpeyvîn bi endamên Meclîsa dada civakî re, Qamişlo, 2017, li Qamişlo

pêşeroja xwe di avakirina civakê de bibîne. Jinên pêşeng divê daîmî rist û wateya jiyanê di avakirina rêxistinbûna civakê de bibînin."[736]

Mira jî nexwest bizewice. Bavê wê herdu xwuşkên wê yên mezin bê dilê wan zewicandibûn. Piştî ku wî êşa kêçên xwe dît, wî êdî li ser Mira zext ji bo zewacê nekir. Mira bi naskirina Apociyan di sala 1992'yan de dest bi xebatên 'cebhewî' kir. "*Bes kêmasiya min wê demê ew bû ku ez tevlî nebûm ji ber ku hinek nexweşiyên min hebûn. Ez pirr zeîf bûm. Ji ber vê, hevalan ji min re digot, 'Tu nikarî bikî!' Min jî digot, 'Wela ez dikarim!' Lê hevalan digot, 'tu nikarî' û dixwestin ku ez di herêma xwe de kar bikim. Ez niha jî wekî erd û ezman poşman bûmê ku ez neçûme. Lê dîsa me xwe her tim daye kar û me ji karê xwe hez dikir. Di heman demê de ez keça mezin a malê bûm. Min xwuşk û birayên xwe jî xwedî kirin. Lê min di hêla nêzîkatiyên feodal ên civakê de gelek êş kişandin."*[737]

Wekî din jin jî hene ku hatibûn zewicandin, lê belê bi naskirina Tevgera Azadiyê, vebijêrkên nû yên jiyanê dîtine. Endameke Kongra Star ya ku di gundên Kobanê de xebatên civakî dimeşîne, hîna beriya Şoreşa Rojava gava yekem ber bi şoreşê ve di mala xwe de avêt: *"Bavê min ez dam zewicandin, ser hewiyê. Wexta ku min şoreşa PKK'ê nas kir min mêrik berda. Şoreşê di nava malê de dest pê kir ji ber ku wî nexwest ku ez tevlî bibim. Sê salan em bi hev re man. Dema wî nedihişt ku ez tevlî bibim, min ew berda ji ber ku min xwest di nav şoreşê de bijîm."*[738]

Pirraniya jinên nezewicî yan jî yên ku hevjînê xwe berdane, li mala bavê xwe yan jî ya xizmeke din mane. Lê hinekan jî mal û jiyana xwe bi xwe ava kiriye. Li çend gund û bajarên Rojava xwuşkên 20 heta 50 salî hene yên ku ne zewicî ne û bi şiklê komîna xwezayî ya jinan dijîn. Ew karên xwe yên hundir û derveyî malê bi hev re birêxistin dikin.

Li Til Temirê çar xwuşkên 25 ta 45 salî, bi vî rengî dijîn. Mala wan di nav civakê de wek 'Mala Keçan' tê naskirin. Hîn di salên 1980'yî de şoreşgerên PKK'ê dihatin mala wan û malbata wan dibû dostên tevgera azadiyê. Ew şeş xwuşk û şeş bira bûn. Xwuşka herî piçûk 3 salî bû, dema bavê wan çû ber dilovaniya Xwedê. Dayikê jî bi hezkirin û berpirsyarî zarokên xwe mezin kirin heta wê jî beriya 9 salan jiyana xwe ji dest da. Her çar xwuşk dibêjin, ew û birayên xwe li ser çanda dayika xwe rabûne: *"Dayika me ti carî dengê xwe li hemberî me bilind nedikir. Em jî bi vî exlaqî mezin bûn. Kesî ti zext li me nekiriye, ne ji bo zewacê û ne ji bo tiştekî din."* Xwuşk û bira ev exlaq û şewazê jiyanê ji xwe re kirine esas, bawerî û rêzdarî li hemberî hev raber kirine. Du xwuşkên wan zewicî ne û çar bi hev re mane.

Dema şerê Til Temirê, wan bajarê xwe terk nekir. Biraziyek û kurxalekî wan di şerê parastina Til Temirê de şehîd bûn. Piştî şer, wan mal û hewşa xwe careke din sererast kiriye. Her çar xwuşk karê xwe yê rojane, yê aborî û civakî bi hev du re dimeşînin û dibêjin, *"Em ewsa hîn xweştir dijîn, lê civak ji me re dibêje, 'Hûn ê poşman bibin'. Di dema pêş de em ê bibînin gelo kî rast e. Li gorî me tiştekî me kêm nîne. Em fikrê hevdu distînin û biryarê bi hev re didin. Xwuşka me ya mezin, em wekî dayika xwe dihesibînin. Ew karê me koordîne dike û aboriya malê meyze dike."*

[736]Hevpeyvîn bi Fatma Tahir re, Amûdê, 2017

[737] Hevpeyvîn bi Mira Zoro re, Amûdê, 2017

[738] Hevpeyvîn bi endamên Kongra Star re, Xeta Xerbiyê, Kobanê, 2017

Carekê malbateke ji Bakur hat û yek ji xwuşkên Til Temirê wekî jina duyemîn ji bo zilamekî kal xwest. Lê wê red kir: *"Ew çawa tiştekî wisa cesaret dikin? Ez nikarim jiyana xwe ji bo zilamekî feda bikim. Dema ez dixwazim herim cihekî û ew destûrê nade, ew ê li zora min biçe. Gelek keçên me diçin bi zilamekî temenmezin re dizewicin û gelek jî çûn li Bakur zewicîn. Lê rojekê jî em li vê nefikirîn û me nexwest jî. Gelek kes, zilamî rexne dikin ji ber ku jineke din tîne. Lê lazim e em jinê rexnê bikin ya ku qebûl dike hewî here li ser jinê. Gereke jin xwe biparêze û zane be."*[739]

Zozan û Hîva ji gundê Helincê yê Kobanê jî li malbateke welatparêz mezin bûne û piştî wefata bav û dayika xwe, bi hev re jiyana xwe domandine. Destpêkê ew çar xwuşk bûn ku mal û pez xwedî dikirin. Zozan qala wê demê dike: *"Bi her tiştî em wekî xwuşk radibûn. Xwuşka me ya mezin 23 salî bû. Me hemû karê çolê wek sê xwuşkan dikir, yek xwuşkê jî karê malê dikir. Zehmet bû, lê xweş bû. Birayên me tiştek nedikirin. Ne madî ne manewî alîkariya me nekirin. Lê birayê me rabû xwuşka me ku hîna ciwan bû, zewicand. Me ji birayê xwe gelek êş dît. Piştre xwuşka me ya din jî zewicî û em herdu tenê mane. Em pirr bi hev ve hatine girêdan ji ber ku me gelek êş û rojên giran bi hev du re derbas kirin."*

Hîva dibêje ku mîlîtanên Tevgera Azadiyê dibûn wekî dayik, bav û xwuşkên wan: *"Hevalan em mezin dikirin. Ji piçûkanî heta niha me jiyana xwe bi wan re derbas kir. Ew dayik û xwuşkên me bûn. Em bi dirustbûna wan û karê wan bi bandor bûne. Heval dihatin cem me û ji me re her tişt dan fêrkirin; em dikarin çawa bijîn û li ser lingê xwe bisekinin. Wan nedihişt ku em xemgîn bibin û bi tinebûna dayik û bavê xwe bihesin. Me karê ciwanan û Kongra Star dikir. 10 heta 20 keçên din yên gund, me bi xwe re derdidixistin. Çi pêwîstî çi demê hebû, em derdiketin û me karê xwe dimeşand. Wê demê hîna nîzam hebû. Gelek heval li cem me diman. Mala me mala wan, mala rêxistinê bû. Lê birayê me nedixwest ku em bi wan re kar bikin. Ew tirsiya ku nîzam wê were ser wî."*[740]

Zozan û Hîva didin xuyakirin ku gundî û cîran li hemberî wan rêzdar bûne û bi qedrê wan zanîne. Di demekê ku civakê nedihişt ku keç bi tenê derkevin û biçin bajêr, ew matmayî diman ka wan çawa mal û jiyana xwe meşandin. Lê birayê wan qayil nedibû û dixwest wan ji mala wan derxe û bide zewicandin. "*Lê me qebûl nedikir. Me got, em ê soza xwe bidin û tevlî hevalan bibin. Me ji hevalan re got, 'ger em şehîd bikevin, bila birayê me azarê me çêneke!' Lê hevalan nedihişt ku em tevlî bibin ji ber em hîna piçûk bûn. Hevalên jin, li hemberî birayê me helwest danîn û ew dan sekinandin. Heya şoreşê em bi hevalan re bûn. Em tevlî civîn û perwerdeyê dibûn. Dema rejîm hat derxistin, em gelekî kêfxweş bûn. Heta roja îro jî em karê xwe yê malê û yê civakî bi serbilindî berdewam dikin."*[741]

Mala Xabûr ya Mirovên Temenmezin a ku di 12'ê Tîrmeha 2016'an de li bajarê Til Temirê hatiye vekirin jî yek ji mînakên jiyan û aboriya komînal e. Ji ber koçberiya pirraniya civaka Aşûrî ji herêma Xabûrê, gelek dayik û bavên kal û pîr, bi tenê mabûn. Wan nedixwest axa xwe berdin. Lewma Ator Ishaq û jinên din wekî 'karekî mirovahiyê' bi hezkirin li wan mirovan xwedî derdikevin. Bi alîkariya civak û saziyên Aşûrî, wan ji bo wan maleke komînal ava kiriye. Bi hev re jî ew pêdiviyên wan ên jiyanê peyda dikin: *"Me ew dayik hewandin weke ku em malbatekê damezrînin. Li cihê ku her yek li halê xwe bijî, me ew kom kirin û kirin malbatek. Me maleke Aşûrî*

[739] Hevpeyvîn bi çar xwuşk re, Til Temir, 2017

[740] Hevpeyvîn bi Zozan û Hîva re, gundê Helincê yê Kobanê, 2017

[741] Çavkanî li heman cihî

mezin kir. Niha li cem me pênc dayik, bavek û sê xaltîk dijîn. Ew xaltîk ne zewicî ne. Lê em wan bi vî rengî bi nav dikin. Wekî ku em zarokên wan, ew jî dayikên me ne."[742]

Gundê Jinwar: Vebijêrkeke Jiyana Hevbeş a Jinan

Bi şoreşa Rojava re jin derfet didîtin da ku ew bikarin bi awayekî birêxistinkirî jî vebijêrkên nû yên jiyanê ava bikin. Gundê Jinwarê jî yek ji wan pêngavên avakirina jiyaneke kolektîf û komînal bi vîn û rengê jinê ye. Bi pêşengiya Akademiya Jineolojî û Kongra Starê di sala 2017'an de avakirina gund û xebatê çandiniyê dest pê kirine. Di nava salek û nîvê de gundekî bi 30 malan ji kelpîçê û avahiyên komînal ên wekî akademiya gundî, dibistana zarokan, cihê tenduristiya xwezayî, dikan, firin û tenûrê lê hatin avakirin. Jin û dayik tevî zarokên xwe bi serpêhatiyên cuda û ji cihên cuda dihatin tevlî jiyan û karê gundî dibûn. Hinek jin hatine ji bo ew bikarin jiyaneke hevbeş û ekolojîk ava bikin a ku bibe alternatîfek li hemberî pergala baviksalariyê û desthilatdar ya ku jiyanê difetisîne. Gelek jin jî ji ber êş û tengasiyên di encama şer û zextên zayendperestiya civakê de xwe gihandine Jinwarê. Bi armanca hevbeşkirina jiyanê û ji nû ve zindîkirina çanda neolîtîk, meclîsa gund wekî cihê nîqaş, biryar û birêveberina gundî hatiye sazkirin. Li ser bingehê parvekirina kar wekî sewaldarî, çandina werz, bostan û zeviyan, jinên Jinwarê bi hev re fêrî aborî û hilberîna komînal dibin.

Jiyan piştî şerê Efrînê hatiye gundê Jinwarê. Qederê du salan bi şûn ve, ew erka xwe wekî berdevka demî ya Meclîsa Jinwarê pêk tîne û wateya vê gundê ji bo jinên Rojava wiha şirove dike:

"Ev gund ji bo hevjînên şehîdan û ji bo hemû keç û jinan hatiye avakirin yên ku bixwazin bi hêza xwe bi hev re bijîn. Ji bo min, ev gaveke pirr girîng e û wateyeke pirr bi nirx dayê jiyanê. Heta niha li kîjan welatî gundek hatiye avakirin ku jin tê de dikare serbixwe bijî? Ez pêşniyar jî dikim, dema Efrîn rizgar bibe, em gundekî bi vî rengî li Efrînê jî ava bikin. Ji bo min hebûna gund û jiyaneke serbixwe pêşketinek û derfeta herî mezin e. Cara yekem ez li gundekî dijîm ku ez her tişta ji min re pêwîst tê de dibînim. Ya yekemîn perwerde ye. Min xwe di vî gundî de perwerde kiriye. Jiyana gund bixwe perwerde ye. Ne îlla pêwîst e em rûnin û bikevin civînan û nîqaşan. Ev jî heye. Lê em di gundekî navneteweyî de bi jinên ji welat û warên cuda re dijîn. Ev bixwe jî perwerdeyek e. Min çandên cuda cuda nas kirine.

Divê her jin bi nirxê vî gundî zanibe. Dervê gund, gelek daxt ji aliyê malbat, tiyê xwe, birayê xwe be li jinan tê kirin. Civaka me jin fêr kir ku ew tenê ji malbata xwe re, ji zaroka xwe re kar bike. Lê li vir karê me hevbeş e, xwarina me hevbeş e, kombûnên me hevbeş in. Hinek malbat fêrbûne tenê ji bo xwe bifikirin û bixebitin. Ji ber vê, wextek divê heta em pergala jiyanê hevbeş bidin rûniştandin. Mînak, hinek dayik hebûn ewilî diçûn, pez didotin û şîr tenê ji bo zarokên xwe dibirin. Ji ber ku ew wiha fêrbûne. Ew fêr nebûne ku karekî bikin û encama wê bi derdorê re parve bikin. Lê belê bi parvekirinê re jiyan xweş dibe û bi tahm dibe.

Min di vî gundî de xwe dît, xwe komî serhev kiriye û hêza xwe nas kiriye. Beriya ez bême gund, min hêza rêxistinbûna jinê nas nedikir. Dema ez hatim, min nizanîbû jiyana vir wê çawa bibe. Lê ez bi jiyana Jinwarê ve pirr hatim girêdan. Ji ber ku ez xwe li vir rehet hîs dikim û bêhna min derdikeve. Derfetên me jî pirr in. Her tiştê ku me meraq dikir, em dikarin fêr bibin. Mînak, min her tim dixwest ez ê fêrî ajotina seyara bibim, li vir ez fêr bûme. Min ti carî jî bawer nedikir ku ez ê

[742] Hevpeyvîn bi Ator Ishaq re, Til Temir, 2017

rojeke di civînekê de rûnim û nîqaş bikim. Ji ber hêza min tine bû. Hêza min di hundirê min de hebû, lê ji ber zexta malbat û zilamî, min nikaribû derxista. Tişta ku ez herî zêde pê ra kêfxweş dibim, em niha di civînê de bi hev re dirûnin, hevalên min dikarin nîqaş bikin û ez jî dikarim nêrinên xwe bêjim. Em vê li vir fêrbûne. Niha ez xwe îfade dikim. Carna şaştî jî çêdibin. Lê ez vê demê fêhm dikim min çi şaş kir û ez dikarim li ser bisekinim. Carna ez dipeyvim û dibînim nêrîna min rast e û hevalên din jî tevlî min dibin. Berê min nikaribû rastiya xwe derxistiba, ne jî şaşîtiya xwe derxistiba. Ji bo vê, vî gundî gelek tiştên girîng fêrî min kirin."[743]

Avakirina gundê Jinwarê bala civaka Rojava û ya cîhanê kişandiye. Di serî de gelek helwestên bi guman nexasim ên zilaman bi pêş ketine yên ku ev gav wekî 'veqetandina jinan ji civakê' nirxandin. Lê belê Jiyan dide xuyakirin: "*Jinwarê him bandor li ser civakê kiriye, him jî civakê bandor li ser Jinwarê kiriye. Berê kesekî bawer nedikir ku jin bikare li ser lingê xwe bisekine û jiyana xwe bi xwe rê ve bibe. Niha civak bawer dike. Mêvan, jin û zilam tên cem me. Em bi wan re jî nîqaş dikin, em çawa xwe bi rê ve dibin, karê xwe çawa dikin û çawa dijîn. Wê demê, ew gelekî bi bandor dibin. Lê hinek jin jî hene, demekê dimînin û ji gund derdikevin. Careke din ew di bin bandora zextên malbatê de dizivirîn jiyana xwe ya berê ya zehmet. Divê em ji xwe bipirsin, em çawa dikarin jiyan û têkiliyên xwe hê jî bêhtir pêş bixin da ku ti jin êdî nema berê xwe bide cihekî ku zilmê lê bibîne."*[744]

Serpêhatiyên jinan yên derveyî têkiliyên zewacê, jiyana xwe bi vîn û hêza xwe ava dikin, destnîşan dikin ku bi Şoreşa Rojava re derfetên nû ji bo avakirina jiyaneke hevbeş vebûne. Hê jî cih cih qebûlnekirin û pêşhukmên zayendperest li dijî vê derdikevin. Nerazîbûnên hinek zilaman çêdibin ji ber ku ew pê dihisin ku jin êdî nema mecbûr in, desthilatdariya wan li malê qebûl bikin.

Hê jî gelek jinan xwe ji bandora nihêrînên desthilatdar rizgar nekiriye. Ev nihêrin jinê lawaz dibînin, bi qedrê jiyan, fikir û keda jinê nizanin. Lewma jin gelek caran bê îstîqrar dibin, nizanin çi dixwazin, biryara xwe diguherin yan jî di asta moral de diçin û tên. Lê belê vebijêrkên kesayetî yên jinan ku di salên 1990'î de li dijî kolekirina jinê derketine holê, îro dikarin gav bi gav bizivirin vebijêrkên kolektîf ên ku pêşiya guhertinên demokratîk di jiyana malbatê de vekin.

Gelek jinên li navçeyên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji ceribandina gundê Jinwar sûd wergirtin. Hinekan mala xwe bar kiriye û bûne şêniyên Jinwarê. Hinek jî niha li bajar yan gundê xwe bi vê zanebûnê tevdigerin, dema pêwîst be, cihekî aydê wan heye. Ev jî dihêle ku bandora gefên ku li jinê tên xwarin, kêmtir bibe. Ji ber ku ew dizanin vebijêrkên jinê êdî hene. Bi ser de hinek jin jî niha li deverên cuda li ser derfetên avakirina gund û warên jinan li herêmên xwe dest bi nîqaşan kirine.

- **Rastiya Hevjîn û Zarokên Şehîdan**

Di heqîqeta 40 salên şoreşa Kurdistanê de şehîd hertim wek nirxê herî pîroz hatine bibîranîn û wek hêza pêşeng a şoreş û civakê hatine dîtin. Ji salên destpêkê ve malbat û hevjînên şehîdan li Rojavayê Kurdistanê hewl dane ku li ser çand û exlaqê xizm û hevjînên xwe yên şehîd bijîn û xeyalên wan pêk bînin. Heta salên Şoreşa Rojava, hevjînên gerîla û şehîdan nikaribûn eşkere xwe bidin naskirin yan jî xwe birêxistin bikin. Bi sedan hevjînên şehîdan beriya şoreşê bi tenê êş û derdên xwe kişandine. Ji bilî vê, gelekan ji wan zehmetiyên mezin ji destê civak, malbat, xwesû û

[743] Hevpeyvîn bi Jiyan re, Jinwar, 2019

[744] Çavkanî li heman cihî

xwezûrê kişandine. Her wiha gelek hevjînên şehîdan bi zextan re rû bi rû mane da ku careke din bizewicin. Belê, şîretên Abdullah Ocalan û elaqedarbûna endamên Tevgera Azadiyê, hêz û bawerî dida hevjîn û zarokên şehîdan da ku bikarin wateya şehadetê fêhm bikin û jiyana xwe li gorî vê bi rê ve bibin. Li ser bingehê van tecrûbeyan di destpêka Şoreşa Rojava de Meclîsa Malbatên Şehîdan û piştre jî Meclîsa Hevjînên Şehîdan hatine avakirin.

Diya Ciwan ji Dêrikê di rêveberiya Meclîsa Hevjînên Şehîdan de cihê xwe digire. Ew balê dikişîne ser wê yekê ku rewşa hevjînên şehîdan bi şoreşê re di gelek aliyan de guhertiye: *"Niha rêxistina xweser a hevjînên şehîdan çêbû û malên hevjînên şehîdan tên ziyaretkirin. Ev pêşketineke baş e. Li gorî derfetan em nahêlin ku di jiyana wan de tiştek kêm bibe. Yên ku berê jiyane, nirxa wê dizanin. Divê ew zarok bizanibin bavê wan ji ber çi çû û şehîd ket."*[745]

Di şoreşa Rojava û berxwedanên mezin li hemberî êrîşên çete û dagirkeriya dewleta Tirkiyê de bi hezaran şehîdên ji tevahiya beşên civak û pêkhateyên Bakurê Sûriyê çêbûne. Di destpêka sala 2017'an de li kantona Cizîrê û Kobanê bi giştî 800 jin hebûn ku hevjînên wan di şoreşê de şehîd ketibûn. Tenê li Kobanê di heyva Mijdara 2017'an de 828 zarokên şehîdan hebûn. Roj bi roj hejmarên hevjîn û zarokên şehîdan li tevahî herêmên Bakurê Sûriyê zêditir dibin. Li cem êşên windakirina bav, dayik û hevjînên xwe, xizmên şehîdan di gelek milan de zehmetiyên civakî, derûnî û aborî jî dikişînin. Nexasim jinên ku hevjînên xwe ji dest dane, xwe didin ber berpirsiyariyên giran. Çawa ku ew dibêjin: *"Em îro him dayik him jî bavên zarokên xwe ne. Tevahiya kar û berpirsiyariya hundirê malê û dervê malê ji me tê xwestin. Dîsa, em dixwazin layiqê keda hevjînên xwe bin."*[746]

Di vî warî de xebata hevjînên şehîdan ku girêdayî sazî û Meclîsa Malbatên Şehîdan hatiye birêxistinkirin, xwedî wateyekê gelek girîng e. Hevdîtin, kombûn û parvekirinên bi jinên xwedî heman zehmetî re, dibin çavkaniya hêz û baweriya hevjînên şehîdan. Hevjînê Feyrozê, piştî rizkarkirina Kobanê di teqînekê de şehîd bû. Du zarokên wan wê demê hîna piçûk bûn, lê Feyroz bavê wan hertim tîne bîra xwe û zarokan: *"Weke fizîkî ew ne bi me re ye. Lê peyvên wî, gotin û tiştê ku jê hez dikir, her roj bi me re ne. Bi qasî ku ez pê diêşim, ewqasî jî pê kêfxweş û serbilind im."* Nedwa jî dibêje: *"Zarokên min jî bi şehadeta bavê xwe pirr êşiyan. Lê dema ku dîtin li Kobanê di her malbatekê de herî kêm şehîdek heye, ew êdî bi şehadeta bavê serbilind in."*[747]

Bi xwebirêxistinkirinê, hevjînên şehîdan dikarin pêdiviyên xwe yên manewî û madî pêk bînin bêyî muhtacî kesekî bibin. Ev serpêhatiyeke girîng e ku bandoreke erênî li jiyan û siberoja zarokên wan jî dike. Wekî din hevjînên şehîdan pê hisisyane ku ew dikarin bi sekn, ked û berpirsyariya xwe, nihêrînên civakê li ser jin û şêwaza jiyanê jî bidin guhertin. Di vî warî de êdî gelek kes dipejirînin ku hevjînên şehîdan bi zarokên xwe li mala xwe dijîn. Lê hîna jî hinek malbat hene ku zextê li ser hevjînên şehîdan dikin û vîna wan nas nakin.

Hevseroka Desteya Malbatên Şehîdan a Kantona Cizîre, Fatma Tahir dide xuyakirin ku taybetmendiyên malbat û hevjînên şehîdan gelek ji hev cuda ne û li gorî vê jî pêdiviyên cuda bi pêş dikevin: *"Hevjînên şehîdan ne hemû tevgera me nas dikin. Gelek malbat tên yên ku fikrê me, bîrdoziya me û rêxistina me nas nakin. Hinek ji wan xort in, hinek jinên ciwan in. Hinek hene bavê zarokekê ne. Hinek hene dayika 5, 6 heta 10 zarokan in û divê wan niha bi tenê mezin bikin. Hinek jî hene zarokên wan tine ne û hevjînê wan çû, tevlî şer bû û şehîd ket. Keç û xort hene ku ji bo*

[745]Hevpeyvîn bi Diya Ciwan re, endama Meclîsa Hevjînên Şehîdan, Dêrikê, 2017

[746]Hevpeyvîn bi hevjînên şehîdan re, Kobanê, 2017

[747] Çavkanî li heman cihî

parastina axa xwe bi hesteke welatparêzî çekê xwe rakirin û çûn. Dema ku şehîd ketin hevjînê/a wan bi tenê maye. Hinek ji ber ji hevjînê xwe pirr hez kirin naxwazin ji malên xwe derbikevin û bi zarokên xwe re bi tenê dimînin.

Dîsa hin kes hene ku ne xwedî kesayeteke xurt in da ku bikarin xwe biparêzin û têkoşînê bikin. Hinek hevjînên şehîdan hene ku neketin ferqa nirx û rûmeta xwe. Ew tenê pişta xwe bi mala xwezûre xwe ve girêdidin. Hinek, yên ku zarokên wan tine ne zû jî dîsa dizewicin. Hinek jin hene ne di ferqê de ne zilamê wan ji bo çi şehîd ketiye. Welatparêzî çi ye, nizanin. Ji bo wan jinan wext û rêxistineke pirr xurt lazim e ji bo mirov bikare van hevjînan û zarokan qezenc bike û perwerde bike.

Heta astekê em wek Desteya Malbata Şehîdan dikarin bibin alîkar. Projeyên me ji bo birêxistinkirin û perwerdeyên hevjîn û zarokên şehîdan hene. Lê ji ber ku em hîna di şerî de ne, derfetên me tine ne da ku em bikarin pêdiviyên wan yên madî hêmûyan pêk bînin. Heta me pêdiviyên jiyanê hal nekirin, têrê nake ku em behsa siyaset û îdeolojiyê bikin. Hejmara hevjînên şehîdan gelek e. Niha li Şedadê, Holê û Derazorê pirr hevjînên şehîdan çêbûn. Li kantona Cizîrê jî hema em her roj şehîdên nû dispêrin axê. Ji ber vê, her roj hejmara hevjîn û zarokên şehîdan zêde dibe. Di kantona Cizîrê de tev Şedadê û Holê niha bi hezaran hevjîn û bi deh hezaran zarokên şehîdan hene. Gelek ji wan jî di nav xizaniyê de dijîn. Hîna demek ji me re lazim e ku em bikarin pêdiviyên wan ên jiyanê pêk bînin û wana bi rêxistin bikin."[748]

Rewşa hevjînên şehîdên Ereb, li gorî yên Kurd ku birêxistinkirî ne, zehmettir e. Him di warê zayendperestiya civakê de him jî di warê aborî de. Pirraniya malbatên şehîdan yên Ereb, ji ber şer koçberbûne û xizan in. Gelek jinên Ereb bi zextan re rû bi rû dimînin da ku bi awayekî bi lêz cardin werin zewicandin. Endamên Saziyên Malbata Şehîdan dibêjin, rewşa jinên Ereb niha bêhtir dişibê ya civaka Kurd beriya 20 – 30 salan.

"Zext li ser hevjînên şehîdan da ku bi tiyê xwe re bizewicin di nav gelê Kurd de kêm e. Hinek bîrewerî di nav civaka Kurd de pêş ketiye ku ev biryar aydê hevjîna şehîd e, ger ku ew bizewice yan nazewice, cem zarokên xwe bimîne yan namîne. Lê di nav gelê Ereb de gelek malbat hene yên keça xwe bi zorê dibin ji bo ku bi mêrekî din re bizewicînin. Mesela, ew jin naxwaze ji mala xwe, ji mala xwesûya xwe here û zarokên xwe bihêle. Bes mala bavê wan zextê li ser wan çêdikin. Mala xwesûyê wan bi pirranî dixwaze ku ew ê wekî bûka malê li cem wan û zarokên xwe bimîne. Lê mala bavê hevjîna şehîdî dibêje, 'Keça me hîn piçûk e. Divê bê mêr nejî'. Rewşên wiha gelek hene.

Em jî hewl didin ku piştgiriya jinê bikin. Dema ku jin tên cem me û dibêjin, ew naxwazin bizewicin û bi zarokên xwe re bimînin, em maleke din ji wan re ava dikin. Vê demê em ji malbata bav û xwesûyê re dibêjin, ev jin di bin parastina me de ye û em xwedî li zarokan derdikevin. Gelek jinên bi vî rengî jî hene. Em zarokên şehîdan wekî zarokên xwe dibînin. Dema ku hevjîneke şehîdan bi zorê hatiye zewicandin û zarokê wê mane, em li zarok meyze dikin. Em hewl didin ku ew bavê xwe û rêya wî rast fêhm bikin û wekî rûmet bibînin.

Nisbeke jinan jî heye ku niha bi tenê dijîn, jiyana xwe û ya zarokên xwe bi rê ve dibin. Lê nisbeke din a jinan heye ku hîna ne di wê asta baweriyê de ne. Bi taybetî jinên ciwan ên bi zarokên piçûk, ditirsin. Hinek malbatên şehîdan hene ku daîmî bi xwestekên madî tên cem me û alîkariyê

[748]Hevpeyvîn bi Fatma Tahir re, hevseroka Deste ya Malbatên Şehîdan ya Kantona Cizîre, Amûdê, 2017

dixwazin. Lê hinek malbatên şehîdan yên pirr xizan jî hene ku ti alîkariyê naxwazin û tenê dibêjin, 'Serketina we, serketina şoreşê ji me re bes e'. Her du aliyan jî em fêhm dikin."[749]

Hinek hevjînên şehîdên Ereb yên YPG, QSD û Asayîşê bi zarokên xwe re bi tenê dijîn. Çend ji wan dayikan, malên xwe birin gundê Jinwarê yan jî taxên Kurd ên welatparêz. Ew dixwazin zarokên xwe bi çanda şoreşê û watedayîneke rast ya şehadeta bavê xwe mezin bikin. Ebtîhal ji eşîra Ereb El Şemar ye. Xizmê wan berê ji Iraqê hatibûn. Dema çeteyên El Nusra sala 2013'an êrîşê gundê wan li navçeyê Girkêlegê kirin, hevjînê wê Hesen di nav refên YPG'ê de tevlî berxwedanê bû û şehîd bû. El Nusrayê serê Şehîd Hesen jêkir. Wê demê Ebtîhal hîna bi keça xwe ya piçûk ducanî bû. Ji bo her du zarokên wê bi çanda şoreşê mezin bike û zarok perwerdeyeke baş bibînin, Ebtîhal mala xwe bir bajarê Dêrikê. Tevî ku ew carna bêriya jiyana gund dike jî ew girîng dibîne ku zarokên wê di nava cîrantiya bi malbatên şehîdan û gaziyên şoreşê de mezin bibin:

"Keça min Hesna di zikê min de bu dema bavê wê şehîd ket. Piştî şehadeta hevjînê min bi heftekê, nû keça min çêbû. Ew bavê xwe nas nake. Lê kurê min Hemudê bavê xwe nas dike. Malbata hevjînê min gelek feqîr in. Bes malbata min madiyata wê baş e. Malbata hevjînê min tên gel min, min ziyaret dikin û zarokên min jî diçin gel wan bi roja dimînin. Lê ez bêhtir diçim gel mala bavê xwe. Dema em diçin gund, keça min Hesna ji bapîrê xwe re dibêje 'Yabo'. Lê Hemudê dibêje: 'Ev ne bavê me ye. Bavê me miriya.' Kurê min bi bavê xwe serbilind e. Ew her tim behsa wî dike û ji xwuşka xwe re jî behsê dike. Ez dibêjim: 'Ji xwuşka xwe re behs neke, bila aciz nebe.' Lê Hemudê dibêje: 'Na, bila ew jî bavê xwe nas bike.'

Hemudê diçe sefê duyem ê dibistanê. Wê xwest bi zimanê Kurdî bixwîne. Ji ber ez Kurdî nizanim, ez her roj wan dibim mala cîranan ji bo bikarin li ser dersê xwe bixebitin. Kurê min bi min re Erebî û bi zarokên cîrana re Kurdî diaxivê. Mamoste wî dibêje, gelekî jêhatî ye. Ez pêşeroja zarokên xwe li vir dibînim. Ez dixwazim ku ew herî baş û serketî bin. Hevalên min ên Ereb jî dev ji min bernedan û man li kêleka min. Bes ya herî zêde manewiyat da min, malbata min bû."[750]

Jinên ji pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemû êş û hêza manewî ya şehîdan parve dikin. Tevî ku ew gelek zehmetiyan dibînin, pirraniya dayik û hevjînên şehîdan hewl didin ku zarokên wan perwerdeyeke baş bibînin û wateyeke rast bidin şehadeta bav, dayik, bira yan jî xwuşkên xwe. Bi vî rengî ew dixwazin ku zarok xwedî li keda şehîdan ya ji bo parastina welat û siberojeke azad derkevin. Li ser vî bingehî, rêxistinbûna hevjîn û malbatên şehîdan him ji bo pêkanîna pêdiviyên madî û manewî yên roja îro, him jî ji bo avakirina siberoja civakê xwedî wateyeke girîng e.

- **Têkoşîn, Sazî û Zagonên Jinê li dijî Zayendperestiya Civak û Dewletê**

Ji destpêka şoreşê ve Yekîtiya Star û Malên Jinê gelekî hewl dan da ku hişmendî û tundiya zayendperest di nav malbat û civakê de deşîfre bikin û wan li pey xwe bihêlin. Di salên dawî de gelek rêbazên tekoşînê hatine ceribandin: Ji perwerdeyên gel û kampanyayên guhertina hişmendiya zayendperest heta bi avakirina saziyên xweser ên jinê û ragihandina 'Rêgezên bingehîn û ferweriyên giştî yên jinê' ku di civakê de bi navê 'qanûnên jinê' tên nasîn.

[749]Çavkanî li heman cihî

[750] Hevpeyvîn bi Ebtîhal re, Dêrik, 2017

Ji bilî tundiya zayendperest a ku di feraset û kevneşopiyên civakê de hatibû çandin, dewlet jî bi êrîşên taybet hewl didin serweriya xwe li ser jin û civakê misoger bikin. Çiqas têkoşîna azadiya jinê bi hêztir dibû, ewqasî jî dewletê êrîşên şerê taybet li dijî jinan bi cûreyên cuda dijwartir kirine. Yek ji rêbazên ku ji serdema zîguratên Sûmerê ve herî zêde wekî amûreke desthilatdariyê li dijî jinê hatiye bi kar anîn, bazirganiya bedena jinê ango fihûş e.

Raporên saziyên jinê û ewlekariyê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî destnîşan dikin ku fihûş û bazirganiya jinê wekî êrîşên birêxistinkirî li dijî Şoreşa Rojava hatine bipêşxistin. Nûnerên Mala Jinê, Dada Jinê û Asayîşa Jinê didin xuyakirin ku ew hewl didin bi hişyarbûn û têkoşîneke hevbeş ya saziyan hemûyan van êrîşan pûç bikin.

Têkoşîn li dijî êrîşên Rêxistinkirî - Fihûş û Bazirganiya Jinê

Li gorî raporên Rêxistina SARA, tawanên ku wekî 'bazirganiya jinan' hatine binavkirin, di navbera sala 2013 û 2017'an de sal bi sal kêmtir bûne. Di sala 2013 de 27 bûyer; di sala 2014 de 3 bûyer, di sala 2015 de bûyerek û di sala 2016 de ti bûyer di vê mijarê de nehatine tesbîtkirin.
Miqabilî vê, tawanên fihûşê zêdetir hatine ragihandin: 13 bûyer di sala 2013 de hatibûn eşkerekirin, bi gîştî 42 bûyer di sala 2016'an qewimîne. Di nav bûyerên fihûşê de rêjeyên bilind ên li Qamişlo di sala 2013'an de, li Tirbespiyê û Girkelegê di sala 2014'an de bala mirov dikişînin ser xwe. Her wiha di 6 mehên dawiya sala 2017'an de bi gîştî 44 bûyerên fihûşê hatin ragihandin, ji wan 23'yan li Efrînê û 21'an jî li kantona Cizîrê rûdane. Di sala 2018'an de Meclîsa Dada Jinê 16 bûyerên laşfiroşiyê tomar kirine. Heman salê Asayîşa Jinê 32 tawan û Asayîşa Gîştî 53 tawanên fihûşê di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê de şopandine.

Birêxistinkirina koordînasyona saziyên jinê û Asayîşa Rojava hatiye tesbîtkirin ku şebekeyên girêdayî dewletên Tirkiyê û Sûriyê, tawanên bazirganiya jinê bi rengekî birêxistinkirî meşandine. Endamên Mala Jinê ya Qamişloyê dibêjin, laşfiroşî û bazirganiya jinê wekî êrîşeke li dijî jin û civaka Rojava hatine pîlankirin: *"Dema şoreşê dest pê kir, dewleta Tirk sînorê xwe vekir. Li vir wek rengê ticaretê bi jinê dikirin. Jin didan zewicandin bi zilamên temen mezin re. Destê hinek malbatan jî tê de hebû ku ji bo pera keçên xwe didan. Bi pirranî Ereb bûn. Lê piştî me ev rewş fêhm kir, Mala Jinê ev şebeke şikand û me firotina jinan da sekinandin."*[751]

Lêkolînên Rêxistina SARA ya ku endamên saziyê di dawiya sala 2016'an de bi me re parve kirine jî gihiştine heman encamê: *"Di salên 2012 -2013'an de firotina jinan gelekî çêbû. Li vê derê sînor hene. Min bi xwe jinek dît 12 caran hatiye firotin. Wê digot ku şebeke hebû, wê gelek jin dibirin cihekî. Wê zilamek bihatana, wê yek ji nav wan hilbijarta û ew dibirin Tirkiyê. Heftayek heta bîst roj wê bima li wir. Piştra, wê bireviya û dîsa careke din wê bihata û dîsa heman tişt kirin. Hinek jin bi xwe jî ji wan re dibûn alîkar. Ew jina min dîtî ji Himsê bû. Firotina jinan gelekî çêbû. Lê hêdî hêdî heta Malên Jinê ava bûn û zagon derketin li ser van xalan hatiye sekinandin û tiştên bi vî rengî kêm bûn. Heta, em dikarin bêjin par yek tenê hebû li bajarê Dirbêsiyê. Îsal jî li Cizîrê û kantonên din firotina jinan tine bû. Di vî aliyî de him Asayîş bi rola xwe radibe, him jî Mala Jinê û saziyên jinê bi rola xwe radibin."*[752]

[751] Hevpeyvîn bi Îlham Omer û Dayika Mûrad re, endamên rêveberiya Mala Jinê, Qamişlo, 2017

[752] Hevpeyvîn bi endamên navenda Rêxistina SARA re, Qamişlo, 2016

Berdevka Desteya Jinê ya Kantona Cizîre Emîne Omer dibêje, sebebên fihûşê ji aliyê wan ve hîna baş nehatine lêkolan. Lê belê wan bi hevkariya saziyên jinê û Asayîşê hemleyeke hevbeş li hemberî torên fihûşê daye destpêkirin. Di encamê de ew gihiştin hinek malumatan ka ev şebeke çawa ketine herêmên Rojava: *"Ji sedî 99'ê kesên ku bazirganiya jinê û fihûşê pêş dixistin, di encama şer û koçberiyê de ji derve hatine kantona Cizîre. Civak hevdu nas dike. Heger tiştek bi vî rengî were pêşxistin, zû eşkere dibe. Ev karek e ku birêxistinkirî û bi zanebûn hatiye pêşxistin. Dema rejimê jî ev tişt hebûn. Wê demê nedihiştin ew jin werin bajêr. Lê ruxsed ji wan re çêdikirin. Wan jî konek dervê bajar vedikir û zilam diçûn cem. Ev karê bi destê istîxbarata Sûriyê hatiye çêkirin."*[753]

Hevpeyvînên bi rayedarên saziyên jinê re derxistine holê ku divê bêhtir li ser sedemên diyardeya bazirganiya jinê û fihûşê were sekinanin. Dîsa meyla ku di serî de jinê gunehbar yan jî '*bêexlaq*' dibîne, gelek caran di hevpeyvînan de xwe dida der. Her wiha ji bo bipêşxistina projeyên çareseriyê, nihêrîna wekî '*pirsgirêk e ku ji derve hatiye*' kêm dimîne. Di vî warî de nûnera Dada Civakî balê dikişîne ser wê yekê ku şebekên fihûşê ji xizanî û pergala zayendperest sûdê werdigirin:

"Zilam vê bi rêxistin dikin û bi kar tînin. Çiqas şoreşa jinê pêş ketiye, ewqas jî êrîşên taybet li hemberî jinê hatine pêş xistin. Şertên civakî bandorê dikin, lê belê divê biryara têkoşînê ji bo guhertina vê rewşê hê jî xurttir bibe. Jin bi pirranî ne bi zanebûn dikevin nav rewşa fihûşê de. Ew bi pirranî dikevin bin bandora siyasetên cuda. Ji ber ambargoya li ser Rojava, birçîbûn û pirsgirêkên aborî hene. Dema jin bikarin di milê aborî de xwe bi xwe îdare bikin û di warê zanebûna xwe ya dîrokî û civakî de xwe pêş bixin, ew dikarin têkoşîneke hîn radîkaltir bimeşînin. Wê demê ew nema girêdayî zilam û leyîstokên wî ne.

Di encama dozan de yên ku me lêkolîn kirin û şopandin, ez dikarim bêjim ku min heta niha jineke ku bi xwesteka xwe ketiye di nav fihûşê de nedîtiye. Her tim destê zilamekî di nav bûyeran de heye ku jin kişandiye nava xirabûnê. Ez tevlî nabim ku jin di vê mijarê de sûcdar tên dîtin. Divê em bipirsin û lêkolîn bikin, jin çima dikevin nav van karên xirab de? Em nikarin jinê sûcdar bikin, 'çima zanebûna te tine ye?' Hinek jin hene hîna nizanin xwe li pêşiya dadgehê îfade bikin û xwe biparêzin. Lê zêhniyeta zilamî, xirabûn li ser jinê ferz kir. Divê em jinê ji nav vê xirabûnê ve bikişînin. Ti car jin naxwaze mala xwe xira bike.

Di warê fêhmkirina psîkolojî û ferasetê de xebatên me hîna kêm dimînin. Asta xweperwerdekirinê kêm dimîne. Divê em ji bîr nekin ku çanda tecawizê bi destê dewletê hatiye avakirin. Siyaseta dewletê li ser bingehê zayendperestiyê tê meşandin di mala taybet û ya giştî de. Ticareta jinê girêdayî pergala kapîtalîst a dewletê bi zanebûn tê pêşxistin ji bo jin û civakê bişikîne. Mînak, melayek li Girkêlegê hatiye girtin yê ku girêdayî Beesê dixebite. Wî 'zewacên demî' çêdikirin. Yanî wî jin ji bo mehekê yan jî 10 rojan difirotin zilaman. Ev bûyerên hanê di salên 2015 û 2016'an de qewimîne û têkiliyên wî bi dewletê re derketin holê. Ev bi zanebûn hatiye çêkirin. Ji bo li pêşiya pêşketina jinê were girtin."[754]

Xebatkarên Mala Jinê para bêhtir pirsgirêkên aborî wekî sedema 'bê exlaqî' û gelek pirsgirêkên din ên jinê dinirxînin. Lewma Desteyên Jinê û Komîteya Aborî ya Kongra Starê giranî dane avakirina

[753]Hevpeyvîn bi Emîne Omer û Emel Kûriya re, endamên rêveberiya Desteya Jinê ya Kantona Cizîrê, Qamişlo, 2017

[754] Hevpeyvîn bi endamên Meclîsa dada civakî re, Qamişlo, 2017

derfetên kar û kooperatîfên jinê. Mînak, li Tirbespiyê Kooperatîfa Jinan a *Înanna* û li Kobanê du kargehên *Vîna Jinê* hatine avakirin. Bipêşxistina aboriya jinê wê vîna jinê xurt bike û îhtîmalên xapandin û bi kar anîna jinê kêm bike.

Li hêla din lêkolînên saziyên navneteweyî destnîşan dikin ku fihûş û bazirganiya jinê di asta cîhanê de bi taybet girêdayî rewşên şer û pevçûnan tê bipêşxistin û wekî amûreke şer û dagirkeriyê li dijî jin û civakê tê bi kar anîn. Ev rastî di êrîşên DAIŞ'ê û hêzên dewleta Tirk ên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de careke din eşkere bûye. Bazirganiya jinê, fihûş, revandin û tecawuz li herêmên di bin dagirkeriya van hêzan de bi rengekî sîstematîk tê meşandin da ku bi şikestina kesayeta jinê, vîna civakê jî bişikînin. Di heman demê de istîxbaratên dewleta Tirk û Sûriyê hewl didin van torên fihûşê li herêmên xweseriya demokratîk careke din bihûnin û wekî amûra şerê taybet bi kar bînin.

Jinên Efrînê li Kampa Berxwedanê ya Şehbayê êrîşên vî şerê taybet him li hemberî jinên li Efrînê him jî li hemberî jinên koçber li Şehbayê, bi hêrs û guman şopandine. Dema ku gel nû gihiştibû Şehbayê, belavbûnek di warê pergala komîn û birêxistinbûna jinê de çêbûbû. Jin dibêjin, di vê rewşê de ajanên dewletê hebên hişbir belav kirine û dest avêtine jinan.

Endama Meclîsa Kongra Star a Kampa Berxwedanê, Muna dibêje, dema ku ew hat kampê di jiyana xwe de ew cara yekemîn tirsiyaye: *"Destpêkê tiştên pirr xerab di vir de hatin kirin. Gelek zehmetî hatin kişandin. Dijmin xwest jinên ciwan bixapînin. Wan kesên nebaş xwestin dest bavêjin hevjînên şehîdan jî, bi şerê taybet xwestin jinan bixapînin. Zilam li pêşiya konên xwe sekinîn û jinên xwe difirotin. Lê me rêxistinbûna xwe pirr zû komî ser hev kir. Me mudaxeleyî wan jî dikir û ew ji kampê derxistin."*[755]

Mamoste Meryem Mistefa jî balê dikişîne ser wê yekê ku armanca wan kesan dûrxistina jinê ji birêxistinbûnê ye: *"Şerê taybet jî pirr tê meşandin. Nîvê şevê kesên nenas telefon ji me re vedikin û tiştan dibêjin ji bo nakokiyên di nav civakê û malbatan de kûr bikin. Dixwazin me ji kar dûr bixin. Ev jî tirsê çêdike, bandorekê li ser nefsa mirov ava dike. Lê dema em rewşa jinên li Efrînê bînin ber çavê xwe, herî kêm li vir kuştin, revandin, firotin û irtîsaba jinê tine ye."*[756]

Herçiqasî jî hinek şaneyên ji torên fihûşê û bazirganên jinê di encama operasyonên asayîşê de hatibûn hilweşandin jî, xetera van êrîşan dewam dike. Armanca van hêzan, belavkirina rêxistinbûna jinê û civakê ye. Di serî de wan jinên di rewşên hewcedar û qels de ji xwe re dikin armanc. Beramberî vê, serpêhatiyên jinên Efrînê jî diyar dikin ku birêxistinbûna jinê rêbaza herî encamgîr e di têkoşîna li dijî laşfiroşî û hemû şêwazên şerê taybet de.

Bandora Malên Jinê li ser Jiyana Jin û Civakê

Jinan di hevpeyvînan hemûyan de piştrast kir, rêxistinbûna jinê çiqasî bi pêş dikeve, ewqasî jî jin dibin xwedî vîn û hêza biryarê derheqê jiyana xwe de. Îro gelek jinên ku di saziyan de dixebitin di kesayeta xwe de bixwebawerî ava kirine da ku bi awayiyeke serketî têkoşînê li hemberî tundiya zayendperest li nav malbata xwe jî bimeşînin. Jinên ku pêşî bi miracaeta alîkariyê diçûn Mala Jinê,

[755]Hevpeyvîn bi nûnerên Meclîsa Kongra Star a Efrînê re, Kampa Berxwedanê, Şehba, Tebax 2019

[756] Çavkanî li heman cihî

îro bûne rêveber û alîkariya jinên din dikin. Bi vî rengî, helwest û hevgirtina jinê xurttir bûye.

Di sala 2017'an de me li Mala Jinê ya Serêkaniyê dîtiye çawa jinên ji netewe û çandên cuda yên ku beriya şoreşê hev du nas nedikirin, bi xebat û ruhekî hevbeş dikarin bibin hêza çareseriyê. Wekî endameke Çeçen dibêje, *"Di van pênc salan de rewşa me gelek baş bûye. Jin niha bi hêz e û dikare parastina mafê xwe bike. Ruxmê adetên me dibêjin, divê tenê nêrîna zilamê bi temenê herî mezin di malbat yan eşîrê de esas were girtin, îro jin pirsgirêkên di navbera malbata xwe û eşîran de çareser dikin."*[757]

Bi tevlîbûna jinê ya nav xebatên Mala Jinê re di gelek malbatan de guhertinên civakî û têkiliyên hevjînan jî çêbûne: *"Li gorî berî şoreşê, niha di civaka Ereban de pirr guhertin hene. Jinên Ereb derbasî kar bûn. Berê hevjînê min nedihişt ez ji malê derkevim û bi min re nedibû alîkar. Piştî ez ketim karê Mala Jinê, dema ku ez piştî dewamê vedigerim malê, ew ji zarokan re dibêje: 'Dayika we westiyaye. Hûn ê zêde wê newestînin.' Ew ji min re çayê çêdike. Êdî ew li min guhdarî dike, ne wek berê ye. Ew pirr hatiye guhertin."*[758]

Lê belê gelek jin jî hene yên ku bi dehan jin ji tundiya zilaman xilas kirine, lê bixwe di mala xwe de hê jî rastî tundiya hevjînê xwe tên. Ev yek destnîşan dike ku girêka kor a desthilatdariya zilam di nav malbatê de zû bi zû nayê vekirin û li paş nayê hiştin. Lê belê ew jin didin xuyakirin ku wan bi xebata xwe ya civakî hêz ji hevgirtina jinan girtiye û rêbazên nû yên têkoşînê li mala xwe jî bi pêş xistine.

Di warê parastina mafên jinan û çareseriya pirsgirêkên malbatî de Malên Jinê hewl didin ku misyona xwe bi rêbazên rexne û qanehkirina 'kesên neheq' bi cih bînin. Lihevhatin û aramî di nava malbatê de esas tên girtin. Dozên şideta fizîkî yan jî berdanê radestî mekanîzmayên Dada Jinê tên kirin. Lê carinan jî di nêzîkbûnên xebatkarên saziyê de jî têgihiştinên zayendperest yan jî olperest derdikevin holê û ev têgihiştin çavkaniyên kêmasiyan bi pirranî li cem jinan dibînin.

Di gelek civîn û nîqaşan de jinan daxwaz kir ku saziyên Mala Jinê tenê li bendê nemînin heta ku jin bi pirsgirêkên xwe werin cem wan. Malên Jinê dikarin bi risteke girîng wekî navendên zanekirin û perwerdekirina jin û malbatê jî rabin. Jin dixwazin ku xebatkar û rêveberiyên Malên Jinê têkiliyên xwe bi komînan re hîn xurttir bikin da ku ew bikarin naveroka qanûnên jinê û armanca xebatên xwe di civakê de baştir bidin fêhmkirin. Nexasim bi rêya hevkariya Mala Jinê û hevserokên komînan, gelek pirsgirêk hatine çareserkirin: *"Her dozeke ku ji me re tê ji me re dibe perwerde. Niha em têkiliyên Mala Jinê bi komînan re aktîv dikin. Di her taxê de komînek heye. Dema ku pirsgirêk çêdibin, divê komîn û hevserokên komînê agahiyê bidin Mala Jinê ji bo em nas bikin ka çi çêbû. Ji komînê tê xwestin ku zanibe di kîjan malê de zewaca duyem yan jî zewaca bi temenê piçûk tê çêkirin, kîjan mal ji ber xizaniyê zehmetiyê dikişîne yan jî di kîjan malê de kesek zordestiyê dike. Dema em bi van rewşan dizanin, em dikarin alîkar bibin, gel li taxan perwerde bikin û bi komînan karê xwe bidin naskirin."*[759]

Bandora Zagonên Jinê û Pergala Dada Jinê

[757] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Serêkaniyê re, 2017

[758] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Koçerê re, 2017

[759] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Temirê re, 2017

'Rêgezên bingehîn û ferweriyên giştî yên jinê' yên xweseriya demokratîk bûne pîvan û amûreke girîng di têkoşîna li hemberî tundiya li dijî jinê de. Lê belê gelek caran endamên Dada Jinê û Malên Jinê di nirxandinên xwe de anîn zimên ku qanûnên jinê, zû ketine meriyetê, bêyî ku di nava civakê de baş werin fêhmkirin. Ji ber vê yekê, qebûlnekirin û nerazîbûnên cuda derketine holê. Heta, hinek kes nerazîbûnên bi rengê şerê taybet û reşkirinê belav kirine, yên weke *"Mala Jinê mala berdanê ye"* yan jî *"gelek kesan ji ber qanûnên jinê ji Rojava bazdane"*. Beramberî van nerazîbûnan, endamên dada civakî wate û bandora qanûnên jinê wiha şirove dikin:

"Qanûnên jinê ji ber binpêkirina maf û vîna jinê di nav eşîr û civakê de hatine derxistin. Guhertina jin û civaka Kurd û Ereb pê re pêş ket. Li gorî pêşketin û guhertinên civakî, qanûn jî dem bi dem ji nû ve di ber çav re tên derbaskirin. Li hinek herêman, hîn nêrînên feodal pêş de ne. Lê jin êdî nema qebûl dikin ku wekî tişte di nav malê de bijîn. Mirov dikare şiyarbûneke jinan bibîne. Ew bi asta zanebûnê ve girêdayî ye. Ji bo qanûna jinê û rûniştandina vê, gelek nîqaş û perwerdeyên li ser feraseta desthilatdar û bandora olan li ser jinê hatine meşandin. Pêşketin hene, lê jinên nezane jî hîn hene."[760]

Endamên saziyên jinê, asta qebûlkirin qanûnên jinê bi pirranî wiha dinirxînin: *"Bi giştî qanûnan bandoreke erênî li ser civakê çêkiriye. Lê belê têrê nakin."*

Mijar welê hene yên ku li gorî qanûnên jinê qedexe ne, lê di rastiya civakê de hîna kêm tên lêpirsîninkirin yan jî ew li paş nehatine hiştin. Ev mijar heta niha bi pirranî li ser pelên kitêbên qanûnê dimînin yan jî dibin mijarên perwerde û nîqaşan. Weke mînak kevneşopiya 'next' (qelen) hîn lê ye. Endamên Mala Jinê ya Dêrikê derheqê van mijaran de dibêjin: *"Her tiştî bi carekê em nikarin bidin qebûlkirin. Em niha bi taybetî li ser mijarên anîna pirrjinan û zewicandin bi temenê piçûk disekinin. Mijarên din em ê piştre bi wan dakevin û em ê gav bi gav pêş bixin."*[761]

Ji bo pêkanîna qanûnên jinê koordînasyoneke taybet bi beşdarbûna Malên Jinê, Rêxistina SARA, Desteya Jinê, Lijneyên Sulhî, Asayîşa Jinê û Meclîsa Dada Jinê hatiye avakirin. Ew bi israra avakirina pergal û polîtîkayên xwe, dike ku pêkanîna qanûnên jinê gav bi gav bê sererastkirin. Mînak, Desteya Jinê li kantona Cizirê li gorî pêwîstî û daxwazên jinan di nav 3 salan de gelek saziyên nû yên wekî Mala Parastina Jinê saz kirine da ku jinên di rewşeke xeternak de ango yên ku gef li wan tê xwarin ji ber "namûsê" bên kuştin, dikarin werin parastin.

Bi avakirina vê koordînasyonê re bipêşketinên girîng di warê şirovekirin û birêvebirina dozên jinê de derketine holê. Lê bîlanço û nirxandinên saziyên jinan, destnîşan dikin ku di çareseriya bingehîn a pirsgirêkên jin û civakê de hîn êş û zehmetiyên mezin tên kişandin. Pîvanên hevpeymana civakî ya xweseriya demokratîk û qanûnên jinê bi gelemperî civak li ser rewş û mafên jinan hişyar kiriye. Lê di bipêşxistina feraset û exlaqî de, 'qanûnên jinê' zêdetir bi rê û rêbazên asayîş, dadgeh, cezakirin û girtin tên bicihanîn. Him gel him jî berpirsyarên Dada Jinê ev nêzîkatî carinan rexne kirine. Dema qanûn bi mentiq û şêwaza 'hiqûqa pozîtîvîst' tên xebitandin, ew di bersivdayîna pêdivî û xwezaya civakê de kêm dimînin. Pirsgirêkên jiyanê bi rêya qanûn û ceza heta asteke tên sekinandin. Lê belê ew xeter heye ku mirov tenê xwe li gorî van qanûnan eyar bikin, lê qanehbûna wan ji bo guhertin û veguhertina zêhniyetê qels bimîne. Lewma pêwîstî bi rêbazên afirîner û palpiştên bi zimanê civakî heye yên ku bikarin pîvanên exlaqê civakê ji bandora qalibên zayendperest û desthilatdar rizgar bikin.

[760] Hevpeyvîn bi endamên Meclisa dada civakî re, Qamişlo, 2017

[761] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Dêrikê re, 2017

Serpêhatiyên jinên Rojava destnîşan dikin ku taybetmendiyên têkiliyên malbatê û yên civakê bandorê li hev dikin. Beşdarbûna jinê ya jiyana civakî çiqas xurt be, ewqasî jî ew di jiyana malbat û hevjînan de dibe xwedî vîn û bixwebaweriyê. Gelek mêr, ciwan û zarokên ku bi çanda welatparêzî û perwerdeyên saziyên civaka demokratîk mezin bûne, îro lêdipirsin û diceribînin ka ew ê çawa bikarin di jiyan û têkiliyên xwe de pîvanên azadiyê û wekheviyê pêk bînin.

- **Kurteencamên Lêkolînê Derbarê Jiyan û Têkiliyên Hevjîn, Malbat û Civakê de**

Çaresériya pirsgirêka azadiya jinê û veguhertina demokratîk a malbatê mijareke sereke ya Şoreşa Rojava ye. Ji bo di têkiliyên hevjînan û malbatê de exlaqê civaka komînal, naskirina vîna jinê û çanda demokrasiyê hîn xurttir bibin di serî de pêwîst e ku malbat û têkiliyên hevjînan ne wekî 'mijar ango qadeke taybet' werin nirxandin. Jiyana malbat û hevjînan, şane ango prototîpa civakê ye. Çawa feraset û pergala baviksalar bi rêya van têkiliyan xwe li ser jinê û civakê ferz kiriye, bipêşxistina feraset û têkiliyên hevjiyana azad dikarin bibin bingehê guhertinên ber bi azadiya jin û civakê ve.

Bi taybetî bi têkiliyên malbatî, zewac, evîn û vebijêrkên cuda yên jiyanê ve girêdayî, girîng e ku were fêhmkirin kîjan adet û teqalîd wekî 'çand û exlaqê civakê' tên pêşkeşkirin, lê belê esas, encamên zêhniyeta baviksalariyê ne. Kevneşopiyên ku wekî amûrên dîlgirtina jin û civakê tên bi kar anîn û ziyanê digihînin ferd û civakê, dikarin bi rengekî nû werin şirovekirin. Bi vî rengî pêkan e ku rêûresmên nû bi pêş bikevin yên ku hişmendiya wekhevî û azadiya ferd û civakê xurt bikin. Mînaka vî şêwaza têkoşînê ji bo ji nû ve pênasêkirina têgeha namûsê, kampanyaya Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê ye ya bi dirûşma *'Em jin in. Em ne namûsa ti kesî ne. Namûsa me azadiya me ye'*. Nakokî û guftogoyên li derdora vê kampanyayê dibûn sedem ku gelek jin îro namûsa xwe wekî 'azadiya jin û welat' pênase dikin. Heman rêbaz di mijarên din ên nakok de yên wekî berdan yan jî pirrjinanînê jî dikare encamgîr be.

Ji bo guhertinên demokratîk di nav malbat û civakê de çêbin, di serî de rêxistinbûn, rêbaz û naveroka komînan girîng e. Komîn dikarin bibin navnîşana yekemîn a lihevhatin û çareseriyê. Bi taybetî avakirina komîngehên jinê li tax û gundan, bi perwerde, nîqaş û piştgiriya jinan xurttir dibe. Her wiha, di komînên giştî de jî birêxistinkirina perwerde û nîqaşên malbatî bi beşdarbûna jin, zarok û zilaman dibe gaveke ber bi avakirina empatî û hevfêhmkirinê ve.

Di vî warî de Akademiya Jineolojiyê jî bi lêkolîna pirsgirêkên bingehîn, rojev û berçavkirina pîvanên azadiya jinê û hevjîyana azad, dikare bi ristekî girîng rabe û perspektîfa çareseriyê têkildarî nîqaşên di nav komîn û civakê de ava bike. Bi zelalkirin û pejirandina pîvanên exlaqê civakî li ser bingehê wekhevî û azadiya jinê wê miracaetên li mekanîzmayên dada civakî û qanûnên jinê jî kêmtir bibin. Lê belê di rewşa heyî de girîng e ku qanûnên jinê lê bin, di çend xisûsan de werin xurtkirin û ji bo pejirandina van rêgezan li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemûyan xebatên perwerdê û qanehkirine dewam bikin. Saziyên ragihandinê û perwerdeyên dibistanê dikarin di vî milê ronakkirina civakê de bi risteke pêşeng rabin.

Gelek jinan, nexasim mijarên wekî xwedîtiya hevpar a jin û zilam a mal û milk, pêkanîna pêdivî û parastina mafê jin û zarokan di dema berdan yan jî koçberiya hevjînê de û parastina maf û rûmeta jinên ku nikarin zarokan bînin, sererastkirina qanûnên jinê pêşniyaz kirin. Ji bo nirxandina van pêşniyazan û amadekariya sererastkirinên pêwîst Meclîsa Dada Jinê dikare komisyoneke taybet bi beşdarbûna nûnerên jin yên hemû pêkhateyên neteweyî û olî erkdar bike.

Her wiha di warê bipêşxistina saziyên jinê li gorî pêwîstiyên jin û zarokan de jî gelek nihêrîn û pêşniyaz çêbûne. Ji bo endamên saziyên heyî yên wekî Mala Jinê û lijneyên lihevhatinê bi taybet perwerdeyên li ser derûnî û zanista jinê girîng tên dîtin da ku mirov ferasetên zayendperest di nêzîkatiyên kevneşop de li pey xwe bihêlin. Ji bilî vê, hewcetiya bi avakirina saziyên nû yên parastin û perwerdeyê ji bo jin û zarokên hewcedar li gorî rastî û çanda pêkhateyên cuda hatiye diyarkirin. Manedar e ku jin di van saziyan de bikarin rê û rêbazên têkoşînê li hemberî her cûreyê tundî û ferasetên zayendperestiya civakê di çarçoveya çand û nasnameya xwe ya neteweyî û çandî de bi pêş bixin. Di heman demê de jî girîng e ku hevkarî, nasname û têkoşîna hevbeş a azadiya jinê di nav pirrengî û pirçandiyê de were bihêzkirin.

c) Rewş û Siberoja Jinên Ciwan

Jinên ciwan rengê xwe dane Şoreşa Rojava. Ew hewl didin ku di nav şert û mercên şoreşê de kesayet û siberoja xwe ava bikin. Şert û mercên Şoreşa Rojava, mirov dikare wek 'lihevketina nakokiyên hest û çandan' pênase bike. Jinên ciwan di navbera gelek nakokiyan de wekî di navbera nîzamên kevin û nû, kevneşopî û nûjenî, modernîteya kapîtalîst û modernîteya demokratîk, zayendperestiya civakî û azadiya jinê, koçberî û berxwedan, şer û şehadet, xizanî û teknolojîyên nû, êş û kêfxweşî, xemgînî û hêvî de mezin dibin. Gelek dubendî ketine zik hev. Di kaosa van nakokî û bandorên wan de jinên ciwan li rêyên xwe yên jiyanê digerin.

Komîteya Jineolojiyê ya Jinên Ciwan di dawiya sala 2017'an de li dibistan û kolanên bajarên Qamişlo û Hesekê rapirsînek li dar xistiye û xwe gihandiye hezar jinên ciwan. Li gorî vê, pirraniya jinên ciwan wateya jiyanê bi gotinên 'azadî' û 'têkoşînê' pênase dikin. Lê gelek ji wan hîna nefikirîne ka ew ê armancên xwe çawa pêk bînin.

Dîsa ji sê paran didu yên jinên ciwan ên beşdarî rapirsînê bûn, gotine ku ew ji jiyana xwe ne razî ne. Lê dîsa pirraniya wan bi rengekî erênî li siberoja xwe dinihêrin. Ew bawer dikin ku bipêşketinên baş wê di jiyana wan de çêbin û rewşa jiyanê di demên pêş de wê baştir bibe. Lê balkêş e ku heman jinên ciwan diyar kirine ku wan ti plansazî ji bo siberoja xwe çênekiriye. Wan nikarîbû armanca xwe rave bikin. Pirraniya wan li benda 'nesîbê xwe' dimînin.

Astengiya herî mezin ku jinên ciwan li pêşiya xwe dibînin, lawaziya bixwebawerbûnê ye. Ew xwe 'piçûk' yan jî 'bêqîmet' dibînin. Lewma pirraniya jinên ciwan zehmetiyan dikişînin ku derheqê jiyana xwe de biryaran bidin. Li ser vê mijarê bi taybetî malbat wek asteng tên nirxandin. Jinên ciwan dan zanîn ku di danûstandinên bi ferdên malbatê re ew nikarin nihêrînên xwe bi rehetî bibêjin. Ew xwe neçar dibînin ku li gorî bendewariyên malbatê tevbigerin. Jinên ciwan dibêjin ku di nav ferdên malbatê de yên ku herî baş ji wan fêhm bike dîsa dayika wan e. Malbat li dewsa tundiya fizîkî bêhtir bi zext û rêbazên zirav jinên ciwan dişidînin.

Cîhan di xebatê jinên ciwan de li Efrînê cihê xwe girtiye. Ew dide xuyakirin ku divê jinên ciwan bi wêrekî tevbigerin da ku bandorên neyînî yên perwerdeya malbat û rejîma Beesê ji ser derûniya xwe biavêjin:

"Di dema rejîmê de hebûna jinên ciwan xuya nedibû. Ew tenê li mal bûn û her li benda zilamekî diman ku bizewicin. Lê bi destpêka şoreşa Rojava re jinên ciwan dixwestin xwe ji van sînoran rizgar bikin û wî qalibê civakî bişkînin. Ez jî berê li malê bûm. Malbata min malbateke welatparêz e. Lê dîsa jî ev derfeta ku derbikevim, bidim û bistînim tine bû. Her tim hat gotin, 'Tu qîzek î, eyb e. Nabe tu derkevî. Divê tu karê malê bikî'. Lê niha me ev tişt derbas kir. Jinên ciwan xwe ji gotina 'eyb e û şerm e' heya astekê rizgar kirine û gavên pirr mezin avêtine. Lê dîsa jî di hinek cihan de hîna fedî heye. Dema ku ez diçim civînan, carna teredûd bi min re çêdibe. Ez dibêjim dibe ku

nihêrina min şaş be. Yanî hîna em ditirsin. Bi derbasbûna min a kar, min gelek tişt nas kirin û gelek pêşketin di kesayeta xwe de çêkirin. Jinên ciwan di hemû aliyan de xwe pêş xist, wekî di aliyê ziman, leşkerî de, siyasî û rêxistinî de.
Lê heya em gavekê bavêjin divê em tirsa xwe derbas bikin. Berê dema em biçûna cihekî, birayên min pirr mudaxele dikirin. Lê niha, ew gotin û bendên kevin hatin şikandin. Pirr caran ez derketim kar, ez diçûm cebhe û bi rojan jî nedihatim malê. Birayên min jî qet mudaxele nedikirin. Xwuşkeke min di mal de bû. Wê qebûl nedikir ku ez derbiketima û pişt re zewicî. Lê niha ew dibêje, 'xwezî min wisa nekiriba.' Niha kes li mala me namîne. Hemû tevlî kar û xebatê bûne."[762]

Pirraniya jinên ciwan bi pirsgirêkên xwe dizanin û dikarin wan şirovê bikin, lê gelek caran ew rêyên çareseriyê nabînin yan jî cesaret nakin gavê bavêjin. Ji ber van nakokiyan, jinên ciwan di zelalkirina helwesta xwe ya jiyanê de zehmetiyê dikişînin û bê îstîqrar tevdigerin. Lewma, ew tiştên cuda, karên cuda li ser hev diceribînin. Ew zû bi zû bi tiştan razî nabin. Wekî din balkêş e ku gelek jinên ciwan di temenê piçûk de cixarê dikişînin. Qalibên kevin hatin şikandin, lê ew hîn nikarin bi rehetî terîfa daxwazên xwe yên nû bikin. Ji ber ku wan a aydê xwe nas nekiriye û rastiya xwebûnê di kesayeta xwe de ava nekiriye, gelek jinên ciwan li bandorên derve re vekirî ne. Di vî warî de bandora propaganda û modayên modernîteya kapîtalîst dihêle ku jinên ciwan xwe 'kêm' bibînin û krîzên derûnî bi wan re çêbin. Çend bûyerên xwekujiyên jinên ciwan wekî encama van nakokiyan û hesta bênirxbûnê hatine nirxandin.

"Zextên civaka zayendperest, eşîrtî, ol û kapîtalîzmê jiyana jinan û bi taybetî ya jinên ciwan sînordar dikin. Serdestiya zilam, ya bav û bira û her wiha zêhniyeta namûsê nahêlin ku jinên ciwan rehet bikarin vîna xwe nas bikin. Ruxmê ku qanûnên jinê, zewaca bi temenê piçûk qedexe kirine, qanûnê zêde encam negirtine. Lê bi nîqaşên di nava gel û malbatan de em encamê digirin. Em li ser mijara rakirina nextê [qelendê] jî nîqaş dikin. Çend malbatan adeta nextê li pey xwe hiştiye, lê bi pirranî hîna pêk tînin."[763]

Jîn di temenekî ciwan de wekî hevseroka Meclîsa Gel li herêma Koçeratê xebatê dimeşîne. Ew li ser rewşa xwe û ya jinên ciwan li herêma xwe dibêje, *"Berê ez dernediketim ji malê. Ez bêhtir girêdayî olê bûm. Destpêka ez ketim nava kar de ez bê bawerî nêzîkî xwe dibûm. Lê dema min perwerde dîtin û ketim nava civakê de, min li çîrokên dayikan guhdarî kirin û min xelk nas kirin ev dibû wek waneyekî civakê ji min re. Niha tu binêrî, hinek jinên ciwan di temenê şazdeh salî de, zêhniyeta wan a dayikên çil an pêncî salî ye. Ew di civakê de naaxivin, ji malê dernakevin, herdem karê malê dikin. Jê re dibêjin, 'ew jina herî qenc e'. Jina ku şoreşê çêbike, jina pêşketinê çêbike, jina çek li milê wê be, ew jin hîna ne bi dilê civakê ye."*

Her wiha Jîn balê dikişîne ser wê yekê ku her jina ciwan mecbûr dimîne li dijî zêhniyeta hişk a li malbat û civakê têbikoşe da ku ew bikare bibe xwedî biryar. Xortên ciwan di hilbijartina jiyan û karê xwe de serbest in. Lê malbat heman tiştê ji bo keçên xwe qebûl nakin. Lewma Jîn armanca xwe wiha diyar dike: "*Armanca min wek jin ez bikarim xêr û paqijiyê bidim hevalên xwe, ji bo jin hemû derkevin, bi xwe bawer bin, xwedî hêz bin. Divê jinên ciwan bizanin ku jiyan ne bi mêran ve girêdayî ye û ne karê malê tenê ye."*[764]

[762] Hevpeyvîn bi Cîhan re, jina ciwan, Efrîn, 2017
[763] Hevpeyvîn bi Ruheyv re, endama Tevgera Jinên Ciwan, Kobanê, 2017
[764] Hevpeyvîn bi Jîn re, gundê Girzîro yê Koçeratê, 2017

Ji bilî kevneşopiyên malbatî, rêzefilmên Tirkî, Erebî û Hindî, hewesên çanda arabesk, Hollywood û Bollywoodê jî bandora xwe li ser jiyan û nihêrînên ciwanan çêdikin. Gelek dikevin nav xeyalên 'evîna romantîk'. Lê belê çîrokên filman, xeyalên wan û rastiya jiyanê hev du nagirin. Tevî vê yekê şêwaza bi kar anîna înternetê û medyayên civakî jî dikare bibe sedema pirsgirêkên dêrûnî, hevaltî û malbatî. Gelek jin û xortên ciwan êdî bi rêya telefon û înternetê hev du nas dikin, ji hev hez dikin û heta biryara zewacê didin bêyî ku rastiya hev nas bikin. Dema ku piştî zewacê rastiya hevdu nas dikin, gelek caran pirsgirêkên giran ên heta bi berdanê diçin jî derdikevin holê. Dîsa medyayên civakî ji bo şopandin û teftîşkirina hev du jî tên bi kar anîn. Bi vî rengî gelek caran di têkiliyan de fesadî, şaşfêhmkirin, bawerîpêneanîn û hesûdî bi pêş dikevin. Bi bandora medyayên nûjen çanda xwendin û lêkolînê lawaz bûye ya ku di salên 1990'î de di nav ciwanên Rojava de xurt bû. Rojevên modernîteya kapîtalîst ên ku bi rêya televizyon û înternetê tên belavkirin, asoyên fikrî û zanînê teng kirine.

Aya 18 salî ye û rexne dike ku gelek jinên ciwan yên derdora wê di temeneke piçûk de daxwaza zewacê dikin: "*Hevalê min tenê behsa zewacê dikin. Tenê ev serê wan de ye. Yên ku herin zanîngehê jî beşekê bixwînin ji bo xortekî baş re bizewicin. Sûncê malbatê jî têde heye. Ew keça xwe hîn di temenê 15 – 16 salî de ji bo zewacê amade dikin û qala zewacê dikin. Lê jiyan ne tenê zewac e."*[765]

Lê belê Silîvan dibêje, jinên ciwan gav bi gav vîna xwe didin diyarkirin: "*Êdî jinên ciwan di mijara zewacê de tercîhên xwe tînin ser ziman û li hemberî zewacê bi zorê ber xwe didin. Pê re, naskirina vîna jinên ciwan ji hêla dayik û bav ve jî êdî pêş dikeve."*[766]

Her wiha jinên ciwan di nav şoreşê de nasnameyeke nû ji xwe re avakirine. Car yekê ye ku ew rêxistinên xwe yên xweser bi navê Yekîtiya Jinên Ciwan a Rojava û Yekîtiya Jinên Xwendekar ava kirine. Rêxistinên jinên ciwan, nasname û vîna xwe di nav xebatên Kongra Star û Yekîtiya Ciwanên Rojava de jî didin xuyakirin. Di heman demê de ew di tevahiya qadên şoreşê û saziyên civakê de cihê xwe digirin. Ew vê yekê bixwe weke bipêşketineke girîng dinirxînin:

"Di şoreşa Rojavayê Kurdistanê de jinên ciwan xwe nas kirin, vîn, hêza xwe nas kirin û herikîn nava qadên jiyanê. Herikîna qada jiyanê, bi serê xwe şoreşek e. Qadên leşkerî, rêveberî, siyasî û civakî tenê ji bo zilaman bûn. Lê jinên ciwan di her qadekê de xwe îsbat kirine. Di qada perwerdê de jina ciwan parastina ziman dike. Qada werzîşê jî her tim girêdayî zilaman bû. Lê jinên ciwan niha tîmên sporê ava kirine. Ew beşdarî festîvalan dibin. Di qada rêveberiya xweser de jinên ciwan nûnertiya xwe di hemû sazî, deste û cihên biryarê de dibînin. Ji komînan de bigire heya kongreyan di hemû meclîsên li ser asta beldê, herêmê, kanton û asta Rojava de kotaya ciwanan heye. Her wiha kotaya jinên ciwan jî hatiye belîkirin."[767]

Lê belê ji ber gelek derfet û vekirîbûna li bandorên cuda, jinên ciwan gelek caran jî bê îstîqrar tevdigerin. Ew carinan dikarin di kêliyekê de biryara xwe biguherin, dev ji karekî berdin. Lewma, hewildanên wan ji bo bipêşxistina kesayeta xwe û xebatê li gorî derfetên heyî, lawaz e. Ji ber ku bi vî rengî encameke xurt dernakeve meydanê, gelek jinên ciwan jî nikarin baweriya xwe ya cewherî derxin holê. Pirraniya jinên ciwan yên ku dixwînin piştî xwendina xwe yan dixwazin bibin mamoste yan jî di saziyekê de bixebitin. Yanî, ew dixwazin di karekî de wekî miwazif bixebitin û heqdestê xwe bistînin. Mixabin, hewes û hewldanên ku ew di beşa xwe de xwe wekî pispor bi pêş

[765] Hevpeyvîn bi Aya re, Hesekê, 2017

[766] Hevpeyvîn bi Silîvan re, endama Yekîtiya Jinên Ciwan, Dirbêsî, 2017

[767] Hevpeyvîn bi Gulê re, endama Yekîtiya Jinên Ciwan a Efrînê, Efrîn, 2017

bixin, xebatên akademîk û projeyên civakî, aborî yan jî zanistî bi pêş bixin, kêm in. Wekî din jinên ciwan ên ku dizewicin, gelek caran, dev ji xwendinê berdidin û ji karê xwe derdikevin.

Beşek jinên ciwan di nav malbatên welatparêz de mezin bûne. Wan li dibistanên dewleta Sûriyê dixwend, lê bi çanda Tevgera Azadiyê mezin bûne. Gelek ji wan jinên ciwan niha di nav xebatên şoreşê de, di sazîyên Kongra Star û xweseriya demokratîk de cih digirin. Rêjekê, ew dibêjin, ew di nava şert û mercên heyî de li zewacê nafikirin. Lê ew pêwîstî dibînin ku projeya hevjîyana azad li gorî rastî û pêdiviyên civakî zêdetir were nîqaşkirin û zelalkirin.

Her wiha gelek jinên ciwan ên ku bêyî destûra malbatê tevlî şoreşê û hêzên parastinê bûne, di dawiyê de ev biryara xwe bi malbatên xwe jî dane pejirandin. Bi guhertina jiyana xwe ve, van jinên ciwan di malbatên xwe de jî guhertin û bawerî dane avakirin.

Di encama hevpeyvîn û lêkolînan de diyar dibe ku ya herî girîng ew e ku jinên ciwan di kaosa nakokiyên ku li Bakur û Rojihilatê Sûriyê de diqewimin, dikarin bibin xwedî nihêrin û biryarên aydê xwe. Di vî warî de jinên ciwan pêdiviyê pê dibînin ku ew bikarin nasnameya xwe wekî ferdeke civaka xwe nas bikin û di kesayeta xwe de ava bikin. Naskirina kesayetên jinên ciwan ên ku di nav civaka xwe de bi rengekî serketî dibûn xwedî biryar, gotin û çalakiyê, îlham dide ciwanan. Her wiha gelek jinên ciwan di xebatên çand, huner, tenduristî, cûreyên werzîşê yan jî hezkarên din de nasname û qebîlyetên xwe naskirine û xwebaweriyê di kesayeta xwe de ava kirine. Lewma bipêşxistina xebatên wiha li her gund, tax û bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê girîng e da ku jinên ciwan di nav civakîbûnê de mezin bibin, bikarin xwe û derdora xwe bi pêş bixin. Bi vî rengî mijûlbûna bi înternet û bandora şerê taybet li ser jiyana wan jî kêmtir dibe.

Têkiliyên xurt, bi hezkirin û rêzdarî di navbera nifşên jinên ciwan, dayik û dapîran de potansiyeleke mezin ji bo guhertina malbat û civakê dihewîne. Dema ku jinên ciwan serpehatî û têkoşînên dayikên xwe baş nas bikin, ew dikarin jê gelek sûd werbigirin da ku ew heman êşan careke din nekişinîn. Bi vî awayî, jinên ciwan dikarin bersivên xwe ji bo pirsa bingehîn: 'Ez dixwazim çawa bijîm?' hîn zelaltir bibînin.

d) Etîk û Estetîk

Di bin pergala desthilatdariya zilam û kedxwariyê de pîvanên başbûyîn, exlaq û xweşikbûyînê yên civaka xwezayî li bin guhê hev hatine xistin. Li şûna rêgezên jin û civakê yên ku jiyanê watedar dikin, hezkirin û parvekirinê ava dikin, ferasetên zayendperest hatine bicihkirin da ku serweriya zilam û dewletê di fikr û hestên mirovan de were misogerkirin. Di encamê de jin û civak ji xwezayê û cewherê xwe hatin silkirin û biyanîkirin. Yek ji armancên sereke yên şoreşên sosyalîst ev e ku biyanîbûna mirovan ji keda xwe, ji xwezayê û civakê li pey xwe bihêle; çand û exlaqê jiyanê li ser rêgezên azadî û wekheviyê careke din bide rûniştandin.

Bipêşxistina etîk wekî teoriya exlaq û ya estetîk wekî teoriya bedewiyê, wê asta serketina şoreşa jinê û azadiya civakê diyar bike. Di vî warî de Jineolojî etîk û estetîk wekî coteke girêdayî hev, dinirxîne. Serwextbûna kolektîf a civakê li ser hîmên başbûnê û xweşikbûnê wekî yekîtiya di navbera cewher û şikil de, di navbera ruh, raman û bedenê de bingehê civaka exlaqî û polîtîk e. Hişmendiya desthilatdariyê, pîvanên rast û şaş, red û qebûl, xweşik û kirêt li bin guhê hev xistine û şêlî kirine. Lewma girîng e ku em bi nihêrîna Jineolojiyê, sedemên hilbijartinên civakê, yên ecibandin, pejirandin û hezkirinê dahûrînin, etîk û estetîkê li ser bingehê zanîn, wijdan û hestên dada jinê, careke din bidin rûniştandin.

Abdullah Ocalan serxistina jiyana rast, baş û xweşik wekî şertê azadiya civakê pênase dike: "*Di dereke de ku ji eşqê re vekirî nebe, demokrasî, azadî, wekhevî û welatparêzî pêş nakeve. Jiyaneke demokratîk a bi jinê re li ser esasê wekhevî û azadiyê, ji bo jiyanê bivênevê ye. Lê, ji bo vê, exlaqê kole yê pirr kûr bandor kiriye û jirûderxistina kapîtalîzma nûjen, divê bi exlaqê azadiyê (ETÎK) û jiyana xweş (ESTETÎK) li paş were hiştin. Bi jinê re (her wiha bi mêr re) jiyaneke rast (ZANISTÎ-JINEOLOJÎ), baş (etîk-helwest û hişmendiya exlaqê nû) û xweşik (pîvanên nû yên estetîk, jiyana azad) bisernexistin, bi bisernexistina civaka sosyalîst re weke hev e. Hêza mezin a ji kaosa dawî ya pergala kapîtalîst, ji eşqên rastîn tê hêvîkirin, li dora jinê afirandin û gavavêtin, yek ji karên herî esîl û pîroz ên lehengên rastîn ku dil dane eşqê û ser dane ser vê rê ye!*"[768]

Li ser vî bingehî me di xebatên lêkolîna sosyolojîk a civaka Rojava de hewl da ku em nihêrînên jin û civakê li ser etîk û estetîkê fêhm bikin: *Jinên Rojava îro jiyaneke rast, baş û xweşik çawa pênase dikin? Di têgihiştin û rastiya çand û exlaqê jiyanê de bi şoreşê re çi guhertin çêbûne?*

- **Têgihînên 'Xweşikbûyîn' û 'Başbûyînê'**

Siyaseta bişaftinê ya dewleta Sûriyê û her wiha qalibên baviksaleriyê, ferasetên xwe yên 'xweşikbûyîn' û 'başbûyîn'ê li ser jinên Rojava ferz kiribûn. Lewma jin di afirandina etîk û estetîka jiyanê li gorî cewherê xwe de tengezar bûne.

"Di milekî de rejîmê em weke Kurd ji ziman û çanda me dûr xistibûn. Her wiha weke jinên ciwan jî em xistibûn bin kontrola dewletê da ku em tenê li ser teşe û bedena xwe bifikirin, ji xwezaya xwe şerm bikin û xwe nas nekin. Etîk û estetîka me, tenê di teşe û bedenê de dabû pêş. Rengîniya jinê kuştibû. Di malbatê de jî wê keç di piçûkaniya xwe de bi leyîstokên weke bûkan, fêrî avakirina malbatê kirin. Ev jî dibû sedem ku keç bê hêz û vîn bimînin, nedibû ku nêrînên wê hebin."[769]

Nexasim ji destpêka sedsala 21'ê ve belavbûna çanda modernîteya kapîtalîst bandora xwe li ser têgihiştina etîk-estetîkê ya civaka Rojava kiriye. Ji sala 2007'an û bi şûn ve dewleta Sûriyê giranî dayê weşandin û wergerandina rêzefilmên televîzyonê yên dewleta Tirk. Wekî din di gelek kanalên televizyonê yên dewletên Ereb de rêzefilmên bi çanda arabesk hatine çêkirin û dubare her hatine weşandin. Di van rêzefilman de çand û hişmendiya baviksalar û kapîtalîst derheqê şêwaza jiyanê, zewac û malbatê de tên pêşkeşkirin. Bi vî awayî nihêrîn û modayên çanda kapîtalîzmê û Îslama polîtîk a AKP'ê bi rengekî zirav berdan nava civakê.

Di demekê de ku civak bi pirsgirêkên mezin yên aborî û zextên dewletê re rû bi rû bû, bi rêya rêzefilman hewes û rojevên sexte hatine avakirin. Ev rewşa aloz bi belavbûna girseyî ya telefonên dîjîtal, înternet û 'medyayên civakî' yên weke facebook û whatsappê gihîştiye asteke nû. Civaka ku ji ber sansura dewletê ji derfetên ragihandina azad dûr mabû, bi carekê ket bin bandora propaganda, moda û çewisandina pergala lîberalîzmê. Di encamê de lêgerîna 'bipêşketinê', 'dewlemendbûnê' û 'azadiyê' li derve û bi koçberiyê hatiye teşwîqkirin. Ji ber nihêrînên oriyantalîst gelek kes êdî çanda civaka xwe piçûk dîtine. Pîvanên ecibandin û lêgerînên jiyanê hatine guhertin.

Li gorî encamên rapirsînê bi jinên ciwan ên li bajarên Rojava re di dawiya sala 2017'an de jinên ciwan ên 16 ta 25 salî herî zêde wexta xwe bi înternetê derbas dikin. Di rêza yekê de ew bi 'ragihandina civakî' weke facebook û leyîstokên înternetê re mijûl dibin. Bi gelekan ji wan gumanên li ser ecibandina wêneyên wan ên ku ew li ser facebookê diweşînin, hene û bi kêmbûna puanên 'ecibandinê' yan jî kesên ku rûpela wan dişopînin, bi awayekî neyînî bandor li wan dibe.

[768] Jêwergirtina ji pirtûka 'Destpêkek ji bo Jineolojiyê', Beşa 'Çima Jineolojî, *Weşanên Akademiya Jineolojî*, 2015'
[769] Hevpeyvîn bi Zîlan re, endama Komêla Jinên Ciwan, Cindirês, Efrîn, 2017

Dîsa jinên ciwan didin zanîn ku ew bejna xwe naecîbînin û bi kar anîna makyajê 'baweriya' wan xurttir dike. Gelek jin û bi taybetî jinên ciwan pîvanên 'xweşikbûnê' yên rêzefilmên Tirkî, Erebî û Hindî dişopînin û ji xwe re esas dibînin. Di nav wan de gelek kes hene ku carna nexweşî yan jî krîzên derûnî digirin canê wan. Ji ber ku derfetên wan yên madî, fizîkî yan jî malbatî destûrê nadin ku ew wan 'pîvanên' çanda kapîtalîst pêk bînin. Lewma ew xwe sûcdar, 'kêm' û 'bêqîmet' dibînin.

Guhertinên ku di destpêka sedsala 21'ê de di çanda jiyanê ya civaka Rojava de rûdane, Şervîn wiha terîf dike: "*Ez li Amûdê mezin bûm û tevlî şoreşê bûm. Sala 2014'an ez dîsa hatim vir. Min dît, hemû malên kelpiç bûne çîmento. Berê gel bê pera bi hevdu re alîkarî dikir û çîrok ji hev re digotin. Gundiyan ji hevdu hez dikir. Lê ev ruh kêm bû. Her kes li 'erda xwe', li 'pezê xwe' difikire. Ezezîtî pêş ket. Têkiliyên civakbûnê qut bûn. Kapîtalîzmê ruhê civakê parçe kir. Pêvçûn li ser tiştên piçûk derdikevin.*

Kapitalîzm bi rêya teknîkê, rêzefilmên Tirkî û Hindî diket nava her mal û malbatê. Aniha mirov di koletiyeke bi qanaet, jê razî de ne. Jineke makyaj li xwe nake, êdî eyb tê dîtin. Berê bala ciwanan li ser xwendinê bû. Niha pirraniya wan ji xwendinê dûr ketin. Madiyat ket pêşiya hezkirina mirovan. Vê li jiyana gundan jî bandor kiriye. Bajarvanî û hezkirina bajêr pêş ket."[770]

Lê belê di heman demê de bi bipêşketina şoreşê re gelek jin ji nû ve ketine nav lêgerîna xwebûnê û ji nû ve zindîkirina çanda xwe ya kevnar. Weke nimûne di roja îro de hinek jinên ciwan bi kêfxweşî û serbilindî dîsa cil û bergên Kurdî li xwe dikin. Li bajarên Rojava gelek jin û zilam bi hezkirin vegeriyane çanda cilên xwe yên resen. Nexasim di rojên pîrozbahiyan de estetîka cilên rengîn bala mirovan dikişîne. Jinên Ereb, Çerkes, Aşûrî û Suryanî cilên xwe yên resen dîsa bi şanazî li xwe dikin û pêşkeş dikin. Her wiha gelek jin jî lixwekirina cilên leşkerî diecîbînin, ji ber ku ew cilûberg bûne remza veqetandina jinê ji bindestiyê. Ecibandina cilên leşkerî di nav jinên ciwan de mirov dikare wek teyîsandina etîk û estetîka kolektif a birêxistinbûn û bixwebaweriya jinê şirove bike.

Dîsa jin li gelek cihan di birêxistinkirina komînan, zindîbûna têkiliyên civakî, çandina bax û baxçeyan de bûn xwedî kedeke hevbeş, reng û estetîka xwe dane jiyanê. Bi vekirina dibistan û akademiyên bi zimanê dayikê re gelek jin, carna dayik tevî keçên xwe bi meraq û hezkirineke mezin tevlî perwerdeyan bûne. Ferbûna xwendin û nivîsandinê bi zimanê Kurdî bûye bingehê bipêşxistina wêje û fikrên nû, nîqaşên li ser exlaqê azadiyê û avakirina jiyaneke xweş û baş.

- **Çand, Huner û Wêjeya Şoreşa Jinê**

Bi bandora Tevgera Azadiya Kurdistanê hîna di salên 1980 û 1990'î de xebatên çand û huner di civaka Rojava de hatin birêxistinkirin. Gelek zarokên ku di komên govend û stranê de bi çanda welatparêz a Kurdî mezin bûn, bi etîk û estetîka azadiyê li vir nas kirine. Gelek ji wan jî tevlî nav refên şoreşê bûn.

Di pêvajoya Şoreşa Rojava de gelek berhemên çand, huner û wêje hatine çêkirin. Hinekan ji wan çanda kevnar ji nû ve şirove kirine. Gelek berhem jî qala dîrok û kêliyên şoreşê dikin. Şervanên YPJ û YPG'ê di çeperên şer de stranên berxwedanê afirandine. Dayik û bav, dapîr û bapîr di şevbihêrkên malê de hatine cem hev, meqamên kevin bi şêwazên nû gotine. Endamên saziyên çand û huner, bi hestên şoreşê stran, wêje û helbestên nû çêkirine. ***Destana Genim*** a Koma Botan yek ji van berheman e. Ew dîroka afirandin, xiyanet û berxwedanê dibêje ya ku ji serdema neolîtîkê heta roja îro li ser erdnîgariya Kevana Zerîn pêk hatiye:

[770] Hevpeyvîn bi Şervîn re, Hesekê, 2017

Malek, malek min tê û tê û tê.
Ber qurma Dicle û Feratê
Me lê çand libek genim simbil da
Xêr û bêra dinê tev jê tê
Dêw û Ehrîman pilan girêdan
Enkido dan pêş bêbextê rê
Dîsa dixwazin axa me vebigirin
Yadê wa dengê lingên wan tê

Dahola şer gurm e gurm e
De bila bêtin vê meydanê
De bila bêtin vê rêbendê

Govend geriya dime dime
Em bernadin vê dîlanê
Em bernadin vê govendê

Tîr û kevan rime rime
De bila bêtin vê meydanê
De bila bêtin vê rêbendê

Li Rojava şerî germ e
Em bernadin vê dîlanê
Em bernadin vê govendê

Li seranserî Binxetê
Li Zevin girên heybetê
Li Hûriyan ji paytextê
Ji Mîtanan li Keytextê

Ji geliyê Ava Mezin
Ta Heşarkê Pira Hesin

Hêy tev tev

Muxlacî zerbûn talanê
De bila bêtin vê meydanê
De bila bêtin vê rêbendê

Siwar ketin berxwedanê
Em bernadin vê dîlanê
Em bernadin vê govendê

Gurzê Zal in ji îmanê
De bila bêtin vê meydanê
De bila bêtin vê govendê

Lêda gêr kir der holanê
Em bernadin vê dîlanê
Em bernadin vê govendê

Derbalutê ta Qestelê
Digirmanê ta Kendalê

Ji Gir Xelef ta Gir Koçer
Ji Elokê ta Rimêlê

Ji Til Berek ta Xabûrê
Berya Homan û Holê

Halelehale

Qada şer toz û kulxane
De bila bêtin vê meydanê
De bila bêtin vê rêbendê

Rêşopa hespê hedban e
Em bernadin vê dîlanê
Em bernadin vê govendê

Li hawir mij û dûman e
De bila bêtin vê meydanê
De bila bêtin vê rêbendê

Tola Derwêş e li Homanê
Em bernadin vê dîlanê
Em bernadin vê govendê

Kurdên çê ne li Holê ne
Di Rojava de her malxwê ne
Koçê nakin her li cih ne
Dara merx in têr û şîn e

Yê xerab her ser çepel e
Tuxmê revok û zexel e

Gelparêz in, Rojhilat in
De bila bêtin vê meydanê
De bila bêtin ve rêbendê

Apoyî ne, tev kelat in
Em bernadin vê dîlanê
Em bernadin vê govendê

Dayik in, kezebxelat in
De bila bêtin vê meydanê
De bila bêtin vê rêbendê

Xweser in, xemla civat in
Em bernadin vê dîlanê
Em bernadin vê govendê

Bi şoreşê re jinan rengê xwe daye xuya kirin di nav xebatên çand û huner de wek di beşên wêje, helbest, govend, stran, muzîk, hunerê destan, şano û sînemayê de. Bi avakirina komên jinê re tevlîbûn, xwestek û bendewariyên jinê di warê xebatên çand û huner de hê zêdetir bi pêş ketine. Gelek jinên ku malbatên wan beriya şoreşê nedihiştin ku tevlî xebatê koman bibin, îro di mihrîcanên Rojava de derdikevin ser dikê û stranan dibêjin, şanoyan dilîzin û govendê digerînin.

Mînak li herêma Koçerata, jinên navsere Koma Kevneşop ava kirine. Ew stranên kevnar ên herêma xwe li hevdu vedigerînin û beşdarî gelek şahî û mihrîcanan dibin. Diya Ciwan di sazkariya Koma Kevneşop de cihê xwe girtiye û dibêje, *"Gelek jinên bi dengekî xweş hene, lê ew tevlî van tiştan nabin. Armanca me ew bû ku em jinan ji malê derxin û nêzî çanda xwe bikin. Hêdî hêdî me hejmara jinê di xebatê çandê de zêde kir. Armanca me niha ew e ku em ciwanên xwe fêrî çanda me ya kevnar bikin. Her tişt di erşîfa me de heye ji bo çanda me ya kevnar neyê windakirin. Çanda me, koka me ye. Yên ku bê kok û bê çand dimînin, tine dibin."*[771]

Gelek jin dibêjin, çanda kevnar a gelên Rojava bi şoreşê re ji nû ve zindî bûye. Lê asta vê li gorî nifş û herêman hinekî ji hev cuda ye. Li gorî texmînan baldariya ciwanan kêm dimîne:

"Ciwan ji çanda kevnar bi pirranî bêpar mane, ji ber dayik û bav pê re ji ber tirsa dewletê ev çand parve nekirine. Xwesteka ciwanan di beşa govendê de heye, lê meraqa dengbêjiyê lawaz e. Di çanda Koçeratê de jin bi xwe bi bawer in, bi serbilindî derdikevin ser dikê û stranan dibêjin. Lê di herêmên din yên Rojava de jin hîn bêhtir girtî ne û fedî dikin. Bi taybetî li herêmên ku bandora ol zêdetir e, jin zû bi zû dernakevin ser dikê. Wan jinan gelek tişt di hundirê xwe de kom kirine, lê nikarin parve bikin. Lê di hinek kêliyan de ev rewş dikare biguhere. Mînak, bi vê şoreşê re jinên Kobanê hemûyan çand û zanebûna xwe bi xwezayî derdixistine holê."[772]

Xebatên çanda jinê li hemû navendên Tevgera Çand û Huner hatine birêxistinkirin. Her wiha di sala 2017'an de sazîbûna xebata çand û hunerê xweser ê jinê bi navê Kevana Zêrîn dest pê kiriye. Akademî û navendên çanda jinê di bin navê Kevana Zêrîn de bi beşên wekî stran, şano, govend, karê destan û lêkolîna çanda kevnar hatine avakirin. Yekemîn konferansa Kevana Zêrîn li kantona Efrînê bi beşdarbûna 400 endamên jin ên kantona Efrînê û bajarê Helebê hat lidarxistin. Wekî din yekemîn konferansa Kevana Zêrîn a Bakurê Sûriyeyê li bajarê Qamişloyê pêk hatiye. Bi vê konferansê re hewildanên ji bo bipêşxistina çanda neteweya demokratîk zêde bûne. Mînak, klîbên stranên jinên Aşûrî, Ereb û Kûrd bi awayekî hevbeş û rengîn hatine amadekirin. Jinên hunermend dibêjin, pêşîn hinekî zehmetî hebûn, lê dema klîb hatiye weşandin, her kes pirr kêfxweş bûye, ji ber ku gelan hemûyan rengê xwe tê de dîtiye. Endamên Kêvana Zêrîn balê dikişînin ser wê yekê ku bi beşdarbûna xwe ya li xebata çandê ew bi guhertinên mezin di kesayetên xwe de hisiyane. Bi ked û lêhûrbûnên xwe li ser çand, etîk û estetîkê, wan bawerî, hêza xîtabê, zanebûn û civakîbûna xwe bi pêş xistiye.

"Ev şoreş ji bo jinê wiha bû wekî tu kevirekî li ser giya rakî. Piştî armanc, fikr û exlaqê vê şoreşê hatiye fêhmkirin, ruhê şoreşê gihand jinên hemû pêkhateyan. Mirov tî û birçiyê zanebûnê ne. Ji hemû beşên civakê, tevlîbûna civakê ji xebatê çandê re çêbû."[773]

Di gelek navendên çand û huner ên Rojava de îro ew jin cihê xwe digirin, ên ku berê bi nêzikatiyên cuda yan jî zayendperestiya civakê re rû bi rû bûne. Di nav wan de jinên astengdar, bi zehmetiyên derûnî yan jî yên ku tundiya malbatê dîtine, hene. Ew dibêjin, wan bi xebatên çand û hunerî kariye bi xwe bawer bibin. Ew dibêjin, ew di nav xebat û rêxistinbûna çand û hunerî de cara ewilî hez kirine û hûrmetê dibînin. Vê yekê cesaret daye wan da ku ew bikarin gelek pirsgirêk û astengiyan li pey xwe bihêlin û hêza xwe ya cewherî derxin holê.

[771] Hevpeyvîn bi Diya Ciwan re, Dêrik, 2017

[772] Hevpeyvîn bi Gulistan re, endama Tevgera Çand û Hunerê Tev-Çand, Efrîn, 2017

[773] Çavkanî li heman cihî

Wekî bersiv ji pirsa *'tevlîbûna xebatên çand û huner guhertinên çawa di jiyana jinên ciwan de çêkiriye?'* endama koordînasyona Tev-Çandê ya Hesekê, Zozan mînaka jiyana xwe dide. Wê li Helebê dixwend heta sala 2011'an ji ber şerê Helebê zanîngeh hatibûn girtin: *"Xwesteka min a pêşketin û xwendinê hebû. Lê li gorî adet û teqalîdên civakê, êdî lazim bû ez bizewicim. Wekî din hevaltî û hezkirin nedibû. Xortek di mektaba min de hebû. Pênc sal me hevdu nas kir û kêfa me ji hev du re dihat. Ez 21 salî bûm û em zewicîne. Ewilî baş bû, me ji hev du fêhm dikir û me rêza ji hev du re digirt. Lê piştre em çûn Başûr û malbata wî mudaxele jiyana me dikir.*
Ez mamoste bûm. Lê wan qebûl nedikir û zext li ser hevjînê min jî dikirin û digotin, 'Çima jina te li derve ye?' Zilamê min gelek dihat guhertin. Pevçûn, lêxistin û heqaretê dest pê kir. Wî serê min xist dîwar û porê min gişt bi kêrê rakir. Piştî vê, ez wekî kûçik girêdam û ew ji malê derket. Min xwe rizgar kir, lê derûniya min xirab bû. Min dengên cuda bihîstin. Wî ez dîn kiribûm. 15 rojan min nikaribû xew bikirama. Ji ber adet û teqalîdan min dengê xwe nedikir. Min nedixwest kesek pêbihese. Piştre, zilamê min zêrê min hemû birin û çû Ewropayê. Min krîzeke derûnî derbas kir û ez ketim nexweşxaneyê.

Piştre ez vegeriyam Rojava. Hevaleke jin ji navenda çandê hat cem min û digot, 'Zozan, tu ji tiştên te hatine serê te direvî. Lê bi revê tu jê xilas nabî. Ez dizanim dermanê te çi ye. Divê tu xwe nas bikî. Were çand û huner.' Ez çûm û min çîroka xwe bi hevalên jin yên navenda çandê re parve kir. Wan gelek alîkarî da min. Piştî salek û nîvê bi danûstandin û perwerdeya hevalên vir, min xwe û hêza xwe nas kiriye. Min dît gelek endamên din jî hene, gelek zehmetî di jiyana xwe de dîtine. Divê jin xwe ji zilamên xirab zû xilas bikin û ne girêdayî adet û teqalîdan bimînin. Ji ber ku zilamên xirab ruhê jiyanê yê jinê dikujin.' Hevalên Zozanê jî jê re dibêjin, *'Tiştên hatin serê te, ne tenê jiyana Zozanê ne. Heman tişt hatiye serê bi milyonan jinan. Heta em exlaq û çanda jiyanê neguherînin, ev tişt jî wê hîna bên serê wan."*[774]

Herçiqasî di çanda jiyanê ya hinek ferd û malbatan de guhertinên mezin çêbûbin jî, civakîbûna etîk, estetîk û çanda şoreşa jinê hê jî qels e. Di şêwaz û berhemên xebata huner û wêjeyê de teyisandina ramanên hevjiyana azad, etîka malbat û civaka demokratîk hîna kêm in. Estetîka şoreşê bi pirranî li ser çanda berxwedanê û bi bandora lehengiya şehîdan hatiye afirandin.

"Rojane em bi vî şerî dijîn. Her roj em xort û keçen xwe dispêrin axê. Gelo ji vê girantir çi heye? Her carê kezeba me û dayikên şehîdan dişewite. Dema dayikên me dilorînin, ew wateya şoreşê bi êş û xweşiya xwe tînin ziman. Jina Kurd her tiştî dide xuyakirin, him di aliyê kêfxweşiyê de him jî di aliyê qehrê de."[775]

Lewma di stran, helbest û şanoyên Rojava de para bêhtir mijarên êş û şehadetê li pêş in. Wekî din hinek berhemên şano û wêjeyê rexneyên li ser kevneşopiyên paşverû yan jî tundiya li hemberî jinê, dikin mijar. Xebatên çand û hunerî dikarin ji bo bipêşxistina felsefeya jiyanê, hêza xeyalkirinê û vekirina asoyên nû bi risteke girîng rabin. Di vê biwarê de çend rewşenbîr û nivîskarên jin li Rojava hewl didin ku xebatên şano, helbest û wêjeyê bi pêş bixin. Ew dixwazin hestên şoreşê bibêjin û îlhamê bidin guhertin û veguhertinên cewherî yên civakê. Rewşenbîrên jin ên Bakurê Sûriyê sala 2017'an Yekîtiya Jinên Rewşenbîr ava kirine. Bi xebatên xwe, ew di vî warî de jî li hemberî helwestên zayendperest û bijarte têdikoşin.

[774] Hevpeyvîn bi Zozan re, endama koordînasyona Navenda Tev-Çandê ya Hesekê, 2017

[775] Hevpeyvîn bi Diya Ciwan re, Dêrik, 2017

Leyla Saroxan di xebatên Yekîtiya Jinên Rewşenbîr de cihê xwe digire. Wê bi Şoreşa Rojava re dest bi nivîsandina metnên şanoyan kiriye û tevlî mihrîcana wêje ya jinê ya Rojava bûye. Ew nivîsandina şanonameyan wekî çalakiyeke şoreşgerî dinirxîne:

"Ez ji qalemê hez dikim. Birayê min sala 1999'an şehîd ket û di sala 2007'an de hatiye îlankirin. Dilê min gelek êşiya û min got qey dinya xira bûye. Min xwest, ez tiştekî ji bo birayê xwe bikim, ji bo wijdanê min rehet bibe. Lewma min xwest çîroka wî û ya sê hevalan bikim şano.
Piştî wê min şanoyeke civakî li ser jin û mîrasê bavê çêkir. Wexta ku bav dimire, hevjîna wî, kur û keçên wî hene. Di civaka me de jî adet e ku dayik hertim aliyê kur bigire. Dayik dibêje keçikê, malê bavê xwe nebe ji zilamê xwe re. Ev zilam nebaş derkeve. Rojekê ew keç tê berdan ji xêrê birayê tê. Lê ew deriyê xwe ji xwuşka xwe re venake. Min ev mesele di şanoyê de berfireh vekir. Keç jî li vir radibe serhildanê û dibêje, 'Birayê ku mafê min bixwe, ne birayê min e!'
Wezîfên şoreşê gelek in, şoreş wan ferz dike ser me. Ji ber vê, ez mecbûr dimînim ku gelek karan bimeşînim. Hinek kar hene kesek xwe nade ber. Wê demê em neçar in em wan jî çêbikin. Di dema pêş de ez dixwazim li ser van jinan jî şanoyekê çêbikim.
Şano rêbazekî herî xurt ji bo guhertina civakê ye. Mijarên gelekî hesas hene. Dibe ku tu wana nikarî bi civakê re minaqeşe bikî. Lê bi rêya şanoyê tu dikarî bi uslûbekî xweş peyameke xurt bigihîne civakê. Mirov vê demê li ser difikirin û pirsên nû ji xwe pirs dikin."[776]

Jinê bi şoreşê re di gelek waran de qalibên desthilatdarî û bindestiyê şikandine. Wekî din wê di milê pênasekirina etîk û estetîkê, bipêşxistina fikr û çalakiyên baş û xweş de gavên destpêkê avêtin. Ji bo jin û nexasim jinên ciwan bikarin di dorpêça moderniteya kapîtalîst, Îslama siyasî û qirkirina çandî de xwebûna xwe wekî çavkaniya jiyana rast, baş û xweşik ava bikin û biparêzin, xebatên xuluqkar pêwîst in. Nirx û girîngîpêdayîna çanda resen a dayikan bingehê xwenaskirinê û hunera şoreşê ye. Lê belê ew bi tena serê xwe kêm e. Li gorî bipêşketin û pirsgirêkên demê, daîmî lêhûrbûn û pengavên nû jî pêwîst in. Mînak, dema di xebatên çand, huner û zanistê de heman mijar bi heman şêwazê tên dubarekirin, bandor û balkeşiya van xebatan kêm dibe. Ji bo ku xebat û çalakî bikarin etîk û estetîka azadiyê di kesayet û çanda civakê de biçînin, divê ew xîtabî ruh û pêwîstiyên demê yên civakê bikin. Di sedsala 21'ê de desthilatdar amûrên teknolojî, medya û zanista pozîtîvîst hemûyan ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin da ku bikarin xirabiya xwe wekî başî, tiştên şaş wekî rast û yên kirêt wekî xweşik pêşkeş bikin. Parastina nirxên mirovahiyê û hebûna civakê li hemberî êrîşên çanda moderniteya kapîtalîzm û liberalîzmê ji her demê zêdetir jiyanî ye. Bi hişyarî, xebat û têkoşîneke afirînerî ve, jin û civak dikarin wateya jiyanê ji nû ve nas bikin, etîk û estetîka jiyanê li ser bingehê pîvanên baş, rast û xweşik bi pêş bixin.

- **Kurteencamên Lêkolînê Derbarê Etîk û Estetîkê de**

Ji nû ve avakirina çand û exlaqê jiyanê li ser rêgezên azadî û wekheviyê armanceke bingehîn a şoreşê ye. Jin û civak dikarin bi dahûrînên li ser têgehîn, felsefe û exlaqê azadiyê bandora siyaseta bişaftin û biyanîkirina ji xwezayê, ked û çanda xwe, li pey xwe bihêlin. Ev yek derfetên nû ava dike da ku pênaseyên hevbeş yên **etîk** yên wek '*exlaqê azadiyê'* û yên **estetîk** wek *'jiyana xweş'* û **jiyaneke rast** wek jiyaneke '*li ser bingehê zanista jinê, exlaq û pîvanên azadiyê'* dikarin şûna ferasetên moderniteya kapîtalîst bigirin.

Şirovekirina berhemên kevnar û nû yên çand, huner, helbest û wêjeyê dikare têgehên rast û şaş yên etîk û estetîkê zelal bike û asoyên nû veke. Gelek destan, çîrok û stranên resen nakokiyên civakî û

[776]Hevpeyvîn bi Leyla Saroxan re, Hesekê, 2017

lêgerînên evîn, jiyana xweş û azad vedibêjin. Dema ku em li van bi kûranî guhdarî dikin û wan şirove dikin, em dikarin bi êş û hesreta jinê, rewşa civakê û xedariya pergala desthilatdariyê bi pêjnên xwe hemûyan bihesin. Gelek caran lêpirsîn û nîqaşên li ser vî bingehî dikarin ji tehlîl û nirxandinên analîtîk zêdetirî zelalbûnek li ser pîvanên exlaqî û estetîk bidin avakirin. Ji bo vê, parastin û parvekirina berhemên dengbêjî û çanda devkî ya dayikan wek çavkaniyên zanista jin û civakê gelekî girîng û bi nirx e. Di nav her pêkhateyê de û li herêmên Bakur û Rojhilatê Suriyê hemûyan, jin û dapîr hene yên ku xwediyê van çavkaniyên zanebûnê ne. Li ser vî esasî tomarkirin, weşandin û nirxandina van berheman, ji bo xwegihandina têgihîn û hişmendiya azadiyê hêja ye.

Her wiha xebatên hemdemî yên ku di beşên cuda yên çand, huner û wêje de tên bipêşxistin, etîk û estetîka şoreşa jinê digihînin civakê. Stran, helbest, çîrok, şano û film dikarin nakokiyên jin û civakê eşkere bikin û rêyên çareseriyê destnîşan bikin. Li ser vê babetê, têkiliyên civakî yên stranbêj, nivîskar, şanoger û derhêneran girîng in da ku ew bikarin ruhê civakê bixwînin û biteyisînin di berhemên xwe de. Serpêhatiyên jiyanê yên gelek jinên Rojava, çavkaniyên dewlemend û balkêş ji bo vegotina etîk û estetîka şoreşa jinê dihewînin. Gelek berhemên wêjeya şoreşên cîhanê diyar kirin ku şiroveyên hunerî li ser çîrokên jiyanê dibin amûreke bi bandor ji bo zelalkirin û rûniştandina têgihînên 'xweşikbûyîn' û 'başbûyînê'.

e) Tenduristî û Ekolojî

Tenduristiya civakê bi şêwaza jiyanê ve û bi wan têkiliyên navbera mirov û xwezayê ve girêdayî ye. Di encama feraset û polîtîkayên desthilatdar de hevsengiya ekolojîk û tenduristiya civakê hatine xirakirin. Çawa xweza wekî çavkaniya kara zêde hatiye çilmisandin, welê jî tenduristiya civakê di bin fermana dewlet û sermayedaran de hatiye rizandin. Jin wekî amûra hilberîna nifûsê û karkerên erzan hatine dîtin. Civak bi giştî jî wekî leşker, karker û xercker hatine bi kar anîn da ku ew feyde û kara serdestan zêde bikin. Zanebûna jinên şîfager ya ku xwe dispêre têgihîna xwezaya zindî û têkiliyeke sembîotîk di navbera xwezayê û mirov de bi rengekî sîstematîk hatiye tinekirin. Bi vî rengî civak li hemberî nexweşiyên pergalê bê parastin hatiye hiştin û neçar maye dermanên kujerên xwe bixwe. Ev helwest bûne sedema krîza mezin a ekolojîk û tenduristiya ku di roja îro de hebûna xweza û tevahiya mirovahiyê dixe xeterê.

Abdullah Ocalan di pirtûka Sosyolojiya Azadiyê de vê rastiyê wiha terîf dike: *"Civaka nikaribe tenduristiya xwe bi îmkanên xwe biparêze, bingeh, hebûn û azadiya wê yan di tehlûkeyê de ye yan jî bi temamî ji dest hatiye dayîn."*[777] Di vî warî de armanceke Jineolojiyê ye ku zanyarî û çavkaniyên herêmî yên şîfagerî lêbikole, parve bike, feraset û şêwaza jiyana ekolojîk ji nû ve zindî bike. Bingehê jiyaneke bi etîk û estetîka azadiyê ew e ku jin û civak bikarin tenduristiya xwe û hevsengiya ekolojîk biparêzin û ji nû ve ava bikin.

Di beşên 'Jinên Şîfager' û 'Pirsgirêkên Ekolojîk û Tenduristiyê yên Civakê' yên vê pirtûkê de me agahî û şiroveyên li ser çavkaniyên çareserî û pirsgirêkên tenduristî û ekolojîk ên civaka Rojava parve kirin. Niha jî em dixwazin bala xwe bidin guhertinên ku di wan waran de bi Şoreşa Rojava re çêbûne: *Nêzîkatî û hewildanên ji bo parastina tenduristiya jin û civakê çawa ne? Di pergala xweseriya demokratîk de kîjan gav tên avêtin da ku tenduristiya civakê û hevsengiya ekolojîk ya jiyanê ji nû ve were sazkirin? Bipêşketin û kêmasiyên di vî warî de çi ne?*

[777] Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Şarestaniya Demokratîk - Pirtûka Sêyemîn*, 2011

- **Rewşa Tenduristiya Jin û Civakê**

Yek ji erkên herî girîng ên şoreşê rêxistinkirina qada tenduristîyê li gorî pêdiviyên civakê û avakirina pergaleke ekolojîk a jiyanê ye. Ji ber şert û mercên heyî di vî warî de gelek zehmetî tên kişandin. Dewleta Sûriyê bi mentiqê dagirkeriyê nêzî xwezaya Rojava û tenduristiya gel dibû. Lewma beriya şoreşê jî pirsgirêkên cidî di vî warî de rûdane. Piştî sala 2011'an şer û ambargoyên li ser herêmê jî dibûn sedema tengasiyên mezin di hêla peydakirina derman, amûr û teknolojiyên tenduristiyê de. Her wiha, di destpêka şoreşê de gelek bijîşk û pisporên tenduristiyê koçî derveyî welat kirine. Pê re beşeke şêniyên nexweş jî koçber bûne ji ber ku wan êdî nikaribû derfetên emeliyat û dermankirinê li Rojava peyda bikin.

Nexasim ji bo dermankirina nexweşiyên giran yên wek nexweşiyên dil, kanser û pandemiyên nû, derfet kêm in. Hîna jî malbatên bi zarok û xizmên astengdar yan jî bi nexweşiyên kronîk ên bedenî yan jî derûnî di peydakirina derfetên dermanbûnê û xwedîkirinê de zehmetiyan dikişînin. Her wiha ji ber sedema şer zêdetirî 20 hezar mirov birîndar bûne. Ev hejmar ji ber berdewamiya şer û dagirkeriyê û bermayiyên şer ên wekî mayînên li rê û deverên şên, her roj zêdetir dibe. Ji ber birînên ku di encama teqînan û heta bi kar anîna çêkên qedexê yên wekî fosfora spî de pêdiviyeke mezin bi dermanên taybet, emeliyat û dermankirinên pisporî derdikeve holê. Gelek birîndar jî demeke dirêj yan jî daîmî hewcedariya dermanbûnê û alîkariyê ne ji bo pêkanîna pêdeviyên jiyanî.

Her wiha şer, şehadet û koçberî dibin sedema êşên giran yên ku bandoreke neyînî li ser tenduristiya derûnî û bedenî dikin. Mînak, xebatkarên jin ên xizmeta tenduristiyê dan zanîn ku bi qederê ji sedî 70 – 80'yê jinên Kobanê re yan nerehetiyên bedenî yan jî yên nefsî hene. Li gorî nihêrînên xebatkarên tenduristiyê gelek ji wan nexweşiyan bi rewşa şer, koçberî û komkujiya Kobanê ve girêdayî ne. *"Gelek jin tên nexweşxaneya Kobanê ji ber aseb pê re çêdibe. Ew hingî diqehirîn ku hişê xwe winda dikin. Berê rewşên bi vî rengî cem me tine bûn. Lê piştî komkujiyê carna di şevekê de 5 - 6 kes tên. Hinek jinên ku hevjîn yan jî zarokê wan şehîd ketiye, krîza nefsî digirin. Ew digirîn û hinek jî xwe birîn dikin. Em vê demê derziyê lêdixin ji bo xew bike û hinekî rehet bibe."*[778]

Emîne ji navçeya Bilbilê ya Efrînê ye, piştî derketina gel ji Efrînê di Komîteya Tenduristiyê ya Jinê ya Şehbaye de kar dike. Ew pirsgirêkên tenduristiya gel li Şehabayê ji ber sedema şer û koçberiyê wiha şirove dike: *"Pirraniya miletê me ji ber zilm û zorê asebî pê re çêbûye. Derman jî kêm in. Çiqas em dixwazin alîkariya gelê xwe bikin. Lê em pê re nagihjin. Êş pirr e. Hinek xwe bi tenê dibînin û bi êş in. Hinek jî hene wekî wehş bûn, li şexsiyeta dixin. Ev jî gişt ji tesîra şer çêbû. Bandoreke giran a şer li ser zarokan çêbû. Dîsa nexweşiyek heye bi rêya peşiyan belav dibe. Çerm hemû sor dibe. Encax bi derzî û dermanan rehet dibe. 1200 şexs li vir pê ketin."*
Ji bilî vê Emîne balê dikişîne ser wê yekê ku ew ji bo parastina jiyan û tenduristiya mirovan hawirdor û derdora xwe jî ji bermahiyên şer paqij dikin: "*Derdora cihê avê jî çeteyan mayin kir. Mayinan di zarokan de diteqînin. Em paqijiya mayinan jî dikin."*[779]

Ev tenê çend dane û mînak in yên ku eşkere dikin ku pergala tenduristiyê ya Rojava di bin şert û mercên giran de bi erkên mezin re rû bi rû ye.

[778] Nîqaşên perwerdeya bi xebatkarên tenduristiyê yên jin re, Kobanê, 2017

[779] Hevpeyvîn bi endamên meclîsa jinê ya Ehrezê re, Şehba, 2019

- **Têgihîna Tenduristî û Xwezayê**

Têgihîna jin û civaka Rojava ya tenduristiyê û xwezayê li gorî kar û rêûresmên malbatê û nişteciheên wan, hinekî tê guhertin. Gelek jinên li gundewarên Rojava yan jî yên ku li gundan mezin bûne, bi rengekî xwezayî di nav çanda jiyanê de agahiyên li ser tenduristî û şîfageriyê ji dayikên xwe fêrbûne. Ew pê dizanin ku jiyana bajêr tevî dengê motoran, stres, gemara hewa, kolan û avê bandoreke neyînî li ser tenduristiya mirovan dike. Lewma, beşeke jinên ji hemû nifşan jiyana gundan tercîh dike. Lê belê di gelek aliyan de hişmendî û şêwaza jiyana modernîteyê bandora xwe li ser civaka gundan jî kir. Doktor Merîvan '*tenduristî wekî neynika jiyana te*' û *'neynika civakê ku tu tê de dijî'* dinirxîne. Ew çavderiyên xwe li ser rewş û têgihîna tenduristiya jinên Rojava wiha şirove dike:

"Êş û nexweşiyên jinên bajêr û yên gundan nêzî hev in. Di gelek jin, jinên bi temenê ciwan de jî pirsgirêkên daxta bilind [tansîyon] yan jî pirsgirêkên mîde û rivî hene. Ev nexweşî girêdayî çanda xwarinê pêş dikevin. Xwarina şor, çay, qehwe yan jî xwarinên hazir ên îndustriyel wekî mortadella, konserve yan jî cîbs bandoreke neyînî li ser daxta xwînê û hezimê dikin. Dîsa gelek jin cixara dikişînin, diqeherin yan jî ji ber rewşa malbatê yan jî rewşa şer û nezelaliyên pêşerojê bi stres dijîn. Ev hemû dibin sedemên daxta bilind.

Gelek jin bi piştêşê yan jî bi êşa di tevahî laşê xwe de dijîn. Sedemên wê jî girêdayî rista civakî ya jinê ne. Gelek karên mal û zîraetê, anîna zarokan, rakirina tiştên giran, şiklê rabûn û rûniştinê yan jî zêde rûniştin zorî laşê jinê dikin. Jin bi pirranî kêm dimeşin û werzîşê jî nakin. Stres yan jî êşên derûnî jî dibin sedem ku tevahiya laşê mirov gelekî diêşe bêyî ku sedemeke anatomîk yan jî fîziyolojîk hebe. Dema mehikê jî gelek jin zêde diêşin ji ber vê wekî nexweşî yan jî rewşeke şermê dihesibînin.

Heta kesek nêşe, tenduristî di jiyana mirovan de pirr nabe mijar. Vê demê ew diçin cem doktor yan jî nexweşxaneyê û li bendê ne ku ew dermanên kîmyewî bigirin ji bo sax bibin. Nêzîkatiya doktor û nexweşxaneyan jî bi vî rengî ye. Ji bo her tiştî heb û derzî tên dayîn. Ji bo her tiştî, bêyî ku îltîhab hebe jî antîbiyotîk tên dayîn. Antîbiyotîk jî bandoreke xirab li ser pergala hezmê dikin û piştî demekê feydeya wê namîne. Jinên gundan jî dema diçin cem doktoran li benda dermanên kimyewî ne. Lê nêzikatiya wan a ji tenduristî û dermanên xwezayî re dîsa cuda ye. Jinên gundan bi pirranî li dermanên xwezayî vekirî ne, ji xwe re nêzîk dibînin. Mixabin di nifşê dayikên bi temenê 40 salî û ciwantir de bi pirranî zanebûna dermanên xwezayî kêm bûye. Lê dermanên giyayî û tedawiya xwezayî bala wan dikişîne. Ew dixwazin dîsa fêrî bibin û vekirî ne. Ji ber jinên gundan bi ax û xwezayê re di têkiliyê de ne, ew zûtir dikarin wateyê bidinê û xwe nêz dikin. Ew li tenduristiyê wekî manewiyateke baş dinêrin û têkiliya di navbera xwezayê û tenduristiyê de ava dikin. Careke din ew rêbazên dayik û dapîran tînin bîra xwe. Dema ku em diçin gundan, jin ji me gelek pirsên girêdayî feydeya giya û dermanên xwezayî dipirsin. Ew van rêbazan meraq dikin û wekî çareseriyê dibînin. Gelek jinên welatparêz, jinên ku pêşengtiya şoreşê dikin jî bi zanebûna polîtîk têkiliya di navbera siyaset, civak û tenduristiyê de dinirxînin û bi vê nêzîkatiyê bala xwe didin tiba xwezayî."[780]

Şehîd Lêgerîn (Alîna Sanchez) ji Arjantînê yek ji jinên şoreşger bû ku bi fikr û keda xwe pêşengiya avakirina pergala tenduristiya Rojava dikir. Wê 'linihêrîna tenduristiya mirovan wekî têkoşîna li dijî pergala ku mirovan nexweş dike' pênase dikir û wiha jî pêk dianî. Bi şoreşê re

[780] Hevpeyvîn bi Dr. Merîvan re, gundê Jinwar, 2020

Kongra Star, Akademiya Jineolojiyê, Desteyên Tenduristî û Jinê li hinek cîhan xebatên perwerdeyê û projeyên nû ji bo tenduristiya jin û civakê dane destpêkirin. Yek ji armancên wan hewldanan lipeyxwehiştina wê têgihîna teng a tenduristiyê ye, ya ku tenê bi semptomên nexweşiyan re elaqedar dibe. Li şûna bi kar anîna dermanên ku semptomekê baş dikin, lê belê di heman demê de deh nexweşiyên din çêkin, pêwîst e ku têgihiştina yekpare ya tenduristiyê hîn zêdetir bi pêş bikeve.

Tenduristiya derûnî û bedenî bi têgihîn û şêwaza jiyanê ve girêdayî ye. Lewma parvekirina zanînê û perwerdeyên civakî li ser mijarên wekî parastina hawîrdor û çavkaniyên xwezayê, xwarin û xwedîkirina baş, girîngiya werzîş û tevgerê, anatomiya jinê û zayîna xwezayî, danasandina dermanên bifeyde û yên xirab girîng in. Dema ku jin xwe nas bikin û tenduristiya xwe di têkiliyên xwe yên bi xweza û civakê re pênase bikin, ew ê êdî nehêlin ku li bedena wan wekî tişte were meyzandin. Ew ê êdî nema qebûl bikin ku bedena wan bê parçekirin yan jî bedena wan ji ruh û fikrê wê bê veqetandin. Bi vê armancê jinan xebatên nû dane destpêkirin da ku bi rengekî xweser dermanên xwe yên baş peyda bikin, tenduristiya xwe û ya civakê biparêzin. Çiqasî di têkiliyên navbera jin û zilam, navbera xweza û civakê de empatî û rêzdarî bi pêş bikevin, ewqasî jî nexweşiyên pergala desthilatdar wê kêm bibin.

- **Bipêşxistina Tenduristiya Jin û Civakê**

Li herêmên rêveberiya xweseriya demokratîk hemûyan Meclîsên Tenduristiyê bi beşdarbûna yekîtiyên bijîşkan, xebatkarên tenduristiyê û endazyaran; saziyên tenduristiyê, yên ciwan û jinan; şaredarî û komînan hatine avakirin. Wekî din ji sala 2014'an ve Desteya Tenduristî û Ekolojiyê ji gel re xizmetên tenduristiyê pêşkeş dike û çavdêriya nexweşxane, dermanxane, kar û buhabûna doktor û dermanan dike. Bi vî rengî, ew hewl dide ku xebatên tenduristiyê ne bi armanca kar lê li gorî pêdiviyên civakê werin birêxistinkirin û meşandin. Li gorî kemasî û pêdiviyên ku tên tesbîtkirin, sazîbûn û projeyên nû tên bipêşxistin.

Beriya şoreşê ji ber astengiyên dewletê, malbat û aboriyê, derfetên xwendina bijîşktiyê ji bo jinên Rojava û nexasim ji bo jinên Kurd, pirr kêm bûn. Lewma hejmara doktorên jin di hemû şaxên tenduristiyê de pirr kêm e. Di sala 2016'an de li kantona Cizîrê bi gştî tenê 151 jinên bijîşk hebûn. Ji wan 52 li Qamişlo û 40 li Hesekê diman.[781] Li kantona Kobanê, sala 2017'an ti bijîşkên jin tine bûn.[782]

Jin di beşa tenduristiyê de bi pirranî weke alîgîrên bijîşkan, hemşîre yan jî xebatkar dixebitin. Ew piştî perwerdeyên tenduristî û alîkariya pêşîn, ketine nava xebatê. Beşek ji wan di komîteyên tenduristiyê yên komînan de dixebitin, yên din jî di saziyên tenduristiyê û nexweşxaneyan de hatine wazîfedarkirin. Xebatkarên tenduristiyê yên jin li Kobanê balê dikişînin ser wê yekê ku ji sedî 80 – 90'ê xebatkarên tenduristiyê jin û keç in, lê kesên di asta rêveberiyê de bi pirranî mêr in: *"Di nexweşxaneya me de sêçarek keçik dixebitin. Lê di warê naskirina îradeya jinê de em zehmetiyan dikişînin. Ji ber doktor tenê zilam in û îdareya nexweşxanê jî di destê doktoran de ye. Di rêveberiyê de pergala hevserokatiyê heye. Lê di warê biryarê de dîsa bi gotina doktor dibe. Doktor jî gelek caran hevseroka jin muxateb nagire. Gelek jin demeke dirêj di vê qadê de dixebitin, xwe îsbat kirine û karê xwe dizanin, lê ew muxateb nayên girtin."*[783]

[781] Çavkanî: Serjimara NLSR, 2016

[782] Nîqaşên perwerdeya bi xebatkarên tenduristiyê yên jin re, Kobanê, 2017

[783] Nîqaşên perwerdeya bi xebatkarên tenduristiyê yên jin re, Kobanê, 2017

Dr. Merîvan jî pêwîst dibîne ku şêwaza dermankirinê û helwesta desthilatdar a doktoran di nexweşxaneyan de were guhertin: *"Di nexweşxaneyan de asta tundiya li hemberî jinê pirr bilind e. Li wir bi pirranî zilam dixebitin û ew tenê dermanên kîmyewî didin jinan. Dema tu bi pirsgirêkeke tenduristiyê diçî nexweşxanê – li vir yan jî li cihekî din ê cîhanê - nêzikatiyên pirr sar û teknîkî hene. Pirraniya jinan bedena xwe baş nas nakin. Ji ber ew ji bedena xwe û ji xwezayê hatine qutkirin. Jin fêrbûn ku ew ê biçin cem doktor, jê re êşa xwe bêjin û doktor derman bide wan. Ew vî dermanî digirin bêyî ku bizanin çi nexweşî çima heye û di laşê wan de çi çêdibe. Doktor van tiştan ji jinan re şirove nakin. Ew zanebûna tenduristiyê nadin jinê ji bo jin girêdayî wan bimînin û xweseriya xwe di qada tenduristiyê de nikarin bi dest bixin. Lê nêzîkatiya jinê ya tenduristiyê cuda ye. Jinên di pergala tenduristiyê ya fermî de dîsa li gorî zilaman germtir, zêdetir bi empatî û însanî nêzîk dibin. Ev ferqeke girîng e."*[784]

Vekirina Akademiya Tenduristiyê ya Rojava di sala 2017'an de gaveke girîng bû ji bo vîn û rengê jinê di qada tenduristiyê de diyarker bibe. Bernameya akademiyê bi armanca rûniştandina paradigmaya civaka demokratîk, ekolojîk û azadiya jinê di warê tenduristiyê de hatiye amadekirin. Pirraniya 48 xwendekarên Akademiya Hemşîretiyê li Serêkaniyê jin bûn û 85 xwendekarên Akademiya Tenduristiyê ya Rojava li Qamişloyê jin in. Di rêveberiya akademiyê de ku bi beşdarbûna doktor û xwendekaran hatiye avakirin, jin bi rengekî çalak cihê xwe digirtin. Dîsa şaxa akademiyê ya li Kobanê, wekî akademiyeke xweser a tenduristiya jinê hatiye sazkirin. 28 xwendekarên ku li wir dixwînin, hemû jin in.

Endama Akademiya Tenduristiyê ya Rojava Dr. Abeer berê li zanîngeha Helebê dermanzanî xwendibû. Ew cudatiya di navbera pergala zanîngeha Helebê û ya Akademiya Tenduristiyê de wekî '*ferqekê navbera erd û ezman*' rave dike: "*Li Helebê doktor dihatin mijara xwe dixwendin û waneya xwe xilas dikirin. Doktor tenê beşa xwe zanibûn. Wan nikaribû bersivê li ser tiştekî din bida. Wan ji şagirtan re alîkarî nedikir, lêkolînên şagirtan çênedibûn. Li vir, him doktor alîkariyê dikin, him jî înîsiyatîfa şagirtan heye. Cihê xwendin û mayinê, jiyana me hemû bi hev re ye. 5 - 6 şagirt xwe wekî komîn bi rêxistin dikin. 10 komîn hene û berdevkên komînan jî di rêveberiyê de cih digirin. Pirtûkxanê, dermanxanê, arşîv û hemû beşên akademiyê xwendekar bi xwe dimeşînin. Her roj 9 saetan perwerde heye. Di 2 rojên heftê de êvarê semîner li ser mijarên taybet hene. Şagirt bi xwe semînerê didin û lêkolînên xwe parve dikin. Piştî 4 salên perwerdeya akademiyê, em 3 salan tevlî pratîkê dibin. Dûvre em dikarin beşên pisporiyê jî bixwînin. Em niha bernameyên beşên pisporiyê li gorî pêdiviyên gel û qada tenduristiyê amade dikin. Mînak li Rojava pisporên anestezî û laboratuwarê kêm in."*[785]

Her wiha rêveberî û şagirtên akademiyê nêzîkatiyeke zanistî esas digirin û nihêrînên zayendperestiya civakê dixin ber lêpirsînê: "*Di warê zanista tenduristiyê de em vekirî li ser her tişt diaxifîn û dîmen jî nîşan dikin. Ji bo her du zayendan em him bedena jinê him jî ya zilaman didin naskirin. Fonksiyonên organên cinsî û têkiliyên cinsî jî dibin mijarên nîqaşê. Divê em wekî şagirtên tenduristiyê fêrbûnên şermê li pey xwe bihêlin."*[786]

Endamên akademiyê ji danûstandinên bi zanîngeh û pisporên li welatên cuda re jî sûdê werdigirin. Ew ji wan re xebatên akademiyê didin nasîn û pirsên xwe li ser lêkolînên nû, nexweşî û rêbazên

[784] Hevpeyvîn bi Dr. Merîvan re, Şifajin, gundê Jinwar, 2020
[785] Hevpeyvîn bi Dr. Abeer Hassaf re, endama Akademiya Tenduristiyê ya Rojava, Qamişlo, Cilê 2019
[786] Hevpeyvîn bi endamên Akademiya Tenduristiyê ya Rojava re, Qamişlo, Cilê 2019

dermankirinê ji wan re dişînin. Bi rêya skypê doktorên pispor ji welatên derve encamên lêkolînên xwe parve dikin û semîneran didin şagirtên akademiyê. Lê belê stûna herî girîng a akademiyê danûstandinên bi sazî û gelê Rojava re ye. Şagirtên akademiyê bi rêya semînerên li komîn û saziyan zanînên xwe bi civakê re parve dikin û di heman demê de rewşa civakê fêr dibin.

"Mînak şagirt semîneran li ser nexweşiya qanserê amade dikin. Piştre ew diçin li tax û gundan ji gel re dibêjin, parastin li hemberî qanserê çawa çêdibe. 4 - 5 şagirtên hemşîre yên ku niha di nexweşxanê de stajê [temrînê] dikin, li ser mijara qeyserî û zayîna xwezayî semînerek amade kirin. Aliyên wê yên erênî û neyînî çi ne, ew ji jinan re şirove dikin. Me ev semîner bi Kongra Star re di komînan de bi rêxistin kirin. Ev semîner pirr baş bûn. Dema me qala zerara qeyseriyê dikir, dayik jî tecrûbeyên xwe yên zayîna xwezayî û yên qeyseriyê parve dikirin. Me bandora qeyseriyê li ser bedena jinê şirove dikir. Wê gavê, jin pê dihisiyan ka kîjan pirsgirêkên wan ên tenduristiyê çavkaniya xwe ji zayîna qeyseriyê digirin. Mînak, wan nizanibû ku ji ber qeyseriyê şîrê dayikê kêm dibe û tenduristiya zarokan lawaz dibe. Jin bi van semîneran gelek kêyfxweş bûn û pirsên xwe dipirsîn. Ew îqna dibûn ku li şûna ew hemû jiyana xwe bi êşa qeyseriyê bikişînin, êşa zayîna xwezayî ya 3 saetan kêmtir e.

Em semîneran li gorî daxwaza sazî û komînan amade dikin. Pêdivî bi semînerên alîkariya yekemîn hebû, me ew didan. Îsal jî li ser kansera rehmê xwestibûn. Şagirtan semîner amade kirin û dan. Em diçin gundan jî. Em gel, mal bi mal ziyaret dikin ji bo em rewşa tenduristiyê fêhm bikin û rêyên çareseriyê bi wan re nîqaş bikin. Mînak şagirtên hemşîrê çûn gundekî ku ava wan tine bû. Me têkiliyên wan bi şaredariyê re çêkirin û wan karibû pirsgirêka xwe çareser bikin. Em semînerên li ser giyayên şîfager jî didin. Şêniyên gund hemû kom dibûn û beşdar dibûn."[787]

Bername û xebatên akademiyê nexasim girîngiyê dide parastin û nûjenkirina zanînên tiba xwezayî. Pê re hewldan hene da ku doktor û civak girîngiyê bidin vê zanînê. Endamên akademiyê balê dikişînin ser girîngiya wê yeke ku civak hêza xwe nas bike û şêwaza xwe ya jiyanê biguhere:
"Hêza cewherî esasgirtin jî tiştek e ku em di vê akademiyê de fêrî dibin. Tenduristiya xwezayî ne tenê beşek e. 80 cureyên wê hene. Fizîoterapî jî beşeke vê ye. Di hemû dersên xwe yên teoriyê de em rêbazên tiba xwezayî jî didin. 90 saetên dersa tiba xwezayî bi taybet jî di bernameya me de hene. Di nav de [dersa] zanîna giyayên şîfagerî jî tê dayîn. Teorî û pratîk di beşa dermanzanî de di sala 3'yemîn de jî heye. Ne tenê teknîk, zêhniyet jî girîng e ji bo mirov him rêbazên xwezayî bi kar bînin, him jî xwezayê biparêzin. Ji ber ku em ruhê vê di civakê de didin avakirin, em dîrok û çanda tenduristiya civakê didin naskirin. Em civak û doktor hişyar dikin ji bo ku li şûna dermanên kimyewî giya û tiştên xwezayî tercîh bikin.

Komeke me li ser zanîna giya li gundan dixebite. Têkiliyên malbatan bi xwezayê re hebûn. Em bi rengekî xwezayî gelek tişt û dermanên giyayan ji dayikên xwe fêrbûnê. Dema ku tu bi xwe jî bi kar tînî, tu bi wan tiştan dizanî. Gava ku şagirt niha careke din dikevin nav de, hezkirineke cuda çêdibe. Di pirtûkên me de jî waneyên li ser desthilatdarî û tenduristiyê û li ser tenduristiya xwezayî hene. Agahiyên dayikan li vir hemû hene. Em dinirxînin ji kîjan pêşketinên teknîkî em dikarin feydeyê bigirin û kîjan mijaran em dikarin bi zanebûna xwe ya li ser xwezayê çareser bikin. Li ser esasê ku em rêbazên xwezayî zêdetir didin naskirin û bi kar tînin, em dinirxînin ka kîjan amûr ji bo çi lazim in."[788]

[787] Çavkanî li heman cihî

[788] Çavkanî li heman cihî

Ji bilî xebatên akademiyê Desteya Tenduristiyê, Kongra Star û Heyva Sor jî hewl didin ku pergala tenduristiya jin û civakê di komînên tax û gundan de bi pêş bixin. Mînak ji bo jinên ducanî li komînên bajar û gundan perwerde û miayene tên birêxistinkirin da ku zarok bi awayekî tenduristî werin dinyayê. Wekî din bi rêya serdanên malan, agahiyên li ser tenduristî, plansaziya malbatê, pêşîgirtina li ducanîbûnê û xeterên zewaca bi xizmên nêz re tên parvekirin. Tevî ku ji bo jin bipêşketinên di warê derfetên perwerde û dermanbûnê de çêbûne, hîna kêm in. Bi taybetî jinên li gundan û yên xizan di rewşên acîl û nexweşiyên giran de di peydakirina muamele, derman û emeliyatên pêwîst de zehmetiyê dikişînin.

- **Şîfageriya Jinê**

Wekî pêngaveke ji bo bipêşxistina xizmet û xebatê, şîfageriya jinê li gundewaran di Adara 2020'an de nexweşxaneya 'Şîfajin' li gundê Jinwarê hatiye vekirin. Ji bilî meşandina cihê venêrîn û dermankirinê koma xebatkarên Şîfajinê li gundên derdor jî semînerên li ser tenduristî, tiba xwezayî û şîfageriyê dide. Damezrînerên Şîfajinê girîngiya projeya xwe wiha şirove dikin:

"Jin tên cem me, behsa êşa xwe dikin û alîkariyê dixwazin. Em jî ji wan re sedema vê êşê û çareseriya vê şirove dikin. Lê me dît ku pirraniya jinan pirr bala xwe nadinê. Ew bixwe tiştekî napirsin. Heçko ev mijar wan elaqedar nake. Ji ber ku ew fêrbûne ku doktor tenê heb yan jî derziyê bide wan. Di xebatên Şîfajin de em dixwazin vê nêzîkatiya bermaberî jinê bidin guhertin. Ji bo me girîng e ka em çawa bi baldarî û bi çi şêwazê nêzîkî jinê dibin. Em êşa jinan tenê di cihekî de nabînin. Em pirsên din jî dipirsin, çavderiyê li jinan dikin. Bi vî awayî, em hewl didin bi her jinê re têkiliyeke însanî ava bikin. Elaqedarbûn û parvekirina agahiyan bi jinan re wekî perwerdeyê ye.

Em dixwazin ku jin bedena xwe nasbikin û fêhm bikin. Girîng e ku ew bixwe bikarin his bikin, çavderiyê bikin û fêhm bikin di bedena wan de çi çêdibe. Li gorî vê, em rêyên cuda yên çareseriyê destnîşan dikin da ku ew bixwe bikarin rêya çareseriyê hilbijêrin. Em derfetên dermanên kîmyewî û yên dermankirina xwezayî didin naskirin. Cihê tenduristiya jinê ji nexweşxaneyên din pirr cuda ye. Li vir em bi germayî û cewherê jinê nêzîkî hev du dibin. Wîha jin cesaretê digirin û pirsan wiha dipirsin ku ew nikarin li nexweşxaneyan bipirsin, yên wekî zîkêş, pirsgirêkên îdrar û mehikê. Dema ku tu bi mirovekê re elaqedar dibî, divê tu tevahiya jiyana wê li ber çav bigirî. Têrê nake tu tenê wî cihî bibînî ku diêşe û derman bidî wê kesê. Pêwîst e ku tu li civakê jî meyze bikî.

Gava ku jin ferq dikin kesek li wan guhdarî dike, gotinên wan cidî digire û zanîna xwe parve bike, ew miqabilê vê, cudahiyên pergala zayendperestiya civakê jî ferq dike. Em derfetê didinê ku jin bikarin pirsgirêkên xwe yên din, wekî yên malbatî jî parve bikin. Ji ber ku ev pirsgirêk gelek caran dibin sedema nexweşiyê jî."[789]

Tenê du hefteyan piştî vekirina fermî ya nexweşxaneya Şîfajinê alaqeyeke mezin çêbûye. Doktor û xebatkarên Şîfajinê jî fersendên ku bi xebatê tenduristiya jinê re derdikevin holê, wiha dinirxînin:

"Em pê hisiyan ku Şîfajin dikare bi risteke girîng ji bo avakirina têkilî û yekîtiya jinan rabe. Jinên Ereb, Kurd û ji netewên cuda bi rêya tenduristiyê tên cem hev. Dema ku em diçin gundan û li ser tenduristiya xwe diaxifiyan yan jî em li mişifê Şîfajinê kom dibin û bi hev du re alîkar dibin, ez hîs dikim parvekirin û têkiliyên ji dil pêş dikevin. Zilam yan jî sînorên netewan vê demê bandor li ser têkilî û danûstandinên me nakin.

[789] Hevpeyvîn bi Dr. Merîvan re, Şifajin, gundê Jinwar, 2020

Em tenduristiya xwezayî wekî vebijêrkeke baş didin naskirin. Her wiha dema em diçin gundan û li jinan guhdarî dikin, em agahiyên nû li ser rêbazên tedawiyên xwezayî, fêr dibin. Em dixwazin wan kom bikin, binivîsin û parve bikin. Di çarçoveya Jineolojiyê de em wana nîqaş dikin ji bo em bikarin vê zanebûnê ji bo pêşxistina zanista jinê di beşa tenduristiyê de bi kar bînin. Xebatê lêkolînê bi perspektîfa azadiya jinê wê pêşketinên girîng çêbikin."[790]

- **Karê Tenduristiyê wekî Rêbaza Parastinê**

Di şertên şoreşê de jin li aliyekî xwe, zanebûn û birêxistinbûna jinê ji bo jiyaneke bi tenduristî bi pêş dixin, û li aliyê din jî jinên di warê tenduristiyê de jî di hemle û şerên li dijî DAIŞ'ê û dagirkeriya dewleta Tirk hemûyan de bi risteke pêşeng rabûne. Gelekan ji wan jiyana xwe feda kiriye da ku birîndaran xilas bikin.

Muna Xelîl beriya şoreşê karê alîkariya bijîşkan xwendibû lê nikaribû di pîşeyê xwe de kar kiriba. Bi pêngava şoreşê re wekî endama Meclîsa Tenduristiyê ya Herêma Cizîrê wê di birêxistinkirina xizmeta tenduristiyê û alîkariya lezgîn de cihê xwe girt: *"Dema DAIŞ'ê êrîşê gelê Şengalê kir û ew koçber bûn, em di roja ewilî de bi ambulansa Heyva Sor tevî doktoran wekî koma tenduristiyê ji Amûdê çûn. Saet 11'ê nîvro em gihiştin. YPJ û YPG'ê ji me re rê vekir. Gel gelekî ditirsiya. Tirsa DAIŞ'ê ket dilê wan. Jin, zarok ji tîna û germayê di halekî perîşan de bûn. Binê lingê wan şewitî bû. Me ew derman dikirin. Hinek kes dîn bûn ji êşa ku dîtine. Rewşa wan pirr giran bû. Me ew gihandin nexweşxaneya Dêrikê.*

Bi dorveger em 2 rojan diman û 2 rojan jî me îsrehet dikir. Grûbek din a tenduristiyê ji bo 2 rojan dihat û me dîsa dorê digirt. 3 caran em çûn heta me gel hemû gihand aliyê Dêrikê. Di şerên Hesekê, Serêkaniyê û Til Temirê de jî em bi ambulansê diçûn. Me birîndar radikirin û gelê koçber di dibistanan de bi cih dikir. Birînên nefsî hîna gelek hene. Lê hinek malbat jî li hundirê bajêr diman û digotin, 'Em ê çawa herin? Hîn zarokên me di cebhê de şer dikin.' Me nikaribû wan îqna bikin. Heger berê şoreşê kesekê ji min re gotiba tu yê rojekê wan karan bikî, min bawer nedikir. Şoreşa jinê roj bi roj di her aliyî de bi pêş dikeve."[791]

Şagirtên Akademiya Tenduristiya Rojava, jiyana ekolojîk wekî rêbazeke xweparastinê pênase dikin. Lewma ew di perwerdeyên xwe de li ser şêwaza jiyana civak û malbatê jî disekînin: *"Em hişyarbûnê didin, beriya ku nexweş bikeve mirov dikare xwe çawa biparêze. Mînak, mijarên qeyseriyê, xirabiya dermanan, têkiliyên bi xwezayê re em ji gelê li gund û taxan re şirove dikin. Dema zanebûna mirovan hebe, ew dikarin xwe ji tiştên bi zerar biparêzin. Em perwerdeyên li ser şêwaza jiyanê, paqijî, bandora xwarin û vexwarinê û girîngiya moralê jiyanê jî didin. Ev hemû beşên xweparastina mirov in. Jiyana ekolojîk, rêbaza xweparastinê ye."*[792]

Ji bo mirovên nexweş ji barên madî û manewî yên koçberiya ber bi derveyî welat ve bên parastin, Desteya Tenduristî û Ekolojiyê ya Rêveberiya Xweser van salên dawî hewl dide ku derfetên nû yên dermankirinê ava bike. Mînak di sala 2019'an de Nexweşxaneya Çav û Dil li bajarê Qamişlo hatiye vekirin û kongreyeke pisporiyê li ser nexweşiyên dil hatiye lidarxistin. Di mehên destpêkê yên piştî vekirina vê nexweşxaneyê de jiyana bi dehan mirovên bi nexweşiyên dil, hatiye xilaskirin. Tevî ku di dîtina doktorên pispor, derman û amûrên taybet de zehmetî hene, projeyên

[790] Çavkanî li heman cihî

[791] Hevpeyvîn bi Muna Xelîl re, Amûdê, 2017

[792] Hevpeyvîn bi endamên Akademiya Tenduristiyê ya Rojava re, Qamişlo, Cilê 2019

wiha jî gavên girîng in ji bo bersivdayîna pirsgirêkên tenduristiyê yên gelê Rojava.

Yek ji hewldanên girîng ji bo parastina hevsengiya ekolojîk û tenduristiya civakê jî peyda kirin û sazkirina amûrên ji bo bikar anîna enerjiya rojê. Di wan ceribandinan de ku li cihên cuda yên Rojava hatine kirin, encamên erênî bi dest ketine. Ev yek girîng e ji ber ku dûmana motor û sobayên mazotê, dibe sedema gelek nexweşiyên pişik û nefesê. Dîsa dengê motoran jî stresê çêdike. Heger amûr û zanebûna pêwîst werin peydakirin, beşeke mezin a pêdiviyên kehrebeyê yên civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi rêya enerjiya rojê dikarin werin peydakirin. Bi vî rengî bipêşketinên di warê parastina xweza û tenduristiyê de wê çêbin.

- **Kurteencamên Lêkolînê Derbarê Tenduristî û Ekolojî de**

Bi avakirina pergala xweseriya demokratîk re hewldan û bipêşketinên girîng ji bo bipêşxistina têgihîn û xebatên tenduristiyê çêbûne. Lê belê, li gorî pêdiviyên civakê hîna lawazî û kêmasî hene. Ji bo helwesta moderniteya kapîtalîst a ku xweza, beden û tenduristiya mirovî wekî amûreke bazirganiyê bi kar tîne di civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê de li paş bê hiştin, bi taybetî birêxistinbûna civakê, xebat û perwerdeyên tenduristî di komînên tax û gundan de xwedî wateyeke stratejîk in. Bi parvekirina zanîna jiyana ekolojîk, tenduristiya bedenî û nefsî, her jin û her kes dikare bi ristekê rabe da ku tenduristiya civakê were parastin û xurtkirin.

Li gorî çavderî û encamên nîqaşê yên bi jinên kedkar ên qada tenduristiyê re, em bi taybetî girîng dibînin ku bernameyên taybet werin amade kirin da ku jin bedena xwe baş nas bike û zêdetir nirx bide tenduristiya xwe. Wekî din bi giştî di nav civakê de divê hişyarbûn û zanebûn li ser tenduristiya nefsî were bipêşxistin. Şer, şidet û koçberî gelek caran bibin sedema nexweşiyên nefsî û bedenî. Gelek mirov êşên xwe dixin bin hişê xwe, da ku ew bikarin jiyana xwe bidomînin. Di lêkolînên li ser trawmayên giran de jibîrkirin ango bertekên cuda yên weke rêbazên xweparastinê jî tên şirovekirin. Lê dema firsendên parvekirin û tehlîlkirina van êşan çênabin, ew dikarin bibin sedema pirsgirêkên cuda yên demdirêj jî. Di vê mijarê de girîng e ku jin êşên xwe ne wekî 'qeder', 'eyb' yan jî 'pirsgirêkên şexsî' lê girêdayî pergala desthilatdariyê şirove bikin. Dema ku jin armanca dagirker û tecawizkaran fêhm bikin ew pêdihisin ku ne ew bi tenê vê êşê dikişînin. Hingê gelek caran jin dikarin rê û rêbazên berxwedanê jî bibînin û hevgirtinê bi jinên din re ava bikin.

Nêzîkatiyên derûnzaniya pozîtîvîst para bêhtir jinên ku bûyerên trawmatîk hatine serê wan wekî 'qurban' ango 'mexdûr' dinirxînin û di bin navê 'xwerehetkirinê' de ji civakê qut dikin. Di vî warî de endamên Kongra Star li herêmên Kobanê û Şehba jî bal kişandin ser bandorên neyînî yên van nêzîkatiyan yên ku hinek proje û xebatkarên rêxistinên ji welatên derve li ser derûniya jin û civakê ava kirine. Qutkirina mirov ji civakê û teşwîqkirina ferdîtiyê gelek caran krîzên derûnî kûrtir kirine. Li şûna vê, girîng e ku jin bikarin sedemên krîzê û trawmayan rast fêhm bikin û rêbazên ji bo xurtkirina vîn û bixwebaweriya xwe peyda bikin. Jinên Efrînê ku ji ber dagirkeriya dewleta Tirk koçî Şehbayê kirine jî vê yekê piştrast dikin: *"Di milê nefsî de jin ne rehet in. Ew dibêjin 'qey ez nexweşim'. Lê nexweşiya jinan nefsî ye. Ji derveyî vê tenduristiya jinan baş e. Dema jin dikeve nav karekî, ew nexweşiya xwe jî ji bîr dike. Ji bo vê jî divê jin hertim di nav kar û civakê de bin."*[793]

Endama Komiteya Tenduristiyê ya Şehbayê Emîne sebeb û dermanê nerehetiyên derûnî wiha dinirxîne: *"Mirovên ku xwe teslîmî desthilatdariyê û koletiyê dikin, bi tenê di malê de bin, ew dîn*

[793] Nîqaşa bi nûnerên Meclîsa Kongra Star a Efrînê û saziyên jinê li Kampa Berxwedanê re, Şehba, 2019

dibin. Nefsiya wan xirab dibe. Ew ser hişê xwe diherin. Jin, keç, ciwan ku xwe xwe perwerde nakin, digihînin vî halî. Lê dema ku em ji bo azadiya zarokên xwe xebat dikin û tehma xweş a azadiyê digirin, siheta me jî xweş dibe."[794]

Jiyana komînal, parvekirin û nîqaşên bi armanca hêzdayîn û çareseriyê, dermanê herî baş in li dijî krîzên derûnî. Keda berhemdar û ruhê hevbeş ê jinan çavkaniyên herî girîng ji bo avakirina hêza jiyan û têkoşînê ne. Biryara têkoşînê li dijî neheqiyan û pergala ku mirovan nexweş dike, dikare gelek nexweşiyan sax bike. Her wiha mamosteyên dibistanan jî dinirxînin, divê di perwerdeya zarokan de li malbat û dibistanan zêdetir baldarî li ser tenduristiya derûnî ya zarokan û sedemên pirsgirêkên derûnî hebe.

Zanebûna jinê li ser bedena xwe û lipeyxwehiştina feraseta şermê ya li ser jinê hatiye ferzkirin, bingehê jiyaneke bi tenduristî ye. Mînak, dema ku jin fêrî kontrola sîng û bedena xwe bibin, ew dikarin xwe li hemberî nexweşiya pençeşêrê biparêzin. Her wiha girîng e ku jin û civak li ser xeterên anîna zarokan bi qeyseriyê werin ronakkirin. Tirs û zanînên şaş di vê mijarê de bandoreke neyînî li ser tenduristiya dayik û zarokê çêdikin. Perwerdeyên tenduristî û paqijiyê li komîn û dibistanan ji bo fêrkirina şêwaza jiyana ekolojîk û bi sihet, xwedî wateyeke girîng in. Teşwîqkirina rêbazên tiba xwezayî, parastina tenduristî û xwezayê bi rêya torên medyaya civakî, bernameyên radyo û televizyonê heweseke nû di nava civakê de ava dikin.

Parastina zanebûna dayik û dapîran li ser rêbazên tiba xwezayî û giyayên derman ên herêmî gelekî girîng e. Çandina giyayên şîfager di hewş û komînan de, rast naskirin û bi kar anîna wan, gelek pêdiviyên jiyanê dabîn dike. Li ser vî bingehî, derfetên sazkirina navendên jinên şîfager yên xwecihî derdikevin holê ku bikarin bibin navnîşan û vebijêrkek ji bo pirs û pirsgirêkên tenduristiyê yên civakê. Gavên destpêkê ku di vî milî de hatine avêtin, dibin rênîşanek da ku jinên pîr û ciwan bikarin jiyana xwe bi xwezayê re têkildar bi pêş ve bibin û xwezayê wek çavkaniya tenduristiya ruh û bedenê binirxînin.

f) Aborî

Peyva aborî di zimanê Kurdî de tê wateya 'tiştê pê debar tê kirin'. Koka peyva ekonomî di zimanê Yewnanî de jî xwe dispêre 'zagona malê'. Koka van peyvan dide xuyakirin di dîroka mirovahiyê de aborî ango ekonomî wekî peydakirina pêwîstiyên jiyanê û meşandina malê hatiye fêhmkirin û pêkanîn. Jin wekî berhevkarên tov û berhemên xwezayî, wekî sazkarên jiyana mal û civakê xwedî risteke navendî bûn di xebatên aboriyê de. Aboriya jinê, bi bipêşxistina çandinî, hilberîna hevbeş û parvekirina dadperwer hatiye nasîn. Lê belê di bin pergala serweriya zilam, dewlet û sermayedaran de jin û civak ji aboriyê hatin qutkirin û ji keda xwe hatin sil û dûrkirin. Di heman demê de xweza jî hatiye talankirin û rûxandin. Armanca tevahiya şoreşên cîhanê bi dawî kirina vê pergala kedxwarî û koledariyê bû ku li ser qada aboriyê hatibû înşakirin.

Lê belê heta roja îro siyaseta qirkirin, kolekirin û biçîkirinê di warê aboriyê de yek ji pirsgirêkên sereke ye ku azadiya jinê, jiyana civakê û hevsengiya xwezayê ji holê radike. Zordariya pergala kapîtalîst, mêhtinger û baviksalariyê neçarî, dijberî û ezezîtî fêrî mirovan kirin. Ji ber tirsa ji bêkarî û birçîbûnê, karker bi koletiya bi heqdesteke kêm hatine razîkirin. Wekî din jin wekî karkerên bêheqdest li hundirê malê û bi heqdesta herî kêm li derveyî malê duqat tên tepisandin û

[794] Hevpeyvîn bi endamên meclîsa jinê ya Ehrezê re, Şehba, 2019

perçiqandin. Bi vî awayî ruhê komînal û hêza afirîner a jin û civakê hatine şikandin. Ji bo jin û civak bikarin xwe ji vê rewşa bindestiyê rizgar bikin, divê qada aboriyê wekî yek ji qadên bingehîn ên şoreşa jin û civakê werin dîtin. Gavên destpêkê lipeyxwehiştina neçarî û bipêşxistina çalakiyên komînal ji bo debarê ne.

Hişmendî û rêxistinbûna aboriya komînal û ekolojîk armanc dike ku aborî ji nû ve wekî qadeke jiyanê li ser esasê peydakirina pêdiviyên civakê, hilberîna hevbeş û parvekirina dadperwer saz bike. Di vî warî de Jineolojî lêhûrbûnên li ser têgihîna keda dayikê wekî kedeke dilxwaz û çavkaniya civakbûnê, girîng dibîne. Dema ku dewlemendiyên xwezayî wekî ax, av û enerjiyê bi şêwazeke komînal, ekolojîk û afirînerî tên xebitandin û parastin, kesek êdî mehkûmê koledarî û bircîbûnê nabe.

Ax, xweza û civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê di dîrokê de bûye mekanê şoreşa çandiniyê û gundan. Ev mecalên xêrdar in da ku di çarçoveya pergala xweseriya demokratîk de li ser bingehê komîn û kooperatîfan aboriya civakî wekî çalakiyeke demokratîk were bipêşxistin. Di çarçoveya lêkolîna sosyolojîk de me xwest nexasim fêhm bikin: *Ka Şoreşa Rojava bandoreke çawa li ser aboriya jin û civakê kir? Jin di qada aborî de bi risteke çawa radibin? Avakirina kooperatîfan gihişt kîjan astê û bi çi şêwazê tê bipêşxistin? Gelo pergala aboriya xweseriya demokratîk a Rojava ji pêdiviyên civakê re dikare bibe bersiv?*

- **Rewşa Aboriya Jin û Civakê**

Di nav salên şoreşê de di qada aboriyê de bi gelemperî aloziyên mezin rûdane. Hêzên hegemon şerê li Sûriyê bi salan dirêj û berfireh kirin da ku ew bikarin serweriya xwe li ser bazar û çavkaniyên nû misoger bikin. Her dewleta ku ket nav şerê Sûriyê, hewl dide bi rêya hêzên leşkerî, şirketên aborî û rêxistinên civakî dest werde dewlemendiyên vê axê. Gelên Sûrî jî di encama şer û koçberiyê de ji çavkaniyên xwe yên aborî hatine qutkirin. Di encama şer û pevçûnan de pirraniya bajarên wekî Kobanê, Minbic, Heleb û Reqayê di êrîşên çeteyan de û bi lêxistina balafiran hatine hilweşandin. Gund û zeviyên derdorê hatine xirakirin û mayinkirin. Wekî din ji ber êrîşên dewleta Tirk jî li aboriya çandiniyê ziyanên mezin bûne. Bi lêkirina diwarê şermê di salên 2016 – 2017'an de erda gundiyên li ser sînor hatiye dagirkirin. Ji ber gulebaranên leşkerên Tirk gelek kes nema dikarin baxçe û zeviyên xwe li bin xetê sînor biçînin. Li herêmên li bin dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê, mal û milkê gelê nişтecih hatine talan û wêrankirin. Qutkirina bi hezaran darên zeytûnê li herêma Efrînê ji aliyê hêzên dagirker ve nîşana siyaseta qirkirinê, tinekirina çavkaniyên xweza û debara jiyanê ye.

Her wiha hêzên navdewletî armanc dikin bi rêya embargo, bênirxkirina diravên Sûriyê û buhakirina Dolarê Emerîkî rejîma Beesê lawaz bikin. Bi ser de jî dewleta Tirk, hikûmeta herêma Başûrê Kurdistanê û rejîma Beesê hewl didin pêşiyê bigirin li bipêşveçûna pergala rêveberiya xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi rêya ambargo û mueyîdeyên taybet. Ev siyasetên desthildatdar ên ku li dijî aboriyê tên meşandin, beriya her tiştî rewşa aborî û jiyana gelên Sûriyê dixin xeterê.

Nexasim di salên 2011 û 2012'an de û di dema şerên rejîmê û DAIŞ'ê de gelê Rojava hemwext li dijî êrîş û birçîbûnê li ber xwe dida. Ji ber ku zivistanê mazot peyda nedibû, xelkê dolab û tiştên navmala xwe dişewitand ji bo ku xwe germ bikin. Jinên Kurd yên bajarê Hesekê dibêjin, dema ku rejîma Beesê taxên wan topbaran dikirin, ew diçûn nan ji bo zarokên xwe peyda bikin: *"Rewşa Hesekê gelekî zehmet bû. Dema teyarên rejîmê lêxistin, gelek koçberî çêbû. Em man li bajêr, bê av,*

bê nan, bê kehrebe. Çi pêwîstiyên jiyanê hebe, peyda nedibû. Em pênc rojan man bê nan. Ji bo nan diçûn aliyê nîzamê. Em tenê jin diçûn. Dema xortê me diçûn, ew digirtin ji bo eskeriyê. Em gihandin aliyê rejîmê. Ew nan didan kesên din, lê ne didan me, ne didan Kurdan. Malbat hebûn, wileh li nan di nav zibalê de digeriyan. Bi rastî miletê Hesekê berxwedaneke gelekî mezin kir."[795]

Rastiya şer û êrîşan nîşan dide ku peydakirina pêdiviyên jiyanê û ji nû ve birêxistinkirina warê aboriyê di pêvajoya Şoreşa Rojava de bi gelek astengiyan rû bi rû bûye: "*Li ser Rojava şerê aborî tê meşandin. Desthilatdar ji bo berjewendiyên xwe vî şerî dikin. Em jî şerê xwe li hemberî pergala resmalî [kapîtalîst] û hişmendiya zilamî dikin. Ji bo me aborî qadeke parastina civakê ye. Di qadên neft û ziraetê de hîna bandora xirab a siyaseta Beesê xuya dibe. Civak û xweza, mirov û ked, jin û jiyan ji hev hatine veqetandin."*[796]

Di gelek şoreşên cîhanê de gel sermaye û pîşesaziya dewletê desteser kiribû. Komarên sosyalîst bi pirranî li ser vî bingehî pergala xwe ya aboriya gel ava kirine. Lê belê, ev derfet li Rojava tine bû. Ji ber ku rejîma Beesê binesaziya aboriya Rojava hilweşandibû: *"Mehmele li Rojava ji xwe tine bûn. Hinek cihên ku hebûn jî Beesê teqandin û makînayên wan birine beriya ku ji vir derketine. Mînak dewleta Sûriyê mehmeleya trîko ya ku pembû dikir ta li Hesekê, kargeha tovan û hinek sewirmayên cêh û genimê li herêma Cizîre teqandin. Lewma me nikaribû dest deynin ser binesaziyê ku hebû.*
Pispor, doktor û kesên dewlemend bi pirranî bi şoreşê re çûn. Hinek piştre dîsa hatin. Lê girîng e mirov çiqasî bawerî û kedê bide şoreşê. Zanebûn û pisportiya me hîna kêm e. Yên ku xwendin jî nikaribûn di beşa xwe de pratîkê bikin. Zanebûna pisporî bi giştî lawaz e. Me di qada aboriyê de ji tinebûnê hebûna xwe ava kir.
Nîzam li gorî rewşa xwe ya siyasî û aborî sînor ji bo derbaskirina kelûpelan vedike yan jî digire. Tîcareteke qirêj tê meşandin. Tenê tiştên xirab derbasî herêmên me dike. Ew li pêdiviyên mirovan nafikirin. Lewma çiqas em dikarin pêdiviyên xwe bi xwe pêk bînin, ewqas jî jiyana civakê wê baştir bibe."[797]

Di salên 2017 û 2018'an de pirraniya jinan li her sê kantonên Rojava digot, rewşa aboriya civakê û ya malbata wan li gorî dema beriya şoreşê baştir bûye. Gelek kesan da zanîn ku hîna tengasî û ferqên di derfetên peydakirina pêdiviyên jiyanê de hene, lê *'kesek li Rojava ji birçîbûnê namire. Rewşa kesên ku berê gelekî xizan bûn, niha hinekî baştir bû.'* Endamên Komiteya Aboriya Jinê ya Rojava didin xuyakirin ku şer û koçberî bandoreke neyînî li ser aboriya civakê kiriye. Lê belê di encama birêxistinkirina aboriya komînal de pêşî li hilweşandinên mezin hatiye girtin: *"Ji ber şer û koçberiyê gelek kesan her tiştî xwe winda kir. Lê bi giştî rewşa aboriya gel baştir bû. Ferq di navbera xizan û dewlemend de kêmtir bû. Lê nakokî hîna berdewam dikin. Di asta aboriya jinê de jî di sê salên dawî de pêşketin çêbûne, lê kêmasî hîna hene."*[798]

Gelek malbat ji ber bihabûna kelûpelan û pêdiviyên jiyanî yên wekî fêkî, sebze, goşt û şîrê zarokan zehmetiyan dikişînin. Xwarinên yekrengî bi kêm vîtamîn, bandoreke neyînî li ser tenduristiya mirovan dike. Nexasim di hişkesaliyê de pirsgirêkên aborî derdikevin ji ber ku çandinî stûna aboriya Rojava ye. Jinên Heseke dibêjin, rewşa aboriya jinê û ya malbatan bi giştî hîna zehmet e.

[795] Hevpeyvîn bi endamên Yekîtiya Jinên Kedkar re, Hesekê, 2017

[796] Hevpeyvîn bi endamên Koordînasyona Aboriya Jinê ya Bakurê Sûriyê re, Qamişlo, 2018

[797] Çavkanî li heman cihî

[798] Hevpeyvîn bi endamên Komîteya Aboriya Jinê ya Rojava ya Kongra Starê re, Qamişlo, 2017

"Gelek malbat nikarin sebze bikirin. Li Hesekê em hemû wekhev û xizan in. Ji ber ku her kes bi rewşa şer jiya. Hesekê kantona berhem çêkirinê ye. Fabrikeyên pembû û zeytê hebûn. Rejîm gelê Kurd xizan hiştiye û her tişt ji vir bir. Ambargo jî rewşa aborî û maliyê giran dike. Niha du sal baran nehat. Vê jî zehmetî çêkir."[799]

Til Temir jî yek ji navçeyên herêma Cizîrê ye ku di sala 2017'an de hîna di encama şer de lawaziyên aborî lê hebûn: *"Pirraniya miletê Til Temirê feqîr in. Çend mal tenê yên dewlemend in. Yên dewlemend jî zarokên xwe derxistine derve. Lê yên feqîr nikarin zarokên xwe derxin ji bo pera rêbikin. Her tim yên dewlemend derdikevin. Buhabûna tiştan, milet pê diêşe ji ber ku feqîr pirr in. Hinek malbat 16 zarok û hinek jî 7 zarokên wan hene. Tu diçî cem firoşkarekî û yekî din, tenê dîwar di navbera wan de heye. Lê buhabûna wî û vî ne weke hev e. Dibêjin 'ma dolar buha bûye.' Roj bi roj tu dibînî ku buhabûna tiştan zêdetir dibe. Hinek milet dibêjin, çavê me jê şikestin."*[800]

Dîsa rexne û gazincên gel li ser kêmbûna mazot û kehrebê, kalîteya nanî û buhabûna tiştan hene. Nexasim bilindbûna buhayê Dolarî ku Emerîka li hemberî hikûmeta Şamê wekî amûreke şerê aboriyê bi kar tîne, beriya her tiştî bandoreke neyînî li ser hêza aborî ya civakê dike. Dayikên ku bi tenê zarokên xwe mezin dikin, malbatên bi gelek zarokên piçûk yan jî pîr û kalên bêxwedî herî zêde zehmetiyên aborî dibînin: *"Gelek jinên Serêkaniyê bindest û feqîr in. Gelek ji wan bi zarokên xwe re diçin çolê, diçin çinîna kemonê. Ew heta danê êvarî kar dikin ji bo bikarin zarokên xwe yên piçûk xwedî bikin. Malbatin hene, bav şehîd buyê. Dayîk bi tenê maye, zarokên we piçûk in. Barê wan dayikan pirr giran e."*[801]

Li Kobanê û li herêmên ji zordestiya DAIŞ'ê nû hatine rizgarkirin jî gelek jin hene ku bi tenê debara xwe û ya zarokên xwe dikin. Alîgira berdevka Desteya Jinê ya Kantona Kobanê, Nejme Mazlumî bal dikişîne ser wê yekê ku nexasim jî pirsgirêkên aborî yên jinên nexwende hene. Lewma Desteya Jinê ya Kobanê hewl da ku derfetên kar ji bo van jinan ava bike: *"Li Kobanê bi gişti rewşa aborî pirr lawaz e, ji ber ku kar pirr tine ye. Tenê jinên ku di sazî, mekteb û dibistanan de kar dikin wan, dikarin xwe bi rê ve bibin. Ew dikarin li ser meaşê xwe, debara xwe bikin. Lê gelek jin hene muhtacê pera ne, lê kar ji bo wan tine ye. Hinek dayik temenmezin hene, kes yan jî zarokê ku pera bidin wan, tine ne. Çend ji wan niha tên cem me û bi kêfxweşî bi me re kar dikin. Ew dibînin û hîs dikin ku ew jî dikarin tiştekî bikin û debara xwe dikin."*[802]

Jinên Til Koçerê balê dikişînin ser rista navendî ya jinê di jiyana aborî ya gundan de. Her wiha ew dibêjin, piştî rizgariya herêma Til Koçerê ji çeteyên El Nusrayê û avakirina pergala xweseriya demokratîk, jin xwedî li keda xwe derdikevin: *"Jiyana gundan ji aliyê aborî ve xweş e. Pez heye, şîr û mast tê firotin, pale û zeke hene. Xelk wiha xwe xwedî dikin. Karê gund bêhtir li ser jinan dimeşe. Zilaman pişta xwe bi keda jinan xurt kiriye, ji ber ku li gundan jin aboriya mala xwe xurt dikin. Lê li bajaran berovajiyê vê ye, zilam karê aborî dike û aboriya malê di destê zilaman de ye. Li gundan zilam rûniştîne û jin kar dikin. Jin karê malê, karê zîraetê, karê heywanan, hemû karên aboriya mala xwe û gundê xwe dikin. Niha, jin weke ku serî xwe hildane. Dema diçin paleyiyê yan çandinê, çi pereyê xwediyê erd dide, ew radikin. Jin niha ji hevjînê xwe re dibêje, 'Ev keda min e û ez pereyên xwe nadim te. Tu jî dikarî kar bikî û perê te yê te bin.' Jin bi pere xwe, azad e çi bike, çi*

[799] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Hesekê re, Hesekê, 2017

[800] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Temirê re, Til Temir, 2017

[801] Hevpeyvîn bi endamên Komiteya Aboriya Jinê ya Serêkaniyê re, Serêkaniyê, 2017

[802] Hevpeyvîn bi endamên Kooperatîfa 'Vîna Jinê' re, Kobanê, 2017

bikirre. Zilam êdî nikare jê re beje, 'Çima te kirrî? Kanî pere?' Vê demê jin ji zilaman re dibêjin, 'Heger hûn perê me bibin, em ê herin Mala Jinê û li we gilî bikin.' Wisa zilam ditirsin."[803]

Şoreşa Rojava di dorpêça şer û destwerdana pergala kapîtalîzmê de pêk tê. Bi rakirina yekdestiya dewleta Sûriyê li ser çavkaniyên aborî û avakirina pergala hilberîn û bazirganiyê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji jin û civakê re derfetên nû peyda bûne. Lê belê nakokî û şerê navbera dagirkirina aborî û xweseriya aborî, vedide li kêlî û warên jiyanê hemûyan. Derfetên kêm, berdewama şer û rewşa bêîstîqrar nahêlin ku pirsgirêkên debarê yên civakê, feraseta bêçaretî û bendewariyê rehet li paş werin hiştin. Hewldanên ji bo bipêşxistina aboriya komînal di pergala xweseriya demokratîk de heta astekê karîbûn di salên 2015 – 2019'an de pêdiviyên bingehîn ên civakê di warê aboriyê de misoger bikin. Lê belê 'Qanûna Qeyserî'[804] ya ku hikûmeta DYE'yê di 17'ê Hezîrana 2020'an de xist meriyetê, dibû sedem ku Lîreyê Sûriyê ji qîmet bikeve û kelûpel zêde buha bibin. Ev yek bûye sedema pirsgirêkên giran ên aboriya civakê.

- **Aboriya Komînal û Kooperatîfên Jinan**

Cewherê aboriya komînal di çanda jinê û gundewarên Rojava de hîna heye. Di çarçoveya xweseriya demokratîk de hewl tê dayîn ku ev çand wekî nirxekî civakî were dîtin û bi awayekî zanistî were birêxistinkirin. Bi vê armancê ji salên destpêkê yên Şoreşa Rojava ve ceribandinên avakirina komîn û kooperatîfan hatine bipêşxistin. Di nav van xebatan de jin bi risteke girîng ji bo sererastkirina ferasetê û rêxistinkirina aborî li gorî pêdiviyên jin û civakê rabûne. Di heman demê de pêdiviya bi avakirina qada aboriya xweser a jinê derket holê: *"Him ji ber şer him jî ji ber taybetmendiyên civaka feodal pêwîst bû ku jin xwe di qada aboriyê de xweser bi rêxistin bike. Gelek jin ji ber şer bi tenê mane. Divê ew mal û malbata xwe bi xwe rê ve bibin û derbara xwe bikin."*[805]

Ji sala 2014'an û bi şûn ve, gav bi gav mînakên kooperatîfên jinê pêşîn di warê çandinî û sewaldariyê de hatine damezrandin. Li ser erdên ku berê di bin serweriya dewletê de bûn, jinan kooperatîfên xwe ava kirine û tevahiya karên girêdayî çandiniye meşandine. Piştre jî kooperatîfên bazirganiyê yên wek firoşgeh û pîşesaziyên wek kargehên şîr, mast, firinên nan û xwaringeh hatine vekirin. Bi rêxistinkirina komîte, meclîs û navendên Aboriya Jinê di bin banê Kongra Star de nasname û keda jinê ji sala 2015'an ve di qada aboriyê de bêhtir berbiçav bûye.

Sê salan piştî avakirina pergala Aboriya Jinê, endamên koordînasyonê encamên xebatên xwe wiha dinirxînin: *"Em aboriya jinê di hemû milan de ji tinebûnê ava dikin. Hişmendî û amûrên wê, aliyê wê yê madî û manewî hemû ji nû ve tên avakirin. Zayendperestiya civakê û ferasetên olî, jin fetisandibûn. Ji ber vê, jin bi tirs û bê zanebûn maye. Her jina ku em tevlî xebatên aborî dikin, bi serê xwe wekî şoreşekê ye. 2015'an xebatên Aboriya Jinê dest pê kir. Di sê salan de pergala wê di hemû kanton û herêman de hatiye birêxistinkirin. Lê pratîk û tevlîbûna jinê, hîna ne di wê astê de ye wekî em dixwazin."*[806]

Kedkarên qada aborî û kooperatîfên jinê, qal dikin ku destpêkê di fêhmkirina hişmendî, armanc û

[803] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Koçerê re, Til Koçer, 2017

[804] Daxuyaniya hikumeta DYE li ser 'Qanûna Qeyserî': https://www.state.gov/caesar-syria-civilian-protection-act/

[805] Hevpeyvîn bi endamên Komiteya Aboriya Jinê ya Dêrikê re, Dêrik, 2018

[806] Hevpeyvîn bi endamên Koordînasyona Aboriya Jinê ya Bakurê Sûriyê re, Qamişlo, 2018

rêbazên aboriya komînal û kooperatîfan de zehmetî hatine kişandin. Ji ber ku jin ji qada aboriya derveyî malê hatibûn dûrxistin û kêmbûna derfetên aboriyê, wan zû bi zû berê xwe neda xebatên kooperatîfan. Di serî de gelek jinan bawer nedikir ku ew ê bikarin berpirsiyariyê rakin û aboriya xwe bimeşînin. Lewma, wan nexwest pere û keda xwe tevlî avakirina kooperatîfan bikin. Lê piştî ku jin cara yekê encama keda xwe girtine, motîvasyon û xwestek bi pêş ve çûye. Sal bi sal danehev, tecrûbe û bipêşketin xurttir bûne.

"Destpêkê me zehmetî kişand heta me 30 jin kom dikirin ên ku dixwestin bikevin xebatên kooperatîfan. Kooperatîf tê wateya ku her kes pera wekhev dide, wekhev kar dike û wekhev jê sûd werdigire. Me digot, wê her kes 30 hezar Lîre bide. Lê 30 hezar di destê jinê de tine bû. Divê ji zilamî bixwaze. Lê piştî salekê, jinê encama wê dît: 30 hezar dabû, lê 150 yan jî 200 hezar lê vegeriya. Vê bandoreke erênî li ser jin û li ser zilam jî çêkir. Vê demê jinê hêza xwe dît, pê hisiya ku dikare bi xwe bijî, bi xwe aboriya xwe ava bike û rê ve bibe. Pê re girêdana jin a zilam û dewletê ji holê radibe. Jin êdî serbixwe difikire, biryar dide û kar dike. Em bi xwe biryar didin, em çi diçînin. Ne tenê genim, em nok, nîsk, fêkî û hwd. jî diçînin. Bi vî awayî rengên jiyanê zêde dibin û em dikarin bi xwe debara xwe bikin. Vê yekê, bandora xwe li ser jiyana malê û têkiliyên navbera jin û zilam jî dikir. Êdî zilam dibînin ku jin nema neçar e ku tundiya zilam tehemûl bike."[807]

Ewilî jin ji ber pêdiviyên xwe yên madî bûne endamên kooperatîfan. Lê piştre, jinan dît ku bi xebatên hevbeş manewîyat û zanebûna wan jî bi pêş dikeve. Vê yekê bixwebaweriya jinan xurttir kiriye û rista wan di malbat û civakê de jî dayê guhertin. Jinan hev du mînak girtine û tevlî xebatê bûne. Li gelek deveran jin êdî bi serbilindî û kêfxweşî bi hev re dixebitin, biryarê didin û xebatên xwe hevbeş bi rê ve dibin. Ev bipêşketin di kesayet û sekna jinan de jî xuya dibin: *"Niha li Rimêlan ferq û cudahî navbera jinên ku kar dikin û yên kar nakin gelek xuya dike. Meşa jinê ya ku ratib distîne, cuda ye. Ew bi xwe bawer bi rê ve diçe. Belkî hûn ê bi axaftina min bikenin jî. Lê ev rastiyek e, min evna dîtiye. Meşa jinê ku tenê karê malê dike, sist e, melûl e; ya jinê ku li derve kar dike, geş dibe. Heya mêrê wan di karê malê de alîkariya wan dike."*[808]

Endamên Komiteya Aboriya Jinê ya Rojava rave dikin ku karkirina kolektîf yekîtiyê di nav jinan de ava dike. Ceribandinên wan destnîşan dikin ku bi rêya xebatên kooperatîfan hezkirin û fêhmkirin di nav jinên ji beşên cuda yên civakê de bi pêş ketiye: *"Me jinên ji malbatên xizan û dewlemend tevlî heman kooperatîfê dikirin. Hemû jî bi hev re û wekhev tê de kar dikin. Îcar jinên dewlemend fêhdî dikirin ku bi zêrê di destê xwe de biçin kar, ji ber wan rewşa jinên xizan dîtiye. Xebatên kooperatîfan ne tenê bandoreke madî çêkir, lê pêşketinên di warê yekîtî û zêhniyeta civakê de jî ava kir. Jinên ji hemû pêkhateyan bi hev re dixebitin, fêrî jiyana komînal û keda kolektîf dibin."*[809]

Nayla Hesen yek ji 10 dayikên Dêrikê ye ku di bihara 2015'an de kooperatîfa firinê 'Adar' ava kirine. Heta şoreşê tenê zilaman karê firinê dikir. Nayla bi serfirazî qala serpêhatî û karê xwe dike: *"Destpêkê zilam li dijî vê derketin, lê piştre qebûl kirin ji ber ku em wekî jin tenê dixebitin. Niha li cihên din jin û zilam bi hev re jî kar dikin. Lê heger ev şoreş çênebûya, zilamê me nedihiştin em kar bikin. Hemû karê firinê, em bixwe çêdikin. Serê sibê saet 5'an em tên hevîrê xwe çêdikin, nanê xwe çêdikin û difiroşin heta xilas bibe. Carna em heta saet 2'yê piştî nîvro dimînin. Em hemû bi*

[807] Hevpeyvîn bi endamên Komîteya Aboriya Jinê ya Rojava ya Kongra Starê re, Qamişlo, 2017

[808] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Rimêlanê re, Rimêlan, 2017

[809] Hevpeyvîn bi endamên Komîteya Aboriya Jinê ya Rojava ya Kongra Starê re, Qamişlo, 2017

hev du re karê xwe bi kêfxweşî çêdikin. Serê heyvê em civîna xwe çêdikin û pera hemûyan didin ser hev. Em pera ji bo deyn û mesrefên karê xwe jê derdixin û pereyê ku dimîne di nav xwe de parve dikin."[810]

- **Yekemîn Konferansa Aboriya Jinê ya Bakurê Sûriyê**

Piştî ceribandinên kooperatîfên jinê li herêmên cuda, pêdiviya nîqaşên li ser polîtîkaya jinê ya aborî û biryarên hevbeş derket holê. Bi vê armancê sala 2017'an Yekemîn Konferansa Aboriya Jinê ya Bakurê Sûriyê bi beşdarbûna 150 delegeyan hatiye lidarxistin. Di nîqaşan de girîngiya sûdwergirtina ji tercrûbeyên neyînî û erênî, û parvekirina zanînên pisporî hatiye destnîşankirin. Bi armanca bipêşxistina projeyên wekî kooperatîfên perwerde û tenduristiyê li ser bingehê zanistê, biryara avakirina navendeke lêkolînê hatiye dayîn. Dema peyamên kooperatîfên jinê yên ji Brezîlya, Kolombiya û Katalanyayê hatin xwendin, delegeyên konferansê pê hisiyan ku karê wan him ji bo civaka Bakurê Sûriyê him jî ji bo jinên cîhanê xwedî wateyeke girîng e: *"Peyamên wan jinan hêz û hêvî dane me. Peyva 'kooperatîf' di serî de ji gelê me re xerîb dihat. Me nîqaş dikir 'gelo em ê peyveke cuda bi kar bînin?' Lê me dît, em jî berdewama keda gel û jinên cîhanê ne, yên ku li dijî kapîtalîzm û desthilatdariya zilam rabûne û kooperatîf ava kirine. Di gelek cihên cîhanê de komîn û kooperatîfên jinê hene. Divê em werin cem hev, têkiliyên xwe daîmî bikin. Her nihêrîneke nû me dewlemendtir dike."*[811]

Her wiha di konferansê de şêwaz û pîvanên bingehîn ên damezrandina kooperatîfên jinê jî hatine zelalkirin: *"Armanca me ev e ku civak bikare pêdiviyên xwe bi xwe pêk bîne bêyî ku girêdayî yan jî hewceyî kesekî be. Civak bi hêza xwe ya civakbûnê ji xwe re alîkar dibe."*[812]

- **Pergal û Ruhê Kooperatîfên Jinê**

Jin li gorî pêdiviyên xwe pêşniyazên xwe pêşkeşî lijneya aboriyê ya komînê dikin. Bi awayekî giştî divê ji bo damezrandina kooperatîfê herî kêm heft kes hebin. Ew projeya xwe bi navendên Aboriya Jinê yên herêman re jî parve dikin. Di encama lêkolîn û nîqaşên bi komîn û meclîsa Kongra Star re, pêşniyar tên pejirandin. Endamên kooperatîfê hemû wekhev bi pareke pera, keda xwe û mafê beşdarbûna biryaran, tevlî xebatên kooperatîfê dibin. Endamên nû tevlî perwerdeya li ser armanc, rêbaz û karê kooperatîfan dibin. Kooperatîf bi xwe di komînan de tên avakirin û şopandin. Di 6 mehên destpêkê de heta kooperatîfeke nû li ser lingê xwe bisekine Navendên Aboriya Jinê alîkariya madî didin. Dema ku karê kooperatîfê dimeşe, ew pereyên alîkariyê beş bi beş dîsa li Navenda Aboriya Jinê vedigerînin.

Endamên Koordinasyona Aboriya Jinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê rêgez û rêbazên kooperatîfan wiha şirove dikin: *"Em naxwazin ku jin bi heman ferasetê, wekî zilam aboriyê bimeşîne û bikeve şûna wî. Em pergaleke nû ava dikin. Kooperatîf jî li gorî taybetmendî û pêdiviyên herêman tên damezrandin. Dema ku mînakek baş pêş dikeve, ev baweriyê dide ji bo tevlîbûna jinan û ji bo projeyên nû. Rêgezên kooperatîfan wekî pîvanên exlaqî û yên xebatê hatine zelalkirin. Lê ew ne qalib in. Mînak, tê gotin ku 'divê her endam him sermaya xwe him jî keda xwe tevlî bike'. Lê hinek*

[810] Hevpeyvîn bi endamên Kooperatîfa Firinê 'Adar' re, Dêrik, 2018

[811] Hevpeyvîn bi endamên Komiteya Aboriya Jinê ya Hesekê re, Hesekê, 2018

[812] Hevpeyvîn bi Meyaser Mehmut re, berdevka navenda Aboriya Jinê ya Dêrikê, Dêrik, 2018

jinên xizan hene, pere di destê wan de tine ye. Ew destpêkê tenê dikarin bi keda xwe tevlî bibin. Piştre dema derfetên wan çêbûn, ew behra xwe dixin sindoqê."[813]

Kedkarên Aboriya Jinê balê dikişînin ser girîngiya pîvanên wekhevî û edaletê: *"Em alîkariyê didin kesên xizan ji bo bikarin di kooperatîfan de cih bigirin. Feraseta edaletê em dixwazin bidin rûniştandin ji bo tebeqeyên feqîr û xizan wê rabibin. Edalet çawa tê avakirin? Kesek ne xwediyê kar e û kesek ne karker e. Cih û amûrên hilberînê yên kooperatîfê ne. Di pergala Kapîtalîzmê de karker kar dikin û xwediyê kar dewlemend bide. Lê di kooperatîfan de têkiliya karker û xwediyê kar ji holê radibe. Her kes wekhev pera dide, wekhev kar dike û wekhev berhema keda kolektîf distîne."*[814]

Her wiha endamên Navenda Aboriya Jinê girîng dibînin ku di qada aborî de li pêşiya nêzîkatiyên burokratîk û şêwaza miwaziftiyê were girtin. Bi vî awayî ew di xebatê xwe de li dijî zêhniyeta kapîtalîzmê, ya nîzama Beesê û ya desthilatdariya zilam têdikoşin. Bi bihurîna ji van ferasetan, ew gav bi gav feraseta aboriya komînal di xebatên xwe û civakê de didin rûniştandin: *"Berê jinê encax wekî miwazif kar dikir. Heta roja îro em êşa zêhniyeta milkiyeta xas [taybet] dikişînin. Ji ber civak wisa hatiye elimandin. Bayê Kapîtalîzmê gihişt Sûriyê. Em bi feraseta 'bila ev seyara tenê ya min be, ne ya komekê be' têkoşîn dikin. Çima em parve nakin? Lê hêdî hêdî guhertin çêdibin. Niha nîvê jinan kar dikin. Berê pirr kêm bû. Jin fêrî nebûbû ku ew bi serê xwe xebatekê dest pê dike. Lê dema ku piştek wekî sazî yan jî komeke mirov li pişta wê hebe, ew êdî serkêşiyê dike."*[815]

"Em aboriya xwe di nav mercên şer de ava dikin. Ji ber vê meteloka me ev e: 'Dema ku tiştek ji te re lazim be, bi destê xwe çêbike!' Divê em li benda kesekî nemînin, lê bixwe çêbikin. Gelê Rojava gelekî şiyar e. Di hêlê siyasî de dinirxîne û dizane ku ti hêza derve di pişta wî de tine ye. Em li kooperatîfan jî tenê wekî pera meyze nakin. Girîng ew e ku jin û civak dikarin pêş bikevin. Kêmasî jî çêdibin, lê baweriya me naşkîne. Bi xuliqkarî em hewl didin van kêmasiyan derbas bikin. Divê em parastina aboriya xwe bikin, da ku azadiya jinê hê jî pêş bikeve û destketî werin parastin."[816]

Di sala 2017'an de bi giştî 10 hezar jin di kooperatifên xweser û giştî de xebitîne. Ji sedî 75'ê endamên jin ên kooperatîfan di warê çandiniyê de ne. Her wiha li 8 bajarên herêma Cizîre bi giştî 86 kooperatifên jinê di beşên çandinî, sewaldarî, sinaiya konserve, bîo-plastîk [sera], xwaringeh û firinê de karê xwe meşandine. Wekî din di xebatê çandiniyê de bipêşxistina rêbazên çandiniya pirralî û hilberîna ekolojîk esas hatine girtin. Endamên Komîteya Aboriya Jinê ya Rojava dibêjin, *"Pirsgirêka esasî di pergala Aboriya Jinê de ew e ku di navbera kooperatîf û civakê de tucar hene. Ew ji keda jinê feydê distînin û buha bilind dikin. Pirsgirêka yekemîn, derxistina jinê ji malê bû. Niha jî pirsgirêka firotin û gihandina berheman heye. Divê em pergala çandinî, sinaî û bazirganiyê girêdayî hev ava bikin."*

Wekî pêngava birêxistinkirina pergala firotin û bazirganiyê bêyî ku keseke sêyemîn di nav de hebe, Aboriya Jinê kooperatîfên firoşgehan û li bajarên Amûdê, Qamişlo û Dêrikê, Sûkên Jinê ava kirine. Cihê firoşgehên Sûka Jinê ji bo 2 salan bê kirê radestî komînên jinan hatin kirin da ku ew

[813] Hevpeyvîn bi endamên Koordînasyona Aboriya Jinê ya Bakurê Sûriyê re, Qamişlo, 2018

[814] Hevpeyvîn bi endamên Komîteya Aboriya Jinê ya Rojava ya Kongra Starê re, Qamişlo, 2017

[815] Hevpeyvîn bi endamên Komiteya Aboriya Jinê ya Dêrikê re, Dêrik, 2018

[816] Hevpeyvîn bi endamên Komîteya Aboriya Jinê ya Rojava ya Kongra Starê re, Qamişlo, 2017

bikarin pergala bazirganiya jinê, rasterast bimeşînin. Bi vî awayî jin him dikarin bibin xwedî keda xwe, him jî civak dikare jê sûdê wergire. Endamên Aboriya Jinê diyar kirin ku zanebûn û hişyarî pêwîst e da ku aborî û bazirganî ne li gorî mentiqa kapîtalîzmê bê meşandin. Ji bo kooperatîfan bikarin di bazarê de ferqa xwe bidin xuyakirin, ew dixwazin berhemên xwe ji markayên kapîtalîzmê baştir û paqijtir, lê erzantir çêkin.

Di sala 2018'an de tenê di kooperatifên xweser ên jinan de 7000 jinan kar kiriye û debara xwe kirine. Dîsa, herî zêde jin di xebatê çandiniyê de cihê xwe girtine. Lê belê di beşên din ên Aboriya Jinê de jî sazbûnên nû çêbûne. Lewma rêjeya jinên ku di kooperatîfên çandiniyê de dixebitin, daket ji sedî 57'an. *"Dema çandinî pêş dikeve, her tişt pê re pêş dikeve. Zanebûna jinê di vê qadê de heye. Ji bo tenduristiya civakê bi taybet çandina sebze û şînkatî girînge. Em dixwazin kooperatîfên hingivî, dermanên xwezayî û fistiqan jî pêş bixin. Lê pêşîn, perwerde lazim e. Ji ber van tiştan, heta niha li vir tine bûn."*[817]

Wekî din projeyên sinaî yên wekî kooperatîfên konserveyên avabacana, îsot, meqtûz û mirabe yan jî kooperatîfên kehrebê jî encameke serketî dan. Jin bi ceribandinên nû gav bi gav di warên aboriyê hemûyan de li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikarin dibin hêza çareseriyê: *"Ji ber kehrebê li bajar û gundan nebû, jin fêrî xebitandina motoran [jeneratoran] bûn. Bi pêşengtiya jinan 3 - 4 komîn bi hev re kooperatîfa jeneratoran ji bo çareseriya pirsgirêkên kehrebê ava kirin. Ev jî kooperatîfa jinê ye. Jin niha li gelek cîhan li ser jeneratorên şaredarî û komînan disekinin.*
Ceribandinên Rojava ji bo pêşerojê tevahiya Sûriyê bingehekî ava dikin. Danûstandina me bi kooperatîf û projeyên aborî yên jinên li Kobanê, Helebê, Minbic, Tebqayê re heye. Me li hemû navçeyan navendên Aboriya Jinê ava kirin. Aboriya Jinê ya Efrînê jî pirr baş pêş ketibû. Ji ber vê dijmin wir dagir kir. Di nav heft salên şoreşê de baweriya me xurttir bû. Gel xwe bi vê girt. Ev felsefe û ceribandinên me ji bo dinyayê jî dibin mînak."[818]

Avakirina kooperatîfên jinê di gelek aliyan de bipêşketin bi xwe re anîn. Him jin him jî civak dibîne ku jin dikarin di warên jiyana aborî hemûyan de tevahiya karan bi rê ve bibin. Bi vî awayî, têgihîna zayendperest qels bûye ya ku hinek kar wek 'yên zilaman' û hinekên din jî wek 'karên jinan' dabeş dike. Jinan hêza xwe ya cewherî, hêz û zanebûna jinên din nas kiriye û bi pêş xistiye. Asoya jinan bi vî rengî firehtir bûye û jin bûn xwediyê keda xwe. Bixwebaweriya jinê û xweseriya aborî ya jinê hevdu xurt kirine. Vê yeke jî bandoreke erênî li ser têkiliyên malbatî û hevjînan kir. Ji bilî pêdiviyên madî ev hemû dibin sedemên ku jin bêhtir daxwaza kar û endametiya kooperatîfan dikin.

"Ev 5 sal in, bi rastî gelek derfetên kar ji bo jinan çêbûne. Gelek jin di kargehên nû de kar dikin. Wisa, jin nema hewceyî mêr dibin heya ku 10 wereqa bidê wan. Pirranî pisgirêkên malbatî pirsgirêkên aborî ne. Dema jin dervê malê kar dike, mêr jî qedrê wê digire."[819]

Îro ji deh hezarî zêdetir jin di qada Aboriya Jinê û kooperatîfan de kar dikin. Lê belê gavên ku hatin avêtin, li gorî pêdiviyên civakê hê jî kêm dimînin. Pergaleke pirralî ya aboriya civakî pêwîst e da ku têra xwe bike. Di milê rêxistin kirina karên civakî, hilberîn û parvekirinê de hîna valatî hene. Heta niha, tenê ji qismeke jinan re derfeta cihgirtina di xebatên kooperatîvan de vebû. Hema

[817] Hevpeyvîn bi endamên Koordînasyona Aboriya Jinê ya Bakurê Sûriyê re, Qamişlo, 2018

[818] Çavkanî li heman cihî

[819] Hevpeyvîn bi Cîhan re, endama rêvebiriya Mala Jinê ya Rimêlanê, 2017

hema di tevahiya hevpeyvîn û nîqaşan de jinan xwest ku derfetên kar ji bo jinan li bajar û navçeyên wan werin zêdekirin. Li şûna ku ew bi xwe înîsiyatîfa avakirina kooperatîfekê di komîna xwe de bidin destpêkirin, pirraniya jinan hîn li bendê ne ku keseke din ji wan re derfetan ava bike. Polîtîkayek û rêxistinbûneke hîn berfirehtir li ser bingehê komînan pêwîst e da ku her jin bikare di pergala aboriya jinê de bi çanda jiyana komînal debara xwe bike û aboriya xwe, bixwe bi rê ve bibe.

Di Şoreşa Rojava de avakirina gundê Jinwar mînak û ceribandineke nû ye ji bo afirandina aboriya komînal li ser bingehê jiyana hevbeş. Jin û zarokên bi zanîn û serpêhatiyên cuda karên jiyanê, hilberîn, sewaldarî û çandiniyê parve dikin û li gorî pêdiviyê encamên keda xwe parve dikin. Li wir aborî û jiyan ji hevdu nayên veqetandin. Erk û berpirsyarên jiyanê diguherin da ku her kes bikare qabiliyetên xwe bi pêş bixe û ji hev du fêrî tiştên nû bibe. Bi vî awayî aboriya komînal dibe ruh û şêwaza jiyanê. Hîna gelek jin newêrin vê gavê biavêjin, lê belê her jina ku tevlî jiyana Jinwarê bûye, dewlemendî û afirîneriya jiyan û aboriya xweser a jinê nas kiriye. Gundê Jinwarê civak hîn kir ku jin dikarin bi rengekî kolektîf û bi hêza xwe ya cewherî jiyana xwe ava bikin û bi rê ve bibin. Encamên van ceribandinan dikarin bibin çavkaniya îlhamê ji bo pêngavên nû.

- **Jinên Kedkar**

Hejmara jinên Rojava yên xwedî pîşeyî pirr kêm e. Lewma pirraniya jinan tenê bi karê çandinî û paletiyê dikare debara xwe bike. Ji ber ku pergala kooperatîfan hîna di wê astê de bi pêş nehatiye xistin ku karibe civakê hemûyî têr bike, pirraniya jinên kedkar hîna bi şêwaza berê diçe paletiyê. Nexasim li navçeyên ku şer û dagirkerî li wan bûye, avakirina pergala kooperatîfan dereng ketiye. Mînak li gelek navçeyên Hesekê hîna nû ji sala 2017'an û şûn ve mecalên damezrandina kooperatîfên çandiniyê çêbûne. Endamên Komiteya Jinê ya Yekîtiya Kedkaran ya Hesekê destnîşan dikin ku ji ber xizaniyê gelek jin û zarok mecbûr dimînin wekî karkerên demsalê di bin mercên giran de bixebitin. Li gorî texmînan ji sedî 90'ê karkerên demsalê li kantona Cizîrê jinên Ereb in. Ew rojê qederê 6 seatan kar dikin û nêzî 1200 Lîreyî distînin. Carna ew bêhtir jî dişuxilin ji ber ku pere têra wan nake.

  - **Tekoşîna li dijî Pergala Çawîştiyê**

Nûnerên Komiteya Jinê ya Yekîtiya Kedkaran balê dikişînin ser wê yekê ku pirsgirêka bingehîn pergala çawîştiyê ye ku ji aliye dewleta Sûriyê ve hatiye teşwîqkirin û parastin. Ev pergal bi hevpeymaneke di navbera xwediyê erd û çawîşan de pêk tê. Çawîş bi gelemperî zilam in. Ew bi pirranî jin û zarokan wekî karkerên erzan kom dikin û di karên giran ên wekî karê çinînê de didin xebitandin. Çawîş gelek caran zextê li karkeran dikin û seyarên xwe zêde tijî dikin da ku menfaeta xwe zêde bikin. Ji ber vê qeza dibin, karker birîndar dibin û jiyana xwe ji dest didin. Nexasim jin di bin fermana çawîşan de gelek êşê dikişînin. Mafên jinên ducanî nayên parastin. Wekî din bûyerên destavêtinê li hemberî karkerên jin hatine ragihandin.

"Mafên jinên kedkar, yên keçikên piçûk û zarokan gelekî tên binpêkirin. Lê kes curet nake bêje ku ev tişt heye. Ew çawîş bi xwediyê erdê re ditefiqe û diçe wan keçan kom dike. Yek jin jî napirse: 'Tu yê çiqas bidî me? Em ê çend saetan bixebitin?' Hema hemû saet pêncê sibehê dikevin wê seyarê û diçin. Ew kengê û çawa wê vegerin, nizanin. Malbata wan jinan jî tiştekî napirse. Carekî, jin mar pêveda. Carekî, jinek hat cem me laşê wê şîn û reş bûye ji lêdanê. Carekî, yek ser kar mirî. Dema

em dixwazin karkeran hişyar bikin, ew ji me direvin. Çawîş derî û şibakan li me digirin."[820]

Komiteya Jinê ya Yekîtiya Kedkaran, têkoşîna birêxistinkirina jinên kedkar li hemberî pergala çawîştiyê dikin. Lê, gelek zehmetî derdikevin pêşiya wan, ji ber ku pirraniya malbatan dixwazin keçên xwe radestî çawîşan bikin. Bav û dayik çawîş wek 'parêzvanê namûsa xwe' dibînin. Lê di rastiyê de çawîş bi xwe pirr caran dibin sedema tacîz û neheqiyan. Pirr caran ew heqdestê jinan bi avayekî kêyfî kêm dikin, dereng didin yan jî nadin. Jinên Yekîtiya Kedkaran vê nakokiyê wiha şirove dikin: *"Çima zilam nahêle jina wî û keça wî serê xwe ji malê derbixe, lê ji bo kar kû der be, yê wan bişînin? Zilamê wan rûniştî ne, kar nakin. Jin xwe diwestînin û rastî hemû cûreyên neheqiyan tên. Lê mixabin, carna jin bi xwe jî xwe nêzîk çawîşî dike û xwe erzan difiroşe ji bo çawîş wê newestîne, cihê wê di seyarê de çêdike heya ku tişta bixwazê jê bibe."*[821]

Hewildanên Yekîtiya Kedkaran ji bo guhertina vê pergalê û parastina maf û rûmeta jinên kedkar heta niha zêde encam nedane. Dema wan dixwest bi xwediyê erd û çawîşan re li ser mafê kedkaran û helwestên wan ên beramberî kedkaran civînan çêkin, xwediyê erd nedihatin. Lewma endamên Yekîtiya Kedkaran niha hewl didin ku bi cotkaran re nîqaş bikin. Ew dibêjin, heger ew bi cotkaran bigihîjin lihevhatinekê, rista çawîş wê qels bibe û nemîne. Jinên kedkar ji bilî sektora çandiniyê jî bi pirranî di asta xizmetkaran de li cem xwediyên kargeh yan jî pîşeyên wekî bijîşkan di bin şert û mercên giran de û bi heqdestekî kêm dixebitin.

- **Zarokên Kedkar**

Herî zêde jî rewşa zarokên ku ji bo heqdestê herî kêm di bin şertên giran de dixebitin, li benda çareseriyê ye. Hevpeymana civakî ya xweseriya demokratîk dibêje, *'Mafê zarokan parastî ye. Karkirin û kedxwariya wan qedexe ye'.* Lê belê ji ber xizanî û rewşa malbatê, gelek zarok neçar in û kar dikin: *"Gelek zarokên feqîr diçin ji bo alîkariya malbata xwe bikin. Dema zarok derdikevin kar, mirov gelekî diêşe. Bi hezaran kedkar hene. Bêhtir ji wan zarok in. Em bi wan û dayikên wan re civînan çêdikin û wan hişyar dikin. Lê dema ez dibêjim, 'Çima zarokên te diçin kar?' Ew dibêjin, 'Ma tu yê mesrûfa wan bidî wan? Tu yê heqê mast û nanê me bidî me?' Hema yek ji wan zarokan jî kurê min e. Ew dibêje, 'Ez ê herim kar. Ev şeş îde, te cil ji min re nekiriye.'*
Em seyareke dibînin deh jin û 15 zarok tê de ne ku diçin ser kar. Me gotibû 'divê seyarê girtî bin û kursî tê de hebin.' Lê dema mudaxele tê kirin û tê xwestin ku ji seyara peya bin, ew ji me re dibêjin, 'Ka heqê nanê min?' Carekê min zarokek dît, ew pênc salî bû. Di meha Sibatê de cilê wê hemû herî bûn, ew dişixulî û çawîş li wê dixist. Em carna dibêjin, 'Çima em civînek ji bavê van zarokan re çênakin? Yê ku ewqas zarokan tîne, nafikire wê çawe wan xwedî bike?' Em bêjin wan, 'yê zarok di bin 18 re bişîne kar, em wî ceza bikin.' Divê dê û bav bi kûranî li ser anîna zarokan bisekinin. Çima ez ê vê zarokê bînim û ez nikarim wê xwedî bikim?"[822]

Ji bilî zarokan gelek ciwan û xwendekarên zanîngehê jî hene ku wek pale kar dikin da ku bikarin alîkariya bidin malbata xwe da ku debara xwe bike, û xwendina xwe bidomînin.

- **Birêxistinbûn ji bo Maf û Rûmeta Jinên Kedkar**

[820] Hevpeyvîn bi endamên Komîteya Jinê ya Yekîtiya Kedkaran re, Hesekê, 2017

[821] Çavkanî li heman cihî

[822] Çavkanî li heman cihî

Di destpêka Şoreşa Rojava de Komîteya Kedkaran hat damezrandin da ku rêxistinbûn û têkoşîna kedkaran li dijî neheqiyan bi pêş bikeve û pergala kedxwariyê ji holê were rakirin. Bi heman armancê Yekîtiya Kedkaran di nav pergala xweseriya demokratîk de karê xwe didomîne. Ji ber zextên zayendperest û pêdiviyên taybet ên jinên kedkar, Komîteya Jinan ya Yekîtiya Kedkaran wekî rêxistina xweser xwedî peywirên girîng e. Lê belê nûnerên komîteyê li Hesekê didin xuyakirin ku wan di warê birêxistinkirin û perwerdekirina jinên kedkar de gelek zehmetî kişandine:

"Dema ev sazî ji bo kedkarên jin vebû, bi rastî gelek zehmetî hebû heya me jin kom kirin. Me digot, 'Werin xwe bi rêxistin bikin, ji bo mafê xwe ji çawîşan bistînin û kerameta xwe biparêzin. Werin saziyê, li vir em alîkariya hev bikin ji bo kes heqê we nexwe. Çima hûn 150 jin in û zilamek we bi rê ve bibe?' Hê jî gelek baweriya wan nîne ku ew ê bi rêxistinbûnê bigihîjin mafê xwe. Ew diçin li çawîşan digerin. Me xwest ku her komîn karkerên xwe kom bike ji bo em meclîsa kedkaran ava bikin. Lê ji bilî yek komînê ne meclîs, ne jî komîn bi me re bûne alîkar. Tenê li komînekê me karibû rêxistinbûnekê ava bikin. Karê me zehmet e, lê heya ku em bikarin yek kesî jî birêxistin bikin, em ê karê xwe nesekinînin. Piştî ku hinek biryar ji bo sererastkirina rewşa kedkaran hatine standin, rêxistinbûna me hinekî xurttir bû. Niha soz dane me ku ew ê werin cem me.
Em bi jinan re nîqaş dikin. Ewilî em dibêjin, 'Ya herî girîng kerameta xwe biparêzin. Dema jinek bi êşekê bihesê, bila êşa we be. Jin bila bi jinê re bisekinin. Bihesibînin xwuşka we ye, diya we ye. Dema yek ket şaşiyekê, wekî jin hevdu hişyar bikin, şîret bikin bi hezkirinê, ne bi axaftina hişk. Divê jina mezin pişta jina piçûk bigire.' Ji her 10 jinên kedkar, yên me bi rêxistin kirin yek dibe berdevkê wan."[823]

Ji bo birêxistinbûn û zanebûna jinên kedkar bi pêş bikeve, jinên Yekîtiya Kedkaran plansaziyên ji bo perwerdekirina jinên kedkar ên li kargehên Hesekê hemûyan amade kirine. Wekî din ew hewldanên xwe ji bo rakirina pergala çawîştiyê dewam dikin. Ew daxwaz dikin ku karên demsalê êdî bi rêya komînan û berpirsiyarên jinê werin birêxistinkirin û nûnertiya wan bi xwe di Desteya Aborî ya Xweseriya Demokratîk de çêbe.

Rewşa jinên kedkar ên di kargehan de dixebitin ên ku rêgezên hevpeymana civakî pêk tînin, naşibe rewşa paleyên di bin fermana çawîşan de. Şêwaza kar û rêxistinbûna van kargehan nêzî ya kooperatîfan e. Sala 2015'an li Dêrikê kargeha cîbsên patata hatibû vekirin. Kongra Star jî tevlî vê projê bû da ku derfetên kar ji bo jinan werin peydakirin. Di sala 2018'an de 15 jin di vê kargehê de dixebitîn û karê xwe bi rê ve dibirin. Wekî harêz û ajokar zilam jî bi wan re kar dikin. Dewama wan rojê 8 saet in. Li gorî zêdebûn yan jî kêmbûna kar ew carna li gorî nisbet, carna jî heqdestê sabît distînin.

Jineke kedkar a kargehê, Şêrîn dide zanîn ku di têkiliyên navbera jinên kargehê de hevgirtin û hezkirin heye: *"Em wekî jin dixebitin ji bo em hewceyî kesekî nebin û alîkariya malbata xwe dikin. Dema yek ji me nexweş be, ew dîsa ratib distîne û masrûfên doktor jî mehmele dide. Em hemû jinên di temenê 18 salî û jor de ne. Me dît em dikarin her tiştî çêbikin. Em dikarin makînayên mezin jî bişuxilînin. Ji ber, min xwest fêrî makîna mezin bibim, min xwe fêr kir. Li gorî xwestekê jî em dikarin tevlî perwerdeyan bibin. Heftê carekê em tekmîla xwe wekî jin xweser digirin. Di civînên mehane de hevalên zilam jî tevlî dibin û em rapora xwe amade dikin. 15 rojan carekê em*

[823] Çavkanî li heman cihî

perwerde yan jî semîneran dibînin."[824]

- **Xebatkarên Saziyên Xweseriya Demokratîk**

Pirraniya jinan li gorî derfet, zanebûn û rêûresmên berê di karê çandinî û hilberînê de cihê xwe digirin. Lê belê bi avakirina pergala rêveberiya xweser re derfetên nû yên kar ji bo jinan ava bûne. Gelek jin ji hemû beşên civakê, nexasim jî jinên xwende di saziyên civakî, siyasî, çandî û parastinê yên xweseriya demokratîk de dixebitin. Bi hezaran jin li herêmên xweseriya demokratîk hemûyan wekî endamên asayîş, zabite, desteyên rêveberiyê, şaredariyê, saziyên jinê û perwerdeyê de kar dikin. Ew di nav xebatên xwe de fêrî hişmendî, pîvan û karîgeriya pergala xweseriya demokratîk dibin. Li aliyê din jî mecalên kar bi taybetî ji bo dayik û jinên ku bi tenê debara xwe dikin, hatine avakirin. Bi vî awayî gelek jinan karîbû xwe û zarokên xwe ji rewşên tengav xilas bikin. Dîsa bi van karan ve girêdayî jî gelek jin perwerde bûne, zanîn û tecrûbeyên xwe bi pêş xistine.

Gelek endamên van saziyan karê xwe bi kedeke mezin, bi bîr û bawerî çêdikin. Lê di heman demê de jî rexne û çavderî hene ku hin kes ji karê saziyan re wekî 'miwazif' nêz dibin. Li şûna ku ew ji bo bipêşxistina xebat û erkên saziyê xwe berpirsyar bibînin, ew dema dewama xwe bi ked û tevlîbûneke kêm derbas dikin. Endamên rêveberiya zanîngehê jî dinirxînin ku meyleke wiha ya xwendekaran bi pêş ketiye. Li şûna ku xwendekar armanc bikin di beşa xwe de di warî zanist û pîşê de tiştên nû biafirînin, ew tercîh dikin wekî miwazif bi ratîbeke sabît bixebitin. Ev feraset jî li pêşiya bipêşketinên nû û bipêşxistina çarêseriyên ji bo pirsgirêkên civakê û şoreşê dibe asteng.

"Destpêka şoreşê, bi giştî di gel de ruhê fedekariyê hebû. Her kesî bi ruhê şoreşê kar dikir. Lê niha van herdu salên dawî pirraniya kesan, wezîfekê tenê dixwaze bike. Milet vegeriya şûnde. Çima wisa ye? Carna ez dibêjim ji ber ku di hinek karan de fon heye. Her jineke ku em dixwazin tevlî xebatê bikin, dipirse: 'Ka fon çiqas e?"[825]

Di hevpeyvînan de gelek jinan nirxand ku di warê aborî û sazîbûnê de bipêşketinên mezin di salên dawî de çêbûne. Lê miqabilê vê, ruhê welatparêzî û şoreşgeriyê lawaztir bûye. Nêzikatiyên ji rêzê yan jî tiştên ku hatine bidestxistin têra xwe dîtin, dibin asteng li pêşiya dînamîkên veguhertinên demokratîk ên malbat û civakê.

"Şoreşa me, şoreşa jinê ye. Heya ku em li gorî vê têkoşîn bikin, ew ê mezin bibe. Divê ku jin bi xwe bawer be û zilam ji xwe re wekî asteng yan jî pîvan nebîne. Dema ku ez her tim nêrîna zilam ji ya xwe rastir bibînim, ev yek dihêle ku zilam jî ya xwe her tim rasttir bibîne. Di gelek saziyan de bandora hevalên zilam hîna li ser hevalên jin heye. Hevalên jin gelekî xwe pêş xistibin jî, dema ku digihine nuqtê dawiyê, dikare careke din nêrîna zilam ji xwe re esas bigire. Ez vêna bixwe jî ferq dikim. Mînak, di mijarên bazirganî û aboriyê de ez pêdihesim ku eqilê hevjînê min bêhtir li ser van tiştan dişuxile. Pêwîst e em vê nêzîkatiyê jî derbas bikin."[826]

[824] Hevpeyvîn bi jinên kedkar ên kargeha cibsên patatan re, Dêrik, 2018

[825] Hevpeyvîn bi Leyla Saroxan re, Hesekê, 2017

[826] Çavkanî li heman cihî

Kurteencamên Lêkolînê Derbarê Aboriyê de

Gavên destpêkê ji bo avakirina feraset û rêxistinkirina aboriya komînal bi înşaya pergala xwerêveberinê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine avêtin. Bi tevlîbûna jinan di beş û xebatên aboriyê hemûyan de him di jiyana gelek jinan de guhertinên erênî çêbûne, him jî helwesta civakê beramberî keda jinê qismî hatiye guhertin. Pirraniya jinên ku hevpeyvîn bi wan re hat kirin, serxwebûna xwe ya aborî, bi azadiya jinê re hemwate şirove dikin. Serboriya gelek jinan radixe ber çavan ku bi heqdestê ku jin ji karên derveyî malê distînin û tînin malê, nirxê keda jinê xuya bûye. Lê belê hîna heman qedrî nadin keda rojane ya dayik û jinên li nav mal û civakê. Hîna jî tundî û hîşmendiya zayendperestiya civakê di malbat û gelek warên jiyanê de li paş nehatiye hiştin. Lewma asta azadiya jinê tenê bi heqdest nikare were pîvan.

Bi gelemperî bipêşketin di rewşa aboriya gel de çêbûne. Lê dîsa jî tengasiyên mezin û nediyariyên di warê debarê û birêveberina jiyanê de yên jin û civakê hene. Sedemên van tengasiyan bi pirranî girêdayî rewşa şer, ambargo û polîtîkayên dewletan in. Her wiha em dibînin ku di warê bipêşxistina projeyên jiyan û aboriya komînal de li gelek cihan afirînerî û cesaret qels e. Tehlîla ceribandinên Aboriya Jinê dibe ku bibe bingehek ji bo pêngavên nû yên aboriya komînal a civakê. Li vir, girîng e ku jin hilberînê li gorî pêdiviyên esasî yên civakê, rêgezên jiyana ekolojîk û bi tenduristî, jiyan û keda kolektîf bikin. Dema ku berhemên wan rasterast bigihîjin mirovan, jin dikarin nirxê keda xwe bixwe bipîvin û buhayê berheman ji bo mişteriyan kêmtir dibe.

Têgihîna aboriyê wekî 'tiştê pê debara civakê tê kirin', 'ked û edaleta dayikê' yan jî 'danûstandinên navbera civak û xwezayê' mijareke hêja ye ji bo xebatên perwerde û nîqaşên di komîn û civînên jinan de. Bi vî rengî wê kêmasî û derfetên heyî karibin werin zelalkirin. Bi taybetî veqetandina erdê çandiniyê ji bo avakirina kooperatîfên jinên di nav komînên gundan de dikare bibe rêbazeke encamgîr. Bi vî rengî gelek jin dikarin bibin xwediyê biryar û keda xwe û nema neçar dimînin ku li bin şertên giran di bin fermana çawîşan de bixebitin.

Di encama çavderî û nîqaşên bi jinên kedkar re diyar dibe ku pênasekirina pergala çawîştiyê wek pergala koletiyê û rakirina vê, daxwaz û pêwîstiyeke bi lez e. Li şûna vê, karên çandinî, yên demsalê û wekî din mirov dikare bi rêya komîteyên aborî yan jî komîteyên kedkaran yên meclîs û komînan bi rêxistin bike. Ev komîte dikarin di heman demê de jî berpirsyariyê ji bo şopandin û parastina mafên kedkaran li navçeyên xwe bigirin ser xwe. Wekî nûnerên Yekîtiya Jinên Kedkar dayî xuyakirin, avakirina komîteyên xweser yên jinên kedkar li komînan hemûyan dikare bibe gavek ji bo xurtkirina hevgirtin, zanebûna maf û xwe parastina jinan li dijî neheqiyan. Pê re jî tedbîrên taybet ji bo parastina zarokên kedkar û jinên ducanî jî dikarin bi pêş bikevin.

Her wiha jinan di gelek hevpeyvînan de dixwest ku erd û derfetên ji bo avakirina kooperatîfên jinan li navçeyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemûyan bên zêdekirin. Cûreyên nû yên kooperatîfan li tevahiya beşên hilberînê û karên civakî dikarin bibin ceribandinên bi armanca hev gihandina jiyan û aboriya komînal. Ji bo pêkanîn û birêvebirina van xebatan perwerdeyên pisporî ji bo jinan bi taybetî di bêşên teknîkî, zanistên ekolojîk, civaknasî û bazirganiyê de pêwîst tên dîtin.

g) Demografya

Zanista demografya û teoriyên wê girêdayî hejmara zayîn û mirinê, pêkhateyên nifûsê û koçberiyê yek ji amûrên herî xetenak a siyasetên desthilatdar e. Beriya her tiştî, ev siyaset li ser bendena jinê tên meşandin. Li gorî ferasetên desthilatdar, jin weke amûreke zarokanînê ji bo hilberîna mirovan û 'dewamkirina nijadê' tê bi kar anîn. Ev feraseta baviksalar, him di çanda eşîrtiyê de him di moderniteya kapîtalîst de serwer e. Ferq tenê ev e: Di kevneşopiya eşîrtî û xanedaniyê de zêdebûna serjimarî, bi taybetî pirrbûna mêran wekî çavkaniya hêz û rûmetê tê dîtin. Lê belê di mentiqa modernîteya kapîtalîzm û netewe dewletê de cudahiyên navbera 'mirovên kêrhatî' û 'mirovên bêkêr' tên çêkirin. Li gorî berjewendiya desthilatdaran, siyasetên demografyayê, yên plansazkirin û venihêrîna nifûsê yan zayîn û zêdebûna nifûsê teşwîq dikin yan jî asteng dikin. Her du nêzikatî jî vîna jinê tine dihesibînin. Hesabên demografyayê yên ku bi ferasetên zayendperest, nijadperest, mêhtinger û qezanca zêde li ser bedena jinê tên meşandin, hebûna jin û civakê înkar dikin. Ferzkirina zayîna zêde yan jî pêşîgirtina li zayînê, mişextkirin, koçberî û qirkirinên etnîk encamên van ferasetên siyaseta demografyayê ne.

Jineolojî naskirina vîn û biryara jinê wekî rêgeza yekemîn di nêzikatiya demografya û zarokanînê de diparêze. Jineolojî li siyasetên demografyayê dikole da ku wan bide rawestandin yên ku xweza û pirçandîbûna civakê xira dikin, hevsengiya ekolojîk dixin metirsiyê, qirkirinên çandî û etnîk pêk tînin.

Kurdên Rojava êşa siyaseta demografyayê ya dewleta Sûriyê di gelek aliyan de bi kûrahî dîtine, bi wê jiyane. Pêkanîna wê ya herî darîçav, serjimara sala 1962'yan bûye. Tevahiya daneyên demografyayê ji aliyê nîzama Beesê ve bi armanca misogerkirina serweriya qewmê Ereb hatine şirovekirin û bi kar anîn. Bi vê amûra siyaseta demografyayê, bi sed hezaran Kurdên Rojava zêdetirî 50 salan bê maf û nasname hatine hiştin. Ji ber vê sedemê, gel zorî, xizanî dîtiye û koçberî bûye. Li hemberî siyasetên dewletan yên înkar û tinekirinê, civaka Kurd jî her tim bi berteka xweparastinê û xwezêdekirinê, bersiv daye. Lewma ji bilî feraseta eşîrî û baviksalariyê, malbatên Kurd zêdebûna zarokan wekî rêbazeke berxwedanê li hemberî qirkirinên çandî û fizîkî jî nirxandine.

Di çarçoveya lêkolîna sosoyolojîk de me xwest hê jî ji binî ve fêhm bikin: *Rêbazên siyaseta demografyayê ku li ser jin û civaka Rojava hatine meşandin çi ne? Bi şoreşê re li hemberî siyasetên demografyayê wekî amûreke desthilatdarî û mêhtingeriyê, têkoşîneke çawa û bi çi encamê hatiye meşandin? Siyaseta koçberkirinê û êrîşên qirkirina etnîk bandoreke çawa li ser civakê çêkirin? Gelo naskirina vîn û biryara jinê di mijara zarokanînê de heta kîjan astê bi pêş ketiye?*

- **Koçberî û Guhertinên Demografyayê di salên 2011 heta 2017'an de**

Ji ber sedemên şer û aloziyên li Sûriyê ji sala 2011'an û pê ve pêlên mezin ên koçberiya hundir Sûriyê û ber bi welatên din ve çêbûne. Di serî de gelek koçberan ji herêmên Sûriyê yên weke Şam, Heleb, Hims û yên din berê xwe da herêmên bi ewle yên Bakurê Sûriyê. Pirraniya malbatên Kurdên Rojava yên ku di salên 1980 heta 2010'an de koçî bajarên mezin ên Sûriye kiribûn, vegeriyane welatê xwe. Wekî din ji ber êrîşên çeteyên El Nusra û DAIŞ'ê bi deh hezaran mirovên pêkhateyên din ên Sûriyê, Êzdiyên Şengalê, Kurd û pêkhateyên din ên Başûrê Kurdistanê, xwe sipartin kantonên Rojava. Di heman demê de jî koçberiya gelên Rojava ji ber sedemên aborî û êrîşên giran ên çeteyan bi taybetî di salên 2011 – 2014'an de rûdaye. Pirraniya wan, berê xwe dane

herêmên Bakur û Başûrê Kurdistanê, Tirkiye û Ewropayê. Bi bipêşketina rewşa aram piştî şerê Kobanê û bipêşketina derfetên aboriyê ji sala 2015'an û pê ve, beşeke girîng a penaberan dîsa vegeriya ser axa xwe. Lê belê heta 2017'an beşeke mezin a penaberên Rojava hê jî li welatên derve bûn.

- **Sedemên Koçberiyê û Bandora Koçberiyê li ser Jin û Civakê**

Di sala 2017'an de endamên saziyên jinan wiha nirxandine ku rewşa şer û bêîstîqrarbûnê bi taybetî li ser jin û zarokan bandoreke neyînî çêkiriye. Jinên ji cih û warên xwe yên li hundirê welat koçber bûne û di bin gefên şer û êrîşan de nikaribûn cihekî bi ewlê bibînin, gelekî tengav bûne, zehmetî dîtine. Carinan ev rewş dibe sedema krîzên derûnî û nexweşiyan jî. Nexasim heta sala 2014'an ev rewşa bi metirsî û nediyarî dibû sedema koçberiya ber bi derveyî welat ve.

Di destpêka şerê Sûriyê de beşeke ciwanan bi daxwaza xwendina zanîngehên Ewropayê ji Rojava derketine. Wekî din bi qesda parastina zarokên xwe û misogeriya debara malbatê, hinek malbatan zarokên xwe xistine rêyên koçberiyê. Lê derketiye holê ku xeyalên jin û ciwanan û rewşa jiyanê li derveyî welat hev du nagirin. Gelek caran rewşa jin û ciwanan hîn xerabtir bûye. Nakokiyên di têkiliyên hevjînan de di bin şertên koçberiyê de zêde dibin û zû diçin heta asta hevberdanê.

Wekî din gelek jin û ciwan jî ketine kemînên siyaseta dewleta Tirk li ser koçberên ji Sûriyê. Kampên penaberan yên girêdayî saziya dewleta Tirk Afatê, wekî baregehên çeteyên El Nusra û DAIŞ'ê û navendên bazirganiya jinê hatine birêxistinkirin. Li gorî agahiyan, hinek jin û ciwanên Rojava jî bi vî rengî ketine nav torên fihûş, mixadirat û çeteyan. Li aliyê din dewletê û faşîstên wê êrîşên nijadperestî birine ser gelek penaberên Rojavayî yên li Tirkiyeyê . Ji bilî vê pirraniya wan ji ber xizaniyê neçar mane wekî karkerên herî erzan di bin şertên koledariyê de bixebitin. Lewma beşeke koçberan zû vegeriya Rojava, beşeke din jî li benda wê derfetê ye ku biçe Ewropayê. Lê belê yên ku bi zehmetiyên mezin heta metirsiya mirinê gihiştin dewletên Ewropayê jî bi pirranî nikaribûn jiyana ku xeyal kirine, li wir bibînin.

Hevpeyvînên ku Navenda Jineolojiyê ya Ewropayê sala 2017'an bi jinên koçber ên Rojavayî yên li Swissre, Belçîka û Elmanyayê kirine, destnîşan dikin ku pirsgirêkên giran ên jinan nexasim jî di hêla manewî û civakî de hene. Hesta tenêbûn û dûrketina ji civakê yek ji pirsgirêkên wan yên herî mezin e. Di armanca xwe ya jiyanê de nezelalî û gelek nakokiyan dibînin. Temenê pirraniya jinên koçber yên ku di salên 2013 heta 2017'an de çûne, di navbera 15 û 45'an de ye. Hema hema tevahiya wan dibêje, ew li Ewropayê aciz in û naxwazin bimînin. Lê ji bo vegera welatê xwe, ew bixwe ti gavan navêjin û xwe berpirsyar nabînin. Ew li bendê ne ku 'rewşa Rojava baş bibe'. Jinên koçber di fermiyetê de bi pirranî dibêjin, ew ji ber şer û tinebûnê çûne. Lê çavderiyên me ew in ku gelek ji aliyê malbatên xwe yên li Ewrupayê ve hatine teşwîqkirin, yan jî çav li hev du kirine. Wekî din siyaseta teşwîqkirina koçberiyê ku bi destpêka qeyrana Sûriyê re bi taybetî ji aliyê dewletên Swîsre û Elmanyayê ve hatibû meşandin, pêşî vekiriye li ber çûna wan a Ewropayê.

Hinek jinên ciwan ji ber xeyalên 'jiyana xweş û azad li Ewropayê' hewl dane bi rêya zewacê ji Rojava derkevin. Gelek caran, bûkên li Rojava û zavayên li Ewrupayê yan jî li Başûrê Kurdistanê hev du bi danûstandinên li ser facebookê nas kirine. Bi vî awayî gelek jinên ciwan hatine xapandin û ketine rêyên xeter. Li welatên xerîb, ew bi tena serê xwe û bê parastin bi gelek cûreyên tundiyê re rû bi rû bûne. Hin ji wan jinan dîsa vegeriyane Rojava. Lê gelekan ji wan jî rê û wêrekiya

vegera welatê xwe hîna bi xwe re nedîtine. Me bi jinên ciwan re sedem û xeterên zewaca bi xortên derveyî welat re nîqaş kir. Di van nîqaşan de gelek caran jinên ciwan nîvî bi henekî û nîvî cidî gotina *'êdî xort li cem me nemane'* bi kar dianîn. Heman nihêrîna şaş wekî yek ji bahaneyên zewaca bi temenê piçûk jî tê rêzkirin. Balkêş e ku gelek kes ji agahiya şaş bawer dikin ya ku dibêje *'ji ber koçberî, şer û şehadetan, hejmara xortên li Rojava kêm bûye'*. Daneyên serjimara Rojava ya sala 2016'an destnîşan dikin ku rêjeya mêran ji sedî 50,7 e ya jinan ji sedî 49,3 ye li kantona Cizîrê. Yanî jin zêdetir in ji mêran. Bandor û xeterên belavkirina gotegotên şaş derheqê hejmarên demografyayê de bi vê mînakê re eşkere dibin.

Gelek jin û malbatên koçber piştî derketina xwe ji Rojava jî poşman bûne, lê newêrin hestên xwe bi malbatên xwe re parve bikin. Hinek naxwazin ku malbatên wan biqeherin. Hinek jî ji ber mesrûfên ji bo koçberiyê xerc kirine, fedî dikin, nikarin behsa bûyerên di jiyana xwe de bikin. Lewma ev kes careke din xizmê xwe teşwîqî koçberiyê dikin da ku ew li xerîbiyê êdî ne bi tenê bin. Lê belê li gorî berê, êdî civaka Rojava rastiya koçberên li welatên Ewropayê başfir fêhm dike û bi guman meyze dike.

Jinên Til Temirê wiha behsa rewşa mirovan dikin yên ku di dema şer de derketin derveyî welat: *"Dema şer, tirs çêbû. Hinek kesan got, belkî rewş xerabtir bibe. Wisa çarenûsa xwe dîtin û çûn. Ew niha gelekî poşman bûne û dibêjin, 'Xwezî em vegeriyana. Em rojeke li vêderê nadin bi sed rojên li Elmanya.' Ji ber ku ew li wan dewletan gelekî astengiyan dibînin. Her tişt heye, lê belê ruhê mirovahiyê nîne. Wêneyên ku wan li ber hediqayek yan jî li ber peykerekî yan ji li ser sifrekê girtine, temaşe nekin! Ne bi xwarinê ne jî bi peran, axa xelkê nabe ya mirov. Aniha ew di xaniyan de di şeqan de ne. Dema ku bi me re diaxivin, li ser telefonê digirîn. Xwuşka min jî li wir e. Ew dibêje, 'Bila em di nav saetekê de vegerin û bila ez bimirim. Çi dibe bila bibe.' Yanî em li vir mane û me rojekê tirs xwar. Ew li wir her gav, her saet û her deqîqe dimirin."*[827]

Di danûstandinên bi malbatên li Rojava de me carna nihêrîna *'jin pirranî dibin sedema koçberî*' jî bihîst. Wekî sedema vê tê gotin, çanda modernîteya kapîtalîst bandorê li jinan dike, lewma jî jin li xilasiya xwe û hewesa 'jiyaneke rehet' li welatên Ewropayê digerin. Berovajiyê vê nihêrînê jî tê gotin, '*gelek jin li hemberî koçberiyê derketine û bi vî awayî zarok û hevjînên xwe jî dane sekinandin*'. Di encamê de em dikarin bibêjin, tirsa şer, dagirkerî û gumanên siberojê, hîn zêdetir dibin sedemên koçberiyê. Lê belê herdu nihêrîn jî beşeke rastiya jinê û civaka Rojava diteyîsînin. Ji bilî vê hatiye piştrastkirin ku wan li cihan yên ku çanda welatparêzî û rêxistinbûna jinê xurt be, hişyariyek li hemberî qirkirinên demografîk heye û koçberî kêmtir çêdibe.

- **Veqetandina Malbat û Cîranan**

Her wiha li Rojava gelek jin bi tena xwe mane ji ber ku hevjîn û zarokên wan koçî Tirkîye, Başûr yan jî welatên Ewropayê kirine. Endamên Mala Jinê li Tirbespiyê anîn zimên ku ev jin di warê nefsî û aborî de zehmetiyên mezin dikişînin: *"Beriya du salan [2015] koçbertî ji vir [Tirbespî] gelek çêbû. Lê niha kêm bûye. Pirsgirêka herî mezin dema mêr diçe devereke derve ji bo ji xwe re jineke din dibîne. Vê dema jin dewa berdanê dike. Hinek ji van jinan jî ducanî ne. Em niha kar dikin ji bo em bikarin piştî berdanê mafê jin û zarokan biparêzin. Zarokên wan hebin, em bi gîştî zarokan li gel dayikê dihêlin dema ku bixwaze. Lê dema ku naxwaze em zarokan li mala bavê wan dihêlin. Em ji jinê re dibêjin, heta dawiyê em li gel te ne heger tu zarokan xwedî bikî. Em nefeqê*

[827] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Temirê re, 2017

wan jî digirin. Bi dehan jin bi vî rengî hene."[828]

Gelek dayikên hevjîn yan jî zarokên wan koçî derveyî welat kirine, dibêjin, derdên wan ji ber êşa tenêbûnê zêde bûye. Sê salan piştî êrîşên DAIŞ'ê li dijî Kobanê, Yadê Hemîde bandora koçberiyê li ser jiyana xwe wiha dinirxîne: *"Jiyana niha xweş e, ji ber gelek tiştên pêşketî derketine. Aboriya berê jî ne ewqas bû. Lê niha zarokên min li gel min nemane. Ger jiyana berê ba, wê niha hemû zarokên min li gel min bana. Ji ber vê, jiyana berê ji ya niha xweştir bû. Niha pirr qetiliam û komkujî çêdibin."*[829]

Ji ber êşa belavbûna malbatê, gelek dayik dibêjin, ew nikarin li siberoja xwe û ya zarokên xwe bi tenduristî bifikirin. Lê belê derheqê vegera penaberan de bi jinên koçber û jinên li Rojava re hestên nakok peyda dibin. Jiyana di rastî û pergalên cuda de dihêle ku raman û têgihîştin ji hev dûr bikevin. Bi vî awayî gelek mirovên heman malbatê, ji hev du sil û biyanî bûne.

Jinên li Rojava dudilitî, nêzîkatiyên hesabî û ezezî yên hinek koçberan rexne dikin: *"Ew kesên ku çûn piştî demekê zarokên wan fêrî Elmanî dibin. Ew dibêjin: 'Zarokên me fêrî Elmanî bûne û di dibistanê de ne. Ez dixwazim vegerim, lê ji ber zarok nikarim.' Hinek jî dibêjin 'Erka Xweparastinê heye. Ji ber vê em venagerin.' Lê berê leşkeriya nîzama Beesê jî hebû. Ev du sal û nîv bûn, kesekî dengê xwe nedikir. Çima niha wê hinek zarokên xwe bidin û hinek jî nedin, wê zarokên xwe bişînin dewletan? Yên ku çûne derve niha dibêjin: 'Em ê bên û bi perên xwe li vir şirketan ava bikin û hûn ê tê de li cem me kar bikin.' Min ji wan re got, 'Na. Ev tişt çênabe. Saziyên me hene û em ê tê de kar bikin.' Mirovên dema ku pêwîstiya te bi wan hebe, dev ji te berdin û birevin, êdî baweriya mirov bi vî kesî nema tê. Dema pêwîstiya me hebû, em wekî xwuşk û bira dest bidin hev, me ew nedîtin. Piştî çûn, ew dibêjin, 'em ê vegerin'. Ew ê vegerin yan jî venegerin li cem me weke hev e. Dema ku vegerin jî qedrê wan li cem me nîne."*[830]

Siyaseta demografyayê ya dewletê û guhertinên demografîk ên ku encamên şer û aloziya li Sûriyê ne, bandoreke mezin li ser jiyana jin, çand û exlaqê civakê kirine. Mirovên ku ji ax û warê xwe hatine qutkirin, parçeyek ji jiyan, xweza û çanda xwe li pey xwe hiştine. Têkiliyên cîran û malbatî hatine veqetandin. Bi vî rengî jî bîra hevbeş a dîrokî û civakî lawaz bûye. Gelek kes êdî nema dikarin bibîranînên zaroktiya xwe bi hevdu re parve bikin. Çîrokên dapîr û dayikan ji ber bûyerên koçberiyê û zehmetiyên avakirina jiyaneke nû, di nav çandên cuda de ji bo gelek kesan girîngiya xwe nemane. Rista civakî û danûstandinên jinan di bin şertên koçberiya derveyî welat de çilmisîne. Li welatên xerîb gelek ji wan xwe bi tenê, bê ziman û bê nirx dihesibînin. Yên ku li welatê xwe mane ji gelek dost û xizman dûr ketine û bi cîranên nû re ji nû ve têkiliyên civakî ava kirine. Bi vî rengî di çanda jiyana rojane de gelek guhertin çêbûne.

Koçberiya ber bi derveyî welêt û ya li hundirê welat bandor li tevahiya warên jiyanê ya civaka Rojava kiriye û bûye sedema pirsgirêkên aborî, tenduristî, derûnî, perwerdeyî û malbatî. Rewşa koçberiyê nehiştiye ku zarok û ciwan perwerdeyeke bi îstîqrar bibînin; dîrok, ziman û çanda xwe baş nas bikin. Lewma gelek zarokên koçber ji derfetên bipêşketinê û avakirina nasnameya xwe bêpar bûne. Bi xetên stûr em dikarin bandorên koçberiyê li ser jin û civaka Rojava heta destpêka

[828] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Tirbespiyê re, 2017

[829] Hevpeyvîn bi Yadê Hemîde re, gundê Helincê ya Kobanê, 2017

[830] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Temirê re, 2017

sala 2018'an bi vî rengî şirove bikin. Lê belê, şerê dagirkeriyê yê dewleta Tirk li hemberî herêmên Rojava, diyardeya koçberiyê gihand pileyeke nû.

- **Qirkirina Etnîk a Dewleta Tirk li Bakurê Sûriyê**

Dewleta Tirk guhertina demografyaya Bakurê Sûriyê bi awayekî sîstematîk wekî rêbaza şer û qirkirina etnîk bi kar tîne. Gavên destpêkê di sala 2016'an de bi dagirkeriya herêmên Cerablus, Bab û Ezazê hatin avêtin. Di dewama wê de dewleta Tirk di şerê dagirkirina Efrînê de bi komkujî û gefên qirkirinê di 18'ê Adara 2018'an de zêdetirî 300 hezar Kurdên kantona Efrînê ji cih û warên wan derxistin. Di heman demê de dewleta Tirk bi hezaran çeteyên bi pirranî bi eslê xwe Ereb û Tirkmen ji herêmên Xûta, Dera û Idlibê tevî malbatên wan veguhestin şûn û warên Efrîniyan. Wê heman rêbaz di şerên dagirkeriyê yên payîza 2019'an de li dijî nişтecihên navçeyên Serêkaniyê û Girê Spiyê jî meşandin.

Tevî ku guhertina demografyayê bi darê zorê li gorî hevpeymanên navneteweyî dibe tawaneke li dijî mirovahiyê jî, dewleta Tirk van kirinan bi piştgiriya dezgeh û dewletên navneteweyi pêk anîne û wan didomîne. Bi propagandaya 'vegera koçberên Sûriyê' dewleta Tirk di sala 2019'an de qirkirineke nû ya etnîk bi êrîşên li dijî herêmên Girê Spî û Serêkaniyê da destpêkirin. Li wir jî dewleta Tirk gelan vediguhêze, sînoran diguherîne, çavkaniyên aborî û dîrokî talan dike, saziyên dagirkerî û bişaftinê bi cih dike. Salekê piştî van êrîşan, armanca dewleta Tirk a dagirkina tevahiya herêmên Xweseriya Demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hîna di rojevê de ye. Li gorî vê, wê pîlankeriyên xwe di civîn û saziyên navdewletî de pêşkeş kirine.

Daneyên rapora Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê (RMME) ya 17'ê Adara 2020'an pergala qirkirina etnîk ya dewleta Tirk li ser Kurdên Efrînê eşkere dike. RMME kirinên dewleta Tirk wekî 'paqijiya etnîk li dijî Kurdan' pênase dike: *"Rêjeya şêniyên Kurd li Efrînê niha ji sedî 18'an derbas nake, ev jî mezintirîn kirina guhertina demografiyê ye ku ji destpêka aloziya Sûriyê ya 2011'an ve pêk tê. Nêzî 400 hezar malbatên ji deverên dîtir bi taybetî ji gundewarên başûrê Idlibê û başûr-rojavayê Helebê li gund û navçeyên Efrînê hatin bicihkirin. Ji ber pirrbûna şêniyan, kampên bêserûber li tevahî herêmê hatin avakirin."*[831]

Di du salên dagirkeriya dewleta Tirk li Efrînê de zêdetirî 553 mirovên sivîl hatin kuştin. Ji wan 498 mirov di encama topbaran û bombebarana dewleta Tirk û komên girêdayî wê de jiyana xwe ji dest dane. 55 mirov jî di bin êşkenceyê de hatin qetîl kirin. Di encama bombebaran û teqandina mayînên arteşa Tirk û komên girêdayî wê de birîndarbûna zêdetirî 881 kesî, ku 303 ji wan zarok û 213 jî jin bûn, hat belgekirin. Dîsa di pêvajoya du salên dagirkeriyê de zêdetirî 6200 sivîlî hatin revandin, çarenûsa 3400 mirovan jî ne diyar e. Şêniyên Kurd bi armanca fîdyestandinê dûbare tên revandin û êşkence li wan tê kirin.

Li ser jinan qirkirineke taybet tê meşandin. RMME 61 rewşên tecawuzkirinê û 3 rewşên xwekuştinê yên jinan belge kirin, lê balê dikişine ser wê yekê ku '*ji bilî wê jî rojane destdirêjî li jinan tê kirin*.' Hêzên dagirker jin ji hemû qadên jiyana civakî dûr xistine, lixwekirina hîcabê li ser wan ferz kirine. Ji ber tirsa destdirêjî û revandinê jin newêrin ji malê derkevin.

Hêzên dagirker wekî parçeyekî siyaseta qirkirina etnîk, navên resen ên Kurdî yên şûnwaran hemû wergerandin navên Osmanî. Pirraniya 75 girên dîrokî ji aliyê dagirkeran ve hatin kolan, şûnwarên

[831] Rapora Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê (RMME), 17-03-2020

wan û yên 28 cihên din yên dîrokî dizîn. Cihên pîroz û goristanên ên gelê Êzdî hatin wêrankirin. Li şûna navên Kurdî yên gund, firoşgeh, sazî û kolanan, navên bi Tirkî hatin bicihkirin. Ala Tirk û wêneyên Erdogan li her deverê hatin danîn. Perwerdeya dibistanan bi zimanê Tirkî tê kirin û li ser cilên dibistanê yên zarokan ala Tirkiyeyê heye. Li ser şêniyan, derxistina nasnameyên dewleta Tirk hatiye ferzkirin.

Di heman demê de xweza û çavkaniyên jiyanê tên wêran kirin: Zêdetirî 200 hezar darên zeytûnê bi hedefa bazirganiyê hatin qutkirin û zêdetirî 10 hezar darên zeytûnê jî hatin şewitandin. Nêzî 11 hezar hektar zeviyên çandiniyê hatin şewitandin. *"Bi hezaran malên sivîlan bi zorê hatin desteserkirin û vegerandin girtîgeh û baregehên komên çete yên girêdayî dewleta Tirk."*[832]

Gelê Efrînê li hemberî pêkanînên qirkirina etnîk ya dewleta Tirk neçar mabû ji warên xwe derkeve. Lê belê wan nexwest dûrî axa xwe bikevin. Lewma wan li herêmên Şerawa û Şehbayê kon û wargehên xwe ava kirine, jiyan û berxwedan bi hev re bi rêxistin kirine.

Nûnerên jin ên sazî û meclîsên Kongra Star li Kampa Berxwedanê didin xuyakirin ku bi taybetî jin gelekî zehmetiyan di bin mercên koçberiyê de dikişînin: *"Jin diçin avê dikişînin, heta karekî xwe yê malê dikin, gelekî zehmetiyan dikişînin. Jin li Efrînê pirr rehet dijiyan. Lê gelek zehmetiyên koçberbûnê hene. Mînak piştî koçberiyê pirsgirêkên tenduristiyê jî zêde bûn. Bi taybetî ji milê nefsî ve gelek bandor li jin û zarokan bû. Ji aliyê jinê ve êşa herî mezin, derketina ji Efrîn bû. Derman ji bo vê êşê jî tinebû. Vê tesîrek pirr mezin li ser malbat û bi taybet jî li ser zarokan kir."*[833]

Feraset û kevneşopiyên zayendperest nexasim di mehên destpêkê yên piştî derketina gel ji Efrînê de careke din zindî bûn. Nûnerên komîn û meclîsên jinên Efrînê li Şehbayê dinirxînin ku bi taybetî fihûş, zewaca di temenê piçûk de û anîna pirr jinan wekî rêbazên şerê taybet û tundiya li dijî jinê bi armanca şikandina vîn û berxwedana jinê hatine bi kar anîn. Ew balê dikişînin ser wê yekê ku ji ber şertên kampê agahiya her kesî ji hev çêdibe: *"Di destpêka avakirina qampê de zahmetiyên ku me didîtin, nêzîkatiyên zilam li hemberî jinê bûn. Qebûlnekirina li vir jiyanê bû. Gelek caran pirsgirêk di navbera jin û mêran de derdiketin ji ber ku hîn fêrî jiyana qampê nebibûn. Gelek jin hatin berdan. Hevdu qebûlnekirin çêbûn. Zarokên piçûk tiştan dixwazin, lê derfetê jiyanê jî teng e. Ji ber wê jî jin astengiyan dibînin."*[834]

Jinên Kampa Berxwedanê balê dikişînin ser wê yekê ku *"çi dibe, bila bibe jin vala nasekinin û her tim xebatên xwe dimeşînin. Lê mêr jî ji ber ku di malê de dimînin pirsgirêkan derdixin. Piştre dema rêxistina jinê li vir hat avakirin, barê me hîn siviktir bû. Her yekê ji milê xwe, alîkarî bi jinan re dikir. Me giranî da perwerdan û civînan. Hîn zêdetir bi wan kesan re hat nîqaşkirin, ji bo ji kêmasiyan dûr bikevin. Niha, halê hazir hinekî başbûye. Qanûnên jinan ne tenê ji milê jinan ve hatin naskirin. Mêran jî edî qebûl kir û li ser van tiştan disekînin. Di koçberiyê de her tişt diqewime, şerê taybet li ser me tê meşandin, şerê nefsî li ser me tê meşandin. Divê em li hember vî şerê taybet hişyar bin."*[835]

Tevî ku topbaran û komkujiyên dewleta Tirk zêdetirî du salan li ser koçberên Efrînê didomin, ew

[832] Rapora Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê (RMME): *Li Efrînê paqijiya etnîkî: Nifûsa Kurd daket ji sedî 18'an*, ANF, 17-03-2020

[833] Nîqaşa bi nûnerên Meclîsa Kongra Star a Efrînê û saziyên jinê li Kampa Berxwedanê re, Şehba, 2019

[834] Çavkanî li heman cihî

[835] Çavkanî li heman cîhî [ibidÇavkanî li heman cihî]

biryardariya xwe wiha didin xuyakirin: *"Edî em ti gavê paş ve navêjin. Heta em vegerin ser axa xwe ya azad, heta em vegerin Efrîna xwe ya şîrîn, em ê li vir bimînin û li ber xwe bidin!"*

Gelên Serêkaniyê û Girê Spiyê jî heman helwestê nîşan didin. Dema êrîşên arteşa Tirk di 9'ê Cotmeha 2019'an de bi armanca dagirkirina herêmên Cizîrê dest pê kirin, careke din zêdetirî 300 hezar mirovî koçber bûne. Lê belê koçberiya derveyî welat pirr kêm çêbû. Şêniyên gund û bajarên ku bûn hedefa dagirkeriyê, êrîşên balafiran û topbarana arteşa Tirk bi pirranî xwe gihandin cihên ewletir hundirê herêmên Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Heman siyaseta qirkirina etnîk ku dewleta Tirk li herêma Efrînê dimeşîne, niha li bajar û gundên Girê Spî û Serêkaniyê yên dagirkirî jî hatine ferzkirin. Jinên Serêkaniyê û Girê Spiyê radigihînin ku dagirkeran bi armanca tirsandin û teslîmgirtina gel bi taybetî jinên ciwan direvînin û dest diavêjin wan. Hinek ji wan piştî ku çend rojan li cem çeteyên 'Arteşa Nişтîmanî' yên arteşa Tirk dîlgirtî bûn, dîsa vegeriyan cem malbatên xwe. Lê belê çarenûsa gelekan jî nediyar e.

Nîv salê piştî destpêka êrîşên li ser navçeyên Serêkanî û Girê Spiyê zêdetirî bi sed hezaran malbat hê jî li wargeh û dibistanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dimînin û jiyana xwe bi rêxistin dikin. Nediyariya siberojê ji bo gelên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemûyan didome. Lê gel bi israr in ku ew ê li ser axa xwe bi nasname û zimanê xwe azad bijîn, ji ber ku wan êşên koçberî û dagirkeriyê gelek dîtine.

Di pêvajoya berxwedana Serêkaniyê de rojnamevan Rojbîn Ekîn ev rastî û helwesta gelê Rojava li dijî qirkirina etnîk wiha şirove kiriye: *"Demeke dirêj e ku aramî û aştiyê li axa xwe nedîtine. Vê yekê baş dizanin û herî zêde pêdiviya wan bi aştî û aramiyê heye. Bûbûn şahidê gelek şeran, hemû awayên êşê şiyabûn, nedixwestin êdî şer û êşên din bijîn li welatê xwe, lê şerekî nû li pêşiya wan bû. Roja pêncan a êrîşên dagirkeriya dewleta tirk bû. Gelên Suryan, Kurd, Ermenî û Ereb neçar mabûn hemû tiştên xwe li dû xwe bihêlin û axa xwe biterikînin. Ew niha li axa xwe penaber in...*

Jiyana mirov li vir nediyarî ye, tu him nêzî jiyanê, him jî nêzî mirinê yî, di navbera her duyan de li cihek biyanî. Beriya 9'ê Cotmehê li vê axê ala azadî û hêviyê li ba dibû. Him ji bo kesên li vir dijiyan, him jî ji bo yên carna dihatin didîtin hestek pirr xweş a azadiyê ava dikir. Zarokên vî welatê bi rûyê herî xirab ê tarîtiyê re şer kiribûn û wan têk biribûn. Diviyabû we bidîta ku çiqas dixwestin wê ronahiyê li rûyê asîman binexşînin. Dilê wan wisa mezin û pak bû.

Êş û birînên fizîkî bi demê re baş dibin, lê birînên ku tu carî baş nabin hene. Tu êş bi qasî êşa dagirkirina welatê te ya ji aliyê hovan ve mezin û giran nîn e. Niha Rojava ji bo van hovan têk bibe şer dike, têdikoşe. Li vî welatî ti kes ji ber neçariyê nagirî û çarenûsa xwe radestî kesên din nake. Kesên ku dema ku delaliyên dilê xwe dispêrin axê jî rondikên xwe vedişêrin hene li van deran. Di destên wan de sêniyên heneyê, bi govend û tilîlî zarokên xwe bi rê dikin. Ew hê jî li piyan e, serbilind in, hêviyên xwe diparêzin û ji bo azadiya ku xeyal dikin li ber xwe didin."[836]

Di salên şoreşê de gelek rêbaz bi armanca guhertina demografyayê li ser jin û civaka Rojava hatine meşandin: Ji komkujiyên fizîkî, destdirêjiya rûmeta jinê û koçberiya bi darê zorê heta bi pêkanînên qirkirina çandî û aborî, dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê rêbazên qirkirina etnîk hemû ceribandine. Ev êrîş bûn sedema windahî, êş û birînên mezin. Lê belê jin û civaka bi zanebûna armancên van kiryaran vîn û biryara parastina ax û rûmeta xwe bi pêş xistine. Bi vî awayî ruhê

[836] Rojbîn Ekîn, Gotar: *'Rêwîtiya ji bo berxwedanê û şopên demê: Serêkaniyê',* Malpera *Women Defend Rojava*, 08-12-2019

berxwedana hevbeş ya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dijî siyaseta qirkirinên etnîk derket holê. Xurtkirina vê helwestê, parastina pergal û herêmên xweseriya demokratîk dermanê yekane ye li dijî siyasetên guhertina demografyayê yên ku wekî amûreke desthilatdarî û mêhtingeriyê tê ferzkirin.

- **Biryara Zarokanînê**

Daneyên xebata serhêjimara 16'ê Îlona 2016'an li kantona Cizîrê destnîşan dikin ku nêzîkî nîvê nifûsa kantona Cizîrê di bin 18 salan de ye. Her wiha li gorî hejmara zarokan, di temenê 0 heta 17 salî de xuya ye ku rêjeya anînazarokan serê salê beriya şoreşê û piştî sala 2011'an nêzî hev e.

Balkêş e ku di bin şertên herî giran ên şer û koçberiyê de jî meyla anînazarokan her tim zîndî maye. Endama Kongra Star a Kampa Berxwedanê ya Şehbayê Hecer Silêman dide xuyakirin ku dema derketina gel ji Efrînê, gelek jinan zarokên xwe ji dest dane: *"Yên hinekan di rê de zarokên xwe anîn dinyayê, yên hinekan ji ber wan çûn, zarokên hinekan ji tirsa mirin. Ji bo vê mijarê jî jinan pirr zehmetî kişandin. Piştî hatina Şehbayê, jinên ducanî hîn zêdetir bûn. Niha di vê qampê de 696 malbat hene, di van konan de dimînin. Di vê meha derbasbuyî de [meha Tebaxa 2019'an] herî kêm 320 zarok hatin dinyayê."*[837]

Em dikarin anîna zarokan di vê rewşê de wekî israra jiyanê binirxînin. Nexasim ji bo gelên tirsa qirkirinê li ser wan, zayîna nifşekî nû wekî helwesteke parastina hebûnê, xwedî wate ye. Dayik û bav hêvî dikin ku zarokên wan wê dîrok, çand, ziman, nirxên malbat û civaka xwe biparêzin. Berdewamiya qewmî, dibe misogeriya siberojê. Lê belê di warê siyaseta demografyayê de ya ku li ser bedena jinê bi armanca zêdekirina nifûsê tê meşandin hê jî ferasetên eşîrtî û baviksalar di civaka Rojava de serwer in. Li gorî vê ferasetê nirxê jinê bi dayikbûn û hejmara zarokên kur tê pîvan. Her çiqas di serî de zilam bi vî rengî nêzîkî jinê dibin, pirraniya jinan jî di bin bandora vê hişmendiya zayendperest de tevdigerin.

Bi rêya perwerdeyên jinan û yên civakî, nîqaş û hewldanên ji bo guhertina vê ferasetê hatine destpêkirin da ku jin bibe xwediyê biryarê derheqê anîna zarokan de. Jinên ciwan dibêjin, di nifşê wan de bi kêmayî jî be, hinek guhertin çêbûne û vîna jinê ji bo biryardayîna anîna zarokan û hejmara wan bi pêş ketiye. Lê belê bi giştî fêrbûnên kevneşopiyên baviksalar di vî warî de jî gelekî xurt in û koka xwe berdane jêr.

Di heman demê de em dikarin di çarçoveya nîqaşên li ser biryara anîna zarokan de nakokî û diyalektîka şoreşa jinê di civaka Rojava de binirxînin: Nêzîkatiya exlaq û zanista jinê hê jî di gelek aliyan de bi fêrbûnên baviksalar, hişmendî û derûniya jinan re di nava gengeşiyan de ye. Avakirina vîn û fikra azad a jinê tenê wê bi zanebûna jinê li ser heqîqeta xwe û wêrekiya hilweşandina fêrbûnên desthilatdar bi pêş bikeve. Lewma endamên saziyên jinan girîngiya Jineolojiyê destnîşan dikin. Ew dixwazin ku xebatên perwerde û ronakkirinê hîn berfirehtir û bi rêbazên qenaetî werin meşandin.

"Hinek tiştên ku Jineolojî dibêje, civak hemû qebûl nake. Tehlîlatên wê ji bo civakê baş in. Lê me hîn bingeh û rêgezên wê baş nedan naskirin. Ji ber vê, nîqaş û danûstandinên bi civakê re zêde zêde girîng in. Carekê me di civînekê de nîqaş kir. Me got, 'divê jin li ser xwe qebûl neke wekî makîna ya zayînê were dîtin û tenê karkeran û eskeran bîne. Zilam jinê bi kar tîne ji bo 6 lawikan

[837] Nîqaşa bi nûnerên Meclîsa Kongra Star a Efrînê û saziyên jinê li Kampa Berxwedanê re, Şehba, 2019

bîne.' Ev nêrîn wiha rasterast ji aliye gelek zilam û jinan ve nayê qebûlkirin. Mînak jineke Ereb li hemberî vê derket û digot 'çiqas tu zarok bînî, ewqas pişta te rast e û pêşeroja te wê hebe'. Hevjînê xwuşka min jî jê re dibêje, 'Her du salan carekê pêwîst e zarokeke me çêbibe.'

Lê çiqas tu zarokan bînî ji wextê te dixwe, ji tenduristî û bedena te dibe. Ew zarok pêşiyê li pêşketina jinê digire. Ji ber vê, çiqas Jineolojî zanista xwe nêzî civakê bike, ewqas ew ê bikare xizmeta guhertina civakê bike. Di parêznameya Serokatiyê de zanistek ewqas pêşketî heye, lê em hîn ne li gorî wî ne. Em di merhelekê de ne ku me hinek gav avêtin, lê hîn pêwîst e jin û civak gelek gavên din biavêjin. Ev jî bi zanistê re bi hev re çêdibe."[838]

Dema ku em rewşa zarokên ku bêxwedî mane tînin ber çavê xwe yan jî nêzîkatiya malbatên ku zarokên xwe û nexasim zarokên keç wekî 'bar' yan jî 'karkerên erzan' dinirxînin, xuya ye ku di mijara anîna zarokan de hişmendiyeke bi berpirsyarî pêwîst e. Hebûna her jinê, her zarokek yan jî her mirovî bi serê xwe nirxek e. Dema ku ew mirov bikare jiyana xwe watedar bike û nirxên civakî ava bike, ew di heman demê de berdewama gelê xwe diparêze û siberoja civakê misoger dike. Heger civak bi vî rengî bihizire û pêbihise, ew ê li hemû zarokan wekî yên xwe xwedî derkeve û her wiha vîna azad û biryara jinê di mijara zarokanînê de bê guman nas bike.

- **Kurteencamên Lêkolînê Derbarê Siyaseta Demografyayê de**

Di pêvajoya Şoreşa Rojava de civaka Kurd û bi giştî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriye bi xeterên siyaseta demografyayê wekî amûreke desthilatdarî û mêhtingeriyê re rû bi rû bûne. Bi şiklekî, bi koçberî û kiryarên qirkirina etnîk ên ku hêzên girêdayî dewleta Tirk û Sûriyê li ser gelan meşandine, bandor li her malbatê bûye. Lewma hişyarbûn û berxwedana civakê li hemberî hewldanên bişaftinê, dagirkerî û guhertina demografyaya herêmê bi pêş ketiye. Mirov beramberî rastiya şer û jicihkirinê, mirovan nirxê ax û jiyanê di serpêhatiyên bi êş de careke din hîs kir û nas kir.

Zanîn û hestên civakê ku derketin holê, ji têgihîştinên kevneşopiya xanedaniyê û mentiqê modernîteya Kapîtalîzmê derheqê demografyayê de cuda ne: Ne tenê xwezêdekirina fizîkî dikare rûmeta civake biparêze, ne jî wijdanê civakê dabeşkirina mirov wekî 'kêrhatî' û 'bêkêr' ango dabeşkirina gelan wekî 'yên mafdarê jiyanê' û 'yên mafdarê mirinê' qebûl dike. Jiyan, hîna nû bi xurtkirin û naskirina vîna cewherî ya gel û jinan watedar dibe. Tenê bi vî rengî civak dikare hebûna xwe wekî xwezaya sêyemîn biparêze. Bi avakirina pergala xweseriya demokratîk ve jin û civakê karibû hêza xweparastinê li hemberî hesabên siyasetên demografyayê yên ferasetên zayendperest, nijadperest, mêhtinger û qezanca zêde bidin xuyakirin. Lê belê hê jî êş û metirsiya van siyasetên qirkirinê didome.

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Suriyê, Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê, Kongra Star û Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS) bi belge, rapor û komxebatên li ser mijarên penaberî û koçkirinê, balê dikişînin ser wê yekê ku dewleta Tirk bi awayekî sîstematîk qirkirineke etnîk li ser herêmê dimeşîne. Belgeyên van saziyan piştrast dikin ku jin û zarok di wan êrîşan de bi taybet hedef hatine girtin.[839]

[838] Hevpeyvîn bi Leyla Saroxan re, Hesekê, 2017

[839] Self Administration of Northern and Eastern Syria: *Demographic change by the Turkish state in North-East Syria,* 07-11-2019; Kongra Star: *Effects of the Turkish invasion of North and East Syria on women and children,* 22-11-

Lê belê heta niha ti hêz gavekê ji bo dadgehkirin û rawestandina tawanên qirkirina çandî û etnîk li hemberî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li pêşber dadgeheke navneteweyî neavêtiye. Saziyên navneteweyî guhdariya şahîdên bûyerên sûcên li dijî mirovahiyê nekirine. Ji ber bêdengiya saziyên navneteweyî li hemberî dagirkeriya Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê, mirov ji siberojê gelek gumanê dikin. Heta siyasetên dijmirov ên ku bi darê zorê mirovan didin koçberkirin, neyên dadgehkirin û sekinandin, qirkirinên etnîk, trajediyên li ser rêyên koçberiyê û êşên mişextbûnê wê bidomin. Lewma hewldanên avakirina mekanîzmayên alternatîf yên dada jinê û dada gelan di asta navneteweyî de jî girîng tên dîtin.

Tevî ku gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di dîroka xwe ya bi hezaran salan de her û her koçberî û mişextbûn dîtine, wan li her cihê nû, careke din jiyaneke komînal bi çand û zimanê xwe ava kiriye. Nifşê roja îro jî ev rêûresma domandina jiyanê ku ji dayik û pîrên xwe fêrbûne di gelek waran de dewam dikin. Mînak, tenê çend hefteyan piştî ku gelê Efrînê koçberî Şehba bûye, jinan li pêşiya konên xwe yên piçûk li kampên penaberan bi hêviya vegera li warê xwe, gul û darên zeytûnê çandine. Lê herçiqasî ev damarên afirandina jiyanê xurt bin jî, westandin û bêzarbûn belav dibin, dema ku êrîşên qirkirinê û xetera dubarekirina koçberiyê ber bi cihekî dûrtir ve hertim di rojevê de bin. Ev yek nexasim bandorê li jiyana jin û dayikan dike, ji ber ku ew li bin şertên herî giran her tim dubare xwe ji bo avakirina jiyanê û debarê berpirsyar dibînin.

Mijareke din a girîng girêdayî demografyayê jî siyasetên desthilatdar in yên ku li ser bedena jinê bi armanca zêdêbûnê yan jî kontrolkirina nifûsê tên meşandin. Nêzikatiya baviksalar ya ku jinê wekî amûra anîna zarokan dibîne û qîmeta jinê bi hejmara zarokan (yên kur) dipîve zexteke mezin li ser derûnî û bedena jinê çêdike. Her zayîneke nû pîroziya jiyanê û hêviyên siberojê dihewîne. Lê belê dema ku qedrê jinê tenê girêdayî zayîna zarokan (yên kur) be di civak û malbatê de, jin nabe aydê xwe. Ew nikare kesayet û vîna xwe ya cewherî bide xuyakirin, ji ber ku ew tenê wekî 'dayika zarokan' tê naskirin.

Lewma girîng e ku di hişmendiya civak û jinê de her jin bi xwe jî wekî hebûneke bi nirx were dîtin. Tenê hingê jin dikare vîna xwe derheqê anîna zarokan de bide xuyakirin. Perwerde û nîqaşên bi beşdarbûna dayik û bav, jin û xortên ciwan li ser rêgez û şêwaza hevjiyana azad, dikarin bingehê têgihîştineke nû ya civakê ava bikin. Bi naskirina vîna jinê di mijarên anîna zarokan û biryarên jiyanê de, siyasetên demografyayê li ser bedena jinê nema dikarin encamê bigirin û jinê wekî amûrekê bi kar bînin.

h) Perwerde û Zanist

Perwerde di cewherê xwe de ragihandina zanîn û serboriyên jiyanê ji bo bipêşxistina takekes û civakê ye. Di dîrokê de çavkaniya yekemîn a zanîn û perwerdeyê xweza bû. Di serî de jin bi têkiliyên xwe yên bi xwezayê re zanînên bi feyde ji bo jiyana civakê bi dest xistin û bi civakê re parve kirin. Li ser vî bingehî dayikan perwerdeya jiyanê dida zarok û civakê. Pîvanên exlaqî û karên pêwîst ji bo domandin, parastin û xweşikkirina jiyanê hemû wê fêr kirin da ku zarok û civak

2019; NRLS: *Forûma Paqijiya Etnîkî û Guhertina Demokratfîk a li Efrînê ya Navneteweyî li* Amûdê, 2 heta 4-12-2018*; Encamnameya Komcivîn 'Qirkirina Etnîkî û Guhertinên Demografîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê*, 18-12-2019

bikarin bi xwe li ser piyên xwe bisekinin. Bi vî awayî em dikarin dayikê wekî mamosteya yekemîn a civaka exlaqî û polîtîk jî pênase bikin. Wekî koka peyvê 'perwerde' di zimanê Kurdî de jî destnîşan dike ku şêwaza fêrkirina dayikan 'perwer' bû. Yanî wan bi dilsozî û hezkirin şîret li zarok û civakê kirine. Her wiha kombûnên gund, şevbihêrk û rîtuel perwerdeyên komînal û xwezayî yên civakê bûne. Wekê din nîqaş û lêkolînên di saziyên bawerî û zanistê de yên wekî perestgeh, akademî, dergeh, medrese û manastirê, hatin bipêşxistin di ronakbûna civakê de ristekî girîng rabûn.

Lê belê di bin serweriya dewletê de armanc û şêwazên perwerdeyê hatin guhertin. Dewletê dibistan, zanîngeh û saziyên perwerdeyê ava kirin da ku ew bikarin yekdestiya xwe li ser naverok û karên perwerdeyê misoger bikin. Di van saziyan de nifşên nû bi hişmendiya baviksalar û li gorî berjewendiyên dewletê hatin mezinkirin. Li wir, rayedarên dewletê her dubare dogmayên xwe bi civakê dane jiberkirin û heta bawerkirin. Bi rêbazên xelat û cezayî wan reqabet, ferdperestî û serîtewandin di hişmendiya mirovan de dane rûniştandin. Pergala perwerdeyê ji aliyê netewe-dewletê ve wekî amûreke şehtkirin, bişaftin û mêhtingeriyê hatiye bi kar anîn. Êdî zarok nema dibin zarokên dayik û civakê, lê dibin yên dewletê. Li ser vî bingehî û bi vê armancê dewleta Sûriyê jî pergala perwerdeyê bi şêwazeke otoriter û nijadperest meşandiye, bandor li hişmendiya civakê û mirovan kiriye.

Ji bo ferd û civak bikarin xwe ji bandora hişmendî û perwerdeya desthilatdar û mêhtingeran rizgar bikin, gelek tevgerên rizgariya neteweyan yên sosyalîst û femînîst girîngî dane bi bipêşxistina rêbazên alternatîf yên perwerdeyê. Di têkoşîna azadiya Kurdistanê de Abdullah Ocalan xebatên perwerdeyê bi armanca avakirina kesayeteke azad û civakeke azad wekî peywîrên sereke yên şoreşê rave kirine û bi şêwazên diyalog û akademiyê ew meşandine. Bi rêbazên afirîneriyên perwerdeyê yên wekî dahûrandina kesayetê, teşwîqkirina xebatên lêkolînê yan jî perwerdeyên xweser ên jinan, ferd û civakê xwe nas kiriye. Bi vî rengî, wan karibû vîn, zanebûn û bixwebaweriya xwe bi pêş bixin.

Li ser vî bingehî yekem car bi şoreşa Rojava re pergaleke perwerdeya civakî û dibistanan bi zimanê dayikê û rêbazên alternatîf hatiye avakirin. Lipeyxwehiştina fêrbûnên zêhniyeta desthilatdar a zilamî û ya dewleta Beesê, ji nû ve zindîkirina zanîna civaka exlaqî û polîtîk û bipêşxistina hişmendiya neteweya demokratîk li ser bingehê azadiya jinê wekî armancên esasî yên xebatên perwerdeyê hatine diyarkirin. Di çarcoveya lêkolîna sosyolojîk de me xwest fêhm bikin: *Xebat, rêbaz û sazîbûnên zanist û perwerdeyê di pergala xweseriya demokratîk de çawa bi pêş ketine û çi bandor kirine? Gelo ew heta kîjan astê dibin bersiva pêdivî û bendewariyên jin û civakê? Destketî û pirsgirêkên di qada perwerdeyê de çi ne?*

- **Çavkaniyên Zanist û Zanînê**

Di civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jî bi bipêşketin û belavbûna girseyî ya teknolojiyên ragihandinê di sedsala 21'emîn de televizyon, înternet û medyayên civakî wekî Facebookê, wekî çavkaniyên zanînê tên şopandin. Li gel vê yekê, li şiroveyên oldaran û 'mezinên civakê' tê guhdarîkirin. Dîsa gelek kes agahî û ferasetên ku ji pirtûk û perwerdeyên dewleta Beesê girtine jî wekî çavkaniya zanînê dipejirînin. Lê çanda xwendinê, hewildanên lêpirsîn û lêkolînê di civakê de gelek lawaz mane. Di dorpêca zêhniyeta otorîter a Beesê û ya lîberalîzma modernîteya kapîtalîst

de mirov wek ne aydê xwe mezin dibin, xwe li gorî nihêrînên serwer eyar dikin, ji nakokiyan direvin û li rehetiyê digerin.

Anket û hevpeyvînên ku bi jinên ciwan re di Kanûna 2017'an de li bajarên Qamişlo û Hesekê hatine çêkirin, derdixin holê ku ji sê paran diduyê jinên ciwan wexta xwe ji xwendinê re venaqetînin. Tevî ku ew dibêjin, ew 'ji xwendinê hez dikin', ew pirraniya dema xwe bi şopandina medyaya civakî û leyîstokên înternetê li ser telefonên dijîtal dibihurînin. Gelek kes bi vê nakokiyê dihisin, lê belê xîret nakin ku vê rewşê biguherin. Bi vî rengî, gelek jinên ciwan ji zanînên bingehîn û berfirehî bêpar dimînin yên ku dikarin ji bo bipêşxistina hêza tehlîl û fikrên afirîneriyê werin nirxandin.

Serjimara kantona Cizîrê ya sala 2016'an destnîşan dike ku rêjeya jinên ku dibistan di ser asta seretayî de xwendine jî gelekî kêm e. Ji sedî 23,3'yê jin û keçên jorî 6 salî yên kantona Cizîrê nexwende ne û ji sedî 41,8'ê wan tenê dibistana seretayî xwendine. Ji sedî 8,8'ê jinan heta asta dibistana navîn, ji sedî 7,6'ê wan dibistana amadeyî û tenê ji sedî 2,1'ê wan di înstîtûyan de û ji ji sedî 2,7'ê wan jî zanîngeh xwendine. Di nav xwendekarên jin ên zanîngehê de 33 kesan doktora û 53 kesan master kiriye, 151 jinên bijîşk û 562 endezyar hene. Ev tê wateya ku rêjeya jinên akademîsyên ku şehadeya [dîploma] xwendina bilind wergirtine li kantona Cizîrê ji sedî 0,16'yê ye. Ji bilî vê jî tenê ji sedî 0,03'yê jinên kantona Cizîrê, perwerdeyeke pisporî ya pîşeyî dîtine.[840]

Asta xwendinê bandoreke mezin li ser derfetên peydakirina kar û debara jinan dike. Anketeke Weqfa Jinên Azad a Rojava ya sala 2016'an destnîşan dike ku asta xwendinê ya jinên 18 ta 59 salî, çiqasî bilind dibe, ewqasî jî derfetên wan ên kar bi destheq bêhtir dibin. Jinên nexwendî di peydakirina karên bi destheq de herî zêde zehmetiyan dikişînin. Li kantona Cizîrê rêjeya jinên 'bê kar' yên nexwendî ji sedî 45'ê; yên dibistana seretayî xwendine ji sedî 34'ê; yên dibistana navîn xilas kirine ji sedî 9'ê û yên amadehî ji sedî 7'ê ye. Di nav xwendekarên jin ên peymangeh û zanîngehê de rêjeya jinên ku 'bê kar' mane, tenê ji sedî 2'yê ye.[841]

Lê asta kêm a xwendinê ne tenê bandor li ser derfetên debarê dike. Di heman demê de gelek jin di hevpeyvînan de dane xuya kirin ku wan ji ber kêmbûna xwendinê pirsgirêkên xwebawerî, di meşandina karên jiyanê û perwerdeya zarokan de jî zehmetiyan dikişînin.

Di xebatên perwerde û înşayê yên şoreşê hemûyan de analîz, pirtûk û parêznameyên Abdullah Ocalan wekî çavkaniyên sereke hatine nirxandin. Agahî û şiroveyên felsefîk, dîrokî, siyasî û sosyolojîk yên van çavkaniyan dibûn hêz û rênîşana avakirina qada perwerdeyê û hemû rehendên neteweya demokratîk. Wan rê vekir li pêşiya bipêşketina kesayet û guhertina zêhniyeta civakê. Ji bo bipeşxistina raman û vîna azad a takekesî û civakê, avakirina pergala perwerde, akademî û dibistanan wekî yek ji peywirên herî girîng ên Şoreşa Rojava hatiye pênasekirin. Bi avakirina saziyên perwerdeyê re nîqaşên ji bo guhertina hişmendî û rêbazên perwerdeyê jî hatine meşandin.

Bi armanca misogerkirina şoreşa jin û civakê ji sala 2013'an ve xebatên Jineolojiyê li Rojava hatine destpêkirin û piştre bi şêwaza akademiyê hatine birêxistinkirin. Jineolojî li ber parçekirina jiyan û zanistan radibe. Ew hemû berhemên xwezayî, çand û keda mirovan wekî çavkaniyên zanist

[840] NLSR: *Encamên Serjimara li ser Rewşa Xwendina Jinên Kantona Cizîrê*, 2016

[841] WJAR: *Anket li ser hejimar û radeya jinên bêkar ên temenê wan ji 18 heta 59 salî li herêma Cizîrê*, 2016

û zanînê dipejirîne û bi her warê jiyanê re elaqedar dibe. Li gorî pêdiviyên şoreşa jinê Akademiya Jineolojiyê xebatên xwe ji bo peydakirina çavkaniyên resen û nû yên zanînê, rêbazên lêkolîn û perwerdeyê bi cewhera jinê dan destpêkirin. Pêkanîna vê lêkolîna sosyolojîk li Rojava bûye yek ji encamên van xebat û lêhûrbûnan. Her wiha di navbera salên 2017 û 2019'an de Navendên Jineolojiyê yên Lêkolînê li Efrîn, Dêrik, Minbic, Hesekê û Kobanê hatin avakirin. Bi vî awayî xebatên ji bo eşkerekirin û nirxandina çavkaniyên zanist û zanînên dîrokî, çandî û civakî yên jinên Bakurê Sûriyê ji bo bipêşxistina şoreşa duyemîn a jinê li ser vê erdnîgariyê hatine destpêkirin.

- **Dibistanên Neteweya Demokratîk**

Avakirina pergala nû ya perwerdeya li dibistanan di sala 2011'an de bi birêxistinkirina Saziya Zimanê Kurdî perwerdeyên zimanê Kurdî, dest pê kiriye. Wekî gava yekemîn mamosteyên zimanê Kurdî hatin perwerdekirin û amadekariya pirtûkên dibistanê hat meşandin. Polên dersa zimanê Kurdî di sê astan de hatin vekirin. Ji sala 2012'an ve dersên zimanê Kurdî wekî babeteke di dibistanan de hatiye dayîn. *"Yên ku di destpêka şoreşê de digotin, 'Em ê mamostetiyê bikin, em ê xebatên çandê bikin' bi rastî fedayî bûn. Wan hîn nizanibû wê çi çêbibe. Dewlet ber kêleka wan sekinî, lê wan digot, 'Em ê bikin! Ger dewlet hat jî bila em bibin fedayî, nehat jî wê ji me re bibe dîrok.' Wan herdu ihtîmal jî dianîn pêşiya xwe û gavên xwe diavêtin."*[842] Yek ji van mamosteyên destpêkê yên zimanê Kurdî ku her tişt dabûn ber çavê xwe, mamoste Zekiya ji Amûdê bû: *"Ji 7'ê Mijdara 2011'an ve me bi pirr kêm derfetan ev xebat dest pê kir. Kehrebe tine bû. Me çira pêdixist ji bo ku em bikarin dersê bidin. Du odeyên me ji axê hebûn. Me kom bi kom perwerde dida û derbasê dibistanê dikir. Rejîm jî hebû. Wan qebûl nedikir. Lê dîsa em diçûn dibistanên wan."*[843]

Li aliyekî bingehê perwerdeya bi zimanê dayikê hat amadekirin. Li aliyê din jî xebatên ji bo sazkirina pergaleke perwerdeya neteweya demokratîk bi armanca bipêşxistina kesayet û civaka azad, hatin destpêkirin. Sazîbûneke nû û rêbazên nû pêwîst bûn da ku dogma û qalibên zêhniyeta desthilatdariya Beesê li paş bên hiştin. Bi vê armancê ve girêdayî, tecrûbeyên pergala perwerdeya bi zimanê Kurdî li wargeha Mexmûrê û yên gelek welatên cîhanê hatin lêkolan. Dîsa ji ceribandinên pedagojî û perwerdeyên alternatîf sûd hat wergirtin. Hevseroka Desteya Perwerdeyê ya Kantona Cizîre dibêje, wan di 11'ê Mijdara 2012'an de biryar da ku êdî dibistanên seretayî li ser bingehê perwerdeya bi zimanê dayikê û bi armanca bipêşxistina vîn û ramana azad a şagirtan bên vekirin.

Mamosteyên ku di avakirina pergala dibistanan de cih girtine, dibêjin, xala herî girîng guhertin û veguhertina zêhniyeta mamosteyan bûye yên ku di pergala Beesê de perwerde bûbûn: *"Desthilatdariya Beesê ev feraset dabû rûniştandin: Bila zarok bixwîne ji bo di dawî de bawernameyê bigire. Ev bibe wezîle ji bo ew bikare pê kar bibîne, ratib bigire û rehet bikare debara xwe bike. Zarok ji bo jiyanê fêrî çi bibin, çi dixwînin û bawername çawa digirin, ne girîng bû. Dewletê tenê qalibek ji mirov re danîbû. Ji ber vê jî em niha dibînin ku di pirraniya kesên ku di sîstema Beesê de mane ew zêhniyeta hişk a baregeha leşkerî heye. Ew di cihekî de mezin bûye ku tenê xetek û fikrek nas kiriye. Ji vê zêdetir nikare biaxive, şirove bike yan jî bide.*

Bi rastî bi kesên ku di wê sîstemê de zêde mane û ew zêhniyeta qalibî girtine, em zehmetiyan dişikînin. Bi Erebî ji bo vê rewşê tê gotin 'dûma muteherîka' [kûkla]. Ji ber vê di avakirina pergala

[842] Hevpeyvîn bi Necbîr re, Tirbespî, 2017

[843] Hevpeyvîn bi endamên Komîteya Perwerdeya Civakî ya Demokratîk (KPCD) re, Amûdê, 2018

perwerdeya xweseriya demokratîk de me girîngî da bi guhertina zêhniyetê û perwerdeyên fikrî yên mamosteyan. Beriya ku em wane û rêbazên perwerdeyê didin, em perwerdeya fikrî didin ji bo mirov bixwe bikare bibe keseke/î afirîner û xuliqkar. Ev girîng e ji bo mamoste ne tenê li gorî pirtûkekê waneyekê bide û here malê. Na. Pêwîst e mamoste li ser bifikire ew ê bixwe çawa nifşekî rake ku bikare jiyanê biafirîne, bi zanistî bifikire û azad biaxife."[844]

Ji bo rûniştandina hişmendî û pergala perwerdeya neteweya demokratîk, xebateke bingehîn pêwîst hatiye dîtin. Lewma akademiyên mamosteyan li her sê kantonên Rojava hatine avakirin. Di van akademiyan de xebatên perwerde û lêkolînê bi armanca bipêşxistina zêhniyet, çand û rêbazên perwerdeyê yên ji bo avakirina kesayet û civaka azad, hatine meşandin. Akademiya Ş. Dorşîn li Cizîrê û Akademiya Ş. Arîn Mirkan li Efrînê wek akademiyên xweser ên mamosteyên jin hatine sazkirin. Her wiha di Akademiya Ş. Azîz de perwerdeyên mamostetiyê bi zimanê Erebî tên meşandin. Dewreyên di van akademiyan de herî kêm du mehan dikişînin. Dîsa di betlaneyên havînê de jî perwerdeyên mamosteyan tên lidarxistin û amadekariya sala nû tê kirin. Bi van perwerdeyan re hewl tê dayîn ku çanda xwendin û lêkolînê di nav mamosteyan bê bipêşxistin da ku ew bikarin xwendekar û civakê teşwîqê xwendina pirtûkan û lêkolîne bikin.

Hevseroka Desteya Perwerde û Xwendinê ya Kantona Cizîre Semîra Hec Elî dide xuyakirin ku di avakirina pergala perwerdeya dibistanan de gelek pirs û pirsgirêkan wan çêbûne: *"Di destpêka şoreşê de civaka me ji guhertinan re ne pirr vekirî bû. Di gelek aliyan de nezelalî hebû. Gelo paşeroja zarokên me wê çawa bibe? Ji 2014'an ve me pergala dibistanên bi zimanê dayikê xist meriyetê. Pê re, him pirsgirêk him jî kêfxweşî di civakê de çêbûn. Bi carekê gelek dayikan zarokên xwe anîn dibistanan. Lê hejmara mamosteyên me hîna kêm bû. Lewma gelek zarok di polan de bi hev re hatin perwerde kirin. Me zor û zehmetî didîtin. Lê civaka me ji me re dibû alîkar. Me dît ku gelek malbat girîngiyê didin perwerdeya zarokên xwe. Ew jî dixwazin ku zarok bixwînin û bikarin paşeroja xwe ava bikin."*[845]

Hinek dayik elaqedariyeke mezin nîşanî perwerdeya zarokan didin û wan bi şopandina dewr û dersên zarokên xwe tevî wan xwe fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî kiriye. Ew bi kêfxweşî dibêjin, ji zarokên xwe tiştên nû fêr dibin. Lê belê hinek mamoste jî gazindan dikin ku malbat zêde balê nadin perwerdeya zarokan û li hêviyê dimînin ku mamoste barê perwerdeya zarokan bi giştî bigirin ser xwe. Di dibistanên dewleta Sûriyê de rêbazên cezayê wekî lêxistin yan jî piçûkxistina zarokan hatine bi kar anîn. Ev yek di dibistanên xweseriya demokratîk de hatiye qedexekirin. Hinek mamoste û malbat didin xuyakirin ku di peydakirina rêbazên bi bandor ên perwerdeya zarokan de li gorî pîvanên pergala xweseriya demokratîk, ew hîna zehmetiyan dikişînin.

Beranberî vê, hevseroka Desteya Perwerdeyê dibêje ku şêwazeke nû yê danûstandina bi zarokan re pêwîst e da ku sedemên kêmasiyên zarokan eşkere bibin û mirov wan li pey xwe bihêle: *"Cem me parastina mafê zarokan esas e. Li gorî vê divê em û mamoste jî danûstaninên xwe bi zarokan re rast bikin. Lêxistina zarokan hatiye qedexekirin. Platformên rexne û rexnedayînê yên çend mamosteyên ku şidet li hemberî zarokan bi kar anîn, hatin çêkirin. Hinek kes jî ji mamostetiyê hatin dûrxistin. Malbat carna dibêjin, 'dema guhdarî nake, li zarokê min xe'. Lê çênabe tu li zarok xî! Tu wê demê îradeya wî dikujî. Dema zarokek pirr çalak be û nasekine, ev tê wateyê ku tiştek di mejiyê wî/wê de heye. Divê em vê zarokê fêhm bikin ji bo em bikarin kesayeta wî/wê ava bikin û ne*

[844] Hevpeyvîn bi mamoste Menal re, Dêrik, 2017

[845] Hevpeyvîn bi Semîra Hec Elî re, hevseroka Desteya Perwerdeyê ya Kantona Cizîrê, Qamişlo, 2017

kesayeta wî/wê tine bikin."[846]

Ji bo danûstandinên di navbera şagirt, mamoste û malbatê de xurttir bibin û çareseriya pirsgirêkan werin nîqaşkirin di dibistanan de civînên dayik û bavan biserûber tên lidarxistin. Bi vî awayî hewl tê dayîn ku şopandina bipêşketina zarokan weke berpirsyariyeke hevbeş û civakî were dîtin. Wekî din karên dibistanê yên wekî paqijî yan jî tadîlata dibistanan mamoste, şagirt û malbat bi hev re dimeşînin. Di komîteyên dibistanan ên wekî komîteyên çand, tenduristî, perwerde û paqijiyê de nûneriya şagirtan jî heye û ew jî tevlî xebatan dibin. *"Di dibistanan de komîteya tenduristiyê jî heye. Em li ser paqijî û tenduristiya zarokan disekinin. Em zarok û dayikan fêr dikin ka ew çawa dikarin xwe li hemberî nexweşiyan biparêzin û aşî [derziya xweparastina ji nexweşiyê] çêdikin. Komîteya şopandinê jî heye. Ew waneyên dibistanê û têkiliyên mamoste, xwendekar û malbatan dişopînin û di çareseriya pirsgirêkan de dibin alîkar."*[847] Bi vî rengî, zarok û malbat fêrî berpirsyariya jiyanê dibin. Di heman demê de ew hêza xwe ya nirxandin, lêpirsîn û çareseriyê derdixin holê.

Nûnerên Desteya Perwerdeyê destnîşan dikin ku mamosteyên jin bi risteke girîng di avakirina çanda perwerdeya demokratîk de rabûne: *"Niha her kes dikare rehet biaxive. Em avakirina civakeke nû di kesayeta zarokan de armanc dikin. Mamosteyên jin bi roleke girîng radibin. Em nîqaş dikin: Ji bo nefsiya zarokan çi pêwîst e da ku ew bikarin kesayeta xwe azad ava bikin, îradeya xwe îfade bikin û jiyana xwe ava bikin."*[848]

Salekê piştî vekirina polên yekemîn ên dibistanên bi perwerdeya zimanê dayikê di sala 2015'an de Konferansa yekemîn a Komiteya Perwerdeya Civaka Demokratîk (KPCD) hatiye lidarxistin. Delegeyên konferansê ji herêmên Efrin, Kobanê û Cizîrê encamên xebatên xwe nirxandin. Di vê konferansê de biryar hat dayîn ku pergala nû ya perwerdeyê li tevahiya herêmên Rojava ji refê 1'ê heta 6'an li dibistanan pêk were. Li gorî vê, zarokên di refên 1 heta 3'yan tenê bi zimanê xwe ya zikmakî dixwînin ji bo bingehekî baş deynin. Zarokên di refên 4 heta 6'ê de ji bilî zimanê xwe wê fêrî zimanekî din ên pêkhateyên cuda jî dibin. Bi vî rengî zarok him dikarin fêrî ziman û çanda xwe bibin him jî danûstandina xwe bi zarok û civaka pêkhateyên din re bi pêş ve bibin. Her wiha ji bo bipêşxistina asta zanist û perwerdeyê peymangeh û zanîngeh jî hatine vekirin.

Di havîna 2017'an de pergala dibistanan gihişt astekê ku 17 hezar mamoste di 1950 dibistanên seretayî yên kantona Cizîrê de xebatên perwerdeyê meşandin û 170 hezar zarokan karnameya xwe wergirt. Li kantona Efrînê di 318 dibistanan de perwerde bi zimanê dayikê hat dayîn. Ji bilî perwerdeyên di dibistanên seretayî de, êdî waneyên dibistanên navîn û amadehî jî li Efrînê bi zimanê dayike hatin dayîn. Bi giştî nêzikî 2800 mamoste hebûn, ji wan qederê 2200'î jin bûn. Li kantona Kobanê piştî pêvajoya şer û koçberiyê careke din pergala perwerdeyê bi zimanê Kurdî di demeke kin de ji dibistana seretayî heta amadekariya dibistanên amadehî hatiye birêxistinkirin. Li wir jî ji sedî 90'ê mamosteyan jin bûn.

Li herêmên ku bi şerên giran ji zilmkariya DAIŞ'ê hatin rizgarkirin yên wekî Hol, Şedadê û Minbicê ji nû ve dibistan û pergala perwerdeyê hatiye avakirin. Di dema dagirkeriya çeteyên

[846] Çavkanî li heman cihî

[847] Hevpeyvîn bi endamên KPCD re, Amûdê, 2018

[848] Hevpeyvîn bi Semîra Hec Elî re, Qamişlo, 2017

DAIŞ'ê de dibistan hemû hatibûn girtin. Zarokên di van herêman de nêzî sê, çar salan bê perwerde mane û bûn şahidên nêzîkatiyên hovane. Lewma malbatên li wan herêman, beriya her tiştî xwestine ku tavilê dibistanên zarokan werin vekirin. Ji ber vê KPCD'ê giranî daye dewreyên perwerdeyê ji bo mamosteyên Ereb.

Ji bo nirxandina tecrûbeyên avakirina pergala perwerdeyê di sala 2017'an de duyemîn konferansa KPCD'ê û yekemîn konferansa Perwerdeya Jinên Bakurê Sûriyeyê hatine lidarxistin. Delegeyên ji herêm û pêkhateyên Rojava hemûyan û yên ji cihên wekî Minbic, Reqa, Tebqa, Derazor, Heleb û Şamê jî beşdarî konferansan bûn. Bi biryarên van konferansan perwerdeya bi zimanê dayikê û feraseta neteweya demokratîk kete refên 7 heta 9'an ên dibistanên navîn. Her wiha armanc bûye ku ji sala 2018'an û pê ve jî perwerdeyên bi vê ferasetê û van rêbazan di refê 10'an ên dibistanên amadehî de werin destpêkirin. Li gorî vê jî minhac [mufredat] û pirtûkên dibistanan ên waneyan hemûyan bi zimanên Kurdî, Erebî û Suryanî hatin amadekirin. Wekî din dewreyên perwerdeyê ji bo mamosteyên ji pêkhateyan hemûyan hatin lidarxistin.

Di sala 2018'an de li seranserê Bakurê Sûriyê bi giştî 32 hezar mamosteyan karê perwerdekariyê li dibistanên xweseriya demokratîk kirine. Ji wan 21 hezar di dibistanên herêma Cizîrê de peywirdar bûne. Di dawiya sala xwendinê 2019/2020'an de bi giştî 269.795 xwendekar li herêmên Firat, Cizîre, Şehba, Heleb xwendine. Balkeş e ku ji sedî 53,81'ê xwendekarên asta navîn û ji sedî 60,65'ê xwendekarên dibistanên amadeyî xwendekarên keç bûne. Lê belê di dibistanên seretayî de rejê yê xwendekarên keç tenê ji sedî 48,93 bûye.

Endamên rêveberiya jinê ya Komîteya Perwerdeyê ya Civaka Demokratîk (KPCD) ya Bakurê Sûriyê, didin zanîn ku li herêmên bi pirraniya nifûsa xwe Ereb, di warê karkirina jinên ji derveyî malê de bêhtir astengiyên girêdayî zayendeperestiyê derdikevin holê. Lewma li gorî texmînan, rêjeya mamosteyên jin bi giştî kêm bûye, lê belê dîsa jî ji nîvî zêdetir e. Asta têgihiştin û pêkanîna pîvanên perwerdeya neteweya demokratîk, mamoste Hêvîdar wiha dinirxîne:

"Di hêla gotinan de guhertin hene, lê belê di pratîkê de gelek zehmetî hene. Hîn wext divê, heta pêk were. Ji ber çanda welatparêziyê ya ku ji aliyê Serokatiyê ve hatiye rûniştandin li herêmên Kobanê, Efrîn û Cizîrê fêhmkirinek heye. Mînaka herî baş ji bo pergala perwerdê, herêma Efrînê bû. Heta zanîngehê bi zimanê Kurdî hatibû avakirin. Li herêma Cizîrê jî her sal pêşketin çêdibin. Lê belê li herêmên Ereb ên ku nû hatin rizgarkirin, di fêhmkirina paradigmaya neteweya demokratîk de zêdetir zehmetî hene. Lê kesên ku wate didin lê xwedî derdikevin. Niha em giraniyê didin avakirina dibistanên li herêmên Ereban. Her wiha hewldanên me ji bo avakirina pergala perwerdê, dibistan, minhac û peymangehên bi zimanê Suryanî hene. Lê hinek zehmetî hene ji ber ku hinek kesên pêkhateya Suryanî bi zimanê Erebî, hinek jî bi zimanê Suryanî dixwazin."[849]

Di heman demê de perwerde û rêxistinbûna xweser a mamosteyên jin di bin banê KPCD'ê de hatine bipêşxistin. Carna rexne çêdibin, dibêjin, jin wekî mamosteyên civakê rista xwe li hinek cihan kêm pêk tînin. Bi armanca xurtkirina vîn, xebat û yekîtiya mamosteyên jin di 3 û 4'ê Tebaxa 2018'an de Konferansa Yekemîn a Jinên KPCD'ê di asta Bakurê Sûriyê de hatiye lidarxistin. Her wiha Meclîsa Mamosteyên Jin hatiye avakirin. Piştî vê konferansê li herêma Cizîrê amadekariyên ji bo dayîna dersên Jineolojiyê li refê 10'an yê dibistanên amadehî hatine destpêkirin. Beriya vê, waneya Jineolojiyê li Efrîn û Kobanê ketibû mifredatên dibistanên amadeyî. Lê belê ji ber ku

[849] Hevpeyvîn bi endamên rêveberiya jinê ya KPCD'ê re, Qamişlo, 2018

amadekariya mamoste û pirtûkan di demeke pirr kin de hatibû kirin, li hinek cihan lawaziyên perwerdedayîn û fêhmkirinê çêbûbûn. Lewma perwerdeyên taybet ji bo amadekariya mamosteyên Jineolojiyê hatin birêxistinkirin.

- **Jin wek Mamosteyên Civakê**

Di sala 2017'an de qederê 11 hezar mamosteyên jin di dibistanên herêma Cizîrê de, 1743 li herêma Firatê û 1435 mamosteyên jin li herêma Efrînê erkdar bûn. Bi vî rengî rêjeya mamosteyên jin dibû nêzî ji sedî 85'ê mamosteyên dibistanên li herêmên Rojava. Tevî ku gelek mamosteyên jin di hêla mamostetiyê de seketî bûn jî, wan demeke dirêj xwe ji bo erkên rêveberiyê amade nedidît. Di encama perwerdeyên xweser ên mamosteyên jin de yên wekî dewreyên di Akademiyên Şehîd Dorşîn û Jineolojiyê de vîn û bixwebaweriya mamosteyên jin sal bi sal xurttir bûye.

Her wiha mamosteyên jin di civînên xweser ên di asta bajaran de pirsgirêkên xwe û rêbazên têkoşînê li hemberî ferasetên desthilatdar nîqaş dikin. Bi vî awayî sala 2017'an li şûna erkdarkirina midûrê dibistanan, êdî pergala hevserokatiyê li dibistanan û tevahiya saziyên perwerdeyê hatiye rûniştandin. Lê belê mamosteyên jin rave dikin ku rûniştandina çanda demokrasiyê ne hêsan e. Malbatên xwendekaran hê jî bi pirranî berdevkê zilam muxateb dibînin.

"Ji sedî 80 - 90'ê mamosteyên me jin in. Lê belê di destpêkê de tirs ji erka rêveberiyê hebû. Ji ber, jin fêr bûbûn ku di bin serweriya zilam de kar bikin. Lewma destpêkê di gelek dibistanan de mamosteyên zilam bi raya jinan wekî midûrên dibistanan hatin hilbijartin. Îsal [2017] me pergala midûrtiyê rakir. Du mamoste bi hev re ji bo dibistanekê berpirsyar in. Divê jin di hemû cihên biryardayînê de hebin. Li cihên ku jin berpirsyartî radikin, xebat bi wijdan û baştir tên meşandin. Niha di tevahiya beşên qada perwerdeyê de pergala hevserokatiyê ket meriyetê. Lê li hemberî feraseta 'jin hevserok e û mêr jî serok e' em hê jî têdikoşin."[850]

Ji bilî erkên dibistanê, pirraniya mamosteyên jin bi erkên dayiktî û karê malê jî bi tenê radibin. Ji bo dayik zêdetir derfetên tevlîbûna kar û jiyana civakî bibînin û zarok bikarin bi hev re bingehekî baş ê bipêşketina kesayeta xwe ava bikin, li gelek bajaran rewda [baxçeyê zarokan] û pêşdibistan bi zimanê dayikê hatine vekirin. Di sala 2019'an de 2712 zarok li herêma Cizîrê diçûn baxçeyên zarokan.

Lê dîsa mamosteyên jin balê dikişînin ser wê yekê ku dîsa *'tevahiya barê malê li ser pişta jinê ye'*. Lewma gelek ji wan gazinê dikin ji westanê û nexweşiyan. Bi birêxistinbûna xweser di bin sîwana KPCD û Kongra Star de hevgirtin û parvekirin di nav mamosteyên jin de bi pêş ketiye. Wekî din beşdarbûna mamosteyên jin a li çalakiyên siyasî û civakî xurttir bûye. Ew balê dikişînin ser vê yekê: *"Yek ji erkên me jî têkiliyên civakî ne. Dema yek ji mamosteyên me nexweş dikeve, eza hebe, dawet hebe, em hemû diçin cem. Di kêfê û şînê de em li cem hev in."*[851]

- **Perwerde û Pirtûkên ji bo Azadiya Jin û Civakê**

[850] Hevpeyvîn bi Semîra Hec Elî re, Qamişlo, 2017

[851] Hevpeyvîn bi endamên rêveberiya jinê ya KPCD'ê ya Amûdê re, Amûdê, 2018

Endamên Desteya Perwerdeyê û mamoste dinirxînin ku pirrbûna hejmara jinan di avakirina pergala perwerdeyê de bandorekê erênî di hêla danîna feraseta neteweya demokratîk, pîvan û nihêrînên perwerdeyê û xuluqkariyê de çêkiriye. Ew bi serbilindî dibêjin: "*Di salên şoreşê de me nehişt ku zarok bê xwendin bimînin."* Tevî ku gelek tengasiyan jî, di nava sê salan de pergala perwerdeya dibistanên seretayî bi zimanên dayikê yên Kurdî, Erebî û Suriyanî li Rojava hatiye rûniştandin. Mamoste, pirtûk û materyalên nû yên dibistanê bi her sê zimanan hatin amadekirin.

Ji bilî zimanê dayikê şagirt ferî zimanekî pêkhateyên din jî dibin. Di dibistanên navîn de dersên zimanên biyanî yên wekî Ingilîzî û Fransî jî tên dayîn. Li şûna dersa ola Îslamê ku li dibistanên dewletê tê dayîn, di minhacê dibistanên xweseriya demokratîk de waneya Çand û Exlaq heye. Mamoste Nûjîn di saziya minhacê û amadekariya pirtûkên dibistanê de cihê xwe digire û girîngiya dersa Çand û Exlaq wiha îfade dike: *"Xwendekar çanda kevin, ya nû, ya xwe û ya cîranan fêr dibin. Dema zarok fêrî nêrînên Zerdeşt û Manî yan jî Îsa li ser exlaq dibin, ew dikevin nava pirs û lêkolînan: çima rewşa civakê îro cuda ye? Niha em amadekariya pirtûkê li ser dîroka baweriyan amade dikin. Ji ber her gel xwedî baweriyekê ye. Em dixwazin baweriya gelan hemûyan bidin naskirin. Bi yekîtiya baweriyan re em li ser vê dixebitin."*[852]

Her wiha mijarên di waneyên Civaknasî û Jineolojî de jî ji bo lêpirsîna fêrbûnên zayendperest û guhertina zêhniyeta kevnperest xwedî risteke girîng in. Endamên rêveberiya jin a KPCD'ê rave dikin ku hê jî gelek fikrên wan di mijara azadiya jinê de bi gişt nayên qebûl kirin. Di serî de hinek xwendekar, mamoste û malbat li hemberî dayîna waneya Jineolojiyê derketin. Beramberî vê rêveberiya jin a KPCD'ê hewl dide ku bi xwebaweriya keç û jinan, ya şagirt û mamosteyan bi pêşbixe da ku ew bikarin li ber ferasetên eyb û şermdîtinê di malbatên xwe de rabin, vîna xwe nîşan bidin.

"Lê derbaskirina ferasetên zayendperest hêdî dimeşe. Perwerdeya malbat û ya dibistanan ji hev cuda ne. Ji ber vê, divê em bêhtir hevkariyê bi malbatan re pêş bixin. Pêşketin hene. Hinek dê û bav bi rêya zarokan tiştên nû yên çanda demokrasiyê fêr dibin. Lê ji bo hinekan giran tê, nêrînên wan hişk in. Lê mirov dikare guhertinê jî bibîne. Mînak, berê kesî cilên Kurdî li xwe nedikirin. Piştre hinek xwendevanan di şahiyan de li xwe kirin û pê re dayikên wan jî li xwe kirin. Dema ku mirov tiştên rast û xweş dibînin, hêdî hêdî îqna dibin. Hinek malbat jî dibêjin, bi dersên dibistanê re êdî zarok nema tiştên li malê xira dikin, lê ava dikin û diparêzin. Çanda malê jî tê guhertin."[853]

Pirtûkên dibistanê jî bi armanca guhertin û veguhertina civakê bi baldarî tên amadekirin. Wekî rêgez hatiye pejirandin ku pirtûk hemû li ser bingehekî zanistî yê ku ji aliyê pêkhateyan hemûyan ve tê pejirandin, bi hişmendiya neteweya demokratîk, dûrî zayendperestî, neteweperestî û olperestî werin berhevkirin. Di encama nihêrînên xwendekar, mamoste û civakê de pirtûk her sal di ber çavan re tên derbaskirin û sererastkirin. Mînak, hinek rexne ji bo mijar, wêne û giranbûna ziman hebûn. Ji ber vê di sala duyemîn de guhertin çêbûn û ziman hatiye sivikkirin.

"Mijarên wekî hevjiyana azad yan jî civaka exlaqî û polîtîk em bi rengekî ku zarok fêhm dikin, amade dikin. Em dixwazin ku zarok fêhm bikin, çi keç be çi kur be, divê azadiya wan hebe. Lê di civakê de zarok fêr dibin ku keç li malê bin û karê malê dikin, lê lawik li derve bin. Em nîşan didin ku ji bo ku hevjiyana azad karibe pêk were, divê cudahî di nav keç û xortan de tine be. Di wêneyên

[852] Hevpeyvîn bi endamên saziya minhacê [mufredat] ya KPCD'ê re, Amûdê, 2018

[853] Çavkanî li heman cihî

pirtûkê de em hewl didin wan ristan biguherin û zarok nexin qaliban. Zarokên keç jî dikarin bi seyera yan jî teyera bileyizin. Kurik jî dikarin bi bûkikan bileyizin. Di pirtûka bi zimanê Erebî de hevokek hebû: 'Bavê min diçe kar, diya min firaxan dişo.' Me wiha guhert: 'Diya min firaxan dişo, bavê min alîkariya diya min dike.' Ji bo hişmendiya civakê bê guhertin, ev mînak girîng in. Him wêne him jî mijaran em li gorî hişmendiya hevjiyana azad amade dikin."[854]

Herî zêde zehmetî di amadekariya pirtûkên waneya Jineolojiyê de hatine kişandin. Ji ber ku Jineolojî bi xwe wekî zanista jin û civakê hîna xwe nû saz dike: *"Ji bo Jineolojiyê hê jî çavkanî kêm in. Lê em dixwazin bi zarokan bidin fêhmkirin ku zanisteke jinê jî heye. Hinek mamoste û xwendekar vê yekê baş dibînin, lê hinek jî bi feraseta berê nêz dibin. Em dixwazin di dersa Jineolojiyê de bi rengekî zanistî nihêrînên Jineolojiyê ji bo pirsgirêkên civakî bidin nasîn û rista jinê di civakê de fireh bikin. [Dersa] Dîroka jinê jî di nav Jineolojiyê de tê dayîn. Lawik hingê pê dihisin ku di dîrok û civakê de ne tenê zilam hebûn. Lê jin û zilam bi hev re bi rolên xwe rabûne. Ev, di nêrînên wan de guhertinekê dide çêkirin."*[855]

Ji bo di şêwaza dersdayînê de jî fêrbûnên jiberkirinê li paş bên hiştin di pirtûkan de jî mijar bi rengekî nû tên pêşkeşkirin: *"Girêdayî waneyan, em mijarên lêkolînê û pirsan jî di pirtûkê de bi cih dikin. Pirsên şirove tên pirskirin, wekî 'nêrîna te di vê mijarê de çi ye? Vê pirsgirêkê em dikarin çawa çareser bikin?' Beriya mijarê, pirsên amadekarî tên pirskirin, piştre mijar tê ravekirin û di dawî de pirsên şiroveyê tên pirskirin. Wisa zelal dibe ka zarok çi fêrbûne û çi encam derxistine. Em dixwazin meraqa zarokan a lêkolîn û lêpirsînê pêş bixin ji bo di civakê de jî ev meraq pêş bikeve. Bi vî rengî zarok bi xwe fêr dibin, ji tercûbeyên jiyanê zanebûnê derdixin."*[856]

Di warê rêbazên perwerdeyê de jî ceribandinên nû çêbûn. Mamoste rave dikin ku ew bi rêbaza diyalogê di dersan de digihîjin encamên baş. Bi feraseta *'her kes him xwendekar, him mamoste ye'* carna erka amadekariya dersan jî didin xwendekaran. Dema ku xwendekar dersê amade dikin û didin, ew bêhtir li mijaran dikolin û fêhmdikin. Di heman wextê de ew bi berpirsyarî radibin û fêrî axaftinê li pêşiya komeke mirovan dibin. Nexasim ji bo şagirtên keç ev dibe gavek ku pê hestên şermê li pey xwe dihêlin û bi xwe bawer dibin.

Ji bo şagirt bikarin qabiliyetên xwe pirralî bi pêş bixin, komîteyên çalakiyê di dibistanan de hatine avakirin. Ew komên wekî futbol, fêrbûna ajotina bisikletê, muzîk, şano, wêne û govendê bi rêxistin dikin û amadekariya ji bo mihrîcanên xwendekaran dimeşînin. Kom û civînên xweser ji bo xwendekarên keç jî tên lidarxistin da ku ew bikarin bixwebaweriya xwe ava bikin. Endamên rêveberiya jin a KPCD'ê destnîşan dikin ku elaqedarbûn li gorî pêdiviyên şagirtên keç girîng e da ku ew bikarin xwe ji ferasetên eyb û şermê xilas bikin. Di heman demê de ew perwerdeya şagirtên keç û xort di heman dibistan û polan de ji bo bipêşketina her du zayendan dipejirînin. Her wiha ji refê 7'an heta zanîngehê meclîsên xwendekaran hatine avakirin û nûnerên wan jî di birêveberiya dibistanan de cihê xwe digirin. Bi vî awayî xwendekar fêrî çanda nîqaş, xwe birêxistinkirin û berpirsyar dîtinê dibin.

Tevî kêm û kurtiyan jî di nav çend salan de bipêşketinên mezin di warê perwerdeyê de çêbûne. Cara yekê civaka Kurd pergaleke perwerdeyê ji dibistanên seretayî heta zanîngehan bi hişmendiya

[854] Çavkanî li heman cihî

[855] Çavkanî li heman cihî

[856] Çavkanî li heman cihî

neteweya demokratîk û azadiya jinê ava kiriye. Nemisogeriya siberoja Sûriyê û nehesibandina pergala xweseriya demokratîk ji aliyê pergala navdewletî ve hê jî bandoreke neyînî li ser motîvasyona hinek xwendekar û malbatan çêdike. Hevpeymana civakê, mafê xwendin û bipêşketinê ya hemû zarokan misoger dike. Lê belê endamên rêveberiya jin a KPCD'ê texmîn dikin ku di sala 2018'an de çarêkê zarokên Bakur û Rojhilatê Sûriyê neçûne dibistanê. Ji bilî zarokên ku ji ber xizaniya malbatên xwe neçar dimînin û kar dikin, mamosteyên jin sedemên bêparmayîna zarokan ji xwendinê wiha dinirxînin:

"Di civaka Ereb de hîna eyb tê dîtin ku keç diçin dibistanê dema ku ketin dewrê [mehik]. Ji ber vê, keçên Ereb bi pirranî heta refê şeşan dixwînin û ji dibistanê qut dibin. Li cem Kurdan, hîna malbat zarokên xwe naşînin ji ber ku dibêjin 'şahdeyên dibistanên me ne fermî ne' û li dewletan nayên qebûlkirin. Lewma beşeke malbatên Kurdan zarokên xwe dişînin cem dewletê, beşek jî wan li malê dihêlin."[857]

Mamoste Menal nêzîkatiyên bi nakok yên hinek malbatên Kurd rave dike yên ku salên dirêj daxwaza perwerdeya bi zimanê Kurdî kirine, lê niha zarokên xwe naşînin dibistanên Kurdî. Ew vê rewşê girêdayî watedayîna mirov a perwerdeyê û şoreşê dinirxîne: "*Niha pêwîst e her kes bi xwe zanibe ew kî ye û çi dixwaze. Hîn di fikra gelek kesan de heye ku dîsa dewlet wê vegere. Wan kesan xwendin tenê wekî amûrekê fêhm kiribû da ku pê bawernamekê bigire û bibe mamoste, endezyar yan jî bijîşk. Ji ber vê zêhniyetê bi van kesan re guman çêbûne. Minhacê me û rêbazên me baş nayên zanîn. Ew tev têr û tijî bi zanist in. Lê hinek kes difikirin, em tenê perwerdeya zimanê Kurdî didin û qaşo zarok ji zimanê Erebî tên qut kirin. Lê rastî ne wisa ye."*[858]

Semîra Hec Elî jî balê dikişîne ser bandora propagandayên reş û bipêşketinên ku di sazîbûna perwerdeyê de hatine bi dest xistin: "*Me peymangeh, zanîngeh û akademî jî ji bo ronîkirina gelê xwe vekirin. Lê heta niha jî rêşkirinek heye. Tê gotin, paşeroja van zarokan tine. Perwerde, materyal û dîplomayên me ne fermî ne. Lê em meşruyeta xwe bi xwe ava dikin. Bi serdanên malbatan encamên baş hatine standin. Dema ku malbat rastiya perwerde û dibistanan dibînin, propagandaya reş bandora xwe winda dike û pêşhukim radibin."*[859]

Ji bo bipêşxistina pergala perwerdê ya xweseriya demokratîk di serî de şewazê akademiyên bîrdozî û pişeyî hatiye pejirandin. Lê belê li ser daxwazên xwendekar û malbatên xwendekaran û ji bo pêkanîna pêdiviyên civakê ji sala 2015'an ve li ser avakirina zanîngehan jî hatiye sekinîn.

Astengiya herî mezin li pêşiya bipêşketina warê perwerdeyê û xwendina zarokan, hê jî şer û dagirkeriya dewleta Tirk û komên leşkerî yên girêdayî wê ne. Ev êrîş bûn sedem ku gelek berhem û pêngav nîvî bimînin yan jî dereng bikevin. Bi sed hezaran zarok û mamoste ji ber xeterên ewlekariyê, zext û koçberiyê demên dirêj ji perwerdekirin û perwerdebûnê bêpar mane. Gelek ji wan, dubare li cihên nû di bin şertên zehmet de tevlî dersan dibûn. Vê rewşê, tevî bandora şer û koçberiyê li ser nefsiya zarokan, nehiştiye ku ew karibin bi îstiqrar bala xwe bidin xwendinê.

Her wiha arteşa Tirk bi taybetî dibistan kirin armanca êrîşên xwe. Avahiyên saziyên perwerdeyê wekî baregehên leşkerî yan jî saziyên asîmîlasyonê tên bi kar anîn. Di şerê dagirkeriyê yê dewleta

[857] Hevpeyvîn bi endamên rêveberiya jinê ya KPCD'ê re, Qamişlo, 2018

[858] Hevpeyvîn bi mamoste Menal re, Dêrik, 2017

[859] Hevpeyvîn bi Semîra Hec Elî re, Qamişlo, 2017

Tirk li dijî herêma Efrînê de ji 20'ê Çileyê 2018'an û pê ve 31 dibistan bûn armanca bombebaran û êrîşan. Di van êrîşan de 13 xwendekaran jiyana xwe ji dest da. Ji ber rewşa şer, perwerdeya dibistanan nikaribû were domandin. 50 hezar xwendekar ji mafê xwe yê perwerdê bêpar mane. Lê belê gelê Efrînê ji bo parastina mafê perwerdê bi zimanê dayikê jî li ber xwe daye. Piştî ku zêdetrî 300 hezar şêniyên Efrînê li wargehên Şehbayê bi cih bûn, wan careke din di bin şertên zehmet de dibistan û akademiyên xweseriya demokratîk li bin konan û avahiyên vala saz kirine.

Fikret Ebdilla ji navçeya Şêrawa ye. Bi pêvajoya koçberiyê re wê wekî hevseroka Meclîsa Gel a bajarokê Babîlîsê wezîfe girtiye. Ew balê dikişîne ser wê yekê ku dewleta Sûriyê dixwest zarokên Efrînê li dibistanên dewletê bide xwendin. Lê meclîsên gel û mamosteyan destûr nedan van hewldanan: *"Piştî demekê, dibistanên me vebûn û zarok pirr kêfxweş bûn. Zarokan hîs kir ku hinek dixwazin ji bo wan tiştekî bikin û biafirînin. Her roj bi kêfxweşî, bi moral radibûn û diçûn dibistana xwe. Dema zarokên me kêfxweş bûne, moralê me, yê dayik û malbatan jî baş dibû."*[860]

Di sala 2019'an de li herêma Şehbayê 900 mamoste, di nav de 700 mamosteyên jin perwerdeya zimanê dayikê heta refê bakaloriya meşandine. Wekî din beşên peymangehê jî hatine vekirin. Li kêleka vê, perwerdeyên çand û huner di beşên govend, stran û wêne de jî hatine birêxistinkirin. Bi qasi 150 zarokên Efrînî tevlî van perwerde û xebatên çand û huner dibin. Di wêne û stranên xwe de ew him tirsên şer û êşên koçberiyê, him jî hêviyên siberojê dibêjin.

Di êrîşên dagirkeriyê de yên ku arteşa Tirk di 9'ê Cotmeha 2019'an li dijî herêmên Cizîr û Firatê da destpêkirin jî careke din dibistan, mamoste û xwendekar bûn armanca êrîşan. Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 18'ê Cotmeha 2019'an de bi daxuyaniyekê ji rayê giştî re ragihand ku 810 dibistan ji ber êrîşa artêşa Tirk a dagirker hew xizmetê dikin. Her wiha zêdetirî 86 hezar xwendekar ji perwerdeyê bê par man û 5.224 mamoste ji karê xwe qut bûn. 20 dibistanên li herêma Serêkaniyê bi temamî wêran bûne. Her wiha koçber di sê dibistanên li Qamişlo, 35 dibistanên li Hesekê û du dibistanên li Girkêlegê de bi cih bûne.[861] Bi hezaran malbatên koçber ji Serêkaniyê heta destpêka sala 2020'an hê jî li dibistanan diman. Lewma bi hezaran xwendekarên Hesekê jî zêdetirî 4 mehan nikaribûn perwerdeya xwe dewam bikarana û li benda çareseriyê mane.

- **Zanîngehên Rojava**

Gava yekemîn ji bo avakirina zanîngehê wekî saziyeke zanist û fêrbûna bilind li kantona Efrînê hat avêtin. Zaningeha Efrînê di 26'ê Cotmeha 2015'an de vebû. 98 mamoste û profesor di beşên Wêjeya Kurdî, Ragihandin, Endezyariya Elektro-Mekanîk, Tenduristî, Çandinî û Aborî de ders didan. Dema destpêka şerê dewleta Tirk li dijî herêma Efrînê di 20'ê Çileyê 2018'an de bi giştî 870 xwendekar di sê astên Zanîngeha Efrînê de dixwendin. Zanîngeh ji aliyê dagirkeran ve hat talankirin. Beşeke xwendekaran li zanîngeha Rojava ya Qamişloyê xwendina xwe domand.

Zanîngeha Rojava di 7'ê Tîrmeha 2016'an de bi rêgeza 'perwerdeya bê pere û bê ezmûn' û 'bi mebesta avakirin û mayîndekirina paradîgmaya neteweya demokratîk û Modernîteya Demokratîk' hatiye damezrandin. Heta sala duyemîn a xwendinê şeş fakulteyên di beşên Wêjeya Kurdî,

[860] Hevpeyvîn bi endamên meclîsa jinê ya Ehrez re, Şehba, 2019

[861] Daxuyaniya Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, 18-10-2019

Endezyariya Çandiniyê, Zanistên Perwerdeyê, Petrol û Petro-Kîmya, Hunerên Bedew û Jineolojî hatine vekirin. Di pêvajoya tomarkirinê de 1100 xwendekar di zanîngeha Rojava de hatin tomarkirin. Balkêş e ku pirraniya xwendekaran dixwest beşa Petrolê bixwîne. Ji ber kêmbûna cih, qismek ji wan li beşên din yên zanîngehê qeyd bûne, hinek jî miracaetên xwe betal kirine. Ev yek destnîşan dike ku baldariya xwendekaran ji beşên zanistên civakî bêhtir li ser beşên teknîkî yên girêdayî derfetên pişeyên pisporî ye.

Di Mijdara 2017'an de li Zanîngeha Rojava bi giştî 744 xwendekar hebûn, ji wan 344 xwendekarên jin bûn. Wekî din ji 141 karmend û mamosteyên zanîngehê 41 jin bûn. Pergala zanîngehê ji aliyê koordînasyon, hevberdevk û meclîsa zanîngehê ve hatiye birêvebirin. Komînên xwendekaran hatine avakirin. Ji her fakulteyê du berdevkên xwendekaran, yek jin û yek mêr beşdarî civîna mehane ya zanîngehê bûne û nûnertiya xwendekaran di desteyên zanîngehê hemûyan de hatiye misogerkirin. Her wiha di her fakulteyê de xwendekarên jin heftane tekmîlên xweser girtine. Wekî din meclîsa xweser a jinê jî di pergala zanîngehê de hatiye rûniştandin. Ji bo bipêşxistina çanda jiyanê û nirxdayîna bi hemû cûreyên kedê, paqijî û xwedîkirina avahiyên zanîngehê ji aliyê xwendekar û mamosteyan bi hev re tên meşandin.

Ji ber nebûna çavkanî û pirtûkên bi zimanê Kurdî di beşên zanîngehê hemûyan de û nexasim jî di beşên Wêje û Perwerdeyê de zehmetî hatine kişandin. Lewma, pêwist bû ku di salên destpêkê de xebatên perwerdeyê û avakirina pergal û materyalên perwerdeyê di zik hev de bên meşandin. Wekî din ji ber xewgehên zanîngehê nebûn, gelek kesên ji derveyî Qamişloyê derfeta wan a xwendinê nebû. Hejmarek xwendekar jî ji ber pirsgirêkên aborî neçar mane û dev ji xwendinê berdane.

Ji bo lipeyxwehiştina kêmasiyan û bipêşxistina pergala zanîngehê, naverok û rêbazên zanistî di 20 û 21'ê Tîrmeha 2018'an komxebata bi navê *'Zanîngehên Azad û Akademiyên Nû'* hat lidarxistin. Li wir, xwendekar û mamosteyên Zanîngeha Rojava, zanîngehên Efrînê û Kobanê tecrûbeyên xwe û yên ceribandinên dîrokî û welatên din hatin nirxandin. Tevî akademisyen û nûnerên rêxistinên civakî, pêşniyazên çareseriyê ji bo bipêşxistina rêbazên zanistî û şêwazên perwerdeyê hatin nîqaşkirin. Di encamnameya komxebatê de perwerdeyeke azad li ser pîvanên exlaq, pratîk û avakirina hezkirina perwerdeyê, hêza çareseriyê, hêza tehlîlê, xwebirêvebirin, xwebirêxistinkirin, vîna cewherî, berpirsiyarî û karkirina komînal wekî erkên zanistî hatin destnîşankirin. Di vî warî de pergala hevserokatî, pîvanên azadiya jinê û tevlîbûyîna demokratîk a hemû pêkhate û endamên zanîngehê wekî rêgezên zanîngeha azad hatin pênasekirin. Wekî din hat hişyarkirin da ku di navbera civak-zanîngeh, rêveberî-xwendekar û mamoste-xwendekar de dîwarên hîyerarşiyê neyên avakirin. Her wiha komxebatê bal bire ser girîngiya zanista civakî û Jineolojiyê wekî bingehê zanistan hemûyan.

- **Fakulteya Jineolojiyê**

Fakulteya Jineolojiyê li zanîngeha Rojava di sala 2017'an de hatiye vekirin. Mebesta fakulteyê bi armanca azadiya jinê ve girêdayî, bipêşxistina xebatên zanista civakî ye da ku ew bikarin bibin çavkaniya guhertinên civakî ber bi jiyana azad, komînal û ekolojîk ve. Li gorî vê armancê, fakulteya Jineolojiyê bername, mufredat û sazîbûna xwe ya xweser ava kiriye; naverok, rêbaz û mamosteyên xwe hilbijartine. Her wiha bi pêşengiya fakulteya Jineolojiyê pergala xweser û

meclîsa jinê ya Zanîngeha Rojava hatine avakirin. Bi vî awayî hewldanên ji bo danasandina nihêrîna Jineolojiyê di xebat û beşên zanîngehê hemûyan de çêbûne.

Bernameya xwendinê ya fakulteya Jineolojiyê 2 salan didome. Ji bilî jinên ku bûn xwedî bakelorya, derfeta miracaetê dide wan jinên ku nekarîne asta amadehî bixwînin, lê bi daxwaza azadiya civakê radibin, xwedî azwerî, bawerî û hêza lêkolîn, xwendin, şêwrîn û bipêşxistina zanînê ne.

Di mufredata destpêkê ya fakulteyê de ev wane hene: Çarçoveya têgeh û teoriya Jineolojiyê, Jineolojî wekî zanista hevjiyana azad û şoreşa jinê; rêbaz û sazîbûna Jineolojiyê; dîroka jinê; sosyolojiya azadiyê; zayendperestiya civakî, xwezaya jinê, rêbaz û rejîmên heqîqetê wekî mîtolojî, ol, felsefe û zanist; qadên Jineolojiyê wekî etîk-estetîk, aborî, demografya, polîtîka, perwerde, tenduristî, tiba xwezayî, ekolojî, pedagojî, psîkolojî, arkeolojî, etîmolojî, rêbazên xweparastinê, ceribandinên şoreşa jinê û Şoreşa Rojava.

Pê re xwendkar di warê zimanê Kurdî, rêbazên lêkolînê, bi kar anîna kompûter, uslûb û xîtabet, rêbazên nivîsandin û ragihandinê perwerde dibin. Ji bo xwendekar karibin fêrbûnên xwe yên teorîk bi pratîk û pêdiviyên civakê ve girêbidin, di qonaxên dawî de ew di saziyên xweseriya demokratîk de temrînê [stajê] dikin û têza derçûnê amade dikin. Endameke Akademiya Jineolojiyê ku di xebatên fakulte û zanîngehê de cihê xwe girtiye, encama xebatên du salan wiha dinirxîne:

"Di du salên derbasbûyî de zehmetiyên di hêla amadekirina mamoste, ders û minhacan de hatine kişandin. Fakulteya me hîn di pêvajoya avabûnê de ye. Gelek nîqaş li ser ders û bernameyan çêbûn. Lê di encamê de tecrûbeyên girîng derketin holê. Li ser vî bingehê van ceribandinên xwe, em dikarin di sala sêyemîn de ber bi pisporiyê ve biçin û pirtûkên xwe ji bo hemû waneyan amade bikin.

Di sala yekemîn de 11 xwendekarên fakulteyê hebûn. Di destpêk û dawîya her qonaxê de bername û rêbazên perwerdê, rewşa mamoste û xwendekaran hatin nirxandin. Nêrînên xwendekaran di van mijaran de li ber çav hatin girtin û guhertinên pêwîst hatin çêkirin. Di dawî de xwendekaran têzên xwe yên derçûnê amade kirin, nihêrîn û pêşniyazên wan ji xebatên fakulte hatin girtin. Her wiha mamoste û rêveberiya fakulteyê jî nêrînên xwe li ser tevlîbûn û helwestên xwendekaran bi wan re parve kirin. Hemû xwendekar behs dikin ku Jineolojiyê di jiyana wan de guhertin daye çêkirin."[862]

Di serî de armanc û naveroka Jineolojiyê di civaka Rojava de zêde nehatibû naskirin. Lê belê bi cihgirtina waneya Jineolojiyê di mufredatên dibistanên amadehî de û di encama perwerde, xebat û ceribandinên Akademiya Jineolojiyê de li nav civakê baldarî bi pêş ketiye. Bi vî awayî miracaetên xwendinê di fakulteya Jineolojiyê de zêde bûne. Miracaet û pêşniyazên çend mêran çêbûn da ku ew jî bibin xwendekarên Jineolojiyê. Ev yek wekî bipêşketineke girîng hatiye dîtin. Lê belê li gorî biryara fakulteyê ji bo xwendina mêran bi rûniştandina sazîbûna fakulteyê re di demên pêş de bernameyên taybet wê werin amadekirin. Bi vî awayî di sala duyemîn ya fakulteyê de 27 xwendekarên jin dest bi xwendinê kirine. Pirraniya xwendekaran wekî armanca xwe ya xwendina beşa Jineolojiyê xwesteka naskirina rastiya xwe wekî jineke Rojhilata Navîn û pêkanîna wekheviya jin û zilamî di civakê de didin xuyakirin. Zeyneb ji Qamişloyê dibêje: *"Min xwest jinê di rastiya civaka xwe ya Rojhilata Navîn de nas bikim û rista ku niha ji jinê re hatiye dayîn, derbas bikim. Di Şoreşa Rojava de jinan di hemû qadan de cih girtiye. Lê hîna wekheviya jin û zilamî pêk nehat. Em dixwazin ferasetên eyb û şermê derbas bikin. Mehek û nîv e ku em niha di*

[862] Nîqaşa bi endamên Akademiya Jineolojiyê ya Rojava, Dêrik, 2020

fakulteya Jineolojiyê de dixwînin. Di vê dema kin de ez gelek tiştan fêr bûm da ku ez bikarim bersiva xwe bidim."[863]

Di nav xwendekaran de dayikek û keça wê jî cihê xwe digirin. Beşeke xwendekaran dibêje, dayik, bav û derdora wan biryara wan a xwendina Jineolojiyê erênî pêşwazî kirine. Lê belê hinek xwendekar jî didin xuyakirin ku têkoşîna wan li hemberî ferasetên baviksalar bi pêkanîna vê biryarê dest pê kiriye: *"Dema min got, ez ê Jineolojiyê bixwînim, gelek kes bi min keniyan û digotin, 'Çima tu wê vê bixwînî? Jixwe, jin ne tiştek in.' Lê min israr kir. Min bawer kir ku ez ê tiştekî baş bikim. Gelek kes hene, bav, zilam û civak li pêşiya xwendina wan dibin asteng. Xwendina Jineolojiyê jiyana min da guhertin. Min mafê xwe nas kir û ez dikarim mafê xwe biparêzim. Niha ez dikarim bi bavê xwe re nîqaş bikim. Berê min nikaribû ji ber [wî] min fedî dikir. Lê niha ez dikarim di nîqaşan de nêrînên xwe bêjim û kesên din qaneh bikim."*[864]

Endamên rêveberiya fakulteya Jineolojiyê didin xuyakirin ku avabûn û xebatên fakulteyê him di civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê de him jî di qada navneteweyî de bala gelek kesan kişandiye: *"Gelek kesan dixwest karê me ji nêz ve nas bikin û fêhm bikin. Gelek akademisyen, mamoste û xwendekaran dixwest bi hev re kar bikin. Mînak, bi vî rengî têkiliyên dostane û hevkariyê bi Zanîngeha Karê Civakî ya Emden li Elmanyayê pêş ketin. Hemû şande û akademîsyenên ku hatin Rojava û Zanîngeha Rojava bi taybetî serdana fakulteyê kirin. Beşa ku herî zêde bala wan kişand Jineolojî bixwe ye.*
Di nav jin û civaka Rojava de, di nav jinên Ereb de jî fakulteya Jineolojiyê balê dikişîne ser xwe. Heta pêşniyarek çêbû ku fakulteya Jineolojiyê bi zimanê Erebî jî vebibe. Gelek jinên navsere jî dixwazin xwendineke nû li fakulteya Jineolojiyê dest pê bikin. Wekî din mamosteyên ku berê di beşên cuda de xwendine, dixwazin careke din di fakulteya Jineolojiyê de bixwînin. Xuya dibe ku pêşxistina zanista jinê wê gelek pêwîstiyên civaka me û şoreşa me pêk bîne. Fakulteya Jineolojiyê jî wê xizmeta wê bike."[865]

Di mînaka du salên xebatên fakulteya Jineolojiyê de ezmûnên qada perwerdeyê di nav şertên şoreşê de eşkere dibin. Bi misogeriya armanca azadiya jin û civakê, gelek gavên nû û mezin bi hev du re hatine avêtin. Pêvajoyên avakirina sazî, amadekirina mamoste, bername û materyalan, xwe gihandina civakê, lêkolîn û perwerdekirin di zik hev de hatine meşandin. Ji bo kesên ku di van xebatan de cihê xwe girtine, pêwîst bû ku fêrbûnên kevin, bendewarî û nêzîkatiyên wekî muwazif yan jî alîgir, li pey xwe bihêlin. Yên ku bi armanca xwe ve girêdayî ked dane, kela canê wan rabûye û xwe berpirsyar dîtine, di kesayeta xwe û civaka derdorê de kêliyên şoreşê ava kirine. Ya girîng ew e ku li ser bingehê xebatên akademîk û ezmûnên destpêkê ji vê û şûn ve pêngavên nû di qadên perwerde û zanist, jiyan û civakê de çêbin.

- **Akademiyên Civakî**

Pergala perwerde û akademiyên civakî wekî stûna bingehîn a şoreşa Rojava ji bo lipeyxwehiştina hişmendiyên zayendperest û dewletperest tê nirxandin. Lê belê li gorî lezbûn û pêdiviyên şoreşê,

[863] Hevpeyvîn bi xwendekarên Fakulteya Jineolojiyê re, Qamişlo, 2018

[864] Çavkanî li heman cihî

[865] Nîqaşa bi endamên Akademiya Jineolojiyê ya Rojava, Dêrik, 2020

gava vekirina Akademiyên Civakî hinekî dereng maye. Lawaziyên di fêhmkirina zêhniyeta pergala xweseriya demokratîk de dibûn sedema pirsgirêkan di avakirina komîn û saziyan de. Ji bo lipeyxwehiştina van lawaziyan ji sala 2013'an ve li navçeyên herêma Cizîrê hemûyan, li Kobanê, Efrîn û Helebê Akademiyên Civaka Demokratîk hatine sazkirin. Di van akademiyan de bi pirranî bernameyên perwerdeyê ji bo danasandina paradîgmaya civaka demokratîk û ekolojîk li ser bingehê azadiya jinê û avakirina pergala xweseriya demokratîk bi feraseta neteweya demokratîk hatine birêxistinkirin. Wekî din ev perwerde bi şiklê semîneran li komînan hatine kirin.

Pêre pêre li tevahiya herêmên ji dagirkeriya DAIŞ'ê rizgarkirî yên wekî Minbic, Tebqa, Reqa û Dêrazorê jî Akademiyên Civaka Demokratîk hatine avakirin. Di van akademiyan de bi pirranî perwerdeyên bîrdozî bi armanca bipêşxistina civaka exlaqî û polîtîk tên meşandin. Wekî din akademiyên pîşeyî û pisporî girêdayî qadên aborî, tenduristî, ragihandin, şaredarî, dada civakî, asayîş, akademiyên ciwanan, yên çand û huner, perwerde û ziman, siyaset û dîplomasiyê hatine avakirin. Di van akademiyan de bernameyên perwerdeyê bi armanca kûrkirina zanîn û lêhûrbûnên ji bo avakirina rehendên neteweya demokratîk û pisporiya pişeyî li gorî pêdiviyên civakê hatine amadekirin. Dem, şêwaz û naveroka perwerdeyan li gorî derfet û armancê tên guhertin. Lê belê bi pirranî beşdar di pêvajoya perwerdeyê de ya ku mehekê heta 6 meh yan jî zêdetir, li mekanên akademiyê dimînin, jiyan û perwerdeyên xwe bi hev re bi rêxistin dikin. Jin him di sazkirin û rêveberina akademiyan de him jî di tevlîbûna perwerdeyan de bi risteke girîng rabûne. Her wiha di pirraniya akademiyan de dewreyên xweser ên jinan jî hatine birêxistinkirin.

Di navbera salên 2013 û 2017'an de derdora 14 hezar jinî di Akademiyên Civaka Demokratîk de, nêzîkî 1800 jinî di akademiyên ziman û perwerdeyê de, nêzîkî 300 jinî di Akademiya Edaleta Civakî de, nêzîkî 2000 jinî di akademiyên Asayîşê de, nêzîkî 400 jinî di akademiyên siyaset û dîplomasiyê de, nêzîkî 300 jinî di akademiyên şaredariyên gel de, nêzîkî 100 jinî di akademiyên aborî de, 270 jin di akademiyên ragihandinê de beşdarî dewreyên perwerdeyê bûne. Wekî din bi dehan jin tevlî dewreyên demdirêj ên pisporiyê li akademiyên tenduristî, çand û huner bûne.

Her wiha di Îlona 2014'an de Akademiya Mezopotamya bi armanca bipêşxistina pêşengên pergala xweseriya demokratîk û xebatên zanistê di beşên dîrok, felsefe, sosyolojî û siyaseta demokratîk de hatiye vekirin. Heta sala 2017'an 91 xwendekarên jin di dewreyên 6 mehan de mezûn bûne. Li Akademiya Mezopotamya û akademiyên din jî waneya Jineolojiyê hatiye dayîn da ku nihêrînên zayendperest di hemû beşên zanistê de werin eşkerekirin û mirov wan li pey xwe bihêle. Wekî din xwendekarên jin beşdarî perwerdeyên xweser jî bûne.

- **Akademiyên Jin û Jineolojiyê**

Di sala 2012'an de Kongra Star yekemîn akademiya jinê ya qada civakî li herêma Cizîre vekir. Ev akademî bi rista akademiya navendî ya Kongra Star ji bo perwerdekirina xebatkar û endamên rêveberiyê û jinên di tevahiya warên pergala xweseriya demokratîk de rabû. Wekî din li kantonên Efrîn, Kobanê û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên ku ji DAIŞ'ê hatine rizgarkirin jî akademiyên jinê li pey hev hatine vekirin. Di salên 2012 heta 2017'an de zêdetirî 80 dewreyên perwerdeyên bîrdozî li akademiyên jinê yên Cizîrê, Kobanê û Efrînê hatin lidarxistin. Bi giştî nêzîkî 2000 jinî beşdarî van dewreyên perwerdeyê bûn.

Armanca pergala akademiyê, fêrbûn û fêrkirineke pirrengî û pirralî di nav jiyaneke kolektîf de ye. Ji bilî waneyên perwerdeyê, avakirina mekan û têkiliyên jiyanê jî dibin beşên perwerdeyê.

Parvekirina fikr û serboriyên jiyanê, birêxistinkirina xebatên rojane wekî çêkirina xwarin û çandina baxçe yan jî werzîş û xebatên çandê, hemû aliyên jiyana komînal di akademiyên jinê de ne. Bi vî rengî têkiliyên zanînê bi jiyanê re û yên jinê bi civakê re berhemdar û watedar dibin.

Piştî xebatên perwerdeyên Jineolojî hatin meşandin, ji sala 2015'an ve Akademiya Jineolojiyê jî dest bi xebatên xwe yên li Rojava kiriye. Li aliyekî dersên Jineolojiyê di akademiyên civakî de hatine dayîn, li aliyê din bernameyên taybet yên perwerdeyê li dor Jineolojiyê hatine lidarxistin. Di dewreyên taybet de nêzîkî 300 mamosteyên jin ji kantonên Efrîn, Kobanê û Cizîre ji bo dayîna waneya Jineolojiyê di dibistanên amadehî de hatin amadekirin. Her wiha giranî li ser perwerdekirina perwerdekar, endam û xebatkarên Jineolojiyê bû. Waneya Jineolojiyê di pirraniya perwerdeyên akademiyan de bi bendewariyên mezin û nîqaşên jîndar hatiye pêşwazîkirin. Beşdarên perwerdeyê gelek caran wiha nirxand ku wan bi perwerdeya Jineolojiyê lêpirsîn, lêkolîn û lêgerînên nû dane destpêkirin.

Gelek jinên ku tevlî perwerdeyên akademiyên jinê bûne, di zaroktiya xwe de dibistan nedixwendin. Bi pirranî jin dibêjin, meraq û xwesteka wan ji bo tevlîbûna perwerdeyê bi pêş ket dema ku ew bi cîran û jinên din re axivîn ên ku beriya wan beşdarî perwerdeyan bûne. Guhertinên ku wan di sekn û nihêrînên van jinan de dîtine bala wan kişandine. Lewma wan jî xwestiye ji derfetên perwerdeyê sûdê wergirin û di jiyana xwe de guhertinê çêkin. Bi vî awayî ew cara yekê ji malê derketine û hefteyekê, heyvekê yan jî demeke dirêjtir ji jiyan û erkên malbatê qut bûne. Hê jî, gelek caran jin ji bo tevlîbûna perwerdeyê, têkoşîna ewilîn bi malbata xwe yan jî hevjînê xwe re didin ber çavê xwe.

Jinên ji herêmên Tirbespî, Hesekê û Şedadê yên tevlî dewreyên perwerdeya jinê bûne, didin xuyakirin ku cara yekemîn di jiyana xwe de ew bûne xwedî derfeta fêrbûn û xwe îfadekirinê:
"Ez ti carî neçûme dibistanê, nedihiştin ez ji mal derkevim. Lê min xwest ez werim vê perwerdê bibînim û zana bibim."[866]
"Em rênekirin dibistanan. Meteke min helbestvan bû. Helbest dinivîsandin di piçûkaniya xwe de. Lê malbatê nedihişt û ew di malê de xist hepsê. Eger jinekê ji xortekî hez bikira, ne didan yê jê hez dikir û dizewicandin bi yekî din re. Nehiştin ez rojekê jî biçim dibistanê. Dema ez hatim perwerdê ne xema min bû ku ji min bixeyidin. Min got, 'Ez herim serxwebûna xwe ava bikim'."[867]
"Heşt sal in ez zewicî me. Min jiyana xwe di mal de bi kurê xwe re borand. Min jiyana xwe nedît. Zilam dîtiye, her tişt di destê wî de ye. Ew çi bixwaze tê pêkanîn. Dema min xwest ez werim perwerdê, hevjînê min ji min re got, 'Neçe. Çi kêmanî yê te hebin, ez ê pêk bînim'. Min got, 'Na, ez ê herim ji bo ez fêr bibim ez ê rolekî çawa di civaka xwe de bikarim bileyizim'. Niha têgihiştina min çêbû û ez dixwazim rêya xwe berdewam bikim."[868]

Cara yekê wê tevî jinên ji herêmên din ên Rojava ji xwe re dem veqetandin da ku bi hev re xwe zane bikin, bixwînin, pirsgirêk û daxwazên xwe nîqaş bikin. Birêxistinkirin û parvekirina jiyana kolektîf bi jinên temen û serpêhatiyên cuda, bi çand û baweriyên cuda bi xwe jî beşeke girîng ya perwerdeyên akademiyê ye. Bi naskirina rêbazên civîn, tekmîl, rexne û rexnedayînê, û erkgirtinên wekî berdevkên komînê, endamên komisyonên perwerdeyê, berpirsyariyên lojistîkê, yên ewlekariyê, paqijî û xwarinçêkirinê, her kes xwe li hemberî jiyana hevbeş berpirsyar dibîne.

[866] Nîqaşa bi beşdarên dewreya yekemîn a perwerdeya jinê ya Akademiya Şehîd Farûq re, Heseke, 2017

[867] Çavkanî li heman cihî

[868] Çavkanî li heman cihî

Beşdarên perwerdeyê di waneyên wekî Girîngiya Perwerdeyê, Civaka Xwezayî, Zayendperestiya Civakî, Jineolojî, Dîroka Jinê û Dîroka Kurdistanê, Neteweya Demokratîk, Uslûb û Xîtabet, Tenduristî û Anatomiya Jinê, Siyaseta Demokratîk û Pergala Hevserokatiyê de agahiyên bingehîn digirin, hînî nihêrîn û tehlîlên Abdullah Ocalan dibin. Bi vî awayî, ew nakokiyên xwe di navbera fêrbûnên civaka zayendperest, felsefe û rastiya jiyanê de şirove dikin. Di nîqaş û diyalogên perwerdeyê de jin dikarin sedemên pirsgirêkên xwe û yên civakê baştir fêhm bikin, rê û rêbazên çareseriyê nîqaş bikin.

Jinên Kurd, Ereb û hevserokên jin ên ciwan dibêjin, bi rêya van perwerdeyan, wan xwe û civaka xwe bêhtir nas kiriye, bi xwe bawer bûne, hêza xebatmeşandinê û vîna erkstandinê di kesayeta xwe de ava kirine. Nexasim jinên ku di perwerdeyên akademiyê de fikr û felsefeya Rêbertiyê nû nas kirine, qala wê yekê dikin ku di zêhnê wan de cîhaneke nû vebûye. Mamoste Ehlem ji navçeya Til Koçerê wateya perwerdeyê ya akademiya jinê wiha dinirxîne: *"Berê, dema rejîma Beesê min xwend û ez bûm mamoste. Min di gelek akademiyan de xwend. Lê hertim me kêmbûnek di aliyê xwendinê de hîs dikir, ji ber rejîm tiştekî rast bi me neda nasîn heta em xwe têr bibînin. Piştî herêma me ji çeteyên El Nusra rizgar bû, ez derbasî Akademiya Jina Azad li Rimêlan bûm û min li wir perwerdeyek dît.*
Bi salan min xwendibû û ked dabû, lê tiştê min di vê perwerdê de nas kir û fêhm kir ji salên ku min li cem rejîmê dixwend rasttir û bi faydetir in. Xwendina di dibistanên rejîmê de fayde li jiyana min nedikir. Lê perwerdeya Akademiya Jina Azad jiyan bi min da naskirin. Ji aliyê nefsî, ez di perwerdê de rehet bûm. Tiştekî ku nefsiya te jê re rehet be, mirov jê hez dike. Heger perwerdeyeke din jî vebe ez ê dîsa tevlî bibim û keçka xwe jî bibim. Beriya vê perwerdeyê min digot: 'Çawa dibe ku jin û zilam bi hev re dijîn, şer dikin û bi ruhê hevaltî û azadiyê nêzî hev dibin?' Niha ez dibêjim: 'Xweska ez nezewiciyama û ez ê biçûma çiyê'."[869]

Wekî din gelek jin qala wê yekê dikin ku perwerdeyên civakî bandoreke erênî li ser nihêrînên malbat û zilaman jî çêkirin: *"Birayê min li ser me serdest bû. Birayê min li min dida. Wî nedihêla em ji mal derbikevin. Bav û diya min ev maf dabûn wî. Lê piştî şoreşê, ew gelekî hat guhertin. Dema ez hatim perwerdê xal û mamê min got, 'Bila neçe'. Edî birayê min li hemberî xalê min şer kir û got, 'Xwuşka min wê herê perwerdê!'."*[870]

Bi tevlîbûna perwerdeyan re gelek jin şirove dikin ku ew êdî di jiyana malbat û têkilyên bi hevjînê xwe re dikarin vîna xwe hîn rehettir bidin xuyakirin. Ji ber ku ew nema wekî berê her gotina bav, bira û hevjînê xwe bê pirs û bêdeng qebûl dikin û pêk tînin, carna di jiyana malbatê de nakokî û pirsgirêk derdikevin holê. Lê belê gelek jin pê hisiyan ku ew di gelek cihan de bi hêza fikr û vîna xwe, bi rêbazên nû yên îqnakirinê nêzîkatiyên desthilatdar jî dikarin bidin guhertin. Bi vî awayî gelek jin dibêjin, di encama perwerdeyan de guhertinên erênî di têkiliyên wan û hevjînên wan de çêbûne.

Her wiha pirraniya jinên ku tevlî dewreyên perwerdeyê yên Akademiyên Kongra Star û Civaka Demokratîk bûne, dûvre cihê xwe di xebatên komîn, sazî û qadên xweseriya demokratîk de digirin. Wan di kesayeta xwe de bawerî ava kiriye da ku ew bikarin nihêrînên xwe bînin zimên. Gelek jin jî karên welê dimeşînin û bi rê ve dibin yên ku wan berê aydê zilam didîtin. Jin tiştên ku li

[869] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Koçerê re, 2017

[870] Nîqaşa bi beşdarên dewreya yekemîn a perwerdeya jinê ya Akademiya Şehîd Farûq re, Heseke, 2017

perwerdeyan fêrbûne di karên civakî de parve dikin û di heman demê de zanebûna xwe bi pêş dixin:

"Di perwerdeyên komîn û akademiyên civaka demokratîk de em bûne xwedî nêrîn û fikir. Berî ez dernediketim ji malê. Ez bêhtir girêdayî olê bûm. Destpêkê ez ketim nava karê komînan de ez bi xwe bê bawer bûm. Lê dema min perwerde dîtin, ez fêr bûm û ketim nava civakê de. Min li çîrokên gel guhdarî kirin û xelk nas kirin. Ev dibû wek waneyekê, waneya civakê. Herî zêde min bi naskirina civakê re xwe pêş xist. Min dît ku jin ji jinê hez nake û ew jî sûncê zilamî ye. Zilam bi du jinan re dizewice. Jin dibin dijminê hev du, lê her du jin nabin dijminê zilam. Lê piştî jin ketin nava rêxistina Kongra Star de û perwerdên xweser dîtin, em dibînin ku jin parastina hevdu dikin. Hezkirin di nava jinan de çêbûye. Niha em wek rêveberiya jinê kar dikin û em pirsgirêkên jinan çareser dikin. Em dixwazin ku jin bizanin ku xwedî hêz in û bikarin xwe rêvebibin."[871]

Jin bi perwerdeyan re lê hûr dibin ka ew ê çawa bikarin bi rista xwe rabin ji bo guhertina civakê û bipêşxistina rewşa jinê. Bi vî awayî gelek biryarê didin ku gavên nû di jiyana xwe de bavêjin. Mînak, jineke ciwan di perwerdeya Kongra Star de armanceke wiha danî pêşiya xwe: *"Piştî perwerdeya xwe, ez dixwazim herim li Mala Jinê kar bikim. Ez dixwazim li ser mafê jinê kar bikim. Karê min ê yekem wê ew be: Ez ê keç û hevalê xwe yên li gundê me di bin destê bira û bavê xwe de ne, hişiyar bikim ji bo rizgar bibin. Ez ê ji hemû hevalên xwe yên jin re bêjim ku bila werin perwerdê."*[872]

Piştî şerê li Tebqayê, Cemîle Hisên di bihara 2018'an de li Akademiya Jinê ya Tebqayê dest bi xebatê kir. Wê di jiyana xwe de gelek êş dîtine û zarokê xwe bi tenê mezin kirine. Li gorî hizra wê di nava salekê de ku ew li akademiyê dixebite, gelek geşendan di jiyana wê de çêbûne: "*Di destpêkê de min xwarin çêdikir. Lê ez tevlî perwerdeyan jî dibûm û ez ferî gelek tiştan bûm. Min fikrê xwe bi pêş xist. Hevalên min yên jin gelekî alîkarî dane min. Nefsiya min ewqas xirab bû, lê li vir nefsiya min rehet bû. Min perwerdeya bîrdozî jî dît û hevalan di têkiliyên min ên bi zarokên min re jî gelek alîkarî didan. Wan nehişt ku ez nexweş bikevim. Jiyana min gelek hat guhertin. Niha ez berpirsyara giştî ya akademiyê me. Berî her tiştî ez dixwazim ku jin xwe û fikrê xwe azad bikin. Bila netirsin! Bi her dewreyê ez careke din dikevim dersa jinan. Her car ez fêrî tiştên nû dibim."*[873]

Ji ber ku gelek jin wekî encama perwerdeyên akademiyan di jiyana xwe de guhertinên erênî dîtine, ew dixwazin ku hejmara akademiyan û dewreyên perwerdeyê werin zêdekirin. Ew dixwazin ku jinên civakê hemû bikarin ji perwerdeyên akademiya jinê sûd wergirin.

- **Perwerdeyên Komîn û Meclîsan**

Ji bo derfetên perwerdeyê ji jinan hemûyan re werin afirandin û hişmendiya civak û exlaqê demokratîk were xurtkirin, Kongra Star di destpêka sala 2016'an de beşa komîteya perwerdê ya komîn û meclîsan di asta Rojava de ava kiriye. Di serî de endamên komîteyê xwe ji bo perwerdekirinê amade kirin. Wekî din li herêmên Cizîrê, Efrîn, Kobanê, Şehba, Heleb û Minbicê

[871] Hevpeyvîn bi Jîn re, gundê Girzîro yê Koçeratê, 2017

[872] Nîqaşa bi beşdarên perwerdeya Akademiya Kongra Star re, Rimêlan, 2017

[873] Hevpeyvîn bi Cemîle Hisên re, endama rêveberiya Akademiya Jinên Sûriyê, Tebqa, 2018

komîteyên herêmî, yên tax û gundan hatine birêxistinkirin. Di nav danûstandinê bi komînan re bernameyên perwerdeyê hatine zelalkirin. Li gorî vê di hefteyê de carekê li komîn û komîngehan perwerdeyên xweser ên jinan hatine destpêkirin.

Her wiha ji bo jinên ku nikarin ji bo demekê bi giştî ji malbat yan jî karên xwe qut bibin, dewreyên perwerdeyê yên 10 yan jî 15 rojan yên vekirî yên li bajaran hatine vekirin. Li gorî pêdiviyê û daxwaza jinan dewreyên li ser mijarên taybet ên wekî pergala hevserokatiyê yan jî zayendperestiya civakî jî hatine vekirin. Ruxmê vê, gelek endamên komîn û meclîsên jinê dibêjin, zehmetiyên wan ên herî mezin di guhertin û veguhertina ferasetên zayendperestiya civakê de ne. Gelek caran em weke nimûne dibînin ku gotinên demokrasî, wekhevî û azadiya jinê hê jî bi gelemperî nebûne hişmendî û şêwaza jiyana malbat û civakê. Ji bo ku di nifşê ciwanan de qalibên zayendperest li paş bên hiştin, endamên qada perwerdeya civakî girîng dibînin ku jinên ciwan bêhtir tevlî perwerdeyan bibin. Di hinek dewreyên akademiyên Kongra Star de pirraniya beşdaran di 40 ta 50 salî ne. Herçiqasî zanebûn û tecrûbeyên wan ên jiyanê, danehevên girîng raber dikin jî di zêhniyeta vî nifşî de hinek fêrbûnên civaka zayendperest zû bi zû nayên guhertin.

"Di guhertina civakê de em zehmetiyan dikişînin. Em dibêjin dewleta yekemîn ya piçûk malbat e. Malbat hîn nehatiye guhertin û negihiştiye wê zêhniyetê ya ku keç dikarin kar bikin, siyasetê bikin û pêşketin di civaka xwe de çêbikin. Heya niha di malbatan de nêrîna kur bi hêsanî tê qebûl kirin, lê ji nêrîna keçan re bê bawerî nêz dibin. Civak rêvebertiya zilam bêhtir qebûl dike ji ya jinê. Ne ku jin nikare bike, lê karê wê û rêza wê nayê dîtin."[874]

Jineke ciwan ya ku nû beşdarî xebatên komîteya perwerdê ya Kongra Star li Girkêlege bûye, serpêhatî û lêpirsînên xwe parve dike: *"Min ji bavê xwe lêdan xwar heya min xelasiya xwe bi vê tevgerê dît. Min zilam didîtin û min digot, 'ekîd ew jî wek bavê min in'. Dayîka min çawa tehmul kiriye, ez nizanim. Ez her tim ji wê dipirsim û ew dibêje, 'Ji ber zarokên xwe ez tehmul dikim.' Lê me wekî zarok jî gelek zilm dît. Min Tevgera Azadiyê bi rêya pirtûkan nas kiriye. Piştre ez tevlî civînan bûm û gelek bi bandor bûm. Min got, 'Divê ez jî wek jinekê kar û xebatê bikim.' Hejmareke mezin a jinan tevlî perwerdeyên me yên Kongra Star li bajar û gundan dibin. Lê gelek jin jî hîn bi zincîrê malê ve giredayî ne. Gelek kar li ser milê jinê ye û fedekariya jinê pirr e. Ji gelek jinan re hîn perwerdê pewîst e, ji ber bi xwe bê bawer in û zilamê xwe silte dibînin. Di vir de em wekî jin têkoşîn dikin."*[875]

Ji bilî perwerdeyên civakî yên bi zimanê Kurdî, perwerdeyên bi zimanên pêkhateyên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî tên birêxistinkirin. Li vir jinên Ereb, Kurd, Tirkmen, Çeçen û Suryanî digihîjin hev. Di encama van perwerdeyan de xebatên komînên jinê xurttir bûne. Di heman demê de tevlîbûna jinên pêkhateyan hemûyan di komînên giştî û meclîsên gel de jî di warê hejmar û bandora xwe de bi pêş ketiye. Jineke Ereb ji navçeya Girkêlegê di perwerdeya Kongra Star de bipêşketina jinê dinirxîne: *"Destpekê di karê komînan de tevlîbûna jinê gelek kem bû, mirov dikare bêje tine bû. Hêdî hêdî, bi civîn û perwerdên jinê me, xwe dan pêş û tevlî kar dibûn. Niha hijmara jinên tevlî kar dibin ji ya zilaman bêhtir e. Jinan êdî xwe û mafê xwe nas kir. Ew dizanin mafê zilam heta kû derê heye. Qebûldîtina jinê îsal [2017] gelekî zêde bûye. Niha komîna jinan a xweser û hevserokatiya komînê tên qebûlkirin. Jinên Ereb îro di her milî de cihê xwe di nav*

[874] Hevpeyvîn bi Jîn re, gundê Girzîro yê Koçeratê, 2017

[875] Nîqaşên bi beşdarên perwerdeya vekirî ya 15 rojî ya Kongra Star re, Girkêlege, 2017

komînan de digirin. Bi hatina Şoreşa Rojava û şoreşa jina azad, gelek guhertin di çanda me de çêbûne. Gelek jinên me yên Ereb niha tevlî xebatên qada leşkerî jî dibin an jî bûne mamoste."[876]

Bedia endama rêveberiya Akademiya Civaka Demokratîk a Til Temirê ye. Ew dibêje, perwerdeyên li ser feraset û pergala neteweya demokratîk danûstandin û bawerî di nav gelan de xurttir kirine: *"Em li vir perwerdê didin û diçin li gundan civînan çêdikin. Sîstema neteweya demokratîk bala her însanî dikişîne. Dema ku rastî li ser erdê pêk were, tiştekî pirr xweş e. Hin bi hin mirov fêrî wê dibin. Neteweya demokratîk her qewm û netewê dihewîne. Li Til Temirê jî sê netewe hene. Her yekî mafê xwe heye, ziman û çanda xwe biparêze. Çiqas hejmara netewekê kêm be jî, mafê wê heye. Bi vî rengî hêdî hêdî jinên ji hemû netewan tevlî saziyên civakî, siyasî û leşkerî dibin."*[877]

Her wiha perwerdeyên taybet ji bo guhertin û veguhertina zilamî ji aliyê komîteyên perwerdeyê yên Kongra Star jî tên lidarxistin. Hinek ji perwerdeyên bi armanca lêpirsîn û lipeyxwehiştina hişmendiya desthilatdariya zilamî bi beşdarbûna malbatan, hinek jî wekî dewreyên xweser ên zilaman hatine birêxistinkirin. Lê ev perwerde hemû ji aliyê jinan ve tên birêvebirin. Him jinên perwerde dane meşandin, him jî beşdarên mêr dibêjin, wan ji van perwerdeyan gelek sûd wergirtiye. Cara yekê ye ku mêr pêwîst dibînin ku xwe pênase bikin. Gelek jî didin xuyakirin ku ew naxwazin 'zilamekî desthilatdar' bin. Lê belê ew hîna jî nizanin ka ew ê çawa karibin nasname û rastiya 'zilamekî demokrat' di kesayet û jiyana xwe de ava bikin.

Muna ji rêveberiya Kongra Star a Kampa Berxwedanê li Şehbayê bipêşketinên ku bi xebatên wan ên perwerdeyê çêbûne, wiha dinirxîne: *"Berê dema cemaetek kom dibû, nedibû ku jin jî cihê xwe di nav wê kombûnê de bigre û gotinekê bike. Lê di roja me ya îro de jin kom dibin, zilaman perwerde dikin. Bipêşketina herî mezin jî zilam li wan jinan guhdarî dikin, îhtîram didin û êdî qebûl jî dikin. Niha ev ji bo me derfetek e, dema em vegeriyan Efrînê ji bo em hemû zane vegerin. Rast e, hatina me ya Şehbayê gelekî zehmet bû. Lê vê rewşê gel zane kir, perwerde kir."*[878]

Di ceribandinên perwerdeyên komîn û akademiyan de pêdiviyên jin û civakê berbiçav dibin. Lewma, endamên Komiteya Perwerdeyê ya Kongra Star, girîngiyê bi wê yekê didin ku xebatên perwerde, lêkolîn û tehlîlên civakê di zik hev de bimeşînin. Ew didin xuyakirin ku ji bo ku perwerde bibe misogeriya civaka exlaqî û polîtîk, divê di serî de em bi van pirsan tevbigerin: *"Ji bo guhertina civakê çi pêwîst e? Em ê çawa bidin guhertin?"* Ji ber vê, nîqaşên berfireh û daîmî li ser pergal, rêbaz, naverok û mufredatên perwerdeyê girîng in. Ji parvekirina agahiyan wêdetir, armanca perwerdeyên jin û civakê lêgerîna bersiva pirsa *'Em ê çawa bijîn?'* e. Asta pêkhatina vîna azad, çanda demokrasî, hûrmet û hezkirinê di têkiliyên malbatî û civakî de wê asta serketinê ya xebatên perwerdeyê bide xuyakirin.

Wekî encam; em dikarin bibêjin, xebat, rêbaz û sazîbûnên zanist û perwerdeyê ku di pergala xweseriya demokratîk de hatine avakirin di gelek aliyan de bipêşveçûn di jiyana jin, zarok û civakê de derxistine holê. Bandora ferasetên zayendperest û desthilatdar hê jî didome. Lê belê mînakên ku destketiyên fikrî û helwestên girêdayî pîvanên wekhevî, rêzdarî û azadiyê destnîşan dikin, di jiyana

[876] Çavkanî li heman cihî

[877] Hevpeyvîn bi Bedia re, endama rêveberiya Akademiya Civaka Demokratîk a Til Temirê, 2017

[878] Nîqaşa bi nûnerên Meclîsa Kongra Star a Efrînê û saziyên jinê li Kampa Berxwedanê re, Şehba, 2019

civakê de her diçe berbiçav dibin. Çavdêriyên mamosteyên jinê piştrast dikin ku zarokên nifşên nû li bipêşketinên pirralî vekirî ne, jiyan û çanda pirrengî di xwezaya xwe de fêr dibin.

"Bi gişti em dixwazin perwerdeya jiyana azad û demokratîk li ser bingehê têkiliyên hevaltî navbera mamoste û xwendekaran pêş bixin. Heman nêzîkatiyê em dixwazin di têkiliyên dayik, bav û zarokan de jî bidin rûniştandin. Malbat cudahiya perwerdeyên me dibînin. Ji ber waneyên me jiyanî ne û ne bi şêwaza jiber tê dayîn. Zarok fêrî ziman, fikirandin û afirandinê dibin û zarok vana jî fêrî malbatên xwe dikin."[879]

Her wiha hinek jin didin xuyakirin ku bi perwerdeyên Akademiyên Civaka Demokratîk yan jî yên saziyan re nêzîkatiyên hevjînê wan di jiyana malbatê de hatine guhertin. Piştî perwerdeyên li ser mijarên wekî zayendperestiya civakî yan jî Jineolojiyê, hevjînên wan zêdetir empatî ji bo rewşa wan raber kirine û qismek jî di karên malê de alîkar dibin.

Lê belê fikr û feraseta hevjiyana azad û neteweya demokratîk hîna negihiştiye tevahiya civakê da ku guhertineke bingehîn di çanda civakê de mumkin bibe. Herçiqasî endamên saziyên civakî û ewlekariyê hemû tevlî perwerdeyan dibin, perwerdeyên komînan hê jî lawaz in û li her cihî nayên meşandin. Lewma tê xwestin ku saziyên civakî, bi taybetî yên zanist û perwerdeyê hîn zêdetir xebatên xwe yekser di nav civakê de û bi civakê re bimeşînin. *"Ji bo xebatên Jineolojiyê gavên mezin hatine avêtin. Lê dema ku xebatên akademîk her tim li pêş biçin û civak li paş xwe bihêle, ev ê bibe sedem ku ev zanist di pirtûkan de, di mekteban de bimîne. Divê têkilî bi civakê re xurt be, ji bo esasên Jineolojiyê û neteweya demokratîk bên naskirin."*[880]

Pirsgirêkeke din jî ew e ku şêwaza fêrbûna jiberkirinê hê jî serwer e. Lewma gelek caran li şûna şekil û qalibên kevin, şekil û qalibên nû tên avakirin. Mînak Abdullah Ocalan têgehên wekî 'çand û exlaq' girêdayî nirxên têkoşîna azadiyê, vîna azad û berpirsyariya takekesan ji bo parastina nirxên civaka xwezayî şirove dike. Lê belê di nîqaş û nirxandinên pirsgirêkên jiyanê de gelek caran feraset û kevneşopiyên zayendperest wekî 'çand û exlaqê civakî' tên binavkirin. Ev, yek ji gelek mînakan e ku nakokiyên di navbera guhertinên şeklî û cewherî de diyar dikin. Ji bo hêza guhertinê û veguhertinên demokratîk a civakê bi pêş bikeve, pêwîst e nêzîkatiyên şeklî û jiberkirinê li paş bên hiştin. Di vî warî de rê û rêbazên 'perwer' yanî bi hezkirin û dilsozî yên perwerdê pêwîst in ku bikarin yekbûna raman, hest, gotin û çalakiyê di kesayetê de xurttir bikin, lêpirsîn û lêkolînê teşwîq bikin.

- **Kurteencamên Lêkolînê Derheqê Perwerde û Zanistê de**

Pergala perwerde, zanist û dibistanan a dewleta Sûriyê li gorî ferasetên neteweperest û zayendperest ên partiya Beesê teşe dabû jin û civakê. Li şûna vê, bipêşxistina zanist, sazî û rêbazên perwerdeyê bi zimanê dayikê û çanda demokrasiyê yek ji armancên bingehîn ên Şoreşa Rojava bûye.

Dane û şiroveyên li ser pêvajoya birêxistinkirina perwerdeya neteweya demokratîk destnîşan dikin ku bi kedeke mezin ji tinebûnê hebûna pergaleke nû hatiye avakirin. Bi taybetî jinên ku berê bê derfetên xwendinê hatine hiştin, bi kelecan tevlî vê pêngavê bûne. Fêrbûn û fêrkirin di zik hev de hatine meşandin. Bi xuluqkarî çavkanî û zanebûnên nû hatine bidestxistin û ceribandinên nû bi pêş

[879] Hevpeyvîn bi mamoste Sema re, endama rêveberiya KPCD, Qamişlo, 2017

[880] Hevpeyvîn bi Leyla Saroxan re, Hesekê, 2017

ketine. Ji rewda [baxçeyê zarokan] û dibistanên serêtayî heta peymangeh, zanîngeh û akademiyên civakî, gelek sazîbûn ava bûne. Jinan wekî mamoste û şagirt jî di saziyan hemûyan de rêxistinbûna xwe ya xweser ava kir, ew bûne xwedî nihêrîn û ked.

Ji bo perwerdeya bi armanca bipêşxistina zêhniyet, kesayet û civakeke azad hîn zêdetir encamgîr be, hewce tê dîtin ku perwerdeyên akademî, sazî, komîn, malbat û jiyanê zêdetir hev du temam bikin û bigihîjin tevahiya civakê. Wekî mamosteyên jin jî dinirxînin, girîng e ku perwerdeyên dibistan, sazî, dayik û malbatê bi gişt bi heman feraset û şêwazê werin bipêşxistin ya ku fikr û vîna azad di kesayeta zarokan de xurt bike.

Rê û rêbazên ji bo gotûbêjkirina mijarên aloz ên weke têgihîna namûsê, bekaret, hestên jinê û pirsgirêkên malbatî, dikarin werin bipêşxistin da ku ferasetên zayendperest bikevin ber lêpirsînê û mirov wan li pey xwe bihêlin. Dahûrandinên bûyer û pirsgirêkên jiyanê di çarçoveya rêgezên Bîrdoziya Azadiya Jinê de û bi rêbazên Jineolojiyê dikarin bibin waneyên perwerdeyên civakî û dibistanan. Wekî din nîqaş û perwerdeyên li ser rêgezên jin û welatparêzî, jin û naskirina rast a azadiyê, jin û veguhertina zilamî, rê û nêzîkatiya çareseriya pirsgirêkên civakê nîşan didin. Di vî warî de nexasim birêxistinkirina perwerdeyên zilam û ciwanan li ser esasên hevjiyana azad weke gavên erênî tên nirxandin. Her wiha, ji ber lêgerînên jin û zilam ên ji bo naskirina heqîqeta xwe û jiyanê, perwerdeyên Jineolojiyê jî rastî meraq û bendewariyên mezin tên.

Amadekariya pirtûk û materyalên perwerdeyê bi zimanên pekhateyên Bakur û Rojihilatê Sûriyê hemûyan, bipêşketineke girîng e. Bi rêya van materyalan nifşên nû dikarin ji zaroktiya xwe ve him çand, ziman û dîroka xwe him jî yên pêkhateyên din fêr bibin. Dema ziman û naveroka pirtûkan pirrengî bin û xîtabê ruh, jiyan û lêgerînên nifşên civakê hemûyan bikin, hewes û hezkirina xwendinê di nav nifşê ciwan de jî bi pêş dikeve. Ji bilî vê, jin bi taybetî daxwaza birêxistinkirina perwerde û akademiyên pîşeyî û pisporî dikin.

Elaqeya jinên Bakur û Rojhilatê Suriyê di warê perwerde û zanistê de dide xuyakirin ku jin bi pirranî dixwazin pêdiviyên xwe yên jiyanê bi xwe pêk bînin û bi bipêşxistina xwe re civakê jî bi pêş bixînin.

i) Nirxandinên li ser '*Asta Şoreşa Jinê Gihandiye'*

Wekî encama vê beşa pirtûkê em dixwazin li wî wêneyî binihêrin ku bi dane, serpêhatî û gotinên jinên di nav Şoreşa Rojava de hatiye xêzkirin. Ev wêne, bandora Şoreşa Rojava li ser jin û civakê nîşanî me dide di rehendên polîtîka, etîk û estetîk, tenduristî û ekolojî, aborî, demografya, perwerde, jiyana hevjînan, malbat û jinên ciwan de.

Mebesta Şoreşa Rojava li dijî qeyrana kûr a ku pergala desthilatdariya zilam û kedxwariya kapîtalîzmê li ser mirovahiyê ferz kiriye, avakirina jiyaneke azad û civakeke demokratîk e. Peyva *'şoreş'* ya bi zimanê Kurdî em dikarin wekî '*şûstina tiştên reş, tarî û xirab'* şirove bikin.[881]

Wergera peyva şoreşê di pirraniya zimanên Ewropî de *'revolution'* e. Koka vê peyvê xwe dispêre peyva Latînî '*revolutio'* ya ku bi zimanê Kurdî wateya wê '*veger*' ango '*paşve vegerandin'* e.[882]

[881] '**şo'** ji şûştinê tê û '**reş**' tê wateya tarîh û xirab; binêre: Husein Muhammed: *Rehnas – ferhenga etîmolojî ya zimanê kurdî*, 2016: şorreş hevreha soranî شۆڕش (şořiş), herdu ji farisî ورش ش (şûriş) ji شوریدن (şûrîden: dijîtî kirin, şoreş kirin; têk vedan, şêlû kirin; şûştin) - یدن- (-îden: -în, paşpirtika raderiyê) + ش- (-ş / -iş: -iş)

[882] Ferhenga Duden; https://www.duden.de/rechtschreibung/Revolution#herkunft

Gava em van pênaseyên etîmolojîk tînin cem hev, diyardeya şoreşê dibe pêvajoyeke ku mirov xwe ji tiştên xirab xilas bike, ji desthilatdariyê paq bike û vegere nirxên çanda dayikê ya civaka xwezayî. Balkêş e ku peyva '*amargî*' ya zimanê Sumerî jî xwedî maneya '*vegera dayikê*' ye ku di heman demê de wateya wê '*azadî*' ye. Tevgera Azadiya Jinê ya Kurdistanê jî Şoreşa Rojava wekî 'şoreşa duyemîn a jinê' pênase kiriye ya ku li ser ax û nirxên dîrokî yên şoreşa neolîtîk tê bipêşxistin.

Gelo di bin şertên Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de armanca vê şoreşê heta kîjan astê pêk hatiye? Nirxên çanda dayikê wekî edalet, wekhevî û azadî di nav civakbûnê de çawa tên parastin ango ji nû ve zindî kirin? Gelo jinên di nava vê rastiya berxwedan û jinûveavakirinê de rewşa xwe çawa şirove dikin?

Rojîn, yek ji jinên ku bi ked û baweriya xwe ji bo serketina vê şoreşê xebat meşandine, hest û serboriyên xwe wiha tîne zimên: *"Şoreş tê wateya ku tu di nava pençeyê gurekî de yî. Tu di hundirê şoreşê de xweşiya wê tam nabînî. Şoreş hezkirin e, avakirin e. Dema tu pê re mijûl dibî tu her tim dibêjî 'ez ê lê xwedî derbikevim, ez ê bi wê bijîm'. Tiştekî ku tu di nava şoreşê de pê dijî, guhertin û veguhertin e. Tu civakeke mirî bi ruh dikî, civakeke kole azad dikî. Ev karekî pirr mezin û zehmet e. Di civakekê de ku edalet û wekhevî tê de namaye, ewqas bindestî û serdestî tê de çêbûye, divê tu tewazuna wê çêbikî.*

Dema tu li rewşa mirovahiyê meyze bikî, li ti deran tu hêvî û xizmetekê ji bo mirovahiyê nabînî. Lê li Rojava di warê wijdanî û pisîkolojîk de tu rehet î. Dema tu rehet bî, hêza te derdikeve pêş. Dema tu bi vê berpirsyariyê karê xwe dikî û baweriya te mezin be, piştî demekê hêza te bêhtir mezin dibe. Em gihan astekê ku milet ji destketiyên şoreşê bi bawer e. Em dikarin bêjin, sê ribekê gel di wê baweriyê de ye û pê re dimeşe. Ew li hemberî hemû ambargo, êrîşên siyasî û leşkerî heta roja îro li ber xwe didin. Ev li gorî min şoreşeke bi serê xwe ye. Piştî ewqasî, kesek nikare milîmekê jî bêbawerî bimîne."[883]

Di hevpeyvîn û nîqaşan de yên ku bi jinan re şeş, heft salan piştî destpêka Şoreşa Rojava hatine çêkirin, jinan jiyana xwe bi rewşa beriya şoreşê re muqayese dikir. Bi awayekî giştî jin guhertin û bipêşketinên ku di jiyana wan û ya civakê de çêbûne, erênî dibînin. Ew rave dikin ku jinan xwe naskiriye û bi naskirina maf, civak, çand û zimanê xwe, ew bi xwe bawer bûne. Beşdarbûn û birêveberina jinê li warên civakî, aborî, polîtîk û leşkerî de bûye çavkaniya şanazî û nasnameya nû ya jinên Rojava. Ev yek xwe di beşên jiyanê hemûyan de dide der.

Jineke ciwan serpêhatiyên xwe bi vî rengî raber dike: *"Bi şoreşê re vîna jinan pêş ket. Hewldanên me ew in ku em ê bi ramanên xwe şêwazeke rêveberiyê bê sulta [desthilatdarî] pêş bixin. Di hêla zewacê de jî adetên kevin tên guhertin. Heyrandin, berdêlî, zewaca bi pirr jinan re êdî nayên qebûlkirin. Jinên ciwan niha dikarin bi xortan re biaxifin û fikrên wan nas bikin beriya biryara zewacê bidin. Ciwan êdî dikarin bi hev re bişêwirin û hevdu nas bikin. Ruxmê ku têkoşîna me li hemberî desthilatdariya zilam li her cihî berdewam dike jî, pêşketinên girîng hene."*[884]

[883]Hevpeyvîn bi Rojîn Remo re, Qamişlo, 2016

[884] Hevpeyvîn bi Suhelya re, endama Kongra Star ê Çilaxayê, 2017

Asya Ebdullah asta ku şoreşê xwe di nav şeş salan de gihandiye, bipêşketin, nakokî û erkên siberojê wiha dinirxîne: *"Me niha li Rojava sîstemeke demokratîk bi pêşengtiya jinê ava kir. Lê pirsgirêkên jinê, daxteke mezin û şidet li ser beşeke jinan hîna hene. Di asta sosyolojîk û psîkolojîk de gelek jin hîna êşên pergala desthilatdar dikişînin. Beşeke jinan, hîna nikarîbû xwe ji zêhniyeta sîstema desthilatdar rizgar bike. Ev bi serê xwe xeterek e. Em vê mesafeyê di navbera pêşketinên şoreşê û rewşa beşeke jinan de çawa ji holê rakin? Ev pirseke girîng e. Di qadên civak, şoreş û berxwedanê de jin di asta pêşengtiyê de hene û zanistiyeke mezin çêbû. Lê di aliye din de hîna pirsgirêkên pirr bi zehmet ên jinan hene. Ev nakokiyek e. Li gorî nêrîna min, heger ku hemû jin vê şoreşê wekî şoreşa jinê nebînin, ne birêxistinkirî bin û nizanibin çawa biryarê derheqê jiyana xwe de bidin, pêwîst e em van tiştan hemû wekî kêmasiyên xwe binirxînin. Dibe ku ew jin jî jiyana ku tê de ne qebûl nakin û dilê wan bixwaze têkoşînê bikin. Lê dema ku ew ne birêxistinkirî bin, hêz û zanistiya wan kêm be, ew ê neçar bimînin.*

Girîng ew e ku hemû jin zanibin ku şoreşeke jinê heye û ew dikarin têkoşînê bikin. Divê hemû jin zanibin pişteke wan, hêzeke wan a parastinê û rêxistinê heye. Girîng e ku her jin zanibe mekanizmayên wê yên çareseriyê û biryardayînê hene û çi ne. Li ser rewşa wan jinên ku ne birêxistinkirî ne, pêwîst e em têkiliyan ava bikin û lêkolînekê pêş bixin. Belkî ew jin li bendê ne ku kesek were li rewşa wan bipirse û dixwaze gavekê bavêje, lê nizane çawa bike. Ger xebatek wiha hebe, em ê bizanin [ka] em çawa bikarin li hemberî şidet û întîharan têbikoşin û hemû jin jî mafên xwe yên jiyanê zanibin."[885]

Jineke Ereb bi navê Neda ku di sala 2017'an de li Serêkaniyê di komiteya têkiliyên dîplomasiyê ya Kongra Star de xebat meşandiye, da zanîn ku qebûla projeya neteweya demokratîk di nav pêkhateya Ereb de qederê ji sedî 70'yî ye: *"Xwesteka jinên Ereb ji siyesetê re heye ji bo ji bin zilma zilamî derkevin. Nakokî navbera cêlê bi temenê mezin û ya ciwan heye. Yên bi temenê mezin zû zêhniyeta xwe naguherînin. Hîn, tiştên berê wekî adet û teqalîdên kevneperest di serê wan de ne. Teqebûla wan, wek yê ciwan nîne. Di mijarên xwendin, kar û gelek tiştan de ew serhişk in."*[886]

Jinên pîr jî gelek caran bi hesret û hestyarî kevneşopiyên jiyana komînal yên zaroktiya xwe tînin bîra xwe: *"Jiyan berê xweştir bû. Şer û kuştin tine bû. Gel mîna hev bû. Lê weke jin, em îro bûn xwediyê maf û gotinê. Jiyana me niha rehettir bûye. Lê kêmasî hê jî gelek hene."*[887]

Rêya azadiyê rêkê dûr e. Kengî zordestî û koledarî li ser jin û civakê hatin ferzkirin, ji hingê ve mirov li azadiyê digerin. Ev lêgerin heta roja îro didome ji ber ku pênasekirina azadiyê ango peydakirina jiyaneke azad ne hêsan e. Hevpeyvînên bi jinên Rojava re yên li ser mijara guhertinên şoreşê derxistî holê, em li her derê rastî heman hevokê hatine. Bala me kişandiye ku jin hema di nîqaş û nirxandinan hemûyan de hevoka ***'Jinên me ji azadiyê şaş fêhm kirine'*** anîne ziman.

Berê me gelek caran bihistiye ku zilam vê gotinê bi kar tînin. Nexasim dema ku zilam dixwazin misoger bikin ku cihê jinê tenê di mal de be yan jî naxwazin li nihêrîn û gotinên jinê guhdarî bikin, ew xwe dispêrin vê hevokê. Lê îro ev axaftin belav bûye di nava wan jinan de jî yên ku bi armanca azadiya jinê li Rojava xebatê dimeşînin. Mînakên sereke yên ku him zilam him jî jin ji bo terîfkirina 'têgihîna şaş a azadiyê ya jinê' didin, bûyerên jiyanê ne. Ji bo nimûne, tê gotin *"dema ku zilamekî ji jinê qedehek av xwestiye, wê jinê jê re gotiye, 'rabe û ava xwe bi xwe bîne!'"* Gelek

[885] Hevpeyvîn bi Asya Ebdullah re, Qamişlo, 2017

[886] Hevpeyvîn bi endamên WJAR û Kongra Star a Serêkaniyê re, 2017

[887] Hevpeyvîn bi Yadê Hemîde re, gundê Helincê ya Kobanê, 2017

caran jî tê gotin *"derketina jinê ji malê û lixwekirina cilan ne azadî ye"*.

Beranberî vê me xwest têgihîna azadiyê ya civakê hîn baştir fêhm bikin û her wiha çavkanî, sedem û armanca bi kar anîna vê gotinê dahûrînin. Lewma me li hemû navçeyên Rojava ji jinan pirsî gelo ***'Azadî çi ye?'*** û ***'Çima tê gotin, jinên me ji azadiyê şaş fêhm kirine'***? Di bihara 2018'an de Navenda Lêkolînê ya Jineolojiyê ya Dêrikê jî pirsnameyek derbarê têgihîna azadiyê de amade kiriye û nîqaş bi komên jinan re meşandine. Nihêrîn û pênaseyên ku di van hevpeyvîn û lêkolînan de derketin holê, em dikarin bi kurtî wiha raber bikin:

- **Azadî çi ye?**

Pirraniya jinan wateya azadiyê, girêdayî azadiya vîn, fikr û ramanê terîf dikin û bi van têgihînan pênase dikin: '***Azadî,*** *fikr, îrade û nêrîna bi zanistê ye'; 'dema tu azad bifikrî û hurmeta azadiya fikrê ya kesên din raber dikî'; 'dema ku mirov serbixwe tevdigere û bikare biryarên xwe bide'.* Ji ber vê *'şikandina zincîrên koletiyê', 'xwe ji bandorên neyînî xilaskirin'* û *'xweperwerdekirinê'* pêwîst dibînin da ku jin bikarin '*xwe û nasnameya xwe nas bikin'*.

Her wiha gelek jin jî azadiya xwe girêdayî azadiya civakê şirove dikin. Ji bo wan wateya azadiyê '*keramet, edalet û wekhevî'* ye*;* nexasim jî '*wekheviya di navbera jin û zilamê de'*. Ew '*xwebirêvebirin û tevlîbûna jinê di her beşa jiyanê de'* wekî stûnên azadiyê dibînin. Li gorî nihêrîna gelek jinan jî '*serxwebûna aborî'* azadî ye. Bi kurtasî jî jinan azadî wekî '*jiyaneke bê tirs û jiyaneke bi rûmet'* da nasîn. Jinekê jî bi rengekî sade azadî wek tiştekî jêneger pênase kir û got, '*Azadî wek nan û avê ye'.*[888]

Xewla Diyad wekî jineke Ereb ji Til Temirê, azadî wekî mihtaca bingehîn a jiyanê rave dike. Ew azadiyê wekî nihêrîna cewherî ya mirov pênase dike ku di heman demê de '*hebûn û tinebûna mirov'* dide diyarkirin. Bi hestên xwe yên hundirîn û kelecanê ew dibêje: *"Azadî tiştekî pîroz, xweş û mezin e. Dema ku mirov bi azadî bi zimanê xwe biaxive, bi cil û berg û çanda xwe bijî, mirov azad e. Dema ku mirov bixwe xwedî nêrîn be û kesek desthilatdariyê li ser kesekê ferz neke. Yanî kesek jê re nabêje 'rabe', 'rûne', lê dema kesek tiştan bixwe bike. Ew e ku mirov pêdihese ku ew bi azadî tevbigere û azad nêrînên xwe dibêje, tiştên ku di hundirê wê de hebe diteyise, nema kole be û bi cîhaza kumanda di destê keseke din de nameşe."*[889]

Di pênaseyên azadiyê de gelek caran hesret û êşên jinan jî xuya dibin. Ji bo gelek jinan, raza azadiyê di pêkanîna wan tiştan de ku ji wan hatine standin û di gihiştina wan pêdiviyan de ku ji wan bêpar mane, veşartî ye. Jinên gundê Jinwarê yên wekî Bedrana, rave dikin ku wan tama azadiyê li gundê jinê nas kiriye. Bedrana jineke Ereb e û hevjîna şehîdekî ye. Wê bi 7 zarokên xwe re jiyaneke nû li Jinwarê dest pê kiriye û dibêje, *"Min berê bi wateya azadiyê nizanîbû. Min qîmeta azadiyê li Jinwarê nas kir, azadiya demokratîk."*[890]

Hêvîdar jî dide xuyakirin ku wateya azadiyê bixwe yekbûna fikr û hest e: "*Dema însan ramanê xwe, nêrîna xwe bikare bê guman bîne zimên û bikare xwe temsîl bike; dema jinek bikare di şexsê xwe de jinên cîhanê, jinên Kurd, jinên Ereb, Aşûr û Suryanî temsîl bike; dema tu bi parastina rewa*

888 Navenda Lêkolînê ya Jineolojiyê ya Dêrikê: *Encamên rapirsiya 'Azadî çi ye?'*, 2018

889 Hevpeyvîn bi Xewla Diyad re, Til Temir, 2018

890 Hevpeyvînên bi jin û zarokên li gundê Jinwar re, Jinwar, 2018

parastina hemû jinan bikî; dema tu xwe di fikr û bîrdoziya azadiyê de kûr bikî û tevahiya zanistê di xwe de kom bikî, ev hemû ji bo min azadî ye. Ji bo me azadî, azadkirina hemû jinan e."[891]

Arîn 8 salî ye û bi dayik û pênc xwuşkên xwe re li Jinwarê dijî. Ew zarokên derdora xwe nîşan dide û bi misogerî dibêje, *"Azadî zarok in! Hemû zarokên ku li vir dileyizin û xwe bi hêlikê hêl dikin! Azadî zarok in!"*[892]

Her wiha gelek jin, nexasim dayikên navsere behsa mînakên ne-erênî dikin, dema ku azadiyê terîf dikin. Ew guhertinên civakî yên ku di salên dawî de qewimîne û rewşa jinan li gorî nêrînên xwe di aliyê erênî û neyînî de didin ber hev: "*Azadiya jinê ne rewşa jin ya cil, ya por e. Azadiya jinê mejî ye, fikrê wê ye. Dema jin fikrê xwe bişuxlîne û pêş dixe. Hinek jin hene, ew diherin hinek cihan, diherin nava şahran, ew ne azad in. Jinên ku aqilê xwe pêş dixin û dişuxilînin û bi hevalê zilam re kar dikin, ew azad bûne. Ji ber, jin berê tenê di mal de bûn. Jinên ku di nav siyasetê de bin, di nav leşkeriyê de bin wan xwe azad kirine."*[893]

Hevseroka Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Bêrîvan Xalid balê dikişîne ser têkiliya azadiyê bi demokrasiyê re. Ew dide xuyakirin ku ji bo bicihanîna azadî û demokrasiyê têkoşîna jinan xwedî risteke pêşeng e: "*Di têgihîna azadiyê de demokrasî esas tê girtin. Em dikarin bêjin ku rêveberiya xweser ew bi xwe jî mînakek e ku em dikarin bi demokrasiyê bijîn. Ev tê wateya ku tu qîmet didî her tiştî û her kesî. Qîmetdayîna însan û civakê ye. Berî her tiştî tu her kesî bi xwe re bixî di nav kar de û tu hevbeşiyê çêbikî. Ya ku herî zêde demokrasî daye naskirin û jê re pêşengtî kir, jin e. Ji ber ku jinê ne tenê bi nasnameya xwe ya qewmî têkoşîn dikir. Wê têkoşîna xwe bi nasnameya xwe ya jin dikir û beriya her tiştî cinsê xwe parast. Ger jina Kurd ba, Ereb ba, Suryan ba, Tirkmen ba, çi jinên ku di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dijiyan, têkoşîna wan dibû yek ji bo nasnameya wan a jin."*[894]

Ji vê wêdetir jî beşeke jinên civaka Bakurê Sûriyê têgihîna azadiyê wekî *"guhdarî li derdora xwe kirinê* û *jiyaneke li gorî rêûresmên civakê"* şirove dikin. Jinên Ereb di navbera 35 û 45 salî de yên ku wekî karkerên şahredariyê li gundeke Dêrikê dixebitin, bê dudilî gotin, ew di jiyana xwe de niha azad in. Berê wan tenê dikarîbûn li gel zarokên xwe yên nexweş biçin gel doktor. Wekî din wan nikarîbû ji mala xwe derketibana. Lê niha ew dikarin kar bikin, werin cihê kar û biçin malê. Ji derveyî vê çênabe ku biçin cem hevalekî xwe yê gundiyên wan nas nakin. "*Erê, ji bo me azadî bi rehetî ji malê derketin û hatina malê ye. Destûra me ya derketina derveyî malê bi qasî heye ku em ji bo malê pere bînin. Lê em bi vê kêfxweş in, razî ne. Niha civaka me guheriye. Mînak jin dikare di asayîşê de kar bike, dikare tevlî YPJ'ê bibe. Berê tiştên wiha eybeke mezin bûn. Civakê bi ti rengî qebûl nedikir, ew keç weke keçên ku hatine revandin, gunahkar didîtin."*[895]

Tevî têgihîştinên cuda yên azadiyê û tevî aliyên mayî jî, pirraniya jinên Bakurê Sûriyê pê qaneh in ku bi Şoreşa Rojava re jin û civakê gavên mezin ber bi azadiyê ve avêtine. Ew di encama nirxandinên li ser jiyana xwe ya şexsî û çavderiyên xwe derheqê rewşa civakê de gihiştine vê qanaetê. Serboriyên Meyase ya ku wekî jineke ciwan a Kurd di nav şert û mercên şoreşê de mezin

[891] Çavkanî li heman cihî

[892] Çavkanî li heman cihî

[893] Hevpeyvînên bi beşdarên perwerdeya Akademiya Kongra Star re, Rimêlan, 2018

[894] Hevpeyvîn bi Bêrîvan Xalid re, hevseroka Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Eyn Îsa, 2018

[895] Navenda Lêkolînê ya Jineolojiyê ya Dêrikê: *Encamên rapirsiya 'Azadî çi ye?'*, 2018

bûye jî vê yekê piştrast dikin: *"Wek ciwan, em di hundirê şoreşekê de mezin bûn. Di destpêka şoreşê de me gelek jin dîtine ku di hundirê mala xwe de kole bûn. Îro em dibînin ku ew gihîştinê azadiyeke gelek peşketî. Vê şoreşê gelek guhertin bi xwe re anîn. Ez xwe di hundirê malbata xwe û civakê de azad dibînim."*[896]

Li gel pênase û nirxandinên gişti li ser têgihîna azadiyê, me xwest hîn zelaltir fêhm bikin jin li radeya azadiya jinê bi çi şêwe û ferasetê dihizirin. Li gorî vê, ew kîjan nêzîkatiyan dipejirînin yan jî napejirînin. Lewma me ji jinan pirsî: *Bi nihêrîna civakê kîjan jin wekî 'jina azad' tê hesibandin? Pîvanên azadiya jinê çi ne? Jinên ku ji azadiyê şaş fêhm kirine kî ne?*

- **Bi nihêrîna civakê jina azad kî ye?**

Li ser pirsa *'Bi nihêrîna civakê û bi taybet a zilamî, jina azad çawa ye û kî ye?'* jinekê ji me re got, "*Di civaka me de ev pirs ji jinê nayê kirin!"* Lê belê bi gişti bersivên jinan ji me re got, sê meyl derbarê têgihîna azadiya jinê de derdikevin pêş:

Meyla yekem ew e ku wekî '*jinên azad*' yan jî *'jinên baş'* ew jinan tên pênasekirin yên ku '*bi mala xwe, adet û teqalîdan ve girêdayî bin'*. Di nav van de jin tên hesibandin yên ku '*xizmet û karê malê dikin* û *yên ku erkên xwe yên derve û hundirê malê pêk tînin'*.

Li gorî **meyla duyem** jî '*jina azad*' wekî wê jinê tê pênasekirin ya ku dide pey berjewendiyên xwe yên şexsi û desthilatdariyê: '*jina ku weke zilam bifikire û bihizire'; 'bi zêhniyeta zilam ku li kesî guhdarî nake'* ango '*jina ku teqlîda zilamî dike û zêhniyeta zilamî qebûl dike'*.

Beramberî van meylan, **meyla sêyem** di nav civakê de kesayeta jina ku '*xwedî îradeke xurt be; xwedî cesaret, hişmendî û berpirsyarî be'* wekî '*jina azad'* tê nîşandan. Di nav van jinan de '*jinên xwendevan yên ku bi xwesteka xwe her tiştê xwe pêk tînin'; 'jinên ku erkên jiyan û azadiyê rast nas dikin'; 'jinên ku wekhevî di navbera xwe û zilamî de di her beşa jiyanê de ava dikin'* û *'jinên şoreşger yên ku jiyana xwe ji bo azadiyê feda dikin û xwe îsbat dikin'* tên bîra mirovan.

Piştî nihêrînên jinê li ser pênaseyên ku di civakê de ji bo jinan tên raberkirin, me xwest nihêrînên jinan bi xwe derheqê pîvanên azadiya jinê de nas bikin û me ji jinan pirsî:

- **Pîvanên azadiya jinê çi ne?**

Me xwest bizanibin, *gelo ji bo kîjan jinê tê gotin ku wê ji 'azadiyê şaş fêhm kiriye'?* Jinan li gorî ferasetên xwe bersivên cuda ji bo vê pirsê peyda kirine. Ev meylên cuda yên ku di pênasekirina pîvanên azadiya jinê de derketine holê, di heman demê de jî şiroveyên jinan li ser îdîaya '*jinên me ji azadiyê şaş fêhm kirine*' didin xuya kirin. Bi xatên stûr em dikarin bersivên jinan dîsa wekî sê meyl ango ferasetên cuda dabeş bikin:

Beşeke jinan pîvanên azadiya jinê, wekî '*pîvanên adet û teqalîdên civakî'; 'karkirin'; 'zewac û anîna zarokan'* bi nav dike û fêhm dike. Ew dibêjin, '*jinên ku azadî şaş fêhm kirine*' ew jin in yên ku '*adet û teqalîdên civakê li ber çav nagirin'*; yên ku '*bê disîplîn tevdigerin'* ango '*bê exlaqiyê dikin'*. Pênaseya exlaq jî gelek caran li gorî feraseta baviksalar tê raberkirin ya ku jinê wekî namûs û milkê bav û zilamî dibîne. Li şûna lêpirsîna neheqî û bandorên pergala baviksalariyê, yekser jin

[896] Çavkanî li heman cihî

gunehbara muhtemel tê dîtin. Jinên ku xwediyê vê nihêrînê ne, qesd dikin ku '*serbestî'* û *'jiyaneke bê armanc'* sedemên 'têgihîna şaş a azadiyê ya jinan' in. Mînak jinên Ereb li gundên Dêrikê diyar kirin ku ew dixwazin kevneşopiya zawacê ya keçên temenpiçûk biparêzin: "*Ji ber ku jin azadiyê şaş fêhm dike, lewra zewaca keçan a zû pêşiyê li gelek pirskirêkan digire û keça ciwan bi vî rengî disitirîne. Ew zewac jî bi riza keçe çêdibe, ne bi zorê."*[897]

Jinên bi vê têgihîna azadî û exlaqî bi pirranî li gorî pîvanên ku ew di malbata xwe de fêrî bûnê, radibin û rûdinin, û li gorî vê jî jinan wekî 'jinên baş' û 'jinên xirab' dabeş dikin. Jineke ciwan a Kurd nihêrîna xwe li ser vê mijarê wiha tîne zimên: *"Azadî bi qasî zanistekê nehatiye fêhmkirin. Her yek li gorî mentiq û mefhumê xwe şirove dike, fêhm dike. Ez bi esehiyê nêz nabim. Ez bi azadiya xwe, li gorî şexsiyeta xwe nihêrîna xwe didim. Jina ku fêhm neke azadî çi ye, ew bi cilê xwe û derketina xwe, xwe azad dibîne. Ew bi xortan re diaxive û bi têkiliyên şaş nêz dibe. Di hundirê malbata xwe de ti kesî ji min re negotiye 'te azadî şaş fêhm kiriyî'. Çima? Ji ber min ew firsend li peşiya malbata xwe venekir da ku axaftineke wisa ji min re bêjin. Ji ber, ez ji azadiya xwe bawer im. Ez dizanim ez çi dikim û ez azad im."*[898]

Beşa duyemîn a jinan jî pîvanên azadiya jinê li gorî statûya zilamê di nav civakê de pênase dikin. Ew dixwazin ku '*jin jî wek zilam xwedî maf û erk be û hemûyan pêk bîne'.* Carna bêyî ku pîvanên exlaqê rast, baş û xweşik dahûrînin, ew tiştên ku zilam dikin, ji xwe re wekî mînak digirin. Bi vî rengî, ew li wekheviya di nav jin û zilamî de li gorî zilam digihîjin yan jî wê wekî rabûn û rûniştina bi taybetmendiyên zilamê desthilatdar fêhm dikin. Ev yek jî silbûn û biyanîbûna jinê ji nirx û çanda xwe ya civakî û dîrokî îfade dike. Li aliyekî ew pesnên zilamî ji xwe re wekî pîvana bipêşketinê qebûl dikin, li aliyê din jî ew gelek caran bi çavekî piçûk li jinan dinihêrin. Li gorî wan, *'jinên azadî şaş fêhm kirinê'* jinên '*nezan'* in û yên ku '*atifî nêz dibin'.* Jinên ku xwegihandina statûya zilamî ji xwe re esas digirin, bi pirranî bi hewesa desthilatdariyê tevdigerin. Li şûna xwedîderketina li nasname û rêxistinbûna jinê, ew xeyal dikin ku wekî ferd armancên xwe pêk bînin û xwe îsbat bikin.

"Mixabin jinên me hene yên ku di gelek cih û saziyan de cihê xwe girtine û hêza xwe gişt ji zilam distînin. Ez vê kêmasiyê dibînim. Dema tu hêza xwe ji zilam distînî, tu azadiya xwe nabînî. Heger tu bi xwe hêz bî û bi xwe ava dikî, wê çaxê tu dikarî bêjî 'ez azad im'. Çima tu piştgiriya cinsê xwe esas nagirî? Ji ber ku çanda burjuwazî û desthilatdariyê ketiye nava jinê de jî. Lê fikirîna li desthilatdariyê û berjewendiya malbata xwe, ziyanê digihîne civakê. Divê tu desthilatdariyê hilbiweşînî."[899]

Têgihîna 'wekhevî' ya bi feraseta pergalê di cewherê xwe de dabeşkirina çînî ya jinan e. Jinên ku li gorî nihêrînên desthilatdaran wekî kesayet bi hêz û serketî bin, 'bindestbûna jinên din' wekî kêmasiya wan a kesayetî dinirxînin. Têkoşîn û hewesa wan beriya her tiştî, wekî şexs ji bo gihiştina payeyên bilind bi pêş dikeve.

Beşa sêyemîn a jinan jî rêgezên bîrdoziya azadiya jinê wekî pîvanên azadiya jinê dipejirînin. '*Jina ku bibe xwedî îrade, berpirsyarî û bixwebaweriyê'; 'jina ku di nava civak û malbatê de xwedî rûmet û biryar be'; 'jina ku xwedî fikr, felsefe û îdeolojî be'* ew wekî mînakên jinan destnîşan dikin

[897] Çavkanî li heman cihî

[898] Nihêrînên ji nîqaşa koma jinan li Navenda Jineolojiyê ya Dêrikê li ser encamên *Encamên rapirsiya 'Azadî çi ye?'*, 2018

[899] Hevpeyvîn bi Emîne re, Qamişlo, 2017

ku pîvanên azadiyê di kesayeta xwe de ava kirine. Beşeke mezin a jinên Rojava '*xwe û civak perwerdekirin'; 'çalakbûna jinê di nava civakê de'; 'hişmendî û rêveberina hevbeş'* wekî rêgezên azadiya jinê esas dibînin. Bi vî rengî, ew azadiya jin û civakê, azadiya şexs û jinan hemûyan peywendîdarê hev dinirxînin. Pirraniya van jinan pîvanên azadiya jinê bi têkoşîna li dijî pergala desthilatdariya zilam ve girêdidin. Li gorî wan '*xwe û jinên din ji zayendperestiyê xilaskirin'; 'xilasbûna jinê ji zilm û koletiyê'* û pê re girêdayî '*xilaskirina koletiya insanî li ser insanî*' esasên feraseta azadiya jinê ne. Ew diyar dikin ku pêkanîna '*edalet û wekheviyê'* rêgez û erka têkoşîna azadiya jinê ne.

Gelek ji wan jinan bi gotina 'jinên ku ji azadiya jinê şaş fêhm kirine' wan jinan rexne dikin yên ku '*nêzikatiyên hişk raber dikin', 'nêrînên hevdu qebûl nakin'* û '*desthilatdariyê esas digirin'*. Bi vî awayî ew gazinên xwe ji wan jinan tînin zimên, yên ku teqlîda şêwaza zilamê desthilatdar dikin û yekîtiya jinan esas nagirin. Her wiha, ew ji bo '*jinên ku azadiya jinê ji welatpareziyê qut dikin* û *azadiya zayendê din nas nakin'* ango '*zilamî red dikin'* jî heman pênaseyê bi kar tînin.

Sedemên wan feraset û nêzîkatiyan ew wekî '*zanebûna kêm'* û *'negihîştina zanebûna jinê'* ji ber *'kêm perwerdebûyîna jin û civakê'* şirove dikin. Ji ber '*kêmasiyên hişmendiya civakê ya ku jin tê de dijî*' jin ji cewherê xwe dûr dikevin û nabin aydê xwe. Ew dibêjin, '*zêhniyeta zilamê desthilatdar'* li aliyekî bi '*adet û teqalîdên di bin navê olî de'* zextê li ser jinê ava dike; li aliyê din jî têgihîna moderniteya kapîtalîst a estetîkê ku '*xweşikbûna jinê bi canê wê, bi cil û bergên wê belî dike'*.

Ji vê wêdetir hinek jin jî çavkaniya gotina '*jinên me ji azadiyê şaş fêhmkirine*' girêdayî rastiya zilaman şirove dikin. Ew rave dikin ku zilamên ku naxwazin dev ji serweriya xwe di civak û malbatê de berdin, xeyidîna xwe ji bipêşketina bixwebaweriya jinê bi van gotinan diyar dikin. Ji ber ku '*di nêrîna zilamî de jin hîna amûreke kirrîn û firotinê ye'*.

Dayikeke şehîdan dibêje: *"Azadiya jinê bi jinê re ye. Roj bi roj jin ji xwe bêhtir bi bawer dibe û xwe dide qebûlkirin di hundirê civakê de. Dema ku zilam dibejê, 'jinê azadî şaş fêhm kiriye', ew tê maneya ku zilam xwe kêm dibîne. Ew wisa dibêjin, ji ber hertim zilam jinê wek koleyekê ji xwe re çêkiriyê. Lê roja îro jin xwe kolê nabîne, xwe azad dibîne. Nêrîna min wisa ye."*[900]

Beramberî vê hinek jinên din jî didin xuyakirin ku jinê '*ji ber zexta li ser jinê tê meşandin hê jî azadî nas nekiriye'*. Lewma nakokiyên kûr di navbera daxwazên wan û bendewariyên civakê de, di navbera fikrên şoreşa jinê û kevneşopiyên civakî de bi wan re peyda dibin. Dayikeke ciwan nakokiyên gelek jinan bi mînaka rewşa xwe ya jiyanê eşkere dike:

"Min hîn azadî nedîtiye, ji ber hîn gelek jin hene yên ku koletî û zilm li wan dibe. Gelek ji wan yên koletî û zilmê qebûl nakin, xwe didin berdan. Zilam ji bo wê yekê dibêjin, 'jinê ji azadiyê şaş fêhm kiriye.' Niha mînak ez im. Ji bo zarokê xwe min heta niha qebûl kiriye. Erê, min lêdan nexwariye. Lê min xwe tenê neda berdan ji ber ku ez ji xwe û malbata xwe şerm dikim. Ez vê li ser xwe malbata xwe û zarokê xwe qebûl nakim.
Gelek zilaman 'ji azadiyê şaş fêhm kiriye' ji bo jinê tenê dibêjin. Lê çima ji bo xwe jî nabêjin? Tenê jin li ber çavê xwe dibînin, ji ber her zilam xwe desthilatdar dibîne. Azadî divê ku wekhevî di hundirê malbatan de çêbe di navbera zilam û jinê de. Divê her kes azadiyê li ser xwe û ji derveyî xwe jî bide qebûlkirin. Em jin ji xwe negihiştinê azadiya xwe, ya em dixwazin. Ji bo vê em dibejin,

[900] Navenda Lêkolînê ya Jineolojiyê ya Dêrikê: *Encamên rapirsiya 'Azadî çi ye?'*, 2018

'me azadî hîn fêhm nekiriye'. Yên ku di dema niha de xwe azad dibînin, wan ji azadiyê şaş fêhm kiriye."[901]

Li hemberî vê, gelek caran di sohbet û nîqaşan de zilam îdîa dikin *'ji xwe jina min azad e, ew çi bike serbest e'*. Lê belê rapirsîna Navenda Lêkolîn a Jineolojiyê ya Dêrikê dide ber çav ku pirraniya jinan '*zêhniyeta zilamê desthilatdar', 'adet û teqalîdên civakê', 'bandora ol'* û *'pirsgirêkên aborî'* wekî kelemên sereke li pêşiya azadiya jinê dinirxînin. Xwe gihandina hêza xwe ya cewherî û yekîtiya jinan, naskirina civakê û xwedî derketina li çanda xwe ya resen, ew wekî binyatê rêya azadiyê bi nav dikin.

"Me azadî neditiyê da ku em bikarin fêhm bikin. Divê em di destpekê de bibînin heya em bêjin em jinên azad in. Çareserî perwerde û ji yekbûna jinan hêzgirtin e. Bila tiştên ji derveyî çanda me wek înternet û tiştên ku terzê jiyana me didin guhertin, nekevin di nav civaka me de. Divê her jinek sînorê xwe yê azadiyê berfirehtir bike û azadiya xwe bistîne. Çavê jinan bila vekirî bin. Dema bêexlaqî li ser jinan tê meşandin, bila qebûl nekin. Em her tiştê bi hev bidin fêhmkirin, da ku em ji zilma zilamî derkevin û bi jiyaneke wekhev bijîn."[902]

Di encama lêkolîn, nîqaş û lêpirsînên li ser têgihîna azadiyê de em dikarin bibêjin, peyva *'jinên me ji azadiyê şaş fêhm kirine'* diyalektîka nakokî û veguhertinên civakî yên Şoreşa Rojava eşkere dike. Lêgerîna jinê ya azadiyê didome. Sedema ferasetên wekî meyla desthilatdarî yan jî hewesên ferdperestî û modayên modernîteya kapîtalîst bê guman ne lêgerîna azadiyê ya jinê ye. Ev meyl xwe dispêrin zayendperestî û bîrdoziya lîberalizmê ya ku hewl dide nasname û xwebûna jin û civakê ji holê rake.

Di qeyrana Şerê Cîhanê yê Sêyem de êrîşên fizîkî û bîrdozî hemwext li ser beden û zêhnê mirovan tên meşandin. Qirkirinên çandî, dîrokî û civakî hebûna jin û gelan dixin metirsiyê. Kok û çavkaniyên jiyanê tên wêrankirin; xweza û tenduristiya mirovan tên jehrkirin û rizandin; olperestî, nijadperestî û zayendperestî bi rêbazên hişk û zirav tên gurkirin. Di nava van pêvçûn û êrîşên bişaftinê de rast fêhmkirin û watedarkirina azadiyê ne hêsan e.

- **Şoreş û Lêgerînên Azadiyê Didomin**

Ji bo lêgerîn û gihiştina azadiyê, asoyeke fireh pêwîst e. Teqez, hîmên bîrdozîya azadiya jinê û xwebûnê rê li ber azadiya jinê vekirine. *Lê fikrên ku me ji qalibên desthilatdarî û bindestiyê xilas kirine, gelo em ê çawa veguherînin gotin û çalakiyên azadiyê? Em ê etîk û estetîka azadiyê di kesayet û çanda civaka xwe de li ser koka xwe ji nû ve çawa biçînin û bi berhemên têkoşîna azadiya jinên Kurdistan û cîhanê av bidin? Em ê zanebûna xwe, hebûna xwe û şeklê xwe çawa bikin yek?*

Ev pirsên girîng in da ku em bizanin çi aydê me ye û em dixwazin bi kû ve biçin. Di pêkanîna şoreşa jinê ya duyem ya li ser axa Kevana Zêrîn de, em hîna di destpêkê de ne. Carna peyvên nû bi hişmendiyeke kevneperest tên bi kar anîn. Carna jî jin cilên resen lixwe dikin, lê xwedî nihêrîneke modernîst in. Ev mînakên nakok û têkiliyên diyalektîk, bi guhertinên şoreşê re di navbera şikl û

[901] Çavkanî li heman cihî

[902] Çavkanî li heman cihî

cewher de darîçav dibin. Bi dahûrandina van nakokiyan, em dikarin derfetên fêhmkirina hişmendî û bijartinên xwe ava bikin.

Guhertinên ku di teşê de dest pê dikin dikarin dehf bibin ji bo fikr û nihêrînên nû bi pêş bikevin. Her wiha, fikr û gotinên nû dikarin bibin sedama peydakirina şêwaz û şiklên nû yên jiyanê. Gelek jinan di hevpeyvînan de bal birin ser wê yekê ku ew di nav pirsgirêkên malbatî de fetisandî bûn lê bi naskirina fikrên Abdullah Ocalan, ew ji nû ve hatine dinê. Bi cihgirtina di nava şoreşê de gelek jinan lêgerina azadiyê di kesayet û jiyana xwe de jî bi pêş xistiye. Jinên ku berê di mala xwe de heps bûn lê belê her tim di hundirê xwe de hêzek hîs kirine ya ku wan nikaribû îfade bikira, bi şoreşê re wan rêyên nû yên jiyanê keşf kirine. Li hemû gund û bajarên Rojava em rastî jinên ji nifş û pêkhateyan hemûyan hatin yên ku hebûn û îfadeya xwe di nav rastiya şoreşê de dîtine.

Yek ji van jinan Emel Celûde ye, jineke Ereb ji Til Kocerê. Ew dibêje, xwendina pirtûka Sosyolojiya Azadiyê ya Abdullah Ocalan jiyana wê guhertiye û vê pirtûkê wekî 'dermanê jinê' bi nav dike. Pê re wê gelek warên nû yên jiyanê nas kirine û keda xwe tevlî xebatên jinûveavakirina jiyana civakê kiriye. Ji bo Emel azadî, jiyanî kirina felsefeya azadiyê û bipêşxistina vîna jinê ye: *"Ez rast nabînim serxwebûna jinê bi aboriyê re çêbibe. Ji bo tekoşîna wê, gerek vîna wê hebe. Vîn ser her tiştî re ye. Dema vîn nebe, pere feyde nake. Pere diçin û tên, lê tu dimînî û tu pere tînî. Girîng ev e, niha jinê dît ku jin pirsgirêkên wê çareser dike, zilam çareser nake. Azadî nayê, heya jin azad nebe. Ez di vê baweriyê de me. Niha jin mafê xwe nas dike. Lê perwerde ji zilaman re divê. Însan di perwerdeyê de tê guhertin. Ez ji xwe dizanim."*[903]

Dîsa bi lêgerîna azadiyê, jinên ji gelek welatên cîhanê jî berê xwe dane Rojava. Di nav gelek qadên şoreşa Rojava de ew wekî înternasyonalîst cihê xwe digirin. Bipêşketina şoreşa jinê û damezrandina pergala xweseriya demokratîk hêvî û îlham daye wan ku avakirina jiyaneke azad pêkan e. Bi tevlîbûna xwe di nav xebatên şoreşê de ew him zanebûn û danehevên têkoşînên azadiya jinên cîhanê parvedikin him jî rastî û destketiyên şoreşa jinê ya Rojava nas dikin. Bi vî rengî jinên Rojava jî hîn zêdetir pê hisiyane ku pêşengiya wan a şoreşê xwedî wateyeke dîrokî û gerdunî ye.

Li ser bingehê xebat û têkoşînên ku bi Şoreşa Rojava re di warên polîtîka, xweparastin, etîk û estetîk, tenduristî û ekolojî, aborî, demografya, perwerde, jiyana hevjîn, malbat û jinên ciwan de hatine meşandin, gelek bipêşketin di rewşa jin û civakê de qewimîne. Pêşengên şoreşa jinê, bipêşketinên ku di heft, heşt salên piştî destpêka şoreşê de qewimîne wiha rave dikin:

"Di warê perwerdeyê de pêşketinên mezin çêbûn. Jin di destpêkê de hîn zêdetir bi hestyarî tevlî bû. Niha zanebûn pêş ket. Nakokiya cins û têkoşîna cins pêş ketiye. Niha li bin banê Kongra Star sîstema jinê hat avakirin. Berê tenê Mala Jinê û Meclîsa Yekîtiya Star hebûn. Pergal berfireh bû, komîn û meclîsên jinê çêbûn. Qanûnên jinê çêbûn. Jin ji zilam hesab dikare bixwaze. Jin dikare zilamekî ku tundîîyê li hemberî jinê bi kar tîne, dadgeh bike û bixe hepsê. Asayîşa Jinê çêbû. YPJ pirr mezin bû û bi berxwedana Kobanê deng veda. Şerên pirr mezin çêbûn. Komutanên pirr mezin derketin [holê] û şehîdên pirr mezin çêbûn. Di mînaka berxwedana Efrînê de me careke din pêşengtiya jinê dît. Hêzên Parastina Civakî yên Jinê wekî sazî xwe bi rêxistin kir. Aborîya Jinê çêbû. Lêkolînên jinan û Jineolojî pêş ketin. Gundekî jinan hatiye avakirin. Pergala hevserokatiyê û nûnertiya wekhev li her derê hatiye rûniştandin. Berê nêzîkatî hîn zêdetir sloganwarî bûn. Niha

[903] Hevpeyvîn bi endamên Kongra Star a Til Koçerê re, 2017

tehlîlên civakê hene. Asta zanebûna bîrdozî û lêgerîna çareseriyê pêş ket. Rêveberiya Jinê ya xweseriya demokratîk û Desteya Jinê çêbûn. Jin di rêveberiyan de hene û bi rista xwe radibin. Mamosteyên di qada perwerdê de pirranî jin in. Di qadên tenduristî, parastin û karê civakî de pêşketin hene û pirranî jin tê de bi rola xwe rabûne. Ev hemû pêşketinên şoreşa jinê ne."[904]

"Di civaka Ereb de jina ku nikaribû ji malê derketiba. Niha tu dikarî jinên Aşûrî, Kurd û yên hemû pêkhateyên Bakurê Sûriyê di meş û serhildanan de bi hev du re bibînî. Di xebatên me yên civakî de jin ji hemû beşên civakê xwe tê de dibînin, dixwazin tê de cihê xwe bigirin. Niha em di qonaxekê de ne ku em li hemberî dagirkeriyê li ber xwe didin. Ev berxwedaneke hevbeş e. Îslama radîkal û dagirkeriya dewleta Tirk ji bo hemû gelên Rojhilata Navîn xeterên pirr mezin in. Jin û civakên hemû pêkhateyan bi vê dizanin.

Li hemberî vê xeterê jî pêwistiya berxwedan û şerekî gelêrî heye. Di vî warê de ne tenê YPJ, tevahiya xebatê ji bo parastina vîna gel û jinan pirr girîng in. Jinên hemû pêkhateyan jî di nav rêveberiya xweser de, di siyaset û dîplomasiyê de û li hemû saziyan di asta rêveberiyê de cihê xwe digirin. Sekretera Giştî ya Partiya Sûriya Misteqbalê Hevrîn Xelef jinek bû. Di dîroka siyaseta Sûriyê de mînakên din wekî wê nînin. Ev asta pêşketinên civakî û xwerêxistinkirinê dide xuyakirin. Bi berxwedanê re nasnameya jinê derket [holê] û jin di hemû saziyên Bakur û Rojhilatê Suriyê wek hevserok cihê xwe digirin."[905]

Lê belê bûyerên zû û liserhev, carna jî dibin sedem ku destketiyên giranbiha yên ku bi berdêlên giran hatine avakirin, ji rêze bên dîtin. Vêga li şûna ku her kes xwe ji bo parastin û mezinkirina van nirxan berpirsyar bibîne, nêzîkatiyên burokratîk û bi bendewarî jî xwe didin der: *"Bi sazîbûnê ve jî 'normalbûn' pêş ket. Li gorî berê heyecan piçekî kêm bû. Di destpêkê de her tişt bi kelecan, eşq û moral bû. Her kesê jixwe dida. Ev heyecan, kelecan niha kêmtir bû. Niha wan tiştan 'normal' tên dîtin. Lê belê sîstemekî xweser hatiye rûniştandin. Pirsgirêkên me yên îro pirsgirêkên pêşketinê ne."*[906]

Ji bo watedayîna nirx û destketiyên şoreşê daîmî zîndî bin û ji bo xwedîderketina li wan bi ked û fedakariyê bidome, parvekirina serpêhatî û lehengiyên dîroka Şoreşa Rojava bi nifşên nû re pirr girîng e. Perwîn ji ciwantiya xwe ve tevlî xebatên tevgera ciwanên Kurd bûye û merhaleyên şoreşê hemû dîtine. Ew balê dikişîne ser bandorên li ser derûniyê yên ji ber dirêjbûna şer û şoreşê:

"Şoreşa me di alîyekî de tişt pêk aniye ku me bawer nedikirin wê çêbibin: Em êdî bi zimanê xwe yê Kurdî diaxivîn, saziyên me çêbûn û rêveberiya me hatiye avakirin. Ev xewn û hêviyên me bûn. Ji bo wan me ked daye, ji bo wan ciwanan canê xwe da. Lê belê me berdêlên giran jî dane û barekî giran girt ser milê xwe. Tê bîra min, me komkujiya Roboskî di sala 2011'an de li televizyonê dîtibû. Gelê Bakur cenazeyên 37 ciwanên Kurd rakiribû û li ber wan sekinî. Ev dîmen ji me re pirr giran dihatin. Niha ev pênc sal in tu rojane vê rastiyê li ber çavê xwe dibînî û dijî. Her roj merasîmên şehîdan hene. Ji hinek malbatan 10 heta 12 ciwan şehîd ketine. Çiqas rabûn ew dîsa bi hestên welatparezî soza xwe bi şehîdên xwe re nû dikin. Dîsa çi were xwestin ew ê bidin.

[904] Hevpeyvîn bi Besta re, Qamişlo, 2018

[905] Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019

[906] Hevpeyvîn bi Besta re, Qamişlo, 2018

Şoreşa me bi bandora şoreşên li Tûnis, Cezaîr û welatên Ereban hatiye çêkirin ku bûn bihara gelan. Di şert û demê de ku em tê de dijiyan, rabûnek çêbû. Hemû ciwanên ku bi me re dijiyan, roja din diçûn şer û şehîd diketin. Vê rewşê derûniyeke cuda dida avakirin. Me xwe amade nekiribû ku şer ewqasî dirêj berdewam bibe û em ê ewqas berdêl bidin. Ji ber vê, hinekî bêzarbûn û westandin jî çêbûye. Ev westandin ne ji ber nemana hêviyê ye. Lê piştî ewqas berdêl milet di aliyekî de dibêje: 'Êdî em dixwazin rehet bijîn. Pêwîst e ev rêveberiya me jî xizmetê me bike.' Li ti welatî ewqas dirêj berdewam nekir, ewqas berdêl nehatin dayîn û şerê me hîn jî berdewam dike. Ev dihêle ku gazinc çêdibin û pirsgirêk derdikevin."[907]

Fermandara YPJ'ê Şîlan Qamişlo jî diyar dike ku ji vê û bi şûn ve bipêşxistina şoreşa civakî, wijdanî û exlaqî erka sereke ji bo serketina şoreşa Rojava ye:

"Moderniteya kapîtalîst û versiyonên wê yên herî ketî, dibin xeterek ji bo şoreşa me. Dema ku hewesên wê di nav civaka me de pêş bikevin, em ê xwe di nav wê de winda bikin û belav bibin. Pêwîst e em bi zanistî û felsefeya Apogerî şoreşa exlaqî û çandî pêk bînin. Esas, şoreş ev e, şoreşa civakî ye. Destketiyên me yên leşkerî û siyasî pirr in. Lê di milê civakî de em hê jî lawaz in. Tenê bi serketina şoreşa civakî em dikarin destketiyên xwe yên leşkerî û siyasî li hemberî êrîşên hêzên desthilatdar û dagirker biparêzin. Leyîstikên bi vî rengî pirr dihatin serê şoreşên cîhanê. Niha avakirina zêhniyet û çanda neteweya demokratîk karê herî girîng e. Divê em perwerde û rêxistinbûna gel ji bo avakirina dilsoziyeke zanistî bi nirxên şoreşê re xurttir bikin."[908]

Wekî koka peyva *şoreşê* ferz dike, êdî gelek '*tiştên reş, tarî û xirab'* yên ku desthilatdariya zilam û dewletê li ser jin û civakê ferz kiribûn, tên '*şûstin'*. Tevî veger û vejandina çanda resen ya jiyan û aboriya komînal, gelek jinên li Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê berpirsyariya parastina nirx û welatê xwe dibînin û di serxistina şoreşa jinê ya duyem de bi biryar in. Lê belê gef û êrîşên qirkirinê li ser jin û gelên herêmê didomin.

"Hîn xeterên meztir hene: dagirkeriyeke ku kesek nas nake. Hemû civak li hemberî vê helwesta xwe ya berxwedanê nîşan dide. Lê dayik û zarok hîn ji aliyê dagirkeran ve tên kuştin. Ji bo vê pêwîst e em parastin û rêxistinbûna xwe hîn xurttir bikin. Şehadetên heşt zarokên li Şehbayê,[909] *şehadeta Hevrîn Xelef û ya Dayika Eqîde, vê yekê ji me re nîşan didin. Gelek pirtûk li ser dayikên di şoreşên cîhanê de hatin nivîsandin. Lê belê dayikek wekî Dayika Eqîde ku bixwe diçe eniya şer û bi teyara tê hedefgirtin, ev pirtûk hîn nehatiye nivîsandin. Civak wê vê şoreşê biparêze. Lê hîn pêwîst e ku em hemû jinên tevahiya pêkhateyan bi rêxistin bikin. Ev hîn erka me ye. Leyîstokên zarokên Rojava ew in ka çawa hacîz li ser rê vedikin û xwe biparêzin.*

Şoreşa Rojava di cîhanê de jî hişyariyek çêkir: Dagirkerî û şer çi ne? Komkujî çi ye? Ev pergala dinyayê çi ye? Qanûn û qayde çi ne? Şoreşa Rojava ev sîstema dinyayê ku li ser bingehekî şaş hatiye avakirin, teşhîr kiriye. Dema Seddam ket Kuweytê, dinya li hemerî vê sekinî. Lê Erdogan ket Bakurê Sûriyê, gelê nîştecih koçber dike û dinya bêdeng e. Van nakokiyên pergala cîhanê hemû bi şoreşa Rojava re eşkere bûn. Îro jinên li Bakur û Rojhilatê Suriyê, hemû barê şoreşa jinê girtin ser xwe. Ji bona vê bi şehadet, talan û qirkirinê re rû bi rû dibin.

[907] Hevpeyvîn bi Perwîn Mihemed re, Amûdê, 2017
[908] Hevpeyvîn bi Şîlan Qamişlo re, Dirbêsî, 2017

[909] Artêşa Tirk bombe barandin li ser zarokên Til Rifatê di 02-12-2019 de. Di êrîşê de 8 jê zarok 10 sivîl hatine qetil kirin û 12 kes jî bi giranî birîndar bûne.

Jineke ji Serêkaniyê doh helwesteke pirr girîng nîşan da: Dema ku saziyên alîkariyê yên ji welatên derve jê pirs kirin, 'Çi ji te re lazim e?' Wê ev bersiv dida: 'Ger hûn vê siyaseta dinyayê nedin sekinandin hûn ê sibê hemû bibin penaber! Ti kes wê li Sûriyê nemîne. Her kes wê li konan bijî.' Ev mînaka helwesta jineke ji civaka Rojava ye. Ew dizane di vê dinyayê de siyaseteke çawa tê meşandin û hesab dipirse. Pêvajoya şoreşê hîn jî berdewam dike..."[910]

Lewma daxwaz, xeyal û nihêrînên jinan derheqê siberojê de xwedî wateyeke girîng in. Ew ê bibin bingehê helwesta jinan li hemberî êrîşên qirkirinê û her wiha hewldanên wan ji bo avakirina jiyan û civakeke azad.

IV. DAXWAZ, XEYAL Û NIHÊRÎNÊN JINAN JI BO SIBEROJÊ

Pirsên derheqê xeyal û daxwazên siberojê de yên ku me di hevpeyvîn û nîqaşên bi jinên Rojava re pirsîne, ji bo pirraniya jinan pirsên herî giran bûn. Li aliyekî pêşdîtina siberojê û bersivdayîna pirsên wekî *'**Hûn ji bo siberoja xwe li çi difikirin? Xeyalên we çi ne? Gelo hûn siberoja xwe û ya zarokên xwe li kû derê dibînin? Hûn jiyaneke çawa ji zarokên xwe re dixwazin?'*** li bin şertên şer û aloziyên li Sûriyê pirr zehmet e. Lê li aliyê din jî jin di pergala baviksalariyê de fêr nebûne ku bikarin bibin xwediyê çarenûsa xwe. Lewma beramberî van pirsan gelek jinan bi rengekî heyirî li me meyze kir û got: *"**Cara yekê ye ku kesek ji min pirseke wiha dike**! **Heta niha ez li ser van tiştan nefikirîm**..."*

Jin di pergala baviksalariyê de fêr nebûne ku xwestek û nihêrînên wan bên mereqkirin. Ji ber ku heya niha jiyana wan her tim bêyî wan hatibû diyarkirin. Her tim kesên din derheqê jiyana jinan de biryar dane: Biryarên bavê wan, dayika wan, birayê wan, hevjînê wan yan jî rayedarên dewletên serdest, qedera jinan diyar kiriye. Daxwazên perwerde û bipêşxistina fikrê yên ku gelek jin di hevpeyvînan de behsa wan dikin, esas xwesteka jinê ya avakirina nihêrîn û siberoja xwe destnîşan dikin. Wateya vê yekê ew e ku jin li xwebûna xwe digerin: "*Em ji xwe û zarokên xwe re paşerojeke azad dixwazin. Perwerde ji me re pêwîst e. Ji mezinan re, ji zarokan re, bi giştî ji me re perwerde weke nan û avê pêwîst e. Pêşeroja me ne bi cilan û xwarinê ye. Perwerde ji her tiştî girîngtir e."*[911]

Lê belê rewşên aloz, koçberî û tirsên jiyanî yên ku nexasim piştî sala 2011'an hatine serê jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bûne kelemên sereke. Nediyariyê nehiştiye ku jin bi kûranî li ser daxwaz û xeyalên xwe yên siberojê bifikirin. Ew neçar mane her kêlî bifikirin ka ew ê çawa li hemberî metirsiyan xwe, zarok û malbata xwe biparêzin û pêdiviyên lazim pêk bînin. Berdewama gefên şer, dagirkerî û nezelalbûna rewşa siyasî ya Sûriyê nahêle ku ew plansaziyên demdirêj û xeyalan bikin.

Jiyana takekesî û malbatî ya gelên Sûriyê û Rojhilata Navîn di her aliyî de bi bûyerên siyasî, leşkerî û aborî yên herêmî û navneteweyî ve girêdayî ye. Dewletên dagirker û hêzên hegemon bi yek biryarê dikarin di rojekê de jiyana milyonan mirovî bidin guhertin. Malbatên ku îro asayî û bi kêfxweşî dijîn, sibe dibe ku bibin koçber. Zarokên ku îro diçin dibistanê û bi hev re li kolanan dileyîzin dibe ku sibe ji derfetên perwerdeyê bêpar bimînin û ji hevalên xwe werin veqetandin.

[910] Hevpeyvîn bi Narîn Efrîn re, Kobanê, 2019
[911] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Temirê re, 2017

Jinên ku îro wek hevserokên komîn û meclîsan dixebitin sibe dibe ku dagirker wan birevînin, dest biavêjin wan û wan bikujin. Xwendekarên ku îro li zanîngehan dixwînin sibe dibe ku neçar bimînin di kozikan de ji bo parastina civak û axa xwe şer bikin. Ji Kobanê heta Reqa û Dêrazorê, ji Efrînê heta Serêkanî û Girê Spiyê li gelek deverên Bakur û Rojhilatê Sûriyê serpêhatiyên wiha hatin serê jinan. Lewma xeyalkirina misogeriya siberojê ne pêkan bûye.

Jin û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di gelek aliyan de heman êş kişandin û bi heman armancan gihiştin hev. Ax û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi têkoşîna hevpar û tevlîbûna şervanên herêm û pekhateyan hemuyan, ji zilma DAIŞ'ê hatine rizgarkirin. Di pêvajoyên berxwedana Kobanê, Efrîn û Serêkaniyê de ruhekî hevbeş yê gelan hemûyan ava bûye. Lê belê di encama siyaset û êrîşên dagirkeran de, di her sala şoreşê de gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemwext bi gelek rastiyên dijberê hev jiyane. Ev rewşa paradoks hê jî dewam dike: Mînak, dema ku li cihekî şerekî dijwar diqewime, li navçeyeke din jiyan wekî 'asayî' be, didome. Yan jî dema ku bi deh hezaran jin û ciwan jiyana xwe ji bo parastina ax û rûmeta gelê xwe feda kirine, bi hezaran kesên din jî berê xwe dane dewletên Ewropayê. Gava ku bi sed hezaran malbat bi darê zorê ji warê xwe hatine derxistin, dagirkeran mal û milkê wan wêran kirine, hinek cîranên wan tevî dagirkeran ketine malên van malbatan.

Her wiha alîgirên pergala xweseriya demokratîk û kesên ku bi pergala netewe-dewletê razî ne di nav hevdu de dijîn. Perwîn Mihemed vê rewşê wiha terîf dike: *"Em bi yên ku me dipejirînin û yên napejirînin bi hev re di heman cihî de dijîn. Em bi hev du re têdikoşin û hevaltî jî dimeşînin. Lê belê di aliyê zêhniyetê de gelek nakokî derdikevin. Em îro diçin cem mamosteyên me yên ku bi salan nijadperestî li ser me dabûn meşandin. Îro em ji wan re dibêjin: 'Werin, em ê yekîtî û azadî û wekheviyê bi hev re ava bikin. Dîrok û paşeroja me hevpar e'."*[912]

Diya Ciwan jî dide xuyakirin ku di civakê de tevî baweriyê, hê jî gelek pirs û guman hene: *"Her ev sîstem wê here pêş. Em ê gavê şûnde navêjin. Lê nakokî helbet wê derkevin. Di nêrîna min de milet dixwaze ku xilasbûn û firehbûnek çêbibe. Lê hê hinek kes bi tirs in ku sîstema Beesê wê vegere. Li ixbarên televizyonê tê gotin ku Rûsya wê destekê bide nîzamê ji bo li hemberî me şer bike. Tevahiya milet demanan dixwazin. Gelê Kurd jî tiştekî berçav dixwaze. Ew dixwaze bigihîje heq û mafê xwe. Pirs hene, wekî 'gelo em ê bikarin bi federaliya Sûrî re tiştekî bi dest bixin? Heya niha jî nîzam li Qamişlo û Hesekê heye. Çima hûn wan dernaxin? Hûn derxin jî, dîsa şerekî mezin wê çêbibe ji ber tiştekî zelalkirî nîne.' Ji ber van pirs û gumanan pêwîstiya me bi civînên gel heye. Baweriya min bi federaliyê heye. Em ê nasnameya xwe biparêzin û bigihînin heqê xwe yê ziman û hebûna xwe. Her kes dizane me çiqas temen daye, me çiqas şehîd dane. Di milekî de teredud bi milet re heye û di milekî din de xwesteka wî heye ku federalî wê çêbibe."*[913]

Endama Yekîtiya Jinên Suryanî û Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Sîham Qeryo jî hêviya xwe ya siberojê di bipêşxistina pergala pirçandî ya xweseriya demokratîk de dibîne: *"Yê ku îtiraf bi yekîtiya gelan û hemû çandan dike, tenê xweseriya demokratîk a Bakurê Sûriyê ye. Em bi hêvî ne ku ev sîstem li tevahiya cîhanê wê pêk were. Lê hinek ji miletê me yê Suryanî û heta hinek Kurd jê ne razî ne. Lê belê me gavên mêzin avêtin û em xwedî hêza serketinê ne. Ji ber ku em bi vê fikrê îqna bûn. Êdî em dizanin em çi dikin û em ê bigihîjin kû derê.*

[912] Hevpeyvîn bi Perwîn Mihemed re, Amûdê, 2017

[913] Hevpeyvîn bi Diya Ciwan re, endama Meclîsa Hevjînên Şehîdan, Dêrik, 2017

Gelek kesên burokrat ji me re dibêjin: 'Heya niha hûn bi Kurdan re kar dikin. Lê sibe ew ê we berdin.' Kesên li vir ji dayik bûnê, li ser esasê yek qewm û yek zêhniyetê rabûne. 'Kesên nîvî' jî hene. Ew îro bi me re ne. Lê heke ku rejîm careke din were, ew ê herin bi rejîme re kar bikin. Beramberî vê, em wek Yekîtiya Jinên Suryanî bi fikra xweseriya demokratîk û biratiya gelan bawer in. Ne ji vê zêhniyetê ba, em nedigihîştin ve astê. Bi nêrîna min di demeke nêz de wê her kes vê fikrê qebûl bike. Ji ber kû li vir bi rastî demokrasî tê meşandin. Îsal ne wekî par e û par jî ne wekî destpêkê bû. Beriya niha, ji me re digotin 'Ereb'. Lê em niha dibêjin: 'Em Suryanî ne.' Em bi hêvî ne û me dest li sînga xwe xistine.

Divê em destpêkê zêhniyeta xwe biguherin û derence bi derence herin. Di serî de em ê çareseriyekê ji bo mijarê xwendinê bibînin. Em ê perwerdê li ser mijara jinê jî bidin ji bo em şideta li ser jinê rakin. Dema zarok tê dinyayê, destpêkê tê pirs kirin, gelo kur e yan keç e? Em vê fikrê jî rakin. Dema zarokek ji dayik dibe jî lazim e em ferq û cudahiyê nexin nava cinsan. Em niha di xweseriya demokratîk de ji bo azadiya jinê û guhertina zêhniyeta zilam dixebitin. Divê jin bibe xwedî biryar. Ne ku jin tenê bi karê malê ve werin girêdan. Erkên me yên herî girîng pêşxistina xwendina jinê û ya aboriya komînal in. Divê em tevlîbûna jinê di aboriyê de xurt bikin ji bo ku em şoreşa xwe bi ser bixin."[914]

Di rastiya Şoreşa Rojava de rewş û hestên pirole wekî xirakirin û avakirinê, êş û keyfxweşiyê, xizanî û dewlemendiyê, xemgînî û hêviyê di heman kêliyê de di zik hev de hene. Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê van rastiyên nakok bi rê û rêbazên cuda dibînin. Di hevpeyvînên para bêhtir ên sala 2017'an de me dît ku bi xetên stûr sê helwestên cuda li hemberî van aloziyan derdikevin pêş. Pirraniya jinan bi yekê ji van helwestan xwe nêzî jiyan û siberojê dike:

1- Pirraniya jinan pêdiviya rewşa asayîbûnê û îstîqrarê dibînin. Lewma ew hewl didin ku di bin şertên misogernebûnê de jî jiyana xwe bi rengekî 'adî' yan jî 'asayî' wekî 'her tim' saz bikin. Daxwazên van jinan bi pirranî di çarçoveya hewcehiyên madî û manewî yên jiyana rojanê de ne.

Bi rewşa aram a ku di sala 2017'an de li her sê kantonên Rojava hebû, hinek jin wekî endameke Mala Jinê ya Til Koçerê derfet dîtine ku xeyalên xwe yên xebat û xwendinê bi pêş bixin: *"Tenê ez dixwazim aboriya xwe xurt bikim da ku ez bikaribim xwe tam ji bin destê zilam derxim û hebûna xwe isbat bikim. Ji ber rewşa aborî ya mala min ne baş bû, min xwendina xwe temam nekir. Niha ez dixwazim kar bikim û rewşa xwe ya aborî baş bikim. Belkî wê çaxê ez bikarim zanîngehê bixwînim. Li Rojava zanîngeh pirr bûn. Heger rewş wisa bimîne wê jin bikaribin bixwînin, xwe pêş bixin û mafê xwe bistînin. Ez niha li gorî rewşa heyî bi deh salan pêş de difikirim, wê ti kes nikaribe li pêşiya jinên Rojava sînoran deyne."*[915]

Jineke Ereb ji Tirbespiyê ya 35 salî di 14 saliya xwe de hatibû heyrandin. Niha ew dayika 9 zarokan e. Ew jî hêvî dike ku rewşa aram wê bidome: *"Weleh rewş wisa bimîne pirr baş e. Em û Kurd bi hev re bin baştir e ji hinek xerîbên wek DAIŞ'ê werin welatê me dagir bikin. Em wan naxwazin. Ewlehî li Rojava çêbûye û zanîngeh ji bo zarokên me jî hatin çêkirin. Ciwanên me niha*

[914] Hevpeyvîn bi Sîham Qeryo re, nûnera Yekîtiya Jinên Suryanî û rêveberiya xweseriya demokratîk, Hesekê, 2017

[915] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Til Koçerê re, 2017

ji ber tirsa nîzama Beesê nikarin biçin ji derveyê Rojava. Hemû tiştê malê û xwarin jî qut nebûne."[916]

Gelek dayikên Kurd dibêjin, beriya her tiştî ew ji bo zarokên xwe *'jiyaneke xweş bi çand û zimanê Kurdî'* dixwazin. Ew hêvîdar in ku zarokên wan wê heman zor û zehmetiyan nebînin ku wan di jiyana xwe de kişandine. Ew dixwazin ku zarokên wan bixwînin, *'karekî baş û paqij bibînin'*, *'bi çand û exlaqê civaka xwe ve girêdayî bin'*, *'bibin xwedî malbat û zarok'* û *'tiştek ji wan kêm nebe'*.

2- Meyleke din di nav jinan de ew e ku ew dixwazin ji alozî û şerê li Sûriyê dûr bikevin û birevin. Ew jin 'jiyaneke rehet' li dewletên derve xeyal dikin û çareya xwe di koçberiyê de dibînin. Koçberî carna fizîkî pêk tê, carna jî di nefs û xeyalan de.

Meyla daxwaza koçberiyê nexasim di nava wan jinên ciwan de yên ku bi rewşa xwe ya malbatî bêzar in yan jî yên ku kariyereke pişeyî armanca wan e, derdikeve holê. Gelek ji wan dixwazin fêrî zimanê Ingilizî, Fransî yan jî Elmanî bibin da ku rêyên koçberiyê li ber wan vebin. Pirraniya wan jinan dibêje, ew dixwazin çand û zimanekî cuda nas bikin, lê ya xwe jî biparêzin. Lê belê beşeke jinan jî şewazê jiyana Ewropayê zêdetir diecebîne û 'pêşketîtir' dibîne. Ew hêvî dikin ku ew ê li Ewropayê hîn bi serbestî bikarin tevbigerin û bijîn.

Ji bilî vê, hinek dayik jî hene bi gumanên siberojê, dixwazin çend zarokên xwe bişînin derveyî welat. Bi pirranî ciwanên kur tên şandin da ku ew di hêla aborî de ji malbatê re alîkar bin. Lê belê hinek malbat jî keçên xwe yên ciwan bi rêya zewacê dixwazin bi rê bikin xerîbiyê yan jî cem xizmên xwe yên ku li derveyî welat dimînin. Lê belê gelek jinên ku bi xeyalên mezin ketin ser rêya koçberiyê, di dawiyê de tiştên lêgeriyan, nedîtine û rastî pirsgirêkên nepayî hatine.

"Di mijara koçberiyê de rewşa jinê bi rastî giran e. Ters zivirî. Cewhereke xurt a jinê ya girêdana axê û welatparêzî heye. Lê koçberiyeke mezin ji Rojava çêbû. Nêzîkî nîvê koçberan jî jin in. Ev rewşeke giran e. Di gelek aliyan de sîstema lîberalîzmê, propaganda û teknolojiyên nûjen jin bi bandor kirine. Doh nûçeya keçik ji Qamişlo derketiye ya ku di avê de xeniqî ji bo biçe Elmanyayê û bi zilamekî re bizewice. Bi dehan keçan jiyana xwe bi vî rengî dixin xeteriyê. Gelek caran jin diçin yên ku çareseriya pirsgirêkên xwe li vir nabînin. Lê li welatên derve jî pirsgirêkên malbatê, pirsgirêkên di têkiliyên jin û zilam de hîn girantir dibin. Ew teqlîda pergal û çanda Ewropê dikin. Her du alî qanûnên Ewropê li hemberî hevdu bi kar tînin û pirr zêde berdan çêdibe."[917]

Koçberiya ber bi derveyî welat ve bi giranî heta sala 2015'an qewimiye. Piştre bi serpêhatiyên kesên din zehmetiyên rewşa jiyanê li welatên Tirkiyê û Ewropayê, bêhtir hatine fêhmkirin. Her wiha bi serketina berxwedana Kobanê re baweriya civakê bi derfetên jiyana siberojê li Rojava jî xurttir bûye. Hê jî li cem hinek kesan ew hewesa koçberiya ber bi Ewropayê ve heye. Lê belê nexasim jî helwesta gel li hemberî dagirkeriya dewleta Tirk li herêmên Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê, derxistiye holê ku pirraniya jin û dayikan siberoja xwe û ya zarokên xwe li ser axa xwe dibînin û vê dixwazin.

[916] Hevpeyvîn bi jinên Ereb re, Tirbespî, 2017

[917] Hevpeyvîn bi Asya Ebdullah re, Qamişlo, 2017

3- Beşeke mezin a jinên Rojava xwe ji bo parastina hebûn û rûmeta xwe, ji bo avakirina siberojeke azad berpirsyar dibînin. Hesreta wan sazkirina jiyaneke azad li ser bingehê neteweya demokratîk li ser axa xwe ye. Lewma gelek ji wan tevlî xebatên komîn û saziyên Kongra Star, înşakirin û parastina pergala xweseriya demokratîk dibin. Ew bi ruhê şoreşê dijîn, wan jiyana xwe bi erk û xeyalên şoreşê re kiriye yek.

Ji ber ku ev jin bi siberoja xwe û ya zarokên xwe li Rojava bi bawer û biryar in, ew civaka xwe bi rêxistin dikin. Her wiha ew bang li koçberan dikin da ku vegerin welatê xwe. Madlên yek ji van jinên li Til Temirê ye yên ku pêşengiya van xebatan dikin:

"Weke Parêzvanên Xabûrê û Meclîsa Aşûrî gelek proje li pêşiya me hene. Me komîn ava kirin. Me Meclîsa Aşûrî bi taybet weke sîwana van komînan çêkir. Misoger e, weke jin em di her deverê de kar dikin. Di hemû çalakiyan de merasîma şehîdan dibe, meş yan jî şahî dibe, em bi erka xwe radibin û em bi hêvî ne. Ji bilî wê jî em li ser projeya vegerê disekînin. Em teşwîq dikin û alîkariyê didin gelê xwe ji bo vegere herêma Xabûrê. Bi qasî ku em dikarin, em piştgiriyê didin gundên ku ji şer û êrîşan ziyan li wan bûye. Em hewl didin ku em herî kêm av û elektirîkê ji bo wan peyda bikin. Em şaredariyan aktîv dikin û li ser projeyên weke çandinî û avakirina firinan kar dikin. Têkiliyên me bi kesên çûyî re berdewam dikin. Kes ji wan ne rehet e li wê derê. Bi tevahî ew li benda derfetan in ku vegerin. Daxwaza me jî ew e ku ew vegerin û em herêma Xabûrê ji nû ve ava bikin."[918]

Gelek hevjîn û dayikên şehîdan jî bi armanca pêkanîna xeyalên şehîdên şoreşê di xebatên civakî û siyasî de cihê xwe digirin. Bi wê zanebûnê ku hê jî rêyeke dirêj û erkên mezin li pêşiya wan hene, ew vê yêkê didin xuyakirin: *"Em tijî hêvî û bawerî ne ku jiyana me û ya hemû jin û civaka me wê xweştir bibe. Belkî em ê gelek caran bikevin. Lê em ê weke zaroka ku nû fêrî meşê dibe, dîsa rabin."*[919] Wekî Diya Ciwan ji Dêrikê, ew bi biryar in ku li ser rêya şehîdan bimeşin û şoreşa jinê û civaka Rojava bigihînin serketinê:

"Em hîn di nîvê rê de ne. Xebat û têkoşîna me gihîşt astekê, lê hîn têrê nake. Têkoşîna azadiyê têkoşîneke bê dawiyê ye. Gerek em wekî jinên Kurd dev ji vê têkoşînê bernedin heya em bigihîjin armanca xwe. Gelek şehîdên me, şehîdên me yên jinên pêşeng çêbûne. Rêber Apo 18 salan di bin tecrîdeke pirr giran de ye. Berpirsyariya me ew e ku em vê tecrîdê rabikin. Gerek em nefikirin 'ez ê bibim çi? Ez ê çi bikim?' Li gorî erkên li pêşiya xwe, pêwîst e em tevbigerin, ji ber ku derfetên serketinê jî li pêşiya me pirr zêde ne. Dema ku em projeya neteweya demokratîk bi tevahî gelên Bakurê Sûriyê pêk bînin, em dikarin vî bixin projeya çareseriyê ya Rojhilata Navîn û ber bi konfederalîzma demokratîk ve herin. Têkoşîn jê re lazim e. Di qada siyasî de jî pêwîst e em bixebitin da ku nasname û rengê jinê hîn zêdetir derkeve pêş. Di vî milî de israr û îdîayên me hene da ku em bibin bersiva keda hevalên şehîd yên ku em bi wan re jiyane û yên hemû şehîdan."[920]

Diya Şehîd Memo ji Dirbêsiyê jî armanc û xeyala xwe ya siberojê bi van gotinan tîne zimên: *"Ji bo paşerojê em hêvî dikin ku em bi hêza jinê vî diwarê Erdogan rabikin, ji bo em hemû bi hev re bijîn û axê xwe bistînin. Em bi hêza xwe bi bawer in."*[921]

[918] Hevpeyvîn bi Madlên Xemîs re, Til Temir, 2017

[919] Nîqaş bi endamên Kongra Star a Haseke re, 2017

[920] Hevpeyvîn bi Diya Ciwan re, endama Meclîsa Hevjînên Şehîdan, Dêrik, 2017

[921] Hevpeyvîn bi Diya Şehîd Memo re, Dirbêsî, 2017

Endamên Mala Jinê ya Rimêlanê ji bo pêkanîna doza şehîdan îşaret bi pêdiviya perwerdeyê dikin. Ew dixwazin ku jin bêhtir di nav siyasetê de bi rista xwe rabin: *"Însanê ku xwedî biryar û îrade be, dev ji welatê xwe bernade. Ew şoreş û xwîna şehîdan li pey xwe nahêle û naçe. Ka çi ji me kêm e? Gelek koçber bûn. Ji ber malê dinyayê çûn. Bi saya xwedê û xwîna şehîdan, em hatin parastin û me gelek kêmayî nedîtin li gorî tişta ku li Sûriyê çêbû. Milkê dinyayê hemû yê te be jî, lê wextê exlaq, şeref û kerameta mirov nebe, ez ê çi ji malê dinyayê bikim? Kêmaniyê me, em ne xwendekar in, ji ber ku berê hat gotin 'eyb e jin biçe dibistanê'. Daxwaza me perwerde ye. Bi giştî bila her kes beşa karê xwe baş fêr bibe. Bila jin ji xwe bawer be û bikeve nava siyasetê da ku navê wê jî derbikeve."*[922]

Daxwazên dayikên pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemûyan di van mijaran de digihîjin hev: *'Hema bila şer û kuştin tine be! Bila malbat dîsa were cem hev û bi hev re bijî! Bila zarokên me bê tirs mezin bibin û perwerdeyeke baş bibînin!'*

Mamoste Menal hêviyên xwe yên siberojê wiha rave dike: *"Ez bawer dikim heger em bikarin sîstema xwe baş bi cih bînin û bidin rûniştandin paşeroja zarokan wê paşerojeke ronî be. Ji ber vê, me perwerdeyeke pirrengî, pirrçandî daye destpêkirin. Di heman demê de em fikrê neteweya demokratîk didin rûnandin. Felsefeya me ya hevdu qebûlkirinê û civakê qezençkirinê ye. Em dixwazin di nava civakê de danûstandinê pêş bixin û bi rêya nifşê nû, vê civakê ji nû ve avabikin. Dibe ku cih cihna kemayî derbikevin, ji ber gava destpekê û merheleya nû avakirinê ye. Lê hêviya me ya serketinê ew e ku em paşêrojeke ronî ji van zarokan re çêbikin."*[923]

Semîra Hec Elî jî dide zanîn ku dayikên ku koçber nebûne û li ser vê xakê dijîn, rastiya şoreşa xwe nas kirine û siberoja zarokên xwe li Rojava dibînin: *"Ew paşeroja xwe di pergala xweseriya demokratîk de dibînin. Rastiya civaka me berxwedêr e û jinê ji vê şoreşê re pêşengtî kiriye."*[924]

Jineke ciwan a Ereb şirove dike ku ew wekî jineke ciwan piştî rizgariya herêma xwe ji DAIŞ'ê ketiye nava pirs û lêgerînan. Bi perwerdeya akademiya jinê, wê nihêrînên xwe yên li ser siberojê zelal kirine: *"Paşeroja me di vê şoreşê de ye. Em dixwazin wekhevî çêbibe. Ji bo vê, ez ê kar bikim, kedê bidim. Em naxwazin weke jinên Ewropî bijîn, yên ku sûretên wan yên tazî li ser pakêtekê bin ango li ser sindoqeke makyajê bin. Wateya azadiyê cuda ye. Ez niha xwe wek jin bêhtir ji jineke li Ewropê azad dibînim. Li vir, em li ser axa welatê xwe dijîn û em ê li ber xwe bidin."*[925]

Endameke Mala Jinê ya Til Koçerê jî dibêje, xwestek û armanca wê ew ku karê xwe dewam bike û weke jin siberoja xwe ava bike: *"Ez ê ked bidim û xwedî li keda xwe derkevim. Dema ez malekê ji xwe re ava bikim yan tiştekî din ji bo xwe bikim, wê demê ez ê bizanibim, ev keda min e, ne ya zilamî ye. Di nav civakê de dibêjin 'jin nikare kar bike, tenê zilam dikare kar bike.' Ez dixwazim ji civakê re isbat bikim ku jin dikare her karî bike û xwe bi rê ve bibe. Ez paşeroja xwe di welatê xwe de dibînim, ne li welatekî din. Bila her kes fikra Serokatiyê baş bixwîne, wê bizanibe wateya welat û paşeroj çi ye. Min pirr ji fikra Serokatiyê hez kir û tê de azadiya xwe dît."*[926]

[922] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê ya Rimêlanê re, 2017

[923] Hevpeyvîn bi mamoste Menal re, Dêrik, 2017

[924] Hevpeyvîn bi Semîra Hec Elî re, Qamişlo, 2017

[925] Nîqaşa bi beşdarên dewreya yekemîn a perwerdeya jinê ya Akademiya Şehîd Farûq re, Heseke, 2017

[926] Hevpeyvîn bi endamên Mala Jinê û Kongra Star a Til Koçerê re, 2017

Jineke ciwan a ku weke hevseroka xeta gundan a navçeya Çilaxa hatiye hilbijartin, hêviyên xwe yên siberojê bi vî rengî dide xuyakirin: *"Ez dixwazim ku em fikr û projeyên Serok Apo rast fêhm bikin û rast pêk bînin. Li kû derê em pergala demokratîk li gorî projeya Serok Apo rast bimeşînin, li wê derê bawerî û hêviyên gel wê kom bibin û koçbertî wê ji holê rabibe. Guhertina civak û zilamî pêwîst e. Lê bila guhertina zilam ne ji ber tirsê û bi şeklî be. Divê ew bi fikra Serok Apo guhertin û veguhertinê di kesayeta xwe de ava bike."* Hevala wê jî li ser zêde dike: *"Baweriya me heye. Êdî tirs nemaye. Dema ku çeteyên El Nusra êrîşî bajêr kirin, tenê çar kes ji bo parastina bajêr amade bûn û çek girtin. Lê îro bi hezaran kes ji bo parastina bajarê xwe amade ne. Em axa xwe bernadin ku bi xwîna hezaran ciwanan hatiye rizgarkirin."*[927]

Li dijî şer, zordestî û hilweşandinê, jinên Rojava bersiva xwe bi jinûveavakirina civak û jiyanê daye. Piştî her gava ku wan avêt, ew armanceke nû datînin pêşiya xwe. Di sala 2017'an de hevseroka Meclîsa Gel a Kobanê Bêrîvan Hesen mebestên siberojê ya şoreşa jinê wiha şirove kiriye: *"Miletê Kurd ji avakirina jiyanê hez dike. Miletê Kobanê jî wisa ye. Bi qasî derfeta xwe dixwazin careke din malên xwe ava bikin û li benda kesî namînin. Em ketin ferqê ku girî nabe çareserî. Divê moralê me her bilind be. Heger em behsa xeyalên jinê bikin: Jinan heya niha pêşengtiya Şoreşa Rojava kiriye û heya astekê di sîstema rêveberiya xweser de cihê xwe girtine. Niha em ber bi federaliya Bakurê Sûriyê ve diçin. Divê di federasyonê de û li hemû herêmên Bakurê Sûriyê yên ku tên rizgarkirin jî mafên jinê li pêş bin. Ji bo vê, divê hêza jinê pirr xurt be û hemû netewan di nava xwe de bihewîne. Em dixwazin xwe bigihînin hemû jinên Sûriyê û hêdî hêdî em dixwazin xwe bigihînin jinên cîhanê jî da ku em ê dengê azadiyê bilind bikin."*[928]

Bi qasî ku jinên Kobanê careke din bajar û jiyana xwe pîştî rizgariya warê xwe ava kirine, jinên Efrînê ku di sala 2018'an de penaber bûn li herêmên Şehba, Kobanê û Cizîrê jî dibêjin: *'Em tenê dixwazin vegerin Efrîna xwe. Tiştek din em naxwazin.*' Hevseroka komîna Efrîniyan yên ku di Kanûna 2018'an de li gundeke Aşûrî nêzîkî Til Temirê li benda roja vegerê mane, bi awayekî zelal daxwazên xwe yên siberojê diyar dike: *"Em berê xwe bidin kû? Ger ez bijîm, ez ê azad bijîm. Ger ez biçim Emerîka yan Ewropayê û bixebitim jî, ev ne jiyan e. Ger ez nikarim bi zimanê xwe biaxivim, ger ez nikarim bi zarok û mirovên xwe li ser axa xwe bijîm, wateya jiyanê namîne. Ew dewlet dixwazin me kor û lal bikin. Lê Serokatî guh, çav û ziman da me. Serokatiyê em şiyar kirin. Wekî jin, ez hertim kole bûm, lê ez êdî vê qebûl nakim. Ez zewicî me, erê zilamê min heye. Lê ez nahêlim ku ew li ser min hikum bike. Tu çawa insan î, ez jî insan im. Ger tu min jî bikujî, wê zarokên min heyfa xwe rabikin. Ger dinya alem hemû jî li hemberî me bisekine, em dev ji vê têkoşînê bernadin. Em mafê xwe dixwazin."*[929]

Ruxmê êşên giran, gef û metirsiyan di helwest û gotinên pirraniya jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hêz û biryardariya berxwedanê xuya dibe. Ew dixwazin aydê xwe bin, jiyan û civaka xwe bi xwe bi rê ve bibin. Di serdemekê de ku bi belavbûna şer û nexweşiyan, bi hilweşandina xwezayî û exlaqê mirovahiyê, bi ferzkirina qirkirinê li ser jin û gelan hêviya gelek kesan hatiye tinekirin, ew ji manewîyat û dîroka xwe ya têkoşînê hêviyên nû ava dikin. Dayika Şehîd Dara ji Efrînê, xeyal û hêviya xwe ya siberojê bi dilsozî wiha derbiriye: *"Serokatî gulek li ser çiyê çand, wê bêhna xwe li dinayê gî belav kir. Ez tenê dixwazim Serokê min vê yekê bibîne û ew ê bibîne jî."*[930]

[927] Hevpeyvîn bi endamên Kongra Star a Çilaxa re, 2017
[928] Hevpeyvîn bi Bêrîvan Hesen re, Kobanê, 2017
[929] Hevpeyvîn bi Elham Omer re, Til Nasir, 2018
[930] Hevpeyvîn bi Dayika Şehîd Dara re, Efrîn, 2017

Her çiqas jinên ku bi xwe li cihek yan jî di beşeke dîroka şoreşa jinê ya Rojava de cih girtine, pêdiviya aramî û kêfxweşiye dibînin jî, ew dizanin ku ev xwestek tenê bi yekîtiya jinan û gelan dikare misoger bibe. Lewma ew têkoşîn û xebatên xwe ji bo serketina şoreşê û pêkanîna xeyalên xwe yên siberojê li ser axa xwe bi heman dilsoziyê dewam dikin.

V. GOTINA DAWÎ

Çerxa dîroka 12 hezar salan, li ser erdnîgariya 14 hezar girên li Bakurê Sûriyê hê jî dizivire. Dîroka şoreşa neolîtîk û çanda xwedawendan ku bûye bingehê û îlhama şoreşa jinê ya hemdemî di gelek kevneşopiyên gelên herêmê de hê jî zindî ye. Herçiqasî êrîşên pergala zilamê desthilatdar û mêhtingeran hewl didan ku hevbeşiya jin, jiyan û civakê parçe û wêran bikin jî, çand û nirxên jin û civakê yên xwe dispêrin pîvanên edaletê, exlaqê azadiyê û lêgerîna jiyaneke xweş û rast di berxwedana jinan û gelan de bi hezaran salan hatine parastin.

Ji Til Xelef heta Efrinê çanda berxwedanê ya xwedawendan zindî ye. Di vê gera lêkolîna dîrokî û hemdemî de dema ku em derbasî şûnwarên kevnar bûn, hestên pirralî bi me re peyda bûn. Em diketin nava xemên giran ku diviyabû bi dewsa piyên xwe em xwedawendan neêşînin. Li gelek cihan dîmenên ku hestên xemgîn ava dikirin jî me dîtin. Parçeyên seramîkan, şopên jiyan û şaristaniyên kevnar li ser vê axa giranbûha belav bûbûn. Li hinek cihan mirov û pez pê li bermahiyên dîrokî kirin. Çend bajarên xwedawendan û xwedayan jî dibin sergo û toza şaristaniya kapîtalîst de dihatin veşartin. Berê şandeyên hikûmeta Suriyê û arkeologên welatên serdest wekî oryantalîstê Elman Max von Oppenheim hatin, li vir erd kolan; zanîn û dewlemendiyên ji vê axê derxistin. Wan destavêt xwedawendan û remzên çanda dayikê, wan ew revandin, birin mûzeyên sar ên paytextên Ewropayê û tezên xwe li ser dîroka Rojhilata Navîn di pirtûkan de ragihandin.

Beramberî vê, pirraniya mirovên welatê rojê bi dîroka kevnar a warên xwe yên şên nizanin. Ew bi talan, şer û xizaniyê re rû bi rû mane. Bûyerên ku li ser vê axê qewimîne, di nava tebeqeyên 'gir'an de hatine veşartin û windakirin. Dema ku em di Gulana 2017'an çûn serdana girê Til Xelef, bûyerek seyr û sosret hat serê me: Di nav toz û xubara girê li ber piyê me, xwedawendekê li me meyzand! Heçko wê dixwest ji me re bibêje: 'Gavên xwe bi baldarî bavêjin! Ez hîn li vir im!' Her wiha me fêhm kir ku hewildanên nû pêwîst in da ku em bikarin li mîrasa xwedawendan xwedî derkevin û xwedawendên hatine revandin vegerînin ser xaka xwe.

Piştî talanên hêzên emperyal û dagirker di sedsala 20'an de, pêleke nû ya ruxandina nirxên jin û gelên Kevana Zêrîn di dehsala 2'yan a sedsala 21'ê de pêk hatiye. Berhem, çand û şûnwarên serdema neolîtîk cardin bûn hedefa qirkirinên sîstematîk ên hêzên faşîst û zayendperest ên wekî DAIŞ, El Nusra û dewleta Tirk: Warên xwedawendên Semîramîs a Mûsilê û Atargatîs a Minbicê ketin bin desthilatdariya dijminên jin û mirovahiyê. Fermana 73'yan, komkûjiya hovane li ser gel û jinên Êzdî li Şengalê bi armanca tinekirina bawerî û çanda resen, hatiye meşandin. Wekî din, navenda koka çanda neolîtîk a Til Xelefê û Serêkaniyê ketiye ber êrîşên dijwar. Şaristaniya Zenubya li Palmîra hatiye rûxandin. Li hemberî erdnîgariya şaristaniya Qarqamişê û xwedawend Kubaba ya Kobanê şerê tinekirinê û komkujiyên çavsor hatin kirin. Di dewama van êrîşan de, herêma Efrînê ku zindîbûna şopên çanda xwedawendan ji xwe re kiribû îlhama avakirina pergala

neteweya demokratîk, bi bombebaran û sûcên li dijî mirovahiyê ji aliyê dewleta Tirk ve hat dagirkirin.

Bi wêrankirina daneyên serdema neolîtîkê û qutkirina damarên dîrokî yên şoreşa jinê ya yekemîn re li ser vê axê, hêzên pergala baviksalarî û netewe-dewletê hewl didin ku çanda jinê û civaka exlaqî-siyasî ji holê rakin. Armanca van hêzan ew e ku rê li pêşiya pêkanîna şoreşa jinê ya duyemîn bigirin. Ev yek, bi taybetî di êrîşên arteşa Tirk û çeteyên wê de zelal bûye ku di 20'ê Çileyê 2018'an de birin ser kantona Efrînê. Ne tesadûf e ku ev cih bûye navenda êrîşên dewleta Tirk û hêzên hegemon. Li ser hemû dar, ber, war û şopên dîrokî yên Efrînê navê jinê, çand û baweriya gelan hene, reng û çanda jinê li her derê xwe dide xuyakirin. Di roja şeşemîn a şerê giran de balafirên şer ên arteşa Tirk perestgeha Îştarê li Girê Endarê kirin armanca bombebaranê. Di encama êrîşên 26'ê Çile de ziyaneke mezin li vî şûnwarê serdema neolîtîk, mînaka mîmariya çand û baweriya Hîtîtan kirin. Cihekî ku weke yek ji mîrateyên dergûşa mirovahiyê hatiye pejirandin, di Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de hat hilweşandin. Pêpelokên ku ber bi perestgehê ve dadikevin, îro parçe parçe bûne. Peykerên sewalên bi baskên ji kevirên reş ên bazalt hatibûn çêkirin parçe, kavil û wêran bûne û êdî nayên nasîn. Dûvre gelê xwecihî jî ji warên xwe li Efrînê bi darê zorê hat mişextkirin û faşîstên dagirker dewlemendiyên Efrînê talan kirin. Beramberî van kiryarên qirker, jinên Efrînê çanda xwe ya berxwedanê diparêzin. Bi hezkirina ax û xwezayê, bi zanebûn û hêza çanda xwe ya dîrokî, ew têkoşîna xwe ya ji bo vegera li ser xaka xwe ya azad û parastina şoreşa jinan a duyemîn, didomînin.

Heman rewş ji bo jinên Girê Spî û Serêkaniyê jî lê ye, her du bajar jî kertin ber êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk yên 9'ê Cotmeha 2019'an destpêkirîn. Nirxên xwedawendan li tebeqeyên girê Til Xelef, jin û zarokên Serêkaniyê careke din bûn armanca êrîşên hovane û bombebaranên kîmyewî. Gelên xwecihî yên Girê Spî jî bi darê zorê hatin revandin, tepisandin û mişextkirin. Careke din dagirkeran dest avêt mirov û berhemên vê axê. Mirov dikare him êşên giran him jî hêrsa tolhildanê di çavê jinan de bixwîne yên ku li wargehên penaberan nêzîkî gund û warên xwe ji bo vegerê li ber xwe didin: '*Kanî mafên jin û mirovan? Kanî edaleta dewletên Ewropê? Baweriya me bi wan nîne! Wekî jin û gelên herêmê divê em li nirxên dîrokî û siberojê yên mirovahiyê xwedî derkevin. Divê em rûmet û axa xwe bi xwe biparêzin...*'

Jinên tevahiya pêkhateyên Bakurê Sûriyê heta roja îro li hemberî mêhtingeriyê, li dijî qirkirinên çandî, etnîk û zayendî di warên jiyanê hemûyan de têdikoşin. Ben û werîsên jiyanê ku hatine veqetandin, ji nû ve tên hûnandin û bi hev ve tên girêdan. Çîrokên jinên Kurd, Aşûrî, Suryanî, Keldanî, Ermenî, Ereb, Tirkmen, Çerkes û Çeçen; serpêhatiyên jinên Êzdî, Xirîstiyan, Misilman û Elewî heman êş, daxwaz û hêviyên siberojê dibêjin. Ew zanebûn û rêûresmên dîrokî yên wekî şîfagerî, çanda mêvanperwerî, şîretên jiyan û çandiniyê, şîn û cejnê parve dikin.

Akademiya Jineolojiyê girîng dîtiye agahî û şopên çanda resen a komînal a jin û gelên Rojava, pekhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê berhev bike da ku berhemên dewlemend yên çand, ziman û dîroka rengîn ya jinên vê herêmê neyên jibîrkirin, dizîn û bişaftin. Di pêvajoya xebatên lêkolînê de me gelek dane dîtin ku hêjayî lêkolînên hîn kûrtir û berfirehtir in. Di gelek daneyên sereke de wek peyker, wêne, çîrok û nivîsên kevnar şikl û remzên jinê xuya dibin. Lê belê nav, rist û berhemên van jinan yan nehatine nivîsandin yan jî bi nihêrînên baviksalar û oryantalîst hatine şirovekirin.

Ji bo dîroka jinê ya vê erdnîgariyê were ronîkirin, daneyên ku xwe dispêrin agahiyên arkeolog û dîroknasên dewletên mêhtinger, ne bes in. Ji vê zêdetir pêdivî pê heye ku jin û gelên niştecih

bixwe xebatên arkeolojî û dîroknasiyê bi pêş ve bibin, çîrok û dîroka girên gundê xwe şirove bikin û binivîsin. Bi komkirin û parastina berhem, belge û daneyên cûr bi cûr, heqîqet û serpêhatiyên şoreşa jinê li ser erdnîgariya Kevana Zêrîn dikarin hîn zelaltir werin nirxandin. Tevî parastina nirx û şûnwarên dîrokî li dijî dagirkerî, talan û wêrankirinê, xebat û hewildanên ji bo vegerandina xwedawend û berhemên dîrokî yên ku ji axa Kurdistanê û Rojhilata Navîn hatin revandin jî ev yek dibe ku bibe pêngavek ji bo eşkerekirina rûyê dîroka resen û ya mêhtingeriyê. Li ser bingehê van xebat û berheman, nifşên nû dikarin çand û dîroka aydê xwe, rast nas bikin.

Daneyên vê pirtûkê eşkere dikin ku şoreşa neolîtîk bûye kok ji bo şînbûna şoreşa jinê li Kurdistanê. Di encama mêhtingeriyê û parçekirina jin, civak û welat de ev kok li cihekî kûr di bin erdê de ziwa bûbû. Lewma pirsgirêkên civakî, siyasî, aborî û hişmendiya desthilatdar jin fetisandibûn. Jinên Kurdistanê dibêjin, hîna nû bi bandora birêxistinbûna Tevgera PKK'ê di nav gelê Kurd de ji nû ve bêhna wan hatiye ber wan û çavê wan vebûne.

Hevpeyvîn û lêkolînên sosyolojîk ku li navçeyên Rojava hemûyan hatine meşandin, bandora xebat û fikrên Abdullah Ocalan ji bo vejîna jin û gelê Kurdistanê, didin diyarkirin. Civîn û parvekirinên wî bi jin, mêr, ciwan, zarok, kal û pîrên civaka Rojava, bandoreke daîmî çêkir, li cem her kesa/ê civakê bixwebawerî, zanebûn û hêvî dan avakirin. Jinên Rojava dibêjin, analîzên Rêber Abdullah Ocalan ji bo têkoşîna azadiya jinê û ya welat, perspektîfên wî li ser şoreşa civakî û neteweya demokratîk îlham û bingehekî saxlem ji bo pêkanîna Şoreşa Rojava ava kirine.

Her wiha di her pêvajoyê de jinên pêşeng û şehîdên azadiyê yên Tevgera Azadiya Kurdistanê bi risteke sereke rabûne di ronîkirin û birêxistinkirina civakê de. Di mînaka wan de civakê nasname û siberoja xwe vedîtiye. Ked, jiyan û têkoşîna şehîdên şoreşê hemûyan di hafize, bîr û dilê civakê de daîmî zindî maye. Roman, gotar, helbest, stran û vîdeoyên li ser kesayet û armancên pakrewanên pevajoyên têkoşîna azadiyê hemûyan, dibin çavkaniyên girîng ji bo rastfêhmkirina ruh û dîroka şoreşê.

Ji dawiya salên 1980'yî ve lêgerîna bersiva pirsên *'Em çawa bijîn?'* û *'Jina azad kî ye?'* bûne rênîşana têkoşîn û rêxistinbûna jinên Rojava. Bi armanca rizgariya jinê û ya welat, avakirina çareseriya pirsgirêkên malbat û civakê, her diçû zêdetir jin tevlî têkoşîna azadiya Kurdistanê bûne. Tevlîbûna jinê ya nav şoreşê di heman demê de dibû serhildaneke li dijî zayendperestiya civakê û feraseta kevneperest a namûsê. Dînamîkên guhertin û veguhertina qalibên hişk ên hişmendiya baviksalar di malbat û civakê de pê re zîndî bûne.

Tecrûbe û zanebûna têkoşîna birêxistinkirî ya 30 salan, dibû bingehê pêşengiya jinê di Şoreşa Rojava de. Ji pêngava Şoreşa 19'ê Tîrmeha 2012'an heta bi avakirina pergala xweseriya demokratîk û şerên dijwar li dijî zordestî û hişmendiya DAIŞ'ê, jinan li tevahiya bereyan bi fikir, helwest û keda xwe reng û ruhê jinê dan şoreşê. Bi şêwaza xwe ya fermandarî û siyasetê, nasnameya nû ya jinên Rojava wekî têkoşerên azadiyê hatiye avakirin û di dinyayê de deng vedaye. Her wiha li ser bingehê ceribandin û zanyariya xwe li ser tehlîl û perspektîfên Abdullah Ocalan, jinên Kurd bûne hêza pêşeng di avakirin û parastina neteweya demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de. Wan hêz, îlham û bawerî dan jinên pêkhateyan hemûyan da ku tevlî siyasetê, avakirina pergala xweseriya demokratîk û meclîsên jinan bibin. Jinan xwe da ber ristên nû di nav xebatên siyasî, civakî û xweparastinê de. Bi her gava nû ku jinan di jiyana xwe de avêt, wan pê re civak jî da fikrandin û guhertin.

Di pêvajoya şoreşê de tevgera jinê ya Kongra Star bi taybet hewl daye da ku rê û rêbazên çareseriya pirsgirêkên jin û civakê di çarçoveya rêgezên bîrdoziya azadiya jinê û civaka exlaqî û polîtîk de bi pêş bixe. Rûniştandina pergala hevserokatiyê û nûnertiya wekhev a jin û zilam di sazî û rêveberiyên xweseriya demokratîk hemûyan de bûye pêngaveke girîng ji bo hejandina serweriya zilam di siyaset û civaka Rojava de.

Gelek pirsgirêk û nakokiyên civakê yên wekî zayendperestiya civakê, tundiya li dijî jinê di têkiliyên malbatê de, êrîş û ferasetên mêhtinger, olperest û nijadperest; pirsgirêkên siyasî, aborî, ekolojîk, perwerde û tenduristiyê yên civakê û nexasim pirsgirêkên hişmendiyê hemwext dibûn mijarên têkoşînê. Ji bo rawestandina qirkirinên li dijî jinê û lipeyxwehiştina desthilatdariya zilamî di jiyana malbat û civakê de ji destpêka şoreşê ve xebatê Malên Jinê û ragihandina qanûnên jinê bûne palpiştek ji bo pêkanîn û parastina mafê jinan. Jinên ciwan jî bi avakirina birêxistinbûna xwe ya xweser, bûn xwedî vîn û çalakî.

Tevî avakirina komîn û rêxistinbûna jinê di qadên polîtîka, civakî, çand, huner, ziman, perwerde, tenduristî, aborî û xweparastinê de gavên mezin hatine avêtin. Gelek jin bûne xwedî vebijêrkên nû yên jiyanê. Jin bi xebatên çand, huner û wêjeyê, ruh û têkoşînên şoreşa jinê diteyîsinin. Hewldanên nû ji bo bipêşxistina jiyaneke ekolojîk û bi tenduristî bi jinûve zindîkirina şîfageriya jinê hatine destpêkirin. Her wiha bi avakirina projeyên aboriya komînal, kooperatîfên jinê û rêxistinbûna jinên kedkar jî jin dixwazin xwe ji zextên aboriyê xilas bikin û debara xwe bi xwe bikin. Di warê perwerde û zanistê de jin him wek mamosteyên civakê him jî wek avakerên pergala dibistanên neteweya demokratîk, akademiyên jinê û Jineolojiyê bi risteke pêşeng radibin. Bi taybetî di bipêşxistina şoreşa ziman, perwerdeyên komîn û meclîsan de jinan ji destpêka şoreşê ve kedekî mezin daye.

Lê tevî gelek destketiyan jî, pirsgirêkên vejandina civaka exlaqî û polîtîk hê jî didomin. Têgihîn û ferbûnên pergala baviksalarî û dewletê di hinek aliyan de hatin eşkere û teşhîrkirin. Lê belê wekî daneyên çendanî û şiroveyên li ser bûyer û cûreyên tundiya li dijî jinê jî destnîşan dikin, bandora zêhniyeta desthilatdar hê jî dibe astengiya herî mezin di avakirina hevjiyana azad, têkiliyên demokratîk di malbat û civakê de û li pêşiya siberoja azad a jinên ciwan. Bi vî awayî lêgerîna wateya azadiyê û rêyên avakirina jiyana azad ya jinên Rojava didome.

Di vî warî de têkoşîn û bipêşxistina proje, çalakî, rêxistin, xebatên perwerde û zanistê yên ku karibin vîn û hêza çareseriya jinan xurt bikin, hîna jî girîng in. Jin hewldanên xwe dewam dikin da ku bi beşdarbûna çalak ya jinên ji tewahî beşên civakê hemûyan, birêxistinbûna vîna jinê di jiyana komînal de xurttir bibe. Ji ber ku li ser vî bingehî guhertin-veguhertinên demokratîk yên civakê û takekesî bi pêş dikevin.

Di şerên parastinê li dijî êrîşên desthilatdariya Beesê, li dijî qirkirinên DAIŞ'ê û dagirkeriya Tirkiyê de jinên Rojava bi berxwedana şervanên Yekîneyên Parastina Jinê YPJ'ê nasnameyeke nû ji xwe re ava kirine. Nexasim rista jinê di berxwedanên Kobanê, Efrîn û Serêkaniyê de û di pêngavên rizgarkirina jin û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji faşîzma DAIŞ'ê de bûye sedema destketiyên mezin û bixwebaweriya jinê. Wekî din jinan li herêmên rizgarkirî pêşengiya avakirina jiyan û saziyên neteweya demokratîk kiriye. Bi vî awayî ruhekî hevbeş ê jin û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi pêş ketiye. Li ser vî bingehî xeterên bîrdoziyên faşîst, zayendperest, nijadperest û olperest tên şopandin û çalakiyên hevbeş li dijî metirsiyên dagirkeriya dewleta Tirk tên lidarxistin.

Em dikarin nirxên exlaqî û manewî yên çanda dayikê û civaka komînal ku di dîroka pêkhateyan

hemûyan de hene wekî dijjahr û spartek li dijî zêhniyeta qirker û zayendperest şirove bikin. Kesekî/e zindiyan hemûyan wekî hebûn û nirxeke pîroz dihesibîne û bi empatî nêzîkê wan dibe, wê nikaribe hovitî û xedariyê li dijî mirovan pêk bîne yan jî bipêjirîne. Lêkolîn û dahûrandinên sosyolojîk li ser sedemên pejirandin bîrdoziyên faşîst û zayendperest di destpêka sedsala 21'ê de dikarin daneyên girîng ji bo têkoşîneke encamgîr li dijî belavbûna vê xeterê derxin holê.

Di sala 2017'an de pirraniya jinan di hevpeyvîn û nîqaşan de anî zimên ku ew xwe di pergala xweseriya demokratîk de bi ewle dibînin û bi bipêşketina rista jinê di jiyana civakî, aborî, siyasî û hêzên parastinê de serbilind in. Herçend aloziyên li Sûriyê û gefên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dewam kirin jî pirraniya jinan diyar dikir ku ew siberoja xwe û ya zarokên xwe li welatê xwe dibînin. Metirsiya herî mezin gefên şer û dagirkeriyê ne ku dewlet û hêzên derve li gelê Kurd û gelên herêmê hemûyan dikin. Xof û êşên qirkirinên dîrokî di bîra gelên Kurd, Ermenî, Aşûrî, Keldanî û Suryanî de zîndî ne û bi qirkirinên etnîk, komkujî, koçberî, veqetandina malbat û civakê di encama êrîşên dewleta Tirk de her dubare diqewime.

Lewma daxwaz, xeyal û nihêrînên jinan ji bo siberojê rave dikin, beriya her tiştî ew e ku li ser axa xwe bi aramî, bi awayekî wekhev û azad bijîn. Bi vî awayî, têkoşîna ji bo parastin û serketina şoreşa jinê li ser bingehê xwe yê dîrokî dewam dike.

"Bi her gava ku jinê di vê şoreşê de avêt, hêza wê û guhertinên mezin çêbûne. Em ê her tim li ber xwe bidin û her tim em dibêjin: Paşeroja me tijî hêvî ye û bawerî ye ku jiyana me û hemû jin û civaka me wê xweştir be. Belkî em ê gelek caran bikevin. Lê em ê rabin jî, weke zaroka ku fêrî meşê bibe."[931]

*** DAWÎ ***

VI. ÇAVKANÎ

Wêje:

- Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Civaka Demokratîk – Pirtûka Yekemîn, Şaristanî: Serdema Qralên Piştperdeyê û Xwedayên bi Maske*, Mezopotamien Verlag, 2009

[931] Beşdara nîqaşê bi endamên Kongra Star a Haseke re, 2017

- Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Civaka Demokratîk – Pirtûka Sêyemîn: Ceribandinek Li Ser Sosyolojiya Azadiyê*, Mezopotamien Verlag, 2011
- Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Civaka Demokratîk – Pirtûka Çaremîn, Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniyê*, Mezopotamien Verlag, 2011
- Abdullah Ocalan: *Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk - Pirtûka Pêncemîn, Parastina Kurdên di nav Pencê Qirkirina Çandî de - Pirsgirêka Kurd û Çareseriya neteweya demokratîk*, Mezopotamien Verlag, 2012
- Bjoern H. Menze and Jason A. Ur: *Mapping patterns of long-term settlement in Northern Mesopotamia at a large scale*, 2012 [Lêkolîn û şiroveyên li ser wêneyên satelîtê yên NASA]
- Bryan Hill: The Rediscovery of Urkesh: Forgotten City of the Hurrians, 2015, https://www.ancient-origins.net/ancient-places-africa/rediscovery-urkesh-forgotten-city-hurrians-003287
- E. Cemîl Paşa: *Dîroka Kurdîstan bi kurtebirî-Enstituya Kurdî ya Brukselê* 1995
- Faik Bulut, *Ortadoğu'nun Solan Renkleri - Bedeviler, Çerkesler, Nusayriler, Dürziler ve Yezidiler*, Berfin Yayınları, 2002
- Fehim Taştekin: *Rojava - Kürtlerin Zamanı*, İletişim Yayınları, 2016
- Fred Donner: *Tribe and state in Arabia*, 1981
- Giorgio Buccellati: *Royal inscriptions, r2 – Tiš-atal*, A Digital Monograph, 2002, urkesh.org/pages/571.htm
- Giorgio Buccellati: *Vexwendinek ji bo serdan ya Girê Mozan - Orkêş ya Kevin*, Mozan: Urkesh Press, 2014 https://doi.org/10.6084/m9.figshare.8396807
- Giorgio Buccellati û Marilyn Kelly-Buccell: Bericht über die 13. Kampagne in Tall Mozan/Urkeş: Ausgrabungen im Gebiet AA, Hezîran-Tebax 2000
- Hannes D. Galter: *Militärgrenze und Euphrathandel. Der sozio-ökonomische Hintergrund der Trilinguen von Arslan Tash*, 2004
- Heide Göttner-Abendroth: *Am Anfang die Mütter*, W. Kohlhammer Stuttgart, 2011
- Husein Muhammed: *Rehnas – ferhenga etîmolojî ya zimanê kurdî*, 2016
- Hüseyin İlker Çinar: *Die Religionen der Araber vor und in der frühislamischen Zeit*, Arabisch-Islamische Welt in Tradition und Moderne 5, Harrassowitz Verlag, 2007
- Ian Morris, *Social Development*, Stanford University, October 2010
- John Anthony Brinkman: *A political history of post-Kassite Babylonia, 1158–722 B.C.*, 1968
- Klaus Schmidt: *Sie bauten die ersten Tempel - Das rätselhafte Heiligtum der Steinzeitjäger, Die archäologische Entdeckung am Göbekli Tepe*, München, 2008
- Lokman I. Meho, Farah W. Kawtharani: *The Kurdish community in Lebanon*, 2005
- Mehmet Emîn Mutlu / Ersîn Çelîk: *Serdema Nû Ya Şoreşan - Şoreşa Azadiya Rojavayê Kurdistanê, Pirtûka Yekemîn: Bingeha Şoreşê*, Weşanxaneya Şilêr, Qamişlo, 2017
- Mehmet Emîn Mutlu / Ersîn Çelîk: *Serdema Nû Ya Şoreşan - Şoreşa Azadiya Rojavayê Kurdistanê, Pirtûka Duyemîn: Cizîr, Pirtûka Duyemîn: Cizîr*, Weşanxaneya Şilêr, Qamişlo, 2017
- Mehmet Emîn Mutlu / Ersîn Çelîk: *Serdema Nû Ya Şoreşan - Şoreşa Azadiya Rojavayê Kurdistanê, Pirtûka seyemîn: Kobanê – Efrîn – Heleb*, Weşanxaneya Şilêr, Qamişlo, 2017
- Michel Fortin: *Syria - Land of Civilizations, The enigmatic figures of Tell Halula,* Musée de la civilisation, Québec, 1999
- Dr. Mihemed Ebdo Elî: *Ezdî û Ezdayetî li Bakur Rojavayê Sûriyê*, Çapnivîsa Kurdî, Efrîn, 2008
- Mustefa Reşîd: *Stranên me yên gelêrî*, Strana Salihê Naso û Kejê Gulîsor, 2002

- N. Gultekin: *Rewşen Bedirxan (1909-1992)*, PolitikART, 2011
- Peter M.M.G. Akkermans, Glenn M. Schwartz: *The Archaeology of Syria - From Complex Hunter-Gatherers to Early Urban Societies (ca.16.000-300 B.C.)*, Cambridge University Press, 2003
- Pîr Dîma: *Lalişa Nûranî – Peristgeha Êzdiyan*, Yêkatêrînbûrg, Basko, 2008, http://www.ezipedia.de/Bib/Books/LalishaNuraniPirDima.pdf
- Şerefxan Bidlîsî: *Şerefname*, 1579; çapa Weşanxaneya Apecê, 1998
- Weşanên Akademiya Jineolojiyê: *Destpêkek ji bo Jineolojiyê*, Çapxana Azadî, 2015
- Zeynep Kınacı Özgür Kadın Akademisi Yayınları: *Rojava Devrimi Broşürü*, Çapxana Azadî, 2018

Gotar, Lêkolîn û Malper

- Andrea Dechant: *Al-Lat – Arabische Mondgöttin*, Malpera Artedea, 14-05-2008: https://artedea.net/al-lat/
- Azîz Ogur: *Evîneke ji agir,* Yeni Ozgur Polîtîka, 15-04-2017
- Bermal Dilgêş: *Li Serê Kaniyê Rihê Berxwedanê Bi Serket*, Navenda Ragihandina YPJ, 27-11-2019: https://ypjrojava.net/?p=10276
- Bêrîtan Medûsa, Sozdar Xelîl: *Ji şaredariya Serêkaniyê ji bo şêniyan bang!*, ANHA, 12-12-2018: https://www.hawarnews.com/kr/haber/ji-saredariya-serkaniy-ji-bo-sniyan-bang-h10874.html
- Bêrîtan Medûsa, Sozdar Xelîl: *Dewleta Tirk dibe sedem ku ava kanalîzasyonê ji bo çandina zebzeyan bi kar bînin*, ANHA, 10-10-2018: https://www.hawarnews.com/kr/haber/dewleta-tirk-dibe-sedem-ku-ava-kanalzasyon-ji-bo-candina-zebzeyan-bi-kar-bnin-h7253.html
- Bêrîtan Sarya: *'Ti tişt nikare li pêşiya karê min ê ji bo gel û Rêberê min bibe asteng'* - Hevpeyvîn bi Bavê Fener re, ANF, Dêrik, 13-02-2017: https://anfkurdi.com/kurdistan/ti-tist-nikare-li-pesiya-kare-min-e-ji-bo-gel-u-rebere-min-bibe-asteng-76019
- Bêrîtan Sarya: *Şervana Ermen: Nebin hevparê êrîşa dewleta Tirk*, ANF, 28-10-2019: https://anfkurdi.com/ewropa/Servana-ermen-nebin-hevpare-erisa-dewleta-tirk-120157
- Bêrîvan Osman: *Çeçenên Rojava li ku ne û ji ku ve hatine?*, ANHA, 19-10-2016
- Clemens Reichel, American co-director of the Syrian-American Archaeological Expedition to Hamoukar: *Artifacts from Hamoukar,* 2007: http://www-news.uchicago.edu/releases/07/070116.hamoukar-photos.shtml
- Daxuyaniya Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê: *Di encama topbaran Tirkiyê de perwerdehî li 810 dibistanan rawestî û 20 dibistan bi temamî wêran bûne*, ANHA, 18-10-2019: www.hawarnews.com/kr/haber/desteya-perwerde-frkirin-ya-bakur-rojhilat-sriy-daxuyan-da-h23216.html
- Daxuyaniya Fermandariya Gişti ya YPG: *Pêngava Fermandar Rûbar Qamişlo bi serketî dawî bû*, ANF Qamişlo, 10-07-2015: https://anfkurdi.com/kurdistan/pengava-fermandar-rubar-qamislo-bi-serketi-dawi-bu-hat-nukirin-43467
- Daxuyaniya Fermandariya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD): *Hemleya Rizgarkirina Reqayê bi navê Xezeba Firatê destpêkiriye*, 06-11-2016: https://www.ypgrojava.org/H%C3%AAz%C3%AAn-S%C3%BBriya-Demokrat%C3%AEk-%28QSD%29-hemleya-rizgarkirina-Reqay%C3%AA-bi-nav%C3%AA-Xezeba-Firat%C3%AA-da-destp%C3%AAkirin.
- Daxuyanî: *Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) qonaxa dawîn a Hemleya Bagera Cizîrê ragihand*, 11-09-2018: http://tev-dem.com/2018/09/11/qsde-qonaxa-dawin-a-bagera-cizire-ragihand/

- Daxuyaniya Komîteya Aborî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê: *Rapora talanê ya Serêkaniyê û Girê Spî hate eşkerekirin*, ANF, 20-11-2019: https://anfkurdi.com/rojava-sUriye/rapora-talane-ya-serekaniye-u-gire-spi-hate-eskerekirin-121180
- Daxuyaniya Komîteya Qada Civakî ya Kongra Star: *Ji Bo Raya Gişti Ya Cîhanî û Netewên Yekbûyî*, 28-10-2019
- Daxuyaniya Rêxistina Mafên Mirovan a Efrînê: *Hezar û 200 bûyerên tûndiya li dijî jinan hatin belgekirin*, Ronahî TV, 27-11-2019: https://ronahi.tv/archives/27283
- Daxuyaniya Kongra Star: *Mala Jinê li Dêrazor cihê çareserkirina pirsgirêkên jinan e*, 11-04-2018: https://ku.kongra-star.org/archives/1082 https://ku.kongra-star.org/archives/1082
- Daxuyaniya Kongra Star: *2019 - Saleke tijî serhildan, berxwedan û sûcên li dijî jinan*; 28-12-2019: https://ku.kongra-star.org/archives/4043
- Daxuyaniya YPJ'ê: *Tekoşîn, Şer û Berxwedana Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê a Sala 2019'an*, 05-01-2020: https://ypjrojava.net/?p=10484
- Dicle Ehmed: *Keça Ebû Leyla: Xewna bavê min pêk hat*, ANHA, Kobanê, 06-03-2019: https://hawarnews.com/kr/haber/keca-eb-leyla-xewna-bav-min-pk-hat-h14205.html
- Dilûcan Bozî: *Şer dibe kabûsê jiyana zarokan*, JinNews, 20-11-2019: http://jinnews.com.tr/kr/Zarok/content/view/124490
- Dominik Bonatz: *Tell Fekheriye*, A project of the Directorate of Antiquities Syria and the Institute of Near Eastern Archaeology of the Freie Universität Berlin with the cooperation of SAHI (Slowakian Archaeological and Historical Institute) 2006-2011: http://www.fecheriye.de/pdf/04_researchhistory.pdf [1]; www.fecheriye.de/wp-content/uploads/2015/02/01_introduction.pdf [2]
- Ehmed Semîr, Sîma Brokî: *Amadekariyên destpêkirina darizandina çeteyên DAIŞ'ê*, ANHA, 19-02-2020: https://www.hawarnews.com/kr/haber/amadekariyn-destpkirina-darizandina-ceteyn-dais-h28387.html
- F. Estebaranz, L.M. Martínez, J. Anfruns, A. Pérez-Pérez: *Short Fieldwork Report: Tell Halula (Syria)*, seasons 1992–2005: http://www.anthropology.uw.edu.pl/01/bne-01-04.pdf
- Hagop and Marilyn Arshagouni: *Armenian History Timeline*, 1998, http://www.littlearmenia.com/html/history/default.asp
- Hayri Demir: *Çarşema Sor – Das ezidische Neujahrsfest*, Malpera Ciwanên Ezidi, 27-03-2011: www.ciwanen-ezidi.de
- Henry Curtis Pelgrift: *Mari*, Ancient History Encyclopedia, 2016: http://www.ancient.eu/mari/
- Hîvda Hebûn: *'Em ê bi rengekî azad vegerin Efrînê', hevpeyvîn bi endama Yekîtiya Êzidiyan Gulêcan Fer*, ANF, Şehba, 07-06-2018: https://anfkurdi.com/rojava-Sûriye/em-e-bi-rengeki-azad-vegerin-efrine-98173
- Jinên Beth Nahrîn: *Ji bo hemû jinan ber bi Reqqa ve dimeşin*, ANHA, 08-03-2017
- Dr. Jörg Becker: *Tell Halaf – Ausgrabungsprojekt 2006 - 2010*, Besiedlungsperioden: http://www.grabung-halaf.de/periods.php
- Dr. Jörg Becker: *Ergebnisse zur Halaf- und Obeid-Zeit in Nordmesopotamien anhand der Untersuchungen in Tell Tawila, im Wadi Hamar und in Tell Halaf:* http://www.orientarch.uni-halle.de/digs/tawila/tawila_results_germ.pdf
- Kemal Tolan: *Kurtiyek ji dîroka Êzdiyên li rojavayê Kurdistanê*, 10-08-2013: http://www.doxata.com/moxtara/11352.htmlhttp://www.doxata.com/moxtara/11352.html
- Konê Reş: *Beriya Mêrdînê Û Rola Jinê Di Civaka Kurdî De*, 2012, www.pen-kurd.org
- Kongra Star: *Effects of the Turkish invasion of North and East Syria on women and children*, 22-11-2019

- Dr. Lutz Martin: *Eroberung mit Spaten und Zeichenstift*, in DAMALS - Magazin für Geschichte 2/2011
- Navenda Heyva Sor a Kurd li Bakurê Sûriyê: *Rapora Salê ya Nexweşên Jin yên ku ji Heyva Sor a Kurd (HSK) Sûd Wergirtine*, ji 01-01-2019 heya bi 01-01-2020
- Navenda Lêkolînê ya Jineolojiyê ya Dêrikê: *Encamên lêkolînê li ser sedemên hevberdanê*, 2018
- Navenda Lêkolînê ya Jineolojiyê ya Dêrikê: *Encamên rapirsiya 'Azadî çi ye?'*, 2018
- Navenda Lêkolînê ya Jineolojî ya Dêrikê: *Gavên destpêkê*, Akademiya Jineolojiyê ya Rojava, 2019
- Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS): *Encamên Serjimara li ser Rewşa Xwendina Jinên Kantona Cizîrê*, Qamişlo, 16-09-2016
- Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS): *Forûma Paqijiya Etnîkî û Guhertina Demokratfîk a li Efrînê ya Navneteweyî li* Amûdê, 2 heta 4-12-2018
- Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS): *Encamnameya Komcivîn 'Qirkirina Etnîkî û Guhertinên Demografîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê*, 18-12-2019
- Nazdar Ebdî, Îdrîs Ebdullah: *Dosya Rojava-3*, *Deryaya deng, reng û baweriyan*, ANHA, 20-02-2016
- Nûçe: *Rêveberên Lafarge yên ku bertîl dane DAIŞ'ê wê bên darizandin*, ANF Parîs, 09-12-2017: https://anfkurdi.com/cihan/reveberen-lafarge-yen-ku-bertil-dane-daiS-e-we-ben-darizandin-89672
- Nûçe: *Komxebata jinên êlên Ereb bi dawî bû*, ANHA/ Tebqa, 01-09-2019: https://hawarnews.com/kr//haber/komxebata-jinn-ln-ereb-bi-daw-b-h21065.html
- Nûçe: *Du salan pişti rizgarkirina Reqayê zêdetirî 5 hezar û 700 termên mirovan di gorên komî yên DAIŞ'ê yên li Reqayê de hatin dîtin*, Nûçe Ronahî TV, 05-02-2020
- Rapora Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê (RMME): *Li Efrînê paqijiya etnîkî: Nifûsa Kurd daket ji sedî 18'an*, ANF, 17-03-2020: https://anfkurdi.com/rojane/li-efrine-paqijiya-etniki-nifusa-kurd-daket-ji-sedi-18-an-125596
- Rojbîn Ekîn: *'Rêwîtiya ji bo berxwedanê û şopên demê: Serêkaniyê'*, Malpera *Women Defend Rojava*, 08-12-2019: https://womendefendrojava.net/en/2019/12/08/journey-for-resistance-and-the-footsteps-of-time-reflections-from-the-massacre-in-serekaniye/
- Rojda Felat: *Rizgarkirina Tebqa û Bendavê tolhildana jinên Êzidî bû*, Malpera YPG, 12-05-2017: https://www.ypgrojava.org/Rojda-Felat%3A-Rizgarkirina-Tebqa-%C3%BB-Bendav%C3%AA-tolhildana-jin%C3%AAn-%C3%8Azid%C3%AE-b%C3%BB ; https://youtu.be/TR-fqj0yOVE
- Ruba el-Elî: *Şoreş jinê azad dike*, Yeni Ozgur Politika, 07-09-2019: http://yeniozgurpolitika.net/sores-jine-azad-dike/
- Self Administration of Northern and Eastern Syria: *Demographic change by the Turkish state in North-East Syria*, 07-11-2019
- Seminar für Orientalische Archäologie und Kunstgeschichte, Martin-Luther-Universität Halle-Wittenberg: Tell Chuera, Syrien - Fundort und Grabungsbereiche: http://www.orientarch.uni-halle.de/digs/chuera/chuinfo.htm#Plan
- Stefan Winter: *The Other Nahdah: The Bedirxans, the Millis, and the Tribal Roots of Kurdish Nationalism in Syria*. Oriente Moderno 86 (*2006*), pp. 461-74
- Şêrîn Zêrevan, Rojda Seydxan: *Ji bo jinan zayîna bi tendurist a xwezayî ye*, Jin News, Qamişlo, 28-07-2019: https://www.jinnews.com.tr/kr/TENDURISTI/content/view/115311
- Şêrîn Zêrevan: *Bijîşka daxiliyeyê hişyar kir: Teşhîsa zû girîng e*, Jin News, Qamişlo, 13-10-2018
- Şîlan Mihammed: *Minbic li hêviya siberoja azad e*, ANHA, 02-06-2016

- Tharwat Al-Batawi: *Frauen und arabisch-islamische Bildung - Pionierinnen der Wissenschaften*, Malper: Qantara, 29-05-2017: https://de.qantara.de/inhalt/frauen-und-arabisch-islamische-bildung-pionierinnen-der-wissenschaften

- Veysî Aydin: *Belgeyek girîng ji dîroka Êzdiyan*, 16-01-2018: http://www.rupelanu.com/belgeyek-giring-ji-diroka-ezdiyan-1815h.htm

- Weqfa Jina Azad li Rojava (WJAR): *Encamên anketa 'Nêrînên li ser rastiya zewaca di temenê piçûk de'* bi 1676 beşdarên jin û mêr re, 2016

- Weqfa Jina Azad li Rojava (WJAR): *Anket li ser hejimar û radeya jinên bêkar ên temenê wan ji 18 heta 59 salî li herêma Cizîrê*, 2016

- Yıldız Turkmen: *Ez Ji Bo Naskirina Nasnameya Xwe Beşdar YPJ'ê Bûm*, Navenda Ragihandina YPJ'ê, 25-11-2019: https://ypjrojava.net/?p=10254

Hevpeyvîn:

Girêdayî xebatê lêkolîn û analîza sosyolojîk li ser jin û civaka Rojava / Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji Kanûna 2016 heta Hezîrana 2020'an **bi giştî 383 hevpeyvînên şaxsî, nîqaş û şevbihêrkên komî** li herêmên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Suriyê hatin çêkirin.

340 ji van hevpeyvîn, nîqaşên komî û şevbihêrkan di sala 2017'an de hatin li darxistin. 53 li bajar û gundên kantona Efrînê pêk hatin, 78 li bajar û gundên kantona Kobanê, 18 li bajar û gundên herêma Minbicê, 11 li bajarê û gundên Girê Spî û Eyn Îsayê, 10 li bajar û gundên navçeya Serêkaniyê, 7 li bajar û gundên navçeya Til Temirê, 9 li bajar û gundên navçeya Dirbesiyê, 13 li bajar û gundên navçeya Hesekê, 27 li bajarê Dirbêsiyê û gundê Jinwarê, 24 li bajar û gundên navçeya Amûdê, 18 li bajarê Qamişloyê, 6 li bajar û gundên navçeya Tirbespiyê, 2 li bajarê Çilaxayê, 9 li bajarên Girkêlegê û Rimêlanê, 5 li bajar û gundên navçeya Til Koçerê, 39 li bajar û gundên navçeya Dêrikê û 11 li eniya şerê rizgarkirina Reqayê.

Di dewama vê xebatê de **di sala 2018'an de** bi giştî 27 hevpeyvîn û nîqaşên komî li gund û bajarên Reqa, Tebqa, Eyn Îsa, Til Temir, Hesekê, Amûdê, Qamişlo, Dêrik û li herêma Qandilê ya Başûrê Kurdistanê hatin çêkirin. Her wiha ji bo misoger kirina hinek agahî û tehlîlan **di sala 2019'an de** 12 hevpeyvîn û nîqaşên komî li Qamişlo, Til Temir, gundê Jinwarê, Dêrik, Amûde, Kobanê û herêma Şehbayê hatin çêkirin. Di dawî de bi giştî 4 hevpeyvîn û nîqaş **di sala 2020'an de** li Qamişlo, gundê Jinwarê û Dirbesiyê hatin meşandin.

Deng û têbiniyên van hevpeyvîn û nîqaşan di arşîfa Akademiya Jineolojiyê de tên parastin.